.

# Kobanê stalingrada kurdan; Berxwedana Kobanê a dîrokî

•

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

**Kobanê stalingrada kurdan; Berxwedana Kobanê a dîrokî**

Weşanên SORAN e

.

17î cotmeha 2014

Edîtor : Zeynel Abidîn Han

Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran

Grafîk û Design : Gazîn Han

.

email: han-grafik@hotmail.de

.

Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH

Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn

.

ISBN 978-3-9816686-7-4

.

**Kobanê stalingrada kurdan; Berxwedana Kobanê a dîrokî**

**Pêşgotin:**

Di temenê pêvejoyaka şoreşa rojava de, em divê ku berxwedana kobanê hildina li dest. Di vê xabatê de, me ji destpêka bûyîna şoreşa rojava û heta serdema berxwedana kobanê me hilde li dest. Gav bi gav, çawa bi ber berxwedana kobanê ve dem diçê, emê divê ku wê fahm bikin. Destpêka şoreşa rojava 19´ê temûza 2012´an bû. Piştî vê dîrokê û demê û pê de, pêl bi pêl, hêrîş li rojava hat kirin. Piştî vê demê re derxistina li holê a DAÎŞ´ê weke projeyeka ku biwê dixwestin ku derbeyê li civate kurd bixin hat pêşxistin. DAÎŞ´, bi rêbazên jenosîdê şer bi kurdan re meşand. Rêbazên jenosîdê ên ku saddam li dijî kurdên başûrê kurdistanê bikarhanî, ên ku rejma tirk li bakûrê kurdistanê li dijî civate kurd bikarhanî û her wusa hin rêbazên jenosîdê ku artişa Sirbistanê ku li dijî Bosna-hersekîyan bikardihanî, li dijî kurdan bikarhanî. Gotinên weke ku weke "fetwa" dihatina ser ziman ên weke "mêrên kurdan bikujin jinên wan ji xwe re weke carîya bibin" vê rêbaza jenosîdê ku DAÎŞ´ê li dijî kurdan bikardihanî bû. Lê ev rêbaz, weke rêbazaka jenosîdê ku artişa Sirbistanê jî li dijî Bosna-hersekîyan bikarhanî bû. Artişa Sirbîstanê jî, mêr dikuştin û jinên bosna-hersekî, weke "koleyên seksê" jî bikardihanîn. Ev rêbazên jenosîdê, bo ji hevdû felişandina civatekê dihatina bikarhanîn. Î ro jî, li dijî kurdan bidestê DAÎŞ´ê dihatina bikathanîn. Ev rêbazên jenosîdê, li herêmên kurdistanê ên weke Şengalê ku zêde rewşa parastina civatî pêşneketîbûbû, birina sêrî. Bi sed hezaran kurdên êzîdî ji warên wan hatina goçberkirin. BI deh hezaran hatina qatil kirin. Û weke jinên kurdên êzîdî jî, bi hezaran, ji aliyê çeteyên DAÎŞ´ê ve bi xwe re hatina birin û weke "koleyan hatina firotin li bazaran" Ev rewş, bieş di çapameniya cihanê û ya kurd de jî cih girt. Piştî Şengalê, li Kobanê û bigştî jî li rojavayê kurdistanê hat xwestin ku were pêşxistin. Bo vê yekê, ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, çeteyên DAÎŞ´ê bi şitt bidest hêrîşa li Kobanê kirin. Armanca wan ew bû ku pêşî Kobanê bixin û piştre berê xwe bidina bi ser Hesekê û Afrînê de. Êdî piştre van herêman jî bixin. Bi wê re jî, hem şoreşa rojava têkbibin û hem jî, temenê ppêşketina civate kurd a bo bidestxistina statûya wê ku pêşketîya ji holê rabikin. Ji xwe, ´pêvajoya çareserîyê´ a li bakûrê kurdistanê jî, rayadarên tirk, bo biserxistina pêvajoyek bi vê rengê a şikandina kurdan bikarhanîn. Bo vê yekê ya, ku çendî ev ser du salan re ser destpêkirina pêvajoyê re di buhurê ti gav ne hatina avêtin.

LÊ li kobanê berxwedanak dîrokî hat dayîn nîşandin. Vê berxwedanê, bi biqasî ku kurd li hemû beşên kurdistanê li dora xwe gihand hevdû û gihand gîyanekê, bi heman rengî ket rojeve cihanê giştî de jî. Berpirsîyarê têkiliyên derve a ewropa Catherîne Ashton li berçapameniyê bo kobanê û berxwedana kobanê dibêje, «kobanê berxwedan şanî cihanê hemûyî da.». Ev jî, dide nîşandin ku ev berxwedan, çawa êdî ketîya dîrokê de. Vê berxwedanê dîrok nivîsand, Di van rojên ku ev berxwedan didomê de, min ev

xabat hilde li dest û nivîsand. Lê ez divê ku vê yekê bibêjim, hê jî, di nava çapameniyê de ên ku bi vî rengî nîqaşê dikin û dibêjin ku ”ku DAÎŞ ket kobanê de wê çi bibe”. Serokkomarê tirk T. Ardogan jî, dibêje ”kobanê ket, dikeve.” Kobanê, ji vê kêlîkê û pê de, bikeve jî û nekevê jî, ew rola xwe ya dîrokî leyist. Êdî bikeve jî, wê bandûra wê li kurdan nebê. Ku di destpêka pêvajoya hêrîşan de ketiba, dibêt ku bandûra wê li civate kurd bi zirabî zêde bûba. Lê êdî ew bandûr şikeşt. Kobanê, êdî ew ”kelehe dimdimê” ya. Bi vê rengî bûya malê dîrokê. Kobanê, bi berxwedana Arîn Mîrkenan û baweran gihişt wê asta rûmetê ya herî bilind. Piştî ku berxwedana kobanê mazin bû, êdî li her çar beşên kurdistanê jî, li dora wê gîyane kobanê gihiştin hevdû. Li hemû beşên kurdistanê, gel rabû serpîyan û serhildan kir. Navê wê serhildana her çar beşên kurdistanê jî ´berxwedana kobanê´ bû. ..

.. **Li vir**, divê ku mirov hinekî li ser dîrokê jî rawastihê. BI teybetî, pêşveçûnên ku di çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de rû didin, sînorên berî dagirkirina wê ya ji aliyê Osmanîyan ve divê ku mirov li ser bisekinê. Di sedsalên berî dagirkirina Îstambûlê de, dema ku mirov li dîrokê dinerê, mirov dibînê ku sînorê anatolîa tê û li kurdan disekinê. Sînorê dewleta kurd a Eyûbîyan dikev sînorê Bîzans de. Bi wê re, berî Eyûbîyan, sînorê dewleta kurd Merwanîîyan, dîsa dikeve sînorê Bîzansîyan de. BI sedsalan Bîzansîyan û kurdan, di sînorekî de bi hevdû re jîya na. Ev rewş, divê ku mirov wê kifş bike. Piştî ku Îstambûl ji aliyê stiltanê osmanî Mehmedê duyem ve hat dagirkirin û pê de, ew sînor ji holê rabû. Desthilatdarîyek îslamî hat avakirin. Kurdan jî, piştgirî dabûbûna wê desthilatdarîya îslamî. Heta ku dewleta kurd, bi hêz û qûdreta xwe, xwe di nava wê desthilatdarîya osmanî de kiribû temen. Êdî, piştî wê dagirkirina Îstambûlê û pê de, bahse dewleta kurd a eyûbîyan jî ne dihat. Ev jî, weke mijareka ku em divê ku bi teybetî li ser bisekin a.

Lê em dizanîn ku piştî ku îstambûl hat dagirkirin ji aliyê Osman ve ew sînor guharîn. Ev bi sînorbûna bi hevdû re a kurdistanîyan û xalkên Anatolia, dîrokeka wan ya teybet heya. Ku em di çerçoveya serdem û demêm hemdem de hildina li dest, em divê ku bibêjin ku di serdemên Hûrî û mîtannîyan kurd bûna sînor bi Hîttîtîyan re. Piştre, di dema Medîya de, wê hîttîtî werina ji holê rabin. Li şûna wan li anatolîa serdemeka dewleta Lîdya ku li anatolîa serdesta wê destpê bike. Di dema Medîya û lîdya de, wê hinek pevçûn jî û ankû şer jî di nava wan de rû bidin. Ew şerê pirr-navdar ê di nava lîdya û medya de ku li ber çemê ´sor´ û ankû çemê ´hayls´ de dibêt wê bibê malê dîrokî, Di wê demê de li ser taxtê Lîdya key Alîyêt heya. Li ser taxtê Medîya jî Qîyakser heya. Artişên herdûyan tên berhevdû û bi hevdû re şer dikin. Di ancamê de, di nava wan de peymanek aşîtîyê tê çêkirin. Key Aliyê keça xwe ´alyanis´ dide kûrê Qîyakser ´Astîyeg´. Piştre jî, ew li rex hevdû bi aşîtî dîjîn.

Piştî Medîya re wê serdemên Sasanîyan wê hebin. Kurd jî, li warên xwe serdest û desthilatdar in. Piştre derketina împaratoriya roma û seferên wê ên li herêmê, wê li herêmê bê sedema gelek şer û pevçûnan jî. Lê li herêmê di wê demê de li Anatolîa serdestîya roma dibêt. Keyanîyên li herêmên anatolîa ên weke li ber bahre reş ên weke ´keyanîya trabzonê´ û hwd, di temenê hevkarîyê de peymanan bi roma re çê dikin. Bi vî rengî, romayî, ne dest li wan didin û ne jî ew jî, li dijî wan raperînan li dar dixin. Li herêmên kurdistanê ên ber diclê û firatê jî serdestîya kurdan bi xalkên din ên weke asûrî û ermenî û hwd re heya. Lê di wê demê de bi herêkirina serdestîya roma ji aliyê keyanîyên anatolîa ve, wê anatolîa bike herêmek ku lê roma serdest a. Lê li vir, divê ku

mirov vê yekê bibêje ku anatolîa gelek keyanî û hwd hena. Minaq, keyanîyên weke ´keyanîya fenîka´ û hwd, wê heta sadsale 15´an a piştî zayîna îsa jî wê hebûna xwe de bide domandin. Ji aliyê sînor ve têkiliyek xalkên anatolîa û kurdistanî bihevdû re hebû. MInaqe vê jî, em bi tefsîrên weke ên ´Zaûgma´ û hwd dibînin. Çend ku ev çand, weke çandna herêmîna, hinekî jî didina nîşandin ku têkiliyek çandî û felsefekî jî bi hevdû re heya. Em vê yekê ji kûderê fahm dikin? Em vê yekê, ji tefsîrên erkolojikî ên ku di roja me de jî bi jîyane herêmê re dihên kifşkirin re dibînin.

Li herêmê jîîyane xalkên herêmê, bi hevdû re di têkiliyê de ya. Ev rewş, di her demê de bûya. Di serdemên hûrî û mîtannîîyan de jî ev bûya. Di serdemên piştre ên Medîya û di dema Bîzansê de jî bûya. Her wusa, di serdema mîtannîyan de bahse çand Mîtra wê weke ku çawa ku li ber diclê û firatê bi kok heya û wê li anatolîa jî xwe bide nîşandin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê biawayekî vekirî bide dîyar kirin. Tefsîrên mîtolojikî ên ku li anatolîa pêş dikevin ên weke Piremetûs û hwd, wê di bin bandûra tefsîrên Mîtra de bin. Ew tefsîrkirin ku bawermendên Mîtrayî bo mîtra dikin, wê ew werina esas girtin û ew tefsîr werina pêşxistin. Piştî van deman di dema Medîya jî, bi pêşketinên weke pêşketina têgihiştinî ên weme Zerdeşt û hwd re, wê herêm pirr zêde were bi bandûr kirin. Jîyan, weke ku ji nû ve were kifşkirin dibêt. Tefsîr û têgihiştinên felsefîkî û hwd, pêş dikevin. Filosofên ku piştre nav didin ên weke Thales ên girêkî, wê bi deh salan di nava jîyane Medîya de xwe perwerde bikin. Di dema ku şerê li ber çemê sor di nava artîşa Medîya û ya Lîdya de dibû, Hingî Thales jî li rex ketê Medî rûniştî bû û li şêwirmendên keyê medî dihisand. Wî çi agahî di bihîst, wê piştre weke hizir bêne herêmên xwe û li wir werêne ser ziman.

Li Medîya, felsefe pirr zêde pêşketîya. Minaqe vê jî, ew a ku bi nivîsandinên avestayên Zerdeşt û hwd in. Tê gotin ku ser 16 hezar çermî avesta hatîya nivîsandin. Di serdemên dema Medîya de, wê ew pêşketina medîya û ew dewlemendîyên wê bikin ku seferên bihovî ên weke wan seferên ku Îskenderê Mekedonî dike li wê herêmê werina kirin. Îskenderê mekedonî ji ber wan kirinên wî yên xadar, kurd navê "zûrqerneyn"tiyê lê dikin. Ev nav, kurdan lê kirîya. Bo ku her dema ku ew navê wî hat hildan, ew kirinên wî yên xadar jî werina bîrhanîn. Jixwe di zimanê kurdî de "zûrqerneyn" tê wateya "qarnê ku jê îbret were girtin" a.

Piştî Medîya re, wê kurd û faris di bin desthilatdarîya Sasanîyan de li hevdû bikin. Ev levkirin jî, parastina herêmên xwe ya. Di wê demê de, bi wê hevkarîyê, li hemberî hêrîş û seferên împaratorîya roma disekin in. Pevçûnên di nava roma û Sasanîyan de, wê di herdû dusadsalên dawiyê ên sedsalên 3´min û 4´min ên piştî zayîna îsa wê zêdetir bibin. Lê wê Sasanî karibin, herêmên xwe biparêzên.. Ya ku wê desthilatdarîya Sasanîyan bike weke "împaratoriyekê" jî, ev levkirina di nava faris û kurdan de ya. Wê li herêmê, ev levkirina kurd û farisan, wan bike hêzek împaratorî a herêmî. Li ser vê temenê, wê sînorê xwe biparêzên. Anatolîa, bi levkirina roma bi keyanîyên wê herêmê re bûya weke herêmek romayî. Lê wê kurd, karibin sînorê xwe yê bi anatolîa re biparêzên. Wê nehêlin ku ti serdestî sînorê wan bikina bin dest de. Ev rewş, heta demên piştî derketin û hatina îslamîyetê jî wê bidomê. Lê berî serdemên derketin û hatina îslamîyetê, di sedsale 4´min û pê de, piştî ku romaya rojava û ya rojhilatbi qatbûna roma re afirî û pê de, rewşek nû afirî bû. Romaya rojhilat, ku navenda wê anatolîa bû, wê di temenê desthilatdarîya dewlet ya herêmkî de xwe bide jîyandin. Ev dewlet jî, wê êdî navê "Bîzans" lê were kirin. Bizansî, ji ber ku di temenê çanda wê herêmê ya girêkî de

xwe birêxistin kir û gihand çandekê. Li gorî wê tevdigerîya. Bo vê yekê, ji rewşa împaratoriyekê zêdetirî, bûbû weke dewletek herêmî ya ku li gorî wê reng standî. ..

Bîzans, sînorê kurdistanê bû. Heta sedsala 11´min, wê bi sed salan ew rewş wê hebûna xwe bide domandin. Lê piştî ku îslamiyet derket û pê de, îslamiyetê xwe weke oleka desthilatdarîyê a sîyesî birêxistin kir. Piştî mirina Hz. Mihemed re, mirovên ku li cihê wî rûniştin bi navê "xalîfetîyê", wê hizra "Fetihkirinê" derxina li pêş.Bi wê yekê re, wê li herêman seferan bikin.Îslam, êdî ji olê derketibû û bûbû weke temen û rengê desthilatdarîyek ku herêm bi herêm li deverên cihanê seferan dike û wan ´fetih dike" ya. Li Anatolîa, ji serdemên hûrî û Mîtannîyan bigra û heta serdemên Medîya û ji van serdeman heta serdema Bizansan, ev desthilatdarîyên ku li anatolîa avabûna bûna cîranê kurdan. Ew cîrantî jî, hatîya kirin. Her wusa, di sedsalên piştre de jî, ev cîrantî hatîya kirin. Lê piştî derketina îslamiyetê, wê kom bi kom, komên aşîrî ku dixwezin bi buhurina anatolîa û li wir herêmek serdestîya xwe ava bikin wê biafirin. Komên tirkmen, tenê hinek ji van koman in. Ji ku ber misilmantî jî herêkirin, di serî de kurd wê gelek xalkên din alikarî û piştgirîyê bidina wan. Li ser vê rewşê vê rewşê dema ku Romeo dîyojen seferekê li dijî van koman dide destpêkirin û wan bi herêmên kurdistanê ve dide goçberkirin û dema ku artişên dîyojen sînorê kurdan derbas dikin, wê li deverên weke malazgîrê û hwd, rastî artişên kurd werin. Êdî dikevina cengê de bi hevdû re. Bi wê têkçûna ku artişên dîyojen di van cengên xwe yên bi kurdan re dixwe, wê bandûra wî û artişa wî ya li ser anatolîa jî kêm bike. Li ser vê rewşê wê êdî komên artişên îslam wê seferan li herêmê bikin. Wê bixwezin ku artişa Bîzansê bişikênin wê herêmê jî bikina herêmek qada ku lê misilmantî hatî bicihkirin.

Ev pevçûn, wê di bin maskeya îslamê de werina kirin. Ew levkirina xwezayî ya bi rengê dest nedayîna sînoran, bi derbaskirina artişên dîyojen ji sînoran û buhurîna wan li herêmên kurdan, weke ku hatibû şikandin. Piştre jî, ev rewş, êdî piştre wê bê temenê şikandina wê. Di wê demê de serdema Merwanîyan li kurdistanê bi serdestî hebû. Merwanî, weke desthilatdarîyek kurdî ku di berdewama desthilatdarîya kurd a şadadîyan de pêşketîya û domîya ya. Ji xwe, Merwanî jî, ji şadadîyan nin. Şedadî û merwanî, ji malbatekê na û kurd in. Her wua, di dewama şadadî û merwanîyan de, weke dewama wê malbatê em dikarin bahse desthilatdarî û dewleta eyûbîyan jî bikin.

Li herêmê, divê ku mirov bibêje ku di dema desthilatdarîya eyûbîyan de jî, ew parastina sînorî bûya. Piştre, ev rewşa parastina sînor, di dema osmanîyan de û di bin navê desthilatdarîya îslamî û hwd de, hatîya buhurandin û ji holê rakirin. Piştî vê re, çendî ku kurdan alikarî dan osmanîyan, wê piştre ew alikarî bê temenê hêrîşên li wan û têkçûna kurdan li herêmên wan. Ev rewş, wê dem bi dem êdî pirsgirêka ji kurdan re biafirêne. Kurdan, piştî kifşbûna rengê desthilatdarîya osmanîyan re ev rastî êdî baş ditin. Çend ku ditin, êdî hin bi hin xwe ji wê dûr dikirin. Bi wê re jî, êdî raperînên kurdan li dijî wê destpê dikin. Ji sedsale 16´min û pê de, wê raperînên kurdan li dijî osmanîyan kêm nebin. Ew serhildanên kurdan ku li dijî osmmanîyan ji sedsale 16´min û pê de, destpêkirin, wê ser çar-sadsalî re bidomîn. Wê bênavber ji sedsale 16´min û heta sedsale 21´ê li dijî osmanîyan û bermehîya wê **komare tirk wê bidomin.**

**Ku mirov** ji kîjan aliyê ve binerê, şoreşa kurd di sedsala 21´ê de bû. Ji serdema weşokanî heta serdema serêkahniyê, felsefe û temenê şoreşa rojava û berxwedana dîrokî a Kobanê ku bû temenê gîyane netewî a kurdistanî, dîrok nivîsand. Berxwedana

Kobanê, hem reng û felsefeya şoreşa rojava bi dunyê da fahm kirin û hem jî di nava kurdan de û di nava civate kurd de şîyarbûnek da çêkirin û kurd li dora gîyanekê gihand hevdû.Berxwedana kobanê, heya hemû beşên civate kurd ên rojhilat, başûr û bakûrê kurdistanê jî, ji hevdû çêkir. Dibêt ku ev sedsala ku ji başûrê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê, bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê bi hevdû re ji ber tiştekî bi hevdû re ne rabûna serpîyan û bertek nedane nîşandin. Ev, bi hevdû re rabûna serpîyan, tenê di du rewşan de bûya. Yek, di komploya navnetewî a 15´ê de ku bi wê Birêz Ocalan hatibû dilgirtin, di wê de bûbû. Û î ro jî, bi kobanê re û bi berxweedana kobanê re ev dibêt. Di hundurê vê sedsala ku em di wê de na, ev herdû bûyar bûna sedema şîyarbûn û berteka civatî a giştî. Komploya 15´ê sibatê, di sale dawî a sedsale 20´an de bû. Bi vî rengî, ku mirov kobanê werêne ser ziman, di hundurê sedsale 21´ê de, berxwedana kobanê, dibê xale hevbeş ya civate kurd giştî. Ji başûrê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê, bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê bi hevdû re bo wê rabûna serpîyan dibêt. Bi vê yekê, mirov dikarê berxwedana kobanê, weke rewşeka ku rengê civatîtîya civate kurd a giştî da nîşandin, raxist li berçav û hemû kurd ji hemû beşên kurdistanê li dora wê gihand hevdû. Ev gîyane hevdû a civate kurd, bi berxwedana kobanê re diafirê. Bo vê yekê, berxwedana kobanê, divêt ku mirov, ji aliyên weke civaknasî, deronî, felsefîkî û têgihiştinî û hwd, ji gelek aliyan ve li ser wê bisekinê û dahûr bike. Berxwedana kobanê, piştî ku destpêkir, bû berxwedanaka navnetewî. Bandûra wê, li giştîya cihanê hat dîtin. Berpirsîyarê têkiliyên derve a ewropa Catherîne Ashton li berçapameniyê bo kobanê û berxwedana kobanê dibêje, «kobanê berxwedan şanî cihanê hemûyî da.» Berxwedana Kobanê, di asta neteweyên yekbûyî de jî bandûra xwe dabûbû nîşandin. Serokê netewyên yekbûyî Ban-kî moon bang kir bo ku civate awerta bo kobanê were li darxistin. Kobanê, weke kantonaka rojava, bi rewşa xwe re ji dewletekê zêdetirî xwedî vîn û berxwedan bû. DAÎŞ´ê di hundurê seatekê de dikarê Musil û gelek deverên din ên Îraqê bike bin kontrola xwe de. Cihan hemû bi tirs li wê dinerê. Lê kurdan ew, tirsa wê ya li ser cihanê jî şikandin. Her wusa, dema ku em bahse DAÎŞ´ê bikin, em nikarin, tenê weke rêxistineka tundrew a kujar bahse wê bikin. Divê ku bi rejimên li pişt wê ên weke rejima tirk û hwd re bahse wê bikin. Dema ku bahse DAÎŞ´ê dikin, bi van têkiliyên li pişt wê re e bahsê dikin. Wekî din, weke rêxistinekê tenê bi serê xwe DAÎŞ´ ne ti tiştek a. Yên ku wê diidna şerkirin ku armancên wan çina, em dema ku li deverên ku DAÎŞ´ şer dike û herêmên ku ew hêrîşî wan dike, em vê yekê kifş dikin. Her wusa, car bi car li ser olê re di temenê mezhebî de bahse DAÎŞ´ê dihat kirin. Lê DAÎŞ´ê tenê weke rêxistinek «tundrew» tenê weke komek civatî a etnikî kurd ji xwe re kirina armanc û hêrîşî wan kirîya. Ev jî, dide nîşandin ku ev gotinên bi vî rengî ên ku li ser olê re bo wê dihên gotin, di temenê maskekirina wê û li ser hin ´rastîyna´ ku binûxûmênin de bahsê dikin. Gîyane Kobanê, bitêgihiştin û felsefeya şoreşa re bû temenê yekîtîyeka civatî ya kurdstanî di nava civate kurd de. Bi şoreşa rojava re rûyê rast ê dîrokî ê herêmê bi hebûna xalkên wê re xwe derdixist li dika dîrokê û dida nîşandin. Lê vajî vê, rastîya statûqûya herêmê jî derket li holê bi hêrîşên ku li ser rojava û biteybetî li ser Kobanê re.

Kurdistan û civate kurd, êdî xwe derxistina li dika dîroke. Şoreşa rojava, î ro, ku hê bi ser ve du sal buhurtina û ketîya destpêk sale xwe ya sêyemin de, rojava cihanê dide kifşkirin. Sîyeseta şoreşa rojava, hin bi hin li rojhilat dihê dîtin. Hêrîşên ku bi rengê DAÎŞ´ê û hwd in, hemû jî, hêrîşên rejimên herêmê ên statûqûparêz ku heta roja me li ser

tûna hasibandin û bişavtina gelan xwe jîyandina û domandina na. Şoreşa rojava, şoreşa zihniyet û têgihiştinê ya. Bi wê re, şoreşa wijdan û ahlaqê ya. Li ser vê temenê jî, şoreşa gelan a**.** Şoreşa rojava, bi gîyaneka ku bi wê gelên herêmê hebûna xwe nas dikin û bi wê re ku êdî hebûna xwe bixwe diparêzên a. Minaqe vê jî, berxwedana Kobanê ya. Berxwedana kobanê, dîrok nivîsand. Dunya û mirovatî, hemû li rastîya berxwedana Kobanê xwedî derketin. Emerika û rojavaya ku heta roja me, li ber hemû komkujiyên ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk û hwd ku hanîna serê kurdan û ku bêdeng mana jî, bi berxwedana kobanê re ew berxwedana xira kirina. Piştgirîya xwe bigotinê jê bê, bo berxwedana kobanê hanîna ser ziman. Lê ev jî, bi rabûna serpîyan ya civate kurd re bû. Kurdistanî, li ber çar beşên kurdistanê, rojhilat, bakûr û başûr û hwd, rabûna ser pîyan. Li dora gîyane kobanê bûna yek û helwestek kurdistanî dane nîşandin.

Şoreşa şoreşa, bi berxwedana Kobanê bi gîyane fedakar a ciwanên kurd ên weke **Arîn Mîrkan**´an re xwe dide domandin. Arîn Mîrkan, keça kurd, ku di nava berxwedana Kobanê de bû û heta gûla xwe ya dawî li berxweda û di dawîyê de çalakiyê fadaî li darxist bû. Ew rûmeta gelê kurd bû. Rengê gîyane civate kurd a dema nû bû. Şoreşa rojava, tîpolojîya ramyarîyê li herêmê da guharandin. Êdî, weke rengê ramyarîya gelan li hemberî ya desthilatdar a rejimên herêmê, ev rayarî heya. Ji xwe, ji ber wê ya ku ev şoreşa rojava di hersê salên xwe yên pêşî de rastî wilqasî hêrîşan hat. Çend ku hêrîş lê zêde bûn, li ber wan hêrîşan jî, berxwedan jî mazin bû. Berxwedana Kobanê, ev berwedana ku li ber wan hêrîşan ku hatîya dayîn nîşandin a. Li hemberê wan hêrîşên ku dihatina biser şoreşa rojava de, bi berxwedanên weke ´berxwedana kobanê´ re bersiv dihat dayîn. Kobanê, hem bo kurdan û hem bo herêmê giştî jî bûbû bû weke ´stalîngrada kurdan´. Ji xwe, di destpêka wê berxwedanê de, dema ku bahse kobanê û berxwedana kobanê dihat kirin, dihat gotin, ´stalîngrada kurdan kobanê´.

Berxwedana Kobanê, weke ku kurd ji nû ve afirand. Piştî ku berxwedana kobanê derxist asta herî biilind, li bakûrê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê serhildanên gel jî li van beşên kurdistanê derket asta herî bilind. Li her çar beşên kurdistanê jî, êdî serhildan hebû û navê wê serhildanê jî ´berwedana kobanê´ bû. Bi serhildanan li her çar beşên kurdistanî bi yekdengî rabûna serpîyan, weke ancamaka dîrokî ya berxwedana kobanê jî bû. Êdî dema ku bahse gîyane kurdistanî dihat kirin, navê Kobanê weke navê wê gîyanê dihat bîra mirov. Kobanê, dîrok nivîsand. Li kurdistanê, ev dîrok, hatibû nivîsandin. Kobanê, hêz û qûdreta şoreşa rojava da nîşandin li berçavê hemû cihanê.

Sîyeseta berxwedana kobanê, ew bû ku sîyeseta xwe nasîn û bo hebûna xwe berxwedan kirina gelan bû. Têgihiştina şoreşa rojava ku em dikarin bi gîyane mesopotamya re werênina ser ziman, rengê ramyarî(sîyeset)ya berxwedanê dihanî ser ziman. Berxwedana Kobanê jî, rûyê rast ê vê sîyesetê bû. Kobanê û berxwedana wê, rûyê rast ê dîrok, nirx û gelên herêmê bû. Li dijî, statûqû û rejimên herêmê ku temenê wan li ser ´bişavtinê´ ya, navê rastîya gelan bû.

Bi berxwedana kobanê re, têgihiştina şoreşa rojava hat fahmkirin ji aliyê gelên herêmê ve. Ev jî, êdî temenê jinûvebûn (´ronasans´)a herêmê a di demên pêş de ya. Bo

vê yekê, divê ku mirov vê jî bibêje ku bi bûna şoreşa rojava û berxwedana kobanê ku destpêka sale wê ya sêyemin de bû, êdî rastîyek dîrokî ya dîroka herêmê bû. Berxwedana kobanê, di çapameniya hemû cihanê de bû. Navê kobanê, bi wê berxwedana wê re bû navek navnetewî ku dihat naskirin. Ev jî, bi xwe re rastiyekê dide nîşandin ku sîyeseta rejimên herêmê ku di temenê wê li ser înkare xalkên herêmê û ´bişavtina´ wan ava ya, têkçûya. Wê di demên pêş de, ev yek hê baştir were dîtin. **Di vê xabatê de, di van rojên ku ev berxwedana dîrokî a Kobanê hê ku didomîya de, ev berxwedana kobanê bi rengê ramyarî û têgihiştina di temenê wê de bi hebûna şoreşa rojava hilde li dest. Ku ancama şerê li Kobanê ku bi Hêrîşên DAÎŞ´ê destpêkirîya ku çi bê bila bibe, lê wê ancam yek bê. Ew ancam jî, wê şîyarbûna gelan bê. Wê ew zihniyet û sîyeseta wê ya li piştî hêrîşên DAÎŞ´ê ya, ew êdî têkçûya. Bi wê berxwedana kobanê re, şoreşa rojava û mirovatîyê qizinc kirîya. Serkevtin ya gelan a bi têgihiştina şoreşa rojava û berxwedana kobanê re**.

**Ev pirtûk, atfî rûmeta lehengên kurdistanê ên ku li kobanê bûna nemir ên weke Arîn Mîrkanan hatîya kirin.**

Abdusamet Yigit

**Destpêk: ji serdema ´Weşokanî´ û heta serdema ´serêkahnîyê´ felsefeya şûnpêya şoreşa rojava**

Dema ku em li dîroka kurdistanê dihizir in, em dibînin ku dîrokek demdirêj ku bi pêvajoyên xwe ên şariştanîyê heta demên Sûmerîyan diçêt heya. Pêvajoyên pêşketina demên şariştanî ên van demên Sûmerîyan, di derbarê wan de zêde zanyarên me ne bitêr in. Lê zanyarên ku hene jî dîrokek pirr kevn a şariştanîyê didina nîşandin. Li kurdistanê li ber diclê û firatê ev pêşvçûnn dîrokî pirr zêde pêşveçûna. Em di serî de divê ku vê yekê bibêjin ku ber firatê û diclê bi dîroka xwe ya ku jînkirî hertimî bûya xwediyê kifşkarîyek dîrokî bo pêşketinên têgihiştinî, şariştanî û dîrokî ên serdemên piştre. Li ber firatê, ku weke demek demên Sûmerîyan, demên xanadana Ur´îyan, em dibînin ku bi kevneşopî pêşketî hena. Em li vir pêşî vê yekê bibêjin, kevneşopî, pêşketineka şariştanî a têr di temenê xwe de diparêzê. Ev jî ji aliyekî ve dide nîşandin ku di van deman de pêşketinak şariştanî a têr dihê jînkirin. Bi teybetî ku di dema me de weke ´dema **xanadana Ur** a sêyemin´ jî dihê bi navkirin, weke demek xort û pêşketî dihê ditin û li berçav. Her wusa, ev dem dema ku hatîya şîrovekirin, weke demeka "jinûvebûnê"

û ankû weke ku bi gotina di roja me de dihê bi navkirin weke demeka "ronasansê" jî dihê ditin. Her wusa, ronasanse dema Sûmerîyan, ku em bahse wê bikin, em van pêşketinên wê demê ên demkî divê ku mirov li wan binerê û wan fahm bike.

Serdemên piştre ên demên hûrî û mîtannîyan, em dibînin ku dihên û serdest dibin. Berî demên hûrî û mîtannîyan, serdemên Gûtîyan hena û ev serdem wê bi pêşketinên têgihiştinî wê temenê van deman jî di derdewamîya xwe de bide afirandin. Gûtî, wê cizîra botana roja me û ber çîyayê Cudî û hwd, ji xwe re bike weke navend. Lê wê serdestî û desthilatdarîya li giştî kurdistanê bicih bike. Ji ber firatê û diclê û heta ku digihijê ber çîyayên Zagrosan, wê serdestîyeka serdemî li herêmê bike. Teybetmendîya dema Gûtîya ku bi rengê pêşketina wê re dihê li berçav ew a ku di temenê serdestîyê û desthilatdarîyê de di yekdestîyê de gihandina hevdû pêşketîya. Yanî, yekkirin bi wê re heya. Bi vê re jî, ev yekkirin wê bike ku gûtî weke împaratoriyekê pêş bikevin û serdest bibin. Ji xwe, dema ku em li dîmen û rengê pêşketina herêmkî a gûtîyan dinerin, em dibînin ku weke ku di rengê "împaratoriyekê" de ya. Ev, biawayekî vekirî dihê ditin. Ji ber çemên firatê û diclê û heta ku ber çîyayên Zagrosan, wê di qadaka fireh de wê xwe bike desthilatdar. Di vê temenê û rengê de wê gûtî bi sedsalan wê li herêmê serdest bin. Serdestîya gûtîyan, wê piştre weke ku di herîkîna xwe de û di berdewama wê herîkîna xwe de wê heta demên Hûrîyan û hwd wê were. Demên hûrîyan, ne li ser temenekî xûrixandî û hwd dihê û pêşdikeve. Li ser temenekî ku bi vî rengî di berdewamîyê de ya pêş dikeve. Ji aliyê şer û pevçûnên ku dibin li herêmê jî, dem bi dem çend ku dibin jî, lê ev nabina temenê ji holê rabûna desthilatdarîya hûrîyan. Ji ber ku bi têgihiştinî û aqilî û zanîna xwe re hûrîyî, serdestê dema xwe na. Çend ku xûrixandin bi wan re dem bi dem dibin jî, dikarin xwe nûbikin û ji nû ve ava bikin û bi vî rengî bi afirênin. Ev jî, weke teybetmendîya pêşketinê a dema hûrîyan dihê li berçav bi dem û serdema wê re.

Li herêmê, hêzên din jî hena. Minaq, li herêmên anatolîa roja me hîttîtî hena. Her wusa, li aliyê wan din jî, Misra kevn heya. Di vê temenê de di nava wan de weke di rewşeka stretejikî de Hûrîyî desthilatdarîya xwe didomênin. Du rewş, wê hertimî bikin ku welatê hûrîyan hêrîş lê bibin. Yek, ew xweşîkatîya ku ew bi rengînî diafirênin a li jîyanê ya. Rewşa din jî ew cihê ku welatê wan lê dimêne ya. Ewder, devereka stretejîkî ya. Mîtannîyan serdemek pêşketî jînkirin. Em dikarin wê serdema wan weke serdema weşokanî jî bi nav bikin. Serdema weşokanî, dibe navê serdemên mîtannîyan ên ku ew bi desthilatdarî li ser axa xwe û li herêmên xwe serdest in a. Weşokanî, navend û paytaxta mîtannîyan a. Di vê qadê de mîtannîyan dîrokek nivîsand. Ew dîrok, ku weşokanî navend û paytaxt bû hat nivîsandin. Yanî, weşokanî navenda wê serdem û pêşketinên wê ya. Bo vê yekê, navê serdema weşokanî, dibê navek rast bo wê serdemê û pêşketinên wê dîrokî ên wê demê. Ji wê serdema weşokanî û bi vir de, çend ku dîrok hat êdî dîrok û **serdema ´serêkahniyê** hat pêşxistin û nivîsandin. Hin bi hin li herêmê, bi navê serêkahnîyê li herêmê pêşveçûnên ku bûn, wê êdî pêvajoya pêşketinên dîrokî ên kurdistanî ku heta roja me dihên jînkirin a. Serdema weşokanî, bi dîrok û pêvajo û demên xwe re di dîroka kurdan, xalkên herêmê kurdistanê de serdemek kifşkar bo pêşveçûnên serdemên piştre jî ya. Serdema weşokanî. Serdemek pêşketî a dîroka civate kurd û kurdistanê ya. Di serdema weşokanî´yê de, civate kurd xwediyê pêşvçûn û

pêşketinaka çawa û bi çi rengî bû, em dem bi dem dema ku demên mîtannîyan dixwênin û kifş dikin, dibînin û fahm dikin. Di vê temenê de divê ku em serdema weşokanî weke serdemeka civata kevnera jî bibînin. Piştî serdema weşokanî, wê li herêmê serdema serêkahniyê destpê bike. Weke ku çend ku serdema weşokanî, hemû demên pêşketî û ên ku hena ên mîtannîyan dike nava xwe de û xwe bi wan salix dike, wê her wusa bi heman rengî serdema serêkahniyê jî, ji dem û pêvajoyên ku ji derketin û serdestbûna îslamîyetê li herêmê û pê de, ku heta ku dihê û digihijê heta roj û dema me, wê bike nava xwe de û xwe bi wê salix bike. Her wusa, dîroka civate kurd û kurdistanê ji serdema weşokanî û heta serdema serêkahniyê, wê temenê pêşketina şoreşa rojava jî bê. Bêgûman, pêşvçûnên herêmî ên din jî ku li herêmên din bûna, wê ew jî di nav wan pêvajoyan de hebin. Lê dema ku em di çerçoveya şoreşa rojava hildina li dest, divê ku em dem bi dem bi dîroka wê herêma wê re êdî wê temenê wê yê civatî bi dîroka wê ya civatî û hwd re werênina ser ziman. Ji **serdema ´weşokanî´** û heta serdema ´serêkahniyê´, dîroka şoreşa rojava û bigiştî jî dîroka pêşketina civate kurd, heya. Di vê temenê de di xatekê de bi dîroka civatî re em divê ku temenê şoreşa rojava werênina ser ziman. Lê mîtannîyan, karîya ku di nava wan rewşan de hebûna xwe bidina domandin. Bi aqilê xwe re kifşkarîya xwe dane berçav. Li ser wê re jî, kifşkirina wan li herêmê zêdetirî bûya. Bi teybetî, weke zanistê dema mîtannîyan ku bahse wî dihê kirin "mîtra", çend ku weke zanistekî ku tê gotin berî zayinê di sadsalên 8´mîn û hwd de jîya ya jî, em navê wî di kêvalberên ji dema mîtannîyan ên ji sedsala **13´min û û hwd de jî, rastî navê wî tên. Ev yek, çi dide nîşandin? Wê dide nîşandin ku serdemên demên hûrî û mîtannîyan, jîyane ku em dizanîn mazintir in. Her wusa, vê jî didina nîşandin ku divê ku em dîrokê hê kevntir bi nivîsandina xwe re bibin û werênina ser ziman.**

**Serdemên hûrî û mîtannî**, serdemna aqil ên pêşketî na. Pêşketina van serdeman, em dikarin bi serdemên aqil pêşketî werênina ser ziman. Hemdemîya van deman, wê pêşketinên demên piştre ên civatî, şariştanî û hwd jî bide kifşkirin. Di vê temenê de divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werêne ser ziman, ku serdemên hûrî û mîtannî wê kifşkar bin. Rojavayê kurdistanê ku em î ro bahse şoreşa ku li wê hatî kirin ji aliyê kurdan û xalkên ku li wir dijîn ve, navenda hûrî û mîtannîyan û pêşketina wan bû. Herêmên weke serêkahniyê ku di dema mîtannîyan de bi navê "weşokanî" navenda wê ya sereka bû, î ro bo şoreşa rojava bi heman rengî bi navê serêkahnîyê bûya navend. Her wusa, em bi vî rengî dikarin şoreşa rojava, weke şoreşa ji nû ve vejînbûna serdema hûrî û mîtannîyan jî şîrove bikin. Bi vê rengî şoreşa rojava, li ser axa xwe ya ku li ser bûyî û li ser temenê xwe yê civatî, têgihiştinî û hwd ku li ser bûyî, şoreşek bi vî rengî ya dîrokî a herêmê ya. Ev şoreş, temenê xwe bi xalkên herêmê ên kevn dihêne ser ziman. Her wusa şoreşa rojava, şoreşa hûrî û mîtannîyan a. Li ser vê temenê, em divê ku demên dîrokê ên piştî demên hûrî û mîtannîyan li herêmê werênina ser ziman. Dem bi dem pêşketina li herêmê, wê herêmê bibe. Piştî serdemên hûrî û mîtannîyan, li herêmê wê serdemên Medîya û piştre ên Sasanî, Şadadî, Merwanî û eyûbîyan û hwd wê pêşbikevin. Di vê navberê de, weke olek herêmî derketin û pêşketina ola îslamê jî, wê li herêmê serdemek nû bi xwe re bide destpêkirin. Kurd, weke gelekî ku berî hatin û pêşketina îslamê jî ku li herêmê xwedî hebûn û desthilatdar bûn, wê bandûra wan li pêşketina îslamê li herêmê giştî wê hebe. Heta ku wê desthilatdarîyên demê ên kurd, wê ji vê olê re di gelek waran pêşavanîyê jî bikin.

**Ji serdema ´Weşokanî´ heta serdema ´serêkahnîyê´ bi felsefeya wê re şûnpêya şoreşa rojava, divê ku mirov bi vê xate pêşketinê re fahm bike.** Ji serdema ´Weşokanî´ heta serdema ´Serêkahniyê´ bi felsefe û şûnpêya wê re şoreşa rojava, di temenê şoreşa kurdistanê de, bi gîyan û nirxên wê ên dîrokî û mesopotamkî re bûya û pêşketî ya. Her wusa mejûya dîrokî a şoreşa rojava, bi vê xate dîrokî a ji serdema weşokanî ku heta serdema serêkahniyê ku dihê û didomê, xwe dihêne ser ziman. Ev şoreşa dîrokî ku li ser axa kurdistanê bi destê kurdistanîyan hat kirin, wê weke ku di pêvajo serdemên wê ên piştre de jî were dîtin wê rastî gelek hêrîşên li dûv hevdû were. Ew navenda ku şoreşa rojava ji wê destpêkirî Kobanê, wê piştre bibe navenda berxwedanê. Berxwedana Kobanê, wê piştre dîrokê binivîsêne. Ev şoreş, weke ku kurd jî wê bi nav dikin ´şoreşa weşokanî´ ya. Weşokanî, navê navend û paytaxta mîtannîyan a. Weşokanî, serêkahniya roja me ya. Şerêkahniyê, weke navendeka şariştanî a herêmê ya. Ev herêm, di demên berê de, ku ji ber çîyayê kurda´ bigra û heta ku digihişt serêkahniyê û Afrînê û hwd, weke herêmeka navendî a şariştanî bû. Di sêkika çîyayê kurda, Afrîn û serêkahniyê de Hûrîyan jî û Mîtannîyan jî weke navend û paytaxt bikarhanî û kirina navendek şariştanî. Dîroka vê herêmê ya li ser ardê, ji ya kurd em î ro dizanîn pirr zêdetir dîrêj û kevntira. Hin bi hin bineterên dîrokî û erkolojikî ku li herêmê dihên dîtin û kifşkirin, hin bi hin vê rastîyê piştrast dike. Ev navendetîya herêmê, wê bike ku herêm bibe weke navendek hizrî û felsefîkî jî. Zanist û filosofên weke Mîtra û hwd, zanistên van deman in. Mîtra bixwe, weke zanistekî dema mîtannîyan, di van deman de hatîya û bi hizrên xwe yên ku formule kirina û hanîna ser ziman, temenekî mazin ên felsefekî û têgihiştinî bi zanistî diafirêne.

Dema ku em bhse serdemên hûrî û mîtannîyan dikin, em divê ku bibêjin ku em bahse serdemna bi hezaran dikin. Bi teybetî, divê ku em ji bîr nekin û weke demna van serdeman ên pêşî serdema gûtîyan jî werênina ser ziman. Em divê ku di berdewama hevdû de werênina ser ziman. Gûtîyan, berçyayê cudî û bi teybetî jî ber diclê cizîra botana roja me ji xwe re kirîya navend. Ev herêm, di demên wan de û her wusa di demên berî wan de jî, weke navendek şariştanî ya. Ji xwe, di roja me de jî, bi lêkolînên ku mirov li vê herêmê dike û bermehîyên erkolojikî û hwd, ku mirov kifş dike, ev yek weke rastiyekê bi awayekî vekirî dihê dîtin û kifşkirin. Gûtîyan, dîrokek şariştanîyê bi têgihiştinê nivîsandin. Temenekî mazin ê bi têgihiştinê avêtin. Ji xwe, ji ber vê yekê ya û ji wê weke mîreteyekê maya cizira bota, hertimî weke ”navendek zanîn û zanistê” hatîya dîtin û wusa jî karûbar kirîya. Dema ku bahse vê bajarê dihat kirin, bi zanînî navê wê jê bahs dihat kirin. Ev, weke rewşeke têgihiştinî ku piştre jî wê bandûra wê li pêvajoyên pêşketinê ên têgihiştinî bibê ya. Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku dema ku ”dihat gotin ”herêma botanê, ev herêm dihat qast kirin. Lê bi wê re jî, herêma başûrrojavayê kurdistanê jî bigiştî dihat qastkirin. Î ro, di destê me de bineter heya ku em dikarin bibêjin ku navê ”botanê” di dema gûtîyan de jî hebûya. **. Di nivîsên weke “Hurrians and hurrians names in the ´mari´ tekst” û hwd de, her wusa mirov rastî nave ´botanê´ ji naven bineterên ji van demên kevnera bi rengên “Puh-tani” û ankû “pu-uh-ta-ni” tê.** Her wusa, herêma botenê, em dive ku bibêjin ku navendeka şariştanî a dîrokî jî ya. Bi wê re li ser Nisêbînê ya ku di dema Sûmerîyan de bi nave “nirbo” dihat bi nav kirin û di dema hûrî û mîtannîyan de bi nave “Nîsîbîs” û hwd dihat bi navkirin re, wê desthilatdarîya Hûrî û mîtannîyan pêş bikeve. Herêmên weke Kobanê

jî, bi heman rengî pirr kevn a. Her wusa, dive ku em bibêjin ku di heman bineter û dokumentan ku li jor di hundurê vê paragrafê de nave wê da de jî, nave Kobanê bi heman rengê ku em î ro bikardihênin, em dibînin ku di dema hûrî û mîtannîyan de jî heya. Di berdewama wê de, dive ku em bibêjin ku nave ´afrînê´ jî bi rengê “efrîn”´ê bê û ankû “erînê” û hwd bê, dihê ser ziman. Ji vê yekê, dihê dîtin ku ji aliyê zimanî ve jî ku mirov li navên herêmê ên kurdî dinerê, em dibînin ku navên pirr kevn in. Bi wê re jî, navên deşt, zevî û çemên wê û hwd jî, bi heman rengî dive ku mirov bahse wê bike.

Bi wê re, dive ku mirov bahse wê bike dema hûrî û mîtannîyan, serdemeka ku ji aliyê têgihiştinîyê ve jî pêşketîya.Em î ro dikarin bibêjin ku bi heman rengê bibêjin bi rengê bawerîyê jî ´yek-yazdanî´tî em dibînin ku bi wan re heya û serdest a. Navê ´yazdan´ ku Zerdeşt dihêne ser ziman berî wê heya û di van deman de jî serdest a. Zerdeşt jî, weke Mîtra, bawermendê yazdan a.Ev bi heman rengî, dide nîşandin ku bi kevneşopî hûrîyî û mîtannîyî pêşketî na û xwedî têgihiştin û pergal in. Bi wê re jî, ji aliyê bawerîyê ve em dibînin ku xwedîyê pergalek pêşketî a di rengê yek-yazdanî´ de na. Ev pergal jî, li weke ku em kifş dikin, li dora gotina “yazdan´ hatîya hûnandin. Î ro, di destê me de zanyarî heya ku em dikarin bi wê bibêjin ku di dema Hûrîyan û mîtannîyan de gotina “laleşê” heya. Navê ´laleşê´, nave cihê bergê ê ola kurd û kurdistanî a êzdatîyê ya.H. Crag Melchert, di lêkolîna xwe yak u bi nave ”Cunneiform Luvian Lexicon” kirî de, hewldaya ku dema hîttîtan a li Anatolia fahm bike. Lê di lêkolîna xwe de, bineter û kêvalbarên dema hûrî û mîtannîyan dahûr kirina. Ev jî, dide nîşandin ku bandura hûrî û mîtannîyan, li ser van herêman jî pirr zêde heya. Bi vê rengê, mirov dibînê ku gelek nivîsên zimanê hûrî û mîtannî, li van herêman hatîna dîtin û kifşkirin. Bi vê yekê re, bandura hûrî û mîtannîyan, pirr zêde li van herêman heya. Heta ku em dikarin bibêjin ku ji temen ve ya ku pêşketina herêmên Anatolia jî dide kifşkirin, pêşketin, pêşveçûn û têgihiştî û felsefe ya hûrî û mîtannîyan a.

Î ro, êzdayî, bi nave ´êzîdî´ jî dihên bi nav kirin. Êzdayî, bi nave ´yazdanê´ xwe re xwe bi nav dikin. Ev jî, weke kevneşopîyekê ya. Her wusa, dide nîşandin ku ola êzîdîtîyê, weke olek yek-yazdanî xwedîyê serdestî û serwerîyê ya di van demên hûrî û mîtannîyan de. Em, ji demên hûrî û mîtannîyan rastî nave ´melekê tawis´ jî tên. Gelek reng û formên ku wî tefsîr dikin, em di van de rastî wan tên. Ev jî, bi sere xwe weke rewşek teybet ya hûrîyî û mîtannîyî ya. Li herêmê, xate ezdatîyê, dive ku mirov bi teybetî hilde li dest û fahm bike. Xate êzdatîyê, girêdana pêşketinên civatî ên li kurdistanê, ji roj û serdema me ya î ro bi roj û serdemên demên hûrî û mîtannîyan ve jî dide çê kirin. Di vê temenê de ola êzdatîyê, bi sere xwe dibe weke bineterek dîrokî ya nivîskî ya dîrokî û civatî jî. Dîroka herêmê, di vê temenê de dive ku mirov di dema nivîsandina wê de, vê xatê li berçav bigrê û binivîsêne. Dem bi dem, ku di vê xatê de bûna, pêşveçûnên dîrokî ên demkî bûna. Weke ku çawa Mîtra, destpêke serdemekê di dema mîtannîyan a di vê xatê de ya, bi heman rengî Zerdeşt jî destpêka serdemekê di vê xate de ku piştre hatîya û bûya ya. Em divê ku di vê temenê de li dîrokê binerin.

Dîrok, piştî hûrî û mîtannîyan re êdî bi reng û demên xwe yên têgihiştinî pêş dikeve. Di dema mîtannîyan de, rengê aqil û zanînê ê bi felsefe pêşketîya û hin serdemên xwe yên pêşketinê bi ser xwe ve buhurandina. Ev yekê, bi mînaqên weke Mîtra û pêşketina wan re bi rehetî dibînin û kifş dikin. Her wusa, ji aliyê felsefîkî û pêşketina civatî û

civaknasîya wê re jî, em rastî rewşek teybet tên. Ev pêşketin û rengên wan û hebûna wan, wê bi awayekî vekirî bi aqil û mejî êdî di demên piştre pirr bi başî werina dîtin. Wê werina xwandin. Bi xwandina wan ya bi mejî û aqil re, êdî wê şoreşên aqil û têgihiştinê li ser wê re bi wê xwandinê bibin. Ev jî, dide nîşandin ku hin destpêkên felsefîkî û têgihiştinî wê dem bi dem bi serdema mîtannîyan re bibin û demên piştî xwe re jî, bidina kifşkirin. Her wusa, ku em bahse pêşveçûnên hizrî ên felsefîkî ên li ber bahre reş û bahre sipî ku dibin û piştre weke serdemek kevnera a bi felsefe jî dihê bi nav kirin, em dibînin ku wê di temenê wan de ev pêşketinên serdema mîtanîyan wê hebe. Tefsîrên mîtolojiikî û hwd, ên di di vê demê de ku dihên kirin bi xwe jî ji mîtannîyan tên. Minaq, tefsîra bi nave "piremetus" ku di ´mîtolojiya yewnanîyan de dihê kirin, em berê vê demê dibînin ku bi Mîtra re û li ser Mîtra re hatîya kirin. Rengê aqil û zanîna ku bi Mîtra re pêş dikeve û ew bi wê rêgezên xwe civatî kifş dike, di derbarê pêşketina hizir a di dema wî de û bigiştî jî di dema mîtannîyan de têgihiştinekê dide me. Hinek ji wan rêgezên bingihînî ku Mîtra dihênê ser ziman ev in: **Ya yekemin, fêrbûn û zanîna sûwarîya hasp a. Ya duyemin, fêrbûn û zanîna avêtina tîr û kavan a. Ya sêyemin jî, hertimî gotina rast ji dev gotin a. Ya çaremin jî, ku zaro bû ciwan û balix bû, êdî zewicandina wan a, ku malbate xwe ava bikin a**. Ji rengê van rêgezên Mîtra, mirov fahm dike ku dema mîtannîyan, di astek têgihiştinî û felsefîkî de xwediyê pêşketinekê ya.

Em dikarin li asta Mîtra binerin û rewş, wûcan û asta mîtannîyan û deme wan fahm bikin. Her wusa, têgihiştina bawerî û olî ya ´êzdatîyê, temenê ´yek-yazdanîtîya dema mîtannîyan ku li dora wê gihiştina hevdû diafirêne. Bo vê yekê divê ku mirov dema Mîtannîyan bi teybetî hilde li dest. Dema hûrîyan û dema mîtannîyan weke demna ku hemdemîya herêmê diafirênin û temenê wê hin bi hin diafirênin in. Ev dema hûrî û mîtannîyan ku em dikarin weke serdema weşokanî jî bi nav bikin, wê bi pêşketin û pêşveçûnên ji wê re dîroka herêmê ya hizrî, bawerî û civatîtî û pêşketina wê ya civaknasî were nivîsandin. Serdema weşokanî, divê navê demên mîtannîyan û pêşketina wan ku weşokanî ji wan navend a. Ev dem, di vê temenê de dema ku mirov li dîrok, civakatî û felsefetîya wê binerê û mirov wê werêne ser ziman. Ev dem bi pêşketina wan re û dem bi dem piştî wan deman re heta ku dem dihê serdemên piştre jî, wê ev pêşketin bi awayna xwe bide domandin. Heta ku dem tê dem û serdema me, ev xate dîrokê pêş bikeve. Li ser vê xate dîrokê û civaketîya wê, pêşveçûnên civatî, felsefîkî û dîrokî diafirin. Şoreşa rojava ku divê ku weke şoreşa mîtannîyan a di sedsale 21´ê de ku bûya û ankû bi navê ´şoreşa weşokanî´ werênê ser ziman, wê weke şoreşeka têgihiştin û civakî pêş bikeve. Li vir, teybetmendiyên vê şoreşê, li ser esas û temenê xalkîtîyê û geltiyê ya. Piştî Mîtra re, Zerdeşt temenekî mazin bi "avêsta" re hanîbû ser ziman. Ew temen, wê di dema wî de, bê temenê desthilatdarîya Medîya. Lê Desthilatdarîya Medîya, di aslê xwe de, hîmê wê li ser têgihiştina Mîtra ya. Piştî van deman re, wê bi têgihiştina Zerdeşt re ev xate têgihiştin, felsefe û zaniînê xwe bide domandin. Piştî Van deman, wê di vê xatê de ku zanista aavêsta´ di temenê wê de ya, wê "civatên avesta" biafirin. Ev tiştekî dide nîşandin, Ew tişt jî, her wusa, rengê pêşketina civatî a bi rengê hizrî ê felsefîkî ya.

Di vê temenê de, wê dem bi dem li ser esasê têgihiştina avêsta, wê dem pêş bikevin. Piştî destilatdarîya Medîya, li ser vê xatê, wê serdemên axamanîşan û Sasanîyan pêş bikevin. Di van deman de, zanistên weke Manî û hwd derdikevina li holê. Ev zanist û

fîlosof, wê di wê xatê de hizrên xwe bênina ser ziman. Hizrên wan, wê kûrahîya van hizrên vê xatê çêbike. Lê ev kûrahî, bi felsefîkî, wê di temenê civaketîyê de pêşketinê bi xwe re bidina çêkirin û bênin. Manî û piştî wî re weke Mezdek, hûrem, babek û hwd, di xatekê de wê têgihiştinaka civaknasî bi felsefîkî bênina ser ziman ku bi sedsalan li ser wê temenê û têgihiştina wan ya ku wan hanîya ser ziman, wê pêşveçûn bi civakî biafirê. Em dema ku li van away pêşketinan dinerin, em hinekî jî, çend ku piştî demên mîtannîyan re hatibin jî, hinek hizran didina me. Rengê pêşketina dema hûrî û mîtannîyan, hinekî jî bi me didina fahm kirin. Serdemên piştre ên ku bi bawerî jî bê bi êzdatîyê, yarsanîtîyê û hwd xwe didomênin di temenê vê xatê de, weke rengê û kevneşopîyên vê dîrokê û xatê na. Em divê ku van pêşveçûn û bawerîyan bi rêz û hûrmeta dîrokê werênina ser ziman. Ev rengê pêşketinê, em dive ku weke rengê pêşketinê ê ji dema hûrî û mîtannîya ku xwe didomênê werênina ser ziman. Bandûra wê jî, li jîyanê wê heta vê demê bênavber bidomê. Çend şariştan, hatina û çûna, wê di kifşkirina pêşketina wan de, ev rengê pêşketin û têgihiştina wê bi serdestî wê hebe. Hûrîyan û mîtannîyan, weke ku rêya têre çûnê ya bi aqil kifşkirin û piştî wan re jî, êdî di wê xatê de pêşveçûn dem bi dem xwe domand û bû. Ev, biqasî ji aliyê zanîn û bawerîyê ve wusa bû, her wusa wilqasî jî ji aliyê rengê pêşketina civatî û hwd ve jî wusa bû.

Piştî van serdemên Sasanîyan û hwd, hatina serdemên misilmanetîyê, wê bina serdemna ku li dijî wê xatê û çandê û rengê bawerîyê ku xwe diafirênê ya. Çend ku Hz. Mihemed, hizrên xwe bi temenê wan re ji van hizrên vê xate ´yazdantiyê´ diafirênê jî, wê piştre hin bi hin rengê têgihiştina desthilatdarî ê firewûntiyê li rengê wan rêveberî û desthilatdarîyên îslamê serdest bibe û piştre wê di vê temenê de ew dijberî biafirê. Ola îslamê, dikeve rengekî wusa de ku piştre Hz. Mihemed bixwe jî were wê êdî wê nasnekê. Kurdan, piştî hatina îslamê û pê de jî, di nava xwe de, bi rengekî civatî, rengekî bawerîyî ku bi kevneşopîya xwe re hûnandina wê biafirênin. Yanî, wê çawa di rex hevdû de bi bawerî û xalkîtî bijîn, wê civate kurd vê minaqê di nava xwe de pêş bixe. Ji ber ku civate kurd, di nava wê de pirr-bawerîtî heya. Her wusa, li kurdistanê, ji aliyê xalkî ve pirr xalkîtî jî heya. Bo vê yekê, ev rewşa kurdistanî, weke model tê esas girtin û pêşketin dihê çê kirin. Lê ew rengê desthilatdarî ku têgihiştina yek-parezî û ku key(´firewûn´) ku dikarê xwe bike krasê xwûde û bênina ser ziman, wê hin bi hin li îslamê jî serdest bibe. Ya ku wê hertimî, îslamê weke bike weke rengê bîrdozîyeka şer de jî wê ev bê. Ev, di aslê xwe de, mirov dikarê weke têkçûna rastîya olî a îslamê jî werêne ser ziman. Tengezerî(´krîz`)yên ku wê di demên piştre de bi vê olê re li rojhilat rû bidin, wê hinekî di temenê wê de ev rewş hebin. Ji ber ku wê bi destê rêveberî û desthilatdarîyên li herêmê, perspektifa jîyanî a navaroka olê were jêbirin û tûnakirin. Li şûna wê jî, wê perspektîfên rêveberîyên herêmê wê werin bi cih kirin. Bi vê rengê, qalikê olê ê bi pergalî weke kiresekî li zihniyetên desthilatdarîyên herêmê dihê kirin û dihê jîyandin. Lê navaroka wê qalikê ê olî jî, dihê jêbirin û tûnakirin. Ev jî, temenê pêşketina ´mezhebîtîyîyan´ û her wusa pevçûnan li herêmê tê.

Di sedsalên piştre de, wê ev rewş xwe bidina domandin. Her rêveber û desthilatdarîyên ku hatin û çûn, wê li wê bihizirin ku çawa karibin li gorî xwe şîroveyek olî pêşbixin ku karibin wê bikarbênin. Bi gotinak din, her rêveberîyek wê ola û ankû ´îslame xwe´ pêş bixin. Êdî bi vî rengî, wê rêveberîyên olî ên herêmê wê ji rastîya rêveberîtîyê dûrkevin û bibina rêveberîyna ku êdî olan diafirênin. Ev rewş, hinek sedem jî di temenê wê de hena. Sedemên pêşî û sereke ew in ku rêveberî dixwezin ku xwe

bikina desthilatdar û bi wê re jî ku karibin xalkên ku li herêmê hena ku bi piçûkatî û mazinatîya xwe re ku çawa bin, ku karibin wan bikina bin kontrola xwe de. Ev li ser olê re hatîya pêşxistin. Ol jî, bo vê yekê hatîya bikarhanîn. Piştî Sefewîyan, osmanîyan jî ev kir. Her wusa, piştre, hem şerê wê hem jî şer bi wê re li dijî xalkên din ên herêmê biarmanca xwe kirina desthilatdar û serdest meşandin. Di sedsalên 18´min û 19´mn û hwd de, ev rewş êdî pirr zêde derketina li pêş. Ji aliyekî ve hem hat dîtin ku ev rêbaz êdî nikarin wê zêde bikarbênin, ji ber ku êdî bikênayê. Lê ji aliyê din ve jî, wê li şûna wê çi bikin, ketina lêgerînên wê de. Di ancama wê lêgerînê de, dîsa weke bîrdozîyek şer bi rêxistin kirina olê kifşkirin. Di sedsale 20´an û 21´ê de, tekoşîna azadîyan a gelan pêşketin. Li dijî van tekoşîn azadîyê a gelan dîsa serî li olê dan. Li dijî tekoşînên gelan ên azadîyê, rêxistinên olî ên şer bi rêxistinkirin û derxistina li holê. Li Somalî, ´El-Şebeb´, li nîjarya ´boko-haram´, li Filiîstînê ´hamas´, li afganîstanê ´talîban´, li kurdistanê ku li dijî azadîya gelan û kurdistanî ´DAÎŞ´ û hwd hatina derxistin li holê. Ev rêxistin, hemû jî, teybetmendîya wan weke hevdû ya. Li ser olê re hatina bi rêxistin kirin. Bi armanca pêşîya pêşketina gelên van herêman girtin a. Her wusa, bi armanca derxistina pirsgirêkên pêşketinê di nava van xalkan de û biwê re pêşîya pêşketina wan ku bigrin û bi wê re nehêlin ku ew xalk li gorî demê û pêşketinên civatî, dîrokî û felsefîkî û hwd ku xwe bi rêxistin bikin û hwd. Ji van aliyan ve û gelek aliyên din ve, ev rêxistin, hatina bikarhanîn.

Di serî de, divê ku mirov vê yekê bibêje ku ol, li dijî şoreşên gelan, weke bîrdozîyeka dij-şoreş´î hatîya birêxistinkirin. Çend ku di cewherê olan de, cewherekê şoreşgerî hebe jî, ew cewher vajî rastîyên civatî û demî hatina şîrovekirin bo ku bikarbênin. Dema ku ne wusa bê, wê nikaribin olê bikarbênin. Wê nikaribin, li ser olê re poliitkayên xwe yên sîyesî bikina piretîkê de. Her wusa, bo ku desthilatdarîyên bi kontrolkirin û bindestkirina xalkên din re bidina domandin. Bi vê yekê re jî, ku karibin nehêlin ku ew xalk bahse maf û azadiyê bikin. Bo vê yekê, di temenê ku ol li dijî gotinên weke ”maf” û ”azadîyê” û hwd bikarbênin, nahêlin ku ew gotin werina bikarhanîn. Yan jî, di temenê hin rêgezna ku wan bixwe dane kifşkirin, şîroveyên olî pêş dixin û didênina pêşîya mirovan, Bo vê yekê ya ku dema ku ”xutbeyek” jî di rojên înan de were xwandin, wê çê hizir û raman di wan de werina ser ziman, ji navendekê nivîsên ku bên xwandin amede dikin û dişênin ji wan mirovên bi navê ”mele” re û ew jî ji mirovan wan dixwênin û piştre, ew jî dibêjin ”me, xûtbeya xwe kir.” Yan jî, wê hin mirovna di vê temenê de ku bi teybetî hatina perwerde kirin bişênin ku di temenê ku ew kifş dikin de gotinan bibêjin û biaxifin. Î ro, em weke ancama vê jî, dibînin ku çawa ku rêxistinên şer ên terorê û faşîşt ku hebûna gelan armanc digirin û bo ji dîrokê birina rengên din ên bawerî û xalkan şer dikin. Her wusa minaqe vê yekê, şerên ku DAÎŞ´ê bi alîkarîya tirkiya û hwd ku li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê û hwd ku li dijî kurdan meşandin in. Weke vê, gelek minaq hena ku em dikarin bidin. Di vê sedsalê de, ev minaq û rêxistinên weke DAÎŞ´ê rêxistinên ku wê mirovatî ji wan bi ´îbretê´ bahsê bikê na. Wê kirinên wan, hertimî bi îbretê bahse wan bê kirin.

Rastîya dîrokê û xate wê ya ku pêşdikeve, divê ku mirov bi awayekî rast wê kifş bike.Herwusa, di wê xatê de hebûna gelan û civatan, divê ku mirov lê binerê. Dîrok, piştî pêşketina serdemên wê yên bi şariştanî û hwd, êdî bi hebûna gelan û civatan de xwe dide domandin. Ev jî, rengekî teybet ê dîrokê ya ku mirov li ser bisekinê ya. Hemû şoreş, weke ancama fahmkirina mirov, di wê temenê de li ser esas û rastîya hebûna

civatan û rengê pêşketina civatan hwd, pêş dikevin. Bi hemû kêmesîyên xwe re jî şoreş, ancama vê na. Lê her şoreş jî, gavek dîrokî ya ku mirov divê ku mirov weke pêngavek şariştanî û bi têgihiştina şariştanî şîrove bike ya. Di serdemên berî zayinê û hinekî jî piştî zayina îsa, wê ev şoreş, wan pêşketinên têgihiştinî ku dibina temenê pêşketna olan û hwd, bikina temenê xwe de û wan şoreşan bikin. Lê piştre, ku civak û civaknasî, bi gelek rengên xwe pêşket û êdî olan nekarî ku bersivê bidina van pêşketin û pêvajoyên dîrokî, êdî ji pêşxistina wan ketin. Êdî, bûna hin rengna hizrî ku dihênin zanîn û bikarhanîn. Di dawîya çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de, pêşxstina DAÎŞ´ê li dijî şoreşa kurd a rojava, minaq nîşanak û birhana vê yekê ya. Di aslê xwe de, ev minaq, nîşanak û birhan dide nîşandin ku çawa ol dihê bikarhanîn. Ev aliyê şoreşa kurd, ku çawa li dijî wê bi rengê pêşxistina rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, li ser olê re hatina birêxistinkirin û bikarhanîn, wê bê temenê fahmkirinaka hemdem di di derbarê olê bixwe de jî. Ol, weke çekeka pirr bitelûka ku li dijî hebûna gelan êdî dihê bikarhanîn a ji aliyê rêveberî û desthilatdarîyên demkî ve. Di serî de, divê ku mirov vê yekê weke rastîyekê kifş bike.

Kurd, di sedsale 21´ê de û di dawîya çeyreka pêşî a sedsalê de li kurdistanê şoreşa rojava pêk tê. Em dikarin vê şoreşê, ku em li gorî wê vaca ku em demên mîtannîyan di vê temenê de weke serdema weşokanî bi navdikin ku bi nav bikin, em divê ku vê dema ku di wê de şoreşa rojava pêk tê jî weke serdema serêkahniyê werênina ser ziman. Şoreşa rojava, bi vê rengê, dibê şoreşa dema serêkahniyê jî. Serêkahniyê, bi navê xwe re û bi dîroka xwe re serdem û pêvajoyên di berdewama serdem û pêvajoyêên serdema weşokanî de hatîya û domîya ya. Î ro, bi şoreşa rojava re, serêkahniyê bi kobanê re dibê navendek dîrokî li herêmê. Piştî şoreşa rojava, ev pêşketin bû. Lê ev pêşketin, xwediyê dîrokeka li şûn xwe, temenekî civatî û felsefeyeka bi pergal a civakî ya. Bi vê yekê re, em çendî ku dîrokê kifş dikin û fahm dikin, emê temenê vê şoreşa ku di serdema me de serêkahniyê ji wê re navenda jî fahm bikin. Dîroka hûrî û mîtannîyan, di xate wê ya pêşketinê de heta roja me tê. Di dem û pêvajoyên vê dîrokê û xatê de, di dema mîtannîyan de navê navenda wê weşokanî bû. Î ro jî, di roja me de navê wê heman navendê dibê serêkahhniyê. Bi vê yekê û rengê, em divê ku şoreşa rojava a di sedsale 21´ê de, weke şoreşa serdem û têgihiştin û felsefeya serdema hûrî û mîtannîyan jî werênina ser ziman. Wê felsefeyê bi civakatîya xwe re ew şoreşa ku da kirin, bi wê xwe vejand û da derxistin li ser dika dîrokê di vê sedsalê de. ..

Piştî hatina îslamê li herêmê serdemek nû destpê dike. Wê kurd jî, weke hêzekê di nava wê de hebin. Heta ku hinek desthilatdarîyên rêveberî ên kurdan ku ji vê olê re pêşavanî kirina, desthilatdarîya Şadadîyan, Merwanîyan, Eyûbîyan û hwd, in. Ev desthilatdarîyên kurdan, wê li herêmê serdest bin. Wê li herêmê bi sedsalan serdest bin. Heta ku dema ku osmanî ji herêmên din ên Asya tên herêmê, wê kurd alikariyê bidina wan ku karibin xwe li herêmê bigrin. Wê osmanî bixwe jî, bi alikarî û piştgirîya kurdan li herêmê pêş bikeve û xwe bigrê. Lê piştî ku vê rêveberîyê xwe girt û rêveberîya xwe ava kir û pê de, wê hin bi hin êdî berê xwe bide kurdan û bidest şerê bi kurdan re bikin. Bo vê yekê bû ku kurdan di van deman de bo wê gotibû "baxtê rumê nîn a." Ev gotin bo osmanîyan hatibû gotin. Ji ber ku kurdan, di berdêla alikarîya xwe de hêvî dikirin ku wê bi bextewarî bi kurdan re tevbigerihin. Lê wusa nebû. Êdî kurd, piştre dibina korbanê wê alîkarî û piştgirîya ku didin. Sadsalên dawîyê ên osmanîyan ên weke sadsala 18´min, sadsale 19´min û hwd, wê bi tememî bi raparîn û serhildanên kurdan ên li ber

Osmanîyan e bi buhur in. Di sadsala 20´an de jî, di dema ku li ser temenê osmanîyan ew komare tirk ku dîsa bi alîkarîya kurdan ava bû, wê piştî ku avabû û pê de, berê xwe bide kurdan û herê bi ser wan de. Wê hêrîşî kurdan bike. Wê zimanê kurdan qadaxa bike û hemû mafên wan ên civatî ên civate ku ji wan bistêne û pêvajoyên bişavtinê li ser serê wan bide meşandin. Ev jî, wê bê temenê serhildana kurdan a sadsala 20´an û 21´ê a PKK´ê. PKK´ê, wê tekoşîna azadîya civate kurd, wê bi deh salan bide. Di ancamê wê tekoşînê de, kurdan hişarî û têgihiştina xwe bidest xist. Xwe farq kiriin. Ev jî, bû temenê şîyarbûna kurdan. Kurdan êdî piştî wê şîyarbûna xwe re tekoşîna maf û azadîyê dan. Ev tekoşîn, êdî wê bi rengê tekoşîna bidest xistina statûya kurdan wê xwe bi kurdan re bide domandin. Di ancama wê tekoşînê de kurdan li rojavayê kurdistanê şoreşek bi navê şoreşa rojava kir ku bandûra wê li giştîya rojhilat bibe. Di dawîya çeyreka pêşî a sadsala 21´ê de kurdan ev şoreş kir. Li ser wê temenê, êdî li rojhilat kurdan xwe derxist li dika dîrokê. Piştî vê re, êdî hêrîşên li kurdan zêde bûn. Kurdistan, piştî şerê cihanê ê yekemîn û pê de, di nava tirkiya, Îran, Sûrî û îraqê de hat qatkirin. Piştre, rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd, avakirin û dane hêrîşkirin li ser wê şoreşa kurd û civate kurd. Ev, ne tenê hêrîşên nû bûn li kurdan. Her wusa, pêvejoyek nû a dîrokî jî bû ku kurd hatina xistin bin hêrîşên nû ku hatina hanîn li ser serê **wan**.

**- Dema** ku em bahse pêvajoya destpêkê ên şoreşa rojava bikin, divê ku em di serî de bahse hêrîşên ku li wê bûna werêne ser ziman. Di serî de, divê ku mirov vê yekê bibêje ku piştî ku şoreşa rojava bû û rêveberîya wê hat avakirin û denezendin û pê de, êdî hêrîşên li rojava jî bi awayekî pirr bişitt destpê kirin. Çawa ku şoreşa rojava ji Kobanê destpêkir, hêrîşên ku li şoreşa rojava bûn, ji Kobanê li şoreşa rojava destpêkirin. Kobanê, bi hêrîşên ku li wê bûn, di bin hêrîşan de ma. Ji her çar alîyên wê ve lê hêrîş bûn. Bi vê rengê ku di bin hêrîşan de ma, bû weke Moskov´a dema şerê cihanê ê duyemin. Çawa ku dema ku artişên Nazîyan bi hêzek mazin û teknîkek pirr zêde û pêşketî Moskov dorpêç kirin, bi heman rengî Kobanê jî hatibû dorpêç kirin. Hêrîşên ku li Kobanê bûn, pirr dordor alikarîya wan ji wê re hebû. Di serî de, rejimên weke rejima tirk ku kurdistan di nava wan de hatî qatkirin, li pişt vê hêrîşê bûn. Bi van hêrîşên ku di bin navê DAÎŞ´ê de li rojava dikirin, dixwestin ku derbeyekê li rojava û şoreşa rojava bixin. Dixwestin ku şoreşa rojava têkbibin. Bo vê yekê, ji her aliyî ve bidest hêrîşê li lê kiribûn. Di ti demê de, di nava kurdan û ti bawerîyê de ti pirsgirêk derneketina li holê. Gelê kurd, hertimî weke ku di nava xwe de nêzî bawerîyên cuda bûya, hertimî rêz û hûrmetek daye bawerîyên cuda jî. Di ti demê de, di nava bawerîya îslamê û kurdan de jî bi heman rengî ti pirsgirêk nebûna. Ji xwe, pirranîya civate kurd bi bawerîya re misilman a. Ji ber ku li kurdistanê, bawerîyên cuda jî ku pêşketîna hena, êdî di temenê ku rêz û hûrmetekê bide wan û ku wê çawa di çerçoveya nirxên xwe yên civatî de wan bi hevdû re bide jîyandin, di wê temenê de nêzîk bûna. Lê rejimên herêmê ên weke tirkiya jî, hertimî, ketina nava wê hewldanê ku weke ku dijberî di nava kurdan û bawerîyan de hebe rastîya kurd bidina nîşandin. Îranê, kurd ji ber ku kurdbûna girtina û bi hêncetên li ´dijî navê xwedû rabûna´, di birina sêdarê. Tirkiya jî, bi heman zihniyetê, politika li ser olê re meşandîya û hewldaye ku xwe weke «oldar» û «misilman» bide nîşandin û kurdan jî weke «dij-ol» bide nîşandin, ketîya nava hewldanê de. Yekî ku gotîya ´ez kurd im´, bi vê rengê çûya biser de û ew bêdeng kirina û tafisandina.

Bo fahmkirina bikarhanîna rengên bawerîyan li dijî hevdû û her wusa li dijî navên komên etnîkî û ankû kêmnetewî û hwd, divê ku mirov li vir di serî de rastîya olê ku çawa dihê bikarhanîn, mirov li ser wê bisekinê. Î ro, derxistina li holê rêxistineka tundrew weke ya DAÎŞ´ bi kurdan re dayîna şerkirinê, bi me mihtecî pê dide dîtin ku mirov van aliyan pirr baş lê bikolin û hewl bidin ku fahm bikin. Li vir, di serî de divê ku mirov balê bikişêne ser vê yekê ku pêşî navê kurdan ji nava olê paqij kirin. Ev paqijkirin jî, di temenê politikayên li ser bikarhanîna mezheban de kirina temenê dijberîya li hebûna civate kurd de. Her wusa, Civateka weke civate kurd ku pirranîya wê zêdetirî ji heman olê ya û ew li dijî kurdan dihê xistin temenê şerekî de, di serî de divê ku oldarên vê olê ji xwe re weke şermekê û aybekê bibînin. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku li dijî wê îstismarkirin û bikarhanîna olê bêdengîya wan jî, bi heman rengî ji nezanîya wan tê. Olek, ti carî, li dijî gelekî û ankû civatekê şer li dijî nav û hebûna wê pêşnaxê.

Ev pêlên hêrîşê ên dawî ên di 15´ê êlûna 2014´an de ku li rojava destpêkiribûn, bi amedekarîyeka mazin hatibûn amede kirin. Di vê çerçoveyê de jî, hêzên herêmî ên ku li pişt hêrîşên vê demê û demên berê jî disekin in, heman hêz bûn. Van hêzan jî, wusa hizir dikirin ku êdî wê vêcarê li ber kurdan wê ancamê bidest bixin û wê derbeyekê li kurdan bixin. Bo vê yekê jî, alîkarîyaka mazin didan hevdû û çeteyên bi navê DAÎŞ´ê ku dibin navê wan de hêrîşî kurdan dikiirn. Berî ku ev hêrîş li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li kobanê destpêkiribûn, di çapameniya tirk jî amedekarî di wê warê de hatibûbûna kirin. Bi awayekî ku rayagiştî ji komkujiyên mazin ên ku wê werênina serê kurdan re amede bikin, digotin ku”wê sed hezar kurd werênina kuştin.” Mirovên ku ev gotin şîrove dikirin, di çerçoveya oparasyonên artişa leşkerî de dihizirin û şîrove ji van gotinan re dihanîn. Lê li bakûrê kurdistanê jî. ´pêvajoyek´ hebû. Bo vê yekê jî, êdî wusa di şîroveyan de dihanîn ser ziman ku”temenê komkujiyek bi vî rengî ku werênina serê kurdan di vê serdemê de nema ya.” Piştre ku dem hinekî buhurt û êdî rengê plana şer a li dijî kurdan kifş bû, hat dîtin ku rêxistinên weke DAÎŞ´ê bi rêxistinkirina li ser olê û mezheban re û bi wan êdî bidest hêrîşa li civate kurd û hemû destkevtiyên wê dikin. BI teybetî, li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê, rêveberîyên kurdî avakirî hebûn. Ev herdû herêmên kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd hena û kurdan li wan temenê statûyekê bo xwe bi destê çêkirina, li wan hêrîş li kurdan destpêkirin. Ev herêmên kurdistanê, pêşxistin bin hêrîşan de

Bi wê re jî, hêzên ku ev hêrîş bi plan kiribûn, wusa hizir dikirin ku wê vê vêcarî qatî wê ancamê bidest bixin. Ji xwe, hemû amedekarîyên xwe jîdi vê çerçoveyê de kiribûn. Di vê çerçoveyê de, weke ku çawa ku artişên Nazîyan Moskov dorpêç kiribûn û hêrîş dikirin, bi heman rengî, Kobanê dorpêç kirin û bidest hêrîşê kirin. **Kurdan,** pergale xwe-rêvebirinê a rojava a demokratîk avakirin. Hêrîşên rejimên herêmê ên di bin”maske”´ya DAÎŞ´ê de ku li lê jî, divê ku mirov bi plana şerê bi kurdan re a ku li leşkergeha tirk hatî çêkirin û di wê de dihê ser ziman ku wê ”sed hezar kurd werina kuştin” şîrove bike. Ev plana şerê bi kurdan re, demekê di çapameniyê de bi gotina”wê sed hezar kurd werina kuştin” re hat nîqaş kirin. Bi van nîqaşan, weke ku bêxwestin ku ji komkujiyên ku wê werênina serê kurdan re ku rayagiştî a herêmê bidina amede kirin. Piştre jî, ji xwe em hêrîşên li başûrê û bi teybetî li şengalê û û hêrîşên li rojava û bi teybetî ên Kobanê bi hevdû re hildina li dest, em divê ku bibêjin ji vê hijmara ku di çapameniyê de li ser dihat nîqaşkirin zêdetir kurd hatina qatil kirin. Bi hêrîşan wusa

hizirkirina ku wê kurdan bişikênin. Di wê şikandinê de jî, wê komkujiyên mazin werina serê civate kurd. Li Şengalê ew komkuji hanîna serê kurdan. Piştre jî, li Kobanê jî, xwestin ku bi heman rengî pêvajoyaka komkujiyê werênina serê kurdan. Lê kurdan li ber wê ketina nava berxwedanê de. Bi berxwedanê, pêşîya komkujiyên mazin ên ku wê werênina serê kurdan hata girtin. Berxwedanê, civate kurd ji wan komkujiyên ku hatibûbûna plankirin ku wê bihanîyan serê civate kurd rizgar kir.

Bi vê rengî, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û bibêje ku li Kurdistanê, li hemû beşên din kurdistanî di nava tevgerê de li ser lingan bûn. Kurdên ku li welatên ewropî bi yekdengî rabûna ser lingan û ketina nava çalakiyên demokratikî ên piştgrîya bi berxwedane kobanê re. Bi gotinaka din, em dikarin vê pêla hêrîşan a li civate kurd, bi rengekî din jî şîrove bikin. Berî destpêka van hêrîşan, di demên sale 2012´an û hwd de, di temenê şerê bi kurdan re nîqaşên bi gotina ”modela Srî-lanka” hatina pêşxistin di nava çapameniya tirk de. Bi wan re, digotin ku tişta ku dewleta Srî-lanka hanî serê tamilîyan ku werênina serê civate kurd. Di vê çeçroveyê de bahse çêkirina planan jî hat kirin. Rayadarên dewleta tirk bixwe jî li ser van nîqaşan hizrên xwe hanîna ser ziman û gotina ku ”ew plan, ne li gorî şert û mercên herêmê ya ku werê xistin li piretikê.” de. Lê piştre hin bi hin, hat dîtin ku bi pêşxistin û rêxistinkirina DAÎŞ´ê re, wê çawa planaka bi vî rengî li dijî kurdan li herêmê pêş bixin û birêxistin bikin, ketina nava hewldana wê de. Piştre, ev yek hin bi hin hat dîtin. Di vê temenê de û di çerçoveyeka bi vî rengî de DAÎŞ, hatîya pêşxistin, bi rêxistin li herêmê û her wusa dane hêrîşkirin li ser kurdistanê. Yanî, birêxistinkirina ”modela Srî-lanka” li gorî şert û mercê kurdistanê, di vê temenê û çerçoveyê de hatîkirin û pêşxistin. Gotinên bi rengê ”wê sed hezar kurd werina kuştin” jî, di çerçoveyê de û di çerçoveya planak bi vî rengî hatina dapalandin(sızdırmak) li nava çapameniyê. Piştî zêdebûna hêrîşên DAÎŞ´ê li beşên kurdistanê û kirina komkujiyên wê re, ev yek hat dîtin û fahm kirin. DAÎŞ´ê, li şengalê bi den hezaran kurd qatilkirin, ravandin û ji herêmên wan dane goçberkirin. Bi vê qatilkirin, ravandin û dana goçberkirinê, hatîbû armanckirin ku temenê pêşketinên civatî ên civate kurd ku kurd li ser wê re doza statûya xwe ya civatî dikin werê xûrixandin û ji holê rakirin. Di temenê van hêrîşên bi vî rengî de, plan û programaka bi vî rengî de hebû. Li Şengalê, ji ber ku hêzek xwe-parastinê ya herêmî nebû, bêî ku hêzên DAÎŞ´ê û piştgirîyên wê, rastî ti berxwedanan werin, ew komkujî li wê herêmê kirin û bi sed hezaran kurdên êzîdî ji wan herêmên wan dane goçberkirin. Bi heman rengî û plan û programnê bidest hêrîşê li herêmên rojavan û bi teybetî li Kobanê kirin.. Ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, pêleka hêrîşan a pirr bişitt li Kobanê hat dayîn destpêkirin. Wusa hatibû hizirkirin ku bi wan hêrîşên li Kobanê wê bi sed hezaran kurdên sîvil ên vê herêmê wê bidest goçberkirina bi ber sînorê tirkiya v bikin. Ji xwe, di nava rûpelên rojanemeyên tirk de dihat gotin ku ”bi sed hezaran kurdên Sûrî hatina ber sînor.” Hê ku goçberîyê destpê nekiribû jî, ev nûçe dihatina çêkirin. Yanî, ji vê rengê bi awayekî zû çêkirina nûçeyan dihat fahmkirin ku wusa bawerkirina ku wê bi heman rengî bibe û wê ancamê weke ku li Şengalê bidest xistin wê li Kobanê jî bidest xistin. Bi wê re jî, wusa hasab kiribûn ku mirovên ku li berxwedan jî, wê ji aliyên çeteyên DAÎŞ´ê ve wê werina qatil kirin.

Dema ku em bi vî rengî, li rengên pêşketinên li pêvajoyê dinerin, em dibînin ku planaka giştî weke ku di rengê ”Modela Srî-lanka” de hatîya amede kirin li gorî şert û mercên herêmê û bi wê re êdî bidest hêrîşkirina li kurdan, civate kurd û destkevtiyên wan dihat kirin. Wusa dihê fahmkirin ku ji şîroveyên ku dihên kirin di nava rûpeêlên

rojnemeyên tirk de ku rejima tirk û rejimên din ên herêmê, piştî serkevtina bi hêrîşên DAÎŞ´ê jî hasabkirina û li gorîî wê plan û programên xwe jî di serê xwe de û di nava xwe de çêkirina. Bi wê bawerîya ku wê serbikevin, Pêşî, temenê DAÎŞ´ê li ser olê bi teybetî mezhebê ´sûnnî´ re bi bîrdozîkî çkirin û piştre bo ku temenekî wê yê herêmî çê bikin artişa iraqê ji herêmên weke Musilê hwd vekişandin û li şûna wan DAÎŞ bicihkirin. Bi vî rengî, weke ku bi navê wê(´DAÎŞ´) re dihê ser ziman, di temenê "dewletek îslamî" de birêxistin kirin.. Êdî li ser vê birêxistinkirin û bi navkirinê re jî DAÎŞ dane hêrîşkirin li ser herêmên kurdan. Herêmên ku pêşî li wan hêrîş dane kirin jî, herêmên kurdistanê ên weke başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurdî avakirî na. Yanî, herêmên ku li wan kurd, serdest in û di bin kontrola kurdan de na, li wan hêrîş dane destpêkirin. Hêrîşên DAÎŞ´ê, di vê temenê de bi plan û program hatina pêşxistin.

Weke ku çawa ku li Somalî "el-şebeb", li Nîjaryayê "boko-haram", li Afganîstanê ´Talîban´, li Filîstinê "hamas" hat pêşxistin û bi xalkên herêmê re dane şerkirin, xwestin ku bi heman mantiqê, zihniyetê û felsefeyê DAÎŞ´ê jî li ser axa kurdistanê pêşbixin û bi kurdan re bidina şerkirin û li ser wê re li herêmê dîzaynkirinê li gorî xwe bikin û wê bêstatûtîya ku ji şerê cihanê ê yekemin ve ku li ser serê kurdan hata roja me hanîna, ji roja me û pê de jî bidina domandin. DAÎŞ´, weke plan û rêxistin û programa rêjimên herêmê a bi vî rengî bû. Dema ku em van aliyan di serî de nebînin, emê şerê DAÎŞ´ê ê ku bi kurdan re dike û bi awayekî zû û di demek kin de li herêmê pirr zêde mazinbûn û pêşketina wê jî bi başî fahm nekin. Piştî şerê filistinê ê bi "el-fetihê" re ku bo azadîya filîstînîyan, bi ´El-fetîh´ planaka bi navê "aşîtîyê" dane herêkirin. Li gorî vê planê El-fetîh´ bêçek kirin. Piştre jî, li ser wê re êdî çûna biser filistinê de. Piştî bêçekkirina Filistinê, li gorî soza ku dabûbûn ku wê pirsgirêka filistinê çareser bikiran, pirsgirêk ne hat çareserkirin û hat domandin. Piştre jî, li ser wê bêçekkirinê re êdî bidest poliitikayên tafisandina filistinê de kirin. Bo ku doza filistinîyan a bo maf û azadîyê "krimînalîza" bikin jî, hamas" weke rêxistineka filistinê ku li olê re hatî birêxistinkirin hat pêşxistin. Bi wê r e jî, êdî bi wê têgihê û politikaya "kriminalîzekirinê" re jî, pirsgirêka filistinê ku bi navê "pêvajoya aşîtîyê a rojhilat" û hwd hat berdewamandin li demên piştre jî. Li kurdistanê jî, wusa dihê dîtin ku weke ku çawa ku "modela Srî-lanka" li gorî şert û mercên herêmê bi rengê DAÎŞ´ê û hwd hat birêxistinkirin, bi heman rengî tişta ku hanîna serê El-fetihê´ û hwd, dixwezin ku werênina serê tevgera azadîya kurd û civate kurd giştî jî. Di serî de, ev politikayên têkbirina civate kurd, politikayên şer ên bi hevdû re hevajodar(´coordination´) dihên meşandin. Di vê temenê de em divê ku DAÎŞ´ê weke rêxistineka şikandina kurdan û ji nû ve dîzaynkirina herêmê şîrove bikkin. Di vê temenê de wê didina hêrîş kirin li herêmê û li ser **kurdan**.

Di vê çerçoveyê de armancên dewletên herêmê ku di temenê derxistina li holê a DAÎŞ´ê de çi na û çawa na, divê ku mirov li ser wan jî rawastihê. Wusa dihê ditin ku levkirinek di nava rayadarên başûr ên kurd, hikimeta baxdadê û hikimeta tirk de di temenê ku DAÎŞ´ê li Musilê bicih bikin de hebû. Di xateka ku ji Musilê ku heta ku digihijê Kobanê û ku şengal jî di nav de ´dewletek sûnnî´ ava bikin li wê hizirîna. Herêmên Kobanê û Afrînê ên kurdistanê, bi vî rengî, di nava wê ´dewleta sûnnî´ a ku tefkîrkirina de hasab kirina.. Bi wê planê re, wê DAÎŞ´ê şerê vê bike û wê şerê şoreşa rojava jî bike û wê li rojava bi şoreşa wê re kurdan bişikêne. Bi vî rengî, li ser sûnnîyan re bi DAÎŞ´ê heta ku sedemên şerkirina wê afirandina. Hasabê tirkiya li vir, ew a ku bi

serkevtina wê planê re wê rojava û şoreşa wê têk herê. Bi wê re jî, weke ku hasab dikirin ku herêma Cizîrê a rojavayê kurdistanê jî bikina nav sînorê wê de û li başûrê kurdistanê ´dewletek kurd´ a piçûk jî denezênin. Li vir, ew rayadarên kurd(ên PDK´yî) ku di çerçoveya planak bi vî rengî de bi sûnnîyan û tirkiya re levkirina, di xwe de ew had û wêretî dîtina ku herêmên kurdistanê ên şengalê, maxûmûr û hwd, ev herêmên ku dervî herêma başûrê kurdistanê hatina hiştin ku di nava sînorê wê dewleta sûnnî de bihêlin.

Li ser vê levkirinê bû ku rayadarên başûr jî digotin ku ´emê serxwebûnê denezênin´. Her wusa, dewletek kurd ku di nava hewlêr û dohukê de hatî xîzkirin a piçûk hizirkirina ku ava bikin û bi wê re hemû beşên din ên kurdistanê êdî kurd jibîr bikin. Hasab li ser vê xalê hatîya kirin. Li vir, di vê demê de herî zêde rejima tirk û Îran, li ser PDK´ê re dixwezê ku leyistikeka bi vî rengî werêne serê kurdan. BI wê re, dixwezin ku pêşîya statûya kurdan a beşên din ên kurdistanê bigrin. Her wusa, rêxistinek kurd, çawa wî mafî di xwe de dibînê ku bi vî rengî biryarê di derbarê beşkirina kurdistanê bide? Ti rêxistinên kurd, nikarin wî mafî di xwe de bibînin. Ew hasabên ku bi vî rengî werina kirin, bi hêzên ku ew bikin re, wê ji aliyê kurdan ve werina şermazar kirin. Şernekirina PDK´îyan di destpêkê de û ji şengalê vekişîna wan, hinekî jî divê ku mirov bi hasabekî bi vî rengî ve girêdayî werêne ser ziman. Lê kurdan, di serî de civate kurd ew hasab şikand. Ya ku ew hasab şikand jî, berxwedana civate kurd bû. Hêrîşên ku ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de ku li Kobanê û rojavayê kurdistanê bi şitt bûn, di temenê wan de hasabek bi vî rengî hebû. Di vê temenê de, weke ku levkirinek li ser beşkirina kurdistanê kiribûn. Di aslê xwe de, em dikarin piştî wê qatkirina kurdistanê a bi peymana ´qasrî-şêrîn´ ku li duqatan û ku di konferanse lozanê de qatkirina kurdistanê li çar-qatan, vê qatkirina dawî ku hatîya plankirin, weke qatkirina sadsala 21´ê a dawî ya sale 2014´an jî bi nav bikin. Ji xwe, DAÎŞ´ê weke rêxistineka ku şerê vê bi kurdan re dike ya.

Rêxistina DAÎŞ´ê bi vî rengî û bo vê armancê li ser olê re hatîya birêxistinkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku di vê temenê de, bi vê pêşxistina bi DAÎŞ´ê û vê hasabê bi avakirina dewletek sûnnî û hwd re, êdî wê ji nû ve carek din, awa û şekil hatiba dayîn li naqşaya kurdistanê. Bi wê re jî, wê derbe li civate kurd ketiba. Wê rewşa wê ya ku î ro li ser wê re doza statûyê dike, wê biheta ji holê rakirin. Bi vê re jî, wê tirkiya jî ji derdê çareserkirina pirsgirêka bakûrê kurdistanê xilas bûba û îran jî ya çareserkirina rojhilatê kurdistanê xilas bûba. Yanî, li vir, weke ku çawa ku bi ermenistenek piçûk ermenî bêdeng kirin, dixwestin ku Kurd jî bi kurdistanek piçûk bi hetan bêdeng kirin. Ev hewldanên bi rêya pêşxistina DAÎŞ´ê û plana avakirina dewletek sûnnî re ku bi teybetî hem naqşaya kurdistanê ji nû ve were beşkirin û qatkirin û hem jî ji pirsgirêk kurd xilas bibin, bi teybetî weke planak giştî a li dijî kurd a. Bi teybetî, ew dewleta sûnnî ku lê dihizirin ku ava bikin jî, li ser axa kurdistanê dixwestin ku ava bikin. Herêmên kurdistanê ên weke şengalê û Koban û Afrînê û hwd jî, di çerçoveya vê planê de hizirîna ku wê bikina nav de û wê dewletek sûnnî ava bikin. Bi wê re jî, wê di rewşek nû de Kurdistan carek din biheta beşkiirn û dîzaynkirin. Li ser vê re jî, êdî wê li gorî wan "pirsgirêka kurd bihata çareserkirin." Yanî, ew çareserkirina ku di serê rejimên herêmê de, di serî de, weke ku dem bi dem berê jî hatîya hanîn ser ziman ku dewletek kurd a piçûk ku li ser ava başûrê kurdistanê ava bikin û bi wê re bêjin ku "me pirsgirêka kurd, çareser kir" û piştre jî êdî dengê kurdan jî bibirrin. Li vir, di vê temenê de ji nû ve

hasab hatîya kirin. DAÎŞ´ê, ji aliyekî ve ancama hasabek bi vî rengî jî ya.

Di vê temenê de, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku hêzên ku DAÎŞ derxistina li pîyasê û bi kurdan re dane şer kirin, hasabên wan pirr zêde li ser herêmê hena. Hasabê pêşî ew a ku şoreşa rojava ji holê ra bikin. Hasabê duyem ku derbeyekê li pêşketina civate kurd a ku heta roja me afirî bixin a. Hasabê sêyem, ku bi hasabên bi vî rengî ku derxistina DAÎŞ´ê re hatîya kirin, Kurdistan weke ku carek din were beşkiirn û parvekirin hasab hatina kirin. Di vê temenê de DAÎŞ´, weke rêxistineka ku wê Îranê jî û tirkiya jî, weke ku ew bi nav dikin wê ji "belaya pirsgirêka kurd" xilas bike ya. Bi vê re jî hasabekî din jî ew a ku DAÎŞ´ê, pêşketina civate kurd a roja me bi rewşa wê re ji holê ra bikira û wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd ji holê ra bikira. Ew rewşa pêşketî a civate kurd, ku kurd li ser wê re doza statûya xwe ya civatî dikin wê biheta ji holê rakirin. DAÎŞ, weke rêxistineka ku rejimên herêmê ên ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin jî di nav de, hemû hêzên ku li rojhilat sîyesetê dikin, bi DAÎŞ´ mudahaleyek li rojhilat bigiştî pêşxistina. Bi teybetî jî, kurd kirina armanca van hêrîşan de. Ji ber ku statûya kurdan newê dayîn û kurd bêstatû werina hiştin, ew şer bi kurdan re dihê kirin. DAÎŞ, bi vî rengî, di temenekî bîrdozîkî de li ser îslamê re birêxistinkirina û bi rengekî "dij-şoreşî" li dijî civate kurd û şoreşa rojava didina şer kirin. Di vê temenê de gelek hasab û kîtab, bi hevdû re bi derxistina li holê a DAÎŞ´ê re hatîna kirin.

**Di vê çerçoveyê de**, mirov êdî baştir fahm dike ku ji ber çi rejima tirk di çerçoveya ”pêvajoya çareserîyê” de ku ji ber çi nêzî destpêkirina muzakareyan bi civate kurd re nabê. Hinekî jî, ev jî dîyar dibe. Rejimê, hêvîyaka mazin bi DAÎŞ´ê û hêrîşên wê ve girêdaya. Hêvî kirîya ku wê DAÎŞ derbeyekê bigiştî li kurdan bixe. Wê DAÎŞ´ bi hêrîşên xwe derbeyê li başûrê kurdistanê bixe û her wusa wê rojavayê kurdistanê û şoreşa rojava bi tememî were şikandin û ji holê rakirin. Piştî wê re jî, êdî wê li gorî wê rewşa nû wê ji nû ve plankirin û dîzaynkirin biheta kirin. Bi wê re jî, piştî van şikandinan, wê zor li birêz Ocalan jî bikiran ku tevgera kurd ”çekê berde.” Ev mijara nîqaşên di navaroka ”pêvajoya çareserîyê” jî, li gorî vê dihat kirin. Berî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li ser Kobanê zêde bibin, di çapameniya tirk de dihat nîqaşkirin ku ”wê tevgera kurd PKK´ê çekê berde” Heta ku di nava wan nîqaşan de, hinekan jî taqwîm(´salname´)ên çekberdanê jî dihanîn ser ziman.. Di vê temenê de hizirkirina ku wê ancamaka mazin bi DAÎŞ´ê re bidest bixin. Li gorî wê ancama ku hizirkirina ku wê bidest bixin, gotin digotin û nîqaş dimeşandin. Ew gotinên ku bi navê dawutoglu re dihanîn ser ziman ên bi rengê ”stretejîya kûr” û hwd jî, di vê temenê de, di temenê şikandina kurdan bi DAÎŞ´ê re bi temen dikirin.

Dema ku em van aliyan hemûyan dihêne cem hevdû, hingî dîmenekî zelal di vê temenê de derdikeve li holê li berçav. Ev dîmen, bi hêrîşên li ser şoreşa rojava re wate xwe dibîbînê. Di roja 19´ê temûza 2012´an de, dema ku kurdên rojava care pêşî, di çerçoveya pêvajoya şoreşa rojava de ku dest danîn ser rêveberîya bajarê kurd ê Kobanê û pê de, êdî li kurdistanê jî pêvejoye nû destpê kir. Bi vê pêvajoyê re şoreşa rojava pêşket. Kurdan, herêma rojavayê kurdistanê bigiştî kirina bin kontrola xwe de. Di destpêkê de, kurdan pirranîyan rêveberîya bajarên xwe dema ku dest danîna li ser wan, ne hiştin ku ne ji wan xwûn birijihê û ne jî ji hêzên rejimê bê û ankû hêzek din bin ji wan bidest kurdan werina kuştin û xwûna wan birijihê. Bi vî rengî, kurdan şoreşek bêxwûn kir. Bo vê yekê bû ku di destpêka şoreşa rojavayê kurdistanê de bo şoreşa rojavayê kurdistanê dihat gotin ku ”şoreşa bêxwûn´ û ankû ”şoreşa demokratîk.” Lê

piştre, bo ku wê şoreşa ku bi bêxwûn bûyî bixwûn bikin, temenê hêrîşên li wê hat çêkirin û dem bi dem û gav bi gav hêrîş li rojava û civate kurd pêşxistin. Kurdan, ev yek dît. Bo vê yekê, êdî giranî dane xwe birêxistinkirinê. Hêzên parastina gel bi navê ´YPG´ê avakirin bo parastina herêmên kurdan. Vê hêzê hemû cihêrengîyên cuda ên herêmê ên kêmnetewî û bawerî parastin. Nehişt, zirer were û bighijê wan. Civate kurd, civatek pirr-rengî û pirr-bawerî ya. Di vê temenê de, ew pirr-rengî û pirr-bawerîyên civatî ên civate kurd, wê çawa li dijî civate kurd bikarbêne û bike temenê hêrîşan, li wê hizirîyan. Dijberîyên dîrokeî li ser ola îslamê re li kurdên êzîdî hatibû afirandin, di vê demê de dîsa hatina bikarhanîn. Lê vê carê li dijî civate kurd bigiştî hatina bikarhanîn. Di destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê ên li civate kurd de, digotin ku ”kurd, kafir in, wan bikujin.” ”Mêrên wan bikujin û jinên wan ji xwe re weke carîya bênin.” Her wusa di dewama wê de gotin ku ”kuştina kurdan ´halal´ a.” Di vê temenê de, dema ku li rojava hêrîş dane destpêkirin, piştre biteybetî, bo ku temenê van gotinên xwe biafirênin çûna bi ser kurdên êzîdî de. Yanî li vir, dihê dîtin û fahm kirin, di temenê çûyina bi ser herêma şengalê û kurdên êzîdî de, planaka pirr-alî heya. Biqasî aliyê wê hêrîşê bi wê şikandina kurdan heya, aliyê wê ”propaganda” jî heya di temenê dij-olîtîyê de li ser navê kurdan û hwd re.

Dema ku em hebûna pêşxistina DAÎŞ´ê, afirandina temenê wê li herêmê û bi wê re îstismarkirin û bikarhanîna olê û hwd ku bi wê re şîrove bikin, divê ku em van aliyan hemûyan bi hevdû re bibînin, li berçavan bibînin û werênina ser ziman. Gelê kurd, pirranîya wê ya civatî i bawerîya xwe ji ola misilman a. Lê tevî ku rast ev a jî, kurd pêşî weke civateke ”dij-olê” hat nîşandin. Lê berî vê jî, pêşî navê kurdan ji nava ola îslamê hat paqijkirin. Bi wê paqijkirina navê kurdan a ji nava ola îslamê re temenê hêrîşên li ser olê re ku li kurdan bikin bi vî rengî afirandin. Dema ku navê kurdan di nava olê de were ser ziman, wê nikarîban ku olê li dijî wan bikarbênin û li ser olê re rêxistinên tundrew ava bikin û li dijî civate kurd bidina şerkirin. Bo ku ev yek bibe û were kirin, divîyabû ku pêşî navê kurd ji nava ola îslamê bihata paqij kirin.Her wusa, sazîyên rejima tirk, ”ansîklopedîya dîroka îslamê” qaşo di nivîsênin. Lê tenê carekê jî navê kurd di wê de nabuhurê. Heta ku ji ber ku Salahadinê Eyûbî, kurdek bûya, navê wî bixwe jî di wê de bicih nekirina. Bi qadaxaya ku bi zimanê kurdî kirina waazan jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest û fahm bike. Bi van politikayên bi vî rengî, pêvajoya li dijî kurdan, hanîna wêastê ku di bin navê DAÎŞ´ê de rêxistinên tundrew ava bikin û bi civate kurd re bidina şer kirin. Li vir, divê ku em binxat bikin ku heta ku em vê paqijkirina navê kurd ji nava ola îslamê fahm nekin, emê pêşxistina van rêxistin tundrew ku bi kurdan re bidina şerkirin baş fahm bikin. Divê ku em li ser wê paqijkirinê re li pêşxistina van rêxistinên tundrew ên li dijî civate kurd ku didina şerkirin binerin û fahm bikin.

Dema ku DAÎŞ´ê bi dest hêrîşkirina li kurdan kir, pêşî got ku ”kurd, kafir in” û ”dij-olê na” Bi van gotinan, bidest pêşxistin û reşkirinê kir û bidest hêrîşkirinê li ser van gotinan û têgihiştinaka bi vî rengî re kir. Ev rewşa weke ”kafir” nîşandina kurdan, temenê wê li ser wê paqijkirna navê kurdan ji nava olê rûnîstîya. Di serî de divê ku mirov vê yekê fahm bike ku ol bi wê paqijkirina navê kurd ji nava wê bi vî rengî di temenekî dijber de li dijî civate kurd kirina pozisyonekê de. Êdî li ser wê pozisyonê re bi kurdan re didina şer kirin. Li vir, di nava olê de, rejimên herêmê ên weke Îranê û tirkiya û hwd, xwe di nava olê de kirina desthilatdar û bi wê olê li dijî kurdan

bikardihênin. Oldarên kurd bixwe jî, ev yek bibaşî fahm nekirina ku wê raxina li berçavên mirovan û rayagiştî a cihanê. Dema ku ev alî hemû werina dîtin, wê temenê şerê rejimên herêmê ê ku li ser olê re li dijî civate kurd afirandina jî wê were xûrixandin. Di serî de, divê ku mirov li ser vê yekê bi teybetî bisekinê. Divê ku mirov bizanebûnî li ser vê aliyê paqikirina navê kurd ji nava olê û li ser wê re pêşxistina rêxistinên tundrew ku ji aliyê rejimên herêmê ve li dijî civate kurd fahm bike û werêne ser ziman.

Piştî bûyîna şoreşa rojava, di temenê awayekî dij-şoreşê de li ser olê re DAÎŞ hatîya pêşxistin û hatîya dayîn hêrîşkirin li ser hebûna civate kurd û destkevtiyên wê ên li herêmê. Bi vê rengê, bi destê DAÎŞ´ê xwestina ku derbeyê li kurdan bixin bi rengekî weke ku çawa ku Srî-lanka derbe li tamilîyan xist bi alikarîya hin welatên rojava. Li kurdistanê, di vê temenê de bi kurdan re şer dikin. Pêvejoyek şer ya giştî li dijî civate kurd di bin navê rêxistina terorê û hov a DAÎŞ´ê de dane destpêkirin. Bi hezaran kurd bidestê vê rêxistina hov hatina qatil kirin. Bi van hêrîşên ku bi destê DAÎŞ´ê li civate kurd dikin, dixwezin ku derbeyê civate kurd bixin. Bi wê re, bi wê şoreşa rojava bitafisênin. Her wusa, kurdan jî, bi hêrîşên vê rêxistina hov bênina wê astê ku karibin hemû politika û xwestekên xwe bi wan bidina herêkirin. Yanî, bi gotinaka din, bi van hêrîşên DAÎŞ´ê dixwezin ku kurdan bênina wê astê ku ji doza xwe ya ku doza statûya xwe ya dike bi şûn ve gavê biavêje. Hêrîşên DAÎŞ bo vê yekê li civate kurd û li herêmên kurdistanê dihên kirin. Di vê temenêê de, bi hêrîşan, dixwezin ku biqasî êş û elemên ku bi komkujiyan çê bikin, her wusa pirsgirêkan jî di nava civate de çê bikin ku bi wan pirsgirêkan êdî civate kurd di nava xwe de meşkûl bibe û ew jî, êdî li ser wê re civate kurd bikina bin kontrola xwe de. Yanî, di vê temenê de, dema ku em li hêrîşên DAÎŞ´ê dinerin û dahûr dikin, em gelek armancên rejimên herêmê ên ku di temenê wan de na, kifş dikin.

Ji awayê bi rêxistinkirina DAÎŞ´ê li herêmên Îraqê ên weke Musilê bicihkirina wê dihat fahm kirin ku ev pêvajoya hêrîşên ku wê DAÎŞ´ê li herêmên kurdan bikira, di çerçoveyak pêvejoyekê de lê hatibû hizirîn. Ji xwe, piştre jî, bi pêşvajoyên piştre ev yek hat dîtin. Bi teybetî, herêmên ku DAÎŞ li wan bichkirina yan herêmên kurdan in û yan jî herêmên di rex herêmên kurdan de na. Bi vî rengî, herêmên di rex herêmên kurdan de ku kirina bin kontrola DAÎŞ´ê de, di vî şerê DAÎŞ´ê bi kurdan re weke herêmên ku weke ”anîyên li şûn şer” in dihatina bi wasifkirin. Her herêmek şer, herêmek anîya li şûn şer´ ji wê re divêt bo serkevtinê. Di vê temenê de bo DAÎŞ´ê jî hatîya hizirîn. Her wusa, çend ku dihat gotin ku DAÎŞ´ li ser mezhebê sûnnî re pêşxistîya û li dijî Îranê ya jî, ev gotin, piştre bûna weke gotinên ”manîpûlasyonî”. DAÎŞ´ê, ti şer bi Îranê re jî tirkiya re jî ne kirîya. Gotinên wê DAÎŞ, hêrîşî van herêman bikin jî, bûna gotinên ku heya mirov ji deverekê bibina devereka din. Di vê astê û pêvajoyê de, ev gotin bûna tenê gotinên ´manîpûlasyonî.´ Rejimên herêmê ên weke Tirkiya, bi rewş û kontrolkirina xwe ya olê re bawer dikin ku wê karibin DAÎŞ´ê weke rêxistineka tundrew ku li ser olê re pêşxistina wê kontrol jî bikin. Ev baawrrî, bi rayadarên îranî re jî û bi rayadarên tirk re jî heya. Bi teybetî, piştî paqijkiirna navê kurd ji nava olê û pê de, van herdû rejiman, li herêmê desthilatdarîya xwe di nava olê de jî xort kir. Li ser wê re jî, bandûra xwe heta ku li ser beşeka civate kurd jî çêkirin.Mirovê kurd ku bi bawerîya xwe bi dilekî safî û paqij nêzîk dibe, ew hêst û bawerîya wan, li dijî hebûna wan bixwe jî hatîya bikarhanîn û îstismarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku di vê serdemê de rejimên herêmê bi wê kontrol kirina navaroka olê û li gorî xwe şîrovekirin û dîzaynkirina wê re

temenê bikarhanîna wê weke ku di roja me de li dijî kurdan dibe diafirandin Hê jî, wê dikin. Bi vê rengê, mirov dikarê bibêje ku DAÎŞ´ projeya rejima tirk û rejimên ên herêmê a sadsalê ku li ser olê re bo şerkirina bi kurdan re hatîya pêşxistin a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û bibêje ku ev hêrîşên DAÎŞ´ê bi konsept û stretejîyeka giştî a li dijî kurdan ku bi wê dihê xwestin ku kurd werina şikandin û pêşketina civate kurd were derbe kirin. Ji destpêka şoreşa rojava ve, ji 19´ê temûza 2012´an ve hêrîş li ser kurdên rojava kêm nebûna. Pêşî bi Cebeil-nasr´ û hwd ev hêrîş bûn. Gelek kom avakirin û dane hêrîşkirin li ser kurdanji herêmên rojavayê kurdistanê ên weke´ til-koçer´, ´ girê-sipî(´til-ebyad´), Şerêkahniyê û hwd ve ew herîş li kurdan û kurdistanîyên rojava domîyan. Hemû hêrîş bi armanca têkbirina şoreşa rojava bû. Di vê temenê de, piştre, weke projeyea têkbirina şoreşa rojava DAÎŞ pêşxistin. Ji 15´ê êlûna 2014´an û pê ve, hêrîşên vê rêxistina terorîst a bi navê DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya li rojava domîyan. Bi wê re jî, weke ku ´pêşnûmayên qanûnên leşkerî´ amede dikirin ku temen hêrîşên leşkerî li rojava çêbikin. ´Pêşnûmayên qanûnên leşkerî´ ên ku rayadarn tirk ji meclîsê buhurandin di 3´yê kewçêrê a 2014´an de, minaq, nîşanak û birhana vê yekê na. Bi vê re, divê ku e balê bikşênina li ser vê jî, ku di roja ku ew ´pêşnûmayên qanûnn leşkerî´ ji meclîsê buhurandin de jî, ji dadgeha tirk a rêvebirinê a sêyemin a li amedê, biryara ´ ji rêvebir birinê rakirina ´hevserokatîyê´ derxistin. Hevserokatî, pergaleka xwe bixwe rêvebirinê a ku kurdan pêşxistibû bû. Bo ku wê ji holê rabikin, biryar ji dadgehê di heman rojê de, yanî di roja 3´yê kewçêra 2014´an de **derxistin**.

Li vir, bi teybetî divê ku mirov li ser vê yekê bisekinê ku hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi rêbazên ´kontrayî´ ku li kurdan dihên kirin, bi konsept û stretejîyeka ku bi wê kurdan têkbibin de dihên kirin. Bi van hêrîşan, bigiştî hebûna civatî a civate kurd û pêşketinên wê ên navxweyî dihên armanc girtin. Hêrîşên bi DAÎŞ´ê, mirov dikarê tenê weke aliyê vê konsept û stretejîya giştî a bi armaca şikandina kurdan a bi leşkerî werêne ser ziman. Bi wê re jî, di 15´ê êlûna 2014´an de êdî giranî dihê dayîn li ser zêdekirina hêrîşan li kurdan bidestê DAÎŞ´ê û bi wê re jî di 3´yê kewçêrê a 2014´an de ´pêşnûnameyên qanûnên leşkerî´ên şer bo dagirkirina herêmên kurdan dihê hanîn li meclîsa tirk û di wê de dihên buhurandin. Bi heman rengî, ku em dikarin weke aliyekî din ê vê konseptê û stretejîyê şîrove bikin, ku di heman rojê de, yanî di roja ku 3´yê kewçêrê a 2014´an de ku wê pêşnûmayên qanûnî ên leşkerî ên şer ji meclîsê bi buhurênin, dadgeha tirk a rêvebirinê a sêyemin a li amedê, biryara ´betalkirina hevserokatîyê´ derdixe. Ev mijar, rewş û biryarên ku hatina girtin, hemû jî, bi kurdan ve girêdayî na û di derbarê jîyane kurdan de na. Wê çawa jîyane kurdan were bêrêxistin kirin û temenê xwe-rêvebirinê ya wan were ji holê rakirin, di vê temenê de, biryar dihên girtin û hêrîş di wê temenê de li kurdan dihên kirin. Li vir, ez divê ku vê jî bibêjim ku çendî ku mirov nikarê ´pêşnûmayên qanûnî ên leşkerî ên şer(´tezkereya şer´)´ ji wan hêrîşên DAÎŞ´ê cuda werênina ser ziman, mirov nikarê wê biryara dadgehê a bo ´betalkirina heverokatiyê´ jî ji van hêrîşên DAÎŞ´ê û ji meclîsê buhurandina wan pêşnûmeyên qanûnî ên leşkerî ên şer cuda werêne ser ziman. Her wusa bi heman rengî, çendî ku divê ku em hêrîşên DAÎŞ´ê û pêşnûmayên qanûnî ên leşkerî ên şer ên ku rejima tirk hanîna meclîsê û buhurandina ji meclîsê bi hevdû re divê ku şîrove bikin, bi heman rengî divê ku mirov di berdewama wan hêrîşên DAÎŞ´ê û van pêşnûmayên şer de, divê ku mirov biryara dadgeha tirk a rêvebirinê a sêyemin a li amedê ya ´betalkirina hevserokatîyê´

werêne ser ziman. Di zihniyetekê de bi hevdû ve girêdayî na.

Zihniyeta ku li dijî statûya kurd a, di vê temenê de şerekî li dijî hebûna civatî a civate kurd dide. Her wusa, bi şer û biryarên xwe yên şer û her wusa bi biryarên xwe yên ji dadgehên xwe ku derdixin re jî, hebûna civate kurd armanc digrin. Wê çawa şikandinekê, bi wê re bidine çêkirin bi civate kurd re, di vê temenê de biryaran digrin. Her wusa, di vê dema ku di wê de hêrîşên pirr zêde û mazin weke ku li kobanê li hebûna civate kurd hena, di wê demê de biryara ´betalkirina hevserokatîyê´ ji dadgehê didina derxistin. Di vê dema ku hey û bala herkesekî li ser kobanê ya, biryaraka bi vî rengî dihê derxistin li dijî kurdan ji dadgehê. Yanî bi gotinaka din ´qurnazîya şarqê´ li vir mirov dibînê.Ji vê jî, zêdetirî, bêbaxtîyeka nemerdî jî heya. Bi vê rengî, carek din ew gotina ku civate kurd gotibû ”baxtê rûmê nîn a” tê piştrast kirin. Di dema ku hey û bala hemû kesî li ser kobanê ya, ji dadgeha tirk a amedê biryara ´betalkirina hevserokatîyê´ derdixin. Her wusa, rasthanîna derxistina vê biryara betalkirina hevserokatîyê jî li piştî hevdîtina birêz ocalan jî, armanca wê ew a ku di dema hevdîtinê de ku li ser wê gotin û hizir newina ser ziman. ..

Hêrîşên li Kobanê, divê ku mirov wan bi teybetî werêne ser ziman. Ev hêrîş û zihniyeta di temenê wan hêrîşan de, zihniyeta ku ´pêşnûmayên qanûnî ên şer´ ji meclîsê derdixe ya. Zihniyeta ku ji dadgehê biryara ´betalkirina hevserokatiyê´ derdixê ya. Zihniyet, heman zihniyet a. Di vê demê de, bi vî rengî pêleka giştî ya hêrîşan li kurdan dane destpêkirin. DAÎŞ´ bixwe jî, wusa xuya dike ku ne rêxistinaka ku armanca wê ya xwe kirina rêveber heya ya. Em vê yekê, ji rengên hêrîşên wê û ji wê helwesta wê ya ku her devera ku ew dikeviyê de ku bi tememî dike kavil û dixûrixênê, mirov ji wê fahm dike. Ev hêrîşên vê demê ên ku li kurdan dibin, em divê ku wan weke hêrîşên stretejikî bi vî rengî şîrove bikin û werênina ser ziman. Bi teybetî bi hêrîşan, hebûna civatî a civate kurd û pêşketina wê ya di nava wê de hatîya armanc girtin. Rejima tirk jî, divê ku mirov vê yekê bibêje ku ji ber ku politikayên wê yên bi armanca çareserkiirna pirsgirêka kurd tûna na, êdî van hêrîşan pêş dixe û alikarîya xwe ji wan çeteyên DAÎŞ´ê ku hêrîşî kurdan û herêmên wan bikin. DAÎŞ, rêxistineka dij-şoreş ku li dijî şoreşa rojava hatîya birêxistinkirin a. Çend ku di vê demê de rayadarên tirk, bi birêz Ocalan re hevdîtin kirin û gotin ku "emê muzakareyan bidina destpêkirin´ û bi wê re gotina ku "meyizênin, me rastkirin di ´civîna serokan´ de kirîya" jî, di piretikê de ya dihê ditin vajî wê ya. Minaqe wê jî, rojekê piştî hevdîtina birêz ocalan re derxistina ji dadgehê biryara ´betalkirina kevserokatîyê´ ya ji dadgeha sêyemin a li amedê ya. Ev, minaqe herî li berçav a ku bêcidîyeta rayadarên tirk dihêne ser ziman a. Çend ku di hevdîtinê de ji birêz Ocalan re bêjin ku "me levkirîya bo destpêkirina muzakereyan" jî, ev gotin bi armanca derbaskirina demê ya. Planak bi DAÎŞ´ê çêkirina û dixwezin ku di vê demê de wê bibina sêrî. Di piretikê de, wê ti tiştek newê kirin. Dibêt ku weke ku berê dikirin, çend kirinên bo boyaxkirina çavên mirovan bikin. Ew jî, ku dema ku ew hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi ancamê şikandina kurdan ku hatina vala derxxistin. ..

Di sedsale 21´ê de şoreşa kurd, li rojava pêk tê. Ev şoreş, şoreşeka herêmî, civakî, têgihiştinî û hwd, a. Şoreşa rojava, em dikarin weke şoreşa mîtannîyan di sedsale 21´ê de şîrove bikin û werênina ser ziman. Mîtannî û newîyên wan kurd, bi vê şoreşê re ji nû ve ku xwe li gorî demê bi rêxistinkirina derdikevina ser dika dîrokê. Ev şoreş, şoreşeka herêmî ya. Weke ku çawa ku di dema hûrî û mîtannîyan de, bi bandûr û pêşketinên wan ên di dema wan de mîtannî di demên piştî de û di temenê pêşketina wan re kifşkar bûna

û pêşketinên ku li herêmê bûna dane kifşkirin, bi heman rengî, di vê demê de jî heman tişt bi pêşketina şoreşa kurd(mîtannî) a rojava re bûya. Î ro ku hêrîşên wilqasî mazin ku li wê pêşketina şoreşî bibin, em dikarin van hêrîşan û hebûna wan, bi pêşketina vê şoreşê û bandûra wê ya dîrokî re werênina ser ziman. Divê ku em di vê temenê de wan hêrîşên li wê şîrove bikin. Şoreşa rojava, şoreşa Mîtannîyan ku di sedsale 21´ê de bûya ya. Em divê ku vê jî bibêjin ku her gotina ”şoreşa rojava” ku em bikardihênin, divê ku em di rengê şoreşa mîtannîyan de bixwênin. Bi vê rengê, wê rastîya vê pêşketina şoreşî baştir were fahmkirin. Temenê vê pêşketina şoreşî jî, li ser wê temenê ya. Bi dîroka wê ya civatî, têgihiştinî û felsefîkî û hwd re, divê ku em di temenê dîroka vê şoreşê a hemdem de ji demên hûrî û mîtannîyan hildina li dest. Hemû hêrîşên ku li vê şoreşê dibin jî, divê ku em weke hêrîşên ku statûqûpaêrêz ku li dijî hemdemîya wê şoreşê pêktên jî şîrove bikin. Ev herîş ku ji hundur bin û ji derve bin, bi heman rengî divê ku mirov van werêne ser ziman. Di vê temenê de bi dîroka civatê û herêmê re, em divê ku temenê vê şoreşê jî bi felsefe û û têgihiştin û zimanê wê re fahm bikin.

Wê dîrok, vê yekê pirr baş binivîsêne û werêne ser ziman ku êdî wê serdemeka nû li herêmê bi şoreşê re wê bibê. Em li vir, divê ku vê yekê bi teybetî bibêjin ku em nikarin vê şoreşê, tenê weke avakirina rêveberîyekê li herêmekê û ku bi wê werênina ser ziman a. Ji wê zêdetirî, b nêzîkatîyeka pergalî, bi felsefeyeka dîrokî û civatî, têgihiştinaka hizrî û felsefekî û rastîyeka demî û hwd re divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di vê temenê de dîrok, vê pêşketinê di nava rûpelên xwe de qayd dike. Lê her qaydkirin jî, bi xwe re destpêkeka di dîroka herêmê û pêşketina wê ya ku wê bibe de. Her wusa, bi wê re jî, têgihiştineka felsefekî ku divê ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman a. Şoreşek û ankû pêşketinaka bi vî rengî di dema xwe de çendî rast hata fahmkirin û hata ser ziman, wê bi heman rengî hem pêşketina wê bi serdeme wê re zêdetir bibe û hem jî wê bandûra wê bi dîrokê re maztir bibe. Ev jî, weke rastîyeka têgihiştinî ku mirov divê ku bi dîrokê re hilde li dest û fahm bike ya. Dîrok, bi vî rengî weke ku li ser kok û ardnîgarîya xwe ji nû ve were nivîsandin dihê li berçav.

Di sedsale 21´ê de şoreşa kurd, li rojava şoreşa mîtannîyan a. Ev jî, bi rastîyeka civatî, dîrokî, felsefekî û hwd re heya. Di vê temenê de divê ku em şoreşa li rojava şoreşa mîtannîyan hildina li dest û fahm bikin. Gotina ´Mîtannî´, î ro, di nava rûpelên pirtûkên dîrokê de, weke navê dîrokeka ku êdî najî û tenê di nava rûpelên pirtûkên dîrokê de dijî dihê hanîn ser ziman. Dema ku em dîrokê ji xate wê ya civatî û herîkîna wê ya ku heya qût bikin, emê hingî bigihijina ancamaka bi vî rengî. Lê dema ku em dîrokê ji wê herîkîna wê qût nekin û werênina ser ziman bi wê temenê wê civatî re ku pêşketîya, wê hingî bi rastîyeka civatî ku î ro jî dijî re wê were ser ziman. Ew rastîya civatî ku î ro jî dijî, şoreşa rojava û ankû şoreşa mîtannîyan, dibêt şoreşa wê û derketina navê li dika dîrokê. Ji xwe navê wê li dîka dîrokê heya. Lê ew civatîtîya wê, hatîya bertûnakirinê. Ji vê yekê tê xilaskirin û dihê hanîn li dika dîrokê. Ev jî, vejînbûnaka dîrokî ya ku em divê ku wê werênina ser ziman a. Şoreşa Mîtannîyan ku li rojava bûya, di aslê xwe de vejînbûnaka jî. Em divê ku bi vê rengî jî wê werênina ser ziman. Ev vejînbûnaka civatî, felsefekî û şariştanîtî ya. Ev vejînbûn, vejînbûnaka dîrokî û têgihiştinî ya. Bo vê yekê, em nikarin wê tenê bi avakirina sazîyeka rêveberî û hwd re bi tenê werênina ser ziman.Lê bi li gorî wê têgihiştinîtîyê û pergalîya wê ew sazîbûna ku diafirê, mirov dikarê wê werêne ser ziman bi rengê wê yê ku êdî li jîyane xwe bi rêxistin dike. Şoreşa Mîtannîyan di sedsala 21´ê de, wate wê çî ya û divê ku mirov wê çawa

fahm bike.? Ev pirs, weke pirseka ku em divê ku pêşî, temenê bersivdayîna wê li ser dîroka hûrî mîtannîyan bich bikin a. Bi wê re jî, bi herîkîn û bandûr û têgihiştina wê ya ku bi demê re xwe di bin nav û awayan de jîyand re wê werênina ser ziman. Ev jî, çendî ku hat ser ziman, wê dîrok were ser ziman. Civakatî û şariştanî, bi pêşketina xwe ya dîrokî re were ser ziman. Bi wê re jî, wê felsefe wê derdikeve li holê. Felefe, rengê vê şoreşê ê herî safî ya bi civaktîya wê re.

Em ku di sedsale 21´ê de şoreşa mîtannîyan fahm bikin, emê dîrokê û temenekî pêşketina civatî jî bi rastî fahmbikin. Emê rastîyna felsefîkî û dîrokî ku dihên jîyîn û ser ziman, li ser temenê wan jî bidina rûnandin. Ev jî, weke rastîyeka vê şoreşa mîtannîyan ku divê ku mirov fahm bike ya. Şoreşa mîtannîyan, wê bi xwe re, şoreşa herêmê bê. Wê temenê pêşketina herêmê ya li pêşarojê biafirêne. Û her wusa wê temenê şariştanîya civakî ji nû ve bi nirxandina bi xwe re werêne ser ziman. Bi vê rengî, bi aliyê xwe yê felsefîkî re ahlaq û bi aliyê xwe yê demkî re pêşketina civatî, ku çawa ya wê bi pêşketina şariştanî bi hevdû re zawacaka dîrokî bikin. Li vir, wê êdî bi wê re hemû reng û pêşketinên bi navê mesopotamîkî wê xwe bidina dîyar kirin. Ev gîyane mesopotamya, gîyane vê şoreşa mîtannîyan a di sedsale 21´ê de ya ku li rojava bûya. Î ro, di roja me de, desthilatdarên li herêmê, hemû hêîşên ku li vê şoreşê di bin reng û navan de ku lê vê şoreşê dikin, divê ku em di temenê statûqûtîya wan de, bi wê zihniyeta wan ya vajî vê zihniyeta vê şoreşê re werênina ser ziman. Ev zihniyeta vajî zihniyeta vê şoreşê jî, ew a ku bi statûqûtî xwe dike desthilatdar û temenê wê li ser gotina ´bişavtinê´ avaya ya. Çendî ku ev statûqû karibê bişavtinê bike, hem bi wê re xwe mazin dike û desthilatdarîya xwe xort dike. Di vê temenê de, em divê ku vê rastîya wê fahm bikin. Rastî li vir, bi zihniyetê re dihê dîîtin. Em jî, divê ku bi wê re werênin ser ziman. Di vê temenê de ku em bibêjin, şoreşa mîtannîyan di sedsale 21´ê de şoreşa zihniyetê û demokrasîya gelan a, wê rast û di cih de bê. Desthilatdarîyên ne demokratîk û temenê wan li ser gotina bişavtinê ya, hêrîşî vê şoreşê û pêşketina wê dikin. Zihniyeta statûqûparêz ku temenê wê li ser heman temenê yanî bişavtinê ya, hêrîşî pêşketina vê şoreşê dike. **Di serî de zihniyeta ku hebûna gelan û pêşketina wan herê nake, hêrîşî şoreşa mîtannîyan a li rojava dike. ......**

Kurdan, di sedsale 21´ê de şoreş kir. Kurdan, gîyane xwe bi agirê şoreşê şiştin. Di nava kurdan de, gotinek berê hebû. Ew jî, ew bû ku digotin ku ”biagirê newrozê xwe afirand” in. Î ro jî kurdan, xwe bi wê agirê ji nû ve afirand. Şoreş bo kurdan, newroz a. Newroz jî, navê jîyane nû ya. Ku em di vê temenê de bahse kurdan bikin, wê pirr rast bê. Dîrokê, piştî serdemên Qasîtan, gûtîyan, hûrîyan, mîtannîyan, medîya, şadadî, merwanî û Eyûbîyan re, carek din derxist dika dîrokê. Ev serdemên dîroka kurdan hemû, di temenê pêşketina şoreşa kurdan a di sedsale 21´ê de na. Pêvajoyên şoreşa kurd a di sedsale 21´ê de, dema ku em bi salên wê ên destpêkê re dihêne ser ziman, mirov tenê bi hêrîşên ku lê bûna re dihêne ser ziman. Di vê serdema ku di wê de şoreş dihê kirim, em dijîn û şahîdîyê ji wê kêlîka dîrokî re dikin û bi wê şahîdîyê û zanîna me ya derbarê wê de dinivîsênin. Em, î ro di nav de na. Ev jî, derfetekê baştir dide me ku em wê fahm bikin. Şoreşa rojava, di sale 2012´an de bû. Ji kobanê di 19ûûê temûza 2012´an de destpê kir. Piştre jî, gav bi gav pêşket. Hêrîşên ku li şoreşa rojava bûn, kir ku şoreşa rojava hê bêhtir maztir bibe. Dema ku pêl bi pêl hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd, bi alikarîya Rejima tirk li kobanê destpêkirin û di 15´ê êlûna 2014´an de derketin asta herî bilind, hingî kobanê bû kurdistan giştî. Bi dirişma, «her der kobanê, her der berxwedana a», bû

temenê serhildanê li kurdistanê. PIştî ku Hikimeta tirk a AKP´ê ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de pêlên hêrîşê ên bi maskeya DAÎŞ´ê û hwd ên bişitt li kobanê û kurdistanîyan dan destpêkirin û ku hêrîşên wan bi serneketin, êdî li bakûrê kurdistanê hêrîşî kurdistanîyan kirin û bi dehan kurd qatilkirin û bi hezaran kurd birindar bûn û piştre jî «rewşa awert» denezend li kurdistanê giştî.

Di sala 2011´an de, pêvejoya pirr bişitt a hêrîşêna hikimeta AKP´ê a demê li kurdan da destpêkirin. Lê bi wê re biserneket. Piştre bi çalakiyên gelê kurd ên li her qadê, kurdan pêvajoya ´çareserîya demokratik´ dan destpêkirin. Ê ku ew pêvajo dabûbû destpêkirin birêz Ocalan bû. Lê dewletê li şûna ku di vê pêvajoyê de gava biavêje, ket nava hewldanê de ku çawa karibê vê pêvajoyê bi rengekê ku birêxistin bike û bi wê re jî derbeyan li kurdan bixe. Her wusa, ji roja ku ´pêvjoyê´ destpêkiribû ve, rayaderên tirk, bi dest çêkirina qarakol û bendavên bi armanca leşkerî kirin. Bi vî rengî jî, heta nêzî du salan li ser esasê mijulkirinê pêvajo birêve bir. Piştre jî, di temenê amedekarîyên xwe de, çeteyên DAÎŞ´ê dan derxistin li holê û şandin bi ser kurdan de ku bi wan derbeyekê li kurdan bixin. Ev, weke plana rejimên herê ên ku kurdistan di nava wan de hatî qatkirin a sedsalê bû. Lê kurdan, bi berxwedana xwe ew têkbirin. Piştî ku hat fahm kirin ku ev plan têkçû, êdî li bakûrê kurdistanê hêrîşên polîs û leşkerên tirk li kurdistanîyên bakûrê kurdistanê destpêkir. Her wusa, weke ku êdî hikimeta AKP´ê pêvejoyek nû ya bi hêrîşan a weke ya sale 2011´an li kurdan dabûbû dest pê kirin. Di vê çerçoveyê de «rewşa awerta» dihanîn li holê. Lê kurdistanî, di vê demê de bi rêxistinkirî bûn. Rayadarên dewletê, weke ku çawa ku di salên 1990´î de çete û kujarên hizbil-kontra derxistina li holê dişandina li ser kurdan de, di vê demê de dîsa weke ku serî li rêbazekî bi vî rengî didan. Kujarên dewletê ku bi mskeya olê di bin navê «huda-par»´ê de birêxistin kirina, dîsa bidest dayîna wan ya hêrîşkirina li ser kurdan kirin. Ev asta hêrîşan, piştî ku pêla hêrîşan ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de ku destpêkiribû û pê de, kurdan ku li ber wê li berxwe dan û ew şikandin, êdî ji 6´ û 7´ê kewçêrê a 2014´an de êdî ev asta hêrîşan li bakûrê kurdistanê jî destpêkirin.

Bi vê rengê, bo kurdan pêvejoye nû destpêkiribû. Êdî kurdan, bi vîna xwe li berxwe dida. Bi gîyane berxwedanê a kobanê û têgihiştina şoreşa rojava û her wusa bi vîna xwe li ser lingan bû. Kurdan, pêlek din ya hêrîşê a ku hatî ser wan weke ku şikandibûn. Lê hêrîş li wan ne sekinî bûn. Kurdan jî, li berxwe didan. Ev hêrîşên ku pêvajoyên destpêkê ên şoreşê de ku li kurdan û civate kurd dibûn, kurdan li gorî wan astaka berxwedanê jî bivîna xwe pêş dixistin. Ev jî, vîna gîyane şoreşê a şoreşgerî bû. Gelê kurd, li bakûrê kurdistanê serîhilda. Li berxweda. Weke ku çawa ku li rojava, kurdan gavbi gav xwe rêxistin kir û temenê xwe yê civatî û rêveberî afirand û li ser wê şoreşek civatî kir, her wusa ji 6´ û 7´ê kewçêrê a2014´an û pê ve, li bakûrê kurdistanê jî pêvejoyek bi vî rengî destpê kir. Rayadern dewletê jî, bo ku ev fahm kirin «rewşa awerta» denezendin. Bi wê re, wê hêrîşên xwe zêdetir dikirin. Lê kurdistanîyan jî li berxwe dida bi vîna xwe, gîyane berxwedana kobanê û gîyane şoreşa rojava. Kurdistanîyan li bakûrê kurdistanê jî, weke ku li rojavayê kurdistanê kurdan kir, li herêmên xwe weke ku dest dênina ser herêmên xwe di nava rewşekê de bûn. Herkesek rabûbû ser pîyan. Êdî ku mirov ji kîjan aliyê ve lê dinerî, mirov didît û fahm dikir, pêvejoyek weke ya rojavayê kurdistanê li bakûrê kurdistanê jî bi serhildane kurdên bakûrê kurdistanê ku bo kobanê destpêkirin re destpê dikir. Kurdan, li herêmên xwe hewl dida ku xwe bikina rêveber û desthilatdar. Bi

vê yekê, dixwestin ku bi vîna xwe êdî rabina ser pîyan. Hêrîşên ku li kurdan dibn jî li vê dibûn.

Kurdên bakûrê kurdistanê, êdî hin bi hin rêveberîya xwe avakirin. Kurdan, hê di 14´ê tirmeha 2011´an e xweserîya demokratik li bakûrê kurdistanê li Amedê denezendibûn li cihanê. Ji xwe piştî wê re rayadarên dewleta tirk, biryara girtina di bin navê «dozên KCK» de dabûbûn û bi sîyesetmederên kurd hatibûbûna girtin û kiribûbûna zindanan de. Heta roja me jî, hê girtinên ku di bin navê «dozên KCK»´ê de ku hatibûbûn girtin, di zindanan de hena. Armanca bi wan girtinan a dewletê ew bû ku temenê wê «xweserîya demokratik» ku kurdan li bakûrê kurdistanê denezendibû ji holê rabikin. Bo vê yekê bû ku dixwestin ku wê ji mejiyê kurdan derxin. Bo ku ji mejiyê kurdan derxin, heta ku digotin ku «li îmraliyê jî, bahse ´xweserîyê´ nayê kirin.» Lê ev ne rast bûn. Kurdan, dixwest ku xwe bi rê ve bibin. Dixwestin ku bi vîna xwe bibina xwedî desthilatdar. Bo vê yekê jî, tekoşînê didin. Ji sale 2011´an û heta sale 2014´an, tişta ku guharî dem bû û hinekî din zêdetirî pêşketina zanebûna kurdan û pêşketina rêxistinîya wan bûû. Di aslê xwe de, di temenê mijulkirinê de dirêjkirina ´ppêvajoya ku birêz ocalan dabûbû destpêkirin jîî, ew bû ku pêşîya vê pêşketinê hin bi hin ku werê ji holê rakirin bû. Heta ku ppêvajo bo vê yekê jî, bikardihanîn. Dema ku kurdan, bi navê xwe tiştek dikir, di cih de ew kirina kurdan û xwestekên kurdan, weke «xwestekên ku zirerê didina pêvejoyê» dihanîn ser ziman. Kurdan, î ro, weke ku ketibina nava pêvejoyek bi vî rengî de. Bi berxwedana kobanê re serhildan li bakûrê kurdistanê jî bûbû bû û bi wê re hemû kurd rabûbûn ser pîyan. Ev serhildana kurdan ku divîyabû ku biheta domandin û di dewama wê de kurdan bi vîna xwe û bi wê gîyane wê serhildanê û her wusa bi wê serhildanê ku rêveberîya xwe ya xweser a cewherî ava bikiran. Ya ku demê jî ji wan dixwest ev bû. Kurd, bi her awayê li ser lingan bûn. Dîrok, êdî bo kurdan di vê aliyê de dimeşî. Kurdan, çendî ku xwe li gorî wê birêxistin û bizanebûn bikiran wê, serkevtin bi dîrokê re bidest bixistan. Bi vê re jî dîrokê êdî ew dinivîsand in. Ev jî, gav bi gav pêşketina şoreşa kurd û kurdistanê bû. Ev şoreş, şoreşa sedsalê 21´ê bû. Di sedsale 21´ê de şoreşa kurd bû. Dîroka kurd a ku wî bidestê xwe dinvîsand bû. .,

**Kurdan, di** destpêka şoreşa mîtannîyan a li rojava de bi awayekî pirr rast gotinak weke navê vê şoreşê bikarhanîn. Ew gotin jî, ew bû ku digotin ”şoreşa weşokanî”. Weşokanî, navend û paytaxta mîtannîyan bû. Di roja me de kurd ji wê re dibêjin ”serêkahniyê.” Boo vê yekê, em di vê şoreşa rojava me de karin bêjin şoreşa serêkahniyê jî. Serêkahniyê, piştî ku serdestîya xwe ya civatî winda kirin, navê wê yê rast hat guharandin. Sînor, di nava serêkahniyê de hat kişandin. Ji aliyekî re hat gotin ”ceylanpinar” û ji aliyê din re jî hat gotin ”resulayn”. Ev herdû gotin, di aslê xwe de, ne tenê sembola qatkirina serêkahniyê na, zêdetirî jî dibina sembol ji metingerkirina paytaxt û navenda mitannîyan re jî. Di vê demê de ku navê ´weşokanî´ ku weke navê vê şoreşê hanîna ser ziman, weke destnîşankirina destpêk û koka civatî, dîrokî û felsefekî a vê şoreşê jî ya. Yanî, destnîşankirina kok û dîrokê ya. Ev gotin, bi vê rengî di aslê xwe de, destpêkeka dîrokî bi xwe re dihêne ser ziman.

Dîrok, di roja me de ji hanîna ser ziman rastîya civatan zêdetirî, bûya rastîya hanîna ser ziman a desthilatdaran. Li ser vê temenê re, navê geltîyê ji hundurê wê gotina ´şariştanî´ a ku dihê ser ziman, hatîya dûrkirin. Yanî jî, hatîya xistin li ast û rêza duyemin de. Ev jî, weke rastîyaka ku hatîya serjêr kirin a.

Şoreşa mîtannîyan, di vê temenê de şoreşeka ku wê zehreya sadsalê bêî dilê wê û desthilardarên wê jî bê, wê bide guharandin. Î ro, şerên vê dihên kirin bi kurdan newîyên mîtannîyan re Li ser vê têgihiştinê re divê ku mirov bibêje ku şoreşa mîtannîyan a li rojava, weke şoreşa sedsalê a giştî jî ya. Di vê sedsalê de rengên pêşketinên civatî derdikevina li pêş. Bi teybetî herêmên weke rojhilat, bindestkirin û desthilatdarîyên bindestkirinê ku hatina avakirin bo ´kontrol kirina gelan´, wê êdî ew jî bi rastîya wan re werina dîrin û kifşkirin. Dema ku em ji aliyê desthilatdarîyê ve, rastîya vê şoreşê werênina ser ziman, divê ku em ji vir ve balê bikişênina li ser wê û bidest hanîna li ser ziman bikin. Ev desthilatdarîyên ku bo kontrolkirinê hatina avakirin, artartnetîfên wan çi na, wê di serî de ew were dîtin bi şoreşa mîtannîyan a li rojava re. Bo vê yekê divê ku mirov şoreşa rojava, weke destpêkeka dîrokî, civatî û felsefekî û hwd, werênina ser ziman.

**Şoreşa rojava, weke ku me hanî ser ziman jî, ji destpêka xwe ve di bin hêrîşên xadar û hov de ya. Şoreşa rojava ji ´kobanê´ destpêkiribû. Î ro jî, Kobanê di bin hêrîşan de ya. Kobanê, navê wê, weke navê serkêkahniyê ´weşokanî´, em di dema mîtannîyan de rastî wê tên. Yanî, navê ´kobanê´ navekî pirr kevn a. Î ro, em dikarin bêjin ku, weke navê serêkahnîyê, weşokanî´, û hwd, navê ´kobanê´ jî, pirr kevn û ji dema mîtannîyan a. Î ro, ev herêm û kobanyê´ya ku bi navê re jî pirr kevn a, di bin hêrîşşan de ya. Armanca hêrîşan jî, têkbirina wê û ew zihniyeta wê ya ku dibê temenê serdestbûna gelên herêmê. Li van xalên wê hêrîş dihên kirin.** Li herêmê, pêşî, di nava wan hêrîşên ku lê dibin de, bawerî weke ku li şengalê û hwd bû, dihên paqijkirin ji dîrokê. Weke ku li Kobanê bû, zihniyeta civatî û ya şoreşê a bi pergalî dihê xistin bin hêrîşan de ku werê ji holê rakirin. Her wusa, bi ne nasîna statûya gelên herêmên ên weke kurd´ hwd re jî, dihê xwestin ku weke ku nebûyî bihasibênin û ne hêlin ku navê wê bikeve nava rûpelên dîrokê de bi pêşketin, têgihiştin, dîrok, felsefeya wê û hwd re. Di vê temenê de di temenê gelek rengan de ew hêrîş dibin. Di roja me de, weke rengekî ´dij-şoreşî´ DAÎŞ bi rêxistinkirina û didina hêrîşkirin li ser wê pêşketina şoreşî a li rojava ku em bi wê bahse şoreşa rojava dikin.

Lê divê ku em bibêjin ku çendî hêrîş bibin û bi astaka bilind bibin jî, êdî wê nikaribin wê dîroka şoreşa mîtannîyan ku di sedsale 21´ê de ku bûya ji holê ra bikin. Ew, êdî bûya. Hêrîşên ku bibin, dibêt ku dem bi dem hinekî pêşketina wê ji hinek aliyan ve bidina hêdîka kirin. Lê wê nedina sekinandin. Ev jî, êdî derketîya li holê. Ji ber ku ev şoreş, bi temenê xwe yê civatî re heya. Ew temenê wê yê civatî wê dide jînkirin. Ew temenê wê yê civatî, heta ku hebe, wê ew jî hebe û bijî. Ev, weke rastîyeka civatî û felsefîkî û dîrokî ya di sedsale 21´ê de ya. Şoreşa rojava, xwedîyê felsefeyeka civakî, dîrokî û têgihiştinî ku ji wê re dibê temen a. Ev felsefe jî, bi hemdemîya xwe ji serdema weşokanî û heta serdema serêkahniyê weke şûnpêyekê heya. Şoreşa rojava, bi pêşketina xwe ya civatî, dîrokî û felsefîkî re heya. Di vê temenê de, divê ku bi dîrokê re wê werêne ser ziman. Li vir, di serî de divê ku em vê jî bibêjin ku weke ku di destpêka her şoreşa ku di vê serdemê de bûya, pêvajoyên hêrîşê pirr zêde li destpêka wê û demên wê ên pêşî bûna. Dema ku em hewl bidina ku vê şoreşê ji destpêka wê û pê ve werênina ser ziman, emê bi dîrok, pêşketina wê ya civatî û felsefe û têgihiştina wê re rastî pêvajoyên ku di wan de pirr zêde hêrîşên xadarî li wê bûna, mirov bibînê ku werêne ser ziman. Di van rojên ku em salên destpêkê ên vê şoreşê dijîn de, em dema ku dîroka wê ya di van demên wê ên pêş de dinivîsênin jî, em rastî pirr-pêvajoyên hêrîşê ên li wê tên ku

werênina ser ziman. Bi teybetî, rejimên herêmê ên vê serdemê ên weke rejima tirk ku wan xwe li axa û hebûna kurdan kirîya hêz, dema ku kurd bixwe dibîna hêzek bi pêşketina statûya wan re, êdî bi teybetî bo ku wê rewşa xwe biparêzên bidest hêrîşan dikirin. Em di vê demê de, bi teybetî ji demên destpêka şoreşa rojava û pê ve, hêrîşên vê zihniyetê dijîn.

Şoreşa rojava, teybetmendiyeka wê jî ew a ku şoreşa xalkên herêmê ên weke gelê kurd û Sûryanî û hwd, ku bi dîroka xwe re xalkên herêmê ên herî kevn in a. Yanî, li vir, şoreşa domandina vê dîrokê ya. Dema ku em van aliyan nebînin, emê rastîyê biawayekî baş fahm nekin. Çendî ku mirov rastîya van xalkên herêmê ên kevn, bi dîrok, çand, rengê bawerîyê û felsefeya wan ya civatî re di hilde li dest û fahm dike, mirov di têgihştin û felsefeya vê şoreşê de jî kûr û dûr diçêt.

Dîrok, divê temenê de ji nû ve li rojava tê nivîsandin. Lê di aslê xwe de bi rojava re dîroka herêmê ji nû ve li ser temen û rastîyên wê ên dîrokî, civatî û felefekî ji nû ve tê nivîsandin. Şoreşa rojava, li herêmê bi wate xwe re di vê rengê de bi wate dibêt. Î ro, hemû hêrîşên ku li wê dihên kirin, hêrîşên ku vê aliyê wê na. Dîroka ku li ser farazîya netewîtîyna´ hatî nivîsandin, dihê xûrîxandin. Li şûna wê, li gorî rastîya herêmê dîrok dihê nivîsandin. Di nivîsandina dîrokê de vê carê jî rastîyên dîrokî, civatî bi dîroka wan re û felsefeyîkî û hwd dihên esas girtin. Ev, weke ji nû ve bi rêxistinkirina rewşa rojhilat giştî ya. Di serî de divê ku mirov fahm bike, dîrok ji nû ve tê nivîsandin. Ji van aliyan(alyên dîrokî, civatî û felsefîkî) ve, em dikarin bahse jinûvebûnekê û ankû bi gotinaka din ”ronasanê” bike. Pêvajoya Sûmerîyan a duyemin ku weke ´serdemeka jinûvebûnê a li herêmê´ jî dihê bi navkirin û ankû pêvajoya bi navê ´ronasansê´ a piştî zayîna Îsa a ku ji sadsale 15´min û pê de ku destpêkir, em î ro li rojava bi vê pêşketina li rojava û bigiştî li kurdistanê dibînin. Şoreşa rojava, hinekî jî destpêkeka bi vî rengî jî ya. Ji salên 2010´an û pê de, gotina ”bihare arab” hat avêtin li holê û li ser wê gelek xwepêşandin û guharîna rêveberîyên herêmê û hwd jî bû. Ev pêvajo, çend ku piştre bû weke pêvajoyeka ku gelek hêzên herêmî û ne herêmî di nava wê de cih girtin û bi wê re xwestin ku li gorî politikayên xwe yên stretejikî bi rêxistin bikin jî, di aslê xwe de ev pêvajo ancama şîyarbûnaka xweza a bi tekoşîna azadîya kurdistanê û hin tekoşînên din ên li herêmê ku di vê rengê pêşketibûn bûn, bû. Lê ev pêvajo, di roja me de, gav bi gav pêşve diçêt. Wê ancamên wê ên dîrokî bibin. Rejimên herêmê ên weke rejima tirk, weke ku î ro hewl didin bi Destê DAÎŞ´ê û hwd, dibêt ku komkujiyên mazin ên dîrokî ku di asta jenosîdê de jî bênina serê gel û xalkan. Lê ev jî, wê êdî nebê temenê ku dîrok êdî weke xwe bidomêne. Wê dîrok, êdî ji vê demê û pê de, pirr-cuda xwe bide domandin. **Şoreşa rojava, di aslê xwe de rûyê rast ê gotina ”bihara arab” jî ya û rûyê rast yê gotina ”bihara kurd” jî ya**. Divê ku mirov vê rastîyê di serî de werêne ser ziman. Di vê temenê de divê ku mirov dîroka herêmê ji nû ve werêne ser ziman. Dîroka xalkên herêmê, divê ku mirov weke temen esas bigrê û vê dîrokê binivîsêne û werêne ser ziman. Bo vê yekê, divê ku mirov li vir bi gotinekê jî bê, bibêje ku pêwîstî bi rewşenbîrên xort û rast di vê demê de heya. Her rewşenbîr, biqasî ku karibê ku civate xwe ya ku dibêje ez rewşenbîrê wê me´, bi zimanê wê xwe bêne ser ziman, wê beş beşek ji vê jinûvebûn û ankû ronasanse demê. Ronasans, fahmkirina civaknasîya wê civatê bi dîrok û felsefe wê re dikarê were jîyîn. Civaknasîya civatî ya civate kurd, ku xwediyê dîrokeka ku heta serdema neolîtîkê û hwd jî diçêt, lê hê jî di mejiyên rewşenbîrên wê civatê bixwe de jî ne hatîya kifşkirin. Li vir, divê ku mirov vê jî binxat

bike ku şoreşa rojava bi serê xwe şoreşek zihniyet û têgihiştinê ya. Heta vê kêlîke me jî, heta ku rewşenbîrên civate kurd bixwe jî, dema ku wê dihênina ser ziman, di çerçoveya hin hêrîşên ku li rojava dibin û hwd de wê dihênin ser ziman. Yanî, ew hêrîş, rengê hanîna wan jî dihêne ser ziman. Derneketina dervî sînorê hizirkirinê ê vê.

Herêmên rojavayê kurdistanê, herêmna giring ên dîrokî na. Dîroka li vê herêmê ya şariştanîyê, pirr kevn a. Î ro, tenê li herêmên weke ”xirabreşkê” û hwd, kolanên erkolojîkî ku dihên kirin, di wan kolanan de bineterên nivîskî û cihên bergkirinê ên ku hatina dîtin, didina nîşandin ku tenê dîroka şariştanîyê, diçêt ser 12 hezar salan re. Ev dîrok, hê ji nû ve dihê dîtin û kifşkirin. Em dema ku gotinên weke ´**hûrî**´ û ankû ´**mîtannî**´ bikardihênin, em bahse serdemna bi hezaran salan dikin. Lê em î ro vê jî dizanin ku ev serdem û şariştanîyên demên hûrî û mîtannîyan, di astaka hemdem û nûjen bi xwe re dihênin ser ziman. Ev jî, dide nîşandin ku tenê ku em li demên berî demêm hûrî û mîtannîyan jî bihizirin, emê rastî serdemna dîrokî ên bi hezaran salan ku em di berdewama wê pêşketina wan re werênina ser ziman, emê rastî wê werin. Ev dîrok û serdemên ku em kifş bikin, serdemên hûrî û mîtannîyan, serdem û demna piştî wan ên pêşketî na. Her wusa, demên şariştanîyê ên hûrî û mîtannîyan bixwe jî, xwedîyê şûnpêyeke dîrokî ya pirr kevn in. Em dema ku vê rastîyê kifş dikin, bi wê re em dîrokê jî bi wê re kevntir dibin. Ev jî, êdî ew hizrên ”akadamîkî” ku heta roja me hatina kifşkiirn, bi xwe re di wan re guharînê jî dihêne. Dîroka herêmê, bêgûman dema ku kifşkiirna wê bi rastî werê kirin, wê gelek guharînan di hemû hizrên akadamîkî ên di derbarê herêmê bixwe de jî bi xwe re bêne.

**.. Herêmên rojavayê kurdistanê, herêmên navend in ji dem û pêşketina Hûrî û Mîtannîyan a hemdem re.** Rojavayê kurdistanê, ku em li kîjan dema wê binerin, emê bibînin û kifş bikin weyneka dîrokî leyîstiya. Hertimî, ew herêm bûya weke ´girêka gordion´ê. Kîjan, hêz derketîya û xwestîya ku li herêmê xwe serdest bike, kirîya ku pêşî xwe bigihêne wir. Ku li wir, xwe dikira serdest, êdî li herêmê bigştî dikir ku xwe bike serdest. Di vê temenê de, ku em bi teybetî, em ku weke demên hemdem ên herêmê jî em bênina ser ziman ji demên hûrî mîtannîyan û hwd ve ku em dinerin, em wê yekê dibînin. Piştî sadsale 7´min(berî zayînê) û pêde, ku êdî hin bi hin hêza hûrî û mîtannîyan weke ku hinekî kêm dibe û hêzên nû li herêmêê derdikevin, hêzên ku derdikevin em dibînin ku berê xwe rastrast didina li wir.

Ev herêm, ji aliyê çandî, têgihiştinî û hizrî, û olî û bawerî û hwd giringîya wê mazin hebû. Lê wekî din ji aliyê serdestî ve jî, ev herêm bûna xwediyê giringiyeka dîrokî. Ev herêm, bûya weke weke kemberekê li herêmê ku kê li wê kemberê serdest bûba, wê êdî li herêmê bigiştî bûba serdest. Di vê temenê de, çûyina li wê herêmê hebû. Bo vê yekê, çend ku ev herêm, di pirtûkên pîroz û hwd de, weke "bihûşta li ser rûyê ardê" jî, dîsa ji aliyekî din ve bi rastî seferan hatina wê re şer ji wê kêm nebûya. Li herêmê, ev herêm di vê temenê de giringiya wê hebûya.

Ji wan demên berê ên ên dema hûrî û mîtannîyan û heta ku digihijê dema me, em dibînin ku ev herêm hertimî di vê temenê de rastî hêrîşan hatîya. Piştî ku Îslemiyat hat, wê jî, cihê ku pêşî berê xwe dayê de ev der bûya. Di ola cihûtîyê de jî, ola filehiyê de jî û li di ola îslemê de de jî, hizrên wan ên bingihîn ku hatina afirandin, ev nirxên van herêman hatina esas girtin. Berî van hersê olan ku bi hezaran salan jîya ya û serdest maya ola êzdatiyê bûya**.** Olên din ên ku hatina û pêşketina, ji ancamên pêşketî ên vê ola êzdatîyê sûdgirtîyan û xwe û têgihiştina xwe afirandina. Piştre di hersê olên weke cihûtî,

filehî û mmisilmantiyê de jî, derketina dervî pergale olî ya ku êzdatîyê afirandîya nebûya. Hemûyan jî, pergale êzdatiyê bi şîroveyên cûda ji xwe re kirina temen û li ser wê re pêşketina xwe dane jîn kirin.

Olda êzîdîtîyê, ji herêma Reheya û heta ku herêmên din ên rojavayê kurdistanê, ji dema hûrî û mîtannîyan û hwd ve, serdestîya wan ya pirr xort hebûya. Ji ber ´çîyayê kurda( jê re ´çîyayê kurmanc´ jî tê gotin)´ û heta li şengalê û çîyayê şengalê û hwd, weke herêmên navend ên ji vê bawerîyê re na. Ji ber çîyayê kurda û heta çîyayê şengalê û ji wir jî heta zagrosan, di xatekê de pêşketina vê bawerîyê bûya. Berî hûrî û mîtannîyan jî, ew pêşketina wê hebûya. Bi teybetî,, divê ku ez bibêjim nirxên têgihiştin û hwd, ku bi têgihiştina "şahmaran" û hwd re dihê li holê, ji herêma Nisêbînê û heta digihijê herêmên qamişlo, koban, afrîn û hwd, li wê qadê herî zêde lê serdest bûya. Bo vê yekê, bandûra wê çand û têgihiştina ku di temenê bawerîyekê de jî dihat ser ziman, wê ji ber çîyayê cûdî heta ku gihişt ber çîyayê kurda(çîyayê kurda´,weke "çîyayê kurmanca" jî dihê binavkirin) ku li dora afirîn û kobanê û hwd a, wê hebe.

Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku Herêma Nisêbînê, weke herêmeka pirr giring a ku di roja me de jî, hê ew giringiya wê bi başî ne hatiya fahm kirin. Bajarê kurdan ê Nisêbînê, di dema sûmerîya de jî bi navê "**nirbo**" bû. Piştre, ji dema sûmerîyan, heta ku dem tê dema Gûtîyan û hwd, wê navê Nisêbînê weke "**nîsîbîs**"´ê were ser ziman. Navê ´Nîsîbîs´ wê di dema hûrî û mîtannîyan û hwd de jî, wê were bikarhanîn. Ev herêm, di wê demê de bi çem û herêmên wê ên avî û dewlemend re, wê hertimî weke "navendekê" were ditin. Di nava xalkê de, gelek gotin û vegotin û çîrok jî li ser Nisêbînê hatina vegotin. Di gelek çîrokên kurdan ên ku li dora Nisêbînê û Cizîra botanê de ku dihên gotin de nisêbîn, weke "bajarê dilan" dihê ser ziman. Di gelek çîrokan de weke "bajarekî ku biafsûn" hatîya ser ziman. Heta ku dihat gotin ku "çin jî, li nisêbînê dijîn." Ji wê ya ku ji kurdan re hatîya gotin ku "kurd, cin in." Piştre, ku ji van çîrokan hatibê derhanîn, hatibû gotin ku "bajarê cinan" jî. Şahmaran jî, dema ku vegotina wê dihat vegotin, hinekî bi afsûnî dihê ser ziman. Ji ber vê yekê, navê wê di gelek çîrokên din de jî bi nisêbînê re hatîya ser ziman. Di wan vegotinan de nisêbîn, weke "welatê şahmaran" jî hatîya ser ziman.

Ev rengên gotin û vegotin û çîrokan hwd, li herêmê heta roja me jî dihên vegotin. Lê li vir, divê ku mirov bibêje ku hemû vegotin, çîrok û hwd ku li dora Nisêbînê dihên vegotin, em bi hinek rengên din ên vegotinan û hwd bê, em li bajar û herêmên din ên rojavayê kurdistanê dibînin. Ji xwe, ev herêmên rojavayê kurdistanê û herêmên botanê ên bakûrê kurdistanê, ti carî jev ne dihatina veqatandin. Ev herêm, di her demê û dîrokê de jî bi hev ve girêdayî bahse wan hatîya kirin û dihat kirin. Jîyane li van herêman jî, bi civaknasîyaka xort hebû. Her wusa, bi hev ve bû. Yekqat bû. Di demna berê de jî, dema ku dihat gotin "herêma botanê", rojavayê kurdistanê jî bigiştî di nav de dihat ser ziman. Gotina ´botan´ê bixwe jî, bi rengê "buhtan" û hwd, ji dema gûtî, hûrî û mîtannîyan a. Bi teybetî, di dema gûtîyan de, mirov dikarê bêje ku dihê bikarhanîn bo vê herêmê bigiştî.

Herêmên weke herêma ´serêkahniyê´ hwd, ku di dema mîtannîyan de navê wê "waşûkan" û hwd bû, ev herêm weke herêmeka avî û pêşketî û şîn bû. Jîyane li lê jî, bi wê xaml û xweşîkatîya xwe bale herkesekî kişandiya li ser xwe. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku jîyane li vê herêma li ber ava-firatê, divê ku mirov bibêje ku jîyane pirr kevn a. Li herêma rehayê, herêmên weke gundê ´xirabreşkê´ hwd, ku dihê kifşkirin ku jîyan li wan berî zayînê bi 12 hezar salan jî hebûya, hinekî jî kevnerîya jîyane li vê

herêmê jî bi xwe re bi nîşanak dikin. Bêgûman, divê ku mirov bibêje ku jîyane li van herêmên li ber ava-firatê û heta ku digihijê berdiclê û heta ku digihijê herêmên rojhilatê kurdistanê ên weke Ûrmiyê, kirmaşanê, aqbatanê û hwd, ji ya ku em dizanin kevntira. Ji xwe, bi kolanên ´arkologî´ û hwd re, ya ku hin bi hin derdikeve li holê ev a. Di derbarê şariştanên berî zayinê de, zanîn me kêm hena. Bi teybetî, ew demên ku weke "demên sûmerîyan" jî dihên bi navkirin jî, bi hezaran salan dihên ser ziman. Di hundurê wan hezar salan de çi pêşketinên şariştanî bûna û derketina li holê, em hê bi tememî di derbarê wan de ne xwedîîyê zanînê na. Lê dem bi dem, hin zanîn piçûk jî, derdikevina li holê, didina nîşandin ku em çendî di derbarê wan deman de bêzanebûn in.

Demên gûtî, hûrî û mîtannîyan, em divê ku weke demna hemdem ên piştî wan demên sûmerîyan û hwd bênina ser ziman.Dema Medîya û avesta û hwd, em divê ku weke pêvajoyên nû ên pêşketî ên van demên hemdem û pêşketî lê binerin û fahm bikin. Bi teybetî, di wan demên hemdem û ên pêşketî de ku em demên hûrî û mîtannîyan bi teybetî werênina ser ziman, emê li wir bibînin ku rojavayê kurdistanê weke naveneka pêşketî ya dîrokî heya. Pêşketinên dema hûrî û mîtannîyan, di roja me de, bo pêşketinên şariştanî li wan dihê nerîn. Hê jî, di temenê pêşketinên şariştanî û civakî, û olî û bawerî, têgihiştinî û hizrî û hwd de, ev demên hûrî û mîtannîyan kifşkarîya wan bi serdestî heya. Ji dema hûrî û mîtannîyan û heta ku digihijê dema Medîya û avesta û hwd, çend ku desthilatdarîyên van deman bi demê re ji holê rabûn jî, serdestîya pêşketinên wan ên hizrî, olî, civakî û hwd, bi mayîndayî man û xwe domandin. Ev rastî, heta roja me jî, bi heyînî xwe didina domandin. ..

Rojavayê kurdistanê, bi teybetî, herêmên wê bigiştî navend in ji pêşketina hûrî û mîtannîyan re. Serêkahniyê ku di wê demê de bi navê "waşûkan" bû, paytaxt bû ji Mîtannîyan re. Ev herêm, bi pêşketina xwe ya ku di wan deman re ku jîn kiriya, hê jî, bi tememî ne hatîya fahm kirin. Ya rastî, ew a ku ev herêm bi dîrok û demên wê ên buhurî re baş were fahm kirin, ew fahm kirinên ku bên bidest xistin, wê dîrokê ji gelek aliyan ve bi me ji nû ve bide nivîsandin. Dema Hûrî û mîtannîyan, ji aliyê çand, kevneşopî û têgihiştinên baweriyê ve jî kifşkar a. Di vêê temenê de divê ku mirov lê binerê. Mîtra, zanyar, filosof û bawermendekî dema Mîtannîyan a. Bandûra wî, pirr zêde li dema wî heya. Bi bandûra wî û hizrên wî, wê li dora gotina ”yazdan” û ”melekê tawis”, wê yekkirinek were çêkirin. Bi wê re jî, wê temenê pêşketinaka bi rengê ´yek-yazdanî bi olê re û her wusa di nava civatê de û her wusa bi desthilatdarîya mîtannîyan re jî wê temenekî li gorî wê yekkirinê pêşketinekê bide çêkirin. Rengê pêşketina vê demê, bi vî rengî wê bi çerçove û têgihiştin bibe.

Mîtra, bi hizrên xwe re wê sadsalên piştî wî re ku tên, wê wan jî bide kifşkirin. Têgihiştina yekyazdanî, bi wî re rûnîstîya. Her wusa kevneşopî û rengê jîyanê kifş a. Kevneşopîyên civatî ku hena, wî ji nû ve li ser wan re şîrove pêşxistîya. Her wusa, wî bi vî rengî têgihiştineka civatî jî bi xwe re hanîya ser ziman. Dema ku em van aliyên Mîtra û bi wî re ên dema Mîtannîyan fahm nekin, emê nikaribin wan û pêşketina wan ba fahm bikin. Î ro, ez bixwe, çend ku li dema Medya dinerim ku demên Mîtannîyan li berbîra min zindî dibin, bi heman rengî dema ku ez li serdema me ya roja me ku em di wê de dijîn ku ez lê dinerim dema Medîya bi rengê pêşketina xwe dihê berbîra min. Her wusa, teherek pêşketinê ku em li ser pêşketina civatî û kevneşopîyên wê re ku werênina ser zima heya.

- Di vê çerçoveyê de û bi vê zanînê, dema ku ez li vê serdema me ya ku em di wê de dijîn ku ez lê dinerim, dema Medîya û pêşketina wê û awayê pêşketina wê têne berbîra min. Li vir, divê ku ez vê yekê jî bibêjim, bi pêşketina rojavayê kurdistanê re weke ku hûrî jî û mîtannî jî, bi nûjenîyeka vê demê ku ji nû ve bivejin dibê. Her wusa, di nava rengê pêşketina rojavayê kurdistanê a roja me de, divê ku mirov vê yekê jî bibînê û bixwêne. Dema Medîya, weke demeka hevgirtinî ku rengê demên hûrî û mîtannîyan jî di wê de dijî ya. Dema Medîya, weke demeka ku heta roja me jî, hê jî, bi teybetî bi awayekî pêşketina wê ji hemû aliyên wê ve ne hatîya fahm kirin. Ev dema Medîya ya ku ez bahsê dikim di sadsale 6´min a berî zayina Îsa de ya. Ava kirina wê, li gorî dîrokzanan di 612´an de dibê. Lê hin bi hin dokument, bineter û hwd ên di derbarê de ku derdikevina li holê, hin bi hin, wê bi dîrokkirinê dike ku bi me bide guharandin. Berî wê demê, di dema Nebî Musa ku tê gotin ku di wê dema ku ew ji Misra kevn ravîya de, hingî di ravê û tê ´welatê Medîya´. Di hinek bineterên ku di kolanên erkolojîkî de tên dîtin û tê gotin ku ji sedsala 13´min û ankû sedsale 14´min in ên berî zayîna Îsa, di wan de gotina «med» di buhurê.Li wir, bi salan dimêne û xwe perwerde dike û hizrên xwe yên olî diafirêne. Di wê demê de jî, pergale olî ya yek-xwûdayî ya êzdatiyê bi pêşketina xwe ya hemdemî ya dema xwe hebûya.

Medîya, em werina ser dema wê û pêşketina wê. Ku em hewl bidina wê dema dîrokê bênina ser ziman, gelek aliyên pêşketina wê hena ku divê ku em bênina ser ziman. Herkû, ku mirov li ser dihizirê û di hizirkirina xwe de kûr dibê, mirov aliyên wê demê û Medîya ên nûtir kifş dike. Medîya, di wê dema xwe de, xwediyê pêşketinaka ku di wê dema wê de jî li ser asta dema wê ya ku ew têde dijî re jî hebû. Medîya, bi têgihiştinî û felsefekî, astaka ku di demên piştre de wê were jîyin dijî. Di şîrovekirina li ser Medîya de, di dema ku em dinerin, em weke aliyekî mazin ê wê vê aliyê wê dibînin. Di wê demê de, Zanistên ku weke destpêka felsefê li rojava û ankû li ewropa tên hasibandin ên weke Thales bixwe jî, bi salan di dema xwe de li Medîya maya û ji wê matamatik, gaomatrî û felsefe hildaye. Bi wê hildane xwe re vegerîya warê xwe û hizrên xwe li wir hanîna ser ziman. Li vir dema ku em vê dema wî fahm nekin, emê bi teybetî, pêşketina antikî ya li ber Bahra reş bixwe jî fahm nekin.

Medîya, di dema ku di xurihê jî, ne di ancama hêrîşekê de dijî. Di ancama xîyanate navxweyî de ku mirovên weke Harpaos ku li key Qiyakser û kûrê wî dikin de dibê. Di dema Qîyakser de jî, Harpagos bi dehsalan şêwirmendîtî û wezîrtiyê dike. Lê di dema ku di ancama xewnê de ku key Qiyakser dibîne û xewna xwe dide şîrovekirin bi rêmildarên medî û jê re tê gotin ku "wê ji keça te kurek bibe û ew wê dawiyê li desthilatdariya tûxmê de werêne", hingî Key jî, fermanê dide Harpagos ku wê zaroya wê ya ku bibe bibe û bikujê. Harpagos dibêje bila. Piştre ku zaro bû, ew zaroyê ji pîrka ku dayika zaroyê welidandîya wê zaroyê hildê û bibe çolê ku bikujê. Lê ew zaro nakujê û dide şivanekî. Şîvan jî, hingî zaroya wî ji jina wî çêbûya û miriya, ew jî, zaroya xwe ya mirî di veşêrên û wê zaroya ku harpagos dide wan, dikina dewsa zaroya xwe de û weke zaroya mazin dikin. Piştre ku zaro tê 12 û ankû 13 salîya xwe, hingî, ku zarok di nava xwe de bilistik dileyizin, ew zaro, xwe weke key dide nîşandin û li zaroyekî dixe. Piştre bavê zaroya ku lê hatixistin ji aliyê wî zarokê piçûk ve, êdî tê û gileh li cem key dike. Key herdû zaroyan têne ber xwe û jê dipirsê ku ka çima li zaro xistiya. Ew jî bersivê dide key Qiyakser ku "tu key yî, ku yek nûha li ber fermane rabê, ma tê jî weke key lê nexê?" Ev gotinaka ku weke pirsekê li key, pirr key û şêwirmendên li dora wê

acêmayî dihêle. Piştre, gotin pêre namêne ku bersivê bidiyê de. Hingî, di wê demê de ew zaroya ku key dabûbû Harpagos tê berbîra wî. Hingî key, di cih de Harpagos di hilde li berxwe û jê dipirsê ku ka ew zaro kuşt û ankû na. Wê caxê, key anîya xwe diqirmiçêne û dipirsê. Harpagos rastîyê dibêje û dibêje min ku "na keyê min, min zaro nekuşt û min da şîvanekî." Piştre key, di wê demê de piştî ku zaro ji ber wî dicin vê pirsînê dike. Li ser wê jî, piştre key zaroyan derdixe ku wî zaroyê bênina ber wî. Lê axir zaman, bavê kûr yê ku ew mazinkirî, agahiyê dihilde ku key leşker şandina ber kûrê wî, êdî ew jî kurê xwe ji wir dişêne devereka dûr li Anşanê û li wir zaro mazinatîya xwe didomêne. Ev zaro, kîrûs a û wê piştre li wir mazin bibe û wê bibe key û wê hemû welatê bike bin destê xwe de û wê heta ku hêza Lîdya bixwe jî bişikêne.

Key ji wê kirina Harpagos, pirr bi hêrs dibe û piştre dikê ku hayf(tola)a xwe dike ku hilde. Key jî, kurê Harpagos dihêne û serê wî dide jêkirin û laşê wî dike xwarin û didene ser sofrê têne û Harpagos ku harpagos wê bixwê. Harpagos, hingî bi key re rûniştîya û herdû bi hevdû re xwarinê dixwûn. Lê di wê de jî xwarina ku Harpagos dixwê ji ya key cûda, ji wê xwarina ji laşê kurî wî dide hanîn li ber wî. Piştî ku Xwarin xwarin, hingî, key ji harpagos dipirsê ku "ma te tê xwar?" Ew jî dibêje "herê keyê min." Piştre dibêjiyê de ku "te kurê xwe xwar" key fermanê dide ku ser û lingê kurê wî ku li şûn maya bênina ber wî. Hingî, ku Harpagos wê dibîne, weke ku avaka sar bi ser wî de tê rijandin lê tê. Hingî, berteka ku Harpagos, dide ew ku " dibêje ku "ferman ya te ya keyê min, .." û hwd. Piştre ku dem tê ve diçê û key dimirê û Astîyaq tê dewsa wî, Hingî, harpagos jî, wî zaroyî li Anşanê dike key û dike ku bike key li dewsa tûxmê Qiyakser. Êdî piştgirêyê dideyê de. Harpagos, hingî, di dema ku Artişa Kîrûs tê bi ser navane Medîya Aqbatanê de, hingî wê bike ku ji herêmên din li dijê wê ne sekin in û bi wê re bikevina levkirinê de. Bi wê re jî, hêza ku pêşî digihijê ber navendê û ankû qasrê Astîyag bi hêza xwe re dike ku wan pêşwazî bike. Lê ew hêza wî têre nakê. Piştre Astîyag li wir di cengê de tê kuştin. Di dema ku Astîyag tê kuştin ku di wê kêlîka ku wê bêhna xwe ya dawiyê bide, hingî, harpagos tê ber serê wî û li nava çavên wî dinerê. Hingî Astîyaq rastiyê fahm dike ku Harpagos ev tişt hemû dane kirin bo ku tola kurê xwe hilde. Lê Astîyaq, weke gotina xwe ya dawiyê, ji Harpagos dipirsê ku "ma ka, te çima ji yekî Medîyalî ne hanî ser serê medîyalîyan ku wan birê ve dibe. Çima tu yekî ku ne ji wan têne ser serê wan. Ne ez dizanim ku te bi vê xwest ku tola kurê xwe hilde. Lê ji bîr neke ku wê Medî ti carî vê ji bîr nekin. Wê kurd, vê ti carî ji bîr nekin. ... Ne ti dizanê ku ev xalk, çendî xorta bi xêva xwe re ku dikarê di hiş de bihêle û jiber bike." Ev gotina dawiyê ya Astîyaq bû. Ev gotinên dawiyê ên keyê dawiyê ên medîya bûn. ..

Piştre jî, yekî ku ne ji Medîyalîyan tê ser serê wan. Êdî wan dike bin desthilatdarîya xwe de. Medîya, di wê demê dedi ancama vê rewşê de destpêka dawîya wê destpê dike. Lê destpêka dawîya kurdan dest pê nakê. Kurd, piştre jî dijîn. Wê, hebûna xwe bidina domandin. Di wê demê de jî, Medî, pêşketinaka wan ya ku wê piştre, bibe temenê hemû pêşveçûnên têgihiştin û felsefekî û hwd jî. Medîya, bi gotinakê em dikarin wê asta wê salix bikin û bênina ser ziman. Ew jî, ew a ku Medîya, astaka li ser asta ya dema xwe re dijî. Bi wê astê, serdestîya xwe jî li demê dike. Medîya, bandûr li anatolîya jî dibê. Şerê ku di nava Medîya û Lîdya de dibê li ber Rûbara Sor û ankû li ber ´çemê heyls´ û hwd, wê bandûra wê zêdetir bike. Lîdya, hingî serdestîya Medîya herê dike. Lê aşîtîyekê di nava hevdû de dikin. Keyê wê demê ê Lîdya Alîyêt wê keça xwe Aryanîs jî bide kurê keyê med Astîyag di wê demê de.

Medîya asta wê, bi dema wê re, ku mirov bêne ser ziman, divê ku mirov weke astaka bilind bêne ser ziman. Ew ast, wê bandûra wê, pirr mazin li pêşketina Athenê jî bibe. Têkiliya di nava Medîya û wê herêmê de, bi felsefekî, rêveberî jî hebû. Hingî, Medîya û Lîdya sînorê hevdû bûn. Ew bûna sînorê hevdû, wê bike ku bandûra medîya hizrî jî li wê herêmê bibe. Piştî ku Medîya serdestî û desthilatdarîya wê dixurihê, êdî wê ew herêm karibê xwe biparêzê. Çend ku piştî ku Kîrûs, hat ser taxt û seferna mazin li wan herêman dike û gelek xûrûxandinan li wan herêman dide kiirin jî. Hinekî jî, wê piştre jî, ku dem tê serdema navîn, wê êdî li ser bineterên wê dema antik wê perwerdebûn bibe. Ev jî, wê temenê pêşketina wê dema ku heta roja me jî jî wê bide afirandin. Medîya, di her demê de bandûra wê li vê pêşketina heya. Di dema medîya de, bi bineterên weke avesta û hwd re ya ev bandûr. Di demên piştî zayinê de, wê nivîsarên Manî û ên piştî wî re ên weke Mazdek û hwd wê bandûra wan li wê xatê hebê. Di dema Ronasanê bixwe de jî, wê mirovên weke Îbnî rûşd kji herêmê na, wê li ser ronasansê wê pirr zêde bibe. Ibnî Rûşd, wê hizrên dema antik, şîrove bike û bi mirovên rojavayî jî bide fahmkirin. Ji nû ve şîrovekirina hizrên Platon Aristo û hwd, wê **Îbnî Rûşd** bike. ´**Averroes**" tê nasîn û binavkirin.

Ku em di çerçova perspektifa Medîya de li pêşketina kurdan û tekoşîna wan ya ku î ro bo azadîya xwe didin û li wê asta wê ya têgihiştinê dinerim, ew dema dema Medîya tê berçavên min. Ev dem jî, hin teybetmendiyên wê ên hizrî û têgihiştin û hwd, ku mirov bi felsefeyê re bêne ser ziman, ên ku di tijbihina ên wê demê hena. Di vê demê de jî, ew asta li ser astê re heya. Bi vê rengê, di dema ku ez li vê dinerim, ev yek bi awayekî vekirî dihê li berçavên min.

Medîya, Ew ast û awayê wê yê pêşketinî ku î ro jî bi tememî hê baş ne hatîya fahm kirin, ku mirov lê dihizirê, mirov kifş dike ku Medîya, ew asta wê pirr mazin heya û ser dest a. Lê Medîya, piştî ku Xûrûxîya, êdî piştre, ew pêşketina wê xatê, ne bi navê mirovên kurd, herwusa, demekê bi navê Axamanîş, demekê bi navê Sasanî, Piştre jî, di sadsale 2´yan de, Manî, weke ku serdestîya wê xatê bi pêşketina bi xwe re hinekî kir li dest. Lê ew jî, zêde nebû. Piştre, Ku îslemiyet li herêmê pêşket, wê bi tememî, ew serdestîya wê kir destê xwe de. Êzdatî ku di wê xatê de pêşketibû, hat qadaxa kirin. Lê çendî ku qadaxakirin û hwd li ser wê xatê bûn jî, hertimî weke gîyan û xîyeleteka serdest ku hertimî li ser mirov difirîya, wê asta wê xwe li herêmê di nava kurdan de da hîs kirin. Î ro jî, di dema ku ez van rêzan dinivîsênin, ew wê gîyan û xîyaleta wê hîs dikim û dibînim. Ya ku î ro, ku ez bi heman rengî li ser vê serdema kurdan re ku ez dibînim ev a. ..

Kurd, di vê demê de jî, xwediyê pêşketinaka ku di nava xwe de bi cewherê xwe yê têgihiştinî ku pirr pêşketîya weke ya wê demê. Lê li gorî wê, ti sazîyên pêşketinê ku proja û afirandina civatî ên şariştanî ên ku hemdemîya wê astê radixina li berçav hê ne hatina afirandin. Aliyê ku em dikarin weke aliyekê dikarê wê pêşketinê bêî ku bike kirinê û jîyanê de û ku pêşîya wê astang a ev a. Li vir, berî hertiştî, divê ku mirov vê yekê bi teybetî bi pêşketina kurdan re bênina ser ziman.

Li kurdistanê, asta ku em bahse wê dikin, di temenê wê de dîrokeka bi hezar salan ku bi pêşketinên wê ên hizrî re ku heya mirov dikarê bahse wê bike. Di dema Medîya de, ew asta wê pirr pêşketî bû. berî Medîya, jî di dema Hûrîyan de di dema Mîtannîyan de wê astê xwe zêde mazin da li berçav. Piştre, ku weke Zerdeştê, wê demê Mîtra derket û pêşketina wê demê kir. Mîtra. wate wî, ya sereka bi aqilê felsefê û bi mantiqbûnîya wê

re heya. Minaq, Mîtra, weke ku çawa ku î ro jî di çand û kevneşopîya êzdatiyê de tê dîtin û ser ziman, di dema wî de, Mîtra hêvî ji ga´yê xwe kirîya. Lê Mîtra piştre di dema ku dîtîya ku ga´yê wî nabê bersiv ji hêvîyên wî re û ji malê ravîya dervê, êdî Mîtra wî ga´yê xwe cardin digirê û zant dike û piştre serê wî zêde dike. Ga, weke ku tê zanîn, di çanda li berdiclê de pirr prîozîya wê heya. Gelek çîrokên ku em nûha dizanin ku bi ga re dihên ser ziman hena. Mîtra bi mantiqê xwe wê hasibandinê dike ku bi rê ve dibe. Piştre, bi mantiqî kifş dike ku yazdanekî ku ga jî çêkiriya heya. Ew di ancama wê kifşkirina xwe de, ga´yê xwe serjê dike. Ew jî, di ancama vac û ankû mantiq meşandina wî de tê û dibêt. ..

Piştre di dema Medîya de, wê Zerdeşt, wê kevneşopîya Mîtra bi aqilmendî û vacîtîya wê re bide meşandin. Piştî Zerdeşt re, wê Manî heman kevneşopîyê li gorî demê şîrove bike, bêne ser ziman û bide domandin. Di vê temenê de, wayeka wan ya li dûvhevdû a pirr giring heya ku divê ku mirov wê li vir bi awayekî pirr rast kifş bike.

Di dema Medîya de, ku mirovna pirr kal û pirr zane ´rêmildar´ hena. Rêmildar, ji mirovên kal û ku bi wê kalbûna xwe re bizane bûya, ji wan pêktê. Heta roja me jî, di wê kevneşopîyê de, di nava kurdan de, mirovên kal bi kevneşopî hena û bi kevnaşopîya wan re, ew weke serokna xweza ên birêvebirina civatê bixwe jî na. Di vê temenê de, di dema ku em li ser têgihiştina Medîya a dema wê dihizir in, em dibînin ku bi têgihiştina felsefe, matematîk û gaomatrî, çand û hûner û hwd, pirr pêşketîya. Ji têgihiştina avesta bixwe jî, weke ku çawa ku ew li ser Ahûra Mazda û hwd re dihê ne ser ziman, di têgihiştina felsefekî ê di derbarê gotina dîrokê de ku di temenê bi hev ve girêdayî û di berdewama hevdû de ku dihêne ser ziman, bi wan re afirîya û heya. Her wusa, di derbarê civaknasiyê de jî pêşketîna. Heredot bixwe jî, di pirtûka xwe ya "dîrokê" de dihêne ser ziman û di derbarê keyê Medî Dîyaqos de dibêje ku wî got ku ”ezê xwe bidima pêşxistina civaknasiyê." Ev gotin, di aslê xwe de, gotinaka ku pirr giring a ku bi xwe re asta têgihiştina dema medîya û a di serî de didêne li berçav. Medîya, ast û pêşketina wê, weke berhemeka giring ya dîrokî û pêşketî ku em divê ku li gorî rastiya wê bixwênin û bi wê re pêşketina dema xwe damazrênin û bigihêjina damazrandinê. ..

Medîya, dîroka wê ya dema wê, bi teybetî biasta wê re dihê li berçavê me. Em divê ku wê dema wê bi başî bixwênin. Ev dem, pêşketinên wê weke felsefe, astronomî, matamatik û gaomatrî û hwd wê bina temenê pêşketinên piştre jî. Thales bixwe jî, ji wan fêrî matamatik û gaomatriyê dibê. Di dema ku şerê di nava medîya û Lîdiya ku li ber rûbara Sor dibê de, li cem medîya û zanistên wan sekinî ya. Hizrên wan dibîne. Di wê demê de di 25´ê gulane 585´an de ku rojgirtin dibê, ku roj, heyv û hwd tên dahma hevdû û dunya dikevê reşîyê de, hingî ew reşbûna bi girtinarojê re, Medî jî û Lîdîyalî jî, weke hêrsbûna xwediyê wan li wan ku ew wî şerî didomênin şîrove dikin û piştre aşîtîyê di nava xwe de çêdikin û mohr dikin.

Felsefeya aqil, a wê demê pirr pêşketî heya. BI teybetî di asta gaomatriyê de mirov wê dibîne. Medî, ku weke hizreka berî wan di dema Gûtî, hûrî mîtannîyan de hebûya, û ku di dema sûmerîyan de hebûya, dihat bawer kirin ku "dunya raste wele tepsîyekê". Ji ber vê yekê, piştre jî dihat bawer kirin ku "dunya gilover ba, mirov wê ji ser bişamitîya û biketa." Ev hizrên gaomatrikî, wê di dema Medîya de, pirr pêşketî bi hebûna xwe re û bitêgihiştin û felsefeyeka mazin wê hebin. Rêmildarên medî, wê filosoftîya wê bikin.

Î ro, di dema ku em li wê xate diner in, divê divê ku bibêjin ku pêşketinaka ku ji pêşketina dema xwe û demên piştre re ku bûya pêşeng di vê xatê de bûya. Î ro jî, bi heman rengî ev ast û pêşketin heya. Li vir, divê ku em bo roja me jî, vê jî bibêjin ku bo ku ew ast baş were dîtin û bikarhanîn bo pêşketina civatî ya roja me, divê ku saziyên wê rewşnbîrî ên civatî û hwd werina avakirin. Bi wê re, pirtûkên perwerde û hwd werina nivîsandin. Dîrok, di serî de bi gîyane wê ya ku zîndîya divê ku mirov li berçav bigirê û bi wê re werêne ser ziman.

Medîya, weke ku me li jor hanî ser ziman jî, çend ku piştre xûrîya jî ew asta wê ya têgihiştinî bi gîyanî heyîna xwe domand bi serdestî. Bi wê re jî, heta ku dem tê dema me, em wê gîyanê bi gelek awayên wê kifş dikin. Ew gîyan, di vê serdema kurdan û pêşketina wê de xwe bi awayekî vekirî dide li berçav. Di serî de, di vê temenê vê gîyanê de di dema ku em dihizir in,, em jî di xateka bi pergalî de, em serdestîya têgihiştinî û gîyanî ya wê dibînin. Î ro jî, ew serdestbûna têgihiştinî bi gîyanîya wê re serdest a. Lê ew serdestbûn û gîyanîya wê, çendî ku mirov li gorî wê sazûmanî ava kir û biharhanî do nava civatê de, mirov wê karibê jê sûd **wergirê**. ..

**-Rojavayê** kurdistanê, dîroka wê ya pirr kevn heya. Bi teybetî ji dema Mîtanî Hûrîyan ve, dîrokaka bênavber ya şariştanîyê li ser wê axê domîya ya û hatîya ta roja me. Giringîya rojavayê kurdistanê, bi teybetî, pirr mazin divê ku mirov aê fahm bike. Rojavayê kurdistanê, di cih û navendaka wilo de disekinê, ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Di dîroka wê de, bi teybetî, cihê pêşketina olên yek-xwûdayî pirr mazin a. Reha ku î ro di nava sînorê bakûrê kurdistanê de maya, berê di wan demên berê yên kevn ên mîtanî û hûrîyan re jê re "kalden-Ur" dihate gotin. Piştre jî, Reha jî hatîya gotin. Reha piştî ku demên Mîtanî û Hûrîyan re, li herêmê dikeve bin serdestî û desthilatdarîya hêzên din ên li herêmê. Asûrî jî li herêmê mana. Bi teybetî, ku mirov ji demên berî zayînê ku zêde bi wir de neçê ku mirov tenê li wê dema Mediya bi nerê, di wê demê çend ku dikeve bin destê Medîyalîyan de jî, bandûra Asûrîyan lê heya. Asûrî, piştî serdestîya Mediyan li herêmê pêşdikeve, êdî wê herê dikin. Peymana aramîyê di nava wan û desthilatdarîya Medîya tê mohrkirin. Piştî wê re ku weke kurê keyê Asûrî sanherîb Esarhadon, weke bavê xwe pirr seferan dike. Lê piştî ku Medîya serdestiya li herêmê dibe, êdî ew jî nikarin wê seferê bike. Êdî li gorî wê peymana aramîyê ya di nava wan de bi aramî dijîn. Kurê Esarhadon Asûrbanîpal, di wê çerçovê de ji wê aramîyê sûd digirê û tê û dema xwe ya di parastgehê de li Rehayê jî di buhurê.

Lê divê ku ez bibêjim ku hingî, weke roja me sînor di nava herêmekê ne hatibû xîzkirin. Hingî, rojavayê kurdistanê ku û ev herêm yekbû. Bi wê yekê re, weke dewleteka bi serê xwe dijî. bandûra Kurdên Gûtî di wê demê de jî lê zêdedir bû. Piştî Mîtanî û Hûrîyan Gûtîyan ew herêm bi yek destî wilo bi rê ve biribû. Gûtîyan, rêveberîya wan ku ber diclê û çiyayê Cûdî dest pê dike û li dora xwe belav dibe. Piştre heta ku digihijê ber Zagrosan jî dibina xwediyê bandûr û serdestîyê. Herême Reha, hingî û piştre jî, yek herêm bû. Piştre weke ku mîrê botan, jê re gotina "herême botanê". Ew herêmê botanê ku wan bi vî rengî bi nav dikir û jê re digot herême botanê, yek herêm bû. Ew herême botanê ku wan jê re digot herême botanê, bi teybetî başûrrojavayê kurdistanê dikir nava xwe de û bi wê re jî herêmê botanê ya rojava me jî ku di nav de, weke herêmeke mazin ya yek qat bû. Bi vê rengê, wê di dema Medîya de jî bibe. Di dema welatê Merwanîyan de jî ev yek wusa bû. Di dema desthilatdarîya Salahadinê Eyûbî û xanadana Eyûbîyan de jî ev yek wusa bû.

Car bi car bahs tê kirin ku dema ku amê Saladinê Eyûbî Şerkoh ku diçê bi ser Libnanê de û wir dike bin siltantîya xwe de, hingî, ew dibîn û fahm dike ku hêze wî têrê nakê êdî ew di cih de agahiyê ji Salahadinê Eyûbî re dişêne û jê daxwez dike ku ew di cih de bi hêzekê werê bi wî ve. Salahadinê Eyûbî jî, hingî, êdî hêzekê tenê ji wê herême botanê ava dike û diçê bi amê xwe de. Salahdinê Eyûbî, di hundurê çend rojan de tenê ji wê herême botanê ku rojavayê kurdistanê û herême botanê ya î ro ku di nav sînorê bakûrê kurdistanê de ya, wêderê hêzeke wilo mazin ava dike û bi amê xwe ve diçê.

Ev herêmên kurdan, hingî yek dengî bûn. Ti qat bûn di nava wan de nebûn. Bi wî rengî, bi wê yekê êdî salahadin heta ku Şam jî di nav de, ew li herêmê hemûyî serdestîya xwe ava dike. Ku were pirsîn ku ma çîma tirba serokê kurd Salahadinê Eyûbî li Şamê ya, bersiva wê, hinekî bi wê mazinbûna wê herême kurdistanê û yekbûna wê ve girêdayî ya. Hinekî jî, ew tirba salahadin ya li Şamê, bersiveka bi vî rengî di temenê yekbûna kurdan jî di xwe de dihawêne.

Ew, hingî yekbû û welatê kurdan bû. Di dema osmanîyan de jî ew qatbûn ne hatîya kirin. Osmanîyan bi navê herême botanê û hikimete wê, ew herêm bi şancaq kirîya. Hingî jî yê ku li ser serê wî mîrê bota bûya. Ji xwe mîrê bota, li wê herêmê û kurdistanê, weke keyê kurdistanê yê herdemê jîya ya û weke dewlet maya. Ji ber vê yekê jî, çend ku dema ku em î ro dibêjin "herême botanê" ku çend herême di nava sînorê bakûrê kurdistanê de herêmê botanê tê fahm kirin jî, lê disa divê ku ez bibêjim ku mirov li dîrokê binerê, mirov wê fahm bike ku heta ku digihişt Kûbanê û Qamişlo û hwd, herêmeke mazin bû herême botanê. Bi destketina rojavayê kurdistanê ya li destê kurdan, êdî divê ku mirov van dîrokan jî hilde li rojava û bêne ser ziman. Ya rastî ku ez weke yekî ji wê herêmê, ku heta roja me jî, bahse wî sînorê di nava wê herêmê botanê de ku di ber Nisêbinê de hatîya kişandin ku bahse wê tê kirin, weke ku bahse wî hêtê berlinê ê ku di nava almaya rojava û rojhilat de hatîya kişandin tê kirin. Bi heman rengî bahs tê kirin. Ku bê bahskirin ku çîma gotina "serxat" û "binxat" afîya û ji kuderê afirîya, mirov wê hingî vê dîrokê wê qatbûnê bi lev bike. Di aslê xwe de ev gotinên ku hê jê bi awayekî pirr zêde di nava xalkê de tên ser ziman, bi wan re ew têgihiştina ku tê ser ziman û fahmkirin, ew a ku kurdistan hingî bûya duqat. Heta ku digihişt salên 1980 û hwd jî, kurdên ji bakûrê kurdistanê bêî ku rastî ti astengîyê werina û diçûna rojava û ku li wir xizmên xwe bibînin hebûn. Her wusa, ji herêmê Reha´yê jî buhurîn dibû. Lê ku piştî salên 1990 û hwd ku êdî sînor bi tememî ji aliyên dewleta tirk û ya sûrî ve hatina jidandin, êdî ew dîmenên ku em her salên di rojên cejnan de li ber telên sînor de li herême Rehayê dibînin êdî rastî wan hatin.

Li aliyekî çend mirov ji malbatekê û li aliyê din jî çend mirovên ji wê malbatê têna ber telên sînor û cejna hevdû pîroz dikin. Di dema ku em di zindanê de ku malbat dihatina zîyerete me, hingî ew dibû. Dema ku ez bixwe jî, nahaka lî wan dîmenên li ber telan li herdû aliyên sînoran ku dibînim, ew dîmenên di zindanê de ku me dijîn tên di demên hevdîtinan de berçavên min**.** Ew dîmen, weke dîmên sembolên metingerîya li ser kurdan in**.** Li kurdistanê, piştî ku tekoşîna azadîyê bi awayekî mazin dest bi tekoşînê kir, êdî sînor, dewletê jidandin. Bi teybetî, divê ku ez vê jî bibêjim. Berî nahaka ez li ser sekinî bûm. Lê jidandina sînoran û ne hiştina ji wan derbaskirin jî, di aslê xwe de di temenê biryaraka dewletê de pêk dihat. Minaq, ji salên 1937´an de ew paxta Sadabadê ku pêkhat, di wê de biryara sereke ew bû ku "sînor werina jidandin û newê hiştin ku derbasbûna kurdan li cem hevdû bibe." Bi gotinekê jî ez dixwezim bahsê bikim ku

komkujiya roboskî jî, hinekî jî ew hasabên astangkirina buhurîna ji sînoran têde heya. Bi vê yekê re û di vê çerçove wê komkujiyê de ez karim bibêjim ku gîyan û têgihiştina wê paxta Sadabadê jî ji hin aliyna ve di temenê wê komkujiya roboskî heya.

Bi vê yekê re di serî de divê ku ez bibêjim ku li kurdistanê, pêvajoya herî giring, ya di vê demê de ya avakirina desthilatdarîya rojavayê kurdistanê ya. Di serî de, divê ku ez dîrok werina zanîn û di wê çerçovê de ku êdî pêşî li wan komkujiyên ku ji bo ku têkiliya kurdan jev were birrîn ku li ser sînoran dibin were girtin. Kurd, di vê yekê de, ev firsandên dîrokî ên ku ketina destê wan de, divê ku wan pirr baş bi kar bênin. Divê ku di serî de, peymana ku di nava herdû rêveberîyên kurdan de were çêkirin û mohrkirin ew bê ku buhurîna ji sînoran meşrû bê. Bi wê yekê re, û peymanaka bivî rengî ku weke ku vê "peymane Hêwlêrê" ku di nava kurdan pêkhat, weke wê, divê ku êdî peyman were mohrkirin. Ew paymana bi vî rengî, serî de, wê bandûra wê li sînorê rojhilat û yê bakûrê kurdistanê bike. Bi wê rengê çûna kurdan ya cem hevdû û buhurina li cem hevdû ji sînoran, bi vî rengî wê çêkirin.

Bi vê yekê re, di serî de, divê ku ne tenê weke rêveberî û avakirina wê êdî kurd li rêveberîyên kurdistanê were nerîn. Bi vê yekê re, di serî de ew peymanên ku ew di nava hevdû çêkibikin, wê bandûra wan li beşên din ên kurdistanê jî bibe. Di serî de, wê kurdan nêzîktirî hevdû bike. Li kurdistanê, şikandina astangîya dewletên serdest ya li ser têkiliyên kurdan bi bandûr in, bi vî rengî wê pêk were.

Î ro, em di sadsale 21´ê de dijîn êdî sînorên ku bi telan di nava dewletan de werina xîzkirin tenî sînorna dîtbar in. Êdî zêde ti bandûra wan nîn a. Lê sînorê zimên, û ew herêmên ku ew ziman lê serdest a, êdî wê weke sînorê hemdem bê û wê bandûra wê hebe. Ku mirov hinekî jî di vir de bi gotinekê jî bahse wê qadaxaya li ser zimanê kurdî bahse wê bike, di vir de û bi vir ve girêdayî, mirov karê bahse wê bike. Ziman, di serî de, biqasî ku zanist jî dibêjin di sê bêşan mirov karê bahse wê bike. Beşa pêşî ew a ku sînorê cihane mirov a. beşa duyem ew a ku ziman hebûna mirov a. Di dema ku mirov dibêje ku hebûna mirov a ew jî ji du aliyan ve tê ser ziman, yek keseyetîya û ya din jî, weke ku zanist jî dibêjin ji aliyê genetikîe jî hinek aliyên wê yê pêşketînî hene ku divê ku mirov wan fahm bike. Beşa sêyemin jî ew a ku ziman, serdestîya wê, hinekî jî serdestîya civakê ya bi desthilatdarî û kevneşopî jî bi xwe re dide kifşkirin.

Li kurdistanê, zimanê kurdî, dîroka wê hê bi tememî ne hatîya kifşkirin. Bi teybetî, zimanê kurdî, bi qasî ku mirov fahm dike ji dîrokê çar û an jî pênc pêvajo û serdemên mazin ên girin buhurandina. Serdema zimanê kurdî, ya pêşî ji dema Sumerîyan("kengîr" ji wan re tê gotin) û heta ku tê û gihijê serdemên Hûrî û Mîtanîyan. Ev pêvajo jî bi teybetî rojavayê kurdistanê jî digirê nava xwe. Serdema duyem jî, ji dema qasît, Gûtî, lolo, hûrî û mîtannî û Medîya na. Lê dema Medîya serdeme wê bi teybetî jî mirov karê wê bêne ser ziman ta dema derketina desthilatdarîya Sasanîya li herêmê. Ji wê demê û pêde jî, ku ji dema şadadî û merwanîya ta dema me ya Kurdistanê jî, mirov karê weke demeka teybet bêne ser ziman. Rojavayê kurdistanê, di nava wan dem û serdeman de, di dem û serdemên demên pêş de cih digirê. Ji ber vê yekê, di serî de kurdîya wê herêmê jî ku mirov weke kurmancî û ya herême botanî binavke, kurdan li ser wê re bidest jînkirina pêvajoyên xwe yên civaktiyê kirina û jîyîna.

Rojavayê kurdistanê, di serî de divê ku ez bibêjim çanda wê hinekî jî teybetmendîyên wê sereke hene. Li wê herêmê yanî li wê xate ku weke xate berfiratê mirov karê binav bike, pêşketina wê ya ku jînbûya, dîroka hersê olên semewî ên yek-

xwûdayî jî daya kifşkirin. Birehim Xalîl Çanda wî li Reha´yê ya. Bi vê yekê re, ew herêm jî dikeve nava wê çandê de. Ew herêm dibêt ew herême ku ew çand û dîrok lê hatîya jîn kirin. Di dem û serdemên berî derketina misilmantiyê de, ew herêm, weke herêmeke teybet, bandûra wê li herdû olên din ên semewî ên weke cihûtiyê û xiristîyaniyê(di zaravayê kurdî kurmancî de jê re "fileh" tê gotin") li ser wan heya. Di pêşketina wan de bandûra wê heya. Piştî ku Misilmanti derket, hingî, misilmantiyê jî, ew çanda wê xate ber firatê ya li wê herêmê bi navê çanda Birehim xelîl tê ser ziman ji xwe re weke temen esas girt û li ser derket û pêşket. Ji ber vê yekê, di dema rêveberî û desthilatdarîya îslemiyetê de ku Şam jî ji xwe re kiribû navend, ji wê derê û herêmê jî sûd digirt. Bi vê yekê, divê ku ez bibêjim ku ev herêm bi vê yekê giring a. Ew bajarê ku î ro hê lê pirr pevçûn hene, Helep, ku di zimanên latinî de weke "aleppo" jî tê ser ziman, bandûra wê bi rojavayê kurdistanê re di *çanda mesîhiyê* de mazin a. Berî wê, di çanda cihûtiyê de jî.

Ev herêm, bi teybetî, ku rêveberî û desthilatdarîya kurdan lê ava bû, ku karibê vê dîrokê û demên wê yê berê fahm bike û di wê çerçovê de nêzîkatîyeka giring bide nîşandin, wê bike ku di hundurê demeka pirr kin de ku pirsgirêkên beêşn din ên kurdistanê ên bakûr û rojhilat bike rêya çareseriyê de. Ji xwe kurdên van herêman jî êdî wê dixwezin. Êdî wê pirsgirêkên li van beşan jî zêde newina dirêj kirin. Ji xwe êdî ew derfet jî bi desthilat kurd ya rojavayê kurdistanê re namêne. Ji ber vê yekê, divê ku em careka de balê bikişênina li ser ku wê di dema nivîsandina destûr û metnên bi vî rengî ên destûrî ku statûyê kifş dikin, wê hewl bê dayîn ku kurd bandûr û statûya wan kêm bibe. Ji ber vê yekê, di vê xalê de li ser sekinîn û ji naka bi bal tevgerîn û amedebûn, ji hertiştî ya giringtira.

Rojavayê kurdistanê, bi avabûna statû û rêveberîya wê re, wê ew wê xate sînor ya li ber Nisêbin û Rehayê re ku hatî kişandin û weke "hêtê berlinê" ê kurdan a jî, wê êdî wê bide şikandin. Bi vê yekê re, ew jî, di wê pêvajoya bicihkirina statûya kurdan ya di destûrê de, tirkî wê ji ber vê yekê pirr li ser bisekinê.

Rojavayê Kurdistanê, dîroka wê ya ji dema Hûrî û Mîtanîya ve ku heta ku tê dema Merwanîyan jî, dîroka civaktiya kurdan a. Bi teybetî, ew herê, weke herêmeke teybet ya stretejikî ku dewletên kurdan yên Hûrî û Mîtannî lê ava bûn û piştre jî ku dewleta kurd ya Merwenîya ava bû. Weke lûleya bêhnê ya. Bi vî rengî jî, giringîya wê heta roja me tê. Ji vê aliyê ve ku mirov lê binerî, mirov wê giringîya wê fahm bike. Ew rola wê ya ku ji serdema dewleta Merwanîyan re bûya lûlûya bêhnê û berî Merwanîya jî ku di pêşketina Hûrî û mîtanîyan de leyîstîya, wê î ro di serdema kurdistanê de jî bileyîze. Lê bi wê re jî, divê ku kurd jî xwediyê têgihiştin, zanîn û bîrewerîyeka mazin ya dîrokî bin bi xwe re di serê xwe de. Li ser wê bîrewerîyê re stretejîya xwe herêmê biafirênin. Di dema ku Medîyan de jî, heta ku Diyaqos, çend ku hêze Asûrîya şîkand jî heta ku bandûra xwe ji rojhilat ne hanî ser van herêmê din kurdistanê bahse desthilatdarîya ya mazin nekir. Di wê demê de jî ku bi xanadanî jî bin Hûrî û Mîtanî jî şûnpêyên wan dijîn. Wan jî, hingî ji wî re û ji mazinatîya wî re got herê û tevlî wî bûn. Bi vê yekê re divê ku em bibêjin ku ew herême rojavayê kurdistanê bi xate firatê û Rehayê re ji herêmê dibê herêmeke stretejîk jî. Tenê ku ji ber vê jî bê, wê bale îsraîl û rojava û welatên dîn ên cîran jî wê û ji wan li ser bê.

- **Rojavayê** kurdistanê, bi dîroka li ser axa xwe re xwediyê dîrokek pirr demdirêj û kevn a. Her wusa, ev herêm, weke herêmek teybet a dîroka cihanê a giştî ku di temenê

pêşketinên wê ên bi bawerî, civakî û hwd de jî ya. Dîroka hemdemîya herêmê, bi hûrî û mîtannîyan re dest pê dike. Her wusa, nivîsandin û afirandina têgihiştinê bi awayekî felsefekî jî di vê demê de destpê dike. Bi vê yekê û rengê, em dikarin dema hûrî û mîtannîyan weke demek teybet hildina li dest. Piştî van demên hûrî û mîtannîyan re jî, çi pêşketin li herêmê dibin, wê li ser wan temenên ku ji van deman in wê bibin. Piştî demên hûrî û mitannîyan jî, wê demek nû a teybet û dirêj li herêmê pêş bike. Hatina ola îslamê, wê rewşek nû li herêmê biafirêne. Piştî hatina îslamê jî, heta ku kurd ji îslamê re nabêjin herê û wê herê nakin jî, wê pêşketinaka mazin li herêmê nejî. Piştî ku kurdan got herê ji îslamê re, êdî temenê pêşketina wê li herêmê xort dibe. Kurd, hem bi hebûna xwe re û hem jî bi herêm û dîroka xwe re di navika hemû pêşketinên herêmê de cihgirtina. Her wusa, heman rengî, di îslamê de jî dibêt.

Bi vî rengî, em dikarin kurdan û rewşa wan û rêveberîya wan, bi giringî li herêmê werênina ser ziman. Kurd, di warê xwe de li ser axa xwe ku dengê xwe dernexin jî, rewşên sîyesî ên herêmê didina kifşkirin. Bo vê yekê, tenê bes dibe ku hebûna xwe bidina dîyar kirin. Ev yek jî, bi dîroka herêmê a ku buhurî bi awayekî vekirî hatîya dîtin.

Demên piştre ên li herêmê ên bi îslamê re ku pêş dikevin, di rewşek cuda de na. Wê rewşa kurdistanê, hertimî bi awayekî stretejikî hebûna xwe bide dîyarkirin. Lê weke ku di sedsalên dawiyê de, dewlemendiyên wê ên binardî weke niftê û hwd jî, ku hatina dîtin, êdî bi tememî kurdistan bûya qada şer. Hêzên herêmê û hêzên navnetewî, bo ku bi awayekî rêkûpêk ji van dewlemendiya sûdbigrin û ji xwe re bibin. Rêya ”bêstatû” hiştina kurdan bijartina. Bo vê yekê, kurd, hertimî bêstatû hatina hiştin. Tenê ku em ji şerê cihanê ê yekemin û heta roja me jî, hildina li dest, em vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Bo wê ´bêstatûtîyê´ bidin domandin jî, şerên mazin ku bi wan komkujiyên mazin hanîna serê kurdan bi kurdan re kirin. Kurd, ji aliyê sîyesî û leşkerî ve bêhêz û çekkirin û çûna bi ser kurdan de. Ev rewş jî, heta roja me domîya. Ya ku ev rewş da guharandin, tevgera azadîya kurdan PKK´ê bû. Piştî PKK´ê derket, rewşeka nû afirî. Dîsa, bo ku kurdan bêçek bikin, çûna bi ser kurdan de. Di aslê xwe de, bêçekîtîya herî mazin bêtêgihiştînîtî ya. Kurdan di serî de ev buhurandin. Ev derbas kirin. Xwe, ji aliyê zihniyetê û têgihiştinê ve pêşî pêşxistin. Êdî, li ser wê re temenê tekoşîna azadîya kurdistanî afirandin.

Di vê sedsale hemdem de ku weke sedsala zanîn û ragihandinê dihê zanîn û bi navkirin de kurdan, xwe li gorî demê bi vî tevgera azadiyê re bi zanebûnkirin û kirina nava tekoşîna azadiyê de. Di vê temenê de, bi serdemê û rengê pêşketina wê û asta wê re ku em kurdan û tekoşîna wan ya azadiyê hildina li dest û fahm bikin, wê baştir bê. Pirsgirêka kurd, hat kifşkirin. Dema ku em bahse vê gotina pirsgirêka kurd û kifşkirina wê bikin, divê ku em dîrokekê bi wê re werênina ser ziman. Bi gotina ´pirsgirêka kurd´ re hebûna civatekê bi dîrok, çand, ziman û hemû nirxên wê ên ku hena, em bahse wan dikin. Ev nirx hemû, hatina dîtin û ser ziman. Nivîsandina van bû. Civat kurd, hat kifşkirin. Kurdan, xwe bixwe kifşkirin. Keseyetîya xwe kifşkirin. Her wusa, bi wê re hebûna civate xwe kifşkirin. Bi wê re jî, pêwîstîya azadîya xwe bi hebûna xwe re û her wusa bi nirxên xwe ên ku hena re kifşkirin. Piştî ku ev kifşkirin êdî ketina nava tekoşîna azadkirina wê de. Di vê temenê de, nirxên civatî, hatina kifşkirin. Bi wê re jî hebûna civatî hatîya kifşkirin.

Hebûna civatî, giringiya vê kifşkirinê ya herî giring a. Di serî de, êdî tekoşîna wê hat dayîn. Kurdan, ev civate êdî bi hemû kêmesîyên wê re kifşkirina. Di pêşxistin û

parastina wê de, hê gelek kêmesîyên wan ên bi têgihiştinî û rêbazî û hwd hena. Ev jî, hin bi hin di nava tekoînê de bi kurdan re pêş dikevin. Tekoşîna demokratik, bi jîyane civatî re çawa tê dayîn ew hat dîtin. Her wusa bi wê re jî, weke ku li rojavayê kurdistanê bû, şoreşek kurdistanî hatkirin. Çend ku ev şoreş hat xistin bin hêrîşan de û hêrîşên pirr xadar ji aliyê rejimên ku kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin ve lê hatina kirin jî, li wê şoreşê hatina kirin. Di serî de sê sedemên giring ên van hêrîşên i vê pêşketin û şoreşa kurdan hebûn. Yek, ew bû ku bi rengê kurdistanî bû. Ya duyemin jî, ew bû ku bi pergale civatî û nirxên wê re ku derket li holê re ji hemû rejimên herêmê ên ku ev bi sedsalan ku desthilatdarin re bû arternetîfîtîya. Ya sêyemin jî, ew bû ku di temenê tekoşîna kurdan û bi vîna wan bûya û pêkhatîya. ..

Di vê temenê de, tekoşîna azadîya kurd bi rêbazên hemdem û têgihiştî ku ji aliyê kurdan ve dihatina pêşxistin ve pêş diket. Bi wê yekê re, li herêmê, tekoşîna kurd, bi pêşketina xwe ya ku di nava civate kurd de û bi civate kurd re da çêkirin re li herêmê weke ”arternetîfekê” jî dihat dîtin û bi navkirin. Bi teybetî, di warê têgihiştina azadîyan de, ev rewş bi awayekî vekirî dihat dîtin û ser ziman. Piştî pêşketina şoreşa rojavayê kurdistanê, hemû hêrîşên ku li kurdên rojava hatina kirin, bi teybetî, li wê pêşketina wan û rengê pêşketina wan hatina kirin. Dewletên herêmê, ne dixwestin ku têgihiştina kurdan û pergale wê ya ku pêşketî a ku kurdan jî bi gotinên weke ”çareserîya demokratik” û ankû ”netewa demokratik” ku bi nav dikirin, li gorî wê pêşketin bibin. Lê tevî hemû hêrîş û astangîyan jî, ew pêşketina kurdan xwe bi wan re domand. Her wusa, tekoşîna azadîya kurd, di warê têgihiştina ”mafê mirovan”, ”azadîya mirovan, ”azadîya bîr û bawerîyan” û hwd de, bi têgihiştinî di nava xalkê de pêşketinên mazin dan çêkirin. Di vê warê de, têgihiştinaka mazin afirî. Piştî ku ew têgihiştina maf û azadîyê afirî û pê de êdî têgihiştina wê re li ser wê afirînê bû û pêşket. Di vê temenê de, pêşketina ´netewa demokratîk´ û ankû ´tekoşîna aşîtîyê´ û hwd jî, bi kurdan re li ser vê temenê pêşket. Di vê çerçoveyê de, em divê ku li rojhilat giştî jî binerin. Ji ber ku pirsgirêkên ku hena, di temenê wan de pirsgirêka ´mafê mirovan´ û pirsgirêka azadîya bîr û bawerîyan´ û hwd di temmen de heya. Rejimên herêmê ên totelîter, li ser wê temenê dijîn. Mafê mirovan û azadîya mirov di zihniyetê de red dikin. Bo vê yekê jî, ol û bawerî, ji her aliyê ve bikardihênin bo ku xwe bidina jînkirin û domandin. Sedemeka wilqasî bikarhanîn û îstismarkirina olê jî ev a li rojhilat ji aliyê rejimên herêmê ên ku bi serdestî hena.

Li Rojhilat, pirsgirêka herî sereka ya mafê mirovan, azadî û pêşketina wê ya. Bi teybetî, mafê mirovan, di her qad û beşa jîyane de hatîya piştguhkirin. Li berçav nayê girtin. Ev pirsgirêka maf û azadîyan, ola herêmê a serdest a îslamê jî bahre we ji wê girtîya. Çend ku hertimî, dema ku ol hatina gotina ´maf´, ´azadî´, ´rastîteqînî´ û hwd, di temenê gotinên xwe de hanîya ser ziman jî, piştre ev hatîya piştguhkirin.Ji ber ku ol, di temenê xwestekên desthilatdarîyên herêmê de hatîya birêxistinkirin û weke "birdozîyek" rêveberîya hatîya bi erkûkar kirin, êdî di temenê de li gorî desthilatdar û rengê pêşketina wan bi awa û reng kirina. Di ancama vê de, rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd, dihên serxistin li holê ku li gorî berjewendîyên xwe li dijî xalkên herêmê bikarbênin. Pirsgirêka herî mazin li rojhilat, di warên ´hebûna maf û azadîyê´ û herêkirina wê de dihê jînkirin. Di temenê hemû şer û pevçûnên ku di bin rengê olê û bi awayê din de dihê kirin de jî ev heya. Pîvanên ahlaqî ku hena, ew jî, li gorî wê navarok ku hatîya bêmafî kirin. Gotina ´ahlaqê jî, bûya temenê bêmaf hiştinê û herêkirina wê. Û ankû gotina ahlaqê hatîya xistin li rengê gotina qader´ê de û bi wê ew rewş bi wê bi

mirovan dane herêkirin. Yanî, çawa ku gotina olê hatîya istismarkirin, bi heman rengî gotina "ahlaqê" jî hatîya îstismar kirin.Bo vê yekê, di bin navê ´ahlaqê´ de, rewş û tiştekî ku em ti carî nikarin bi têgihiştina ahlaqî werênina ser ziman û şîrovekirin, hatîya dayîn jînkirin. Rêveberîyek, dikarê bi xwe bi rehetî mirovan di bin zor û şîdetê de bihêle.

Li deverekê, dema ku mafê mirovan li berçav ne hatibê girtin, li wir pêşketin û heyîna wê jî mirov nikarê bahse wê bike. Hemû rejimên ku hatina ava kirin jî, tenê bo ku xwe bijîn tiştek nema ku nekirin. Di roja me de jî, dema ku em li rojhilat dinerin, dîsa ya ku em dibînin ev a. Rejim û ankû desthilatdarîyên li herêmê, li rê û rêbazên ku wê ka çawa xwe bidina domandin digerihin. Li rojhilat, em nikarin bahse ti rêveberîyê û ankû desthilatdariyê bikin ku di rojeve wê de pêşxistina mafê mirovan, azadî û pêşketin mirov û jîyanê heya. Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku ji xwe jîyan û rengê jîyanê bi tememî ji holê hatîya rakirin. Wê mirov çawa bijî, mudahale li wê tê kirin. Sînorê jîyanê û rengê jîyanê ku wê çawa were jîyîn jî, ji aliyê rêveberîyan ve hatîya kifşkirin. Mirov nikarê bahse xwe û kifşkiriina xwe ya li ser jîyane xwe bike.

Mirov, bi ti awayê ne Azad a. Sînorê mirov, sînorê wê rejima ku di bin kontrola wê de dijî ya. Ku mirov derket dervî wî sînorê ku rejimê ji wî û jîyane wî re xîzkirîya, hingî êşkencekirin û kuştin jî di nav de wê gelek serborîyên xirab werina serê wî. Her wusa, ev sînorê ku rejimên herêmê bo jîyane mirov xîzkirîya, mirov dikarê ji aliyê ziman ve jî li ser bisekinê. Her rejim, pêşî ji xwe re zimanekî dibijêrê û mirov jî wê di jîyane xwe de bi wî zimanî û li gorî wî zimanî bijî. Bi vî rengî, mirov divê ku bibêje ku ji her aliyê ve maf û azadîya mirov ji dest hatîya girtin. Heta ku ew hebûna çerçoveyên têgihiştinî ên dinava olê bixwe de jî, ji ber ku ne li gorî berjewendîyên rejimên herêmê bûya, bi piştguhkirinê re hatîya ji jîyanê dûrkirin. Gotinên weke ´wijdan´, ´ahlaq´, ´maf û azadîya mirov´, ´pêşketina jîyane mirov´ û hwd ku hebûn, û di nava olan de jî bahse wan dihatkirin, hatina ji holê rakirin.

Li rojavayê kurdistanê, dema ku kurdan şoreşek kir, ji ber vê yekê bû ku ewqas hêrîş lê hat kirin. Ji ber ku ew têgihiştin û sînorê jîyanê û rengê pêşketina wê ya ku bi di nava wê têgihiştina şoreşa rojavayê kurdistanê de heyî, vajî ya wan bû. Ew sînorê ku rejimên herêmê ji mirov û jîyane mirov re danîbûn, bi pêşketina şoreşa rojavayê kurdistanê re hat derbas kirin. Bo vê yekê, rejimên herêmê pirr bihêrs bûn hem li kurdan hem jî bi teybetî li rojavayê kurdistanê.Teybetmendîya rejimên herêmê ew a ku rejim ´neteweyên xwe diafirênin´. Yanî, xalkên ku hena, statû, ziman, çandên wan û hwd tên qadaxakirin bi navê wan û bi navê wê rejima ku avakirina rengê wê û referansên wê diguharênin û dihênin ser ziman. Asimlasyonê, bi vî rengî dikin. Bi vê re jî, bi wê asimlasyona ku dikin, çand û ziman û bi wan re jî xalkan ji dîrokê dîbin. Minaq û birhana vê yekê jî qadaxaya li ser zimanê kurdî û reng û baweriyên din ên li herêmê.

Î ro, dema ku em li kurdistanê dinerin, em vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa, li welatên din ên rojhilat jî, ev yek wusa heya. Bo vê yekê, di serî de, divê ku em gotina "mafê mirovan", "azadî" û "pêşketina wê" weke sê gotinên bingihîn hildina li dest û li wan bihizir in. Ev hersê gotin, weke sê gotinên ku bi ti awayê li herêmê ku rejimên herêmê li berçav ne girtina na. Heta roja me, çi rejimên ku hena, nikarin bahse maf azadîyê û pêşketina wê bi xwe re bikin. Rejimên weke tirkiya ku bahsê dikin jî, tenê di gotinê de wê dikin. Rejima ku herî zêde qadaxaya mazin danîya ser ziman, çand û nirxên civatî ên civate kurd, rejima tirk a. Heta roja me jî, ew qaaxakirin didomê û

civate kurd bi pergale perwerde û asimle kirinê dihê tûnakirin.

Mafê mirov ê jîyanê ê tekakesî û her wusa ê civatî, bi hevdû re di temenê pêşketina wî û ankû wê ya civatî de divê ku mirov lê binerê. Di temenê mafê tekakesî û hwd de jî, mafên civatî ên hevbeş(kollektif) û hwd hena. Mafên tekakesî, li ser mafên civatî ên hevbeş ên weke ziman, çand û hwd re pêş dikevin. Mafê mirov, azadî û pêşketina mirov, weke sê gotinên ku weke temenê pêşketina civatî û keseyetîya mirov hilde li dest in. Di vê temenê de, divê ku mirov sînorê mirov yê azadîyê û her wusa bi wê re jî bi pêşketina mirov ya bi keseyetîyê û civatî re bi hevdû re hilde li dest û fahm bike.

Li rojhilat, jîyan bi teybetî di van herdû sadsalên ku me buhurandin de, derneket dervî sînorê ku rêveberîyan û ankû desthilatdarîyan kifş kir. Her wusa, ol, weke amûrekî wê bikarhanîn. Ol, hertimî, dema ku hatina û pêşketina, bi wê dirişm û têgihiştina ku wê bêhtirî pêşketina mirov û azadîya mirov pêş bixin û bi parêzên hatina. Hertimî di olan de, bahse "rêya rast" hatîya kirin. Ev gotina rêya rast, ji bo mirov a. Lê ev ji rastîya jîyanê dûr hatina şîrovekirin. Ya rastî, divê ku miirov vê yekê bibêje ku ol bixwe jî li gorî rastîya xwe baş hatiban şîrove kirin û nîyet û gotinên rêveberîyan di wê de û di şîroveyên wê de ew kifş nekiriban, dibîyabû ku î ro gelek pirsgirêkên ku em nîqaş dikin, me yê nîqaş jî ne kiriban.

- Li Rojhilat, pirsgirêka herî sereka ya mafê mirovan, azadî û pêşketina wê ya. Bi teybetî, mafê mirovan, di her qad û beşa jîyane de hatîya piştguhkirin. Li berçav nayê girtin. Rêveberîyek, dikarê bi xwe bi rehetî mirovan di bin zor û şîdetê de bihêle. Li deverekê, dema ku mafê mirovan li berçav ne hatibê girtin, li wir pêşketin û heyîna wê jî mirov nikarê bahse wê bike. Hemû rejimên ku hatina ava kirin jî, tenê bo ku xwe bijîn tiştek nema ku nekirin. Di roja me de jî, dema ku em li rojhilat dinerin, dîsa ya ku em dibînin ev a. Rejim û ankû desthilatdarîyên li herêmê, li rê û rêbazên ku wê ka çawa xwe bidina domandin digerihin. Li rojhilat, em nikarin bahse ti rêveberîyê û ankû desthilatdariyê bikin ku di rojeve wê de pêşxistina mafê mirovan, azadî û pêşketin mirov û jîyanê ya. Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku ji xwe jîyan û rengê jîyanê bi tememî ji holê hatîya rakirin. Wê mirov çawa bijî, mudahale li wê tê kirin. Sînorê jîyanê û rengê jîyanê ku wê çawa were jîyîn jî, ji aliyê rêveberîyan ve hatîya kifşkirin. Mirov nikarê bahse xwe û kifşkiriina xwe ya li ser jîyane xwe bike. Î ro, dema ku em li kurdistanê dinerin, em vê yekê bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa, li welatên din ên rojhilat jî, ev yek wusa heya. Bo vê yekê, di serî de, divê ku em gotina "mafê mirovan", "azadî" û "pêşketina wê" weke sê gotinên bingihîn hildina li dest û li wan bihizir in.

Mafê mirov ê jîyanê ê tekakesî û her wusa ê civatî, bi hevdû re di temenê pêşketina wî û ankû wê ya civatî de divê ku mirov lê binerê. Yanî, di temenê mafê tekakesî û hwd de, mafên civatî ên hevbeş(kollektif) û hwd hena. Li ser wan re pêş dikevin.Li rojhilat, divê temenê de, divê ku ev yekê weke xaleka pîroz lê were nerîn. Mafê mirov, azadî û pêşketina wê, weke sê gotinên weke temenê pêşketina civatî û keseyetîya mirov hilde li dest in. Divê temenê de, divê ku mirov vê yekê fahm bike.

Li rojhilat, jîyan bi teybetî di van herdû sadsalên ku me buhurandin de, derneket dervî sînorê ku rêveberîyan û ankû desthilatdarîya kifş kir. Her wusa, ol, weke amûrekî wê bikarhanîn. Ol, hertimî, dema ku hatina û pêşketina, bi wê dirişm û têgihiştina ku wê bêhtirî pêşketina mirov û azadîya mirov pêş bixin û bi parêzên hatin. Hertimî di olan de bahse "rêya rast" hatîya kirin. Ev gotina rêya rast, ji bo mirov a. Lê ev ji rastîya jîyanê dûr hatina şîrovekirin. Ya rastî, divê ku miirov vê yekê bibêje ku ol bixwe jî li gorî

rastîya xwe baş hatiban şîrove kirin û nîyet û gotinên rêveberîyan di wê de û di şîroveyên wê de ew kifş nekiriban, dibîyabû ku î ro gelek pirsgirêkên ku em nîqaş dikin, me yê nîqaş jî ne kiriba.

**- Di sadsale** me de, gotina "azadî", "wekhevî" û "xweşdîtin" û hwd, çend ji wan gotinên ku hatina ser ziman in. Bi gotina azadîyê re serdestîya mirov hatîya salixkirin. Bi wekhevîyê re jî, tişta ku ji yekî re hebû ji yê din re ku hebê hatîya salixkirin. Bi gotina ´xweşdîtinê´ re jî, dema ku mirov di civate civatekê de bijî, ji aliyê olî ve jî bê û ji aliyê kêmnetewî ve jî bê û hwd, ku mirov rastî cihêrengiyên civatî hat û ew red ne kir û dijberî li dijî nede nîşandin û rêz û hûrmeta ku mirov weke ku ji nirxên xwe re da nîşandin û ji xwe re xwest ku bi heman rengî ji yên li hemberê xwe re jî ku bide nîşandin, bi wê hatîya salixkirin. Ti civat, tûna ya ku bi rengekî bê. Dema ku em ji aliyê pêşketinê ve jî binerin, em nikarin bibêjin ku yek rengî ya. Dema ku pêşketinê xwe di jîyanê de da domandin, wê rastî cihêrengîyan were.

Ev aliyekî wê ya ku em li ser bisekin in. Di vê temenê de dema ku bahse mirov û keseyetîya wî jî dihê kirin, dihê gotin ku ew jî divê ku "li gorî ku ew dixwezê ku bijî divê ku bijî". Lê li vir, dema ku bahse gotina "li gorî ku dixwezê ku bijî divê ku bijî", li vir, divê ku em ji bîr nekin ku lingekî gotinê jî civaktîya civakî û civaknasîya wê ya. Bi wê re jî, divê ku mirov ji bîr nekê ku têkiliya mirov ya bi civatê re, hinekî jî sînorê wî dide kifşkirin.

Dema ku civaktîya civakê û civaknasiya wê sînorê mirov û keseyetîya mirov ji temen ve bide kifşkirin, divê ku mirov hinekî jî li ser wan mafên keseyetî û ankû ´tekakesî´ û hwd, bi hevdû re divê ku mirov lê bihizirê. Her mafê ku mirov bi teneserê xwe bikardihêne, di nava civatê de, weke wî, gelek mirovên din jî bikardihênin. Ziman bê, wusa ya. Çand bê wusa ya. xwandin bê wusa ya. Weke wan, mirov dikarê gelek aliyên din jî bêne ser ziman. Lê ev alî hemû jî temenê wan li ser heyîna gotina ´civakê´ û hwd dirûnihê. Dema ku civakek, ji mafê xwe yên hevbeş(kollektîf) ku bêpar bê, çawa dibêe ku mirov dikarê bahse azadî û heyîna mafên tekakesî ên mirovên wê civatê bike? Bêgûman, mirov nikarê bahse bike. Ên ku bahse bikin, yan ji nezanîya xwe diaxivin û nizanin ku çi dibêjin û yan jî bi zanebûn civakê manîpûle dikin, derewan dikin. Ji wê û pê ve, mirov nikarê wê salix bike.

Mafê tekakesî û ê civatê, bi hevdû re hena. Hevdû temem dikin. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku temenê hevdû jî diafirênin. Di vê temenê de, dema ku mirov bahse azadîyê bike jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bahse wê bike. Yekî ku zimanê wî qadaxa bê, nikaribê xwe bi rastîya civate xwe pêş bixe, ew mirov ne azad a. Di vê temenê de, car bi car li tirkiya dihê gotin ku "mafên tekakesî" hena. Û ankû dihê gotin ku "em hewl didin ku mafê tekakesî pêş bixin." Dema ku tu zimanê civate wî mirovî qadaxa bike, tê çawa wê pêş bixe. Ev gotin bixwe jî, dihên manipûle kirin.

Î ro, li tirkiya, ji yekî tirk ku bi zimanê xwe perwerde dibîne û dikarê xwe bêne ser ziman û pê de, divê ku mirov bahse vê gotinê ji ti kesekê din re nekin. Ev yek, hatîya pêşxistin.

Li kurdistanê, dema ku ev gotin werina gotin û di nava kurdan de ji kurdan re werina gotin, wê tenê manipûlasyon û derew bin. Dema ku em bahse mafê tekakesî bikin, divê ku mirov pêşî ku di temenê wê de ya mafên civakî ên ku hena wan bibîne. Di sadsale me de, teknolojî û teknîk û hwd, pirr pêşketîya. Pêşketinên ku berê di deh salan de bi mirov dibûn, î ro di hefteyekê de dikarin bibin. Wilqasî, çendî ku pêşketin bûya, dema

fêrbûn û pêşxistinê a mirov jî kintir kirîya.

Di vê demê de, berî hertiştî divê ku mirov bibêje ku bi zanebûnê serwerî pêşdikeve. Rengê wê serwerîyê û hwd jî, bi gotinên weke ên "ahlaq" û hwd pêş dikeve. Di roja me de, ku di demên berê de jî wusa bû, bi ahlaqî, çendî ku mirov dikarî xwe bide herê kirin û di nêzîkatîya xwe de xwe dabibe herêkirin, wê ewçendî jî serdestîya xwe jî bide çêkirin. Ahlaq, hinekî jî bi keseyetîyê û nêzîkatîya mirov re heya. Mirov çawa tevdigerihê û çawa nêzîkatîyê dike, bi wê re kifşkirinê de dide kirin. BI gavavêtin û nêzîkatîya xwe re ku mirov xwe da herêkirin, wê ewçendî jî karibê serdestîyekê bikeseyetîyê re ji xwe re bide hanîn. Hinekî jî, dema ku em li rojhilat dinerin, hertimî serdestî û desthilatdarîya ahlaqî derketîya li pêş. Bi wê re jî, nêzîkatî hatîya pêşxistin. Bo vê yekê, ol weke aliyekî giring ê ahlaqî bi wê serdestbûn bûya û bûna desthilatdar bûya.

Civateka di vê temenê de ku pêşketina xwe bi dîroka xwe re kirî û civatî pêşketî, wê li gorî wê xwediyê keseyetîyê jî bê. Li vir, dema ku em bahse serdestîya ahlaqî bikin, divê ku em ji bîrnekin ku di temenê xwe dayîna herêkirinê de ev hatîya kirin. Desthilatdarîyên herêmê jî, ev yek pirr baş bikarhanîna bo berjewendîyên xwe. Heta ku ez dikarin bibêjin ku desthilatdarîya ahlaqî ne tenê bo domandin rêveberî û rejima xwe bikarhanîna. Her wusa bo sînorkirina mafên mirovan û azadîya wan jî bikarhanîna. Li vir, derketin dervî sînorên ku desthilatdaran kifşkirina weke bêahlaqî jî hatîya dîtin. Bi wê yekê, xwe domandina.

Dema ku rewş, ev bê, divê ku mirov hinekî jî di çerçoveya jîyane civatî de, civat û ahlaqî bi hevdû re biqasî ku pêwîsta ku mirov wê fahm bike, wilqasî jî biqasî wê giringa ku mirov bi gotina azadîyê re jî ahlaqê fahm bike û wê têbigihijê. Ez bibawerim ku dema ku ev bû, wê çekeka rejim û desthilatdarîyên li rojhilat a pirr giring ku wan li pêşîya pêşketina herêmê bi wê danîna wê ji destê wan were girtin.

Her civate nêzîkatîyeka wê ya ku em dikarin ji wê ahlaqê wê jî fahm bikin heya. Dema ku mirov li jîyane wê binerê, li awayê pêşketina wê û dîroka wê binerê, mirov wê êdî vê yekê bi başî bibîne. Gotina ahlaqê, dema ku di çerçoveyeka civatê newê şîrovekirin û di çerçoveya têgihiştinekê û bawerîyekê de were şîrove kirin, wê pêşîya pêşketinên din û heta ku bawerîyên din jî wê bê temenê pirsgirêkan. Dema ku di nava civatekê de pirr-bawerîtî û hwd hebe, divê ku mirov li wir, çerçoveya civatê esas bigrê û bi wê re her mirovê wê civatê di çerçoveya wê de şîrove bike û nirxên wan bikin ku ew bixwe bênina ser ziman. Di vê temenê de, civatîtî di aslê xwe de, wê di sadsalê pêşîya me de, wê bi şîrovekiirna xwe re û çerçoveya xwe re, wê karibê derkeve ser gerdûntîya olê bixwe jî. Bi vê rengê, ew gerdûntîya olî ya gelemper, ku bi nêzîkatîya civatî hat şîrove kirin, wê hingî temenê xweşdîtina hevdû ya bawerîyan û hwd jî wê biafirê. Li vir, ol jî, çendî ku gerdûntîya xwe mazin kir, dema ku li mirov vegerîya wê cardin dîsa li civatê vegerihê.

Di roja me de, pêwîstî pê heya ku mirov gotinên "mirov", "mafê mirovan", "azadî" û hwd bi pêşketin û têgihiştina demê re û bo pêşketina mirov hilde li dest û şîrove bike. Ev yek, wê ne tenê bo pêşketina mirov û civatê weke pêwîstîtîyekê bê, her wusa wê bo ku li gorî pêşketina demê û ast û rada wê ku mirov bijî jî wê pêwîst bê. Jîyan, hertimî pêş dikeve. Weke ava çemekî ku di nivîna xwe de diharikê ya. Hertimî diharikê. Li gorî wê jî, êdî dem diafirê û pêşketin di demê de dibê. Bi vê yekê re, mirov êdî bi demê re car bi car xwe ji nû ve diafirê. .. Î ro jî, dem demeka wusa ya ku mirov di temenê

pêşketina demî û asta wê de ku xwe diafirêne ya. Ev, weke rastîyekê ya û bi wê re êdî weke teybetmendiyeka pêşketinê a bi mirov û jîyanê re jî dihê li berçav. ..

Rojavayê kurdistanê ji aliyê ardnîgarîya wê ve jî dewlemend a. Kurdên ku li rojavayê kurdistanê dijîn, bo ku ji axa xwe baş sûdbigrin, ´jîyane koçerîyê´ jî kirina. Bi teybetî,, ev herêmên ber diclê û firatê, herêmên ku herî zêde li wan koçerî dihat kirin bûn. Ji herêmên bakûrê kurdistanê ên weke ”serhadê û hwd, mirovên ku bi sawalgerîyê meşkûl dibûn, ku demsala koçerîyê dihat, kon ji xwe re çê dikirin û diavêtina ser pişta haspan û sawalên xwe didan dora û diçûn herêmên ber diclê û firatê. Di nava jîyane hûrî û mîtannîyan bixwe de jî, koçerî heya. Ev rengê jîyane koçerîyê ku teybetmendiyeka pêşketina jîyane kurdistanî a kurdan bû, bikortasî em lê binerin.

**- Jîyane koçerîyê, weke teybetmendiyeka** jîyane kurdîstanî ya. Jîyane koçerîyê, li kurdistanê, weke rengekî jîyane ku em dikarin bi mejûyeka pirr dirêj re bênina ser ziman, î ro li ber windabûnê ya. Car bi car, dema ku hin nivîs li ser jîyane koçerîyê hatîya nivîsandin, jîyane koçerîyê li rex "jîyane peneberîyê" û ankû "jîyane goçberîyê" hatîya bicihkirin û hatîya hanîn li ser ziman. Di serê nivîsê de, divê ku em vê xelatîya di nivîsandinê de ya di berê jîyane koçerîyê de bi hanîya wê ya li ser ziman re bahse jîyane koçerîyê bikin. Jîyane koçerîyê, ne goçberîya. Jîyane koçerîyê, ne pêneberîyê ya. Ti teorîyên ku temenê wan li ser goçberî û ankû pêneberîyê ya, em nikarin bi wan jîyane koçerîyê bênina ser ziman.Ji ber ku, jîyane koçerîyê ne goçberîya û ne jî pêneberî ya.Çerçoveya jîyane koçerîyê, temenê wê li ser gotina ´war´ a. Ji ber vê çerçoveya jîyane koçerîyê ku temenê wê li ser gotina ´war´a, em nikarin bi teorîyên goçberî û ankû pêneberîyê re wê bênina ser ziman. Jîyane koçerîyê, ku temenê wê li ser jîyane bi sawalgerîyê ya û lingekî wê li ser şîvaniyê û lingê din jî ku li ser civatîtiyê ava ya, pergale jîyane civatî a bi xwezayê re ya. Di temenekê de ku çawa jîyane civatî li ser temenê xwe û li warê xwe pêş dikeve û di temenê wê de, bi zanîna xosletên xwezayê û ji wê sûdgirtinê re heya, mirov dikarê bahse wê bike. Her wusa, demsale koçerîyê heya. Li gorî damsalê tê kirin. Jîyane koçerîyê a li kurdistanê, weke teybetmendiyaka jîyane li ber çemên diclê û firatê ya. Ev rewşa jîyane, bi teybetî, herî zêde li rojhilatê kurdistanê û bakûrê kurdistanê pirr zêde hebûya. Li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê jî hebûya. Lê pirr zêde li rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê hebûya. Ev jî, bi hinek sedemên ardnîgarî û avîtîyê ve girêdayî hena.

Di serî de, divê ku em bibêjin ku jîyane koçerîyê, dema ku em lê dihzirin, divê ku em bibêjin ku weke jîyaneka xweza ya bi xwezayê re ku dijî, divê ku em wê salix bikin û bi navê bikin û her wusa werênina ser ziman. Ev, divê ku weke gotinaka me ya bingiihînî a di nivîsa me de bê. Dema ku em em jîyane koçerîyê hewl dibin fahm bikin, di serî de, divê ku em hinekî xwediyê zanyarîyê a di derbarê ardnigarîya kurdistanê de jî bin. Ev jî, weke xal û destûreka din ya bingihînî a di dinivîsê de ku divê ku em li berçav bigirina. Ji ber çi, ev xal û ankû destûr pirr giringa ku divê ku em bi teybetî li berçav bigirin? Ji ber ku rewşên jîyane koçerîyê bi wê re dihên ser ziman. Her wusa, wê ardnîgarî, weke destûreka bingihînî a fahm kirina civaknasîya jîyane koçerî û pêşketin û xwe domandina wê bê. Jîyane koçerî, bi vê re, em divê ku xal û ankû destûreka din jî kifş bikin bo ku wê pê werênina ser ziman. Ku biqasî vê xal û ankû destûra ardnîgarîyê ku di temenê jîyane koçerîyê de giringa ardnîgarî, her wusa weke giring jî divê ku em gotina "demsalê" bi gotinên weke yên ´koçerîyê´, ´zozanan´ û hwd re bi teybetî li vir kifş bikin û werênina ser ziman. Her demsal ku dema wê hat çûyina zozanan dibû.

Jîyane koçerîyê, her wusa, civaknasiya wê,, bi du awayan fahm kirina wê wê giring bê. Yek, bi têkiliya mirov a bi xwezayê re ya. ya din jî, her wusa bi têkiliya mirov a bi mirov re ya. Ev jî, weke aliyekî in ku em di herikîna nivîsandina xwe de pirr li ser bisekin in a. Ev ji ber ku pirr giring a. Dema ku em vê aliyê baş fahm bikin, em di derbarê civaknasîya jîyane koçerîyê de jî bina xwediyê zanîn û têgihiştina baş bi fahm kirina xwe re.

Li vir, berî hertiştî dema ku em gotina civaknasiyê hildina li dest, gotina civaknasiyê, di roja me de, li ser temen û esasê jîyane şariştanîyê hatîya salixkirin û bi wê re xalên wê ên bingihinî hatina kifşkirin. Ev aliyê salixkirina gotina jîyane civaknasî ya şariştaniyê re ku em bi tememî xwe di nava sînorê wê de bigrin jî, wê hinekî, wusa lê were ku weke ku em mijarê û şîrove û civaknasiya wê ya ku em werênina ser ziman, weke ku qût bikin û yan jî bibirrin wê lê were. Ji ber çi, ev wusa dibe? Ne ji ber ku jîyane koçerî dervî şariştaniyê ya. Ev jîyan jî, bi civaknasiya xwe re, xwediyê teybetmendiyên şariştanî ya. Lê xwediyê, teybetmendiyên xwe ên teybet ên şariştanî ya. Divê ku em vê yekê jî, li vir bi teybetî kifş bikin.

Jîyan, dema ku em bahse wê bikin û bi wê re hinekî ji aliyê zanînî ve ku hewl bidin ku wê werênina ser ziman bi rengê hizrî, wê hingî, bi wê rengê hizrî re wê civaknasiya wê bi çerçoveya wê re werê ser ziman. Ev teybetmendiya jîyanî û civaknasî, her wusa, di hanîna ser ziman de, ji me dixwezê ku em bi teybetî û xweza li jîyane koçerîyê binerin û wê werênina ser ziman.

Jîyane koçerîyê, bi rengê xwe yê pêşketinê re, me got ku pirr kevna û xwediyê mejûyeka pirr kevn a. BI vê mejiya wê ya dirêj re, em divê ku wê werênina ser ziman. Bi teybetî, em heyîn û hebûna jîyane koçerîyê, divê ku em bibêjin ku di demên berî zayinê de li dora sê û ankû çar hezar salan jî rastî nîşanakên wê tên.

-Em dema ku hewl didin ku dîrokê bixwênin, em dibînin ku di temenê şariştanî de pêşketinaka mazin hebûya. Teybetmendiya rewşa jîyane şariştanî ên berî zayinê bi xwezayê re xwe didina dîyar kirin. Lê hin bi hin bi têgihiştin û hişmendî dibin û xwe bi hizir û felsefê re didina domandin. Ji xwe, felsefe bixwe jî, em divê ku vir binxatkin û bibêjin rengê hizirkirina jîyane şariştanîyê ya.

Li kurdistanî, ku em diçina serdema Gûtîyan li dora ´sê hezaran û heta du hezar û heştsadî salî´ û hwd, em dibînin ku serdema wan bi awayekî vekirî pêşketîya. Serdema Gûtîyan, weke serdemeka dirêj a. Di hundurê vê serdema dirêj dem û pêvajoyê dîrokê ên ku pêşketina û bi rê ve çûna, î ro di derbarê wan de li gorî ku em dixwezîn di destê me de zanyar tûna na. Lê hin bi hin ji dema wan hin nivîsên bizmarî hatina ditin. Ew jî, di roja me de hatina dahûr kirin. Ji wan, nivîsên bizmarî, gotin bi gotin jî bin, hin gotinên ji wan dema wan hatina kifşkirin hena. Her wusa, ew gotinên ku em ji dema wan kifş dikin, gotinên weke "zozan", "zûzan", "zozanan" û hwd, em rastî tên ku di nava wan nivîsên bizmarî de hena. Ev gotina ´zozan´an, gotinaka ku navê rengê jîyane koçerîyê bi xwe re bi wate dike û dihêne ser ziman a. Ev gotin, pirr jî di nava xalkê de, bicih bûya, weke nav bi gelek reng û cûreyên wê jî hatîya bikarhanîn.

Gotina zozan, di dema hûrîyan de jî, bi heman rengî rastî wê tên. Her wusa, nivîsa bizmarî a bi navê teksta "marî" hatîya ditin û ji wê "navên hûrîyan" hatîya xwandin û her wusa bi navê "hurrian and hurrians names in the mari tekst" ku hatîya pirtûkkirin jî, di wê de gotina "zozan" bi rengê "zuzan", "Zoza", "zuzana" û hwd, mirov rastî wê tê. Navê ´zozana´ weke navekî kevn a. Ev nav, ji van deman maya. Di nava xalkê de, di

nava kurdan de, ji wan deman û heta van deman ku em têde dijîn, weke navê mirovan (jinan) jî hatîya bikarhanîn. Hinekî jî, ev nav, weke navekî pirr navdar hem di demên berê de û di demên piştre de jî hatîya bikarhanîn.

Ev nav bi wateya xwe ya ku di wê de hatîuya salixkirin jî, rengê jîyane koçerîyê dihêne ser ziman. Di her demsalê de, dema ku koçer, demsale wan hat, wê êdî ´herina zozanan´. Ev çûyina zozanan, di nava kurdan de û bi teybetî li kurdistanê, bi nav û deng a.

Li kurdistanê, ji van demên kevn û heta demên me jî, aşîrên kurd ên koçer hena. Teybetmendiya jîyane van aşîrên kurd, li ser temenê jîyane koçerîyê ava ya û wê dihêne ser ziman. Ev aşîrên koçer, î ro li kurdistanê, minaq, li dora agirî, û bajarên wê heta ku digihijê herêmên çolemergê û dora û herêmên botanê hena. Yanî li qadaka mazin belavbûyî hena. Ev, aşîrên koçer, ne aşîrên barrî na. Gotina "barrî", di nava kurdan de bi teybetî ji teyrikan re dihê bikarhanîn. Hin çûreyên tayrikan hena ku li cih û warekî naseknin û ji xwe re nakina war û hêlina xwe çênakin. Hertimî di çûyinê de na. Bi deverekê ve ne girêdayî na. Lê koçer, bi cihekî ve girêdayî na. Her aşîrên koçer, xwediyê cihekî ku dayimî ji wê na. Hinek demsalên xwe dayimî li wê cih û malên xwe di buhurênin. Lê tenê demsaleka wan heya ku di wê de ji malên xwe derdikevin û diçina derve. Jîyane wan, di nava ´dest û zozanan´de diçê û tê.

Temenê gotina koçerîyê û zozanan bi vî rengî êdî dihê afirandin li jîyanê. Deşt, niştecihên ku bigirseyî mirov li wan dijîn in. Gotina ´deştê´ weke gotina hevlingê gotina ´zozanan´ jî ya. Di vê temenê de, dualîtîyek, bi gotinên deştê û zozanan re bi hevdû re heya. Minaq, weke bajar, bajarok, navçe, gund û hwd. Lê zozan, ne wusa na. Zozan, hinekî çîyayîtîyê dihêne ser ziman. Lê ew çîyayîtîya ku dihêne ser ziman, ne dûrî ji destên ku li wan jîyan hena. Minaq, Aşîrên koçer ên kurd ku ji herêma serhadê diçûna zozanan wê werina ber cihên nêzî çemê diclê û firatê ku avî na. Ji xwe jîyane koçerîyê, bi derketina li zozanan re weke xoslet û teybetmendiyeka wê jîyane li ber çemên diclê û firatê jî ya. Ya ku temenê wê jîyane koçertîyê diafirêne ew a. Herêmên kurdistanê ên berçeman û avî, cihên ku wan zozantî dihat kirin bûn. Bi teybetî, li wanderan bicih dibûn. Cihên avî, cihên ku li wan zozantî dihat kirin bûn.

Ev rengê vegotinê ê me ku me kir bi cihên avî re, wê têgihiştinekê jî di derbarê jîyane koçerîyê de biserekeyî bide me. Ew têgihiştin jî, bikar û barê koçerîyê ve girêdayî ya. Koçerî, temenê wê jîyane wê, li ser "hebûna sawalîyê" û ankû ´jîyane şîvantîyê´ ava ya. Mirovên ku kerîyên wan ên sawalan hebûn, ew bûn ku diçûn zozanan. Yanî, bi rengekî jî, zozantî, dibû, karekî sawaltîyê jî. Di demên berê de, jîyana malan, li ser temenê sawaltîyê û nêçîrê û hwd bû. Hinekî jî, sawaltî û koçerîtî weke du gotinên ku hevlingên hevdû na.

Di nava sînorê xwe de, mirovê koçer, di derbarê teybetmendiyên xwezayê de pirr bizane bû. Pirr bi fahm bû. Karê kedîkirin û ahlkirina sawalan, ji koçerîyê dihat pirsin. Em dikarin bêjin ku di çerçoveya jîyane koçerîyê de kedîkirin û ahlkirina sawalan weke ´sawalên malê´, pêşî bi jîyane koçerîyê re destpê dike. Aliyekî, giring ê destpêka pêşketina jîyane şariştanî jî ev a. Mal tên avakirin. Êdî ´sawalên malê´, tên kedîkirin û ahlkirin. Ahlkirin û kedîkirin, aliyekî giring ê ku pêşketî ê vê jîyane koçerîyê ya. Bi vê rengê, ku em bêjin temenê pêşxistina jîyane şariştanî jî, bi vê rengê bi mal û malbatîtîyê re û bo dabere malê û malbatê û hwd, kedîkirin û ahlkirina sawalan û hwd re pêşketîya, wê rast bê. Aliyekî vê jîyanê koçerîyê ê pirr giring jî ev ahlkirin û kedîkirina sawalan û

xwedîkirina wan diafirêne. Pergale jîyane şîvanîyê bi civatî, di navaroka vê jîyanê de xwediyê heyînekê ya.Bi vê rengê, em dikarin, pergale jîyane koçerîyê, bi xwezayîya xwe re, pergale jîyane şîvanî a bi civatî ku di destpêka pêşketinên şariştanî de ku pêşketîya ya. Wê çawa kedîkirin, ahlkirina sawalan û xwedîkirina wan bibe, weke ku pergale wê bi rengê jîyane civatî re bi koçerîyê re hatîya pêşxistin. Ku em bibêjin ku destpêka pêşketina jîyane şariştaniyê ku bi malbatîtî û ahlkirina sawalan û her wusa bi wê re bi şîvaniyê û pêşketina wê re bê, em divê ku koçerîyê, weke wê destpêka wê ya pêşî ya destpêkê werênina ser ziman. Karê ahlkirin û kedîkirinê bi xwedîkirinê re, weke karekî hûnerî ê vê jîyane koçerîyê jî ya. Wê çawa ji sawalan sûd were girtin, bi hildane şîr, hîrî û hwd bê, ev jî, weke hûnereka wê ya jîyanî a din a. Jîyane koçerîyê, bi vî rengî, dibêe jîyane kedîkirin, ahlkirin û xwedîkirinê di temenê jîyane malbatî û civatîtîyê de. Di aslê xwe de, hinekî jî, bi vê rengî mirov fahm dike ku piştî ku jîyane şariştanî pêş dikeve û mal ava dibin û her wusa dema ku karê daberekirina malê derdikeve li holê, êdî di wê temenê de wê jîyane koçerîyê bi rengekî xwe re pêş bikeve. Li vir, hinekî jî, em dikarin, koçerîyê û jîyane wê, weke jîyane şariştanî a pêşî a bi xwezayê re ku dijî jî werênina ser ziman. Lê ev jîyan, du lingî ya. Lingekî wê li destê ya. Lingê din ê duyemin jî, li zozanan a. Li ser van herdû lingan jîyane koçerîyê û mirovê koçer dihê ditin û fahm kirin.

Li vir gotina ´deştê´ weke gotina ´zozan´an divê ku divê ku em bi giringî lê binerin û wê fahm bikin bi jîyane koçerîyê re. Jîyane koçerîyê, jîyane ku wê di nava ´jîyane deştê´ û ´jîyane zozanan´ de bi çûn û hatin bê. Gotina ´deştê´, ku em hildina li dest, bi serê xwe wê aliyê jîyane bi niştecihî a bi malî werêne ser ziman. Ev jîyane dikarê jîyane bajarî bê, jîyane gundîtî û hwd bê. Di vê temenê de, jîyane bi hevdû re jîyanê ya. Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku her mirovê ku koçer a, li deştê xwedî mal a. Dema ku ew ji deştê diçêt zozanan, ew ji male xwe diçê. Wê demsalekê li zozanan bimêne û piştre ku dawîya demsalê hat, wê êdî vegerihê male xwe. Jîyane koçerîyê, li vir, rengekî din ê jîyanê ku heyî jî li vir dihêne berbîra me. `jîyane şêwînîyê´, her wusa dihêne ber bîra me. Jîyane şêwînîyê jî, aliyekî jîyane mirovê deştê ya. Mirovê deştê ê ku naçê zozanan, ku ew xwedî sawal û mal bê, wê her demsale havînê wê herê jîyane şêwînê. Temenê ´jîyane şêwînîyê´ jî li ser xwedîkirina sawalgerîyê ya.

Em ku minaqekê bo jîyane şêwînîyê bidin, wê weha bê. Minaq, li gundekî ku 100 mal bijîn, wê ew mal hemû her yekê ji wan herî kêm xwediyê kerîyek sawal ê mehan, bizinan, gayan û ankû hinekî sawalên din bin. Ew mal û ankû malbat, ji wan sawalan dabara xwe dike. Ji hîrîya wan sawalan tiştên malê û li xwekirinê çê dike. Ji şîrê wan sawalan jî, ji xwe re panîr, mast, rûn û hwd çê dike. Bi wê, jîyane xwe didina domandin. Her male ku kerîyek sawalê wê hebe, wê weke ku xwediyê dewlemendiyekê jî bê. Li vir, vê şêwîn dibê çi? Şêwîn, hinekî jî bi demsale havînê ya. Li kurdistanê, hertimî, di wê demsale havînê a germ de, şev bi rohnîyê nêvî bi nêvî rohnî dibû. Ji wê rohnîya heyvê re dihat gotin "tavaheyvê", Yanî rohnya heyvê. Ku tavaheyvê derdiket´ êdî şev wê hinekî ´sayî´ bûba. Sayîtî jî, hinekî ew rohnîya ku mirov dikarê di bin wê de bijî û pêşîya xwe bidîta dihanî ser ziman. "Bi tavaheyvê re, şêv sayî dibû." Ev gotin jî, weke gotinak xalkê bû. Digotin ku "bi tavaheyvê re şev sayî bû." Yanî bû rohnî. Dema ku bi rohniya heyvê tavaheyv dibû, êdî ku ew rohnî dibû, êdî her malê û ankû malbatê jî, kerîyên xwe yên sawalan ne dihanîna malê. "kerî, li derve dihiştin."

Minaq, li gundekî, her malek û ankû malbatek, xwediyê cihekî xwediyê ku her şev di

wan "şevên sayî" de ku kerîyên xwe ên sawalan bi şev li wir dihiştin. Ew li derve hiştina kerîya sawal, ji xwe ji wê re "´şêwîn" û ankû "kerî li şêwînê hat hiştin" dihat gotin. jîyane şêwînîyê, alîyekî din ê jîyane koçerîyê ya. Ew cihên ku kerîya sawal lê dihat hiştin jî, jê re di kurdî de "koz" û ankû "hoz" dihat gotin. Her malê, wê di her şeva sayî ya tavaheyvê de wê kerîya sawala xwe li wê hozê û ankû kozê bihişta.". Di van deman de, li mal jî, ti kesek li hundur ne dirazaha. Herkesekî ji xwe re "taxtên razanê" ku li ser dirazahan çêdikirin û ankû bi alikarî didan çêkirin, li ser wan li derve dirazahan. Ew jî, hinekî, sedema wê ji ber germbûnê bû. Lê dema hiştina kerîya sawal li şêwînê, weke dema "xwêdane sawal"an dihat bi navkirin. Ev nav jî, ji kûderê dihat? Ew jî, ji wê dihat ku "ji demekê û pêde, êdî xwêdidan sawalan" di wê demê de.

Kerîya sawalê ku li şêwînê ma, wê piştre, bi teybetî ku weke barekî li er milê wan û pişta wan bû, wê jinên kurd, rahijina wan stil û ankû beroşên xwe ên û herina nava kerîya sawal, ku di wê dema ku sawal li şêwînê ya, şîrê wê hildin û werênina malê. Ev jî, weke karekî ku di wê demê de jîyane şevê, dikir weke ya rojê bi tevger û çûnû hatin. Bi teybetî, wê hemû ahlên gund û hwd, wê bi hevdû re herin û werina. Ew bi hevdûbûna wan, ji wan re jî dibû weke xwe parastinekê û ji xwe bawerbûnekê jî.

Jîyane mirovê deştê, bi vî rengî di ahang û xwezaya xwe de didomîya. Lê mirovên ku di wê demê de diçûna zozanan jî, êdî li zozanan wê heman kar weke wan mirovên li deştê ku ne hatina zozanan wê bikiran. Wan jî li zozanan, li cihê ku lê bicihbûna, li wir ew şêwînîtî dikirin. Di wê demsalê de, şêwînîtî, weke teybetmendiya jîyanê kurdistanî a bi tevger a jîyanê bû. Jîyan, pirr bi tevger bû. Çûnûhatin, pirr zêde hebû. Ew çûnûhatin, jîyane wan bi şengûşahî dikir. Di çûyîna zozanan de, wê malbatên ku biçûyînan, wê bi komî biçûnan. Yanî, em dikarin bibêjin ku weke an nêvî aşîrê û ankû bêhtirî jî diçûn. Lê ên li şûn diman jî, ew jî, weke mirovên ku hem li male û hem jî li mal û cihên mirovên wan ên ku çûna çavderîyê bikin û lê bimeyîzênin. Di temenê jîyane koçerîyê de, bi vî rengî, divê ku em bibêjin ku bi hevdû bawerbûn pirr zêde hebû. Ji ber ku pirranîya wan li ber hevdû jidilbûn û bêbaxtî li hevdû ne dikirin. ji hevdû bi ewla bûn. Bi wê bawerîyê diçûn û divegerîyan.

Di nava jîyane koçerîyê de, bi sê-gotinan em dikarin navaroka jîyane koçerîyê werênina ser ziman. Gotina pêşî gotina ´jîyane deştê ya. Gotina duyem jî, gotina ´jîyane şêwînê´ ya. Gotina sêyem jî, gotina ´jîyane zozanan´ . Çend ku ev hersê gotin jî, di çerçoveyekê de na û wusa dihên ser ziman jî, her yekê di çerçoveya xwe de weke ku me bi gotina ´jîyane şêwînê´ re hanî ser ziman, teybetmendiyên wê yên xûsûsî û xas bi serê xwe hena ku divê ku em bi teybetî li ser wan bisekin in û werênina ser ziman.

Di çerçoveya van hersê gotinên ku me di paragrafa li ser vê de hanîn ser ziman de, wê civaknasîya jîyane koçerîyê hin bi hin xwe bihûnê û biafirêne û bijî û bidomêne. Dema ku em jîyane koçerîyê bi civaknasiya wê re baş fahm nekin, wê aliyekî fahmkirina me ya di derbarê jîyan û civaknasiya kurdistanî de jî kêm bimêne. Jîyane koçerîyê, li vir, divê ku em bibêjin ku ew civaknasiya wê, ji gelek aliyan ve em wê werênina ser ziman. Çend ku ew rengê pêşketina jîyane koçerîyê, weke rengê pêşketina destpêka şariştanîyê jî ya, lê ev rengê jîyane şariştanîyê, piştre bi pêşketinên ku di nava jîyane şariştanîyê re dibin, wê bi wan re hin bi hin qada jîyane ji rengê pêşketina jîyan û civaknasiya wê re nemêne. Çendî ku xweza ji holê dirabê û winda dibe, jîyane koçerîyê jî winda dibe. Lê li vir, divê ku em vê yekê jî bi teybetî bibêjin ku gundîtî, weke temenekî teybet ê wê jîyane koçerîyê ya. Civaknasîya jîyane gundîtîyê a bi xwezayê re,

reng û aliyekî wê jîyan û civaknasîya koçerîyê bi xwe re dihêne ser ziman û bi me dide fahm kirin. Em li vir, gotina "xalkîtîyê" weke gotina civatîtîyê hildina li dest û gotina "geltîyê" weke pêvajoyaka wê gotina xalkîtîyê ya piştre ku hin bi hin bi bajarvaniyê diafirê ku em werênina ser ziman, ew ast û pêvajoya pêşî ya bi gotina xalkîtîyê ku xwediyê xoslet û teybetmendiyên civatî ya, wê di nave wê de jîyane koçerîyê bi gelek rengan karibê xwe bijî û bêne ser ziman.

- Jîyane koçerîyê, li vir divê ku em hinekî li ser awayê wê û pêşketina wê jî rawastihin. Bi teybetî, ew civatîtîya wê ya teybet, divê ku mirov wê fahm bike û werêne ser ziman. Jîyane gundîtîyê û ankû ya civatitiyê ku mirov di çerçoveya jîyane koçerîyê de hewl bide ku fahm bike, em rengekî teybet ê jîyanê rastî wê tên. Civaknasîya jîyane civatî, bi teybet, li ser kombûnê û ahlkirin û kedîkirina sawalan û ji wan sûdgirtinê ava ya. Bi vê re, divê ku em bi temenê wê yê malbatîtî û hwd re jî werênina ser ziman. Malbat, aliyekî ku temenê wê ya. Di nava jîyanê de, çendî ku malbat, pêş dikeve, wê hin bi hin li dora wê, ev rengên pêşketinê bi demê re rû bidin. Jîyane koçerîyê jî, weke dem û ankû serdemeka pêşketina gotina malbatitiyê bi xwe re dihêne ser ziman.

Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku ya têkiliya malbatîtîyê bi xwezayê re bi başî û xort didêne û dike ku ji wê sûd bigirê û dabare xwe ji wê bike û xwe bidomêne, wê rewşên weke ên ku bi jîyane koçerîyê re ku pêş dikevin bin. Jîyane koçerîyê, ji vê aliyê ve, dema ku em lê dihizirin, em dibînin ku weke pêvajoyaka wê hebûna malbatîtîyê jî bi xwe re bisalix dike û dihêne ser ziman. Malbatîtî, hêst û ramana wê û têgihiştina wê bi teybetî û bi hişmendî û her wusa hişarîyaka mazin pêşketîya. Malbatek, dema ku li cihê xwe yê ku lê mayînda dijî, li wir male wan ya ku ji kevir û hwd bin ku hatîya çêkirin heya. Lê malbate ku diçê zozanan, wê bo ku wê rewşa xwe ya malbatî û sittera wê biparêzê, wê "kon"an ji xwe re çê bike û di bin wê de bi malbatî bijîn. Di nava jîyane koçerîyê de û her wusa di dema çûyina zozanan de, her malbate ku diçê zozanan, wê konekî xwe çê bike ku di bin de bijî. Lê jîyane di bin wî konî de, bi xwezayê re ya. Cihê ku li wan kon dihên danîn jî, ne dûrî cihên ku li wan mirov dijîn ên weke gund û hwd in. Heta ku dema ku dema jîyane koçerîyê dest pê kir, wê herêma ku li wê koçerî bibe jî, tevgerîyek çê dibe. Minaq, ew malbatên ku li dihên ku lê koçer bicih dibin, wê ji wan sûd jî bigrin. Di berdêla ku malbatek koz û ankû ´hoz´ xwe kirê bike ji malbateka koçer re, wê hirî, panîr, rûn, û hwd hilde. Her wusa, li wan cihên ku weke gund in, mirovên ku lê dijîn jî, hem bo jîyane mirovan dayîna genim û ankû ´dan´ li malbate koçer di berdêla panîr, hirî û hwd de, dibêt.

Ev rewş, wê bê alikarîyek ji jîyane wê malbate ku ew dayîn daye jî. Yanî, jîyane koçerîyê, bi vê rengê, di temenê bi hevdû re beşkirinê de jî xwediyê hin teybetmendiyna jî bû. Minaq, hin malbat, li şûna ku zêde bi sawalan ve herin û werina, wê bi çandinîyê ve herin û werin. Wê genim, nîsk, nahk, ce(h), garis, birinc û hwd wê bişandan. Bi hevdû re guharandin jî dibûn. Mirovê ku diçû zozanan, wê bi dewlemendiyeka bi hirîyê, panîr, rûn û hwd vegerihê male xwe. Ên li gundê ku ew lê dijî, malbatên ku neçûna zozanan ku çandînî jê kirina bi sawalgerîyê re, wê bi hevdû guharandin û parvakirinê li ser heyînên di destê xwe de bikin. Di vê temenê de, wê di nava jîyane wan de jî, weke ku di nava jîyane an xwezayê de ahangek heyî, wê ahangek biafirîya.

Di jîyane de, jîyane asayî, di wê ahange xwe de diherikî. Bi teybetî, divê ku em vê yekê jî, li vir ji bîrnekin û bibêjin ku herêmên ku li wan zozanî dihat kirin bi teybetî herêmên ber firatê û diclê bûn. Li rojhilatê kurdistanê ber gola ûrmîyê û herêmên din ên

weke ên xorasanê, loristanê û hwd ên avî û hwd bûn. Lê pirraniya malbatên ku derdiketina zozanan, diherikîna ber keviyên çêmên diclê û firatê. Ji ber ku ev herêmên bişînahî, avî û dewlemend bûn bi xwezaye xwe re. Sawalan, dema ku gayayê van herêmên ber çemên diclê û firatê dixwar, şîr jî bêhtir û zêdetir didan. Herêmên avî, li wan ji aliyê xwezayê ve pir zêde şînatî dibû. Ew şînatîya bi teybetî li dora kevirên diclê û hwd, ji aliyê dewlemendîya xwe de pirr zêde dewlemend bûn. Dema ku sawalan ew şînahîya dewlemend dixwar, weke ku jinaka koçer bi xwe jî digot, "şîrê ku ji wan sawalan dihat hildan jî zêdetir bû. Ev weke aliyekî giring bû. Herêmên ku li wan ji sawalan bêhtirî şîr bihata girtin, dihatina naqandin û hilbijartin. Ev herêmên bivî rengî, ji aliyê mirovê ku jîyangerîya koçerîyê dikir ve dihat zanîn. Bi vî rengî, teybetmendîya xwezayê jî weke xosletekî wan ku dizanîn. Her koçerekî asîl, ji cûreyîn şînahîyan bigra û heta ku digihişt herêmên avî û ên bi gaya, dizanî. Cûreyên gayayan bi xosletên wan re dihanîn. Li kurdistanê, bo vê yekê, yekê koçer, gelek navên gaya û rengên wê bi wê re hebû. ´Gayayê nefelê´, û hwd, reng û cûreyên gaya bûn. Di nava jîyane xwezayê de, wê kîjan cûre gaya ji aliyê mirovan jî bihata xwarin, ew jî dizanîn. Minaq, weke raşalê, xaldel, parpar, gûriz, tolik, kereng, qîfar, komik û hwd, bi gelek cûreyên wan re dizanîn û bikardihanîn. Her wusa, kîjan cûre wê bo wê sawalan jî baş bûba jî, ew dizanîn. Ji ber ku hinek cûreyên gaya hebûn ku şîr zêde dikirin û hinek jî hebûn ku kêm dikirin. Yekî koçer, ev pirr baş dizanî.

Di nava jîyane koçerîyê de, ev aliyên wê û hê gelek aliyên wê ên ku hena û hebûn, temenê wê jîyane bi xwezayê re û her wusa bi domandina jîyane wan re hebûn. Jîyaneka serdest û serfirez, di nava xwezayê de bi zanîna van zanîna re hebû. Bi teybetî, hinekî jî, ev zanînên xwezayî, bihizrî û hwd di temenê jîyane wan de bûn. Bo vê yekê, divê ku em li vir bibêjin ku dema ku bi başî jîyane koçerîyê fahm bikin, emê di derbarê têgihiştin û hizra xwezayê de jî bi zanebûn bin. JI ber ku ev aliyekê wê yê ku jê sûdgirtinê ya weke jîyane sawalgerîyê û hwd. Li vir, ya ku em di serî de di nava jîyane koçerîyê de di serî de dibînin ew a ku di nava jîyane malbatî û bi wê re pêşxistina jîyane sawalgerî û têkiliya wê ya bi xwezayê re mirov bi awayekî pirr baş dibînê. Ev alî û gelek aliyên din di temenê wê malbatê de na. Me di hundurê paragrafa xwe bahskir û got ku bi ´hizrî, xweza di temenê jîyanê de ya.´ Ji vê gotinê em gav biavêjin û bênina ser ziman, mirovê koçer, zimanekî wê yê pirr dewlemend hebûya. Her wusa, di wî zimanê wî de biqasî û nav û gotinên xwezayê ên ji jîyane zozanan hebûn, bi heman rengî û wilqasî jî ji jîyane deştê û hwd hebûn. Yanî, ew yekî ku bizanebûn jî bû. Di naskirinê de jî li pêş bû. Bo vê yekê, weke kevneşopîyeka civatî jî bû, wê di dem û demsale jîyane zozanan û ankû ya jîyane şêwînîyê de, wê mirovên ku bi koçerî hatina wê herêma ku ew çûnê de û mirovên ku ji wê herêmê bixwe na, li hevdû li civate hevdû dirûniştin û bi hevdû re parve dikirin. Ji vê aliyê ve jî, parvekirin û heyîn û dewlemendîyek hebû.

Li kurdistanê, gotina "civatê", weke gotinaka pirr giring û bingihîn a. Mirov, hertimî diçûna civate hevdû û di bin rohnîya çîrayê û hwd de, li hevdû dirûniştin û bi hevdû re diaxiftin û didanûstandin. Car bi car, ji piçûkan re dihat gotin ku "herin û li civatê rûnihin, da qana win jî çend gotinan bi aqil ji ên mazinên xwe bigrin." Ev weke gotinaka xalkê jî bû. Her wusa li ser vê rewşê û gelek rewşên din ên civatê gotinên ku hatina gotin û di aqilan de mana hena.

Mirovan, ku em weke teybetmendiyekê werênina ser ziman, hevdû nas dikirin. Ji ber ku dema ku çûyina malbatekê li zozanan dibû, wê dûbare gelek caran biçûya li

cihekî. Êdî bi wê rengî, hevdû weke ahlê hevdû nas dikirin. Hevdû naskirin, bi wê rengî, aliyekî giring bû. Jîyane koçerîyê, ji ber ku hertimî li gorî demsalê dibû, êdî ew demsale wan li kurdistanê pirr bitevger di buhurt. "Demsala çûna zozanan", weke demsalaka ku giring û bi tevger bû. Di wê demsalê de, herkesek bi tevger bû.

Di nava jîyane koçerîyê bixwe de jî, ku em bahse malbatên ku diçûn koçerîyê bikin, em divê ku wan malbatan bixwe jî li du beşan beş bikin. Beşek ji koçeran, bi şîvanî bû. Beşek jî ne bi şivanî bû. Beşa ne bi şivanî, beşa komî a ku bi hevdû re dijîn bûn. Lê aliyê jîyane koçerîyê ê şîvanîyê, weke aliyekî pirr zêde ê ku li berçav bû. Bi sawalan ve çûyin û hatin, bi malê ve çûyin û hwd, aliyê ku zêde li berçav bû. Lê di bin konê koçeran de, civat jî, hertimî bi mazinên wê civatê re li dar bû. Mazinên civatê, ên ku rêşanî didan bûn. Di nava civatên ber diclê û firatê de, bi teybetî jî di nava civate kurd de, ji rêz û hûrmeta ji mazinan re, pîr û kal, weke çînaka serwer û rêvebir, hertimî li pêş bû. Di nava jîyane koçerîyê de jî, ev yek û alî hebû û li pêş bû.

- Jîyane koçerîyê, divê ku em bibêjin ku jîyaneka ku em divê ku bi rengekî teybetî wê werina ser ziman a. Jîyane koçerîyê, çend ku wê weke di nava jîyane şariştanîyê de û bi teybetî jî di demên destpêkê ên pêşketina jîyane şariştanîyê de pêş bikevê hin xosletna bi xwe re bide nîşandin jî, em nikarin bi tememî bi vê werênina ser ziman. An jî, ku em werênina ser ziman, weke ku ew hanîna ser ziman kêm dimêne. Li vir, dema ku em di nava jîyane şariştaniyê de li jîyane koçerîyê dihizirin, em bi awayekî dibînin ku weke ku di nava jîyane şariştanîyê û bi demê re bi pêşketin û pêşveçûna wê re peresendin bi wê re çêbûbê, rewşek û awayekî bi hîseka xort bi mirov re çê dibe. Ji vir, em ji vê gotina "weke ku di nava jîyane şariştaniyê re peresendin bi wê re çêbûbe", ji wê destpê bike û aliyê wê yê di nava jîyane şariştanîyê de ku pêş dikeve werênina ser ziman. Bi vê yekê re, wê êdî weke ku beşeka wê were ser ziman. Lê wê aliyekî wê ê peresendî û pêşketî were li holê û li berçav.

Jîyane şariştanîyê, em ku di çerçoveya wê de lê dihizirin, em dibînin ku di wê de bi xal û destûr û hwd, di wê de pêşveçûn û pêşketin bi hizrî û têgihiştinî dibêt. Ev aliyekî ku em bi teybetî li vir kifş bikin a. Lê li vir, dema ku em vê aliyê jîyane koçerîyê hewl bidin ku werênina ser ziman, weke ku em demeka wê ya pêşketî dihênina ser ziman. Her wusa, ew aliyê, wê di xwe de hizirîya û bi wê hizirkirinê kifşkiriya ku wê di nava jîyane şariştanî de çawa bijî. Lê li vir, teveger û ankû kevneşopîyên adetî ên vê jîyane ku hena, em dibînin ku weke ku bi wê pêşketina di nava pêşketina bi jîyane şariştanî re ku di nava nakokî û weke ku hinekî jî di nava li berxwedanekê de na. Ev jî, weke aliyekî din ê ku em bi teybetî wê kifş dikin a. Bi mejî, kifşkirin û serdest bûn, bi koçerîyê re pirr zêde heya. Heta ku ez dikarim bibêjin ku ji mirovekî zêde ên di nava jîyane şariştaniyê de ku dikarê jîyane xwe ya malbatî bide domandinm ji wê zêdetir têgihiştin, serwerî û hizirbûn heya. Li vir, ji vê yekê, em fahm dikin ku pirsgirêk, ne tenê ev alî ya. Ji wê zêdetir, Mejiyê mirovê koçer, xwediyê awayekî xwe yê pêşketinê ê teybet a. Ew jîyane xwe li gorî xoslet û hizirkirinên xwe ên di serê xwe de dike. Li vir, divê ku em ji bîr nekin ku ji dema ku mejîyê mirov bi dest girtina aqil û zanînê û hiş kir û pê de, xêveke me afirîya û di wê de zanîn levdigihijê hevdû. Ev jî, di aslê xwe de, temenê wê keseyetîyê ji gelek aliyan ve bi pêşketina wê re diafirêne.

Ji vê yekê û rengê, mirov fahm dike ku di mejî û ankû xêva mirovê koçer de, ji ya ku em dizanîn zêdetirî, dem û pêvajoyê pêşketî û buhurî hena. Bi vê yekê re, bi wan pêvajoya û zanîna wan re, serwerî û kifşkirina rêya jîyanê a di wê re çûyinê dide

kifşkirin. Hin xosletên ku di dema jîyane şariştaniyê de ku koçer bi xwe re dijî, ew a ku xolsetên wê jîyane demên berî dema şariştanîyê ku weke ´dema neolîtîk´ jî dihê bi navkirin, bi wê re dihê li holê û bitevger û kevneşopîyên jîyanî ên bi wan dijî re xwe dide li berçav. Bi du awayan bisereke em kifş dikin. Awayek, di nava jîyane wê de bi serdestîbûn û kifşkarîya jinê re mirov kifş dike. Aliyê din jî, her wusa bi rengê jîyandinê ê ´ji deşt çûyîna zozanan´ û ´ji zozanan vegerîna li deştê´, bi wê re dihê li berçav û mirov kifş dike. Ev alî, ji demên berê ve xwe bi rengê xwe dide domandin. Teybetmendiya peresendina jîyane koçerîyê ew a ku li gorî xosletên xwe û bi xwe re di nava xwe re wê peresendinê dike. Xwe li gorî derve danê rastkirin. Xwe li gorî hundurîn û jîyane xwe û hwd, dide kifşkirin.

Rengê jîyanê ji vê aliyê ve divê ku mirov bi teybetê li ser bisekinê. Koçerî, jîyane wê bi teybetî, pergaleka wê ya jîyane a bi xwezayê re heya. Di aslê xwe de, ku hêza jîyane koçerîyê gihiştiba ser ya jîyane şariştanîyê re, wê êdî wê li gorî wê xwezaya hewirdora wê bi peresenda û bide jîyan kirin. Lê ew hêza wê ji wê bixwe re têrê kirîya. Di nava jîyane şariştaniyê û pergale wê de karîya ku bi rengê xwe yê ku em dikarin bi pergale wê ya jîyanî re bênina ser ziman, jîya ya û xwe domandîya. Têgihiştina klîşa ya jîyane şariştaniyê, ew a ku bicihbûn wê bibe û wê ew bicihkirin heta dawiya jîyanê bê dayîn domandin. Dervî wê derketin wê nebê. Lê koçer, derketîya dervî wê. Dibêt ku aliyê koçer ê herî şoreşgerî jî ev bê li ber wê jîyane şariştaniyê.

Mejiyê mirovê koçer, bi tememî ne weke yê mirovê ku di nava jîyanê deştê di çerçoveyê de dijî û dernekeve dervî wê ya. BI vê rewşa xwe re, di aslê xwe de, mejiyê mirovê koçer, derdikeve ser ya mirovê di nava şariştaniyê de. Çerçoveyeka mejiyê mirovê koçer heya ku dikarê xwe derxe ser asta dema xwe ya şariştanî jî. Ya ku em li vir, dibînin ev a. Ji vê teybetmendiyê ya, ku di jîyane xwe de jîyane bitememî li gorî xûyên jîyane şariştaniyê nadê kifşkirin. Ew jîyane xwe dixwezê ku bijî.

Banekîyên jîyane koçerîyê, li vir, bi reng û xûyên xwe re ku em dibînin, di temene ahangekê ku di nava wê jîyane şariştanî û xwezayê de ya. Bi wê dijî. Bi wê, pirr zêde bi têgihiştin û fahm a. Nas dike. Di wê çerçoveyê de jî, fahm dike. Rengê hizirkirin û fahmkirinê di wê çerçoveyê de bi xwe re diafirêne. Ev rewş û rengê jîyane koçerîyê ku mejiyê mirovê koçer bi pergal dike, weke ku hin xosletên dema neolîtîkê û ên dema şariştaniyê dike nava hevdû de û bi hevdû re bi jîyane xwe re wan dijî. Xûyên jîyane mirovê koçer, di xwezatîya jîyane neolîtîkî de ku di dema jîyane şariştanî de dijî ya. Yanê, weke ku hevgirtinek(sentez) di nava xûy û tevgerên wê de jîyane dema berî şariştanîyê û ya dema şariştaniyê de hatibê çêkirin heya.

Di nava jîyane koçerîyê de, du lingên wê ê giring şivanî û malbatîtî ku bi hevdû re dijî, em dibînin ku weke ku di wê temenê de bi xwezayê re dimeşê. Di nava jîyane şariştaniyê de, teknîk û hwd û xûyên nû pêş dikevin. Lê mejiyê mirovê koçer, tenê di temenê bi awayakî xweza de ji wê bi wê jîyane dihizirê. Aliyê jîyane koçerîyê ê ´jîyane deştê´, aliyê wê yê jîyane şariştaniyê ya. Aliyê wê jîyane zozanan jî, aliyê wê jîyane dema berî şariştaniyê bi xwe re dihêne ser ziman. Bi vê yekê re, em divê ku çerçoveya gotina ´zozanan´ û ankû ´jîyane zozanan´, hinekî jî, di dema jîyane şariştaniyê de bi jîyane dema neolîtîkî û hwd re bê, divê ku mirov bi wê re jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de deştê û ankû jîyane şariştaniyê û jîyane jîyane zozanan, di çerçoveya jîyane koçerîyê de bi pergale dibe û digihijê ahange xwe ya jîyanî.

Çerçoveya jîyane koçerîyê, çerçoveya xwezaya. Bi wê re û di nava wê de,

cûdahîyeka giring heya ku xûyên wê bi yên jîyane şariştanî re di nava nakokîyê û hwd de na. Her wusa, serdestîya jîyane jinê di nava jîyane koçerîyê de û di xwezayîya wê de, bi nava jîyane şariştanîyê re weke aliyekî levnakê ya. Her wusa, çerçoveya jîyane şariştaniyê, bi rengê hizirkirinê ku ev bi olî bê û ankû bi awayê din bê, hatîya hizirkirin û rastkirin. Derketina dervî wê tûna ya. Lê Mejiyê mirovê koçer, tenê di hundurê wê de najî. Ew bi xosletên xwe re dijî. Di vê çerçoveyê de, ku mirov dihizirê, mirov dibîne ku mejiyê mirovê jîyane şariştaniyê xwezatîya xwezayê ya bi xwe re najî. Lê mejiyê mirovê koçer wê dijî. Mejiyê, mirov jîyane şariştanî, weke ku di çerçoveyekê de hapskirî de bê, ya. Ev bi demên piştre ên bi pêşketina jîyane şariştaniyê re û ku hin bi hin ew jîyane şariştaniyê beyenîbûnê bi xwe re û di nava jîyane xwezayî ya civatî de çê dike de dibêt. Lê yê mirovê mirovê koçer, dervî wê ya û dijî bi xwezayê re. Di vê çerçoveyê de, ku mirovê koçer, dikeve nava jîyane şariştanî de, weke ku winda bibe lê tê. Weke ku ji rastîya xwe dûrketî lê tê û wusa xwe hîs dike. Di wê temenê de rewşeka beyenîbûnîyê bi mejiyê xwe re di nava wê jîyane şariştaniyê de dijî. Ev hêsta beyenîbûnê, weke hêstaka ku sînorê di nava herdû jîyanan de jî dide nîşandin a jî. Mirovê koçer, bi jîyane xwe re karî ku bi serdestî bijî li deştê û zozanan jî. Bi wê rengê, hevgirtin(sentez) di nava jîyane deştê û ya zozanan de çêkirîya. Bi wê re bi xwezayê re bi herdûyan re dijî. Dema ku dikeve nava jîyane şariştanîyê û sînorê wê de, weke ku aliyekî mejiyê xwe winda kiribê lê tê.Teybetmendiyên di nava jîyane deştê û ya zozanan de, di aslê xwe de, nakokîya mirov ya di nava xwezayê û jîyane şariştaniyê de jî bi xwe re dihêne li berçav.

-Di dema jîyane neolîtîkê de, dema ku bahse têkiliyên jin û mêr ên bi hevdû re ku zayandî bê û ankû rengên din bê, di temenê xwezayetîyê de dihê ser ziman. Ya jîyane koçerîyê de jî, rengekî rewîstî ku e dikarin bi gotina rewîsta jîyane xwezayî werênina ser ziman re heya. Temenê wê li ser ajoyê dihê rûnandin û dihê hanîn li ser ziman. Di têkiliyên zayendî de ajo û xwestek, bi hîsê re li pêş a. Ev weke aliyekî giring ku temenê têkiliyê diafirêne. Lê dema ku em di çerçoveya pergale xwezayî a jîyane koçerîyê re ku mirov lê dinerê, mirov dibînê ku ew têkilîya di nava zayendan de bê û ankû bi xwezayê re bê, hatîya bi zanîn kirin. Her mirovekî koçer, weke fîlosofekî xwezayê bû. Wusa di derbarê xwezayê, û jîyane xwe ya civatî de bi hevdû re di têgihiştinê de bû. Pergale wê jîyane civatî bi xwezaye re ava kiribû bi rê ve dibir. Jîyane koçerîyê, jîyaneka ku xwezaya xwe têgihiştî ya bi wê têgihiştinê re civatîtîya xwe afirandîya bi rê ve dibêt. Zanîna di derbarê xwezayê de, kirîya ku ew lê serdest bibin. Bi vê yekê re, divê ku em bibêjin ku ew lê serdest in. Li ser wê serdestbûnê re jîyane xwe ya civatî pêşxistina. Hinekî jî, teybetmendiya sereka a têkiliya di nava pergale koçerîyê de ev a. Civatîtî û nirxên wê bi rewîstîyeka ku bi aqilê xwezayê hatî şiştin heya.

Ew rengê têkildanînê ku di temenê wê de ajo û bi ajoyê re xwestek û hîs heya, wê bi jîyane koçerîyê re bi rengê hiş û zanînê re derkeve li ber me. Di vê rengê, weke ku pêvajoyna peresendinê hatibibina jînkirin rewşek û rengekî aqil derdikeve li ber me. Em di serî de, vê yekê û aliyê bi rengê jîyandina koçerîyê de dibînin. Weke ku xateka bênavber bi jîyanî bi wê re jîya bê û dem bi dem çi pêşketin û pêşveçûn bi wê re jîya na, ew jî hin bi hin bi demê re di nava jîyane de hatina hevgirtinkirin(sentez) û bi wê re rengê demên nû ên jîyanî hatîya afirandin. Ev rewş û rengê em kifş dikin bi jîyane koçerîyê re, têgihiştinekê bi me re dide çêkirin ku destpêkeka vê jîyanê û rengê wê ji dema jîyane neolîtîkî û hwd ve bênavber û lê ku bi demê re dem bi dem xwe ji nû ve bi

hevgirtinên nû afirandîya, em wê kifş dikin. Ev rewş, êdî di şîrovekirinê de, bi teybetî nêzîkatîyekê li vê jîyane teybet û pergale wê ya ku heyî ji me dixwezê ku em bikin.

Jîyane koçerîyê, ne rengekî jîyanî ku çend mirovan hatîya cem hevdû û afirandina û derxistina li holê. Ji xwe, ji aliyê têkilîyên navxweyî ên wê ên zayendî, rengê jîyane wê ya bixwezayê re û her wusa bi rengê hizirkirina wê re mirov vê yekê kifş dike. Rengê hizirkirina wê, di nava jîyane şariştanî de, ku xwezatîyê esas digirê ya. Bi wê re pêş dikeve ya. Ev jî, aliyekî giring a ku divê ku mirov wê hilde li dest a. Hişmendiya jîyane xwezayî, li vir, mirov wê bi teybetî kifş dike.

Temenê jîyane koçerîyê, ji aliyê têkili û têkildanînê ve jî, têkiliyeka teybet a. Bi teybetî, weke ku î ro, kurd bixwe jî di nava xwe de dihênina ser ziman, "aşîrî" ya. Temenê vê gotina aşîrî ku em wê komîtîya jîyane koçerîyê bi wê dihênina ser ziman li ser esas û temenê xizmtiyê bicih û ava ya. Her wusa, di têkiliyên xwe de, dema ku em li rengê dinerin, çendî ku ji xwezayê re vekirî bê, wilqasî jî, dihê li berçav ku ji jîyane derve a şariştanî re jî bi têkiliyên xwe yên navxweyî re girtî dihê ditin. Bi vê yekê û rengê, car bi car, di nava civatên kurdan de jî, ku bahse wê dihat kirin, dihat gotin ku "koçer, têkiliya wan tenê di nava wan de bi xwe re heya," Wateyake vê gotinê ya bi demê re û demdirêj heya. Di nava jîyane koçerîyê de wê koçer, bi wan têkiliyên xwe yên navxweyî, wê têkiliyê dêne, wê temenê daberekirina jîyane xwe ya malbatî biafirêne û her wusa wê bi têkilî bê. Ji nava jîyane şariştanîyê ve ku li rengê jîyane koçerîyê dihat nerin, weke komeka ku têkiliya wê tenê di nava xwe de heyî û bi dervî xwe re ti têkiliya wê tûneyî dihê li berçav. Çerçoveya aqilê jîyanî ê şariştanî, ji wê re û ji jîyane koçerîyê re û her wusa ji mejiyê mirovê koçer re weke ku tang were, rewşek jî bi wî re derdikeve li holê û dihê li berçav.

Li vir, di aslê xwe de, jîyane koçerîyê, divê ku em bi têkiliyên wê yên navxweyî û hwd, ku temenê wê li ser xizmtî û malbatîtîyê ava ya re, bênina ser ziman. Têkiliya navxweyî ya jîyane koçerîyê, bi awayekî hîyererşîkî, ji binî ve, ji têkiliya dê, bav û zaro û heta ku digihijê ya êlî û hwd, bi xizmtiyê heya. Hevdû nas dikin. Heta ku zawacên ku dibin ya ji nava komê bixwe na û na jî ji komên xizm dibin. Ev jî weke aliyekê din ê teybet ku mirov dikarê werêne ser ziman a. Koçerî, li vir, weke pergaleka ku temenê wê li ser jîyane xwezayî û xizmtiyê ya, di vê temenê de bi jîyane civatî re di çerçoveya xwe de dijî. Çerçoveya wê ya teybet, heya. Em nikarin bêjin ku di çerçoveya gişt a civatî de dijî. Lê wê çerçoveyê jî, înkar nakê. Têkiilîya jîyane koçerîyê ya bi wê re jî, em dikarin bi aliyê wê ´jîyane deştê´ re bênina ser ziman.

Jîyane koçerîyê, jîyaneka pêşketî a xwezayî ya. Bi têgihiştin, hişmendî û hizir a. Rengê pergale wê ya ku heya jî, weke rengekî pergalî ê jîyane dema berî demên şariştaniyê ku di dema şariştaniyê de bi hiş û zanîn hatîya kirin, di çerçoveya wê hiş û zanînê de êdî destûrên wê bi jîyane civatî re dihên jîyandin û domandin. Rewşeka bi vî rengî, em bi teybetî kifş dikin. Jîyane koçerîyê, li vir, weke gotinaka bi nakok jî bê, divêê ku em bibêjin ku bi axa xwe ve girêdayî ya. Her mirovê koçer, xwedî war a. Di wê çerçoveyê û sînorê de jî dijî. Em divê ku vê yekê jî bi teybetî werênina ser ziman.

Pirsgirêka mirovê koçer ya bi jîyane şariştaniyê re, di temenê sînorê kifşkirî ê zihnîyetî de ya. Çerçoveya şariştanî û civaknasiya wê ya ku heya, em divê ku bibêjin ku koçer, li ser wê re dijî. Mirovê di nava jîyane şariştaniyê de ku bi mejiyê ve û bi hişê ve di çerçoveyekê aqilî de dijî, dema ku di çerçoveyê de rêz tê mirovê koçer, mirovê koçer em dibînin ku ew di çerçoveya pergale xwe ya ku bi xwezayê re dijî wê çerçoveya

şariştanî dike nava wê de dijî.

Çerçoveya jîyane koçerî ku li warê xwe şert û mercên hewayê jî bi demsalî esas digrê û bi wê re jîyane civatî dijî, ku em wê fahm dikin, em dibînin ku ev jîyane koçerî, bi serê xwe weke ku xwediyê pergelaka teybet a giştî û têgihiştinî ya. Civatîtîya vê jîyanê bi aqilê xwe re û hişmendîya xwe re, weke şariştanîyek bi serê xwe di nava xwe de dijî. Divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî kifş bike. Jîyane wê, jîyane bi tevger û bixwezayê re ya. Pêdivî û pêwîstînîyên xwe, bi xwe û bi aqilê xwe kifş dike û her wusa bi wê re di temenê civatîtya xwe de pêş dikeve. Ev aliyekî giring ê xwe afirandina vê jîyane teybet a. Dîroka vê jîyane teybet, em bi hezaran dikarin werênina ser ziman. Yanî, bi hezaran xwe dewrûdayîm kirîya û afirandîya û bi deman re daye domandin. Di vê çerçoveyê de, di aslê xwe de, dema ku em hewl bidin vê jîyane bi hemû aliyên wê re fahm bikin, emê bi şûnpêyên wê re heta dema neolîtîkîyê herin. Bi wê re, ji wê dema neolîtîkîyê û piştre bi jîyane şariştaniyê re çawa xwe ji nû ve dem bi dem afirandîya û daye domandin jî, emê kifş bikin. Di vê temenê de, dem bi dem teybetmendi û xosletên vê jîyanê û rengên wê ên teybet hena. ...

. **Ji dema Hûrî û Mîtannîyan** û heta ku dem tê demên piştî zayinê, wê bi awayekî pêşketina li berdiclê û firatê xwe bide domandin. Nirx û çanda van deman, bi têgihiştin û rengê pêşketina wê re bandûra wê li hemû pêşketinên piştre dibêt. Li herêmê, pêşketina van deman, bi kok a. Di wê demê de navê navenda van pêşveçûnan weşokanî bû. Î ro jî, serêkahniyê ya. Ti pêşketinên ku li herêmê dibin, nikarin vê bandûra van deman înkar biikin. Bo vê yekê, divê ku mirov van deman, weke demna kifşkar bo demên piştre jî bêne ser ziman. Li kurdistanê, bi teybetî li ber diclê û firatê, wê ev çand ib kok hebûna xwe piştre jî bide domandin. Piştî demên Mitannîyan, wê Dema Medîya û hwd, li ser vê temenê pêşbikeve. Wê Medîya, vê nirx û dîrok û xatê esas bigrê û pêş bikeve. Ev, wê bi xwe re kifşkarîya demên hûrî û mîtannîyan bi teybetî bide kifşkirin. Dema Medîya, weke demeka hevgirtî ya ku nirxên vê demê ku bi xwe re pêş dixe mirov dikarê wê werêne ser ziman. Dema Medîya, weke demeka hemdem a herêmê ya. Medîya, wê nêzîkatîyên împaratorî ku hena, wê wan jî, ji nû ve bi xwe re û bi pêşketina xwe re bigihêne şîroveyeka nû. ´Konfederelî´, weke rengekî pêşketina rêveberîya Medîya mirov dikarê werêne ser ziman.

Ev, dide nîşandin ku li herêmê gelek nirxên ji hevdû cuda hena û bi hevdû re û di rex hevdû de dijîn. Her wusa, di nava hevdû de jî dijîn. Medîya konfederelîya wê çê dike. Bo vê yekê, ew rengê konfedelîya ku li rojavayê kurdistanê bi rêveberîya wê ya ku derket li holê, ji vê aliyê ve ku mirov lê binerê, mirov dikarê bibêje ku temenê wê heya. Li vê herêmê, gelek xalk jîyane û hebûna xwe parastina. Şer li dijî hevdû şer nekirina. Di dema mîtannîyan de, wê rêveberîya hîttîtî bike û bixwezê ku bi hêza xwe herê herêmê. Bi vê yekê, şerekî desthilatdarî li herêmê dide meşandin. Lê li herêmê, wê nikaribe ku wê bijî. Piştî wê re, bi heman rengî, îskenderê zûrqerneyn, ê ku kurdan navê "zûrqerneyn"tiyê lê kirîya, wê bixwezê ku were herêmê û serdest bibe. Tê jî, gelek komkujiyan jî dike. Ji aliyekî ve dikeve herêmê û di aliyê din ve derdikeve. Lê dîsa nikarê wê serdestî û desthilatdarîya ku wî dixwest li herêmê bi xwe re pêş bixe. Bi teybetî, bo ku mirov van aliyan fahm bike, divê ku mirov rengê pêşketina herêmê baş bizanibê.

Di dema Medîya de, wê Medîya wê rewşê baş fahm bike. Ji ber ku Medîya newîyê wê kevneşopîyê ya. Bi wê re jî pêş dikeve. Medîya, di hundurê demeka wele 80 salî de, wê bê rêveberîîyek herêmî a împaratorî. Temenê wê heya. Rengê têgihiştina ku di temenê wê de heya, Ew rengê têgihiştinê a Mîtra ya. Li ser wê xate re wê Zerdeşt were. Çend ku Mîtra û rengê têgihiştin û bawerîya wî, bi gotina "yazdan" û bawerîya wî re "yekîtîyekê" çê dike û li ser wê re temenê pêşketina Medîya diafirênê, bi heman rengî, wê Zerdeşt jî, bi rengê têgihiştin û pêşketin û hizrên xwe re, wê temenê pêşketinên weke Sasanîyan bi rêxistin bike. Li ser wê re, êdî wê li herêmê hevgirtinekê bide çê kirin. Ew rêxistinîtiya ku li ser gotinên Zerdeşt re dibe, wê Sasanî û hwd ancama wê bin. Her wusa, di dema sasanî de Manî tê. Bi wê re dem bi dem ev pêşketin hebûna xwe didina jînkirin û domandin. Sasanî, wê desthilatdarîyek herêmî bê. Her wusa, ji nava xwe ve weke di rengekî konfederelî de ya. Lê dema ku mirov ji derve lê dinerê, weke împaratorîyek mazin ku bi rêveberîyek tenê ya. Her wusa, ev rengê pêşketina wê, wê li herêmê xwe bide domandin. Sahên sasanî, çendî karîna ku wê ahangê(balanse) fahm bikin û bidina girtin, karîna ku desthilatdarîyê bikin û bidina domandin. Di vê temenê de Sasanî, rêveberîyek xwedî teybeta ku hem teybetmendîyên demên berî xwe di xwe de dihawêne û hem jî hin bi hin teybetmendîyên demên piştî wê re ku wê werin derdixe li holê. Bi vî rengî, weke desthilatdarîyek navberê ya. Weke desthilatdarîyek buhurînê ya. Di vê demê de, piştî wê re ola îslamê tê herêmê û pêş dikeve. Ola îslamê, wê bi rengekî cuda pêş bikeve. Wê, bi wê pêşketina ola îslamê a zû, wê şariştanîya kurdan û şariştanîya farisan bikeve nava tengezerîyek mazin de. Di ddestpêkê de ku weke şîroveyek îslamê jî ya, bi şîîtîyê wê hewl bidin ku çareserîyê ji wê tengezerîyê re bibinîn. Lê ev têrê nake. Ji ber ku farisan di temenê wê şîîtîyê de hin bi hin di demên ppiştre de nîjadperestî pêşxistin û ev jî bû temenê tengezerîyên demên piştre jî.

Kurdan, di vê demê de rewşa wan hê xirabtira. Li rengekî îslamê ku bi gotina "şafîtîyê" re şîrove kirin. bi wê re jî, xwe jîyandin. Lê piştre hin bi hin çanda wan bi şûn ket. Kurdan, teybetmendîya wan, ew a ku hertimî giringî dane pêşketina têgihiştin û çandê. Bo vê yekê, dema ku bi awayekî şîroveyên îslamê ên dijî rengên çandî û hwd derket li holê, wê bandûra wê pêşî li kurdan bibe. Lê çend ku kurd xort karina ku wê tengezerîya xwe bi buhurênin. Her wusa, wê kurd, heta sadsala 15´min a piştî zayîna îsa, wê karibin bi awayekî hebûna xwe û pêşketina xwe li gorî ku ew dixwezin wê bidina domandin. Çend ku gelek pirsgirêkan dijîn û hêrîş li wan dibin jî, ev dibêt. Desthilatdarîya Eyûbîyan, li gorî wê çanda kurd a. Navenda wê jî rojavayê kurdistanê berfiratê ya. Rêz û hûrmeta li cihêrengîyan di çanda salahadinê Eyûbî û xanadana eyûbîyan de hebûya. Bi vê yekê û rengê, çend ku desthilatdarîya eyûbîyan a kurd, çend ku weke desthilatdarîyek îslamî ya, wê karibê, ahangekê di nava rengên cuda ên civatê de bide girtin. Li rojavayê kurdistanê bixwe jî, bawerîyên cuda hebûna xwe dijîn. Ev rewş hemû li kurdistanê, wê heta sadsale 15´mn û hwd, hebûna xwe bide domandin. Lê pirsgirêk, bo civate kurd, wê ji sadsale 15´min û pê de, wê destpê bikin. Bi şerê çardiranê re wê bibe. Ev şer, wê li kurdistanê bibe. Di wê şerî de, wê kurdistanê were qatkirin li dûyan. Her wusa, ew dûqatîtî jî, wê bi civatî jî bibe.

Duqatîtî, wê hin bi hin rengên cuda ê bawerîyê jî pêş bikevin. Lê piştî van deman re li aliyê Îranê wê desthilatdarîya serdest a sefewî, wê hin bi hin kurdan ji herêmên wan

bide goçberkirin bo ku li rojhilatê kurdistanê xwe serdest bike. Desthilatdarîya sefewîyan, temenê wê şêxê kurd şêx Seyfeddînê Erdebilî çêkirîya bi tarîqate xwe re.Heta ku demenê navî wê jî li demên wê ê destpêkê ketîya. Lê piştre, wê hin bi hin kurd werina bi şûn xistin. Heta dem tê demên şahên sefewî ên weke şah Aabbas û hwd. Di dema Şah Abbas û hwd de pirr zêde dijberî li kurdan dihê kirin. Piştre jî, wê dem bi dem ku kîjan şah tê dewsa wî, wê heman politikayê bide domandin. Êlên kurdan wê bên qatkirin, her aşîreka wê, wê bê şandin li herêmekê. Bi vê rengî, êlên kurdan ku temenê pêşketina rêveberî û desthilatdarîya demê a kurdan in, wê bên qatkirin û ji hevdû felişandin. Ev rengekî bêbandûrkirina kurdan a. Dema ku em li rewşa êlên kurd dinerin, em vê yekê baştir fahm dikin. Ev rengê ji hevdû felişandinê, divê ku mirov hinekî lê binerê, bo ku mirov politikayên wê yên piştre fahm bike. ..

**-Li ser** rewşa êlên kurd ên ku ji sadsale 15´min û pê de ku ji rojhilatê kurdistanê hatibûbûna goçberkirin li cihên din ên Îranê: Kurdên xalxal û dilêmanê, li rojhilatê kurdistanê dijîn. Lê xwediyê dîrokeka demdirêj û bieş in jî. Dema ku mirov li dîroka kurdan dinerê, bi teybetî, rewşa **kurdên xalxal** û **kurdên dilêmanê**, dîmenekî vekirî didê me ku em fahm bikin. Kurdên xalxal jî û kurdên dilêmanê jî, kurdîya wan ya ku pê diaxivin kurmancî ya. Ev bi serê xwe, di derbarê pêşketina zimanê kurdî de jî hinek têgihiştinna bi demê re bi me re dide çê kirin. Î ro ku em di zanîn ku Zerdeşt ji kurdên herêma hewramanê ya, dema ku em hewl didin ku avesteya wê fahm bikin, em rastî rengê pêşketina bi kurmancî re tên. Rengê heyîna demografîya civate kurd a li rojhilatê kurdistanê hem ji aliyê axiftina ziman û zaravayên wê ve û hem jî ji aliyê civatî û komî û aşîrîyên vê, giring a ku mirov wê fahm bike.

Dilêmanê dikeve bakûrê Îranê de. Kurdên Dilêmanê, weke kurdên xalxal ku di dema Şah Abas de ku weke ku ji herêmên rojhilatê kurdistanê ji rojava Ûrmîyê, Mihabadê, Kirmaşanê û hwd, ku bi aşîrî hatibûbûna sûrgûn kirin li herêmên li nêzî tahranê ên weke Weramînê û hwd, bi heman rengî di wê demê de rewşek hatîya hanîn serê kurdên dilêmanê jî di wê demê de. Kurdên dilêmanê, li pirranî li herêmên parêzgeha Gîlanê, li şehristanê Rûdbar û li dora Ameranlû û li dora herêma şehristanê ku dikeve li aliyê Siahkal li dora Deylamê û li şehristanê Rûdsar û li dora Rahimabadê hatina belav kirin. Ev jî, di çerçoveya planakê de hatîya kirin. Kurdên ku hatina goçkirin li van herêman jî, li van herêman jî rehet ne hatina hiştin. Her weha li dora Mazenderan jî û dora bajarê Sarî jî kurdên ku bicih hena. Ev kurdên van herêman jî bi kurmancî axifin. Li hewirdora Nowşar jî êla kurd a Lek´î ya Xecewenî dijî. Eşîrên Mafî û Reşvaandî jî li bakurê parêzgeha Qazwînê ku dijîn û xwediye gelheke kurdî ya mazin in jî, divê ku mirov bahse wan di vê temenê de bike. Dîsa, li parêzgeha Erdebîlê li devera Xalxalê jî, çend gûndan kurdan ku bi kurdîya kurmancî axifin hê jî hena.

Kurdên ku di demên xanadana sefewîyan de ku di dema Şah Abas de bê û di dema Şah Nadir û hwd de bê, wê herina bi ser van kurdan de jî. Piştre, wê ev kurdên ku ji herêmên kurdistanê hatina goçkirin, wê ji van herêman jî, wê piştre bi darêzorê werina goçkirin li herêmên weke xorasanê û Lorîstanê. Ev, bo wan dibê weke goça dûyemin. Di van deman de, bi dehan aşîr û êlên kurd wê ji rojahilatê kurdistanê werina goçkirin li herêmên Gêlan û mazenderan ku li bakûrê îranê na. Li herêma xalxalê, gund û navçeyên xaçexişla, Wasfirçan, êkabaşî û hwd, ji çend ji wan gund û çavçeyên kurdan ku bi kurdî diaxifin in. Li vê herêmê, dîsa gund û navçêyên herêmê ên weke

Binyadabad, Gezur, Leng Deşt, Ebli, Zawçe Kurd, Elnekeş, Îlwaniq, Wanaviz û hwd, ên pirranîya wan kurd in û bi kurdî diaxifin in.

Li herêmê, ku weke êla kurdan a pirr mazin a êla Ameranlû, êla kurd ya mazin ku di van demên berê de ku li van herêmên Gêlan, dilêman û mazenderan hatîya belavkirin a. Êl, ji êlîtîya wan hatîya kirin û weke aşîrên piçûk hatina belav kirin. Ev rewş, ji aliyê rêveberîya sefewîyan ve weke ku hatîya hanîn serê êla kurd a Amûranlû, bi heman rengî hatîya hanîn li serê êla kurd a lekî û êlên din jî ên kurd. Li van herêman, piştre bi gelek çengên wê re, pêşketina xwe ku di bin zilm û zorê de jî bê, jîya ya û daye domandin. Ev êla kurd a mazin, wê hinek çengê wê piştre li xorasanê û li Lorîstanê jî bicih bibin. Ev êla kurd, goçkirina wê di dema Şah Abas de destpê kirîya. Her wusa ´di deme qecaran û hwd de Ameranlû yek ji wan êlên kurd a herî bihêz û mazin bû.´ Ameranlû,ku li rêx navenda Mazendaran, li Sarî'yê, di dema Qecaran de navê taxeke Sariyê *kord mahalle* (taxa kurdan) girtiya. Li navçeya Ameranlû û li Gîlanê dimênin. Ameranlûyên li Tehranê û Mazendaran, bi beşî asîmîle bûna, her weha li hin herêman erebî (li vê herêmê eşîrên ereb hena û ameranlû di nav wanan de halîyana), li hinekan jî farisî an tirkmenî diaxivin. Li Xoresanê Ameranlû yek ji heft êlên kurdan ên mazin ên ku navê wan ev in Zaferanlû, Şadlû, Topkan, Kawanlû, Qereçorlû û Lek in.

Êlek ji wan êlên kurdan ku navê Bacelanî bû, di van deman de ku rastî heman aqûbetê hatîya, wê piştre destna wê werina başûrê kurdistanê li dora xanaqîn, musil û hwd dijîn, di dema ku li rojhilatê kurdistanê de, wê li dora herêma qasrî-şêrîn û hwd, bicih bên kirin. Ev êla kurdan ku bi êlên kurdên şebekî re xwediyê xateka êlî na, wê di demên berê ên sadsala 15´min ´ ên berî wê de, weke êlên herî bi hêz û mazin bin. Êlên kurd ên weke kakewend, kelhûr, modanlû û hwd, ku bi lekî diaxifin, wê ji êla lekî a kurd bûna û ku di demên berê de weke dewlet li ser axa mazin dijîn bûna. Lekî, bi teybetî, divê ku mirov li vir hinekî bi teybetî bahse wan bike. Ev êl, êlek ji wan êlên kurd ku bûya ku di demna dîrokê de dewlet avakiriya ya. Li ser koka vê êla kurd, heta roja me jî, nîqaşên ku hatina dayîn destpêkirin hena.

Li gorî mirov li dîrokê dinerê, mirov dibîne ku lekî weke dewletê dijîn. Bi hêz bûna. Serdest bûna. Heta demên sadsale 15´min û 16´min û hwd, wê bi wî rengî bi mazinahî bijîn. Piştre, ji ber hin sedemna, hin çengên vê êla kurd heta xorasanê û Lorîstanê jî çûna û li wan bicih bûna. Ev êla kurd, navê wê divê ku em li rex navê êla kurd ya din ya mazin ya Gûran hilde û werênê ser ziman. Di dema Şadadîyan de, bi hev re bûna û weke êlekê bi hevdû re tevgerîyana. Lê di demên piştre de, bi zêdebûn û mazinbûnê re, ev herdû çeng mazin bûna û her yekê biserê xwe gihiştîya wê asta êlîtîyê. Dem, heta ku hatîya sadsale 15´min û 16´min û hwd, êdî weke du êlên mazin ên li herêmê ku li rex hevdû dijîn, wê hebûna xwe bidomênin. Ev cûda mazinbûna wan, wê bê sedem ku hinek dîrokzan jî ku wan şîrove dikin, wan weke du êlên ji hevdû cuda ên kurd şîrove dikin. Her wusa divê ku mirov vê jî bibêje ku ji aliyê bingihînî ve êla Lekî jî û ya Gûran jî, ji êla **kurdên** Zendî na. Heta ku em divê ku vê jî bibêji ên ku bi koka xwe ya êlî ve êlên kurd ên lûr û feylî ku heta roja me hebûna xwe domandina, em divê ku wan di berdewama van de ku heta roja me dijîn werênina ser ziman. ..

Bi teybetî, di dema sadsale 15´in û 16´min de, xanadane sefewîyan demografiya kurdistanê bi goçberkirina aşîrên kurd ji herêma rojhilatê kurdistanê re bi awayekî pirr mazin da gûharandin. Aşîrên weke Celîlewend, cengînî, kirmanî, lerîjanî, dilfan, xecewend û hwd, bigelek aşîrên din ên kurd re ji herêmê hatina goçkirin. Bi vê yekê re,

wê rewşa kurdistanê, êdî bikeve rewşa din de. Di nava vê koma êl û aşîran de, hizrên olî ên weke yarsanî û hwd jî ku bicih in, çend ku bi demê re gûharandin di nava wan de bibe jî, wê hebûna xwe biparêzên. Ev rengê pêşketinê, bi me dide fahm kirin ku ev hemû ji kokeka êlî ya bi hevdû re na.

Ev êlên ku pirranîya wan di sadsale 15´min ´ 16´min û hwd de, ku hatina goçkirin ji herêma rojhilatê kurdistanê, teybetmendîya hemûyan ya sereka ew a ku di van deman de pirr bihêz bûna û bi awayekî dewletî li herêmê dijîn a. Bi goçkirina wan re, weke ku hatîya xwestin ku ew rewşa wan ya ku bi dewletî bi wê dijîn were ji holê rakirin. Bi gûharandina wê awayê demografikî a civate kurd re, ev hatîya xwestin ku were ji holê rakirin. Kurdên ku serdest û bihêz û weke ku weke dewlet dijîn, wê li herêmên weke Lorîstanê, xorasan, li dora tahranê û bakûrê îranê û hwd, wê werina belav kirin. Ev rewşa gûharandina demografîya civatî, wê ji aliyê desthilatdarî ve li rojhilatê kurdistanê valahiyekê hin bi hin bi demê re bi xwe re bêne û bide çê kirin. Di dema sefewîyan de, wê sefewî li wê valahiyê xwe serdest bikin û li rojhilatê kurdistanê xwe bikina desthilatdar.

Ev êl û aşîrên kurd, ku heta roja me jî bi hin şûnpêyna xwe ku dijîn, divê ku mirov li wan dinerê û bi rengê zimanê wan û hwd re ku bi wê diaxifin û wan li ser koka wan ya bi hevdû re kifş dike û bêne ser ziman. Bi teybetî, ev êl û aşîrên kurd, wê di dema desthiatdarîyên kurd ên weke eyerîdî, kekoyîdî û hwd ku li rojhilatê kurdistanê ava bûna, wê li herêmê bi hevdû re û bi awayekî konfaredalî bijîn. Bi vê yekê re, temenê xwe yê ku ew bi hevdû re xwe kirina desthilatdar, bi hevdû re afirandin a. Lê dema ku em vê pêla goçberkirina êl û aşîrên kurd hildina li dest, divê ku em heta sadsale 15´min û hwd herin. Di vê demê de, ev goçberîya ku hat hanîn serê van êlên kurd û kirin, bi tememî wê ji gelek aliyan ve bê temenê pirsgirêkên ku heta roja me civate kurd bigiştî dijî jî. .. Î ro, ku em rewşa êlên kurdên ku goçî van herêmên li bakûrê îranê, li dora tahranê, Gêlan, Mazenderan û hwd ku hatina kirin ku hildina li dest, ku em bi vê mejûya wan re neyênina ser ziman, emê nikaribin wan werênina ser ziman. Ev goçberkirina êlên kurd ji herêmên kurdistanê, bi armanca ji hev belavkirina hebûna civate kurd a bigştî ya.Du teher(´metod´)ên ku li dijî civate kurd bo ji hev belavkirina wê hatina bikarhanîn, yek ji wan dane goçberkirina êl û aşîrên kurd ji herêmên kurdan a û ya din jî qadaxa ya li ser zimanê kurdî ya.

Êl û aşîrên kurd ên ji cih û warên hatina dayîn goçkirin, heta roja me jî, li herêmên ku hatina goçkirin hebûna xwe didomênin. Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku ev goçberkirina ku ji rojhilatê kurdistanê li herêmên din ên Îranê ku hatîya kirin, bi armanca tûnakirina civate kurd bû.Piştî sadsalên 17´min û pê de, wê ev hewldanên tûnakirinê zêdetir bibin.Di sadsale 20´an de, wê asta wan hewldanên tûnakirina civate kurd, li Îranê jî derkeve asta herî bilind. Ku em bipirsin ku î ro yanî di roja me de, rewşa rojhilatê kurdistanê çî ya, emê vê pirsê bibersivênin ku hê ew hewldanên tûnakirina civate kurd ji aliyê rejima îranê ve dihên domandin. Bo vê yekê û armanc jî, zimanê kurdî jî ji aliyê rejima Îranê ve hatîya qadaxa kirin. Ev qadaxakirina zimanê kurdî bi armanca tûnakirina civate kurd dihê kirin. .. Bi vê rengî pirranîya wan êl û aşîrên kurd ji ji rojhilatê kurdistanê li herêmên din ên Îranê hatina goçberkirin, ji aliyê rejima Îranê ve hatina bişavtin(asîmle kirin). Î ro, ev aşîrên kurd ku li herêmên bakûrê îranê**, li xalxal, Gêlan, mazenderan** û hwd, pirranîya wan hatina bişavtin. Her wusa, êlên kurd ên ku ji

sadsale 15´min û pê de ku ji rojhilatê kurdistanê hatibûbûna goçberkirin li cihên din ên Îranê, bi armanca tûnakirin û ji dîrokê birina **civate kurd bû. ..**

**- Pirsgirêka kurd,** ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, xwediyê dîrokekê ya. Lê bi teybetî, ku di cihane me ya hemdem de, û di çerçova zihniyeta wê de em hewl bidin ku pirsgirêka kurd hildina li dest, divê ku em ´şerê çardiranê´ weke destpêkeka diring hildina li dest. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku ew ser 500 salî re ya pirsgirêka kurd bo ya bîrîneka ku hertimî di wê birînê de xwûna kurdan dirijihê û ankû dihê rijandin. Temenê wê destpêka wê gotina ´pirsgirêka kurd´, ku ji dema ´şerê çardiranê´ ku em didina destpêe kirin jî, hinekî din jî bi şûn ve diçê. Lê weke destpêkaka giring, hertimî ku miorv ji kîjan aliyê lê dinerê, destpêka şerê çardiranê dihê ber me û berbîra me. Berî şerê çardiranê, di nava ola îslamiyetê de jî şerên navxweyî ên desthilatdarîyê rû didin. Minaq, şerê kerbelayê ya ji wan şeran a ku temenê dûqatbûna kurdistanê di dema şerê çardiranê de bi peymane "qasrî-şêrîn" dide kirin. Şerê kerbeleyê, bandûra herî zêde li vê herêmê û ankû li kurdistanê û li jîyane kurdan dibêt. Hasan û huseyin, du mirovên "ahlî-beyt" bûn. Berî ku werina herêmê, têkiliyên wan bi dergehên kurdan ên olî re hena. Dergehên kurdan jî, di nava civatê de bandûra wan ya ku em î ro dizanên bêhtira. Ji aliyê civaknasî, hizrî û perwerdekirina civatê ve ew dergah xwediyê weyn û rolaka giring in. Lê piştî Hasan û huseyin hatina li herêmê û li herêmê ku hatina qatil kirin, piştre wan dergehên kurdan pêşî li wan xwedî derketin. Di aslê xwe de, yekî ku hinekî jî dîrokê bizanibê û piçekî jî dîroka olê bizanibê, wê fahm bike û bizanibê ku ew xwedîderketina dergahên kurdan bûya temenê afirîna mezhebê "´şîî" bixwe jî. Piştî ku Mezhebê ´şîî´ derket û pêşket, piştre bi teybetî li herêmê û bi teybetî di nava kurdan û persan de bicih bû. Bi wê yekê re, di aslê xwe de, bi wê mezhebîtîyê re di serî de jîyana kurdan di nava mezhebê ´şîî´ û´ yê ´sûnnî´ de bû duqat. Mezhebê ´sûnnî´, ´ şafîî´ û hwd, nêzî hevdû bûn. Di wê demê de, wusa bi awayekî vekirî ku nakokî heban jî, ew nakokî jî, ne hatibûbûna wê astê ku bi hev re tevnegerihin.

Kurd, bixwe jî, di nava wan de herî zêde ´şafîîtî´ pêşketîya. Herî zêde bandûra ´şafîîtiyê´ herî zêde di nava kurdan de xwe da dîyar kirin. Awayê ´şafîîtiyê´ ê ku kurd dijîn jî, di temenê çand û ramanê de û baweriyê de bû. Bi hev re jîyîn û dijberî li hevdû nekirin, bi wê re hebû. Jîyane kurdan jî, dema ku mirov lê dihizirê, di nava wê de ji Êzîdîtiyê bigira, heta ku digihijê hersanîtî, manîtî, mezdekîtî û hwd pêşketina. Berî wan jî Mîtratî û Zerdûstîtî pêşketîya û temenê van pêşketinan jî ji gelek avayan ve afirandîya.

Dema heta ku dihê dema şerê çardiranê, wê li ser afirîna mezhebê şîîtiyê re wê du cihan wê biafirin. Bi teybetî, beşeka giring ji başûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê, wê aligirên şîîtîyê bin. Lê beşên din jî, wê bi şafîîtiyê re sûnnîtî wê li pêş bê. Lê dîsa, ew ev di nava wan nebê temenê jevcûdabûnê. Lê piştî ku bi desthilatdarî pêşketin bû, piştre jî, wê hin bi hin ew pêşketin bibe. Yên ku wê şîîtiyê jî barî desthilatdariyê bikin û bikina hizreka olî ya desthilatdariyê bê, wê malbatên kurd ên weke malbata Şah Îsmaîl û hwd bin. Piştî ku ew desthilatdarîbûn bû, piştre li ser wê desthilatdariyê şer û pevçûn wê bibin. Kurd, wê piştre ji desthilatdarîya şîîtiyê wê bi şerê çardiranê re werina derxistin. Wê piştî vî şerê çardiranê, wê bandûra malbat û keyesetên kurd di desthi9latdariyê de wê mazin hebe. Lê ji ber ku ew mezheb jî nikarê bê kurdan hebûna xwe bide domandin û bijî, êdî nikarê bê wan jî bijî. Bi vê yekê, piştre, kurd, çend ji serî ve desthilatdariyê ji

dest diravênin û winda dikin jî, wê ji binî ve xwediyê wê bandûr û kifşkarîya mazin bin. Ew rewş, wê piştre bikeve rengê kevneşopîyekê de. Êdî kurd, piştî şerê çardiranê ku bandûra wan hin bi hin kêm dibêe, wê êdî ji binî ve bandûra xwe bidina domandin.

Heta wê dema şerê çardiranê jî, kurd, ne tenê li welatê li kurdistanê, her wusa li cihanê îslamiyetê jî bandûr û kifşkarîya wan pirr li pêş a. Mirovên weke Salahadinê Eyûbî û hwd, bandûra wan pirr mazin a. Piştî Salahadin re, wê mirovên weke Salahadinê eyûbî ku bi aslê xwe kurd in, ên weke Şah Îsmail û hwd wê derkevin. Bandûra wan mazin a jî. Malbate sah Îsmaîl, ji ber ku malbateka ku di nava kurdan de weke malbate "şêx" tê nasîn, bandûra wê mazin a.

Heta dema Şerê Çardiranê jî, ew bandûra kurdan didomê. Lê di şerê çardiranê de xelatîya kurdan ya dîrokî ew a ku di nava wan de bûyîna wan ya dûqat û di temenê wê dûqatîtîyê de aliyek bi osmaniyan re ya û aliyê din jî bi Sefewîyan re ya. Bi vê rewşê, di aslê xwe de, di wî şerî de ku kîjan alî serkevtin bidest xistiba û kîjan aliyî winda kiriba jî, wê dîsa li herdû aliyan kurdan winda kiriba. Ji xwe, piştre jî ya ku hat dîtin ev bû. Piştî şerê çardiranê, ku Aliyê osmaniyan ku di pêşengîya Idrîsê Bedlîsî de bi rêxistin bûya, bi ser dikeve. PIştî şerkevtinê, Îdrisê bedlîsî, kurdên başûr jî li berçav digirê û li ser ardnigariyekê bi rêveberîya osmaniyan re peymanakê mohr dike. Li gorî wê peymanê wê kurd li herêmê xwe bi hikimet û mîrgehên xwe wê hebin. Wê "şancaq" wê werina dayîn li wan û wê mudahale li jîyan û kevneşopîya kurdistanîyan newê kirin. Ev peymane ku piştî Peymane ´qasrî-şêrîn´ dihê mirovkirin ya, di nava Îdrîsê Bedlîsî û Yavuz Selim de ya. Peymane "qasrî-şêrîn" di nava osmaniyan û Sefewîyan de dibêt. Lê peymane piştre jî, di nava kurd û osmaniyan de dibê. Ew paumane di nava Îdrîsî Bedlîsî de jî, heta 5 salan jî hebûna xwe didomê. Piştre ne bi gelekî re ku Yavus Selim jî mir û ne bi gelekî re ku ´Qanûnî siltan Sûleyman´ hat ser taxt, piştre wî, bi fermanekê ew peyamana ku di navbera îdrîsî bedlîsî de hatî mohrkirin bêhikim kir û ji holê rakir. Piştre bi fermana ku weşand re xwest ku her kesek ´tabiîî´ wî bê. Lê kurdan ev yek herê nekir. Piştre, Qanûnî siltan Sûleyman, sefera xwe ya mazin li kurdistanê dike. Di wê sefera xwe de gelek cihûwaran ji naqşeyê dibe.

Li herêmê, piştî vê re jî, hertimî şerê qasra Osmaniyan ê bi kurdan re didomê. Hertimî, çû bi ser serê wan de. Piştî wê ppeymane di navbera Îdrîsî bedlîsî û Yavuz selim de bû, ku di nava wan de hatibû mohrkirin, piştre kurdan ew hêsta wan ya ku ´rastî xîyanetê´ hatina û ´bêbaxtî li wan hatîya kirin´ bi wan da gotin ku "baxtê romê nîn a." Ev gotin, weke gotinaka xalkê û ankû nava gel, êdî bû guhar û diguhan de ma.

Li kurdistanê, piştî vê demê û pêde, wê êdî şerê kurd û osmaniyan wê bidomê. Ji wê demê û heta ku tê sadsale me, ser 500 salî re wê şerê osmaniyan û kurdan wê bidomê. Piştî Osmaniyan jî, ku komare tirk ava bû, êdî komare tirk, ew mîrete dewrgirt û şerê osmaniyan ê bi kurdan re weke şerê komarê ê bi kurdan re da domandin. Piştre jî, di vê temenê de şer êdî domîya. Di vê temenê de, hertimî jî şerê du nava herdû aliyan de bênavber domîya.

Lê şerên piştî şerê çardiranê ku di nava kurdan û osmaniyan de dibin, wê di sadsale 18´min û sadsale 19´min û hwd de wê zêdetir û gurtir bibe. Serhildane Mîr Mahmûdê Rawandûzî, Serhildane Berdixanîyan, Serhildan Şêx ubeydûllah û hwd, çend ji wan serhildanên ku wê di wê sadsalê de bibin. Di sadsale 19´min de jî, weke serhildane şêx Mahmûdê Berzencî, Serhildane Şêx Saîd û hwd, çend serhildanên wê sadsalê na. Her serhildane ku bi xwûnê bidawî bû, piştre kurdan, dîsa çawa ku xwe lev didane li hevdû,

dîsa dirabûna serhildan û raperînê. Dewletê jî, hertimî bi komkuji û tevkujiyên weke komkujiya Dersimê û hwd bersiv dide. Komkujiyên kurdan, di xatekê bêî ku navberî werê dayîn li lê, hatina domandin. Bi vê yekê û awayê pirsgirêka kurd, heta vê roja me ya ku em têde dijîn hat. Î ro jî, pirsgirêka kurd, bi heman rengî hebûna xwe didomêne. Li dijî kurdan, di wî şerê bi kurdan re de weke ku "koalîsyonek" hebe, ew şer bi kurdan re bi wê dihê domandin.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîyê ya. Di serî de, dema ku mirov di çerçova gotina "pirsgirêka kurd" de bêne ser ziman, pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya. Di roja me de jî, pirsgirêk, hatîya û li vê astê sekinî ya. Ji ber çi di roja me de pirsgirêk nayê çareser kirin? Ji ber ku ew maf û azadîya kurdan ên ji wan hatina standin û girtin nayên radest kirin li wan. Hinekî jî, pirsgirêk, hatîya û li vir sekinî ya û xitimiya. Wekî din jî, di roja me de, dema ku kurd bahse pirsgirêka kurd û çareser kirina wê dikin, bahse maf û azadiyê xwe dikin. Di wate û têgihiştina maf û azadîya xwe de dihênin ser ziman. Lê dewlet jî, dema ku heman gotinê dihêne ser ziman, di wate tekoşîna kurdan ya biçek de dihildê li dest. Î ro jî, nîqaşên ku tên kirin, di temenê wê de na ku wê çawa kurdan bêçek bikin û di nava sînorê tirkiyê de pirsgirêk li gorî xwe "çareser" bikin û kurdan di nava tirkitiya tirkiyê de wê çawa werina halandin. Hinekî jî, ya ku dewlet, ji gotina pirsgirêka kurd fahm dike bi gotina "çareseriyê" ya di serê wê de tenê ev a. Ji ber vê ne ne levkirinê jî, êdî pirsgirêk nayê çareser kirin.

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku pirsgirêka kurd, di temenê pirsgirêka maf û azadîya kurdan de dibe pirsgirêka ´statûya kurdan´ jî. Li vir, ya ku heta nûha jî li dijî wê dihê sekinandin jî ev a. Li vir, divê ku mirov bibîr bixe ku piştî ku kurdan di 14´ê tirmeha 2011´an de xweserîya xwe ya demokratik li Amedê denezend, piştre dewletê bidest oparasyonên di bin navê `KCK` de kir. Armanc bi van oparasyonan re, ew a ku wê çawa temenê kurdan û statûya wan ya ku bi hebûna wan re were ser ziman ji holê ra bikin. Li wê temenê oparasyon dihên kirin. Komkujiyên ku kurd dijîn ji komkujiya dersimê bigra heta ku digihijê komkujiya roboskî û komkujiya kurdan a li Parîs´ê û hwd jî, hemû bi armanca wê dihên kirin. Yanî, bi girtinên bi oparasyonên weke ên di bin navê `KCK`ê re pêşî temen ji holê ra bikin û piştre bi komkujiyên bi vî rengî jî, piştre tafisandinê li gorî xwe bdiina çê kirin. Bi vê yekê, komkujiyên weke komkujiya kurdan a li Parîs´ê û oparasyonên di bin navê `KCK`ê, bi hev re di ahangekê de û bi heman zihniyetê dihên kirin. Zihniyeta di temenê herdûyan de jî yek a.

Dîroka pirsgirêka kurd, ji dema şerê çardiranê heta ku dihê û digihijê dem û roja me, bi vî rengî domîya ya. Ev 500 sal e ku ew pirsgirêk û şerên wê ên bi kurdan re dihên kirin. Hin mirov, vê dîroka pirsgirêk, qast dikin û dibêjin ku "gelê kurd û tirk" ev 500 sal in bi hev re na." Vê dîroka dîroka şer ya bi kurdan re jî, dixwezin ku weke dîroka "biratîyê" bifiroşîna kurdan. Dem bi dem hin rayadarên tirk jî, ev gotin hanîna ser ziman. Hin sîyesetmederên kurd jî, dem bi dem ev hanîna li ser ziman. Lê ev dîrok, en dîroka biratiyê ya. Dîrok şerê ê bi kurdan re ya. Dîroka şerê bi armanca tûnakirin û ji dîrokê birina kurdan a. Birêz Ocalan jî, bahse wê dîrokê dike. Birêz Ocalan, vê rastiyê jî bi lêv dike û dibêje ku "ew dîroka ku heta vêderê hatîya, bi zor û sîdetê hatîya, em dixwezin wê bi qulubênina bi hevrebûnaka bidiil."

Li vir, divê ku mirov bibêje ku ji bo ku weke dema Îdrîsî Bedlîsî, newê serê kurdan, divê ku kurd pirr bi baldarî tevbigerihin. Dewlet, bi gotin û nêzîkatiyên xwe re, weke ku dixwezê ku heman pêvajoyê bi kurdan bide herê kirin. Ya ku kurd êdî wê dibînin û herê

nakin ev a. Bi vê yekê, di serî de, dewlet, tenê pirsgirêka kurd, weke pirsgirêka "çekberdanê" û ankû " bişûnve kişandina hêzan" dîtin jî, di armanca vê zihniyetê de ya. Li vir, divê ku mirov bibêje ku ya ku êdî kurd wê herê nakin ew a ku xwe bêparastin nehêlin. Hertimî, dema ku bêparastin mana, komkujiyên mazin hatina serê wan. Di vê demê de jî, dema ku kurd bêparastin man, wê heman pêvajoyên jenosîdê bên serê kurdan. Di van rojên dawîyê de bahse navê "îdrisê Bedlîsî" kirin jî, hinekî wê wê nîyeta dewletê radixe li berçav. Lê kurd jî, êdî ne ew kurdên berê na. Serokê wan jî, ne Îdrîsî Bedlîsî´yê wê demê ya. Ya ku di serî de divê ku were dîtin ev a. Dewlet, di ya xwe isrer dike. Ji ber ku di serê wê de bo çareserkirina pirsigirêka kurd, hê ti rêyên çareserîyê tûna na, êdî ew jî van gotinan dihêne ser ziman. di vê pêvajoyê de jî, weke nîşanaka dûyemin ya ku di serê wê de bo kurdan heta nûha ti çareserî tûna na, bahse "derxistina hêzên çekdar dervî sînor" a. Nîqaşên ku di vê demê de rayadarên dewletê didin kirin, ne di temenê gotina ´çareseriyê´ ya ku ew bixwe jî bi lev dikin de ya. Ew, li pey wê na ku hezîmeteka din bi kurdan bidina jîn kirin. Ji ber ku hêza kurdan ya parastinê heya, êdî komkujiyên weke yên dersimê heta nû nebûna û ne hatina serê kurdan. Lê ku ew hêz kurdan neba, meyê î ro bahse pirr komkujiyên din ên bi girseyî bikira û li ser biaxiftan. Çend kurdên dewletê hildana cem xwe û wan hertimî weke ´cahş´an dide axiftin jî, di serê wan de jî ti xema wan bo kurdan tûna ya. Ew li pereyên ku dikevina berîka wan û derfetên ku dewlet di berdêla wê cahşîtîya wan de ji wan re dide wan, derdê wan a. Ji ber vê yekê, nûqta ku kurdan a ku dewletê hêrîşê lê dike, ew jî hêrîşî lê dikin. Dewlet, ji ber ku dibêje "perwerdehîya bi zimanê dayikê nabê", ew jî, ti carî bahse wê nakin. Ji ber vê yekê ku yek ji CHP´ê rabê û bêje "nîjade tirk û miletê kurd, nayê herê kirin ku wekhevdû werina dîtin" jî, bo wan ne sedema bertekdayinê ya. Ji ber ku wan ew jî herê kiriya. Ew, ew "xulam"ên ku Mahmu Easd Bozkurt bahse wan dikirin in. Î ro, yên ku herî zêde li pêşîya çareserkirina pirsgirêk kurd jî ev in. Ne ji van dordoran ba, wê şerê bi kurdan re heta î ro zêde dirêj ne domîya ba û wê evqas komkuji ne hatiban serê kurdan. Ji ber vê yekê, divê ku mirov wan jî, weke yên ku wan komkujiyan dikin bihasibêne û bêne ser ziman.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya. gelê kurd, ji ber ku hemû maf û azadiya wê ji destê wê hatîya girtin, êdî ew pirsgirêk rûda ya. Dîroka wê pirsgirêkê, ya şerên wê pirsgirêkê, herwusa divê ku mirov heta dema şerê çardiranê bibe û ji wir bide dest pê kirin. Ji wê demê û heta vê demê, dîrokeka şer ya ku bênavber afirîya.

Î ro jî, di vê dema ku bahse ´çareserkirina´ pirsgirêka kurd dihê kirin de, divê ku mirov vê dîrokê bi hemû aliyên wê re lê bikolê û li berçav bigirê. Ew dîrok, weke rohniyekê jî ya li ber me ku em lê binerin û hem xwe nas bikin û hem jî dîroka yên ku bi kurdan re şer kirin û ku ji ber çi ji wê demê û heta vê demê ev şer dane domandin, hingî, mirov wê êdî wê jî fahm bike. Di vê temenê de, pirsgirêka kurd, li herêmê, dibê pirsgirêka zihniyetê jî. Zihniyeta ku weke zihniyeta desthilatdarî li herêmê rûniştîya, di ne tenê di demê pirsgirêka kurd û wan şerê wê de ya, her wusa di temenê ne demokratîzabûna wê de ya. Î ro ku demokratîzabûna herêmê nabê, hinekî jî divê ku mirov li sedemên wê di vê zihniyetê de lê bigerihê. Em bibêjin ku î ro pirsgirêka kurd hat çareser kirin, lê ku ev zihniyet, wek xwe ma, wê dîsa bi pirsgirêka kurd re bê û pirsgirêkên din re bê, wê rûyê û zihniyeta xwe bide nîşandin. JI ber vê yekê, bi awayekî

vekirî divê ku mirov bibêje ku pirsgirêka çareserkirina wê û pirspektîfa di temenê çareserkriina wê de, wê bê temenê pêşketina demokrasîya li herêmê jî. Bi vê yekê, herdû alî weke ku bi hev ve girêdayî na dihên ber me û **mirov wan dibîne**. ..

**- Ev rengên politikayên rêveberîya sefewî,** wê li aliyê osmanîyan jî, wê hin bi hin were pêşxistin**.** Bi vî rengî, wê li kurdistanê li ser serê kurdan karibin xwe bidina serdest kirin. Bo ku xwe serdest bikin, pêşî temenê rêveberî û desthilatdarîyên kurd li herêmê bi vî rengî dihên ji holê rakirin. Dînamîkên civate kurd ên bo xwe-rêveberinê dihên tûnakirin. Ên ku dixwezin ku rêveberîyê ava bike jî, di serî de rastî hêrîş û komkujiyan tê.  Ji sadsala 15´min û pê de, emê rastî gelek mînaqên bi vî rengî werin. Kurd, wê rastî gelek hêrîşên bi vî rengî werin. Bi van hêrîşan wê hewl bidina ku pêşîya pêşketina temenê xwe bixwe birêvebirinê a kurd were ji holê rakirin. Lê kurd, ji aliyê çandî û kevneşopî ve di nava xwe de xwediyê kevneşopîna xwe birêvebirinê na ji aliyê çandî ve. Bi vê rengî, li ser çand û kevneşopîyên xwe re, wê heta demekê xwe bidina jîyandin û domandin. Lê ev, ji demn piştre nabê çareserî. Piştre hin bi hin wê serhildanên kurdan li hemberê desthilatdarên herêmê ên ku kurd bindest kirina wê bibe. Ji sadsale 15´min û pê de, heta ku dem tê sadsala me, wê raparîn û serhildanên kurdan bênavber xwe bidina domandin.

Rêveberîyên kurd ên aşîrî ku hena jî, wê piştre di nava raparînên herêmkî de bin. Lê ji ber ku herêmkî na, wê zêde serkevtinek mazin bidest nexin. Lê bo fahmkirina pêşketina kurdan û bertekên wan ên li ber rêveberîyên herêmê êên serdest, giringin ku mirov wan fahm bike. Di vêê temenê de heta sadsala 20´an, wê kurd bênavber wê li ber desthilatdarîyên herêmê li berxwe bidin. Ev sadsal, bo kurdan pirr bixwûn buhurîya. Di sadsale 20´an de kurd, welatê wan Kurdistan hat qatkirin li çaran. Ev êdî bû, temenê tengezerîyên mazin di nava kurdan de. Kurdan, ev herê nekir û hertimî li ber wê li berxwedan. Ev berxwedane wan, wê bike ku ew di sadsale 21´ê de, weke ku li rojavayê kurdistanê û bi pêşketina civate kurd giştî re dihê ditin, wê şoreşek bi xwe re bidina kirin. Kurdan, ev şoreş kir jî. Şoreşa rojavayê kurdistanê, mînaqe vê ya.

Lê dem hat ku tê vê dema kirina şoreşekê çandî, têgihiştinî û civatî bo kurdan, wê tekoşînek mazin bê dayîn. Kurdan, tekoşînek civatî dan. Pêşî ketina farqe xwe de. Bi wê re jî, êdî tekoşîna çareserkirina pirsgirêka kurd li rojhilat dan. Bi vê yekê, tekoşîna xwe weke tekoşînek herêmê pêşxistin. Bi rengê, tekoşîna aşîtîyê re tekoşîn domandin. Hêza xwe parastinê çêkirin. Her wusa, êdî bi civatî, civate kurd ket farqe xwe de û bidest tekoşîna çareserkirina pirsgirê kurd kir. Her wusa, li bakûrê kurdistanê xwepêşandinên bi milyonan dikin. Bi wê re, bi navê ´konên çareserîya demokratik´ pêşxistin. Ev rengê tekoşîna demokratik a kurdan, asta wan ya pêşketinê û têgihiştinê jî dide li berçav. Ku em şoreşa rojava kurdistanê fahm bikin û ankû hewl bidin ku fahm bikin, emê destpêka pêşketina wê ya bigirseyî, bi newroza 2011´an û bi rengê çalakiyên weke çalakiya konên çareserîya demokratik ên ku di vê demê pêşketin divê ku mirov bêne ser ziman. Her wusa, êdî bi heman rengî, li rojavayê kurdistanê bi sed-hezaran kurd dirabûna serpîyan û xwepêşandinên mazin ên girseyî li dardixistin. Ev jî, wê da nîşandin ku gelê kurd, bi rêxistin û êdî azadî di mejiyê xwe de **girtîya**.

.. Divêt ku mirov bi dîrokê re, li ser xate têgihiştinî a ji serdema weşokanî heta serdema serêkahniyê re li ser felsefeya şûnpêya şoreşa rojava bisekinê û wê werênê ser ziman. Şoreşa rojava, bi vê temenê xwe de ku were fahm kirin, wê rast were fahm kirin. Dîrok, bi pêşketinên civatî, civaknasî û têgihiştinî re temenê pêşketinên şoreşgerî ên weke şoreşa rojava diafirênin. Lê ya ku di temenê vê pêşketinê de cih digrê jî hişarîya civatî û felsefîkî a ku êdî afirîya ya. Hişara civatî, bi felsefeyê û têgihiştina wê re dibe xwediyê hêzek biçalak. Me, ev yek bi awayekî vekirî bi şoreşa rojava û salên wê yên pêşî re dît. Piştî ku Şoreşa rojava bû û pê de, hîç hêrîşî ji ser kêm nebûn. Roj bi roj ew hêrîş lê bûn. Ev hêrîş û asta wan, wê bi pêlên hêrîşan ên ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de bigihijin astaka herî bilind. Ev hêrîş, li şûna ku şoreşê bişikênin, gîyaneka berxwedanê afirandin di giştîya kurdistanê û civate kurd de. Minaqe vê jî, piştî pêlên hêrîşê ên ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de ku li Kobanê û navende destpêkirin in. Vê pêvajoya hêrîşan a li ser kobanê ku di nava kurdan de jî û di nava xalkên din ên cihanê de jî weke ku dihat bi navkirin weke **”stalîngrada kurdan kobanê”** hat bi navkirin. Rast bû. Birastî jî, kobanîyan, bi wê berxwedana ku di kobanê de ku pêşxistin, li rojava cihanê rûniştin. Rojava cihanê kifş kirin. Ti kesekî hêvîyek wusa ya berxwedanê ne dikir. Lê wan kir. Piştre, ew berxwedana kobanê, bû temenê serhildanan pêl bi pêl li her çar beşên kurdistanê di nava kurdistanî ya. Êdî li her çar aliyên kurdistanê serhildan pêşket û navê wê serhildanê jî ´berxwedana kobanê´ bû.

Kurdistanîyan dîrok nivîsand. Ev dîrok, destpêka wê bi teybetî, bi destpêka şoreşa rojava re ji 19´ê temûza 2012´an û pê de, destpê kiribû. Ji sale 2012´an û heta sale 2014´an, di hundurê van herdû salan de, agirê şoreşê bi gîyane newrozê di li kurdisstanê di nava kurdan de belav bû. Piştî wê re jî li rojhilat bigiştî, di nava xalkan de belav bû. Pêl bi pêl, şoreşa rojava pêşdiket. **Bandûra wê, pirr mazin bû. Şoreşa rojava, ramyarîya(sîyeseta) cihanê, dide kifşkirin.** Hê di destpêka xwe de, di hundurê van herdû salên xwe yên pêşî de, bi dane kifşkirina rojava cihanê re hem li rojava cihanê rûnişt û hem jî sîyeseta cihanê da kifşkirin. Ev, weke pêşketina pêşî a destpêkê ya şoreşa rojava bû.

Şoreşa rojava, aheng(´denge´)a ramyarîya cihanê guharand. Tîpolojîya ramyarîya cihanê, li rojhilat û bi teybetî li kurdistanê da guharandin. Şoreşa rojava, hem bi hêrîşên ku li wê dibûn di rojevê de bû û hem jî bi têgihiştin û zihniyeta xwe ya komelgerî re di rojevê de bû**.** Di aslê xwe de, aliyê wê (şoreşa rojava) yê herî zêde ku dikir ji rejimên herêmê ên demê ku li wê hêrîş bikin, ew zihniyet û têgihiştina wê bû. Şoreşa rojava, bi zihniyetek dîrokî a mesopotamikî bûbû. Li kurdistanê, bi hebûna gelên herêmê û dîroka wan re vejandinak dabû bû çê kirin. Kurdistanîyan jî, piştî hêrîşên 15´ê êlûna 2014´an û pê de, ji bakûrê kurdistanê dan destpêkirin û pêl bi pêl li hemû beşên din ên kurdistanê ku belav bû, serhildanak mazin da destpêkirin. Gîyane vê serhildanê, ´berxwedana kobanê´ a li ber hêrîşên ku li wê dibûn bû. Dîrok, li kurdistanê bi wê gîyanê û zanînê ji nû ve dihat nivîsandin. Li rojhilat, serdemek nû destpêkir. Agirê şoreşa rojava, hewirdora xwe bi şawitandinê diqaland. Di nava wê qalandinê de, rojhilat û xalkên wê xwe diafirandin. Vê rewşê, efsanaya ´teyrê anqa´ dihanî mirova mirov. Tayrê anqa, hertimî dişawitî û dibû kûl. Piştre ji wê kûl û xwelîya xwe, cardin xwe diafirand. Teybetmendîya tayrê anqa, ev bû. Şoreşa rojava a kurdistanê, xwediyê şawataka bi agirê

newrozê bû. Serdemeka nû bû. Keseyetek nû bû. Destpêkek nû bû. Hemû zihniyetên paşverû ên kevn, hêrîşî wê dikirin. Lê çendî ku li wê hêrîş dibû jî, rohnî dikir. Hêrîşên li wê, ew agirê wê ne dimivirand. Hê zêdetir gûrr pêdixist û gûrr dikir.

Serdemeke nû, di vê sedsala 21´ê de di dawîya çeyreka pêşî a sedsalê de destpê dikir. Bi teybetî jî, li rojhilat bandûra wê her ku dem di buhurt zêdetir dihat hîs kirin. Bandûra wê, her ku dem têve diçû, zêdetir dibû. Bi berxwedanên gelan ên li li dijî zihniyeta metinger a rejimên herêmê, bandûra wê zêdetir dikir. Serhildanên ku li bajarên kurdistanê, pêl bi pêl mazin dibûn, ji nivîgrava araban û li herêmên din ên Asya dihat hîs kirin. Herkesekî, dixwest ku wê şoreşê nas bikin û fahm bikin. Ew temenê ku ev şoreş li ser wê bûya fahm bikin. Teybetmmendîya vê şoreşê, ew bû ku mirov hê zêdetirî bixwe bi bawer bê bû. Temenê wê, ji ber ku li ser vînê û bivînbûnê ava bû. Ev biqasî bû keseyetekî wusa bû, bo civatekê û komên din ên civatî jî wusa bû. Çend ku komên civatê xwe bi rêxistin dikirin û makanîzmayên xwe parastinê ên cewherî diafirandin, ev şoreş jî mazintir dikir bi bandûra wê re. Şoreşa rojava, şoreşa newîyên mîtannîyan û dîroka wê bû. Li ber firatê bûbû bû. Agirê wê, kurdistanî di nava xwe de diqawirand. Her ku diqawirand jî, bimîsala ´tayrê anqa´ ji nû ve weke ku diafirand. Di serî de li kurdistanê, li ser axa kurdistanê nifşekî bi vî rengî ê azadîxwez weke ancam û temenê wê şoreşê pêş diket. Yên ku ew pêş xistin û mazin dikirin û her wusa bi wate dikirin jî ew bûn. Di sale duyemin a şoreşê de, bi alikarîya rejimên herêmê ên ku kurdistan di nava wan de hatibû qatkirin, çeteyên DAÎŞ´ê û hwd derxistina li holê ku hêrîşê wê bikin. Ên ku li ber wan çeteyan jî li berxwe didan û dîrok dinivîsandin, ev nifş bûn.

Dîroka şariştanîyê ku ji serdemên Sûmerîyan û pê virde, pirr zêde mazin bidest pêşxistinê kiribû û piştre bi serdemên weke serdemên Qasîtan, loloyan, gûtîyan, hûrîyan, mîtannîyan, medîyan, şadadî, merwanî û eyûbîyan û hwd ku xwe domandibû, di vê demê de bi kurd û kurdistanê re serdemek nû dijî. Şoreşa rojava, şoreşa vê serdemê bû. Di sedsala 21´ê de, şoreşa kurdistanê bû. Ku bi navên herêmî ên navendî bibêjin, ji serdema gerzûbaqarta û weşokanî û heta serdema serêkahniyê, şûnpêya vê şoreşê bi dîrok û pêşketinên wê re heya. Bi vê perspektifê re, salên destpêkê ên şoreşê wê gelek tiştan bihişarî ji me re bibêjin bi hêrîşên li wê û pêşketinên wê ên civatî û hwd re. Bi dîroka civatê ku ji nû ve dinivîsêne re.

**Li kurdistanê, hewldana berî mudahaleya li Sûrî ku kurdan dan nîşandin bi´konên çareserîya demokratîk´ jî di sala 2011´an de bo çareserkirina pirsgirêka kurd. ..**

Berî destpêkirina vê pêvajoya mudahaleya li Sûrî, kurdan bo çareserkirina pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane, çalakîya bi navê ´konên çareserîya demokratik´ li darxistibûn. Ev, çalakî çîya û çawa ya û armanca çi bû, em pêşî bi wê bidest nivîsandina vê beşê bikin. Berî ku em vê çalakîyê û çalakîyên weke vê ên sîvilane ku gelê kurd li dar dixistin werênina ser ziman, em pêşî hinekî bi kortasî li ser rengê hebûna pirsgirêka kurd, hewldanên rejimên herêmên weke weke rejima tirk ku çawa bi wan di xwestin ku weke «pirsgirêka terorê» bidina nîşandin rawastihin. Ji ber ku ev jî giring a. Ji ber ku aliyekî ve jî, van çalakîyên sivîlane ku gelê kurd êdî ji salên 2011´an û pê de bidest kirina wan kir, ev hewldanên rejimên herêmê ên ku «pirsgirêka kurd» weke «pirsgirêka terorê»´didan nîşandin jî eşkera(deşîfre) dike û **teşîr dike**. ..

- Ku em li nêzîkatîya rejimên herêmê ên weke ´rejima tirk´ û hwd ên li pirsgirêka kurd bihizirin, gelek mînaqên dîrokî hena ku mirov dikarê wan werêne ser ziman. Ku em zêde kevn neçin, em herina sala 2010´an û ji wê demê û bi ber roja me ve werin û bênin, wê baştir bê. Bo fahmkirina nêzîkatîya rejimên herêmê a dane nîşandinê pirsgirêka kurd weke «pirsgirêka terorê» û ankû hertimî di vê temenê de ku çawa li ber rayagişt û welatên ewropî dîplomasî kirina, wê vê jî bi me bide fahm kirin. Rojhilata navîn, ku mirov lê dimeyîzenê, mirov di serî de pirsgirêka kurd, weke pirsgirêkaka sereke ya mazin dibîne. Di çapameniya cihanê de, çend ku ev pirsgirêk wilqasî mazin û kure ji, zêde li ser nayê sekinandin. Ev li ser ne sekinandin ji hinek sedemên wê yên sîyasî û yên ji berjewendiyan hene. Lê tevî waqasan ji dîse, pirsgirêk, dike rojê de. Li ser pirsgirêka kurd, ku mirov bisekinê, divêt ku mirov bi wê re bi wê rewşe

pirsgirêkitiyê re li ser pêşketin û dîroka rojhilata navîn bisekinê. Ji ber ku ev hemû ji bi hev re girêdayîna. Î ro, ku li kurdistanê, çi pirsgirêk hene, hêzên herîmî û navnetewî na. Ew pirsgirêk bi wan ve ji girêdayî ya.

Di sêrî de, deme ku mirov têne di çerçove pirsgîrêka kurd de li herêmê dihizirê, mirov ku têne ji destpêka sadsala 20an ji hildê dest û hate roje me bêne, mirov rastî dîrokaka mazin ye ku hebûna xwe hate roje me parastiya têt. Î ro, em di sadsala 21 ê de na. Em di 2010 an de na. Hindik maya ku em bikevina 2011an de. Lê hê ji, pirsgîrêka kurd hebûna diparezê û hêzên ku muhatabê wê pirsgirêkê ne ji, dixwezin hê ji wê pirsgirêkitiyê bidina berdewam kirin. Tenê di deme serokwezîrê berê yê Filandî ku ji bo ku roparekê bide amede kirin hate kurdistan û tirkiyê û di wê demê de hinek hêzên di nav artişa tirk de yên ku biteybet hatina avakirin li Çolemerge bombeyên ku taqandin, wê têgihiştinê bi me re didina çêkirin. Ev bombeyên ku taqîn, divêt ku mirov li ser wan bihizirê. Her kesek li wan hizrekê têne ser ziman. Hinek bi hinek hêzne derve girêdidin û hinek ji bi kurd û tekoşîna wan ve girêdidin. Lê piştî bûyaran re rewşên ku derketina holê ji, ti gûman ne hiştin ku ew bûyar ji aliyê hêzên dewlete tirk ve hatina kirin. Ev yek ji, derketa holê.

Di aslê xwe de, ku mirov li ser van bûyaran di hizirê, di serî de hizir bi me re çê dibin. Di deme ku Serokwezrê berê yê Filandê Martin Ahtîsarî li wir bû ew taqîn pêk hatin. Çima? Dem, ku mirov li ser dihizirê, hinek tiştna bi têgihiştin bi mirov çêdikin. Berî hertiştî hinek nêht û niyetne ne baş radixina berçavan. Ji dewletê, qadaxakirin zimanê kurdî ji divêt ku mirov bi gotinekê ji di vir de bêne ser ziman. Wekî din ji, ew rafarandûma ku bû û kurdan têde bigiştî got "boykot" ji paya wê di van taqandinê de heya. Lê ji hemûyan zêdetir, bi gera Martin Ahtîsarî re hinekî girêdayî divêt ku mirov wê bêne ser ziman. Di piştî derîyan de di naqabîna serokwezîr û serokkomarê tirk û Martin Ahtîsarî de di çerçeva pirsgîrêka kurd de çê hate axiftin, weke ku hinekî bi wê ve ji girêdayî ya. Weke ku tê zanîn, dewlete tirk, her maf xwestinaka kurdan ye ji dewletê, weke karekî "terorîstî" tê binavkirin û mahkumkirin û li ber wî tê sekinandin. Bi vê yekê ji, êdî çûna bi ser de dikin. Minaq, ji ber ku zimanê kurdî di her qadê ji li wan hatiya qadaxakirin, kurdan di nav xwe de biryar da ku ji bo ku hefteyekê dibistanên tirk boykot bikin. Li hemberê wê, berî herkesekê dewletê çêkir? ji serok wezir û serok komar bigire hate binî, kurd ji aliyên wan ve hatina tehdîtkirin. Piştre di cih de ew afîrên ku ji bo boykotê hatina amedekirin ji, bi sedeme ku " xwestekên dervî zagon" hatina nîşandin û çûna bi ser wan de. Hemû ji hatina qadaxa kirin. Kurdan bi vê boykota duyemîn, xwestin ku weke ku çawa ku di destûrabigihin ye tirkî de ti mafê ji kurdan re nîn e û wan hemûkan weke "tirk" dide nîşandin, her weha bi pergala perwerde ew pêvajoya bişavtinê ya ku li ser serê wan tê meşandin, xwestin ku boykot bikin û pêre ji wê bişikênin. Bişavtin şucekî mirovahî ya. Î ro, kurd, li tirkî rastî wî şucê mirovahî tên. Ziman wan, û çanda wan ji her aliyî ve hanîna ser ziman qadaxa ya. Ku ziman, hate qadaxa kiriin, wê çaxê wê çand û têgihiştin û hizir û dîroka ku bi wî zimanî di wî zimanî de tê ser ziman, win ji dîrokê dibin. Î ro, ya ku li ser serê kurdan dibê ji, her weha ji vê pêve ne tiştekî dî ya. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha di vir de bi zelalî kifş bike.

Ziman, ku newê parastin û nebe zimanê perwerde ji xwediyê xwe re, hingî, ji holê rakirina wê dibêt. Ya ku î ro dibê ji her weha ev yek bixwe ya. Li Kurdistanê, ev yek û kirin, xwediyê dîrokaka pir mazin a. Ew dîrok, di çerçove roje me de û di demên buhurtî de dem bi dem dîroka wî heya. Bûyar û pêvajoyên ku di van rojan de rûdidin ji, ji vê

pêşketin û dîrokê ne dûr e. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha di serî de bêne ser ziman. Di deme ku Martin Ahtîsarî li Kurdistanê bû, ew bûyar, bi hev re bi carekê re bûna, têne armanca wan heya. Ew ji her weha pirsgirêkê weke "pirsgirêka terorê" dana nîşandin heya. Dewlete tirk, bi vê yekê her weha vê yekê dide berdewam kirin. Bi vê yekê re, mirov divêt ku vê ji bêne ser ziman. Em ê li jêr li ser bi berfirehî bisekin in. Lê divêt ku mirov bi gotinekê ji bê di vir de di serî de bêne ser ziman ûp bêje, ku di çerçoveyek li dijî kurdan de statûqûyaka ku di hev de û bi hev re ku di nav hêzên herêmê de di konsensûsê de ye heya. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bi teybet kifş bike û bêne ser ziman. Ev bûyar, wê hê ji, heya ku zêdetir bibin. Heya ku hê bêhtir çûna bi ser kurdan de bibe. ..

Di vê demê de, ye herî girîng ew e ku kurd di nav xwe de yekbûn û konsensûsekê çêkin û pê li dijê van kirin û bûyar û rewşan bisekin in. Ev yek ji her weha pir girîng e. Divêt ku mirov vê yekê ji her weha bi teybet bêne ser ziman.

Bi teybetî ji, divêt ku mirov di van rojan de hinekî bi baldarî û rast tevbigerihê. Divêt ku mirov bi teybetî vê yekê di nav xwe de bikin. Kurd, divêt ku di nav xwe de xwediye yekbûnekê bin. Ne wilo bê, wê nikaribin ku bi ser van rewşan re werin û bi ser bikevin. Ev yek her weha ji bo demê û pêşketinên ku bibin û ku karibin li ber wan bisekin in pir girîng e..

Di serî de, em ku wilo zêde dûr neçin, em hinekî ku bi sereke ji bê li ser dîroka pirsgirêkê ye demên dawiyê em li ser bisekin in. Pêvajoyên pirsigrêka kurd, yên demên dawiyê, mirov karê ji peymana "qasrê şêrîn" bide destpê kirin û bêne hate "peymena Lozanê" ye ku hatiya mohrkiirn û têde kurdistan hatiya çar qat kirin. peymena qasrê şêrîn, di naqabîna dewlete osmaniyan û ye sefeviyan de tê mohrkiirn. Ev peyman di sala 1639an de tê mohrkirin. Di çerçove têkçûna şerê çardiranê de bi têkçûna sefevîyan û serketina osmaniyan re rewşe ku hatibû afirandin hate fermî kirin. Di wê rewşê de kurd nebûn. Waletê kurdan hate qatkirin. Kurdistan hingî bû du qat. Piştre, çend ku şer û pevçûn di naqabîna van hêzên de cih bi cih bûn ji, lê wan ji, li herêmên kurdan yên ku di bin destê xwede digirtin de li ser kurdan gelekî şerên erêkirina van peymana ye li wan bi wan re dana meşandin. Ev rewşên şer yên ku bi dixwestin wê duqatbûnê pê bidina erêkiriin, piştre ji, hate sadsala 19 berdewam dike. Kurd, li ber wê li berxwe didin. Wê erêna kin. Pêşketin û pêşveçûnên sadsala 19 û wan, li hemû cihanê rewşeke nû ye demî diafirêne. Hêz ji, li gor wê rewşê xwe nû dikin û desthildariyên xwe ji nû ve ava dikin. ne osmanî û ne sefevî karîn xwe li gor wê rewşê nû bikin. Ew nêzîkatiya demê ya ku bi awayekî desthilatdarî ji bê, li berçav girtina wîna xalkan ji ne dîtî ve tên û ev yek ji dibe sedeme çûna wan. Kurd, di wê deme de xwediyê derfetekî pir mazin in ku wê rewşê ji ser xwe biavêjin. Ku yekbûnaka hesanî ji di nav xwe de çêkiriban, wê di wê heyemê de bi serketinaka mazin bi serketiban. Lê ew di nav wan de kêm bû. Hêz û xalkên ku kurdistanê bicihbûn ji, yek bi yek bûna armanc û hatina tesfîye kirin. Kurd, ji ber ku hem ji aliyê hijmarî ve gelek bûn û hem ji di nav xwe bi aşîrî bi hev re bûn, êdî hinekî xwe ji tinebûna xilas dikin. Lê ev xilasbûn, nabê xilasbûnaka ku bi serxwebûna wan bê. Bi vê yekê, êdî pirsgirêka kurd ji, di keve demeke nû de. Di wê demê de xalkên ku di nav xwe de yekbûn çêkirin, yek bi yek gihiştina serwerbûna xwe di wê heyemê de. Lê kurd, ji ber nebûna yekbûna nava wan û ew yekbûnên bi aşîrî ku êdî ne li gor demê bûn û li gor demê ji pir kêmbûn û êdî bersiv ne didana demê, êdî xwe li ser xwe nagirin. Dewlet osmaniyan, hingî, serketina wê ye

herî mazin, ku hinek ji wan aşîran aqilê wan ji rê bibe û wan kişêne çem xwe ya. Bi vê yekê, êdî di nav kurdan de yekbûn ji, temenê wê ji holê tê rakirin. Serhildan û raperînên ku ji bo serwerbûnê di kurdistanê de dibin ji, bi vê yekê, êdî bi sernekevin. Êdî ew ji, têk diçin.

Sadsala 19 min, demeke pir girîng e di vê yekê de ji bo kurdan. Lê kurd wê ji bo xwe bikar nayênin. Serhildan û raperînên kurdan yên gelî yên ku dibin ji, ji aliyê rêveberên ku li ser serê wan serdest in, weke hinek "raperînên ku dixwezin şarîatê bênin" têne nîşandin û her weha êdî ew "paşvarû" têne nîşandin. Bi vê yekê, ew ji piştgirtinê dûrkirin. Di wê demê de li herêmê derketina "yekitiye sovyet" ji, bi vê yekê dûrî wan disekinê. Raporên ku ji navende Anqarê diçina wir hemû di wan de, ev yek tê nivîsandin. Îran ji, hingî, li dijî kurdan e. Ew ji, bi vê yekê bi komara tirk ye ku di wê demê de nû tê avakirin ye ku di serî de damazrînerên wê ji kurdan re dibêjin "emê di komarê de bi hev re, her weha bi mafê xwe wê bijî" û bi vê yekê piştgiriyê ji kurdan distênin û piştre kurdan înkar dikin û zimanê wan ji weke "zimanekî çolî" diidina nîşandin û mahkumkirin û piştre her weha pêvajoya bişavtinê li ser kurdan bidest meşandinê dike re dimeşê. ..

Ev pêvajo, êdî pêvajoyaka nû ya. Kurd, di wê pêvajoyê de ne xwediyê ti desthilatdariyê ne. Desthilatdariyên wan yên ku hate wê demê ku ne bi awayekî fermî ji bin, ji holê têne rakirin. Îran ji, bidest hertiştiyê ku heya bi nav persitiyê bêne ser ziman. Kurdî li wir ji tê qadaxakirin. Kurd, di karên dewletê hemû têne dûr kirin. Li aliyê tirkî ji rewş wilo. Li tirkî rewş hê xirabtira. Tirkî piştî avakirina komarê, bidest şerê bi kurdan re dike. Ji destpêka komarê hate salên 1940an de, her weha ev rewş têne berdewam kirin. Dewlet hate van deman şer bi kurdan re dike. Pirsgirêka kurd, êdî her weha hebûna xwe dide berdewam kirin û her ku têve diçê ji, hê bêhtir kurd têne kûştin û komkujî pêk tên. Di wê deme de, hate van deme ku başûr rojhilatê Kurdistanê ji di nav de aliyekî mazin yê herêmê di bin dest firansiyan de ya. Başûrê Kurdistanê ji di bin destê Îngilizan de ya. Ew herdû ji bi hev re bi hêzên herêmê re lev dikin û bi wê levkirinê hebûna xwe didina berdewam kirin. Lê ew levkirin ji, weke ku tê zanîn ku ser tinebûna kurdan a. Îngilîz û Firansizî ji wê rewşê herê dikin û piştre di deme ku bi peymenên weke peymenên Lozanê re ew ji wê rewşê herê dikin.

Weke ku çawa ji deme mohkirin peymana qasrê şêrîn ji deme ku hate mohrkiirn û bi vir ve hate wê rojê bi kurdan re şerê dana erêkirina wê bi wan re hate meşandin, êdî piştî Lozanê re, ew şer bi şerê erêkirine peymana Lozanê. Her weha êdî dem ji bo kurd û hêz û herêmê ji dikeve demeke nû de. Li Kurdistanê, hate ku dem tê salên 1940an wan, êdî demeke nû dest pê dike. Li bakûr û rojhilatê kurdistanê, weke ku dengên kurdan hatiya birrîn. Lê rojhilat, hê ne wilo ya. Bi teybetî ji li bakûrê Kurdistanê li aliyê di bin mitingeriya komara tirk de her zindiyê ku xwe labitandiya hatiya kuştin. Bi vê yekê, êdî weke ku bêdengbûnak lê çêdibe. Ew bêdengî hate deme ku tevgereke nû di nav kurdên bakûr de xwe dide nîşandin di 1967-8 wan de, berdewam dike. Lê li rojhilatê kurdistanê ji, labitandin heya. Yekitiya sovyet ye ku hê nû hatiya avakirin û hê ciwan e, wê labitandinê dibîne û di sala 1943an de bi artişa xwe dikeve wir de û li wir komaraka kurd ye bi navê "komara kurd ye mihabede" dide avakirin. Artişa wê ji dide ava kirin. Ne hêze Îranê û ne ji yên herêmên din karin herine bi ser de. Lê piştre bi hinek têkiliyên li ser Firansa û Îngilistanê re hêze Sovyet di berdêlna de ji wir hêze bi şûn ve dide kişandin û kurdan bi baxtê wan re bi artişa Îranê re bi têne dihêle. Piştre, ku

hêzê sovyet bi şûn di vekişihê, êdî piştre hêze artişa îranê dikeve herême de û li herême bidest komkujiyan dike. Seroke komarê Qazî Muhamed û rayadarên dewletê bi tavahî ne kuştin. Qazî Mihamed ji, *qad çarçira* ye komarê dibina sêdarê û wî bidar ve dikin. Bi vê yekê, êdî ew komara kurd ji ji holê dirabê. Yên ku serokê hêzên komarê bûn weke mele Mistafa Berzanî diravin û xwe xilas dikin û piştre tekoşînekê ji başûrê Kurdistanê bo Kurdistanê didina dest pê kirin. Piştre ku ew diçina sovyetê ji, êdî sovyet, rayadarên wê, weke ku çavên wa ji tiştna tirsaha bê, êdî piştgirîyê ji nadina wan..

Bi vê yekê re başûr û rojhilat, çend ku tekoşînaka kurd ye bi navê tekoşîna "hêzên kurd yên pêşmerge" re dest pê dike, êdî wilo zêde êdî deng dernekavê. Lê hate ku dem salên 1970 wan, êdî weke ku tevgereke mazin di nav kurdên van herêmen de ji dest pê dike. Ew têvger, bi pêvajoyên ku destê amarika ji di nav de ya "peymanê Cazayîrê" ew ji tê xwestin ku ji holê bê rakirin. Bi wê peymanê, ew tekoşîna kurdan, dise derbeyaka mazin dixwe. Piştre, hate demeke dirêj bi ser xwe ve nayê.

Lê hate wê demê li bakûrê Kurdistanê ji, tevgerek bûya. Ew tevger ji, jê re tê gotin "Numayîşên rojhilat" an ji bi tirkî "dogu mitinglerî" tê gotin. Piştî waqas kuştin û tafisandinan, êdî ev weke ji nû ve rabûnaka dî ye li ser ling e. Her weha divêt ku mirov vê yekê wilo bêne ser ziman. Di nav kurdan de, ji salên 1940an û hate wê demê, êdî tevgereke hin bi hin rûdidê ku bi teybetî ji ciwanên xwandevan û yên ku di dibistanên dewletên serdest de ji bê ku dixwênin, bi di pêşengtiya wan dest pê dike. Ev tevgerên li herêmên kurdan li Kurdistanê, hin bi hin dibin û êdî mazin û zêde dibin. Mirovên ku ji wan re pêşengtiyê dikin ji yên xwande na. Bi vê yekê, êdî hin bi hin, weke ku temenê tekoşînaka kurdî ku têgihiştina demî ye nûjen ji ku jê ne dûre, êdî dest pê dike. Lê ew tevgerên ku li herêmên kurdan dibin ji, êdî di cih de bala rayadarên dewletên dikişênin ku yên ku pêşengiye dikin, êdî hinek ji wan têne girtin û hinek ji wan têne girtin û hinek ji wan bi tevgerên camaatan ku wan weke "komînist" û "li dijî xwûdêbûnê" didina naskirin, êdî wan bê bandûr dikin. Yên ku dikin wê bê bandûrbûnê bişikênin ji, êdî ji aliyê dewletê ve têne tasfîyekirin. Gelek ji van, bi hinek rêxistinên ku weke ku bi aslê xwe kurd in û ji aliyê hinek navendên dewletê ve hatina avakirin, bi wan, dikin wan mirovên ku pêşengtiyê dikin bikişênine rojava û li wir ji xalkê dûr bigirin û bi vê yekê wan bêbadûr bikin. Hate derekê ji di vê yekê re bi ser ji dikevin. ..

Ev tevger ji, bi vî awayê, tenê ku cerbandinên wê li şûn wê dimênin êdî ji holê tê rakirin. Bi vê yekê re êdî weke ku bêdengîyeke din dest pê dike.Lê vê carê, ew bêdengî, wilo zêde berdewam nakê û êdî tekoşîna kurd ye hemdem dest pê dike. Êdî ji bakûrê Kurdistanê ku dest pê dike, pêvajoyaka nû li Kurdistanê bigiştî gav bi gav dest pê dike.Ji ber ku bi peymana Lozanê re Kurdistanê hati çar qat kirin û her qatek di bin desthildatiya dewleteke ku hatibû avakirin de bû, êdî li ber wê tekoşîna kurdan, bi hev re tevgerîneke wan dewletan çêdibe. Ew tevgerîna ku hate roje me ji hebûna xwe dide berdewam kirin, bi piştgiriyên li herêmê û qada navnetewî hebûna dide berdewam kirin. Kurd, her weha bi hebûn û dîrok û waletê xwe re, hate î ro, li ber statûqûyaka herêmî bi vê yekê ji bo azadiya xwe têdikoşin. ..

Kurd, hate î ro, bi vê yekî û rewşê re rû bi rû na. Li ber wê rewşê û statûqûya li ser serê wan li ber xwe didin. Zimanê wan û çanda wan hatiya qadaxa kirin. Î ro, em di sadsala 21 de na û di 2010an de û hindik maya ku em bikevina 2011an de. Lê hê ev rewş li ser serê wan hebûna xwe berdewam dike. Kurd, li ber wê rewşê di temenekî ku wê erênekin de li berxwe didin. Rafarandûma ku li tirkî bû, pêvajoyaka nû ya vê

pêvajoya pirsgirêka kurdan li herêmê bigiştî da dest pê kirin. Ku kurd, î ro, wê hê ji baş fahm ne kin, lê wê ancamên wê pir mazin bin. Ji ber vê yekê ya ku serokwezirê tirkî di cih de denezand ku wê "destûraka nû ya bingihîn wê binivîsênin". Wê di wê destûrê de ji, hewl bidin ku wê ev rewşe ku heya hebûna wê bi înkarê bidina berdewam kirin. Lê ku kurd yekbin, wê ev yek nebe. Piştî boykotkirina di rafaradûmê de, î ro, kurd bimaf ji bo zimanê xwe ku bibe zimanê perwerde û bi zimanê xwe yê dayikê perwerde xwe bibin in, careka din dibêjin boykot. Ev boykot, girîngiye wê û ancamên wê, wê ji ye boykote pêşî wê maztir û dîrokî bin. Wê pir baş bide berçavên herkesekî ku zimanê kurdan li wan bixwe ji hê ji qadaxa ya. Di vir de, em li ser navê xwe ji ji bo xwe ji gotinekê bêjin. Ez nivîskariya zimanê xwe yê ku li min bixwe ji hatiya qadaxa kirin dikim. ..

Kurd, di vê boykote xwe ye dûyemin de ji rast in û di cih de dikin. Divêt ku vê yekê re bi bawer bin. Tirs divêt ku gavê biwan bi şûn ve nede avêtin. Ev gava rast, wê pêşaroja zaroyên wa xilas bike. Divêt ku ev yek pir baş û qanc were fahm kirin. Zimanê kurdî, zimanekî herêmî yê herî kevn e. Xwediyê dîrokaka pir kevn e. Lê ev ziman, î ro, li mirovên ku xwediyê wê bixwe ne ji re hatiya qadaxa kirin.. Zimanê tirkî û fêrbûna wê li ser wan hatiya ferzkirin. Ev qadaxa ya ku ji her aliyê ve were şermazarkirin û mahkumkirin, divêt ku bi boykotê destpêka şikandina wê bê kirin. Bi vê yekê re, derbeyek li pêvajoya bişavtinê ye ku li ser kurdan tê meşandin bê xistin.

Di van demên dawiyê de ji, bombeyên ku têne taqandin, divêt ku bê zanîn ku ne bê sedem in. Yekemîn sedem, amcamên di rafarandûmê de derkatin in. Duyemîn ji, her weha hatina Martin Ahtîsarî ye ku wê bilêvkiribû ku wê "raporak" amede bikiran a. Di vir de, berî ku Martin Ahtîsarî bi rayadarên dewletê re hevdîtinê bike ji, bûna wan bûyaran ji bi wate ya. Weke ku temenê axiftin û zanîn ku di derbarê kurd û tekoşîna wan de bidin û radest bikin temenê wê dixwestin biafirênin. Ew zanebûn û dosyên ku bidin ji, mirov ji van herdû bombeyan fahm dike ku wê têde bêjin ku " ti pirgirêka kurd nîn e, pirsgirêka ku heya ji ye terorê ya". Bêgûman, wilo xuya dike ku wê dewlet bi van peyemên xwe yên ku xwestiya ku bide Martin Ahtîsarî û heyeta pêre, wê bi sînor nemêne. Wê hê ji, wê bi kar bêne. Wê di çapamenî û rayagiştî ye hundurû zêdetir wê peyemên xwe bide derve û rayaderve ye navnetewî. Kurd, di serî de divêt ku wê lîstika dewletê ye di vir de kifş bikin û vala derxin. Dewlet, dixwezê bi vê yekê, ancamên boykota rafarandûmê ji di raya giştî ye navnetewî de kêm bike. Ev ji heya. Divêt ku ev yek pur baş bê dîtin. Di vê demê de baş xwandina rojeve, wê biqasî ku mirov ji têkçûnan rizgar bike wê mirov bi gelek pêşketin û serketinan re ji rû bi rû bihêle. Bi ancamên boykotê re, tenê bi hundurû re bisînor mayîn, wê ti carî, ancamaka mazin bi xwe re neyêne. Pişt wê re tiştên ku bêne kiirn, yên weke bilindkirina tekoşîna fermîkirina zimanê kurdî û perwerde pê divêt ku bê kirin ji, divêt ku bêne kirin. Pirtûkên perwerde zimanê kurdî bêne amede kirin. Rêzxistin bûyîn, divêt ku hê ji bê mazintir kirin. Divêt ku di qada navnetewî de agahdarbûna û dîplomasiyaka xurt û mazin û dîrokî bê meşandin. Dewletê, bi taqandina bombeyên li Çolemergê re destpêka dîplomasiya xwe ye li dijî dîplomasiya kurdan ye wîna wan ya ku bi boykotê re derketa holê da. Ev yek, di serî de divêt ku were dîtin. Ku ev rastiya dewletê were zanîn, di vê deme boykote dibistanan de û pê xwestina perwedeye bi zimanê dayikê re, wê bêhtir bi ser bikevin. Mafê zimên mafekî herî xweza yê mirov a. Mafê her mirovî heya ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde xwe bibîne heya. ...

Herkesek ji dibêje û dizanê ku hate ku pirsgirêka kurd newê çaraserkirin, ne li rojhilata navin û nê ji di nav kurdan de wê aramî hebe. Aramiya di nav kurdan de, aramiya herêmê bigiştî ya. Kurd, gelekî herî kevn ye herêmê ya. Lê ji hemû mafên xwe yên mirovehî bê par hatiya hiştîn. Divêt ku mirov biteybet vê yekê ji bêne ser ziman. Kurd, hê di sadsala 21´ê de di 2010an de, hê têkoşîna bidestxistina mafên xwe bi hêzên metinger yên li ser serê xwe re didin. Di dest pêka sadsala 20an de, statûqûya bê ku kurd têde hebin, hate afirandin. Bi peymanên weke Lozanê re ji hate fermî kirin. Kurd, bi tê awayî de têde ne hatina hiştîn. Rengê peymena Lozanê di înkara kurdan ye di destûrabigihîn ya tirkiyê de xwe dide der. Çend ku di destûrabigihîn ya îranê de mafê perwerde yê kurdan hatiya nivîsandin ji, hate nahaka ev nav ne hatiya bikar hanîn. Ji ber çi ..? Ev pirs, divêt ku mirov nahaka wê hê bêhtir jii rayadarên îranê bi Pirsê. Bersive wan ji bicih ne hanîna wê re çi ya? Her weha divêt mirov bi pirsê û bersiva wan hildê. Li Sûrî, çend ku di 2009an de mafê tirkmanan yê perwerde bi zimanê dayikê di destûrê de hate misogerkiirn, gelo çima yê kurdan nebû? Kurd, ne bin 2 milyênan re li Sûrî hene. Lê mafê wan nîn e.

Kirina Tirkî, Îran û Sûrî di çerçoveyekê de tê berçav. Ew çerçove ji, çerçoveyeke ku di înkara kurdan de û bi pê ji ji dîrokê birina wan de levkirinak heya. Her çend bi şerê li Îraqê re bi yê yekemîn û yê duyemîn re vê levkirinê bi xwarina derbeyeke mazin re hate dîtin ji, lê hê ji li ser lingan e. Divêt ku ev yek her weha were dîtin. Kurd, divêt ku di vê demê de berî hertiştî li ser rastiyaka ku rastiya xwe bi her awayê tênine ser ziman re, di qada navnetewî de dîlomasiya xwe bikin. Yê ku wê herî zêde di vê hanîna ser ziman de pêşengtiyaka mazin bike ji, ku hebin, gelê kurd bixwe ya. Di vê demê de divêt ku civate kurd û dînamîkên wê ên bizane ku di têgihiştin û zanebûnekê de werine cem hevdû. Berî hertiştî hizir û têgihiştine wan çi bê, di xala pirsgirêka kurd û di têkoşîna çareserkirina wê de bigihine hevdû. Ev tekoşîna bi armanca çareserkirina pirsgirêka kurd, wê piştre hin bi hin bi xwe re pêvajoyên boykotkirina dibistanan, çalakiyên weke çalakîya konên aşîtîyê û ankû weke ´konên çareserîya demokratik´ û hwd bixwe re û bi demê re bêne. Dem û serdem êdî di çok(mecra)eka din de dimeşê. Ev çalakî, bi rengekî jî çalakiyên ku civak û têgihiştinê bi hevdû re hevnasîn çêkiriya û ancamên wê na. Her wusa, ku weke çand û cejneka kurdan a dîrokî jî ya newroz, bi civatîya xwe re êdî wê temenên çalakî û kombûnên bi vî rengî jî wê biafirêne. Newroz, temenê tekoşîna civatî bi awayekî vekirî diafirêne. Hizrên nû di serê mirov de diafirêne. Yek ji wan hizran jî, ´çalakîya konên aşîtîyê´ ya ku êdî wê ji newroza 2011´an û pê de were pêşxistina. Em hinekî li ser vê çalakiyê û rengê wê rawastihin bi dîrokê re. ..

**Gandî**, li Hindistanê bêîtatîya sivîlî deme ku da dest pê kirîn, pêşî nasnemaya rejima serdest ya metinger şawîtand. Piştre wî û bi wî re gelên Hindistanê bi hev re bidest tekoşîna xwe ya sevîl kirin. Bêîtatîya Sivîl ya Wê demê azadîya gelên Hindistanê hanî. Piştî wê tekoşîna bêîtatîya sivîl re Hindîstan, gihişt azadîya. Rejime metînger dawî lê hanî. Li kurdistanî, piştî wê demê, bi çend deman re î ro, kurdistanîyan çalakîya bêîtatîya sivîl daya dest pê kirin. Kurdistanî, mafê xwe yê ku ji destê wan hatina girtin dixwezin. Di Konfaranse Lozanê de mafê wan yê azadîyê ji her aliyê ve ji destê wan hate girtin. Bi wê re jî bi sînor mayîn nebû, ji bo ku wan ji dîrokê bibin û an jî êdî navê wan di dîrokê de ne hêlin, zimanê wan hate qadaxa kirin. Demên piştî wê peymane re demên ku bi wê peymene û vaca ku têde hatîya afirandin re çûna bi ser kurdan de ya. Li kurdistanê, piştî wê peymane re bi dehhezaran kurd hatina kûştin. Komkujîya Dersimê,

komkujîyaka ku piştî mohrkirina wê peymane re pêk hatîya û têde ku ne bin 140 hezar kurdî re hatî qatilkirin. Komkujiyên weke wê, ku li demê re belavkirin û têne kirin hene. Hate ku dem tê komkujiya Helebçê, kurd wê bi sadhazaran werina qatilkirin. Tenê ji bo ku kurd in têne kûştin û qatilkirin. Em î ro di 2011 an de dijîn, lê hê jî ew komkujiyên li ser serê kurdan berdewam dikin. Hê jî, oparasyonên leşkerî yên artişê li ser serê kurdan dibin.

Di 2011an de di roja komkujiya kurdan di roja 16 adare 2011an de komkujîya li bajerê başûrê kurdistanê li Kurkekê pêk hatî û dewlete tirk di oparasyonên ku dana kirin li ser serê kurdan de di heman rojê de sê ciwanên kurd şehîd kirin. Piştre jî oparasyonan berdewam kirin. Bidehan kurd hatina şehîdkirin. Li bajerên kurdistanê bi hêze polês û hêzên teybet re çûna bi ser gel de û bi sadan mirov hatina birîndakirin. Ev rewş, hemû di sale ku me têde dijîn di 2011an de dibin. Kurd, tekoşîna wan ya bi çalakîya bêîtatî ya sivîl re ji vê re dibêjin ÊDÎ BES! Ji komkujiyên ku bûn re dibêjin êdî bes. Zimanê wan yên dayikê yê ku ji wê konfaranse Lozanê ve hatîya qadaxakirin, dixwezin ku ew qadaxakirin ji ser rabê û êdî bi zimanê xwe êdî xwe û zaroyê bidest perwerdekirinê bikin. Kurd, bi kurtasî êdî li welatê xwe li Kurdistanê bi navê xwe û zimanê xwe û bigiştî bi zimanê xwe bêne naskirin. Ji ber vê yekê, êdî li ser lingan a. Di wê deme ku kurd bi gelî berteke xwe didina nîşandin de parlamane wan yên ku ji aliyê gel ve hatina hilbijartin zor li wan tê kirin. Lê mixabin, li ber wê hate nahaka ti deng derneketîya. Ev hêrîş hemû, î ro kurd wan roj bi roj dijîn.

Di van çalakîyên bêîtatî yên gelê de sê xwestek di serî de derketina pêş. Yek, sekinandina oparasyonên leşkerî sekinandina wan ya li ber wan a. Ya din jî, astagên ku bidestûrî li pêşîya zimanê kurdi ji bo ku newê bikarhanîn hatina afirandin û çêkirin bêne rakirin a. Ya sêyemin jî, ew e ku kurd êdî dixwezin ku bi nasnama xwe werina naskirin. Kurd, li ti qadê û derê bi navê xwe nayêna naskirin. Bigiştî li dijî wan pêvajoyaka înkarê li holê heya. Kurd, dixwezin ku ew ji holê rabe. Minaq, deme ku kurd ji ber şer ji welatên xwe diravin û têne welatên rojava yên weke Almanya û Firsansa jî, kurd ji kîjan beşa kurdistanê hatibin ku ew beşa kurdistanê dibin metingerîya kê û kîjan hêzê de bin, bi navê wan têna nasîn. Minaq, ku ji beşa rojhilatê kurdistanê ku î ro dibin metingerîya îranê de ya ku ji wir herin, wê weke "Îranî û fars" werina naskirin, ku ji beşa bakûrê kurdistanê ya ku di bin metingerîya tirkî de ya ku ji wir herin, wê li dere ku çûnê de, wê weke "ji tirkî û hemwelatîyê tirkî û tirk" werina nasîn. Lê ev ti carî rastîya kurdan nayênê ser ziman. Ji vê kirina ku weke polîtîkakaya li dijî kurdan tê li berçav, mirov fahm dike ku polîtîkayaka dij-kurd li her qadê di merîyetê de ya. Mirov wê dibîne û hîs dike. Ne tenê ji wê mirov wê dibîne û hîs dike. Îro, li Kurdistanê şerek heya. Her roj, di wî şerî de mirovên kurd têne kûştin. Lê mixabin, ji ti saziyê deng û sahl dernakevê. Emê wê rewşê jî, bi çi û kîjan felsefê û rawîst(ahlaq)ê û bawerîya olê bênina ser ziman? An jî, mirov karê weha bêje, ku ka ma ka ev di kîjan felsefe, ahlaq û bawerîya olê re rast tê dîtin?

Dewlete tirkî, hewldaya ku kurdan ji her aliyê ve ji holê rakê. Bi vê yekê re, ew ketîya nava hewldanake de. Di van rojên ku kurd li ser lingan a û çalakîya sivîl ya bêîtatî lidar dixin de çapamaniya tirkî jî, bidest hêrîşên li dijî kurdan kir. Ji aliyekî ve artiş li bejê oparasyonan li dar dixe. Ji alîyekî ve jî li der û bajerên kurdistanê polês û hêzên teybet di nav xalkê de zorê bikar dihênin û ji aliyê dî yê sêyemin ve jî çapamanîya wê jî, di haman rengê û awayê de bi zimanê xwe hêrîşe dike. Bi wê hêrîşe û

zimanê xwe re jî hem wê zor û şîdete ku tê bikar hanîn meşrû dike û hem jî ew ji ji aliyê xwe wê zor û şîdetê dide meşandin. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku kurd ji gelek aliyan ve di bin zor û şîdetekê de na. Gelê kurd, î ro zimanê wan qadaxa ya, lê ti çapamanî vê yekê nayênê ser ziman. Jixwe bahs jî nakê. Weke ku tiştekî wilo nîn a tevdigerihê.
Xal û rêbazên ku di peymane Lozanê û Paxta Sadabadê de hatina kifşkirin, li gor wê î ro li ber kurdan tevgerin dibê. Mafê kurdan di van herdû konfaransan de hatibû ji wan standin. Navê wan jî ji holê hate rakirin. Di paxta sadabadê de kurd, ji her aliyê ve ketina ber pêvajoyaka tûnekirinê de. Zimanê wan, ew qadaxakirina li ser hate jidandin û nivîsandin û axiftin bi pê jî hate qadaxakirin. Kurdên ku bi kurdî diaxiftin, divîyabû ku ku kuştina xwe jî di nav de hertiştê ku wê were serê wan daban li berçav. Ji Paxta Sadababê pêde li kurdistanê oparasyonaka naqandina kurdî li her qadên wê bûn. Çi nivîs û pirtûkên û berhemên wan yên nivîskî hebûn ji holê hatina rakirin. Bi wê re li pêşîya nivîsandin û afirandinê jî astang bidestûrî weke ku li tirkî bi destûrî hatina afirandin bûn. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku Paxta Sadababê, destpêkaka nû ya li kurdistanê. Li kurdistanê, ew beşkirina li çar qatanya herêmên kurdan di bin destê hêzên ku lê serdestin de, di wê Paxta Sadabadê de hate safîkirin û sînor hatina kifşkirin. Di wê Paxta Sadabadê de pirr mazin nîqaşak li ser sînoran dibe. Hate wê demê navê Sûrî nebû, di wê derê de ew der û navê wê jî û sînorê wê jî tê kifşkirin. **Nîqaşên li ser tevlîkirina Xatay û Îskenderûnê ya li nav sînorê tirkî de jî tê safîkirin**. Piştî wê safîkirinê re êdî tevlîkirin tê kirin. Hingî, hê sûrî ne ava bû û Hêzên Firansa li ser wir serdest bûn bi metingerî.

Lê Îraq ava bû û di deme ku di naqabîna wê û Îranê de li ser herême "Şat-ul arab"ê de nîqaşên ku bin, weke yên li ser Xatay û Îskenderûnê hesanî na meşîn. Ji ber vê yekê, ew mijar, teneê bi hin xalna bê ku bibina sedeme hin şerna têne hiştin li demên piştre. Di demên piştre jî, Îraq jî û Îran jî li ser wir doza maf dike. Bi vê yekê re ew rewş, piştre wê bê sedeme şerê di naqabîna şerê Îraq û Îranê de. Kurdistan, safîkirina qatkirina wê ya di nav sînoran de di wê demê de tê şafîkiirn. Di peymane Lozanê de çendî ku Kifşkiirn bû jî, Ew hêze Tirkî hê wilo zêde nebû ku li ber kurdan wê bêne ser ziman. Di deme ku Konfaransa Lozanê bidawî dibe û deme ku heyete tirk di vegerihê tirkî û bi wê denezana ku têde sînorê tirkî dide kifşkirin û yên ku li ber wê ku rabin ku weke "yên xiyenet" di denezênin, piştre kurd, fahm dikin ku ew welatê wan hatîya qat kirin. Piştre bi tevgera Azadîyê, bi dest rêxistina kurdîstanîyê ji bo tekoşîna wê tê kirin. Lê di wê demê de serokên komala azadîyê hemû têne girtin û têne bidarvekiirn. Yê ku sax dimêne têne Şêx Seîdê Pîranî ya. Ew piştre wê serokatîya serhildanê wê hildê ser milê xwe. Lê ew bixwe jî, ne bi tememî amedê ya. Bi bûyara du leşkerên ku li wê li heman herêmê serhildana kurdan dikeve rewşaka ku zû êdî destpê bike. Lê hê ew amedekarîyên wê bidawî nebûna û çekên wan û rêxistina wan ne wilo zêde ya.

Piştî ku Serhildana kurdan dest pê dike, kurd tevlî wê rewşa xwe ya ku ne bi tememî amede na jî, xwediyê wê karîna ku wê bi serbikevin in. Herêmên dora xwe hemûyan hêzên kurd dikina bin destê xwe de û rêveberîya kurd lê ava dikin. Hin bi hin, êdî bi êl û aşîrên din yên herêmên din yên kurd re dikevin têkiliyê de ku ew jî bi alikarîya wan serwerî û serdestîya xwe ya li herêmên xw ebikina destê xwe de. Di wê demê de hêzên tirk, bi tememî weke ku tê jî çûna. Lê di wê demê de hêzên Firansa li herêmê na û ew jî di wê şerê li dijî kurdan de piştgirîyaka wan ya ku wê kurdan hêza wan pişta wê

bişikênin ji hêza tirk re dikin. Riya trenê ya ku di destê wan de bû, ku wan ji hêzên tirk re ku nevekiriban ku hêzên tirk bi wê tirkê çek û leskerên xwe bi veguhêzêne li qada pişt hêzên kurd re û ji piştre li wan nexin, wê kurd têkneçin. Lê ku firsansî sînor divekin û êdî hêze tirk hinek tabûrên xwe bi temem di veguhezê qadên li pişt hêzên kurd in û ku êdî ku ew veguhaztin dibe û piştre ku herîş li hêzên kurd dibe, piştre wê hêzên kurd, bidest têkçûna xwe bikin. Ji xwe, piştî ku ew têkçûn bû û kurdan jînkir, piştre hêzên tirk ne sekin in û bi ser herêmên din yên kurdan de çûn ku temenê serhildanê bi tememî ji holê rakin.

Bi wê têkçûnê re û wê çûna li ser kurdan de ya di pişt wê têkçûnê de, wê kurd êdî temenê serhildanê ji holê rabê. Demên piştre hemû êdî ne demê serhildanê na, demên ku dewlete tirk dike ku temenê ser hildana kurdan bi tememî ji holê rakê ya. Herêm bi herêm, deme ku bi ser wan de çûyin dibê jî, wê li ber xwe bidiin. Ew li berxwedan jî, weke serhildanên herêmî wê werina rojevê û mohrra xwe li dîroka kurdan bixin. Hate ku dem tê deme Paxta Sadabadê, wê bi tememî bi komkuji û jenosîdên mazin yên ku bi kurdan dana jînkiirn jenosîdên weke jenosîdên Dersimê re wê kurd, werina ber astaka xilas bûnê. Jenosîda Dersimê, derbeye pêşî ya ku kurdan xwar bû. Piştî wê re wê kurd weke ku ji kal bikevin. Li ser wê kalbûnê re ku êdî deng ji kurdan dernekeve û ku derdikeve jî kêm e, wê Paxta Sadabadê pêk were û bê bidawî kirin. Piştî bi dawîbûna wê re êdî biçûna bi ser kurdan re wê rojhilatê kurdistanê êdî li derne wê serhildanên gel bibin. Ew nearamî û nexweşiya ku di nav kurdan de piştre dibe, wê bê temen ji afirandina komara kurd ya li wê beşa kurdistanê ji ´komara kurd ya mihabadê´ re.

Piştî Paxta Sadabadê, wê zimanê kurdî qaxadakirina wê bi aliyê ve bibe. Çi nivîs û berhem û pirtûkên kurdî hebûn, wê yên ku hêzên dewletê xwe digihênina wan, êdî wan ji holê dirakin. Wê ev rewş, li bakûrê kurdistanê i zoraka dewetê ya ku piştre dide berdewam kirin re wê bibe. Hertimî bi tirimbêlên leşkerî çûna bi ser gund û bajerkên kurdan de, wê bibe. Hate ku dem tê deme tekoşîna azadîyê PKK. Piştî wê re, êdî wê demeka nû dest pê bike. Wê ji nû ve nivîsandina bi kurdî jî bibe. Destpêkirin bi vê yekê re, weke ku di wê demê de û di demên piştre de dihê gotin, wê bivejînî bê. Gotina "jinûve vejînbûn", êdî piştre li ser vê rewşê wê were holê û ser ziman. Ev pêvajoyên berî deme derketina azadîya kurdistanê ku baş newina fahmkirin, wê ne ew dem û ne jî ew qadaxakirina li ser zimanê kurdî ku hate roja me berdewam dike wê baş were fahm kirin. Paxta Sadabdê, bi şert û mercên xwe yên deme re û biryarên ku li ser kurdistanê û beşkirina wê û sînorên ku têde hatina xîzkirin di nav hêzên ku tevlîbûnê de safîkirina wan ya ku têde ku bû, demeka nû diafirêne. Paxta Sadabdê Lozanê herêmê ya. Divêt ku mirov wê bi vî rengî baş û qanc bibîne.

Î ro, ku hê jî ew qadaxa ya zimanê kurdî berdewam dike û sînor di nav kurdan de hatîya xîzkirin û derfet ji her kurdî hatîya standin ku bi buhurina ji herêmên li herêmên din, di wê paxtê de temenê wê hatîya afirandin û piştre pêşketina ramyarî ya pergalê li ser wê re hatîya jînkirin. Başûrê kurdistanê ji salên 1990 ve xwediyê xweserîya xwe ya. Bi serê xwe ya. Çend ku hukumet û parlmane wê jî heya, ew î ro ku bi ser wê bûna wê de 22 sal buhurtina jî, jhê jî nikarê destûra xwe ya bingihîn binivîsêne. Sedeme wê jî, divêt ku mirov bi pêvajoya Lozanê û Paxta Sadabdê yên ku hê jî xwediyê buhurînaka dadî na, bi wan re bibîne. Kurd, di herêmên xwe de bi civatê î ro jî li ber tûnebûnê na. Mafê wan ji wan hatîya standin. Bi vê yekê re, wate wan çalakîyên li kurdistanê yên bêîtatî ji bo kurdan bi heyîn û hebûna wan bi tekoşîna wan ya ji bo mayîna wan dihê

holê. Kurdistanî, hemû, bi hemû hebûna xwe re divêt ku tevlî wan çalakîyan bibin. Divêt ku ti kes ji wan xwe ji wan çalakîyan dûrnegirê. Em di zanîn ku her kurd bi dilê xwe re li wir e. Lê hin kurdên me, ji ber ku tirsê di cihê xwe de di sekin in. Divêt ku ew jî, êdî wê tirsê ji ser xwe biavêjin. Ji xwûdayê xwe pêde bila ji ti kesekî ne tirsihin.

Dewlete tirkî, li ber kurdan bidest oparasyonên lleşkerî û sîyesî kirîya. Li welatên ewropa jî bidest dîplomasîyaka xwe ya li dijî-kurdan kirîya. Dewlete Tirkî ew hewldana wê ya ku di kongirê konseyê ewûropa ya rêveberên herêmî de ku xwest ku tekoşîna kurdan PKK weke rêxistinaka ´terorîst´ bidina nîşandin jî, dide nîşandin ku tirkî hê di pey tûnekirina kurdan de ya. Kongirê konseya Ewropa ev xwesteka tirkî herê nekir. Em vê neherêkirina wê rast dibînin û dibêjin ku ev hewldanên weha yên ku bersivê ne bibînin yên dewlete tirk, wê aşîtîya herêmê ya nav gelan zûtir bêne. Nêzîkatîya kongira Ewropa ya rêveberîyên herêmî ji aşîtîyê re xizmet kirîya. Em hêvî dikin ku ew rewş bê berdewam kirin û di berdewam wê nêzîkatîyê de hewldanên xwe yên aşîtîyana kongira eworopa ya rêveberîyên herêmî bide berdewam kirin. Tirkî, piştgirîyaka wê ya ji şerê li dijî Libya dihê meşandin re jî heya. Ji wê piştgirîyê jî, dixwezê ku hin ancama li dijî kurdan derxe. Di wê deme ku bidest dîplomasîyê hatîya kirin de, tenê ev armanca wê heya. Di deme Şerê Îraqê yê yekemin, di deme şerê Îraqê yê duyemin de û di deme ku Tirkî bû andamê konseya awlakarîyê ya NY ji bo 2 salan jî, ew dîplomasîya xwe pirr mazin meşand. Î ro jî, ji şerê li dijî Libya ku dibê, bi heman awayê dîplomasîyaka wê heya. Tirkîye piştgirîyê dide şerê li dijî Libya û nahaka ew li ser wê piştgiriyê xwe re bazariyekê dike ji bo wî şerê ku li ser serê kurdan dimeşêne ku ji bo wê piştgirîyê bistêne. Di çerçova nîqaşên ku ji bo mudahalya li Îranê de jî, heman dîplomasî û bazartîya tirkî bi hêzên rojava re li ser kurd û kurdistanê û wê herême kurdistanê ya rojhilat jî heya. .. Ji dêla ku tirkî vê yekê bike, divêt weke xwestekên sereke yên gelê kurd sekinandina oparasyonên leşkerî û sîyasî, qadaxakiirna li ser ziman kurdî bêne rakirin, xwestekên kurdan yên perwerdehîya bi zimanê dayikê divêt ku bibîne. Divêt ku pêşî, ev werina kirin. Tirkî, weke dewleteke ku naxwezê ku bi kurdan re bijî tevdigerihê. Dewleteke ku di wê xwestekê de bê, wê zimanê kurdî qadaxa nakê û oparasyonên leşkerî û sîyasî yên qirkirina kurdan li dar nexê. ..
..

**Dewletê, bi hêrîş birina bi ser konên çareserîya demokratîk´ de nîyeta xwe ya şer dîyar kir.**

Di wê demê de, du demên pêvajoyên pirr girîng kurdan dan dest pê kirin. Pêvajoya pêşî, bi vedana konên çareserîya demokratik re bû. Pêvajoya duyemin jî, ya ku YSK biryara veto ji bo sîyesetmedarên kurd da bûbû. Di deme wê vetokirinê de, kurd bi tavahî rabûna ser pîyan û bi berxwedana xwe ya ku dana nîşandin de, ew biryara xwe bi şûn ve dan kişandin. Dewletê, li ber li berxwedana gel, bi şûn ve gav avêt. Ev herdû pêvajo jî, di demê de li dûr hevdû tên. Pêşî, kurdistanîyan konên çareserîya demokratik vedan. Di wan konên ku vedan de jî xwestên xwe hanîn li ser ziman. Xwestên wan wan yên pêşî ew bûn ku ew şerê ku dewlete tirk li ber wan dide berdewam kirin bê bidawîkirin. Sîyesetmedarên wan yên girtî bên berdan û pêşî li sîyesete wan were vekirin. Oparasyonên leşkerî û yên sîyasî ku dewlete tirk li dijî kurdan hê dide meşandin, bê rawastandin. Astangîyên li pêşîya zimanê wan bê rakirin. Bi wê re jî, xwestin ku êdî bi zimanê xwe yê dayikê perwerdehîya xwe bibînin. Ev bûn xwestên kurdan. Di serî de kurda, tiştek wilo zêde ne xwestin. Tenê ew mafên wan yên ku ji wan

hatina hildan carek din li wan werina vegarandin, li wan bên dayîn. Lê dewlet, nêzîkî vê yekê nabê. Bersiva dewletê ya ji van xwestên kurdan re şer, oparasyonên leşkerî û sîyasî bûn. Ji ber ku bi konên çareserîya demokratik re, derkete holê ku ti planên wê yên ji bo çarserkirina pirsgirêka kurd hatina amede kirin nîn in. Êdî hê bêtir çûna bi ser kurdan de. Bi hezaran kurd hatina girtin. Bi dehan jî cîwanên kurd, hatina kuştin in.

Dewlete tirk di xwezê ku kurdan ji dîrokê bibe.Di wê hewldanê de daya.Bi wê armancê zimanê zimane wan yê zikmakî hatîya qadaxakirin.Zaroyên wan ji biçûkatîya xwe hate ciwanîya xwe, di pêvajoka bişavtinê de têne buhurandin. Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku kurd, î ro, şerê mayîn û nemanê didin.

Kurd, ji gelek aliyan ve derfetên wan kêm in. Hêzên cihanê yên ku pişta wan bigirin yên weke Emerîka û hwd, li ber kurdan disekin in. Di wê deme ku ev şer û oparasyonên bi awaykî pirr mazin li dijî kurdan tên meşandin, Emerîka piştgîrya xwe ji rêveberîya tirkî li dijî kurdan têne ser ziman. Bi kurtasî, Emerîka piştgirîyê dide jenosîda kurdan.

Di wê rewşê de kurd, di çi rewşê de na? Divêt ku mirov vê pirsê jî ji bo wan bi pirsê. Kurdan, hê yekbûneka ku karibin bi wê li ber wan hêrîşên li ser serê wan dibin bisekinin di nav xwe de ava nekirin. Di wê pêvajoyê de ev rastî, hê bêhtirî pêdivîya wê tê hîskiirn. Mirov, ku li wan hêrîşên ku li ser serê kurdan dinerê, ji bo ku mirov bibe xwediye bertekekê, ne hewceye ku mirov kurd bê, mirov ku hinekî jî bê ku hestetîya mirovatîyê ku bi mirov re hebe, mirov wê bê xwediyê bertekekê. Lê mixabin, Tevî wanqas hêrîşên ku li ser serê kurdan dibin jî, wilo zêde ti bertekên mazin nîn a. Bi vê re, mirov çawa êdî karê bahse mirovatiyê bike. Yên ku li ber wê bibê deng in, wê çawa êdî karibin bahse mirovatiyê di gotinên xwe de bikin? Em vê pirsê dikin û di buhurin.

Konên çareserîya demokrat yên ku li kurdistanê hatina vedan, di aslê xwe de rastîya dewletê bi zihnîyeta wê re raxista li berçav. Hizrên wê yên di derbarê kurdan de rijandina li holê. Hukumete T. Ardogan, ya ku bi devî dîgot ku "emê pirsgirêka kurd çareser bikin", piştre derketa li holê bi heman awayê got ku "êdî pirsgirêka kurd nîn a". Bi vê yekê re, da nîşandin, ku ew gotinên ku wî berê bi navê hukumete xwe hanîbûna ser ziman, hemû jî derew û vir bûn. Hemû jî derew û vir derketin. Ti rastîya wan nebû. Hemû gotinên wî jî, yên ku ji bo aqilê mirovan ji rê bibin bûn. Ev derkete holê. Ya ku ev rastî derxista li holê jî, dîsa ew konên çareserîya demokratîk yên ku kurdan li kurdistanê vedan bûn. Wan konan rastîya wî û gotinên wî û virên wî derxistina li holê. Lê konên çareserîya demokratik yên ku kurdan li kurdistanê vedan, rastîya dîn derxistina li holê. Ew jî, ev bû ku kurd êdî gihiştina zanebûnaka mazin di xwe de bi xwe re. Bi wê yekê re, êdî dana nîşandin ku rêxistinîyaka wan ya xurtt heya. Ev rastî jî derkete li holê.

Li kurdistanê, konên çareserîya demokratik, ji roja ku hatina vedan hate vê rojê, di wan de li ser pirsgirêka kurd nîqaş û dan û standin tên kirin. Bi wê re jî, di temenekî xwe perwerdekirinî de bi hev re tevdigerihin. Kurdan di wê demê de rastîya dewletê jî baş naskir. Lê bi wê re jî, dewletê jî, xwe da li berçav. Her roj, rojek namêne ku hêrîşên polîsên dewletê yên hovana li devereke kurdistanê li kurdan nebin. Lê bi teybetî jî, her hêrîş li konên çareserîya demokratik dibin. Konên çareserîya demokratik, ji ber ku polîtîkayên dewletê yên ku bi şer dikevina merîyetê de teşîr kir. Dewlet, bi vê hêrse ku ji wê teşîrîya li polîkayên xwe girtîya êdî hêrîşê dibe bi ser kurdan de. Di wê demê de, bi teybetî, di deme hêrîşan de hêrîşkarîya hovana ya polîsîên tirk derdikeve li holê li berçav. Mirov wê pirr dibîne. Çawa ku hêrîşî dê, zaro, kal û jinan dikin. Di nav

kevneşopîya kurdan de hêrîş birina ser zaro û jinan, ji bêrûmetîyê dihê hasibandin. Yên ku wê bikin jî, ti carî bi rûmet nayêna hasibandin. Yên ku li ber wan bi bêdeng jî bin ku kurd jî bin ti carî bi rûmet êdî navê wan nayê hildan û bi bîr hanîn. ..

Di nav kurdan de hemû kurd li ber wê bi bertek in. Lê tenê hin kurdên ku devşîrme ne û bi têgihiştina tevşîrmetîyê tevdigerihin, deng ji wan dernayê û hwd. Ew jî, yên ku bi kirin û hewldanên xwe yên li dijî kurdan yên ku hertimî lenete kurdan hildana li ser xwe na. Di aslê xwe de, serokwezirê hukumete tirk T. Ardogan diçê ku derê dibêje ku "75 wekilên min hene". Gelo 75 wekilên wî, çima deng ji wan derneyê, di deme ku ewqas hêrîş li kurdan dibin de? Ji ber ku ew hin mirovna ku ji xwe re dibêjin ku ´em kurd in´. Lê di aslê xwe de, bi kurdatiyê re di eleqeye wan nemaya. Ew, bi sîyesete dewletê ye devşîrme tevdigerihin. Ew yên ku biaqil xwe, dewletê ew devşîrme kirina na. Bi vê yekê re, wan dev ji kurdîtîya xwe berda ya. Ew, nikarin ji xwe re bêjin ku em mirov in. Û nikarin bêjin ku bi me re mirovatî jî heya. Ji ber ku yê ku li ber zilmê bê deng bê, ti carî ku ne kurd jî bê, nikarê bêje ku ez mirov im jî. Kurd, civakeka ku li rûmete xwe pirr mazin dihizirê ya. Ku mirov bêje ku ji di dîrokê de û di roja me de herî zêde ji kê ji bo rûmete xwe çûna miriinê, mirov wê bersiva kurd bide. Dîroka wan, bi vê yekê re tişî minaq û fêr a. ..

Di nav kurdan de di demên berê de yên ku bênemûsî dikirin, ji wan re gotinak dihate gotin. Ew gotin gotina "Hîz" bû. Gotina hîz, hê gotinaka ku ji deme Gûtîyan û hwd maya. Mirovê ku jê re hîz hate gotin di nav civatê de, êdî ew mirov di nav wê civatê de ne dima. Li herêmê jî ne dima. Ji herêmê di ravî û diçû cihekî ku êdî ti kesek cihê wî nizanê. Mirovên hîz, mirovên ku deme ku hêrîşek hate ser axa wan li ber wê bi bêdeng bûn, deme ku destavêtinbûnak li mala wan bû û li ber wê bi bêdeng bûn, ku yekî destavêtinak li nemûsa yekî ji civatê kir û li ber wê bêdeng û bêtevger ma û sekinî di cihê xwe de û hwd, ji wan re dihate gotin. Mirovê ku di vê rastîyê de bû û êdî ku dihate bawerkiirn ku êdî rûmete xwe winda kirîya, êdî jê re hîz dihate gotin. Ev gotin, di demên berê de pirr dihate bi karhanîn. Mirovên kurd yên bi rûmet, wê mirina xwe wê hildaban li berçavên xwe û wê ne hiştiban ku ev gotin ji wan re bihate gotin.Wê ew gotin, ji xwe re ne hanîba.

Di vê deme ku hêrîş li ser serê kurdan heya, û jin û zaroyên wan derbeyê dixwûn kurde ku li ber wê bi bêdeng bê ti carî divêt ku ji xwe re û ji navê xwe re bahse rûmetê nekê. Divêt ku kabul bike ku ew rewşa wî ya ku ew di wê bêdengîya xwe de têde ya, têne hîzîtî ya, bênamûstîya. Di wê demê de, ji vê aliyê ve û ji her aliyê ve, ev weke azmûnaka rûmetê ya ku kurd hemû bi yek dengî li ber wê zilma ku li ser serê wan ku tê meşandin bideng bin. Ya ku ji bo wan bi rûmet û ku wê ji şerefê bê nivîsandin jî, ev a. Divêt ku ti kurd, di wê demê de xwe nekê rewşaka ku jê re hîz bê gotin û wê gotinê bêne ser xwe. Ev yek, ji bo wî û rûmeta wê girîng a. Ji bo dîroka wî girîng a. Divêt ku vê yekê pirr baş û qanc bizanibê. Di wê demê de, bêdengbûn, ti carî ji rûmetîyê nayê hasibandin. Ji xwe tenê hin kurdna ku bi dewletê û îstihbarate wê re tevdigerihin bêdeng in, ji wê pêde kurdên din hemû jî bi bêdeng in. Ew jî, gelo her şev d di nav cihê xwe de ku serê xwe di dênin, gelo xew dikeve çavên wan de, karin xwe rehet hîs bikin? Di vê demê de kurdekî ku rastî hêrîşê ne hat name. Mirovên kurd, yên ku di bin konên çareserîya demokratik de rûniştina her roj rastî hêrîşên dewletê û hêzên wê tên. Ew mirovên ku rastî hêrîşan tên hemû jî, jin û zaro na. Yên ku di bin wan konan re rûniştî de axlabê wan jin û zaro na.

Konên Çareserîya demokratik, polîtikayên dewletê yên şer teşir kirin. Ji ber vê yekê wilqasî hêrîşê dibe bi ser wan de. Konên çareserîya demokratik, ji aliyekî din ve jî, temenê sîyesete kurd ya demê afirand. Kurd, ji bo ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin, êdî sîyseete xwe li ser wê temenê ava kirin. Ev yek jî rast bû. Ya herî rast û li gor demê bû. Bi vê yekê re, dewlet kete zorê de. Dewlete ku tekoşîna kurdan hertimî bi awayê ´terorî´ dide nîşandin û li ser wê temenê her roj dosya amede dikirin û dişandina navendên rojava û Emerîka, êdî ew temenê wê ji destê wê şamitî. Ji ber vê yekê, herîş dike. Di deme ku Sîyesetmedarên kurd serî ku YSK´a tirkî dan ji bo ku herina meclîsê û li wir vina kurdan temsîl bikin, di YSK de, astengîya ku ji wan re xwest ku bi vetokirinê derxê, di temenê wê de hewldanaka ji holê rakirna sîyesete kurd û vina gelê kurd bû. Wekî din jî, bi riyên sîyesete hewldana kurdan ya çareserkirina pirsgirêkn xwe yên bi dewletê re, dewletê di sîyesete wê ya ku li ser temenê şer û li dijî kurdan ava ya, kira zorê de. Di vê dmê de, yê ku herî zêde li dijî kurdan sîyesetê dike serokwezirê tirkî T. Ardogan a. Bi gotina ´yek milet, yek al, yek ziman, yek ol, .." û hwd re ew înkara kurdan dide meşandin. Di deme ku wî li Hewlêrê got ku "me êdî dawî li înkara kurdan hanî", hingî, ku jê bihate pirsîn ku ma wê kurd êdî karibin bizimanê xwe re êdî perwerde xwe bibin in?. Wê bi bersiv dayina wê pirsê re, di wê demê de wê derew û vira wî derketiba li holê û hatiba dîtin. Wê hatiba dîtin ku ne rast diaxivê. Lê di vê deme dawiyê de di deme ku wî xwest ku nemzetên xwe yên ji bo hilbijartinê bide nasîn, hingî, wê bixwe ew gotina xwe li derew û virê qaliband.

Êdî hatîya dîtin ku hate ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê li ti welatên rojhilat pêşketinên demokratik yên rêveberî wê ne bin. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka herêmê ya herî dîrokî ya bingeh a. Pirsgirêka Îsreal û Filistênê jî, ji bo ku ev pirsgirêka kurd nayê çareserkirin, ew jî nayê çareserkirin. Hemû welatên ku aligirên wê pirsgirêkê na jî, ji aliyekî ve pirsgirêka wan ya kurd heya. Hemû welatê herêmê yên ku di wê pirsgirêkê dikin ku bibina xwediyê sîyeset, welatên ku pirsgirêka wan ya kurd heya. Divêt ku ev ji were dîtin. Hin caran welatên wek tirkî, bi qirîzên weke yên "qirîza kîştê ya bi Îsrealî re" ji bo ku rojevê xwe bi wê bide guharandin bikar dihênin. Hin caran, weke ku li "Forûma davos"ê bû, weke ku serokwezirê tirk kir, ji bo ku hin sîyesetên xwe yên ku li herêmê bi kar dihênin. Hin caran, weke îranê, bi Pirsgirêka Filîstinê re wê ku bi kar dihêne bikar dihêne. Hate ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, bila ti kes ne hêvîyê bê ku wê pirsgirêka Îsreal û Filîstînê jî bê çareserkirin. Ji ber ku bi teybetî, ji hersê welatên ku pirsgirêka wan ya kurd heya, ji Îran, Sûrî û Tirkiyê re bi van rengan û û gelek rengên din wê bikar dihêjin ji xwe re. Di deme Saddam de jî, ew pirsgirêk bikar dihanî. ..

Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku rêveberîyên herêmê bi hin sîyesetne ku li herêmê tenê karibin xwe bijîn, pirsgirêkan bikar dihênin. Ji aliyê bikarhanîna pirsgirêkan ya ji wan aliyên bi van rengan ve di wê demê dawîyê de hinekî fêra wan jî bû. Rêveberîyên ku li herêmê ava na jî, bi awa û têgihiştina xwe re neyê ku pirsigirêkan çareser bikin in, her weha yên ku her weha bi vî rengî karibin ku ji pirsgirêkan sûd bigirin û li ser wan xwe bidina berdewam kirin in. Pirsgirêka kurd, mixabin bûya pirsgirêkek ji wan pirsgirêkan. Ne tenê rêveberîyên ku li herêmê ava na, her weha ya Emerîka jî vê yekê dike ji bo ku karibê sîyesete xwe bide berdewam kirin li herêmê. Li herêmê, Ku weke ku li Îraqê bû, şertê Îran û Tirkî yê ji wê re ew bû ku di berdêla ´li ber kirinên li ser serê kurdan de bêdeng bimêne û di berdêla ku îran û tirkî ku başûrê

kurdistanê bi bombabaran bikin de´, li wê derê, karê hinekî bixwe bimêne. Ev rewş jî dide nîşandin ku pirsgirêka kurd, ti hêzên ku li herêmê sîyesetê dikin nemana ku jê sûd nagirin û jê bi vî rengî û hê gelek rengîn din wê bikar nayênin.

..

**Konên çareserîya demokratîk, ji newroza 2011´an û pê de hatibûbûna avakirin.**

.

Li kurdistanê, pêşketinên pirr mazin yên dîrokî bi rê ve diçin. Berî Newroza Pîroz bi çend rojan kurdan konên aşîtiyê( ji ´konên çareserîya demokratîk´ re ´konên aşîtîyê´ jî tê gotin) vedan. Ew kon, konên ku çareserkirina pirsgirêka kurd bûn. Li her bajerên kurd yên ku mazin in ev kon hatina vekirin. Ji bo ku çareserîyeka bi riyên dervî şer ji pirsgirêka kurd re were dîtin, kurda ew kon vedan. Di roja Newrozê de jî, piştî ku bi sadhezaran pîrozbahîyên xwe kirin, piştre bê ku jev belav bibin, bi hev re ketina meşê de bi ber konên aşîtiyê de. Ji bo ku wan konên aşîtiyê zîyeret bikin. Li Amedê, piştî ku bi sad hazran û milyonan xalkî newroza pîroz kir, piştre bi hev re ketina rê de û bi ber qada ku lê konên aşîtiyê lê hatina vedan ve ketina rê de. Ev kirin û çûna bi rûmet ya gelê kurd, di rê de rastî astangîya polêsan hat. Lê gel, her tişt da berçav û ketina rê ve bi ber konên aşîtiyê de. Ne tenê li Amedê, li Cizîrê, Nisêbinê, Colemergê, Êlîh û hwd, ku hê li gelek bajerên din yên kurdistanê ev rewş hebû. Li van bajeran jî konên aşîtîiyê hatibûbûn vedan. Piştî pîrozbahîyan gel bê ku ji qadê vaqatihê bi hev re ketina rê de û diçina bi ber konên aşîtîiyê ve. Ev çûna gelê kurd, ji du aliyan ve mirov divêt ku wê bixwêne. Aliyê pêşî, ew e ku gelê kurd piştgirîya xwe ji her aliyê ve dide nîşandin ji çareserkirina pirsgirêka kurd re bi rêyên aşîtiyê. ..

Lê dewlet, ji ber ku planaka wê ya çareserkirina pirsgirêka kurd nîn a, di van her meş û çûyinên bi ber konên aşîtiyê de astangîya derdixe. Li Cizîrê ku weke warê berxweda û serhildanê dihê zanîn û dîtin, li wir polêsên dewletê di deme ku gel kete rê de û dirişmên xwe yên ji bo bidawîkirina şer avêtin û xwestekên xwe yên ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd hanîna ser ziman, ketina hêrîşê de bi dehan kurdistanî di wê çûna bi ser wan birîndar kirin. Ev rewş, ji kurdistanîyan re ne beyenî ya. Ev rewş, rewşa ku zihniyete dewlete di temenê wê de ya.

Kurdan, di newroza 2011an de, tişta ku derkete pêş, xwesteka çareserkirina pirsgirêka kurd bû. Kurdan, ev newroza we weke newroza aşîtî, azadî û çareserîya pirsgirêka kurd dît. Dewlet, di hewldanaka ku pêşîya xwestekên gelê kurd bigirê de ya. Bi vê yekê re, di deme ku gelê kurd, j qadên pîrozbahîyên newrozê ku bê ku jev belav bibin ketina meşê de bi ber konên aşîtîiyê de. Vedana konên aşîtîiyê, rastîya gelê kurd ya aşîtîxwez dide nîşandin. Lê li ber wê mudahaleyên dewletê jî, didina nîşandin ku dewlet, di şer de xwediyê israrekê ya. Li her qada ku newroz hate pîrozkirin de, piştî pîrozbahîyê gelê kurd, bi hemû hêze kete rê de bi ber konên aşîtiyê de. Ev rewş, di roja pîrozkirina newrozê ya 20an de ev rewş, bi teybetî bi kurdistanîyan re derkete pêş. Çendî ku astang hatina derxistin li pêşîya gel, gelê kurd bi biryardarî li ber sekinî û ew buhurand. Da nîşandin ku wê ti hêz li pêşîya hêze wê ya gelî ne sekine. Konên aşîtîiyê, avakarên wan dayikê aşîtîiyê yên kurd in. Dayikên aşîtiyê yên kurd, dayikên ku herî zêde bidilêş in. Her dayikek ji wan, ya keça xwe di vî şerî de windakirîya, yan kurê xwe di vî şerî de windakirîya, yan xwûşk û birayên xwe di vî şerî de windakirin û yan jî jinên kurd yên ku hewserê xwe di vî şerî de yên ku winakirina. Hemû jî, bi vê yekê, mirov karê bêje ku dayikên ku bi dilêş in. Di vê dema newrozê de konfaransa malbatên

şêhîdên kurdistanê ya duyemin pêkhat. Li kurdistanê, di wî şerê ku hate nahaka hatîya meşandin de ser 50 û an jî 60 hezar keç, law, mêr û jinên kurd hatina şehîd kirin. Ew nirxên kurdan yên pîroz yên herî bi rûmet in. Di vî varî de jî divêt ku sazîbûnaka pirr mazin were kirin. Ew dayik, bav û mirovên kurd yên bidilêş, divêt ku sazîyaka wan ku ew karibin xwe têde bênina ser ziman ya bi bandûr were avakirin. ..

Konên aşîtiyê ji, yên ku ew vedana, dayikên kurd yên bi dilêş in. Ew jî, dengê xwe yên dikin, ew deng dengê herî biwate yê ku gelê kurd yê ku di wî şerî de afîriya ya. Bi vê yekê re, deme ku kurdistanîyan bihîst ku konên aşîtiyê hatina vedan, êdî hîc ti xûf û gûman di dil nejîn û bi ber konên aşîtiyê ve çûn. Gelê kurd, ew rewşa wan ya bi rûmet ku ew dayikê aşîtiyê bi wê kirina xwe re bi tenê ne hiştin, kirinaka bi rûmet ya ku divêt ku bidomê ya. Di her qadê de divêt ku ew dayikên kurd, bibîna xweediyê piştgirîyaka mazin. Bi teybetî, ew konên aşîtiyê yên ku hatina vedan, divêt ku di ramyarîya kurdî de di ramyarîya netewî de û di ramyarîya navnetewî de werîna ser ziman. Deme ku min gotina konên aşîtiyê bihîst, rewşa gandî ya ku bi heman awayê hate bîra min. Li ber hêzên Îngiliz, Gandî, bi sekna xwe re seknaka ku bi wan gavê bi şûn ve bide avêtin de bi pêş ve çû. Divêt ku ew rewş were berdewam kirin. Ne tenê li qadekê li ber qad, bajer, navçe, tax û hwd, divêt ku ew konên aşîtiyê werina vedan.

Li kurdistanê, ev rewşa konên aşîtiyê ji bo aşîtiyaka bi rûmet ku wê xwûna ku diharikê bide şekinandin divêt ku bê berdewam kirin. Ciwanên kurd, divêt parazvanîya wan bikin. Di wan de ev rewşa ku dewlet bi şer dide meşandin bê şarmazarkirin. Gelê kurd, di vê newrozê de ew rewş ji xwe şarmazar kir. Lê ev dem, demeke ku pirr girîng a. Divêt ku ev dem, pirr li ser bisekin in. Demeka pirr zîz a. Dewletê, di roja jenosîda kurdan de di roja jenosîda helebçê de oparasyon li darxist û di heman rojê de sê ciwanên kurd hatina şehîdkirin. Piştre jî ew oparasyon dana berdewam kirin. Piştre jî, şehîdbûn. Ew şehîd jî, şehîdên azadîya kurd yên newrozê na. Ew tekoşarên kawayê hesinkar in. Di wê rojê de, ew gihiştina wê rûmetî ku li ser sofra kawayê hesinkar bi kawayê hemdem re rûnihin.

Konên aşîtiyê, polîtikayên dewletê yên şer teşîrkir. Ji ber vê yekê, ew jî di her qadê de kete şer de. şer li ber gelê kurd yê ku berê xwe da konên aşîtiyê vekir. Li Amedê, Colemergê, Cizîr, Nisêbin, Reha û navçeyên we û hwd, ku hê li gelek bajer û navçeyên kurdistanê û tirkî jî ew astang bûn. Ew çûna bi şer xwepêşandvanên serhildêr de. Ji wê rewşê mirov fahm dike ku dewlet, di poltikayên xwe yên şer de kete zorê de. Kurdan, bi laşê xwe yê rût re li ber hêze dewlete tirk sekini. Ew seknaka bi rûmet a. Konên aşîtiyê, di wan de kurdan xwestaka xwe ya çareserkirina pirsgirêka kurd hanîna ser ziman. Qadaxayên li ser zimanên kurdî, xwestin ku bêne rakirin. Hevdîtinên bi rêberê gelê kurd re bên asta muzakarayan, oparasyon bêne sekinandin û şer bi dawî bibe û çareserî pêk were. Hate nahaka yê ku li pêşîya çareserkiirna pirsgirêka kurd, tirkî ya. Tirkî, hate nahak çend firsand derketina holê, hemû jî, weke ku di vê pêvajoya agirbestê ya li ser haft heman de ku bû, bi hewldanên xwe re vala derxist. Î ro jî, xwestekên gelê kurd yên ku bi newrozê re derketina holê, dewlet kete nava hewldanaka ku wan vala derxê de. Divêt ku dewlet dev ji van hewldanên xwe berde.

Di deme ku me ev nivîs di nivîsa de agahîya nû ya ku gihişt destê min ew bû ku hêzên dewletê herîş birina ser konê aşîtiyê yê Êlîh(batman) Ê.Berî vê demê bi çend kêlîkan agahî hatibû me ku li Wîranşarê, Colemergê, Cizîrê, Nisêbinê û Amedê Hêrîş bûbû. Li herêmên din jî, agahî dikevina ajansan ku hêzên dewlete tirk amedekarîyên

hêrîşên nû yên li ser kurdan dikin. Bi bombayên gazê hêzên dewletê hêrîş birina ser jin, zaro, mêr û ciwan de. Dewletê bi tevahî hêrîş bîra bi ser gel de. Gel, xwest ku bila qadaxaya li ser zimên wê yê zikmakî rabê. Ev jî, nêzîkatîya dewletê ya li gelê kurd a. Em di serî de wê nêzîkatîyê wan û van hêrîşên ku ji aliyê dewletê ve têne kirin li gel û yên ku wê hê li qadên din yên ku li konên aşîtiyê yên ku wê bibin jî, lenet dikin û şarmazar dikin.

-Li Kurdistanê, du û an jî sê roja berî roja newroza 2011´an, konên çareserîya demokratîk hatina vedan.Ev kon, armanca wan e, ku balê bikişênina ser pirsgirêka kurd û wî şerê ku li Kurdistanê tê meşandin. Bi wê re jî, li ser rîyên çareserîya pirsgirêka ku bi riyên dervî şer riyekê bide nîşandin. Armanca wan konan ev e. Kon, ji roja ku hatina vedan û hate roja me, bi hezaran kurd, her roj bikomî diharikina bi wan ve. Xalk diçin û li wan konan dirûnihin û hizir û ramanên xwe li ser çareserîyê dihênina ser ziman. Lê bi vê yekê re, nîqaşak ji li ser çareserkirina pirsgirêka kurd bi wan konan re destpêkir. Pirsgirêka kurd, pirsgirêkaka herêmî ku ne tenê tirkî girêdidê, Îran û Sûrî jî girêdide. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku girîngîya konên çareserîya demokratik ya pirsgirêka kurd, wê bandûra wan, li van welatên din û ramyariyên(polîtîkayên) wan jî bibe.

Ji roja ku konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd, ji roja ku hatina vedan û hate vê rojê her roj hêrîş li wan têna kirin ji aliyê polîs û leskşerên dewlete tirk ve. Sedeme wê ya ku ew wilqasî bi hêz diçê bi ser konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd de ew ku ew polîtîkayên dewletên yên şer ku teşîrkir. Ji ber vê yekê, pirr bi zor bidest çûna bi ser konên çareserîya demokratîk ya pirsgirêka kurd de. Bi teybetî li Nisêbîne, di roja 22an de ku xalkên wê du ciwanên xwe yê ku ji wan ciwanên wan yên ku di roja 16 adarê de ku hatibûbûna şehîdkirin, ji wan da axê. Bi wê yekê re Nisêbînî hemû, bi tevahî li ser lingan bûn. Lê hêzên dewletê jî li ser lingan bûn. Deme ku Nisêbinîyan zaroyên xwe didina axê bidilêş, hêzên dewletê bi polês û leskeran re hêrîşê dibina bi ser wan de. Bi sadan mirov ku jin, zaro, ciwan û mêr in, birindar dibin. Di wê hêrîşê de hêzên dewletê hêrîş biirina bi ser konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd de jî. Di vir de, di naqabîna wan herdû bûyaran de mirov karê girêdanaka mazin çêke. Dewlet, bi polîtîkayên xwe yên şer xwe li ser lingan digirê. Ew ciwanên kurd, di ancama wan polîtîkayên wê de şehîd ketin. Di wê rewşê de konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd, li dijî wan polîtîkayên dewletê yên ku hene ya. Ji ber vê yekê, hêrîşa dewletê yên hêzên wê li wan konan dibin.

Di heman rojê de, "destûrnemaya artişa teybet" hate mohkirin. Ew artiş, wê li kurdistanê kar bike. Her mirovê kurd yê ku wê artişa teybet kuşt, wê ji bo wan maaş bigirê. Her mirovê ku kuştin, wê ji bo wê kuştina wî/wê wê prîman bistênin. Çareserîya Hukumete tirk ev bû ji pirsgirêka kurd re. Serokê hukumete tirk, bangê li rêveberîya Libya û yên din yên herême dike ku "li gel bihisênin, guh bidina dengê gel". Lê ew bixwe jî, ti wê yekê nakin. Bi milyonan kurd li ser lingan in. Mafê xwe yê azadiyê dixwezin. Lê Dewlet, bersiva ku dide wan bi zorê û zordestiyê ya. Bihêrîş birina ser konîn çareserîya demokratî yên pirsgirêka kurd re bersivê dide. Bi vê yekê re dirûtîyê didina nîşandin. Konên çareserîya demokratik yên ji bo pirsgirêka kurd, sedeme wêqasî hêrîş birina bi ser wan de ew e ku polîtîkayên dewletên yên bi şer teşîr dikin in.Ji ber vê yekê, weqasî bi bêwijdanî hêrîşê dibina bi ser wan konan de. Li Nisêbînê bi hêrîş birina bi ser kon de kon ji holê rakirin. Lê Nisêbinîyan, carek din levgihiştina hevdû û konên xwe yên çareserîya demokratik yên ji bo pirsgirêka kurd carek din vedan û avakirin. Bi

vê yekê re weke kurdistanîyên herêmên din kurdistanê Nisêbinîyan ji da nîşandin ku ji bo çareserîya pirsgirêka kurd ya bi riyên dervî şer, di israrê de na.

Li kurdistanê, her herême ku lê konên çareserîya demokratik hatina vedan li wan deran hêrîş li wan bû. Ji ber ku van konan bi heyîn û hebûna xwe re polîtîkayên dewletê yên şer teşîr dikir. Ji ber vê yekê berdewamkirina van konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd girîng a. Di vir de, pirr bi balkeşa ku deme ku polîş hêrîşê dibina bi ser gel de bi bomboyên gazê, di wê de demê de deme ku parlamanterên kurd armanc têne nîşandin. Deme ku ew parlamanterê kurd bertekê li ber polêsan didina nîşandin ku çima hêrîşî gel dikin de, serkowezirê tirk Ardogan, bi awayekî ´hîsterîk´ hêrîşî parlamanê kurd dike. Lê ew polêsên ku bi bombayên gazê hêrîş birina bi ser gel de, ji bo wan ti tiştek nayê gotin. Bi vê yekê re dewlet dide nîşandin ku çawa di polîtîkayên xwe yên şer de bi israr a. Lê di aslê xwe de, ew hêrîşa Ardogan, sedemeka wê ya din jî, ew e ku gelê kurd bi konên çareserîya demokratik yên ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd re polîtîkayên wî yên dewletê yên şer teşîrkirin. Sedeme wê hêrîşa wî ya bingihîn jî ev e.

Dewletê, rêxistina kurd, di berdêla pirr tişt û dayinan de li rojava kira lîsta terorê de.Li ser wê kirinê re dewletê hem li hundurê di nav gel de û li ber gel û hem jî li derve li navendên rojava polîtîkaya xwe li ser wê kirina rêxistina kurd ya kirina wê ya li lîsta terorîzmê ava kir. Bi vê yekê re, ew rewşa konên çareserîya demokratik, bi tememî dijî wê polîtkaya wê ya. Ji ber vê yekê, bi wê re êdî bi polîtîkayên xwe teşîr bû. Dewlet, ji her kirin û polîtîkayên xwe re karê gotinê bibiîn, lê ji wê rewşa ku bi wan konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd re nabîne. Ev pêvajoya kurdan dewlet kira rewşaka ne baş de bi wan polîtîkayên xwe yên şer re. Ji ber vê yekê, berdewam kirina wan ya ji aliyê gelê kurd ve, wê pirr girîng bê. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd jî pir girîng in.

Êdî kurd, naxwezin ku bi wê rewşa ku li ser serê wan hatîya ferzkirin bijîn.Ku ew konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd werina berdewam kirin, wê bandûra wan li rojhilat bigiştî bibe. Li Îranê û li Sûrî jî, divêt ku heman konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd werina vedan û vekirin. Bi vê yekê re, divêt ku di çerçova polîtîkaya demî û herêmî de nêzî lê bê kirin. Wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd li herêmê bi afirênin. Ev konên ku hatina vekirin li Herêma bakûrê kurdistanê li aliyê Tirkî, divêt ku werina berdewamkirin û li aliyê rojhilatê kurdistanê û başûr rojavayê kurdistanê jî divêt ku werina avakirin. Li aliyê Sûrî bi xalkê arab re, bi wan konan re çareserkirina pirsgirêka kurd û li aliyê Îranê jî bi xalkê Fars re çareserkirina pirsgirêka kurd, ev kon wê temenê wan biafirêne. Bi vê yekê re ev nêzîkatîya konî ya bi konan, weke polîtîkayaka giştî ya kurdistanî divêt ku li herêmê pêş bikeve ku ji pirsgirêkên din yên herêmê re jî bi vê yekê re bibe perspektifekê.

Konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd, bi tememî ji herêmê û deme wê ya î ro re xwediyê nêzîkatîyaka nû na. Ji bo pêşaroja wê jî, wê bitêgihiştin perspektifekê biafirêne. Di çerçova wan kon û têgihiştina wan û armanca wan de nivîsandin û hanîna li ser ziman jî, wê temenê wê ya herêmî bi têgihiştin bi afirêne. Wê guharandinê di çanda herêmê û têgihiştina rêveberîyên wê de biafirêne. Wê guharandinê di hemû rêveberîyên herêmê de bide çêkirin. Bi teybetî, ev konên çareserîya demokratik, ku li herêmê baş bêna fahmkirin, wê demekêli herêmê vekin û demekê bigirin. Wê herêm, di nêzîkatîya xwe ya çareserêkirina pirsgirêkên xwe de, wê bigihê nêzîkatîyaka dîn ya herêmî ya rast. Temenê wê nêzîkatîyê, bi hizrî di ola Îslamê de jî heya. Ku hizrên olî

yên rast mirov dixwêne mirov temenê vê nêzîkatîyê jî diafirêne. Lê di nêzîkatîya her rêveberîyê yên herêmê de ev nêzîkatîya olî hatîya piştguhkiirn. Ew nêzîkatî jî, carek din bivejîn bibe.

Rêveberîyên herêmê, ne rêveberîyên aramîyê yên herêmê na. Bigiştî rêveberîyên hemû jî, rêveberîyên wê rewşa bi pirsgirêk ya herêmê ya ku heya yên berdewamkirina wê na. Nêzîkatîyên wan bi polîtîkayên wan ku hate roja me hatina nîşandin û ketine merîyetê de hemû jî yên şer in. Bi têgihiştina xwe ya re rêveberîyên herêmê hemû jî, hertimî û demê karin bikevina şer de bi gelê dibin destê wan de û gelê xwe bixwe jî. Weke ku Li Libya bû. Weke ku li Tirkîya, Îranê Sûrî, Yemen, Sûdan, Mizir û hwd, ku hemû rêveberîyên herêmê mirov karê di nav de bêne ser ziman, di wê nêzîkatî û têgihiştinê de awa û şekil standina. Nêzîkatî kurd ya ku bi konên çareserîya demokratik yên pirsgirêka kurd re, wê bi gelemperî li herêmê wê perspektifekê ji van rêveberîyan re jî çêbike. Wê nêzîkatîya gelî bi gel re derxe pêş. Polîtîkatîya nîjadperest û paşvarû yên rêveberîyan, wê li ber van nêzîkatîyên gel, wê têk herin. Rêvberîyên Rojava ji bo berjewendîyên xwe piştgirîya wan ji rêveberîyên herêmê re heya ji ber gelê herêmê. Minaq, weke Amarîka, Almanyan, Firansa, Ingiliztan û hwd, ku li ber kurdan piştgirîya wan ji rêveberîya tirkî re hate roja me bûya. Bi van piştgirîyan re rêveberîyên herêmê li ber gelên herêmê disekin in. Tirkî, ku hate roja me, ew piştgîrî ji rojava û Amarika ne standibana, wê hate î ro pirsgirêka kurd çareserkiriba. Bi vê yekê re, konên çareserîya demokratik, ji van polîtîkayên qirêt û qirêj re jî bersivaka gelî ya herêmî ya. ..

**Çerçoveya pêşketin û pêşveçûnên sala 2012´an, rojavayê kurdistan bi dem û rewşên wê ya sîyesî a berî dema denezendina hersê kantonên rojava, ´kantona kobanê´, ´kantona Cizîrê´ û ´Kantona Afrînê´.**

Li kurdistanê, di deme ku min ev nivîsand de bombabaranên dewleta tirkî û ya Îranê li ser serê kurdan dibûn. Kurd, di bin zor û şidetê de na. Kurd, di vê demê de, di demeka dîrokî de dibuhurin. Î ro, îran jî û Sûrî jî û Tirkî, ne tenê pirsgirêkên wan bi kurdan hene. Pirsgirêkên wan, bi awayê wan yê pêşketina wan re jî hene. Rêveberîyên wan yên ku berî î ro bi 80 salî temenê wan hatina avêtin û avabûn jî, î ro bi pirsgirêkên dîrokî yên demê re na. Wek sedemên wan pirsgirêkan, mirov karê pir sedeman bêne ser ziman. Lê di aslê xwe de sedeme herî mazin û ya sereka, ne çareserkirina pirsgirêka kurd têt. ..

Bi vê gotinê re, mirov divêt ku dîroka ku buhurtî ya 80 salên dawiyê, divêt ku mirov lê bikolê û wê fahm bike. Di destpêka sadsale 20´an de, di konfaranse Lozanê de, deme ku statûya herêmê hat kifşkiirn, weke ku bi zanebûn temenê van pirsgirêkên roja me hat avêtin. Bi awayekî wilo hat avêtin ku î ro jî, bi wan pirsgirêkan re em mijul dibin. Ew pirsgirêk, î ro, pirsgirêkên rojhilat yên sereka na. Bi wê re jî, ji her aliyî ve ev pirsgirêkîtî hat salixkirin û î ro, rojhilat wê dîjî. Rewşa ku Î ro, Sûrî hanîya û kirîya wê rewşê de û temenê mudahaleyak li wê afirandîya, divêt ku mirov bi statûya ku di konfaranse Lozanê de hate kifşkirin û hate roja me tê, em di wê de û di zihniyeta wê de lê bigerihin. Pirsgirêka kurd, afirandina wê ya di demên nû de, di konfaranse Lozanê de dest pê dike. Bi wê re, mirov divêt ku bibêje ku ew pirsgirêka kurd ya ku hat afirandin, bi wê Îraq hat avakirin û hat xuruxandin. Sûrî jî, pê hat ava kirin û di deme me de hatîya ber xuruxandinê. Tirkî û Îran jî, di wê astê û rewşê de na. Divêt ku mirov vê yekê her weha bi teybet bibêje û bêne ser ziman.

Kurd, di sadsale 20´an de, pirsgirêka wan li herêmê hat afirandin û î ro, herêmê bi kurdan re di bin wê pirsgirêkê de dimêne. Divêt ku mirov vê tesbitê di serî de bike.

Awayê domandina pirsgirêkê bi ramyarîyê(Siyesetê) dihê li holê, Di serî de, ew ramyarî, awayê yê serdestî û serwerîyê ya. Wek ku di demên piştî konfaranse Lozanê de hat kifşkirin, bi afirandina têgihiştinna netewî bi awayekî projeyî û li gor wê afirandina netewekê bû. Î ro jî, ev yek berdewam dike. Di temenê ramyarîyaka serdestiyê de ev yek berdewam dike. Civaknasî û dîroka herêmê bi pêşketina wê re ti carî ne hata ser ziman û hasibandin. Tûna hat hasibandin. Bi wê tûn hasibandinê re, hewl hat dayin ku rojhilat were şekilkirin. Bi wê şekilkirinê re, î ro, rojhilat, temenê pirsgirêkên dîrokî ya. Qada pirsgirêkên mazin ku temen û derfetan mudahaleyên pirr mazin lê di afirêne. Rojhilat, bi vê yekê re, î ro, dîroka wê windakirina wê ya di wê de dihê nivîsandin bi mudahaleyên ku lê dibin re.

Pirsgirêka Sûrî, di zana min de, hê jî, wilo zêde ji aliyê rêveberîyên herêmê yekî ve jî baş û qanc ne hatîya fahm kirin. Heman pirsgirêk, hin bi hin li Îranê jî derdikeve li pêş. Li tirkî jî, bi zihniyetê re nahaka derdikeve li pêş. Lê wilo zêde ew nayê ser ziman. Îran bixwe jî, hê ev pirsgirêktiya ku Sûrî î ro dijî, wê ew jî bijî. Îran, çend ku bahse olî bike û olê weke bîrdozîyê ji xwe re bêne ser ziman jî, di aslê xwe de di temen û cewherê wê de netewperestiyaka persî di hundirê wê olîtîya xwe de dijî. Ya ku î ro, wê bi kurdan re dide şer kirin jî ev yek bixwe ya. Li Sûrî, Pirsgirêka Sûrî, bi awayekî dîplomatikî bê û bi awayê şer bê, ku bi kîjan awayê bê, wê mudahale lê bibe. Hin bi hin temenê wê mudahalayê jî di afirêne. Sadamê ku bi wê zihniyetê helepçe bi kurdan re da jîn kirin û temenê mudahaleya li xwe afirand û piştre mudahaleya lê bû, Î ro, bi awayekî dî yê ku li gor demê hatiya dîzaynkirin, Hafiz el Esad dijî. Rewşa tirkî, ya ku î ro ew têde ya, ji ya wan ne xirabtira. Tirkî bi şerê bi kurdan re, di vê demê de di rojevê de ya. Çendî ku hevalbendên wê yên rojavayî jî, wê şerê wê yê bi kurdan re di çapameniya xwe de nekirina rojevê de jî, di nav xwe de di pişt derîya de nîqaşna pirr bi hararetî dikin.

Tirkîya ku bahse demokrasiyê dike, ji têgihiştina demokrasiyê ne xwediyê piçekî jî ya.Piçek jî demokrasî, pê re nîn a. Kurdên ku ji wan re bûna piştgir ku karibin xwe li

Anatoliya bigirin û li herêmê bijîn, î ro, di bin bombabaranên wan de na. Gelo, ma dîrok wê vê nankorîyê ji bîr bike? Ev jî, wê dem şanî me bide. Ku mirov bi dîrokê li pirsgirêkê binerê û bi wê re di derbarê pirsgirêkê de bibe xwediyê zanebûnekê, mirov hingî hê baştir, pirsgirêkê fahm dike û karê bixwêne.

Rojhilat, î ro, pirsgirêka wê ya herî mazin ya mazin, pirsgirêka kurd a. Pirsgirêka kurd, divêt lê were çareserkirin hate ku ew jî nava xwe de bigihijê aramiyê. Statûqûya herêmê ya ku î ro, weke barekî giran li ser pişta tirkî, Îran û Sûrîya jî, di wê de bi isrerkirinê re î ro şerên ku bi kurdan re dikin, ji yên piştî şerê Çardiranê û bi vir ve û hate roja me ku bi kurdan re hatina kirin û berdewama wê na. Di xate wan şeran de ev şerên roja me jî tên kirin. Şerê bi kurdan re, di temenê wê de pirsgirêka kurd heya. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibîr bike ku hate ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê aramî li herêmê jî nebe. Rojhilat, di aslê xwe de, temenê pêşketinaka mazin ya dîrokê têde heya. Lê divêt ku ew dîtin û baş û qanc were xwandin. Ya ku Îro, nayê kirin ev yek a.Kurdistan, di navenda rojhilat dijî. Mirov karê bibêje ku weke dilê wê ya. Kî ku çi bibêje bila bibêje, lê em karin bibêjin weke paytaxta wê ya. Di serî de mirov divêt ku vê yekê rast û di cih de bibîne. Rojhilat, dîroka wê ya hemdem tê ser ziman ya sadsale me, ji destpêka sadsalê hat windakirin. Rêveberîyên ku êdî wê windakirinê bidina berdewam kirin li herêmê hatina avakirin. Î ro jî, Ew windakirin tê jîn kirin. Pêşketin, gotinaka dîtbar a. Di têgihiştinê de dîtina pêşketinê, mirov nikarê tenê di çend awahiyên bilind ku di rex hevdû de hatina rûniştandin de bibîne. Di zihniyetê de ya.

Li rojhilat, pirsgirêka herî mazin di zihniyetê de ya. Di aslê xwe de, Rêveberîyên herêmî yên ku dibêjin ´em musulman in´ jî, ku bi rastî wê zihniyeta musulmantiyê esas hildin, divîyabû ku î ro, ew pirsgirêkên tên jîn kirin, ne hatan jîn kirin. Di vir de jî, mirov baş û qanc fahm dike ku ne di wê xatê de na. Di wê xatê de jî nameşin. Pirsgirêka kurdistanê, li rojhilat, ku mirov bibêje pirsgirêka rojhilat a, wê ne xelat bê. Li rojhilat, welatên ku hatina avakirin, qatek(perçeyek) pirsgirêkeka wan ya pirsgirêka kurd hatîya afirandin. Bi vê yekê re, bi zihniyetê re mirov karê bibêje ku pirsgirêka kurd, pirsgirêka rojhilat a jî. Di aslê xwe de, çareserkirina pirsgirêka kurd, wê li rohilat, xate pêşketinê lê derxe li holê. Welatên li rojhilat yên ku muhatabên pirsgirêka kurdin, hê jî, ne gihiştina wê xîretê û ne hatina wê astê ku navê pirsgirêka kurd lê bikin û çareserîyê jê re bibînin. Çareseriyên ku em î ro ji bo pirsgirêka kurd niqaş dikin jî, hemû jî, çareserîyên ku kurdan bixwe danîna li holê na. Divêt ku mirov, vê yekê jî li ser navê wan bi rûmet bibêje. Pirsgirêka kurd, hemû jî, yek a. Çendî ku li qatekî kurdistanê pirsgirêk were çareserkirin (weke ku li Îraqê bû û başûrê kurdistanê gihişt hinek statûya xwe) jî, wê dîsa, ew çareserkirin, weke ku ne hatî çareserkirin wê were li holê Pirsgirêkên ku Başûrê kurdistanê î ro bi bombabaranên Îran û Tirkî dijî, tenê minaq û birhan a ji vê re.Çendî ku başûrê kurdistanê gihiştiya statûya xwe û wilo tê hasibandin jî, hate ku herêmên din yên kurdan ne gihijina statûya xwe, wê ti carî, ew çareserîya başûrê kurdistanê nebe çareserî.

Li Kurdistanê, Başûrê kurdistanê bi nîvî jî bê, î ro, xwediyê statûyekê ya. Li Bakûrê kurdistanê tekoşîna kurdan ya ji bo statûya xwe bi tirkî berdewam dike. Li wir jî, li bakûrê kurdistanê, kurdan, xweserîya xwe li kurdistanê denezand. Herêma kurdistanê ya

başûrrojavayê kurdistanê jî gihiştîya wê astê û bûya xwediyê wê potansîyalê. Lê başûrrojavayê kurdistanê, xweserîya xwe denezandîya. Başûrrojavayê kurdistanê, divêt ku di vê demê de xweserîya pêşbixe, dana ku di vê deme ji nû ve afirandina sûrî de rengê statûya wan bi yê hebûna wan were li holê û were dîtin.

- Di vê demê de, hem kurdistan û hem jî herêm di pêvajoyaka pirr giring de di buhurê. Li herêmê, ev sadsal in ku statûya kurdistaniyan ji wan hatiya standin û kurdistanî jî tekoşîan wan didin. Di vê deme ku em têde na, ev tekoşîna statûtiyê gihiştîya ast û radaya xwe ya din ya nû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku demeka nû dest pê kiriya. Newroza 2012´an, ji wê destpêkê re, bûya destpêkaka herîmazin ya bi demê re. Li kurdistanê, bi teybetî li bakûrê kurdistanê ku di nav sînorê tirkiye de ya, kurd, bi tavahî li ser lingan in û azadiya xwe dixwezin. Dirişma wan "yan azadî û yan azadî" ya. Bi vê dirişmê jî, kurd, çûna newroza 2012´an. Newroza xwe kirin û demeka nû bi xwe re dana dest pê kirin. Di vê demê de, bi awayekî vekirî, du tişt bi teybetî derketina li holê û hatina dîtin. Yek ji wan tiştan ew a ku tekoşîna wan kurdan ya ji bo statûya wan a. Ya din jî, ew a ku ew tekoşîna dewletên weke tirkiye ku li dijî wê bidestxistina statûya kurdan a. Di vê demê de, ev yek, bi awayekî pirr vekirî û rehet hat dîtin. Di vê demê de, divêt ku mirov demê pirr baş û qanc bixwêne. Dem, xwandina wê, bi teybetî divêt ku mirov bibêje ku di serî de di van herdû xalan de ya.

Î ro, li Herêmê, bi teybetî, ku mirov ji kîjan aliyê binerêm mirov wê tevlîhevî û şerê ku ji bo desthilatdarî û serdestiyê tên dayin dibîne. Di nav wanqas şer û tevlîheviyan de kurd jî, tekoşîna azadîya xwe didin. Li dijî vê xalê, bi teybetî, dewletên weke tirkî di sekin in. Weke mijaraka ku emê li xwerê bi teybetî li ser bisekin in, em li vir, bi gotinekê jî dest lê bidin. bahse mudahale ya li Sûrî dihê kirin. Mudahaleya li Sûrî, li herêmê wê bi xwe re pirr tevlîhevî û rastkirinên nû hem naqşaya siyesete wê de û hem jî ya ardnigariya wê de bixwe re bêne. Ji ber vê yekê, welatên herêmê giringiyê didina sûrî û ketina wê de. Tirkiye, ew "herême tampon" ya ku bahse wê dike jî, bi teybetî li Sînorê kurdistanê ya û ji wê derbas nabê. Ji ber ku Tirkî, naxwezê ku kurd li herêmê bigihijina ti mafê ji bo xwe. Ketina nava hêzên ku dixwezin mudahaleyê sûrî bikin ya tirkiye jî, bi teybetî bi kurdan ve girêdayî ya. Tirkiye, bi awayekî pirr bi hişk, li dijî bidestxistina statûyaka ku kurd wê bidest bixin a. Hemû girtinên ku di vê demê di navê "dozên KCK" de jî, ku li bakûrê kurdistanê dibin, aliyekî wan bi politikayên dewletê yên li ser Sûrî re jî hene. Divêt ku mirov wan girtinan yekê jî ji wê politikaya wê ya li ser Sûrî cuda ne hizirê û neyêne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku weke demeke ku ji aliyê hêzên weke Emarika û welatên rojava re ku ji Tirkiye re hatiya nîşandin ku di vê demê de li dijî kurdan oparasyonên xwe yên leşkerî, siyasî û hewayî bike jî heya. Ji ber ku hasab hatiya kirin ku bi awayê diplomasiyê bê û an jî bi yê leşkerî bê û an jî ku her awa di nav hevdû de bihên bikarhanîn û hwd, politikayên li dijî Sûrî û rojhilat xata wan hatiya kifşkirin. Di wê kifşkirinê de, tirkî, bi teybetî, li ser wê disekin ê ku kurd digihijina ti mafê xwe di vê demê de. Bi vê yekê re, ew bi awayekî bi şitt dihê bi ser kurdan de. Temenê rêxistini û rêveberîya wan ya ku ew bidestê xwe ku êdî xwe bi rê ve bibin, dike ku ji holê rakê. hemû girtinên wê ji bo vê yekê na.

Di deme ku Emarika destûrnemaya ji bo mudahaleya li Sûrî hanî berî neteweyên yekbûyî, hingî Rûsya û Çîn li dijî wê rabûn. Lê ew li dijî wê rabûna wan, ti mudahale di wê politikaya mudahale kirinê de neda çêkirin. Xata ku berî wê demê hatibû kifşkirin, bi hin guharinna ji ber wê li ber sekinîna Rûsya û Çînê ku têde bûna re di rêya xwe de

dimeşê. Bi vê yekê re, mirov nikarê bibêje ku têde ti guharin bûna. Weke ku mudalale hinekî li demê hatiya belavkirin. Bi wê yekê re, ew deme ku têde hatiya belavkirin, tirki, wê demê bi çûna bi serkurdan de bi kar dihêne û dike ku ji hemû aliyan ve wan bêhêz bike ku di vê demê de nikaribin li ser navê xwe ti gotinê bidina gotin û an jî ew bixwe bibêjin.

Di demê de Kurdistan û kurd, di temen û navika mudahelyê de disekin in. Politikaya tirkiye ew a ku mudahaleyek bibe û ew li pêş bê, û ew herêmên ku ew li gor xwe kifş dike û bahse wan dike weke "herêma tampon" û hwd, ku bi tememî başûr rojavayê kurdistanê digirê nava xwe, li wê herêmê xwe di deme mudahaleyê xwe de bicih bike û herê bi ser kurdan de û rêveberîya wan û temenê wê xweserîtîya wan ji holê rakê. Hasabê tirkiyê li ser vê yekê ya. Li başûr rojavayê kurdistanê, bi teybetî, ew di xwezê ku di deme wê mudahaleyê de temenê wan yê rêveberîya wan ji holê rakê. Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku mudahaleyeka leşkerî li Sûrî bibe û weke ku Tirkiye dibêje ku li başûr rojavayê kurdistanê ku di nav de na, ku li wê herêmê herêmê bike dest de ku ji bo ku bikeviyê de, wê ji kirinên ku rêveberîya baas ku î ro dike bêhtirî wê ew li başûr rojavayê kurdistanê bi kuştin û qatilkirina kurdan re bike. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje ku hin hasabên wê yên bi vî rengî hene.

Pêşketina ku başûr rojavayê kurdistanê di nava xwe de çêkiriya, ne bi komkujiyên bi wî rengî bê, wê ji holê ne rabê. Tişta ku rêveberîya Îraqê di salên 1970´î de li başûrê kurdistanê ji bo ku xweserîya wan ji holê di wê demê de kir, wê tirkiye di deme ketina Sûrî de li başûr rojavayê kurdistanê bike. Hemû girtinên li bakûrê kurdistanê ku di bin navê "dozên KCK" de tên girtin jî, bi armanca temenekî bi vî rengî dana çêkirin a. Di deme ku ew wan kirinên xwe yên di deme mudaheleyê de li beşa kurdistanê ya di nav sînorê Sûrî de ya ku li wir bike, dike ku temenê wê jî ji hin aliyna ve bide amede kirin. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku hin politikayên komkujiyê dihên hizirkirin. Di deme ketina tirkiye ya Sûrî de, êdî wê şerê wê yê bi kurdian re wê ji sînorê bakûrê kurdistanê derbas bibe û wê bi gelemperî beşên kurdistanê yên din jî bike nava xwe de. Di aslê xwe de tirkî, di vê demê de, hemû danûstandinên wê yên bi Emarika ku di çerçovaya van poltikayên xwe yên bi vî rengî de dike de, divêt ku mirov bibêje ku danûstandinên kirina hin komkujiyna ya.

Li Kurdistanê, di vê demê de, bi girseyê bi newroza 2012´an re rabûnaka li ser pîyan bûya. Di deme ku newroz bû de ji ber çi dewletê qadaxa danî ser newrozê û nexwest ku kurd bi dilê xwe newrozê pîroz bikin di aramiyê de? Ji ber van politikayên wê bû. Di vê demê de, di navenda politikayên wê de bi teybetî, mudahaleya li Sûrî û ketina wê ya başûr rojavayê kurdistanê heya. Dixwezê ku temenê vê yekê bide afirandin. Lê ew dizanê ku rêxistiniya kurdan ku hebe wê ev yek zor bê. Ji ber vê yekê, bi teybetî dihê bi ser rêxistiniya kurdan de. Dixwezê ku rêxistiniya wan ji holê rakê. Di vir de, bi teybetî, ez karim bêjim ku çûna bi ser bakûrê kurdistanê ya tirki di wê demê de û bi hezaran rêveber, siyesetmeder û rewşenbîrên kurd girtina wan, tevî ku têkiliya wê bi statûya kurdan ya ku wan temenê li bakûrê kurdistanê afirandiya re heya jî, divêt ku mirov ji aliyekê dîn ve bi pêşketin li Sûrî û politikayên wê yên li ser Sûrî ve jî girêdayî hilde li dest û bêne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku dewleta tirk, di temenê wan herîşên wê yên li kurdan, ev alî jî hene. Bi teybetî, rojavaka tirkiye ya pirr veşartî ku dixwezê bi rê ve bibe li ser kurdan heya.

Li herêmê, di vê demê de, ji kîjan aliyê ve mudahale bibe, ku ji aliyê leşkerî ve jî bê

û ji aliyê dîplomatik ve jî bê, bi teybetî hem li bakûrê kurdistanê û hem li başûr rojavayê kurdistanê amedekariyên xwe yên pirr bicidî bikin. Di vê demê de, wê çûnaka dewletê ya bi gelemperî ya bi ser kurdan de wê bibe. Bi teybetî, ku mudaheleya leşkerî li Sûrî bibe, ku mirov ji kîjan aliyî ve lê binerê, ku tirkî di nav de bê, wê bi destê wê bi hezaran kurd werina qatilkirin. Temenê vê yekê, diafirênin. Dewleta tirki, artişa xwe jî ji bo vê yekê dide amedekirin. Bi vê yekê de, li bakûrê kurdistanê, bi teybetî teşkîlata xwe ya polîsan xort dike ku di deme mudaheleya li Sûrî de artişa wê li Sûrî li başûr rojavayê kurdistanê li kar bê û ew teşkîlat jî li bakûrê kurdistanê bi bandûr bê. Bi vê yekê jî, hin hasabên weke ku hene.

Emarika di vê demê de hem ji bo cihana ereb bê û hem jî ji bo Îranê bê, wê bixwezê ku Tirkî di nav mudaheleyak bi vî rengî de bê. Weke ku li Îraqê bû, wê nexwezê ku bike. Li Îraqê, Î ro Emarika bixwe jî dizanê ku ew bombayên ku têde tên taqandin bi destê Îran û Tirki jî na. Ji ber vê yekê, di vê demê de, ew naxwezê ku di wê deme Sûrî de, weke ku Li Îraqê bû, bombayên bi destê tirki û hin hêzên din yên ku wê bi rêxistin kirina bên taqandin. Bi vê yekê re, bi teybetî, li ser vê deme Mudahaleyê dihê sekinandin. Gotina Baraq Obama ya ku wî got "Mudahaleya li Sûrî ji ya li Libya tevlîhevtira", di aslê xwe de hinekî jî divêt ku mirov ji vê aliyê ve jî bixwêne. Ji ber ku ew bixwe jî, dizanîn ku bi destê tirki jî li wir bomba tên taqandin. Hemû jiber çi di bin. Tirki derde wê kurd in. Îran, derde wê, ewlakariya wê û serwerîya wê ya li herêmê ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov têgihiştina di temenê wan bombayên li Îraqê ku heta roja me jî ditaqin fahm bike.

Li Kurdistanê, rewş, î ro, ne weke rewşa salên 1923´an û hwd. Di vê demê de, ji kîjan aliyê ve ku mirov lê binerê, wê rewş cudatir bê. Tirki, bi teybetî, bi kirinên xwe yên di demên dawiyê de tekiliya xwe ya bi kurdan re qatandîya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov vê demê, weke wê deme ku wê deme salên 1923´an ne hasibêne. Lê xatariyên vê demê de pirr jî hene. Divêt ku mirov vê yekê jî bi teybetî bibêje. Di vê demê de, ku mirov ji kîjan aliyê ve dinerê, mirov dibîne ku kurd gihiştina têgihiştina demî û zîhniyetê. Di aslê xwe de, bi vê yekê re, hinekî telûkeyek ji bo kurdan diafirêne. Dewlet, ji bo ku wê zihniyet û têgihiştinê ji holê rakê û ji rayê wê qût bike, wê qatilkirina bi hezaran weke ku di deme komkujiya li Dersimê de kir jî, wê bide berçavên xwe. Di vê demê de, ya ku dewlet, bi teybetî, weke bazariya wê bi hêzên rojava û Emarika re dike jî ev a.

Ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê, mirov wê bibîne û fahm bike, ku ev dem, weke ku me li jor hanî ser ziman, di temen û qarakterê statûtûyê de dimeşêt. Di vê demê de, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku kurdan bi pêşketina di nava xwe de nêvî bi nêvî statûya xwe afirandiya. Dewlet, di vê demê de, hemû hêrîşên wê li vê yekê na. Hemû hêrîşên wê, li statûtiya kurdan in. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ew gotinên ku di deme ku T. Ardogan çûbû Emarika û bahse tekoşîna bi kurdan re ku got ku "**wê hê ser 7 salên din re bidomê",** divêt ku mirov vala şîrove nekê. Ev hijmara 7, weke kredîyeka ku ji bo tekoşîna bi kurdan re ku tirki ji emarika standibû bû. Î ro jî, ew kredî, tê bikarhanîn ji aliyê tirkî ve. Çendî ku î ro, şaradar, parlamanter, rêveber, rewşenbîr û hwd, hatina girtin û nahaka di zindanan de na, deng ji ti navendî cidî ên rojava û emarika nayêt. Ji ber çî ...? Ji ber ku ew kredî jê re hatiya naskirin.

Tirki, vê demê, bi tememî bi tekoşîna bi kurdan re di buhurêne. Têgihiştina tirki, ya ku wê bi rê ve dibêt, weke ya leşkerekî ya. Ew têgihiştin jê ev a, heta ku ez karim hikim

bikim û bikim bindest de ezê bikim, lê ku êdî min nikaribû, ezê êdî vekişihim ji herêmê". Bi vê yekê re, têgihiştinaka bi hev re jînbûnê bi wê re nîn a. Kurd, di her qadê de bahse jîyanaka bi her dikin. Bahse, pêşarojaka hevpar li herêmê dikin. Lê dewlet, vê yekê, naxwezê. Dewlet, ku î ro pirsgirêka kurd di nava xwe de di temenê xweserîtîyê de çareser bike, bi vê zihniyeta wê ya ku î ro heya, wê ew çareserî jî, tenê bê çareserîyaka ku di bindest hiştin û jînkirina herême kurdan bê. Ji wê pê de, wê ne buhurê li pêş.

Bi vê yekê re, dewlet, ti statûyê ji bo kurdan ne hizirê. Li her derî, pêşketina kurdan hebe, ew dixwezê ku herê wir û mudahaleyê wê bike. MInaq, çend ku Beşa kurdistanê ya di nav sînorê Sûrî de, ne di nav sînorê wê de jî ya, dîsan ew dixwezê ku ji sînorê xwe derbas bike û herê û bi wan kurdan re jî bikeve şer de. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku zihniyetaka dewleta tirk ya li dijî kurdan heya. Tirki, di nava xwe de, ji bo kurdan ti tiştî na hizirê. Ew naxwezê ku kurd, bigihijina ti statûyê. Bi vê yekê re dihê bi ser kurdan de. Piştî 14 nîsane 2009´an de kurdan di salek berê xweserîya denezand. Ji vê demê û pê de, hêrîşên dewletê bi şitt li dijî kurdan didom in. Tirkî, dixwezê ku kurdan di rewşa bêstatûtiyê de bihêle û bi demê re bide halandin. Bi vê yekê re, êdî navê wan jî li dîrokê nebe.

Beşa kurdistanê ya başûr rojavayê kurdistanê, gihiştiya astaka statûya xwe li herêmê. Î ro, li herêmê, ez karim bêjim ku êdî rêveberîyaka xweser a. Lê hê pirr kêmasiyên wê hene. Kurdên başûr rojavayê kurdistanê divêt ku di du xalan de ewlakariya xwe hildin. Aliyê pêşî, ew a ku divêt ku êdî rêveberîya giştî ya herêmê ava bikin û meclîsa herêma başûr rojavayê kurdistanê ava bikin û têde wezirên xwe yên rêveberiyê bidina avakirin. Pergalîya xwe ya perwerdehîyê divêt ku ava bikin. Û divêt ku ji aliyê ewlakariyê ve tedbîrên xwe di vê demê de bide girtin. Ji bo her rewşa ku bibe, divêt ku amede bibe. Li herêmê, heta ku statûya kurdan bi navê wan newê naskirin, hertimî xatareyên komkujiyên girseyên yên ku ew bijîn heya. Ji ber vê yekê, divêt ku van aliyan bi teybetî, êdî kurd li ser bihizir in. Başûr rojavayê kurdistanê, gihiştiya xwe xweserîya xwe, Lê hê pirr kêmesiyên wê yên ji aliyê rêveberî ve hene. Bi teybetî, divêt ku temenê xweserîya xwe bi rêxistiniya xwe re bide çêkirin. Ya ku wê temenê ewlakariya wê bide afirandin jî ev a. Ku kurd, yekbin û bi rêxistin bin, di deme ku hêrîş li wan bibin ku çendî windahiyan jî bidin, wê dîsan bi hêz li ser lingan bimên in. Ji ber vê yekê yekîtî, dayika serxwebûnê ya.

Tirki, hemû politkayên wê yên li ser Sûrî, di navende wan de kurd û gihiştina statûya wan heya. Tirki, bi politikayên xwe yên li ser Sûrî re, weke ku li bakûrê kurdistanê li ser bêstatû hiştina kurdan bi kurdan re têdikşê, her weha bi heman awayê li Sûrî, li ser bêstatû hiştina kurdan têdikoşê. Ji ber vê yekê, ez karim bêjim ku di mudahaleyekê de ketina Tirki ya li Sûrî bi hêzên ku wê mudahale bikin re, wê were wate qatilkirina bi hezaran kurdan. Di wê demê de, wê politikayên xwe yên li bakûrê kurdistanê jî, hildê wê asta komkujiyên fizikî ji bo ku dengê kurdan bi birrê. Di wê demê de, wê ji bo herêma kurdistanê ya di nav sînorê Sûrî de jî û ji bo herême kurdistanê ya bakûr ya di nav sînorê tirki de jî, wê şerekî giştî yê kurd û rêveberîya tirk bikeve rojevê de. Tirki, wê hemû teknîk û hêza xwe bikar bêne. Di vê demê de, wê qatilkirina bi hezara mirovan wê bibe. Ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, mirov karê bibêje ku di deme mudahaleyekê de ketina tirki ya Sûrî de, wê felekateke mazin bi xwe re bi teybetî ji bo kurdan û piştre ji bo xalkên din ên herêmê bêne. Ji ber vê yekê, di serî de, em hêvî dikin ku di deme mudahaleyekê de, wê destûr newê dayin ji tirki re ku ew bikeve Sûrî de. Di

vê demê de, bi teybetî, bi gotinên "wargahên ji bo ku mirovên ku ravîna û hatina têna ava kirin" û hwd re temenê, hin mudahaleyên dihê afirandin.

Di aslê xwe de, mudahaleyeka li Sûrî, wê bandûra wê li siyeseta Rûsya jî û ya Îranê jî û li welatên din ên herêmê jî wê bibe. Li herêmê, di serî de wê êdî bandûra wan û siyeseta wan kêm bibe. Hêzên ku li rojhilat, bi teybetî li sê herêman serdest bin wê bandûra wan li hemû asyê hebe. Ji aliyê avê ve ki ji ber arabîstanê heta ku digihijê ber Hindîstanê li ser avê sehêtkirin û bi wê re ji kurdistanê heta ku digihijê wir û Sûrî û hwd, ku serdest hebe, wê bandûra Rûsya jî kêm bike wê nêvî bi nêvî Îranê jî bike bi sehêtê de. Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku li herêmê, ew tekpşîna serdestiyê ya ku tê dayin, bi teybetî, gihiştîya wê astê ku ew êdî karê herêmê bike rewşaka xirab de. Li herêmê, bahse "bihara ereb" heta kirin, lê divêt ku mirov bibêje ku temenê bihara ereb ji serî ji holê hatiya rakirin. Keseyet û hêzên ku cihê van hêzên ku zilmê êdî li gelên herêmê dikin ku bigir in nin in. Hemû jî ji holê hatina rakirin. Ji ber vê yekê, mirov bi teybetî, karê bêje ku rêveberîtîya xalkîtî û gelîtîyê ya herêmê ya ku gelên herêmê bidestê xwe bikin ji holê hatiya rakirin. Ji demokrasiyaka ku li herêmê ku were afirandin, ku di serî de tirki jî di nav de, welatên ku î ro lê serdest in, divêt ku zihniyeta wan were ji holê rakirin û bê avêtin li muzaxaneya dîrokî.

Demokrasî, bi wate wê û gotina wê, di serî de tê wateya rêveberîya gel. Î ro, ya ku li pêşîya derketina rêveberîya gelan li herêmê jî, di serî de, ev welatên ku me bahse wan kiriya ya. Ku bi awayekî rast, gelên herêmê bi serê xwe bên hiştin û ew karibin bîryara xwe di derbarê xwe de û ji bo xwe bidin, wê hingî, herêm di pêşketina xwe re bifirê. Lê heta ku zihniyeta welatên weke tirki lê hebe jî, wê ti carî, ew pêşketina rast lê nebe. Di serî de, ev welat, pirr jî car bi car gotina demokrasiyê di devê xwe de dikina qajik. Lê yên ku herî zêde ne demokratin jî ew bixwe na. Zihniyeta wan ne demokrat a. Di zihniyeta wan de, mirov ne li pêş a. Welatên weke tirki, nirxên olî ên weke Îslamê û hwd û di cewherê wan mirovatî heya, wan bixwe jî, li gor dikin ku şekl bidinê de û bikina bîrdozîyeka şer ku xwe bi wê bi rê ve bibin û bi wê re şer bikin. Bi vê yekê, ez karim bêjim ku hemû nirx û têgihiştin tên bikarhanîn. Lê yekî jî, bi awa û têgihiştina xwe ya rast nayêna bikarhanîn. Li herêmê, di vir de û di vê xalê de, divêt ku mirov pirsgirêka wê ya sereke kifş bike. Li herêmê, pirsgirêka herî pêşî ya zihniyetê ya. Di zihniyetê de, cihê mirov û dîrok û nirxên mirov çî ya? Di serî de, divêt ku mirov li vê bi hizirê. Di çermê, welatên weke tirki û hwd de, di demên berê de, rêveberiyên weke Nemrûd û hwd hatina û çûna.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov li pêvajoyê binerê. Di demê de, bi politikayên weke ên qadaxakirina newrozê ya ji aliyê rêveberîya tirk ve û hwd, di aslê xwe de, dikin temenê hin politikayna xwe yên di demên piştre ên komkujiyê bidina afirandin. Ew qadaxaya newrozê ku tirki li bakûrê kurdistanê xwest ku bike, di aslê xwe de, bi politikayên dewletê ên ku li ew li kurdistanê dimeşêne û ên ku dixwezê ku bike meriyetê ve girêdayî ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ji demên piştre kurd, divêt ku amedekariyên xwe yên mazin bikin. Di serî de, temenê yekitiya xwe biavêjin. Konfaranse xwe ya kurdistanî li dar bixin. Li dijî, van politikayên komkujiyê û jenosîdê, lêbelê û lêbelê karin bi vî rengî bi yektiya ku di nava xwe de çêkin re li ser bisekin in.

..

**Yekbûna kurdan û girîngîya wê ya di vê demê de..**

Di vê dema ku bahse mudahaleyekê li Sûrî têkirin de, giringiya yekitiya kurdan xwe

dide li rû. Di vê demê de, kurd, li ser wan pirr hasab tên kirin. Di serî de, hewldanên bêstatû hiştina wan gihiştina astaka mazin bi Îran Û tirkiyê re. Tirkiye, bi teybetî li ser bêstatû hiştina kurdan re siyesete xwe ya li herêmê dide meşandin û bi rê ve dibêt. Bi teybetî, ew naxwezê ku kurd, bi navê xwe di vê demê de bi ti awayê ku li qada siyesetê û rêveberîyê bisekin in. Mudahaleyên wê yên li ser kurdan û hwd, bi teybetî, hemû jî, li ser temenê ji holê rakirina statûya kurdan a. Di deme mudahaleya li Sûrî de, danûstandinên tirkiyê bi teybetî bi welatên rojava û emarika re pirr dibin. Hemû danûstandinên wê, li ser wê temenê na ku di deme ku mudahale li Sûrî bibe ku bi awayê dîplomatikî bê û an jî bi awayê leşkerî bê, ku bi kîjan awayê bê, kurd, dervî prosesê û statûyê werina hiştin. Ji ber vê yekê, di vê deme ku hê mudahale bi tememî nebûya jî, hewldanên hanîna "hêzên muxalif ên li Sûrî" jî, bi teybetî, dikin ku kurd ji wan û ji nava wan dûr bin. Bi vê yekê re, bi teybetî, li ser kurdan re siyeseteka bêstatû hiştinê tê meşandin.

Tirkiye, di deme ku bahse mudahaleyê tê kirin de, di nava sînorê xwe de li bakûrê kurdistanê wilqas oparasyonên leşkerî û siyesî li dar dixê û dike ku bi wan bi tememî rêxistiniya kurdan lawaz bike û ji holê rakê. Newroza 2012´an ji aliyê tirkiyê ve qadaxakirina wê jî, hinek aliyên wê yên ku bi van politikayên wê ve girêdayî jî hene. Bi teybet, divêt ku mirov wan kifş bike û bêne ser ziman. Hewldanên kurdan ên ku wê hêzê bidina wan û wan bi hêz bikin û hewldanên derve ên ku wê deroniya wan baş bikin, bi teybetî, li dijî wan disekin in. Di vê demê de, bi teybetî, bi vê yekê û awayê re siyeseteka teybet dihê meşandin. Tirkiya, di vê demê de di nava welatên ereb de danûstandinên wê yên ku dibin jî, li ser vê temenê na. dike û dixwezê ku bi teybetî bi hev re bin û li dijî kurdan bin. Di nava siyesete cîhane ereban de jî, dike ku anîyeka ku li dijî kurdan û hildana statûya wan bisekinê, dike û dixwezê ku bide afirandin. Li Îraqê jî, bi teybetî, di nava aşîr û hêzên Sûnnî û ên Sîî de jî, ev hewldanên wê didom in. Hemû pirsgirêkên ku li Îraqê, bi vê yekê û rengê derdikevina di naqabîna kurd û rêveberîya navendî ya îraqê de, hinekî jî bi destê tirkiye dibin û tên çêkirin. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Ji ber du sedeman. Sedeme pêşî ew a ku kurd, hêza wan lawaz bibe û nikaribin ku xwe bi rê ve bibin a. sedeme din jî, ew a ku ji ber wê statûtiya kurdan ku ji aliyê tirkiye û welatên ên ên herêmê ve ku hê bi tememî ne hatiya pejirendin a.

Ku mirov ji vê aliyê re li rewşê û pêvajoyê dinerê, mirov dibîne û fahm dike ku kurd di pêvajoyaka pirr giring de na. Di vê demê de, herî zêde karin bi yekitiyaka ku di nava xwe de çêkirina, karin di pêvajoyê de bi hêza xwe re li ser lingan bisekin in. Bi vê yekê re, bi teybetî, pêşî li wê yekitiya kurdan dihê xwestin ku were girtin. Li bakûrê kurdistanê, wilqasî bi şitt çûna tirkiya bi ser kurdan de, hinekî jî têkiliya wê bi wan hewldanên yekitiya kurdan re jî heya. Bi wê re, bi teybetî, bi afirîna temenê statûya kurdan re ya. Î ro, tirkiye li herêmê, bi teybetî li dijî vê yekê disekin e. Di vê deme ku kurd hemû ji 7 salî heta 70 salî ku bahse konfaranse netewî ya kurd dikin û dixwezin ku pêk were jî, hêzên ku li pêşîya wê sekinî na, bi teybetî û sereke tirkiye heya. Di vê demê de, ji ber vê yekê, bi hêzeka mazin tê bi ser kurdan de. Di vê demê de, di serî de, ku kurd yekitiyê di nava xwe de çêbikin, wê bandûra wê bi teybetî û pêşî wê li herêmê û siyesete wê bibe. Yekitiya kurdan, wê pirsgirêkên herêmê nêvî bi nêvî ji holê rabike. Ji ber ku li herêmê, hemû xalk û gelên sereke ên mazin weke ereb, fars û tirkiye, pirsgirêkên wan yên kurd hene. Hemû jî, pirsgirêkên wan bi kurdan re hatina çêkirin û di roja me de jî, roj bi roj ew temenê pirsgirêktiyê bi siyesetên teybet re dihê domandin.

Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku di serî de, çareseriya pirsgirêka kurd, wê ne tenê bê çareserîya pirsgirêka kurd, bi heman rengê û awayê wê bê çareserîya pirdgirêka kurd ya bi cihane ereb re ku bi Sûrîyê re hatiya afirandin, bi Îranê û tirkiyê re jî. Ji ber ku hê pirsgirêka kurd di van beşên kurdistanê de bi van desthilatiyên din ên herêmê re didomê, êdî pirsgirêka kurd ya li Îraqê, ku weke ku hatiya çareserkirin ya başûrê kurdistanê jî, hê bi pirsgirêkî maya. Hê ji gelek aliyan ve, wê pirsgirêktiya xwe didomêne.

Ji ber vê yekê re, projaya çareserkirina pirsgirêka kurd, ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, wê bê projeya sadsalê ya çareserîyê ya rojhilat bixwe jî. Li herêmê, ev pirsgirêkên wê yên bingihîn, minaq, weke pirsgirêka kurd, hertimî temenê mudahaleyên li herêmê bi teybetî dide afirandin. Li herêmê, aramî pêşnakeve. Bi vê yekê re, di sadsale ku me buhurand de, bi van pirsgirêkan mudahale li rojhilat hatina kirin û pirsgirêk hatina mazin kirin. Di roja me de jî, ew pirsgirêkên ku di wê demê de bi mudahaleyan hatina çêkirin, di vê sadsalê de jî, dibina temenê mudahaleyên nû. Li herêmê, bi vê yekê, mirov karê bibêje ku welatekî ku pirsgirêka wê nîn a nemaya.

Li rojhilat, siyesetên ku î ro dihêne kirin, temenê di temenê desthildatdariyê de na. Hemû hêzên herêmê, bi wê siyesetê weke tirkiyê, Sûrî û Îranê û hwd, şer û tekoşîna xwe bi gelên herêmê ên weke kurdan û hwd re didima meşandin. Di asta bilind de jî, welatên rojava û emarika û hwd jî, li ser wê re li herêmê bi siyesetên serdestiyê re, siyesetê dimeşênin. welatên herêmê, hem bi pirsgirêk dijîn û hem jî, bi siyeseteke ku ti çareseriyê ji wan pirsgirêkan re nayê hanîn re siyeset tê kirin. Bi vê siyesetê û domandina wan pirsgirêkên herêmî re jî, êdî çê rêveberî ku tê ser rêveberî û desthildariyê û hwd jî, di serî de ji navika xwe ve li ser wan pirsgirêkên herêmê re dihê girêdan ji ling û destê xwe ve. Di nava vê siyesete desthildatdariyê de, pirsgirêka kurd, weke ku dihê xwestin ku ew sadsale ku em ketinê de jî, bi wê re were domandin. Ji ber ku ew pirsgirêk, hertimî, weke ku hem bi siyesetê bê û hem bi dîplomatiki bê û hem jî, bi awayên din ên cure bê, temenê mudahaleyekê diafirêne. Li Îraqê, di deme mudahaleye lê de, pirsgirêka kurd ya başûrê kurdistanê ku Îraq mihatabê wê ya, nêvî bi nêvî hat çareserkirin. Ji wê ne buhurî. Kurd, di wê beşa başûrê kurdistanê de gihiştina statûyeka ku hê ji aliyê desthilatiyên herêmê ve bi tememî ne hatiya naskirin jî, diîsan pirsgirêkên ku jê re bi demê re hatina derxistin, başûrê kurdistanê bi wan pirsgirêkên ku jê re hatina derxistin re biqasî beşên din ên kurdistanê ên bakûr û rojhilat û başûr rojava û hwd, bûya pirsgirêk li herêmê. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku kurd, di wê beşê de yanî di beşa başûrê kurdistanê de jî hê pirsgirêka wan bi tememî ne gihiştiya çareserîyê.

Di vê demê de, di deme ku bahse mudahaleyekê li Sûrî dihê kirin de, kurd, ew siyesete ku ew bikin, wê kifşkar bê. Bi nasîna statûya wan, wê herêm, ji pirr aliyan ve ji bûna temenê mudahaleyan xilas bibe. Lê welatên herêmê ên weke tirkiye, bi teybetî li dijî çareserkirina pirsagirêka kurd disekin in. Di proje û çareseriyên wan nîn in ku kurd di wan de weke xalkekî hatibê naskirin û mafên wê lê hatina radestkirin. Hemû politika û siyesetên ku tên kirin, li ser temenê ku wê çawa kurd bêstatû werina hiştin. Di vê deme ku bahse Mudahaleya li Sûrî dihê kirin de, bazariya tirkiyê ya di wê mudahaleyê de bi emarika û hêzên rojava re ew a ku kurd li wir di vê deme mudahaleyê de bêstatû werina hiştin. Bi vê yekê re, siyesetê dike. Ketina wê ya nava wan wan hêzên mudahalekar yên ku wê mudahale li Sûrî bikin de, dike ku bike berdêla bêstatû hiştina kurdan. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku siyeseteke wê ya teybet û qirêt ku li ser

kurdan re bazariyê dike heya.

Li herêmê, bi teybetî, bi dewletên herêmê û desthilatdariyên wan re têgihiştina demî ya bi hev re jiyinê neafiriya. Ew têgihiştina bi hev re jiyinê ya di cewherê misilmantiyê de ku heya jî, ew jî, ji aliyê hemû dewlet û desthilatdariyên misilman ve dihê piştguhkirin. Lê nayê nerin. Di aslê xwe de, bi awayekî rastî tenê ew cewherê îslamê were fahmkirin û li gor wê were meşîn, wê li herêmê î ro pirsgirêkên ku hene, wê nêvî bi nêvî werina çareserkirin. Lê li wê jî nayê nerin. Minaq, tirkiye dibêje ku ew "welatekî misilman a". lê divêt ku ez bibêjim ku ew ti carî li gorî cewherê tevnegerihê. Li herêmê desthildatdariyên herêmî ên misilman, di bin navê misilmantiyê û perdeya wê de, siyesetên netewperest ên etnikî didina meşandin. Îslamê jî, ji wê siyesete xwe re weke maskeyekê bikar dihênin. Di aslê xwe de, ev kirin bi serê xwe jî ji welatên ku ji xwe re dibêjin îslam in jî, weke haqareteke mazin ya li ola lslamiyetê bixwe jî ya.

Siyesetên ku li ser temenê etnîkîtîyê yanî li ser temenê nîjadiyê tên meşandin, bi teybetî, qatbûnê di gelemperîya siyesete rojhilat bi xwe de dana çêkirin. Î ro ku mirov li rojhilat dinerê, mirov di serî de wê qatbûnê bi awayekî pirr vekirî kifş dike û dibîne. Li ser temenê nîjadî û desthilkdariya nêjadî ya netewperestî rêveberî tê rêveberbirin. Siyeset, tê kirin. Li herêmê bi vê yekê re di serî de divêt ku mirov bibêje ku pirsgirêka herî zêda li berçav ya têgihiştin û nêzîkatiyê ya.

Pirsgirêka kurdan li rojhilat, di sadsale 20´an de bi teybetî ji ber van siyesetan derketa li holê û mazin bû. Bi teybetî, di sadsale 20´an de, pirsgirêk, bi awayekî pirr mazin derketa li pêş. Bandûra pirsgirêkê li herêmê û li siyesete wê jî heya. Di vê demê de, di vê deme ku bahse mudahaleyekê li Sûrî dihê kirin de, di aslê xwe de divêt ku mirov bibêje ku divêt ku hemû hêzên rojhilat bi desthilatdariyên xwe ve bi hizir in ku çawa temenê mudahaleyan li herêmê bi siyesetên xwe re diafirênin. Bi vê awayê siyesetê ku di roja me de dihê kirin re, temenê mudahaleyên di demên pêş de jî dihê afirandin. Di demên pêş de, wê li ser çî temenê li rojhilat mudahale werina kirin, ji naha de temenê wê dihê afirandin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî, li ser siyesetên welatên li rojhilat bisekinê.

Li Kurdistanê, di vê demê de, kurd ji hemû aliyan ve li ser lingan in. Doza azadî û mafê xwe dikin. Lê li dijî wê xwestina kurdan ya mafê xwe dihê sekinandin. Nayê xwestin ku kurd bigihina mafê xwe li herêmê. Divêt ku ez bibêjim ku heta ku kurd negihina mafê xwe ne tirk, ne ereb û ne jî fars azad bin.

Pirsgirêkên herêmê, bi syeseteke teybetî ji demekê buhurandina wan ya li demeke din dihê kirin. Çareserî ji wan re nayê dîtin. Nayê xwestin ku were dîtin. Bi vê yekê re divêt ku mirov bibêje ku li ser temenê serdestiyê siyeseteke nemrûdî dihê kirin. Ku ez li siyesetên ku li rojhilat diner im, bi teybetî nemrûd dihê berçavên min. Ya ku vê bi min dide hizirandin siyesetên li rojhilat ku desthilatdariyên wê dikin a. Desthildatdariyên rojhilat, bi teybetî ji hemû aliyan ve mirov û têgihiştina mirov û wijdan ji têgihiştinên xwe dana dûrkirin. Bêwijdanî, ya ku herî zêde ku di vê demê de di siyesetên wan de ya serdest a. Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku çareseriya pirsgirêka kurd, ku bêhamdê desthilatdariyê li rojhilat jî bin, wê hinekî mirovatiyê di têgihiştinên wan de bicih bike. Minaq, li tirkiye siyeset û şîdeta ku dijî kurdan ti meşandin, ji hemû nirxê mirovatiyê, wijdan û ahlaqê dûrketiya. Tenê, ev minaqek a. Weke vê, mirov karê hê bi dehan minaqan bide.

Pirsgirêka kurd, wijdanê hemû kesekên li rojhilat in. Ku kurd jî bin, ku fars jî bin û

ku ereb jî bin, wijdanê hemûyan a. Çareserkirina wê jî, hemi wijdan û hem jî mirovatiya wan raxê li berçav. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî, li ser pirsgirêka kurd bisekin ê. Pirsgirêka kurd, çareserkirina wê, ez karim bêjim ku ji aliyê têgihiştin û hizir ve û ji aliyê pêşketinê ve wê bê hêza rojhilat bixwe. Ya ku di serî de, were dîtin ev a. Î ro em di sadsale 21´ê de dijîn. Tevî ku tenê li bakûrê kurdistanê ku di bin destê desthilatdariyê tirkiyê de ya û di nav sînorê wê de ya, ser 20(bîst milyon) milyonan re kurd dijîn. Lê tenê dibistanaka wan jî nîn a ku têde tenê zaroeykî xwe jî perwerde bikin. Heta vê kêlîkê jî şer û kuştin bûya. BI hezaran kurd hatina qatilkirin û girtin û hatina şandin li zindanan. Ji ber çi ..? ji ber ku ew kurd in û maf û azadiya doz dikin û dixwezin. Şer, tê meşandin. ez divêt ku bibêjim ku ew ancamên ku şerên ku li herêmê hatina derxistin li holê re, wê bi sadsalan pirsgirêk li herêmê bijîn. Wê ti kirin newina ji bîr kirin, her ku hata bibîrxistin jî, wê dijîtiya li dijî hevdû wê derkeve li holê. Şer, pevçûn û mudahaleyên ku li rojhilat bi destê desthildatdariyê rojhilat bin û bidestê hêzên derve ku li rojhilat dikin bê, herêmê bi tememî ji riya wê pêşketinê derxistina. herêmê bi awayekî pirr mazin hatiya xuruxandin. Li ser wê xuruxandinê re, hê sîyesete wê xuruxandinê dihê kirin.

Pirsgirêka kurd, pirsgirêkaka ku bi bi destê hêzên herêmê û yên dervî herêmê ku bi awayekî metingerî hatina herêmê hatiya afirandin. Î ro, bi siyesetên ku tên kirin re, ew pirsgirêkti dihê domandin. Kurd, î ro, li dijî wê tedikoşîn. Dixwezin ku pirsgirêka wan were çareserkirin û ew jî li herêmê bi mirovatiya xwe re pêşketina xwe çê bikin û pêş bikevin. Ya ku nayê xwestin ev bixwe ya. Kurd, hewldanên wan yên weke ên li darxistina konfaranse netewî ya kurd, ji bo ku hêza xwe ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bikina yek û dawiyê li şer û pewvçûnên ku li kurdistanê dihên kirin bên hanîn. Yektiya kurdan, di aslê xwe de, wê ji herêmê re û ji pêşketina herêmê re temenekî mazin ê pêşketinê di pêsarojê de bide afirandin. BI çareserkirina pirsgirêka kurd re, gelek pirsgirêkên ku di bina temenê pevçûnan wê ji holê rabin. Di roja me de, deme ku em dibêjin pirsgirêka kurd, di aslê xwe de divêt ku mirov bibêje ku pirsgirêka mirovî ya îranê jî, tirkiye jî û Sûrî ya jî. Di serî de pirsgirêka kurd, pirsgirêka wan û ya mirovatiya wan a. Ji vî aliyê ve jî divêt ku mirov li pirsgirêkê binerê û wê bêne ser ziman. Bi vê yekê re ez karim bêjim hewldanên tirkiyê yên di vê deme ku tê gotin wê mudahale li Sûrî bibe de ku li ser temenê bêstatû hiştina kurdan dike, tenê hewldanên ji dîrokê birina gelan û ji holê rakirina nirxan a. Bazariya di deme şerê Libya de ku tirkiyê di berdêla piştgirîya xwe de kir, li ser bêstatû hiştina kurdan bû. Î ro jî, di deme mudahaleya li Sûrî de ev dihê kirin. Her gotina ku di derbarê îranê de tê gotin de, tirkiye ku xwe dike nav de, tenê di berdêla wê de, tawîzaka li dijî kurdan dixwezê. Evqas, şer û kuştin û qatilkirinên ku li kurdistanê li ser serê kurdan ku di bin û di çapameniya rojava de bi awayekî cîdî cih nagirê, tenê mirov karê weke berdêlaka piştgirîya siyesete wê ya li dijî Libya û Sûrî ya.

Pirsgirêka kurd, heta roja me domandina wê, bi van piştgiriyên bi vî rengî ên ku tirkiye standina bûya. Ji vê demê û pê de jî, tirkiye dixwezê ku bi vî rengî pirsgirêka kurd bide domandin û piştgiriyê ji hêzên rojava bistêne û bi wê piştgiriyê wê pirsgirêktiya wê bide domandin. Ji ber vê yekê re, du tişt di cewherê siyesete tirkiyê de hene. Yek, bêstatû hiştina kurdan a û ya din jî domandina şerê li dijî kurdan a û standina piştgirîya ji wî şerî re ya. Ji ber vê yekê, hemû hewldanên kurdan ên ku ew dixwezin ku yekbûnekê di nava xwe de çêbikin, dike ku wan vala derxe. Bi teybetî, li ser vê yekê

disekin e. Piştî ku kurdan li başûrê kurdistanê konfaranse cerbên komare Mihabad li darxist û piştre, di cih de tirkiye heyetek şanda başûrê kurdistanê. Di wê konfaranse jî siyesetmederên kurd ên bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê jî têde amede bûn. Konfarans, weke konfaranseka netewî ya kurd bû. Em hêvî dikin ku wê konfaransên bi vî rengî ên ku temenê yektiya kurdan xort dikin zêdetir bibin. Bi vê yekê ve girêdayî, ez bi gotinekê bibêjim ku giringiya yekitiya kurdan, ne tenê ji bo kurdan bi kurdan re ji bo herêmê û pêşaroja wê giştkî heya û giring a. Bi vê yekê re, bi teybetî, divêt ku lê were nerin. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka rojhilat ya herî mazin a. Ti pirsgirêkên wê, ne weke pirsgirêka kurd mazin in. Di aslê wê de, pirsgirêka kurd, pirsgirêkeka ku pêşaroja kurdan û herêmê bi hev re dide kifşkirin a.
..

**Mijara statûya kurdan û rojhilat. ..**

Statûya kurdan, ku mirov ji kîjan aliyê lê binerê, wê naqşaya herêmê guharandinê têde bike. Hem di naqşaya ardnigarî û hem jî ya ya siyesetê de wê guharandinan bi xwe re bêne. Ew guharandin jî, ji bo pêşketina rojhilat pêdivî bi wan re heya. Kurd, li herêmê xwediyê dîrokaka pirr kevn in. Ez karim bêjim kurd, li herêmê gelê herî kevn a. Gelê ku xwediyê dîrokeke herî kevn a. Lê mixabin, di roja me de, rewşa ku ew hatiya û ketiyê, rewşaka pirr xirab a. Bi teybetî ji sadsale 20 û pê de, bêstatûbûna kurdan li ser kurdan bi siyeset û pyemanên ku hatina mohrkirin re li ser kurdan hat farz kirin. Bi teybetî, Ku mirov bi rêzê hildê li dest, ji Peymana, Siykes-pikot û heta ya sevrê û ji ya sewrê heta ya Lozanê û ji ya Lozanê heta ya Sadabadê û ji wê heta yên Baxdadê û cezayirê û hwd, bi teybetî, hertimî peymanên ku hatina mohrkirin, bi awayekî dijîtîya wan ya li dijî kurdan derketiya li holê. Di roja me de jî, peymanên ku hatina mohrkirin hene. Di wan de jî, bi teybetî, dijîtîya li dijî kurdan û statûtiya derketiya li pêş. Di hemû peymanên ku tirki, Îran û Sûrî mohrkirin hem di nav xwe de û hem jî bi welatên rojava û hwd re, li herêmê li ser temenê tûnebûn û tûnekirina kurdan hatina çêkirin. Î ro, li ser vê temenê siyeset dihê kirin. Li kurdistanê, kurd, ji aliyê kurditiya wan ve ti maf û azadiya wan tûneya. Hemû mafê wan ên civatî ji destê wan hatina girtin.

Li ser wê hildana mafê wan ya ji destê wan re, î ro, hem welatên herêmê û hem jî yên ku têne herêmê û siyesete serdestiyê dikin û dimeşênin, li ser wê temenê û tûnebûna kurdan siyesetê dikin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku kurd, di her demê de rastî nehaqî û dij-mirovatiyê hatina. Ev nehaqî û dij-mirovatîtî, heta roja me jî didomê. Ev şerê ku î ro bi kurdan re dihên kirin ji aliyê Tirkiye, Îran û Sûrî ve, li ser temenê tûnekirina kurdan ava na. Bi vê yekê re, ez divêt ku bibêjim ku bi teybetî ku çendî heta roja me di nav welatên herêmê ên ku pirsgirêka wan ya kurd hebûya, pirsgirêk çêbûna jî, ku mijar hatiya ser kurdan, bi teybetî sînorê xwe derbas nekirina û tifaq di nava xwe tevî ku ew pirsgirêkên di nava wan de hene jî çêkirina. Di roja me de jî, dikin û dixwezin ku bi heman awayê tevbigerihin.

Li herêmê, bi teybetî, dihê xwestin ku dij-kurdîtî were kûrkirin û bê domandin. Bi wê dij-kurditiyê re, êdî tafisandinê li ser serê kurdan bidina kirin. Minaq, li Îranê, di deme Humeynî de, fetwa serê kurdan hatiya dayin. Kî ji min re karê bibêje ku cihê wê di ola îslamê de heya? Îslam, hertimî, dana fetwe serê xalkan şermazarkiriya. Bi vê yekê re, mirov çawa karê bêje ku Îranê, di vê yekê de dij-olîtî nekiriya? Di aslê xwe de, Îran jî û Tirki jî li dijî peyamên xwûdê bixwe jî rabûna. Minaq, xwûdê dibêje ku "min, we weke xalkan jevcuda afirand". Ev weke hadisekê jî ya. Lê Î ro, bi teybetî, hev herdû

welat, zimanê gelan qadaxakirin û fetwe serê gelan didin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku dijî wê hadîsa li ser navê xwûdê rabûna wan bûya û înkare wê hatiya kirin.

Şerê ku ji bo ku kurd bêstatû werina hiştin, di roja me de hê bêhtirî û maztirî didomê. Ev şerê ku di vê demê de bi kurdan re dihên kirin, hemû jî, şerên ku bi armanca bêstatû hiştina kurdan tên kirin in. Ew şerê, hemû jî, di deme ku bahse mudahaleya li Sûrî dihê kirin de, hem li Tirki û hem jî Li îran û Hem jî li Sûrî bi kurdan re zêdetir bûya. Di vê demê de welatê herêmê ê ku herî zêde navê wê bi şerê bi kurdan re ku derketiya li pêş tirkiya ya. Tirki, hem di nava xwe de wê şerê bi kurdan re dike û hem jî dervî xwe wî şerê li dijî-kurdan dimeşenêt. Ji ber çi tirkiye bi Isrer dixwezê ku di mudahaleya Sûrî de cih bigirê? Ji ber ku ew hizir dike ku di deme ku ket Sûrî de ew bi teybetî herê û bikeve herême kurdan de û li wir temenê xweserîya kurdan û rêveberîya wan ji holê rakê. Ji bo ku di deme nû de kurd li Sûrî nebina xwediyê ti maf û azadiyê û statûyê, tirkiya di hewldanaka bi vî rengî de ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku bi gotinên mudahaleya li Sûrî re tirki, temenê şerekê mazin ê bi kurdan re jî dike. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Ji ber ku di deme ku ew kete Sûrî û bi teybetî hat û keta başûr rojavayê kurdistanê, wê li hemû perçeyan kurdan bi wê re bikevina tekoşînê de. Bi teybetî jî, li bakûrê kurdistanê wê ew tekoşîn bibe. Hemû girtinên di bin navê "girtiyên doza KCK" de ku tên girtin, ji bo rêxistiniya kurda jev bi felişênê ya. Bi teybetî, armanca di temenê wê jev felişandina rêxistiniya kurdan, hinekî weke amedekariyaka di vê deme şerê bi kurdan re ya.

Herkesek, di zanê di deme ku mudahale li Sûrî bû, wê dewlet, qatilkirina bi hezaran kurdn weke ku di deme komkujiya dersimê de kir, wê bike. Aliyekî danûstandinên dewleta tirki ên bi welatên rojava û emarika re ku di bin di vê demê de, hinekî jî li ser van xalan in. Ku komkujiyên mazin bibin û ew di çapemeniyê xwe de ti bertek û reaksyonên mazin nedina nîşandin. Bi vê yekê re, weke ku amedekariyaka mazin di vê demê bi vî rengî dihê kirin. Ji bo ku kurd, di vê demê de di deme mudahaleyê de nedigihina statûya xwe tişta ku ji destê tirkiya tê ew dikêt. Hemû dîplomasî û hewldanên wê, bi vê yekê, li ser temenê dîj-statûya kurdan dimeşêt. Tirkiye, di çapemeniya xwe de, gotinên weke ên "çêkirina herêmên tampon" dike rojavê de. Hinekî jî, divêt ku mirov, van gotinan bi kurdan û komkujiyên ku ew bike re bêne ser ziman û fahm bike. Ku tirkiye bikeve Sûrî de, wê li wir li ser serê kurdan qatliamên mazin bike. Di serî de divêt ku mirov bibêje. Tirkiye, gotinên wê yên ku ew bi kardihêne ên weke "herêmên tampon" û hwd, li ser wan jî, bi emarika danûstandinê li ser wê dike. Tirkiye, dixwezê ku tenê ew herême tampon, tenê, başûr rojavayê kurdistanê bike nava xwe de. Wekî din jî, dixwezê ku di deme mudahaleyê de, ku ew ket başûr rojavayê kurdistanê, li wir çi komkujiya bike û çawa tevbigerihê ew destûra wê hebe. Wê yekê dixwezê. Li ser vê yekê jî, ew bazariyê bi emarika re dikêt.

Ku ez ne şaş bim, baraq Obama, ew danûstandinên tirkiye ên bi vî rengî jî li berçav girtina û ew gotina "mudahaleya li Sûrî ji ya li Libya´yê tevlihevtira". Ji ber ku tirkiye destûra ku çî dixwezê ku keta wir de bike ji emarika dixwezê. Bi vê yekê re, ew di danûstandinekê de ya. Tişta ku mirov ji wan gotinên hem yên rayadarên emarika û hem jî yên tirk fahm dike, tenê ev a. Ji ber vê yekê re, divêt ku mirov li ser van xalan bi teybetî bisekin e.

Tirkiye, naxwezê ku li ti derî statûyaka kurdan hebe. Statûya başûrê kurdistanê bixwe jî, wê heta roja me jî hê hazm nekiriya. Hê neqûrtandîya. Hê jî, ku derfet bikeve

dest de, wê bikeve wir de û wê statûyê xira bike. Bi teybetî, divêt ku ez bibêjim ku ew bombabaranên ku ew li herêmên Kandîl û Zagrosan, qaşo li gerillayên kurd dike, di aslê wê de, bi armanca çûna bi ser statûya kurdan ya başûrê kurdistanê ew wan bombabaranan dike. Armanca di temenê wan bombabaranan de, ez ti carî nikarim bêjim ku tenê gerllieyên kurd in. Armanca wan bombabaranan, bi teybetî başûrê kurdistanê, rêveberîya wê û statûya wê ya. Herkesek jî vê yekê baş û qanc dizanê. Li herêmê ku ji kê were pirsîn, wê bi rehetî vê yekê bi lêv bike. Ji ber ku ya herî rast ew a. Tirki jî, di zanê ku bi bombabaranan çûna bi ser gerillayên kurd de û bi teybetî ku li çiyayên kurdistanê bin, wê ti zererê nedê wan. Lê wê, bi teybetî bombabaran zirerê bide aramiya başûrê kurdistanê. Ya ku dewlet li wê dihizirê jî ev a. Di wê deme bombabaranê de, gelek herêmên kurd ên sivil li wir hatina bombabaran kirin. Minaq, di bombabarana tirkiyê li gundê Kandilê li Kortekê ku bû û têde malbataka bi hemû ferdên xwe têde hatina qatilkirin, bû. Ew der, kî karê bêje ku cihekî ku lê gerilla dijîn? Ne ti kesek. Ji ber ku herkesek jî dizanê ku ewder cihên sivil in û tenê sivil têde dijîn.

Bi vê yekê û temenê re bi teybetî, dihê xwestin ku li herêmê statûya kurdan nebê. Kurdên başûr rojavayê kurdistanê, di deme mudahaleyê de ku tirkiye têde di mudahaleyê de hebe, wê komkujiyên mazin bi wan bide jînkirin. Em divêt ku vê yekê dubara û bi teybetî bibêjin. Bi vê yekê re, tirkiye diuxwezê ku hin ancamna din jî bidest bixe. Hin planên wê sînsî jî hene. Minaq, di şerê ku wê heta roja bi kurdan re kiriya ku bi ser neketiya, dixwezê ku rêveberîye ereb û ereban jî bikev nav de. Dixwezê ku ereban jî bi kurdan re bi xwe re bide şerkirin. Bi teybetî, plana wê ya teybetî ya li dijî kurdan, di wê de ev xal weke xalaka sereke ya ku dihê li berçav a. Di temenê danûstandinên wê de û di kirinên wê de jî ya ku derdikeve li pêş ev a. Ji bo ku kurd negihijina statûya xwe, bi vê yekê û awayê, ew şerekî herêmî dike ku bi kurdan re bide dest pê kirin. Ya herî zêde ku divêt ku di vê demê de were ser ziman û ser were sekinî nin jî ev bixwe ya.

Di deme şerê li Kandilê ku bi Îranê re bû, ez divêt ku weke hewldanaka bi vî rengî şîrove bikim û bênima ser ziman. Di piştperde de tirkiya li pêş bû. Hata ku weke di çapameniyê de derket ku di şerê PJAK û Îranê de hin leşkerên tirk jî ên paya bilind jî hatibûbûna kuştin. Tirkiye, bi vî rengî, şerê ku bi kurdan re dike, dixwezê ku hem îranê jî û hem welatna ereb jî tevli bike. Di wê deme ku bahse mudahaleya li Sûrî dihê kirin de, hin hewldanên tirki ên bi vî rengî hene. Di hin danûstandinên xwe yên bi dewlet û rêxistinna ereban de, bi teybetî, vê hewldana xwe derdixe li pêş. Bi vê yekê re, divêt ku ez bibêjim ku gele rêxistin û rêveberîyên ku ji nezaniya xwe bikevina xelatiyên bi vî rengî û xevka tirki de hene. Ji ber vê yekê, bi teybetî, divêt ku mirov li ser vê yekê bi teybetî bi sekin e. Di vê demê de, bi teybetî, divêt ku li başûrê kurdistanê baldarbûn û heybûn hebe. Ji ber ku bi vê têgihiştina xwe re, hertimî, provakasyonên ku werina kirin wê hebin ji aliyê tirkî û hin mirovên ku ji wê herêmê bê û ji nava ereban bê û kişandibê cem wê, wê bi destê wan bike.

Tirkiya bi teybetî li dijî statûya kurdan disekinê. Ji ber vê yekê, evan kirinan dike. Ew gotinên wê yên hin rayadarên wê ku serowezirê wê T. Ardogan jî di nav de, dibêjin qaşo "wê pirsgirêka kurd çareser bikin", tenê derew in. Ji derewna pê de, ne buhur in. Tenê, weke gotinna xapandin û mijulkirinê na. Ji wê û pê, nabuhur in.

Rêveberîya ku xwediyê planaka çareseriyê bê, wê ti carî gotinên dijwar ên şer bi kar neyêne. Wê şer sor nekê. Wê rêxistiniya kurdan, hewldanên jevbelavkirina wê nekê. Wê bi hezaran rêveberiyên wê, parlamanter, rewşnbîr û şaradarên wê negirê û neavêje

zindanan. Rêveberî, ku xwediyê plan û programê bê, wê kirin û gotin lev bike. Lê li tirkî, hemû tişt û gotin li got şer tê kirin û gotin. Ji ber vê yekê, ez nikarim bêjim ku planaka wê ya çareserkirinê heya. Ew gotinên rayadarên dewletê ên ku dibêjin "emê pirsgirêka kurd çareser bikin jî derew in. Ji xwe, ti kurd jî, bi wan bawerîya xwe nayêne.

Şerê dewletê yê bi kurdan re, şer bêstatû hiştina wan a. Bi wê re ez karim bêjim ku şerê tûnakirina wan û ji dîrokê birina wan û navê wan a. Heta roja me jî programên wê yên bişavtinê yanî yên asimlasyonê di dom in. Çend ku li bakûrê kurdistanê ku di nav sînorê tirkiye de ya, ser 20 milyonan re kurd dijîn jî, tenê dibistanaka wan nîn a ku têde xwe û zaroyên xwe bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bikin. Zimanê kurdî, di çerçova wê şerê dewletê yê bi kurdan re ku bi armanc bêstatû hiştina wan re dike hê qadaxa ya. Di mudahaleya li Sûrî de jî, bi awayekî pirr bi şîdetî tirkiyê li dijîya ku kurd, bigihina statûya li wê beşa kurdistanê. Tirkiye, tenê ji ber vê yekê dixwezê ku aktiv ji mudahaleyê de cih bigirê, da qana ku karibê êdî pêşîya statûya kurdan bigirê.

Bi vê yekê re divê beşa nivîsa xwe de, me bi hêvî û dixweziya xwe ku tirkiye di deme mudahaleyê de newê hiştin ku bikeve herême kurdan de bidomên in. Ji ber ku ketina wê ya herême kurdan de, wê feleketekê bêne serê kurdan. Emarika bixwe jî, dizanê ku di deme şerê Îraqê de tirkiya xwest ku bikeve herême kurdan ya başûrê kurdistanê de. Ku kurdan ev yek nexwest û êdî destûr ji wê re ne hat hiştin êdî wê di mudahaleyê de cih negirt. Di çapemeniyê de tê gotin ku "tirkiya, nexwest ku di mudahaleyê de cih bigirê". Ev gotin, hemû jî derew in. Bi teybetî, divêt ku mirov bibêje ku di mudahaleya li îraqê de, çawa ku weke di vê deme mudahaleya Sûrî di rojavê de ya, bi dilûcan bû. Lê wê destûr ne hilda ku bikeve herême kurdan de. Ji wê hat xwestin ku li herême Şîîyan û an jî hinekî ya Sûnniyan bimêne. Lê wê ew yek nexwest. Wê tenê dixwest ku biukeve herême kurdan de û bi teybetî herê bi ser kurdan de. Di wê demê de tirkiye destûr ne hilda ku bikeve herême kurdan de ku komkujiyên mazin bike. Lê nahaka, dixwezê ku ew destûra ku ji bo ketina başûrê kurdistanê ku bidest nexistiya, di deme mudahaleya li Sûrî de bidest bixe û bikeve herême kurdan de. Tirkî, di ketina Sûrî de, wê ti carî, herêmeke din ya Sûrî nexwezê. Wê tenê bixwezê ku bikeve herême kurdan de û temenê xwe rêvebirina wan ji holê rakê. Derd û mereme wê(Tirki), ew a ku ew kurdan li herêmê bêstatû bihêle. Di serî de, ez bibêjim ku ya rastî ne kirina mudahaleyeka leşkerî ku bi hezaran kuştina mirovan bi xwe re bêne. Pirsgirêkên li Sûrî bi rêyên dîyalogê divêt ku werina çareserkirin. Lê ku mudahaleyek bibe jî, di vê de, em hêvî dikin ku tirki destûra ketina herême kurdan negirê. Ji ber ku tirkiye bi armanca ku herê bi ser kurdan de dixwezê bikeve Sûrîyê de. Dixwezê ku temenê xwe rêvebirina kurdan bi komkujiyan bê û bi awayên din bê, ji holê rakê.

**. Nîqaşên avakirina «herêmeka tampon»** … ...

Di deme ku mirov mudahaleya li Sûrî şîrove bioke, divêt ku mirov tiştekî ji berçav neravêne. Di serî de, planên ku dihên xwestin ku li wir bên li cih. Di serî de, tirkiye, rojavaka wê ya teybet heya di mudahaleya li Sûrî de ku bibe. Rojava wê, di serî de kurdên başûr rojavayê kurdistanê na. Yanî rojava wê, bi gotinaka din ew beşa kurdistanê ya ku di nav sînorê Sûrî de hatiya hiştin a.

Di serî de, di deme ku bahse mudahaleyê dihê kirin, li tirkiye, bahse afirandina herêmeke tampon li sînorê Sûrî û bi teybetî li Sînorê herême kurdistanê. Tirkiye hizir dike ku herême kurdistanê bike nava wê herême tampon ku tê gotin were afirandin. Ew

jî, êdî bikeve wê herême tampon de. Bazariyên tirkiyê di deme mudahaleya li Sûrî de li ser vê na. Di çapameniya tirkiyê de, zimanekî teybet ji bo bi vê gotina "afirandina herêmeke tampon re dihê bi karhanîn. Bi teybetî, tekoşîna azadiyê, weke aliyekî ku li li cem rejime baasê ya ku nahaka li ser kar a dihê nîşandin. Ev ziman, bi teybetî û bi zanebûn dihê bi karhanîn. Herkesek jî dizanê ku tekoşîna azadiyê PKK, hertimî tekoşîna xwe ji bo bidestxistina maf û azadiyê kurdistanîyan kiriya û hê jî, wê têkoşîna xwe ya maf û azadiyê dide domandin. PKK rêxistina kurd, ya ku bi deh hezaran şehîd û pekrawanên wê hene ya. Bi nirxên wê yên ku di hundurê 30 salî de ku hatina afirandin re, î ro kurd, temenê xwe diafirnênin pêşaroja diafirênin.

Tekoşîna azadiyê, ti carî ne mumkun a ku rejimeka ku heta roja me hertimî li dijî kurdan sekinîya û mafê kurdan hemû ji destê wan girtîya. Ev yek, pirr safî ya û ti gûman jê nîn a. Lê ew hêzên metinger ku heta roja me li ser serê kurdan şer dana meşandin, dixwezin ku wê sisteme metingeriyê ya li ser serê kurdan ku dana avakirin, bidina domandin. Ji ber vê yekê, di serî de, her rê û rêbazên bêbandûrkirina tekoşîna azadiyê bikar dihênin. Di vê demê de, di deme ku bahse "herême tampon" dihê kirin, bi teybetî, bi zimanekî hilbijartî, tekoşîna azadiyê weke rêxistinaka ku bi rejime Esad re tevdigerihê didina nîşandin. Di zane min de, ev gotin hemû, bi armanca dewletê ya ku dixwezê ku herême kurdan ya başûr rojavayê kurdistanê jî di nav de herêmeke tampon bide avakirina re girêdayî ya. Ku bi çî awayê û şeklê bê, ku êdî rejime Sûrî were guhartin jî û newê guhartin jî, wê kurd, maf û azadiya êdî bidest bixin. Wê statûyekê bidest bixin. Ji xwe, nêvî bi nêvî êdî rêxistinbûna temenê xweserî û statûya kurdan li wê herême başûr rojavayê kurdistanê bi awayekî vekirî afirîya û derketiya li holê. Êdî gelê kurd, li wê perça kurdistanê jî rengê xwe daye der.

Dewleta Tirk, dixwezê ku di deme ku mudahaleyek li Sûrî bû, ew jî di nav de bê, herême kurd, bi teybetî, weke herêmeke tampon were nîşandin û ew jî bikeviyê de û temenê wê statû û xweserîya wan ji holê rakê. Di deme Şerê Îraqê de, bi vê yekê armancê, tirkiye xwest ku di mudaheleyê de cih bigirê û xwest ku di mudaheleyê de bikeve başûrê kurdistanê de. Di deme ku wê ew destûr ne hilde, êdî di mudahaleyê de, cih negert. Di aslê xwe de, cih ne hat dayin jê re. Ku bi çî awayê ba, ku cih hatiba dayin, wê tirkiya ketibayê de. Lê tirkiya di mudahaleya Îraqê de cih ne girt. Î ro, di mudahalye li Sûrî de, bi awayekî ku mazin daxwez dike ku ew di mudaheleyê de cih bigirê. Bi teybetî jî, di mudahelyê de dixwezê ku herê û bikeve herême kurdan ya başûr rojavayê kurdistanê de. Ji ber vê yekê, bahse "herêmeke tampon ya li ber sînor" dike. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ew zimanê, wê yê ku di çapemeniyê de dihê bi karhanîn ê ku bi wê dibêje ku "rejime Esad û tevgera kurd, bi hev re tevdigerihin", bi teybetî, weke hin gotinna ku ji bo amedekariyaka bi vî rengî ya herême tampon in.

Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bi teybetî, li ser wê zimanê wê bisekinê û wê fahm bike. Ev zimanê ku ew bi vî rengî bikar dihêne. Di serî de, dixwezê ku bi wê, tevgeriyeka ku di wê deme mudahaleyê de ku li dijî rejjima Esad were çêkirin, li dijî tevgerîya azadiyê ya kurd jî were çêkirin. Bi vê yekê re, di raya giştî ya ereb de ji bo wê herême tampon, piştgiriyekê ji xwe re bide çêkirin. Ji bo wê jî, bi teybetî, di nav netewperestên ereb de, tirki ji naha de di têkiliyekê de ya. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku bi wî zimanê ku dihê bikarhanîn û dixwezê ku tevgera kurd bi rejime Esad re bide nîşandin, bi teybetî, dixwezê di nav raya giştî ya ereb de jî bicih bike. Têkiliya hin rayadarên tirki ên bi televizyonên erebî ên weke "el-cizîre" û "el-arabîya" heya, û li ser

çapameniyên bi vî rengî ku karin xwe bigihênina girseyeke mazin re, dikin ku bi vî rengî, temenekî bidina afirandin. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku di vê demê de ji her demê zêdetir telûke bi teybetî ji bo kurdan hene.

Tirkiye, daxwez ji Emarika dike ku "rewşeka weke ya ku di dii deme mudalaleye li îraqê de bû nebê". Rewşa ku Îraqê bû çi bû? Ew jî, ew bû ku kurd li wir gihiştina hin mafna xwe û statûyek bidest xistin. Di deme mudahaleya li Sûrî de, tirkiye daxwezê bi isrer ji Emarika dike ku li Sûrî kurd, di deme nû de nebina xwediyê ti Statûyê. Ji ber vê yekê hewldanên wê hene. Hemû daxweza wê ya ku ew dixwezê ku di mudahaleya li Sûrî de cih bigirê, ji bo vê yekê ya. Bi teybetî, ew dixwezê, di deme mudahaleyê de, bi tememî temenê statû û xweserîya kurdan ji holê were rakirin û rejimeke hişk li ser serê wan were bicihkirin. Ji ber vê yekê, ew li gor vê daxwez û rojava xwe ya teybet, daxweza herêmeke teybet ya "tampon li başûr rojavayê kurdistanê" dike. Di vê demê de, hemû danûstandinên wê yên bi rayadarên Emarikî re jî, di vê temenê de na. Ji ber vê yekê, çi ji destê wê tê dike.

Bi vê têgihiştin û plana tirkiye ya ku biisrer dike ku bimeriyetê de ya herême tampon, di wê çerçovê de, mirov karê li wan gotinên hukumeta T. Ardogan, yên ku bi wan dibêjin wê qaşo pirsgirêka kurd çareser bikin binerê. Di çerçova van kirin û plan û programên tirkiyê de, ku mirov li wan gotinan dihizirê, mirov dibîne ku ew gotin hemû jî derew in. Di van rojên piştî newrozê de dibêjin ku wê bi qaşo bi BDP re wê "dîyalogê" dênin jî, teneî gotinna aqil ji rê birinê na. Di destpêka oparasyonên qirkirina siyasî de, gotin ku "têkili û dîyalog, bi tevgera kurd PKK re heya". Lê ku rayadarên kurd, ev derew derxist, êdî weke ku lingekî plana wan şikeşt. Êdî ji ber ku nikarin bêjin ku têkilî bi wê re heya di vê deme ku evqas oparasyon li kurdan tên kirin de, êdî bahse qaşo "têkiliya bi BDP re" dikin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ev hemû di çerçovaya planakê de dihên gotin ku nerast in. Bi van gotinên ku bi vê rengî, dixwezin ku ku karin parçebûnekê di nav raya giştî ya kurd de bidina çêkirin. Ku nikaribin wê çêbikin, weke ku di wan rojên ku me buhurandin de di gotin ku "kandîl û îmralî cuda difikir in", bi vî rengî ku dixwestin ku parçebûnekê di nav raya giştî ya kurd de çêbikin, nahaka bi heman politkayê li ser BDP re dikin ku bidina meşandin. Ev gotin û kirin û gotinên ku tên gotin, di vê demê de, hemû jî, tenê ji bo ku parçebûnekê di nav raya giştî ya kurd de bidina çêkirin û an jî ku nikaribin wê parçebûnê çêbikin, êdî parçe bidina nîşandin. Ev hewldan hene.

Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku hê dewlet ji şikandina vîna gelê kurd ne buhurîya. Tekoşîna azadiyê, serokatiya wê Birêz Ocalan û Gelê kurd û saziyên wê yên siyasî hemû jî yek deng in û di vê demê de ji her demî bêhtirî ew hêz û yekdengîya wan heya. Ji her demê xorttirin. Tekoşîna azadiyê, ji herdemê bêhtirî bihêztira. Her hêrîşa ku lêbûya, ew ji hêz ne kiriya, vajî wê, ew bihêzkiriya û bêhtir bi cerb û fêr kiriya. Bêhtir bi zanebûn kiriya. Di vê demê de, gelê kurd, hê bêhtirî, li dora tekoşîna azadiyê gihiştîya hevdû. Ji her demê zêdetir, gelê kurd vîna xwe bi serokatiya xwe re û bi tekoşîna azadiyê re kiriya yek û daya nîşandin. Newroza 2012´an, vê yekê, pirr baş û bi awayekî vekirî da nîşandin. Newroza 2012´an, weke zirveye wê bû. Ji ber vê yekê, dewleta tirk, êdî bi hêrîş û hîsterîk hêrîşî gelê kurd dike. Hêrîşî sazîyên wê dike.

Hemû rayadarên kurd ên ku dewleta tirk di bin navê "dozên KCK" de dan girtin, ji bo ku vîna kurdan bi teybetî ji holê rakê bû. Bi wan girtinan re, bi teybetî, armanca wê ew bû ku vîna wan bi tememî ji holê rakê. Hinekî jî ew gertin, weke amedekariyaka ji

hêrîşên demên pêş re ku wê li kurdan bike re jî bû. Bi teybetî, heka ku mudahaleyek li Sûrî bûba, wê dewletê, bi teybetî, kiriba ku hêzên xwe kiriba başûr rojavayê kurdistanê de û li wir çûba bi ser kurdan de bi hin aşîrên ereb re. Li bakûrê kurdistanê jî, wê şer hatiba zêdetir in û wê hatiba bi ser kurdan de. Wê çekên giran ên teknîkî û biolojikî hatiban bi karhanîn, weke ku li Geliyê Tiyarê û di komkujiya Qilbanê de bû. Bi vê plana xwe re, ew dixwezê ku bi tememî temenê statûya kurdan ji holê rabike. Dewleta tirk, ti carî naxwezê kurd, bigihina maf û azadiya xwe. Ew gihiştina kurdan ya maf û azadiya, bi mirina xwe dibîne. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku ew gotinên wê yên ku rayadarên wê dibêjin ku wê "pirsgirêka kurd çareser bikin" jî, tenê derewna mazin in. Çareserîya di serê wan de, ew a ku kurd, bi tememî vina hatiba şikandin, êdî doza ti mafî nekin a. Çareserîya wan, ew a ku tekoşîna azadiyê bi tememî ji holê rakin û bêî mafê kurdan radestî wan bikin politikayên xwe yên asimlasyonê bidina domandin û bi wê re bi demê re kurdan jî dîrokê bibin.

Ji ber vê yekê, ew gotinên ku bi gotina "herême tampon" ve tên bikarhanîn, divêt ku mirov wan bi teybetî fahm bike. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, dide nîşandin ku di serê tirkiyê de hin planên komkujiyê ên mazin hene. Ku mudahaleyek li Sûrî bibe û tirki têde cih bigirê, hingî wê bi hezaran qatilkirina kurdan ne tenê li bakûrê kurdistanê bibe her weha wê li başûr rojavayê kurdistanê jî ku wê hin aşîrên ereb ên netewperest hildana cem xwe û ku bidestê wan(tirkiya) pêk were û wê bibe. Ji ber vê yekê, em hêvî dikin ku wê Emarika ti carî derfet û îmkanê nedê tirkiyê ku bikeve Sûrî û bi teybetî başûr rojavayê kurdistanê de. Ku derfet û destûr dayê de, hingî wê ew derfet û destûr wê bê destûra qatilkirina bi hezaran kurdan. Wê li herêmê, hingî bi teybetî li kurdistanê û bigiştî li herêmê, wê bi hezaran mirov werina qatilkirin. Tirkiya, tenê ji bo ku kurdan statûya wan bi tememî ji holê rakê, dixwezê ku di pêvajoya mudahaleya li Sûrî de cih bigirê. Tenê, ev armanca wê heya. Kurd, li Sûrî neban, wê tirki, ti carî dibêt ku doza ketina nava hêzên ku wê mudahale bikiran jî bikira.

**E**z dixwezim ku vê yekê jî bibêjim. Di serî de tirkiye ku bi keve Sûrîyê de, wê bi ajanda xwe û rojava xwe wê bikeve Sûrîyê de. Derdê wê kurd in û wê herê bi ser kurdan de. Minaq, ew herême ku ew bahse wê dike û dixwezê ku lê "herêmeke tampon" bide avakirin jî, sînorê başûr orjavayê kurdistanê ya. Bi vê yekê re, dixwezê ku bi teybetî herê bi ser kurdan de. Di deme ku mudahaleya li Sûrî bibe ku dest pê kir, wê rastûrast çûna wê ya bi ser kurdan de bibe. Tirkiya, ku bi keve Sûrîyê de, wê bi teybetî, têkiliya xwe ya xort bi rêxistinên netewperestên ereb re dêne. Ji xwe, ji nahaka de ew têkilî danîya jî. Li ser wê têkiliyê re, wê bike ku anîyaka din ya li dijî kurdan ji aliyê herême ereban ve were vekirin. Bi vê yekê re, wê tirkiye di hewldanekê de ya. Bi vê yekê re, ez karim bêjim ku wê ancam û şerê li dijî ku bi li dehsalan belav bûyî wê bibe. Tirkiye, di deme şerê hin komên ku bi rêveberîya baasê re ku nahaka dibêt, di vê demê de xwest ku kurdan jî bike nava şer de. Bi destê wê û hin rêxistinên li herêmê re dide gotin ku "çîma kurd li dijî rejime nahaka şer nakin(?)". Bi vê yekê re, li Sûrî, şerekî ku li ser temenê desthildariyê û şerê hêzê û bidestxistinê hêzê ya xwest ku kurdan bike navê de. Lê ew hewldana wê bi serneket. Ketina kurdan ya şerekî bi wî rengî re wê ji du aliyan ve bi hatan bi karhanîn. Aliyê pêşî ew bû ku wê wê şerê herême kurd û ereban derbixista li pêş û ji wê bi armanca ku anîyek li dijî kurdan bigiştî di nava cihane ereb de bide vekirin, wê bikarbihanîya. Aliyê dî yê duyemin jî ew bû ku wê bi şerekî wilo re ku temenê kurdan û hêza wan hemû têde bide xarckirin.

Kurd, ji bo maf û azadiya têdikoşîn. di şerê di nav hêzên dewletê yê desthilatdariyê de, hewldana kirina kurdan ya di nav de, tenê, bi armanca tûnekirina kurdan a. Rêveberîya Baasê heta roja me, bi dehan kurd qatilkirin. Mafê kurdan, heta nehaka ne hatiya radestkirin li wan. Hê, weke ku li Tirkiyê û Îranê, li Sûrî jî, zimanê kurdan bi awayê fermî qadaxa ya. Li wê herêmê, heta roja me, politikayên erebkirinê li ser kurdan hatina ferzkirin. Gelek kurd, ji cih û warên wan jî hatina kirin. Bi hezaran kurd, ji xwe nasnema wan jî nîn a. Li welatê xwe li ser axa xwe weke mirovna beyenî dijîn.

Başûr rojavayê kurdistanê, di deme me de jî, li wê herêmê û li gelek herêmên din ên Sûrîyê Sîxûrên Tirkiyê hene û wî şerê ku dihê kirin, di wê de cih digir in. Di deme ku min ev nivîs di nivîsande, nûçeyên ku diketina ajansan de ew bûn ku pevçûnên li Sûrî yên di nava rejime baasê û komên çekdar de, herîkîya Halabê ku lê pirranîya wê kurd dijîn. Herîkandina şer ya li van herêman, divêt ku mirov, weke nêzîkatîya xweza neyêne ser ziman. Weke nêzîkatiya teybet bêne ser ziman. Hê, hewldanên ku kurdan tevî wî şerê desthilatdariyê bikin, bi dawî nebûna. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku herîkandina pevçûnan li kurdistanê, wê bi teybetî, weke hewldanaka ku xwestina kirina kurdan ya di nava pevçûnan de û bi wê re temenê çûna bi ser wan de bidina afirandin bê. Ev yek, wê ne bê hewldana tirki bibe. Tirkî, di serî de, dixwezê ku herêmên kurdan, weke herêmne, ne aram û yên bide nîşandin û bi wê yekê re, temenê çûna bi ser kurdan de bide afirandin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku ev hemû, hewldanên pirr xatarnak in.

Ku bi çi armancê bê, ku pevçûn werina herikandin li herême kurdan, wê bi armanca çûna bi ser xwerserîtiya herême wan de bê. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bi teybetî, vê yekê bêne ser ziman. Ji ber vê yekê jî, bi teybetî, kurd, divêt ku bi baldar û heyîdar bin ji hemû kirinên bi vê rengî ên ku bin kirin re. Di vê deme ku tirkiye li herêmê şerek li dijî statûtiya kurdan daya dest pê kirin, ev hewldanên bi vî rengî, wê tenê ji wê armancê re xizmetê bikin. Ne bidestê van hêzan jî bê, wê ew pevçûn newina herîkandin li herême kurdan. Di vê demê de jî, di temenê bi çûna bi ser kurdan de, hin têkiliyên sûrî û tirkiyê ên bi hev re hene. Di nav wan têkiliyên ku hê di dom in de, heya ku ev hatibina kifşkirin, û di rojên pêşîya me de, bi nîyeta çûna bi ser muxalifan de, hêzên rejimê biherêkina bi ser kurdan de. Di van xalan de jî, pirr liyistik tên leyistin.

Li Başûr rojavayê kurdistanê, di vê demê de nêvî bi nêvî rêveberîya wê di destê wê de ya. Kurd, saziyên xwe yên civatî ava dikin. Bi teybetî, li herême vê kêlîkê kurd serdest in. Ev yek jî, bale dewleta Sûrî jî û ya Tirkiye jî dikişene. Çend ku gotin ji rêveberîya ku naha hê li ser kar e ya baasê jî û ji yên muxalix ku weke rêveberîya piştre jî êdî hatina naskirin jî werin û bêjin ku "emê, mafê kurdan bidina wan" jî, lê dîsan, di nêzîkatî û hewldanna ku tên nîşandin de, bi teybetî dij-kurdî xwe dide li rû. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bibêje ku hin kiirnên ku li gotinê nakin û hin gotinên ku li kirinê nakin dibin. Bi vê yekê re, êdî mirov dikeve xûf û gûmanê de ku ne jidilî heya. Li ber vê yekê, divêt ku kurd bi teybetî xwe bi rêxistin bikin û baxtê û qadare xwe hildina li destê xwe. Li başrû rojavayê kurdistanê, di vê demê de, çendî ku hin nûçeyên ku hin dibistanna xwandinê hatina vekirin jî hatin jî, lê dîsan ev têrê nakin. Divêt ku bi teybetî, di hundurê vê deme kin de li hemû herêmên kurdan dibistanên bingihîn heta yên seretayî werina vekirin û bi pergalî demsale xwandinê ya zarokan were destpêkirin bi kurdî. Bi vê yekê re, divêt ku rêveberîya herêmê, dengê xwe li dijî dervê bike yek. di asta wezirtiyê û serokwezirtiyê herêmê de, rêxistinbûn bibe û muhatabê hemû

pirsgirêkên kurdan yên bi derve û di hundur de ew bê. Bi teybetî, kurd, karin yekalî hukumete xwe ava bikin û denezênin li başûr rojavayê kurdistanê. Ew hukumete wê, were nasîn û pirsgirêkên kurdan bidest çareserkirinê bike. Êdî bi partîtî û rêixistinti tevgerin divêt ku di asta herêmê de ji holê rabê. Kurd, di nava xwe de dikarin, wê partitiya xwe bikin. Lê divêt ku li berderve, bi yekdengî tevbigerihin. Di vê demê de meclisa herême ya civatî divêt ku were avakirin û denezandin û ew meclis hukumete kurd ava bike. Tenê xwestina maf û azadiyê nabê. Êdî, divêt ku ev gavên giring jî werina avêtin. Meclis û hukumet,heyîn û hebûna kurdan ya xwe bi rêvebirinê ya. Ya ku wê were nasîn ev a. Ev, mafê kurdan a.

Di newroza 2012´an de, kurdan, bi teybetî, vîna xwe li gelemperîya kurdistanê da nîşandin. Kurdan, ev yek xwest. Kurdan, xwest ku êdî biu vîna xwe êdî ew xwe bi rê ve bibin. Kurdan xwest ku êdî ew li ser pêşaroja xwe bibina xwediyê gotinê. Bi teybetî, li bakûrê kurdistanê, hemû hewldanên dewletê ên jev felişandina rênixistiniya kurdan, bi newrozê re kurdan bersivaka bi berxwedanî dan. Li başûr rojavayê kurdistanê jî, bi heman awayê weke bakûrê kurdistanê newroz bi ihtîşamaka mazin hat pîrozkirin. Di newrozê de, di aslê xwe de, ev peyam jî hat dayin ku kurd êdî meclisa xwe ava bikin û danezênin û hukumeta xwe denezênin û êdî bi wê re xwe bi xwe êdî bi rê ve bibin.

.. **Başûrrojavayê** kurdistanê jî, di vê demê de hin pêşketinên ku lê dibin hene. Lê başûrrojavayê kurdistanê jî, weke rojihilatê kurdistanê hê di rêxistinîya xwe pirr kêm a. Di serî de divêt em vê kifşe bikin. Saziyên kurd yên başûrrojava û rojihilatê kurdistanê, divêt ku êdî xwe bighihênina rêxistinîyaka demî ya ku karibe deme wan bi wan re bide xilaskiirn û pêşaroja wan ji wan re bêne. Ev yek, di vê demê de ji her demên din bêhtirî pêdivî bi pê heya ji bo kurdan. Ji her kesekî zêdetir kurd pêdivîya wan bi vê yekê re heya. Ji şerê cihanê yê yekem û duyem ve kurd, di rewşaka pirr xirab de na. Kurd, bi çûna li ser wan re ya Tirkî û Îranê ya bihevre re ya li ser wan de windakirin. Li ber wan, ne tenê welatek bi pergalîya xwe sekinî. Herême bi statûqûya xwe ma sekinî. Li demên ku bi ser deme paxta Sadabadê ve ku buhurtina ku mirov li wan dinerê, mirov dibîne ku kurd, di rewşaka çawa û xirab de na. Kurd, ji her aliyî ve dervî pêvajoyên ku hatina jînkirin hatina hiştin. Bi herêmî bi peymanên weke yên paxta Sadabadê û peymana Cezayîrê re li herêmê bi tavahî dervî pêvajoyên dadî hatina hiştin. Di hundurê welatê herêmê yên ku afirîn de jî, pêvajoyên destûrî û dadî jî li gor gîyan û dadîya van peymana hate afirandin. Bi vê yekê re, li her derî û cihî ku di welatê xwe de jî dervî pêvajoyên dadî hatina hiştin.

Di deme Paxta Sadabadê de temenê Sûrî hate avêtin. Di wê demê de sînorê wê hatina xîzkirin. Di wê peymanê de deme ku li ser sînoran axiftin bû û safîkirin li ser wan di nav hêz û dewletên ku tevlî wê bûn de bû, êdî beşa Kurdistanê ya başûrrojava jî ku di nav de sînorê Sûrî hatina xîzkirin û safîkirin. Bi vê yekê re, ew beşa Kurdistanê jî bi kurdistanîya xwe re, êdî dervî pêvajoya dadî hate hiştin. Di wê demê de Firansa li ser wê herêm û beşa Kurdistanî û bigiştî li Sûrî hemûyî serdest bû. Di wê dema ku wê êdî kare xwe ya vekişînê dike de, soza ku ew dide kurdên ku dengê xwe derdixin jî, ew ku "deme ku ew vekişîya bi şûn de ji herêmê wê herême kurdan bi serê xwe bê û hukumete wê hebe". Ev gotin, weke sozekê ji kurdan re tê gotin. Lê piştre derdikeve li holê ku ev gotin û sozên ku hatina dayin, tenê ji bo ku wê pêvajoyê bêî kurd bertekna bi şerî bidina nîşandin hate ku vekişîhin hatina gotin. Ji bo ku pêşîya rewşa wilo bê girtin, ev gotin hatina gotin. Ya ku derdikeve holê, di salê xwe de ev e. Ji ber ku deme ku

temenê Paxta Sadabadê diafirê û êdî ku ew tê wê pêvajoya ku wê pêk were û êdî ku pêk tê piştre êdî ku Xatay û Îskenderûn jî ku tevlî sînorê tirkî hatîya kirin, piştre Firansa jî, êdî bi çûn ve di kişêne hêzên xwe ji herêmê di wê demê de

Piştî ku Paxta Sadabadê tê mohrkiirn û piştre, êdî Firansa jî li gor ku kare xwe kirîya, êdî bi şûn ve divekişîhê. Kurd jî, bi soza ku ji wan re hatîya dayin re bi tenê li holê li însafa hêzên herêmê yên bê însaf dihêne hiştin. Piştre kurdên başûr rojavayê kurdistanê jî, êdî wê rewşa wan dem bi dem bi dest xirabûna xwe bike. Ew jî, êdî hin bi hin bikevina rewşaka xirab de bi serdestîya rejîma baasê de. Rejima baasê ya ku hatîya avakirin li Sûrî, wê bi rejima baasê ya ku li Îraqê ava ya re tevbigerihê li ber kurdan. Wê weke wê tevbigerihê. Kurdn di deme piştre de êdî dikin ku bertekên xwe bidina nîşandin. Lê belê, êdî ji wan re weke ku dem buhurîya. Çi gotin û soz, di deme ku ji wan re hatîya dayîn, tenê ji bo ku dem bi pê buhurîna. Li Wê beşa kurdistanê jî, ev yek wilo dibê. Piştî konfaranse Lozanê ya ku kurdistanê tê de di nav Tirkî; Îran, Ingiliztan wê demê ya ku serdestîya wê Îranqê hebû û Firansa wê demê ya ku serdestîya wê li Sûrî hebû. Îngiliztan, piştre wê bi şûn ve hêzên xwe bikişêne û wê ew beşa kurdistanê ya başûrê kurdistanê ku di bin serdestîya wê hêzê de bû, wê di nav sînorê wê welatê nû ku tê avakirin yê bi navê "Îraq"ê de tê hiştin. Temenê wê di peymane Lozanê de tê avêtin. Ew temenê ku Îngliz ji bo xwe li wir diafirênin, wê piştre aliyekê beşkirina kurdistanê wê biafirêne. Ev rewşên demê divêt ku baş û qanc werina dîtin û fahmkirin. Îngiliz, rewşa beşkirina kurdistanê bi Firansa re di konfaranse Lozanê de ji bo kurd wê heyîn û hebûna xwe ya li herêmê bi parezên diafirênin bi hêzên herêmê yên ku tevlî wê konfaransê dibin re.

Başûrrojavayê kurdistanê, di wê demê de bi biryara Konfaranse Lozanê re di bin destê hêzê firansî de dimêne. Ew herêm hate ku digihê herême Libnanê wê serestîya wan bi hev re lê hebe. Di wê demê de Firansa, ji bo ku xwe li herêmê bigirê, têkiliya wê bi melîkên araban re pirr heya. Li herêmê hingî, Îranê bi Sah Riza Pahlawî re weke Welatekî ku nêzî amarîka ya. Bi wê re, Têkiliya wan bi Îngilizan re jî pirr xurtte. Tirkî, di wê demê de jî, ji bo ku heyîna xwe ya li herêmê biparezê dike ku nêzî Amarîka bibe. Pêşnîyara serokkomar û avakerê tirkî M. Kemal ya ji amarika re ku "ew weke mandaya amarika li herêmê bibin" wê piştre bikeve devrê de bi girêdana wê ya bi Amarîika û Îngiliztanê ve. Pêşnîyaraka wan ya bi vî rengî jî dibe ji Amarîka re ku xwe bikina "manda" wan. Sedeme wê yekê jî, di wê demê de ji ya î ro ne cudatira. Sedeme wê, hê ku kurd li ser lingana û raperînên wan hene, ji bo ku li ber wan raperînan alikarîyê bistênin û nehêlîin ku kurd piştgirîyekê ji wan û hêzên rojava bistênin. Di wê demê de ji tirkî raporên ku diçina yekîtîya sovyet jî, di wan de raperînên kurdan weke "raperînna paşverû yên ku di xwezin rejîme şerîetê bin in" in. Bi vê yekê re, tirkî deme xwe dike ku xilas bike û xilas jî dike. Bi ancama van raporan, ti têkiliya yekitiya sovyet jî, bi kurdan re û raperînên wan re wilo zêde nabin.

Li başûrrojavayê kurdistanê jî, di wê demê de çend bertek têne nîşandin ji aliyê kurdan û hin mirovên wan yên ku li pêş in ve, wê bêne kuştin. An jî, wê bêne girtin û bikina zindana de ji bo ku wan bê bandûr bikin. Rejima ku piştî bi şûn ve kişandina Firansa ve ku li welatê nû yê ku ji nû ve ava dibe li Sûrî tê ser kar jî dike ku bi kurdan re baş bi buhurîne û weke ku rastkirin di paxta Sadabadê de hatîya kirin bi safîkirina sînoran re û avakirina pergalê re biparezê. Rêveberîyaka ku li gor gîyane paxta Sadabadê tevdigerihê ya. Kurd, li wir bi wê rêveberîyê re jî, hin bi hin temenê wan yê

dadî û pêşketinî yê kurdî jî tê şamitandin û ji holê rakirin. Rêveberîya ku heya, wê tenê li gor pergale Baasê ku pergale ku tenê rengê arabîyê daya xwe wê tevbigerihê. Hin bi hin, wê li gor vê bi rê ve herê. Pêvajoyaka ku tirkî û Îran jî piştgirîyê didinê de û Îraq jî bi rejima baasê li cem a, bi awayekî bişavtinî dike devrê de. Li wir, weke ku li Tirkî, Îran û Îraqê heya, zimanê kurdî wê ji sazîyê perwerde û fermî were dûrkiirn. Bi wê re hin bi hin, weke baqa ku di nav ave germ de ku lê xweş tê û ew jî hin bi hin xwe diberde û hin bi hin dimirê wê li kurdan were. Ji wê deme paxtê ku bi ser ve 9 an jî 10 sal di buhurin, êdî kurd hin bi hin wê rastiyê fahm dikin. Wê polîtîkaya ji holê rakirinê dibînin. Bidest dîtina wê dikin. Êdî hn bi hin bi gotin û nêzîkatiyê bertekên xwe didina nîşandin.

Piştî ku kurd êdî rewşê fahm dikin û bidest dayina bertekên xwe dikin, êdî wê hin bi hin bi bertek nîşandana rejimê ya li ber wan bertekên kurdan re wê rastîya wê derkeve li holê. Wê kurd, êdî bi wan bertekan re weke ku bihajijin wê li wan were û êdî wê bidest dayina bertekan zêdetir bikin. Piştî wê demê de êdî kurdên ku bertekên xwe bi awayekî safî didin, wê êdî werina girtin û bikevina zindanê de. Komkujiyên weke ku bikomî pêktên yên weke "dibistana Amudê" wê pêk werina. Lê ne tenê kurd, êdî komên din yên cuda jî, wê bertekên xwe bidin.Ew jî, wê rastî komkujiyan werin.Ji wê demê pêde hate ku dem tê salên 1980 û wan, wê bi hezaran kurd û mirovên ji komên din werina kuştin ji ber sedeme ku li ber rejima baasê rabûna û serî hildana. Başûrrojavayê kurdistanê, li ser serê wê pêvajoyaka ku ji kurditîyê ya dûrkirinê ya bişavtinê li ser hate meşandin weke ku li Tirkî, Îran û Îraqê piştre dibe. Piştî Paxta Sadabadê, di nav sazîyên dewletan yên ku têde hatina cem hevdû û beşên kurdistanê kirina nav sînorê xwe de, komîsyon û komîteyên bi hev re karkirinê yên Îstihbarî û din têne avakirin. Ji bo ku di nêzîkatîyekê de bi hev re karbikin û nêzîkatîya wan bi hev re bê. Hertimî, çendê ku weke ku di rojevê de nakokîyên wan hebin jî, lê dîsa dervî wê, bi wan komîte û komîsyonên dayimî ku avakirina re di çerçova beşên kurdistanê û kurdan de bi hev re tevgerîyana û gavên xwe avêtina bi prensîbî. ..

Demên pişt re ku têne jînkirin, hemû wê di wê çerçovê de bin. Li ber kurdan, wê di tevger û nêzîkatiyê de yek bin. Bi wê yekê re, piştre bi peyman û lecivînên weke yên Cezayirê ku bi peymane Cezayîrê biancam dibe re wê pêvajoyê bidina berdewam kirin. Ji salên 1980 û wan pêde û bi vir de, wê êdî pêvajoyaka şer ya mazin ya demî dest pê bike bi kurdan re. Sûrî, çend ku bi şerê leşerkerî li ber kurdan weke Îran, Tirkî û Îraqê danê dest pê kirin jî, wê di nêzîkatîyaka ku wan temen dike de bê. Hewldanên arabkirina herêmên kurdan, wê di demên piştî 1980 û wan de wê zêdetir bibin. Li tirkî û Îran û Îraqê jî, wê ew bibin. Lê bi tekoşînên kurdan yên li Îran û Tirkî re ku van başûrrojavayê kurdistanê jî bi rêxistin in, wê êdî hin bi hin, ji bo kurdan bi kurdan re pêvajoyaka li berxwedanê dest pê bike. Kurd, wê di wê demê li Îranê, Tirkî, Sûrî û Îraqê jî, hê bêhtir qadaxaya li ser zimanê xwe wê hîs bikin. Bi vê yekê re, wê êdî rêxistinbûna kurdan li van deran bibe. Wê êdî partiyên wan ava bikin. Lê hê jî, ew partiyên wan yên ku li Başûrrojava avabûna, ne wê astê de na ku pêşketina mazin di nav xwe de bidina çêkriin. Ji ber ku jevbela na. Bi hev re ne li cem hevdû na ku wan polîtîkayên bişavtinê ku vala derxin û ji holê rakin**.** Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku ji hertiştî zêdetir pêdîya kurdên başûrrojavayê kurdistanê bi rêxistinîyaka dîrokî ya di nav xwe de heya ku wan bêne cem hevdû û xwestekên wan bi yek dengî bêne ser ziman û ji bo wê tekoşînê bide. Gelê kurd, di wê têgihiştinê û yekbûnê de ya. Lê saziyên wan yên

ku wê têgihiştin û yekbûna wan di xwe de bêne ser ziman li başûrroavayê kurdistanê kêm in.

Di van dem û rojên ku em têde ne, ne tenê kurd herêmên rojhilat hemû jî li ser lingana ji bo azadî ya xwe. Kurd, di wê demê de ku nexwezin, ew pêvajoyên dadî yên ku bi Peymana Lozanê, Paxta Sadabadê û Peymana Cezayirê re hatina afirandin û têde kurd hatina tûnekirin û bi wan hewl tê dayîn ku kurdan ji holê rakirin, ku bêne berdewam kirin û ji wan xilas bibin, divêt ku rêxistinîyaka xwe ya demî biafirênin.Divêt ku rêxistinîyaka xwe ya ku karê bersivê bide demê bi yekbûna wan ya ku pê hatina li cem hevdû re divêt ku bi afirênin. Di wê demê de, ji herdemî zêdetir pêdîvîya wan bi vê yekê heya. Ya ku wê di vê demê de wê rewşa li ser wan ji holê rakê jî, ev bixwe ya. Ti parti û rêxistinên kurdan û keseyetîyên kurdan di vê demê de ew mafê wan nîna ku dervî wê yekê xwedî gavavêtin bin. Di wê demê de, divêt ku d cih de li başûrrojavayê kurdistanê sazîyaka kurdistanê ya sihwan ku hemû partî rêxistinên kurd di bin de werina cem hevdû divêt ku were avakirin. Divêt ku li ser pirensîba perwerdehîya bi zimanê dayikê û avakirin û birêxistinakirina herême kurdistanê li gor nirxên **kurdan bê.** Kurd, di wê demê de ku vê yekê nekin, wê nikaribin, bibina hêze afrîner ji bo xwe û herêmên xwe bi xwe re. Wê nikaribin ku wê rewşa giran ya sîyasî ku heyîn û hebûna înkar dike ji holê rakê. Li başûrê kurdistanê, mirovekî ku ev rastî dît û xwest ku li gor wê gavna biavêje Şêx Maşûqê xiznewî bû. Ew jî hate kuştin. Bi wê kuştina wî de hewl hate dayin ku pêşî li wê bi rêxistinkirinê bê girtin. Hat xwestin ku pêşî li wê bi rêxistinkirina di nav xalkê de bê girtin. Kurd, di vê demê de divêt ku wê yekê jî bibiînin û ew xwesteka Şêx Maşûqê xiznewî ku wê xwest ku bike bênina li cih. ..

Di wê deme ku Li Sûrî Gel serî hildaya, kurd ku bi yekbûnekê tevbigerihin û li berxwe bidin, wê rejima vê awayê wê ji holê rakin. Kurd, divêt ku di vê demê de di nav xwe de pirr bi rêxistin bin. Divêt ku di vê demê de dengê wan yek bê. Bi hev re gavên xwe biavêjin. Ku kurd, wilo nekin, wê di vê demê de pirr mazin winda bikin. Li ber wan serî hildanên gel serokkomarê Sûrî Beşar Ezad, deme ku bahse xwenûkirina dike de, artişê di dişêne herême kurdistanê başûrrojavayê kurdistanê. Ev, dide nîşandin ku hate ku kurd bi hêzeke bi rêxistinî dernekevina holê, wê nikaribin ji bo xwe ti pêşketinan li wir bidina kirin. Di vê demê de, berî hertiştî, rêxistînîyaka ku wê pêşketinê wê li başûrrojavayê kurdistanê bide çêkirin, divêt ku hebe. Ev rêxistin, bi teybetî, aliyê wê sivîl ku pirr mazin li pêş bê û di demê de bi cidîyeteka mazin li her bajer, bajerk û hate ku li gundên herême kurdistanê bi rêxistin bê. Ev yek, di vê demê de li wir pirr mazin pêdivî bi pê heya. Sazî, partî û rêxistinên kurd û bi teybetî jî rewşêbîr û nivîskarên kurd, divêt ku di wê yekê de pêşengîya xwe ya dîrokî di wê demê de dikeve ser milê wan de bikin. Divêt ku derkevina pêş. Di nav xalkê de kar bikin. Xalkê li ser rewş û demê bi pêşketin bikin. Li Sûrî, hate nahaka, di çi rêxistinîyê de bertek hatina nîşandin? Tenê bi bertek nîşandinê re bisînor mayin, tenê xwe li tûnekirinê û tûnebûnê razandina. Ev yek, di wê demê de ti carî nayê herêkiirn. Divêt ku ji gelek aliyên din ve pêşketin bibe. Rêxistinaka gel ku di demeka kin de li başûrrojavayê kurdistanê ku xwe bi rêxistin kiribê, divêt ku nahaka di vê demê de hebe.

Ji aliyê perwerdehîya bi zimanê dayikê re divêt ku kurd li herêmên xwe di vê demê de gavên xwe yên ku divêt ku biavêjin divêt ku wan gavên xwe biavêjin. Pirtûkên xwe yên perwerde amede bikin û dibistanên de divêt ku bidest avakirina wan bikin. Divêt ku êdî zaroyên xwe tenê bişênina wan dibistanên xwe yên kurdî yên ku wê ew wan

avabikin in. Bi vê yekê re wê êdî dawiyê li bişavtina li ser xwe bênin. Di wê demê de ev kirin, wê temenê pêşketineka mazin ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd ya di wê beşa kurdistanê de biafirêne. Rejima baasê, di vê demê de li ber bertek û serhildana gel, gotinên reformê (xwenûkirinê) dihêne ser ziman. Ya ku wê wê temenê wan gotin di jîyane de û di merîyetê de biafirinê jî ev bixwe ya. Di wê demê de tenê bi hin nivîs û hanîna ser ziman ya nivîskarên kurd bi teybetî yên wê herêmê kurdistanê, wê tenê weke bêxîretîya wan bê. Divêt ku ew ti carî wê bêxîretîyê nekin. Di wê demê de ji gelê xwe re pêşavaniyê bikin. Sazîyên gelê xwe yên perwerde bê û yên rêveberbirinê yên din bin, divêt ku ji wan re pêşavaniyê bikin û ava bikin.

Bi wê yekê, divêt ku bi pêşketina kurdên bakûrê kurdistanê bigihina hevdû.Divêt ku ew bisekn, di nav xalkê de bin û wê birêxistin bin û temenê sazîyên wê yên bi avakirina dibistanên wê de bê û pêşavanîya wan kirina wê bê û hwd, divêt ku ew li qadê bin.. Di wê demê de, ya ku wê ji kurdên wê beşa kurdistanê re bide qizinckirin tenê evnakê ya. Gelê kurd, di newrozê de rabû ser pîyan. Li başûrrojavayê kurdistanê de bi tavahî rabû ser pîyan. Ew rabûn, divêt ku newê rûnandin bê berdewam kirin. Di vê deme ku li herêmê û bi teybetî li Sûrî herkesek li ser lingan a, kurd tevî ku hemû mafê wan ji destê wan hatîya girtin, wê çawa di cihê xwe de rûnihin(?). Divêt ku mirov vê yekê jî bi pirsê û bibêje. **Ev dem, deme ku roj û weyneke mazin dikeve ser milê rewşênbîrên kurd de ya. Divêt ku ew di vê demê de pêşevanîyaka rast ku wê pêşaroja wan ji wan re bêne ji gelê xwe re bikin**. Ciwanên kurd yên başûrrojavayê kurdistanê, divêt ku ji vê yekê re pêşendîyaka mazin ya bi rewşenbîrî bikin. Di wê demê de, divêt ku tenê bi nîşandina hin bertekna re bisînor newê sekin in. Bi wê re sekin, tenê herêkirina kuştina xwe ya di dîrokê de ya. Bi vê yekê re, wê hingî, karibin di dîrokê de bahse xwe bikin. Ku vê yekê nekin û tenê wilo weke ku nahaka dikin di cihê xwe de bimênina sekinî, wê tenê alikariyê bidina wê rejimê ku wê rewşa ku li ser wê wan hate roja ma hatîya wê ji nahaka pêde jî êdî bidina berdewam kirin. Êdî ev jî, tê wê wate ku di demên pêş de jî, êdî êş û elemên gelê kurd berdewam bikin. Di wê demê de bi vê yekê re, û bi rêxistinîyaka mazin ya ku wê bersivê bide demê ji bo kurdan û sazîbûnaka ku wê ji pêşketina wan ya ji vir ji wê demê de pêde ku ji wan bê temen divêt ku bê avakirin.

Başûrrojavayê kurdistanê, kevneşopîyaka wê ya ku di deme salahadînê Eyûbî de afirîya jî heya. Mirov divêt ku vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Î ro, tirba serok û mazinê kurd, Salahadînê Eyûbî li Şamê ya. Di wê deme Salahadînê Eyûbî de başûrrojavayê kurdistanê ku li ber Firatê ya bi REHAYÊ re weke navendaka wê pêşeketin û pêdeçûna wî bû. Salahadînê Eyûbî, ji wir bi ber misrê ve çû û li wir rahişta rêveberîya wir û ew der bi rê ve bir. Bi vê yekê re, têkiliyaka rast û bi rûmet bi gelê arab re ya gelê kurd jî hebû. Lê di deme rêveberîya rejima baasê de ev têkilî ji holê hate rakirin. Awayekî têkiliyê yê li ser nîjadperestîyê ku ava ya da avakirin. Bi vê yekê re, êdî du gel bi wê rêveberîyê re hatine wê astê ku bikevina berhevdû. Di wê pevçûna di Stadyûma lîstikê ya ku du û an sê sal berê ku bû di nav hin ciwanên kurd û arab de de, dide nîşandin ku wê rêveberîya baasê, nîjadperestî di nav xalkê arab yê li wê herême de bicih kirîya. Dirişmên ku wan ciwanên arab di avêtin, "wê li vêderê jî tişta ku li Helepçê hate serê wê" bû. Ji kurdan re badikin ku "winê Helebçêne din yên nû li vir bijîn". Helebçê, li başûrê kurdistanê ya û ew der jî, di deme ku ew komkoji kurdan jînkir, rêveberîya baasê ya Îraqê li ser kar bû. Di Helebçê de Saddam Huseyin, bi hezaran kurd di rojekê de bi çekên kîmyewî kuşt. Ev didê nîşandin ku rejima baasê rejimaka

nîjadperest ya paşvarû ya. Ji kurdan re nêzîkatîya baase Sûrî ji ya Îraqê ya Saddam Huseyin cudatir nebûya. Kurd. divêt ku li ber wê mafê xwe êdî hildina destê xwe û bi vîna xwe re xwe bidina pêşxistin. Divêt ku sazîyên xwe yên perwerde ava kin. Divêt ku dibistanên xwe ava kin. Divêt ku sazîyên xwe yên din yên rêveberîyê ava kin. Ji vê yekê re jî, divêt ku rewşenbîr û nivîsakarên kurd û bi teybetî mazinên kurd yên wê herêmê, di nav xalkê xwe de derkevina li pêş û wê afirandinê bidina kiriin û jê re pêşavanîyê bikin. Ev yek, di wê demê de ji her demê zêdetir pêdivî û lezimî pê heya. Ya ku wê di vê demê de bi vê yekê, bi awayekî bi rêxistinî ku wan bi ser bixe û bigihêne serfirezîyê ji bo wan ev .

.

**Li ser li kurdistanê bicihkirina ”pergale martalê parastina ji fûzaya”. ..**

Di vê demê de pirr pêşketin û pêşveçûn bi hev re dibin. Hemû pêşveçûnên ku dibin jî, ji hin aliyna ve têkiliyna wan yên bi hev re ku hatina danîn û an jî afirîna û hene jî hena. Mirov bi vê yekê re, divêt ku wan bi hev re li ser bisekinê û bêne ser ziman. Rojhilat, di demne dîrokî de dibuhurê. Ev dema wê, wilo xuya dike, ku hêzên herêmê yên desthilatdar û yên ku li ser herêmê bi ramyarî na, dikin ku sadsale pêşîya me jî bi wê bidina windakirin. Wilo xuya dike, ku wê rojhilat di demên pêş de, hê bêhtir wê bibe qadaka ku lê tevlîhevî bi pevçûn û şer lê heya. Li kurdistanê şer heya. Tirkî û Îranê, bi hev re, çendî nakokî jî d nav wan de hebin, di çûna bi ser kurdan re levkirina. Hewl didin ku kurdan ji hêz bikin û paktaw bikin. Bi vê yekê re, hêrîşên wan hene li ser kurdan. Piştî ku kurdan li bakûrê kurdistanê xweserîya xwe denezand, êdî ew şer û pevçûn lê zêdetir bûn.

Ev zêdebûna şer ya li lê, ku piştî denezandina xweserîyê ya li bakûrê kurdistanê zêde bû, mirov divêt ku ji pirr aliyan ve wê şîrove bike. Di serî de, divêt ku mirov bibêje ku kurdistan, weke dilê rojhilata navîn a. Çi hêzê ku li rojhilat bixwezê ku bibe xwediyê serwerîyê, divêt ku li kurdistanê jî lingekî wî hebe. Ku ew ling li kurdistanê nebe, wê hertimî di wê serwerîya xwe ya li herêmê de wê kêm bê. Emerîka jî, ev yek fahm kirîya. Ji ber vê yekê, pirr li ser kurdistanê dan û standinên wan hene. Bi teybetî, di vê deme dawiyê de ev şerê ku bi kurdan re hat zêdekirin, armanca wê, ew e ku kurdan ji aliyê ramyarî ve kêm bikin û bêhêz bikin. Hêzê ku li kurdistanê serdest bê, weke ku li rojhilat serdest bê, wilo bihêz û xwediyê serdestî û serwerîyaka girîng a.

Kurd, bi vê yekê re, di demeka germ de di buhurin. Ew germitîya ku ew têra di buhurin, ji wê rewş û girîngîya warê wan yê di rojhilat de di navenda ramyarîya wê ya giştî de ya. Divêt ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Di vir de, divêt ku em gotineka din jî, bi vir ve girêdayî bênina li ser ziman û bibêjin, her şîroveyên ku li ser kurdistanê û herême wan bê kirin, wê girîngîyeka wan ya di rojhilat û ramyarî û desthilatdarîya wê de wê hebe. Bi vê yekê re, divêt ku mirov wê pirr mazin bêne ser ziman. Di vir de, emê bi teybetî, li ser cihê kurdistanê di ramyarîya rojhilat de bisekin in. Ji ber ku ev yek her weha pirr giring a. Di vir de, kurd, ew rewşa wan ya ku bi welatê xwe re ku têde na, wê bandûra wan li tekoşîna wan jî wê hebe. Ji xwe heya jî. Minaq, ku di van rojên dawiyê de ket rojevê de, li beşa kurdistanê ya di bin metingerîya tirkî de ya, lê bicihkirina 'pergela mertalê parastina ji fûza'yan, ket rojevê de. Mirov karê têkiliya vê xeberê û weke ku dîsa ketîya rojevê de ku tirkî destûra oparasyonaka dervî sînor ji Emerîka standîya ku li ser kurdan bike, jev dûr bike? Na, mirov nikarê bike. Wekî din jî, doza girtina roj tv ya televizoyona kurd jî, bi wê re mirov divêt ku hilde li dest. Bi wê re hê

pirr pêşketinên din jî hena. Minaq, li rojavayê kurdistanê, hewldanên astangkirina gihiştina mafê xwe yê kurdan jî, divêt ku mirov bi vê re şîrove bike. Her weha, di vê rewşê de, nayê xwestin ku kurd li ser axa xwe di vê ramyarîya ku hatîya dîzaynkirin de jî bibina xwedî gotin ji bo xwe û rewşa xwe û hwd.

Ev rewşên ku wê demên me yên pêş bidina kifşkirin in. Temenê ramyarîya demên pêş in ku tê afirandin in. Bêgûman, ji aliyê tekoşîna kurdan ya gihiştina mafê xwe ve jî, divêt ku mirov lê binerê û wê fahm bike. Ev yekê jî, her weha giring a.

Li rojhilat, di van demên ku em dijîn de, temenê hin şer û pevçûnên ku wê di demên pêş de bibin dihê avêtin. Bi teybetî jî, kurdistanê, ji ber ku di navika rojhilat de cih û war digirê, ev pêşveçûnên ku weke amedekarîyeka ji wan pêşveçûnên ku di demên pêş de bibin ku tên kirin, kurdistanê dihê xistin li di nav de. Li rojhilat, di temenê şerê serwerî û serdestiyê de dihê xwestin ku ji nû ve were rast kirin. Li rojhilat, bicih kirina 'mertalê parastina ji fûza'yan, mirov karê ji yekê bi hasibêne. Kurdistanê, me got ku weke navika rojhilat a. Ev navik, weke navika ramyarîya serdestiya wê jî mirov karê wê bêne ser ziman. Ev gotinên ku tên gotin ku wê mertalê parastina ji fûzayan lê were bicihkirin, wê bandûra wê li ser hemû pêşketina li rojhilat wê hebe. Rusya jî, divêt ku mirov bibêje ku wê bandûra wê, li ser hebe.

Bi teybetî, ku mirov hinekî di temenê wê ramyarîya serwerîyê ku li gor wê dihê xwestin ku dîzaynek were kirin li rojhilat, ku mirov li gor wê dihizirê, mirov dibîne ku wê ew bicihkirina mertalê parastina ji fûzayan, ku li kurdistanê werina bicih kirin, wê ne tenê Rûsya eleqeder bike.. Her weha wê hemû hêzên ku dibêjin ´em hêzna rojhilat in´ jî, wê bandûra wê li ser hebe, Wê ji vî aliyê ve weke Asya ji wê were û bikeve bin kontrolê de. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku hate ku bigihijê bersînorê Çînê, wê kontrol kirin, wê were kirin. Di serî de ku weke ku di rojevê de jî heya, Îran û Rûsya û Sûrî, wê bandûra wan ya hewayê bi wê were şîkandin. Bi wê re jî, li rojhilat, qada hewayê ye herêmê bigiştî wê were kirin di bin kontrolê de. Kirina vê herêmê bi vî rengî bin kontrolê, wê bandûra wê li Ewropa, hate Asya ber Hindistan û Çînê û hwd, li ser herêmeka mazin, wê bandûra wê hebe. Qada ku jê re avrasya û asya tê gotin, bi awayekî stretejikî hem ji aliyê ardnîgariyê û hem jî ji aliyê ramyarîyê ve wê bike bin kontrola xwe de. ..

Bi vê yekê re, weke ku pergelaka kontrolê ku herêmê bigiştî dike nava xwe de tê ava kirin. Lingê wê yê giring jî, dibe, ev mertalê parastinë ku tê gotin ku wê li kurdistanê were bicih kirin. Kurdistan, bi ´jeo-politik´ û ´jeo-cogrefi'kîya xwe, wê temenê di afirêne. Bi vê yekê re, pêşketina herêmê jî, wê bikeve bin kontrolê de. Di vir de, di çerçova mijara me de, du xalên ku me li ser bisekin in yên giring ev in. Yek, ev li kurdistanê dihê kirin û ya din jî, ew e ku temenê şerna mazin yên herêmî lingên wê li vê ardnîgariyê dihê danîn. Bi vê yekê re, divêt ku mirov aliyekî din jî, li ser bisekin ê. Ew jî, ne hiştina ti hêzên herêmî ya derketina wan a. Ku bi navê xalkê jî bin, ku derkevin, li ser wan dihê sekinandin. Bi teybetî, çûna bi ser tekoşîna kurdan de ji du aliyen ve mirov karê di vir de sedeme wê bêne ser ziman. Aliyê pêşî, ku ji bo hêzên Herêmê yên weke Îran û Tirkî giringa ku dixwezin ku kurdan bêstatû bihêlin û wan ji herêmê bibin, ew şerê bi vî rengî yê wan yê ku bi kurdan re tê dayin a. Aliyê duyemin jî, ji bo awakarê(mîmarê) vê dîzaynkirinê ku naxwezê hêzê û an jî, rêxistiniyek ku xwediyê têgihiştinaka dervî têgihiştina wî bê, biafirê û were li holê ya. Ev herdû alî, bi hev re di

qadekê û derekê de di şerê bi kurdan re hevdû temem dikin û dike ku koalîsyonak li ber kurdan bi kurdan re bikeve şer de.

Li ser ardnîgariya kurdan, bicihkirinaka wilo weke ya pergela mertale parastine bahs tê kirin. Lê bi kurdan şêwirîn û hizra wan hildan jî nabê. Navê wan jî, ji xwe tûne tê hasibandin. Li ser tüne hasibandina wan ü tûnakirina wan, lingekî vê projeyê bi hewldana tirkî û Îranê tê rûniştandin. Bi vê rûnûştandinê re dihê xwestin ku bi kurdan re êdî şerekî nû bi deme nû re bidina dest pê kirin. Tirkî, di vir de, wê du argumana bêne ser ziman Di demên pêş de ku mertalê parastina ji fûzayan li kurdistanê hatina bicih kirin. Argumana pêşî, li ser parastin û awlakarîya wan, bi vê yekê re, wê hewl bê dayin ku kurd, weke dijminekê herkesî were dîtin û li ber wê herkesek bisekinê. Rêxistinên wan yên ku tekoşînê didin, wê weke dijmin werina dîtin û wê hewl bê dayin ku herina bi ser wan de. Bi vê yekê re, demeka nû, tirkî hizir dike ku bêî ku kurd bigihina statûya xwe werina bêstatûkirin û ji holê werina rakirin. Di vê deme ku bahse bicih kirina mertalê parastina ji fûzayan hatkirin de, gotineka din jî, bi wê re di çapameniyê de cih digirê. Ew ev jî ev e ku ´tirkî destûra oparasyonaka dervî sînor standîya ji Emerika' ku her bi ser kurdan de. Ji xwe, li hundur, çi dike û çend kurdan digirê û çenda dikujê jî, li ber wê deng û meng ji ti kesekî dernekevê. Her kesek, li ber wê bi bêdengî tevdigerihê.

Plana bicihkiirna mertalê parastina ji fûzayan, li ser temenê hêziyê tê ava kirin. Gelê kurd, di wê projeyê de tûne hatîya hasibandin. Emerîka, li ser tûnekirina kurdan, di wê çerçovê de, weke ku bi tirkî re levkirîya. Bi vê yekê re, wê pêşî bi bêbandûrkirinê re wê kurd bên kuştin û piştre wê li ser wê kuştinê re, wê hewl bê dayîn ku ewlakarîya wê were kirin. Tirkî, di vir de jî, dike û dixwezê ku lingekî wê ewlakarêyê li ser tekoşîna bi kurdan re bide rûniştandin. Bi vê yekê re, wê hewl bê dayin ku şerê bi kurdan re bê domandin. Kurd, di vir de tûna hatina hasibandin. Ji xwe, deme ku tirkî wezereta wê ya derve revakir ku 'hewldanaka bi vî rengî heya ku wê mertalê parastina ji fûzayan were bich kirin', di wê navberê de ti carî bi kurdan ne hatîya şêwîrîn. Ji xwe, Tirkîya ku li ser tûnebûna kurdan ava bûya, bi çi awayê û ahleqê karê gotinê li ser navê kurdan bibêje di vê demê ku hê înkara kurdan dide domandin û zimanê wan qadaxa kirîya de?

Pergale mertalê parastina ji fûzaya, li ser temenê parastina rejiman ji gelan dihê ava kirin. Li herêmê li rojhilat di vê demê de dihê ava kirin. Li herêmê, rejimên weke tirkî û Îranê ku ti carî gel û xalkên herêmê nasnakin û mazin ji destê wan girtina, li ser wê ji destgirtina maf û nasnekiirnê de di temenê xwe parastinê de, wê projeyê û planê herê dikin. Bi şertê ku wê rewşa karibin bidina berdewam, herê dikin. Tirkî, weke ku dibe, çendî ku rojava piştgirîyê bidiyê de ku karibê bi kurdan re şer bike û televizyona wan bigirê, mafê wan yê ku ji wan girtîya ku nedê wan û ew jî neyênina li rojeve û hwd, li ser wan re di wê projeyê û planê de cih digirê. Bi vê yekê re, herêmê tenê nayê kirin weke qadaka şer, her weha li ser tûnekirina xalk û gelên herêmê jî, bi wê re weke ku levkirinek dihê kirin. Dunya hemû jî dizane ku tirkî ji bo kurdan ji dîrokê bibe, bi kurdan re di şer de ya. Ku î ro, em di 2011´an de dijîn jî, hê jî, mafên wan yên heyîn û hebûna tên radestî wan ne hatîya kirin. Di vê demê de ku di 2011´an de ku em dijîn, hê zimanê kurdan li wan qadaxaya û mafê wan nîna ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehîya xwe bibînin. Wê, di nedana vî mafê kurdan de jî, ew pergale mertalê parastina ji fûzaya, wê weke piştgirîyaka mazin ji tirkî bê, ku karibê bi kurdan re hê bêhtir şer bike û wan mafê wan radestî wan nekê.

Tirkî, pir dixwest ku ew proje li tirkî were pêşxistin di vê demê de. Ji ber ku wê ji wê piştgiriyê di vê demê de li ber kurdan ji Nato û hêzên din yên rojava wê bigirê. Tirkî, ji roja ku ketîya Nato de û bûya andemê wê, piştgirî wê ji wê standîya di şerê wê yê bi kurdan re de. Di vê demê de jî, wê ev yek wilo bê. Wê di vê xalê de ti tiştekî din newê guharandin. Lê tenê tiştek bê guharandin, ew jî ev a, ku wê şer û kuştin li ser serê kurdan wê zêde bibin, û di berdêla wê de, wê yek ji wan kuştin û şerên ku li kurdistanê dibin, wê di rojev û çapameniya rojava cih û war negirê. Ev necihgirtin jî, di aslê xwe de, weke pişgirîyeka ku ji wê projeyê wê ji wê re were dayina. Çendî ku kurd, werina kuştin, wê cih ne girin di çapameniyê de. Vajî wê, wê piştgirîyeka wan ya ji şerê wê yê bi kurdan re hebe, weke ku hate î ro ku hebû. ..

Pergala mertalê parastina ji fûzaya, wê di vê rewşê de, wê li herêmê, dîzaynaka mazin û nû wê di rastkirina wê de wê bi xwe re bêne. Lê wê ew dîzayn, ti carî, gel û xalkên herêmê têde nebin. Wê li ber û li dijî gel û xalkên herêmê bê. Li herêmê, wê ew pergal, wekî din, wê li dijî kê were ava kirin? Hin hêzna ku wilo pêdivî parastina li ber wan bi pergaleka bi vî rengî heya, ka kî li rojhilat heya. Îran, ku Emerîka bixwezê karê Îro, bi keve hundurê wê de weke ku ket hundurê Libya de. Lê weke sedemeke ji bo vê pergalê û avakirina wê, di vê demê de bi vî rengî dihê bi karhanîn. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku hate ku ev pergal bicihbû li herêmê û piştre bi hinekî jî, êdî wê gotinên mudehaleye li Îranê wê werina li Rojevê. Rûsya, li ber wê rewşê, li ber pergala wê mertalê parastina ji fûzaya, wê hem qadaxa ya wê ya ramyarîyê wê tang bibe û hem jî, wê bandûra wê.

Li kurdistanê bicihkirina wê pergala mertalê parastina ji fûzaya, wê di sînorê Rûsya, Îran û Sûrî de bê. Bi vê yekê re wê nêzîkî Afganîstan û ji wê wirde Çînê û Hindistanê jî bê. Wê bandûra wê, li wan hebe. Weke ku tê gotin ku bi vê yekê re mirov fahm dike ku wê ev pergal, ne tenê ji ´li ber fûzayan hê zû hişyarkirinê´ bê. Bi wê re, wê hin lingên wê hêrîşê jî wê hebin. Ma ku tenê ev pergal, pergaleka ku tenê li ser temenê hê zû agahî hildan û hişyarbûnê ba, wê hewceyê, bi cihkirinaka bi vî rengî wê heba? Ji wê zêdetir, weke pergaleka hêrîşiyê ku di bin navê ´mertalê parastina ji fûzaya´ a. Ji aliyê leşkerî ve çend lingên wê yên weke yên teknolojîk û hwd jî, wê hebin. Li ber pergaleka wilo mazin ya şer jî, ku şerek qawimî jî, cihê ku ew pergal lê ya, wê ewder jî weke armanceka leşkerî ya ku were lêxistin bê. Bi vê yekê re mirov karê bibêje ku herême kurdan wê hertimî di bin telûka ü xateraya hêrîşê de bê.

Ji wê zêdetir jî, divêt ku mirov di vir de bibêje ku bidestê tirkî bikarhanîna wê pergalê ya li ber kurdan jî, wê bibe. Hin aliyna wê yên ku ew bikar bêne jî, wê hebin. Tirkî, hê şerê wê yê bi kurdan re di domê. Di vê deme ku hê ew şerê tirkî yê bi kurdan re di domê de li kurdistanê bidestê rejima tirkî bicihkirina ev pergale mertalê parastina ji fûzaya, weke pergale ji dîrokê birina kurdan bixwe ya. Divêt ku mirov di serî de vê yekê bêne ser ziman û bibêje. Bi vê yekê, gelê kurd, mafê wê ya ku li her der û qadê li dijî bicihkirina wê pergalê li kurdistanê rabê. Ji ber ku lingên wê yên li kurdistanê, ne tenê bi parastinê û hêrîşan re heya. Bi vê yekê re, li ber kurdan bi kar hanîna wê jî heya. Çendî ku di çapameniyê de tê nivîsandin û tê gotin ku "tenê ji bo hêrîşên fûzayî yên ji derve na" jî, ev gotin, di xwe de hem kêm dihêne ser ziman û hem jî ne rast a. Ji wê zêdetir di wê gotinê de heya. Tirkî, Î ro, bi çekên ku ji Firansa, Almanya, Rûsya, Îsraîl û Emerîka û hwd, ku ji wan dikirê û ew difiroşinê de, bi kurdan re şer dike. Ev pergala martalê parastina ji fûzaya jî, ku hat bicihkiirn li kurdistanê, ne

biderfet(mumkun)ê ku ew jî bi vaqas bikarhanînên li ber kurdan li ber kurdan newê bikar hanîn.

Ji wê zêdetir, mirov karê weke nişanak û birhan(kanit) ku mirov bêne ser ziman, ne di demeka ku hê pirsgirêka kurd ne hatîya çareserkirin de bahse li kurdistanê bicihkirina vê pergala mazin ya parastinê û hêrîşê dihê kirin. Ku nêhteka ku weke ku wê li ber kurdan bikar neyênin ku bi dewletên ku wê li kurdistanê wê pergal martalê parastina ji fûzaya bicih dikin re ku heba, wê pêşî pirsgirêka kurd hildaban rojava xwe û wê pêşî, ew pirsgirêk çareserkiriban û piştre, wê bahse wê kiriban. Lê ti nêhteka wan ya bi vî rengî nîn a. Bi vê yekê re, mirov êdî karê bibêje ku wê ew pergala mertala ku li ber kurdan bi awayê wê yê hêrîşîyê wê were bikar hanîn. Ew teknolojiya wê ya ku di wê de dihê bikar hanîn, wê ew teknolojî, wê were bikarhanîn li dijî kurdan. Çendî ku înkara vê gotinê bikin û bêjin ku ´emê li dijî kurdan wê pergalê bi ti awayê bikar neyênin´ jî, weke nîşanaka bikarhanîna wê, mirov karê ne çareserkirina pirsgirêka kurd bêne rojevê û ji wê fahm bike. Tirkî, bi vê pergale mertalê parastina ji fûzaya, bi hin lingên wê, wê bixwezê ku kurdan bişîkêne. Bi vê yekê re, wê ev rewş, were li holê. Kurd, li ser vê lingê wê yê ku wê ev pergal li ber wan bê bikarhanîn, pir bisekin in. Bi vê yekê re divêt ku xwe ji hemû rewşan amede bikin. Heya ku bi van çekên ku bên bikarhanîn de, bideh hezaran kurd, di ancama wê de werina kuştin. Ev, ti carî li gor aqilê tirkî yê pergale wê ya ku î ro heya, ji aqilan ne dûr a û di ber derfetê de ya.

Emerîka, li herêmê, tenê li gor ku karibê serwerîya xwe bide berdewam kirin, dîzaynekê dike. Li herêmê ti hizir û zamenê wê yên ku di wan de aşîtî ji bo herêmê tê ser ziman nîn in. Hate vê kêlîkê jî, ne hatina ser ziman. Bi xistina rêveberêyên weke yên ku berê wê bikar dihanîn yên husnu Mubarek û Zeynel Abdin bin alî û hwd û li cihên wan hanîna yên weke yên T. Ardogan, nayê wê watê ku ew xwediyê hizreka ku bi wê dixwezê aşîtiyekê bêne herêmê ya. Ji wê zêdetir, tenê nîşanaka demeka nû ya ku li gor demê hatîya rastkirin û dîzaynkirin ya serwerî û serdestîyê ya. Bi vê yekê re, wê şerê wê dema nû û pevçûnên wê awayê wê rêveberîya vê dema nû, wê ji ya berê cudatir bin. Wê ramyarî li pêş bê. Wê gel û xalk, dîsa mafê wan ku ji destê wan hatîya girtin û têne ber ji dîrokê çûnê, wê bibin. Weke ku î ro kurd hatina û ketina wê rewşê de û hwd. Pergale martalê parastina ji fûzaya, tenê awayê serwerî û serdestîya demê û ramyarîya wê ya. Ramyarîya metalê parastina ji fûzaya, li ser temenê ewlakarî û hêrîşa ya. Pergal, weke ku ketibê, xwe parastinê de ya. Lê li herêmê, hemû pergalên ku hene, xwe ji gelên herêmê di parezên. Tirkî jî û Îran jî û Sûrîya jîî, vê yekê dike. Têgihiştina Beşar El Esad û ya T. Ardogan kî karê bêje min ku jevcuda ya? Ne ti kesek. Bi zihniyetaka weke ya T. Ardogan, pergaleka weke ye pergale metalê parastina ji fûzaya, bikarhanîna wê, wê çi ancamê bi xwe re di dîrokê de bêne, divêt ku fahmkirina wê ne wilo zor bê. Bi vê yekê re, mirov karê bibêje ku rojhilat û bi teybetî jî, kurdistanê dikevina demeka xwe ya nû de. Kurd, divêt ku wê derfetê nedina ku hate ku pirsgirêka wan newê çareserkirina, ew pergal li ser axa wan were bicih kirin. Wekî din jî, ji bo ku mirov bibîne ku wê bibe dawîya wan li dîrokê, wê ne zor bê. Cihan, pêdivîya wê, ne pergalên parastinê yên şer heya, pêdivîya wê, bi yên aşîtiyê ku hemû gel karibin bi hev re bi biretî bijên heya. Bi hêvîya dunyayaka wisa ya biaşîtî, ..

-

**Gotina "entegresyon"ê û hewldana "bêstatû" hiştina kurdan û hêrîşên li Serêkahniyê bi piştgirîya tirkiya ku dibin.**

Ev demeke ku hêrîşên li ser rojavayê kurdistanê ku bi piştgirîya hin komna ve dibin dikevina rojevê de. Bi teybetî, piştî bûyîna komkujiya kurdan a li Parîs´ê ku tê de sîyesetmederên kurd ê jin hatina qatil kirin re, êdî ew hêrîş jî zêdetir bûn. Bi wê re jî, li başûrê kurdistanê jî, di serî de li kerkûk´ê bê bomba tên taqandin. Ev hersê mijarê, bêgûman, divê ku bi teybetî bi serê xwe û cûda bi cûda li ser wan divê ku mirov bisekinê. Lê bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku di çerçova pirsgirêka kurd û xwestina kurdan a statûya xwe ya li herêmê ve girêdayî na. Bi teybetî, li vir, divê ku mirov j vî aliyê ve li ser bisekinê. Pêşî, ku em bahsê bikin; li başûrê kurdistanê, herêmên weke Kerkûk, Xanaqîn, Şingal û hwd ne bi ser herêm û rêveberîya kurdistanê ve bûyîn jî, weke bendeke ku li pêşîya pêşketina statûya kurdan ku hatîya danîn a. Lê li vir, divê ku mirov bibêje ku ji ber ku ev herêmê bi ser herêmên başûrê kurdistanê ve ne hatina kirin, êdî ew bomba taqandin û her roj bi dehan mirov li wir qatil kirin jî, dihê kirin. Hinekî, têkiliya wê ne çareserkirina pirsgirêka herêmên kurdan ên weke kerkûk´, xanaqîn, Şingal û hwd jî, divê ku mirov bi taqîna wan bombayan re dêne. Ji ber ku têkiliya wan bi wê re heya. Ku di destpêka mudahaleya li Îraqê de, ku Emerika ew herêmê wusa di çerçova xale destûra bingihîn ya Îraqê ya 140´î de ne hiştiba bi pirsgirêkî û çareser bikira, wê î ro, ew bomba jî li wir ne taqîya ban. Dibêt ku hijmara kuştiyên leşkerê wê jî, bi kuştiyên Îraqî û kurdan r wê kêmtir maba. Lê ji vî aliyê ve, dema ku mirov lê dinerê, hinekî jî, weke ku sedemeke zêde kuştina leşkerên wê, di wê demê de bi ne çareserkirina van pirsgirêkan di destpêkê de, wê bo leşkerên xwe afirandîya.

-Di van deman de, li kerkûk, xanaqîn û herêmên kurdan ên weke Şingalê û hwd, zêdetirî bomba tên taqandin. Divê ku mirov bi ser gotina xwe ve bike ku ew pirsgirêk, ji vê demê û pêde jî ku bi vî rengî bimêne, wê hê zêdetir bomba ji aliyê hêzên ku pirsgirêka wan bi statûya kurdan re heya wê bitaqênin. Ji bo ku mirov vê gotinê bibêje û vê kifş bike jî, hewce nakê ku mirov zêde bizane bê û jîrekî ku bi aqilê xwe li ser dunyê re bê. Her wusa, divê ku mirov di berdewama wê de jî, li wê şerê ku komên çete bi piştgirîya tirkiyê li Serêkahniyê û bigiştî li rojavayê kurdistanê bi kurdan re didin jî, divê ku mirov bêne ser ziman. Ew jî, aliyekî wê yê weke wê çêkirin û ne çareserkirina pirsgirêkên herêmên başûrê kurdistanê ên weke kerkûk, xanaqîn, Şingal û hwd jî heya. Li wir jî, yanî li rojavayê kurdistanê jî, ji ber ku rayagiştî ya rojava û ankû ewropa ku li ber wê bêdeng a û ankû ji hin aliyna ve weke ku ji sîyesete wê re bi gotinên xwe re dibin bingeh, êdî ew şerê li wir jî, bi kurdan re zêdetir dibe. Wusa xûya dike, ku li wir jî weke ku li başûrê kurdistanê bû û li ser herêmên başûrê kurdistanê ên weke Kekûk´, xanaqîn, Şingal û hwd re ku bû, li rojavayê kurdistanê jî wê rewşeka aloz ya bi pirsgirêk wê bê afirandin û domandin. Hinekî jî, li wir, di vê temenê de, bi nêzîkatîyên welatên ewropî û bi teybetî Emerika ve jî girêdayî ya. Ji ber vê yekê, divê ku mirov li vir balê bikişêne li ser wê.

Weke ku li başûrê kurdistanê bû, ji rojavayê kurdistanê re, ji ber ku kurdên wê herêmê bi teybetî bi tekoşîna azadiyê ya ku li tirkiye ve girêdayî na û di wê têgihiştinê de na, bi vî rengî temenê pirsgirêkan li herême wan dihê xwestin ku werina afirandin. Li herêmê, Emerika jî û Rûsya jî, di serî de divê ku êdî fahm bikin ku kurd di nava xwe de xwediyê têgihiştinaka mazin ya demokratik in. Bi vê yekê, di vê temenê de, bi nêzîkatîyên demokratik, divê ku pirsgirêkê êdî çareser bikin. LI herêmê, pirsgirêka kurd, temenê ne demokratikbûna herêmê jî ya. Divê ku di serî de ev yek were fahm kirin.

Di zane min de, Emerika jî vê yekê dizanê. Lê heta nûha, ti pêdivîyên wê zanînê jî ne hatina hanîn li cih. Li herêmê, gelekî weke gelê kurd ku li ser 50 milyonî re bêstatû hat hiştin. Welatê wan, hat perçekirin. Nav û zimanê wan hat qadaxa kirin. Tirkiya ku di van rojên dawiyê de bahse "hevdîtinan" dike jî, hê jî, di çapameniya xwe de ku bahse başûrê kurdistanê dike jî, li zora wê diçê ku gotina "kurdistan"ê bikar bêne. Ji ber vê yekê, gotina "kuzey Irak" bikar dihêne. Ev, çi didina nîşandin? Ev didina nîşandin ku di zihniyetê de muhafazakariya ku afirîya, êdî temenê zihniyetekê ya û êêdî bi wê rojhilat ti pirsgirêkên wê nayêna çareser kirin. Zihniyeteka ku li herêmê, hebûna gelek herê nekirî, wê dijiminatiya gelan bike û wê şerê xwe bi wan re bidomêne, weke ku tirkiya ev 30 salin ku bi kurdan dike û hwd.

Di vê dema ku bahse çareserkirina pirsgirêka kurd dihê kirin de jî, û dihê gotin ku «bo çareserkirinê hevdîtin hena» jî, çareserî nayê nîqaşkirin. Ya ku tê nîqaşkirin, di temenê zîhniyeteka ku kurdan înkar dike de ku dixwezê weke sale 1923´an de ´lozane dûyemin´ bi wan de bide herêkirin û mohrkirin, di wê temenê de ku derbeyekê din ya dîrokî li wan bixin, nîqaş dihên kirin. Ji ber vê yekê jî, mirov nikarê ti hêvîyê ji vê bike. Minaq, ber nûha, Birêz Ahmed Turk, gotinaka pirr giring got. Ew jî ew bû û got ku "dema ku win bahse hesasîyetê dikin ji kurdan, win qadilê bombabaran dikin." Ev gotin pirr rast a. Hasasîyet, ku di temenê wê bilêvkiirna wê de ti nîyetên xirab tûna bin, bi hev re dihê dayîn nîşandin. Lê ku win ji aliyekî ve bahse ´hevdîtinan´ û ´hasasîyet´an bikin û ji aliyê din ve balefiran rakin û kurdan û herêmên wan bomba baran bikin, wê çaxê, wê bi awayekî pirr rast ji wê bilêvkirina we jî gûman were kirin. Hingî, gûman kirin ji wê û nîyete yên ku wê bi lêv dikin jî rast a û di cih de ya.

Ji xwe, deme ku mirov ji gotinên rayaderên tirk, hewl didê bigotinên wan, dîmenekî li ser gotina ´hevdîtinan´ re bide çê kirin, hingî ya ku mirov rastî wê tê ne jidilbûn û ne samîmîyetî ya. Di serî de, divê ku mirov vê yekê fahm bike û bêne ser ziman.

Weke ku Birêz Ahmed Turk gotî, "ji aliyekî ve win bahse hasasîyetê bikin û ji aliyê din ve qandilê bomba baran bikin, wê kî ji we bawer bike?". Wê ti kesek bawer nekê. Di dema ku bahse hevdîtinan dikin de, bi dehan cenezeyên zaroyên kurd bi ser wan de şandin. Gelo, li vir mirov çawa bi wê gotina ´hevdîtinê´ re ku rayaderên tirk bi lêv dikin, êdî bawer bike? Li vir, dema ku ji aliyekî ve bahse ´hevdîtinan´, ´hasasîyet´ û hwd bê kirin û ji aliyê din ve oparasyonên leşkerî, sîyesî û hewayî li dar bixin, êdî mirov çawa dikarê bahse cîdîyetê û samimîyetê bike? Di vê dema ku bahse hevdîtina dihê kirin de, komkujiyên weke komkujiyên li Parîs´ê û hwd kirin û piştre gotin, "heya Almanya jî, bûyarên bi vî rengî rû bidin", wê hingî çawa bahse samîmîyetê bikin. ..

Li vir, bi mafî û haqî û bi rastî, êdî mafê kurdan heya ku gûmanê ji wê gotina ´hevdîtinê´ ku ji devê rayadarên tirk derdikeve dikarê jê bikeve şik û gûmanê. Her wusa, li vir, divê ku mirov ji serokwezirê tirk jî bipirsê; dema pirsgirêka kurd tûna bê, wê çaxê winê bi sîyesetê re çi hevdîtinan bikin? Li vir jî ne cîdîyetî û ne ji dilbûn heya. Dema ku mirov li ser gotinan re dahûrîyê dike, ya ku derdikeve li holê, ne ji dilbûn û ne samîmîyetî ya. Ji aliyekî ve wê bêjin "birayê minê kurd" û ji aliyê din ve, weke ku li Serêkahniyê dibê wê piştgiriyê bidina çeteyan û şer li wir bi kurdan pêş bixin. Li aliyekî wê bêjin "birayê minê kurd" û ji aliyê din ve, wê bi deh hezaran kurdan di bin navê oparasyonên KCK´ê de bide girtin û bi avêje zindanê. Ji aliyekî ve wê bêje "birayê minê kurd" û wê oparasyonên leşkerî li ser serê wan bike û bi dehan cenezeyan bi ser wan de bişêne. Ji aliyekî ve wê bêjin "birayê minê kurd" û ji aliyê din ve wê bi balefiran bomba

barandinê li ser serê kurdan bikin. Ji aliyekî ve wê bêjin "birayê minê kurd" û ji aliyekî ve wê weke ku li girtîgeha Bozanti û hwd, wê dest biavêjina zaro û rûmeta gelê kurd. Ji aliyekî ve wê bêjin "birayê minê kurd" lê ji aliyê din ve jî wê hertimî di her qada jiyanê de wê wê hêrîşê bina bi ser wan de. Ev ne biratîya. Ew dijimatîya, nemerdî ya.

Yên ku hasabê, komkujiya dersimê, Komkujiya roboskî, komkujiya Zilanê, Komkujiya kurdan a li parîs´ê nedê, ti carî divê ku bahse biratîya bi kurdan re nekeê.

Li vir, divê ku em vê jî bi ser gotina xwe ve bikin. Serokê gelê kurd Birêz Ocalan bi milyonan ew weke vîna xwe hilbijartîya. Yên ku wî di zindanê de digrin, wina kurdan di zindanê de digrin. Ew jî, ti carî divê ku bahse biratiyê nekin. Yên ku hasabên komkujiyên xwe nedebê, hê bi oparasyonên leşkerî û sîyesî kurdan dikujê û wan digirê û diavêje zindanan, û hwd, divê ku dernekeve ber wan û bahse biratiyê nekê. Tevî van kiryarên xwe yên ku hê didomêne jî, ku derkeve ber kurdan û bahse "biratiyê" bike jî, ew biratîya ku ew bahse dikin, tenê dibê gotinaka ku dihê îstismar kirin. Ji wê û pê de, nabê ti tiştekî din.

Î ro, divê ku mirov, bibêje ku di dîrokê de jî, temenê vê gotina biratiyê bi awayekî rast û pak tûna ya di nava sîsteme tirk û kurdan de. Lê Birêz Ocalan bi projeyê ku danî li holê, xwest ku ew jî rast bikin û bikina mirov û têkiliyeka rast bi peyman çê bikin di nava kurd û tirkan de. Birêz Ocalan, ji vê re got "bi hev rebûna bi dil". Yanî, kurd, ku karibin wê biryara xwe ya bi hev re jiyinê jî bidin û ya dervî wê jî bidin. Li herêmê, ku kurd, dewleta xwe ya serbixwe jî denezênin, wê dîsa herdû xalk bi xalkên din ên li herêmê re bi hev re bijîn. Dîsa divê ku bi hev re di têkiliyê de bin û bi hev re li herêmê di nava aşîtîyê de bijîn. Yanî serxwebûn jî di aslê xwe de, ku mirov di têgihiştinaka rast de bê, ti carî ji bo ti kesekî nabê sedeme cûdabûnê. Ya ku î ro zêde nayê dîtin ev a. Hinekî jî, rayadarên tirk jî û yên welatên din ên li herêmê jî, ji ber ku hertimî di çerçova zihniyeta desthilatdariyê de dihizir in, êdî nikarin vê bibînin, fahm bikin û herê bikin. Li vir, ya ku dihê dîtin ev a.

Li vir, dema ku bi piştgirîya tirkiya ew hêrîşên çeteyan li kurdên rojava dibin û di hundurê tirkiye di bin navê oparasyonên KCK`ê de ev qasî kurd ji ber ku kurd in tên girtin û tên derizandin, ku rayadarekî tirk derdikeve berçapameniyê û bahse "biratiyê" dike, ew li berçavê mirov dibê weke "hêstirên tîmsahan".

Bi teybetî, divê ku mirov bi komkujiya kurdan a li Parîs´ê re ku têde sê jinên kurd hatina qatil kirin, bi wê re divê ku mirov li wan hêrîşên li rojavayê kurdistanê li Serêkahniyê bihizirê. Di çerçoveyekê de, ev hêrîş û ev komkuji dihên berçavên mirov. Her wusa, herkesek jî dizanê ku ev herê hemû jî, bo ku kurdan li herêmê cardin bê statû bihêlin ev hêrîş li wan dihên kirin. Bi teybetî, tirkiya hemû hêrîşên ku kurdan dibin, divê ku mirov bi wan hêrîşan re navê wê di mejiyê xwe de zîndî bigirê. Tirkiya, divê dema ku bahse ´hevdîtinan´ bi serokê gelê kurd re dihê kirin de jî, serokwezirê tirk derdikeve berçapameniyê û diblje ku "pirsgirêka kurd tûna ya." Wê çaxê divê ku mirov bipirsê, tu hevdîtinên çi dike? Tu ji ber çi dibêje, "emê bi terorê re têbikoşîn û bi sîyesetê re muzakare bikin." Li vir, dîsa, bi gotina terorê krimînalize kirina kurdan heya weke ku çawa ku di hemû dozên di bin navê KCK`ê de ku hemû aktivîteyên kurdan û partiyên wan ên weke BDP weke "şûc" dihên dîtin. Ev ji bo çi û bi çi armancê dihê kirin? Ji ber ku bi sîyesetê re navê kurdan newê li holê, hemû kirinên wan ên sîyesî, weke "şûc" dihên dîtin. Bi vê yekê û armancê, di wan dosyayên qaşo "dozên KCK´ê" de ew dihê kirin.

Bi dozên KCK´ê û dosyayên wê re, dixwezin ku hemû dîroka kurdan û dîroka tekoşîna kurdan ya sîyesî bi vî rengê krîmînalize kirinê re ji holê ra bikin. Di vê çerçovê de, hikimeta AKP´ê, xwediyê proja û plan a. Bi vê yekê re, ya ku dihê hizirkirin ev a. Wê pêşî, bi dozên bi vî rengî re wê dîroka kurdan ya sîyesî bidina mahkum kirin. Piştre bi projeyên di bin navê "entegresyon"ê de wê bi tememî civate kurd di nava tirk de bihalênin û ji holê ra bikin. Gotina "entegrayon"ê, di temenê civate kurd ya ku afirî di nava ya tirk de bidina halandin a. Gotina "entegresyon"ê bi gotina "asîmlasyon"ê re, di heman wateyê e ya.

Ji xwe, dema ku rayadarên tirk jî, bikardihênin, di heman wateyê de bikar dihênin. Minaq, T. Ardogan, bixwe dibêje ku "perwerdehîya bi zimanê kurdî nabê". Bi wê re, di temenê wê de dibêjin û gotina "entegresyon" dihênin ser ziman. Bi zihniyeta ku dibêjin "perwerdehîya bi zimanê kurdî nabê" û ya ku li dijî xweserîya demokratik a ku li Amedê kurdan di 14´ê tirmeha 2011´an de ku denzend dibû de gotina ´entegresyon´ê dihê bikarhanîn. Yanî, dibêjin, wê kurd nikarin bi zimanê xwe perwerde xwe bibînin û wê nikaribin li ser navê xwe gotinê bibêjin û xwe bi rê ve bibin. Bi vê zihniyetê gotina "entegresyon"ê dihênin ser ziman. Di vê temenê de, di sîyesete xwe de jî li dijî kurdan disekin in. YÊn ku dibêjin "birayê minê kurd", di serî de dibêje "perwerdehîya bi zimanê kurdî nabê" û li dijî xweserîya kurdan disekinê. Di vê temenê de, ew zihniyeta ku di serê wan de di temenê gotina "biratîyê" ya ku ew bikardihênin de jî di vê temenê de divê ku di vê temenê de di temenê înkara kurdan de fahm bike. Ew gotinên di bin navê ku di bin navê ´biratiyê´, ´mafê mirovan´ û hwd de di temen nêzîkatîya sîyesî ya xafkî de dihênin ser ziman. Biratiya T. Ardogan, mirov dikarê ji bi fermanê wî kirina komkujiyên weke komkujiya Roboskî, bi piştgirîya hikimeta wî û dewletê biçekkirina komên çekdar û şandina bi ser rojavayê kurdistanê de, li kerkûk û Şingalê û hwd taqandina bombayan û hwd, fahm bike.

Di dema ku şoraşa rojavayê kurdistanê bû û kurdan li bajarên rojavayê kurdistanê ku rêveberîya xwe bidest kirin piştre gotina T. Ardogan, ew bû ku "em ji vê re nabêjin eywellah û na buhûr in." Bi vê rengê, berteke xwe ya pêşî li dijî pêşketina rojavayê kurdistanê dabûbû nîşandin. Î ro jî, li gorî wê zihniyeta xwe ya ku bi wê gotina xwe ya demê re hanîbû ser ziman tevdigerihê. Hêrîşên li Serêkahniyê, piştî pêlên hêrîşê ên di 8. 16. û 21´ê mijarê û pê de, di sale nû e pêla hêrîşan di 15´ê çile´ya 2013´an de dest pê kir. di aslê xwe de, berî vê demê, vê pêla dawiyê ya hêrîşan destpêkiribû. Lê ji 15´ê çile û pê de, êdî awayê hêrîşê mazin bû û ket rojevê de. Ji xwe, heta roja me, bi awayekî "ambargo" li ser rojavayê kurdistanê hatibû danîn. Bi wê danîna ´ambargo´ re, hat xwestin ku mirov bi birçîbûnê û bêzad hiştinê, "terbîya" bikin. Lê piştre ku dîtin ku gel di nava xwe de ji wê jî çare dît û li dijî wê bi serket, êdî piştre ev pêla hêrîşan a dawiyê ya li Serêkahniyê ya bidestê komên çeteyên bi navê ´Şehûda El-Tahîrî´, ´newaf El-beşîr´ û hwd, dest pê kir.

Tirkiya li ser van kom û hêrîşan re dixwezê ku di nava nîjadperestê arab de jî dijberiyekê li dijî kurdan bide afirandin. Bi vî rengî, pêşî bêtifaqîyê bide çêkirin û piştre jî, berê wan bide bi ser kurdan de. Ev komên ku tirkiya dixwezê ku bi kurdan re bide şer kirin, di temenê ´tarîqat´ û ´mezhebî´ û hwd de bi rêxistin kirina wan jî, aliyekî din ê pirr bitelûka ê ku divêt ku mirov pirr li ser bisekinê ya. Ew jî, dibê awayekî bikarhanîna olê di şerê li dijî kurdan de. Ya ku pirr zêde ku divê ku mirov li ser bisekinê û wê fahm bike û her wusa bide fahmkirin jî ev a.

Di vê temenê de divê ku mirov bi teybetî, li ser komkujiya kurdan a li Parîs´ê û teybetmendiyên wê jî bi şerê bi kurdan re divê ku mirov li ser bisekinê. Hinekî jî, ev rewş hemû di çerçoveyekê de weke ku digihijina hevdû. Yên ku şerê bi kurdan re dikin, bo ku tekoşîna kurdan a ku bi statûya kurdan û kurdistanê têdikoşê ji holê ra bikin, her tişta ku ji wan tê dikin. Komkuji, sûîqast, tevkuji, û hwd, hemû rêbazê bikar dihênin. Her wusa, weke ku li tirkiya dibê, li ser dozên di bin navê KCK´ê û hwd re sîstema dadê û ankû ´hûqûqê´, li ser wezeretên çandê, malbatê û hwd re, temenê civatê kurdan û hwd armanc tên girtin ku wan ji holê ra bikin. Politikayên ku li ser van sazîyan re dikina meriyetê de, hemû jî, politikayên di temenê zihniyeta jenosîdê de na. Bi wan politikayan ew jenosîda kurdan ku dewletê daya berxwe, dixwezê bibê sêrî. Hêrîşên bi piştîgirîya tirkiya ku li Serêkahniyê dibin jî perçeyeke ji wê politikayê na. Zihniyeta ku piştigiriyê komên çekdar ku hêrîşê kurdên rojavayê kurdistanê bikin, li dijî bakûrê kurdistanê û ankû beşa kurdistanê ya di nava tirkiyê de oparasyonên leşkerî û sîyesî û hewayî dide li darxistin. Zihniyeta ku oparasyonên di bin navê KCK`ê de li dardixe û ew zihniyeta bi piştgirîya wê komên çete ên bi çek ku li dijî kurdan şer dikê yek a. Heman zihniyet a. ...

-

**Hewldane tirkiya a herikandina şer ji herêmên Sûrî li herêmên rojavayê kurdistanê zêdetir dibe di dawîya salên 2012´an de. ..**

Di van rojên girêvên birçîbûnê di rijevê de na, nûçeyên şer li rojavayê kurdistanê dikevin ajansên nûçeyan de. Berî, van rojan bi çend rojan, hêrîşên hin komên çekdar ên ku girêvayî artişa tirkiyê na û tirkiyê ew biçekkirina ên weke "çeteyên Omar dedîxî" û "tabûra salahadin" û hwd, tirkiye dike ku li ser wan re şer bide herikandin li herêmên kurdistanê ên rojava. Li herêmên rojavayê kurdistanê, kurd hewldidin ku rêveberîya xwe ava bikin. Hewl didin ku statûya xwe biafirênin. Bi vê yekê, gelê wê herêmê ê kurd, bi yekdengî di nava hewldan û kar û bar de ya. Ev yek jî, tirkiye rehetsiz dike. Di serî de, tirkiye ji tiştekî pirr aciz bûya. ew jî, ew a ku ev demeke dirêj a ku li Sûrîyê ku şerê navxweyî dibe û ew jî weke aliyekî ya di wî şerê navxweyî ê Sûrîyê de, lê kurd dervî wê na. Ya ku herî zêde tirkiyê diêşêne jî ev a. Ji ber vê yekê, hewl dihê dayin ku şerê bê herikandin li herêmên kurdan. Berî van heftayan bi çend rojan li Helebê li xatên kurdan ên Eşrefîyê û Şêx Maqsûd û hwd, tirkiyê li ser "tabûra Saladin" re ku çend kurdên ku îstihbarata tirkiyê wan bikardihêne jî ku di navde bûn, li wir hêrîşêk li kurdan kirin û bi dehan kurd qatil kirin. Pişt re jî, li herême din a Qestel Cendo ya kurdên Êzîdî, tirkiyê fermanê dide komên çeteyî ên ku wê bi rêxistin û çek kirina jî ên weke ên "çeteya Omar Dedîxî" û hwd jî, li wir hêrîşî kurdan dikin. Piştî van herdû herîşan bi çend rojan re di 8´ê mijdarê de ji sînorê tirkiyê ku dikevina nava axa herême rojavayê kurdistanê de li Serêkahnîyê hêrîşa hêzên çekdar li herêmê dike.

Ev hersê hêrîş, li dûv hevdû hatina wan, divêt ku mirov bi awayekî rastarast(tesedûf) ne hasibêne. Tirkiye di destpêka mudahaleyê de pirr li ser avakirina "herêmeke tampon" sekinî. Lê ew hewldana wê, weke ku ji bo demekê pêk ne hat. Nûha jî, tirkiye, bi organîzekirina hêrîşên bi vî rengî, dike û dixwezê ku temenekî bi vî rengî bihasibêne. Bi teybetî, ev herîşa li herêma ya li Serêkahnîyê, bi teybetî hinekî carek din ev mijar kira rojevê de. Bi teybetî, tirkiyê, li dijî kurdan xwediyê ´dijberîyekê´ ya. Tirkiye, naxwezê ku kurd li herêmê xwe bibina xwediyê ti statûyê. Ji bo kurd, nebina xwediyê ti statûyê, çi ji destê wê tê dike. Bi vê yekê, êdî van herîşan dide kirin.

Bi teybetî, piştî hêrîşa ji aliyê tirkiyê ku tê gotin ku hêzên çekdar ên girêdayî "artişa

azad" kirina re jî, hin ji wan herêmên ku tirkiyê bi destê xwe bi mayîn kirina, e jî, tê gotin ku tirkiyê wan paqij dike. ev jî, weke amedekarîyaka mazin ay hêrîşê a li rojavayê kurdistanê jî dihê dîtin û hasibandin. Li gorî nûçeyên ku dikevina ajansên nûçeyan de tê gotin ku "tirkiyê, bi paqijkirina herêmên mayinkirî ji mayina re hin wergahên ku mirov di wan de bijîn jî tên amade kirin. Bi vî rengî, tê gotin ku tê xwestin ku hêrîşî herêmên kurdan bikin û bi hêrîşan re bikin ku kurd ji herêmên xwe bidina ravandin li wan wergahan. Bi vî rengî, tê gotin ku wan wergahan ji kurdan re amede dikin. Bi vê yekê, hin kurdên ku ji xwe re qaşo dibêjin sîyesetmeder jî li cem tirkiyê disekinê û vê plana ku kurd û herêmên wan bi wê bê "îşkalkirin", piştgirîyê didinê de. Tê ti kurdekî bi rûmet û şeref jî piştgiriyê nadê planaka bi vî rengî ya qirêj ya qirkirina kurdan.

Di dema şerê navxweyî de, herêmên herî aram û ên ku li wan şer pêşneket herêmên kurdan bûn. Kurdan, xwe bi nêzîkatîyaka pirr rast ji wî şerê qirêj ku tirkiyê bi hin welatên din re li wir dimeşêne jê dûr girtin. Ev jî, ya herî rast ku kurdan kir bû. Nûha jî, ya ku herî zêde ku tirkiyê nexweş dike û bi hêrs dike jî ev a. Tirkiye, di serî de, dixwest ku kurd, weke aliyekî wî şerê qirêj cih bigrin. Lê ev nebû. Bi vê re, nûha jî, şerê navxweyî hewl didin ku bi herikênina li herêmên kurdan. Tirkiye, bi teybetî, di vê dixwezê. Ji bo ku li wê herêmêa xwe kurd ti statûyê xw ebidest nexin û temenê ti statûyî ji bo xwe neafirênin, wê dike. Bi vê rengê, nûha jî, hewldanên herikandina şer ya li wê herêma kurdan heya. Komkujiyên ku li taxên Eşrefîyê û Şêx Maqsûd, tirkiye bidestê wê çeteye ku ji xwe re dibêje "tabûra Saladin ku kir û hewldana komkujiyê ya ku tirkiyê bi destê "çeteye Omar dedîxî" da kirin û di herî dawiyê hêrîş û komkujiya ku li Serêkahnîyê bû, weke hewldan û nîşanaka şerekî ku dihê xwestin ku şer li herêmên kurdan pêş bikeve. Her wusa bi vî rengî, hin kesên ku xwe bi navê "artişa azad" didina nîşandin û tê gotin ku bi navê "zaydan" ket rojevê de jî tê derxistin li telewizyonên ereb ên weke "Al-arabîya" û hwd jî û bangê li aşîrên arab ên li herêmê dikin ku li dijî kurdan bikevina nava tevgerîyê de. Bi vî rengî, temenek dihê xwestin ku were afirandin. Ev hewldan hemûk jî, hewldanên derxistina şer li herêmên kurdan in. Li herêmê, pêşî ku bi şerekî pêşketinên kurdan li herêmê di nava xwe de bidina xûrîxandin û piştre şerê hinekî din dirêj bikin ku bi tememî kurdan li herêmê bidina ardê. Ev hasab, bi vî rengî ji berê ve di serê tirkiyê û rayadarên wê de heya.

Berî nûha jî, li ser telewîzyonên weke ên "al-arabîya" û "Al-Cezira" û hwd jî, bahse şerê li herêmên kurdan ên li dijî rejimê dihat kirin. Bi vî rengî, hertimî, di raya giştî de jî hewl hat dayin ku temenekî bi dîmenî di serê mirovan de bidina afirandin. Lê ji ber ku li herêmên kurdan şer pêşneket, ev hewldanên li ser telewizyonên bi vî rengî jî, weke ku ne gihiştin armanca xwe. Êdî nûha jî, bi rengekî, bi awayekî ku rastûrast şandina hin komna çekdar li herêmên kurdan bi wan şer derxin dikin. Hewldana li Serêkahnîyê, hewldanaka bi vî rengî ya û ne hewldana pêşîya û ne jî wê bê ya dawiyê. Di serî de divê ku mirov vê yekê fahm bike. Wê piştî vê hewldanê re hewldanên din jî ên ku wê bibin, wê bibin. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku tirkiye heta ku şerekî li wir nedê derxistin wê neseknê. Bi vê yekê û ji ber vê yekê, di serî de divê ku kurd heyîdar bin û bi baldarî tevbigerihin.

**Komên** çekdar ku tirkiyê dixwezê wan biçek bike û bi kurdan re bide şerkirin, li herêmên kurdan hêrîşî kurdan dikin. Minaq, li gundê qastel ê kurdê kurdên Êzîdî û hwd, şandina hin komna çekdar, divê ku mirov di çeçova vê hewldanê de şîrove bike û bêne ser ziman. Di şerê ku li Sûriyê bi destê tirkiye, Katar û Suudi Arabiya dihê meşendin,

heta nûha kurdan, hewlda ku xwe jê dûr bigrin. Kurdan, ne xwestin ku bi hêzên ku ji xwe re di dibêjin "artişa azad" re ketina şer de û ne jî aliyê rejima esad girtin. rêyeke sêyemin ji xwe re hijbijartin û li herêmên xwe rêveberiyên xwe bidest xistin û li herêmên statûya xwe ava kirin. Lê tirkiye, di serî de ji vê yekê pirr aciz a. Ji ber vê yekê, hertimî, dixwezê ku herê bi ser kurdan de. Dixwezê ku kurdan bikişêne nava şer.

Ev hewldanên ku weke hin bûyarna çeteyan ên bi hêrîşkarî ku li herêmên kurdan li kurdan dibin û dihên kirin, divê ku mirov di serî de bi tirkiyê ve girêdayî bêne ser ziman. Ev, hewldaneka tirkiyê ya teybet a. Tirkiyê, dixwezê ku kurdan tevlî wî şerê bide kirin. Lê ku nikaribê, bi vî rengî komên weke çeteyan ku wê bi rêxistin kirina, wan bişêne bi ser kurdan de. Di vê temenê de komkujiyên li herêmên kurdan ên li taxên Eşrefîyê û şêx Maqsûd li Helebê bûn, divê ku mirov di vê çerçovê de şîrove bike û bêne ser ziman. Ev komên ku hatina şand li wir, ku kurd jî bin û ereb jî bin û ji wan cûda kîj komên din jî bin, ji wan komên ku li tirkiyê hatina perwerdekirin in. Bi vê yekê, komên ku di bin kontrolên fermandarên tirk de na. Li gorî gotin û fermana wan tevdigerihin in. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku ev hewldan, hewldanên tirkiyê ên li dijî statûya kurdan ên li herêmên wan jî ya. Tirkiyê, weke ku li dora gundê qastelîyê bû, hin komên tirkmen jî weke çeteyen bi rêxistin kirina û şandina herêmên kurdan û bûyaran bidina kirin. Bi vî rengî, gelek komên ku mirov dikarê wan kifş biike û navê wan bêne ser ziman jî hena ku tirkiyê şandina.

Tirkiye li dijî statûya kurdan a. Bi teybetî, dema ku kurdan cara pêşî dest danî ser rêveberîya bajarê xwe yê Kobanê jî, hingî serokwezirê tirk T. Ardogan, bixwe jî derket berçapamaniyê û got ku "em vê yekê herê nakin û em jê re nabêjin ´eywelleh´. " Piştre ku tirkiyê dijberîya xwe da nîşandin. Artişa xwe herikend ber şînor. Divêt ku herê bike ku her kuştinên ku li Sûrîyê dibin destê tirkiyê têde heya. Di serî de, divêt ku mirov vê yekê kifş bike. Tirkiye, li wir, tenê rojeveka wê heya. Ew jî, ew a ku kurd li herêmê nebina xwediyê ti statûyê bi navê xwe. Bi vê yekê û armancê, hertişte ku ji wê tê û ji destê wê tê dikêt. Bi vê armancê dîplomasiya xwe dimeşênet li ber welatên rojava jî. Tirkiya bi tememî li dijî kurdan ketîya nava hewldan û pozisyonekê de. Ev yekê û pozisyona xwe jî, ew bixwe jî di her firsandê de dihêne ser ziman.

Di vê demê de, rewşa li Sûriyê, rewşeka pirr aloz a. Di nava wê alozîyê de, tirkiyê dixwezê ku kurdan bike nava aloziyê û şer de. Kurd, hertimî xwe ji şer dûr dikin. Ne li aliyê "artişa azad" û ne jî li aliyê rejimê, naxwezin ku bikevina şer de. Bi vê yekê, di xwezin bi awa û nêzîkatîyaka demokratik û aşîtîyane, di nava wê rewşê de rewşa xwe bi parêzên û statûya xwe ava bikin. Bi vê yekê û armancê kurd, li herêmên xwe êdî xwe bi rêxistin dikin.

Heta vê kêlîkê jî, bi awayekî vekirî li herêmên kurdan şer nebûya. Aramî li herêmên kurdan serdest a. Di aslê xwe de di nava wê alozîya li sûrîyê de ew aramîya li herêmên kurdan, tirkiyê diêşêne. Ji ber vê yekê, bi şandina komên weke çeteyan li herêmê, dixwezê ku wê aramîyê xira bike û aloz bike. Dixwezê ku tevlîhevîyê di nava kurdan de û li herêmên kurdan bide çê kirin. Hin komên ku ji xwe re dibênin "partî" jî ku têkiliya wan bi muharate tirkiyê re hene û ku kurd in jî, li ser wan re hewl tê dayin ku di asta sîyesî de jî parçebûnekê bide çê kirin. Bi vê yekê, dixwezê ku yekbûna kurdan ya ku wan di nava xwe de çêkirî bide xirakirin.

Di vê demê de, di nava kurdan de jî di bin navê "li dijî sîyesete PYD" de, hewl dihê dayin ku komna din ên qaşo sîyesî werina ava kirin. Bi vê re jî, parçebûnê bidina çêkirin

û wê parçebûnê li ser wê re kûr bikin. Di vê temenê de lîstikeka mazin heya. Hin komên di bin navê "muxalif"tîyê de jî ku diaxivin, dewlet li ser wan re jî li dijî wê yekbûna kurdan dikevê nava hewldanê de. Ev hewldanê tirkiyê ên hem li ser hin partîyna ku ji xwe re dibêjin em kurd in û hem jî li ser hêza artişa azad ku li Sûrîyê bi rejimê re di şer de ya, hemû jî tenê armancaka wan heya. Ew armanc jî ew k u pêşî parçebûnê di nava kurdan hem ji aliyê sîyesî û rêveberî ve bide çê kirin û hem jî bi wê re jî ku karibê temenê statûya kurdan li herêmê bi tememî li ser wê alozîya ku li ser wan re bide derxistin bi tememî ji holê ra bike. Bi vê yekê, hewldanaka tirkiyê heya.

Li herêmê, di vê demê her rê û rêbaz dihê bikarhanîn ji bo kurd werina parçekirin. Bi vê yekê, tirkiyê, li ser partîyana re di nava kurdan de di temenê parçekirinê de dileyizê. Gotinaka me kurdan heya, tê gotin ku "kûrmê darê ne ji darê wê qalandina darê nebe." Bi rastî jî, di serî de divê ku mirov bipirsê ku ne ji wan kûrmên navê bê, wê dewletê tirk di armanca xwe ya têkbirina statûyan de bisernekeve. Bi vê yekê, hinekî jî divê ku mirov vê yekê bibîne. Ev kom û an jî ku ji xwe re dibêjin "partî" jî, ew ên ku têkiliya wan bi tirkiyê re hena, divê ku her mirovê kurd têkiliya xwe ji wan bibirrê û ji wan dûr keve. Bi teybetî, di vê demê de li ser hin mirov û partîyna de bi vî rengî tirkiye li nava kurdan dileyizê. Bi vê yekê, di serî de her mirovê kurd, van bibîne û li dijî wan bihelwest bê.

Çawa ku şerekî navxweyî li Sûrîyê bidestê welatên weke Tirkiyê hat derxistin, her wusa, dihê xwestin ku di nava kurdan de jî şerekî bi vî rengî were derxistin. Ya ku li pişta wê disekinê jî tirkiyê ya. Minaq, komên ku ji xwe re dibêjin "tabûra salahadin" û hwd jî, bi vê armancê bi destê tirkiyê hewl hatîya dayin ku ji nava kurdan werina bi rêxistin kirin. Weke tê zanîn Salahadinê eyûbî alim û serokekî kurd a. Li ser wî re, hêsta misilmanên kurd ên wê herêmê jî, hewl tê dayin ku were bikarhanîn û îstismarkirin. Bi vê yekê û armancê, di serî de li dijî van komên ku di bin van navan de ku hatina avakirin oldarên kurd berteka xwe li dijî bidina nîşandin, ji bo tirkiyê nikaribê bi wan komên bi vî rengî di nava kurdan de şerekê navxweyî bide derxistin.

Di vê demê de, li ser van komên bi vî rengî weke ên ku me navê wan hanî ser ziman re, wê tirkiyê bixwezê ku li herêmê alozîyan bi teybetî di nava kurdan de bide çêkirin. Nakokîyan bide çêkirin. Di serî de, bi rijandina xwûnê û hwd bê, wê hewl bê dayin ku nakokîyan bide çê kirin. Li ser wan re jî, di nava kurdan parçebûnê bide çê kirin.

Ev kirinên bi vî rengî, di aslê xwe de politikayaka tirkiyê ya ku wê bi armanca avakirina sistema cerdawanîyê li bakûrê kurdistanê ku li ser aşîrên kurdan re bikarhanîya û ji hin aliyan ve bi serketîya ya. Di bin navê olê de û li ser nakokîyên aşîrî ên li herêmê re dewleta tirk ew sisteme cerdewanîya ku bi wê komkujiyên kurdan bidestê hin kurdan pêktîne daya ava kirin. Nûha jî, bi rengekî din wê politikayê li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan li ser komên weke ên ku ji xwe re dibêjin "tabûra Salahadin" û komên çeteyî ên weke yên "omar dedixî" ku bi aslê xwe tirkmen in û ku tirkiye wan bi rêxistin dike û hwd re dike meriyetê de. Ev komên çete ên weke "komên Omar dedixî" jî ku tirkiyê bi rêxistin kirina û ji tirkmenan in jî na, hêrîşî gundên kurdên êzîdî dikin. Berî ku ev hêrîş li gundên kurdên êzîdî bibin, li tirkiyê ku T. Ardogan bixwe pêşengtîye wê kiribû û pêleka hêrîşê li kurdên êzîdî hatibû kirin. Tirkiyê, li ser hêrîşên komên çeteyî ên bi vî rengî û gotinên weke ên T. Ardogan re, dixwezê rewşekê di temenê "dij-ol"îtîyê de li ser kurdan re bide afirandin. Bi vê rengê jî, wan hêrîşên ku dibin dixwezê ku bide meşrû kirin. Bi vî rengî, sîyesetekê li ser ola

Îslemê re bi awayekî qirêj dike. Em vê jî bibêjin, ku ew kurdên ku di nava wê koma "tabûra Salahadin" de cih digirin, ku Salahadinê Eyûbî bixwe sax ba, wê wî bixwe ew şermazar bikira. Wê Salahadinê Eyûbî bixwe, ew "tabûra" bi navê wî ku kurdan bixwe dikujê wê şermazar bikira.

Salahadinê Eyûbî bixwe kurd bû. Wê ti carî herê nekiriba û ne pejirendiba ku bi navê wî hêzekê li dijî kurdan û statûya kurdan biketa nava tevgerîyê de li ser navê hêzên weke Tirkiyê ku li dijî kurdan bi salana ku şer dikin û bi hezaran kurd qatilkirina meşa.

Bi vê yekê, divêt ku mirov bibêje ku di serî de divê ku her mirovê li rojavayê kurdistanê di derbarê van kirinên bi vî rengî de agahdar bê. Di serî de, ji xwe ew kurdên dibêjin hatina tevlîkirin li nava wan tabûrên bi vî rengî, ku wan bixwe jî dîroka Salahadinê Eyûbî zaniba û rastîya baş bizanîyan, wê wan bixwe li dijî wê hêza ku ew nûha di nav de na, wê li dijî wê ketiban nava tekoşînê de. Salahadinê Eyûbî bixwe jî ku sax ba, wê gotiba bi navê xwûdê û navê min li dijî wê bikevina nava tekoşînê de. Salahadinê Eyûbî bixwe jî, ku mirov di temenê têgihiştina wî de dihizirê, mirov dibîne û dikarê bibêje ku hemû hewldanên bi vî rengî ên şerxwezî ên ku bi navê wî tên kirin jî hem li dijî kurdan û hem jî li dijî herêmê, wê wî bixwe ew şermazar bikira. Tiştekî ku têgihiştina salahadinê Eyûbî Şermazar dike, ti kesek nikarê li ser navê wî bi mirovan bide herê kirin û bêne ser ziman. Ev îstîsmarkirina navê Salahadinê Eyûbî bixwe jî, em bixwe jî wê şermazar dikin û lenet dikin. ..

Di dema ku min ev nivîs di nivîsand de li rojavayê kurdistanê li herêmên weke Til temûr û Dirbespîyê û hwd, bi tememî hêzên rejimê ji herêmê paqij dikin. Bi vê yekê, li herêmên din jî êdî ev rewş berdewam bike. Hêzên weke Tirkiyê, wan dikina sedem ku li wan hêrîşan bidina kirin. Lê kurd, êdî wan jî ji herêmê paqij dikin. Bi vê rengî, kurd, ji hemû aliyan ve li herêmên xwe êdî serdest dibin. Piştî hêrîşên li Serê kahnîyê û hwd, êdî kurdan bi tememî herêmên xwe kirina bin kontrola xwe de. Kurd, ji bo herêmên xwe ji şer xilas bikin û ne hêlin ku şer bi herikê li herêmên wan û li nava wan, bi vê rengê di hewldanên pêşî lê girtinê de na. Lê tirkiye, ji ber ku hewldana wê ya pêşî lê girtina pêşketina statûya kurdan li herêmê heya, êdî ew dikeve nava van hewldanan de.

Her wusa divê ku mirov bibêje ku weke ku li Serê kahnîyê ev hewldan dihên kirin, bi heman rengî li herêmên Kobanê û Hesekê jî, tê gotin ku hewldanê tirkiyê hena ku şer li wanderan pêş bixe. Li van herêman, ne tenê kurd, gelek komên civatî ên weke ên ereb û sûryanî û hwd jî hena ku bi hev re dijîn. Lê bi teybetî, herêmên weke Kobanê û Serêkahnîyê ku dikevina ber sînorê (bakûrê kurdistanê)tirkiyê de jî, li vanderan bi buhurandina komên çekdar re li van herêman dikin ku şer li van herêman derbixin. Berî ku ew rûdawên ku li herêmên Serê kahnîyê rûbidin, tirkiyê amedekarîyak kir. Di serî de, li ber sînor, mayinên ku wê danîbûn paqij kirin. Piştre jî, berî ku şer û pevçûn dest pê bikin bi destê hin koman xwestin ku di nava xalkê de nerehetiyê çê bikin û xalkê ji cih û warê wan bidina goçkirin. Bi vê armancê, hin denezand jî weşandin. Lê çend ku bi serneketin jî di van hewldanan de, piştî şer û pevçûnan li dora serê Kahniyê destpê kir, li gorî ku nûçeyên ku ketina ajansan de tê gotin ku ser 12 hezaran re mirovan goçî vî aliyê sînor yanî aliyê sînor kirin. Gelek ji wan mirovên ku goçî vî aliyê sînor kirin jî ahl û xizmên wan li vî aliyê sînor hebûn. Bi hizir û nêhta ku ji sînor bi buhur in û xwe li wan xizmên xwe bigirin ji sînor buhurtin. Lê Tirkiyê ew girtin û kirina wan wargah)kamp) ku berî ku şer û pevçûn destpê bikin ku avakirin de. Ev rewşa ku li ser herême Serê kahniyê re rûda, nûha jî tirkiyê dixwezê ku heman rewş li herêma Kobanê bidê çê kirin.

Li gorî ku di ajasên nûçeyan de tê gotin ku tirkiyê hêza xwe ya artişî harikandîya ber sînorê Kobanê. Ev jî, didêt nîşandin ku wê heman rewş li wir biqawimê.

Ev hewldanên bi vî rengî, hewldanên herikandina şer ên li herêmên kurdan in. Kurdan, ji destpêka şerê li Sûrîyê de, rêyeka sêyemin hilbijartin û nexwestin ku tevlî şer bibin. Li herêmên xwe xweserîya xwe ava kirin û ketina ava hewldana avakirina pergala xwe ya xweser de. Bi vê yekê û armancê, li herêmê xwe êdî xwe bi rêxistin kirin. Lê tirkiyê ji vê yekê pirr nexweş bû. Tirkiya ji ber ku li dijî xweserî û statûya kurdan a, bi vê yekê êdî bi xwesteka herikandina şer ya li vê herêmê re dixwezê ku pêşî kavilkirinekê bide çê kirin û piştre jî wê temenê statûya wan ya ku ew dixwezin ji holê rabike.

Li kurdistanê, bi teybetî li bakûrê kurdistanê, di van rojên dawiyê de girêvên birçîbûnê di rojavaê de na. Bi girêvên birçîbûnê re xwestekên kurdan derxistina li pêş ew in ku qadaxaya li ser zimanê kurdî were rakirin û bi serokê gelê kurd birêz Ocalan re hewldîtin werina destpêkirin û bi muzakarê û danûstandinê pirsgirêka kurd were çareserkirin û bi wê re jî dawî li wî şerê li ser serê kurdan were hanîn. Lê dewleta tirik, ji dêla ku vê bike, şerê li ser serê kurdan gurrtir dike û qadaxaya li ser zimanê kurdî dide domandin. Bi wê ve girêdayî jî, şerê li Sûrîyê hewl dide ku bi herikêne li herêmên rojavayê kurdistanê ku di nava Sînorê Sûriyê de hatina hiştin. Bi vê yekê, tirkiyê şerekê "topyekûm" weke ku li dijî kurdan daya dest pê kirin. Li rojavayê kurdistanê hin komên ku xwe weke partî didina nasin ên bi navê "partîya azad" dixwezê ku yekîtîya kurdan belav bike. Her wusa li bakûrê kurdistanê bi heman rengî li ser hin komên ku weke partî ên bi navê "hak-par"ê re jî destê diavêja nava wan û wan ji nû ve dike ku li gorî xwe û van poliitkayên xwe bi rêxistin bike û li dijî statûya kurdan û yekbûna kurdan bikarbêne. Bi vê rengî li herêmên kurdan jî hewl dide ku bereyeke xwe li ser van komên bi vî rengî ku girêdayî îstihbarate tikriyê kar dikin re yekbûna kurdan xira bike û bêtifaqîyê bike nava wan de.

Di vê demê de, çendî ku kurd dikarin yekîtîya di nava xwe de biparêzên, wê ewçendî jî karibin li ser kifşkirina baxtê xwe bibin xwedî gotin. Yekîtî û yekbûn, di vê demê de weke nan û avê ji wan re pêwîsta û pêwîstîya wan pê heya. Ji bo ku ew şerê ku Tirkiya dixwezê ku biherikêne li herêmên wan jî, pêşî lêgirtina wê jî, tenê bi yekîtîya di nava wan de dikarê bibe. Ku kurd, di nava xwe de ne yekbin, çi bikin jî, wê nikaribin pêşî li wî şerê ku tirkiya dixwezê ku bi herikêne li herêmên wan bigr in.

Di her demê de ya ku bûya ev a. Her demê, di dema serhildan û raperînên kurdan ên ku di demên berê de ên cuda bûna jî, ev yek wusa bûya. Dewletê, hertimî li nava kurdan kurdan leyîstîya û hin aşîrên kurdan ên ku li cem hêzên serhildanê disekin hildana cem xwe û bi wê re hêza kurdan zayif kirîya û ew têk birina. Di vê demê de jî, weke wan aşîran, hin partî û ankû komên bi vî rengî ji nava kurdan bi rêxistin dike û kurdan bi hêza wan re kêm dike û yekbûna wan bi vî rengî têk dibe û li ser wan re sîyesete xwe bi rê ve dibe. Di vê demê de, tişta ku dibê ev a. Aşîrên wê demê yên ku dewletê dihildana cem xwe û li dijî serhildanên kurdan bikar dihanîn jî, bûna partîyên roja me ku li dijî kurdan û statûya wan li cem dewletê cih digrin in. Hewldana ji nû ve perçekirina kurdan, î ro dewleta tirk li ser mirovên weke Kemal burhay re bi vê re dibê. Hanîna wî ya li ser serê "Hak-par"ê bixwe jî, ez ti carî nikarim bi vîna kurdan re bênima ser ziman. Ew tenê, bi hin poliitkayên dewletê ên perçêkirin û xirakirina yekbûna kurdan ve girêdayî ya. Di vê demên pêş de, ev zêdetir derkevina li pêş. Î ro, zimanê kurdî qadaxa

ya. Li zindanan û li kurdistanê li dervî zindanan bi hezaran kurd ji zimanê xweyê dayikê di girêvên birçîbûnê de na. Gelek ji wan mirovên kurd ên ku ji bo zimanê xwe yê dayikê di girêvên birçîbûnê de na, li ber sînorê mirinê na. Di vê demê de ji van koman ti deng dernekeve. Li ber qadaxaya zimanê kurdî û girêvên birçîbûnê û mirina mirovan bêdeng in. Heta vê rojê ti kesekî ne dîtîya ku van mirovan gotîya ku divê ku ev şer bê bi dawî kirin û mafê kurdan were radestkirin li wan.

Ev komên ku ji xwe dibêjin em kurd in li cem hikimete AKP´ê ya ku dibêje "ji bo kurdan, perwerdehîya bi zimanê dayikê nabê" ku disekin in, gelo tekoşîna çî didin? Ku tekoşîna nirx û çand û zimanê xwe yê dayikê daban, wê di serî de li cem hikimeteke ku bi vî rengî gotin gotîya ne sekinîban. Hikimete AKP, ji xwe tekoşînê û şer bi kurdên ku doza maf û azadîyê dikin re dike. Kurdên ku tekoşîna, çand, ziman û nirxên xwe didin, î ro bi hezaran ew di zindanan de na. Pirranîya wan jî, î ro di zindanan de di girêvên birçîbûnê de na bo çand û zimanê xwe yê dayikê. Em hêvî dikin ku ev kom jî wê êdî ji î ro û pê de, ji van hewldanên dewletê ên perçekirina yekbûna kurdan ku dewlet dixwezê bide kirin dûr bisek in û li rex gelê ku ew jî jê na cihê xwe bigrin bi rûmet. ..

**Pêvajoya soreşa rojavayê kurdistanê a sale 2013´an bi hin pêşveçûnên demî re û di vê pêvajoyê de hewldanên kurdan ên afirandina ´yekbûna navxweyî ya kurdan´ û hewldanên dijberî wê ên qatkirin û perçekirina kurdan.**

**Bi wê re jî, hin bi hin bi gotinan afirandina dijberîyê li dijî pêşketin û rêveberîya rojava ku kurd wê ava dikin û afirandian temenê hêrîşan li rojava û destpêka pêvajoya yekem a hêrîşên li rojavayê kurdistanê ku pêş dikeve.**

- Li ser ahlaqê sîyesetê û ´sîyeseta´ hin komikên ji rojavayê kurdistanê ku bi sîyeseta rejima tirk re li dijî kurdan tevdigerihin û gotinê dibêjin: komên kurd, li ser navê metingerên xwe, dibêjin ku "PYG û "YPG, têkilîya wê bi rejimê re heya". Ev ne rast in. Lê ji ber çi ev dordor van gotinan dibêjin, me xwest, em ji hemû aliyên wan ve hildina li dest û şîrove bikin. Ev yek, bo fahm kirina rastiyê giring bû. Di dema ku me li ser mijarê lêkolîn dikir û hewl da ku em fahm bikin, me dît ku rastî vajî wê ya. Me dît û fahm kir ku têkilîya van komên ku van gotinan dibêjin, hem bi rejimê re heya û hem jî di temenê zihniyeta wê de li dijî civate kurd şer dikin. Di temenê reşkirina YPG´ê de jî, û di temenê hêrîşên sîyesî û bi devkî ên li PYD´ê jî, argûmanên dewleta tirk ên li dijî hebûna civate kurd hena. Hemû hêrîşên ku li PYD´ê jî, û li YPG´ê jî, bi armanca şikandina vîna kurd û ji holê rakirina temenê statûyeka kurd ya ku li rojavayê kurdistanê pêş dikeveya na. .. Armanc, ew a ku reş bikin û ku karibin, bi wê reşkirinê bêqiymet bikin û piştre jî li gorî xwe rewşekê li rojavayê kurdistanê rejima baasê re bê û ankû bi rejimên nû ên ku wê li şûna wê werina avakirina re pêş bixin. Lê ew rewş û ankû "statûya" ku bo kurdan pêş bixin jî, wê ne statûyeka kurdî û ku di wê de kurd bi nav û ziman û mafê xwe re lê serdest bin. Ji xwe, piştî ku di wê politikaya reşkirinê de bi serneketin, êdî bidest çêkirina ´diwarê şermê´ kirin. Hinekî jî, divê temenê de, divê ku em bi têgihiştin û zanîna sîyesî jî li mijarê binerin.

Sîyeseta kurd, di vê demê de, hem lli dijî civate kurd û hem jî li dijî pêşketinên civatî ên kurd ên weke ku li rojavayê kurdistanê dibin, azmûneka baş neda. Gotinên ku di vê

demê de hanîn ser ziman jî, di aslê xwe de, ji aliyê sîyesetkirinê ve tenê xizanîya wan dide li berçav. Dîroka xwe ya civatî nizanin. Hebûn û civaknasiya civate xwe baş naxwênin. Heta bi zimanê civate xwe jî sîyesetê nakin. Di rastîyêê de, dîroka kurd û civate kurd ku bi hezaran salan a, ku baş zanîban û fêrbûban, wê zanîban ku li ser çi temenê sîyesetê dikin. Bo vê yekê jî, gotinên sîyesetê ên ku dikin, yan li ser nîqaşên ku sîyesî ên rejimên herêmê na û yan jî bi awayekî ji rastîya civat qût di temenê dijberîyek zûwa de na. Sîyeset ku li ser navê civatekê hatkirin, wê di temenê dijberîyê de newê kirin. Wê li ser felsefeya civatî ku di wê de rastîya wê civate ku bi navê sîyesetê dikin, wê sîyesetê bikin. Di vê temenê de di temenê sîyeseta civatî de felsefe, civaknasî û dîroka civatê di temenê wê de ya.

Sîyeset, dema ku were kirin, di temenê têgihiştin felsefe û rastîyaka civatî de dihê kirin. Li vir, dema ku em di vê temenê de binerin, em dibînin ku sîyeseta kurd, ne di rewşeka baş de ya. Piştî ku pêvajoya mudahaleya li Sûrî ku li ser komên çete re bê û ankû bi sîyesetê û dîplomasîyê û hwd re bê, ku dest pê kir, kurdan jî, li herêmên xwe xwe bi rêxistin kir û êdî ku pêvajoyê dest pê kir, dest danîna ser rêveberîya herêmên xwe. Bi wê re, pêşî, kurdan ji bajarê rojavayê kurdistanê ê Kobanê dest pê kir û dest danîna ser herêmên xwe. Kurdan, pêşî kêfxweşîyek jîn kirin ku ew şoreşa wan ya rojavayê kurdistanê bêxwûn bûya. Di dema ku dest danîna ser rêveberîya herêmên xwe, kurdan û tevgera wan, pirr xesasîyetek dane nîşandin ku xwûn ne rijihê û bêxwûn, ew pêvajo bi dawî bibe.

Ya ku kurdan, dixwest ew bû ku ne xwûna ciwanên wan birijihê û ne jî, ti mirovên din xwûna wan birijihê. Ya rast jî, ev bû. Di aslê xwe de, weke ku di şîrovekirina her şoreşê de dihê kirin ku ji destpêka wê bidest şîrovekirinê dihê kirin û ew rêxistinî û têgihiştina wê ya demokratîkî çendî heya û ankû ku hebe li pêş a, pêşî li wê dihê nerîn. Di vê temenê de, dema ku em rojavayê kurdistanê û şoreşa wê şîrove bikin, divê ku em vê rewşa destpêkê ya wê bi teybetî û bi giringî li ser bisekin in.

Di wê demê de, dema ku kurdan bêî ku ne xwûna wan birijihê û ne jî xwûna ti kesekî din ên li dijî wan birijihê ew pêvajo dan destpêkirin û heta astakê jî bi serket. Hêzên rejima Sûrî, li berçav negirtin ku li dijî kurdan şer bikin. Bi vê yekê re, êdî ew jî bû derfetek ji kurdan re ku nehêlin xûna ciwanên wan birijihin û şoreşa xwe bibina şêrî.

Lê piştre çi bû? Piştî ku kurdan dest danî ser rêveberîya herêmên xwe û pê de, piştre ji rêveberîya tirk hin gotin hatina gotin. Di aslê xwe de, hê berî pêvajoya Sûrî destpê bike, rejima tirk ev gotin digotin ku "têkiliya PKK´ê û rejima baasê bi hevdû re heya." Piştî ku ev gotin, hatina ditin ku rejima tirk di temenê propagandayekê de dibêje, êdî piştre hinekî bêdeng man.. Lê piştî ku kurdan dest danîna ser rêveberîya herêmên xwe û pê de, partîya kurd PYD derket lli pêş. JI ber ku tenê partîya ku li wir bi rêxistinkirî û temenê wê bi tekoşîna azadîya civate kurd re hebû ew bû. PIştre bi piştgirîya PYD´ê bê û ankû çend partîyên din ên rojavayê kurdistanê ên nêzî wê bin ku hêzên parastina gel ´YPG´ê hat ava kirin weke hêzeka rojavayî û leşkerî û pê de, êdî ew serwer û serdest bû. Kurdan, bi can û malê xwe, tevlî wê bûn. Di demek kin bi de hezaran ciwanên kurd tevlî refên YPG´ê bûn. Bi wê re jî, YPG´ê bû, hêze sereka ya artişî ya parastina kurdan û rojavayê kurdistanê.

Ciwanên kurd, ên ku bo parastina civate kurd gihiştin hevdû û bi dest parastinê kirin, canê xwe bi lêpirsîn dan di ber gelê xwe de. LÊ herêmên xwe parastin. Her bajarên ku dest danîna li ser rêveberîya wê di cih de ew valahîya parastinê bi hebûna

xwe YPG´ê dagirt. Û piştre jî, gelê kurd li rojavayê kurdistanê parast. YPG´ê, weke hêzeka parastinê ku ji sadî 95´î gelê kurd ê rojavayê kurdistanê piştgirî didayê de bû.

YPG´ê, piştî bi sazûmana wê re û bi hêze wê ya parastinê re ku ew cîdîyeta wê hat ditin û êdî ku hat fahm kirin ku wê nikaribin li ber wê bisekin in, bi dest reşkirna wê hat kirin. Lê dîsa, tevî ku hin komikên kurd jî di nav de û ku nêzî rejima tirk in ku bidest reşkirinê kirin jî, dîsa yên li YPG´ê xwedî derketin gel bû. Bi lê xwedî derketina gel re, ew propagandayên reşkirinê jî, hemû hatina vala derxistin. PIştre, çend komikên kurd, hin partikên piçûk jî bûn, di xwestin ku hinek hêzên xwe yên leşkerî bidina çêkirin û bi wê re li ser jîyane gel û gel bixwe jî, kontrola xwe bidina çêkiirin û xwe bijîn. Ji ber vê yekê, van komikan, di serî de, ew gotinên rejima tirk ên ku digotin ku "têkiliya PYD´ê, bi rejima baasê re heya, û ankû "bi hevdû re di nava hevkaiyê de na" û hwd, bi dest dij-propaganda kirin. Di temenê hemû propagandayên wan de jî, ew hebû ku dixwestin ku hêzeka xwe ya piçûk, çêbikin û bi wê serdestîya xwe çê bikin. Tevî ku rojavayê kurdistanê, nêzî 3 milyon û nîv a jî, xwestin ku wê jî bikina dû-qat. Yanî, bi partî, herkesek, qadaka xwe ya serdestîyê çê bikin û li wir jî hêzeka´ xwe ya leşkerî çê bikin û bi wî rengî tîranîya xwe çê bikin. Armanc, ji wê xwestina avakirina hêzeka cûda jî, ew bû ku parastina rojavayê kurdistanê û gelê bikin bû. Armanc, pirr cûda bû. Armanc, ew bû ku herêmeka ku piçûk jî bê ku bajarek jî bê, di bin kontrola wan de bê ku karibin jê fêde bigrin û bi wê berîka xwe tişî bikin. Wê ev jî, li ser xwûna ciwanên kurd bikiran.

Li vir, gotinekê pirr zêde bale min kişand, Ew jî, ew bû ku pêşî rayadarên rejima tirk hanî ser ziman û piştre jî van komikên qaşo kurd bidest hanîna ser ziman kirin. Heta ku, hinek rayadarên rêveberîya başûrê kurdistanê jî, bi gotinên xwe re ew **tuwanc**(´îma´) kirin. Ew jî, ew bû ku digotin ku "PYD, têkilîya wê bi rejima baasê re heya." Bi wê re jî, di dewama wê de digotin ku "bi alîkarîya rejima baasê û vekişîna wê, êdî PYD´ê dest danîna ser rêveberîya herêmên kurdan." Bi vê re, gotinaka din jî, digotin ku "rejima esad a baasê, herêmên kurdan radestî PYD`ê kirina bi hevpaymanîya di nava wan de." Dema ku ev gotin dikirin jî, ev jî, di temenê sucekî de digotin û dihanîn ser ziman. Rejima baasê, ev 50 sal e ku li ser desthilatdarîyê ya û hebûna kurdan jî weke tirkiya herê ne dikir. Heta ku, pirranîya kurdên ji rojavayê kurdistanê bênasnema jî hatibûn hiştin. Politikaya arabkirinê li herêmên kurdan dimeşand. Ev û hê gelek kiryarên din ên rejima baasê na, ku li dijî kurdan kirina. Her wusa, ji xwe em bahse komkujiyên weke ên "sînemaya Amûdê" bikin, wê rewşeka pirr xirab ya rejima baasê li dijî kurdan biafirê. PYD`ê jî û YPG´ê jî tenê li civate kurd hizirî na. Wekî din jî, li ser hebûna civate kurd û mafê kurdan bi ti kesek peyman û hasab çênekirina. Lê pirr xarîbû ku ên ku ev gotin bilêv dikirin, berê bi gelek awayan têkilîya wan bi rejima esadê re hebû. Bi wê re, heta ku li dijî kurdan jî, tevdigerîyan. Lê î ro, derdiketina berçapameniyê û kurd gunahbar û sûcdar dikirin. Tenê jî, reş dikin û hwd. Ti kesek jî, ji devê wan ne bihîstîya ku gotinaka bi xêr ji bo rojava hanîna ser ziman. Lê dema ku ev gotin digotin jî, pirranîyên wan li Îstembûlê û hewlêrê di hotelê ´pênc stêrk´ de di man û dixwarin û dirazahan.

Piştî ku mudahaleya li Sûrî destpêkir û şerê navxweyî lê destpê kir û pê de, êdî rejima baasê fahm kir ku wê nikaribê li herêmên kurdan bisekinê, êdî li şûna ku bi kurdan re bikeve şer de û anîya xwe ya şer firehtir bike, li herêmên kurdan ne ketina şer de hilbijart. Kurdan jî, bi amedekarîyên xwe yên ku kirina, dest danîna ser rêveberîyên herêmên xwe ên xwe rêvebirinê. BI pişgirîya gelê kurd ê rojava û hêze parastinê ya

YPG´ê re kurdan rêveberîya herêmên xwe kirina destê xwe de. Î ro, dema ku em li rewşê binerin, emê bibînin ku kurdan, hema bêja pirranîya herêmên xwe hemû kirna bin destê xwe de û kontrola xwe de. Hêza sereka ya parastinê jî YPG´e ya. Lê hê jî, ew reşkirinên li dijî, YPG´ û hwd, ji aliyên van komikên kurd ve didom in. Her ku devê xwe divekin, dibêjin ku " bi esad re hevpeyman kirin û dest danîna ser rêveberîyên herêmên kurdan." Yanî, weke ku ev sucek bê, dihênina ser ziman. Lê ev gotin, bi xwemalî(orjînalîya)ya xwe ne ya van komikên kurd a. Ya rejima tirk a, ku bo reşkirinê di demên destpêka pêvajoyê de dihanî ser ziman. Li vir, ev komik, ji ber çi vê gotinê weke şuc bê, dihênina ser ziman? Armanc reşkiirina. Ku hinekî jî, sîyesetkirin zanîban û felsefe wê bi wan re heba û ahlaqekî rast û baş ê sîyesî bi wan re heba, wê bigotan," rast bû ku bêî ku xwûna ti ciwanên kurd birijîya, dest danîna ser rêveberîyên herêmên kurdan. BI wê re jî, wê bi gotan, ´ji xwe esad û rejima wê sucên wê ên ku li dijî kurdan û xalkên din kirina, wê cuda hasabê wê bide.´

Li şûna ku kêfxweş bin ku bêî ku xwûna ti ciwanên wan birijjê ku dest danîna ser rêveberîyên xwe kurd, ji wê aciz in. Ew acîzîya wan jî, ew acizîya rejima tirk a ku bi wê nexweşa ku kurdan dest danîna ser rêveberîya herêmên xwe û bûna hêzek. Ji wê rewşa ku kurdan, xwestin ku bêî ku xwûna ti kesekî birijê û destdênina rêveberîya herêmên xwe kêfxweş bin, aciz in. Di aslê xwe de, ew aciz bûn, ku ev dordor di farqê de bin û ne di farqê de bin, sîyeseta xwûnrijiyê ya. Yanî ku dema ku kurdan ji KObanê dest pê kir û destdanîna ser rêveberîya herêmên xwe, ku rejima esad, bi tank û topên we bi dest hêrîşê kiriba û bi hezaran kurd hatiban kuştin, wê hingî, ev dordor kêfxweş bûban? Ji wan gotin û rengê axiftina wan dihê fahm kirin ku wê kêfxweş bûban. Ji xwe, di rewşeka wusa de jî, wê pêşketina rojavayê kurdistanê ya roja me jî nebûba. Ji ber ku wê pirranîya mirovên xwe winda bikira û wê herêm hê zêdetir biheta kavil kirin. Ev jî, bi tememî, têkçûna kurdan bû. Ji xwe, bo ku ew kavilkirin û ew têkçûn bi kurdan re bibe, bi piştgirîya rejima tirk, bi çeteyên ´cebetil-nasr" û ankû ´dewleta şam a îslam´ û hwd, ew kavilkiirin li kurdistanê kirin. Ev komikên kurd, ên ku ev gotin digotin jî, bi van komên ku hêrîşî kurdan dikirin re tevgerîyan û wan jî, bi dehan ciwanên kurd qatil kirin. Destê wan ketîya xwûna ciwanên kurd de.

Gotinên ku ew dikin jî, hemû jî, gotinên rejima îranê ên li dijî kurdan û ên rejima tirk ku li dijî kurdan gotina na. Yanî, bi tememî, di temenê dijberîya kurdan de gotinên ku hatina gotin in. Ew jî, weke ´papagan´an wan gotinan dûbare dikin. Tiştekî nû, nayênina ser ziman.

Kurdan, li rojavayê kurdistanê, bi dirişm û felsefeya xwe, gotin ku "em rêya sêyemin in." Bi vê gotinê, gotin ku "em ne li aliyê rejimê baasê a esad in û ne jî li aliyê muxalefeta ku şerê desthilatdarîyê dide û hebûna kurdan herê neke na." BI vê rengî, weke rê û hêzeka sêyemin, derketina li holê. Bi wê re jî, î ro, pêşketina xwe dikin. Lê hemû hêzên ku ji pêşketina kurdan aciz in, gotina dijber li dijî wê rewşa kurdan dibêjin. Ev komikên kurd jî, bi gotina van hêzên dijber, gotinên xwe diafirênin û dibêjin. Minaq, tirkiya çi gotinê, di temenê dijberîya pêşketina rojavayê kurdistanê de bibêje, winê roja din di devê van komikên kurd de ku weke papagan´ dûbare dikin bibînin û bihîzin. Di temenê gotinên wan de, mirov ti felsefe û ahlaqên civatî nabînê. Ji bo pêşketina civate kurd, win ti gotinê bi başî di nava gotinên ên ku dibêjin de nabînin. Hertimî, çendî ku gotinê dibêjin hêrîş dikin. Lê ev hêrîşkirinên wan jî, ji ber ku bêahlaq û felsefe na ji aliyê sîyesî ve, ku gotinên rejima tirk dijber bin, ên van jî dijber in. Ku baş bin, wê

gotinên van jî baş bin. Yanî, bi serê xwe, ew ne xwediyê hizrekê û têgihiştinê û felsefeyekê na.

Kurdên ku qaşo weke ´rexneyekê´ dibêjin ku "PYD´ê, bi hevpaymanî bi esad re çêkirîya û êdî li gorî herêmên kurdan teslîmî PYD´ê hatina kirin", di xwestin ku esad şerekî bi tank û topan bi kurdan re bikira ku bi hezaran ciwanên wan bihata qatil kirin.`? Wê hingî, dilê wan xweş bûba? Wê hingî, ya ku wan dixwest biheta li cih.? .. Gotinaka din jî, tê gotin. Ew jî, ew a ku "Artişa rejima Esad, bi tank û topên xwe û artişa hêrîşî nekê û bi hezaran, ciwanên kurd nakujê, ji ber ku levkirin di nava wan de heya. Yanî, kengî ku Esad, artişa rakir û bi sadan û hezaran ciwanên kurd qatil kir, hingî, wê li gorî wan rast bê. Wekî din jî, tê gotin ku "PYD´ û rejima Esad levkirin di nava wan de heya. Ji ber vê yekê, bi hevdû re şernakin." Yanî, ev dordor, ji ber çi wilqasî zêde dixwezin ku kurd bikevina şerekî bi rejimê re ku bi hezaran ciwanên kurd di wî şerî de werina kuştin û ankû ji aliyê din wê ew qas mirov werina kuştin. Ku rêyên danûstandinê hebin û bi wan rêyên danûstandinê ku derfet hebe ku pirsgirêk, werina çareser kirin, wê çima şer were kirin. Şer, dema ku rêyên sîyesetê, hemû hatina xitimandin û êdî ku derfetê xwe hanîna ser ziman nema û ku hêrîş li hebûna te ya civatî û keseyetî bûn, hingî, di temenê ´xwe parastina cewherî de, ti wê dike." Ji bo ku şer were kirin, şer nayê kirin. Divê ku ev rastî were ditin û kirin. Li vir, tevgera azadîya kurd, li Sûrî jî, Li Îranê, û Li tirkiya jî, hertimî xwestîya ku pirsgirêk bi ryên danûstandinê were çareser kirin, da qana xwûna ti ciwanên kurd û ankû ên ji xalkên din ku arab bin, faris bin û ankû tirk bin ne rijihê. Li vir, ev nêzîkatîya tevgera azadîya kurd ya bi mirovatî, di temenê felsefeya wê ya ahlaqî, mirovî û civatî de ya.

Li Bakûrê kurdistanê jî, tevgera kurd, hertimî gotîya ku "ji ber ku derfetê xwe hanîna ser ziman ji me re nebû û hêrîş li ser civate kurd hebûn, şer dest pê kir." Ev rast bû. Tevgera kurd, ne tevgereka ku tenê bo şer ava bûya. Armanca tevgera kurd, ew a ku civate kurd, bi nirxên wê re biparêzê. Bi vê felsefeyê, li rojavayê kurdistanê jî tevgerîna wê bûya. Tevgera kurd, hertimî, bi vîna xwe û ya gelê kurd tevgerîya ya. Derneketîya dervî wê. Li gorî rastî û ahlaqê civatê, hertimî ya rast, hem bo kurdan û hem jî gelên din xwestîya.

Divê ku em vê jî bibêjin ku çend ku rejima esad, li dijî kurdan suc kiribin di demên berê de, di vê demê de rejima esad, biqasî wan komên çete ku hin komikên kurd ên weke ´el-partî´ û ankû ´azadî´ ku di nav de na, kurd ne kuştiya. Di vê demê de, bi destê van komên çete, bi sadan malbatên kurd hatina qatil kirin. Herwusa, divê ku em vê jî binxatkin û bibêjin ku van komên çete ku ev komîkên kurd jî di nav wan de bûna, derketîna minareyên mizgeftan û di mizgeftan de bakirina û gotina ku "kuştina kurdan, helal a.", "destavêtina jin, mal û canê kurdan helal a." Nûha, dema ku em hinekî jî bahse ahlaqê sîyesî û civatî bikin divê ku em bibêjin ku divîyabû ku ev komikên kurd, dema ku van koman kuştina kurdan "helal" kir, hingî divîyabû ku li ber helwest bidan nîşandin. Ya rast û civatî ev bû. Ji bo ku mirovek li ber van gotinên ku bi wan "kuştina kurdan helal" kir, helwestê bide nîşandin, hewce nakê ku tenê kurd jî bê, tenê ku mirov bê û hinekî mirovatî pêre hebe, bes û têr a. Ji xwe, ku em tenê di çerçoveya van gotinan de jî şîrove bikin, ku kurd bin û piştî van gotinan hê di nava wan komên di bin navê artişa Azad û hwd de bin, divê ku ne î ro û ne jî siba gotina mirovatîyê´ û ya kurd´, ne hildina ser ziman. Ku hildin jî, wê tenê bê bêahlaqî û bêşerefîya wan. Lê ka, bibêjin, ev komikên kurd, ev mirovatî jî bi wan re hebû? Piştî ku wan komikan ku hêrîşî kurdan

kirin û destavêtina jin û malên kurdan û hê jî ku li ber kurdan şer dikin û herêmên wan kavil kirin û kirina harabê, ku ev kurd hê di nava wan de bin, divê ku bahse mirovatîyê nekin û gotina ´mirovatîyê´ jî ne î ro û ne jî siba bi lêv bikin. Ji xwe ku bi lêv bikin jî, wê ji aliyê felsefeya ahlaqî ya civate kurd ve, wê ne rast bê. Ji xwe, felsefeya ahlaqî ya civate kurd, vê rewşa van komikên kurd jî şermazar dike. ..

Di çerçoveya ahlaqê civatî de, dema ku em li rewşê binerin, felsefeya ahlaqî, rastîyê û mirovatiy pêşnîyar dike. Ku hêrîş li rûmet û ahlaqê civatê hebe, hingî, berpirsîyarî dikeve ser milê her kurdî û ankû her mirovê ku dibêji ´ez mirov im´ de ku li ber wê bisekinê. Î ro, li jîyan, ahlaq û mirovatîya civate kurd hêrîş hatina kirin. MInaq, kuştina kurdan hat "helal" kirin. Li ber vê ´helal´kirina kuştina kurdan, ku ew kurd bin û li ber wê bêdeng bin, ne kurd û ne jî mirov in. Ku mirov bin û ji civateka din jî bin, ji aliyê ahlaqî, mirovî û her wusa parastina mafê mirovan ve, li milê wan dikeve ku li ber vê helal´kirina kuştina kurdan bihelwest bin. Di ahlaqê ti civatê de, meşrû û rast dîtina kuştina mirovên ji civatekê tûna ya. Dema ku navê kêmnetewî(etnîkî) ê civatê were bikarhanîn û bahse mirovên wê civatê were kirin û kuştina wan were "helal" kirin, ew dibe jenosîd." Yanî, li wir, hebûna civatekê, armanc tê girtin. Ji xwe, li vir, wê helalkirina kuştina kurda jî, hebûna civate kurd armanc hatîya girtin. Gotina "kurd", navê civatekê ya ku xwediyê dîrok, çand, nirxên xwe yên civatî ên din û hwd a. Dema ku gotina "kurd" hat bikarhanîn û hat gotin ku ""kuştina kurdan helal a"", hingî, tû wê civatê û andamên wê armanc digirê. Ji xwe, bi wê gotinê, hebûna civate kurd armanc hat girtin. Ku navê civatekê ê kêmnetewî(etnîkî) were bikarhanîn û kuştina andamên wê were "helal" kirin, ew civat, tê armanc kirin û tê xwetin ku ew were ji holê rakirin. Di çerçoveya "kuştina kurdan helal a" de, dema ku em bihizirin, emê bînin ku helal kiirna ´kuştina´ andamên civate kurd hemû bi vê gotinê hatîya "helal" kirin. Yanî, kî ji xwe re bêje "ez kurd im", ew kuştina wî "helal" a. Rewşa, dihê vê rewşê.

Li rojavayê kurdistanê, kurdên bi rûmet hemûyan, di bin navê YPG´ê de bin û ankû di bin navê PYD´ê û hwd de bin, li ber wê ´helal´kirina kuştina kurdan, li berxwedana û biserkevtina. Di aslê xwe de, ev serkevtina YPG´ê, serkevtinaka ahlaqî û mirovî jî ya. Dema ku em ji aliyê felsefîkî ve li serkevtina YPG´ê hwd binerin, emê serkevtina wê di temenê parastina nirxên civatî ên civate kurd de, weke serkevtina ahlaqî û felsefîkî bibînin. .. Ji ber ku li ber vê zihniyeta ku gotina "kurd" bikardihêne û dibêje ku "kuştina kurdan helal a" biserketîya. Ev serkevtin,, li vir, dibe serkevtineka mirovatiyê ya biahlaqî û pîroz jî di temenê parastina hebûna civatî de.

Î ro, bahse rûmetê bêkirin, wê navê YPG´ê were bîra her kurdî li rojavayê kurdistanê û li beşên din ên kurdistanê. Ji ber ku ya ku bi rûmetî rûmeta gelê kurd li ber van çeteyan parast, ew bû.

Li rojavayê kurdistanê, kurdan gotin em "rêya sêyemin di hilbijêrên". Wate wê, rêya sêyemin jî, ew bû ku wê ne li aligirê rejimê bin û bo wê bikina şer de û ne jî bi sîyesetê wê bikin. Her wusa, bi heman rengî wê ne aligirên komên çekdar ku di bin navê ´artişa Azad´ de civîyan û piştre hêrîş kurdan û jîyane wan jî kirin bin. Ji ber ku azadî, demokrasî û parastina mafê mirovan bi hevdû alîyan re jî nebû. Hêzên ku li dijî rejima esad ketina şer de di bin navê ´hêzên muxalif˝ de, ne şerê azadîyê kirin. Şerê desthiilatdarîyê kirin. Şerê xwe kirina desthilatdarîyê kirin. Kurdan, nexwestin ku bibina aligirê wî şerê desthilatdarîyê. Ku kurdan, li aliyê komên di bin navê ´hêzên muxalif´ de jî cihgirtiba wê bûba aligerê şerê desthilatdarîyê û ku li aliyê rejimê jî cihgirtiba, wê

bûba aligirê şerê desthilatdarîyê. Di wê de jî, wê bi tememî civate kurd windakiriba. Ji ber vê yekê, weke ´rêya sêyemin´ helwesta xwe kifşkirin, bo kurdan bû nêzîkatîya kurdî ya dîrokî.

Î ro, ên ku vê rewşa kurdan a tevlî şerê desthilatdarîyê ê rejimê û ´komên muxalif´ nebûya, ku vê weke "hevkarîyê" şîrove dikin jî, ne ji nezanîya wan bê, bi zanebûnî ew dijminatîyaka dîrokî li dijî pêşketina civate kurd dikin. Tenê ku em hijmara komkujiyên kurdan ên ku bidestê wan komên qaşo ´komên muxalif´ hatina, wê ji yên ku bidestê hêzên rejimê hatina kirin wê ji wan zêdetir bin. Lê rejimê jî, bi kurdan re şer dikir.Rejimê, ji aliyekî ve li kurdan dixist û komên muxalîif ên çete jî, ji aliyekî din ve hêrîşî kurdan û herêmên wan dikirin. Lîsteya mirovên kurd ên ku bidestê van komên muxalif û ên ku di bin avê olê û hwd de, ku dibin reng û navê ´artişa Azad´ û hwd bi rêxistin bûna, ku were derxistin, wê bigihijê asta helepçeyeka nû ku hatî serê kurdan. Lê pirr bêşerefî û bêrûmetî ya ku ev kurdên li wê aliyê na û ku hê bahse tevlîbûna wan koman dikin. Cihê, vê nêzîkatîyê bi rastî, di ti felsefeyên ahlaqî û olî de tûna ya. Ku Fuche û maqyawellî jîya ba, wê gotiba, ´win bahse bêahlaqîya min dikin, lê ka li ya van binerin.´ Yanî, rewşa van kurdên di nava wan komên artişa Azad û hwd de na, ji aliyê ahlaqî ve ji ya ji maqyawellî jî û fuche jî xirabtira û bêahlaqtira.

Esad, tişta ku li dijî kurdan û xalkên kiriîya wê, ew weke mijareka biserê xwe divê were hildan li dest. Lê ev dordorên kurd jî, weke ku aczin, ku ka çima esad hêzeka xwe li dijî kurdan jî bikarnehanî û bi hezaran ciwanên kurd ne kuşt. Ji xwe bikardihêne jî. Li taxên kurdan ên li helebê ên ´şêx maqsûd" û ´eşrefîya´ hwd, bikardihêne. Topbaranê li navenda afrîn, qamişlo û kobanê dike. Lê li vir, em vê gotinê jî binxatkin û bibêjin ku weke komên çete ên dibin navê "artişa Azad" de ku levgihiştina hevdû, biqasî ku wan herêmên kurdan kavilkiirina û kurd kuştina, wilqasî rejima esad di vê demê de kurd ne kuştina. Divê ku em vê yekê jî, binxatkin û bibêjin. Ev komên çete ku ji rejima esad a baasê zêdetir herêmên kurdan, kavil kirin û ciwanên kurdan qatil kirin, î ro ev komikên kurd ku dibêjin "bi rejima esad re levkirina û destdanîna li ser herêmên kurdan", ku vê gotinê weke sucekê dihênin ser ziman, bi wan komên çete ên ku komkujiyan li dijî kurdan dikin re tevdigerihin. Ji aliyê ahlaqî û mirovî ve ku mirov li mijarê binerê, ku bêje ´ez ji civate kurd im´ û tu herê û bi wan komên çete ên ku kurdan qatil kirin û dibêjin "kuştina kurdan helal a" û "destavêtina jinên kurd helal a" tevbigerihê, wî çaxî, ne ti dikarê bêje ´ez kurd im´ û ne jî ti dikarê bêje ez mirov im.Ji aliyê felsefeya mirovatiyê û felsefeya ahlaqê ve, ti nikarê vê yekê bibêje. Lê wekî din ku ti bêje, hingî ti dibe dirû û bênamûs û bêahlaq´ li gorî ahlaqê civate kurd.

Ji xwe, dema ku kurdan gotin ku "em rêya sêyemin" in, hingî, di serî de, rejima tirk hêrîşî wan kir. Ji ber ku ne dixwestin ku hebûna kurdan cûda were li berçav. Bi wê yekê, bi navê ´civate kurd´, ne dixwestin ku ti gotin werina kirin û ti pêşketin bibin. Dema ku kurdan bahse ´rêya sêyemin´ kirin, hingî, kurdan, rewşa xwe ya civate di navaroka wê gotina ´rêya sêyemin´ de hanîn ser ziman. Bi wê yekê re, hanîn ser ziman ku ew civatek in û xwedî dîrok, ziman û çand in. Bi wê re, xwestin ku li herêmên xwe, bi navê civate xwe, rêveberîya xwe ya xweser ava bikin. Bi vê yekê, êdî kurd rastî hêrîşê hatin. Di aslê xwe de, bi destê wan komên çete ku ev dordorên kurd jî di nav de bûn, dema ku bidest hêrîşê li civate kurd kirin, di aslê xwe de hêrîş li wê xate kurdan ya ku bi navê ´rêya sêyemin´ hanîbûn ser ziman dihat kirin. Yanî, ne dihat xwestin ku kurd, bi navê xwe xwediyê ti statûyê bin. Dema ku hin rayadarên tirk, derdiketin ber

çapameniyê û digotin ku "em ne li dijî kurdan ku mafên xwe bidest bixin" jî, ne rast digotin. Ev gotin, bo ku çend kurdan bikişênina rex xwe bikardihênin. Li bakûrê kurdistanê jî, di serî de T. Ardogan, dema ku devê xwe divekê, dibêje ku "birayê minê kurd", lê yê ku zimanê kurdî qadaxa kirî û astangî danî pêşîya perwerdeya bi zimanê kurdî ew bixwe ya. Yanî, ti farqê wê gotina ku bo rojavayê kurdistanê digotin ku "em ne li dijî kurdan ku mafên xwe bidest bixin" û ya T. Ardogan û rayadarên din ên tirk ya bi rengê "birayê min ê kurd" weke hevdû na. Di temenekê de, dihên gotin. Bi wê gotina ´birayê min ê kurd´, dixwezin ku dengê kurdên bakûr bibirrin. BI gotina "em ne li dijî kurdan ku mafên xwe bidest bixin" jî, dixwezin ku çend kurdan bi wê gotinê bixapênin û dibin navê "artişa Azad" de bê û ankû di nava wan çeteyên din ên weke ´cebetil-nasr´ û ankû ´dewleta şam a îslamê´ de li dijî kurdan bidina şer kirin. ..

Ev komikên ku di bin navê "ENKS" û hwd de, hatina civandin jî, yek jî ji wan, ne xwediyê vîn(îrede) û hizreka sîyesî bo civate kurd in. Ew li gorî, gotinên ku rejima tirk bixwe gotî û ankû çend gotinên ku li ser rêveberîya başûr re gotî re tevdigerihin. Sîyesetmeder, ew a ku li ser navê civate xwe xwediyê hizrekê û çareserîyeka civatî bê û ku wê bêne ser ziman. .. MInaq, dema ku ez bixwezin li vir, bi çend gotinan, ´çareserîya´ van komikan werênima ser ziman, ezê nikaribim, ti çareserîyê ji wan bibînim. Ji ber ku ti çareserîya wan ya bi serê xwe ku pêşxistin tûna ya.

Bo pêşketinaka civatî, cihan, hewldide ku hêzên leşkerî ji jîyane xwe derxe, ev komik jî dixwezin ku hêzên xwe yên leşkerî ên piçûk biafirênin û bi wan zorê bidina gel ku li gorî wan bike. Di nava rewşên leşkerî de, jîyane civatî nayê pêşxistin. Ji xwe ne bi derfet a jî. Tevî ku rojava, ne buhurê li çar milyonan jî, dixwezin ku çend hêzan ava bikin. Yanî, bajar bi bajar di nava xwe de parve bikin. Bi wî rengî, tîranîya xwe ava biikin. Ew bêje, ev bajar ê min, ê din bêje nav ev bajar ê min, û hwd. BI vî rengî, bikevina şerê hevdû de. Ji xwe, metodeka ji baştir tûna ya ku bi wê jîyane civatî were tûna kirin. Yên ku van hizran pêş dixin, ti carî li wê pêşketina jîyane civatî ne hizirin. Ew, di pişt mejiyê wan de, têkbirina jîyane civatî ya rojavayê kurdistanê heya.

**- Di vê demê de, hê zêdetir bidest bikarhanîna olê li dijî kurdan hatkirin.** Pirsgirêka kurd, li rojhilat hin bi hin hebûn û bandûra wê zêdetir dihê hîskirin. Hêz û desthilatdarîyên li herêmê jî, vê yekê hîs dikin. Bo vê yekê, êdî ol weke astangkirinekê û ankû weke metodeke pêşîlêgirtinê dihê bikarhanîn. Wusa xuya dike ku wê ev mijare olê û nêzîkatîyên li ser olê re ku hin bi hin hem tirkiya û hem jî Îran ku li dijî kurdan pêş dixe, wê di rojên pêş de zêdetir bikevina rojeve me de. ..

Piştî hêrîşên komên çekdar ên li şoreşa rojavayê kurdistanê re, nîqaşên li ser "´cebetil- nasr" û ankû "el-kaîde´ re nîqaşkirin hatina kirin. Her wusa, bi ´el-kaîde´ re nîqaş bûn. Lê wusa xuya dike ku ev weke politikayekê ku li ser olê re lê ku ne tenê dewletek, lê hemû dewletên ku pirsgirêka wan ya bi kurd re heya ku hemû jî di nav de na, di çerçeveya wê politikayê de êdî bidest leyistinê dikin. Piştî ku şerên komên çete ên ku olê ji xwe re weke maske bikardihênin û hêrîşî kurdên rojavayê dikin û pê de, li rojhilatê kurdistanê li bajarên kurdan ên weke Kirmaşanê, Ûrmîyê û hwd, "komên selefî" rûdan. Ev jî, hin bi hin weke komna çekdar dihên birêxistin û dihên derxistin li ber civate kurd. Yanî, rewşa ku li Somalî, û hwd, ku li hemû welatên afrîqa hatina pêşxistin û hwd, dihê xwestin ku li kurdistanê were pêşxistin. Bi teybetî, ev lîstik jî, li ser ciwanên kurd û bawerîya wan re dihê leyistin.

Yekî ku demgrafîya civate kurd bizanibê, wê bizanibê ku ji aliyê olî ve pirr-

rengîyeka wê heya. Kurdên, yarsan hena. Kurdên êzîdî hena. Kurdên Zerdeştî hena. Kurdên ku ji mezhebên cuda ên îslemê hena. Kurdên elewî hena, û hwd. Dema ku rewşa demografîya civate kurd bi vî rengî bê, ku li ser olê re herê bi ser civate kurd ve, bi tememî wê civate têk bibe. Wê li ser navê civatîtîyê ti tiştekî li holê nehêle. Bi wê re jî, ne tekoşîna çekdarî, lê tekoşîna li ser têgihiştinê re tenê û tenê dikarê pêşîya vê tûnakirin û têkbirina civatî bide girtin.

Li vir, xaterîya herî mazin, wusa dihê ditin ku li ser olê re dihê derxistin li ber kurdan. Di vê temenê de, li ser komên civatê ên ku bawerîya wan ji hevdû cûdaya, ku bi wê leyîstina li ser mezheban û hwd bê, ku bênina ser hevdû û êdî ku karibin bi hevdû re bidina şer kirin. Ji xwe, Li Îraqê, weke ku lingê vê lîstikê hatîya xistin li merîyetê. Hêrîşên ku di van rojên dawiyê de li kurdên şebekî zêdebûna, hinekî jî, divê ku mirov ji vî aliyê ve jî lê binerê û bixwêne. Îran, çend ku bi rejima xwe re weke rejimeka Şîî´ya jî, ku mijar dibê kurd, dikarê destûrê bide komên ´selefî´ ku li bajarên kurdistanê bi rehetî xwe bi rêxistin bikin. Ev komên ku li van herêmên rojhilatê kurdistanê êdî hin bi hin xwe didina dîyar kirin û derdikevin, ji komên din ên mezhebî na.

Di nava kurdan de û bi teybetî di nava kurdên rojhilatê kurdistanê de, hewldanên bicihkirina ´komên selefîyan´, weke lingekî vê lîstîkê ê pirr biqirêt û bi bêahlaq ê ku li dijî civate kurdan dihê leyistin a. Bi teybetî jî, li herêmên kirmaşanê bicihkirina wan û xwe nîşandane komên selefî, weke lingê lîstikê herî xaternak a. Herêma kirmaşanê, li wir, bi teybetî, pirranîya kurdên vê herêmê, yarsanî, şebekî, hinekî jî feylî û hwd in. Yanî, ev kom, li başûrê kurdistanê û li herêmên Îraqê bixwe jî ku ji ber rengê bawerîya xwe û hebûna xwe ku rastî hêrîşê tên in. Vêca, nûha li vê herêmê, hewldanên rejima Îranê ên bicihkirna komên selefî li vê herêmê, bi tememî ku bi armanca şerekî di nava komên civatî û bawerî ên girêdayî civate kurd de bide pêşxistin a. Li Herêmên rojhilatê kurdistanê ên weke kirmaşanê û hwd, çi temenê selefîyan û hwd, tûna ya. hewldanên hanîna van koman, bi tememî bi armanca derxistina şerekî navxweyî di nava civate kurd de ya. Ji bo vê jî ol, dihê bikarhanîn. Ji ber vê yekê, divê ku em bi teybetî binxat bikin ku ev lîstika qirêt hemû beşên civate kurd û hem jî rayagiştî a cihanê li ber wê hişyar bê.

Li vir, bi teybetî li rojhilatê kurdistanê ku rejima Îranê bi van lîstikên weke ku li ser komên selefî re li dijî civate kurd dileyizê, wê bi wê re temenekî pirr mazin ên xaternak bo civate kurd û rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê jî û beşên cdin ên civatî ên kurdistanê biafirê. Ji ber vê yekê, ev mijare olê divê ku pirr li ser were sekin û fahm kirin. Di nava rewşenbîrên kurd bixwe de jî, di vê warê de ti zanînaka mazin û li berçav ku pêşketî tûna ya.

Îran bixwe, di dema ku bahse "gavavêtinan di nava xwe de" dike, di heman demê de komên tundrew ên olî li rojhlatê kurdistanê bicih dike. Ev komên tundrew û lîstika ku li ser wan re li rojhilatê kurdistanê dihê leyistin, bi wê hewl dihê dayin ku hem temen û ´dîmanîkîya´ civate kurd ji holê ra bike û her wusa bi wê re jî, civate kurd bike nava pirsgirêkên navxweyî de ku bi salan bi wê ve meşkul bibin. Ev rewş û zihniyet, bi teybetî, di temenê wê de ´înkare kurdan´ û ´dijberîya li dijî statûya kurdan´ heya.

Di temenê vê de Îran, weke ku pêşengtîyekê li ser olê re li dijî kurdan ji vê rewşê re dike. Îran, divê ku tenezûl jî neke ku serî li rêbazên bi vî rengî ên qirêt bixe. Ev, ne rast a. Ev rewş, bi vî rengî ku were pêşxistin, we bê xîyaneteka mazin ya dîrokî li dijî kurdan û wê dîroka wan ya bi îranê re.

Ji ber vê yekê, divê ku em bi teybetî bibêjin ku heta nûha zêde hêrîş li nirxên civatî ên

li kurdên rojhilatê kurdistanê bûna. Lê ev rengê çûyîna bi ser kurdan de bi destê komên selefî, hêrîşa herî qirêt û bi bêahlaqî ya. Armanca bi vê rengê çûyîna bi ser civate kurd de, armanc ew a ku hemû ´dînamîkên´ civate kurd ji hevdû bifelişênin. Hinekî jî, stretejîya bi vî rengî ya li ser komên tundrew re ku li dijî kurdan hin bi hin dihê pêşxistin bi destê Îranê, tirkiya û hwd, armanca wê hebûna civatî ya civate kurd a. Bi wê, diçina bi ser kurdan de ku civate ji hevdû felîşênin. Ev rewş, ne rewşên ji rêzê na. Kurd jî, divê ku weke rewşna ji rêzê li wan ne nerin û ji rêzê ne hasibênin. Rengê hêrîşê, ku li ser komên tundrew ên olî re ku civatekê werina kirin, wê ancamên wê ji ya kirina şerekî cihanî zêdetir û maztir bin bo civatekê. Vêca ku ev di dem û serdemeke ku di wê de zanîn û zanist pêşketîya de bê, wê ancamên wê di asta tûnakirinê de bin. Yanî, ev rêbaz, dikarê jenosîda çandî, têgihiştin, fizîkî û hwd,, hemû rengên jenosîde bi hevdû re bide kirin. Di vê temenê de, divê ku ol, weke mijareka teybet ku bandûra wê di her demê de li pêşaroja civatekê dihê kirin lê were nerîn û di vê temenê de bergir(tedbîr)ên parastina civatî werina girtin. Bi wan bergiran re, wê pêşketina olê jî di xateka rast de xwe bide domandin. Bi vê rengê, komên tundrew, weke çekeke li dijî nirxên civatî û pêşketinên civatî ên civate li herêmê dihê bikarhanîn jî, wê nêvî bi nêvî were vala derxistin.

Kurd, bi bawerîya xwe re ji dil in. Ev ku kurdên êzîdî bin, kurdên yarsanî bin, kurdên ji mezheb û olên din jî bin, wusa ya. Yanî gelek bawerî û olên cûda ên kurdan di nava kurdan de hena. Divê ku rêz û hûrmet ji wan re were girtin. Ev rêz, divê ku di temenê têgihiştineka demokratikî de, were pêşxistin û têgihiştin û ser ziman. Ji xwe, di olan û bawerîyan de jî, dijbarîya li hevdû û li dijî hevdû tûna ya. Lê, rejimên herêmê, heta roja me, li ser mezheban re bê û her wusa li ser olan û hebûna olan û hwd re bê, ew dijberî pêşxistin û kirina temenê şerên wan komên tudnrew ku bi civatan re û di nava wan de dibe.

Di aslê xwe de, cihê gotina "tundrewîyê" di olan de tûna ya. Di temenê wê tûndrewîya ku "bi navê olê" dihê ser ziman de, ne ol heya. Di temenê wê tundrewîyê de, birdozîyên nîjadperest ên rejimên herêmê ên ku pêşxistina heya. Di hemû olan de jî, ku ev êzîdîtî bê, cihûtî bê, filehî û ankû mesîhî bê, Misilmantî bê û hwd, di wan de kuştina mirovan qadaxa ya. Li gorî nirxên wan ên pîroz, parastina jîyane û nirxên wê û rêzgirtina ji jîyanê re û hwd, gotin hatina kirin. Bi teybetî, ev her çar olên mazin û dîrokî ên yek-xwûdayî, li ser esasê parastina wijdan û mafê mirovan pêşketina. Bi vê re jî, bi çi şêwayê bê, kuştina mirovan di wan de qadaxa ya û hatîya şermazar kirin.

Li dijî hevdû, ew hêsta komên bawerî ya olî dihê bikarhanîn. Berî şerê cihanê ê yekemin, ol li dijî pêşketina civate kurd hat bikarhanîn. Kurdan, ew pêvajoyên ku li ser olê re hatina bi ser wan de bi gelek zireran buhurandin. Î ro jî, weke ku bi regna din, ew pêvajo dihê xwestin ku werê pêşxistin. Bi teybetî, piştî şoreşa rojavayê kurdistanê re, li her çar beşen kurdistanê, li başûr jî, li bakûr jî, li rojhilat jî û her wusa li rojava jî, rêxistinkirinên ku ji nava kurdan û li ser olê re dihên pêşxistin. Ev jî, giring in ku divê ku werina ditin û mirov bi teybetî li ser wan bisekinê na. ..

Kurd, bo ku serdestîya wan li hêst û bawerîya wan ya naxweyî hebe, hem zanebûneka mazin bi têgihiştinê ji wan re pêwîstî pê ku hebe û hem jî rêxistinîyeka olî ku weke "şûraya kurdistanî ya olî" û hwd, pêwîstî pê ku hebe. Ev şûrayê bi vî rengî, divê ku di temenê rêz û hûrmete ku ji hemû bawerîyên li kurdistanê ku ji hevdû cûda re bigrê û ya rastî çîya wê werênê ser ziman. Divê ku ji hemû bawerîyan di nava wê

´şûrayê´ de cihbigrin. Di vê temenê de, weke şûrayaka olî ya kurdîstanî bê. Di vê temenê de, karekî pirr mazin ên rewşenbîrî jî divê ku were kirin. Ji ber ku pêwîstî bi fahmkirin û têgihiştinaka pirr mazin jî heya. Rewş û lîstikên ku li ser olê re ku dihên leyistin, bi şerkirina li dijî wê re ji holê ranabin. Vajî wê, tekoşîna çekdarî, weke ku li Afganîstanê û hwd ku dihê dîtin, wan xorttir dike. Bo vê yekê, pirr giring a ku li ser zanebûnê û rastî û rastteqînîyan re pêvajoyên tekoşîna têgihiştin û zihniyetê were pêşxistin û dayîna fahm kirinê were pêşxistin. Ev yek, di aslê xwe de, di derbarê olê de jî fahmkirinaka rast û baş wê bide çê kirin. Dema ku mirovan rastî dît û fahm kir, êdî ew bixwe wê li dijî wan xaletîyên rejimên herêmê ku bi zanebûn li dijî gelan û di nava gelan de dihên pêşdixin wê bisekin in. Bo vê yekê jî, rêxistinîyek li ser têgihiştin û zanebûnê re pêwîsta. Civatekê ku xwe li ser zanîn û têgihiştinê re bi rêxistin kirî, wê hingî, hemû pirsgirêkên xwe bixwe bi rêyên rast û zû çareser bike.

Î ro kurd, li ser têgihiştin û zanebûna xwe re, xwe bi rêxistin kirina. Lê bisazîbûna kirina wê rêxistiniyê, lawaz û kêm a. Dema ku lingên piretîkî ên rêxistiniyê hatina pêşxistin, wê hingî, pêşîya xaterîyên li pêşîya pêşketina civate jî werina girtin. Ev yek, ne tenê bo demekê her wusa bo hemû deman wusa ya û di buhurê.

Di vê temenê de, li rojhilatê kurdistanê, divê ku mirov bibêje ku ji aliyê rêxistin kirinê ve di van waran de hinekî kêmesîyên wê hena. Ev kom û bi giştî jî rejim, ji wan sûd digirê û wan di temenê dijberîya civate kurd de li gorî xwe didagirê û bikardihêne. Ev yek, dihê ditin. Bo vê yekê, zanebûn û rêxistinî, giring a ku were pêşxistin. Bi teybetî, di vê demê de, divê ku mirov hey û bale xwe hinekî zêdetir bike li ser rojhilatê kurdistanê. Ji ber ku di demê de, weke wê lîstika li ser komên tundrew ku li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan rejima tirk leyist û ew li dijî kurdan dane çêkirin û şer kirin, bi heman rengî, nûha jî, Îran li ser ´komên selefî´ re dike û dixwezê ku li rojhiilatê kurdistanê pêş bixe li dijî civate kurd li wê herêmê. Kurdên rojhilatê kurdistanê, şîî jî, di nava wan de hena. Yarsanî jî di nava wan de hena. Kurdên ola kevnar ya civate kurd ya êzîdîtîyê jî hena. Her wusa, ji gelek rengên din ên olî û bawerî hena. Ku rewş ev bê û ku hewldanên pêşxistina komên tundrew ji nava civate kurd were pêşxistin, wê hingî ew bi tememî civate kurd ji navika wê ve tûna bike. Di wê temenê de, bi pêşxistina komên tundrew re ol, dikeve xizmeta tûnakirina civat û nirxên wê de.

Li Tirkiya jî ev bû. Minaq hanîna komên civatî ên ku bawerîyan wan ji hevdû cuda ya, di wê dema ku kurdan li bakûrê kurdistanê li Amede ´konfaranse bawerîyên kurdistanî´ ku li dar dixist û ku T. Ardogan derdikeve berçapameniyê û gotinên dijber ên qirêt li dijî ola kurdan ya kurdên êzîdî dibêje ya. Di wê demê de, hinek şîrovekirin û bertek bûn. Lê kêm man. Li ser rengê bawerîya kurdên misilman re gotinê ku li dijî bawerîya kurdên êzîdî û Zerdeştî bibêje, li ser bawerîya kurdên elewî re bi heman rengî li dijî sûnnîyan re gotin dayîn gotin, bi redkirina cihê pîroz ê olî ê elewiyan a cem´ê û li ser wê re nîqaşên dijber bide pêşxistin û hwd, hinek ji wan rêbazên ku di farqê de bin û ne di farqê de bin, ên ku dihên pêşxistin in.

Minaq, li bakûrê kurdistanê ev rewş di van rojên dawiyê de pirr baş hat ditin. Li ser fethullahçîyan re, qaşo projeyek bi navê "cem-camî-male xwarinê" li cem hevdû, ku kurdên elewî bimafî bertekên xwe dane nîşandin, piştre li ser çapameniyê re, weke ku ew bertek li dijî mezhebê sûnnî hatibê kirin, xwestin ku întibayekê bidina çê kirin. Lê ev ne rast bû. Ne pirsgirêka elewîyan bi sûnnîyan re heya. Û ne jî, pirsgirêka sûnnîyan bi elewîyan re heya. Lê dewlet, bi politikayên xwe ên bi vî rengî pêşdixe. Mixabin ku ji

oldarên sûnnîyan bin û ankû ji hin oldarên elewîyan bixwe jî bin, ên ku dibina amûrên wan lîstikên ku li ser olê re ku li dijî civatê dihên leyistin.

Pirsgirêka bawerîyan bi hevdû re tûna ya. Lê pirsgirêka rejimê û zihniyeta wê bi wan re heya. Ji ber ku dixwezê ku wan li gorî xwe bide rastkirin û dîzaynkirin. Gotinên rayadarên dewleta tirk ku bi devê oldarên misilman li dijî bawerîya kurdên êzîdî û Zerdeştîyan dihat dayîn gotin, weke wê lîstika li ser olê re ku di nava kurdên elewî û sûnnî de dileyizê ya. Yanî, zihniyeta di temenê wan de yek a. Ev rewş, li rojhilatê kurdistanê jî di van demên dawiyê de dihê leyîstin. Berî vê demê, bi çend rojan, ku li kirmaşanê mamosteyekî gotinên qirêt ji bawerîya kurdên yarsanî re gotibû û du ciwanên wan ev ranekiribûn û xwe şawitandibûn jî, hinekî weke listikeka li ser olê re ku di temenê vê zihniyetê de ku divê ku mirov fahm bike ya. Komên civatî, li ser olê re dihên li ber hevdû û dijberî di nava wan de dihê pêşxistin. Her wusa, li ser ziman re jî, ev rewş dihê pêşxistin. Minaq, li bakûrê kurdistanê, ku rejima tirk xwest ku di nava kurdên kurmanc û ên zaza de pêş bixe, ji kurdên zaza re got "win ne kurd in, win zaza na." He wusa heman gotin ji kurdên din re jî xwest ku bi lêv bike. Çend ku di vê politikaya xwe de bi serneket jî, bi destê hin kurdên ji zaza bin û hin kurdên ku ne zaza na re, ew rewş dem bi dem di rojevê de girt û da nîqaşkirin. Bi nîqaşkirinê, ku mirovan bawer jî nekiribê, xwest ku întîbayekê di vê demê de bide çêkiirn di serê wan de û li ser wê întîba û ankû ´gûmana´ ku da çê kirin re êdî politikaya xwe bide bi rêve birin û bi wê politikayê re perçekirina civatê mayînda bike.

Di vê temenê de weke gotina dawî, em li vir jî bibêjin ku ew pêşnîyara birêz Ocalan ya bo ´konfaransa îslama demokratîk´ di vê nûqtê de giringîya wê pirr zêde dihê ditin li berçav. Di vê temenê de, têgihiştina olî ya Azad were afirandin. Di aslê xwe de, ev têgihiştina olî ya Azad, wê were wê wateyê ku ol bixwe ji destê rejiman û bikarhanîna wan were rizgarkirin.

Li rojavayê kurdistanê, piştî şoreşa 19´ê temûzê û pê de, hin bi hin jîyane kurdî pêşket. Di jîyane de, di demên piştre de, heyv bi heyv, mirov dibînê ku jin li jîyanê serdest dibe. Di rêxistinkirinê de, di her warê de jin heya. Jinê, di nava karên parastinê, perwerde û sazîbûnê û rêveberinê de jî jin derdikeve li pêş jin a. Ku em vê rewşê, weke teybetmendiyeka şoreşa kurd ya rojavayê kurdistanê bênina ser ziman, wê pirr rast bê.

Î ro, di vê dema ku min ev nivîs dihilde li dest de, rêjeya jinê di jîyanê û di nava saziyên kurdan de bi cih girtina wê re derketîya ser rêjeya ji sadî 65´an. Yanî, di her qada jîyane de jin li pêş a. Yê ku jiyanê diafirêne û bi rê ve dibe jî jin a. Yê ku bi rêve dibe jî jin a. Ev yek, li rojavayê kurdistanê heya. Çend ku di vê demê de, şert û mercên jîyanê zor in û ambargoyaka mazin li ser rojavayê kurdistanê heya jî, jina kurd bi serdestîya xwe re, gav bi gav jîyanê li rojavayê kurdistanê dihunê û diafirêne.

Pêşîyên me kurdan, gotinaka wan ya pirr xweş û xweşik hebû. Gotibûn ku **"jin jina, çi şêra çi mêra."** Bi rastî jî, wusa ya. Î ro, em pretîzekirina vê gotinê li rojavayê kurdistanê bi jina kurd re dibînin. Î ro, li wir, di nava sazîyên perwerdeyê de jî, di nava saziyên parastînê de jî û di nava saaziyên rêveberîyê hemûyan de jî rêjeya heyîna jinê di karkirinê de jî derketîya ser ji sadî 65´an. Ji karên rojane ên jîyane bigre û heta ku digihijê hemû karên din ên rêveberî û hwd de, jin di wan de cih digirê. Bi nvê YPJ´ê jî, hêza wê ya parastinê jî heya ku herêmê diparêzê. Bi wê re jî, bi sînor nemaya û di nava aşayîşê de jî bizêdeyî cih digirê.

Î ro, yê ku li wir jîyanê ava dike û diafirêne jin a. Ev keda jinê nebûba, ma gelo, tevî

wanqas astengîyan, î ro wê ew serkevtîna bi afirandina jîyanê re hebûba? Bêgûman, di serkevtina şoreşa rojavayê kurdistanê de û di pêşketina jîyane wê de û her wusa di parastin û rêvebirina wê de jî, cihê herî mazin û bi rûmet, î ro di destê jinê de ya.

Ku em li vir rabin û gotinaka bi vî rengî bikarbênin û bibêjin ku şoreşa rojavayê kurdistanê şoreşa jinê ya, di zane min de wê ev gotin ne şaş bê û ne xelat bê. Di destpêka ti şoreşê de, weke ku di şoreşa rojavayê kurdistanêê de bûya, serdestîya jinê wilqasî zêde hem di rêveberî û parastinê de û hem jî di şerkêşî û afirandinê de derneketîya li pêş. Bêgûman, di destpêka her şoreşê de jinê weynek leyistîya. Lê ew serdestîya wê, piştre, di salên piştre ên şoreşê de hatîya ji ber çav dûrkirin. Piştre jî, bi hin awayna pirsgirêkên jinê di nava wan civatan de dest pê kirina.

Di destpêka pêşketinê de, ku bergirên civatî û hişmendî ku werina girtin di şoreşê de, bi wan re wê di demên piştre de jî ew pêşketin were û bibe. Î ro, di destpêka pêşketina şoreşa kurd de, ev bergir hatina girtin. Bo vê yekê, î ro ew serdestî heya bi jina kurd re. Lê ma ev têre dikin,? Na, têrê nakin. Ji wê zêdetir, bisazî bi sazûmankirina pêşketina civatî ya bi vî rengî di roja me de, her wusa temenê wê azadîyê ku jinê bi hişmendiyekê bi xwe re gihand sazgerîyekê, wê hingî karibê bibe **ewla**(temînata)**ya** wê pêşketinê û her wusa bi wê re bibe ewlaya civatê bigiştî bi wê pêşketinê re.

Î ro, yê ku li rojavayê kurdistanê jîyanê diafirêne, jin a. Ya ku lê serdest a jin a. Di nava wan şert û mercên zor de, ya herî zêde afrîner jî jin a. Ev şoreşa rojavayê kurdistanê a kurd, ya ku wê bi nirx û mazin dike û girêk bi girêk wê dihunê jî jin a. Şoreşa rojavayê kurdistanê, bi vê rengê, êdî destanaka jina kurd a, ku wê ew girêk bi girêk ew huna ya û afirandîya.

Jina kurd li rojavayê kurdistanê, ev hişmendî jî baş bidest xist ku ti kes azadiyê nadê ti kesekî. Herkes, bi kirin û tekoşîna xwe re wê bidest dixe. Li wir, bi kirin, ked û tekoşîna xwe re jina kurd, ew girêk bi girêk huna û bi wê û bi xwe re jîyane civatî hunandîya û nûha jî, wê pêş dixe. Tekoşîna wê dide. Ya ku divê ku mirov weke aliyekî bi rûmet ê wê serkevtina rojavayê kurdistanê ya bi şoreşî li vir bêne ser ziman û bi pîrozî bahse wê bike jî ev

- Piştî ku li başûrê kurdistanê me kurdan ´anfal´ bi komkujiyên weke ên ´pêvajoyên jenosîda Helepçe´ re dît, nûha jî, em pêvajoya duyemin weke filmê duyemin ê anfalê li rojavayê kurdistanê dibînin. "Pêvajoya ´anfalê´ ya duyemin, nûha jî li rojavayê kurdistanê bidest komên çete ku piştgirîya tirkiya ji wan re heya ên weke Bîlad el-şam û cebetil-nasr´ û hwd, em dbînin ku ev komkuji dibîn û dihên kirin. Tirkiya, ji sînorê xwe, bi kamyonan cebilxane ji wan re dişêne. Ew jî, bi wan çekên ku dikevina destê wan de, kurdan dikujin. Berî, nûha bi çend rojan ketibû rojevê de ku van çeteyan ji aligirên xwe re gotîya û bakirîya ku "kuştina kurdan helal a." "destavêtina jin û malê kurdan helal a." "Heçîyê ku kurdekî bikujê wê herê bihûştê" û hwd. Bi vî rengî, gelek gotinên din jî ku tên gotin hena. Piştî van gotinan re jî, êdî van komên çekdar, li herêmên kurdan bides talanê û kuştinê kir. BI dehan û bi sadan malên kurdan hatina talan kirin. BI dehan kurdên sivîl ên weke jin, zaro, pîr û kal hatina qatilkirin.

Ev qatil kirin, hê jî didomê. Di dema ku min ev nivîs dinivîsand di roja 01.08.2013 seat 02.00´an de çûyên ku dikevina ajansan de ew in ku "van komên çekdar bidest komkujiya kurdên sivîl kirin." Bi wê re jî, lîsteya pêşî ya nava ya kuderên ku hatina kuştin ku tê gotin nezî 30 navî tê de ya, ket ajansan de. Ev navên ku hatina kifşkirin in. Nûçeyên ku tên jî, di wê rengê de na ku tê gotin ku bisadan kurdên sivîl ên jin, zaro, pîr

û kal hatina kuştin, lê hê navê wan ne hatina qatil kirin. Ev komên çete ku bidest kuştina kurdên sivîl kirina, bo ku agahî ji herêmê dernekevin di derbarê jenosîda kurdan ya ku ew nûha dikin de li rojavayê kurdistanê û her wusa li bajarên din ên weke Til- Eran. Til-hasil û hwd, xatên telefonan jî qûtkirina. Ev herêmên kurdan ên li roja Helebê, nûha li wan ser 60 hezarî kurd dijîn. Tê gotin ku jîyane van kurdan hemûyan jî din xateriyê de ya.

Nûha, seat bi saet, kurd guhê wan li wê herêmê ya. Ha vê kêlîkê, w agahîyeka nû were ku di wê e bahse bi sadana kurdan dike. Ha wê agahî di kêlîka din de were ku di wê de bahse kuştina bi sadan kurdan dike. Wan komên çekdar, ji destpêka şerê Sûrî de jî, bi sadan kurd qatil kirin. Lê piştî ku kurdan dest danî ser herêmên xwe û rêveberîya xwe bidest avakirina wî kirin, êdî hem komên çekdar û hem jî hêzên rejimê berê xwe dane bi ser kurdan de. Nûha jî, herdû alî jî, bi piştgirîya dewletên weke tirkiya şer bi kurdan re dikin. Hemû jî, di destê wan de, çekên ji tirkiya çûna û ên giran in. LI ber wê jî, di destê kurdan de jî, ti çekên wusa giran tûna na ku karibin xwe biparêzên.

Hin bi hin nûçeyên ku ji herêmê tên, di wan de bi komî bahse qatilkirina sivîlan dike û lîsteya navê wan dinivîsêne. Çend ku dem tê ve herê jî, wusa tê ditin û xuya kirin ku wê hijmara kuştina sivîlan zêdetir bibe. Ev komên çete ku biçek in, di min maskeya olê de dihên bi rêxistin kirin. Weke ku çawa ku Saddam Huseyin, li başûrê kurdistanê oparasyona qirkirin û jenosîda kurdan da dest pê kirin û navê "anfalê" llê kir ku navek ji navê Sûreyê ´kuran´ê ya û bi wê re di bin maskeya olî de ew komkujiyên xwe yên ku di wan de bi de hezaran kurd bi carekê qatil kirin, î ro bi heman rengî li rojavayê kurdistanê heman rewş û pêvajo li berçavê me û hemû cihanê dihê pêşxistin. Li ber wê jî, mixabin, ew cihane ku gotina "mafê mirovan" ji dev naberdê, li ber wan komkujiyên ku ev komên çete ku bi piştgirîya welatên weke tirkiya dikin jî bêdeng in. Ev jî, îbreteka. ..

Netewên yekbûyî´, heta vê kêlîkê, bêdengîya xwe xira nekirîya. Hêzên ewropî û emerika ku bahse "demokrasiyê" û "mafê mirovan" dikin jî, li ber wan komkujiyan heta vê kêlîka ku min ev nivîs dinivîsand jî bêdeng bûn. Ti deng ji wan derneketibû. Li Herêmên sûrîya kurdên ku dijîn, hemû jî, nûha di bin telûkeya komkujiyê de na. Ji xwe, ji pirr herêman jî, nûçeyên komkujiyan bidest hatina bû. Hin bi hin, nûçe dikevina ajansan de ku êdî bi komî kurd dihên kuştin. Nûçeya ajansa Firatê´ ya di 01.08.2013 14:17:21 de hat weşandin de, tê gotin ku "50 sivîl bi carekê hatina qatil kirin li herêmên ´til-Eran´ û li ya ´til-hasil´ê." Di nûçeyên din ên ku hin bi hin dikevin ajansan de tên gotin ku "komên çete ser 400 mirovên sivîl de dilgirtin û wan weke ´mertal´ bikardihênin. Ji xwe, gelek herêmên din, ên ku tê gotin ku van komên çete li wan bidest kuştin kurdên sivîl kirina jî, agahî ji wan nayê girtin. Ev komên çete jî, bo ku di derbarê komkujiyên ku dikin de, agahî dernekevina derve xatên telefonan û têkiliyê ên din, hemû jî birrî na. Yanî, rêyên têkiliyê qûtkirina.

Di vê pêvajoyê de, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku çendî ku bêdengî dibe, ewçendî jî komkujiyên van çeteyan zêdetir dibin. Her bêdengî, hevkarîya bi komkujiyên vê rewşa ku em divê ku weke anfale duyemin bi nav bikin re. ..

Kurdan, bi demokratîkî, pêvajo demokatikî li rojavayê kurdistanê dane dest pê kirin. Dixwezin ku xweserîya xwe denezênin. LI dijî wê jî, tirkiya piştgirîyê dide komên çete ku hêrîşên xwe zêdetir bikin ku bo ku derfet ji pêşxistina xweserîyê re nemêne. Nûha, rewşeka bi vî rengî, em bi wê re rû bi rû na. Van komên çete, bidestê fethullahçîyên

bêşeref, ciwanên kurd dixapênin û dişênina nava wî şerî û didina kuştin. Ev jî, biserê xwe aliyekî din ê vê anfale dûyemin´ ya ku van hêzan li dijî kurdan rojavayê kurdistanê dane dest pê kirin a. Mirov, dikarê vê aliyê, weke teybetmendiyeka vê pêvajoya anfalê ya li dijî kurdan ku rojavayê kurdistanê hatîya dayîn destpêkirin jî şîrove bike.

**- Li rojavayê kurdistanê, bi serkevtina kurdan, dorpêçkirina Afrîn û kobanê û şerê li Til-ebyed´ê ê bi kurdan re pêvajoyek nû a şer a bi kurda re destpêkir.** Bi şerê li til-ebyed(girêsipî)´ê re mirov hinekî dî baştir armanca dorpêçkirina li afirîn û kobanê baştir fahm dike. Til-Ebyed, herêmeka kurdistanê ku li aliyekî wê afirîn û koban dimêne û li aliyê wê din jî serêkahniyê, Qamişlo, Hesekê û hwd dimên a. Yanî, di serî de, ev herêm, şerê ku li wê dibin, armanca wan ew a ku kurdistanê li rojavayê kurdistanê bike duqat. Dema ku çeteyên ´cebetil-nasr´ ku li til-Ebyed´ê bi serbikevin, wê hingî armanca wan ya bi dorpêçkirina afirînê û kobanê re bigihijê armanca xwe.

Dewleta tirk, piştgirîyê pirr zêde dide çetetên ´cebetil-nasr´ bo ku li wir yanî li ´til-Ebyed´ê bi ser bikevin. Piştî ku ev çete, li wir bi serketin, wê hingî, beşa kurdistanê ya bi afrîn û kobanê re hatîya dorpêçkirin, wê êdî bikina destê xwe de. Wê li van herêman, êdî temenê statûya kurdan ji holê ra bikin. Bi teybetî, bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku dewletên herêmê ên weke tirkiya jî, şerê çeteyên cebetil-nasr´ û hwd, ji xwe re weke şerekî stretejîkî dibînin. Bo vê yekê, divê ku mirov li ser vê nûqtê pirr zêde bisekinê.

Li herêmê, nûha stretejîya ku li dijî kurdan tê meşandin, ew a ku pêşî yekparatîya herêmên kurdan bidina şikandin. Pêşî, bi dest û şerê çeteyên weke ´cebetil-nasr´, herêma Til-Ebyed´ê bikina destê xwe de û weke "herêmeka tampon" ku rojavayê kurdistanê dike duqat bikarbênin. Ev hêz, dihizirin ku dema ku wan Til-ebyed, kirina destê xwe de, êdî wê têkiliya afrîn û kobanê ji herêmên din ên weke serêkahniyê, qamişlo, hesekê, amûdê û hwd bidina birrîn. Yanî, êdî herêma serêkahniyê, Qamişlo, hesekê, amûdê û hwd, dibina aliyek û herêmên afrîn kobanê dibina aliyekî din ku bi herêma Til-Ebyed´ê re ji wan hatîya qatkirin ku lê dihê nerîn. Di vê temenê de, nûha, ev rewş, weke stretejîyeka ku dewleta tirk û hêzên din ku nexwezin ku kurd bibina xwediyê statûyê, pirr li ser disekin a.

Ji serêkahniyê heta ku tê til-ebyed´ê û ji wir jî heta ku tê afrîn û kobanê û hwd jî, herêmên ku li ber sînor dimênin a. Bo vê yekê jî, dewleta tirk, bi teybetî, alikariyaka mazin ji van sînoran dide van çeteyên cebetil-nasr´ bo ku ew li dijî kurdan şer bikin.

Ev stretejîya xistina Til-Ebyed´ê, ji ber ku giring a, êdî bidestê van çeteyan li dijî kurdan weke ku "cihad" were dayîn dest pê kirin, rewşekê diafirênin. Li til-Ebyed´ê, mirovên ´cebetil-nasr´, ji mizgeftan û ji minareyan bangî aligirên xwe dikin û dibêjin ku "kuştina kurdan ji we re helal" û "malê kurdan ji were helal ku win dest dênina ser wan û kurdan ji wan herêman bikina der." Divê temenê de, rewşeka ku em dikarin di temenê kirina jenosîda kurdan de jî bênina ser ziman, li herêmê dihê afirandin. Her wusa, li Til-Ebyed´ê, çeteyên ´cebetil-nasr´, bi sadan mirovên kurd ên sivîl, weke jin, zaro û pîr û kal dil girtina û dibêje ku "emê serê hemûyan bidina lêxistin." Divê temenê de, çûyînaka bi ser kurdan de dikin. Yanî, di vê temenê de, tirkiya ev çeteyên cebetil-nasr´, piştgiriyê dide wan ku ew kurdan bikujin.

Tirkiya, di destpêka şerê Sûrî de jî, bi rêxistinên tundrew ên olî re peyman çêkiriya ku ew di berdêla piştgirîya ku bide wan de ku ew wê li dijî kurdan şer bikin. Nûha jî, hemû tişt û rewş, li gorî vê peymane ku tirkiya bi van komên tundrew re çêkiriya dimeşê. Tirkiya, weke ku di peymane xwe ya ku bi wan re kirî de alikariya aborî û çekî

dide wan û çekên giran ji wan re dişêne. Her wusa ev rêxistinên tundrew jî, bi wan çekên ku ji tirkiya girtina, li dijî kurdan şer dikin û şerê xwe mazinn dikin. Nûha, rewşa li Til-Ebyed´ê ku em lê binerin, emê bibînin ku rewş bi vî rengî dimeşê. ..

Dema ku kurd, Til-Ebyed´ê winda bikin, birastî jî, wê rewşa rojavayê kurdistanê bikeve rewşeka pirr xirab de. Lê ku ew çeteyên cebetil-nasr´ ku bi piştgirîya tirkiya li wir li dijî kurdan şer bikin ku werina şikandin, wê ambargo´ya li ser afirîn û kobanê jî were şikandin. Hinekî jî, weke ku ev rewş bi hevdû ve ji navikê ve girêdayî na. Ji xwe, ambargo´yên li ser herêmên afrînê û kobanê ku hatina pêşxistin, di temenê stretejîya şer û leşkerî de ya. Yanî, ew ambargo, bi armanca dorpêçkirina leşkerî hatiya pêşxistin. Bi vê yekê, dema ku bi destê van çeteyan Til-ebyed jî, hat xistin, êdî berê xwe bidina herêmên afrîn û kobanê, êdî ku ewder jî xistin êdî piştre wê herina bi ser herêmên din de û hewl bidin ku wan jî bixin û ji destê kurdan derxin. Yanî, dixwezin ku kurd, li herêmên xwe nebina xwediyê gotinê û statûya wan nebê. Bo ku pêşî li pêşketina statûya wan were girtin, ev hêrîş, bi vê armancê hatina pêşxistin û tên domandin.

- Rojavayê kurdistanê, bi teybetî, bi dîroka xwe ve jî giring a. Ew herêm, weke herêmeka ku temenê gelek pêşketinên mazin ên dîrokî jî ya. Ya rastî, ew ku li wir, li rojavayê kurdistanê serkevtina kurdan, wê ne tenê bandûra wê li herêmê û li sîyeset û pêşaroja wê ku wê hebe, ji wê zêdetir wê rengê pêşketina rojhilat bi tememî bide guharandin. Rojhilat, weke ´sêkoşa´ ya di nava kurd, faris û araban de jî ya. Di dîrokê de, hertimî wusa bûya. Piştî sadsale 15´min ´ û 16´min û pêde ku osmanî li herêm bi piştgirîya kurdan bûn hêz û piştre êdî ew sêkoşa bû çarkoşa. Nûha jî, rojhilat, di nava wê de ya. Bandûra pêşketinên li rojhilat, wê di demên pêş de zêdetir wê hebin.

Rojhilatê kurdistanê, bo dîroka kurdan jî, xwediyê temenekî giring a. Ev herêm, şûnwarê hûrî û mîtannîyan a ku ew kalkên kurdên roja me na. Pêşketina ku hûrî û mîtannîyan bi xwe re da jîn kirin, piştre temenê pirranîyan pêşketinên hemdem ên cihanî û hwd jî afirand. Dema ku bahse rojavayê kurdistanê dihê kirin, di cih de hûrî û mîtannî dihên berbîra min. Mirovekî ku hinekî jî dîroka herêmê bizanibê, wê di cih de ev were berbîra wan.

Wê herêmê, bi pêşketinên xwe yên dîrokî re, hertimî kifşkarîyeka wê ya têgihiştinî di nava zihniyeta sadsalên me de jî daye çê kirin. Ji aliyê olî, çandî û hwd ve jî, ev herêm bi wate ya. Ji herêmên rojavayê Kurdistanê, ji afrîn, qamişlo û heta ku digihijê kobanê, ew dîroka wan ya kevn heya. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku hê jî di roja me de jî kelehên kevn ên ji dema hûrî û mîtannîyan ku mana li wir hena. Bi vê minasebetê ev wan keleh û cihên kevnera jî bahs bikin û bibêjin ku divê ku ew jî werina kirin bin parastinê ..

Ev herêm, ji aliyê stretejîkî ve jî, pirr giring in. Bo vê yekê. di demên berî zayinê bixwe jî jî, kîjan hêzê xwe mazin kirîya piştre bo ku li herêmê bibina xwediyê bandûrê xwestina ku wir jî bikina bin destê xwe de. Ji împaratorîya babil û qasîtan û heta ku digihijê împaratorîya asûr û ji wê jî heta digihijê hemû hêzên ku piştre li herêmê pêşketina, ev yek di dema xwe de kirina. Bo vê yekê, di dema hûrî û mîtanîyan bixwe jî, em bi dehan şerên ku dixwezin li wê herêmê serdestîyê bidin çêkirin, em rastî wan tên. Îskenderê Mekedonî ku piştî ku hat kurdistanê û ji ber kirinên wê yên bixadarî kurdan navê "zûrqarneyn" lê kirin bixwe jî, bi teybetî, ew herêm ji xwe re kirîya armanc di dema xwe de. Ew herêm, bûya weke derîyekî bidest xistina serdestiyê li herêmê bixwe jî. Bo vê yekê, bi vê yekê re, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku di demên piştre de jî ev

yek wusa bûya. Împaratorîya roma, dema ku hat hat herêmê û bi hêzên kurd û sasanîyan re ket şeran de, pêşî li wê herêmê xwestîya serdest bibe. Mirovekî ku weke rewşeka dîrokî ku ji wê demê de ku "rewşa Palmîra" ne bihîstî tûna ya. Banûya Palmîra Zenûba, weke banûyekê pirr li azadîya xwe dihizirê. Dizanê ku dema ku ew ketina dest de wê li herêmê êdî mafê jîyanê ji wan re nemêne ji koledariyê pêve.

Piştî ku hêrîşên li palmîra dest pê kirin û piştre ku bi hin mirovên ku xîyanetê dikin û deriyên palmîra divekin û dibina sedema têkçûna palmîra jî, wê bina afrînerê rewşeka pirr xirab jî li herêmê. Zenûba, piştî ku dibîne ku wa palmîra ket, dî dibêje ku "zenûba bê palmîra nîn a û najî" û piştre jahra di gostîlka xwe de bi serxwe de dike û dawiyê li jîyane xwe de dihêne.

Ev rewşên ku li wê herêmê na jî, dîroka wê herêmê jî diafirên in. Li herêmê, wê piştre jî, rewş pirr mazin xwe bide domandin. Dem ku tê dema Salahadinê Eyûbî, emê bibînin ku Ew herêm di bin desthilatdarîya wî de na. Salahedînê Eyûbî, wê bi wê serdestîya xwe ya li wir, wê hemû herêmê bike bin bandûra xwe de. Rojavayê kurdistanê bi bakûrê kurdistanê re di wê demê de yek a û bi teybetî, dema ku em bahse dema salahadînê Eyûbî dikin, em bahse dewleta eyûbîyan jî dikin ku bakûrê kurdistanê û bi teybetî rojavayê kurdistanê, qadaxa wan ya ku ew lê serwer û serdest in û lê desthilatdarîya wan ava ya.

Piştre jî, osmanî jî, fahm dikin ku dema ku li wê herêmê ne serdest bin wê nikaribin li herêmê û bi teybetî li kurdistanê jî serdest bin. Piştî wan re jî, firansiz bi metingerî hatina herêmê û ew herêma bi navê "sûrî" hemû lê man. Di dîrokê de, heta wê demê, ti welat û ankû ti desthilatdarîyên ku em weke desthilatdarîyên dîroka li şûn ya sûrî şîrove bikin tûna ya. Sûrî jî, weke ´Îraqê´, îcat û kifşeka bi metingerî ya sadsale 20´an a.

Sînorê ku heta roja me bi îraqê re jî, bi sûrî re jî, û bi tirkiya re jî ku heta roja me tê, sînorên ku di sale 1923´an de ku di konfaransa lozanê de hatina kifşkirin. Di dema kifşkirina van sînoran de, ti carî rêz û hûrmet ji dîrok û gelên herêmê re ne hat girtin. Piştî ku ev sînor hatina kifşkirin, piştre jî bo ku van sînoran bi gelên herêmê bidina herê kirin bi dehan û sadan komkuji hanîn serê gelên herêmê. Di aslê xwe de, ku ez bipirsim û bixwe bersiva wê bidim ku heta nûha çima li herêmê demokrasî û pêşketin zêde nebûya, hinekî jî, divê ku ez bibêjim ku ji ber wê zihniyeta konfaranse lozanê ku bi wê re naqşaya herêmê hat rastkirin û heta roja me, bi piştgirî li herêmê serdest kirina wê ya. Hinekî jî, sedemeka giring ya pêşketina demokrasiyê, divê ku mirov vê zihniyetê bêne ser ziman. Di roja me de jî, di pêşîya hemû hewldanên pêşxistina demokrasîyê de, dîsa ev zihniyet û serdestî wê li pêşîya wê asteng a.

**Ev** zihniyet, heta roja me li herêmê bûya temenê şer, pevçûn û kirina komkujiyan. Di van rojên ku kurdan li rojavayê kurdistanê serdestîya xwe bidest xistiya de, dîsa dijberîya ku li wê dihê pêşxistin, di temenê wê de zihniyeta Lozanê heya. Heta ku tê gotin ku heya ku "hêzên herêmê ên weke tirkiya heya ku mudahaleyê rojavayê kurdistanê bikin." Ku ev bibe, wê dîsa di temenê vê zihniyeta wê konfaransê de bibe. JI ber ku ev zihhniyeta LOzanê, hertimî temen ji şer û mudahaleyên bi vî rengî bi armanca tûnakirin û ji holê rakirina vîna gelan re diafirêne. Yanî, ev zihniyeta Lozanê, di roja me de jî di temenê dijberî û afirandina temenê şer û pevçûnan de kar dike**. ..**

Pirsgirêka kurd ya ku em î ro bahse wê dikin, pirsgirêka maf û azadîya gelê kurd a. Bi wê re jî, dema ku em bahse pirsgirêka kurd dikin, em temenê ´Kurdistan´ê de bahsê dikin û li kurdistanê bi xalkên din jî ku weke kurdan û bi kurdan re ji maf û azadîya xwe

hatina dûrkirin hena. Em bahse wan jî dikin. Her wusa, komên din ên olî ku hena, em bahse wan jî dikin. Minaq, li kurdistanê, ku weke oleka qadîm ola êzdatiyê heya. Ev ol, berî cihûtîyê, berî filehiyê û ankû xiristiyaniyetê jî û berî misilmanetiyê jî hebûya. Minaq, dema ku em li dema hûrî û mîtannîyan dinerîn, weke sazîyeka pîroz û pêşketî ya civatî em pêşketina ´laleş´ê dibînin. Laleş jî, cihên bergkirinê ên ola êzdatiyê na.

Lê ev cudahî û rengîn civatî ên xalkên herêmê hatina ji holê rakirin. Di temenê nîjadperestiyekê de desthilatdariyên ku li herêmê hatina avakirin, hertimî û ji roja ku avabûna heta roja me, xwûna gelên herêmê rijandina. Î ro jî, dirijênin. Ku em bahse şerê ku di van rojên dawiyê de ku li rojavayê kurdistanê ku bi kurdan re û li dijî kurdan hatkirin, di temenê wê de jî, çend ku ol jî weke maskeyekê di wê de dihê bikarhanîn jî, di temenê wê zihniyeta nîjadperest ya etnîkî de ya. Zihniyeta nîjadperest, hertimî ji xwe re serdestî, serwerî û deesthilatdariyê dixwezê. Lê ji xalk ên din û ên ne ji wê na, ji wan naxwezê û li dijî wan derdikeve. MInaq, li tirkiya, hertimî dixwezê ku hertişt bi navê tirkitiyê were ser ziman û navê xalkên din bi reng û zimanê wan re were qadaxa kirin. Bi politikayên asîmlekirine re, êdî wan bike wek xwe. Piştî wê re, êdî derfeta jîyanê ji wan re bide nîşandin.

Serkevtina kurdan ya li rojavayê kurdistanê, beşeka mazin û giring ya sînorên ku di nava kurdan de hatîya xîzkirin jî bêwate kir û di zihniyetê de ji holê dirakê. Bi gotinaka din, kurdan dibe yek. Ya ku nûha dibe jî, ev a. Lê li wir di vê dema pêşketina kurdan de, çendî ku ev pêşketinên giring li herêmê û li kurdistanê rûdidin jî, bi wê re telûkeyên mazin jî hena. Ew jî, ew in ku ew hêrîşên li dijî kurdan ku weke ku bi destê tirkiya û hwd ku li ser komên çete re ku dihat kirin û hwd. ..

Dema ku herêmên kurdan dikevina bin destê kurdan de, êdî bi wê re pêwîstîya wan bi hêzeka mazin ya xwe bixwe parastinê ya cewherî heya. Ev yek, weke pêwîstîniyekê jî ya. Ez dema ku di vê temenê de dihizirim, dema şêx Ubeydullahê nehrî dihê berbîra min. Di wê demê de, dewleta osmanî, stretejîya ku li dijî wî meşand, ew bû ku piştî ku serhildêran herêm xilaskirin û kirina destê xwe de, û piştre bi wê xilaskirin û kirina dest re ku gelek herêmên wan ên bidestkirî ku bûn, êdî bidest hêrîşî li wan herêmên xilaskirî hat kirin. BI wê re, bi awayekî xweza, hêzên serhildêr êdî ketina rewşeka berxwedanê de. Piştî sale serhildane şêx Ubeydullahê nehrî 1880´î û hwd, wê heta di sale 1885´an û hwd de, ku ev herêmên weke herêmên Sasonê û hwd ku xilaskirî bûn, çûna bi ser wan de bû û komkujiyên mazin dan kirin. Di wê demê de, ev komkuji, di wan de ew çeteyên hemîdîya ku weke van çeteyên roja me ku ên weke "cebetil-nasr" û hwd bûn, hatina bikarhanîn. Di wê demê de jî, di komkujiyên kurdan de ew çetetên hemîdîya hatina bikarhanîn û di roja me de jî, di nava van çeteyên ku bi piştgirîya tirkiya û hwd ku hêrîşî rojavayê kurdistanê dikin de hinek kurd jî hena û kurdan dikujin û li dijî statûya kurdan şer dikin.

- Rojavayê kurdistanê, di van rojan de yanî di roja 19´ê temûzê de salvegera wê ya yekemin hat pîroz kirin. Lê di wê demê de jî, hêrîşên komên çekdar ên weke "cebetil-nasr" jî li kurdan dibûn. Piştî ku di dema ku li serêkahniya komên çekdar kir hêrîş dewrîyeya hêzên kurd ya YPG´ê kir û piştre, YPG´ê de oparasyon li serêkahniyê da dest pê kirin û komên çekdar ji wir derxistin. Nûha jî, divê dema ku min bixwe jî ev nivîs dinivîsand, nûçeyên ku diketin ajansên nûçeyan de ew bûn ku pevçûn li dora ´til-koçer´ û til-xelafê´ û ´ girkê lege´ û li hin herêmên rimêlan didom in. Lê tê gotin ku wê ew der jî di demeka kin de ji wan çeteyan werina paqijkirin.

Bi bitememî ji serêkahniyê paqijkirina komên çete û ankû ên weke ´cebetil-nasr´ jî, li herêmê naqşaya rewşê bi carek guharand. Hinekî jî, tirkiya ji ber vê yekê, nexweş û aciz bûya. Piştre jî, gotinên ku ji devê rayadarên tirk derdikevin ku kurdên rojava jî krimînalize bikin û wan jî weke ku çawa ku dewleta tirk kurdên bakûrê kurdistanê weke ´terorîst´ dide nîşandin ku kurdên rojava jî wusa bide nîşandin. Ji xwe, bo tirkiya, bo ku ji mirovekî re gotina ´terorê´ bikarbeên, tekê ku ew kurd bê bes û têrê dike. Di ravakirina ji rayagiştî ya serokfermandariya artişa tirk ku partiya kurd PYD´ê jî bi gotina ´terorê´ re dihêne ser ziman, vê rastîya dewleta tirk dide nîşandin.

Di vê demê de, ku em ji kîjan aliyê ve binerin, wê rewşa kurdan giranîya wê zêdetir bibe. Lê piştî pevçûnên serê kahniyê ku rastî roja salvegara roja şoreşa rojavayê kurdistanê jî hatin, naqşaya rewşê guharand. Lê berpirsîyarîyên kurdan jî, zêde kir. Di vê demê de, dema ku kurdan herêmên xwe ji çeteyan paqijkirin, divê ku hêze xwe jî xort bike bo parastina wan. Lê ku wusa nekê, wê rewşa rojavayê Kurdistanê bikeve rewşa kurdan ya di dema şerhildane şêx Ubeydullahê Nehrî de. Di wê demê de, li ser propagandayên dewleta osmanî, gelek aşîrên kurd ên mazin jî ku soz dabûn ku wê di serhildanê de cih bigrin jî, piştî ku serhildanê bêdeng ma. Lê pştî ku serhildanê dest pê kir û kurdan herêmên xwe yên weke Sasonê, Wan, Agirî, Ûrmîya, herêmên botanê Çolemerg, Êlih, Amed û hwd ku gelek herêmên din jî d nav de na, ku kirina destê xwe de û piştre ku di dema serhildanê de ku hewldan ku hem serhildanê bidomênin û hem jî herêmên xilaskirî bi parêzên, hingî dikevina zorê de. Ev rewş, wê kurdan bike rewşeka xirab de.

Di dema serhildane şêx Ubeydullahê Nehrî de, kurd dema ku serî hildidin, pirranîya herêmên xwe yên bakûrê kurdistanê û hinek herêmên başûr û rojhilatê kurdistanê jî di nav de wê wan bidest bixin. Lê piştî ku gelek herêm hatina xistin li dest û piştre ku dor hat parastina wan herêmên xilaskirî, kurd hêzên wan dikevina zorê de. Di wê demê de, dema ku em li dema serhildane şêx Ubeydullahê nehrî dinerin, em dibînin ku serhildan di salen 1880´î û hwd de ku dest pê dike, ji ber vê yekê êdî piştre wê serhildan ji dema serhildanê vegerihê dema berxwedanê. Dema vegerîna serhildanê li berxwedanê, hinekî sedema wê ew a ku ew aşîrên din ên kurd ku çendî hêza wan heya, qasra osmanî bi mîrên wan herêman û serokên aşîran re ketîya têkiliyê û hin ji wan "bêalî" kirina. Ji wan xwestîya ku "tevlî serhildanê nebin." Piştre jî, ev rewş, wê piştî ku serhildêran li herêmên kurdistanê serdestî bidest xist û hin bi hin herêmên di destê wan de ên xilas kirî ku zêde dibin, êdî rewşa wan di guharê. Divê ku êdî hêza xwe bikina hem hêza serhildanê û hêza parastinê. Dema ku hêz bû hêza parastinê, êdî nikarê weke rewşa destpêkê ya serhildanî bidomêne. Piştre ku êdî hêrîşên artişa osmanîyan li herêmên xilaskirî dibin, êdî ew hêzên parastinê dibina hêzên ku li berxwe didin bo ku herêmên xwe biparêzên.

Ji ber ku di wê demê gelek aşîrên kurd, bi hewldan û xapandinên qasra osmaniyan bêalî mabûn û ankû li hin deverna jî li dijî serhildêran sekinî bûn. Ew li ber serhildêran sekinin jî, di ancama wê propaganadaya osmaniyan ku bi wê digotin ku "şêx bi kafiran re levkirîya û li dijî desthilatdarîya misilman serî hildaya" û hwd. Bandûra vê propagandayê pirr zêde bûbû. Êdî ev rewş, wê bike ku hêzê serhildêran nêvî bi nêvî bimêne. Di wê demê de, piştre jî, li berçavên wan hêzên aşîrên ku bêdeng mana, artişa osmaniyan wê çê bi ser herêmên xilaskirî û rizgarkirî de û wê li wan herêman komkujiyên pirr mazin bike û herêman bike kavil. Minaq, ji sale 1880´î ku heta ku dem

tê sale 1885´an û hwd, di sale 1885´an de komkujiyên ku li herêma Sasonê bûna, wê hertimî bi îbretî bi dilêşî werina bibîr hanîn  di nava kurdan de.

Î ro, bi pêşketina rojava re jî, rewşa ku pêş dikeve, wê rewşê dihêne berbîra min. Bo vê yekê, di serî de, pirr giring a ku hemû hêz û tevgerîyên rojava bibina yek û bi hevdû re di temenê yekbûnekê de parastina rojavayê kurdistanê bikin. Ku wê rewşa ku nûha dijîn, ku dewleta tirk, hin ji wan xapandina û kişandina cem xwe û hin ji wan deng ji wan dernekeve û hwd, wê kurd bike rewşa dema serhildane şêx Ubeydullahê Nehrî de. Ji ber vê yekê, di serî de, divê ku di nava xwe de yek bin û hêza wan yek bê û bi hevdû re bin. Divê ku wê xelatîya wê demê, dubara nekin di vê demê de.  Di wê dema Şêx Ubeydullah de jî bi serketibûn û herêmên xwe kiribûbûna bin desthilatdarîya xwe de û xilas kiribûn. Lê ji ber ku hêza wan hemû ne kirina yek û ne kirina tevgerîyê de ku wê parastinê bike, êdî rewşên piştre rûdan. Di aslê xwe de, hinekî jî, armanca avakirina çeteyên Hemîdîya ku bi navê "alayên hemîdîya" jî tên binav kirin û ku ti farqe wan ji van çeteyên ku î ro li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan şer dikin ên weke "cebetil-nasr" û hwd tûnaya, bi armanca wan jî ew bû ku pêşî li pêşketin, desthilatdarî û yekbûna kurdan bigrin bû. Di wê demê de jî, ji mirovên ku di nava wan çeteyên hemîdîya de digrin re tê gotin ku "winê ji xwe bibin hêz û mal  herêmên xwe biparêzên." Lê wan nizanî bû ku li dijî civate xwe şer dikin li ser navê celladê xwe.

Î ro jî, dema ku ez li wan kurdên ku li cem tirkiya disekinin ku li bakûrê kurdistanê li dijî tevgera kurd disekinin û ku di vê demê de li rojavayê kurdistanê dixwezin ku bi wan hêzekê li dijî hêza parastina herêmê ya kurdan bidina çêkirin û hwd, di temenê vê zihniyetê de ya. Weke ku dîroka bi vê rewşê û zihniyetê dihê xwestin ku were dubara kirin. Di vê demê de jî, gelek komên ku dixwezzin ku xwe weke partî pêş bixin û hêza xwe ya leşkerî pêş bixin û hwd, rewşa wê dihêne berçav. Di roja me de, minaq, komên çekdar ku hêrîşî herêmên kurdan û jîyane kurdan dikin jî, rewşa wan çeteyên hemîdîya dihêne berçavên me. Di vê demê de jî, stretejîya ku dewletên serdest bi komên çete re li gorî xwe ku li dijî kurdan bikardihênin ew a ku dema ku herêmên rizgarkirî ku gelek bûn, êdî di wan de nearamiyê bidina çêkirin û her wusa bi destê van çeteyên ku hinek kurdên bêrûmet jî ku bi wan re na, di wê rewşê de kurdan bişikênin.

**Yekbûna kurdan, xewna Ahmedê Xanê jî bû, pêk tê, yekbûna kurdistanê tê çêkirin.** Ahmedê xanî, di dema xwe de pirsgirêkên nava civate kurd dîtibûn. Bo vê yekê, wî li ser wan serî wastandibû û di nava civate de tê gotin ku wî hizrên xwe jî li ser wan pirsgirêkên civatî hanîbû ser ziman. Î ro, dema ku ez dibînim ku temenê yekbûna kurdan dihê avêtin, ew xwezîya dilê Ahmedê Xanî ya bo yekbûna kurdan hat bîra min. Bo vê yekê, min jî xwest ku bi wê bidest nivîsê bikim.

Heta nûha û roja me, çi hatina serê kurdan û çend kurd hatina kuştin û qatil kirin jî, hinekî jî sebep û sedema wê nebûna yekbûna navxweyî ya kurdan hebû. Ankû, dem bi dem yekbûna navxweyî bi hêstî û ramanî hebû bûya jî, ji ber xafk û xapandinan ew yekbûn bi tememî êdî di pretikê de **pêşneketîya**.

Di 22´ê temûzê de civînaka giring ku wê di wê de komîteyek bo ku amedekarîya konfaranse netewî ya kurd bike ava bike li darket. Pirranîya rêxistinên kurdan di civînê de amede bûn. Kurd, êdî dixwezin ku yekbûnek di nava wan de hebe. Êdî dixwezin ku ew jî statûya xwe bidest bixin. Bi wê re jî, dixwezin ku êdî ew şerê li dijî wan ku ji destpêak sadsale 20´an de hatîya dayin destpêkirin dawî lê were hanîn. Berî konfaranse Lozanê ku di wê de Kurdistan bû duqat jî şerê bikurdan re hebû. Lê piştî vê konfaranse

re ku di wê de biryar hat girtin û Kurdistan hat qatkirin li çarqatan, êdî şerê li dijî kurdan jî zêdetir bû. Piştî wê re komkujiyên weke komkujiya geliyê zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê û hwd bi kurdan dane jîn kirin. Heta î ro jî, kurd, din giraniya wan komkujiyan de na. Bi wan komkujiyan û hê gelek komkujiyên weke van, xwestin ku kurdan ji dîrokê bibin.

Heta ku sal tê sale 1970´yî û hwd, êdî ya ku wê êdî wê baxtê kurdan ê xirab bide guharandin, derketina tekoşîna azadiya kurd PKK´ê bê. Berî wê jî, komare kurd ya mihabad ava bûbû, piştî ku ew hatibû xurixandin, êdî tevgera berzaniyan di pêşengîya mela mistefa berzani de destpêkir. Bandûra van hersê pêşveçûnan wê dîrokî bê li ser tekoşîna kurdan ya ji salên 1970´î û pê de. Piştî ku tevgera azadiyê PKK´ê destpêkir, êdî serokatîya gelê kurd Birêz Ocalan hertimî ket nava hewldanên avakirina yekîtîyeka kurd de. JI Salên 1990´î û pê de, pirr hewldanên wî bûn. HIngî, bi gelek rêxistinên kurd ên ku hebûn, bi serokên wan re hevdîtin kir. Lê ji wan jî ancam derneket. Lê serokatîya kurd birêz Ocalan, ji wê hewldana xwe bi şûn ve gav neavêt.

Î ro jî, dema ku em li pêşketinên di van rojên dawiyê de dinerin, hem tekoşîna kurd ya azadiyê û hem jî ew hewldanîn serokatîya gelê kurd êdî hin bi hin weke ku ancamê didin. Ev yek, weke dîrokî ya ku divê ku mirov li ser bisekinê ya.

Ya rastî ew a ku ev civîna ku li Hêwlêrê bû jî, divê ku mirov wê bi awayekî dîrokî werênê er ziman. Gavaka giring a ku bo konfaranse netewî ya kurdistanî. Li kurdistanê, vîna gel hertimî yek bû. Lê sazîyek û ankû rêveberîyeka ku temsîlkariya wê dengê bike û li gorî wê û pêwîstînîyê wê gav biavêje pêwîstî pê heya. Ya ku nûha, bo wê gav dihê avêtin jî ev a. Şert û merc bo konfaranse netewî ya kurd pirr baş in. Kurd, divê ku van şert û mercan ji dest ne berdin û bii yekbûna xwe re gavaka dîrokî biavêjin. Ya ku hem gelê kurd û dîrok jî ji wan dixwezê ev a.

Îran jî û tirkiya jî divê ku êdî gavê biavêjin. Di vê demê de ku di vê pêvajoya ku serokatîya gelê kurd ku dayî destpêkirin de ku ti gavan neavêjê û hizirê ku wê bi çêkirina qarakolan û kirine herêmê weke herêmeka leşkerî û bi wê re wê derbeyê li kurdan bixe, wê pirr şaşîyeka mazin bike. Bi wê re, wê bi tememî êdî têkiliya xwe û kurdan ji hevdû bide birrîn. Piştî rewşeka bi wî rengî wê êdî kurd, bi tememî rêya xwe ji wê cuda bikin. LI herêmê, nûha, hem li dijî kurdan û hem jî bigiştî ku di roleka xirab de ya tirkiya ya. Divê ku tirkiya ji vê yekê xwe derkeve. Divê ku êdî hinekî bibe mirov û xwe rast bike. ..

**Yekbûna** kurdan, ne li dijî ti kesekî ya. Yekbûna kurdan, bi armanca ku kurd di nava xwe de yekitiyê çê bikin û pirsgirêkên xwe yên civatî bixwe çareser bikin û xwe bixwe birêvebibin. Ji xwe, heta nûha, hemû pirsgirêkên kurd, ji ber nebûna yebûna nava wan a.

Kurdistan, care pêşî bi peymane qasrî-şêrîn hat duqatkirin. Piştre di konfaranse Lozanê hat çarqatkirin. Ji destpêka sadsalê ve kurd, dixwezin ku yekbûnekê di nava xwe de bidina çêkirin û wan hêrîşên li ser xwe bidina sekinandin.

Her kurd, di zanê ku heta ku yekbûnek di nava wan de çênebê, wê nikaribin vê yekê di nava xwe de çê bikin. Dewletên herêmê jî, ji wê nebûna yekbûna navxweyî ya kurdan, sûdgirtina û kurd bi kurdan re dane şer kirin. Dema ku em dîroka kurdan binerin, em vê yekê bi awayekî vekirî bibin. Hertimî, nakokiyên nava civatê hatina çêkirin û li ser wan re sîyeset hatiya kirin û bi wê sîyesetê re hewl hatîya dayîn ku kurd, werina ji holê rakirin.

Pirsgirêka kurd, di vê temenê de hatiya afirandin. Lê êdî kurd dixwezin ku were çareser kirin. Li herêmê, dewletên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, nexwezin ku çareserkirina pirsgirêka kurd bibe. Minaqa vê yekê, şerê dewleta tirk ê bi kurdan re ya. Her wusa, piştgirîya wê ya ji komên çeteyên ku hêrîşî rojavayê kurdistanê dikin re ya. ..

Ku em ji aliyê olî ve lê binerê, emê bibînin ku çawa ol hatîya îstismar kirin. Di nava kurdan de, kurdên elewî, kurdên ezîdî, kurdên yarsanî, kurdên zerdeştî, û hwd hena. Her wusa, ji bil van bawerîyan gelek baweriyên din jî hena. Kurdên cihû jî hena. Lê hertimî, yek li ya din hatina nîşandin weke dijmin û bi hevdû re nakokî di nava wan de afirandin û ew bi hevdû re dane şer kirin. "Dijberî di nava bawerîyan de", weke renge politikayên dewletên herêmê ya. Hertimî, li ser wan dijberîyên ku hatina afirandin re politikayên xwe yên ku nîjadperest dane domandin. Bi wê re jî, ´ji wan dijberîyên li ser bawerîyan re´, sûdgirtina û politikayên xwe yên li dijî xalkên herêmê jî kirina pretîkê de.

- **Ev çend** rojên ku li Hêwlêrê li navenda başûrê kurdistanê, civîna pêşî ya bo civate netewî ya kurd levcivîya. Di wê civatê de, hemû rêxistin, sazî û komel û hwd, ên kurd têde cih girtin. Berî wê jî Birêz Berzanî ku li ser wî, Birêz mam celal û Birêz Ocalan jî bê, bangî li civînê kir. Piştî banga wî, re civîna pêş di 22 temûza 2013´an de bi rê ve çû. Ev jî, cihê dilxweş ya.

´Konfaransa netewî ya kurd´, weke konfaranse çaremin ku birêz Ocalan pêşnîyar kiribû bû. Rol û weyna wê jî dîrokî ya. BI rastî ku bi bê qaza û bela ku bi serbikeve, wê ev bê gavaka dîrokî di dîroka kurd û di nava civate kurd de jî. Li vir, ya ku em jî bibêjin ku her mirovê ku piçekî rûmet û mirovetî pêre hebe, wê êdî piştgirîyê bidiyê de û ji aliyê xwe ve hewl bide ku ew konfaransa netewî ya kurdistanê bi serbikeve. Li vir, em vê yekê jî bibêjin ku ne tenê kurd, her wusa, hemû komên kêmnetewî ên li kurdistanê jî, divê ku xwe têde bibînin û ew jî bo serkevtina wî di nava hewldan û karkirinê de bin. Divê ku ew jî bizanibin ku wê temenê azadî û bidest xistina mafê wan jî li wir were avêtin.

Li kurdistanê, ji aliyê olî ve bê û ji aliyê kêmnetewî ve bê, divê ku bi rengê xwe têde hebin û ji bo wê jî di nava kar de bin. Bi teybetî, li vir, divê ku ez navê komên civate kurd ên weke yarsanî, êzdatî, zerdeştî, elewî, mesihî û heta ku cihûyên kurdistanê jî divê ku di nav de hebin û karibin gotina xwe bibêjin. Ew bawerî û xalk, koka wan bi hevdû re pêşketîya û bi hevdû re dîroka wan ya bi hezar salan heya. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku di temenê têgihiştina mesopotamîyîtî de divê ku tevbigerihin û tekoşîna maf û azadiyê pêş bixin.

Li kurdistanê, dema ku em bahse pirsgirêka kurd dikin, em divê ku bibêjin pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya. Her wusa, dema ku em pirsgirêkê fahm bikin, hingî jî, emê bigihijina têgihiştina maf û azadîya xwe û emê bo wan di nava hewldan û tekoşînê de bin.

Di vê demê de, divê ku mirov bi teybetî, vê yekê fahm bike ku dema ku em dibêjin pirsgirêka kurd, em di aslê xwe de dibêjin pirsgirêka kurdistanê. Pirsgirêka kurdistanê jî, dema ku em bahse wê dikin, em bahse maf û azadîya kurdan û xalk û baweriyên din ên li kurdistanê jî dikin. Bo vê yekê, pirsgirêk, hem bo kurdan û hem jî bo xalk û baweriyên din ên li kurdistanê pirsgirêka maf û azadîyê ya. Di vê temenê de, pirsgirêka, di roja me de, rengê xwe pirr zêde jî dîyar kiriya. Êdî di vê temenê de, dema ku hewldanên çareserkirina vê pirsgirêkê were kirin û dayîn jî, hingî jî, wê ew hewldan bo

hemû xalk û baweriyan jî bê. BI wê re jî, êdî ji wê xwezatir û asayîtir, ti tişt tûna ya ku ew jî di nava wê tekoşîna azadiyê cihê xwe bigrin û ji aliyê xwe ve wê tekoşînê mazin bikin û hewl bidin ku bigihijênina çareserîyê.

Bi teybetî, di çerçoveya vê demê de jî, divê ku mirov nêzîkatiyê li konfaranse bike. Bo vê pêvajoyê pirr giring a. Li rojavayê kurdistanê, kurd hewl didin ku rêveberîya xwe ya xweser ava bikin. Li bakûrê kurdistanê jî, pêvajoyek ji aliyê tekoşîna kurd û serokê gelê kurd birêz Ocalan ve hatîya dayîn dest pê kirin. Li bakûrê kurdistanê, di vê demê de ji her demê zêdetir divê ku tekoşîna sivîl û demokratik werê pêşxistin. Dewleta tirk, li her herêmê, bendavên bi armanca leşkerî û qarakolan, hê jî çê dike. BI teybetî, li dijî wan, divê ku tekoşînaka hê xort û bi tevger were dayîn dest pê kirin. Ji ber ku ev amedekarîya ji şerekî nû ê bi kurdan re ya ku dewlet dixwezê bike. ..

Ji xwe, di şerê li rojavayê kurdistanê de, ku komên çete hêrîşî kurdan dikin û jîyane wan xira dikin jî, di wê de hêzên tirk jî hena. Gelek hêzên teybet, ên tirk di bin navê "komên artişa Azad" û hwd de, ew komên ku hatibûbûna avakirin ku li dijî rejimê şer bikin, di nava wan de hêzên teybet ên tirk jî hena. Heta ku bi wê re jî bi sînor nemêne tankan jî dişêne û bi wan li wir jî bi kurdan re şer dike. Yanî, li bakûrê kurdistanê li dijî tekoşîna azadiyê ya kurd, çawa têdikoşîya, her wusa bi heman rengî li wir li dijî kurdan di nava şer de ya.

Di vê demê de weke nan û avê, pêwîstîya kurdan bi yekbûna kurda heya. Ya ku wê temenê azadî û statûya wan li herêmê biafirêne jî wê ev bê. Ji ber ku wê yekbûna kurdan temenê statûya kurdan bê, wê gelek hêzên herêmê ên weke tirkiya û îranê û hwd, wê hewl bidin ku astangiyan ji wê re derxin û ne hêlin û nexwezin ku bi serkeve. Lê kurd, li vir, divê ku di ya xwe de safî û zelal bin û di avakirina yekbûna xwe de isrer bikin. JI ber ku bo wan pirr giring a..

**Li kurdistanê, bi ber Kongira netewî a kurd ve pêvajo diçêt.** Piştî avakirina rêveberîya herêmî a rojavayê kurdistanê û pê de, di 22´ê temûza 2013´an de civînaka giring ku wê di wê de komîteyek bo ku amedekarîya kongira netewî ya kurd bike ava bike li darket. Pirranîya rêxistinên kurdan di civînê de amede bûn. Kurd, êdî dixwezin ku yekbûnek di nava wan de hebe. Êdî dixwezin ku ew jî statûya xwe bidest bixin. Bi wê re jî, dixwezin ku êdî ew şerê li dijî wan ku ji destpêka sadsale 20´an de hatîya dayin destpêkirin dawî lê were hanîn. Berî konfaranse Lozanê ku di wê de Kurdistan bû duqat jî şerê bikurdan re hebû. Lê piştî vê konfaranse re ku di wê de biryar hat girtin û Kurdistan hat qatkirin li çarqatan, êdî şerê li dijî kurdan jî zêdetir bû. Piştî wê re komkujiyên weke komkujiya geliyê zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê û hwd bi kurdan dane jîn kirin. Heta î ro jî, kurd, din giraniya wan komkujiyan de na. Bi wan komkujiyan û hê gelek komkujiyên weke van, xwestin ku kurdan ji dîrokê bibin.

Heta ku sal tê sale 1970´yî û hwd, êdî ya ku wê êdî wê baxtê kurdan ê xirab bide guharandin, derketina tekoşîna azadiya kurd PKK´ê bê. Berî wê jî, komare kurd ya mihabad ava bûbû, piştî ku ew hatibû xurixandin, êdî tevgera berzaniyan di pêşengîya mela mistefa berzani de destpêkir. Bandûra van hersê pêşveçûnan wê dîrokî bê li ser tekoşîna kurdan ya ji salên 1970´î û pê de. Piştî ku tevgera azadiyê PKK´ê destpêkir, êdî serokatîya gelê kurd Birêz Ocalan hertimî ket nava hewldanên avakirina yekîtîyeka kurd de. JI Salên 1990´î û pê de, pirr hewldanên wî bûn. HIngî, bi gelek rêxistinên kurd ên ku hebûn, bi serokên wan re hevdîtin kir. Lê ji wan jî ancam derneket. Lê serokatîya kurd birêz Ocalan, ji wê hewldana xwe bi şûn ve gav neavêt.

Î ro jî, dema ku em li pêşketinên di van rojên dawiyê de dinerin, hem tekoşîna kurd ya azadiyê û hem jî ew hewldanîn serokatîya gelê kurd êdî hin bi hin weke ku ancamê didin. Ev yek, weke dîrokî ya ku divê ku mirov li ser bisekinê ya.

Ya rastî ew a ku ev civîna ku li Hêwlêrê bû jî, divê ku mirov wê bi awayekî dîrokî werênê er ziman. Gavaka giring a ku bo kongira netewî ya kurdistanî. Li kurdistanê, vîna gel hertimî yek bû. Lê sazîyek û ankû rêveberîyeka ku temsîlkariya wê dengê bike û li gorî wê û pêwîstînîyê wê gav biavêje pêwîstî pê heya. Ya ku nûha, bo wê gav dihê avêtin jî ev a. Şert û merc bo kongira netewî ya kurd pirr baş in. Kurd, divê ku van şert û mercan ji dest ne berdin û bii yekbûna xwe re gavaka dîrokî biavêjin. Ya ku hem gelê kurd û dîrok jî ji wan dixwezê ev a.

Îran jî û tirkiya jî divê ku êdî gavê biavêjin. Di vê demê de ku di vê pêvajoya ku serokatîya gelê kurd ku dayî destpêkirin de ku ti gavan neavêjê û hizirê ku wê bi çêkirina qarakolan û kirine herêmê weke herêmeka leşkerî û bi wê re wê derbeyê li kurdan bixe, wê pirr şaşîyeka mazin bike. Bi wê re, wê bi tememî êdî têkiliya xwe û kurdan ji hevdû bide birrîn. Piştî rewşeka bi wî rengî wê êdî kurd, bi tememî rêya xwe ji wê cuda bikin. LI herêmê, nûha, hem li dijî kurdan û hem jî bigiştî ku di roleka xirab de ya tirkiya ya. Divê ku tirkiya ji vê yekê xwe derkeve. Divê ku êdî hinekî bibe mirov û xwe rast bike. ..

Yekbûna kurdan, ne li dijî ti kesekî ya. Yekbûna kurdan, bi armanca ku kurd di nava xwe de yekitiyê çê bikin û pirsgirêkên xwe yên civatî bixwe çareser bikin û xwe bixwe birêvebibin. Ji xwe, heta nûha, hemû pirsgirêkên kurd, ji ber nebûna yebûna nava wan a.

**Kurdistan, care pêşî bi peymane qasrî-şêrîn hat duqatkirin. Piştre di konfaranse Lozanê hat çarqatkirin. Ji destpêka sadsalê ve kurd, dixwezin ku yekbûnekê di nava xwe de bidina çêkirin û wan hêrîşên li ser xwe bidina sekinandin.**

**Her kurd, di zanê ku heta ku yekbûnek di nava wan de çênebê, wê nikaribin vê yekê di nava xwe de çê bikin. Dewletên herêmê jî, ji wê nebûna yekbûna navxweyî ya kurdan, sûdgirtina û kurd bi kurdan re dane şer kirin. Dema ku em dîroka kurdan binerin, em vê yekê bi awayekî vekirî bibin. Hertimî, nakokiyên nava civatê hatina çêkirin û li ser wan re sîyeset hatiya kirin û bi wê sîyesetê re hewl hatîya dayîn ku kurd, werina ji holê rakirin**.

Pirsgirêka kurd, di vê temenê de hatiya afirandin. Lê êdî kurd dixwezin ku were çareser kirin. Li herêmê, dewletên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, nexwezin ku çareserkirina pirsgirêka kurd bibe. Minaqa vê yekê, şerê dewleta tirk ê bi kurdan re ya. Her wusa, piştgirîya wê ya ji komên çeteyên ku hêrîşî rojavayê kurdistanê dikin re ya. ..

Ku em ji aliyê olî ve lê binerê, emê bibînin ku çawa ol hatîya îstismar kirin. Di nava kurdan de, kurdên elewî, kurdên ezîdî, kurdên yarsanî, kurdên zerdeştî, û hwd hena. Her wusa, ji bilî van bawerîyan gelek baweriyên din jî hena. Kurdên cihû jî hena. Lê hertimî, yek li ya din hatina nîşandin weke dijmin û bi hevdû re nakokî di nava wan de afirandin û ew bi hevdû re dane şer kirin. "Dijberî di nava bawerîyan de", weke renge politikayên dewletên herêmê ya. Hertimî, li ser wan dijberîyên ku hatina afirandin re politikayên xwe yên ku nîjadperest dane domandin. Bi wê re jî, ´ji wan dijberîyên li ser bawerîyan re´, sûdgirtina û politikayên xwe yên li dijî xalkên herêmê jî kirina pretîkê de.

- Ev çend rojên ku li Hêwlêrê li navenda başûrê kurdistanê, civîna pêşî ya bo civate netewî ya kurd levcivîya. Di wê civatê de, hemû rêxistin, sazî û komel û hwd, ên kurd têde cih girtin. Berî wê jî Birêz Berzanî ku li ser wî, Birêz mam celal û Birêz Ocalan jî bê, bangî li civînê kir. Piştî banga wî, re civîna pêş di 22 temûza 2013´an de bi rê ve çû. Ev jî, cihê dilxweş ya.

´Kongira netewî ya kurd´, weke konfaranse çaremin ku birê Ocalan pêşnîyar kiribû bû. Rol û weyna wê jî dîrokî ya. BI rastî ku bi bê qaza û bela ku bi serbikeve, wê ev bê gavaka dîrokî di dîroka kurd û di nava civate kurd de jî. Li vir, ya ku em jî bibêjin ku her mirovê ku piçekî rûmet û mirovetî pêre hebe, wê êdî piştgirîyê bidiyê de û ji aliyê xwe ve hewl bide ku ew kongira netewî ya kurdistanê bi serbikeve. Li vir, em vê yekê jî bibêjin ku ne tenê kurd, her wusa, hemû komên kêmnetewî ên li kurdistanê jî, divê ku xwe têde bibînin û ew jî bo serkevtina wî di nava hewldan û karkirinê de bin. Divê ku ew jî bizanibin ku wê temenê azadî û bidest xistina mafê wan jî li wir were avêtin.

**Li kurdistanê, ji aliyê olî ve bê û ji aliyê kêmnetewî ve bê, divê ku bi rengê xwe têde hebin û ji bo wê jî di nava kar de bin. Bi teybetî, li vir, divê ku ez navê komên civate kurd ên weke yarsanî, êzdatî, zerdeştî, elewî, mesihî û heta ku cihûyên kurdistanê jî divê ku di nav de hebin û karibin gotina xwe bibêjin. Ew bawerî û xalk, koka wan bi hevdû re pêşketîya û bi hevdû re dîroka wan ya bi hezar salan heya. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku di temenê têgihiştina mesopotamîyîtî de divê ku tevbigerihin û tekoşîna maf û azadiyê pêş bixin.**

Li kurdistanê, dema ku em bahse pirsgirêka kurd dikin, em divê ku bibêjin pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya. Her wusa, dema ku em pirsgirêkê fahm bikin, hingî jî, emê bigihijina têgihiştina maf û azadîya xwe û emê bo wan di nava hewldan û tekoşînê de bin.

Di vê demê de, divê ku mirov bi teybetî, vê yekê fahm bike ku dema ku em dibêjin pirsgirêka kurd, em di aslê xwe de dibêjin pirsgirêka kurdistanê. Pirsgirêka kurdistanê jî, dema ku em bahse wê dikin, em bahse maf û azadîya kurdan û xalk û baweriyên din ên li kurdistanê jî dikin. Bo vê yekê, pirsgirêk, hem bo kurdan û hem jî bo xalk û baweriyên din ên li kurdistanê pirsgirêka maf û azadîyê ya. Di vê temenê de, pirsgirêka, di roja me de, rengê xwe pirr zêde jî dîyar kiriya. Êdî di vê temenê de, dema ku hewldanên çareserkirina vê pirsgirêkê were kirin û dayîn jî, hingî jî, wê ew hewldan bo hemû xalk û baweriyan jî bê. BI wê re jî, êdî ji wê xwezatir û asayîtir, ti tişt tûna ya ku ew jî di nava wê tekoşîna azadiyê cihê xwe bigrin û ji aliyê xwe ve wê tekoşînê mazin bikin û hewl bidin ku bigihijênina çareserîyê.

Bi teybetî, di çerçoveya vê demê de jî, divê ku mirov nêzîkatiyê li kongirê bike. Bo vê pêvajoyê pirr giring a. Li rojavayê kurdistanê, kurd hewl didin ku rêveberîya xwe ya xweser ava bikin. Li bakûrê kurdistanê jî, pêvajoyek ji aliyê tekoşîna kurd û serokê gelê kurd birêz Ocalan ve hatîya dayîn dest pê kirin. Li bakûrê kurdistanê, di vê demê de ji her demê zêdetir divê ku tekoşîna sivîl û demokratik werê pêşxistin. Dewleta tirk, li her herêmê, bendavên bi armanca leşkerî û qarakolan, hê jî çê dike. Bi teybetî, li dijî wan, divê ku tekoşînaka hê xort û bi tevger were dayîn dest pê kirin. Ji ber ku ev amedekarîya ji şerekî nû ê bi kurdan re ya ku dewlet dixwezê bike. ..

Ji xwe, di şerê li rojavayê kurdistanê de, ku komên çete hêrîşî kurdan dikin û jîyane wan xira dikin jî, di wê de hêzên tirk jî hena. Gelek hêzên teybet, ên tirk di bin navê "komên artişa Azad" û hwd de, ew komên ku hatibûbûna avakirin ku li dijî rejimê şer

bikin, di nava wan de hêzên teybet ên tirk jî hena. Heta ku bi wê re jî bi sînor nemêne tankan jî dişêne û bi wan li wir jî bi kurdan re şer dike. Yanî, li bakûrê kurdistanê li dijî tekoşîna azadiyê ya kurd, çawa têdikoşîya, her wusa bi heman rengî li wir li dijî kurdan di nava şer de ya.

Di vê demê de weke nan û avê, pêwîstîya kurdan bi yekbûna kurda heya. Ya ku wê temenê azadî û statûya wan li herêmê biafirêne jî wê ev bê. Ji ber ku wê yekbûna kurdan temenê statûya kurdan bê, wê gelek hêzên herêmê ên weke tirkiya û îranê û hwd, wê hewl bidin ku astangiyan ji wê re derxin û ne hêlin û nexwezin ku bi serkeve. Lê kurd, li vir, divê ku di ya xwe de safî û zelal bin û di avakirina yekbûna xwe de isrer bikin. Ji ber ku bo wan pirr giring a..

-

**Kongira netewî a kurdistanê û care sêyemin taloqkirina li darxistina wê ya li demeka ne dîyar. ..**

Kongira netewî, ev care sêyemin a ku dihê taloqkirin. Berê vê nivîsê bi du rojan min nivîsa xwe ya berî vê li ser kongira netewî nivîsandibû û gotibû "divê ku kongira netewî a kurd vê carê newê taloqkirin û were li darxistin." Bêgûman, dema ku min ev nav li nivîsê kir, tenê ji ber ku ev du car in kongira netewî a kurd ku tê taloqkirin di serê min de hebû. JI ber ku min jî, di dil û serê xwe de ne dixwestin ku vê carê were taloqkirin, min ev nav li nivîsê kiribû. Lê gotinaka heya, bi wê tê gotin ku "ya ku mirov ji wê di tirsihê tê serê mirov", dema ku ez sereka nivîsa xwe ya berê lê dihizirim û nivîsandina vê nivîsê dihênima berçavê xwe, ev gotin dihê bîra min. Ya rastî, ew a ku ev gûmana min hebû. Ji ber ku tirkiya û Îran li dijî statûya kurdan in û emerika jî di temenê de wan de tevdigerihê.

Vêcarê, kongira netewî a kurd hat taloqkirin. Lê vê carê, taloqkirina wê li demeka ne dîyar hat kirin. Çend ku di denezena “Ji aliyekî din ve tekez li ser wê yekê dikîn ku weke Komîteya Amadekar ji bo temam kirina pêwîstiyên sazkirina Kongreyê di demeke guncaw de dê karên xwe berdewam bikîn" jî, lê dîsa ew berjewendîparêzîya partîyên kurd ku tenê li bûna desthilatdarîya xwe dihizirin û ji wê pê ve, ti carî giştîya civate kurd ji wan re nebûya derd û kul ji wan re, di vê demê de cardin derketîya li pêş. Wê dîrok, vê rewşa partîyên kurd, mafdar dernexe. Wê, ji ber ku wan li ber giştîya civate kurd ne hizirîna û berpirsîyarên xwe ne hanîna li cih û tenê li partî û bûna desthilatdarî ya partîyên xwe dihizirin, wê dîrok wan berpirsîyar bigrê.

Di vê demê de, herî zêde, partîyên başûr ên ku bûna desthilatdar ji vê yekê berpirsîyar in. Partîyên başûr, ji navikê ve xwe bi tirkiya bi paymanên aborî û hwd girêdane. Bi vê yekê jî, êdî bi vî rengî, li pêşîya yekbûna netewî a kurd, ew payman derdikevin. Dema ku peymanek were çêkirin û ankû sozek were dayîn, divê ku ne di temenê dijberîya netewa te de bê. Divê ku di temenê parastina berjewendîyên netewa te de bin. Lê mixabin, desthilatdarîya başûrê kurdistanê, li ber civate kurd, di vê warê de azmûneka pak û baş nedaye.

Î ro, di vê demê de ku kurd, newina cem hevdû û yekbûna xwe ya navxweyî çêkirin, gelo wê kengî û di kîjan demê de çê bikin? Divê ku em vê pirsê jî ji wan bikin. Li vir, civate kurd, di nava partîyan de hatîya perçekirin. Sê tişt, î ro li pêşîya pêşketina civate kurd hena. Yek, perçebûna partîyî ya. Ya duyemin pêvajoyê asîmlekirinê ku rejimên weke tirkiya û îranê ku li ser kurdan dane meşandin in. Û ya sêyemin jî, weke ancamaka herdû xalên pêşî jî bi wan astangîyên ku li pêşîya li darxistina kongira netewî

ku dihên afirandin in û ku di ancama wê de kongira netewî nayê li darxistin a. Yanî, partîyek kurd, dikarê bûna desthilatdar, giringtir bibîne ji yekbûna civatî ya civate kurd. BI vê re jî, di aslê xwe de, î ro ev astangî li pêşîya civate kurd in. Î ro, ku em di temenê hêrîş û astangiyên li ser civate kurd de ku şîrove bikin, divê ku em hêrîş û înkare rejimên herêmê li aliyekî bihasibênin. Lê vê rewşa partîyên kurd jî, li aliyê din bihasibênin ku ew jî biqasî wan hêrîşan êdî zirerê dide civate kurd û xizmetî tûnakirina civate kurd dike.

Kîjan partî, wê çend andamên wê zêdetir bin. Kîjan partî wê çawa were temsîlkirin, ku weke mijarên "ûsûlî" ku mirov dikarê nîqaş bike, bûna mijarên ´esasî´ li pêşîya li darxistina kongira netewî a kurd. Siba, di pêşarojê de, ku weke sedemekên têkçûna civate kurd, sedem werina rêzkirin, divê ku ev rewşa partîyên kurd jî, weke sedemeke giring û dîrokî were nivîsandin li nava li rûpelê dîrokê. Di vê demê de, hemû astangiyên li pêşîya pêşketina kurdan û yekbûna kurdan, di temenê berjewendîyên partîyan de dihên li holê. Girtîna deriyê sêmalka, ne hiştina sîyesetmederên kurd ên weke Salih Mislim çûyina li başûrê Kurdistanê, pêşîlêgirtina alîkarîya mirov ji başûrê kurdistanê ve çûyina li rojavayê kurdistanê û hwd, çend ji wan mijarên ku em dikarin weke rûreşîya sîyesetmederên kurd werênina ser ziman in. Bi vê re jî, ku hin kurd ji xwe re weke sîyesetkiriinê dihasibênin lê ku di aslê xwe de rûreşîya wan a, qatkirina rewşa sîyesî ya rojavayê kurdistanê jî bi tevlîbûna ENKS li muxalefeta li Sûrî jî, wê rûpelekî din ê wê dîroka kurdan ya rûreşîyê bê. Bêgûman, wek rûpelekî din jî, wê care sêyemin taloqkirina li darxistina kongira netewî a kurd jî, wê li ser navê sîyesetmederên vê serdemê ên kurd, wê weke rûreşîyeka din ya dîrokî bê li ser navê wan. Mixabin, ev dîroka rûreşîyê, bûya sedema pirr komkujiyên kurdan jî. Şerê birakujî li başûrê kurdistanê ku di salên 1993 û 1994 ´an û salên piştre ku bû û her wusa hêzên başûrê şerkirina wan bi tekoşîna azadîya bakûrê kurdistanê jî, çend ji wan rûpelên wê dîroka rûreşîyê na.

Di destpêka desthilatdarîya başşûrê kurdistanê de, min bixwe, car bi car di serê xwe şîrove dikir û ji xwe re digot ku "êdî dawî li wê dîroka rûreş tê". Lê bi vê bawerkirinê, min bixwe jî, min xwe xapandîya di serê xwe de. Ev rewşa sîyesetmederên kurd ya vê serdemê, bi rastî, ez bixwe jê fihet dikim weke kurdekî û andamekî civate kurd.

Gelo, divê ku çend felefeketên din werina serê civate kurd, heta ku ev sîyesetmederên kurd ji xwe fihêt bikin û jê sûd bigrin û heta ku êdî di yekbûna kurdan isrer bikin? Divê ku çend komkujiyên weke komkujên ´geliyê zilan´, ´komkujiya dersimê´, ´komkujiya helebçê´ û hwd werina serê kurdan, heta ku ev jê derxin. Ez vê jî bibêjim ku heta ku van sîyesetmederên kurd ji vanqas komkujiyên ku hatina serê kurdan ku ders û fêr derxistibin, divê ku mirov êdî bawer bikin, sad komkuji û tûfanên din jî werina serê kurdan, wê jê ders û fêr dernexin. Bi rastî jî, ya ku em ji sîyesetmederên kurd re bêje, ew a ku "divê ku êdî ji xwe fihêt bikin!". Gelo, piçekî jî hêsta netewî ya kurdî bi we re nemaya? Li vir, ev jî derdikeve li holê. Asîmlasyona zimanî, ku zimanê civate were qadaxa kirin, ew liingekî asîmlasyonê ya. Lê asîmlasyona zihniyetê, ew pirr xirabtira. Wusa xuya dike ku, çendî ji aliyê zihniyeta civate kurd ve asîmlasyon bi sîyeseta kurd û her wusa rewşenbîrên wê re bûya. Asîmlasyon, du alî ya. Yek, zimanî ya. Ya din jî, zihniyetî ya ku em dikarin bi çand, kevneşopî û nirxên weha ên civatê re werêne ser ziman a. Li vir, ev yek bi vî rengî, pirr zêdetir, dihê ditin û fahm kirin.

Ahmadê Xanî, di got ku "çend serokên me heba û li me hizirîban, wê î ro rewşa me

ne di vê rewşê de ba." Ahmedê Xanî, bi gotinên dema xwe, di vê temenê de û wateyê de çend gotinan dihêne ser ziman. Di aslê xwe de, ku ez bahse têkçûnekê bo civate kurd bikim, divê ku ev vê rewşa sîyesetmederên kurd, di xale pêşî de şîrove bikim. BI sîyeseta têkçûyî re, tekoşîna parastina nirxên civatî nayê dayîn. Yên ku bêjin tê dayin derew û viran dikin.

Mirov, bi sîyesetmederên weha, pazê xwe jî naçîrêne. Siyesetmederên ku li civatê û giştîya wê û li nirxên wê nahizirin. Tenê, li bûna desthilatdarîya xwe dihizirin. Di aslê xwe de, ev sîyeseta dîktarorî ya. Dibêje, ´bila hemû tişt bo min bê. Piştî min re jî, heta dojehê cihê wê heya.´ Sîyeseta vê zihniyetê, wê çiqasî karibê, serkevtinê bo civate kurd bêne. Bike û bike, wê qatbûnê di nava xwe de bide çê kirin. Weke ku çawa ku li rojava, çend bêaqil dibin navê sîyeseta kurd de çûn û tevlî ´muxalefeta Sûrî´ ya ku hê hebûna civate kurd nasnekê bibibin, û hwd.

Ev rengê sîyesetê, heta roja me, bi kurdan daye windakirin. Heta roja me, dema ku em komkujiyên kurdan şîrove bikin, divê ku em biqasî wan kiryarên ku ew komkuji bi zihniyeta xwe re kirina, vê rewşa sîyesetmederên kurd jî li rex wê şîrove bikin. Pêşîyên me kurdan çend rast gotina, "kûrmê darê ne ji darê bê, wê qalandina darê nebê." Rejima îranê jî û rejima tirk jî, ev 80 salin ku bo tûnakirin û ji dîrokê birina civate kurd têdikoşîn. Lê biserneketin. Lê mixabin, ya ku li ber kurdan wan biserxist jî, ev sîyesetmederên kurd in. Di aslê xwe de, ku mirov bibêje ku yên ku ew biserxistin û civate kurd tûnakir, ev sîyesetmeder û rewşa wan ya weke ya roja me ku heya ya. Ji vê aliyê ve ku em binerin, du beş ji nava kurdan hertimî di vê 80 salîyê de ketina xizmeta têkçûna civate kurd de. Yek, ew "rewşenbîr"ên kurd bi bi tirkî dinivîsênin û zimanê tirkî li ser civate kurd farz dikin in. Ên din jî, sîyesetmederên kurd ên bi vî rengî rewşa xwe na. Ev herdû beş û dordor, î ro, bi zihniyeta wan re, di aslê xwe de di temenê wan taloqkirinên li darxistina kongira netewî a kurd de jî na. Civatek, bi nirxên xwe heya. BI nirxên xwe dikarê bêje ku "ez civat im". Ew nirxên wê jî, çi na? Yek ziman a. Ya din, çand a. Ya sêyemin, nirx û rewşên wê civatî kevneşopî û hwd in. Ev rewşên giring ên ku dikin mirov bi wan dikarê ji civatê re bêje civat.

Di vê sadsalê û vê rewşa pêşketinê a ku êdî civate kurd hatîyê de jî, êdî sîyesetmederên kurd, nikarin gazinan ji ti kesekî bikin. Yên ku di vê demê de, civate kurd bi ber tûnabûnê ve û xwarina têkçûnên nû ve dibê jî, ev rewşa sîyesetmederên kurd û rewşa wan ya sîyesî ya ku di wê de na. Carna, zihniyeta mirov, çendî pêşketî û têgihiştî û filosofîkî jî bê, dema ku mirov nekarî bi awayekî rast û pak wê birêxistin bike, ew tenê êdî di gotinê de dimêne. Ji gotinê nabuhûrê. Çend ku pêşketinaka mazin di nava civate kurd de, bi wê bibê jî, lê dema ku sîyeset, bi kêmesîyên xwe bivî rengî tevgerîyan, hingî wê dîsa têkçûnê bi xwe re bênin. Carna, mirov bi deh salan kar dike û di xabitê û pêşketinê. Bi wê keda wan deh salan mirov pêşketinaka mazin jî çêdike. Lê carekê, sîyesetmederek tê û bi xelatî û şaşîyên xwe re hemûyan bi carekê ji holê dirakê. Êdî weke ku ew pêşketinê bi wê zihniyeta pêşketî re nebûyî dibe. Î ro, rewşa kurdan jî, ketîya vê rewşê de. Bi tekoşîna azadiyê re bê, bi gelek kedên din re bê, pêşketina civatî ya mazin derketîya li holê. Lê nûha, yên ku wê pêşketina ji holê radikin jî, ´nivîskarên kurd´ ên ku bi tirkî dinivîsênin û ev rewşa sîyesî ya di nava kurdan de ya.

Di vê demê de, hemû dordorên kurd û beşên civate kurd hêvî dikin û li bendê na ku siyeseta kurd bigihijê hevdû bi hevdû re yekbûnê çêke û bi wê bersivê bide ppêwîstînîyên demî û ên civate kurd. Lê sîyesetmederên kurd, mixabin, di nava çend

berjewendîyên xwe ên li ser partîyan re ku hena re dikarin bi carekê derbeyê li wê rewşa kurdan bixin. Yanî, heta ku gavekê jî bi pêşde herin û siba, derkevina ber çapameniyê û bibêjin ku "li darxistina kongira netewî a kurd ne giring a´ jî, bi vê sîyeseta wan, divê ku mirov şaş nebê. Ên ku di vê demê de weha bikin, wê siba wê jî bikin.

Sîyeset,, çend ku refaransên wê zanebûnî û têgihiştî hebin jî, divê ku hertimî ji wê şaş nebê ku divê ku pişta xwe bide civate xwe û hêza ji wê bigrê. Ev, divê ku weke xaleka ku nebê nabê ya. Divê ku wusa bibînin jî. Divê demê de, em hêvî dikin ku sîyesetmederên kurd, aqilê xwe hildina serê we û vê şaşîya dîrokî nekin û di demek kin de werina cem hevdû û pirsgirêkên xwe ên navxweyî çareser biikin û kongira netewî a kurd li dar bixin. Lê wekî din ku ew pêxember jî bin û kûrê pêxembaran jî bin, wê gelê kurd û civate ti carî wan afû nekê. Ev dem, demeka dîrokî ya. Divê demê de, pêşaroja civate kurd dihê kifşkiirn. Herkesek dibîne ku dihê xwestin ku Lozanek nû li ser serê kurdan were çêkirin û hûnandin. Ev rewş û çenekirina yekbûna kurdan, bi her awa û rengê xwe re, tenê û tenê xizmetî wê sîyesetê dike ku Lozanek nû were serê kurdan û li ser serê kurdan were hûnandin. Bêgûman, ji van sîyesetmederên kurd ên li pîyasê na, gelê kurd û civate kurd, pirr cûda dihizirê. Lê di her seferê de, gelê kurd, dibêje, ´dê wê vê carê bin zilam, dê vê carê nebûn wê care din, dê hêde vê carê û hwd. Lê heta kengî bi vî rengî wê herê? Bi vê rewşê û wê rengê ku sîyesetê ku dikin, xwe bêwate dikin. ...

Lê birastî, ku hêdî bi wê bêwatekirinê ku tenê zirer gihiştiba wan, me yê gotiba, heta kûderê herin bila herin. Lê ya ku mirov dihêşêne, zirer digihijê civate kurd giştî. Di ancame wê siyesetê de, kurd jî bûna lingekî wê ambargoya li ser rojavayê kurdistanê. Bi vê sîyesetê, her yekê li ber hevdû bûna dîkê alokan. Meselekok heya, bi tememî li vê rewşa sîyesetmederên kurd tê. Li herêma me ya botanê ev vegotin tê gotin. Min bixwe ji ji dayîka xwe bihîstîya. Dibêjin ku rojekê Teyrê sîmûrg, bi çend tayrên din re çûya bajarekî, ku ew bajar bajarê alokan bûya. Dibêjin ku Tayrê sîmûrg, ku ketîya nava bajarê de, ku gihiştîya kîjan alokê jê pirsîya ku ka kîjan ji wê mîrê vî bajarê alokan a. Dibêjin ku Tayrê Sîmûrg, ji kîjan alokê pirsîya ku ma kîjan ji we mîrê vî bajarî ya, aloka bersiva daye gotîya "ez im mîrê bî bajarî". Tayrê sîmûrg çûya ber kîjan alokê û jê pirsîya, wê alokê parên xwe vekirîya û gotîya "ez im mîrê vî bajarî.", Di dawîyê de ku Tayrê gihiştîya kîjan alokê û pirsîya ku kîjan ji we mîrê vî bajarî ya û ku hher yê ku sîmûrg jî pirsîya, k bersiv daye û gotîya "ez im mîrê vî bajarî", dibêjin ku Tayrê sîmûrg, gotîya sawal, tayr û ajalên din, "li vir dad tûna ya, bikivina nava wan de û serê hemûya jêkin." Piştre, êdî tayr û sawalên din ketina nava bajarê alokan de û qira alokan hanîna." Ku weke gotinaka kurdan jî gotina xalkê ya bi rengî "weke qira alokan hanî wan hanî" jî, ji vê vegotinê hatîya derhanîn û hatîya vegotin. Vêca, em li vî bajarî li kurdistanê, ji kê dipirsin, hemû jî bûna serok û yek jî yê din qabûl nakê û ne pejirêne. Hemû jî, bo serokatîya xwe hertiştî dikin. ..

**-Piştî ku li darxistina Kongira netewî a kurdistanê hat taloqkirin, êdî hêrîşên li rojavayê kurdistanê jî zêdetir bûn. Heta ku hêrîşên li başûrê kurdistanê jî zêdetir bûn. Civate kurd, weke ku bigiştî bikeve bin pêlên hêrîşan de lê hat.** Em di demeka giring de di buhur in.. Hêrîşên pirr mazin li ser serê kurdan hena. Li rojavayê kurdistanê, bi teybetî li herêmên ´til-Eran´ê,´til-Hasil´ û hwd, komkujiyên mazin ji aliyê çeteyên weke ên ´cebetil-nasr´, ´bilad el-şam´ ve hatina kirin.. Ev çeteyên ku xwe di bin navê olê ji xwe re weke ´maske´ bikardihênin û ku di aslê xwe de zihniyeta wan ji ya ´nazîyan´ necudatira, komkujiyên mazin dikin. Ev çete û hê gelek çeteyên din ên weke

wan, li pişt wan, dewletên weke tirkiya û hwd hena. Piştgirîya welatên rojava û emerika jî ji wan çeteyan re heya.

Heta roja me, di çapameniya rojava û emerika xwe de bahse ´el-kaîde´, ´cebetil-nasr´ û hwd dihat kirin. Ev komên bi vî rengî ji aliyên emerika û rojava ve jî, weke ´terorîst´ jî hatina xistin li lîsteyê de. Lê ev komên ku hatina xistin li lîsteya terorê de jî, î ro li dijî kurdan bi piştgirîya heman hêzên ku ew kirina lîsteya terorê de,, li dijî kurdan şer dikin. Di anîya ku li dijî kurdan hatîya vekirin de, emerika, hêzên ewropî, bi ´cebetil-nasr´ û ´el-kaîde´ hwd re li alîyekî na. Li dijî kurdan, bûna yek. Piştgirîya ji ingilstan û emerika ji wan hêzên kujar re çûya, di çapameniya hem ya van welatan de û hem jî ya cihanê de dihê axiftin.

**Bi teybetî, divê ku mirov bipirsê ku ji ber çi li dijî kurdan, ´el-kaîde´ û emerika bûna yek.? Ji ber çi, emerika piştgiriyê didiyê de ku herê bi ser kurdan de.? Bi wê re jî, hin bi hin dokumentên nû derdikevina li holê ku şerê bi kurdan re dihê meşandin, gelek alî di wê de na. Ajansa nûçeyan ya fermî ya Îranê, duhû di nûçeyeka xwe de hanî ser ziman ku " bi sadan leşkerên tirk, cilên komên çekdar ên cebetil-nasr´, ´bîlad el-şam û hwd, li xwe dikin û ji sînor derbaskirin û buhurin û şer dikin" li herêmên kurdan**. Ev nûçe û agahîyênn bi vî rengî, dide nîşandin ku di aslê xwe de di bin navê çeteyên ´cebetil-nasr´, û bilad, el-şam û hwd de, ev dewlet hêzên xwe yên leşkerî bi awa û reng dikin û dişênina wir û didina şer kirin. Yanî, weke ku çawa ku li ser navê ´cebetil-nasr´, ´ bilad el-şam´ û hwd re navê olê weke maskê dihê bikarhanîn û îstismarkirin, biheman rengî, dii bin navê van çeteyan de şandina leşkerên dewletên weke tirkiya û hwd jî, bi heman rengî navê ´cebetil-nasr´, bilad- el-şam´ hwd, dikeve weme maske li berçavan.

Pêşî hat gotin ku ´cebetil-nasr, çend aşîr in´, Piştre hat gotin ku "çend mirovên ku ji derve hatina xapandin û şandina li herêmê ku bidina şerkirin in." Lê nûha, bi agahî û nûçeyên ku dihên li holê û dikevina ajansên nûçeyan de, rengê vê rewşê di guharê. Berî hingî, di destpêka şerê li sûrî de, hatibû rojevê ku tirkiya, hin komên xwe yên "hêzên teybet´ ku amede kirina, di bin navê van koman de şandina li Sûrî û dide şer kirin." Piştre jî ketibû rojevê de, ku gelek ´"fermandarên tirk, ji sînor buhurîna û şerê li sûrî û bi teybetî şerê li dijî rojavayê kurdistanê bi sazûman dikin." ..

Piştî ku kurdên rojavayê kurdistanê, hanîn rojevê ku ´wê rêveberîya xwe ya xweser´ ava bikin û pê de, hêrîşên li wan hatina zêdetir kirin. Ew şerê ku hatî zêdetir kirin, hê didomê. Di dewam û ancama wî şerî de, komkujiyên li ´til-eran´, ´til-hasil´ û hwd hat kirin. Ev komkuji, di wan de bi dehan û sadan kordên sivîl hatina qatil kirin. Li aliyekî bi vî rengî komkujiyên mazin tên kirin. Li aliyê din jî, bi sûîqastên weke sûîqasta Îsa Hiso û hwd, rêveberên başûrê kurdistanê tên qatil kirin. Yanî, ev hemû bi hevdû re di ahangekê de dihên kirin.

Kurd, li rojavayê kurdistanê, di bin hêrîşên mazin de na. Hêrîşên ku li wan dihên kirin, li hebûn û heyîna wan dihên kirin. Bi armanca tûna kirina wan ew hêrîş tên kirin. Hemû hêrîşên ku tên kirin, bi vî rengî, bi wan armanca wan ya din jî ew a ku ne aramiyê bidina çê kirin. Lê aliyekî din jî ew a ku bi teybetî, piştî ku kurden rojavayê kurdistanê gotin emê rêveberîya xwe xweser ava bikin, êdî bi teybetî li herêmên kurdan ên ´girê-sipî´ zêdebûn. Girê-sipî, ku rejima baasê, navê wê yê kurdî bi armanca ku bike arabî kirbû "ti-abîyad´, weke herêmeka stretejîk a. Herîşên li wir, armanca wan, ew a ku herêmên rojavayê kurdistanê bikina duqat. Ku ev komên çekdar, ku tirkiya û û hwd ku

piştgirîyê didina wan ku li girê-sipî bi serkevtiban, wê hingî herêmên rojavayê kurdistanê, ku kobanê û afrînê li aliyekî dima û li aliyê din jî ku qamişlo, hesekê, Amûdê û hwd ku diman, wê bûban dûqat. Bi wê rengî, êdî wê temen xweserîya kurdistanê ji holê ra kiriban.. Bi vê armanc û hizrê, ew hêrîşên li wê herêmê hatina zêdetir kirin.

Hêrîşên li wê herêmê ên li girê-sipî, hê jî dibin. Nûha, nûçeyên ku tên ji wê herêmê di wê rengê de na ku komên van çeteyan diçina gundan û dibêjina gundîyan "gundên xwe vala bikin´" Ev jî, weke ku di temenê wê stretejiyê de dihên kirin. Bo vê yekê, di serî de, divê ku mirov di van taktîkên ku em divê ku bi wê stretejiya kirina bin kontrolê ya girê-sipî ve girêdayî lê bihizirê û fahm bike. Hin kurdên ku li cem dewleta tirk in ên ku qaso "partîyên kurd" in, ên bi navê "partîya Azad" û ankû "el-partî" ku ti eleqeya wan bi azadî û mafê kurdan re tûna ya re, hewldan ku ji nava kurdan ve wê qatbûnê bidina çê kirin. Mixabin, ew hewldan, hê jî, didom in.. Bi teybetî, nûçeyên ku dikevin ajansan de, ew in ku di wan de tê gotin ku "rêveberîya başûrê kurdistanê jî pişgirîyê dide vê". Em hêvî dikin ku ev nûçe ne rast bin. Partîyên başûrê kurdistanê bi teybetê PDK û YNK, dizanîn ku dema ku du hêzên cuda habin, çawa wê li dijî hevdû şer bikin. Şerên YNK û PDK, ên di salên 1995, 1996 û hwd, ên li dijî hevdû bûna jî, di bîra kurdan de na. Herwusa, çawa ku dewleta tirk PDK, li dijî PKK´ê bikarhanî di oparasyonên xwe yên dervî sînor de û bi hevdû re da şer kirin. .. Divê ku ev dîrok, newina ji bîr kirin. Di wan deman de, bi sadan kurd, PDK û YNK´ê jî, ji hevdû kuştina. Herwusa, bi heman rengî bi sadan PKK`yî jî bi destê wan hatina qatil kirin, di dema ku tirkiya ew bikardihanî de. ..

Î ro jî, li bakûrê kurdistanê, bi deh hezaran, "cahş" hatina çêkirin û li dijî kurdan didina şer kirin. BI destê wan, bi hezaran kurd, hatina qatil kirin. Ev rewş, hemû jî, rewşên, ku patîyên kurd li dijî hevdû hatina dayîn şer kirin in. Di nava wan şerên ku kurd di wan de li dijî hevdû hatina bikarhanîn de, bi sadan kurd hatina kuştin. Ev dîrok, divê ku newê ji bîr kirin. Kurd, vê yekê naxwezin. Li kurdistanê, ya ku kurd naxwezin ku dubara bibe ev a. Ji ber çi kurd, wilqasî zêde dixwezin ku kongira netewî, were li darxistin? Ji ber ku kurd êdî naxwezin ku ew dîrok were dûbara kirin. Naxwezin ku ´birakujî´ di nava kurdan de bibe. Ya ku dikeve sermilê sîyesetmederên kurd de jî, ew a ku temenê wê biafirênin ku ew birakujî êdî nebe. Kongira netewî bo vê yekê, li kurdistanê, bi teybetî, li rojavayê kurdistanê hewldanên ´ava kirina hêzeka duyem a dervî YPG´ê´´, tenê wê temenê wê biafirêne û wê bike ku ew dîrok were dûbara kirin. Ku du hêz hebin, wê hertimî, ew li dijî hevdû werênina bikarhanîn. Li başûrê kurdistanê bi salan, hêzên peşmergê ên YNK´ û ên PDK´ê li dijî hevdû hatina bikarhanîn. Divê ku rêveberîyên başûrê kurdistanê, vê dîrokê nedina dûbara kirin.Fêr û aqilê ku ji wê dîrokê derxin ew a ku ew dîrok newê dûbara kirin. Bo vê yekê, kongira netewî giringa û dîrokî ya.

Kongira, netewî, divê ku hemû hêzên kurd ên leşkerî û ên sîyesî di bin banê xwe de bi destûr û nkû ´prensîbên´ ku kifş bike re, bike yek. Temenê yekîtîyê, bi vî rengî dihê afirandin. Hêzên leşkerî, ne ji bo partîyekê tên ava kirin. Hêzên leşkerî, bo parastina civatê tên ava kirin. Hêzên leşkerî ku hatina ava kirn jî, dibêt ku hin partî, weke ku di dema PDK, YNK, PKK û hwd de bû, bidestê wan werê ava kirin. Lê ew hêz, dihê xistin bin xizmeta civatê û parastina wê de. Ti hêz, bi xizmeta partîyekê de namêne. Ji ber vê yekê bû, ku dema ku hêza leşkerî ya PKK´ê ava bû, ji hemû beşên kurdistanê tevlî bûn,

Ew hêzeka netewî bû.

KOngira netewî, bo vê yekê, ya ku dikeve sermilê wê de, êdî "komîteya xwe ya parastinê" ku ava kir û dema ku rêzikên wê kifş kir, hemû hêzên ku hena di bin banê wê de bibina yek û li gorî biryar û destûrên ku di wê kongirê de hatina kifşkirn di temenê netewî de tevbigerihin. Ya ku divê ku were kirin ev a. Hêzên parastinê, li gorî ti partiyî, nakeve tevgerê de. Li gorî parastina civatî û netewî di nava tevgerê de ya. Ji xwe armanca hebûna wê jî, parastina civate kurd a. Divê ku mirov di vê temenê de nêzî wê bibe.

LI ti devera cihanê, ti partî tûna na ku xwediyê hêzên leşkerî de na. Ji xwe di nava civateka ku di wê îdîayê û biryarê de bê, ku wê di nava xwe de bi demokratikî bijî û demokrasiya xwe pêş bide, ti carî hêzên leşkerî ne girêdyî ti partiyê na. Carna, di nava civatekê, 15 û ankû 20 partî ava dibin. Dema ku hemû partîyan hizirkir ku xwediyê hêzeka leşkerî bin, wê hingî rewşa civate bikeve çi rewşê de? Wê ti carî nekeve rewşeka baş de.

Dema ku em bahse kongira netewî bikin, divê ku mirov di vê temenê de girîngîya wê fahm bike. KOngira netewî, meclîsa xwe jî ava dike. Andamên wê li wê meclîsê na. Ew andamên wê, ne ji partîyekê na. JI hemû partîyan in. Wê hêza leşkerî jî girêdayî wê bê. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku karê kongira netewî, ew a ku parastina civatê bike. Bo vê yekê, projeyên çandî, rewşenbîrî û perwedeyî, û hwd, pêş dixe. Bi wê re jî, di hemû çerçoveyên ku pêş dixe de, wê esas bigrê ku civatê biparêzê û pêş bixe. Ji derve, dema ku hêrîşek li civatê bû, hingî, wê hêzên leşkerî ên ku hena, wê bikevina dewrê de û wê parastinê bikin.

Î ro, rojavayê kurdistanê, di bin hêrîşên mazin de ya. Hemû kurd, ji wan re berpirsîyar a ku li cem rojavayê kurdistanê bê û wê biparêzê. Demên weha ên dîrokî na. Dema ku hêzên civatî ên sîyesî, di nava xwe de yekîtîyê çênekin, wê nikaribin paarastinê jî bikin. Destûr û ´prensîbên´ netewî çi na` Divê ku çawa bin? Bersiva van pirsan, di kongirê de dihê dayîn û li gorî wê destûrên sîyesî ku hemû hêzên civatî û netewî li gorî wê tevbigerihin. Destûrên ku di kongirê de di temenê parastin û pêşxistina civatî de ku hatina girtin, wê bo hemû partîyan bin, ev partî ku piçûk bin û ku mazin bin.

Kurd, ji ber ku heta roja me, hêza wan ya ´parastina cewherî´ nebû, gelek komkuji hatina serê wan. Ên ku hebûn jî, ya dibin destê serokê aşîrekê de bûn û hwd, êdî bi serneketina. Rejimên herêmê jî, hertimî, nexwestina ku hêza wan ya parastinî nebê. Dema ku hêza kurdan ya parastinê ya netewî ya giştî hebe, wê nikaribin, kurdan li dijî hevdû bidina şer kirin û wê nikaribin, komkujiyan bikin. JI xwe, bo ku wan politikayên xwe li ser serê kurdan bibina sêrî, naxwezin ku kurd bibina xwediyê parastina cewherî jî. Dema ku kurdan bahse hêza xe ya parastinê kirina, weke ku gunahekî bikin, ji wê bahskirina. Dema ku kurd, xwediyê hêzaka parastinê bê, weke ku ´dawiya dunyê´ bê bo wan. Wusa lê dinerin. Hertimî, xwestin ku kurd, nexwediyê hêzeka giştî ya parastinê bê, bo ku karibin li ser serê wan serdest bin. Hemû jî, bo vê yekê, Tirkiya ji ber çi, hertimî nûha di nava xwe de, bi PKK´ê bahse "çekbardanê` dike? Hinekî jî, armanca wê ya bi wan gotinên wê ên di temenê de re, bo ku kurd bêparastin werina hiştin a. Kurdekî, ku xwedî hêz û hêza wî ya parastinê heyî, wê nikaribin, komkujiyan lê bikin û wê politikayên tûûnakirinê li ser serê wê bidina meşandin. Heta roja me, politikayên jenosîde li ser serê kurdan hatina meşandin.

Kurdistanê di Lozanê de hat qatkirin li çaran. PIştre jî, di nava her qata kurdistanê de jî, politikayên qatkirinê dane meşandin. Yanî, tenê bi wê qatkirna li çaran a kurdistanê, bi wê re bi sînor nemênin. Dixwezin ku ew qatkirina li çaran bikina sad qat. Bi wê rengê wê rengê, wê êdî karibin ku di bin dest de bigrin. Hewldanên avakirna hêza dûyemin li rojavayê kurdistanê li dervî YPG´ê, divê ku mirov di çerçoveya wê qatkirina kurdistanê de şîrove bike û fahm bike.

Li bakûrê kurdistanê, tevgera kurd, pêvajoyek da destpêkirin. Divê pêvajoya ku kurdan da destpêkirin de, çend ku kurdan çend gav avêtin jî, dewlete tirk, heta roja me ti gav nevêtîya. Vajî wê, wê çawa derbeyê li tevgera kurd bixin, divê pêvajoyê de hasabê vê tê kirin. BI sadan qarakolên ku çêkirina û bendavên ku bi armanca leşkerî ku çêkirina, bi vê armancê na. Dewleta tirk, hebûna xwe ya leşkerî bakûrê kurdistanê zêdetir kir. Pêvajoya ku kurdan li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirn, wê çawa di temenê têkbirina kurdan û ku derbeyekê li kurdan bixin de hewl didin ku pêş bixin. PÊvajoya ku kurdan û tevgera kurd li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin, pirr giring a bo pêşaroja kurdan. Kurd, dixwezin ku bi serkeve û pirsgirêka kurd bi rêyên danûstandinê were çareser kirin. Divê dema ku ev pêvajo heya de, li darxistina kongira netewî a kurdistanê û serkevtina wê, wê bê temen û aliyekî serkevtina wê pêvajoyê jî. Ji ber vê yekê, divê ku ev pêvajo, bi teybetî, bêî ku dem werê winda kirin, divê ku di demeka kin de bi li darxistina kongira netewî a kurdistanê re divê ku were tacîdar kirin.

Ti tiştek, divê ku nebe astengi li pêşîya li darxistina kongira netewî. Ev rewşên ku hena û girtina derîyên weke ên ´sêmalka´, di aslê xwe de, dide nîşandin ku çendî giring û jîyanî ya bo kurdan ku kongira netewî li dar bixin. Hemû hêrîşên li rojavayê, pêvajoya ku kurdan bo çareserkirina pirsgirêka kurd li bakûrê kurdistanê, rewşên li başûrê kurdistanê ên weke ên herêmên tûsxûrmatû, Kerkûk, Şengel û hwd, didin nîşandin ku çendî giringa ku divê ku kongira netewî were li darxistin. Di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd li herêmê ku bi Îranê re pirsgirêka rojhilatê kurdistanê, bi tirkiya re çareserkirina pirsgirêka bakûrê kurdistanê, li sûrî çareserkirina pirsgirêka rojavayê kurdistanê, û her wusa têkiliya kurdan û van gelan ku di temenekî rast û baş de pêş bikeve jî, kongira netewî giring a. Kongora netewî, wê di çareserkirina pirsgirêka hemû başên kurdistanê de helwesta kurdan û sîyeseta wan bike yek. Ya herî giring û dîrokî û ku pêwîstîya kurdan jî pê heya ev a. Divê dema ku evqas hêrîş li kurdan hena û li rojavayê kurdistanê, komên çete ku dibin navê navê olê de şer dikin û ´fetwa´ya serê kurdan û kuştina wan didin de, kongira netewî, êdî weke pêwîstîyeka dîrokî ya kurdan a. Ên ku li pêşîya li darxistina kongira netewî astengiyê derxin jî, wê bina şirîkê wan mirovên ku komkujiyan li ser serê kurdan dikin in a.

Her wusa divê ku mirov mirov vê yekê jî bibêje ku divê ku deriyê ´sêmalka´ û hemû derîyên din werina vekirin. Yên ku deriyên herêmên kurdan li kurdan girtina, ti carî, wê dîrok wan afû nekê. Gelê kurd, li başûrê kurdistanê û li bakûrê Kurdistanê, divê ku bo hemû alikarî û piştgitîya ji rojavayê kurdistanê re divê ku li ser lingan bin. Divê ku cihanê rakina ser pîyan. Tenê bi çend xweşandina re bi sînor nemênin. Divê ku her kurd, di temenê netewî de nêzîkî rojavayê kurdistanê bibe. Rojavayê kurdistanê rûmet û şerefa hemû kurdan a. Ku lê xwedî dernekevin, bila ti carî bahse rûmetê nekin.

- Li herêmê, pirsgirêka kurd, hatîya wê astê ku êdî hemû politikayên herêmê dide kifşkirin. Li herêmê, hêzên herêmê ên weke Tirkiya û hwd jî, piştgirîyeka mazin didina çeteyên weke ´cebetil-nasr´ ku herina bi ser kurdan. Bi teybetî, piştî taloqkirina civîna

Cenewrê, şerê bi kurdan re zêde bûn. Lê herî zêde, dema ku kurdan gotin ku "emê rêveberîya xwe ya ku em xwe bixwe bi wê bi rê ve bibine emê ava bikin" û piştre, êdî hêrîş pirr zêde bûn. Têkîliya zêdebûna hêrîşên li kurdan, divê ku mirov bi wê re lê bihizirê û bêne ser ziman. Piştî ku kurdan, bidest hewldana avakirina rêveberîya xwe cewherî ya kurd kirin, êdî hêrîşên li wan pirr zêde bûn.

Ev komên çete ên ku hêzên rojava ên weke Ingilistan, firansa, almanya û emerika pişgirîyê dide wan, bi sadan kurdn qatil kirin. Di kuştina kurdan de, çekên ku ji tirkiya û îngilistan û emerika diçin dihên bikarhanîn. Fethullahçîyan, dibistanên xwe yên ku ku li herêmên kurdan û li herêmên din ên cihanê ku ava kirina, kirina weke saziyên hildane mirovan li leşkerîyê. Li kûderê, van mirovan, dibin navê olê de xwe birêxistin kirina, li wir bi sadan mirov birêxistin kirina û şandina li Sûrî ku li dijî kurdan şer biikin û kurdan bikujin.

Ev şerê li dijî kurdan ku hatîya dayîn destpêkirin, bi armanca têkbirina wan a. Yanî, hê jî, şer li dijî statûya kurdan dihê dayîn. Nayê xwestin ku kurd, li herêmên xwe yanî li kurdistanê bixwe jî bibina xwediyê statûyê. Li dijî wê şer dihê dayîn. Di vê temenê de, piştî ku kurdan, denezendin ku wê rêveberîya xwe ya herêmî ya rojavayê kurdistanê ava bikin û pê de, êdî hêrîşên van komên çekdar ku bidestê welatên weke tirkiya û hwd ku hatina bi rêxistin, hêrîş hatina zêdetir kirin. Di hêrîşkirina li kurdan de, dokumentên ku derdikevina li holê, didina nîşandin ku leşkerên tirk jî di bin navê komên çekdar de hatina bi rêxistinkirin û hatina şandin li sûrî ku li dijî kurdan şer bikin.

Di şerê dewletê ê bi kurdan re de, heta roja me li tirkiya, ew komên ku di bin navê olê de hatina bi rêxistin ên weke ´fethllahçîyan´, û hwd, divê demê de hemû berê wan dane rojavayê kurdistanê ku bi kurdan re şer bikin. Şerekî giştî bi kurdan re dane destpê kirin. Li bakûrê kurdistanê, pêvajoya ku tevgera azadiya kurd ku bo çareserkirna pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane dabû bû destpê kirin, dewletê weke firsandê bikarhanî ku derbeyê li kurdan bixe. Piştî ku şer sekinî, berê xwe da rojavayê kurdistanê ku kurdan û rewşa wan ya ku i wir heyî têk bibe. Bo vê yekê, ji rêveberên kurd ên weke Îsa Hiso ku rastî sûîqastê hatin bigra, heta ku digihijê taqandina bombayan û şandina komên çekdar û cebilxane ji wan re li Sûrî kir. Ev rewş, hemû, divê demê de pêşketin.

Çendekê berê ketibû ajansên nûçeyan de ku rayadarên AKP´ê gotibûn ku "emê pakêtekê amede bikin. Wê pêşketinên ku ti kesekî di xewna xwe de nedîtî wê bibin." Ew pêşketinên ku ti kesekî wê dixewna xwe nedîtiban, rengê wan li Sûrî bi şerê bi kurda re derket li holê û xwe da nîşandin. JI xwe, berî hingî, di dema civîna "mirovên aqilmend" de T. Ardogan bixwe gotibû ku "wê perwedeya bi kurdî nebê." piştre gotibû ku "wê rêjaya ji sadî deh jî newê xwerê´". JI xwe, hem di wê demê de û hem di demên berê de jî gotibûn ku "em li dijî statûya kurdan in." Gelo dema ku li dijî statûya kurdan bin û perwerdeya bi kurdî nebe û rêjaya ji sadî deh newê xwerê, wê pakêta çi amede bikin? Tevî ku dibêjin ku wê "perwerdeya bi kurdî nebê" û "wê rêya ji sadî deh newê xwerê" û bi wê re ku dijberîya xwe li dijî statûya kurdan didina nîşandin, wê bi çi rûyî derkevina ber kurdan?

Li vir, divê ku mirov bibêje ku ev gotinên bi navê "em pakêtê amede dikin" jî, tenê gotinên bi armanca xapandinê na. Hikimeta tirk, sîyeseteka qirêj, dike. Gavên ku di temenê demokratîkbûna tirkiyê de ku biavêje, di temenê "çareserkirina pirsgirêka kurd" de dihêne ser ziman. Pirsgirêka kurd û demokratîzabûna tirkiya ji hevdû cuda na. Ti alaqeya wan tûna ya. Ew pakêta ku dibêjin wê amede bikin jî, wê di wê temenê de

amede bikin û wê bêjin ku "meyîzênin, me pakêt amede kir". Lê belê, em hemû bi armanca xapandinê de na. Gelo, zihniyeta ku di vê dema ku kurdên rojavayê kurdistanê gotin ku emê rêveberîya xwe ya herêmî ava bikin û piştre bi awayekî şitt bidest hêrîşî li wan kirin, wê çi pakêtê amede bikin? Di sazûmankirina hêrîşên li kurdan de tirkiya, di temmen de ya.

Wê hikimeta AKP`ê, wê pakêteka ku çawa dikarê pêvajoyê dirêj bike û mijul bike, wê amede bike. Ji xwe jî, ya ku dihê ditin û gotin jî hem di nava kurdan de û hem jî di di nava rayagitştî de ev a. Ya ku herkesek jî dihizirê ev a. Hikimeta AKP´ê, bi gotinên ku dibêje "pêvajoya çareserîyê dewam dike" û her wusa "emê nehêlin ku bê xirakirin" jî, gotinên di temenê xapandinê de gotinên ku dibêjin in. Bi kirinên xwe, ya ku hikimeta AKP´ê dike, ji xwe ew a ku xira bike. Heta nûha, hemû gavên ku hatina avêtin, kurdan û aliyê kurd avêtin. Pêvajo, heta roja me, li ser milê kurdan û bi yekalî meşîya ya. Ji xwe, dema ku rayadarên hikimetê diçin û birêz Ocalan hevdîtinê dikin, bi wî re wê çawa gavan bi hevdû re di ahangekê de biavêjin ku kifş dikin, ku piştre ku pêvajoyê dest pê kir, dibêjin ku "me soz ne daye ti kesekî", û hwd, ev gotin didina nîşandin ku çendî di temenê xapandinê de nêzî pirsgirêkê bûna. Mirovekî ku bi wijdan bê û ji dil bê û rast bê, pêşî hevdîtinan nakê û piştre dernekeve ber çapameniyê û nabêje ku "me soz ne daye ti kesekî".

Bêgûman, dema ku tenê nameyên ku birêz Ocalan şandina derve, ku tenê ew jî werina weşandin, wê van gotinên hikimeta AKP´ê ên ku dibêje wê bên ditin ku çendî derew in. Di destpêkê de, dema ku name hatina şandin, mirovên ku ew xwandina, dema ku di tv´yê de li ser pêvajoyê û gavavêtinan diaxiftin, bahse "bi hevdû re gav avêtinê" jî kirin. Yanî, gotin ku "wê di pêvajoya pêşî de hin gava dewlet biavêje û hin gavan tevgera azadiya kurd jî biavêje" Hemû tişt, bi vî rengî, hatîya nîqaşkirin. Serokê gelê kurd birêz Ocalan bixwe jî, di hevdîtinên xwe de, ev hanîya ser ziman. Wî bixwe jî, dûbara hanîya ser ziman ku "pêvajo yek-alî nameşê." Berê jî, serokê gelê kurd gotîya ku "wê bi hevdû re gavan biavêjin." Lê heta nûha, ti gavên ku em bahsê ku ji aliyê dewletê ve hatina avêtin tûna na. Ji xwe, di roja pêşî ya radestkirina raporan ku ji aliyê "mirovên aqilmend" ve de, T. Ardogan bixwe got ku "wê perwerdeya bi zimanê kurdî nebê.", Piştre jî, got ku "em li dijî statûya kurdan in." Di wê demê de di derbarê rêjaya ji sadî deh de jî got ku "wê rêje newê xwerê" Ji xwe, statûya kurdan û perwerdehîya bi zimanê dayikê, xalên bingihîn in. Zimanê kurdî, bo tûnekirina kurdan hatîya qadaxa kirin ji destpêka komarê ve. Hê jî, ew qadaxa didomê. Ew tûna kirin, didomê.

BI wê re jî, şerê xwe bi kurdan re dimeşêne. Hê bi hezaran kurd di zindanan de na. BI hezaran sîyesetmederên kurd, di zindanan de na. Hê rewşa tendûrîstîa serokê gelê kurd birêz Ocalan di bin qatareyê de ya. Gûmana di serê hemû kurdan de ew a ku "mudaheleyên biolojikî" weke ya salên 2007´an ku bûya lê hena. Herkesek jî dihizirê ku ji ber ku dewlet, naxwezê ku ew nîşanakên mudaheleyê werina ditin, nayê hiştin ku heyetek serbixwe herê Îmraliyê û wî mûayne bike. Ku tiştekî bi vî rengî neba, ma gelo ji ber çi dewlet ti tirsihê? Deme kû, tiştna bi vî rengî hena, heta ku ew ditirsihê ku heyete serbixwe bişêne îmraliyê. Serokê gelê kurd, hertimî giringî daye giirngîya pêvajoyê. Bo vê yekê, tendûrîstîya xwe ne hanîya rojevê. Dema ku ew neyênê rojevê, nayê wê wateyê ku tiştna bi vî rengî tûna na.

Bi wê re jî, dewleta tirk, hêrîşên li rojavayê kurdistanê jî bi destê çeteyan dide kirin. Di dema ku min ev nivîs dinivîsan de jî, ku weke "nûçeya lezgîn" ku dikeve ajansên

nûçeyan de ew a ku komên çete ên di bin navê ´cebetil-nasr´ de ku bidest tirkiya û hwd, ku hatina bi rêxistin kirin, hêrîş di birina ser gundên ´Mehmûdîyê´, ´Sarincê´ û ´Xeryê´ ku girêdayî "girê-sipî na. Ev hêrîşên li rojavayê kurdistanê ku dibin, hewldanên di temenê gavneavêtinê de ku dewleta tirk hewl dide pêvajoyê bi rê ve bibe û hwd, bi herêkirin û ne herêkirina statûya kurd ve girêdayî ya. Ji xwe, dema ku heyîna statûya kurdistanê hat herê kirin, yên ku wan hêrîşan dibina bi ser kurdan de jî, wê êdî hêrîşên xwe bidina sekinandin. Hemû hêrîş û şerê ku li dijî kurdan, bi armanca ku temenê statûya kurdan werê ji holê rakirin a.

Î ro, pirsgirêka kurd, gihiştîy astaka pirr kifşkar. Li herêmê, rewşa kurdan jî, ne rewşa dema destpêka sadsale 20´an a. Di destpêka sadsale 20´an de kurd, hatina tûna hasibandin û hewldanên tûna kirina dan nîşandin. Ev şerên ku heta roja me, li dijî kurdan tê dayîn, di ancama wê politikaya ku di temenê wan hewldanên tûnakirina kurdan de ya. Divê ku mirov, vê şerê li dijî kurdan tê dayîn di berdewama wan hewldanên tûna kirina kurdan de bihasibêne. Piştî ku kurd, welatê wan Kurdistan di konfaranse Lozanê de li ser masayê bi ´cetwel´ hat qatkirin û piştre, şerê wê qatkirin û di wê temenê de şerê tûnakirina kurdan bi wê re li dijî kurdan hat dayîn. Komkujiyên weke komkujiyên, komkujiya geliyê zilanê, komujiya dersimê, komkujiya helepçe, komkujiya roboskî û hwd, di ancama wan hewldanên tûnakirinê de bûna. Lê di vê demê de kurdan bi tekoşîn û pêşketina xwe re, êdî gelek ji wan hewldanan vala derxistina. Lê hê jî, ew hewldan didom in.

**-Ez** li vir, carek din di çerçoveya mijare ´kongira netewî a kurd´ de bibêjim ku piştî civîna di 22´ temûza 2013an ya ku li hewlêrê hat li darxistin pê de, êdî rewşeka nû li kurdistanê bigiştî afirî. Hêst û kelecaneka mazin bi hemû kurdan re afirî. Kurd, dixwezin ku yekbûnekê di nava xwe de çêkin. Kurd, dixwezin ku statûya xwe ya li herêmê bidest bixin. Li herêmê statûya kurdan, wê bi tememî di pêşketin û awayê pêşketina herêmê de bandûra wê hebe. Ev di demên berê de jî wusa bûya. Di dema gûtî, hûrî û mîtannîyan de wusa bûya. Piştre di dema Medîya de jî wusa bûya. Desthilatdarîyên herêmî ên weke Sasanî û hwd jî, li ser wê temenê pêşketin. Piştre, desthilatdarîya şadadîyan û merwanîyan û her wusa piştre desthlatdarîya Eyûbîyan, desthilatdarîyên kurd û kurdistanî na û bandûra wan li herêmê û li pêşketina herêmê bûna.

LI vir, ez dixwezim ku vê yekê jî bibêjim. Piştî civîna 22´ê temûza 2013´an ya bo amedekarîya kongira netewî, di nîqaşên ku tên kirin de, tê gotin ku "ew xewneka bi hezar salan bûya." Ev gotin, dema dîroka kurdan bênina ser ziman û şîrove bikin, emê bi tememî nikaribin wê gotinê bi lêv bikin. Ji ber çi, emê nikaribin bi tememî bi lê bikin. Ji ber ku di demên dîroka kurdistanê, gelek demên kurdan di wan de yekbûna kurdistanî di nava xwe de çêkiriya mirov rastî wan tê. Em hewce nakê, ku em herina dema Mediya û demên berî wê. Tenê ku em di demên piştî zayinê de ku li wan dinerin, em dibînin ku yekbûn hatiya çê kirin. Minaq, dema şadadîyan de di dema Mihemedê kurê şadadî de yekbûna kurdîstanî ya giştî hat çêkirin. Ji xwe, ew yekbûna ku wî çêkir, wê bê temen ku ew dewleta mazin ya ku bi navê kalkê şadadîyan tê bi navkirin û navê "dewleta Şadadî" ya re. Ev dewlet, wê ji rojhilatê kurdistanê destpê bike û wê piştre başûrê kurdistanê û piştre gelek herêmên bakûrê kurdistanê ku di nav de li herêmeka mazin serdestîya wê hebe. Heta kû, ermenistana roja me û azarbeycane roja me jî ku di nav de ku herêmeka qafqasya ku hinekî herêmên din jî di nava van herêman de, wê di bin destê

desthilatdarîya kurd ya dewleta şadadî de bin.

Piştî Mihemedê kurê Şadadî, piştî wî re newîyên wî Elîyê leşkerî, Mazrûban, Fadl û ankû bi wî yê din ku bi wê tê nasin "fazlûm" û piştre wî re Şawûr û hwd, çend hikimdarên kurd ên dema dewleta Şadadîyan in. Bi teybetî, dema Fadl, hem ji aliyê sîyesî, rêxistin û stretejiya leşkerî û her wusa giringî dayîna pêşketina civaknasîya civatî û hwd, ji van aliyan ve weke demeka pirr giring dihê ditin. Dewleta Şadadîyan, ew desthilatdarîya wan ya ku pirr zêde pêşket, gihişt asta împaratoriyaka pirr mazin. Dewleta Merwaniyan jî, di aslê xwe de, dema ku hat ava kirin, wê di destpêkê de hinek herêmên desthilatdarîya şadadîyan jî xwe bi wê ve girêbidin û wê temenê wê biafirênin. Desthilatdarîya Şadadîyan, desthilatdarîya kurd ya ku ji aliyê rojhilat ve dest pê kir û yekbûneka giştî li kurdistanê çêkir bû. Lê Desthilatdarîya Merwaniyan, weke desthilatdarîyeka ku ji bakûrê welêt ê kurdistanê destpê dike û her wusa yekbûneka kurdistanî diafirêne. Di aslê xwe de, ew yekbûna mazin ku hatî afirandin, di vê demê de, wê temenê pêşketin û serdestî û desthilatdarîya Salahadinê Eyûbî jî biafirêne. Piştre desthilatdarîya dewleta Eyûbîyan ya kurd û navenda wê Riha bû û her wusa ew paytaxta Mîtannîyan Serêkahniyê jî ji wî re bûya paytaxt. Ev herêm di wê demê de pêşketî bûn.

Di van deman de, yekbûna ku di nava kurdan de hatina çêkirin, wê kurdistanê hemûyî bikina nava xwe de. Her wusa piştre ku pêşket, wê herêmên li dora xwe jî bike nava xwe de û pêş bikeve. Yekbûna kurdan, di dîrokê de pirr caran bûna. Berî şerê çardiranê, wê yekbûna kurdan pirr zêde hebe. Di aslê xwe de, têkçûna yekbûna kurdan, wê şerê Çardiranê, ji wê re jî bibe destpêkek. JI wî şerî çardiranê û pê de, wê pirsgirêkên di nava kurdan de biafirê. Di aslê xwe de, peymane qasrî-şêrîn, weke peymanaka ku ti carî ne li gorî gîyane herêmê bû, ku piştî ku hat mohrkirin û pê de, êdî wê kurd li herêmê bi wê re winda bikin. Wê her wusa gelek xalkên din jî, bi wê re êdî winda bikin. Bi teybetî, şerên bi kurdan re, wê destpêka wan ji dema şerê çardiranê û pêde bê. Bi teybetî, piştî şerê çardiranê û pê de, bênavber serhildan û raperînên kurdan wê hem li dijî dewleta îranê û hem jî li dijî dewleta osmaniyan bibin. Peymane ´qasrî-şêrîn´, weke peymanaka ku bi teybetî derbeyeka mazin li wê yekbûnaka giştî ya kurdan û ya kurdistanî xistîya ya.

Ji dema şerê çardiranê û heta ku digihijê şerê cihanê ê duyemin ê ku di sale 1914´an û hwd de ku destpêdike, wê bênavber tekoşîn û serhildanên kurdan bibin. Kurdan, hertimî doza azadîya xwe kirina. Bi vê yekê, ew yekbûn wan û azadîya wan ku ji wan hatîya standin, kurdan tekoşîn û serhildana wê dane û kirina. Bi teybetî, di sadsale 20´an de, kurdan bênavber tekoşîna azadiyê dan. Î ro, di roja ku em tê de dijîn di sadsale 21´ê de û sale 2013´an de, êdî ew yekbûna xwe ya ku winda kirina carek din ava dikin. Hewl didin ku wê ava bikin. Di van rojan de, ew nîqaşên li ser yekbûna kurdan, dema ku mirov li wan dinerê, yekî ku dîroka kurdan û kurdistanê û wan demên wê yên berê bizanibê, wê bêhtirî dilperî û kelecanekê hilde û di xwe de bijî.

Ahmedê xanê, di dema xwe de ji ber ku ew rewş dît, êdî bi teybetî, di dema xwe de giringî dît ku gotinê li ser yekbûna kurdistanê û azadîya wê bibêje. PIştî ku kurdan yekbûna xwe ya giştî winda kir, êdî herêm bi herêm şerên bi wan re bûn. Ji herêma din jî, dema ku derfet nebû ku piştgirîyê bidina wan, êdî dikevina rewşeka xirab de.

Li vir, piştî vê re em divê ku vê pirsê jî di çerçoveya pêşketina roja me hebûna wê de bipirsin ku wê bandûra yekbûna kurdan li rojhilat çawa bê. Mirov divê ku bi teybetî

ji du aliyan ve bahse wê bike. Yek, ji aliyê kurdan ve ya ku kurd wê pirsgirêka xwe çareser bikin û vîna xwe bikina yek û derxina li holê. Bi vê re jî, ku pirsgirêka kurd bi wê re di ancama wê yekbûnê de hat çareser kirin, êdî wê pêşîyaa demokratizebûn û pêşketina rojhilat jî vebê. Aliyê duyemin jî, wê di temenê pêşketina demokratikî ya li rojhilat de bê. Di wê temenê de, wê kurd, temenê pêşketina rojhilat jî bidina afirandin. JI xwe, ji nûha de jî dane afirandin.Pêketina kurdan, teybetmendiya wê ew a ku bi zihniyet û têgihiştina demokratikî pêş dikeve. Yanî, di aslê xwe de zihniyet û rê û nêzîkatîyaka nû ya bo herêmê. Li vir, bi tekoşînê re, li herêmê bi cihbûna wê têgihiştinê re, wê êdî demokratizebûn temenê wê biafirê û pêş bikeve.

Bi kongira netewî ya kurdistanî re, wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd jî biafirêne. Pirsgirêka kurd, bi çareserkirina wê re, wê ev zihniyeta û têgihiştina demokratik ya kurd, wê li herêmê bi wê pêşketina wê re bicih bibe. Bi wê re jî, çendî ku bi cih bû û pêşketina xwe jîn kir, wê hin bi hin êdî bandûra wê li herêmê û welatên herêmê û pêşketin wê bibe. Wê êdî di warê pêşketina demokratikî û mafê mirovan û hwd de, wê pêşketinê li herêmê bide afirandin.

**Lê ku ev(yekbûna kurdan) nebê û bi sernekeve û yekbûna kurdan neafirê, heya ku piştre komkujiyên ku pirr mazin ku weke ku li Rûanda bûn, werênina serê kurdan. Ev çeteyên ku li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan şer dikin, bi tememî di temenê jenosîda kurdan de şer dikin. LI minareyan û mizgeftan, bangî aligirê xwe dikin û dibêjin ku "kuştina kurdan helal a.", "destavêtina malên kurdan helal a.", "Destavêtina jin û canê kurdan helal a." Li Rûanda jî, bi wî rengî, bûbû. Piştre jî, bi sadhezaran mirov hatina qatilkirin.** Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku divê ku ev dema ku kurd di wê de dikin ku yekbûna xwe ya netewî çêbikin, divê ku bi serbikeve. Ku bi sernekeve, wê kurd, komkujiyên pir mazin bijîn. Yekbûna kurdan, û serketina kongira netewî ya kurdistanê, divê ku bibe û biserkeve. Ev yek, di vê demê de bo kurdan weke mecburîyetekê jî ya. Yekbûn, wê tenê wan ji komkujiyan xilas bike. Yekbûn, wê tenê ew şerê ku li dijî wan ku li rojavayê kurdistanê bê û li bakûrê kurdistanê bê û her wusa li beşên din ên kurdistanê bê, ku hatina dayin destpêkirin wê bide sekinandin. Di vê demê de, divê ku em bibêjin, ku di vê demê de, tenê wê yekbûna kurdan wê kurdan xilas bike.

Di vê demê de, ji berjewendîyên kurdan zêdetir, jîyane kurdan di bin telûkeya jenosîdê de ya. Di vê demê de, divê ku ti kesek ji nava kurdan xwe li pêşîya yekbûna kurdan nekina asteng. Ku kurd bê û ankû ku ne kurd bê, ku kî bila bê, ên ku li pêşîya afirandin û çêkirina yekbûna kurdan astengiyan bidina çêkirin, ew mirovên ku dixwezin ku komkujiyên mazin werina serê kurdan.

Li herêmê û bi teybetî jî li kurdistanê, pêvajoyaka pirr giring dihê jîn kirin. Li kurdistanê, piştî şerê cihanê ê yekemin, Kurdistan hat qatkirin û piştre jî şerên li dijîn kurdan hat dayîn destpêkirin. Hêzên demê ên weke Firanse, Inglistan û hwd, hatina herêmê û li herêmê demekê bi metingerî man. Bi teybetî, pirranîya pirsgirêkên ku î ro em bi navê pirsgirêka kurd û her wusa gelek pirsgirêkên din jn dikin, weke mîreteyeka wan ya ku wan lli şûn wanli herêmê maya ya. Ji wê demê û heta roja me, kurd wan pirsgirêkan dijîn. Bi konfaransên weke ên Siykes-picot û Lozanê û hwd, Kurdistan hat duqat kirin. Konfaranse LOzanê di van duroj berê yanê di 24´ê temûzê de salvegera wê hat û buhurî. Kurdan jî, bi hin xwepêşandinna ew salvegera wê şermezar kirin.

Konfaranse LOzanê, divê ku mirov bi gotinekê jî bê, li vir li ser bisekinê û wê bêne

ser ziman. Bi teybetî, ji ber ku weke konfaranseka ku di wê de naqşeyên herêmê ên rojhilat di wê de li ser masayan hatina xîzkirin û kifşkirin. Naqşaya kurdistanê jî, di wê demêde li ser masayê hat qatkirin. Lê ji bilî van teybetmendiyên wê, teybetmendiyeka wê ya din jî heya. Ew jî, ew a ku di wê demê Ingilistan, piştî ku naqşa li gorî herêmên ku ew lê serdestbûn kuu hatina kifşkirin û ku bi navê "îraqê" ku welatek hat ava kirin û desthilatdarîyek li ser serê wê hat danîn û piştre, êdî ingilistan dawî li hebûna xwe ya leşkerî a li herêmê hanî. Lê ji aliyê ramyarî û ankû sîyesî û hwd ve bi wê rêveberîyê heyîn û hebûna xwe da domandin.

Li herêmê, di wê demê de, Firanse jî, ew herêmê ku wê piştre bi navê "sûrîya" wê were kirin weke welatek jî, ew lê bû. Piştî ku ingilistan, heyîna xwe ya leşkerî vekişand, êdî piştre jî, wê heyîna xwe da domandin. Di aslê xwe de,, ya ku heyîna van hêzên metinger li herêmê da domandin jî, derketin û avabûna ´yekîtîya sovyetê´ bû. Bo ku li herêmê li dijî wê di rewş û seknekê de bin, ew herêmên ku pêşî ingilistan û firanse kiribû bin destê xwe de, piştre bisîyeseteka ku ew êdî wê kifş bikin re ew domand in. LI vir, dema ku em vê pêvajoyê hildina li dest, divê ku em pêşî weke demeka giring ji dema konfaranse Lozanê heta ku digihijê dema li darxistina paxte sadabadê, weke demeka giring hildina li dest. Bo ingilistan û vekişîna hêzên wê yên leşkerî ku konfarane Lozanê çû rol û weyn leyîst, wê paxte Sadabadê jî bo Firanse wê heman rol û weynê bileyîzê. Her wusa, weke ku çawa ku piştî konfaranse LOzanê care pêşî navê "îraqê" hat bihîstin, wê piştî paxte sadabadê jî, care pêşî navê "sûrîye" were bihîstin. Îraq, zaroya konfaranse LOzanê ya. Sûrîya jî, zaroyekî bêbav û bêdîrok ya paxta sadabadê ya. Ev herdû zaro jî, zaroyên metingeriyê na. Îraq, weke ku çawa pîçekî lozanê bê, wê Sûrîya jî pîçekî paxta Sadabadê bê ku wê weke ku çawa piştî lozanê re navê ´îraqê´ hat rojavê wê bi heman rengî piştî paxta sadabadê re navê ´sûrîya´ jî were bihîstin.

Em dikarin bi vî rengî, navê Îraqê jî û avê Sûrîya jî, weke sembola metingerîya firanse û ingilistan ya ku li herêmê bûyî fahm bike û bêne ser ziman. Ji xwe, divê temenê de jî dihê ser ziman. Rastî jî, her wusa ew a.

Piştî konfaranse lozanê û paxta sadabadê, wê piştre paxta baxdadê û konfaranse cezayîrê wê werina li darxistin. Ev hemû, li dûv hevdû hatina li darxistin û di temenê wan de jî heman zihniyet heya. Zihniyeta ku di konfaranse LOzanê de afirî, piştre bi paxta sadabadê, paxta baxdadê û konfaranse Cezayîrê wê werina domandin û barî pêşaroja herêmê werina kirin. Di aslê xwe de, ew dema ku wan re hatiya buhurîn, hemû jî, demna ku divê mirov weke bi tememî ku di wan de ku temenê jîyane herêmê hatin rakirin in. Ew xirakirina li herêmê ku Osmaniyan dabûbû kirin, wê piştî osmaniyan re ev hêz bi kirin, kiryar û politikayên xwe re bidina domandin.

Li kurdistanê, divê ku mirov bibêje ku ´pirsgirêka kurdistanê´ di van deman de afirandina wê, wê bike ku herêm jî têk herê. Hêzên herêmê, ez dikarim bêjim ku heta roja me jî ev rastî bi tememî û bi başî fahm nekirina. Ew jî, bi nîjadperestîyaka ku ol weke kiresekî lê hatiya kirin, bûna hevkarê wan hêzên ku herêm di hundurê demê de ku têk dibin. Şerên ku li herêmê hatina dayîn, bi wan re temenê wan hatîya afirandin. Lê pirsgirêkên li herêmê ên weke pirsgirêkên kurdistanê´ û hwd jî, wê bike ku herêm ji şer û pevçûnan xilas nebê. Li herêmê, weke gelekî qadîm ê herêmê û gelê herî kevn ên herêmê gelê kurd, wê li herêmê ji xwe navê wê jî were qadaxa kirin. Wê hewl bê dayîn ku ew were ji dîrokê birin. Gelek sedemên wê ên çandî, zimanê û aborî û hwd hena. Ew

jî, divê ku mirov wan yek bi yek hildê li dest.

Pirsgirêka kurdistanê, bi wê re heta roja me tê. Li herêmê, hê jî, hem hêzên herêmî û hem jî hêzên ne herêmî li dijî statûya kurdistanê na, ku kurd wê bidest bixin. Dema ku welatên weke Tirkiya dibêje ku "em ne li dijî na, ku kurd mafê xwe bidest bixin" jî, dema ku rêz tê bidestxistina mafan û ankû tekoşîna bo mafan, herî zêde ên ku li dijî disekin in ew in. Yanî, wê gotina xwe bixwe jî derewîn derdixin. Ji ber ku ew gotin, tenê bi armanca xapandinê dibêjin. Ne ji dil in, dema ku van gotinan dibêjin. Li bakûrê kurdistanê ku di nava sînorê tirkiya de hatîya hiştin, ser 20 milyonan re kurd dijîn. Lê ti mafê wan û statûya wan tûna ya. Heta ku, zimanê kurdî bixwe jî qadaxa ya. Tevî ku ser 20 milyonan re kurd hena jî, win tenê dibistanekê jî li wir nabînin ku kurd bi wê bi zimanê kurdî di wê de xwe û zaroyên xwe perwerde bikin. Piştî wê re jî, ev dewlet dirabê, bahse "mirovatiyê", "mafê mirovan" û "demokrasiyê" û hwd dike. Bi wê re jî, bi sînor nemêne û bahse "welatê dadî" dike. Lê komkujiyên weke komkujiya roboskî bixwe jî, dîsa ew dad(adelet)a wê ya ku dixwezê ku ser wê binixûmêne. Dixwezê bi demê re "biryara neşopandinê" bide. Weke vê komkujiyê, heta roja me, bi dehan komkuji ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatinakirin hena. Lê yek jî qatil ne hatina darizandin. ..

Pirsgirêka kurd, dema ku em bahse wê dikin, em bahse maf û azadiyê dikin. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadiyê ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje.. Ew ji destpêka komarê ve kurd tekoşîna maf û azadiya xwe didin. Lê heta roja me, tenê bi gotinên xapandinê û hwd û pê de, ti tiştekî din ne hatiya kirin û gotin. **.. Bi pirsgirêka kurd, piştî şerê cihanê ê yekemin û pêde, dem bi dem gelek komkuji ku hanîn serê kurdan. Pi**ştî şerê cihanê ê yekemin, şerê cihanê ê duyemin jî di sale 1944´an û hwd de bû. Piştre jî, bi heyîna yekîtîya sovyet de, dema "şerê sar" dest pê kir. Ev jî, li dijî yekitîya sovyet bû. Gelek rewşenbîran, dema ku ev dema ´şerê sar´ şîrove kirin, weke "şerê cihanê ê sêyemin" û hwd şîrove kirin. Heta ku ev pêvajoya ku dihê roja me jî, dihê şîrove kirin. Lê li vir, divê ku mirov ji bîr nekê ku şerê cihanê ê yekemin bi armanca parvekirina cihanê bû. Piştre ew dema şerê cihanê ê duyemin ku bahse wê dihê kirin jî, di berdewama wê de bû. Çend ku weke du şerên cihanî dihên şîrove kirin jî, lê di aslê xwe de weke du şerên ku di berdewama hevdû de ku hatina kirin in. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku di dema şerê cihanê ê yekemin de temenê şerê cihanê ê duyemin hat avêtin. Piştre jî, di dema şerê cihanê ê duyemin de jî, temenê şerê sar û her wusa hemû şerên ku heta roja me dibin hat avêtin.

Îraq û Sûrîya, weke welatên ku di vê demê de derketina ser dika dîrokê. Bi wan re, herêm kirina gola xwûnê. Ji dema şerê cihanê û heta roja me, li rojhilat şer bi dawî nebûya. Her wusa, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku şer û pevçûnên li dijî kurdan û pevçûnên kurdan re jî, dawî li wan he ne hatîya hanîn. Şerên ku bi kurdan re tên kirin jî, şerên parastina wê statûqû û zihniyeta ku piştî şerê cihanê ê yekemin ku di konfaranse Lozanê de hatibû kifşkirin in. Konfaranse LOzanê û paxta sadabadê û hwd, piştî wan çend paxt û konfaransên weke paxta baxdadê û konfaranse Cazeyîra û hwd ku hatina li darxistin jî, di berdewama wan de bûna. Li kurdistanê, ev konfarans, temenê şerên bi kurdan re bi wan hatina avêtin.

Her timî, şerê bi kurdan re hatîya kirin. Her wusa, bi wê re divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku weke ku di dema Çeteyên hemîdîya û hwd de bê, weke ku di dema "korucu" û ankû "cahşên" ku di roja me de li dijî kurdan şer dikin li rex dewleta tirk û hwd, rewşek

hertimî hatîya afirandin. BI wê re jî, bi sînor nemaya, her wusa, ku weke şerê ´birakûjî´ dihê şîrove kirin jî, rêxistinên kurd jî bi kurdan re dane şer kirin. Ji ber ku temenê vê **yekê hebûya**. ..

Bi vê yekê. Ezê li vir, bi nav ´kongira netewî ya kurd´ re gotina "berjewendîyên netewî" bênina ser ziman. Di van rojên ku bahse li darxistina kongira netewî dihê kirin de jî, salixkirina vê gotina ´berjewendîyên netewî ên kurdan´ jî, giring a. Ya ku wê êdî wê temenê van şer û pevçûnên di nava kurdan de dihê afirandin ku ji holê ra bike wê ev bê. Kongira netewî, ku li kûdera cihanê bê, temenê wê li ser berjewendîyên netewî ên civatî ya. Armanca wê ya sereka ew a ku maf û azadîya civatê biparêzê. Her wusa, wê yekbûnê di wan civatê de bide çê kirin û bi wê re jî, wê parastina wê bike. Di vê temenê de, gotina "berjewendîyên netewî", di serî de weke gotina ku pirr pêwîstî pê heya ku divê ku rewşenbîrên kurd wê hildina rojava xwe û bi zimanê civatê wê şîrove bikin û bênina ser ziman. Li vir, di aslê xwe de, salixkirina sînorê civatê bi berjewendîyên wê, wê êdî derfetê ji bikarhanîna rêxistinên kurd li dijî civate kurd jî ji holê rabike.

**Gotina** ´berjewendîyên netewî´, mirov ku di çerçoveya wê de lê dihizirê, mirov wê kifş dike ku bi teybetî di temenê rastîya civatî de dihê li holê. Bi wê re jî, berjewendîyên netewî, çi dibin? Berjewendiyên netewî, gotina heyîn û hebûna civatê dike temen û bingihê xwe de. Li ser wê re jî, êdî, bahse civatê û nirxên wê dike. Ziman, çand, dîrok û hwd, bi ardnîgariyê re çend ji wan nirxên civatî na û ku gotina berjewendîyên netewî jî bi wan xwe salix dike ya.

Di nava kurdan de, heta roja me, pêvajoyên bişavtinê û ankû ´asîmlesyonê´ ku li ser serê kurdan hatina meşandin, têgihiştina netewî ya di nava kurdan de ji holê rakirîya. Bi teybetî, divê ku ez bibêjim ku di sadsale 19´min jî û berî wê di sadsale 18´min jî, têgihiştina netewî di nava kurdan de hebû. Ya ku bûya temenê wan serhildan û raperînan jî ew bûya. ..

Di dema avabûna komare tirk de, bi teybetî ev têgihiştin armanc hatiya girtin ku ew were ji holê rabikin. Her wusa, piştî avabûna komare tirk, qadaxakirina zimanê kurdî û ku hewldanên dewletê ên ku bi wan xwestîya ku "nifşekî bi navê nivîskarê kurd biafirênin ku zimanê kurdî terikendî û tenê zimanê tirkî bikardihêne, hinekî bi vîr ve grêdayî ya. Di aslê xwe de, ev projeya dewletê ya "afirandina nifşekî nivîskarîya kurd ku zimanê kurdî terikendî û zimanê tirkî bikardihênin û li ser civate kurd farz dikin" bi serket. Heta roja me jî, dema ku em tenê li rewşa wan mirovên ku ji xwe re dibêjin "em nivîskarên kurd in" dinerin, em vê rastiyê bi awayekî vekirî dibînin. Ne di dîrokê de û ne jî li ti devera cihanê, ti nivîskarên weke nivîskarên kurd ku ji zimanê civate fihet dikin ku bibarbênin û zimanê civate xwe weke zimanê rewşenbîrî nabînin û her wusa ji wê dûr in tûna na. Bi nifşeka bi vî rengî ku zimanê civate xwe terikendî ya nivîskarên civatekê re ti carî parastinê nirxên civatî nayêna kirin.

**Di serî de**, divê ku mirov bibêje ku di nava nivîskarên kurd de û bi teybetî jî di mejiyê wan de têgihiştinek bi navê gotina ´berjewendîyên netewî´ bi civate kurd tûna ya. Hinekî jî, pirsgirêka wan ya sereka ev diafirêne. Di aslê xwe de, aliyekî ku temenê pirsgirêka kurd ku heta roja me hatîya diafirêne jî ev bixwe ya. Minaq, dema ku em tenê li çapameniya kurd binerin, zimanê civate xwe zêde bikarnayênin. Her wusa, hin çapameniyên ku hinekî jî bikardihênin weke telewisyonên ku qaşo bi kurdî weşanê dikin ên weke "rûdaw tv" û hwd jî, çend ku zimanê kurdî jîî bikardihênin, di temenê dijberîya berjewendiyên civate kurd û ku di xizmeta dijberîya civate kurd de na. Ji ber

ku têgihiştineka netewî û civatî di serê wan de tûna ya û bi wê mejiyê netewî ne hizirin, êdî li gorî politikayên dewletên herêmên ku heta roja me înkara kurdan û dijberîya statûya kurdan kirina dihizir in û dihênin ser ziman. Bi vî rengî, di aslê xwe de, çend ku zimanê kurdî jî bikarbênin, lê dîsa di xizmeta hêzên dijberî kurdan de na. Weke ku çawa ku dewleta tirk bi vekirina "trt-şeş" xwest ku nîjadperestîya tirkitiyê bi zimanê kurdî bi kurdan şêrîn bide nîşandin û hwd, her wusa rola van çapameniyên din ên ku ji xwe re dibêjin ku "çapameniya kurd" jî, ji vê yekê ne cudatira.

Ev rewşa çapameniyê ku çendî car bi car di hinek rewşan de zimanê kurd jî dihê bikarhanîn jî, ku ne xwediyê têgihiştineka netewî na, divê ku mirov ji wê rewşa nivîskarên kurd ku zimanê civate kurd terikendî dûr şîrove neke. Ev herdû mijar, di aslê xwe de weke mijarekê bi hev ve girêdayîîna ku divê ku mirov wan bi hevdû re bêne ser ziman in. Pirranîya nivîskarên ku bi aslê xwe kurd in û bi tirkî dinivîsnin û xwe weke "nivîskarên kurd" bi nav dikin jî, ji rastî, têgihiştin û hişmendiya civatî ya kurd dûr in. Ji çand, dîrok û zimanê civatê dûr in. Rastîya civate kurd, dema ku dihênina ser ziman, ji çend gotinên ku berî wan çend mirovên ku bi kurdî hizirîna û hatina ser ziman nabuhurê. Ew ne buhurîn jî, hinekî jî, bi wê rewşa van ve girêdayî ya. Nivîskar, bi fahmkirina nirxên civate re û bi zimanê civate xwe re hanîna wan ya ser ziman re keseyetîya xwe ya civatî jî diafirêne.

Di vê temenê de, dema ku em li rojavayê kurdistanê binerin jî, em rastî heman rewşê tên. Li rojavayê kurdistanê, bo ku rêveberîyeka kurd neafirê û statûya kurdan bi navê wan pêşnekeve, dîsa bi destê van hêzên serdest ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin, qatbûn di nava rêxistinên kurdan de jî xwestin bi afirênin. Hêza desthilatdarîya kurd û nûha li ser desthilatdarîyê ya, xwestin ku bi destê hin rêxistinên kurdan ên weke ´partîya Azad´ û hwd, ku di xizmeta îstihbarate dewletên weke tirkîye de na ji holê ra bikin. Ji xwe piştî ku ew hatiba ji holê rakirin, ew jî wê ji xwe êdî ji holê rabin. Ji ber ku di serê van dordoran de, di temenê jîyane kurdan û kurdistanî de ti têgihiştin û fahmkirin tûna ya, êdî ew bi wî rengî li gorî wan hêzên serdest dihizirin û gava xwe diavêjin.

Minaq, ez vê rewşê bênima ser ziman, ku minaqa wê li ti devera cihanê tûna ya. Dewletên weke tirkiya, Îranê û hwd ku zimanê kurdî qadaxakirin û hertimî hewl dana ku civate ku ji holê ra bikin, ew rêxistinên kurd ku herin û bi wan re tevbigerihin li dijî statûya kurdan tevbigerihin, mirov dikarê çawa wê rewşê bi hêsta netewî re bêne ser ziman? Rêxistinek û ankû mirovek ku bi rastî bi hêsta netewî tevbigerihê, divê ku ji dêla hizrekê û ankû hêzekê esas bigirê, wê pêşî ew civate ku di navê de ya, wê pêşî wê fahm bike û li gorî wê û rastîya wê tevbigerihê û wê esas bigrê. Wê ti rastî, bo wê dernekevina li pêş ku ew li ser wê rastîya civatî ya xwe re bibîne. Bi wê re jî, wê hemû kirin û kiryarên xwe li gorî wê rastîya civatî şîrove bike û xelatiyên xwe rexne bike û rastiyên xwe weke ên civatî bibîne û bi navê wê bêne ser ziman. Ya rast ku em dikarin weke hêsta netewî û di temenê rastîya civatî de werênina ser ziman ev a.

**Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku hêsta netewî bi serê xwe heyînaka giring û bi wate ya. Lê ne bes a. Ji wê zêdetir bi rêxistin kirina wê hêstê û ew hêsta netewî ku hatî bi rêxistinkirin bi têgihiştinkirina wê jî, aliyekî din ê giring ku nebe nabê ya**.

Di nava netewekê de jî, ku serkevtin bibin jî, ku bi pêşxistina rewşenbîrî û zanebûnê parastina wan nebê û pêşxistina wan nebê, wê ne mayîîndatîya wan hebe û ne jî wê

mirov karibê ku wan biparêzê. Karê rewşenbîrî û hizrî, divê ku mirov weke temen bihasibêne. Minaq, î ro, li rojavayê kurdistanê şoreşek bûya. Wê şoreşê di dil û canê rewşenbîrên kurd de çi kelecan û dilperî da çê kirin? Bo wê çi rast nivîsandin? Tiştekî ku ew xalkê wê herêmê karibê bixwêne, ji van mirovêên ku xwe weke rewşenbîrên kurd bi nav dikin ji wan re heya? Ji çend pirtûk û ankû nivîsên ku bi tirkî nivîsandina û pêde, gelo çi wan heya ku bidina wan? Ji xwe, ew dayîn jî, ne ti dayînên rast in ji wan. Dema ku em di sale 2013´an de bijîîn û di cihanê û demê de ewqas pêşketin hebin û hê ku pirtûkên bi armanca perwerdekirina bi kurdî nebin û ne hatibibina nivîsandin, û her wusa wan "nivîskarên kurd" hemû keda xwe bi zimanê tirkî û dinivîsandina di wê de bikarhanîna, ku rastî ev bê, wê çaxê mirov ti carî nikarê bahse ti rastîya wan û rewşenbîrtîya wan bike bo civate kurd. ..

**-Rojavayê kurdistanê û şoreşa wê nirxeka netewî ya kurdistanî ya.** Rojavayê kurdistanê, ev saleka ku buhurtîya ser bûna şoreşa wê re. Bi teybetî, buhurîna salekê jî, bi serê xwe de hêst û ramanaka ku bi wê serê mirov bilind dibe bi mirov re dide çêkirin. Rojavayê kurdistanê, bi pêşketina xwe re bûya taca serê hemû kurdistanîyan di roja me de. Bandûra wê serkevtina wê jî, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku pirr li kurdan û li kurdistanîyan heya. Wê hê jî, û hê maztir wê hebe. Asil ji nûha û pêde, wê pêşketina rojavayê kurdistanê û şoreşa wê, wê bandûra wê hebe.

Berî vê bi çend salan, li herêmê bi gotina "bihara Arab" hat kirin. Piştre, derket û derket, ji wê biharê ya derket, bûna destilhatdar li misrê ya birayên misilman bû. Bûna desthilatdar ya wan li wir, ancamê wê cuda derketin li holê. Gelê misrê, li bendê ku pirr pêşketin û başbûn di jîyane wan de bibin. Lê bo vê yekê, ti projeyên jîyanî ne hatin pêşxistin û ne hatina bicihbicih kirin. Vajî wê, hinek azdiya ku hebû, ew jî, hin bi hin ji dest hat girtin. Hêvîyên ji desthilatdarîya piştî ya Husnu Mubarek ya Mihemed Mûrsî, hin bi hin vegerîyan xewneka tirsê bi mirovan re. Piştre jî, hin bi hin dijberî li wê pêşket. Ew girseya ku bo ku Husnu Mubarek ji desthildariyê bide dûrkirin ku li qada ´tahrîr´ lev civîya, piştre di heman qadê de bo ku mihemed Mûrsî ji desthilatdarîyê bidina dûrkirin ew qad tişî kirin. Ew jî, ancama wê, weke ku î ro herkesek dizanê, bi derbeya leşkerî ya ku li misrê pêkhat re bi ancam bû. Piştre jî, xwûn rijîya. Bi sadan mirovên sivîl hatin qatil kirin.

Deme kû, desthilatdarî, heçîyê ku hat ser û têj û tahm jê kir, êdî destê xwe ji wê naberdê. Piştî Mûrsî re aligirên wî bi çekbûn û daketin qadan. Artiş bi çekbû û daket qadê û bi hevdû re şerkirin. Di ancamê de ya ku bû jî, li gelê misrê ku dixwezê ku i aramiyekê de bijî bû. Ew dihê kuştin. Herdû alî, bo ku bibina desthilatdar, bi hevdû re şer dikin. ..

Ev dîmenê li Misrê ku me bi çend gotinan hanî ser ziman, dîmenê bihara arab a. Her desthilatdarîya ku wê were serkar û bibe desthilatdar, di serê wan de ti hizrên demokratîkî û ku rêz û hûrmetê bi wan re ji ´mafên mirovan´ re digrin tûna na. Lê rojavayê kurdistanê, dîmenekî bi tememî cuda da nîşandin li berçav. Ya ku nûha hêrîş lê tê kirin, di aslê xwe de, ew dîmen bixwe ya. Li herêmê, ji destpêka şerê cihanê ê yekemin ve, kî hat desthilatdariyê, yê li hemberê xwe yan kûşt û yan jî bi awayekî bêbandûr kir. Ji wê rojê û heta ku roj tê roja me, êdî dema ku xalk û gel li dijî desthilatdaran serî hildidin jî, ti artartnatîfên wan ên ku ji wan re derfet hatî hiştin ku pêş bikevin tûna na. Yanî, guharîn jî, hatîya wê astê ku tenê mirovek diçê yek tê. Lê zihniyet naguharê û di wê de ti demokratikbûn pêşnekeve.

Li rojavayê kurdistanê, şoreşa ku kurdan kir, bêxwûn bû. Piştre di serî de, tirkiya û îranê, hewldan ku wê jî bixwûn bikin. Rewşek û pêşketinaka bêwûn, di serî de, ji ber ku rûyê wan yê reş û nîyetên wan ên xirab radixin li berçav. Ji ber vê yekê, komên çete ên weke ´cebetil-nasr´ û hwd, biçek kirin û piştî dan wan û ew dan hêrîşkirin biser herêmên kurdan de. Heta nûha jî, bidestê van koman gelek mirovên sivîl ên kurd hatina qatil kirin. Di serî de, ew şoreşa bêxwûn ku li rojavayê kurdistanê bû, xwestin ku bixwûn bikin. Piştre jî, êdî bi tememî bitafisênin. Ev nîyeta wan hebû û heta nûha jî wê nîyeta xwe bicih dihênin. Hemû çekên cebetil-nasr´ ên ku ew bi wan kurdan dikujê ji tirkiya û îranê na.

Li herêmê, şerê ku î ro tê dayîn şerê statûyê ya. Kurd jî, tekoşîna statûya xwe didin. Li herêmê jî, welatên weke tirkiya û îranê, li dijî kurdan şerê bêstatûkirina wan bi wan re didin. Ev şer û tekoşîna van welatan, ne tenê bi leşkerî bi rê ve diçê. Her wusa bi sîyesî û dîplometîkî û hwd jî bi rê ve diçê.

Rojavayê kurdistanê, divê ku mirov bi teybetî bibêje ku pêşketina wê ya li herêmê dîrokî ya. Bandûra wê jî, dîrokî ya. Li herêmê, piştî serkevtina wê re êdî rewşa pirsgirêka kurd jî ket rewşeka din ya cuda de. Ji ber vê yekê ya, ku bi piştgiriya tirkiya û îranê ev şerê bi kurdan re di vê demê de hat zêdetir kirin. Rewş, hatîya wê astê ku êdî ne kurd û ne jî hêzên herêmê dikarin bi wî rengî ku heta roja me hatina êdî bidina domandin. Êdî mecbûr in ku pirsgirka kurd were çareser kirin. Lê wê çawa were çareser kirin, ya ku heta nûha wan di serê xwe de safî û zelal ne kirina na. Heta roja me, kurd, di bin destê xwe de girtin û car bi car jî bi hevdû re ew dane şer kirin. Êdî ew rewş ji holê dirabin. Heyîn û hebûna kurdan, êdî derketiya dika dîrokê. Ya ku ji wan zor tê jî, hinekî ev a. Heta roja me, li herêmê, hemû hêz û desthilatdarî di destê wan de bû. Weke dilê xwe ew desthilatdarî bi rê ve bibin. BI dehan komkuji kirin. Ti kesekî ji wan re negot, çima win mirovan dikujin. Ya ku ji destê wan diçê jî ev rewş a.

bakûrê kurdistanê, î ro, di rewşeka cuda de ya. Serokê ggelê kurd Birêz Ocalan piştî di 21´ê newrozê de ew pêvajoya nû da dest pê kirin, êdî tirkiya jî ket rewşeka nû de. LI tirkiya, êdî kurdan pêvajoya çareserkirina pirsgirêka kurd dan destpê kirin. Lê dewleta tirk, heta nûha jî, ji amedekarîyên şer û pê ve, ti gav ne avêtina. Hê jî, qarakol û bendav tên çê kirin. Her roj, kurd li dijî wan xwepêşandinan li dar dixin. xwepêşandinên bi dirişma "hikimet gav biavêja" jî li darxistin. Lê tevî wê jî, dewletê, heta nûha, ti gav ne avêjina.

Dewleta tirk, bi dijberîya ku kir û piştgirîya xwe ya ku dide komên çekdar, li herêmê jîî û li cihanê jî xwe kir rewşeka xirab de. Li herêmê, î ro ti hêzên ku wê weke ´dost´ ji xwe re dibînin tûna na. Bi tenê ma ya.

Di vê pêvajoyê de, hikimeta AKP`ê stretejiyekê bi rê ve dibe. Ew stretejiya wê jî, ew a ku di hizirê û dibêje ku ´ezê ti gavan neavêjim, lê hertimî jî ezê derkevima berçapameniyê û bibêjim ´pêvajoya çareserîyê´ bi rê ve diçê, heta ku ji me were emê nehêlin ku wê xira bibe.´ Bi wê re jî, îhmal nakê û bi ser gotina xwe ve dike û dibêje ku "yên ku wê vê pêvajoyê xira bikin wê ne em bin." Lê wekî din jî, bo ku pêvajo xira bibe jî, ti gavan navêje. Di vê temenê de, di aslê xwe de, stretejiya têkbirina pêvajoyê, heta vê kêlîkê jî bi vî rengî bi rê ve dibe. Li gotî mantikê wan, ew a ku wê ew hertimî derkevina berçapameniyê û bibêjin, ´pêvajoya çareserîyê´ bi rê ve diçê û em nahêlin xira bibe.´ Lê wekî din jî, ti gavan navêje. Lê piştre ku pêvajo xira bû jî, wê derkeve berçapameniyê bibêje ku "meyizênên yên ku pêvajo xira kirin ne em bûn." Bi vê yekê

re, wê bibêjin, ne di pêvajoyê de gotibû ku ´yên ku wê pêvajoyê xira bikin, wê ne em bin´. Gotinên ku divê demê de dihên gotin jî, weke gotinna ku amedekarîya ji hn pêvajoyên bi wî rengî re na.

Li bakûrê kurdistanê hikimeta tirk ya AKP`ê, zimanê kurdî qadaxa kirîya û nahêle ku kurd bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bibînin û her wusa bi wê re li dijî statûya kurdan a. Bi wê re jî, li dijî rojavayê kurdistanê, bi destê komên çekdar hêrîşî rojava dike. LI dijî rojavayê kurdistanê, heta roja me jî, ambargo hatîya danîn û nayê hiştin ku alîkarîya mirovî jî bibuhurê. Li bakûrê kurdistanê, rewşa tendûrîstîya serokê gelê kurd birêz Ocalan giran a. Di nava kurdan de, weha tê ser ziman ku tê gotin ku "ji ber ku mudahaleyên biolojikî li laşê wî hena, êdî nayê xwestin ku heyetên bijîşkan ên serbixwe herina girava îmraliyê û wî muayne bikin." Heta ku heyetek serbixwe neçê îmraliyê û wî muayne nekê, ku bi dehan saziyên dewletê jî herina îmraliyê û wî muayne bikin jî, wê wan gûmanên ku "mudahaleya biolojikî li wî dihê kirin" ya di serê kurdan de wê ji holê ra nekin. ..

Rojavayê kurdistanê jî, di vê navberê de, dema ku bi piştgirîya tirkiy hêrîş lê dibin, êdî ew gûmana li dijî tirkiya ya di ser kurdan de mazintir dibe. Tirkiya, heta roja me, çi pêşketina kurdan bûya, hertimî li dijî wê dijberîya xwe daye destpêkirin. Li kûderê kurdan pêşketinek bi xwe re daye çêkirin, tirkiya li dijî wê dijberîyek daye nîşandin. Di vê temenê û bi wê mantiqê, hêrîşî rojavayê kurdistanê û destkevtiyên kurdan ên li wir dikin.

Rojavayê kurdistanê, rê û rengê desthilatdarîya gel çawa ya ew da berçav. Di aslê xwe de, bi vî rengî, ji hemû dîroka dethilatdarîyê ya herêmê re, bi vî rengî weke arttarnatifekê jî ya. Ji ber vê yekê, pirr zêde hêrîşî wê dihê kirin. Ji ber ku dewletên herêmê, di pêşketina zihniyeta demokratik ya bi şoreşa rojavayê kurdistanê re têkçûna zihniyeta xwe dibînin, êdî hêrîşî wê dikin.

Di aslê xwe de, bo tirkiya, wateyeka serkevtina şoreşa rojavayê kurdistanê ya giring ya din jî heya. Ji ber wê yekê, êdî ew jî hêrîşî wê dike. PIştî wê serkevtina kurdan ya li rojavayê kurdistanê û li darxistina kongira netewî ya kurdistanê û hwd pê de, êdî wê nikaribê bi vî rengî pirsgirêka kurd bide domandin. Ya ku wê bi zihniyeta wê re dike zorê de jî ev a. Ji ber vê yekê, li dijî wê di nava hewldanê de ya. BI teybetî, pirr giring a ku kurd li wir, xweserîya xwe denezênin. Denezendina xweseriya rojavayê kurdistanê di vê demê de, wê bandûra wê li vê pêvajoya ku kurdan li bakûrê kurdistanê daye destpêkirin jî wê hebe. Ji ber vê yekê, komên çete dide hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê û her wusa bi hêzên kurdan ên rojavayê kurdistanê re dikeve têkiliyê û dibêje ku "xweserîya xwe nûha ne denezênin." Ev dijîberîya tirkiya ya li dijî denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê, divê ku mirov ji wan hêrîşên komên çekdar ku bi piştgirîya wê dibin dûr şîrove nekê. Bi vî rengî jî, hemû rê û rêbazê bi kardihêne. Lê li vir, ez dixwezim bibêjim ku rêbaza herî xatara û qirêt ya ku bikardihêne, ew a ku bidestê camaeta fethullahçîyan ku ciwanên kurd dixapêne û dişêne nava şerê li Sûrî. Li başûrê kurdistanê, gelek dibistan û zankoyên fethullahçîyan ên weke bi navê "işik" û hwd hena. Pirranîya ciwanên kurd ên ku ji başûrê kurdistanê ku hatina şandin li nava şerê li Sûrî ku di nava çeteyên weke cebetil-nasr´ û hwd de na, hemû ciwanên kurd ên ku têkiliya wan bi wan dibistan, zanko û ankû malên fethullahçîyan ên li wir ku hena na. Ev rewşa fethullahçîyan ku ciwanên kurd dişêne nava şer, divê ku em li hinekî din li ser bisekin in. JI ber ku hinekî jî, armanca bi wan, ew a ku destkevtiyên kurdan têkbibin û

her wusa nehêlin ku netewa kurd pêş bikeve. **Ji xwe, hemû rêxistinên fethullahçîyan ên li kurdistanê, armancaka wan ew a ku nehêle ku hêsta netewî ya kurdistanî di nava kurdan de pêş bikeve ya**.

**-Cemaeta fethullahçîyan, ji dibistan û rêxitinên xwe yên li başûrê kurdistanê û bakûrê kurdistanê ciwanên kurd dişêne nava şerê Sûrî û dide kuştin.** Berî nûha jî, çend caran me ev mijar hildaya li dest. Lê divê demê de, hewceyî pê heya ku em divê ku carek din hildina li dest.. Bi teybetî, ev cemaeta Fethullahçîyan, bi teybetî li bakûrê kurdistanê û li başûrê kurdistanê xwe bi rêxistin kirin. Heta ku li başûrê kurdistanê bi dehan dibistanên û zankoyên ku bidest wan bûna hena. Di van rojên dawiyê de, bêhtirî ev sazîyên qaşo dibin navê "dibistan" û "zanko"yan de ku ava na jî, ketina rojavê de. Piştî ku şerê li Sûrî destpê kir, êdî ketina wê ya rojavê bû. ..

Lê li vir, di serî de emê vê bibêjin. Heta nûha, bi dehan ciwanên kurd ên ku ji başûrê kurdistanê û ên ku ji bakûrê kurdistanê ku hatina şandin li nava wî şerê li Sûrî bûna. Ev ciwanên kurd, hem ji bakûrê kurdistanê hatina şandin û hem jî ji başûrê kurdistanê hatina şand in. Teybetmendiya van ciwanên ku hatina şandin ên kurd, ew a ku hemû jî, yan di wan dibistanên fethullahçîyan de xwandina û yan jî bi malên wan ên dibin navê "camaetê" re ku têkilîyên wan hena na.

Piştî ku dîmenên ciwanekî kurd ji helebçê ku ket ajansên nûçeyan de, êdî bêhtirî rastîya vê rewşê hat ditin. Ew ciwanên kurd ên ku hatina şandin li sûrî li nava şer ku li Sûrî li dijî kurdan jî şer bikin, ciwanên ku di bin navê olê de bidestê van camaetan hatina xapandin in. Her wusa, em vê yekê jî bibêjin, heta ku ew dibistan û saziyên fethullahçîyan li vê herêmê başûrê kurdistanê hebin jî, wê rêveberîya başûrê kurdistanê bixwe jî nikaribê pêşî li kiryarên bi vî rengî bigirê. Heta ku em divê ku vê yekê jî bibêjin ku di sale 2011´an de bû ku li herêma Zaxo´yê ku hin bûyarên ku rûdabû bûn li dijî desthilatdarîya herêma kurdistanê jî, dîsa telîya van dordoran têde hebû.

Ev ciwanên ku di wan dibistanan de tên perwerde kirin, di perwerde kirina wan de ol dihê bikarhhanîn û ew weke mirovna "oldar" dihên bikarhanin. Lê di rastiyê de, dibin navê "ol" û "pewerdeya olî" de dîroka osmaniyan perwerde dikin û her wusa nîjadperestiya tirkitiyê bi wan didina şêrîn kirin ku ew bi wê mazin bibin û ku êdî ew karibin wan bikarbênin. MIxabin, ji salên 1995´an û hwd pêde, bi hezaran ciwanên ku di wan dibistanên fethullahçîyan de hatina perwerde kirin, hemû jî temen û potansîyala ku dijminatiyê li mirovên li dora xwe jî bidina nîşandin bi wan re heya. ..

Ji xwe, em dikarin deronîya wan ciwanên kurd ji wê rewşa wan ya şandina li nava wî Serê navxweyî ê Sûrî de fahm bike. Pirranîya wan ciwanên kurd, ketina destê komên olî ên tundrew de. Di destê wan de na, û wan dişênina mirinê. Heta ku wan ciwanên kurd, li dijî kurdan bixwe jî didina şer kirin. Di şerê van çeteyên "cebetil-nasr" de gelek ciwanên kurd jî hebûna ku bi destê wan mirovên sivîl ên kurd jî hatina kuştin. Yanî, mirov hatina xistina deronîyaka bi wî rengî de ku dikarin çekê li civate xwe bixwe jî bikişênin.

Li bakûrê kurdistanê di salên 1991´î û hwd de navê "huzbullah" bikarhanîn. Bi wê re gelek navên din jî bikarhanîn. Lê bi wan koman, bi deh hezaran mirovên sivîl ên kurd, rewşeênbîrên kurd, û hwd, bi destê wan koman hatina kuştin. Ol, weke birdozîyeka ku dihê bikarhanîn de şerê bi kurdan re de. Di van rojên dawiyê de, ku li rojavayê kurdistanê hêrîşî kurdan dikin û ew gotin li mizgeftan û li minarayan bang dikin ku "kuştina kurdan, helal a." "Yekî ku destdanî ser jineka kurd, wê herê bihûştê", "dest

dênin ser malê kurdan, ji we re helal a." û hwd. Bi vî rengî gotinan dibêjin. Ev gotin, berê jî hatina gotin li dijî kurdan. Bi wê re jî, bi hezaran kurd, hatina qatil kirin û malên wan hatina talankirin û vêrankirin.

Li vir, em vê jî bibêjin ku dibistanên van fathillahçîyan ên li başûrê kurdistanê, divê ku ti kurd zaroyên xwe neşêne li wan. Divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê tedbîrên xwe yên civatî li ber van bide girtin. Heta ku ev dibistan, di nava kurdan de bi rêxistin kirîbin, wê pirsgirêkên di nava civate kurdan de bi dawî nebin. Ev dibistan camaeta fethullahçîyan, armanca wan ew a ku temenê pêşaroja civate kurd ji holê ra bikin. Bi vê yekê, armancaka wan ya din jîî ew a ku pêşî xwandina civaknasî û dîroka kurd jî bigrin. Her wusa, karekî van ê bi vî rengî ku wan ji xwe re weke "berpirsîyar" dîtîya dikin. Hemû temenê şîdeta di nava civate de û temenê tundrewîya olî û hwd, bi destê van dihê avêtin di nava civate de û di nava ciwanan de. Bi wî rengî, hewl didin ku ciwanan ji rastîya civate wan dûr bikin. Ti farqa van, ji talîban û El-kaîde tûna ya. Ev jî, bi rengekî em dikarin bibêjin ku "el-kaîde´ya tirk a ku li dijî kurdan dihê biarhanîn a. Kurd, hem li başûrê kurdistanê û hem li bakûrê Kurdistan divê ku hertimî van sazî û dibistanên fethullahçîyan şermazar bikin û xwe ji wan dûr bigrin.

Dê û bavên kurd jî, heka rast zaroyên dihizirin û dixwezin ku zaroyên wan bi aqilekî baş û bi mirovatî mazin bibin, divê ku bi tememî zaroyên xwe ji wan dûr bikin. Rêxistinên ciwanên kurd ên li bakûrê kurdistanê û li başûrê kurdistanê jî, divê ku kampanya şermazarkirina van dibistanan bidina dest pê kirin û ciwanên ku diçina van dibistanan ji wan dûr bikin û xilas bikin. Dema ku rêxistinên ciwanên kurd ên başûrê kurdistanê û ên bakûrê kurdistanê jî ku vê nekin, wê ew jî berpirsîyar bin ji wê kujarîya ku bidestê van sazî û dibistanan ku li ser ciwanên kurd dihê meşandin.. ..

Di nava kurdan de, ti saziyên ku perwerdeya olî didin tûna na. Ti saziyên ku perwerdeya olî didin, bi destê kurdan heta nûha jî ne hatina vekirin. Ên ku hena, hemû ên ku dewleta tirk vekirina na. Bi van saziyan, dewleta tirk, hewl dide ku ciwanan bike temenekî ku karibin wan bikarbênin. Saziyên kurd, ên rewşenbîrî û civatî jî, bêgûman berpirsîyarîya wan heya. Heta roja me, temenekî baş ê bi zanistî pêşnexistina. Yanî jî ku hewl hatibê dayîn jî lawaz mana. Ji ber vê yekê, divê ku ez bibêjim ku her ciwanekî ku di bin navê olê de hatî xapandin û hatî şandin nava şer de, divê ku ew jî xwe ji wî berpirsîyar bibînin. Divê ku ji xwe bipirsin ku çi kirin bo ku ciwanan ji wê rewşa qirêt xilas bikin? Bi teybetî, zanyarîyeka civatî û pêşketî, weke arttarnatif ji wê re ne afirandin ku wan sazîyên kujar ên weke yên fethllahçîyan ku bêbandûr bikin.

Ev sazî jî, bi dibistanên li başûrê kurdistanê û bi dibistan û malên camaetê ên fethullahçîyan ên li bakûrê kurdistanê, ciwanên kurd kom dikin û dibin nava nava wî şerî û didina kuştin. Ji xwe, fethullahçîyan, lingekî temenê şerê dewletê ê bi kurdan re ji nava kurdan li ser wan dibistan û malên camaetê re pêşxistîya û heta roja me hanîya. .. Ew rewşa rojavayê kurdistanê û destkevtiyên wê, xapandina ciwanên kurd ên ku di wan dibistan, malên wan û hwd, li başûrê kurdistanê ên li bakûrê kurdistanê û hwd. rewşên ku divê ku mirov di çerçoveya têgihiştina netewî de ku divê ku mirov pirr zêde li ser wan bihizirê û şîrove bike.

-Li vir, di berdewama vê de û di çerçoveya pêşketinên li rojhilat ên bi gotina "bihara arab" ku dihatina bi navkirin de, divê ku mirov bibêje ku b**i derbeya li Misrê re a li desthilatdarîya Mursî, qarakterê gotina "bihara arab" jî diguharî.** Piştî ku li Misrê artişê destdanî li ser dathildatdariyê û destûr bêhikim kir, êdî li welêt tevlî hevî zêdetir

bû. Nûçeyên şer ji welêt tên. Birayên misilman, tê gotin ku aligirên wê hêrîşî noqteyên leşkerî dikin. Ev rewş, wê bi xwe re rewşê aloztir bike. Her wusa, li rojhilat bixwe jî, wê ev rewşên bi aloz wê zêdetir bin. Ji bin ve jî, gotinên ku ji rayadarên emerikî û ankû ewropî tên ew a ku tê gotin ku "dii cih de divê ku desthilatdarî radestî rêveberîyeka sivîl were kirin." Ev gotin, dema ku mirov ji rêzê ve li wan dinerê, weke gotinên masûmane na. Li Rojhilat, heta nûha şer û pevçûnên ku li rojhilat bûna bi destê van hêzên ku van gotinan dibêjin hatîya gurr kirin.

Li rojhilatê, statûya ku hatîya ava kirin, ji aliyê van hêzan ve hatîya ava kirin. Statûyeka ku di wê demê de navê gelan tûna ya. Li herêmê, ji xwe heta roja me ku şer bûna, hinekî ev yek bûya sedem ji wê re. Li Sûrî jî, li Misrê jî û li Îraqê jî, li kurdistanê jî û hwd jî, rewş ji vê yekê ne cudatira. Wusa xuya dike ku li misrê wê di demeka kin de hewl bidin ku karibin herina hilbijartinan û yan mirovekî weke Mihemed Baradayî û yanî Mihemed baraday bixwe hilbijêrên û bênina ser rêveberîyê. Bi wê yekê re, êdî wê statûya xwe ya ku ava kirina bidina domandin. Lê wê ev rewş, pevçûnên roja barî pêşarojê bike. Li tirkiya, pirsgirêka kurd û hwd, dîsa di ancama wê statûqûya ku hatî afirandin de bûya. Rojhilat, bûya weke afrîqaya sadsale 20´an ku hîç jê şer kêm nedibûn. Ya rastî ew a ku wê heta dawîya vê sadsalê jî û heta ku dibêt ku hê zêdetir jî bê, wê nehêlin ku jê şer kêm bibin.

Li rojhilat, ji sadale 20´an û pê ve, pêşketinên ku bûna, hemû bi yek-alî bûna. Ew statûya ku hatîya afirandin, hemû pêşketin, di wê çerçoveyê de ji wê re derfet hatîya hiştin. Ji wê û pê ve, ti pêşketinên din, ji wan re derfet ne hatîya hiştin. Î ro, dema ku em bahse pêşketina li rojhilat bikin ku di çerçoveya gotina "bihara arab" de û her wusa di çerçoveyeka din de bê û hwd de bê, em nikarin bahse ti artarnatifan ji wê statûya berê re ku heya bibînin. Bihara arab jî, tenê di çerçoveya zihniyeta berê de ev yek dihê kirin. Bi derbeya li Misrê re, ´bihara arab" jî, divegerihê hût(cenewir)ekî ku êdî hin bi hin wê pêşketina li herêmê bixwe ya. Misir, ji destpêka zayînê ve, ji dema ku Împaratorîya Roma li wir sefer kir ve, heta roja me, vîna wê hatîya qaspkirin. Bi teybetî, ji sadsale 20´an û pê de, weke ku ew dem û rewş li Misrê were dûbara kirin, rewşek dihê li berçav. Ji destpêka sadsale 20´an, piştî ku Misrê şoreşa xwe li dijî Osmaniyan kir û azadîya xwe bidest xist, piştre hin bi hin ji aliyekî din ve hat û ket bin kontrolê de. Ev derbeya ku li Misrê bû jî, armanca wê ne azadî û pêşketin û aramîya Misrê ya. Armanca wê, ew a ku wê kirina bin kontrolê de bide domandin a. ..

Dema ku min li kirina derbeyê nerî, ew rewşa ku di dema împaratoriya roma de ku li Misrê sefer hat kirin û ew hat bindestkirin û hemû dewlemendiyên wê hatina dizîn û jê hatin birîn û hwd, hat bîra min. Piştî wê re, di roja me de, bi heman zihniyetê rewşek xwe li misrê dide domandin. Di wê demê de metodên bindestkirina roma bi leşkerî bûn. Divê demê de, bi rengê derbeyan û hwd a. Gelê Misrê, pêvajoyaka şoreşê, dijî. Di aslê xwe de, ev weke firsandekê bû ku bi vîna xwe bijî û vîna xwe bikira destê xwe de. Lê bi derbeyê, weke ku hin bi hin ew firsand ji destê wê hat derxistin û ankû dihê derxitin. Li vir, ya ku em bibêjin ew a ku gelê misrê destûrê nedê vê yekê û azadîya xwe bidest bixe û êdî bi serê xwe pêşketina xwe bijî û bide domandin.

Rejimên ku serdest bûn, heta roja me hemû artarnatifên ku weke rêveberî û desthilatdarî ku em î ro karibin weke aliyekî demokratikî û pêşketinî şîrove bikin, ji wan re derfet ne hat hiştin ku pêşbikevin. Bi vê yekê, hemû pêşketinên ku hena jî, yek-alî bûna. Di destpêka vê sadsale ku em têde na, tenê weke artanatifeka zihniyetî ya

pêşketinê tekoşîn û tevgerîya kurd bû. Têgihiştin û zihniyeta tekoşîna kurd, weke artnatifekê ku pêşket, ku bi wê li rojhilat temenê demokrasîyekê pêşbikeve. Nûha jî, bo ku ew artarnatif pêşnekeve di nava gelên herêmê de, hêrîş tên bi ser kurdan de. Hinekî jî, divê ku mirov wê dorpêçkirina li rojavayê kurdistanê di vê çerçoveyê de fahm bike. Heta roja me, pirsgirêka kurd li aliyê bakûrê kurdistanê, ji ber vê yekê nayê xwestin ku were çareser kirin. Hinekî jî, ew têgihiştina ku weke çareserî û artarnatifî ji zihniyet û statûqûya li herêmê re ku wê pêşbikeve, derfet ji wê re nayê hiştin ku ew pêş bikeve.Li kurdistanê, hemû dorpêçkirinên leşkerî, sîyesî û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje ku çareserîya pirsgirêka kurd a li rojavayê Kurdistanê û li bakûrê kurdistanê û hwd, ku tenê ev herdû beş jî çareser bibin, wê li herêmê zihniyeteka artarnatif ji zihniyeta statûqûparêz ya herêmê re pêş bikeve.

Li vir, bo ku ev yek pêş bikeve jî, du tişt pêwîstîn ku divê ku kurd wê bikin. Yek, bi zimanê civate xwe ku sîyesete xwe bikin û di nva xwe de pêşketina xwe ya civatî çêkin û bênina ser ziman. Li vir, ev herdû xal bi serê xwe wê temenê pêşketina çareserîya kurdistanê bin. Her wusa, wê temenê pêşketina herêmê bigiştî jî bo pêşsroja wê biafirêne. Bi wê re jî, wê temenê pêşketina civate kurd jî bin. Li vir, di serî de divê ku mirov li ser van herdû aliyan bisekinê. Demokrasî, bi pêşketina wê re ku herêkirina ciherengiyên civatî û bawerî û hwd, ku bûn û rêz ku ji wan re ku were girtin wê bibe. Di vê temenê de, êdî divê ku mirov bibêje ku pêşî divê ku pêşketin bi têgihştinî û civatî were û bibe.Misre Kevn, di wê demê de, demên wê ên zêr li herêmê ku wê pêşketiban, ji destpêk zayîna Îsa û pêde, bi sadsalan împaratorîya roma ji holê ra kir. Î ro jî, di sadsale me de, weke ku heman tişt dihê kirin. Li Misrê, piştî derbeyê re pêvajoyaka nû dest pê dike. Di aslê xwe de, divê ku mirov bibêje ku bi derbeyê re qarakterê gotina ´bihara arab´ jî diguharê û rengekî ê xirab ku ji bo herêmên araban û herêmên din ên rojhilat û hwd, distêne. Gotina demokrasiyê ya ku di çerçoveya gotina bihara arab de dihê bikarhanîn jî, bi mudahele û derbeyên bi vî rengî û hwd re, ji gotina ´azadîyê´ dûr êdî rengekî distêne. Têgihiştina ku pêşketina kurdan a li kurdistanê dorpêçkirî, di temenê derbeya li Misrê de jî ya. ..

**-** Ji **sale** 2010´an ve bahse ´bihara arab´ hat kirin. Lê pêşî, gotinên ´reformê´ hatin gotin. Hat gotin ku divê ku ´divê ku êdî feform werina pêşxistin´. Di sale 2010´an de gelek xwepêşandin bûn. Ji welatên arab û heta ku digihijê Cezayîr û Fasê jî, xwepêşandin bûn. Rejimln weke ên Cezayîr û Urdûnê û hwd, paketên reformê denezendin. Hikimetên xwe xira kirin û car din ava kirin. Lê Di ancamê de çi guhartin di jîyane mirovên sivîl de bû? Ne ti tiştek. LI Misrê jî, piştî ku desthilatdarîya Mubarek a bi deh salan hat xûrîxandin û piştre, bi hilbijartinê nemzetê ´birayê misilman´ Mihemed Mûrsî hat xistin. Artişa Misrê dest danî ser desthilatdarîyê.

Birayên misilman, bandûra wan li welatên arab û ên li dora wê ên afrîqa û hwd jî heya. ´Birayên Misilman´, piştî ku hat ser rêveberîyê, guhartinên ku gel ki bendê bû, ne kir. Guhartinên vajî wê kir. Azadiya ramanê kêmtir kir. Di jîyane misrîyan de ti guhartin nebû. Li misrê, tevî ku gelek dewlemendiyên wê ên serard û binard hena jî, rêjeya xizaniyê pirr bilind a. Her kesekê ku piştgirî da Mursî, li bendê ku di jîyane wan de guhartin bibin. Lê her ku çû bi ber ne başîyê de xirabî bûn. Komên tûndrew ên olî giranî û hêza wan li welêt zêdetir bû. Î ro ku em bibêjin, em komên tûndrew in ku li Sûrîyê dihên şerkirin in.

Di sadsale me de, bûya weke xûyekê ku her rêveberî dibêje ku "ez bi hilbijartinan hatima ser desthilatdariyê." Lê dema ku hat jî, kiryarên xwe ji yên tîranekê û ankû dîktatorekî cudatir nadê nîşandin. Î ro, minaq, li Tirkiya, minaqa vê yekê ya. Li tirkiya, T. Ardogan, weke Mihemed Mursî, minaqa vê yekê ya. Her care ku T. Ardogan devê xwe divekê, dibêje ku "bi rêjeya ji sadî 50´î ez hatina ser desthilatdariyê". Lê kiryarên wî ên dîktetorekî na. Li nava sînorê tirkiya de, rejima ku wî ava ki, rejimeka leşkerî ya. LI welêt ku em bibêjin dibin navê gotina demokrasiyê de hêzên herî zêde hatina serdest kirin ên leşker û polîs in. .

Li Misrê jî, rewş ji vê yekê ne cudatir a. Li misrê, desthilatdarîya Mursî ku hat hilbijartin, gel jê hêvî dikir ku wê reforman bike û wê jîyane gel hin bi hin baştir bibe. Lê ya ku hêvî dihat kirin nebû. Piştre, gelê misrê, çawa ku bo ku desthilatdarîya Mubarek bide xistin li qada ´tahrîr´ bi milyonan tişî kir û xwepêşandin li darxist, her wusa bi heman rengî piştre bo ku Mursî jî ji desthilatdariyê bide birin ew qad bi milyonan tişî kir. Li misrê, gelek komên cuda ku çendî ku bi hevdû re rûniştîn jî û gotina xwe bi hevdû nedan herê kirin jî bûn. Lê komên weke Selefî û birayên Misilman (´ixwani-l mislimên´) bandûra wann zêdetir bû. Di nava misrê de, komên cuda ên olî û etnîkî hena. Her wusa, dema ku ji navendê ji Qahîrê bi ber keviya welêt çûyîn dibe, serdestîya aşîran mirov dibîne. Ev yek jî, aliyekî din diafirêne. Piştî ku artişê dest danî ser desthilatdarîyê, ew girseya di nava xwepêşandinan de bû ku bo ku Mursê herê, kêfxweşîya xwe hanî ser ziman. Lê aligirên Birayên misilman û komên din ên olî ku li rex wê na, ne kêm a. Ya ku nûha ji ber vê yekê jê dihê tirsîn ew a ku wê şerekî navxweyî derkeve. Ji ber vê yekê, nûha ew bernem artişê ku tê ku gotin ku wê denezêne ji rayagiştî re hewl tê dayîn ku li ser wê levkirin were kirin. Bo vê yekê, hewldan tên kirin. Lê wekî din jî, temenê şerê navxweyî li Misrê heya. Bi teybetî, Birayê misilaman, weke hêzeka mazin a jî li herêmê ku dikarê temenê şerekî navxweyî bide çêkirin.

Di aslê xwe de, ev derbeya li Misrê, mirov nikarê tenê bi ahang(denge)eya desthilatdarî ya nava misrê ve girêdayî bêne ser ziman. Hinekî jî, ew şerê ku li Sûrî hat dayîn destpê kirin, banndûra wê jî heya. Li wir, hêvî bi birayên misilman ve hatibû girêdan ku wê hêza xwe bide nîşandin û li Sûrî desthilatdariyê bide guhartin. Lê li wir, tişta ku bû, hema bêja bû weke afganistana dema Talîban. BI dehan komên tûndrew, bi destê tirkiya, Qatar û hwd, hatina bi rêxistin kirin û hanîn li Sûrî û li dijî rejimê dane şer kirin. Nûha jî, ku em bahsê wî şerê Sûrî bikin, divê ku em bibêjin ku bi deh hezaran mirov di şerê i Sûrî de hat qatil kirin. Di serî de, di wî de komên weke ´Selefî´ û ´Birayên misilman´ di nava wî şerî de na. Rêxistiniyeka ku li Misrê desthilatdar bê û li Sûrî li dijî rejimê şerê çekdarî bide jî, wê bi tememî lingê xwe ji ardê qût bike. Î ro jî, derbeya li Misrê weke ancama wê bi tememî birayên misilman ji desthilatdariyê hatina dûr kirin.

Ku mirov ji kîjan aliyê ve jî lê binerê, wê bandûra derbeya li Misrê a li dijî desthilatdarîya Mursî wê li rêveberîyên ên li herêmê jî bibe. Wê li Sûrî jî bibe. Wê li Îranê û heta ku divê ku mirov bibêje ku wê li Tirkiya jî bibe. Bandûra guharînên li Misrê weke ´kevirê domîno´ wê li herêmê hebe. Çend ku destna cuda di nava vê derbeya li misrê hebin jî û bi wê xwestibin ku bandûra pêşketina gelan li gorî xwe bidina rastkirin jî bê, lê ku mirov ji kîjan aliyê ve jî divê ku mirov vê yekê bibêje ku çi rêveberî û ankû desthilatdarî were ser desthilatdariyê, ku mafê mirovên û azadîya gelan li berçav negrê wê mafê jîyanê ji xwe re nebînê. Ku ev rêveber bi derbeyê jî bê ku

hatibê û ku bi hilbijartinê jî hatibê, wê dîsa li wir heman ancamê bide derxistin li holê. Li vir, ya ku wê ancamê dide dîyar kirin jî şert û mercên demê ên ku bi pêşketinê re ku dihê xwestin a.

Guhartina rejimê li Misrê, dibê ku nêzîkatîyeka cuda li şerê navxweyî ê Sûrî de jî bi xwe re bêne. Ji xwe, ev yek weke ku pêwîsta jî. Li herêmê, ji dêla ku bi şerê navxweyî û hwd rêveberî werina guhartin, bi reforman, hilbijartinan û demokrasiyê û hwd, wê ya herî rasttir bê. Li herêmê, temenê vê yekê jî êdî weke ku afirîya. Tekoşîna kurdan a ev 30 sale ya ku li kurdistanê boo maf ûa zadîyan kurdistanîyan dihê dayîn têgihiştineka pirr xort afirand. Di dema şerê navxweyî ê Sûrî de jî, kurdan ne li aliyê rejimê chgirtin û şerkirin û ne jî li aliyê komên çekdar ku bi armanca xistina rejimê ku li dijî rejimê şerkirin cih girtin. Li herdû aliyan jî, cih negirtin. Ji xwe re, nêzîkatîya xwe weke "rêya sêyemin" hilbijartin û li gorî wê pêşxistin.

Ev nêzîkatî, weke ku li herêmê hat ditin. Nûha jî, weke ´nêzîkatîya serdest´ li herêmê derdikeve li pêş. Li herêmê, bo ku herêm û gelên herêmê demokasiyekê ji xwe re pêş bixin, divê ku berî hertiştî bi hevdû re di têkiliyê de bin û hebûna hevdû herê bikin. Nêzîkatîyên tûndrew, di nava rewşên şer de jî bin û di nava demokrasiyekê de jî bin, nêzîkatîyên têkbirina nêzîkatîyên demokratîk in. Li herêmê, nêzîkatîyaka desthilatdarî ku mirov û mafê mirov û azadîya mirov û civakê ji xwe re kirî navend û bingeh, wê tenê karibê xwe serdest bike û pêşketinê bide kirin. Li herêmê, ol jî, di temenê nêzîkatîya nîjadperest de û di temenê înkara gelan de hatîya şîrovekirin û bikarhanîn ji aliyê desthilatdariyên serdest ve. Weke xale sereka, divê ku ev yek were ditin. Bi wê re jî, divê ku heyîn û hebûna gelan were herê kirin. Li herêmê li rojhilat, du herêm weke navika herêmê na ku çû pêşketina li van bibe wê bandûra wan li herêmê bigiştî bibe. Yek ji wan Misre. Ya din jî Kurdistan a. Herêm ji van herdû navikên wan dihê bi rê ve birin. Di dîrokê de jî, ev yek wwua bûya. **Di roja me de jî, ev yek wusa ya. Di şerê navxweyî ê di Sûrî de jî, hat ditin ku rol û weyna kurdan çendî giring a li kurdistanê. Ji ber çi herêmên kurdan ên rojavayê kurdistanê heta vê roja me jî dorpêçkirî na? Hinekî jî, divê ku mirov bi vê bandûra wan re şîrove bike û bêne ser ziman. Lê divê ku mirov vê yekê jî bibêje, ku hêzên ku dixwezin ku li Sûrî şer bidomê herêmên rojavayê kurdistanê dorpêç kirina.**

Li herêmê li rojhilat, Misir, ev derbeya ku li wê di 3´ê temûza 2013´an de bû, wê li gorî rastiyên ku were kirin, wê bandûra wê zêdetir bibe. Di aslê xwe de, ev salek bû ku Mursî li Misrê desthilatdar bû û di wê vê salê de bandûra Birayên misilman, bi kirinên wî û hewldanên wê ên di nava şerê Sûrî û hwd de, şikeşt. Ya ku Birayê misilman têk bir, ne derbeya li Misrê ya. Ya ku birayê misilman têkbir, kirînên Mursî li dijî azadîya ramanê, jinê û civatê û her wusa şerkirina wan a li Sûrî bû. ”Rêxistina birayên misilman”, piştî ku rêxistinek kuu êdî misrê birêvebibe jî, li derve li Sûrî û hin deverên din weke wê rêxistinek çekdar ku şer dike ma. Ev herdû alî, bi rewşa birayên misilman re bi hevdû re di nakokîyê de bûn. Li misrê, çend ku bû desthilatdar jî, ji wê rewş û têgihiştina rêxistinîtîyê ne buhurî. Wekî din, ku dema ku bû desthilatdar ku bo demokratîzekirina herêmê gavên mazin avêtiba û xwe ji nava şerên ku li herêmê dihat meşandin dûrkiriba û weke rêxistina desthilatdarê tevgerîyaba, wê karîba hem desthilardarîya xwe biparêzê û hem jî biserkeve. Xelatîya dîrokî a rêxitina birayên misilman ew bû ku li hin herêmên rojhilat ên weke Sûrî û hwd, li gorî welatên weke tirkiya û hwd, tevbigerihê bû. Tirkiya, li herêmê, bi politikayên ku piştre bi wan DAÎŞ

pêşxist, di dema desthilatdarîya Mursî de nêzîk bû û Birayarên misilman jî xwe li politikayak bi vî rengî razand û herê kir. Çend ku dîrokek misrê a kevn bi kurdan re jî hebû, Birayên misilman, li gorî tirkiya tevgerîya û heta ket pozisyonek di temmenê dij-kurd de jî.Ev rewş û gelek rewşên din, xelatîyên politikayê bûn ku hatina kirin bûn. Ev xelatî jî, bûna temenê desthilatdarîya Mursî bikeve rewşek ne baş û derbe li wê were kirin. Wekî din jî, têkilî danîna desthilatdarîya Mursî, ne li ser temenê prensîbên civatî bûn. Desthilatdarîyeka ku bi ´hilbijartinan´ hatî bijartin, divîyabû ku li ser prensîbên civatî û demokratîkî gav biavêta. Lê li şûna wê, desthilatdarîya Mursî li şûna ku politikayên xwe bixwe kifş bike û bike merîyetê de, li gorî politikayên welatên weke tirkiya û hwd, ket nava pozisyonê de. Ev jî, bû sedema ku ne pêşxistina politikayê a desthilatdarîya Mursî û ku bibe dûvikê politikayên rejimên weke tirkiya û hwd. Politikayên desthilatdarîya Mursî ên di derbarê Sûrî de, li gorî xwestekên welatên weke tirkiya û hwd, hatibû pêşxistin. Bi van kêmesîyan, di aslê xwe de desthilatdarîya Mursî, temenê derbeya li xwe jî bi destê xwe gav bi gav hûnand û afirand. Çend, mirov xelatîyê di kirina derbeyê de bibînê û derbekaran rexne bike jî, divê ku mirov van xelatîyên desthilatdarîya Mursî ku temenê derbeya li wê afirand jî li berçav bigrê û werêne ser ziman. Ji xwe, piştî ku derbe li desthilatdarîya Mursî hatkirin û tirkiya jî fahmkir ku wê nikaribê birayên misilman li Sûrî û hwd li gorî politikayên xwe bikarbêne, êdî bidest pêşxistina DAÎŞ´ê kir. Lê ku desthilatdarîya Mursî heta piştre maba jî û derbe li wê ne hatiba kirin, wê bi militanên birayên misilman, weke ku bi DAÎŞ çi dikin li Sûrî, wê heman rewş û kirin û kiryar bi wan bikiran. Tirkiya, hinekî jî bi bûna derbeyê li Misrê û li desthilatdarîya Mursî, weke ku ji van aliyan ve temenê bikarhanîna birayên misilman li gorî politikayên li Sûrî windakir. Hêrsa wê jî, ji vê yekê bû. Ji ber ku tirkiya hemû hasabên xwe li ser birayên Misilman kiribû li Sûrî. Heta ku tirkiya hizir dikir ku weke ku çawa ku î ro bi DAÎŞ´ê re dike, çengê rêxistina birayê misilman a li Sûrî ku li dijî-kurdan jî bide şerkirin. Ji van aliyan ve bigiştî rêxistina birayên misilman, wê pêvajoya ku li Misrê bû desthilatdar de, ket rewşa rêxistineka ku ji aliyê rejimên weke tirkiya û hwd de were bikarhanîn jî. Piştî ku derbe li desthilatdarîya Mursî hat kirin jî, ev politikayên bikarhanîna birayên misilman ji aliyê rejimên weke ya rejima tirk û hwd ve bû. Ji vê yekê, mirov dikarê gav biavêje û bibêje ku tevî wê derbeya li desthilatdarîya Mursî jî, hê jî rêxistina birayê misilman rastîya civatî û pêvajoyên pêşketinê bi awayekî baş û rêkûpêk nexwendîya û ne dîtîya. Dema ku heman xelatîyê bidina domandin bi têkiliya xwe ya bi tirkiya re, ji wê ev tê fahmkirin. Li kurdistanê, partîya Kurd PDK´ê jî di temenê politika û nêzîkatîyaka bi vî rengî de li kurdistanîyan bixwe hatîya bikarhanîn ji aliyê rejima tirk ve. Î ro, li dijî şoreşa rojava û bi teybetî statûya rojavayê kurdistanê helwesta dijber a vê partîya kurd, divê ku mirov bi vê rengê politikaya rejima tirk û ankû rejimên herêmê ku kurdistan dinava wan de hatî qatkirin bêne ser ziman. Di temenê politikayên ku bi wan di wê demê de bi destê birayên misilman dieşandin ên di temenê dijberîya statûya kurd de, î ro partîya PDK´ê jî di pozisyonekê de ya. Ev rengê politikaya PDK´ê a di temenê dijberîya statûya kurdên rojava de, bi têkiliyên wê ên bi tirkiya re pêşketîya. ..

Car bi car, rayadarên vê partîya kurd jî, ku bahse têkiliyên xwe yên bi tirkiya re dikin, gotina ”muttefîk” û ankû ”têkiliya stretejikî” û hwd bikardihênin. Lê ne li başûr û ne jî li ti beşên din ên kurdistanê, têkiliyeka bi rejima tirk a ku em bi van gotinan werênina ser ziman, tûna ya. Rejima tirk, li bakûrê kurdistanê û li rojavayê kurdistanê û

heta ku li rojhilatê kurdistanê li dijî pêşketina statûya kurd û temenê wê ya. Li dijî kurdan bi vê armancê şer dike. Hêzaka ku bi vê armancê şer dike, çawa dibe ku têkiliya wê re dibê têkiliyek ´muttefîkî´ û ankû ´stretejîkî´ û hwd. Bêgûman, mirov nikarê bi vê rengê werêne ser ziman. Têkîliyên ku em bi gotinên weke ´muttefîkîtîyê´ û ankû ´stretejikîyê´ werênina ser ziman, di temenê nêzîkatîya weke hevdû ya bi civatî û maf û statûya desthilatdarî ya. Ev rewş jî di nava kurd û tirkan de tûna ya. Rengê politikaya rejima tirk ku bi wê vê Partîya kurd a bi navê PDK´ê ku li dijî kurdan û statûya beşên din ên civate kurd û kurdistanê kirîya pozisyonê de, mirov dikarê nêzîkatîya rejima tirk a li rêxistina birayên Misilman jî binerê û wê bi vê nêzîkatîyê hilde li dest û fahm bike. Bi heman rengî, têkiliya rejima tirk a bi birayên misilman re jî, bi gotinên weke ”têkiliya baş´, ´muttefîk´ û hwd dihat bi navkirin. Rêxistina kurd a bi navê PDK´ê jî û ya birayên misilman jî, ew têkilîyên wan ên bi rejima tirk re ku di temenê bikarhanîna wan de di temenê politikayên de, herdûyan jî bi gotinên ´têkilîyên baş´ û ankû ´muttefîkîyê´ hanîya ser ziman. Lê rewşa partîya kurd û têkilîyên wê ên bi rejima tirk re di keve pozisyonaka xirabtir ji ya têkilîyên rejima tirk ên bi birayên misilman re. Rejima tirk, dixwest ku li ser olê û têkilîyên wê ên bi birayên misilman re ola îslamê îstîsmar bike weke ku bi DAÎŞ´ê dike. Lê partîya kurd PDK´ê, li dijî beşên din ên civate kurd hêzên ku tekoşîna rizgarîya civate kurd didin hat bikarhanîn. Mînaqe, nîşana û birhana vê jî ew a ku dema ku kurdên rojavayê kurdistanê rêveberîya xwe ya xweser avakirin, rayadarên rejima tirk, pêşî dibêjin ”em û hikimeta kurd di heman helwestê de na.” û piştre dibêje ku ” ” wê berzanî destûrê nedê ku PYD, ku rêveberîyeka ´facto´ li rojavayê kurdistanê ava bike" Heta ku rayadarên partîya kurd a PDK´ê û ên başûrî ku di vê temenê de, çendî ku li dijî statûya kurdan li beşên din ên kurdistanê bûn, têkilî bi wan re dihat danîn. Ku di nava kurdan de, ew dijberîya PDK´ê bi armanca xwe serdestkirinê û ankû bixwestina kirina bin kontrola xwe de dihat ser ziman jî, ev nîqaş ji deverekê û pê de, dibûn weke nîqaşên ser nûxûmandinê. Ji ber ku ew dijberîya li şoreşa rojava û ne naskirina rêveberîyên kantonên rojavayê kurdistanê ên rêveberîyê ku kurdan bidestê xwe avakirin, li ser helwest û xwestina rejima tirk dibû. Nîşanak û qanita vê jî, ew a ku di dema ku kurdan paymana hewlêrê çêkir bo rojava, di cih de wezîrê karê derve ê demê ê rejima tirk, çû başûrê kurdistanê û bi hin partîyên kurd re rûnişt û ji wan xwest ku ew li partîyên din ên kurd ên weke PYD´ê dijberîyê bidina nîşandin. Piştre, bi rêya PDK´ê hin partîyan xwe ji wê peymanê vekişand û sazîya ´desteya bilind a kurd´ ku hatibû avakirin jî, ne hiştin ku bikeve piretikê de. Piştre jî, rayadarên kurd ên başûrê kurdistanê ên PDK´yî li dijî rêveberîya kurd heman helwestê weke ya rejima tirk ku li dijberî wê rêveberîya dide nîşandin, dihênin ser ziman. Her wusa, rayadarên ên vê partîya kurd, çendî ku di vê temenê de li dijî statûya kurd ya rojavayê kurdistanê dibina xwedîyê helwesta dijber, bi rayadarên tirk re dibina ”muttfefîk”. Em vê jî, bibêjim ku piştî ku bi ser avakirina rêveberîya kurd a rojavayê kurdistanê bi du-salan jî, hê jî wê rêveberîya ya başûrê kurdistanê ew rêveberîya kurdên rojavayê kurdistanê nasnekirîya. Rengê têkilîya partîyên ên ku bi rejimê re tevdigerihin, di vê temenê de ya. Û vê têkilîyê jî, weke ´têkilîya baş´ û ankû ´muttefîkîtîyê´ dihênin ser ziman. Lê ya rastî ew ku cihê ti gûmanê di wê de tûna ya ku em nikarin vê têkilîya partîyên kurd ên bi rejima tirk bi gotinên ´têkilîyên baş´ û ankû ´muttefîkîtîyê´ werênina ser ziman. Bi gotinên weke gotinên ´têkilîyên stretejîkî´, em hîç nikarin werênina ser ziman. Rejima tirk, hemû têkilîyên wê ên bi partîyên kurd re, li ser temen û esasê bêstatûkirina kurdan û wê rewşa

bêstatûkirinê ku bi wan bide herêkirin a. Li bakûrê kurdistanê jî, kurdên ku navê kurd ne dihanîn ser ziman û li gorî tirkitiyê tevdigerîyan, têkiliyên wan bi rejimê re hebûn. Yanî, partîyên kurd ên ku kurdîtîya xwe weke gomlekekî ku ji xwe kirina, têkilîya wan bi rejima tirk re hebû. Li vir, divê ku mirov bikarhanîn û îstîsmarkirina fektora olê jî ji bîr nekê. Ji ber ku rêxistina birayên misilman, bi têkiliya xwe ya bi tirkiyê re bûya korbanê wê têkiliya wê ya ku maskeya olî hatîya nûxûmandin jî. Li dijî vê partîya kurd a bi navê PDK`ê, li şûna ku weke ku bi rengê têkilîyeka ku bi maskeya olê hatî nûxûmandin bikarbênin, bi têkilî û peymanên aborî û niftê û hwd re ew bi xwe ve girêdane û bi wê re jî êdî li gorî poliitkayên xwe wê bi rêvedibin û bikardihênin li dijî kurdan jî. Bo bikarhanîna vê partîya kurd ji aliyê rejima tirk ve têkiliyên wê ên bi peymanên aborî ku çêkirîya tên çi wateyê, her wusa ew têkiliya heman rejimê a bi maskeya olî hatî nûxûmandin jî tê heman wateyê. Ji van aliyan ve, mirov li rewşê dinerê, pozisyona ku ev partîya kurd hatî li wê de, di tijbihê ya birayên misilman ku hatî xistin de. .. Mursî û ankû Birayên Misilman, piştî ku li Misrê bûna desthilatdarîya, divîyabû ku hê zêdetî giringî daba ban azadîya ramanê, jinê, mafê mirovan û hwd. Lê ev ne kirin û wajî wê tevgerîyan. Ev jî, bû temenê têkçûna wê.

Li herêmê, ne di nava gelên herêmê de û ne jî ku li desthilatdarîyê jî bê, ku komên tûndrew, êdî wê hin bi hin têkherin. Wê mafê jîyanê ji xwe re nebînin. Her wusa, desthilatdariyên ku heta roja me, ol û bawerî ji xwe re weke bîrdozî biakarhanîna jî, wê mafê jîyanê ji xwe re nebînin. Kîjan rêveberî, mafê mirovan û azadîyan gelan esas bigrê û li berçav bigrê, ewê wê mafê jîyanê û pêşketinê bidest bixe. Wê bi wê re jî, ji xwe re pêşarojê qizinc bike bi civatê re. Yekrengî û yekdengî, êdî nêzîkatîyên desthilatdarî ên ku têkçûna na. Li herêmê, sê welat, weke welatên kevn ên dîrokî ku xwedîyê mejûyeka dîrokî na. Yek, Kurdistan a, ya duyemin Îran a, Ya sêyemin jî Misir a. Ev hersê welat, wê di demên pêş de jî bandûra wan ji ya ku em î ro hizir dikin ji wê zêdetir jî wê derkeve li holê û li pêş.

Dîroka van hersê welatan jî, dema ku were ser ziman, wê ronekbîrî û ronasansa herêmê di temenê hemdemîya wê de pêş bixe. Î ro, gelek desthilatdariyên li herêmê ên weke Tirkiya û hwd, naxwezin ku e were ditin û were ser ziman. Ji ber ku dibînin ku ew were ser ziman, wê pêşkeina herêmêê zûtir bibe. Bi wê re jî, wê zêde nikaribin, weke berê bi desthilatdarî ku gelên herêmê di bin metingeriyekê de hiştin û xwûna wan rijandina, wê xwe bijîn. Ya ku li vir, dihê ditin ev a. Î ran, hinekî rewşa wê cudatira. Îran, tenê ku bi hin reformna jî bê, ku di nava xwe de bide kirin, wê mejûya xwe ya berê bibîr bike û wê pêşketinaka mazin bi xwe re bide çê kirin. Desthilatdarîya nû ya Îranê, ku weke ku di destpêkê de bo wê hat gotin ku hasan Rûhanî reformên pêşketinê bide kirin, wê ne tenê li herêmê Îranê mazintir bike, wê herwusa pêşengîya gelên herêmê jî karibê ji gelek aliyan ve bike destê xwe de. Li herêmê, weke ku çawa ku di dema medîya de di nava kurdan û persan de konfadarasyon ava bû û bi hevdû re herêm pêşxistin, dikarê temenê vê yekê di roja me de jî li gorî pêşketina demê bide çê kirin. Derbeya li Misrê li vir, ya ku herî giring a ku wê bi bernemeyaka çawa derbeve ber mirovan û wê ew bernema çawa di pretikê de pretîze xwe bibîne, wê hinekî jî di vê temenê de pêşketina wê ya li herêmê û her wusa pêşketina herêmê jî bide kifşkirin. Pirsgirêk, li vir, ne pirsgirêka avakirina desthilatdarîyeka nû ya. Ku desthilatdarîyeka nû were ser kar û ji ya berê xirabtir bê, wê hingî rewş hê xirabtir bibe. Ji ber vê yekê, di

serî de divê ku pirsgirêk, weke pirsgirêka nêzîkatî û awayê hizirkirin û rengê pêşketinê were ditin.
-

**Di 2013´an de gera Mesud berzanî a li Amedê û nîqaşên li ser wê û di gerê de ketina rojevê û qastkirina rojavayê kurdistanê û gotina ku " wê berzanî destûrê nedê ku PYD, ku rêveberîyeka ´facto´ li bakûrê Sûrî (rojavayê kurdistanê) ava bike"**

Di vê demê de, serdane Mesûd Berzanî ya li Amede ket rojevê de. Mesud berzanî hat amede. Lê ev serdane Berzanî, di serê kurdan de pirr gûmanan dide çê kirin. Gelek Nîqaş bi xwe re hanî. Ên ku vê serdanê, ´weke serdanaka bo hilbijartinan´ jî şîrove dikin hena. Berî nûha, gelek caran sazîyên kurdan birêz Berzanî dewetî amede kirina. Di newrozê de jî, birêz Berzanî hatibû dewetkirin. Lê ew ne hatibû. Lê î ro, ne li ser deweta kurdan tê Amede. Li ser deweta T. Ardogan tê. Hat sr ziman ku ji xwe, rêveberîya başûr, derîyê sêmalka jî li ser xwesteka tirkiya girtibû li kurdên rojava. Kongira netewî a kurd jî, dîsa bi heman rengî li ser xwesteka wê taloqkirin li demeka ne dîyar. Birêz Berzanî, piştî taloqkirina kongira netewî li demeka ne dîyar, tê amede. Gelo, ev gera li amedê ku dihê xwestin ku vilqasî were xistin rojevê de, berdêla wê taloqkirina kongira netewî a kurd li demeka ne dîyar a? Ev şaşîyên polîtîkî ên vê demê ên dîrokî na ku hatina kirin in. Berdêla wan jî, wê li civate kurd bigiranî bide. Ji xwe, heta roja me, berdêla şaşîyên sîyesetmederên kurd, hertimî civate kurd bixwûna xwe û giran dane.

Hinek, dibêjin ku "wê ev serdan, wê fêdeya wê li pêşajoyê bibe. Bêgûman, ya ku kurdan jî dixwest ev bû. Lê bi rengê hatinê, ev jî gûmanê di serî me de dide çê kirin. Bi teybetî, piştî taloqkirina kongira netewî a kurd´bûyîna vê serdanê, dide nîşandin ku wê ne di temenê xwetekên kurdan de ew fêde li pêşajoyê bibe. Dewletê, bo ku pêvajoyê di temenê têkbirina kurdan û vîna kurdan de hertimî xwestîya ku bikarbêne. Heta ku di dema amedekarîyê kongira netewî a kurd de jî, dihat gotin ku "dihê xwestin ku kongira banga çekberdanê bike li tevgera kurd". Yanî, pirsgirêk, ne weke pirsgirêka civatekê, lê weke pirsgirêka "çekê" hatîya ditin. Nêzîkatîyên dewleta tirk jî, derneketina dervî vê. Dema ku Birêz Berzanî jî, di çerçova wê nêzîkatîyê de tê, wê çawa kî dikarê bêje ku wê di temenekî rast de li pêvajoyê bandûra wê li pêvajoyê bibe?

**Gera birêz Berzanî, di bin sêwane du şaşîyên dîrokî ku sîyeseta kurd ku kirina de dibe. Yek, rewşa girtina derîyê sêmalka li kurdan rojava ya. Ya din jî, taloqkirina li darxistina kongira netewî a kurd li demek ne dîyar a.** Piştî ku birêz Berzanî hat amedê, her ku kurdan lê nerîn wê girtina derîyê sêmalka li rojava û taloqkirina kongira netewî a kurd li demek ne dîyar wê bibîr bikin. Wê dibin wan nerînên gelê kurd ên rexnakar de wê were wê gerê.

Lê Birêz Berzanî, bersiv ne daye wê û ne hatîya. Î ro, ne li ser xwestek û deweta kurd, lê li ser ya T: Ardogan tê Amedê. Lê T. Ardogan jî, bi armancên xwe yên hilbijartinan vê dixwezê ku bikar bêne. Ev şîrove jî, dema ku em pêvajoyê, politikayên dewletê û zihnîyeta wê ya înkarê lê dinerin, em divê ku bibêjin ku ev ´gûman´ û şîrove rast derdikevin. Hikimeta AKP´ê, bi dijminatîya xwe li kurdan re, êdî di nava kurdên bakûr de teşîr bûya. Bi vî rengî, êdî "kurdan li dijî kurdan bikarbêne", bi wê dixwezê ku xwe ji wê teşîrîyê xilas bike û hinekî din demê ji wan politikayên xwe înkar û domandina wan re qizinc bike.

Hê di demên ku nîqaşên li ser li darxistina kongira netewî a kurd´ ku dihat kirin de,

T. Ardogan bixwe derketibû berçapameniyê û gotinên weke ´gef´ bikarhanî bû û gotibû ku "wê ew rêveberîya li wir zirerê jê bibîne".. Bi wê gotina "...ew rêveberîya li wir. ..", jî qastî rêveberîya kurd ya başûrê kurdistanê dikir. Ji xwe, piştî wê gefxwarina T. Ardogan, êdî hingî li darxistina kongira netewî a kurd, hatibû taloqkirin li dîroka 24 û 25´ê mijdara 2013´an. Di wê demê de, Nêçîrvan berzanî jî hatibû tirkiya û bi T. Ardogan re hevdîtin kiribû. Ji xwe, piştî wê hevdîtinê, êdî ew taloqkirina kongira netewî a kurd´ hatibû kirin.

Piştî wê taloqkirinê re, ku dem tê roja 24 û 25´ê mijdarê, êdî ku dem ne gihiştî vê demê, di 10´ê mijdarê komiteya amedekar ya kongira netewî a kurd li hevdû dicivê û di wê civînê de kongira netewî a kurd´, li ber wê dîroka 24 û 25´ê mijdarê nayê sekin in û li demeka ne dîyar bêî ku dîrok were dîyar kirin tê taloqkirin. Piştî wê taloqkirina kongira netewî a kurd li demek ne dîyar jî, ket rojevê ku wê Mesûd Berzanî were Amedê.

Ev gera Birêz Mesûd Berzanî, piştî taloqkirina kongira netewî a kurd li demek ne dîyar dibê. Lê bi wê re jî, dewletê hasabên wê ên ku kirina hena. Bi teybetî, wusa xuya dike ku wê hin rewş û gerna din ên bi vî rengî wê bikin. Ev jî, hemû wê di temenê domandina înkare kurd de werê bikarhanîn.

Her wusa, aliyekî din ku li ser gotinan re di çapameniyê de dihê nîqaş kirin. Ew jî, bi teybetî, di çapameniya tirkî de tê gotin ku "pêşbazîya dinava PKK´ê û PDK´ de." Bi vî rengî, di aslê xwe de, weke ku li ser piştê kirina pêşbaziyê jî, weke barekî dihê xwestin ku were kirin.. Ji xwe, dewlet jî, wê dixwezê. Her ku ew rewş hebe, wê tirkiya jî, ji wê sûd bigrê di temenê dijbarîya tekoşîna kurdan ya maf û azadiyê de. Bi gotinên "pêşbazîya di nava wan de", dihê xwestin ku hertimî ew li ber hevdû hebin. Her ku ew bi wî rengî hebin jî, wê temenê bikarhanîna aliyekî li dijî yê din wê hebe.

Hikimeta AKP´ê, bi teybetî, dijberîya xwe ya li dijî rojavayê kurdistanê, bi piştgirîya wê ya li çeteyan re bê û bi çêkiirna diwarê şermê û hwd bê, dide nîşandin. Di vê dema ku herî zêde pêwîstî bi yekîtîya kurdan ya navxweyî heya, bo ku ew yekbûn nebê û pêşnekeve, di vê temenê de leyistikna dîrokî dihên leyistin. Lê nezanîya sîyesetmederên kurd, hinekî jî temenê bikarhanîna wan li cihê statûya civatîya wan bixwe jî ya. Birêz Berzanî, dema ku were Amedê, peyamên ku bide wê giring in. BIrêz Berzanî, divê ku hêvîyên gelê kurd rast bixwêne.

Ya min bixwe, ez wilqasî ne bi hêvî me ku wê rast werina xwandin. Ji ber ku rewş û pozisyona sîyesî ya ku di wê de dihê meşîn ne rast a. Ev rewş û pozisyon, ne li gorî rastîya civate kurd a. Bo vê yekê, di vê rewşê de, ji fêdeyê zêdetir, ev ger wê zirerna jî bi xwe re ji civate kurd re bêne. Heta nûha, hertimî, piştî pêvajoyên weha, hin pêvajoyên din ên hêrîşkarîyê ên rejima tirk li dijî civate kurd dest pê kirina. Nûha jî, piştre ku tê kirin, ew a ku wê piştî vê gera Birêz Berzanî re wê hêrîşna di çi rengî de li kurdan û li civate kurd û li tevgera azadîya kurd dest pê bikin. Ku em bahse bendwarîyê bikin, divê ku em bahse vê bikin. Kurd, dimejiyê xwe de, vê ´bendewariya hêrîşên nû´ di serê xwe de dikina pirs û dipirsin û li bersivê ji wê pirsê re lêdigerihin.

Hikimeta AKP´ê, bi politikayên dewletê, dixwezê ku rewşeka qaşo rewşa "baş" biafirêne û di nava wê rewşê de di hilbijartina de li kurdistanê ji nava kurdan hin dengna bigrê û hinekî din bigrê, dakû politikayên xwe ên li dijî kurdan di temenê înkare wan de bi cemeatê re bide domandin. Ku em bahse leyistikekê bikin, ev lîstikek ku di temenê vê gerê de ya.

Lê aliyekî din jî, ew a ku gotinên ku di çapameniya tirk de derdikevin bi wî rengî na ku dibêjin ku "wê ev ger di nava kurdan de nîqaşên mazin vekê." Bi vê gotinê, dihê xwestin ku bi rastî jî ev ger were nîşandin û bi wê re di nava wê nîqaşê de di mejiyan de derkevina nêçîrê.

Kurd, serokên wan, gerên wan weke gera birêz Berzanî, me hêvî dikir ku li şûna di xizmeta hikimeta AKP´ê de, gerek bi vî rengî bikira, me hêvî dikir ku li gorî rastîyên civate kurd gavên xwe biavêtan. Di vê demê de, herî zêde yekbûn di nava sîyeseta kurd pêwîstî pê hebû. Lê bi şaşîyeka dîrokî, ev nayê pêşxistin.. Kongira netewî a kurd, dihê taloqkirin. Gerên ku dikevina xizmeta politikayên înkarê rejima tirk de, tenê û tenê wê bi ancamên xwe re kuştinê di demên pêş de ji kurdan re bênin. Piştî vê rewşê re, wê çi were serê kurdan û ankû wê çi politika werina pêşxistin, emê bi hevdû re bibînin. Tirkiya, hê ji başûrê kurdistanê re gotina "bakûrê Iraq" û ankû bi tirkî "kuzey Irak" bikardihêne. Zimanê kurdî, hê qadaxa dike. Hebûna civate kurd nasnekê. Li bi her awayê li dijî statûya kurdan şer dike û nasnekê. Naxwezê, ku statûya kurdan nas bike.. Pêvajoya, ´pêvajoyê´ jî, hatîya û li vê nûqtê aliqî û qilibîya.

Rêveberîya başûrê kurdistanê, di serî de refê xwe ku di nav de cihgirtiba xelat nîşan kirîya. Bêgûman, hevdîtin, di nava rêveberîyan de dibin. Ku ev hevdîtin, bo sîyesî û dîplomatikî bin, aborî û hwd bin, dibin. Lê dema ew rejim, di temenê dijberîya civate kurd de, hê poliitikayên xwe yên dijber dimeşenê û hê dijbarîyê dike li kurdan bi politikayên xwe yên asîmlasyonê re û hê înkare kurdan bi qadaxaya li ser zimanê kurdî û ne naskirina civate kurd re didomêne. Ku rewş ev bê, hingî, di temenê wan politikayan de, her hevdîtin, bêgûman, wê ne di temenê başîyekê de bin bo civate kurd.

Rêveberîya kurd a başûrê, divê demê de li ber kurdan û civate kurd azmûneka rast û pak neda. Bi rewşa xwe re ket dijberîya heyîna civate kurd de. Bi poliitikayên ku meşandin, dide nîşandin ku pêvajoyê rast û dûrûst naxwêne. Hebûna civate kurd, ji aliyê wê bixwe ve jî, hatîya piştguhkirin. Politikayên ku ew dimeşêne, weke ku di hevkarîya wê ya bi tirkiyê meşandina ambargoyê li ser rojavayê kurdistanê jî, da nîşandin ku ne li civate kurd dihizirê. Bi wê rengê ku qaşo bi wê politika kirin, ev pêvajo bigiştî bi kurdan dan winda kirin. Gera Mesud berzanî a ku li Amedê kir, di vê demê de, herkesek jî hêvî dike ku fêdeya wê li pêvajoya çareserîyê hebe. Hêvîya gelê kurd, hemûyî jî ev a. Di serî de, divê ku em vê **pêdandin(´tespît´)**ê di serî de bikin. Tirkiya di serî de, bi wê hewayê dixwezê ku carek din li ser serê kurdan rejima xwe ya metingerî xort bike. Ji xwe, ji vê aliyê ve ku em lê binerin, wê ancamên wê pirr zêde hebin. Lê ji aliyê kurdan û sîyeseta wan ve jî, divê ku em herê bikin ku derbeyeka li kurdan. Çend ku bi gera Berzanî re tê gotin ku "wê pirr fêdeya vê gera berzanî li pêvajoya çareserîyê bibe jî, em nikarin vê yekê biibêjin. Bo ku fêdeya gerê li pêvajoyê biibe, divê ku pêşî nîyeta dewletê ya çareserkirinê û radestkirina mafê kurdan hebe. Ya ku tûna ya ev a. Lê kurd, bo ku pirsgirêka kurd were çareserkirin û nîyetek bi vî rengî biafirê, têdikoşin. Tekoşîna demokratîk didin. Dema ku ev tûnabê, wê çaxê, gotinên ku tê gotin "wê fêdeya vê gerê li pêvajoyê biibe" jî, weke gotinna ku lingên wan li hewayê dimênin. Rasta, pêvajoyeka heya. Lê ew pêvajo ji aliyê BIrêz Ocalan ve hat dayîn dest pê kirin. Mirovê ku ev pêvajo daye destpêkirin, di girava îmraliyê de di bin ´tecrîdê´ de ya. Hemû têkilîya wê bi cihanê re hatîya birrîn. ..

Lê li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku ev pêvajoya ku bi gera berzanî re destpêkir, heya ku wê derbeyekê li pêvajoya çareserîyê jî bixe. Bêgûman, ew derbe wê li kurdan

bikeve. Yanî rengê wê derbeyê wê di pêvajoyê de kurdan bide têkbirin. Wê rejimê li ser serê kurdan bide bihêztirkirin. Weke ancameka vê gerê jî, em dikarin vê bênina ser ziman. Yanî, gera berzanî, bi rejima tirk jî, di **taktîkeka stretejikî** li dijî kurdan û tekoşîna kurdan a maf û statûyê.

Gotinaka din jî, pirr bale min dikişêne. Ew jî, ew a ku tê gotin ku "qisawet(endîşe)a tirkiya û rêveberîya başûrê kurdistanê bo rojava wehev a." Li vir, ev gotin, di serî de, divê ku mirov wê lêbikolê. Ev gotin, di zane min de, rengê gerê û armancên wê jî dihêne ser ziman. Ji ber çi û çawa "qisawet(endîşe)ên ardogan û Berzanî wekehev in." Li vir, dema ku em li ser vê gotinê bihizirin, em dibînin ku ev gotin li ser "rojava" û "bûna xwedi statû"´bûna wê, dihê gotin. Li vir, ku bê gotin ku "bo tirkiya ew qisawet heya", mirov wê fahm bike. Ji ber ku tirkiya, beşeka kurdistanê di nava sînorê wê de ya. Ev beşa kurdistanê jî, bakûrê kurdistanê ya. Kurd, dixwezin ku pirsgirêka wê beşê were çareser kirin. Bi wê re jî, kurd dixwezin ku mafê wan ên ku ji wan hatîna standin werina radestkirin û statûya wan were nasîn. Dema ku em bo tirkiya vê gotina "qisawet(endişe)ê hildina li dest, ji vê aliyê ve rast a. Ji ber ku tirkiya naxwezê ku mafê kurdan radestî wan bike. Lê dema ku rojava statûya xwe pêşbixe, wê êdî tirkiya jî mecbûr bimêne ku mafên kurdan radest bike û statûya kurdan nas bike. Demma ku em gotina "qisawet(endşe)ê ji vê aliyê, ji aliyê tirkiya dihildina li dest, rast a. Lê ji aliyê rêveberîya başûrê kurdistanê û berzanî ve çawa dibe rast? Çawa dibe ku heman qisawet(endişe)ê bo berzanî jî were ser ziman. Dema ku ev qisawet, bo berzanî jî rast bê, wê çaxê divê ku mirov fahm bike ku berzanî jî bo bêstatû hiştina kurdan têdikoşê. Wê çaxê, ew gotinên ku tên gotin ji aliyê berzanî ve ku "em dixwezin ku birayên me ên rojava jî mafên xwe bidest bixin", hingî dibe derew û vir.

Bi teybetî, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku sîyeseta başûrê kurdistanê, bo civate kurd li vir di rengê ´pirsgirêkê´ de derdikeve li ber me. T. Ardogan, dema ku mafê kurdan înkar dike û ew dixwezê ku "yek ziman, yek milet, yek netew, yek olê, yek dewletê, ..." û hwd çê bike û bi wê re civate kurd, înkar bike û ku bi wê re sîyeseta başûrê kurdistanê ku bi wê re di ahangekê de bê û di heman rêyê de weke hevdû bê, wê çaxê, li vir pirsgirêk bo civate kurd derdikeve li holê. Hin gotinên ku tên gotin ku "berzanî, bo ku aligirên xwe serdest bike" jî, wê çaxê divê ku em di temenê ´bêstatû´kirina kurdan de bixwênin. ..

Li vir, sîyeseta rêveberîya başûrê kurdistanê, ku bi ya roja me ya rejima tirk re di heman ahangeê û wekhev bê, wê çaxê, em bo kurdan dibe levkirineka wan ya li dijî bidestxistina statûya wan. Bo rejima tirk jî, dibê levkiirneka ku bi hevdû re li dijî statûya kurdan şer bikin. Li vir, ev derdikeve li holê.

Li vir, dema ku rewş weha bê, divê ku em rêveberîya başûrê kurdistanê, bi sîyeseta wê re bikina bin lêpirsînê de. Li vir, dema ku kurdên rojavayê kurdistanê, bixwezin ku mafên xwe bidest bixin û li herêmên xwe statûya xwe ava bikin, çawa dibe ku ev ji berzanî re dibe "qisawet(endişe)"? Li vir, ku bê gotin, ev ji T. Ardogan re dibê qisawet, wê mirov wê fahm bike. Lê bo berzanê, ev çawa dibe? Li vir, ev pirs, di serî de, di vê gera berzanî ya li Amedê de derdikeve li holê. Gotinaka din jî ku sîyesetmederên kurd ji berzanî re gotin ku "divê ku berzanî hêvîyên kurdan rast bixwêne" jî, li vir bi awayekî xweza nabê. Wekî din jî, li vir, em sîyeseta başûrê kurdistanê bi navê wê nabînin. Em sîyeseta rejima tirk, di temenê sîyeseta wê de jî dibînin. Li vir, rewşa ku derdikeve li holê ev a.

Berzanî, bi teybetî, li dijî kurdên rojava, pêşî helwesta xwe bi xirabî da nîşandin û piştre çû gera xwe ya li Amedê. Piştî ku hat jî, bi teybetî, bi wê gerê ji kurdan zêdetir derbeyek li kurdan û statûyan wan ya maf û statûyê xist. Li vir, rewşa ku derdikeve li holê ev a. Rejima Tirk, dixwezê ku rewşa xwe li bakûrê kurdistanê hê zêdetir xorttir bike. Bo vê yekê jî, rêveberîya başûrê kurdistanê û berzanî bikardihêne. Ev jî, divê pêvajoyê de derbeyeka li kurdan û civate kurd bigiştî.

Di destpêka ppêvajoyê de, tevgera kurda jî li bendê bû û hêvî dikir ku rêveberîya başûr jî helwesta xwe di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd û bidest xistina mafê kurdan de bide nîşandin. Lê li vir, rewş êdî di guharê. Rewş, bi qatkirina sîyeseta kurd ya ku bi rêveberîya başûr re afirîya, dikeve dijberî berjewendîyên kurdan de. Li vir berzanî jî, weke sîyesetmederekî kurd, ku li aliyê kurd lê bi sîyeseta xwe re li dijî civate kurd û bi hêzên ku Kurdistan metinger kirina re tevdigerê dihê li holê. Ev, bi serê xwe qatbûna di nava civate kurd de ya. Li vir, başûrê kurdistanê, dikeve rewşeka dijberî statûya kurdan de hem li bakûrê kurdistanê û hem jî li rojavayê kurdistanê û beşên din jî. ..

Di pêvajoya ´çareserîyê´ de berzanî, bi tirkiya re di temenê "entegrekirina" kurdan li rejima tirk û ankû bi gotina din "asîmlekirina kurdan li nava rejima tirk", di temenê wê de helwestan dide nîşandin. Di vê temenê de, helwestên wî, li dijî kurdan û civate kurd biwate dibin. Di vê pêvajoyê de, ya ku sîyeseta başûrê kurdistanê baş naxwêne, ew a ku bi sîyeseta xwe re weke ku çawa ku dikeve dijberî civate kurd de, bi hebûn û politikayên xwe û kiryarên xwe re dikeve xizmetî politikayên bêstatûya kurdan de. Di vê temenê de, rewşa rêveberîya başûrê kurdistanê û bi teybetî sîyeseta wê derdikeve li holê. Li vir, em nikarin, bêjin ku sîyeseta başûrê kurdistanê, di xizmetê civate kurd de ya. Sîyeseta başûrê kurdistanê, bi kirinên wê re dikeve dijberî xwestina kurdan ya statûya xwe de. Çend ku hin rayadarên başûrê kurdistanê, gotinên weke "mafê kurdan" û ankû "em aligir in ku kurdên beşên din ên kurdistanê bigihijina çaresernûsa xwe û mafê xwe" jî, di kirin û pretika sîyeseta wan de, rewşek vajî wê derdikeve li holê.

Kurdên bakûrê kurdistanê jî, û kurdên rojavayê kurdistanê jî, ne li dijî ti kesekî na. Ew tenê maf û azadîya xwe dixwezin. Heta nûha jîî, ya ku dozkirina û xwestina ev a. Lê yên ku mafên wan nadê wan rejima tirk a. Nûha jî, rejima ku mafê kurdan nadîyê de, çawa dibe, ku sîyeseta rêveberîya başûrê kurdistanê bi wê re dibe wekhevdû. Ev rewş, bêgûman, rewşna sîyesî ku ancamên wan ên pirr cîdî hena û divê ku werina fahm kirin in. Di vê demê de, rewş, dihê û dikeve wê rewşê de ku bi destê kurdan dihê xwestin ku derbeyek li kurdan were xistin. Rejima tirk, ku hIkimeta AKP´ê bê û ankû partîyeka din ya rejima tirk bê, dixwezê ku hinekî din li kurdistanê di nava kurdan de bi bandûr bibe û hebûna wê zêdetir bibe. Ev jî, di vê demê de, wê ya ku herî zêde derbeyê li kurdan bixe ya. Yanî, li vir, di temenê bêstatû hiştina kurdan de û dirêjkirina vê pêvajoyê û ankû bi hewldanên di temenekî vajî xwestekên kurdan biancam kirina vê pêvajoyê, weke hin hewldanên rejima tirk in ku dixwezê bike. Di vê temenê de, dihêne bi ser kurdan. Ji ber vê yekê, bi hemû hêzên xwe yên dewletî, keşkerî, sîyesî û hwd re, giranîya xwe dane kurdistanê. Di vê temenê de, di aslê xwe de, rastkirina "destûra hilbijartinan" ji aliyê rejima tirk ve jî, hinekî weke ku di vê temenê de dibe temenek. Yanî, ji wê re dibe temenek ku hinekî din, rejimaê li ser serê kurdan xorttir bikin û bi hebûn bikin. BI wê re jî, tekoşîna xwe ya ku ew li dijî tevgera kurd didin ya bêstatû hiştina kurdan jî, êdî bimeşênin.

Pêvajo, di vê temenê de, bi şikandina sîyeseta kurdan û hildane rêveberîya başûrê kurdistanê li aliyê rejima tirk ku weke aliyê ku nexwezê ku mafê kurdan radestî wan bike, weke derbeyekê di serî de di vê pêvajoyê de li kurdan a. Weke ku çawa ku T. Ardogan dibêjê ku "pêvajo didomê" û ankû "meyîzênin, ev 9 meh in ku ceneza nayên" û hwd, berzanî jî, dibêje ku "em piştgirîyê didina pêvajoyê" û hwd, lê ku bi kirinên xwe re vajî gîyane wê pêvajoyê bi rêve dibin û dixwezin ku li gorî xwe û di temenê ´bêstatû´ hiştina kurdan de bi ancam bikin jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî kifş bike ya. Dema ku rewş ev bê û mirov rabê û bêje ku "qisawetên Ardogan û berzanî wekehev in", hingî rewş bi awayekî din dihê xwestin. Yanî, bi tememî, di temenê dijberîya kurdan de dihê xwandin. Rejîma tirk, li dijî statûya kurdan a li rojavayê kurdistanê ya. Naxwezê ku li wir kurd xwediyê mafekî û statûyekê bin. Ji xwe, ji ber vê yekê, tirkiya pirr zêde alîkarî da çeteyên weke "cebetil-nasr" û çeteyên din ên ku hêrîşî herêmên kurdan dikin. Li vir, dema ku rewş ev bê, wê çawa dema ku bê gotin ku "qisawetên Ardogan û berzanî weke hevdû na." , wê çawa dihê fahm kirin ku herdû jî li dijî statûya kurdên rojava na. Yanî, bi kortasî rewşeka bi vî rengî derdikeve li holê. Ji xwe, rewşa sîyesî ya rojavayê kurdistanê, kirina du-beş. Beşek, bi çend komikên kurd ku tevlî ´muxalefeta Sûrî ku hebûna kurdan nasnekê û li dijî statûya wan a kirina. Beşa din jî ya mazin, weke tev-dem û hwd jî, li rojava weke aliyê ´sêyemin´ mana û bo statûya kurdan di nava tekoşîna sîyesî de na. Di vê temenê de, rewşa ku derketî li holê jî, ew a ku ew aliyê ku statûya kurdan pêşdixe jî, rastî hêrîşa tirkiya û rêveberîya başûrê kurdistanê bixwe jî tê.

Çend roj berê, kurdên rojava meclîsa xwe ya rojava demezrendin. Lê mixabin Berzanî bixwe, di nivîseka xwe ya ku piştî wê denezendinê bi du rojan weşand de got ku "emê danûstandinê li gel wê meclîsê nekin." Gotin Berzanî a di nivîsa wî de bi vî rengî ya ","Di çend rojên borî de PYD’ê yekalî îdareya xwe li Rojava ragehandiye û evna jî biryareke yekalî ya eşkere û paşguhxistina partiyên din ên Kurdî ye. Em li ser helwêsta xwe berdewam in û tenê piştgiriyê li wan pêngavan dikin ku hemû alî bi hev re biryarê li ser bidin û danûstandinê ligel biryarên yekalî nekin.". Ev gotina berzanî, di serî de nîşanaka şikandineka mazin ya di sîyeseta kurd de ya. Wekî din jî, em dikarin vê gotinê û helwesta wê, di temenê dijbarîya nasîna statûya kurdên rojava de jî bixwêne.

Li vir, gotinaka din jî weke ya T. Ardogan, di alê xwe de nîşanaka zîhniyeta wî ya înkarker a. Di axiftina xwe de dibake amedîyan û dibêje "ku win li pêvajoyê xwedî derkevin, wê ên li çîyê jî werin û wê zindan jî vala bibin." Pirsgirêk, li vir, ne çîya jî ya û ne valakirina zindanê jî ya. Pirsgirêk, pirsgirêka bidest xistina radestkirina mafên gelê kurd a. Ji xwe, di dema ku nameya Birêz Ocalan, di newrozê de hat xwandin, ne tenê amedîyan, hemû kurdistanîyan gotin ku em li pişt wê pêvajoyê na. Lê li vir, gotina T. Ardogan tê wê wateyê ku ´amedî piştgirîyê bidina politikayên wî ên înkarê û doza statû û mafê perwerdeya bi zimanê dayikê nekin.´ û nexwezin. T. Ardogan, di vê wateyê de, wê gotinê dibêje û doza asîmlekirinê dike ji amedîyan. T. Ardogan, ji amedîyan re dibêje ´doza statû û xweserîyê nekin´. T. Ardogan, ji kurdan re dibêje ku ´dewletê got çi û çi daye we, bi wê razî bin û doza tiştekî din nekin û bêdeng bin. Yanî, dibêje ku ´têkiliya xwe bi tevgera azadîya xwe qût bikin û piştgirîyê bidina min û partîya min.´ Yanî li vir, dibêje ku ´doza statûyê nekin´ û ´bahse mafê perwerdeya bi zimanê dayikê nekin´. Ji xwe, ew dibêjin, ´meyîzênin, me ´trt-şeş´ vekir, me serbestî hanî ji ziman re´. Hata ku dibêjin ku "me dawî li asîmlasyonê hanî". Lê ev gotin ne rast in. Heta ku mafê

kurdan ê perwerdeya bi zimanê dayikê nebê, ew gotinên T. Ardogan ên bi rengê "me dawî li asîmlasyonê hanî" jî derew in. Xapandin in. Divê ku em vê yekê bi teybetî bibêjin. Ji xwe, vekirina trt-şeş´ jî û gotina "di dibistanên teybet de perwerde kurdî´ jî, ji ber ku êdî nikaribîn ji wê qadaxaya li ser zimanê kurdî biparêzên, êdî ev gavavêtina. Lê ev gav jî, bi armanca ser wê qadaxaya giştî nûxûmandinê na. Bi vê rengê, di aslê xwe de, ev gav jî, bi armanca ku karibin wê qadaxayê li ser zimanê kurdî bidomên in avêtin. Bo ku dema ku mirovan ji wan re pirsî û got, "zimanê kurdî qadaxa ya", da qana bersivê bidin û bibêjin ku ´meyîzênin, me telewîsyon vekir´, ´me perwerde bi zimmanê dayikê hanî di dibistanên teybet de´ û hwd. Bo ku di vê temenê de, karibin xwe biparêzên, ev gavavêtina. Yanî, ev gav, di asasê wê de, ne ji bo kurdan hatina avêtin. Bo vê rewşê, ku karibin xwe bi wê biparêzên avêtina.

Li vir, divê ku mirov bibêje ku peyamên ku ji cîvîna berzanî-ardogan derket li amedê ev bû. Di wê temenê de wê çawa, pêvajoyê bo tirkiya di temenê bêstatû hiştina kurdan de bi ancam bikin û wê gavê bi kurdan bi şûnde bidina avêtin ku doza ´statû´ û ´perwerdeya bi zimanê dayikê´ nekin, civîna wê hatîya kirin. Ji ber vê yekê ya, ku dewletê, di vê pêvajoyê de muzakare ne dane destpêkirin bi kurdan re. Ji ber vê yekê ya, ku qarakolan û hwd, çê dike li ser serê kurdan. Ji ber vê yekê ya ku dibêjin ku "perwerdeya bi zimanê dayikê nabê, wê welêt qat bike." Ji xwe, di vê temenê de sîyesetê dikin. Di vê temenê de, sîyeseteka dijberî kurdan û statûya kurdan dihê meşandin. Lê weke ku li kurdan dihizirin, gotinan bibêjin û bi wê re êdî gavan neavêjin. T. Ardogan, dibêjê kurdan "em hijî we dikin." Ji ber ku hijî wan dikin, bombabarandinê li wan dikin? Bo ku hij wan dikin, zimanê kurdî qadaxa kirina? Bo ku hij dikin, 17 hezar kuştinên kiryar ne dîyar çêkirin. Bo ku hij dikin, dibêjin ku li dijî xweserîya civate kurd û perwerdeya bi zimanê kurdî na? Bo ku hij dikin, ser 15 hezaran re sîyesetmeder û rojnemavan û ciwanên kurd kirina zindanan de? Bo ku hij dikin, komkujiya roboskî kiirn û hê jî qatilên wê ne hatina **derxistin? ...**

Lê ev sîyeseta înkarê di vê demê de, dema ku tê meşandin jî, bi gotinên ku di vê pêvajoyê de dihên bikarhanîn dihê kirin. Yanî, bi awayekî di, pirr bi bi binbinkî(sînsî) leyistikek qirêj dihê leyistin. hezar û yek leyistikî dileyizin û bêahlaqîyê dikin, bo ku kurdan bêstatû bihêlin. Dema ku ez bixwe li vê lîstika dewletê ya di vê pêvajoyê de ya bi vî rengî lê dihizirim, ew gotina Sêd Riza ku gotibû ku "min bi hîleyên we re serî dernexist ev ji min re bû derd, lê ez jî li ber we serî natawênim bila ev jî ji were bibe derd"**,** dihêne bîra min. Bi rastî jî, di vê demê de, di vê temenê de lîstikeka pirr bi bêahlaq di temenê dijberîya statûya kurdan û dijberîya perwerdeya bi zimanê kurdî de li dijî kurdan dihê leyistin. Mixabin, gelek kurd jî, van lîstika nabînin û yan jî dibînin ji ber çend qûrûşan xwe li wê razandina.

Li vir, ji ber ku pirr bale min kişand, ez vê dixwezim jî bibêjim. Roja ku ceza di dadgeha tirk de ji serokê gelê kurd birêz Ocalan re hat dayîn, di 29´ê hezîranê di roja ku Şêx Saîd hatî bi dervekirin bû. Yanî di roja ku di wê de cezayê bi dervekirinê hat dayîn li serokê gelê kurd birêz Ocalan roja bi dervekirina Şêx Saîd bû. Şêx Saîd, di 29´ê hazîrana 1925´an de hatibû bi dervekirin. Lê çi rasthatin(tesedûf)a, ku di roja ku Berzanî dihê dewet kirin û bi T. Ardogan re hevdîtinê dike jî, roja 16´ê mijdarê roja ku Sêd Riza hatîya bi derve kirin. Ma gelo ev rasthatin(tesedûf)a? Di karên dewletan de û di kifşkirina rojên weha cihê rasthatinan tûna ya. Ev şahî û dewet û mahrên ku hatina

birrîn, li vir divê ku mirov bibêje ku ti farqê wan, ji wê gotina ku li ser çîyayê agirî nivîsandibûn û gotibûn "sawêra kurdistanê, li vir vêşartîya." nîn a. Di wê demê de, bi kuştinê kurd diveşîrandin. Di vê demê de bi mahrê û wê şahîyê, bi asîmlekirinê wan diveşîrênin ku ji dîrokê bibîn. Di roja bidervekirina Şêx Saîd de, xwestin ku kurdan jî bi birêz Ocalan re bi derve bikin. Lê di vê roja 16(li gorî, hinekan jî roja dervekirina Sêz Riza, roja 15´ê mijdarê ya) mijdara 2013´an de, di roja bidervekirina Sêd Riza de jî bi dewet û şahiyê, wê dervekirina kurdan dixwezin temem bikin û bi wê mahra 300 cotî re jî mohra tûnakirinê li hebûna civatekê bixin. Weke ku çawa ku li ser çîyayê agirî nivîsandibûn "sawêra kurdistanê, li vir (bimirîtî) veşartî ya."

Dema ku rejima tirk li dijî statû û xweserîya rojava bê û ji rêveberîya başûrê kurdistanê bixwezê ku li dijî wê bi helwest û dijberîyê bide nîşandin, hingî gotina ´pêvajoya çareserîyê ku rayadarên wê û di serî T. Ardogan ku bikardihêne, dikin maske ji poliitikayên xwe ên di temenê înkar û dijberîya kurd û statûya kurd de. ..

Tirkiya, bi rewş û asta ku hatiyê de, êdî nikarê bi kurdan re şer bike. Heta nûha şer kir û bi wê şerkirina xwe ya bi kurdan re hem di nava kurdan de û hem jî di nava cihanê de teşîr bû. Nûha jî, di wî şerê xwe yê bi kurdan re dixwezê ku rêveberîya başûrê kurdistanê bicih bike. Di civîna duhû ya Ardogan-berzanî de, ku Beşîr Atalay û Ahmed Dawutoglu jî tevlî bûna, biqasî ku tê ser ziman, tê gotin ku "çar biryarên hevbeş hatina hildan". Yek ji wan biryaran jî, ew a ku tê gotin ku "wê berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîya ku ´facto´ ku li rojava ava bike." Wê berzanî çi bike? Wê li dijî rojava, weke ku rejima Esad û komên muxalefet û çeteyên wan ku kirina, wê şer li rojava veke? Ev gotin biserê xwe ketina wan ya rojevê de, di aslê xwe de, bo serokekî kurd bêrûmetî ya. Bêrûmetîya ku bê niqaşkirin û gotin ku serokekî kurd li dijî pêşketin û statûya rojavayê kurdistanê ya. Berzanî, ku li gorî gîyane van gotinên ku bi vî rengî tevbigerihê, wê çaxê, berzanî hem xîyanet li bavê xwe û hem jî li gelê kurd kirîya. ..

Li dijî pêşketina û statûya kurdan sekinin li berzanî ne ketîya. Ew ji bo wî bêrûmetî ya. Li vir, divê ku em di serî de, vê yekê bibêjin. Berzanî, divê ku di serî de vê yekê bibîne. Li gorî ku tê gotin, di cîvna ardogan û berzanî ku Atalay û Dawutoglu jî tevlî bûna de ev her biryar hatina girtin; ku "(1)wê di hundurê heyvekê de du deriyên din di naqabîna başûr û bakûr ve vebin", "(2)wê berzanî, piştgirîyê bide pêvajoya çareserîyê", "(3)wê berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîya ´facto´ li bakûrê sûrî (rojavayê kurdistanê) ava bike" û "(4)nifta kurd, di hundurê heyvekê de bidest herîkîna wê bêkirin li bazarên cihanê di wê lûleya ku hatî çêkirin de". Ev her çar biryar tê gotin ku hatina girtin**.**

Li vir, ev her çar biryarên ku rêveberîya kurd û rejima tirk ku tê gotin bi hevdû re girtina, em di çerçoveya wan e jî, gotinekê bibêjin. Di nava her çar biryaran de, du gotinên giring hena. Yek, ew a ku tê gotin ku "berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîya ´facto´ li rojavayê kurdistanê were ava kirin". Ya din jî, ew a ku tê gotin ku "wê berzanî, piştgirîyê bide pêvajoya çareserîyê" ya. Ev herdû gotin, bi hevdû re di kirina sîyesetê de, dibina nakok. Pêvajo, ji xwe, ew a ku kurd maf û azadîya xwe bidest bixin. Pêvajo, ew a ku tirkiya qadaxaya li ser zimanê kurdî ra bike û xweserîya kurdan a demokratîk herê û nas bike ya. Di vê çerçoveyê de, dihê xwestin ji tirkiya, ku ew dijminatîya xwe ya li kurdan dawiyê lê werênê. Ev xwestekên kurdan in. Di vê çerçoveyê de, dema ku bo Berzanî, bê gotin ku "wê piştgirîyê bide pêvajoyê", lê wê "li dijî avakirina rêveberîya

kurd ya li rojavayê kurdistanê bê.", wê çawa ew gotina "wê pirstgirîyê bide pêvajoyê dibe ´maske´yek ji wê dijbarî û dijminatîya tirkiya ku rêveberîya başûr jî bi wê re tevdigerihê li dijî statûya kurdan. Li vir, êdî, em dikarin, vê gotinê bi vî rengî fahm bikin.

Li vir, divê ku em vê yekê jî, fahm bikin. Dema ku bahse ´pêvajoyê´ dihê kirin û bahse ´pêvajoya çareserîyê´ dihê kirin, dihê ditin ku wateya vê gotinê ya di serê kurdan de û ya di serê rayadarên rejima tirk de ji hevdû cuda na. Kurd, bi wateya xwe ya ku di serê xwe de ku didina gotina ´pêvajoya çareserîyê´, di wê temenê de ya ku qadaxaya li ser zimanê wan ê dayikê were rakirin û perwerde bi zimanê xwe yê dayikê bibînin, statû û bi wê re jî xweserîya wan ya demokratik were naskirin û rejima tirk jî xwe demokratik bike û bi wê demokratikkirinê re êdî dawiyê li dijminatîya xwe ya li dijî hebûna kurdan û civate kurd werêne. Ev wateya wê gotinê ya di serê kurdan de ya. Lê di vê çerçoveyê de, wateya vê gotina ´pêvajoya çareserîyê´ ya di serê rayadarên rejima tirk de jî, ew a ku "kurd, dawi li tekoşîna xwe ya maf û azadîyê werênin û doza perwerdeya bi zimanê dayikê û statûyê û bi wê re xweserîya demokratik bo xwe nekin. Bi wê yekê re, herkesek, êdî di nava sînorê tirkiya de ku bibe tirk û weke tirk û bi zimanê tirkî bijî. Ya ku di serê rayadarên tirk de, ku di çerçoveya zihniyeta wan de di çerçoveya vê gotinê de bi sîyesetkirna wan re û bi gotinên wan ên di vê pêvajoyê re û bi sekna wan re ku derdikeve li holê û dihê fahm kirin ev a. Ev jî, du nêzîkatî û zihniyetên ji hevdû cûda na.

Li vir, ev zihniyet, dema ku tiştekî ji rêveberîya başûrê kurdistanê bixwezê, bêgûman wê di temenê dijberîya statûya kurdan de bê. Her wusa, li vir, weke aliyekî din jî, ku em li vir bi vir ve girêdayî şîrove bikin ev lûleya niftê ku di nava sînorê tirkiya re dibuhurê ya. Tirkiya biqasî ku dahateyên wê ên ji bi qizinckirinê ji wê buhurîna niftê, her wusa ji aliyê sîyesî ve jî dixwezê ku di temenekî dijberî kurdan de wê bikarbêne. BIqasî ku mirov ji vê gera Berzanî û biryarên ku di nava rêveberîya wî û ya rejima tirk de ku hatina girtin, di berdêla ku firotîna niftê li ser tirkiya re jê dihê xwestin ku ew li dijî statûya kurdan ya rojavayê kurdistanê bisekinê. Di vê temenê de, di temenê biryarên ku wan di nava xwe de girtina ancamak derdikeve li holê.

Rêveberîya kurd, li vir, bi awayekî li dijî kurdan û pêşketina kurdan, bi vî rengî dihê bikarhanîn. Bi gotinaka din jî, ji rêveberîya kurd, dihê xwestin ku li dijî statûya kurdan pozisyonê bigrê. Li vir, di aslê xwe de, derdê tirkiya ew a ku pirsgirêka bakûrê kurdistanê çareser nekê. Yanî, dema ku rêveberîya başûrê kurdistanê li dijî statûya Kurdistan rojava ket nava pozisyonekê de, êdî wê nikaribê bêje ku "bila kurdên bakûrê kurdistanê, bigihijina maf û azadîya xwe". Ji wê zêdetir û wirdetir, êdî weke ku çawa ku li rojavayê kurdistanê, dihê xistin li dijberî statûya kurdan a rojavayê kurdistanê de, ev rewş wê weke rewşeka dijberî ku li dijî tekoşîna kurdistanîya ya bakûrê kurdistanê jî bibe rewşek. Di serî de, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî fahm bike. Rêveberîya başûrê kurdistanê, bi vî rengî, sîyeseta wê, dihê qatkirin û piştre dihê xistin li dijberî statûya kurdên rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê de jî. Li vir, êdî dema ku rewş ev bê, gotinên "em piştgirîyê didina pêvajoya çareserîyê" jî, tenê dibina maske ji bo vê politikaya rejima tirk ya di temenê înkare kurdan û bêstatûya hiştina wan de.

Li vir, aliyekî giirng ên din ew a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Ew jî, ew a ku rêveberîya kurd sîyeseteka bi sîyeseta rejima tirk ya înkarê re bimeşêne ya. Ya ku ji wê dihê xwestin ev a. Li vir, ev di serî de, derbeyeka dîrokî ya li kurdan. Divê ku em vê yekê di serî de kifş bikin.

Ji xwe, di ancama sîyeseteka bi vî rengî ya înkare kurdan de, kongira netewî a kurd hat taloqkiirn li demek ne dîyar. Dîsa bi heman rengî girtina deriyê sêmalka di ancamak sîyeseteka bi vî rengî de hat girtin li kurdên rojava. Buhurîna Salih Mislim li başûrê kurdistanê, astengkirina wê jî divê ku mirov di çerçoveyê de şîrove bike. Bi teybetî, gotina berzanî a bi rengê "meclîsa rojava ku hatî demezrendinm emê têkilîyê ligel wê ne çênekin" jî, divê ku em di çerçoveya vê sîyesetê de şîrove bikin. Yanî, ev rewş hemû, rewşna ku dikevina dijberî statûya kurdan û civate kurd de na. Li vir, pozisyona sîyeseta rêveberîya başûrê kurdistanê, ew a ku ne di temenê parastina berjewendîyên civate kurd de na. Vajî wê, na. Li dijî berjewendiyên civate kurd, rêveberîya başûrê kurdistanê dikeve rewşekê û pozisyonekê de.

Hin gotinên ku tên gotin ku "Berzanî, dixwezê ku li rojava aligirên xwe serdest bike û xort bike" jî, li vir tenê di gotinê de dimênin. di nava pêşketinaka civatî a demmokratikî de ku hilbijartin hebin, di dema ku çûyina hilbijartinan bû, hingî heya ku gelê kurd piştgirîyê bide aligirên berzanî jî û heya ku piştgiriyê nede aligirên wî jî. Lê di her halikarê de, dema ku hilbijartin çêbûban, wê aligirên berzanî jî, herî hindik, wê di meclîsa rojavayê kurdistanê de bûban xwedî hebûn û bandûr. Li vir, wusa êdî dihê xuyakirin, pirsgirêk, êdî ne dibe ev. Pirsgirêk, dibe ya tûna hasibandina statûya kurdan. Li vir, rewş ji aliyê sîyesî ve bi vî rengî dihê xwandin.

Lê aliyekî din, divê ku mirov pirr zêde bi gotinê li ser bisekinê heya. Ew jî, ew a ku tê gotin ku "wê berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîyaka ´facto´ ku li rojava ava bike" ya. Yanî, ji rêveberîya başûrê kurdistanê dihê xwestin ku ew helwestê li dijî pêşketina statû û xweserîya rojavayê kurdistanê bide nîşandin. Li vir, rejima tirk, ku bi çi awayê bê, li dijî kurdan bikeve şer de jî, dizanê ku wê bi sernekeve. Ji xwe, ev 30 salin ku bi kurdan re şerê tûna kirina wan û têkbirina wan bi wan re dide. Li vir, êdî ya ku rejima tirk, ne karîya ku bike, ji berzanî dixwezê ku ew bike. Yanî, ji berzanî re, dibêje ku ´min nekarî ku ez pêşketina statû û xweserîya kurdan bigrim, tû wê bi navê kurdîtîyê, û sîyeseta kurdiîtîyê wê pêşîyê ji bo min bigrê. Li vir, divê ku mirov vê gotinê bi vî rengê bixwêne. Di vê temenê de, ji rêveberîya başûrê kurdistanê dihê xwestin ku ew pozisyonekê li dijî pêşketina statûya kurdan û pêşketina wan ya bixweserî ya civate kurd bigrê. Li vir, rewş dihê û li vir disekinê.

Rêveberîya başûrê kurdistanê, li vir, piştî ku Calal talabanî, xwûn çû ser mejiyê wî û pê de, êdî bi tememî bidest sîyeseteka ´ne baş´ û ankû "nagatîf" di nava kurdan de kir. Li vir, em balê bikişênina li ser vê jî, ku pirr manîdara ku tam di destpêka mudahaleya li Sûrî de, ev rewş tê serê Calal talabanî. Di destpêka 2000´an de weke ku çawa birêz Ocalan hat dilgirtin û hat xwestin ku ji sîyesetê were dûrkirin, di destpêka pêvajoya mudahaleya li Sûrî de, rewşek bi heman rengî bi Calal Talabanî re derket li holê. Piştî ku Calal talabanî xwûn çû ser mejiyê wî û ev rewşa wî derket li holê, êdî bi awayekî sîyeseta li başûrê kurdistanê jî bi carekê weke ku biguharê lê hat. Di "fîîlîyetê" de, rewşek û rêveberîyek nû li başûrê kurdistanê hat û afirî. Ev rewşa Calal Talabanî, rewşa birêz Ocalan ku bi dilgirtina wî re derket li holê û rewşa Yasar Arafat ku di van rojên dawiyê de çapameniya cihanê jî nîqaş dike ku ew hatîya jahrkirin, dihêne berbîra me. Li vir, gûman di serê mirov de çê dibin ku weke ku rewşek bi vî rengî hebe. Em ji kûderê digihijina vê ancamê? Em ji rûdaw, pêşveçûnên li başûr û rojavayê kurdistanê û pêşketinên li bakûrê kurdistanê, vê yekê dixwênin. Bi temenî weke ku di destpêka

mudahaleya Sûrî de, bêxwestin ku Calala Talabanî ji sîyesetê were dûrkirin rewşek derdikeve li holê. ..

Calal Talabanî, gelek caran navbeynkarî jî kirîya di naqabîna tevgera a li bakûrê kurdistanê û rejima tirk de. Di dema Turgut Ozal de, hingî turgut Ozal li ser Calal talabanî re têkilî bi Birêz Ocalan re didanî. Di vê demê de, di dema ku ´pêvajoya çareserîyê´ birêz Ocalan da destpêkirin û ku dem hat ber mudahaleya li Sûrî, êdî ev rewş hat serê Birêz Calal talabanî. Li vir, piştî Calal Talabaî re, sîyeseta Rêveberîya başûrê kurdistanê, bi xortî ji hilbijartina derxistina PDK´ê re di navendekê û destekî hat "yekkirin". Ew yekkirina ku hatkirin û çêkirin jî di destê Berzanî de, nûha di wê temenê de rejima Tirk ji wê dixwezê ku li dijî statûya rojavayê kurdistanê bibe xwediyê helwestê. Gotinên ku tê gotin ku ""wê berzanî destûrê nedê ku PYD rêveberîya ku ´facto´ ku li rojava ava bike" jî, piştî vê re û bi teybetî, di gera berzanî a li amede de dihên bi lêvkirin.

Li vir, divê ku em dûbare vê yekê werênina ser ziman, sîyeseta kurd li ser rêveberîya başûrê kurdistanê re dihê qatkirin. Bi wê qatkirina sîyesî re jî, dihê xwestin ku derbe li kurdan were xistin. Çawa dibe ku rêveberîyek u ji xwe re bêje ku ´ez rêveberîya kurd im´ û rabê li dijî statûya kurdên beşeka din a kurdistanê bikeve nava helwestê de. Cihê vê, di ti ahlaqê civatî û felefeyê de tûna ya.

Weke ku çawa ku di asta giştî ya civate kurdî de li ser rêveberîya başûrê kurdistanê re sîyeseta kurdistanê dihê qatkirin, her wusa, di astên binî ên herêmî de jî, weke ku di vê demê de li rojavayê kurdistanê dihê kirin, li dijî tev-dem´ê ava kirina meclîseka din bi navê ENKS´ê û bi wê re rewşa sîyesî ya rojavayê kurdistanê jî kirina du-qat jî, di temenê wê sîyeseta qatkirina civatî de divê ku mirov fahm bike. Li ser vê rewşê re, rejima tirk dixwezê ku li dijî bidestxistina statûya kurd şer bike. Li vir, divê ku em vê yekê jî werênina ser ziman ku ´bidestê kurdan, dihê xwestin ku derbe li kurdan werê xistin´. Sîyeseta qatkirina civate kurd, di vê temenê de dihê kirin.

"Dema ku dijberî lki rêveberîya xweser a kurd ya rojavayê kurdistanê û statûya wê hebe, wê çaxê gotinên "´em piştgirîya pêvajoya çareserîyê dikin" jî, dibina weke maskeyekê. Li vir, di serî de divê ku em vê yekê bi teybetî werênina ser ziman. Tê çawa bêje ku "emê piştgirîya xwe bidina ´pêvajoya çareserîyê´" û pişte tê rabê û bêje ku "emê destûrê nedin ku kurdên rojava rêveberî û statûya bidest bixin." Ev gotin, bi teybetî, vajî hevdû na. Ev gotin, didina nîşandin ku pêvajoya çareserîyê, di temenê bêstatû hiştina kurdan de dihê xwestin ku were domandin û biancam kirin û bidawî kirin. Li vir, weke destûreka ahlaqî, civate û felsefeya civatî, divîyabû ku ji herkesekê zêdetir rêveberîya başûr bê şert û merc gotiba ku ´piştgirîya me ji rêveberîya kurd ya rojavayê kurdistanê re heya´. Divîyabû ku pêşî, rêveberîya başûrê kurdistanê, ku kê pêşî lê girtiba jî, wê alîkarî ji biredrên xwe re bişanda û bo hêzkirina wan û di rêyeka rast de meşandina wan û hwd, wê alikarîya ji wê re bişanda û bikira. Ev yek, weke destûreka civatî ya. Gotina Berzanî ya ku rojevê berî gerîya wî ya li Amedê ku hatîbû ser ziman û gotibû ku "emê danûstandinê liger wê rêveberîya rojava nekin" û gotinên ku piştî ku gera berzanî bi çûyîna wî ya li Amedê re destpêkir re ku hatina ser ziman ên weke "wê berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîya ku ´facto´ ku li rojava ava bike", bi hevdû re di ahangekê de na. Lê weke ku çawa ku ev gotinên bi hevdû re di ahangekê de na jî, bi heman rengî bi rengî sîyeseta rejima tirk ya înkare kurd re jî di ahangekê de na. Bi vê yekê, divê ku em bi teybetî vê yekê kifş bikin û bin xat bikin.

Li vir, bi gotinên ku tên gotin re di çerçoveya ´pêvajoya çareserîyê´ de jî dîmenek û wêneyekî ku xatên wê pirr zelal in jî derdikeve li holê. Li vir, çend ku Berzanî, dibêje ku "emê piştgirîya xwe li pêvajoya çareserîyê bidomênin" û rayadarên rejima tirk ên weke T. Ardogan dibêje "pêvajoya çareserîyê, didomê" jî, em dibînin ku ev gotina "pêvajoya çareserîyê", dihê kirin weke ´maskeyekê li wan politikayên înkare kurdan de ku didomênin. Li vir, tenê bi vî rengî di temenê berjewendîyên xwe de bikardihênin. Ya ku di vê demê de, birêz Ocalan giranîyê didiyê ku nebê ev a. Birêz Ocalan, dixwezê ku pêvajoya çareserîyê, ji danûstandinan vegerihê "muzakereyan". Di vê temenê de, di nava kar û tahbaka mazin de ya. Lê ya ku heta nûha nebûya jî ev bixwe ya.

´Pêvajoya çareserîyê´, dema ku rejima tirk li dijî statû û xweserîya kurdên rojava bê û ku ji rêveberîya başûrê kurdistanê jî bixwezê ku di vê temenê de van politikayên wê de ji wê re bibe alikarî jî, hingî em nikarin bi awayekî rast bahse ´pêvajoya çareserîyê´ jî bikin. Hingî, gotinên ´pêvjoya çareserîyê´ û hwd jî, dibina maske ji hin politikayên înkarê re. Li vir, divê ku mirov vê yekê biteybetî binxatkê û werênê ser ziman. Li vir, dema ku em ji aliyê rejima tirk ve gotina ´pêvajoya çareserîyê´ dixwênin, em ji di temenê "bêstatû hiştina kurdan" de dixwênin. Lê dema ku em ji aliyê kurdan ve dixwênin, em di temenê "xwestûna kurdan a statû û xweserîya wan de" û her wusa "rakirina qadaxaya li ser zimanê kurdî" de dixwênin. Li vir, ev herdû xwandin, xwandinên ji hevdû cuda na. Di vê temenê de, rejima tirk bo ku kurdan "bêstatû" bihêle têdikoşê û kurd jî bo ku statû û xweserîya ya demokratik bidest bixin û êdî di aramiyê de bi maf û azadîya xwe re pêşketina xwe bijîn têdikoşîn. Bi vê yekê, di aslê xwe de tekoşîn, di temenê statûya kurdan de ya.

Li vir, tişta ku rejima tirk bi xwe bi şerê xwe yê bi kurdan re ku ev 30 salin ne karîya ku bike, ji rêveberîya başûrê kurdistanê dixwezê ku ew bike. Ji rêveberîya başûrê kurdistanê, dixwezê ku li dijî statûya kurdên rojava bê. Ev gotina "dihê gotin ku ""wê berzanî destûrê nedê ku PYD, rêveberîya ku ´facto´ ku li rojava ava bike", di aslê xwe de ne gotina rêveberîya başûrê kurdistanê ya, ev gotin di aslê wê de gotina rejima tirk a. Tirkî jî, dixwezê ku wê gotinê bike malê rêveberîya başûr jî ku rêveberîya başûr jî, bi wê re li dijî statûya kurdan têbikoşê. Rêveberîya başûrê kurdistanê, di rewşeka wusa de ku li dijî statûya kurdên rojava helwestê dide nîşandin, aslê xwe înkar dike. Sedema hebûna xwe înkar dike. Divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê, vê yekê di serî de kifş bike. Rêveberîyek kurd û ankû mirovekî kurdî, çawa dibe, ku dibe ku li dijî statûya kurdan bê.? Ev, bo wê ne ahlaqî ya û û ne mirovî jî ya. Rêveberîya başûrê kurdistanê, bi vê rengî, sedemên hebûna xwe tûna dike û ji holê dirakê. Bi wê re jî, di aslê xwe de, temenê hebûna xwe tûna dike. Ev rewş, dibe, rewşek li dijî rewşa sîyesî û heyînî ya rojavayê kurdistanê jî.

Li dijî statûya kurdên rojavayê kurdistanê helwesta rêveberîya başûrê kurdistanê, qatbûneka dîrokî di nava sîyeseta kurdî de ya li ser navê civate kurd a. Ev qatbûn, bi wê tenê statûya civatî a civate kurd dihê tûnakirin. Civate kurd, bêparastin dihê hiştin. Civate kurd, bi sîyesî bo ku newê parastin, rewşek li ser wê qatbûna sîyesî re dihê afirandin. Dema ku sîyeseta kurd, di nava xwe de bû du-qat, wê hingî nikaribê bi awayekî rêk û pêk, karibê nirxên xwe yên civatî jî biparêzê. Ev rewşa sîyesî ku li ser rêveberîya başşûrê kurdistanê re dihê xwestin ku were pêşxistin, wê tenê bê temenê qayran û alozîya civatî di nava civate kurd de. Her wusa, divê ku em dûbare bibêjin ku ev sîyeset, wê hertimî bê temenê ´birakujiyê´ jî. Ji ber ku ev sîyeset, sîyeseta birakujiyê

ya. Bi wê sîyesetê, dihê xwestin ku rêveberîya başûr li dijî rojavayê kurdistanê û xweserîya wê bê. Bi wê re jî, dijberî êdî bi wê di nava civate kurd de ji beşekê li dijî beşa din dihê pêşxistin. Bi wê re jî, gotinên ku di temenê dijberîyê de werina gotin û bikarhanîn, wê bi dîrokî weyn û rolekê di temenê qatkirin û tûnakirina civate kurd de bileyizin. Li vir, gotin jî, giring in ku li ser wan were sekin in. Ji xwe, sîyeseta kurd, heta roja me jî, bûya temenê qayranên civatî di nava civate kurd de. Ev li başûrê kurdistanê jî, li rojavayê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê jî wusa bûya. Minaq, weke ku li rojavayê kurdistanê, qatbûna sîyesî di nava du meclîsên ku hatina avakirina de hat çêkiirn, li bakûrê kurdistanê jî, weke "kurdên aligirê "PKK´ê û "kurdên, li dijî wê na" hatîya pêşxistin. Bi wê re jî, beşa ku ji xwe re dibêje ku "ez ne aligirê PKK´ê me," ji w dihê xwestin ku gotinê li dijî aliyê din ê ku ji wê re dihê gotin aligirê PKK´ê bi bêje. Bi wê re, ew dijberîya ku dihê afirandin jî, êdî bi wê re civat dihê qatkiirn û ew qatên û ankû beşûn civatî ên dijberî hevdû ku hatina afirandin jî, li dijî hevdû, heta ku dihên dayîn şerkirin. Minaq, bi hezaran kurd, di bin navê "olê" de hatina bi rêxistin kirin û ji wan re hatîya gotin ku "PKK´ê, rêxistinaka kominist a" û êdî "li dijî olê ya" û bi wê re êdî ji wan re hatîya gotin ku "ma winê herin û bi wê "tevgera dij-ol" re gavê biavêjin. BI vî rengî, ol jî, di temenê wê qatkirina civatî de hatîya bikarhanîn. Piştre jî, dewletê, li ser navê xwe ev komên kurd ên olî heta ku li dijî tevgera kurd bi rêxistinkirin û dane şer kirin jî.

Ev rewşê qatkirina sîyesî, nûha jî, di ast û dîmen û wêneyekî din de bi rêveberîya başûrê kurdistanê re dihê xwestin ku were pêşxistin. Bi wê re, ji rêveberîya başûrê kurdistanê dihê xwestin ku sîyesetek dijber di nava rêveberîya başûr û rojava de werê pêşxistin.. Ji xwe, berê di nava tevgera kurd ya bakûrê kurdistanê de û partîyên başûr ên weke PDK´ê û hwd de hatibû pêşxistin. Bi wê re jî, li ser wê re jî, ev partî li dijî tevgera kurd ya bakûrê kurdistanê heta ku hatina dayîn şerkirin jî. Ev, di ancama wê sîyesetê de ya. Î ro, bi rengekî din, ev sîyeset li ser serê kurdan bi destê partîyên kurd û di temenê qatkirina civatî a kurdî de dihên bikarhanîn. Pêşî, ew dijberî dihê afirandin û li ser wê dijberîyê re dikin li dijî hevdû gotinê bibêjin. Piştî ku ew gotin hatina gotin jî, êdî bi wan gotinan ji aliyê hêstîyarî ve şikandin di nava mirovên civatê de li dijî hevdû pêktê. Pişte jî, êdî pêvajoyên li ser wê şiketinê re ku heta ku bikevina dijberî hevdû û bi hevdû re şer jî bikin pêş dikevin di nava kurdan de. Di vê dema dîrokî de, dîsa dihê xwestin ku pêvajoyek nû ya bi vî rengî ya qatkirina civate kurd ku were pêşxistin dihê bi rêvebirin. Bi teybetî, li ser rêveberîya başûrê kurdistanê re hewldanên pêşxistina dijberîya li statûya kurdên rojavayê kurdistanê jî, hinekî di vê temenê de ya.

Li vir, em vê gotinê di temenê pirsîna li rejima tirk de jî bibêjin.Çawa dibe ku rayadarên rejima tirk, bahse pêvajoya çareserîyê dikin û li aliyê din jî dijberîyê li dijî statûya rojavayê kurdistanê dikin.? Li bakûrê kurdistanê, kurd tekoşîna xweserîya demokratîk didin. Dema ku rejim li dijî statûya rojavayê kurdistanê û bidest xistina maf û azadîya xwe ya kurdên rojava bê, wê çaxê, ev dihê wê wateyê ku li dijî ya kurdên bakûrê kurdistanê jî ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî fahm bike. Lê dema ku li dijî statûya kurdên rojava û bakûrê kurdistanê bê, wê çaxê bi çi ahlaqê û mirovatîy bahse ´pêvajoya çareserîyê´ dike? Li vir, dema ku li dijî statûya kurdên herdû qatên kurdistanê bê û piştî wê re gotina ´pêvajoya çareserîyê´ bikarbêne, wê çaxê, divê ku mirov fahmbike ku gotina ´pêvajoya çareserîyê´ weke maske li wê dijberî û dijminatîya xwe ya li dijî statûya kurdan û bi dest xistina mafê wan dihêne ser ziman. Di vê temenê

de, êdî ji rêveberîya başûrê kurdistanê dixwezê ku ew jî tevlî wê poliitkaya wê ya xapandiina kurdan bibe. Li gorî, êdî wê rêveberîya başûrê kurdistanê jî bêje ku "emê piştgirîya xwe bidina pêvajoyê" û rayadarên tirk jî wê bêjin ku "pêvajoya çareserîyê" didomê û heta ku weke li civîna xwe ya li Amedê de wê bibêje gelê amedê, "ku win piştgirîyê bidna pêvajoyê, wê bi serkeve." Yanî bi vê gotina "ku win piştgirîyê bidina ppêvajoyê wê bi serkeve" jî, dixwezê ku bibêje ku ´piştgirîyê bidina politikayên min ên înkarê û bêstatû hiştina civate kurd.´

Pirsgirêka kurd, weke rayadarên tirk dibêjin ne pirsgirêka "terorê" ya. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka maf û azadîya civate kurd a. Pirsgirêka radestkirina mafên gelê kurd ji wan hatîya standin in. Pirsgirêka kurd, ev pirsgirêk a. Divê ku em pirsgirêkê, divê temenê de lê binerin û wê bixwênin û fahm bikin. Pirsgirêka kurd, bi vî rengî, pirsgirêka mafên civate kurd a. Heta ku ew maên civate kurd newina radest kirin jî, wê ew pirsgirêk newê çareserkirin. Kengî, mafên civate kurd ên ku ji wan hatina standin girtin, ku hetian radest in, hingî, em dikarin bêjin ku wê pirsgirêka kurd were çareser kirin.

Li vir, bi gotinekê em vê jî bibêjin ku heta ku bi vê rengî sîyeseta dijberîya statûya kurd ji aliyê rejima tirk ve were meşandin, ew gotin ku tên gotin "rêveberîya başûr a kurd û rejima tirk ´îtîfaq´ên hevdû na" jî ji dereweкê û pê de ne ti tiştekî din in. Îtîfaq, bi rêveberîyekê re ne di temenê têkbirin û tekoşîna li dijî beşên din ên wê civatê dihê çê kirin. Dema ku ´îtîfaq´, li ser wê temenê were çêkiirn, wê ew ´îtîfaq´, bê ´îtîfaqek metingerî´ ku li dijî hebûna wê civatê hatîya çêkirin. Di nava îtîfaqek bi mirovatî de, ti rêveber û ankû rejim, nikarê ji rêveberî û rejimeka din bixwezê ku ew li dijî beşeka civate xwe û maf û azadîya wê û bidestxistina statûya wê bisekinê. Ji xwe, ku ew were xwestin jî, êdî ew nabê îtîfaq, ew dibe ´îtîfaqek´ û ankû ´hevkarîyek´ li dijî giştîya wê civate bixwe jî. Dema ku rejima tirk, di temenê wê gotina ´îtîfaqê´ ku bikardihêne bi rejima xwe û rêveberîya başûrê kurdistanê, ku ji rêveberîya başûrê kurdistanê bixwezê ku ew li dijî tevgera kurdên bakûrê kurdistanê bihelwest bê û ankû li dijî zilma li ser serê wan bêdeng bê û ankû li dijî statûya rojavayê Kurdistanê bikeve dijberîyê û ankû hemû têkiliyên xwe bi wê re bibirrê û ankû li dijî kurdên rojhilatê kurdistanê û piştgirêkên wan xamsar û hwd bê, hingî ew îtîfaq, dibe îtîfaqek di temenê têkbirin û tûnakirina civate kurd de. ..

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li hêtên ku rejima tirk bo ku têkilîya kurdên rojava û bakûrê kurdistanê ji hevdû bibirrê çê dikê jî, wê bibe sedema bertekên mazin di nava kurdan de. Piştî hewldanên rejima tirk a çêkirina van hêtan li başûrê kurdistanê jî, ket rojevê de ku PDK´ê ku partîya kurd ya mazin a başûrê kurdistanê ya, «hendekan» di nava rojava û başûrê kurdistanê de **dikolê**. Di destpêka sadsalê de, piştî ku yekîtîya sovyet ava bû piştre ku ji rojava jî pêşî piştgirî didayê de, tevgera Nazîyan pêşket. Piştre, ev tevger wê bê temenê şerê cihanê ê duyemin. Bi dehan miilyonan mirov hatina qatil kirin di şerê cihanê ê duyemin de. PIştî şerê cihanê duyemin, Nazî têkçûn. Almanya welatê Nazîyan bû. Piştre almanya, di nava yekîtîya sovyet û rojava(ewropa=Emerika) de hat beşkirin. Rojhilata Almanya di bin destê yekîtîya sovyet de ma. Lê rojavayê Almanya jî di destê rojava de ma. Di nava wê de jî, hête hat çêkirin. Ew jî, bi navê "hêtê Berlîn"ê hat naskirin. Piştre bi salan jî li ser wî hêtî hat nîqaş kirin. Piştî ku yekîtîya sovyet xûrîxî û pê de, êdî almanya jî ew hêt ji nava wê hat rakirin û bû yek. Yanî, almanya rojhilat û rojava bû yek. Weke sembola wê yekbûnê jî, xirakirin û ji holê rakirina ´hêtê Berlîn´ê hat ser ziman.

Li Cîhanê, bi vî rengî, gelek rewşên ku bûna hena. Em dikarin bahse pirr hêtên ku di di nav gelan de hatina xîzkirin bikin. Lê hêtê ku di nava welatekî de û xalkekî de hatîna xîzkirin weke ´hêtê Berlîn´ê, bi wê çêkirin û ancamên xwe re bûna malê dîrokê. Di pirtûkên dîrokê de, pirr jî bahse wan dihê kirin. Li Almanya jî, herêm ji navê ve hatibûn qatkirin bi hêtê Berlîn´ê.

Nûha li "rojava ´şerîa´" jî bahse hêtekî ku Îsraîl çêkirî dihê kirin. Heta roja me jî, ev hêt jî, biqasî hêtê Berlîn´ê dihê nîqaş kirin. Hêtê ku îsralê ava kirî, weke hêtekî ku di nava gelan de hatî çêkirin bahs jê dihê kirin. ´Hêtê Berlîn´ê jî weke hêtekî ku di nava gelekî de hatî çêkirin û ew hatî qatkirin hat şîrove kirin.

Ji xwe em bahse "hêtê Çînê´ nekin. Ew hêt jî, ji ber ku hêrîşên ku ji derve li Çînê dibûn, bo ku xwe biparêzên çînîyan û ´împarator´ên wan çêkirin. Ev hêt, hêtên ku pirr zêde hê jî ji wan bahs dihên kirin in.

Li kurdistanê jî, nûha dewleta tirk, hewl dide ku hêtekî bi vî rengî di nava kurdan bixwe de bide çêkirin. Kurdistan, di konfaranse Lozanê de hat kirin qat li çar-qatan. Qatek(rojhilatê kurdistanê), di nava sînorê Îranê de hat hiştin. Qatek(başûrê kurdistanê), di nava sînorê Îraqe di wê konfaranse de biryara avakirina wê hat dayin û hat avakirin de hat hiştin. Qatek(bakûrê kurdistanê), di nava sînorê tirkiye de ku ew jî weke îraqê, ava kirina wê di wê demê de hat kirin de hat hiştin. Qatek(rojavayê kurdistanê) jî, di nava sînorê dewletî Sûrî ku piştî konfaranse Lozanê, ku di paxte Sadabadê de biryare avakirina wê hat dayin û ew hat ava kirin de hat hiştin. PIştî ku ev dewlet hatina ava kirin jî, jîyane kurdan hat qat kirin. Di aslê xwe de, ne tenê hêtek weke ´hêtê Berlîn´ê di nava kurdan de hatiya ava kirin. Gelek hêt, hatina ava kirin. Ji her aliyê ve jiyane wan ya civatî hatîya qat kirin**.**

Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê şoreşek kirin û rêveberîya xwe y xweser bidestê xwe bidest avakirinê kirin û pêde, hêrîşên komên çete ku piştgirîya tirkiya ji wan re hebû zêde bûn. PIştî ku bi wan hêrîşan ancam ne girtin, piştre êdî li ser kurdên rojavayê kurdistanê, ´ambergo´yek ku heta roja me jî didomê dan çê kirin. Ew ambargo, hê jî, didomê. Î ro jî, dewleta tirk, dixwezê ku hêtekê weke hêtê berlînê di nava kurdên bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê de bide çê kirin. Kurdan jî, piştî ku ew bihîstin, bertekên xwe dan nîşandin û gotin "hêtê şermê". Ev gotin pirr rast a.

Li vir, divê ku em vê jî bibêjin, her mirovê ku piçekî jî mirovatî bi wî re hebe, ku hewce nakê ku kurd jî bê, ku mirov bê bes a, divê ku vê herê nekê û li dijî wê hêtê şermê ku di nava jîyane kurdan de dihê ava kirin bertekê bidina nîşandin. Ji xwe, dema ku sînor hatina xîzkirin, xate trenê di kûderê ve diçû, ewder kirina sînorê di nava kurdan de. Li ser wê re, wekî ku ew ne bes bê, nûha jî, dirabin û dibêjin ku wê hêt ava kirin. Ava kirina jî. Li herêma serêkahnîyê li çend deveran ava kirina jî. Dibêjin ku dixwezin ku li Nisêbînê jî ava bikin. Nisêbîn û qamîşlo dikevina dahma hevdû de. Weke ku çawa ku xizmên nisêbînîyan li qamişlo û lî Afrînê hena, her wusa, xizmên afrînîyan ên malbatî jî li Nisêbînê û hin deverên din ên li dora wê hena. BI heman rengî, li Serêkahnîyê jî, xizmên herdû aliyan li hevdû hena. Ji xwe, bajarê kurd serêkahniyê bixwe hatîya qatkirin(perçekirin). Xate trenê di nava bajarê serêkahniyê de dibuhurê. Qat û ankû beşa bajarê şerêkehniyê ya ku li aliyê tirkiya maya, tirkan navê wê guharandin û kirina "ceylanpinar". Aliyê ku di nava sînorê Sûrî de jî ma, jê re hat gotin "resûlayn". Navê ´ceylanpinarê´ navê aliyê bajarê serêkahniyê ya. `Resûlayn´ jî,navê aliyê din a. Bajarek hatîya qatkirin û bi vî rengî nav lê hatîya kirin. Nûha jî, ew qatkirin

û ankû ´perçekirina´ ku kirina, dixwezin ku hêtekî lê zêde bikin ku bi tememî têkiliyan kurdên herdû aliyan ji hevdû were birrîn.

Ew hewldanên birrîna têkiliya kurdan, ne nû ya. Ev, pirr kevn a. Biryare birrîna têkiliya kurdan ji hevdû, hê di ´paxta Sadabadê´ de hatibû girtin. Piştre jî, ev biryar, çend ku rejim guharîn û hatinûçûn jî, ew biryar neguharî. Ew biryar, bo rejimên ku pişte hatina avakirin jî weke biryarekê ma. Yanî, biryarên ku li ser kurdan hatibûbûna girtin, ku rejim jî bihatan guharîn jî, wê ew weke xwe maban û wê bihatan parastin. Berî avakirina ´komare îslemê ya Îranê´ paxte Sadabadê hat li darxistin û biryare birrîna têkiliyên kurdan hatibû girtin. Ew rejima ku ev biryar li Îranê bi wê re hatibû girtin, ew hat xirakirin û ji holê rakirin û li cihê wê ´komare îslemî ya Îranê´ hat ava kirin. Lê biryarên bi vî rengî, ên weke "birrîna têkiliya kurdan ji hevdû", ew rejima ku bi destê rejima Îranê ya nû ya îslamî hat xirakirin hatibû girtin. Lê rejima nû ya Îranê jî, ew biryar ji xwe re weke biryar esas hilda. Di destûra xwe jî, d wê temenê de çêkir û bigîyan kir**.**

Komkujiyên ku di dîroka kurdan de bûna, komkujiyîn weke "komkujiya Qerqeliyê", "komkujiya Roboskî" û hwd, di ancama wan biryaran de hatina kirin in. Sibe jî, hêtê şermê ê ku tirkiya ava kirîya, ew çend canê ciwanên kurd û ankû bigiştî kurdan hiilde, emê wê jî bi hevdû re bibînin. Hêtê ku dewleta tirk, di nava kurdan de di nava rojavayê kurdistanê û bakûrê kurdistanê de çê dike, ev hêt, ancama zihniyeta wê ya. Ya rastî, ev jî dide nîşandin ku ne xwediyê ti politikayên çareserîyê ya. Carek din, em wê hêtê dewleta tirk di nava di nava kurdên bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê de ava bike û têkiliya wan ji hevdû bibirrê û ku kurdan weke ´hêtê şermê´ û ankû ´hêtê Berlînê´ jî bi nav kir û wê şermazar dikin.

-

Her wusa li Nisêbêne, şaradare nisêbînê Ayşe gokhan, li ber sînor bidest rojîya mirinê kir. Ayşe gokhan, li ber sînorê, li cihê ku dewleta tirk dixwezê lê diwarê şermê çê bike, li wir di nava ´mayînan´ de rûniştîya girêvê dike. Li vir, divê ku li ber sînor, ji serî heta serîyê din, divê ku xelake ji mirovan were çêkirin. Ayşe gokhan, li dora wê bi hezaran ciwan û jin û mêrên kurd, divê ku bi wê re rûnihin û girêvê mazin bikin. Ev yek, bo rûmetê ya. Li wir, ew diwarê şermê ku dewlet tirk dixwezê ku di nava kurdên bakûrê kurdistanê û ên rojavayê kurdistanê de çê bike, bi wê dixwezê ku jîyane kurda bike qat. Kurd, wê ti carî derfetê nedina wê yekê.

Diwarê şermê, armanca wê ew a ku têkilîya hemû kurdan bibirrê. Bi wê re jî, bi tememî, armanca bi wî diwarî, ew a ku jîyane kurdan were qatkirin. Î ro jî, hewldane wê didin. Bi teybetî, piştî ku kurdên rojavayê kurdistanê bi tekoşîna xwe re bi ber statûyê çûn, êdî ew hewldanên tirkiya ên bi dayîna kom çete li wir hêrîşkirinê bû û çêkirina ´diwarê şermê´ ket rojevê de. Heta roja me, ew herêmên ku Ayşe gokhan lê rûniştîya jî di nav de, hemû hatina mayînkirin. BI wê mayînkirinê, xwestin ku têkilîya kurdan ji hevdû qût bikin. Bi teybetî, ez vê yekê bibêjim ku ji Nisêbînê, Cizîrê û ji herêm û gûndên ji dora wê, her mirovê herî kêm xizmekî wan li aliyê din ê sînor ku kurd bi navê "binxat"ê bi nav dikin lê hena. Kurdên bakûrê kurdistanê ji aliyê rojavayê kurdistanê re dibêjin "binxat". Lê kurdên rojavayê kurdistanê û bakûrî jî, ji bakûrê kurdistanê re gotina "serxatê" bikardihênin.

Di sale 1923´an de, sînor di nava malbatan de hatina çêkirin. Malbat,, hatina qatkirin. Li herêmê, bi teybetî, mirovên nisêbînî û Cizîrî ku xizmekî wan ku li aliyê

rojavayê kurdistanê qamîşlo û afrînê nebê tûna ya. Ez bixwe jî, weke nivîskarê van rêzan, ji herêma Cizîrê me û gundê me nêzîkî nisêbinê ya. Li Nisêbînê jî, bi sadan xizmên malbatî ên min hena. Her wusa, bi heman rengî divê ku ez bibêjim ku bi sadan bi dehan malbatên xizmên min bixwe jî, ji aliyê din ên ´binxatê´ mana. Ev xizmên ku ez bahse wan dikim ku sînor di nava wan de hatîya xîzkirin ku hinek li aliyê Nisêbînê û Cizîrê û li dora wê mana, hinek ji wan jî li aliyê din ê sînor li herêma qamîşlo û afrînê mana. Têkilîya wan ya malbatî jî, qût nebû. Piştî ku sînor jî, di nava wan de hat çêkirin de jî, hertimî hem xizmên aliyê binxatê yanî li rojavayê kurdistanê mana jî dihatina zîyereta xizmên xwe yên li aliyê bakûrê kurdistanê. BI heman rengî, malbatîyên li aliyê nisêbîn, Cizîrê û li dora wê mana jî, hertimî ji wî sînorê ku di nava wan de hatibû kişandin di buhurîîn û diçûna aliyê din ê sînor yanî diçûna qamişlo, afrîn û hwd, li wir xizmên xwe didîtin.

Bi vî rengî, ne tenê malbate min bixwe, gelek malbatên din ên kurd jî bi heman rengî lli herêmê hatina qatkirin(perçekirin). Nîvê malbatê li wî aliyê sînor mana. Nîvêyê din jî, li vî aliyê sînor mana. Yanî, malbat, hatina qatkirin. BI heman rengî, li hemû herêmên kurdistanê, ew qatkirin bûya. Minaq, malbatên li herêmên kurdistanê ên serêkahnîya ku li aliyê tirkiya mana û xizmên wan li aliyê din ê sînor yanî li binxatê mana, dihatina ber têlên sînor û weke ku di zindanekê de bin bi hevdû re hevdîtin dikirin û li ser têlan re ji hevdû re dîyarî û hwd, dişandin. Ev rewşa ku li serêkahnîyê bû, bi dehan caran di çapameniyê de jî cihgirt.

Di wan demên berê de, herêmên ber sînor, bi dehan ji wan hatibûbûna mayînkirin. Di dema ku malbat diçûna serdana xizmên xwe yên malbatî ên li aliyê din ên ku hena, di nava wan sînorên mayînkirî de dibuhurtin. Gelek ji wan jî, di nava wan herêmên mayînkirî de jîyane xwe ji dest didan. Dema ku jîyane xwe ji dest didan, ji wan re di çapameniyê de dihat gotin ku "ew kaçakçî na." Lê ev gotin, dibû weke ´qamûflafekê´ û ankû ser nûxûmandinekê ji wê qatkirina malbatan re. Li ser wê gotina "kaçakçî", gelek film jî hatina çê kirin. Ev film hamû jî, çend ku rastiyekê bi wê kişandina sînor di nava malbatan de ku wê dide nîşandin re dihêne ser ziman jî, lê ji aliyê din ve, ew filmên li ser "kaçakçîyan" bûna alîkar ji wê politikaya dewletê re jî. Ji ber ku ew miirov, weke ´kaçakçî´ hatina dayîn nîşandin û bi wî rengî, mirovan jî ên ku ew film, tamaşa kirina, di serê wan de cih girtina.

Di temenê tefsîrkirin û salixkirina wê gotina ´kaçakçîtîyê´ de jî, salixkirin hatîya kirin ku ên ku ´dervî destûrê ku diçê û tê di sînor de û tişt û malên ´kaçak´ bi xwe re dihênin û difiroşin". Lê ev salixkirin û hanîna ser ziman jî, bi serê xwe pirsgirêk a. Ji aliyê civaknasîya herêmê û wê rewşa herêmê ku dûr tê şîrove kirin, wê çaxê, di temenê hinek "sucdaran" de bahs dihê kirin. Lê ev ne rast a. Ew mirovên ku di buhurin û diçina aliyê din ê sînor û divegerihin, xizmên wan ên malbatî hena. Ew malbatin û têkiliya wan ya malbatî nayê birrîn. JI xwe, libendêbûna birrînê wê têkiliyê jî, ne rast û di cih de ya.

Nûha jî, dihê xwestin ku li wê mayinkirina herêmê û kişandina têlan û hwd, diwarê şermê lê zêde bikin. Yanî, herêmên kurdan, li wan bikina herêmna ku ji wan re zindan in. KU diwarê şermê, hat çê kirin, ji xwe wê wate jî ev bê..

Li herêmê, mirovên ku berteka li wî diwarê şermê didina nîşandin, ne tenê ji ber ku li dijî wî diwarî na. Bêgûman li dijî wîî diwarê şermê na. Lê aliyê din jî ku ji bo wan pirr giring a heya. Ew jî, ew a ku her malabetek kurd ê li vî aliyê sînor li bakûr, li wî aliyê din xizmên wan ên malbatê hena. Naxwezin ku têkiliya xwe ji hevdû qût

bikin.. Dewletê û rayadarên wê, berê, pirr zor dane malbatan ku têkiliya xwe qût bikin. Lê wan ev nekirîya. Ji ber ku ew malbatên hevdû na. Xizmên hevdû. Tenê,, mirovên ku ji civatekê na. Ji wê zêdetir, xizmên hevdû na. Ew diwarê şermê, di nava malbatan de dihê kişandin. MInaq, ez bixwe li ser navê xwe bibêjin, çend ku li dora nisêbînê ji em bijîn bi malbatî, lê dîsa li aliyê din ê sînor lli qamîşlo, afrînê û hwd,, xizmên me yên malbatî jî hena.

Ev rewş, ne tenê bi malbatekê re na. Bi hemû malbatan re wusa ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Vêca malbatên Cizîrî û nisêbînî, biaşîrî bê û ankû bi awayekî din ê weke wê bê, mazinbûna wan pirr heya. Di vê temenê de, çend malbat li vir bicih bûn. Çend jî, li wir bicih bûna. Yanî, li herêmê, çend ku bi malbatî, hinek bi hevdû re jî bin, lê dîsan li herêmê xwe belavkirina. BI awayekî din jî, li cihê ku çûnê de jî, ne weke çûyina welatekî din, weke çûyina êi cem û nêzîkî hin xizmên xwe bicihbûnê çûna. Ev rewş, weke rewşeka civaknasî ya di nava civate kurd de. Î ro jî, dema ku malbatek, li deverkê, çend nasên wê ên bixizmî nebin, wê neçin û li wir bicih nebin.

Ev yek, ji bo kurdên rojava jî û bo kurdên bakûrê kurdistanê wusa ya. Her wusa, divê ku em bo kurdên başûr û rojhilat jî heman rewşê bênina ser ziman. Sînor, di nava malbatan de hatîya kişandin. Malbat hatina qatkirin. Bi teybetî, rojava û bakûrê kurdistanê, ev rewş bo wan bêhtirî û zêdetirî di buhurê. Ji ber ku ev herdû herêmên kurdan, beê yekbûn. Yanî, piştî sînor, di nava wan de hat kişandin, pirr ji wan re zor bû û ew kişandina sînor bû sedema pirr pirsgirêkên civatî di nava wan malbatan de jî. Ew pirsgirêk, piştre pirr zêde jî hatina ditin. Heta ku, ew filmên ku di wan de bahse "kaçakçîyan" hatîya kirin, bi jîyane van mirovan re bahs hatîya kirin. Di aslê xwe de, ew filmên ku bi gotina ´kaçakçî´tiyê hatina çêkiirn, divê ku mirov wan weke haqareteka mazin li civate kurd bihasibêne. BI wan filman, jîyane kurdan, hatîya piçûkxistin. Di wê temenê de bûyina kaçakçîtiyê jî, ku weke sedema wê dihê dayin nîşandin "nezanî" û ankû "xizanî" jî, ne rast û ne di cih de na. Ev gotin, ti carî, rastiyê nayênina ser ziman.

Ev gotin, tenê, xizmetî vajîî û berevaj nîşandina rastiyê dikin. Yanî, bi gotinaka din, ev gotin ser rastiyê di nûxûmênin. Ev gotin, pêşîya dîtina rastiyê bi çavn rût digrin. Di vê temenê de, di aslê xwe de, ew film bixwe jî, di nava civate kurd de, bûna sedema qayranên civaknasî, derûnî û her wusa gelek pirsgirêkên din jî. Divê ku em vê rastiyê baş fahm bikin. Dema ku em van filman, bi civaknasiya civatî ya mirovên herêmên re şîrove bikin, emê bibînin ku temenê pirr pirsgirêkên mazin ên civatî jî na. Em nikarin bêjin ku tenê çareserîyeka civatî jî di wan filman de tûna na. Hemû, rastîyê vajî dikin û didina nîşandin. Bi gotinaka din,, ew film, zihniyeta dewletê ya piçûkxistin û bi wê piçûkxistinê re xwe mazin dane nîşandin û serdest kirinê didin nîşandin.

Bi wan filman, hebûna wan sînoran, hat xwestin ku di serê mirovan de bidina ´meşrû´ kirin. Dankirin jî. Ew sînor,, di serê mirovan de bi wan filman û gotina "kaçakçî" ya di wan filman de dihat ser ziman re dan rûniştandin. Bi vê yekê re, zihniyetek hat pêşxistin û afirandin. Î ro jî, li ser wê zihniyetê re bi kurdan re şer dikin û hewldanên têkbirina civatî ya kurd pêş dixin. Li kurdistanê, sînorên ku hatina meşandin, bi vî rengî, di aslê xwe jî bi wan filman bertekên ku wê di destpêkê de li ber wan bihata dayîn hatina şikandin. Yanî, wan filman xizmeteka bi vî rengî jî kirîya ji dewlet re li dijî civate kurd û qatkirina wê**.**

Î ro jî, dixwezin ku wî sînorî bi diwarê şermê bidomênin. Gotinên wê demê ên di

temenê dayina meşrûkirna wan sînoran de ku hatina gotin ên weke "kaçakçî" hwd, di roja me de bi rengê gotinên weke ên "ewlakariyê" û hwd derdikevina li ber me. Di vê temenê de jî, heya ku di demên pêş de çend filman bidina çêkirin. Ev, wê bi wê bê xwestin ku berxwedane civatî bê dayîn şikandin bê.

Li kurdistanê, ew sînor, hertimî, bûna pirsgirêk, di nava civate kurd de. Ji ber ku ew sînor, di nava du civatan de ne hatina kişandin Di nava hundurê civatekê dde di temenê qatkirna wê de hatina kişandin. Yanî, dema ku sînor, hatina kişandin, beşe ji wê civatê li aliyekî sînor maya û beşe jî li aliyê din ê sînor maya. Minaq, î ro, ku em tenê sînor ku di nava bakûr û rojavayê kurdistanê bihasibênin, emê bibînin mirovên li wî aliyê sînor jî kurd in û miirovên li vî aliyê mana jî kurd in. Ji wê zêdetir jî, malbat hatina qatkirin. Sînor, di nava malbatan de hatîya kişandin. MInaq, bajarên kurdistnê ên weke ´serêkahniyê sînor di nava wê de hatîya kişandin, Aliyê bajarê serêkahniyê ku li aliyê tirkiya maya, navê wê hatîya guharandin û kirina "ceylanpinar" û aliyê ku li aliyê din ê sînor maya jî, dîsa navê wê hatîya guharandin û jê re "rasulayn" hatîya gotin. Ev tenê, rewşa bajarekî kurdan a. Weke vê, gelek rewşên din jî hena.

Minaq, Nisêbîn û qamişlo, weke du navçeyên bajarekî kurdistanê na. Lê sînor nava wan de hatîya kişandin. Mirovên ku li qamişlo jî dijîn û ên li Nisêbînê jî dijîn, ne tenê ji civatekê na, her wusa xizmên hevdû ên malbatî jî na.

Î ro jî, ew sînorê ku di nava malbatan de hatîya kişandin, bi diwarê şermê, dihê xwestin ku bilindtir bê kirin. Li ber wê jî, kurdan, li her deverê li qada na. Bertekên xwe didina nîşandin. Li Nisêbînê, î ro, di vê roja min ev nivîs dinivîsand de, kurdan xwepêşandin bi armanca şermazarkiirna wî diwarê şermê li dar dixstin. Ayşe Gokhan, ku şaradara Nisîbînê ya, li ber xate sînor ku li wir dihê xwestin ku diwarê şermê were li darxistin bi dest girêve birçîbûnê kirîya. Divê ku ti kurdên bi rûmet, wê jina kurd li wir bi tenê nehêlin û bi hezaran mirov, divê ku dayimî li wir li cem wê bin. Ev yek, weke berpirsyarîyeka civat, ahlaqî û mirovî ya. Li ber sînor, ji serî haya serîyê din, divê ku xalaka mirovan were çêkiirn û ew bi rojan were domandin. Di vê demê de, hemû kurdên bakûrê kurdistanê, divê bi herikina herêmên serêkahniyê û nisêbînê. Divê ku li wan deran, bimênin û heta ku ew diwarê şermê were xûrixandin, ew ji tekoşîna xwe ya demokratîk bi şûn ve gav neavêjin. Em gotina xwe, bi gotina serokê gelê kurd ya bo Nisêbînê bi dawî bikin. Serokê gelê kurd birêz Ocalan bo Nisêbînê gotibû ku "Nisêbîn, gûla welêt a." Li gûla xwe xwedî derkevin.

**Pêvajoya duyem ya herîşên li ser şoreşa rojava, piştî konferanse Cenevê a duyem bû. Ji vê demê û pê de, pêl bi pêl dest bi hêrîşan li rojavayê kurdistanê û civate kurd kirin.**

Konfaranse Cenevê a duyemin, hewldanên bêstatû hiştina kurdan û şerê ku li dijî hebûna kurdan tê dayîn û meşandin: Konfaranse Cenevê a duyemin, di 22´ê û pê de tê li darxistin. Çend ku hêzên ku tevlî dibin jî, li ser berjewendiyên xwe re diaxifin. Hêzên li herêmê ên ku sîyeseta wan heya jî, divê civînê de li wê digerihin ku wê çawa rewşa xwe xort bikin. Herkesek hatîya dewetkirin li konfaranse. Lê kurd ne hatina dewetkirin. Di vê temenê de, weke ku di rayagiştî a kurd de jî tê gotin, tê xwestin ku "lozane duyemin" were seê kurdan. BI vê rengê di temenê înkar û dîjberîya kurdan de bi ancam û bidawîkirina konfaranse Cenevê, wê weke ku piştî konfaranse Lozanê bû, wê dîsa komkujiyan, kuştina ji kurdan re bi xwe re bêne. Ji nûha de, bangên hişyarîyê ji nava kurdan tên ku heya ku "koman bi rêxistin û bi çek bikin û bidina hêrîşkirin li ser serê kurdan." "Heya ku hêrîşî rêveberî û sîyesetmederên werina kirin". "Piştî denezendina kantonên rojavayê kurdistanê, weke ku çawa sîyesetmederên kurd ên weke Îsa Hiso bi sûîkast´î kuştin, heya ku bi heman rengî, rêveberîyên din ên kurd werina qatil kirin. Ev hişyarî, ne tenê bo kurdên rojava û rêveberî û sîyesetmederên wê tê kirin, her wusa bo kurd û sîyesetmeder û rêveberên kurd ên beşên din ên kurdistanê jî dihê kirin. Ji xwe, ku Konfaranse Cenevê di vê temenê ku weke di temenê înkare kurdan de dimeşê ku bimeşê, piştî wê re divê ku em li bendî komkujiyên nû ên ku werina serê kurdan û sûîkastên nû ên ku werina serê rêveber û sîyesetmederên kurd. Wê weke ancamna xweza ên ancama konfaranse Cenevê bin. Ji ber vê yekê, me jî, ev mijare Cenevê, xwest ku hûr û kûr hildina li dest û li ser bisekin in. Ji xwe, hê ku konfaranse Cenevê bi dawî nebûya jî, ´narayên şer´ li dijî kurdan dihên avêtin. Provakasyonên ku bi wan temenê komkujiyên ku werênina serê kurdan diafirênin.

Di dema ku konfaranse Cenevê destpêkir, çend kurdên bêrûmet û xayîn kirina nava "muxalaefeta Sûrî ku hebûna civate kurd û navê kurdan jî nasnekê û birina wê konfaranse ku bibêjin "ev, li ser navê kurdan hatina." Ev, lîstikên qirêj ên ku li ser pêşaroja kurdan dihên leyistin in. Bo vê yekê, bi wê konfaranse Cenevê re li ser wê ´înkare kurd´ û ´hewldanên bêstatû hiştina kurdan´, divê ku em bisekin in.

Pirsgirêka Sûrî, bi vî rengî, divê ku em bibêjin ku bûya pirsgirêkek navnetewî. Hêzên ku hatina vaqandin ser 30 welatî re na. Hêzên ku eleqeder û ne eleqeder hatina vaqandin û dewet kirin. Lê kurd, weke hêzek di nava wan sînorê Sûrî de dijîn û xwediyê hêzekê jî na, heta nûha ne hatina vaqandin û ne hatina dewet kirin. Kurd, tevî ku aliyekî pirsgirêkê jî diafirênin û pirsgirêk, pirsgirêka wan jî ya, kurd ne hatina dewet kirin. Hêzên ku konfaransê Cenev´ê a duyem li dardixin, naxwezin ku pirsgirka kurd di konfaranse cenev´ê a duyemin de were ser ziman. Bo vê yekê, dema ku bi kurdan re hevdîtinê dikin, dibêjin ku "nûha, pirsgirêka kurd, newênina ser ziman, piştre bila were ser ziman." Bi vî rengî, dixwezin ku kurdan û pirsgirêka wan ji rojeve cenev´ê dûr bikin. Ev hewldanên ne hiştina hatina rojevê a pirsgirêka kurd di konfaranse cenevê de, tenê xizmetî domandina şerê dewletên herêmê ên bi kurdan re dike. Tenê, xizmetî domandina pirsgirêkê li pêşarojê dike.

Li tirkiya, çend ku kurdan pêvajoyek daye destpêkirin bo çareserkirina pirsgirêka kurd jî, dewleta tirk heta vê kêlîke ti gav neavêtina. Pirsgirêk, hê bi rengê înkare statûya kurdan didomê. Bi vir ve girêdayî divê ku em vê jî bibêjin ku piştî ku hêzên kurd li bakûrê kurdistanê bi rejima tirk re ket rewşeka agirbestê de, rejima tirk jî şer ne sekinand û şer barî rojevayê kurdistanê kir. Piştgirî da çeteyan û li ser çeteyan re ew şerê bi kurdên rojava re domand.

Piştî konfaranse Lozanê re, dîsa weke ku di vê demê de ku dixwezi ku bikin, kurd dervî wê konfaranse wê demê jî hiştin. Piştre jî, çi biryar girtin, bo ku wan bi kurdan bidina herêkirin, çûna bi ser kurdan de. Bi wê re, êdî şerê dayina herêkirina a biryarên konfaranse Lozanê bi kurdan re dest pê kir. Di ancama wan şerên ku bi kurdan re kirin, bi sad hezaran kurd hatina qatil kirin. Komkujiyên mazin bi kurdan dane jîn kirin. Di konfaranse Lozanê de, statûya kurdan ne hatibû ditin û herêkirin, bo vê yekê jî kurd bêstatû hatibûbûna hiştin. Piştre jî, wê çawa wê ´bêstatû´tiyê bi kurdan bidina herêkirin, bi kurda re ketina şerê wê de. Hemû komkujiyên piştî konfaranse Lozanê, divê ku em bi vî rengî jî wan şîrove bikin. Divê ku em weke komkujiyên ku di ancama zihniyeta konfaranse lozanê de ku hatina û bûna û hatina serê kurdan herê bikin û bênina ser ziman.

Ku kurd, di vê konfaranse Cenev´ê a duyemin de bi heyeteka ku li ser navê kurdan tevlî nebin, wê dîsa pêvajoyak bi vî rengî destpê bike bo kurdan. Bo ku mirov vê yekê kifş bibe û bibîne hewce nakê ku mirov zêde bizanebûn jî bê. Sibe, ku konfaranse Cenev´ a duyemin hat li darxistin û piştî wê re ku hêrîş lli kurdan bûn divê ku em van hêrîşan weke hêrîşên zihniyeta konfaranse Cenev´ê bi nav bikin. Ji wê, wê wusa jî bê. Di konfaransek weke konfaranse Cenev´ê a duyemin de, dema ku kurd newina vaqandin û newina dewet kirin, wê çaxê piştre ku çi biryar hatina girtin, wê kurdan jî girênedin. Wê, biryar di temenê înkare kurdan de bin. Wê di temenê "bêstatû" hiştina kurdan de bin. Piştre jî, wan biryarên di temenê bêstatû hiştina kurdan de ku di wê konfaranse Cenev´ê a duyemin de girtina bo ku bi kurda bidina herêkirin, wê herina bi ser kurdan de. HIngî, wê şerê zihniyeta konfaranse Cenev´ê a duyemin bi kurdan re wê destpê bike. Piştî li darxistina konfaranse Cenev´ê a yekemin û pê de, bahse kurdan hat kirin. Heta ku, hat gotin ku "divê ku kurd, tevlî konfaranse cenev´ê a duyemin bibin". Lê piştre çi bû, ku kurd êdî dervî dihên hiştin`? Hinekî jî, divê ku mirov li ser vê jî serî bi wastêne.

Kurd, li rojhilat, ser 40 milyonî re na. Lê bêstatû na.Maf û azadîya wan ji destê wan hatîya girtin. Ev jî, di konfaranse Lozanê de hat kirin. BI zihniyeta konfaranse Lozanê, statûqûya ku li herêmê hat afirandin û pêşxistin, kurd bi nav û statûya xwe di wê de nebûn. Bi vê yekê jî, şerê wê bi deh salan bi kurdan re bû. Di aslê xwe de, ji komkujiya geliyê zîla, komkujiya dersimê, komkujiya helepçe, komkujiya roboskî û hwd bigra ku hemû komkujiyên din jî di nav de, komkujiyên ku wê zihniyeta konfaranse Lozanê li ser serê kurdan kiriya na. Zihniyeta Lozanê, 80 salî, ji kurdan xwûn hanî. Nûha jî, dihê xwestin ku piştî konfaranse Lozanê re, dîsa heman pêvajoyan bi kurdan re bidina domandin. Li herêmê, ev zihniyeta di temenê bêstatû hiştina gelên herêmê de dihê pêşxistin, di temenê hemû komkujiyên li herêmê ku di dibin de jî ya.

Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku wê piştî konfaranse Cenev´ê a duyemin, vê şerê ziniyeta wê bi kurdan re bidina domandin. Ew statûqûya ku ziniyeta wê di konfaranse Cenev´ê de hat dîyarkirin, wê hewl bê dayîn ku bi kurdan bidina herê kirin. Wê şerê bi kurdan re êdî bikin. Kurd jî, weke ku çawa ku ji zihniyeta konfaranse Lozanê ku statûya kurdan tûna hasiband re gotin ´na´, wê zihniyeta konfaranse Cenev´ê a duyemin ku di temenê zihniyeta lozanê de û bi teybetî jî di temenê bêstatû hiştina kurdan de pêşbikeve re wê bêjin na. Piştî wê re jî, weke ku çawa ku piştî konfaranse Lozanê, şerê wê zihniyeta konfaranse Lozanê bi kurdan re kirin, wê piştî vê konfaranse Cenev´ê a duyemin ku di temenê înkare kurdan de weke ya demên buhurî pêş bikeve

êdî wê şerê wê zihniyetê bi kurdan re bidin. Her zihniyeta ku di wê de, înkar û ne naskirin hebê, ew zihniyet kujar a. Wê, ew zihniyet, hertimî xwûnê birijêne. Weke ku çawa ku zihniyeta konfaranse Lozanê rijand. KOnfaranse Cenev´ê a duyemin, hê du roj ji li darxistina wê re mana. Lê ji nûha de, ku kurd newina weke heyetekê newin dewet kirin û hebûna wan û statûya wan newê naskirin, divê ku mirov li bendê bê ku wê şerê wê zihniyeta wê jî bi kurdan re êdî dest pê bike.

Weke aliyekî din ê teybet jî, divê ku mirov bibêje ku tirkiya bo ku kurd dervî konfaranse Cenevê a duyemin werina hiştin, dîplomasîyeka mazin dide nîşandin. Ev dîplomasîya wê ya bo dervî hiştina kurdan, dide nîşandin ku çiqasî di pêvajoya ku kurdan di daye destpêkirin a li bakûrê kurdistanê de jî jidil a. Rejimek, bo ku kurdên dervî sînorên wê jî, nebina xwediyê statûyê ku di nava hewldanê û xabatê de bê, çiqasî dikarê bêje ku jidil a bo kurdên di nava sînorê xwe de.? Konfaranse Cenev´ê a duyemin, ku kurd dervî wê werina hiştin, wê mirî bê. Wê ti biryarên wê bo kurdan ne buhur in. Wê ti cidîyeta wê bo kurdan tûna bê. Divê ku ev yek, were zanîn. Di rewşeka weha de, wê kurd, bêhtirî werina xwe wê tekoşîna xwe ya maf û azadîyê maztir bikin. Divê ku ev jî were ditin.

Weke ku di dema li darxistina konfaranse lozanê de kirin ku çend kurdên ti cidîyeta wan di nava kurdan de tûneyî birina konfaranse û bi devê wan didane gotin ku bibêjin ku "em kurd in û li ser navê kurdan li vir in." Di vê demê de, heman lîstik û hewldane xapandinê heya. Dîsa, kurdek kirina nava muxalefeta sûrî de ku di konfaranse Cenev´ê de bêje ku "ez kurd im û li ser navê kurdan li vir im." Lê ti cidîyeta wê jî bo kurdan tûna ya. Kurd jî, ev herê herê nekirina. Ji nûha de, weke ku çawa di dena konfarane Lozanê de kirin û bi devê kurdên ku biribûbûna konfaranse Lozanê gotin didane gotin, di vê demê de, bi devê kurdên ku kirina nava muxalefeta Sûrî ku weke "makyaj" û ku bibina konfaranse Cenev´ê a duyemin, didina gotin ku "pêşî pirsgirêka Sûrî, emê werênina ser ziman, û piştre jî emê pirsgirêka kurd werênina ser ziman û nîqaş bikin." Lê ev gotin hemû jî, bo xapandina rayagiştî na. Di serî de, divê ku em vê yekê kifş bikin û werênina ser ziman.

Divê ku em vê yekê jî bibêjin ku ew kurdên ku weke ´makyaj´ jî ku kirina nava ´muxalefeta Sûrî´ de jî, wê ji komkujiyên ku piştî wê konfaranse werênina serê kurdan wê berpirsîyar bin. Divê ku em vê yekê jî bibêjin. Wê ew jî, di nava rûpelên dîrokê de werina mahkum kirin ji aliyê kurdan ve weke ku çawa ku ên ku biribûbûna konfaranseê Lozanê ku hatina mahkum kirin. ..

Tirkiya di 21´ê Mehê de, yanî rojekê berî li darxistina konfaranse Cenev´ê de serokwezirê xwe T. Ardogan dişêne Birûkselê. Di vê demê de, T. Ardogan kirina rola îsmet Înonû´yê ku serkêşîya heyete ku çûbû konfaranse Lozanê dikir. T. Ardogan, bo dîplomasîya xwe ya li dijî kurdan diçê wir. Piştî vê gera T. Ardogan a li Birûkselê, gera T. Ardogan a li Îranê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest. Li wir, heta kêlîka dawî wê li wir di van mijaran de bi hevdû re bidin bistênin. Ev gera T. Ardogan, asta dîplomasîya tirkiya ya di temenê dijberîya kurdan de dide nîşandin.

Gera T. Ardogan ya ku tê payîn ku di 21´ê meh de li Birûkselê were kirin, di derbarê wê de hin bi hin nûçe derdikevin û bi wan dihê gotin ku "ev ger bi armanca başkirina têkiliyê û yekîtîya ewropa ya." Lê ji vê zêdetir, divê ku em vê bibêjin ku çend ku hin dordor bi zanebûnî û ne bi zanebûnî bê ku dixwezin ku ji berçav dûr bikin, bi li derxistina konfaranse Cenevê a duyemin û rewşa kurdan ve girêdayî ya.

Tirkiya, heta nûha, dîplomasîyeka mazin kir bo ku kurd di wê civînê de serbixwe newina temsîlkirin. Tirkiya di temenê înkare kurdan de û di temenê ´bêstatû´ hiştina wan de hê di nava tevger û dîplomasiyê de ya. Ev ger jî, bi vir ve girêdayî ya. Mijarên din, li ser ewropa û hwd, dibêt ku werina rojevê. Lê divê ku, em vê gerê, weke dîplomasiyeka esasî a di temenê konfaranse Cenev´ a duyemin de hildina li dest.

Di wê gerê de, dosya pêşî ku werênina ser masayê, wê mijarên ku bi statûya kurdan ve girêdayî bin. Her wusa mijarên ku bi rewşa Sûrî ve girêdayî bin. Divê ku ev jî, were ditin û fahm kirin. Ev gera T. Ardogan a li Birûkselê, di dema li darxistina konfaranse Lozanê de ku bi heyetekê çûbû, çûna Îsmet Înonû ya bo konfaranse Lozanê hanî bîra min. Dema ku mirov li ser şert û mercên demê, mijarên ku di rojeve cihanê de ku dihên nîqakirin û hwd, ku li wan dinerê, mirov vê yekê bi awayekî xweza dibînê. Bo vê yekê, di vê demê de, mijara giştî li darxistina Konfaranse Cenev´ê a duyem a. Dervî wê, bi gera T. Ardogan re, sedemên bi gerê re dihên nîqakirin hem ne rojevên sereke na û hem jî ji aliyekî ve nîqaşkirina van sedeman û hwd, dibina sernûxûmandinek bo rojevên esasî ên ku ew dixwezin ku li ser wan goftûgo bikin.

Bi vê rengê, d aslê xwe de, ku em gerê weke gera duyemin a îsmet Înonû jî bi nav bikin wê ne xelat bê. JI xwe ger, di vê temenê de ya. Mijarên ku wê li ser wan werina axiftin, di vê dema ku wê konfaranse Cenev´ê a duyem bibe, bêgûman wê ew mijarên ku bi wê re û bi wê re û di wê de ku dihên axiftin bin.Konfaranse Cenevê, ku hebûna kurdan herê nekê û pirsgirêka kurd nekê rojeve xwe de, wê çaxê wê piştgirîyekê bide şerên ku berî wê bi kurdan re hatina kirin û piştî wê re jî ku wê bi kurdan re di temenê ´bêstatû´ hiştina wan de ku bi wan re were dayîn. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku dema ku kurd newina vaqandin û dewet ji wan re newê şandin, divê ku ti kesek weke "konfaranse aşîtîyê" bi nav nekê. Ev nav jî, hingî, wê bê weke navekê bo xapandinê û hwd. Ji wê û pê ve, ti wateya wê namêne. Li vir, dema ku rewş ev bê, nav û gotina "aşîtîyê" li wê konfaranse Cenevê a duyemin kirin jî, tenê bo xapandinê û pê de ti wate wê namêne. ...

- Pirsgirêka kurd, pirsirêka herêmê ya herî mazin a. Pirsgirêka kurd, li pêşîya demokratizebûna herêmê û her wusa pêşketina wê astang a. Çendî û çiqasî, ev dirêjkirina pirsgirêk didomê û pirsgirêk bi rengê pirsgirêkîya wê tê dirêjkirin, ewçendî jî pirsgirêkên herêmê jî, tên taloqkirin û dirêjkirin û i demê tên belvakirin. Î ro, ya ku tê ditin ev a. Pergale herêmê ku li ser înkare kurdan ava bûya û kurd di wê de bêstatû hatin hiştin, dihê xwestin ku di wê rengê wê de bi heman zihniyetê werê domandin. Kurd jî, vê naxwezin. Kurd, ne kurdên dema ku konfaranse Lozanê di wê de hatibû li darxistin in. Di wê demê de, pêşî, li başûrê kurdistanê, îngilîzan li başûrê kurdistanê derbeyek bi alîkarîya hêzên din ên herêmê li kurdên başûr da û desthilatdarîya kurd a şêx Mahmûdê berzencî şikand û ji holê rakir. Firanse jî, ku rojavayê kurdistanê jî di nav de li wê herêma ku î ro ji wê re ´sûrî´ tê gotin bû bi metingerî û piştre wê jî, ew bi wê rengê bi pirsgirêkî hişt. Ji xwe, tirkan, hertimî bo kurd bên şikandin di nava şer û dijberîya wan de bû.

Li ser wê rewşê konfaranse Lozanê hat li darxistin. Kurd, di wê de, bêstatû hatina hiştin. Piştre jî, ku konfaranse Lozanê bi dawî bû, wê çawa wan biryarên konfaranse Lozanê bi kurdan bidina herêkirin, bi kurdan re ketina nava şerê wê de. Di ancama wê de, komkujiyên weke ´komkujiya geliyê zilanê´, ´komkujiya dersimê´, ´ komkujiya helepçe´ û hwd hanîna serê kurdan. Ji destpêka konfaranse lozanê ku di sale 1923´an de

hat li darxistin û heta roja me, ser dusad hezarî re kurd hatina qatil kirin. Ev, hijmar, hijmareka ku herî hindik ku em dikarin bênina ser ziman. Bêgûman, hijmar ji vê pirr maztira. ..

Î ro jî, ew şerê bi kurdan re di temenê wê zihniyeta konfarane Lozanê de bi kurdan re didomê. Hê jî kurd, didom in. Kurdan, weke ku li tirkiya û hwd, dihê ditin, tên girtin û dikina zindanan de, dikujin û hwd. Tenê, ev ji ber ku ew kurd in. Nûha jî, dihê xwestin ku ev pêvajoya li ser serê kurdan, were domandin. Kurd, li rojhilat navîn, ser 40 milyonî re na. Lê ti statûya wan tûna ya. Ji ber Kosova´ya ku nêzî 2 milyon in, NATO bixwe dikeve dewrê de û oparasyonan dike û dewleta kosova ava dike. JI bo du milyonan mirovan dewletek tê avakirin, lê bo 40 milyon kurdî statû jî nayê xwestin. Kurd, ku em li dîroka wan binerin, xwediyê dîroka herî kevn a. Ev rewş, weke bêbaxtîyeka sîyeseta cihanê û demê li kurdan a.

Î ro, kurd di rewşeka pirr xirab de na. Di aslê xwe de, li başûrê kurdistanê jî, ew rêveberîya kurd ku hat avakirin jî, bi wê hizirin ku wê çawa hemû kurdan bikina bin kontrolê de. Rewşa ku dihê ditin jî, ev a. Lê piştre ku hat ditin ku ew jî, ne bi derfet a, êdî bi awayekî vekirî li dijî kurdan ketina ´pozisyonê´ de. Minaq, li ser rêveberîya başûrê kurdistanê re, dijberîyekê li dijî statûya kurdên rojava pêş dixin. Vê jî, dixwezin ku bidestê kurdan bikin. Yanî, bi destê kurdan, êdî kurdan bêdeng bikin. Heta roja me jî, ku ne bidestê kurdan bûya, ne karîna ku derbeyê li kurdan bixin. Bo ku derbe li kurdan were xistin, hertimî ji nava kurdan, hin kurd bi karhanîna. MInaq, weke ku çawa ku di konfaranse Lozanê de di sale 1923´an de kirin, ku dema ku komisyon hatina şandin û di wê de çend kurd bicihkirin ji wan re gotin bêjin "em li ser navê kurdan hatina" û piştre ku wan jî, wusa got, êdî piştre ew rewş hanîna serê kurdan. Î ro jî, di nava muxalefeta Sûrî de jî, bi heman rengî "çend kurd" bicih kirina û bi wan didina gotin ku bênin "em kurd in" û "em li ser navê kurdan li vir in". Piştre jî, li ser wê re jî, ku wê rewşê li ser serê kurdan bidina domandin.

Ti farqe wan kurdên î ro kirina nava "muxalefeta Sûrî" de, ji wan kurdên ku kiribûbûna nava komiteya ku çûbû konfaranse Lozanê a di sale 1923´an de, tûna ya. Zihniyet heman zihniyet a. Di wê demê de li ser wan kurdên ku bi xwe re birina konfaranse Lozanê, bi wan derbe li kurdan xistin. Di vê demê de jî, bi wan kurdên ku kirina nava "muxalefeta Sûrî", bi rêya wan dixwezin ku derbeyê li kurdan bixin. Pêşîyên me kurdan, çii xweşîk gotina, "ku kûrmê darê ne ji darê bê, wê qalandina darê nebê"

Li vir, divê ku em vê jî bibêjin. Pirsgirêka kurd, ne tenê pirsgirêka kurd a. Pirsgirêka mirovatiyê jî ya. Pirsgirêka kurd, ji ber çi hat afirandin û ji ber çi nayê xwestin ku were çareser kirin? Li vir, dema ku em li wê dihizirin, em dibînin ku ji statûqûya ku li herêmê hatî afirandin zêdetirî, hinekî jî girêdanbûnên wê xwesteka ne çareserkirinê bi pêşketina ewropa ve jî girêdayî hena. Ji ber ku pirr nirxên gûtî, hûrî û mîtannî, kirina temenê wê pêşketinê de jî. Ya ku şerê wê bi kurdan re dihê dayîn, hinekî şerê wan nirxên ji van deman û yewêtî(aîdîyet)ya wan a. Divê ku mirov ji vê aliyê jî lê binerê. ..

Bo vê yekê, di aslê wê de, ne tenê dewletên herêmê ên weke tirkiya û hwd, hebûna xwe li ser tûnakirina kurdan avakiirina û hizirî na. Her wusa, dervî wê jî, bi zihniyeta ewropî re jî, hin aliyên bi vî rengî ên ku mirov bi sîyeseta wê û zihniyeta wê ya giştî re ku fahm bike hena. Ji ber vê yekê, êdî bi isrerî li dijî kurdan di şer de na. Naxwezin ku kurd û pirsgirêka kurd were çareser kirin. Ji ber vê yekê ya ku dihê xwestin ku ev civîna dûyemin a Cenewrê bibe lozane duyem li ser serê kurdan. Kurd û Kurdistan, pirsgirêka

wê ya ku hatî afirandin, hinekî jî bi wê dîroka wê ya dirêj ve girêdayî ji van aliyan ve hin alî hena. Şerê aîdîyete hin nirxna demê berê jî bi kurdan re dihê dayîn. Ev rewş, dema ku newina kifşkirin, ev hewldanên dîsa ´bêstatû hiştina kurd´ wê baş newê fahm kirin.

Şerê bêstatû hiştina kurdan, divê ku em di vê temenê de ji pirr aliyan ve lê bihizirê. Her wusa, şerê desthilatdarîyê ku li herêmê û hwd, tenê weke aliyekî wê dihê ditin. Her wusa, di qada navnetewî de û di sîyeseta navnetewî de hewldanên ku di temenê zihniyeteka ku bi wê dihê xwestin ku kurd bêstatû werina hiştin de ku bi kurdan re tekoşîn dihê dayîn, divê ku mirov ji van aliyan ve lê binerê. Î ro, milletekî weke miletê kurd ser 40 milyonî re, nexwe emê çawa fahm bikin ku di sadsale 21´ê de, ku hê bêstatû hatîya hiştin. Ev rewşên ku em şîrove bikin, em nikarin tenê, bi zihniyete desthilatdarîyê û renggirtinên wan re fahm bikin. Ji wê zêdetir, gelek rewşên ku em divê ku fahm bikin hena. Tirkiya jî, Îran jî, û heta Sûrî û Îraq jî, bi aliyê desthilatdarî û kirina wan ya desthilatdar jî, tene aliyekî vê pirsgirêkê û bo domandina wê jî ya. Hebûna, milletên herêmê ên van xalkan(tirk, faris û arab û hwd=bi awayekî hebûna wan kirina xizmeta domandina vê pirsgirêkê de, û heta ol jî kirina wê xizmetê wê domandina pirsgirêkê de=), di temenê domandina pirsgirêka kurd bi vî rengî de kirina pozisyonekê de, hinekî jî divê ku mirov bi vê aliyê ve girêdayî hilde li dest û şîrove bike.

Ev aliyên ku van rêveberîyên herêmê ên weke Tirkiya û Îranê û wan welatên din ên herêmê jî ku fahm nekirina, di aslê xwe de, temenê pirsgirêkên wan ên ku ew di roja me de dijîn jî ya. Statûya kurdan, li vir, giringa ku divê ku mirov divê ku mirov ji van aliyan ve lê bihizirê ya. Li herêmê, ji ber çi, bi isrerî li dijî statûya kurdan rewş dihê xwestin ku were pêşxistin? Ew rewşa serwerîya li herêmê ku hinek bi gotinên "serwerîya emperyal" re şîrove dikin jî, tenê aliyekî wê diafirêne. Li vir, ev aliyên ku dihên nîqaşkirin, tenê aliyên ku weke "aliyên çîyayê qaşayê ku dihên ditin in."

Ji wê zêdetir, rewşên ku em kifş bikin, hinekî jî, di vê temenê de, ji aliyê têgihiştina ku şerê aîdîyeta nirxên wê xata dîrokê a mesopotamya bi kurdan re dide, divê ku mirov ji pirr aliyan ve wê kifş bikê û hilde li dest. Li vir, dema ku statûya kurdan were dayîn, wê hingî, di wê temenê de ew were ditin. Li kurdistanê, pêvajoyên tûnakirina civatî ku dihê pêşxistin divê ku mirov ji vê aliyê ve lê binerê. Di nava gotinên weke ên "civake tirkiya", "civake Îranê", "civake Sûrî", "Civake îraqê" û hwd, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest.

Serokê gelê kurd, gotina "têgiha netew a ku temenê wê li ser gotina ´bişavtinê´" ya hanî ser ziman. Di aslê xwe de, ev rewş bi serê xwe aliyekî vê zihniyetê diafirênê ji bingihînî ve. Lê aliyên wê ên afirandina "aîdîyetên nirxan ên nû" û her wusa ji holê rakirina ´aîdîyetên kevn ên dîrokî´ jî, divê ku mirov biqasî wê gotina bişavtinê di temenê wê nêzîkatîyê û zihniyetê mazin û giring hilde li dest. Li ser vê rewşê re, "şerê deronî" û ankû "şerê bi vî rengî ên bi rengên teybet li dihên meşandin jî, di vê temenê de şerên ku aqil û bîrewerî dihê bikarhanîn û dihên dayîn in.

Î ro, em di sale 2014´an de, dijîn. Lê hê kurd, ne xwediyê wê statûya xwe na. Î ro tevî ku ser 40 milyonî re kurd dijîn jî, zimanê wan qadaxa ya. Bi lîstikên weke "perwerdeya li dibistanên teybet" ku dewletên weke tirkiya û hwd dikin jî , di vê temenê de bo ku wê tûnakirinê bidina domandin in. Di aslê xwe de, gotinên "perwerde di dibistanên teybet´ de, bi armanca şikandina bertekên civatî û bi wê re domandin pergale bişavtinê(asîmlasyonê) ya. Di vê temenê de, di bêstatûya kurdan de isrerkirin dihê kirin.

Şerê ku bi kurdan û dîroka wan û nirxên wan ên civatî û hwd re dihê dayîn, şerê vê serdemê ê dîrokî û herî mazin a. di vê temenê de, ev şer di temenê bêstatûya wan de dihê dayîn. Hewldanên astangkirina kurdan ya çûyina li civîna Cenewrê ya bi serê xwe û serbixwe, hinekî di vê temenê de divê ku mirov di temenê zihniyeta serdest ya herêmê û navnetewî ya serdest de fahm bike. Ev hewldanên astangkirina çûyina kurdan li civîna cenewrê a duyem jî, hewldanên ku hertimî kurd wan şermazar dikin in. Kurd, bo ku wan astangîyan û ên derdixin şermazar bikin û helwesta xwe ya rast bbidina nîşandin, li qadan in. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku ev herîşên ku li kurdan dibin hem li rojavayê kurdistanê jî, li başûrê kurdistanê jî, li rojhilatê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê jî, di temenê wê şerê bi kurdan re ê bêstatû hiştina kurdan de na.

Zihniyeteka ku ji kêmneteveka 2 milyon re dewlet rast dibîne û ji gelekî weke gelê kurd ku ser 40 milyonî re statûyê jî zêde dibînê, vêca dirabê û bahse "demokrasî"yê û "mafê mirovan" dike!. Î ro, gelê kurd, ser 40 milyonî re ya. Lê hemû maf û azadîya wê ji destê wê hatîya girtin. Ji hemû aliyan ve hêrîş lê têne kirin. Hemû nirxên wê ên civatî di bin hêrîşên metingerî û hwd de na. Di dema ku kurdan li rojavayê kurdistanê, bi awayekî demokratikî dest danîna ser rêveberîya herêmên xwe û bajarên xwe, hingî ew ne hat diyax(tahamûl) kirin. Êdî bo ku wê nêzîkatîya aşîtîyane û demokratik a kurdan bixwûn bikin, komên çete afirandin û bi çekkirin û dan hêrîşkirin li ser kurdan herêmên wan. Hê jî, heta roja me jî, ew hêrîşên li kurdan û li herêmên wan ên bi destê çeteyan didom in.

Bi wan hêrîşên ku li kurdan û li herêmên wan dan destpêkirin re, nûha jî, dîplomasîyê dikin li dijî kurdan ku ew serbixwe û bi navê xwe neçina civîna cenewrê a duyem. Di wê temenê de di ahangekê de ew dîplomasî di temenê dijberîya statûya kurdan de dihê meşandin. Bo ku weke ku çawa ku di konfaranse Lozanê de hatkirin û kurd bêstatû hatina hiştin, nûha jî, dixwezin ku bi heman şêwayê û rengê kurdan bêstatû bihêlin bi civîna cenewrê re. Lê kurdên î ro bi hiş û têgihiştina xwe re, ne kurdên wê dema di wê de konfaranse lozanê hat li darxistin a. Êdî wê çawa kurdan bêdeng bikin, li rêyên wê digerihin. Bi vê rengî, dîplomasîyê jî û şerên çekdarî ê bi destê çeteyan ku bi kurdan û herêmên kurdan re dihê meşandin bi hevdû re di ahangekê dikin. Bi şer û hêrîş û kuştinê bêdeng bikin. Û her wusa bi dîplomasiyê jî, bêstatû bihêlin. Bi vî rengî, êdî kurdan bêdeng bikin.

Nûha, di temenê bêstatû hiştina kurdan de, ew astangiyên li pêşîya kurdan ya di çûna civîna cenewrê a duyem de dihên derxistin. Nayê xwestin ku kurd, bi navê xwe tevlî bibin. Naxwezin ku pirsgirêka kurd li wir were rojevê. Wê çawa pêşîya wê bigrin, nûha li rê û rêbaz û lîstikên wê digerihin. ...

Lê divê ku em vê jî bibêjin ku dema konfaranse Lozanê de jî, ev kirin. Pêşî, biryar girtin û kurd bêstatû hiştin. Piştre şerê wê bi kurdan re kirin. Wê çawa, wan biryaran bi kurdan bidina herêkirin, şerê wê bi kurdan re dan. Girtina serokê gelê kurd birêz Ocalan û kirina wî ya di girave Îmraliyê, komkujiyên weke komkujiya ku hat serê kurdan a li Parîsê û hwd jî, di vê temenê de hatina kirin in. Hemû komkujiyên berê ên weke komkujiya geliyê zîlanê, komujiya dersimê, komkujiya qerqeliyê, komkujiya helepçe, komkujiya roboskî, komkujiya şengalê û bi dehan komkujiyên din ku hanîna serê kurdan, komkujiyên ku kurdan bi wan bêdeng bikin û wê bêstatûyê bi wan bidina herêkirin in. Nûha, nayê hiştin ku kurd bi navê xwe herina civîna cenewrê. Û nayê

xwestin ku pirsgirêka kurd jî, were ser ziman. Piştî civînê re, êdî wê dîsa vî şerê xwe yê ku bi kurdan re dane destpêkirin, wê bidina domandin.

Li vir, ez dixwezim ku vê gotinê jî bibêjim. Di demên berê de, dema ku pirsgirêka kurd ketîya rojevê de hin rayadarên emerikî û ewropî gotina ku "ev pirsgirêka navxweyî a tirkiya ya." Ev gotin jî, di aslê xwe de, gotinaka sernûxûmandinê ya bi rengê ku bikardihênin. Bo ku wê bêstatûya ku layiqî kurdan dibînin di temenê sîyeseta xwe ya gelemper de, wê vêşarên vê gotinê dibêjin. Ev gotin, hinekî jî, ku temenê wê were lêkolînkirin, wê gelek zihniyet û nêzîkatîyên di nava "sîyeseta giştî" a ewropa û emerika de jî wê werina kifşkirin. Gotina, "pirsgirêka kurd, pirsgirêka navxweyî ya tirkiya ya", gotinaka weke wê gotina dadgeha tirk ya di derbarê komkujiya roboskî de ku bi rengê "biryara ne şopandinê" ya. Di zihniyetê de, ti farq di nava wan de tûna ya. Tenê, farq ew a ku yek di nava sîyeseta navnetewî de dihê ser ziman û yek di nava sîyeseta di nava sînorê tirkiya de ku bi armanca ser komkujiyê nûxûmandinê di dadgehê de weke ´biryar´ hatîya girtin a. ..

Di vê temenê de, wusa dihê ditin ku dixwezin ku w bêstatûya kurdan bidomênin û wê şerê bi kurdan re jî bidomênin, heta ku karin jî kurdan tûna bikin. Ji xwe, bi civatî, hebûna kurdan jî nasnekin. Ji ber çi muxalefeta Sûrî, bi serê xwe di wê de isrer dike û naxwezê ku navê ´kurd´ û navê ´civate kurd´nasnekê? HInekî jî, bi vir ve girêdayî, divê ku mirov vê isrerê fahm bike.

Ew isrera ne naskirina navê ´kurd´ û navê ´civate kurd´, isrera bêstatû hiştina kurdan a. Vê isrerê jî, dixwezin ku di civîna cenewrê de, bi biryarên ku di temenê bêstatû hiştina kurdan de bigirin, bi wan misoger bikin. Di vê yekê de isrer dikin. Emerika, hinekî jî, di wê temenê de, dijberîya xwe li dijî statûya kurdan dihêne ser ziman. Piştî salên 1990´î, rêveberîya başûrê kurdistanê avakirin. Bi wê xwestin ku bidina gotin ku "pirsgirêk çareser bû". Bi wê re jî, êdî kurdan li beşên din ên kurdistanê bêdeng bikin û ji tekoşîna wan ya statûyê dûr bikin. Bi vê yekê û ê têgihiştinê ve, divê ku mirov wê afirandina dijberîya rêveberîya kurd ya başûr a li dijî rojavayê kurdistanê fahm bike. Bidestê kurdan, dengê kurdan bi birrin. Bi wê re jî, bêjin, "meyêzênin, ev kurd in li dijî wê disekin in." Di vê temenê de û di temenê vê têgihiştinê de, di aslê xwe de, ji başûrê kurdistanê bê, ji bakûrê kurdistanê bê û ji rojhilatê kurdistanê bê, ku di bin navê olê de mirovên kurd di xapandin û di birina li nava Sûrî û li wir didane şerkirin. Ev rewş hemû, rewşên ku di çerçoveyekê de ku divê ku mirov wan hilde li dest û şîrove bikê na.

Pirsgirêka kurd, di vê çerçoveyê de, dihê domandin. Dihê xwestin ku hê jî bi vî rengî were domandin. Bi wê re jî, bêî ku kurd ti statûyê bidest bixin, dawiyê lê bênin. Li gorî wan hêzên ku ´pirsgirêka kurd´ didomênin û lê dihizirin, kengî ku dengê kurdan derneket, hingî pirsgirêk hatîya çareser kirin. Di vê vacê(mantiqê) de tevdigerihin û heta gotinên xwe jî dibêjin. Ku vac(mantiq) ev bê, mirov çawa wê karibê ji wê hêvîya çareserîyeka aşîtîyane û adilane bike?

Hêzên ku dixwezin ku kurdan dervî civîna duyem a cenewrê bihêlin û naxwezin ku pirsgirêka kurd li wir were rojevê û ji wê re çareserî werina ditin, hinekî jî, di vê temenê de li kurdan dihizirin. Di wê hizirkirina wan de, statû û bidest xistina mafan a kurdan tûna ya. Ya ku î ro, kurd jî, bi wê têdikoşîn jî ev a. Kurd, ji ber vê yekê, ji aliyê zihniyetê ve jî li pirsgirêka kurd dinerin. Rêberê gelê kurd birêz Ocalan, di pirtûka xwe ya bi navê "pirsgirêka kurd û çareserîya netewa demokratik" de, vê yekê bi awayekî pirr-alî dihêne ser ziman. Ji ber ku, bi zihniyetî li dijî kurdan sekinin heya. Bi vê

zihniyetê jî, êdî di çerçoveya sîyeseta serdema sadsale 21´ê de, li çarereserîya pirsgirêka kurd û statûya kurd û kurdistanê nayê hizirîn. ..

-Ku kurd, serbixwe di bin sêwane ´desteya bilind a kurd´ de tevlî civîna duyem a cenewrê nebin, wê pêvajoyaka nû ya komkuji û jnosîdê bo kurdan dest pê bike.

Agahiyên ku tên guhê me, hinek dordor dikin û dixwezin ku kurdan dervî civîna cenewrê a duyemin bihêlin. Ji ber ku naxwezin ku bigihijina statûya xwe. Her wusa, êdî di wê temenê de, wê çawa kurdan dervî pêvajoyên sîyesî ên vê demê ku pêşaroja herêmê bigişştî didina dîyarkirin dixwezin ku bihêlin. Li vir, divê ku mirov vê jî bi teybetî, bibêje ku di vê demê de ku kurd, dervî wê bên hiştin, divê ku em vê pêvajoyê êdî weke destpêka pêvajoyên komkujiyê ên ku wê ji vê demê û pêde ku werina serê kurdan şîrove bikin. Di dema konfaranse Lozanê a di sale 1923´an de jî heman tişt bû. Di wê demê de jî, kurd dervî pêvajoyê hatina hiştin. Heyetên ku amede kirin jî, bi wan dane gotin ku "li ser navê kurdan hatina". Piştre jî, êdî pêvajoyên çûyina bi ser kurdan de û ên komkujiyan bo kurdan dane destpêkirin.

Di vê demê de jî, dihê xwestin ku heman pêvajo bo kurdan were destpêkirin. Tirkiya di her warê de, di vê demê de giranî daye wê û dîplomasiyê dike ku kurdan dervî vê pêvajoyê bihêle. Tirkiya, nûha, li Emerika jî, li neteweyên yekbûyî û hwd jî, di hemû qadan de dîplomasiyê dike ku pêşîyê li kurdan bide girtin.

Tevî ku tê gotin ku hêzên ku wê tevlî civînê bibin û di 8´ê rêbendanê de ji wan re dewetîya hatîya şandin jî, kurd wusa dihê xuya kirin ku hê navê wan na buhurê. Heta vê kêlîkê jî, min di ti deverê de ne xwandîya ku ew dewetîya ji desteya bilind a kurd´ re hatîya şandin. Ev jî, nîşanaka wê ya ku dixwezin ku kurdan dervî wê bihêlin.

Di vê demê de, kurd, divê ku di her warê de di nava tevgerê de bin û divê ku bikin ku kurdên rojavayê kurdistanê bi navê xwe û civate xwe tevlî civînê bibin. Divê ku di vê demê de her kurd li ser lingan bê. Di vê ku derfet newê dayîn ku pêvajoyaka weke ya dema konfaranse Lozanê a sale 1923´an ku were serê kurdan.

Kurd, di vê demê de, bo vê yekê, divê ku hemû hêza xwe bikina yek bo ku rewşa sîyasî ya rojavayê kurdistanê pêşbixin. Desteya bilind a kurd, di pêşengîya birêz Berzanî de jî li hewlêrê bi ´peymana hewlêrê´ hatibû ava kirin. Di vê demê de, divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê, divê ku dîplomasiyê bike bi rojavayê kurdistanê. Divê ku di vê demê de, ti sazî, rêveberî û partîyên kurd, pêşaroja kurdan û civate kurd, nekina kurbanê berjewendî û nakokiyên xwe ku hena. Ev, wê bo wan ne rast bê û ne ahlaqî jî bê. Wê dîrok jî, wan afû nekê, di rewşeka wusa de.

Civîna cenewrê a duyem jî, û civînên din ên bi vî rengî, ku di wan de biryarên ku pêşaroja herêmê didina dîyar kirin, divê ku kurd dervî wan newina hiştin. Kurd, divê demê de, divê ku hêzên xwe bikina yek dîplomasiya xwe bikina yek. Divê demê de, ku kurd lli rojava qizinc bikin, wê hemû kurd qizinc bikin. Lê ku winda bikin jî, wê hemû kurd winda bikin. ..

Bo vê yekê, bo ku kurd, dîsa rastî pêşarojeka bi bêstatû û bixwûn newin, divê ku di vê demê de, ji her aliyê ve kurd, di temenê yekitiyekê de bi hevdû re bin. Li rojavayê kurdistanê jî, divê ku rêveberîya xweser a kurd, were pêşxistin û rengê bi tememî were dîyar kirin. Di vê demê de, kurd, ku em ji kîjan aliyê ve lê binerin, divê ku em bibêjin ku kurd, di pêvajoyaka giring de dibuhur in. PÊşketinên di vê demê de dibin, wê pêşaroja wan jî bidina dîyar kirin. Divê ku di serî de, em vê yekê bibînin û bibêjin.

Li kurdstanê, ji aliyê gel û tevgera gel û têgihiştin û zanînê ve ti kêmesîyên mazin

tûna na. Lê kêmesîya herî mazin di nava partî û sazîyên kurd de ya. Ji aliyê rêxistiniyê ve kêm in. Ji aliyê bi hevdû re tevgerin û bi hevdû re serxistina pêvajoyekê de kêm in. Di wan waran de divê ku têgihiştinekê bi xwe re çê bikin. Di vê ku bi hevdû re bin. Di van demên bi vî rengî de, rexnekirin jî, zêde wusa ti qiymetê wan tûna ya. Tenê kirin û kirina ku mirov bi serbixwe qiymetê wê heya. Dema ku ev nebin, rexneyên ku bênkirin jî ti wateye wan namêne.

Muxalefet Sûrî, di temenê sovenisma arab de tevdigerihê. Bi wê re jî, di temenê wan poliitkayên dewletên herêmê ên weke tirkiya ku di temenê înkare kurdan û hwd de na, di wan temenan de tevdigerê û gav diavêje û gotinên xwe dibêje. Yanî, ew muxalefeta ku hê nebûya desthilatdar bixwe jî, di temenê înkare statûya kurda de ya. Vêca ku bû desthilatdar, kî dikarê bêje ku wê rêzê ji mafên kurdan re bigrê? Ji xwe, vê muxalefetê, hebûna navê kurd û hebûna civate kurd jî nasnekiriya û di nasnekirin û herêkirinê de jî isrer dike. Divê ku em vê jî binxat bikin û bibêjin.

Kurd, di vê demê de, divê ku ji her aliyê ve li ser lingan bin. Divê ku bo rojava li ser lingan bin. Rojava, bakûra jî, rojhilata jî û başûr jî ya. Divê ku ev were ditin. LI wir, li rojava ku lozanek duyem werênina serê kurdan, wê ev bê lozanek li ser serê hemû beşên din ên kurdistanê û hemû kurdan jî. Divê ku em vê yekê jî ji bîr nekin. Nûha jî dewletên weke tirkiya bi dîplomasîya xwe re û hwd, bi piştgirîyên xwe re dikin û dixwezin ku wê bidina kirin. Dixwezin ku lozanek duyemin dîsa werênina ser kurdan. Ya ku nûha dîplomasîya wê dikin jî ev a. Ya ku em kurd jî, dîplomasîya wê bikin, divê ku ew bê ku dîplomasîya maf û azadîya me kurdan û civate kurd bê.

Konfaranse Cenevê a duyemin di 21´ê rêbendanê de hat li darxistin. Piştre jî, di çapameniyê de pirr li ser hat sekin in. Di nava kurdan de jî, pirr zêde li ser sekin in bû. Kurdan, ji aliyê statûya xwe ve şîrove kirin. Di hundurê konfaranse Cenevê a duyem de, hêzên eleqeder û ne eleqeder bi dehan hêz û sazî û navend hena. Hemû jî, tevlî konfaranse Cenevê a duyem bûna, Lê li Sûrî, li rojavayê kurdistanê, tevî ser 4 milyonan re kurd hena jî, tenê win ti gotinê jî bi navê kurdan nabînin. Çend kurdên ku weke `makyaj" ku kirina navê muxalefeta Sûrî de û birina konfaranse Cenevê jî, ne ji bo ku kurdan bibina cenevê ya. Bo ku kurdan nebina Cenevê ya. Dema ku rexne jî, hatina kirin û hat gotin ku "kurd, di wê konfaranse de ne hatina temsîlkirin" jî, hingî wê bibêjin ku Meyizênin ev kurd in di nava me de hatina. Yanî, tenê bo vê yekê ya.

Her wusa, li wir jî, ji xwe, ji destpêkê ve dihanîn ser ziman ku "divê ku pirsgirêka kurd newê rojevê di nava konfaranse Cenevê de." Piştre jî, wusa kirin. Hin kurdên bêrûmet ku qaşo di gotin ku "me rekeftinname bi muxalefetê re mohrkirîya û wê di çerçoveyê de pirsgirêka kurd jî, were ser ziman,", tenê ên ku hewl didan ku bi xwe re rayagiştî a kurd jî bixapênin bûn. Ev jî, derew bû. Ji xwe, tiştekî wusa jî, tûna bû. Muxalefeta ku di destpêkê de di wê de isrer dike ku hebûna civate kurd û navê kurdan nasnekê, wê piştre çawa li ser esas û temenê pirsgirêka kurd, rekeftinnameyan mohr bike? Ev jî, gotina hin bêaqil û ahmaqên ku xwe bi "aqil" dihasibandin bûn.

Ji xwe, ji destpêkê ve hatibû kifşkirin ku wê pirsgirêka kurd li wir di wê konfaranse de newê rojevê. Ev yek, di destpêkê de, hem rayadarên emerikî û hem jî ên rûsî jî hanîna ser ziman.. Lê piştî ku konfaranse Cenevê hat li darxistin û ditin ku êdî wê nikaribin bi vî rengî bidina meşrû kirin, êdî hin nîqaş dan destpêkirin ku "divê ku hin aliyên din jî tevlî werina tevlîkirin li konfaransê." Ev jî, hinekî di ancama vê de bû. Lê ev jî, di temenê wê de, ew hebû ku wê çawa karibin wê politikaya inkarê û bêstatû

hiştina kurdan û hwd, bibidna sêrî.
Pêvajoyên ku divê demê de bi vî rengî bi hevdû re dihên bi rê ve birin, di vê temenê de na. Lê li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku li herêmê Îran û tirkiya, weke welatên ku herî zêde di îsrerkirina ne çareserkirina pirsgirêka kurd isrer dikin in. Herî zêde, Tirkiya li vir divê ku mirov bi nav bike. Piştî Gera T. Ardogan a li Birûkselê, çûyina wî ya li Îranê û hevdîtina wî ya bi rayaderên Îranî re, bi teybetî bi vê mijarê ve girêdayî bû. Çend ku di çapameniyê de herî zêde li ser gerê hat rawastîn û hat gotin ku "di gerê de herî zêde li ser têkiliyên aborî û pêşxistina wan sekinî na" jî, em nikarin bi tememî vî bi rengî fahm bikin. Di roja duyemin a gera T. Ardogan a li Îranê de li Qasra Sadabadê, li hevdû civîna wan bûya û bi hevdû re peyman mohrkirina.
Li vir, di serî de, ez divê ku vê yekê bibêjim. Dema ku min ew hevdîtina wan ya li Qasra Sadabadê nerî, ew paxta ku li Sadabadê ku di sale 1937´an de ku hatibû li dar xistin hanî berbîra min. Ew paxt, pêvajoyek nû ya beşkirina kurdistanê û parvekirina wê bû. Ev paxta li Sadabadê, bi teybetî, piştî ku jenosîda Dersimê hatibû bi dawîkirin û pê de, ku êdî Îranê jî û Tirkiya jî û hêzên din ku li herêmê xwedî serdestî bûn ku bawer dikirin ku êdî kurd hatina tafisandin û êdî wê dest ji wan dernekev û pê de, êdî li ser wê rewşê re paxta sadabadê hatibû li ser darixistin. Di paxta sadabadê de, çend biryarên ku hatibûna girtin ew bûn û di wê temenê de bûn ku "sînorên ku hatina xîzkirina di nava kurdan de werina jidandin", "dema ku li aliyekî raperîna kurdan bû, wê aliyê din alî kurdan nekê û wê alî hevdû bikin." "wê ev yek ji parastina aramiya navxweyî ya hevdû were ditin.", û "aliyê kurd ku di nava Îranê de mayî wê bi kurdan bidina bawerkirin ku ew Îranî na, Aliyê tirkiya jî wê bide bawerkirin ku tirk û ankû tirkiyalî na û li aliyê Sûrî û îraqê jî wê bi kurdan bê dayîn bawerkirin ku faris û arab in". Bi vê rengî jî, politikayên bişavtinê hatina kifşkirin û li ser navê kurd çi li jîyanê hebû hat ji holê rakirin û tûna kirin. Navê ´kurd´ û ´Kurdistan´ê jî hat qadaxakirin.. Zimanê kurdî hat qadaxakirin. Heta roja me jî, ew qadaxa ya li ser zimanê kurdî didomê li van welatên ku kurd û Kurdistan di nava wan de hatiya parvekiirn.
Di destpêka konfaranse Lozanê de Îsmet Înûno weke serokê heyetê çûbû bû konfaranse Lozanê. Di wê demê de, wî bi heyetê dabûbû gotin ku "em li ser navê kurd û tirkan hatina vir." Lê ev derew bû. Di paxta Sadabadê de jî, di asta blind de serokkomarîîya tirk hatibû temsîlkirin. Wan jî, li wir êdî biryarên girring li ser kurdan dabûn girtin. Di wê temenê de jî, piştî konfaranse Lozanê jî û paxta sadabadê jî, ku em î ro di sale 2014´an de dijîn jî, divê ku em bibêjin ku gîyane van herdû paymanên ku di van konfarans û paxtê de hatî mohrkirin bizihniyetî serdest a. Hinekî jî, di temenê hewldane ´bêstatû´ hiştina kurdan de ev hena.
Di vê dema ku konfaranse Cenevê dihat li darxistin de, pêşîya çûyina Ardogan a li birûkselê û piştre çûyina wî a li Îranê û li qasra Sadabadê bi rayadarên Îranî re rûniştina wan divê ku mirov çawa fahm bike?. Ku em bi rewşa van herdû deman ve van herdû gerên T. Ardogan şîrove bikin, divê ku em di temenê gera wî ya pêşî a li Birûkselê de giîyane konfaranse Lozanê lê bigerihê. Di vê demê de di temenê çûyina gera li Îranê jî, divê ku mirov gîyane paxta Sadabadê kifş bike. Ev herdû, paxt, çend ji wan paxtên ku statûqûya herêmê li ser lingan digirin in.
Li kurdistanê, pêvajoyên ku pêşketina, komkujiyên ku hatina serê kurdan û hwd, hemû divê ku em di temenê wan de gîyane van herdû paxtan bibînin. Î ro jî, li rojavayê kurdistanê, piştî ku kurdan rêveberîya xwe ya xweser denezend û hikimeta xwe ya kurdî

û kurdistanî avakirin û pê de, hêrîş zêdetir bûn li kurdan û li herêmên kurdan. Ji xwe, ev gera Li Îranê jî, piştî wê denezendinê re bû. Ev rewş, rewşna ku mirov divê ku bi teybetî li ser wan bisekinê na.

Piştî konfaranse Cenevê, wê pêvajoyaka çawa a di temenê dijberîya kurdan de werre dayîn destpêkirin. Ev jî, weke pirsekê divê ku mirov bipirsê ku li bersiva wê bigirê. Dema ku kurd newina dewet kirin li konfaranse û di konfaranse de ku pirsgirêka kurd newê rojevê û statûya kurdan newê naskirin, hingî divê ku mirov li bendî pêvajoyeka bivî rengî a di temenê dijberîya kurdan de ku dihê pêşxistin de bê. Ev rewş, weke rewşeka giştî a ku divê ku mirov bigiringî li ser bisekinê ya. Çeteyên ÎŞÎD´î ku li Îraq û Sûrî hatina bicihkiirn û piştgirîya tirkiya ji her aliyê ve ji wan re heya, gefan li kurdan dixwûn. Ev komn çete, hemû jî ol hatîya bikarhanîn û hatina afirandin. Yanî, hemû jî, ji tûndrewên olî hatina afirandin in. Li vir, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku hertimî li ser olê re pêşxistina dijberîya li kurdan, weke aliyekî politikayên dewletên herêmê ên ku li dijî kurdan şer dikin in. Saddam, dema ku oparasyonên jenosîdê li Helepçe û herêmên din ên başûrê kurdistanê li dijî kurdan da destpêkirin, navê Sûreyekê Kûran´ê ê bi navê "anfall" bikarhanîn weke navê wan oparasyonê xwe. Li Îranê jî, dema ku kurdan bahse maf û azadîya xwe kir, pêşî Hûmeynî "fetwa" serê kurdan da. Piştre jî, kurd dema ku dihatina bidervekirin, hêncetên olî dihatin ûû bi wan ew bidervekirinên kurdan dihanîn ser ziman. Minaq digotin ku "li dijî xwûdê rabûya" Ev gotinaka ku hema bêja di bidervekirina hemû kurdan hatîya bikarhanîn a.

Îran, dibêt ku xwe dike şîrîkê navê xwûdê. Ew pirsgirêkeka din a. lê li vir, divê ku em vê yekê bibêjin ku ol, hertimî li dijî kurdan weke amûrekî hatîya bikarhanîn. Li tirkiya jî, di nava tirkiya de çeteyên xwûnrij ên bi navê "hizbilleh" ku kurd weke "hizbil.kontra" bi nav dikin, hatina bi rêxistinkirin û bidestê wan, bi hezaran kurdîn sivîl bêsûal hatina qatil kirin. Ev politikayên dewletê ên li dijî kurdan ku meşandina, di temenê wan de ol herttimî hatîya bicihkirin. Minaq, saziyên cameatê ankû fethullehçîyan, herî zêde li kurdistanê di nava kurdan de bicihkirina. Kurdên ku kuştin ji xwe kuştin. Kurdên ku ne kuştin, wan jî asîmle bikin. Bo vê yekê jî, ev saziyên cameatê, hatina bikarhanîn. Ev saziyên cameatê, di van demên dawiyê de, bi rengna din derdikevina ber me. Weke ku bi navê "huda-par" û hwd, ku ji qatilên hizbil-kontrayên berê pêktê û hinekî fethullehçîyên din jî kirina nava wan de, bi vê rengî bi rengekî din weke "partîyekê" ku "oldar" dixwezin ku derxina ber kurdan û li ser wê êdî li dijî kurdan politikayên xwe ên li dijî statûya kurdan bibina sêrî. Ev hemû jî, bi hewldanên ´bêstatû´ hiştina kurdan ve girêdayî na.

Ev pêvajoya ku em di wê de di buhur in, bo kurdan pêvejoyek pirr giring bû. Di vê pêvajoyê de, kurdan xweserîya rojavayê kurdistanê denezend. Bi wê re jî, kurd hemû ketina nava pêşxistin û parastina wê rêveberîya kurd li rojavayê kurdistanê de. Kurd, naxwezin ku tişta ku hat serê komare kurd a Mihabadê were serê wê jî. Divê ku em vê jî bi vê navgînê bibêjin ku denezendina rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê, rastî salwegera avakirina komare kurd a Mihabadê hat. Bi wê denezenê re, ev dîroka komare kurd a Mihabadê jî, hat vejinkiirn û zîndîkirin. Ew dîrok jî, hat binirxkirin. ..

Konfaranse Cenevê jî, di vê demê de dihê li darxistin. Hin dordorna, dema ku denezendina rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê Şîrovekirin, weke bersivekê ji konfaranse Cenevê re jî şîovekirin. Bi demê re rasthatina wê re, dibêt ku mirov karibê hin şîroveyna bi vê rengê bike. Lê di aslê xwe de, em bi tememî nikarin di vê temenê de

şîrove bikin. Ji ber ku ev bi salane amedekarîya wê hatina kirin a. Rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê, di ancama keda bi salan da hatîya kirin. Dema ku em tenê bi vê dema ku di wê de konfaranse Cenevê tê li darxistin re wê şîrove bikin, wê ew şîrove bê weke nehaqîyekê jî li wê keda bi salan ku di temenê wê de ya. Ji ber vê yekê, em nikarin bi tememî bi vî rengî şîrove bikin. Lê her denezendin, dema ku dema wê tê li berçav girtin û kirin, hingî dibêt ku ancamên wê ên bi vî rengî hebin. Lê denezendinên bi vî rengî ên weke ên xweserîya rojavayê kurdistanê ku ancama kedaka bi salane, divê ku em bi wê keda di temenê wan de ya, bi wê werênina ser ziman.

Rojavayê kurdistanê, di vê demê de di pêvajoyaka pirr giring û dîrokî de derbas dibe. Piştî ku ew denezendina rêveberîya wê hat kirin û hikimeta wê hat avakirin jî, êdî ew giiringîya wê zêdetir hat ditin. Lê em nikarin wê giringîyê, tenê bi rojavayê kurdistanê re bisînor werênina ser ziman. Ji wê zêdetir, divê ku mirov bibêje ku bi bandûrên wê re û hwd, bi giştî divê ku em di temenê giştîya kurdistanê û pirsgirêka kurd û rojhilat de hildina li dest û fahm bikin û werênina ser ziman.

Î ro, weke tê zanîn, li tirkiya jî pirsgirêka kurd heya. Li Îranê jî heya. Çend ku li Îraqê pirsgirêka kurd bi rêveberî û statûya kurdên başûrê kurdistanê re weke ku hatibê çareserkirin jî, lê hê jî ew pirsgirêk ne hatîya çareserkirin. Di aslê xwe de, wê rewşa rêveberîya başûrê Kurdistanê, pirsgirêk, çareser nekir. Hê zêdetir, pirsgirêk, bi rengê wê yê pirsgirêkî hanî û danî li berçav. Dema ku em ji vê aliyê ve lê binerin, divê ku em bibêjin ku hê pirsgirêka başûrê kurdistanê, tevî hin pêşketina di nava kurdan de hebûna xwe didomêne. Ji ber ku pirsgirêka hemû beşên Kurdistanê bi hevdû ve girêdayî ya. Dema ku pirsgirêka beşekê were çareserkirin jî, ku pirsgirêka beşên din xwe bide domandin, wê ew beşa ku pirsgirêka wê hatî çareserkirin jî, weke ku ne hatî çareserkirin, wê li holê bi pirsgirêk bimêne. Ev jî, weke aliyekê, divê ku mirov li berçav bigrê ya. Pirsgirêka kurd, piştî li îraqê kurdên başûrê kurdistanê hinekî statû bidest xistin û rêveberî û parlamane xwe avakirin û ku li Sûrî jî, kurdên rojavayê kurdistanê xweserîya xwe û rêveberî û hikiimeta xwe denezendin, êdî li Îranê jî û li Tirkiya jî dikeve pêvajoyaka nû de. Çend ku tirkiya û Îranê, gav neavêtibin di çerçoveya pirsgirêka kurd de jî, dîsa ev rewş bi giringiya wê dihê li holê. Vêca, dema ku Îran û Tirkiya, di temenê ne çareserkirin û dijberîya kurdan de tevdigerihin, êdî ew jî di wê çerçoveyê de nêzî hevdû dibin û dikevina nava lêgerînan de. Hinekî jî, divê ku em gera T. Ardogan a li Îranê a piştî gera wî a li Birûkselê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de jî hilde li dest û şîrove bike.

Li herêmê kurd, êdî naxwezin ku bêstatû bijîn. ji destpêka sadsale 20´an ve statûqûyek hat avakirin. Di wê de kurd tûna hatina hasibandin. Bi wê re jî, bi sînor neman, ketina nava ji dîrokê birin û tûnakirina kurdan. BI vê yekê, dema ku kurd jî, ketina nava tekoşîna maf û azadîya xwe de, êdî ne tenê dewleteka li ber xwe û li dijî xwe ditin. Her wusa êdî bi tememî statûqû û hemû dewletên wê ên herêmî û bi aligirên wê ewropî û emerikê û hwd re li ber xwe li dijî xwe ditin Ev rewş, kir ku ´koalîsyonaka navnetewî" li dijî kurdan were avakirin û li ber kurdan û bi kurdan re bikeve şer de.

- Li vir, di serî de divê ku em vê bibêjin ku piştî konfaranse Cenev´ê kurd li bendî şerekî mazin ê bi xwe re bin. Weke ku çawa ku piştî konfaranse Lozanê, şerê zihniyeta konfaranse Lozanê a kujar û înkarker bi kurdan re bû, di vê demê de bi heman rengî divê ku em li bendî şerê zihniyeta konfaranse Cenevê´ ê bi kurdan re bin. Konfaranse Cenev´ê jî, di temenê zihniyetek kujar û înkarker de dihê kirin. Ji aliyê kurdan ve, di

temenê înkarê de ya. Bêgûman, divê ku em bibêjin ku piştî di civînê de çi biryar werina girtin, wê di temenê înkare statûya kurdan de bê. Piştre jî, wê şerê bi kurdan re bidin bo ku wê bi kurdan bidina herê kirin. Bo vê yekê, divê ku em li bendî şerê zihniyeta konfaranse Cenev´ê ê bi kurdan re bê.

Zihniyeta konfaranse Cenev´ê, bo ku mirov kifş bike ku wê di temenê înkare statûya kurdan de û di temenê ´bêstatû´ hiştina kurdan de biryarann bigrê, hewce nakê ku mirov xwediyê zanebûneka mazin bê. Piştî wê re jî, wê şerê bi kurdan re bidina kirin. Di dema konfaranse Lozanê de heman tişt hat kirin. Pêşî biryarên di temenê ´bêstatû´ hiştinê de biryar girtin û piştre şerê wan biryaran ku bi kurdan bidina herêkirin bi kurdan re kirin. Ev pêvajoyên piştî konfaranse Lozanê ku ji sale 1923´an û heta roja yanî 2014´an, şerê wê zihniyeta konfaranse Lozanê bi kurdan re hat kirin.

Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku piştî konfaranse Lozanê re, divê ku mirov ne li bendê bê ku wê tenê bi kurdên rojavayê kurdistanê re şer bê kirin. Her wusa, bi kurdên bakûrê kurdistanê re jî, heya ku pêvajoyeka şer ya nû bidina destpê kirin. Divê ku em li bendî wê bin. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku şerê "bêstatû" hiştina kurdan bi kurdan re dihê dayîn. Ev jî, bi armanca ji dîrokê birina wan û navê wan a. Ev şerê bêstatû hiştina kurdan, ne tenê li rojavayê kurdistanê bi kurdan re dihê dayîn. Her wusa li bakûrê kurdistanê jî û li beşên din ên kurdistanê jî ew şerê bi gelek rengên wê bi kurdan re dihê dayîn.

Di aslê xwe de, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku pêvajoya ku rêberê gelê kurd birêz ocalan li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin bi rejima tirk re bo ku pirsgirêka kurd were çareser kirin, piştî konfaranse Cenev´ê re, ew jî êdî heya ku bi tememî vegerihê şer. Tirkiya, xwesteka wê û armanca wê ew a ku nehêlê ku ji konfaranse Cenevê di temenê herêkirina statûya kurdan de ti biryar werina girtin. Bo vê yekê jî, di nava dîplomasîyê de ya. Ev dîplomasîya wê, di astaka mazin de didomê. Çûyina T. Ardogan li Birûkselê rojekê berî roja ku wê di wê de konfaranse Cenev´ê destpê bike, hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Di vê temenê de, dixwezin ku pêvajoyê di temenê "bêstatû" hiştina kurdan de bi ancam bikin di konfaranse Cenev´ê de. Ku ew biancam kirin, êdî wê şerê wê bi kurdan re destpê bike. Ji xwe, piştî ku bi ancam kirin jî, êdî wê şerê wê bêstatû hiştinê bi kurdan re destpê bike. Ev jî, tê wê wateyê ku pêvajoya ku nûha herkesek li bendê ya ku di wê de pirsgirêka kurd were çareserkirin û aşîtî bibe, wê bi tememê bi xwe re pêvajoyaka nû ya şerê tûnakirina kurdan bêne. Yanî, em dikarin bêjin ku, di temenê biryarên ´bêstatû´ hiştina kurdan de, wê pêvajoya çareserîyê a li bakûrê kurdistanê ya bi tirkiyê re jî wê têkherê, wê were têkbirin.

Bi vê re, divê ku em bibêjin ku piştî konfaranse Cenev´ê re, heya ku şerê dijwar bi kurdên rojavayê kurdistanê re jî destpê bikin. Ev şer hemû, wê şerên ku di temenê wê çerçoveya konfaranse Cenevê a duyemin de bin. Şerên ku piştî konfaranse Cenev´ê a duyemin ku bi kurdan re bibin, ku li rojavayê kurdistanê bin û li bakûrê kurdistanê û her wusa li beşên din ên kurdistanê bin, emê nikaribin ji wê çerçoveya konfaranse Cenev´ê dûr werênina ser ziman.

Ji xwe, ew ´muxalefeta Sûrî´ ku bahse wê dihê kirin, di temenê şowenizma arab de tevdigerihê. Ew, li dijî statûya kurdan in. Hebûna kurdan û navê kurdan û hebûna civate kurd nasnekin. Her wusa di nasnekirinê de jî, isrer dikin. Ev zihniyet, wê çawa ´çareserîyê´ bi xwe re bêne? Zihniyeta ku hebûna civatan û gelan û navê wan înkar dike û nasnekê, wê çawa çareserîyê bi xwe re bêne?

Bi vê yekê re, divê ku em bibêjin ku ´pêvajoya çareserîya demokratik´ a li tirkiya jî ku rêveberê gelê kurd birêz Ocalan dayî destpê kirin, ew jî weke ku bi wê zihniyeta ku hebûna statûya kurdan nasneke û ku di dihê xwestin ku di çerçoveyê wê de biryarên konfaranse cenevê a duyem werina girtin û çerçoveya wê were kifşkirin re dihê têk birin. Li vir, bi zihniyetî temenê şerekî mazin jî di konfaranse Cenev´ê a duyem de bi kurdan re bigiştî dihê avêtin. Ku statûya kurdan, newê rojevê û herêkirin, wê bixweza ev bibe. Divê ku em vê yekê di serî de û bigiştî bibêjin. ..

Di nava hêzên ku tevlî konfaranse Cenev´ê dibin, herkesek heya. Lê tenê xalkên li Sûrî û kurd tûna na. Di pêvajoyaka bi vî rengî a ku weke ku dihê xwestin ku di konfaranse Cenev´ê a duyem de temenê wê dihê avêtin, divê ku mirov ne li bendê bê ku wê dawî li şer û pevçûnan were hanîn. Vajî wê, divê ku em li bendê bin ku wê şerekî mazin bide destpêkirin. Ku ev bi leşkerî bê û ankû bi rengên din ên sîyesî û hwd bê. Lê li vir, em nikarin weke ku ev konfaransa cenevê dihê bi nav kirin, ne ´konfaranseka aşîtîyê´ ya.

Çerçoveya zihniyetî ku bi biryarên ku hatin girtin ku hat dayîn nîşandin, piştre bo cihbicih kirina wê, êdî zor û şîdeta wê êdî wê bi pêvajoya piştî wê re wê dest pê bike. Ji vê aliyê ve, dema ku em ji aliyê kurdan ve lê dinerin, em dibînin ku em divê ku li bendî şerekî mazin ê bi kurdan re bin. Ji vê rewşa konfaranse Cenevê a duyemin, ne dewetkirina kurdan û her wusa di temenê isrera ne naskirina statûya kurdan de nêzîkatîya ku di çerçoveya konfaranse Cenevê a duyemin de dihê dayîn nîşandin, bi me dide gotin ku em ji hemû kurdan re bibêjin ku li bendî şerekî mazin ê ku wê piştî vê konfaranse Cenev´ê a duyemin ku bi wê re bê dayîn destpê kirin bin.

Ev zihniyeta ku ev 30 sale ku şer bi kurdan re dike bo ku wan ji dîrokê bibe, di temenê bêstatû hiştina kurdan de di konfaranse Lozanê de temenê wê hat avêtin. Heta roja me jî, şerê wê hatkirin bi kurdan re. Î ro jî, şerê wê bi kurdan re dihê kirin. Ji ber çi, di sadsale 21´ê de jî, di sale 2014´an de jî, şerê bêstatû hiştinê hê bi kurdan re dihê dayîn? Bersiva wê pirsê, konfaranse Lozanê, biryarên ku di wê de di wê dema wê de ku hatina girtin û her wusa pêvajoyên piştî wê konfaranse Lozanê ku destpêkirin û ku heta roja me jî dike nava xwe de.

Bi vê yekê re divê ku em bibêjin ku kurdan şerên ku zihniyeta Lozanê bi wan re kir jîyan. Komkujiyên ku wê zihniyetê hanîn serê wan ditin û jîyan. Ji konfaranse Lozanê û heta roja me, tenê bo ku kurd in, nêzî milyonekê kurd hatina qatil kirin. Ev qatilkirin, hemû di ancama zihniyeta Lozanê de bû. Êdî ji nûha û pê de, divê ku em bibêjin ku wê şer û komkujiyên zihniyeta konfaranse Cenev´ê a duyemin êdî wê werina serê kurdan. Em ji nûha de hemû şerên ku wê piştî konfaranse Cenev´ê bi kurdan re wê bên kirin şermazar dikin. ..

-Konfaranse Cenevê a duyemin, hewldanên bêstatû hiştina kurdan û şerê ku li dijî hebûna kurdan tê dayîn û meşandin; Di vê pêvajoya ku tê gotin ku di wê de konfaranse Cenevê dihê li darxistin, di wê de komên tundrew, dihên bi rêxistinkirin û dihên dayîn hêrîşkirin li ser civate kurd. Ev li rojavayê kurdistanê jî û li başûrê kurdistanê hem li herêmên kurd ên ku dervî rêveberîya hatina hiştin ên weke Şengal, Tûzxûrmatû, Kerkûk û hwd. Bi teybetî, di van rojên dawiyê de hêrîşên li van herêmên kurd ên ku dervî rêveberîya kurd hatina hiştin, hinekî jî, divê ku emm bigiştî bi pêvajoya pêşketina kurdan û denezena xweserî û rêveberîya rojavayê kurdistanê ve girêdayî şîrove bikin. Bi hêrîşan navarok û hebûna civate kurd hatîya dorpêçkirin. Li bakûrê kurdistanê jî, di

vê demê de komên tundrew bi rêxistina wan giranî hatîya dayîn li wan. Bi teybetî, herêmên bakûrê kurdistanê ên weke Êlihê, Amed, Şirnaxê û hin herêmên din ên li dora wan ên bakûrê kurdistanê û hwd, giranî dane rêxistiniya li ser olê re. Di çend rojên ku buhurî de ku ji Êlihê de ket rojevê de weke wêneyekê ku bi dehan jin li rex hevdû rêzkiribûn û li bin wê nivîsandibûn ku"Alîmeyên jin, dîplomaya xwe digrin". Ev rewş, rastî dema ku hilbijartin nêzîk dibin û di dema ku komên tundrew dihên bi rêxistin kirin û dihên dayîn hêrîşkirin li ser rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê de pêk tê.

Ev dîmen, hinekî jî, bo ku mirov rengê bikarhanîna olê a li kurdistanê û li dijî kurdan fahm bike giring a. Divê ku mirov wî wêneyê dêne li berxwe û bi kêlîkan li ser bihizirê û li ser pirr zêe binivîsêne û werêne ser ziman. Ev yek, bo kurdan, ne tenê weke hizirkirinekê ya. Ji wê zêdetir, di vê demê de weke pêwîstînî û rewşeka zarorî ku divê ku fahm bikin a.

Li bakûrê kurdistanê, bi destê rêxistinên tundrew ku dewletê weke "rengê dewleta hewrast" bi rêxistina, li dijî kurdan bi vê rengî dihên bikarhanîn. Li bakûrê kurdistanê, piştî ku rêberê gelê kurd pêvajoya çareserîya demokratik da destpêkirin, dewletê jî giranî da pêşxistina van politikayên xwe ên qirêj li dijî kurdan.

Pêvajoya ku em nûha di wê de di meşîn, bo kurdan giring a. Kurd, di vê demê de, çendî ku bi rêxistin û di yekbûnê de bin, wê ewçendî serkevtî û li pêş bin. Wê destkevtîyên hingî zêde bibin û wê karibin wan biparêzên. Yekbûn, di vê demê de, ji kurdan re weke nan û avê giring û pêwîsta. Bi wê, tenê û tenê dikarin serbikevin. Ji ber vê yekê ya ku dewletên herêmê giringiyê didina wê ku kurdan di aliyê sîyesî de ji nava wan ve bikina qat. Li rojavayê kurdistanê hinekî ev pêşxistin. ENKS´, hinekî jî bi destê rejima tirk û piştgirîya rêveberîya kurd a başûrê kurdistanê hat avakirin. Yanî, ew rêxistin, ne ya kurd a. Ew bi destê hêzên ku dixwezin dîa bêstatû bihêlin hatîya avakirin. Nûha jî, li ser wan re jî, gotinên xwe yên dijberîya kurdan didin gotin û politikayên xwe ên qirêj û qamar dikin. Ev pêvajo, di vê temenê de, divê ku mirov bo wê gotinekê bibêje ku çend ku di nava kurdan de li rojavayê kurdistanê weke ku dû-qatkirin bûbe jî, di aslê xwe de em nikarin bi vî rengî şîrove bikin. Ji wê zêdetirî, dema ku em ji aliyê zihniyetê ve binerin, em dibînin ku li aliyekî kurd hena û li aliyên din jî hêz û dewletên herêmê ku li dijî kurdan şer dikin û dixwezin ku kurdan bêstatû bihêlin hena. Çend kurd, wan hildabibina li rex xwe, ev nayê wê wateyê ku ew kurd in. Di aslê xwe de, şaşîya herî mazin li vir, divê ku mirov bibêje ku heya. Ewên ku di bin navê ENKS`ê de hatina bi rêxistin, çend ku hinek ji wan bo´i koka xwe kurd jî bin û zimanê kurdî jî bikarbênin jî, ew ne kurd in. Ew dijminê kurd in. Li dijî statûya kurdan in. Weke ku çawa ku tirkiya statûya kurd bi mirina xwe dibîne, ev hêz jî pêşketina rêveberî û statûya kurd, ku kurd jî bi mirina xwe dibînin.

Li kurdistanê, ev dordor, li dijî kurdan bi vê rengê, di nava şer de na. Li rojavayê kurdistanê, xweserî û rêveberîya rojavayê kurdistanê, ne tenê ya rojavayê kurdistanê ya, ya hemû kurdan a. Di serî de, divê ku kurd bi vê rengê wê bibînin û xwe ji wê berpirsîyar bibînin û di warê parastin û pêşxistin û bi rêxistina wê de xwedî kar û erk û wasif bin. Divê ku ew xwe bi vî rengî bierk, kar û wasif bibînin. Ev, bo her kurdî sedema hebûn û nebûnê. Çawa ku hêzên serdest, statûya kurdan, bo xwe sedema hebûn û nebûnê dibînin, divê ku kurd jî bo xwe hebûna wê sedema hebûn û nebûnê bibînin û bi wê têgihiştina bo parastin û pêşxistina wê di nava kar û erk û wasifiyê de bin. Divê ku ne hêlin ku tişta ku hat serê komare kurd a Mihabadê were serê wê. ..

Li vir, dixwezin ku ez vê jî bibêjin, ji ber çi herî zêde piştî denezendina rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê li bakûrê kurdistanê pîrozbahî hatina li darxistin? Tenê sedema wê ew ku ew kurd in dixwezin ku piştgirîyê bidin? Ne tenê ev a. Ji wê zêdetir, ew a ku herî kêm hemû malbatên bakûrê kurdistanê xizmekî wan li rojava heya. Yanî, ew malbat in. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî lê binerê. Dema ku sînor di nava rojava û bakûr de hat xizkirin, malbat hatina qatkirin. Divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman.

Rojava, serkevtina wê, wê bê wateya pêşxistina çareserîya pirsgirêka kurd li bakûrê kurdistanê jî û li rojhilatê kurdistanê jî. Ji ber ku rastî ev a, êdî di serî de, di vê demê de herî zêde Îran û tirkiya di temenê pirsgirêkê de nêzîkî hevdû dibin û li ser pirsgirêkê di nava xwe de danûstandina di nava hevdû de dikin. Hinekî jî, divê ku em çerçoveya gera T. Ardogan li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje.

Li vir, tiştekî pirr bale min kişand. Ew jî, ew bû ku Pişt 77 salan carek din rayadarên tirk û Îranî ji ber çi li qasra Sadabadê bi hevdû derketina berçapameniyê? BI wê re xwestin ku çi peyamê bidin? Ev ne care pêşîya ku rayadarên Îran û tirk dihên li ber hevdû. Lê vê carê bo çi bi teybetî Qasre Sadabadê hilbijartin.? Bersiva van pirsan, bo dayîna wan, divê ku em herina berî î ro bi 77 salan yanî li sale 1937´an ku di wê de "paxta Sadabadê" hat li darxistin. Li vir, di vê dema ku konfaranse Cenevê di wê de dihê li darxistin û ku baxt û pêşaroja kurdan jî di wê de dihê kifşkirin de, Rayadarên tirk diçina Îranê û bi hevdû re di qasra Sadabadê de dihêna cem hevdû û bi hevdû re li wir derdikevina berçapameniyê. Wê derfeta li darxistina paxtaka din a ´paxta sadabadê´ a duyemin wê hebe? Bêgûman, ya ku weke ku dihê xwestin ku were kirin ev a.

Pirsgirêka kurd, di vê temenê de, divê ku mirov fahm bike ku di vê demê de bo çareserkirina wê li darxistina ´kongira netewî a kurd´ dibê weke aliyekî bingihînî û jîyanî. Rêberê gelê kurd, ji ber ku vê yekê pirr vekirî dibînê, êdî pirr zêde li ser li darxistina kongira netewî a kurd dirawastihê. Ji ber ku pirr giring a. Ji vê aliyê ve jî divê ku mirov li ser kongira netewî a kurd bisekinê û hewl bide ku wê fahm bike. Dema ku berî li darxistina konfaranse Cenevê a duyemin, ku dema ku kongira netewî a kurd ku ketibû rojevê de ku hatiba li darxistin, bêgûman wê î ro kurd ne di vê rewşê de ban. Vê jî, divê ku mirov bi teybetî û giringî kifş bike.

- Ku rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê baş û qanc were fahm kirin, divê ku mirov bibêje ku kurd dikarin wê erk û kar û wasifiya ku wê bi kongira netewî a kurd´ re bihata li cih, dikarin bi wê rêveberîya rojavayê kurdistanê re wê bênin li cih. Li vir, pirsgirêk, ew a ku bi kîjan zihniyetê mirov nêzîkî wê bibê ya. Dema ku kurdekî ku piçekî jî zanîna civate wî û dîroka wî bi wî re hebe ku di wê çerçoveya kurdewarîya xwe de wê nêzîk bibe. Tenê, ev nêzîkî dibe bes ku rêveberîya rojava bê kirin temenê yekbûna kurdan. Li vir, di aslê xwe de karekê mazin ê bi erk dikeve ser milê rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê de jî.

Rêveberîya başûrê kurdistanê, di vê demê de ket nava helwesta ne baş de li dijî wê. Ev jî, di temenê têkilî û girêdanên wê ên bi peymanî ku bi rêveberîya tirk û îranê re çêkirina re bû. Derket dervî wê. Lê li vir, divê ku em bibêjin ku sazîyên kurd ên başûrê kurdistanê jî, di wê warê de kêm man ku di nava gelê kurd ê başûrê kurdistanê de tevgereka lê xwedî derketina a li rojavayê kurdistanê ku pêş bixin. Her wusa, di vê warê de, divê ku karek were pêşxistin. Ev jî, wê temenekî baş bê bo pêşketina kurdan û şikandina wan nêzîkatîyên ne baş ku rêveberîya kurd dide nîşandin jî. Di serî de, divê

ku bi rêya gel û civatî êdî politika bi vî rengî were dayîn kifşkirin. Li başûrê kurdistanê, gelê kurd ê başûrî divê ku dakeve qadan û bi xwepêşandinên xwe hem helwesta rast bide nîşandin û hem jî divê ku li rêveberî rojavayê kurdistanê xwedî derkeve. Bi wê re jî, êdî di vê demê de, êdî civate zane divê ku were pêşxistin. Ji xwe, civatek bi andamên xwe re bi zanebûn bû, wê karibê êdî pirsgirêkên xwe jî bide çareserkirin û wê ew bixwe rêya rêveberîyên xwe jî bide dîyar kirin.

Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku çapameniya kurd jî, divê ku tenê zimanê kurdî bike zimanê xwe yê ragihandinê û bi vê rengî di nava rêxistina civate xwe de kar bike. Di vê warê de divê ku berpirsîyarîya xwe werêne li cih. Di vê demê de, çapameni, ez divê ku bibêjin ku pirr lawaz û kêm maya li ber pêşketinên dîrokî ên ku pêşaroja civate kurd jî didina kifşkirin.

di vê demê de, hemû peyman dihên nûkirin. Wê di temenê têkiliyên nû ên ku werina danîn û pêşbikevin de wê statû jî pêş bikeve. Bo vê yekê, di nava têkiliyên ku werina danîn de, minaq platformên weke konfaranse Cenevê û hwd de, dixwestin ku kurd dervî wê were hiştin. Bo ku kurd, di nava têkiliyên dema nû de nebiin, ev hewldan hatina pêşxistin. Di vê temenê de, dihên bi ser kurdan de. Di vê temenê de dijberîyê li dijî rojavayê kurdistanê dixwezin ku pêş bixin û herina bi ser wê de.

Giringîya rojavayê kurdistanê û avakirina xweseriya wê ya ku hatî denezendin, bo kurdan û herêmê pirr giring a. Divê ku mirov bibêje ku kurd, çendî ku karibin rêveberîya rojava bi parêzên û pêş bixin û barî beşên din ên kurdistanê bikin, wê di pêşketina civate kurd de jî û her wusa di çareserkirina pirsgirêka kurd de jî pêş bixin. Ev yek, weke aliyekî giring û derfetaka dîrokî jî di dêne ber hemû kurdan. Kurd, di vê warê de, li rojava modale xwe ya rêveberîyê hanîna ser ziman. Her wusa, li wir rêveberîya xwe jî ava kirina. Li başûr jî bi hemû kêmesîyên xwe re rêveberîyek kurd li başûrê kurdistanê jî heya. Kurd, ku yekbûnekê di nava xwe de çê bikin, wê rêveberî û pêşketina van herdû beşan bikina xizmeta çareserkirina pirsgirêka kurd li bakûr û rojhilatê kurdistanê jî. Bo vê yekê, derfet û firsand, ji herdemê zêdetir ji wan re afirîya. Lê kurd, vê yekê bikarneyênin, wê dîrok jî wan afû nekê.

Pirsgirêka kurd, di vê demê de bi denezendina rêveberîya rojavayê kurdistanê re ket pêvajoyaka nû de. Hêzên herêmê ên ku naxwezin ku pirsgirêka kurd were çareser kirin, heya ku pêngavên hêrîşê ên nû û mazin jî li dijî kurdan bidina destpêkirin. Divê ku mirov ji vê yekê re jî amede bê. Lê bi wê re jî ku kurd yekbin, wê di vê demê de pêşaroja xwe bi destê xwe bidina kifşkirin û maf û azadîya xwe bidest bixin. Ev jî, di vê demê de weke derfetekê ketîya destê wan de. Li kurdistanê, bi teybetî li bakûrê kurdistanê baxt(qadare) pêvajoya çareserîyê jî bi serkevtina rojava ve girêdayî ya. Divê ku em vê yekê bi teybetî werênina ser ziman. Pirsgirêka kurd, gelek pirsgirêkên civatî di nava civate kurd de afirandina. Ev pirsgirêk, divê ku divê demê de werina buhurandin û ji rojeve derxistin.

Li rojava, statûya ku kurda bo xwe û xalkên din ên herêmê bi statûkirin û birêveberî kirin, giring û dîrokî ya. Bo demokratizekirina herêmê jî wê giring bê. Lê li rojava ev pêşket û bû malê dîrokê. Êdî pêşîya wê û pêşketina nayê girtin. Hêrîşên mazin ku li wê beşê û civate kurd jî werina kirin, wê pêşîya wê nikaribê bigrê. Gelê kurd, di pêşengîya rêveberê gelê kurd û felsefeya wî de bûya xwediyê xwe bi rêxistin û zanebûn kirîya. Î ro li rojhilat, di vê temenê de, divê ku em bibêjin ku civate herî birêxistinkirî û bizane a kurd a. Tevî ku hemû hêrîş li wê dibin û hêrîşên li wê bidawî nebûna jî, wê ev bi xwe

pêşxistîya û derxistîya astaka bilind.

Rêveberîya rojavayê kurdistanê, ku hemû hêzên kurdî ku bi rastî li gorî berjewendîyên kurd tevbigerihin ku li dora wê bicivin, wê ew rêveberî û pêşketina rojava, karibe bibe platformaka civatî ku yekbûna kurdan û civate kurd çêbike bê. Ji xwe, bi bakûrê kurdistanê ew ew çêkir. Başûrê kurdistanê jî, pirranîya partî û sazîyan piştgirîya xwe ji rêveberîya xweser a rojava re hanî ser ziman. Tenê, ya ku ne hanîya ser ziman, PDK ya. Lê li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku tenê bi hanîna ser ziman a piştgirîyê de bi sînor nemênin. Ji partîyên başûr jî bakûr jî ku divê ku dayimî bi rojava re bin.

Rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê ku di roja salwegera komare kurd a Mihabadê de hat denezendin, dema ku mirov bi têgihiştina dîrokê re lê dinerê, dema Medîya û rewşa bajar-welatên dema Sûmerîyan û hwd dihêne berbîra me bi têgihiştinek nû a hemdem û demî.

Rêveberîya kurd a rojavayê kurdistanê, mirov dikarê bi du-dîmenî wê fahm bike. Yek, ku dikarê weke welatekî di çerçoveya civatekê û xalkekê de xwe bi rêxistin bike ya. Dîmenê duyemin jî, ku di nava sînorê welatekî de bêî ku sînor werina guharandin ku di hundur de hemû cihrengîyên kêmnetewî, olî û hwd, ku hena ku karibin xwe birêxistin bikin û bi rêve bibin û Azad bijîn. Ev rewş, herdû jî bi wê re hena. Di vê temenê de, temenê wê ne li ser temenê avakirina dewletekê ya. Temenê wê li ser hebûna gelan, pêşxistin û maf û azadîya gelan a. Bi wê re, ku sînor û astang ji pêşketina civatî a gelan û xalkan re tûna bê. Divê temenê de divê ku mirov nêzîkî wê bibe. Bi wê re, bi têkiliya mirov a bi hewirdora mirov re jî, di temenê bi nirxkiirn û parastinê de ya.

Kurdan, giringî û wateya pêşketin û rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê dîtina û hîskirina. Lê hê bi tememî dernexistina têgihiştinê. Divê ku bi tememî derxina têgihiştinê. Hingî, wê karibin, zêdetirî lê xwedî derkevin û biparêzên û pêşbixin. Bi teybetî, li rojavayê kurdistanê pêşî avakirina wê rêveberîya kurd jî, giringîya wê ji aliyê dîrokî û mejûya civate kurd ve jî ew a ku ew herêmên rojavayê kurdistanê navend bûn ji pêşketina hûrî û mîtannîyan re. Hûrî û mîtannî jî, kurd bûna. Dema hûrîyan jî û dema mîtannîyan jî, em dikarin di temen û têgihiştina hemdem de wê hildina li dest û fahm bikin. Zaneyên dema Mîtannîyan ên weke Mîtra û hwd, wê bi hizir û pêşketina xwe re pêşketin û rengê pêşketina felsefekî ên piştre jî bide kifşkirin.

- Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov bibêje ku "şerê di nava AKP`ê û Cameatê" de, weke ´şerê deronî ê li sser çapameniyê ya li mejiyan bû û di temenê mûdahaleyeka li pêvajoya ´çareserîyê´ de bû. Piştî nemaya rêberê gelê kurd birêz Ocalan di newroza 2013´an de pêvajoya aşîtî û çareserîya demokratik da destpêkirin û pê de, hikimet û dewleta tirk, di temenê mudahaleyên li pêvajoyê de gavavêtin. Di destpêka pêvajoyê de, demekê pêvajo bi navê "pakêtê" pêvajo mijul kirin. Piştî ku pakêt jî, hat vekirin hat ditin ku di wê de ti tiştek tûna ya, êdî piştre dewletê bo ku pêvajoyê li gorî ve bi rê ve bibin, êdî ev pêvajoya ´şerê di nava AKP´ê û cameatê´ de hat dayîn destpê kirin.

Li vir, divê ku di destpêka nivîsê de, ez balê bikişêneme li ser vê xalê. Tevî ku bahse "dewleta hewrast(peralal)" dihê kirin jî, ji kirinên wan ên li dijî kurdan ti kêmbûn nebûna. Vajî wê, zêdebûn bûna. Heta roja me, hertimî cameat, ji aliyê dewletê ve li kurdistanê li ser serê kurdan hat bi rêxistin kirin. BI destê wan, bi hezaran kurd qatil kirin. Herî dawî, provakasyona li Lîcê, divê ku mirov bibîr bixe. Ku bahse ´dewleta hewrast´ bêkirin, tenê mirov li vê provakasyona li ser "huda-par"ê re dewletê pêşxist,

divê ku mirov bibîr bixe. Weke van rêxistinên bi navê ´huda-par´ê ên kujar, ku destê wan di xwûna kurdan de sor bûya, bi dehan rêxistinên ku li kurdistanê li ser serê kurdan hatina avakiirn û bidestê wan bi hezaran kurd qatil kirina. Ji xwe, di dema şerê navxweyî ê di Sûrî de jî, ´ev rêxistinên hewrast´, hatina bikarhanîn bi destê wan bi sadan ciwanên kurd jî hatina xapandin û hatina şandin li Sûrî û li dijî kurdan bixwe jî dane şer kirin. ..

Li vir, bi vir ve girêdayî divê ku mirov bibêje ku hemû rêxistinên dewletê ên ku wê avakirina bo domandina şerê dewletê ê li dijî kurdan, rêxistinên ku mirov dikarê weke rêxistinên dewleta hewrast şîrove bikê na. JI xwe, divê pêvajoya ku bahse "hewrastîtîyê" dihê kirin de, ev rêxistinên ku weke rêxistinên hewrast ku şerê dewletê ê li dijî kurdan meşandin û dimeşênin, bahse wan jî nakin. Lê li vir, divê ku mirov bibêje ku çend bi gotina "dewleta hewrast(peralal)" re tenê navê Cameatê tê ser ziman jî, divê ku mirov bibêje ku Cameat, tenê rêxistinek ji wan rêxistinên hewrast(peralal)a ku dewletê bidestê xwe avakiriya û ku li ser wê re ku li dijî kurdan bê û ankû komên din ên civakî û hwd bin, şerê xwe daye û meşandîya. Di vê rewşê de, Cameat, dikeve rewşa ´tetîkkêşekî" de. Lê zihniyet û kesên ku ew avakirina û ên li piştperde jî, hê jî li cihê xwe rûniştîna û dihizirin ku cameat ji holê rakirin wê çi li dewsa wê bicih bikin.

Li kurdistanê ev rêxistinên hewrast, bi du rengan hena. Yek, ku lingekî wê li ser aşîrîyê hat avakirin ku di ancama wê de bi deh hezaran cerdawan hatina derxistin û li holê û ku bi wan şerekî bi destê hin kurdna bi kurdan civate kurd re meşandin. Lingê duyemin jî, her wusa li ser olê re ku berê bi navê "hizbileh" ku di nava kurdan de bi navê "hizbil-kontra" tê binavkirin û nasîn û ku di roja me de weke rengekî hizbil-kontra ku ji wê perisî û hatîya peresendin ´huda-par´ û hwd, heya. Ev lingê duyemin jî, di temenê wê de ol weke amûrekî hat bikarhanîn. Ol, li dijî kurdan û civate kurd wê çawa bi rêxistin bikin, li ser van rêxistinên weke ên fethullehçîyan û huda-par´ û hwd re ceribandin.

Î ro jî, di pêvajoya çareserîya demokratik ku rêberê gelê kurd birêz Ocalan daye destpêkirin de, herî zêde ev rêxistinên ku li kurdistanê li ser serê kurdan hatina avakirin û ku em dikarin weke "rêxistinna hewrast(peralal)" bi nav bikin, li ser wan re şerê dewleta tirk ê bi kurdan re meşandin. Ev rengê rêxistinîya hewrast a li kurdistanê, ji xwe re bahse wê jî nayê kirin. Ti gotin, divê demê de bi wê û kirinên wê ên li kurdistanê re nayê ser ziman. Ev jî, dide nîşandin ku li ser şerê qaşo di nava AKP´ê û cameatê re aliyê baş û aliyekî xirab biafirênin û bi vê rengê li gorî xwe berê herkesekê bidina aliyekî û ku li gorî wê ancam bidest xistin jî, êdî li ser wê re di vê pêvajoyê de derbeyê li kurdan bixin. Ya ku heta nûha dihê kirin ev a. Ji xwe, ev şerê qaşo di nava AKP´ê û cameatê de jî, weke ku herkesek rola wan hatîya kifşkirin, û herkesek rola xwe dileyizê bi rêve diçê. Di aslê xwe de, hebûna vê "şerê di nava AKP´ê û cameatê jî, divê ku em weke mudahaleyekê li vê pêvajoyê û birêveçûyina wê jî bihasibênin.

Bi wê gengêşî û "tengezarî(kriz)ya" ´sûnî´ ku qaşo di nava AKP´ê û cameatê de ya, bi wê re pêvajoyê li gorî xwe di temenê nêzîkatîyaka mijulkirinê û xapandinê de bi rêve dibin. Ya ku divê ku mirov vê yekê bibîne Ji xwe, heta nûha bo temenê pêvajoyê û hevdîtinên bi rêveberî gelê kurd birêz Ocalan re ti temenê destûrî û zagonî ne hatîya çê kirin. Yanî hemû pêvajo, di vê demê de, tenê li ser pişta rêveberî gelê kurd, tevgera azadîya kurd û gelê kurd bixwe meşîya ya. Tevlîbûna dewletê a li wê, ne di temenê pêşxistinê de ya. Tenê di temenê ku bi hin hewldanna dixwezê ku ji wê li gorî xwe sûd

vergirê de, nêzîkî pêvajoyê dibe. Bi vê yekê re, dewlet, ne weke aliyekî pêvajoyê, lê weke aliyekî ku dixwezê ku li gorî berjewendîyên xwe ji wê sûd bigrê û li gorî xwe îstismar bike û bikarbêne tevigerihê. Nêzîkatîya dewletê ev a.

Ev pêvajo, bi kedaka mazin li ser milê rêberê gelê kurd meşî. Lê pêvajo, hê jî, yekalî dimeşê. Tenê, gavên ku aliyê kurd û tevgera azadîya kurd avêtina hena. Ji wê û pê de, heta vê kêlîkê jî, dewletê ti gav neavêtiya. Tenê, tişta ku nekerî ku hinek dordor weke gavavêtinê jî şîrove dikin, di temenê redkirinê de gotin ji devê rayadarên wê derneketina. Lê di nêzîkatîyê de jî, bi oparasyonên di bin navê KCK´ê de bin û girtina sîyesetmederên kurd bê û hwd, dewletê hertimî di temenê xitimandina pêvajoyê de gavavêtîya.

Tenê, ji newroza 2013´an û heta roja me, li çend bajar, bajarok û navçeyên kurdan oparasyonên di bin navê KCK´ê de hatina li ser xistin? Di ancama wan oparasyonên malan ên çavtirsandinê de, çend kurd di vê pêvajoyê de hatina girtin û avêtina zindanan? Tenê ku mirov li vê rewşê jî binerê, mirov wê piretika dewletê li gorî pêvajoyê û gîyane wê nebînê. Ji bilî wê, ji xwe bi dehan caran bahse çêkirina qarakolan û bendavên bi armaca leşkerî jî hatiya kirin ku dewletê di vê pêvajoyê de giranî daye çêkirina wan. Pêvajo, di vê temenê de, aliyê wê yê li ser çapameniyê re ku dewlet şerê xwe yê sûnî, ê ku li ser AKP-cameatê re dimeşêne, wê jî di temenê mudahaleya li wê ya. Bêgûman, aliyekî wî şerê ê li ser parvakirina desthilatdarîyê û berjewendîyan û hwd re heya. Lê aliyê wê ê herî giring û mazin û li berçav jî, di vê temenê de, di temenê mudahelaya li pêvajoyê ya. Ku mirov, di temenê "şerê teybet" û ankû "şerê derûnî" de jî, vê şerê di nava AKP-cameatê de şîrove bikin ji aliyê wê yê di temenê mudahaleya li pêvajoya çareserîyê de wê rast bê. Di vê temenê de, bi teybetî, ji aliyê mudahaleya wê ya li pêvajoyê ve divê ku mirov vê pêvajoyê û ankû ev şerê qaşo di nava AKP´-cameatê de şîrove bike. Divê temenê de, nêzîkatîya wan ya di hilbijartinan de li ber kurdan jî di vê temenê de ya. Di hilbijartinan de, dixwezin ku aliyê AKP´ê, weke aliyê ku di xwezê pêvajoyê biserbixe bidina nîşandin û bi wê re berê kurdan bidina wir û di nava kurdan de li ser wê re qatbûnê(perçebûnê) bidina çêkirin û êdî xwe di vê pêvajoyê de li dijî kurdan biserbixin. JI xwe, aliyekî vê şerê AKP-cameatê, bi hilbijartinan ve ji vê aliyê ve girêdayî heya. Ya ku kurd, divê ku bibînin û fahm bikin jî ev a. Ji vê aliyê ve jî divê ku em hinekî li ser pêvajoya qaşo ´şerê di nava AKP-cameatê de bisekin in.

- Kurd,, divê demê de di pêvajoyeka giring de di buhur in. Di vê pêvajoya giring de, pirr giring a ku rojeve wan jî di destê wan de bê. Divê ku di vê demê de, hemû hey û heyîderîya xwe bidina ser rojeveyê kurdistanê û pêşxistina rêveberî û statûya wê. Ne tenê kurdên rojeve, her wusa kurdên rojhilat jî, başûr jî û bakûr jî, divê ku rojeve wan statû û pêşveçûnên rojavayê kurdistanê bê. Ev yek, pirr giring a. Li bakûrê kurdistanê, kurdan weke ku rojeve xwe hinekî ji dest berdane na. Di vê demê de, ev "oparasyonên" qaşo ku li ´cemaatê dibin, aliyekî wan ê giring jî ew a ku bi wê dihê xwestin ku rojevê bidina kifşkirin. Bo vê yekê, di serî de, ji vê aliyê ve, divê ku mirov weke mudahaleyekê jî li rojevê bibînê û lê binerê.

Di vê demê de, nîqaşên li ser firîwîya T. Ardogan û ankû ya Gulen sekin in, wilqsî divê ku mirov nekê rojevê di nava kurdan de. Şopandina wê giring a. divê ku were kirin. Lê divê ku weke rojevekê di nava kurdan de, newê bicih kirin. Dema ku ev were kirin, wê kurd, hingî ji rojeve xwe dûrkevin. Di serî de, li bakûrê kurdistanê, serokê gelê kurd Birêz Ocalan, pêvajoya ku daye destpêkirin heya. Ev pêvajo, divê ku bi teybetî, li ser

rojeve wê were sekin in. Divê ku ev ji rojevê dernekeve. Ji xwe, weke ku bi van nîqaşên li ser firîwîya camaatê û T. Ardogan û hikmeta wî û hwd, aliyekî wan ê nîqaşkirin ku lli ser çapameniyê re pirr zêde dihê xwestin ku were nîqaşkirin, armancaka wê ya bi armanca mudahaleya li rojevê heya. Divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê.

Bi vê re jî, li kurdistanê, rojeva civate kurd û kurdistanîyan divê ku pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan daye destpêkirin û statûya rojavayê kurdistanê bê. Hikimet û T. Ardogan û cemaat jî, ji aliyê zihniyetê ve ti farq di nava wan de tûna ya. Camaat, dibêje ku ´min zêde kurd kuştina, ji ber vê yekê mafê desthilatdarîyê ê min a.´. T. Ardogan û hikimeta wî, dibêje ku "min zêde girtina, mafê min a." Bi vê yekê, êdî bi hevdû ketina. Destê herdûyan jî bi xwûna kurdan sor bûya. Di vê demê de, ev oparasyonên ku tên gotin ên li dijî camaatê na, dikina cihê oparasyonên ´erganekon´ê. Ên ku di dema berê de, girtina jî di bin navê ´erganekon´ê hatina girtin jî, hemû êdî dihêne berdan. Li cihê wan jî, çend camaatîyan bo demekê wê bicih bikin û demekê bi wan û ku vekin bi dozên wan re wê demê bi buhurênin. Lê ew jî, wê piştre werina berdan. Ev listik û kiryarên ku di vê demê de bi vî rengî di bin navê "oparasyonên li camaatê" û hwd de ku dihên kirin, bi armanca xortkirina serdest pergale metinger di dema nû de li ser serê kurdan a. Yanî, ji xwe gotinên ku ji devê rayadarên dewletê dihên û derdikevin jî, di temenê wê de na. Li vir, kurd, divê ku rojeve xwe nekina kurban li vê rojeve ku dewlet bixwe jî dixwezê ku bike rojeve hemû kesî û pêvajoyê bi wê re dêne li tihêle.

Gotinên ku di vê pêvajoya qaşo oparasyonên li dijî camaatê dibin de ku tên ser ziman jî, di temenê zihniyeta înkare kurdan de na. Divê ku mirov vê yekê jî binxatkê û werêne ser ziman. Gotinên ku di nava sîyesetê de dihên ser ziman, di wê temenê de kirina sîyesetê û mejiyê rayagiştî jî didina kifşkirin. E bi vir ve girêdayî bibêjin ku derûnîya ku di nava rayagiştî de dihê afirandin jî, ne derûnîîyaka ku baş ku em dikarin di temenê rastîya pêvajoya ku aliyê kurd û birêz Ocalan daye destpêkirin de ya. Bi tememî vajî wê ya. Li ser vê derûnîyê re, temenê pêvajoyên nû ên şer jî dihên avêtin. Ji xwe, pêvajoya ku dihê gotin hatîya destpêkirin, ti temenê wê ê destûrî tûna ya. Bo vê yekê, divê ku mirov di vê demê de pirr bi heyîdarî tevbigerihê. Bi teybetî jî, kurd û sazî û sîyeseta wan di vê warê de divê ku rojeve xwe bide kifşkiirn û li ser wê re bimeşê. Ew rojeve ku da afirandin, bo civate kurd jî, wê li ser wê re temenê xweserîya demokratik a kurdistanî biafirêne û di wê de û di nava wê de rastîyên civate kurd û pirsgirêk û xwestekên wê bi zimanê wê werêne ser ziman.

Bi vê gûharandina rojevê ya li ser "oparasyonên qaşo li dijî camaatê", rojeve asil ya pêvajoyê ji xwe hatîya danîn li tihêle. Bi vê yekê re, ew weke rojevek duyem û ankû mijareka di nava rojeva ku hayî de dihê ditin û ser ziman. Ev, bi serê xwe berevajî kirina rojevê ya. Divê ku ev di serî de were ditin. Ev oparasyonên ku dihên kirin û nîqaş kirin, çend ku çend gotinên birêz ocalan jî bo ku balê bikişênina li ser ên weke "dewleta hevrast" bikardihînin jî û çend ku di rastiyê de dewletê bixwe di nava xwe re rêxistinên bi vî rengî ava kirina ku li dijî kurdan şer bikin û ku hena jî, lê dîsa di vê demê de ne di temenê hanîna li ser ziman ya rastiyê de wan nîqaşan didina kirin. Di dema kirinên qaşo "oparasyonên erganekonê" de, weke ku hat gotin ku "ne buhurîna li wî aliyê din ê firatê." Ji xwe hemû komkujiyên ku li wir kiribûn li wir bûn. Gunehên ku kiribûn li wir bûn. Heman tiştî em dikarin bo camaatê jî bibêjin. BI deh hezaran ciwanên kurd bi destê camaatê û rêxistinên wê hatina qatil kiirn. Ka yek jî, tê rojevê? Dema ku kurdan, bixwe

rojeve xwe kifşkiriban, wê di nava xwe de, ku weke bersivekê ji wê re ba, wê ew bihanîyan ser ziman.

Li vir, di serî de, divê ku ev alî werina ditin. Divê ku bê zanîn ku "sa pêl dûvê sa nakê." Ne camaat wê pêl dûva T. Ardogan û rayadarên ên hikimetê bike û ne jî wê ew pêl dûvê camaatê û ên li serê ku biryara komkujiyan didan wê bikin.

Li vir, divê ku mirov vê jî bibêje ku weke ku çawa ku nûha weke ku di temenê "dijberîya hevdû de" gotinên dibêjin, wê siba li ber kurdan dîsa ên ku wê destê wan di hevdû de bê wê ew bin. Dîsa wusa ya. Nûha, di vê pêvajoyê de jî, çend ku tê gotin ku oparasyonên li dijî camaatê dibin, li kurdistanê guharînak dibê? Na, ti guharîîn nabin. Dîsa oparasyonên qirkiirna sîyesî ên girtina sîyesetmederên kurd didomên in. Dîsa hêrîşê dibina bi ser kurdan de. Dîsa, zimanê kurdî qadaxa ya. Dîsa, pergale asîmlekirinê ji heyîn û reng û hebûna xwe ku ti tiştek winda nekirî dide domandin. Divê ku mirov vê yekê di serî de bibîne û bibêje. Sazîyên camaatê ên ku li kurdistanê, li Amedê, Merdînê, Êlihê, Sêrtê, Sirnaxê û hwd, ku hena û heta nûha li dijî kurdan kar dikin, dest jî li wan hatîya xistin? Bi dehan dibistanên bi rengê "îmam hatip"an ku sazîyên camaatê li tenê li amedê vekiirna û hê di destê wê de na, destê li wan hatîya xistin. Li Dersimê, malên camaatê ên ku vekirina dest li wan hatîya xistin? Ev pirs û gelek pirsên din, ji xwe ti kesek nayênê rojevê jî. ..

Di vê dema ku tê gotin ku li dijî camaatê oparasyon tên li darxistin jî, saziyên camaatê li bajarên kurdistanê ên weke amedê, êlih, merdînê, Sêrtê, û hwd li hemû bajarên din jî, alikarîyê ji çeteyên ku li rojeva li dijî kurdên rojavayê kurdistanê û statûya wan didina şerkirin re dişênin. Sazîyên camaatê, ên ku mirovan ji wan çeteyan re dibînin û perwerde dikin û bi wan komkujiyan didina kirin, ji xwe yek jî ji wan nayê rojevê. Ji ber ku , weke ku rayadarên dewletê jî dibêjin ew "Sur(nepenî)a dewletê" ya. Ew ´sura dewletê´, hê tê parastin. Ne zêde demek dirêj, hefteyek berê ´tir´ên tişî çek ku dişandina ji çeteyên ku li dijî rojava şer dikin re hatina kifşkirin. Destê camaatê jî, di wan de heya. Çend ku bê gotin ku ´di ancama şerê wan ên navxweyî de hatîya kifşkirin´ jî.

Bo vê yekê, pirr giringa ku kurd divê ku rojava xwe bidestê xwe kifş bikin û giranîya xwe bidina wê. Divê ku pêvajoya xwe ya dane destpêkirin, wê xort di rojava xwe de bigrin. Divê ku statûya rojavayê kurdistanê, xort di rojava xwe de bigrin. Divê ku tekoşîna xwe ya azadîyê a demokratik di rojava xwe de bigrin. Hê xorttir divê ku di rojava xwe de bigrin. Ji van pêve, divê demê de divê ki ti rojevên sereke ên di nava kurdan de tûna bin. Weke ku çawa ku kurdan di destpêka pêvajoya Sûrî de, "rêya Sêyemin" bijartin û kirna piretikê de, divê ku li bakûrê kurdistanê jî, wê bikin. Ya ku wê ji wan re bide qizinckirin, wê ev bê. Di vê demê de çar rojevên giring ên kurdan divê ku ti tişt derkeve li ppêşîya wan. Yek, statûya rojavayê kurdistanê ya. Ya din, pêvajoya ku serokê gelê kurd birêz ocalan daye destpêkirin a. Ya sêyemin divê ku ew bê ku hemû kirinên dewletê ên ku li dijî kurdan di roja me de ku dikê di demên buhurî de kirina, weke komkujiya roboskî, komkujiya kurdan a li Parîsê ku di wê de sê jinên kurd bi namerdane hatina qatil kirin bê. rojava çaremin jî, ku serokê gelê kurd birêz Ocalan jî di nav de azadîya hemû kurdên di zindanên rejima tirk de na, bê.Ji van pêve, ti rojev bo kurdan ne rojev a.

**Pêvajoya duyem a hêrîşên li şoreşa rojava, bi hêrîşên DAÎŞ´ê re pêl bi pêl û dem bi dem dan destpêkirin. Bi hêrîşên DAÎŞ´ê re, ew modela rêveberîyê a kurd û bi wê re pêşketina kurd ku li ser wê ew temen hatîya avêtin hat xwestin ku were ji holê rakirin.**

Dema ku em di derbarê demên sumerîyan de dinivîsênin, em bahse serdemek ku ne bin 5 hezar salan re ya dikin. Di derbarê vê demê de jî, zanebûnên ku hena jî, li ber wê dîroka dirêj, weke ku nn a. Yanî, wilqasî kêm in, dema ku em lê dinerin, em nikarin bi tememî, wê demê sîmset bikin li berçavên xwe bi wê. Î ro, hin bi hin, ji aliyê erkolojikî ve dihê ditin û kifşkirin ku ew "çolên Sahara" ku weke çolna ku tenê ´ji komê pêk tên´ in, berî î ro li dora 7 û ankû 6 hezar salan bi tememî ard û şînatî bûn. Î ro jî, ku binê wê komê weke 7 û ankû 8 metreyan dihê kolandin, ´harî´ û ´kevir´ û bermehîyên zanî û mezelên kevn derdikevin li holê. Bermehîyên ´seremîkan derdikevina li holê.

Li ser vê rewşa ku î ro ew çol hemû kom in jî, ya ku dihê ser ziman, ew a ku bi guharîn û zêdebûna germê li van herêman re kom zêde bûya û ew şariştanî û hemû di bin wê de mana. Her wusa, di van deman de, ji ber diclê û firatê ku herêmên şîn û dewlemend in, heta ku digihijê wan deveran, di nava şînahîyekê de mirov diçê. Her wusa, çemê nîlê bixwe jî, piştre hin bihin afirîya. Î ro, di hundurê çemê nîlê bixwe de jî, di bin avê de bermehîyên xanîyan dihên ditin. Ev jî, dide nîşandin ku nîlê bixwe jî, gelek herêmên şariştanî jî di bin xwe de hiştina.

Li gorî vê rewşê, dema ku em lê dihizirin, em dibînin ku ev herêm, hemû herêmên avî na. Di nîvê wê çola ku mirov car bi car ji têhna di wê de mirina jî, di bin wê de bi çend metroyan çemên avê diherikin. Ev jî, rewşek û dîmenek din bo herêmê û pêşketina wê ya şariştanîyên wê ên berê dide me. Her wusa, ev dide nîşandin ku şariştanîyên demên sûmerîyan, ji ya ku em dizanîn maztir û pêşketî hena.

Li herêmên weke ku li wan şariştanîyên sûmerîyan pêşketina ên berdiclê, mirov rastî xîz û dîmenkirinên mirovên "berî dîrokê"´ tê. Mirovê berî dîrokê, ên demên destpêka peleolîtikê û demên berî dema peleolitîkê na. Di van deman de, hizirkirin pêşneketîya. Mirov di şikeftan de dijîn. Hê çêkirina xanîyan jî pêşneketina. Di wan şikeftan de, li ser hêtan sûretên sawalan û hwd, bi xîzikan çêkirina. Li ber diclê û firatê mirov rastî van tê. Yanî, ev dem, bi gotinaka din, rastî dema mirovê ku dihizirê ê "homo-sampîens" tê. Ev nîşanakên vê demê ku tên ditin, hin bi hin li herêmên li dora misrê jî tên ditin. Heta ku li hin herêmna dihên ditin jî.

Rewş, di derbarê "demên berî dîrokê" ên ku li herêmê pêşketina jî hizirna di serê mirov de dide çêkirin. Hin bi hin ew "hîpotez"a ku bi hizir dihê gotin ku "mirovê ´homo sampîens´ û ên berî wî ku ji herêmên Afrîqa diherikin belev dibin û dihêna van herêman jî, hin bi hin dihê ditin ku li vê herêmê nîşanaka wê jîyanê li herêmê heya. Em nikarin, rewşên çolî ku î ro li rojhilat hena, weke rewşna mayînda ku di demên berê de hebûna jî, bi tememî şîrove bikin. Em dikarin ji demekê û pêde şîrove bikin û werênina ser ziman.

Ev tiştekî din jî, bi me dide têgihiştin. Ew jî, ew a ku rewşa diclê û firatê, ji ya ku em dizanîn cudatira. Her wusa, weke ku hin lingna wê heta ku bi wan çolan de jî

herîkîna wan dibêt ku hebe. Ev jî, qade ku em weke qadaka li dora çemê diclê û firatê ku werênina ser ziman, weke ku maztir dike. Bi vê re jî, dîmenekî din ê şariştaniyê dihêne li berçavan li herêmê. Her wusa, heta roja me, pirranîya erkologên rojava jî, pirranîya bale xwe dane ser ´pîremîdên´ misrê. Lê ev herêmên mesopotamiya, ji vê aliyê ve, weke ku pirr xîzan maya. Ti lêkolînên mazin ên cidî û erkolojikî li herêmê ne hatina kirin û di derbarê wan de ne hatîna ser ziman.

Ên ku hatina ser ziman jî, bi wan hatîya xwestin ku dîroka herêmê bi rengekî cuda werê nivîsandin. ew rengê cuda jî, zêde ne şibihê rengê jîyane herêmê û bermehîyên wê ên ku heta roja me mana. Î ro, li bakûrê kurdistanê, pirranîya herêmên ku bi vî rengî rejima tirk di bin avê de dihêne, herêmên bi vî rengî ku bi teybetî divêt ku lêkolînên mazin ên erkolojikî li wan werina kirin in. Lê tên tûna kirin. Weke herêmên balqîz, Zaûgma, Heskîf û hwd. Her wusa, herêmên rojavayê kurdistanê jî, bi wê re mirov dikarê bi heman rengî werêne ser ziman.

Ev herêm û gelek herêmên weke wan, ku î ro dibin avê de dihên hiştin, dîrokeka ku ser 10 hezar salan re ku me li şûn xwe hiştîya, di derbarê wê de wê zanebûnên mazin bidina me. Di serî de, divê ku mirov vê yekê bibêje. Ev herêmên ku î ro ji aliyê germê ve ku di havînan de, carna derdikeve ser 40 pîleyan re, di ancama guharînên di hewa û atmosferê de ku bûna dibê. Bi wê re jî, weke ku çawa ku ´çolên kûmê´ ên weke ´çolên Sahara´ û hwd, afirîna. Bi wê re jî şariştanî di bin wê de mana. Bi teybetî, ev sê û ankû çar hezar salên dawiyê hem di hewaya me de û hem jî di xwezaya me de, gelek guharîn bi xwe re hanîna. Piştre jî, şerên ku li herêmê hatina kirin û ku hê jî tên kirin ku em bi ser ve bikin, wê rewşeka gûharînê a mazin bixwe re bêne. Sê tiştan biteybetî, gûharîn daye kirin. Yek, bi vê rengê bi gûharînên di atmosferê de û zêdebûna germehîyê re ya. Ya dûyemin, bi xwezayê re ya. Ya sêyemin jî, şerên ku li herêmê bûna na.

Lê şeran ji herdû aliyên din zêdetir xirabîtî çêkirîya û gûharîn li herêmê daye kirin. Şariştan, hatina ji dîrokê birin. Î ro, ew berhemîyên ku em wan kifş dikin, hinekî divê ku mirov bibêje ku bermehîyên wan şariştanîyên ku hatina tûnakirin in. Bi teybetî di van du-hezar û pênc-sad salên dawiyê de, hîç şer ji herêmê qûtnebûna. Î ro jî, ew şer didom in li herêmê.

Ji ber diclê û firatê ku heta ku dighijê misrê û û hwd, weke qadaka bêj û şîn, ku mirov werêne berçavê xwe û mirov lê bihizirê ku di nava wê qade mazin de wê jîyanek çawa wê were avakirin, wê ev rengê hizirkirinê di derbarê jîyane wan demên buhurî de hizirna rast û baş di serê me de bide çêkirin. Ji xwe, nîşanakên wê hena ku bi vî rengî, ku herêmên ´çolên kûmê´ di nav de, weke herêmna mazin ku şîn û li wan şariştanîyên mazin ava hena na. Di vê temenê de, dema ku mirov dihizirê, mirov kifş dike ku jîyan bi xwezayê re pêşketîya. Lê bi wê re jî, pirr bi têgihiştin bûya. Weke van herêmên li ber diclê û firatê, li herêmên misrê jî, nîşanaka mirovên ku di şikeftan(maxarayan) dijîn dihê ditin. Ev jî, bi xwe re hizrên mazin ên di derbarê pêşketina jîyanê de bi xwe re bo van herêman di serê me de dide çê kirin.

Ev vê yekê jî, bi teybetî, binxatkin û bibêjin ku kifşên ku dihên kirin, dîroka herêmê ji destpêkê ve ji nû ve dide nîvîsandin. Di serî de, ev kifşên ku li ber diclê û firatê û bi teybetê jî ên ku di van demên dawiyê de ku li Misrê di lêkolînan de dihên kirin, her wusa ji vê yekê re dibina bingeh. Jîyane demên berê ku dihê kîfşkirin, vê yekê didina nîşandin. Berhemîyên qasran ên di nîvê çolên kûmê de dihên kifşkirin, her wusa, di vê temenê de dîrokeka nû di mejiyan de didina nîşandin. Bi wê re jî, didina nîşandin ku ew

herêm, berê ne çolên kûmê bûna.

- Li ser herêma Afrînê, giringîya wê ya navendî a şaristanî û denezendina rêveberîya wê ya xweser; Piştî denezîna xweserîya kantona Cizîrê û ya kantona Kobanê, î ro jî, ya kantona Afrînê hat kirin. Weke tê zanîn rojavayê kurdistanê, li sê kantonan hatibû beşkirin û her kantonê bi serê xwe rêveberî û xweserîya xwe denezend. Î ro jî, kantona Afrînê rêveberî û xweserîya denezend. Li vir, divê ku em bibêjin ku çend ku ji herêmên rojavayê kurdistanê ên weke Serêkahniyê, Kobanê û Afrînê weke hevdû û nêzî hevdû jî bin, bi demê re hin teybetmendî bi wan re jî afirîna. Ji Afrînê heta Qamişlo û ji afrîn û Qamişlo û heta Nisêbînê û Cizîra botanê, divê ku em di xatekê de bi hevdû re û di çerçoveyekê de bi mejûyê re werênina ser ziman. Nisêbîn û Qamişlo, li rex hevdû na. Heta ku em dikarin bibêjin ku ne tenê ji aliyê ardnîgarî û domografî û hwd ve weke hevdû û yek in, her wusa ji aliyê rengê pêşketina civatî û hwd jî, em nikarin wan ji hevdû dûr werênina ser ziman.

Bo vê yekê, dema ku rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê ku were denezendin ku herî zêde li van herêmên bakûrê kurdistanê bandûra xwe de bide der û deng vedê jî, divê ku em hinekî bi van aliyên wan ên hevbeş ên weke ardnîgarî, domografî û rengê pêşketina civatî û hwd re, werênina ser ziman. Her wusa, ji aliyê çand û ziman ve jî, mirov dikarê heman tiştî werêne ser ziman. kurdî(kurmancî)ya ku li van herêmên bakûrê kurdistanê dihê axiftin û rengê çandî ku pêşketîya em li Afrînê, Qamişlo, Kobanê û hwd, dikarin bibînin. Her wusa, ji aliyê civaknasîya civatî û hwd ve jî, em divê ku bi hevdû re û di temenekî weke hevdû de şîrove bikin û werênina ser ziman.

Rojavayê kurdistanê, rengê awayê domografîya wê ya civatî ku mirov lê binerê, mirov wê rengê wê yê pêşketinê bi xosletên wê re divê temenê de ku di temenekî kurdistanî de divê ku mirov werêne ser ziman. Rengê pêşketina, van herêman, giring a. Bi teybetî, li wê sêkika Serêkahniyê, Kobanê û Afrînê, bi teybetî lê binerê û wê hilde li destê. Navenda vê sêkikê jî, çîyayê kurda dibe. Çîyayê kurda, bandûra wê, li pêşketina wê herêmê bûya. Ev herêmên weke navendna şariştanî ku mirov dikarê werêne ser ziman ên weke serêkahniyê, Kobanê û Afrînê, bi dîroka wan ya hemdem ya pêşketinê û pêşveçûnê ku em ji dema Gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd bidina destpêkirin, li vê herêmê pêşketinên ku dane çêkirin bi wê pêşketina herêmê û a serdemên ku hatina û çûna hemûyan jî daye kifşkirin.

Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku Mîtra bixwe jî, oldarekî Mîtannî bû. Di dema Mîtannîyan de jîya. Hizrên ku wî hanîna ser ziman, wê bandûra wê li pêşketina herêmê bigiştî bibe. Mîtra, rastîyaka wê herêmê ya. Di dema wî de Mîtannî, xwedîyê pêşketinaka mazin jî bûya. Mîtra jî, pêşketina wî, di wê sêkika serêkahnîyê, Kobanê û Afrînê de bûya. Mîtra, pişta xwe daye çîyayê kurda. Piştre jî, êdî berê xwe dide bi rojê ve û navê ´yazdanê xwe yê mazin´ dihêne ser ziman.

Di vê vê sêkikîyêya rojava de Afrîn, xwediyê giringîyaka mazin a. Bi teybetî Afrîn, navê wê weke navê qamişlo û Nisêbînê di nava çîrok û çîvanok û vegotinên civatî ên kurdî de jî pirr zêde cih girtîya. Bi vanê wan helbest hatina gotin. Ev rewş û xweşgotin û bigotinkirina navê van herêman ji du tiştan û sedeman tê. Yek, ew rengê jîyan û şaristanîya ku li wan pêşketîya ya. Aliyê din jî, navendîtîya wan dîrokî ya. Ev herêm, bi hizrî û hişmedî, di mejiyê mirov de jî weke navend in. Navendna perwerdekirinê na. Bi teybetî, Afrîn û hewirdora wê, vê aliyê ve xwediyê pirr teybetmendiyên giring û mazin a. Divê ku em bibêjin ku Afrîn, weke bajarekî kurdistanê ê kevnera jî ya. Di demên berî

zayînê ên di dema hûrî û mitannîyan de ev yek wusa bûya. Bi çîyayê kurda re çîyayên vê herêma kurdistanê ên weke çîyayê Lêlûn, çîyayê xastîyan, çîyayê hawarê û hwd jî, hena ku herêmê zêdetîrî di pêşketina wê re weyn leyistina. Her wusa, şatên çemî ku ji çemê mazin ê firatê diherîkîn ber Afrînê û herêmên wê hebûn. Di dema Hûrî û mitannîyan de, herêma Dîlokê û hewirdora wê û hwd, bi hevdû re bûn. Dîlok, weke aliyekî din ê Afrînê ê vê bajarê kevnera ê kurdistanê bû. Pêşketina li Afrînê bi têgihiştina wê ya ku pêşdiket de jî, Afrînê ji ber çîyayê Kurda û hwd, li ser bajarên kurdistanê ên weke Dîlokê û hwd ve diherikand bi ber herêmên Anatolia roja me bixwe jî.

Li herêmê, ji aliyê avîya vê jî, ku mirov lê dinerê, di nava çîya û navçeyên wê de di buhurê. Minaq; çemê Afrîn heya ku, di navçeya Şikakan re tê heya ber bajarê Afrînê û di deşta Cûmê re derbas dibe û diçe **Deşta Hemqê,** ku ew tevî **Çemê Asê û Çemê Reş** dibe. Çemê Afrînê ku ku di demên berî zayînê de weke çemekî nêzî ê firatê mazin û bilind bûya, ji herêmên Bakûrê kurdistanê ên weke dîlok û Mereşê şaqekî wê diharikî heta **´Kela Horî**´ ku diket ber çîyayê kurda de. Şaqê din jî, şaqê ´çemê reş´ a, ku ev şaqê wê, girêdanîyaka wê çemê bi ´çemê reş´ ê li bakûrê kurdistanê li herêma botanê ku di ber çîyayê Sipî re diharikê ve hebû. Herdû çemên ku di berçîyayê sipî ve diharîkîn ên "çemê sipî" û "çemê reş" di hundûrê çîyayê Sipî de tevlî hevdû di bin. Lê piştre bi wê tevlîbûnê jî, bi ber rojavayê kurdistanê ve herîkîna şaqekî wê mazin heya ku li deverna mazin xwe dide der û li deverna winda dibe ya. Lê li herêma Afrînê herîkîna wê jî weke şaqekî **´çemê Afrînê´** dibe û diharikê. Çemê Afrînê di demên berê de heta derya sipî dihat.

Giringîya vê çem ê bi navê **´çemê reş´** ew a ku di demên berê de, mirovan di ber çem re ji vê herêma botanê bi meşê diçûn ku hata ku diçûn û xwe digihandina herêma Afrînê berçîyayê kurda. Ev herêm, bi çîya û zevî û daristanên xwe re di demên berê de pirr gurr û mazin bûn. Çîya, di nava wê şînîyê û avîyê de dibû. Di aslê xwe de, ev herîna şaqê çemê reş, weke rêyeka ku mirov di ber re diçû û digihişt wê herêmê jî. Bi vê yekê, herêm bi hev ve girêdayî jî bûn.

Jîyaneka xweza û bi xwezayê re di wê xatê de pêşketibû. Ev herêm hemû weke ku di demên gûtî, hûrî û mîtannîyan de jî dihat gotin, weke ´herêma botanê´ dihatin bi nav kirin. Bi vê rengê, bi hevdû re bûn. Herêma rojavayê kurdistanê, bi vê rengî temenekî mazin ê jîyanî û pêşketina jîyane serdestî û pêşketî hebû. Bi teybetî, herêma Afrînê, ku mirov bibêje, divê ku mirov bibêje ku ku heta roja me jî weke hin ´bermehî´ ku mana, kirman û qasrên kevnera ên ji dema hûrî û mîtannîyan û hwd, didina nîşandin ku ev herêm, di wan deman de jî weke herêmek navend û pêşketî bû. Ev herêma Afrînê ku em divê ku î ro jî, weke herêmeka kevnera a herêma kurdistanê bi nav bikin, di wan demên xwe yên buhurandina de, weke dibistanaka perwerdekirinê jî kar dîtîya ji deman re. Zaneyan, xwe li wê herêmê girtîya. Ev herêm, weke herêmek navdar ku ji aliyê her zaneyî ve dihat zanîn bû.

De ne, weke aliyekî Cizîra bota bû ku perwerde dikir. Lê mirovên ku bo perwerde ji gelekên herêmên din ên dûr dihatina vê herêmê jî, wê li hewidora wê bigerîyan û bidîtîna. Her wusa, herêmên weke Afrînê û hwd jî, ji wan herêmên ku her zaneyî dikir ku xwe bigihandayê ku hinekî zanebûn ji wê bigirta. Bo vê yekê, divê ku mirov Afrînê weke herêmeka teybet û bi mejû werênê ser ziman.

Afrîn, teybetmendiya wê ya ji çîyayê kurda bê, û ankû ji çîyakên din ên weke çîyayê

Lêlûn, çîyayê xastîyan, çîyayê hawarê û hwd bê, û ankû ji wan çemên wê ên ku mazin û bilind ku di nava wê de diharikî, weke niştecihekî şaristanî ê herêmê ku bi zanebûna xwe re pêşketî bû. Li kurdistanê, navên weke navê Afrînê, Nisêbînê, Qamişlo, Cizîra bota û hwd, ku dihatin ser ziman, rengekî bi têgihiştin ê civaknasî di mejiyê mirov de bihiş dikirin ku mirov weke ku di nava xewnên biafsûn de bijî bê li mirov dihat.

Ev rewş, wê bike ku ev herêm ku ji Cizîra bota û Nisêbînê û ku heta Afrînê, Kobanê, serêkahniyê û hwd, ku mirov xatekê xîz bike û bi wê xatê civaknasîyeka dîrokî a teybet a şaristanî ku pêşketî ku divê ku miirov bêne berbîra xwe. Bi vê awayê û rengê, êdî mirov wê baştir wê fahm bike. Lê em vê jî bibêjin ku heta ku mirov ev xate ku me ji Cizira bota û Nisêbînê û ku heta Afrînê, kobanê, serêkahniyê û hwd ku me xîzkirî ku hanî ser ziman ku mirov wê fahm nekê, mirov wê nikaribê bi tememî wê rengê pêşketinê ê li ber firatê ê bi dîrokê re jî baş fahm bike. Ev, weke teybetmendiyaka ku mirov divê ku wê fahm bike ya. Hinekî jî, rengî civaknasîya pêşketina li ber firatê di vê xatê de vêşartî ya.

Afrîn jî, weke navendeka giring a vê xatê ya. Her wusa Koban jî. Koban, navê wê em ji dema Hûrî û mîtannîyan jî kifş dikin. Em dibînin ku di vê demê de jî, bi rengê xwe pêşketîya. Her wusa, herêma serêkahniyê jî, ku weke navend û paytaxta Mîtannîyan jî bûya bi navê "weşokanî", divê ku mirov bi wan re werêne ser ziman. Ev herêm, bi reng û pêşketinên xwe ên bi dîrokê re, hê jî, ne hatina fahm kirin û li bendî fahmkirinê na. Bi nivîskî, kifşên ku ji van herêman hatina kirin û tên ser ziman, têrê nakin ku em bi tememî vê herêmê fahm bikin. Berî hertiştî divê ku em rengê jîyane wê di xwezabûna wê de kifş bikin û bi wê hewl bidin ku fahm bikin. Emê hingî, wê baştir fahm bikin. Ev herêm û ankû sêkika ku pişta xwe dide çîyayê kurda, navendeka şaristanî a bi mejûyî ya. Dîroka vê herêmê, bi civaknasîya wê re û bi rastîya wê re divê ku mirov fahm bike.

Dema ku mirov hinekî jî dîrokê zanibê, ku miirov diçê vê herêmê, mirov bêhna hûrî û mîtannîyan dihilde. Mirov, di mejiyê xwe de, weke ku dihê welatê hûrî û mîtannîyan, ew hîs û hêst bi mirov çêdibe. Bi rastî jî, wusa ya. Ji xwe, ev herêm warê hûrî û mîtannîyan a. Hûrîyan, dema ku bahse welatê xwe û ankû axa ku ew ji wê na û li ser dijîn dikirin, di gotin "warê" me. Ev gotin, ji wan mîrete ya. Ji vê gotina "war" jî, gotina "welat" hatîya derhanîn û afirandin. Ev jî, êdî dibe navê welatê wan.

Afrîn, bi dîroka xwe re, weke navendka perwerdekirinê jî kar dîtîya. Li wir, mirov vê yekê ji kûderê fahm bike? Mirov ji wan bermehiyên kirman, dibistan û qasrên demên berî zayîna Îsa û hwd, mirov fahm dike. Heta roja me jî, ew bermehî, weke nîşanaka wê dîroka wê, li herêma Afrînê dimênin û li berxwe didin ku hê jî bimênin û bijîn li jîyanê.

Dema ku mirov di nava wan herêmên Afrînê de dimeşê, mirov wan kirman û bermehîyên ku tenê weke serê şêran, ga, laş û şerê mirovan ku cûr bi cûr hatina çêkirin, cihên li hevdû civînê ên di rengê dîyatroyên anfî de û hwd, mirov pirr rastî wan tê. Ev, bi serê xwe têgihiştinekê bi dîroka herêmê re û pêşketinên wê ên demên berê re dide me. Şaristanîyên demên berên ku li vê herêmê pêşketîna, ji dema Sûmerîyan, û heta dema Urîyan, Gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd bigra û heta ku digihijê desthilatên merwanî û Eyûbîyan û hwd, mirov rastî gelek pêşketinên dîrokê ên ku li vê herêmê bûna tê. Vê herêma rojavayê kurdistanê, ji wan re navendîtî bi dîroka xwe re kirîya. Herî zêde, bermenhiyên dema hûrî û mîtannîyan û hwd, mirov rastî wan tê. Ku em, weke ku di demên berî zayinê û piştî zayinê de jî bû, em serêkahniya bakûrê kurdistanî û ya li aliyê rojavayê kurdistanê ku di sadsale 20´an de sînor di nava wan de hat xizkirin

ku em bi hevdû re hildina li dest, em divê ku bibêjin ku em rastî rewş û dîmenekî pirr berfireh ê dîrokî, şaristanî û hwd werin. Pêşketinên olî û hwd jî, em divê ji bîrnekin ku ev herêm ji wan re weke navendekê ya.

Afrîn, weke herêmek teybet ya ku weke navendek şaristanî, divê ku mirov bibêje ku weyneka wê ya dîrokî heya di pêşketina herêmê de. BI teybetî, ew weyna wê, bi çîyayê kurda hebûya. Çîyayê kurda û çîyayên din ên weke çîyayê hawarê, çîyayê Lêlûn, çîyayê xastîyan û hwd, bandûra Afrînê li ser herêmên li dora wî mazintir kirîya. Her wusa, bi van çîyayên wê re, li herêmê, Afrîn bûya weke navendekê jî.

Lê Afrîn, ji herêma Afrînê, ku mirov bi ber KObanê, Qamişlo, Serêkahniyê ve tê û ji van herêman jî heta herêmên weke ên bakûrê kurdistanê ên weke Reha, Nisêbîn, Cizîrê û hwd, weke qadaka giring ya ku bi civaknasîyaka xort û pêşketî a şaristanî na. Pêşketina van herêman û jîyane li wan, bi teybetî, di dema Hûrî û mîtannîyan de, zêdetirî pêşketîya. Di temenekî şaristanî de pêşketina wan bûya. Lê Li vir, dûbare divê ku ez bibêjim ku Ev çem û çîyayên li van herêman, weke rêyna ku mirovan ew dişopandin û ji herêman û diçûna herêman. Di demên berê de, ev çemên van herêman, mazintir û bilindtir bûn. Çend ku di roja me de, ji ber gelek sedeman ava ku di wan çeman de diharikê kêmbûbe jî, em divê ku bibêjin ku di demên berê de pirr bilind bû. Şînatîya wê pirr zêde hebû. Her cûra şînatî û zad û qûtê xwarinê û bo xwarinê li van herêman bi gelek cûrayên şînatiyê re şîn dibin. Ev jî, aliyekî din ku jîyane herêmê geştir dikir bû.

BI teybetî, ev herêmên ber çîyayê kurda, divê ku em bibêjin ku bi şînatî û heyîna xwe re temenê pêşketina jîyanê diafirand. Bo vê yekê, weke herêmek pirr avî û ku lê pirr tişt şîn dibûn, êdî pêşketina jîyane dide kifşkirin.

Şaqên çemên afrînê ên weke ´çemê reş´ û hwd, destpêkek ya ku jê diherikîn li bakûrê kurdistanê ji herêma botanê ji ber çîyayê Sipî bûn. Çend ku di cihê ku di wan re diharikî li cihna winda dibû û piştre li cihna cardin serê xwe derdixist jî, lê dîsa bênavber diharikî û li herêma Afrînê tevlî çemê Afrînê ê navdar dibûn. Çemê Afrînê jî, şaqna wê ên ku diherikîn heta herêma Dîlokê û Mereşê yanî vî aliyê bakûrê kurdistanê hebûn. Ji xwe, Dîlok û hwd, weke herêmna ku li kevîya herêma Afrînê ku wê temem dikirin bûn. Mirov ne dikarî ne dîlok û herêmên li dora wê ji Afrînê dûr werêne ser ziman û ne jî dikarî Afrînê bê wan werêne ser ziman. Bi awayekî bi vî rengî bi hevdû ve girêdayî bûn. Bi vî rengî, weke herêmeka mazin bi hevdû ve hebûn. Bi vê rengê, bandûra wê li herêmên ber derya sipî û derya reş jî pirr zêde dibû. Ji xwe çemê Afrînê diherikî û heta digihişt deryaya sipî. ..

Ev herêm, bi serê xwe bi vî rengî, weke herêmek ku dibû weke navendek şariştanî jî. Ev herêm, bi vî rengî, xwedîyê pêşketinê bû û bandûra wê hebû. Di dema Hûrî û mîtannîyan de, ew pêşketina Afrînê ya dîrokî hebû. Ji xwe, ev herêm, weke herêmek navendî bû di nava pêşketin û şaristanîya wan de. Dema ku em bahse pêşketin û pêşveçûnên navendî û şaristanî ên li ber firatê bikin, divê ku em bi teybetî navê Afrîn û herêma wê ya mazin bikin. Di xateka ku ji ber çîyayê kurda û heta ber çemê firatê û ji wir jî bi ber Nisêbîn û Cizîra bota û çemê Diclê ve ku mirov tê, mirov di nava jîyanek geş û şaristaniyek pêşketî a li vê herêêmê de dimeşêt. Çawa ku em nikarin Nisêbîn û Qamişlo ji hevdû çûda werênina ser ziman, emê nikaribin Afrînê û Çîyayê kurda jî bi serêkahniyê re ji wan cûda werênina ser ziman. Her wusa, em çendî ku nikarin bi vî rengî van herêman ji hevdû cûda werênina ser ziman, emê nikaribin ji botanê û çîyayê

sipî, çîyayê gabarê, çîyayê cudî û hwd jî dûr û cûda werênina ser ziman. Ev herêm, weke herêmek navend a ku ji çîyayê kurda û heta berfiratê û ji wir jî heta ber diclê û hwd. Vê herêma kurdistanê Afrînê, cardin navendîtîya xwe ya şaristanî denezend. Rêveberîya xwe ya xweser denezend. Li gorî vê dîrok û rûmetê ya. Li gorî rastîya wê û mejûya wê ya. Li gorî rastteqînîya wê ya. **Jîyane li ber´çîyayê kurda´ li Afrînê pirr xweş û rengîn a weke ku çawa ku di dema hûrî û mîtannîyan de bû.** Pîroz bê, li newîyên Hûrî û mîtannîyan kurdan. ..

- Di destpêka sale 2012´an de, hin bi hin gotinên di derbarê ´mudahaleya li Sûrî´ de diketina navan ajans û çapameniyê de. Di wê navberê de jî, hêzên rojava û emerika jî di nav de, bidest amedekirina ´hêzek muxalif´ li sûrî kirin. Bi vê yekê û rengê li Sûrî, weke ku ji nû ve rêxistinîbûnek bibe, pêvajoyek dest pê bike. Di dawiya sale 2011´an de, di bin navê "dostên sûrî" de nêzî rayadarên nêzî 40 welatî li ewropa dicivin di serkêşîya Hilery Clinton de ku di wê demê de wezirêkarê derve ê emerika bû. Tirkiya jî û sûûdî arabîya jî, di nav de, hin dewletan bidest birêxistina ´muxalefeta Sûrî´ kirin. Di wê navberê de jî, kurd jî, di nava tahb û xîretekê de na ku karibin xwe bikina nava wê muxalefetê de. Lê bi her awayê hebûna kurdan dihat red kirin. Ji xwe navê ´kurd´ bixwe jî, bilêv nedikirin. Ên ku navê kurdan bilêv dikirin jî, ji nava muxalefetê jî dihatina dûrkirin. **Di** vê navberê de, li rê û rêbazên ku wê çawa kurdan bikina nava wê muxalefetê de lê dihat lêgerîn. Wê çawa kurdan, bêstatû bihêlin û wê nehêlin ku bahse ti mafî bi navê kurdan bikin û wê bikina nava muxalefetê de li rê û rêbazên digerîyan. Bo vê yekê, di wê demê de, gotinên ku di pişt derîyan de ji çend ku kurdên ku bi wan re dirûniştin re ku dihaîna ser ziman, ew bû ku "nûha, bahse mafê kurdan nekin, heta ku rejim ket û li şûna wê rejima nû hat avakirin, hingî wê li ser mafê kurdan jî ´danûstandin´ were kirin. Bi vê gotinê, wan kurdan jî, dixwestin ku bi heman gotinê pêşîya pêşketina kurdan bigrin.

Di vê navberê de, piştî ku şerê li nava sûrî dest pêkir, kurdan bo ku ew şer ne pijiqê herêmên wan, di temenê bergirekê de li herêmên xwe xwestin ku dest dênina ser rêveberîyên herêmên xwe. Bo vê yekê û mûnasebetê, care pêşî di 19´ê tirmehê de ji Kobanê dest pê kirin û dest danîn ser rêveberîya bajarên xwe. Piştre, Afrîn û serêkahniyê û Cizîrê bû. Kurdan, dema ku dest danîna ser rêveberîyên herêmên xwe, ne hiştin ku xwûna ti kesekî jî birihijê. Heta ji destê wan dihat dixwestin ku bêî ku xwûn birihijê bi awayekî demokratikî wê pêk bênin. Pêk hanîn jî. Bi heman rengî dest danîna ser hemû bajarên xwe. Kurdan bi vî rengî, weke ku şoreşek kirin û ne hiştin ku xwûna ti kesekî jî bi rijihê. Ya ku herî zêde, li zora rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî beşkirin ên weke tirkiyê çû jî ev bû. Piştre, bo ku wê "şoreşa bêxwûn" bixwûn bikin, ketina nava hewldanê de. Bidest hêrîşan kirin. Pêşî, hêzên di bin navê muxalfeta sûrî de kirina dijberî. Ditin ku wê li ser wan re ancamê li dijî kurdan bidest nexin, êdî bidest birêxistinkirina rêxistinên weke "cebetil-nasr", "DAÎŞ"´ê û hwd, kirin ku wan bidina hêrîşkirin bi ser kurdan de. PÊşî, bi piştgirîya tirkiya li herêmên weke serêkahniyê, bi "cebetil-nasr" xwestin ku ancamê bidest bixin. Lê ti ancam bi wê bidest nexistin. Piştre, bidest, pêşxistin û li herêmê bicihkirina DAÎŞ´ê kirin. Di vê temenê de, DAÎŞ, weke stretejiyek giştî ku bi wê derbeyê li kurdan bixin, hat pêşxistin.

Piştî ku kurdan bigiştî nîyeta di bin van gotinan de fahmkirin êdî li wan ne hisandin û bidest xwe birêxistin kirin. Piştî ku kurdan xwe birêxistin kir û bidest avakirina saziyên xwe kirin, êdî ev kurdên ku di bin navê ENKS´ê de ku hatibûbûna li hevdû

civandin û karê wan ew bû ku pêşîya pêşketina statûya kurdan bigrin bû, êdî li dijî wê birêxistinbûna kurdan jî bûna xwediyê helwest. Li dijî wan saziyên kurd, bidest rêşkirinê kirin. Bo wan, maf û azadîya kurdan ne giring bû. Ya giring ew bû ku gotinên ku serdestê wan ji wan re gotibû, ku li gorî wê bijîn û biaxifin bû. Bo vê yekê, çi hêrîş li kurdan û civate kurd bûn, ev dordor ya bi awayekî filîî di nav de cih digirtin û yan jî, li ber wê bêdeng diman.

Piştî ku kurdan saziyên xwe avakirin û temenê xweserîîya xwe ya demokratik çêkirin, êdî van dordoran bidest dijberîyê li dijî wê kirin. Bidest hêrîşî xweserî û rêveberîya kurdên rojavayê kurdistanê ku avakiribûn kirin. Lê kurdan li wan ne dihisand. Kurdan, hin bihin pêşketinên xwe bi sazibûna xwe re didane çêkirin. Piştre, herî dawi, di dema konferanse Cenevê a duyemin de, dîsa heman helwest li dijî kurdan hat nîşandin. Kurdan bi navê wan dervî wê hatina hiştin. Weke ku çawa ku di konferanse Lozanê(1923´)ê de kiribûn, çend kurd naqandin û birina wê konferansê û ji wan re gotin "bibêjin ´em kurdin û li ser navê kurdan hatin a´". Wan jî, wusa kir. Lê ev ne rast bû. Ev tenê politikayek bû. Kurdan êdî bi tememî fahmkiribû ku dervî hemû pêvajoyên sîyesî ên pêvajoyê hatina hiştin. Kurdan çêkir û nekir, nekarîn ku xwe bikina navê de. Heta ku ew ´muxalefeta sûrî´ ku weke ´çil raqî lê ya´ jî, hebûna kurdan herê nedikir. Heta ku muxalefeta sûrî, li dijî hebûna civate kurd û nasîna wê bixwe jî, dijberîya xwe dihanî ser ziman. Kurdan, tevî hemû dijberî û astangîyan li rojavayê kurdistanê xwe birêxistinkirin û rêveberîya xwe ya cewherî ku xwe bixwe birêvebibin avakirin.

Rêveberîya kurd a xweser piştre weke sê-kantonan ku ev kanton "kantona afrînê", "kantona Kobanê", û "kantona Cizîrê" bû, di 21 çileya 2014´an bi awayekê fermî denezendin. Lê berê rêveberîya kurd, berî wê bi gelekî hatibû avakirin. Lê di wê demê de, denezendina wê, wateya wê ya sîyesî ew bû ku weke bersivekê jî bû ku ji hêzên ku tevlî konferanse Cenevê a duyemin bûbûn û ku hebûna kurdan bi isrerî ne dixwestin ku nas bikin û kurdan bi fermî dewetî wê civînê bikin bû. Ev helwesta kurdan, doma. Kurdan, rêveberîya xwe piştre da rûnandin.

Bi vî rengî, bi zihniyeteka nû û weke sê-kantonan bi rêxistinbûna rojavayê kurdistanê, weke pergal û modeleka nû li rojhilat bigiştî bû. Bo vê yekê, kurdan jî, fahm dikir ku wê dijberî û bertekên li ber wê jî we werina nîşandin. Li rojhilat, ji dema şerê cihanê ê yekemin ve, statûqûya ku hatibû avakirin êdî dixûrîhî. Hêzên herêmê, ev pergal û modela nû ku li rojavayê Kurdistan rengê wê derdiket li holê vajî w statûqûyê diîtin û bidest çûyina bi ser wê dikirin. Di destpêka denezendina rêveberîya xweserî a rojavayê kurdistanê de, rejimên herêmê ên çîran, sûîqast di nav de serî li gelek rêbazan dane li rojavayê kurdistanê. Bi wê rengê bi sadan kurd û rêveberên kurd jî hatina qatil kirin. Rêveberên kurd ên weke Îsa Hiso bi heman sûîqastan hatina qatilkirin. Lê van jî, ancam bidest nexistin. Pêşîya pêşketina kurdan ne hat girtin.

Di destpêka avakirina rêveberîya rojavayê kurdistanê de, li ser PDK´ê re hat xwestin ku dijberîyê di nava rojavayê kurdistanê û rêveberîya başûrê kurdistanê de bidina çêkirin. Bo vê yekê, di temenê dijberîyekê de, PDK´ê kirina pozisyonekê de. PDK´ê jî, bi gotinan bidest hêrîşî rojavayê kurdistanê kir. Piştî gera Mesud Berzanî a li Amedê, ev asta hêrîşên bi gotinan zêdetir bû. Piştre derîyên weke ´derîyên sêmalka´ û hwd ku di nava rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê de bûn hatina girtin. PDK´ê bidest çêkirina hendekan kir. Her wusa, ew ambargoya ku tirkiya û Îranê û hêzên din ku

dixwestin ku dênina ser rojavayê kurdistanê, PDK´ jî tevlî wê bû. Ji destpêka şoreşa rojavayê kurdistanê û heta roja me, ew ambargoya ku PDK´ê jî tevlî bûya a li ser rojavayê kurdistanê didomê. Armanca vê ambargoyê ew bû ku wê çawa rojavayê kurdistanê bidina şikandin. Lê kurdên rojavayê kurdistanê li berxwe dan. Serî li ber ti tehdîdê ne danîn. Kurdên rojava gotin "ji nan û avê giringtir, rûmet û azadî ya." Bi wê têgihiştin û felsefeyê, şoreşa rojavayê kurdistanê, weke şoreşa rojhilat giştî pêşxistin û bi rêxistin kirin. Çend ku kurdên rojava li berxwe da û şoreşa rojava pêşxistin, asta hêrîşên li wan jî hat zêdetir kirin. Piştî ku rejimên herêmêê ditin ku wê nikaribin bi bergir(´tedbîr´)ên ku girtina ppêşîya şoreşa rojavayê kurdistanê bigrin, êdî bidest çêkirina planên nû kirin.

Di temenê van çêkirina planên nû de, di dema ku konferanse Cenevê´ a duyemin di hat li darxistin de çûyina T. Ardogan li Îranê û li qasra Sadabadê bi rayadarên Îranî rûniştin û li ser hin stretejiyên ku bi wê derbeyê li rojavayê kurdistanê û rêveberîya kurd bixin levkirin. Piştî vê levkirinê re êdî hin bi hin doza hêrîşên li rojavayê kurdistanê zêdetir bû. Piştî vê civînê li qasra sadabadê, weke ku di wê civîna li qasra Sadabadê de jî hatibû kifşkirin, artişa îraqê ku hemû çekên xwe jî di cih de bihêle ji herêmên weke Musilê vekişandin û li şûna wê rêxistina tûndrew ku li ser esasê mezhebiîtîya sûnnîyê hatîya birêxistinkirin a DAÎŞ´ê li wir li şûna wê bicih kirin. Bo temenê DAÎŞ´ê çê bikin jî, bi hin aşîrên sûnnî ên li Îraqê jî levkiribûn**.** Bi wê re, êdî DAÎŞ li wir bicihkirin. Di wê demê de, plana di temenê li wir bicihkirina DAÎŞ´ê de ew bû ku wê ji wir destpê bikin ku xatekê li dora kurdan weke "kembera kesk" bikişênin û rêxistinên tundrew li wir bicih bikin û alikariyê bidina wan û li dijî kurdan li rojavayê kurdistanê bidina şerkirin. Ev bû. Piştî ku DAÎŞ´ li wir bicihkirin, bi ser ve ku demek dirêj ne buhurtî, hin bi hin li ser tirkiya û hin herêmên Îranê û Îraqê re bidest şandina çeteyên DAÎŞ´ê li rojavayê kurdistanê kirin ku hêrîşî hersê kantonên rojavayê kurdistanê bikin. Lê pêşî, kantona KObanê kirina bin hêrîşê de. Armanca ku pêşî çûyina bi ser kantona kobanê de ew bû ku wê pêşî kantona kobanê têk bibin û piştre ji wir bidest hêrîşê i herdû kantonên din ên rojavayê kurdistanê bikin û bi wê re li rojavayê kurdistanê derbeyek mazin li kurdan bixin.

Bi vî rengî plan û stretejiyek giştî hatibû çêkirin. Bi vê rengê, stretejiya ku hatîya çêkirin jî, wê di temenê wê de olê çawa bikarbênin, dewletên herêmê ên weke Tirkiya, Îran û hwd, li ser hizirî bûn ku ka wê çawa olê bikarbênin. JI ber ku olê bikardihênin û mirovan ji vê rêxistina kujar û qatil re dibînin û dibin û li wir didina şerkirin. Bi vê rengê, şerekî mazin bi destê DAÎŞ´ê ku rejima tirkiya û Îranê jî piştgirîyê didinê de, li dijî civate kurd dane destpêkirin. Di vê navberê de, rêveberîya başûrê kurdistanê jî kiribûbûna hevkarê van hêrîşan. Ji aliyekî ve li başûrê kurdistanê, çend ku nîqaşên ´serxwebûna kurdistanê´ hebûn jî, bi van nîqaşan, weke ku ser tiştna werê girtin, dihat bikarhanîn. Yanî, ev hêstên civate kurd,, bi destê rêveberîya başûrê kurdistanê weke ku li dijî civate kurd were bikarhanîn, rewşek afirî bû.

Şoreşa rojavayê kurdistanê, bi qarekter xwe ve xwe dide domandin. Hemû komên kêmnetew û cihêrengiyên olî ên cuda li wir li rex hevdû dijîn. Hemû rengên cuda ên kêmnetew û ciherengiyên olî û hwd, xwe dihênina ser ziman. BI Azad dijîn. Maf û azadîya hemûyan weke hevdû heya. Î ro bi hevdû re, herêmên xwe jî, ji hêrîşên ku tên ser wan de diparêzên. Her wusa, bi heman rengî, bi wê cihêrengîya xwe jî salwegera sêyemin a Şoreşa rojavayê pêşwazî dikin û pîroz dikin. Di temenê ku li azadîya xwe

xwedî derdkevin de li sêyemin salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê xwedî derdikevin û pêşwazî dikin. Ya ku wan bi hevdû re dike ku li dijî hêrîşan dide sekinandin jî ev a.

Şoreşa rojavayê kurdistanê rûyekî nû ya. Modeleka nû ya. Hinekî ji ber vê yekê, bi teybetî ew hêrîşên xadar û bêwijdan li wê dibin. Gelên herêmê ku heta roja me bêstatû hatina hiştin ên weke kurd,, asûrî û hwd, li wir statûya xwe pêşdixin. Hêrîş bi teybetî li vê yekê na. Divê ku mirov bi teybetî vê yekê baş û qanc fahm bike. Rejimên herêmê, di vê temenê de şer bi kurdên rojavayê kurdistanê re dikin û ji ber vê yekê dixwezin ku şoreşa rojavayê kurdistanê têk bibin. Rejimên herêmê statûqûperêz in. Ne demokratik in. Bo modeleka weke ya rojavayê kurdistanê jî, statûqûparêzê tê buhurandin. Demokratikbûn, temenê wê dihê pêşxistin. Ev jî, ev rejimên ku statûqûparêz, ditirsêne. Heta roja me, bi metingerî gelên herêmê kirina bin kontrola xwe de. Dixwezin ku wê rewşê ji vir û pê de jî, bi heman rengî bidina domandin. Zihniyeta di temenê şerê rejimên herêmê ên bi rojavayê kurdistanê re ev a. Yanî, li vir, rejimên şerên statûqûparêzîya xwe bi kurdên rojavayê kurdistanê re didin.

Ji aliyekî din ve jî, diçûna bi ser kurdan de. Dem heta ku dihat sêyemin salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê, hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li dijî civate kurd bi piştgirîya tirkiya û hwd, hatina zêde kirin. Kurdan, ev asta hêrîşan a li li rojavayê fahm kir. Di heftaya pêşî a meha tirmehê de, "seferberîya giştî" denezendin bo parastina rojavayê kurdistanê. Di vê seferberîyê de ji hemû beşên kurdistanê kurd çûna rojavayê kurdistanê bo ku rojavayê kurdistanê û rêveberîya kurd û her wusa destkevtiyên kurd biparêzên. Rojavayê kurdistanê, dibin van hêrîşan de sêyemin salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê pêşwazî dikir. Lê gelê kurd, çend ku di bin hêrîşan û telûkeya komkujiyên mazin ên weke helebçeyê de jî bû, dîsa li nirxên xwe xwedî derdiketin û heta salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê bi dil û xweşî pêşwazî dikirin. Wan êş û astangî û zorîyên ku di nav de na, pêşîya wê pêşwazîkirina wan nedigirt.. Li hemû bajarên rojavayê kurdistanê û dervî rojavayê kurdistanê jî amedekariyên pîrozbahiyên salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê dikirin. Kurdên rojavayê kurdistanê û bigiştî civate kurd, çend ku dibin hêrîşan de jî bû, ew deronî û şahîya dilê xwe bi hemû êşên dilê xwe pêşwazî dikir û pîroz dikir. Ne dihişt ku ew zor û êş, bibe astang li pêşîya şahîya dilê wê ya ji bi azadîya xwe bidest xistî. Î ro, di sêyemin salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê bi vê rengê pêşwazî û pîroz dike.

-Piştî ku mudahela li Sûrî bû û hin bi hin hat ditin ku kurdan xwe li herêmên xwe bi rêxistinkirin û rêveberîya xwe ya herêmî ya rojavayê kurdistanê ava kirin, êdî ket rojevê ku rêxistinên tundrew dihên bi rêxistin kirin. Ev rêxistinên tundrew ku dihên bi rêxistinkirin hemû têkiliya wan bi Tirkiya û Îranê ve heya. Ev yek, gelek caran hatîya piştrastkirin jî. BI teybetî, dijberîya li dijî kurdan, di temenê helwesta Îran û tirkiya de ya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje.

Piştî ku rêveberîya xweserîya demokratik li rojavayê kurdistanê hat denezendin û piştre weke sê kantonan herêm hat bi rêxistin kirin, êdî bidest çûyina bi ser kurdan de bû. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî wê re pêşxistina DAÎŞ´ê zêdetirî ket rojevê de. Li vir, bi teybetî, piştî wê re li Îraqê jî DAÎŞ bicih kirin. Li Sûrî jî û li Îraqê jî, herêmên ku DAÎŞ li wan hatîya bicihkirin jî, herêmên balkeş in. Bi teybetî, yan herêmên kurdan in û yan jî herêmên di sînorên herêmên kurdan de na. Ev jî, bi teybetî, weke aliyekî ku bi teybetî divê ku mirov li ser bisekinê ya.

Şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re, em nikarin tenê bi navê DAÎŞ´ê re werênina ser ziman.

Divê ku em bi Îranê û Tirkiya re werênina ser ziman. Ev yek, li berçav a. Ji pêvajoya ku li Îraqê li herêmên weke Musilê ku DAÎŞ dihê bicihkirin, mirov fahm dike ku hevkarîyek Îranê, Tirkiya û rejima baxdadê bi hevdû re heya. DAÎŞ, weke rêxistineka van rejiman ku li dijî kurdan didina şerkirin a. Lê Rejima Baxdadê, bi teybetî, dordora xwe gunahbar dike. Li dijî kurdan, helwesta xwe hanî ser ziman. Heta ku dema ku helwesta xwe li dijî kurdan hanî ser ziman, got ku "tirkiya jî, ji aliyê stretejikî ve bi me re di heman hizrê de ya." Tirkiya jî, li dijî kurdan, piştgirîyê dide rêxistinên weke DAÎŞ´ê ku hêrîşî kurdan dikin. Û bi wê re jî tirkiya, herêmên bakûrê kurdistanê, weke ku ji nû ve dagir bike, kirina herêmên leşkerî. Sevketîyeka mazin ya leşkerî li bakûrê kurdistanê kirîya. Herêmên weke herêmên çolemergê û hwd jî, bi sadan qareqol û ankû kaleqol lê çêkirina.

Bi wê re jî, diçina bi ser kurdan de. Çend ku hin dordor, dibêjin ku "ev ser salekê ku li bakûrê kurdistanê şer nebûya" jî, em nikarin vê gotinê piştrast bikin. Tirkiya şerê ku li bakûrê kurdistanê bi kurdan re kêm kir û li rojavayê kurdistanê li ser rêxistinên tundrew ên weke DÎAŞ´ê û hwd re, şerê xwe bi kurdan re daye domandin. Yanî, ew şerê xwe yê bi kurdan re nedaye sekinandin. Î ro jî, di wan hêrîşên ku li herêma rojavayê Kurdistan a KObanê dibin, em divê ku weke hêrîşên tirkiya jî bi hasibêne. BI teybetî, rejimên herêmê ên weke Tirkiya û Îranê ku çendî nakokîyên wan bi hevdû re hebin jî ku mijar dibe kurd dibin yek û diçin bi ser kurdan de. Dema ku em şerê Kobanê dahûr bikin, emê bibînin ku Îran û tirkiya bi hevdû re di nava hevkarîyekê de wê piştgirîyê didina rêxistina DÎAŞ´ê û didina hêrîşkirin ku hêrîşî kobanê bike.

Li Îraqê, ev ser deh salan re ya ku bomba tên taqandin. Rêxistinên ku tundrew ku wan bombayan li Îraqê ditaqênin, heta roja me bi deh hezaran sivil qatilkirina û bi heman rengî bi hezaran ji wan qatil kirina. Lê dîsa nekarîna ku serkevtinekê bidest bixin. Lê çî hikmeta ku di vê dema ku êdî hêrîşên bi bombayî jî kêm dibin, rêxistina DAÎŞ´ê bi nêzî du hezaran re dikarê Musilê û dordora bike bin kontrola xwe de. Gelo, em dikarin, ketina DAÎŞ´ê, tenê bi wê û şerê wê re bênina ser ziman.? Na, em nikarin. Li Sûrî, bi deh hezaran militanên xwe nekarîya ku wê bike. Ev jî dide nîşandin ku DAÎŞ´ê, nekû musil bidest xistîya, DAÎŞ li musilê hatîya bicihkirin ku bidina şerkirin. Nîşanayeka din jî bo vê, ew a ku dema ku artişa Îraqê divekişihê hemû çekên xwe di cih de dihêle û DAÎŞ wan bidest dixe. Ev jî, bi plan hatîya kirin. Îro, bi wan çekan bi kurdan re şer dikin. Bi wan çekan hêrîşî Kobanê dikin.

Hêrîşên li Kobanê, hêrîşên stretejikî na. Li pişt wan, rejimên ku bi teybetî li dijî kurdan in hena. Bo ku kurd li herêmê, nebina xwediyê maf û azadiyekê, bi kurdan re didina şer kirin. Rêxistina DAÎŞ´ê jî, tenê rêxistineka ku bi kurdan re şer bike hatîya bi rêxistin kirin û formula kirin. Di serî de, divê ku mirov vê yekê kifş bike.

Di aslê xwe de, divê ku mirov bi teybetî bibînê û piştre baş fahm bike, weke ku çawa ku li musilê DAÎŞ hatîya bicihkirin, bi heman rengî li Musilê bi destê DAÎŞ´ê denezendina "dewleta îslamî" û bi wê re qatilekî weke "el-baxdadî" denezendina weke "xalîfe" jî, hinekî weke lingekî din ê vê plana şerê bi kurdan re dihê li berçav. Bi wê re, xwestina ku bi plan û li ser olê re li dijî kurdan bidina şerkirin. BI van kirin û kiryaran temenê şerê bi kurdan re afirandin. Nûha jî, li ser wê re şer dikin.

Ev şerê ku li Kobanê dihê kirin bi kurdan re, şerê jenosîda kurdan a. Di serî de, divê ku mirov vê yekê jî binxatkê û bibêje. Ev şerên ku bi kurdan re dihên kirin, em dikarin weke şerên jenosîda kurdan jî bi hasibênin û werênina ser ziman. Lê ev şerê jenosîda

kurdan ku bi destê DAÎŞ´ê û hwd dihê meşandin li dijî kurdan, armanca wê jenosîda fizikî ya. Her wusa, bi wê re jî, ew jenosîda fizikî ku tirkiya û Îranê, heta roja me domandina, ku wê jî bidina domandin. Ev jî, wê çawa bibe? Ew jî, bi vê rengê dibe ku li rojavayê kurdistanê kurd şikandin, êdî piştre wê rewşa kurdan ya bêstatû hiştina wan, bidina domandin. Rayadarên Îranî û tirk, rojên ku konferanse Cenevê a duyemin dihat li darxistin de li Îranê li Qasre sadabadê li hevdû civîyan û hin stretejiyên şer li dijî kurdan bi hevdû re dane meşandin. Î ro jî, ev şerên ku bi kurdan re dihên kirin, dii temenê wê stretejiyê û peymanên di nava Îran û tirkiya de dihên kirin. Li Musilê bicihkirina DAÎŞ´ê jî, divê ku mirov di temenê wê levkirina li qasra sadabadê hilde li dest û fahm bike.

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku rêxistina tundrew a DAÎŞ´ê, divê ku mirov weke rêxistineka ji rêzê ne hasibêne. Ev rêxistina DAÎŞ´ê, bi hebûna wê re, rengê şerê Îran û tirkiya ê bi kurdan re ê vê demê dihêne ser ziman. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî lê binerê. Ev rêxistin, bi vê rengê, ji aliyê Îranê ve jî û ji aliyê tirkiya ve jî, dihê bi rêxistin kirin, bicihkirin û şerkirin. Li vir, telûkeya mazin ew a ku ev mirovên ku di nava vê rêxistinê de dihên dayîn şerkirin tundrew in û bi wê tundrewîya wan re çavên wan dunyê nabînê. Kor in. Tenê, li ser olê re ku bi navê olê çi ji wan re hatîya gotin bi wê bawer dikin û şer dikin. ..

Li Kobanê, gelê kurd, birûmet û hebûna xwe li berxwe dide. Gelê kurd, tekoşîna parastina hebûna xwe dide. Gelê kurd, li wir, tekoşîn û berxwedane maf û azadî û rastiyê dide. Ew tekoşina kurdan a li Kobanê, ku YPG/YPJ dide mafdar û pîroz a. Ku î ro, pêxemberek li jîyane jîya ba, wê çûba û di nava refên YPG û YPJ de şer bikira bo rastiyê û mirovatiyê. Ev tekoşîn û berxwedane kobanê, wilqasî pîroz a. Tekoşîna YPG û YPJ´ê, tekoşîn û berxwedane pêxemberan a. ..

- Ev demeka ku bi piştgirîya tirkiya çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşî rojavayê kurdistanê Kobanê dike. Di serî de, divê ku em vê jî bibêjin ku çi komkuji li rojavayê kurdistanê û Li Kobanê bibe, berpirsîyarîya tirkiya di wê de heya. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. DAÎŞ´ê, heta vê kêlîkê jî piştgirî ji tirkiya girtîya. Hê jî, piştgirî ji tirkiya digrê. Andamên çeteyên DAÎŞ´ê, ên ku sax dikevina destê YPG´ê de, tê gotin ku dibêjin ku "subayên tirk, wan perwerde dikin." Ev, berê jî, hatibû ser ziman. Î ro jî, ev tê ser ziman.

Ev hêrîşên li ser Kobanê ku di van rojên dawiyê de zêdetir bûn, li pişt wan, rejimên weke rejima tirk hena. Tirkiya, bi wê dixwezê ku rojavayê kurdistanê bişikêne. Bo vê yekê, bi awayekî fîîlî tirkiya piştgirîyeka mazin dide çeteyên DAÎŞ´ê. Di van rojên dawiyê de, çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşên xwe ji kantona Kobanê li rojavayê kurdistanê Zêde kirina. Piştî ku bicihkirina DAÎŞ´ê li Musilê, ev hêrîşên li KObanê, didina nîşandin ku wê van hêrîşan li kurdistanîyan zêdetir bikin. Di rojên pêş de, wê li Şengalê bê, Li kerkûkê bê li herêmên din ên başûrê kurdistanê jî bê, wê hêrîşî kurdistanîyan bikin. Ev, weke konsepteka giştî ya. Wusa dihê xuya kirin.

Ev konsept, di armanca wê de têkbirina rojavayê kurdistanê û pergale wê ya xweserîya demokratik heya. Bo vê yekê, divê ku mirov bi teybetî, li ser van hêrîşên ku bidestê DAÎŞ´ê li Kobanê dibin fahm bike. Her wusa, bi teybetî, wusa dihê ditin ku rejimên weke rejima tirk ku piştgirîyê didina DAÎŞ`ê, berê van çeteyên hov û kujar dane ser Kobanê, Dixwezin ku li wir ancamê bidest bixin û Ji Kobanê ve derbeyekê li kurdan bixin. Piştî ku Kobanê bidest xistin û li wir derbe li kurdan xistin, êdî bidest hêrîşê li kantonên din ên rojavayê kurdistanê bikin. Bi wê re jî, êdî piştî ku li KObanê derbe li

kurdan xistin piştre êdî li herêmên din ên kurdistanê bidest hêrîşa li kurdan bikin. Nûha, bi giranî ji Ji Kobanê û Helebê ve hêrîşî kurdan dikin. Herêmên weke Taxê ´sêx maqsûd" û ´eşrefîya´ ên ku taxên kurdan in, dem bi dem li wan jî hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li kurdan zêde bûna.

Ev hêrîşên ku li Kobanê dibin, hêrîşên bi plan dihên kirin in. Hêrîşên stretejikî na. Bi wan hêrîşan dixwezin ku kurdan bişikênin. Ev hêrîş, li pişt wan Tirkiya, sûûdî arabîya û biqasî ku tê gotin ku emerika jî heya. Çend ku di çapameniyê de, weke ku Emerîka DAÎŞ´ê weke "telûkeyekê" dibînê û wusa dihê ser ziman jî, lê dema ku em li pretikê dinerin ev dibe derew. Yanî, wusa dihê ditin û fahm kirin ku Di çerçoveya konseptekê de DAÎŞ´ hatîya pêşxistin û wusa xuya dike ku wê DAÎŞ´ê biikina weke "koalîsyonekê" ku hemû rêxistinên din ên tundrew ên li herêmê ku di bin banê wê de bigihênian hevdû û bidna şerkirin. Ev jî, tê wê wateyê ku di demên pêş de, wê komkujiyên mazin li rojhilat bên kirin.

Li Tirkiya, li "pêvajoya çareserîyê" a li bakûrê kurdistanê ku birêz Ocalan daye destpêkirin jî, di vê çerçoveyê de dihizirê. Wê çawa di vê pêvajoyê de, kurdan bişikênê, di wê temenê de lê dihizirê. Ji ber vê yekê, gavên cidî neavêje. Ji ber vê yekê, ´pêşnûmayên xapandinê´ dihêne rojevê.

Her wusa, li vir divê ku em vê yekê jî bibêjin ku salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê tê. Di van rojên ku salwegera rojavayê kurdistanê nêz dibe de, zêdekirina hêrîşan a li rojavayê kurdistanê, armancake wê jî ew a ku pêşîya şahî û dilxweşîyên salwegera şoreşa rojavayê bigrin. Ev, politikayaka tirkiya bû. Li bakûrê kurdistanê, di her rojên giring û rojên çejnê de, wê du roj û ankû sê roj berê, wê komkujiyên mazin bihanîyan serê kurdan, bo ku wê şahîyê û ankû wê cejnê bi dilxweşî derbas nekin. Bi vê yekê re, ku hertimî civatê bigiştî di bin deronîyeka binketî û şikestî de bihêlin. Nûha, ev politika, bi awayekî din bi destê DAÎŞ´ê û Hêrîşên wê, dixwezin bi rê ve bibin.

Li vir, giring a ku kurd, di nava yekîtîyekê de bin. Konsept, pirr mazin a. Ev hêrîş, di çerçoveya konseptek mazin de dihên kirin. BI van hêrîşên bi destê DAÎŞ´ê, dixwezin ku rojhilat bikina gola xwûnê û di nava wê gola xwûnê de jî kurdan jî bêdeng bikin. Mirov dikarê, şerê bidestê DAÎŞ´ê û hwd, weke şerê statûqûya li herêmê a ku piştî şerê cihanê ê yekemin ku hatibû avakirin ya bi gelê herêmê û pêşketina wê ya ku heta roja me bûya jî bihasibêne û werêne ser ziman. Di vê temenê de, ola îslamê jî, bi awayekî bê ahlaqî bikardihênin. Mirovan bi navê olê dixapênin û didina şer kirin. Ji ber vê yekê ya ku nakokîyên mezhebî sor dikin û dijberîyê di nava wan de diafirênin. Di vê temenê de, hêstên olî ên xalkênn herêmê jî dihê bikarhanîn û îstismar kirin.

Alîkarîyek mazin ya tirkiya ji DAÎŞ`ê re heya. Dem bi dem ku ji hundûrê tirkiya bê û ankû ji dervî tirkiya bê ku tê gotin ku wê "DAÎŞ, hêrîşî tikiya jî bike" jî, di vê rewşê de tenê weke hin gotinên xapandinê dimênin. Ravandina pîlotên tirk ên li Libnanê, piştî ketina DAÎŞ´ê a li Musilê hatina rojevê ku karkerên balyozxaneya tirk ji aliyê DAÎŞ´ê ve hatina ravandin û her wusa hanîna rojevê ku nêzî 30 şoforên ji tirkiya ku hatina revandin jî, divê ku mirov weke hinek bûyarên ku bidestê tirkiya hatina çêkirin ku li ser van re bi çapameniyê xwe weke ku ti têkiliya wê bi DAÎŞ´ê re bide nîşandin. Ji ber ku gelekî têkiliya tirkiya û DAÎŞ´ê bi awayekî vekirî hat rojevê. Vê caxê, qaso bi çêkirina van ´ravandinên sûnnî", dixwezin ku li gorî xwe li ser çapameniyê re mudaheleyekê li fahmkirin û mejiyê mirovan bikin. Di rastîyê de ti tiştekî wusa tûna ya. Ev ravandin jî, bi plan hatina kirin. Bo ku ew komkujiyên ku wê bi alîkarîya tirkiya ku wê DAÎŞ bike,

xwe ji wan "dûr" bide nîşandin. Hemû plan û konsepta di temenê van dane ravandina mirovan bi alikarîya tirkiya ku weke ku "DAÎŞ´ê ravandina", bo vê yekê na.

Li vir, divê ku mirov dûbare werêne ser ziman ku heta vê kêlîkê jî, bi alikarîya tirkiya û bi çekên ku ji tirkiya diçin ji DAÎŞ´ê re ew hêrîşî rojavayê Kurdistanê û bi teybetî Kobanê dike. Her wusa, heta ku tê ser ziman ku gelek subayên tirk jî di nava wan de hena. Her wusa, tê gotin ku di perwerdekirina wan de jî subayên tirk hena. Bo vê yekê mirov dûbarê bibêje ku her komkujiya ku li KObanê û li dora wê û bigiştî li rojavayê kurdistanê ku were serê kurdan û xalkên li wir ku dijîn, divê ku mirov weke komkujiya tirkiya jî û van hêzên din ên li piştî DAÎŞ´ê û ku piştgirîyê didinê de jî bihasibêne. Divê ku mirov weke komkujiya zihniyeta wan werêne ser ziman.

Ev hêrîşên ku di van rojên dawiyê de li Kobanê zêdebûna, bi armanca şikandina hemû kurdan dihên kirin. Divê ku miirov di vê çerçoveyê de weke hêrîşên ku bi konseptek mazin ku dihên kirin bihasibênê û werêne ser ziman. BI wê re jî, di çerçoveya stretejiyek giştî de dihên kirin.

**Li Musilê bicihkirina DAÎŞ´ê, di temenê wê de planên mazin hena. Û ew plan jî, di temenê ku şoreşa rojava bişikênin de na.** Piştî şerê navxweyî ê Sûrî, li rojhilat bigiştî pêvajoyek nû destpêkir. Ji wê demê û heta vê demê, pêvajoya ku pêşketîya, êdî bi wê re rêxistinên olî ên tundrew dihên bi rêxistin kirin. Pêşî, xwestin ku li rojavayê kurdistanê kurdan bişikênin û wir bikina bin kontrolê rêxistinên weke DAÎŞ´ê de. Piştî ku kurdan xwe bi rêxistin kir, êdî piştre bo wê bi kurdan re ketin şer de. Şerê şikandina kurdan bi kurdan re kirin. Lê dema ku ditin ku li rojavayê kurdistanê nikarin, kurdan bişênin, êdî DAÎŞ herikandina li Îraqê. Li wir, herêmên ku li wan Sûnnî zêde na, li wan DAÎŞ bicih kirin.

Li Îraqê, weke ku di ancama levkirinekê de bê, DAÎŞ bi hesanî hat bicih kirin. CIhên ku DAÎŞ şandinê ên weke Musilê û hwd, artişa Îraqê ji wan hat vekişandin. Her wusa, gelek herêmên din ên Sûnnî jî wusa bû. Bi vê yekê, xate di nava Şîî, Sûnnî û Kurdan de jî, stûrtir bû. Êdî, bi fîllîyetê de Îraqê weke ku bibe sê-qat lê hat. Di nava van rêxistinên tundrew de ku bi dihên birêxistin kirin, Tirkiya bbi teybetî, bo ku kurdan bide sekinandin, bi wan re di nava alikarî û hevkarîyeka mazin de ya. Her wusa bo ku berê wan bidina kurdan jî, çi ji destê wan tê dikin.

Hê dibîra me de ya ku di destpêka şerê Sûrî de Rêxistinên DAÎŞ, Cebetil-nasr" û hwd, çawa ku qatle kurdan "helal" dikirin. Bi destê van rêxistina "fetwa" dihatina derxistin û bi wan kuştina kurdan, dest avêtina jin û mavê kurdan û hwd hatibû "helal" kirin. Li ser vê rewşê re, şerê vn rêxistinan bi kurdan re dane destpêkirin. BI wan "fetwa"yên ku bo serê kurdan dan û her wusa bi wê "helal" kirina kuştina kurdan û destavêtina mal û can û jinên wan û hwd, weke amedekarîya şerekî mazin ê bikurdan ê piştre jî mirov dikarê bixwêne. Piştre, ji xwe şerê van rêxistinên tundrew, ku alîkarîyeka mazin ya tirkiya ji wan re heya, bi kurdan re dawî lê ne hat. Î ro jî, ew şer bi kurdan re didomê. Ji wê zêdetirî, piştre hin bi hin ew şerê ku bi destê van rêxistinên tundrew ku çavên dunyê nabînê, ji rojavayê kurdistanê herikandin başûrê kurdistanê jî.

Li başûrê kurdistanê jî, pêşî hin taqînên wan bûn. Bi dehan mirovên sivîl ên kurd qatil kirin. Piştre, weke ku rejima malikî re lev bikin, ji herêmên sûnnîyan artişa Îraqê dan vekişandin û li şûna wê DAÎŞ bicih kirin. Ji herêmên Musilê bi vî rengî, pêvejoyek hat dayîn destpêkirin. Nûha, ku em li rewşa Îraqê dinerîn, piştî ku DAÎŞ´ê xwe li Musilê bicih kir û Nînova telan jî kir, piştre hin bi hin li hin herêmên din jî kontrola wê hatina

çêkirin. Sûnnîyên Îraqê, kirina temenê DAÎŞ´ê.
BI vî rengî, pêvejoyek nû bo kurdan jî destpêkir. Kurdan, herêmên wan ên ku dervî rêveberîya başûrê kurdistanê mana ên weke Şêngal, kerkûk, tûsxûrmatû û hwd, kirina bin kontrola xwe de. Ev herêmên kurdistanê, nûha di bin ewlakarîya hêzên kurdistanî pêşmergeyan de na. Lê hhê jî, telûkeya hêrîşên li wê hena. Ev jî, dîsa bidestê van rêxistinên tûndrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd a.
Lê li vir, divê ku em vê yekê biteybetî bibêjin ku li Musil û hin herêmên din ên Îraqê bicihkirina DAÎŞ´ê, planaka ku di wê de DAÎŞ´ jî weke ´fîgûran" dihê bikarhanîn a. Ev rêxistina ku di vê temenê de dihê bikarhanîn, li herêmê, Tirkiya pirr zêde dixwezê ku wê bide hêrîşkirin li ser serê kurdan. Bo vê yekê, çi ji destê wê tê dike. Hemû alikarîya we bo vê yekê bikardihêne. Bi bicihkirina DAÎŞ´ê li Îraqê jî, ji hin anîyên din ve jî bi kurdan re şer dihê dayîn kirin. Ji aliyê Îraqê ve jî şer bi kurdan re temenê wê ji hin aliyên din ve dihê dayîn destpêkirin. Ji ber ku piştî vê bicihkirina DAÎŞ´ê li Musilê, heta roja me, ew bombayên ku li Îraqê dihatina taqandin bi armanca ji wir derxistina Emerika û hwd, bo wê êdî rewş guharî ya. Nûha, herêmên şîîyan di bin kontrola şîîyan de na. Bi heman rengî, herêmên kurdan dibiin kontrola kurdan de na. Herêmên Sûnnîyan jî, dibin bin kontrola DAÎŞ´ê ku xwe weke rêxistineka sûnnîyan birêxistin dike de.
Ev rewş, bi vî rengî dihê pêşxistin. Piştî li Îraqê bicihkirina DAÎŞ´ê li Îraqê, ji lîsteyên terorê derxistin rêxistina `cebetil-nasr" û hwd jî, ji aliyê tirkiya û hwd ve, dide nîşandin ku planaka pirr berfireh hatîya amede kirin. Ev dide nîşandin ku konseptek şer ya di rojên pêş de ku wê were bi rêvebirin hatîya amede kirin. Wê dîsa, rejimên herêmê ku bi kurdan û hwd re bê, wê van rêxistinên tundrew, bikina dijberîyê de û piştre bikina şer de. Hertimî, hewldanê rejima tirk ên hertimî xateke di nava kurdan û olê de çêkirin jî, divê ku miirov bi vir ve fahm bike. Ji nava olê paqijkirina navê kurdan û hwd jî, bi vir ve girêdayî ya. Her wusa, di vê temenê de, dervî olê hewldanên bi pozisyon kirina kurdan, bi şerê van rejiman ên weke tirkiya û hwd ê bi kurdan re ku di temenê wê de car bi car olê jî dihê îstismar dikin jî heya. Bo ku wî şerî bidina domandin vê dikin.
Herêma Musilê, bicihkirina DAÎŞ´ê, weke dorpêçkirineka pêşketina civate kurd jî, mirov dikarê fahm bike. Wê çawa projeya şoreşa rojavayê kurdistanê a ku hemû ciherengiyîn olî û xalkî di nava xwe de hmbêz dike têk bibin, di wê temenê de hin bi hin van rêxistinên olî n tundrew birêxistin dikin. Ji lîsteya terorê derxistina cebetil-nasr, hinekî jî, bi vê ppêvajoya şerkirina bi kurdan ve girêdayî ya. Siba, dibê ku heman pêvajoyê bo DAÎŞ´ê jî bi rêve bibin. ..
Kurd, di vê demê de, divê ku xwe birêxistin bikin û yekîtîya di nava xwe de xort bikin. Hemû dijberîyên li ser partîyan re ku di nava civate kurd de bûna, werina ji holê rakirin. Ev, di vê demê de pirr zêde pêwîstî pê heya. Wekî din, wê ev pêvajo, zirerê bide kurdan. Ji xwe, bo ku zirerek mazinn bidna kurdan, rejima tirk bi teybetî li dijî yekîtîya navxweyî ya kurdan a.
Pêvajoya ku rêberê gelê kurd birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê bi rêjma tirk re daye destpêkirin bo çareserkirina pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane, heta roja me bêî ku rejima tirk ti gavê biavêjê domîya. Di aslê xwe de, rejima tirk, ji vê ppêvajoyê jî, sûd girt û xwe ji aliyê leşkerî ve bizêdetirî birêxistin kir bo ku kontrola xwe bi leşkerî li ser kurdan çê bike û şerê xwe yê bi kurdan re bidomêne. Ev rewş, hê jî didomê. Rejima tirk, ji ber çi gavan navêjê? Ji ber ku naxwezê ku statûya kurdan nas bike, ne gavan diavêjê û

ne jî dixwezê ku statûya kurdan nas bike. Rewşên ku weke gavan dihên şîrovekirin ên weke "trt-6" û hwd jî, ti temenê wan ê destûrî tûna ya. ji xwe zimanê kurd, weke "zimanê ku hê tên jîyîn"şîrove dikin. Navê kurdan û kurdistanê qadaxa ya, Her wusa zimanê kurdî qadaxa ya. Pêvajo, di isrera rejimê ya ne naskirna statûya kurdan de xitimîya.

Lê divê ku em bibêjin ku wê vê pêvajoya ku bi wê DAÎŞ´ û hwd li Îraqê bicihkirin, wê hê kûrtir bikin. Li ser wê re, wê hewl bidn ku pêvejoyek nû ya metingerîyê li herêmê bidina destpêkirin. Wê di temenê vê de jî, olê pirr zêde îstîsmar bikin. Ya ku herî zêde li vir, divê ku mirov balê bikişêne li ser jî ev bixwe ya. Wê li ser vê rewşê re, hem li dijî kurdan û hem jî li dijî Îranê bixwe jî, hin bi hin hin pêvejoyna bidina destpêkirin. Li vir, wê ev pêvajo hin bi hin were kûrtir kirin. Hemû nakokîyên civatî û olî û hwd ku hena, di vê pêvejoyê de cardin tên sorkirin û li ser wan re dijberî dihê xwestin ku were pêşxistin. Pêvajoya li Îraqê bicihkirina DAÎŞ´ê, wê hê zêdetir were kûrkirin. Ev, ne hewldaneka DAÎŞ´ê ya. Ev planaka ku di wê de DAÎŞ´ dihê bikarhanîn a.

Kurd, di vê pêvejoyê de, çendî xwe birêxistinkiribin û yekîtî di nava xwe de çêkiribin, wê ewçendî serbikevin. Di vê demê de, hêzên birêxistinkirî, wê serkevtin ya wan bê. Gelê kurd, di vê demê de, pêvejoya azadîya xwe ya civatî, wê bidest bixe. Ev jî, wê bi yekîtîya civatî ya kurd bê. Li kurdistanê, di vê demê de bi vî rengî, divê ku gelê kurd ji her demê zêdetirî birêxistinkirî û bizane bin. Şoreşa rojeva, perspektifa pêşarojê hem bo kurdan û hem jî bo herêmê derxist li holê. Di aslê xwe de, hêrîşên ku li kurdan dibin, hinekî jî li wê perspektifê na. Hêrîşên DAÎŞ´ê li wê perspektifê na. Her wusa,, ev hêrîş, heya ku di demên pêş de pirr zêdetir jî bibin. Divê ku mirov ji vê jî amede bê. Ji xwe rejima tirk amedekarîyek şer ya mazin kirîya.

Li rojhilat, ji her aliyê ve pêvejoyek nû destpê dike. Peymanên ku piştî şerê cihanê ê yekemin ku hatina çêkirin, hin bihin ji holê dirabin. Herêm xwe ji nû ve birêxistin dike. Têkiliyên nû diafirin. Kurd jî, wê di vê pêvejoyê de statûya xwe bidest bixin. Ya ku nûya
şerê bikurdan re dihê kirin jî ev a. Yanî, şerê bêstatû hiştina kurdan, bi kurdan re dihê kirin. Li rex kurdan li rojavayê kurdistanê jî û li başûrê kurdistanê jî, bicihkirina rêxistinên weke DAÎŞ´ê ê tundrew û hwd, hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Di temenê dorpêçkirinekê de, wan rêxistinên tundrew bicih dikin.

-Li dijî pêşketina cihêrengiya herêmê, rejimên herêmê dîsa destavêtina olê ku biwê statûqûya xwe biparêzên, DAÎŞ´ê, di ancama wê de li Îraqê bicih kirin. Li rojhilat, hê em li ser ancamên şerê cihanê ê duyein dihizirin û hizên xwe dihênin ser ziman. Li rojhilat, ahang(denge)yên ku afirîna jî, ên piştî şerê cihanê ê duyemin a. Sûrî jî û Îraq jî, du dewletên ku dewletên weke Ingilistan û Firanse ku li rojhilat xwestin ku metingerîya xwe pêş bixin, di ancama metingerîya wan ku hatina avakirin in. Î ro, ku em li hebûna Îraqê jî û li ya Sûrî jî, em binerîn, em dinarin Îraqê weke sembola metingerîya Ingilistanê û Sûrî jî weke sembola metingerîya Firanse şîrove bikin û werênina ser ziman. Li herêmê, bo ku hebûna van herdû dewletan li ser lingan bigrin jî, gelek xwûna gelan li herêmê hat rijandin.

Î ro, nûqteya ku em hatinê de, hê jî ew a. Piştî şerê kendavê ê yekemin ku Emerika ket Îraqê de, di nava Îraqê de ahangek nû derket li holê. Hingî, kurd, sûnnî û Şîî weke sê hêzên xort ên navendî derketina li holê. Piştre di şerê kendavê ê duyemin de çend ku Saddam û rejima baasê hat ji holê rakirin jî, ji ber ku ew zihniyeta wî ji holê ne hat

rakirin, piştre rewşê û pirsgirêkên xalk û cihêrengiyên din ên bi bawerî û hwd, weke xwe doman. Ji xwe li ser wê rewşa ku li ser wê baas hatibû bi rêxistin kirin, piştre DAÎŞ hatîya birêxistin kirin. Nûha, ew statûqûya ku berê Saddam û î ro jî, tirkiya, Sûrî û Îran û hwd parazvaniya wê dikin, DAÎŞ parazvaniya wê dike. Tenê, farq ew a ku DAÎŞ, ev komên olî ên tundrew ku di bin navê olê de derdikevin.

Nûha li rojhilat, du xat hatina derxisstin li pêş û bi hevdû re dihên dayîn şerkirin. Yek, xate sûnnîtîyê ya ku li ser komên weke DAÎŞ´ê û hwd re dihê birêxistin kirina. Li pişt vê xate sûûdî arabîya û Qatar û her wusa tirkiya jî xwe nêzî wê dike ya. Xate duyemin jî ya Şîîtîyê ya. Ew jî, li ser Îranê re û her wusa rêxistinên weke `hizbileh" û hwd re dihê li holê Li Îraqê jî, pirranî girse şîî na. Lê sûnnîyan li wir, çend ku ne zêde jî bûn xwe di pergalê de birêxistin kirin û kurd jî û şîî jî kiribûbûna bin kontrola xwe de. Piştî şerê kendavê ê duyemin, şîî derketina li pêş. Nûha jî, di nava îraqê de bicihkirina DAÎŞ´ê hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Li vir, li ser rengê olê re li dijî hevdû pozisjonê digrin. Ev xate sunnî ku bi rêxistinên weke DAÎŞ+ê û hwd, xwe di rewşa weke ya Îraqê û sûrî û hwd de dide nîşandin, di nava şerê desthilatdariyê de ya. Li vir, sîyeseta ku dihê kirin jî, sîyeseta mezhebîtîyê ya. Ji ber ku vê yekê, divê ku mirov li vir bi teybetî, şîyeseta mezhebîtîyê baş şîrove bike û fahm bike.

Li vir, Rejima tirkiya, li ser sunnîtîyê re xwe bi rêxistin dike. Bi wê re jî, bi peymanên ku bi wê re çêkirina, PDK´ê re di temenê wê sîyeseta mezhebîtîyê re kirina pozisyonekê de.. Li vir, divê ku em bibêjin ku ya ku wê herî zêde zirerê bide kurdan jî ev a. Kurd, divê ku xwe di temenê mezhebîtîyekê û ankû sîyeseteka mezhebîtîyê de nekina nava pozisyonekê de. Ew wê zirereka mazin ya dîrokî bide kurdan. Bo vê yekê, di vê demê de, sîyeseta ku were kirin, wê çawa bê, divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Sîyeseta netewa demokratik, di vê rewşê de, weke sîyeseta herî aqilane ya ku dihê li berçav a.

Bi çareserkirina pirsgirêka kurd re, wê gelek ancamên xirab ê şerê cihanê ê duyemin ku li rojhilat bi avakirina Îraq û Sûrî û hwd re ku bûna, wê werina ji holê rakirin. Ev, wê bê destpêkek. Li Rojhilat, sîyeseta ku piştî şerê cihanê ê duyemin hat meşandin, ji ber ku ne demokratik û xalkan esas ne girt, êdî di wê temenê de, bi wê zihhniyeta statûqû parêz xwest ku reng û Awa bide xalkên herêmê. Xalkên li herêmên ên weke kurdan û hwd, dema ku li dijî wê berteka xwe dane nîşandin jî, rastî komkuji û qirkirinan hatin. Ev rewş, bo kurdan û li ser serê kurdan, heta roja me hê jî didomê. Komkujiyên weke ên komkujiya geliyê zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, komkujiya roboskî û hwd, çend ji wan komkujiyên mazin ên ku di ancama wê zihniyetê de hatina kirin in. Dema ku em li van komkujiyan û rengê kirina binerin, emê bibînin ku sîyesetek çawa ya statûqû parêz ku car bi car di rengê mezhebîtîyê de hatiya meşandin û hwd, mirov wê baş bibîne.

Piştî ku DAÎŞ´ê li Musilê hêza xwe bicih kir, êdî weke ku li îraqê jî pêvajoyek nû destpêkir. Bi teybetî, ev hêza DAÎŞ´ê ku li musil û dora wê û hin deverêndin ên Îraqê hatina bicih kirin, bi du armancan ew hatîya kirin. Armanca pêşî, bivan rêxistinên tundrew dorpêçkirina kurdan a û bi wan çûyîna bi ser kurdan de ya. Armanca duyemin jî, li dijî pêşketîya şîîyan a li Îraqê weke bergir(´tedbîr`)reka hêzên serdest ên herêmê ya. Yanî, bi gotinaka din, di temenê şerê serdestîyê de mirov dikarê wê fahm bike. Li ser mezhebîtîyê de wî şerî didin domandin. DAÎŞ´ê bi alîkarîya Sûûdî arabîya û qatarê ew kirîya destê xwe de. Lê tirkiya jî di nava wê piştgirîya DAÎŞ´ê de heya. Tirkiya, di

berdêla ku dijberiyê li rojavayê kurdistanê yanî di nava sînorê Sûrî ku şer bi kurdan re bikin û li Îraqê jî, li dijî rêveberîya kurd li gorî wê tevbigerihin, di berdêla van herdû xwestekan de piştgirîya wê ji DAÎŞ´ê re heya. Ji her aliyê ve piştgirîyê didiyê de. Yanî, Ev rêxistinên ku bi wan ol jî dihê îstîsmarkirin, di vê temenê de weke tetîkkeş dihên bikarhanîn li dijî kurdan jî.

Di demên pêş de, wê hêrîşan vê rêxistinê li kurdan bibin. BI teybetî hem li Sûrî û kurdstana rojava û li Îraqê û li kurdistana başûr, di rêx kurdan de bicih kirina van rêxistinên tundrew, hinekî bizanebûn, di temenê ku bi van rêxistinan kurdan kontrol bikin, dihên kirin. Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê serkevtin bidest xist, êdî ev tedbîr kirina rojevê de. Ji aliyekî din ve jî, hêzên herêmî ji ber ku li dijî azadîya gelên gelên herêmê na, bi olê û navê wê, ku karibin pêşîya wê pêşketina azadîya wan bigrin. Yanî, weke ku çawa ku kurdan li rojavayê kurdistanê pergalek demokratik pêşxistin ku hemû ciherengiyên olî û xalkî ku karibin xwe bênina ser ziman, weke artarnatîfa hêzên herêmê jî bi vî rengî ol dihê bikarhanîn li dijî wê. Yanî, çawa li dijî yekîtîya sovyetê ol hat bikarhanîn, herwusa, dixwezin ku bi heman rengî, dîsa bi olê rojavayê kurdistanê û bi teybetî pêşketina kurdan dorpêç bikin. Li vir, ji ber vê yekê, şîroveyeka îslame demokratik pêşxistina wê û bi awayekî vekirî û giring li ser wê sekinin pirr giring dibe.

Li Sûrî di rex kurdan û heta ku hewldana di nava kurdan de bicihkirina van rêxistinên tundrew û bi heman rengî li herêmên weke Musil û hwd ên başûrê kurdistanê jî bicihkirina rêxistinên tudrew, divê ku mirov di rengê wê **"kembere kesk a arab"** ku li ber sovyetê li herêmê hat pêşxistin de fahm bike. Li hemû hewirdora kurdan, rêxistinên tundrew dihên bicih kirin. Bi wan, dihê xwestin ku kurdan kontrol bikin.. Kurd, di vê navendê de, herî zêde pêwîstîya wan bi yekîtîyeka navxweyî heya. Tenê, bi yekîtîya navxweyî, wê karibin di nava wan gengêşî û tengezerîyên ku rûdidin ên li herêmê wê serkevtinê bidest bixin û civate xwe biparêzên. Yekîtîyê, weke nan û avê di vê demê pêwîstîya wê ji kurdan re pêwîsta.

Li Musil bicihkirina DAÎŞ´ê, weke pêşxistina Talîban li Afganistanê û piştre li ser wê re temenê mudaheleyê li herêmê pêşxistin, divê ku mirov fahm bike. Bi DAÎŞ´ê, temenê mudahaleyên nû jî li herêmê dihê pêşxistin. Ev mudahale ku li ser Îraqê re bibin, û ankû li cardin li ser Sûrî re bibin û hwd, wê li herêmê bibin. Lê bi çi rengî bibin û li kîjan nûqteyê jî bibîn, ku bila bibin, wê temenê hin mudaheleyna li herêmê dihê pêşxistin. Ev jî, bi vî rengî, dihê pêşxistin. Bo çêkirina temenê van mudahaleyan jî ev tundrewên ku çavên wan duny nabînê dihên bikarhanîn.

Di vê rewşê de, kurd jî, divê ku ji her aliyê ve li xwe û li herêmên xwe bihizirin. Ji ber ku bi van rewşan temenê mudahaleyan ku li nava wan bê û ankû li sîyeseta wan bê, dihê pêşxistin. Sînorê bisînorkirina kurdan bi wê re dihê pêşxistin. Ev rewşên ku li rojhilat pêşdikevin, divê kurd, weke mudahaleyekê li xwe jî bibînin. Ji hemû aliyan ve li rex van rêxistinên tundrew dihên bicihkirin. Bo vê yekê, kurd jî, li şûna ku van rewşan di nerîna pêşî de red bikin û dijberîyê li dijî wan bidina nîşandin, divê ku baş bixwênin û şîrove bikin û politikaya xwe ya olî û hwd ya rast a li gorî wê pêş bixin û bikina meriyetê de. Berî nûha biçendekê, konferanse Îslame demokratik hat li darxistin. Ev weke bereyekê divê ku were pêşxistin û bitêgihiştin kirin. Ev, wê weke aliyekî ewlakarîya kurdan bixwe jî bê. Ewlakarî, ne tenê bi leşkerî û ankû şîyesî ya. Her wusa, ji van aliyan ve jî, ivê ku mirov politikayan pêş bixe. Rejimên herêmê li dijî pêşketina pirrrengiya herêmê a bi cihê rengî a ji aliyê û xalkîtîyê û hwd ve, dîsa dest avêtina olê û

bi wê dixwezin ku statûqûtîya xwe biparêzên.

**-Li dijî pêşketina cihêrengiya herêmê, rejimên herêmê dîsa destavêtina olê ku biwê statûqûya xwe biparêzên, DAÎŞ´ê, di ancama wê de li Îraqê bicih kirin.** Li dijî pêşketina cihêrengiya herêmê, rejimên herêmê dîsa destavêtina olê ku biwê statûqûya xwe biparêzên, DAÎŞ´ê, di ancama wê de li Îraqê bicih kirin. Li rojhilat, hê em li ser ancamên şerê cihanê ê duyein dihizirin û hizên xwe dihênin ser ziman. Li rojhilat, ahang(denge)yên ku afirîna jî, ên piştî şerê cihanê ê duyemin a. Sûrî jî û Îraq jî, du dewletên ku dewletên weke Ingilistan û Firanse ku li rojhilat xwestin ku metingerîya xwe pêş bixin, di ancama metingerîya wan ku hatina avakirin in. Î ro, ku em li hebûna Îraqê jî û li ya Sûrî jî, em binerîn, em dinarin Îraqê weke sembola metingerîya Ingilistanê û Sûrî jî weke sembola metingerîya Firanse şîrove bikin û werênina ser ziman. Li herêmê, bo ku hebûna van herdû dewletan li ser lingan bigrin jî, gelek xwûna gelan li herêmê hat rijandin.

Î ro, nûqteya ku em hatinê de, hê jî ew a. Piştî şerê kendavê ê yekemin ku Emerika ket Îraqê de, di nava Îraqê de ahangek nû derket li holê. Hingî, kurd, sûnnî û Şîî weke sê hêzên xort ên navendî derketina li holê. Piştre di şerê kendavê ê duyemin de çend ku Saddam û rejima baasê hat ji holê rakirin jî, ji ber ku ew zihniyeta wî ji holê ne hat rakirin, piştre rewşê û pirsgirêkên xalk û cihêrengiyên din ên bi bawerî û hwd, weke xwe doman. Ji xwe li ser wê rewşa ku li ser wê baas hatibû bi rêxistin kirin, piştre DAÎŞ hatîya birêxistin kirin. Nûha, ew statûqûya ku berê Saddam û î ro jî, tirkiya, Sûrî û Îran û hwd parazvaniya wê dikin, DAÎŞ parazvaniya wê dike. Tenê, farq ew a ku DAÎŞ, ev komên olî ên tundrew ku di bin navê olê de derdikevin.

Nûha li rojhilat, du xat hatina derxisstin li pêş û bi hevdû re dihên dayîn şerkirin. Yek, xate sûnnîtîyê ya ku li ser komên weke DAÎŞ´ê û hwd re dihê birêxistin kirina. Li pişt vê xate sûûdî arabîya û Qatar û her wusa tirkiya jî xwe nêzî wê dike ya. Xate duyemin jî ya Şîîtîyê ya. Ew jî, li ser Îranê re û her wusa rêxistinên weke `hizbileh" û hwd re dihê li holê Li Îraqê jî, pirranî girse şîî na. Lê sûnnîyan li wir, çend ku ne zêde jî bûn xwe di pergalê de birêxistin kirin û kurd jî û şîî jî kiribûbûna bin kontrola xwe de. Piştî şerê kendavê ê duyemin, şîî derketina li pêş. Nûha jî, di nava îraqê de bicihkirina DAÎŞ´ê hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Li vir, li ser rengê olê re li dijî hevdû pozisjonê digrin. Ev xate sunnî ku bi rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, xwe di rewşa weke ya Îraqê û sûrî û hwd de dide nîşandin, di nava şerê desthilatdariyê de ya. Li vir, sîyeseta ku dihê kirin jî, sîyeseta mezhebîtîyê ya. Ji ber ku vê yekê, divê ku mirov li vir bi teybetî, şîyeseta mezhebîtîyê baş şîrove bike û fahm bike.

Li vir, Rejima tirkiya, li ser sunnîtîyê re xwe bi rêxistin dike. Bi wê re jî, bi peymanên ku bi wê re çêkirina, PDK´ê re di temenê wê sîyeseta mezhebîtîyê re kirina pozisyonekê de.. Li vir, divê ku em bibêjin ku ya ku wê herî zêde zirerê bide kurdan jî ev a. Kurd, divê ku xwe di temenê mezhebîtîyekê û ankû sîyeseteka mezhebîtîyê de nekina nava pozisyonekê de. Ew wê zirereka mazin ya dîrokî bide kurdan. Bo vê yekê, di vê demê de, sîyeseta ku were kirin, wê çawa bê, divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Sîyeseta netewa demokratik, di vê rewşê de, weke sîyeseta herî aqilane ya ku dihê li berçav a.

Bi çareserkirina pirsgirêka kurd re, wê gelek ancamên xirab ê şerê cihanê ê duyemin ku li rojhilat bi avakirina Îraq û Sûrî û hwd re ku bûna, wê werina ji holê rakirin. Ev, wê bê destpêkek. Li Rojhilat, sîyeseta ku piştî şerê cihanê ê duyemin hat

meşandin, ji ber ku ne demokratik û xalkan esas ne girt, êdî di wê temenê de, bi wê zihhniyeta statûqû parêz xwest ku reng û Awa bide xalkên herêmê. Xalkên li herêmên ên weke kurdan û hwd, dema ku li dijî wê berteka xwe dane nîşandin jî, rastî komkuji û qirkirinan hatin. Ev rewş, bo kurdan û li ser serê kurdan, heta roja me hê jî didomê. Komkujiyên weke ên komkujiya geliyê zilanê, komkujiya dersimê, komkujiya helebçê, komkujiya roboskî û hwd, çend ji wan komkujiyên mazin ên ku di ancama wê zihniyetê de hatina kirin in. Dema ku em li van komkujiyan û rengê kirina binerin, emê bibînin ku sîyesetek çawa ya statûqû parêz ku car bi car di rengê mezhebîtîyê de hatiya meşandin û hwd, mirov wê baş bibîne.

Piştî ku DAÎŞ´ê li Musilê hêza xwe bicih kir, êdî weke ku li îraqê jî pêvajoyek nû destpêkir. Bi teybetî, ev hêza DAÎŞ´ê ku li musil û dora wê û hin deverêndin ên Îraqê hatina bicih kirin, bi du armancan ew hatîya kirin. Armanca pêşî, bivan rêxistinên tundrew dorpêçkirina kurdan a û bi wan çûyîna bi ser kurdan de ya. Armanca duyemin jî, li dijî pêşketîya şîîyan a li Îraqê weke bergir(´tedbîr`)reka hêzên serdest ên herêmê ya. Yanî, bi gotinaka din, di temenê şerê serdestîyê de mirov dikarê wê fahm bike. Li ser mezhebîtîyê de wî şerî didin domandin. DAÎŞ´ê bi alîkarîya Sûûdî arabîya û qatarê ew kirîya destê xwe de. Lê tirkiya jî di nava wê piştgirîya DAÎŞ´ê de heya. Tirkiya, di berdêla ku dijberiyê li rojavayê kurdistanê yanî di nava sînorê Sûrî ku şer bi kurdan re bikin û li Îraqê jî, li dijî rêveberîya kurd li gorî wê tevbigerihin, di berdêla van herdû xwestekan de piştgirîya wê ji DAÎŞ´ê re heya. Ji her aliyê ve piştgirîyê didiyê de. Yanî, Ev rêxistinên ku bi wan ol jî dihê îstîsmarkirin, di vê temenê de weke tetîkkeş dihên bikarhanîn li dijî kurdan jî.

Di demên pêş de, wê hêrîşan vê rêxistinê li kurdan bibin. BI teybetî hem li Sûrî û kurdstana rojava û li Îraqê û li kurdistana başûr, di rêx kurdan de bicih kirina van rêxistinên tundrew, hinekî bizanebûn, di temenê ku bi van rêxistinan kurdan kontrol bikin, dihên kirin. Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê serkevtin bidest xist, êdî ev tedbîr kirina rojevê de. Ji aliyekî din ve jî, hêzên herêmî ji ber ku li dijî azadîya gelên gelên herêmê na, bi olê û navê wê, ku karibin pêşîya wê pêşketina azadîya wan bigrin. Yanî, weke ku çawa ku kurdan li rojavayê kurdistanê pergalek demokratik pêşxistin ku hemû ciherengiyên olî û xalkî ku karibin xwe bênina ser ziman, weke artarnatîfa hêzên herêmê jî bi vî rengî ol dihê bikarhanîn li dijî wê. Yanî, çawa li dijî yekîtîya sovyetê ol hat bikarhanîn, herwusa, dixwezin ku bi heman rengî, dîsa bi olê rojavayê kurdistanê û bi teybetî pêşketina kurdan dorpêç bikin. Li vir, ji ber vê yekê, şîroveyeka îslame demokratik pêşxistina wê û bi awayekî vekirî û giring li ser wê sekinin pirr giring dibe.

Li Sûrî di rex kurdan û heta ku hewldana di nava kurdan de bicihkirina van rêxistinên tundrew û bi heman rengî li herêmên weke Musil û hwd ên başûrê kurdistanê jî bicihkirina rêxistinên tudrew, divê ku mirov di rengê wê **"kembere kesk a arab"** ku li ber sovyetê li herêmê hat pêşxistin de fahm bike. Li hemû hewirdora kurdan, rêxistinên tundrew dihên bicih kirin. Bi wan, dihê xwestin ku kurdan kontrol bikin.. Kurd, di vê navendê de, herî zêde pêwîstîya wan bi yekîtîyeka navxweyî heya. Tenê, bi yekîtîya navxweyî, wê karibin di nava wan gengêşî û tengezerîyên ku rûdidin ên li herêmê wê serkevtinê bidest bixin û civate xwe biparêzên. Yekîtîyê, weke nan û avê di vê demê pêwîstîya wê ji kurdan re pêwîsta.

Li Musil bicihkirina DAÎŞ´ê, weke pêşxistina Talîban li Afganistanê û piştre li ser wê re temenê mudaheleyê li herêmê pêşxistin, divê ku mirov fahm bike. Bi DAÎŞ´ê,

temenê mudahaleyên nû jî li herêmê dihê pêşxistin. Ev mudahale ku li ser Îraqê re bibin, û ankû li cardin li ser Sûrî re bibin û hwd, wê li herêmê bibin. Lê bi çi rengî bibin û li kîjan nûqteyê jî bibîn, ku bila bibin, wê temenê hin mudaheleyna li herêmê dihê pêşxistin. Ev jî, bi vî rengî, dihê pêşxistin. Bo çêkirina temenê van mudahaleyan jî ev tundrewên ku çavên wan duny nabînê dihên bikarhanîn.

Di vê rewşê de, kurd jî, divê ku ji her aliyê ve li xwe û li herêmên xwe bihizirin. Ji ber ku bi van rewşan temenê mudahaleyan ku li nava wan bê û ankû li sîyeseta wan bê, dihê pêşxistin. Sînorê bisînorkirina kurdan bi wê re dihê pêşxistin. Ev rewşên ku li rojhilat pêşdikevin, divê kurd, weke mudahaleyekê li xwe jî bibînin. Ji hemû aliyan ve li rex van rêxistinên tundrew dihên bicihkirin. Bo vê yekê, kurd jî, li şûna ku van rewşan di nerîna pêşî de red bikin û dijberîyê li dijî wan bidina nîşandin, divê ku baş bixwênin û şîrove bikin û politikaya xwe ya olî û hwd ya rast a li gorî wê pêş bixin û bikina meriyetê de. Berî nûha biçendekê, konferanse Îslame demokratik hat li darxistin. Ev weke bereyekê divê ku were pêşxistin û bitêgihiştin kirin. Ev, wê weke aliyekî ewlakarîya kurdan bixwe jî bê. Ewlakarî, ne tenê bi leşkerî û ankû şîyesî ya. Her wusa, ji van aliyan ve jî, ivê ku mirov politikayan pêş bixe. Rejimên herêmê li dijî pêşketina pirrrengiya herêmê a bi cihê rengî a ji aliyê û xalkîtîyê û hwd ve, dîsa dest avêtina olê û bi wê dixwezin ku statûqûtîya xwe biparêzên.

-Her wusa di v navberê de dihê ditin û pêwîstîya yekîtîya kurdistanî dihê rojevê. Li ser nîqaşên ´serxwebûna kurdistanê´, avakirina hêza parastinê a hevbeş û pêşaroja kurdan.Piştî ku DAÎŞ ket Îraqê û herêmên weke Musilê kirina bin kontrola xwe de, li herêmê rewşna nû derketina li holê. Ku em bibêjin îraq êdî wê ne weke berê bê, wê rast bê. Piştî ku salên 1990´î ku Emerika ket Îraqê de, ku di farqê de bê û ne di farqe de jî bê, derbeyek bi wê ketina wê li wê statûya herêmê ket. Li herêmê, BI teybetî, rejimên weke Tirkiya, Îran û hwd, çend ku dem bi dem di rewşên politikî ê dijberî hevdû de jî bin, bi hevdû re ketina nava parastina wê statûqûya ku piştî şerê cihanê ê yekemin ku hatibû afirandin.

Li herêmê kurd jî, hin bi hin derketina li holê. Li başûrê kurdistanê kurdan desthilatdarîya xwe ava kir. Rejimên herêmê, ku li ser rêveberîya baxdadê re bê û ankû bi têkilî û peymanên ku çêkirina bê, bi wê ku wê çawa kurdan di bin kontrolê de bigrin, ketina nava hewldanên wê de. Î ro jî, rewş bi vî rengî didomê. Piştî salên 1990´î û hwd û pê de, şerê desthilatdarîyê li herêmê xorttir bû. Li Îraqê, nakokîyên ku weke ´nakokîyên di nava sûnnî û sîîyan de´ ku dihên bi navkirin jî, hinekî em dikarin di vê temenê de hildina li dest û şîrove bikin. Piştî salên 1990´î û pê de, li îraqê û li herêmên din ên rojhilat dawî lê ne hatîna taqîna bombayan, bi wê şerê desthilatdarîyê ve girêdayî ya. Di nava wê gengêşîyê de, gelê herî zêde zirer dît jî gelê kurd bû.

Kurdan, ji salên 1990´î û pê de, hin bi hin pêşketina xwe jîyan kirin. Lê di berdêla komkujiyên weke komkujiya dersimê ku tirkiya kir û her wusa komkujiyên weke ên komkujiya helebçe û hwd de ku rejima baasê a Saddam kir, jîn kirin. Ev pêvajoya komkujiyan hê jî li ser serê kurdan didomê. Kurdan jî, çend ku heta roja me, yekîtîyeka mazin di nava xwe de çênekiribin jî, lê bi demê re ditin û fahmkirin ku çendî ku yekbin û yekbûn di nava wan de hebe, wê ewçendî karibin li ser pêşaroja xwe û baxtê xwe jî bibina xwediyê gotinê. Bo vê yekê, êdî hin bi hin bi awayekê şênber hat rojevê ku kongira netewî a kurd were li darxistin. Ev ji jî wê pêwîstîya demê, pêşketina kurdan û yekbûna kurdan dihat.

Heta roja me, dengeyên ku di nava kurdan de bi sîyesî hatina avakirin, bi wê ew qatbûn di nava kurdan de hat çêkirin û domandin. Temenê wê qatbûnê li ser wan sînorên ku di konferanse skey-picot û lozanê de hatina xîzkirin hat pêşxistin. Ew weke statûqûyê û sînorên wê li herêmê hat dîyarkirin.

Di sale 2013´an de, hewldanên li darxistina kongira netewî a kurd û serneketina wê, hinekî jî di ancama van rewşan de bûya. Hêzên herêmê ên weke tirkiya û hwd, hertimî li dijî pêşketina kurdan bûna. Bo vê yekê, wê bi çi rengî pêşîya pêşketina kurdan bigrin, bi wê rengê bi kurdan re dikevina têkiliyê de. Piştî ku bahse "serxwebûna kurdistanê´ hat kirin û nîqaşên wê hatina kirin, êdî dîsa di nava nîqaşan de bahse wê dijberîya tirkiya û hwd dihê kirin. Bi gotinan, bahse dijberîya tirkiya a li dijî serxwebûna kurdistanê dihê kirin. Di cih de, di nava wan nîqaşan de Nêçîrwan berzanî dewetî Anqarê hatkirin. Civate kurd û Kurdistan, bi peymanên sykey-picot û peymane lozanê û hwd, hatina qatkirin. Civate kurd, hat qatkirin. Piştre jî, şerê wê di temenê bi armanca tûnakirina civate kurd de bi kurdan re hat kirin. Înkara kurdan hatkirin. Zimanê kurdan hat qadaxa kirin. Pêvajo û programên asimilasyonê bênavber li ser serê kurdan hatina domandin. Gotina ´kurd´ û ´Kurdistan´ê, hê jî di ancame wê de qadaxa ya. Kurd, di pêvajoyên bi vî rengî de derbas bûn û hatina heta roja me.

Kurd, î ro, pêvajo û rewşa ku di wê de na, di wê de serxwebûna kurdistanê nîqaş dikin. Her wusa bi wê re jî, bahse ´avakirina hêzek parastinê a kurdistanê ya hevbeş dikin. Bêgûman, ev hemû di berdêlên mazin de bûna. Divê demê de, kurd çendî ku yekbin, wê karibin serbikevin. Wê li ser baxtê xwe xwedî gotin bin û wê pêşaroja xwe dîyar bikin.

Kurd, li herêmê li rojhilat weke hêzek kifşkar in. Heta roja me, rejimên ku piştî şerê cihanê ê yekemin ku li rojhiat avabûna ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatîya qatkirin, bi peymanên ku li herêmê çêkirina ên weke ´paxta sadabadê´, ´paxta baxdadê´, ´peymane cezayîrê´ û hwd, statûqûya herêmê a ku avakiribûn heta roja me hanîn. Şerê wê qatkirina civatî bi dehan salan bi kurdan re kirin. Herî dawî, di konferanse Cenev´ê a yekemin û duyemin de, ev rewş bi awayekî vekirî pirr baş hat ditin. Bi konferansên weke ên Cenev´ê û hwd, hewldanên domandina wê statûqûya berê ku heta roja me hanîna û kurd di wê de bêstatû na, dan nîşandin.

Piştî şerê li Sûrî, ku kurdan li herêmên xwe êdî xwe birêxistinkirin û rêveberîya xwe ya xweser avakirin li rojavayê kurdistanê, êdî şerê wê bi kurdan re dan. Rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd, birêxistinkirin û dan hêrîşkirin li ser serê kurdan. Şerê ku rejimên herêmê ên weke Tirkiya û hwd li ser rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd re didin bi kurdan re, piştre ji Sûrî pijiqî li Îraqê jî. DAÎŞ´ê xwe li Îraqê li ser Sûnnîyan re birêxistin kir û bicihkir. Yanî, ew temenê ku li ser wê re rejima Baasê hatibû avakirin û Saddam li ser wê dijî, nûha DAÎŞ li ser wê re dihê bicihkirin li Îraqê.

Di vê temenê re, Sûnnîyên Sûrî û Îraqê li ser xatekê re ku Sûûdî arabîa temenê wê diafirêne digihijina hevdû. Siîyên Sûrî jî û Îraqê jî, xwe nêzî Îranê dikin. Kurd jî, li herêmên xwe serdest in. Piştî ku DaÎŞ ket Îraqê de, herêmên başûrê kurdistanê, ên weke kerkûk, Qanaqîn, tûsxûrmatû, Şêngal û hwd ku derve hatibûbûna hiştin, ketina bin kontrola hêzên kurdan de. Bi vê rewşê re dengeyên li herêmê guharîn. Piştî vê rewşê re, nîqaşên serxwebûna kurdistanê, zêdetir bûn.

Rewş, wusa dihê li berçav, ev nîqaşên ku li ser ´serxwebûna kurdistanê´ re dihên kirin, kifşkarîyeka wan bo civate kurd giştî heya. Çend ku li bakûrê kurdistanê pêvajoyek ku di pêşengîya birêz Ocalan de hatibûbê dayîn destpêkirin ku hebe jî, li ser van nîqaşên serbixwebûnê re, nêzîkatîya hêzên rojava li rewşa kurd, wê bandûra xwe li vê pêvajoyê jî bike. Dîsa li vir, li politikaya emerika dihê nerîn. Desthilatdarîya kurd a başûrê kurdistanê, ku serxwebûna kurdistanê denezêne û ew denezendin were naskirin, êdî ev wê bi awayekî xweza bandûra wê li çareserkirina pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê jî bibe. Politikayên mijulkirinê ku rejima tirk dimeşêne jî, hinekî divê ku mirov ji vir gavê biavêje û fahm bike.

Îraqeka yekpare ku rejimên weke tirkiya û hwd, hizir dikirin wê ti carî dernekeve li holê. Her wusa, heman gotin bo Îranê jî û Tirkiiya jî dibuhurê. Ya ku ev rejim şerê wê didin û ku wê ti carî nebê jî ev a.

Di her halûkarê de wê kurdistanî, serxwebûn û azadîya xwe bidest bixin. Wê kurd bigihijina maf û azadîya xwe. Ev yek, ji wê ti gûman tûna ya. Lê li vir, dirêjkirina van pêvajoyên bi vî rengî ên bixwûn jî ji aliyê rejimên herêmê ve, tenê rijandina xwûnê zêde dike û hewd. Ji wê zêdetirî ti tiştekî nakê. Lê li vir, serkevtina kurdan jî, hinekî jî di destê kurdan de ya. Kurd, çendî ku yekbin û yekbûnek di nava wan de hebe, wê ewçendî karibin serkevtina xwe bidest bixin û pêşaroja xwe bidestê xwe dîyar bikin. Di vê pêvajoyê de, hem ji aliyê sîyesî ve û hem jî ji aliyên din ve ku çendî kurd qatkirî(perçekirî) bin, wê ewçendî jî zîrerê ew bibînin. Di vê demê de bi sîyesetek hevbeş ku hêza xwe bikin yek, divê ku sîyesetê bo civate kurd û dîyarkirina pêşaroja wê bikin. Ya ku wê azadîya kurdistanê li her çar beşên kurdistanê jî bi xwe re bêne wê ev bê.

Nîqaşên li ser avakirina hêzek kurdistanî a parastinê ya hevbeş jî, temenê sîyesetek bi vî rengî wê biafirêne. Bo vê yekê, di vê temenê de û bi têgihiştinek bi vî rengî pêşxistina têgihiştinê û stretejiyek kurdistanî, wê pêşketin û serkevtina kurdan jî dîyar bike.

**-Rayaderên Îranî li ber rayadarên Arab digerihin ku dijberîyê li dij ´sexwebûna kurdistanê´ bênin ziman.** Ew dema ku di rojevê de, nîqaşên ´serxwebûna kurdistanê´ dihên kirin. Lê bi wê re jî, rayadarên Îrane ku ´rojhilatê kurdistanê´ di nava sînorê wê de hatîya hiştin, li navendên dewletên araban digerihin û ji wan dixwezin ku dijberîya xwe li dij ´serxwebûna kurdistanê´ werênina ser ziman. Bi vê rengê, dihê ditin ku Îran, dixwezê ku ji nava rayaderên arab jî, dixwezê ku dengekî dijber li dijî kurdan bide derxistin. Biqasî ku ji agahiyên ku tên guhê me, rayadarên Îranî di axiftinên xwe yên bi rayadarên arab de dihênin ser ziman ku "serxwebûna kurdistanê´, metirsîya bo rojhilata navîn", Her wusa, bi wê re dibêjin ku "wê kurdistane serbixwe, bibe îsraîle nû ku bi bastika rojhilat bigrê". Ev gotinên rayadarên Îranî na ku di nava axiftinên xwe de dihênina ser ziman.

Her wusa, ji van gotinan mirov tiştekî din jî fahm dike, ew jî ew a ku rayadarên Îranî, ji wê dijberî û dijminatîya ku li dijî îsraîlê hatî çêkirin, dixwezin ku sûd bigrin û bi wê bandûrê li rayadarên arab jî bikin û bi wê re dijberîyê li dijî kurdan bidina afirandin. Ev demeka ku bi harareteke nîqaşên ´serxwebûna kurdistanê´ dibin, bi heman rengî rayadarên îranî jî, hin nîqaşna bi heman rengî bi rayadarên arab re dikin. Bi wê re, dixwezin ku dijberîyekê li dijî kurdan ji nava araban bidina çêkirin. Her wusa, di ancama wê de derbekarê Misrî El-sîsî, dibêje ku wê ´serxwebûna kurdistanê, wê xûrîxandinê bi xwe re bêne."

Rayadarên Îranî, bi qasî ku di çapameniyê de hatîya ser ziman, bi rayadarên kurd ên başûrê kurdistanê re jî axifîna û ew "tehdîd" kirina û ji wan re gotîna "emê destûrê nedin ´serxwebûna kurdistanê´". Di heman demê de jî, li ser çapameniyê re Cîgirê Wezîrê Derve yê Îranê bo Karûbarê Erebî û Efrîqayê Husên Emîr Ebdulehiyan, wê dijberîya îranê ya bi rengê dijminatîya gelê kurd, bi heman rengî dihêne ser ziman. Îranê, bi teybetî, dijminatîya wê ya li dijî kurdan, di gelek deman de hatîya ser ziman. Politikaya rejima îranê ya tûnakirina civate kurd û nirxên ya bi rengê bişavtin(´asîmlasyonê´)ê di roja me de jî didomê. Lê rayadarên Îranî, di van rojên dawîyê de wê dijminatîyê êdî vekirî bi awayekî li berçav li ser çapameniyê re dikin.

Li vir, di serî de divê ku mirov bibêje ku ´serxwebûna kurdistanê´, weke ku rayadarên Îranî dibêjin bo rojhilat ne metirsî ya. Lê bo Îranê û Tirkiya dibêt ku Metirsî bê. Ji ber ku Heta roja me, li ser esasê tûnakirina kurdan bi kurdan re şer kirina û politikayên bişavtinê li ser serê civate kurd bi deh salan meşandina. Nûha jî, civateka ku heta roja me, ku evqas politikayên asîmlasyonê li ser serê wê meşandina ku rabê ser xwe û doza maf û azadî û serxwebûna xwe bike, bêgûman wê ji wê hêza ku ew politika meşandin re metirsîyê çê bike. Lê ku em ji aliyê rojhilat ve lê binerin, wê kurdistanê bi serê xwe û bi hebûna xwe wê bê temenê aramîya herêmê ya pêşaroja wê. JI xwe, ji şerê cihanê ê yekemin ve, ji ber ku ev pirsgirêk hatina afirandin, êdî ev herêm bûya qade şer. Dema ku ev pirsgirêk werina çareserkirin û ji holê rabin, wê hingî sedema şer ji xwe ji holê rabê. Di serî de, rastî ev a û bi vî rengî rastî vajî gotinên rayadarên Îranî ya.

Rayadarên Îranî, metirsîya wan, kurdên rojhilatê kurdistanê na ku di nava sînorê wê de mana. Dema ku kurdan baxtê xwe kifşkir û gihiştin maf û azadîya xwe, wê hingî bêgûman bandûrê li kurdên rojhilatê kurdistanê ku di nava sînorê îranê de mana jî bike. Metirsîya Îranê ji vê yekê ya. Wekî din, mirov nikarê bahse metirsîyekê bike. Gotinaka din jî ya Cîgirê Wezîrê Derve yê Îranê bo Karûbarê Erebî û Efrîqayê Husên Emîr Ebdulehiyan ew a ku dibêjê ku " planaka sîyonîst a." Çi alaqa bi hevdû hevdû re heya? Ti alaqa tûna ya. Li vir di vê xalê de, divê ku ji aliyê maf û azadîya gelê kurd ve mirov lê binerê. Gelê kurd, dixwezin ku Azad bibin. Heta roja me, zora rejima îranê û rejima tirk û ya rejima baasê a Saddam û ya rejima baasê a Beşar Esad kişandîya. Nûha kurd, tekoşîna ji vê zilm û zorê xilas bibin didin.

Divê çerçoveyê de divê ku ez bibêjim ku piçek jî ahlaqê mirovatiyê bi rayadarên Îranî hebe, divîyabû ku dijberîyê li dijî maf û azadî û serxwebûna kurdistanê nedina nîşandin. Ji ber ku ev ne mirovî ya û ne ahlaqî jî ya. Her wusa, ew mafê civatekê ya. Gelê kurd, civakek mazin a. Mafê ya ku li ser baxt û pêşaroja xwe biryara xwe bide. Li şûna wê, ku rabin û bibêjin ku ne, ew ne maf û em nahêlin, wê çaxê ew nabê mirovatî ew dibe zilm û zorbatî. Bi heman rengî rayadarê Îranî di çerçoveya dijberîya xwe ya li dijî civate kurd de dibêje ku "emê destûrê nekin ku xwesteka natanyahû were li cih." Di serî de, li vir, divê ku mirov bibêje ku berevajîkirinek heya. Divê ku mirov wê sererast bike. serxwebûna kurdistanê, ne xwesteka natanyahû ya, serxwebûna kurdistanê xwesteka kurdan û civate kurd a. Di serî de, divê ku mirov vê yekê fahm bike. Weke ku çawa ku rayadarê Îranî û Cîgirê Wezîrê Derve yê Îranê bo Karûbarê Erebî û Efrîqayê Husên Emîr Ebdulehiyan, di temenê dijberîya civate kurd de hizrên xwe hanîna ser ziman, Natanyahû jî hizrên xwe di temenê piştgirîya kurd de hanîya ser ziman. Em nikarin ji vê zêdetirî payê bi wê gotinê bipîvin.

Di vê rewşê de, bo kurdan wateya rayadarên Îsraîlî çi bê, ya yê Îranî jî ew a. Di wê

de, farq tûna ya. Li vir, li dijî kurdan axiftin, tenê mirov dikarê bi dijminatîyê werêne ser ziman. Yanî bi gotinaka din, dibêjin, emê we ji dîrokê bibin lê win dengê xwe dernexin. Ev gotin, tên wê wateyê. Her wusa, ku mirov ji kîjan aliyê ve jî lê binerê, divê ku mirov fahm bike ku ew mafê kurdan a ku herina rafarandûmê bo kifşkirina baxtê û pêşaroja xwe.

Kurd, serxwebûna xwe jî denezenên û wekî din çawa jî bijîn, wê li herêmê bijîn. Ev rastîyek a. Wê neçin herêmek din. Ji ber ku ew herêmên wan in. Li vir, pirsgirêka Îranê û dijberîya wê, em dikarin tenê bi rojhilatê kurdistanê ku di nava sînorê wê de hatîya hiştin a. Îranê, di vê çerçoveyê de dijminatîyaka mazin heta nûha li kurdan kiriya. Di salên 1946´an de, komare kurd a Mihabadê li rojhilatê kurdistanê ava bû. Lê Îranê ew bixwûnê tafisand. Berteka Îranê, hinekî jî em dikarin li tafisandina komara kurd a Mehabadê binerê û fahm bike. Gelo di wê salê de Îsraîl hebû? Na, nebû. Tenê, êdî bûya weke kevneşopîyekê ku rayadarên Îranî, bi rejimên din ên herêmê re, ew dijbarîya îsraîlê ku çêkirina êdî bi rengên bi vî rengî bikar jî dihênin. Nûha, dixwezin ku wê bikarbênin ku li dijî kurdan bertekan bidina çêkirin. Ev jî, lîstika îranê ya.

Ez di wê bawerîyê de me, wê bi dijberîya li ser Îsraîlê re ku afirandina, wê di demên pêş de jî, pirr zêde bahse ´serxwebûna kurdistanê´ bikin. Îran, wê bi vê bike û bixwezê ku di nava rayagiştî a îranê de bê û ankû dinava rayagiştî a arab de bê, ku karibê dijberîyekê û ankû dijminatiyekê li dijî kurdan bide çêkirin. Bo vê yekê, wê di demên pêş de, zêdetir jî were ser ziman. Ev jî, lîstika ya. Bi teybetî, li herêmê, welatên ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin, hertimî serî li rêbazên bi vî rengî dane. Weke ku çawa ku dûhû serî li rêbazên bi vî rengî didan wê î ro jî bidin û wê siba jî bidin.

**- Pêwîstîya yekîtîya di nava kurdan de, di vê dema dîrokî de derdikê li pêş.** Kurd, di vê demê de di demek dîrokî de di buhur in. Hemû herêmên kurdistanê, di bin hêrîşên DAÎŞ´ê ku piştîgirîya welatên weke tirkiya ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin ji wê re heya. Bi teybetî, divê ku mirov vê di serî de bibêje ku DAÎŞ´ bi armanc ji holê rakirina temenê çareserkirina pirsgirêka kurd hatîya derxistin li Holê. Du herêmên kurdistanê ên weke başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurdî li wan ava na, li wan hêrîş dihê kirin. Armanca hêrîşên DAÎŞ´ê, bi teybetî, va herdû herêmên kurdistanê û rêveberîyên wan ên kurdî bişikênê ya..

Di destpêka mudahaleya li Sûrî de, hewl hat dayin ku kurd dervî hemû pêvajoyên sîyesî werina hiştin. Bo vê yekê, di hemû civînên weke ên konferansên Cenev´ê yekemin û duyemin de kurd dervî wan hatina hiştin. Bi vê yekê jî, ew statûyên ku di van civînan de werina kifşkirin, ji kurdan xwestin ku kurd wan herê bikin. Bo vê yekê, gelekî jî çûna bi ser kurdan de. Piştî ku kurdan rêveberîya xwe ya rojavayê kurdistanê ava kir û pê de, êdî bidest çûyina bi ser kurdan de kirin. Di serî de, ew rêveberîya kurd ya rojavayê kurdistanê ku hatî avakirin, di armanca hêrîşên çeteyên weke ên DAÎŞ´ê û hwd de ya. Bo vê yekê, divê ku mirov vê rêxistina DAÎŞ´ê û hêrîşên wê ên li kurdistanîyan û li civate kurd ku dike, weke weke rêxistin û hêrîşên ku bi wan dixwezin ku civate kurd bişikênin.

Ew gotinên ku weke gotinên Dawûtoglu ên bi rengê "stretejîya kûr" û hwd jî, temen û mantiqê wê li ser van hêrîşên DAÎŞ´ê hatibû avakirin. Bi wê stretejîyê, hizirkiribûn ku ev rêxistina tûndrew wê hêrîşî kurdan bike û wê rojavayê kurdistanê bişikêne û heta ku wê başûrê kurdistanê jî, bi hêrîşên DAÎŞ´ê wê derbeyek mazin

bixwê. Bi vî rengî, plan û program hatina çêkirin. Di vê temenê de, ew pêvajoya ku Birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê bo çareserkirina pirsgirêka kurd ku dabû bû destpêkirin, rejimê kir temenê van hêrîşan de. Di despêka pêvajoyê de,, bidest çêkirina qarakolan li bakûrê kurdistanê ji aliyê rejima tirk ve jî, divê ku mirov di vê temenê de fahm bike. Wusa hizir kirina ku ji dervê wê DAÎŞ´ derbeyekê mazin li kurdan bixe. Wê li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê derbeyek li kurdan were xistin. Piştre jî, bi wan qarakol û amedekerîyên bi wê re ên li bakûrê kurdistanê jî, êdî wê çûban bi ser kurdan de û dengê kurdan bi birrîyan û bitafisandan.

Yanî, em bi gotina "stretejîya kûr" ya dawûtoglu re, divê ku em çêkirina qarakolan ên li bakûrê kurdistanê û hêrîşên DAÎŞ´ê ên li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê bi hevdû re şîrove bikin û werênina ser ziman**.** Ev hasabên ku di vê demê de hatina kirin, bi wan hatîya armanc kirin ku derbeyekê li kurdan bixin. BI vî rengî, wê pêşketina kurdan biheta ji holê rakirin. Bi teybetî, DAÎŞ´ê herdû herêmên kurdistanê ên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd ava na, dike armanca hêrîşên xwe. Li van herêman hêrîşî civate kurd dikin û dixwezin ku bi goçberkirinê û hwd bê, derbeyekê li civate kurd û pêşketina wê ya ku hata vê demê bûya bixin. Î ro, li başûrê kurdistanê û li rojavayê kurdistanê rêveberîyên kurd hena û biteybetî jî ev herdû herêmên kurd di bin hêrîşên DAÎŞ´ê de na. Piştî civîna rayadarên tirk û rayadarên îranî ya li qasra Sadabadê ku di wê dema ku konferanse Cenevê a duyemin di hatkirin de ku bûbû û piştre êdî ev hêrîşên li kurdan û li herêmên kurdan ên weke başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê, gav bi gav zêde bû.

Ev hêrîşên DAÎŞ´ê, bi armanca jihevxistina civate kurd û yekîtîya ku di nava hêzên kurd de ku bûya û hê navê wê ne hatîya danîn were ji holê rakirin.Kurdan, berî vê demê, li ser wê temenê hanîbûbûna rojevê ku kongire netewî a kurd were li darxistin. Piştre, Nêçîrwan Berzanî çûbû bû Anqara û piştî ku ew ji Anqara vegerîyabû û piştre, êdî li darxistina kongira Netewî a kurd hatibû taloqkirin li demek ne dîyar. Î ro, di vê dema ku civate kurd li başûrê kurdistanê, li rojavayê kurdistanê, li bakûrê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê di bin hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd de ya, hat ditin û fahmkirin ku çendî giringa ku yekîtîya kurd were çêkirin. Bi teybetî, li başûrê kurdistanê avakirina ji hêzên başûrî, rojavayî û bakûrî avakirina ´hêza hevbeş ya parastina kurdistanê´ li dijî hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd jî, ev rastî raxista li berçav. Bi vê yekê, hat ditin ku Kurdistan û civate kurd û destkevtiyên kurdistanî, tenê û tenê bi yekîtîya netewî û avakirina hêzên parastinê ên hevbeş re dikarê were parastin.

Li kurdistanê, hêzek netewî ku ne girêdayî ti partiyê divê ku were avakirin. Di vê temenê de, yekbûna kurdistanî, divê ku were avakirin. Cihêrengiyên kurdistanî, bi vî rengî dikarin werina parastin. Bi vê rastiya avakirina hêza hevbeş ya parastinê li başûrê kurdistanê, hat ditin ku hêrîşên ku ji vê demê û pê de ku li herêmên kurdistanê û civate kurd bibin, tenê û tenê dikarin bi berxwedanaka bi vî rengî ya kurdistanî ku hemû hêzên kurdistanî di nav de na,, dikarê were vala derxistin. Bo vê yekê, yekîtî bo kurdan di vê demê de ji nan û avê giringtira û pêwîsta. Bo vê yekê, hemû hêzên kurdistanî, divê ku êdî di vê çerçoveyê de bihizirin. Di hin rengên çapameniya kurd de, di vê dema dîrokî de di temenê dijberîyê de axiftin û gotin bilêvkirin jî, tenê zirerê dide civate kurd û hewd. Ji wê û pê de, zirerê nadê ti kesekî. Gotinên li ser dijberîyê ku bii çi nîyetê bin bila bin, tenê xizmetî rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin dike. Hin dordor jî, di bin navê rexnekirinê de, wê dijberîyê jî dikin û pêş dixin. Gotina

"rexnekirinê" tenê bo kirina wê dijberîyê û domandina wê dibe weke maskeyekê.

Kurd, dii vê demê de, ji her demê zêdetir mihtacî çêkirina yekîtîya navxweyî na. Kurd, mihtacî çêkirina hêzek hevbeş ku bi hevdû re hebûna civate kurd, pêşketin û destkevtiyên wê biparêzê ya. Ev, li başûrê kurdistanê jî, li rojavayê kurdistanê jî, li rojhilatê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê jî wusa ya. Yekîtî, bi teybetî, di sê-aliyan de pêwîsta ku were kirin. Ev hersê alî jî, yek aliyê sîyesî ya, aliyê duyem aliyê parastinê bi wê pêwst tê ditin ku hêzek hevbeş ya kurdistanî were avakirin û ya aliyê sêyemin jî darxistina kongira netewî a kurd a. Xabatên ku demek berî vê demê bo li darxistina kongira netewî hatibûbûna destpêkirin, divê ku ew carek din werina dayîn destpêkirin û bi ancam kirin. Êdî, divê ku hêz û partiyên kurd jî, berjewendîyên partiyên xwe li ser ya civate kurd û ya netewî re nebînin. Êdî divê ku berjewendîyên netewî bo van dordoran jî derkevina ser berjewendîyên partîyan. Ji vê demê û pê de, ti derfet ji kurdan re nema ya ku bêî ku yekîtîyekê di nava xwe de çê bikin ku hebûna xwe bidina domandin. Êdî ew dewra bi navê partîyekê avakirina hêzêkê û bi wê gotina ´ezê parastinê bikin´ bi dawî bûya. Li başûrê kurdistanê, ev yek hat ditin. Ku hêzên tevgera azadîya kurdistanê HPG û YPG´ê neçûbûban alikarîya hêzên peşmergeyî ên başûrê kurdistanê, wê nekarîban ku başûrê kurdistanê biparêzên. Wê başûrê kurdistanê derbeyek mazin û dîrokî bixwara. Ew derbe jî, wê li kurdan hemûyan ba.

Ev rastî hemû, divê ku bibaşî werina ditin. Hemû hêzên kurdistanî, divê ku ji vê pêvajoyê û hêrîşên ku di wê de li kurdistanîyan bûna dersê derxin. Di serî de, divê ku rêveberîya başûrê kurdistanê ji van hêrîşan dersê derxe. Hevkarîyên wê yên bi Îranê, tirkiya û rejima baxdadê re ku dike, hat ditin ku wê ti carî wê neparêzên. Heta ku tirkiya pirsgirêka kurd di nava xwe de çareser nekê û îran jî pirsgirêka kurd ya di nava xwe de çareser nekê, hemû têkilîyên bi wan re wê di temenê dijberîya hebûna civate kurd de bin. Ev jî, di vê demê de hat ditin. Hin hêzên kurd, ku di gotin ku "hevkarîya me bi tirkiya re xort a" hat ditin ku ew hevkarî di temenê dijberîya hebûna civate kurd de hatîya çêkirin. Ji xwe, di vê demê de em nikarin têkiliya rêveberîyên kurd bi rejimên weke ên tirkiya û îranê re bi gotinên weke "hevkarî" û ankû "têkiliyên baş" û an jî ku weke ku hin kurd bi nav dikin weke "têkiliyên stretejîkî" bi nav bikin. Ji ber ku di mantiqê van rengên têkiliyan de wekehevdûbûn û bûna xwediyê heman mafî weke hevdû heya. Rejimên ku statûya kurdistanî red û înkar dikin, wê çawa têkiliya bi wan re bê têkilîya "îtîfaqî" û ankû "stretejikî"?? Yên ku van gotina di roja me de bo têkiliyên kurd û tirk û ankû kurd û îranê b nav bikin, yan bi zanebûnî xwe û civate kurd dixapênin û yanî bi nezanebûnî wê xapandinê dikin.

Kurd, di vê demê de ji her demê zêdetirî mihtacê yekîtîyê na. Di rojên ku buhurî de, amedekarîya li darxistina kongira netewî jî kirin. Lê hê ew kongira netewî li darnexistina. Lê divê ku em vê jî ji bîr nekin ku rejima tirkiya û Îranê di serî de li dijî wê li darxistina kongira netewî a kurd derketin. Vêca, dema ku rewş ev bê, çawa mirov karê bahse têkiliyên "îtîfaqî" û "stretejikî" bi wê re bike? Bo vê yekê, ev rewşa ku di vê demê de ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê re derket li holê, ez hêvî dikim ku aqilê hemû kurdan hanî serê wan. Ku aqilê wan ne hanîbê serê wan, dibêt ku di hêrîşên î ro de têkçûnek mazin nexwaribin. Lê ziyenek mazin weke ku li şengalê bû, bi wan hêrîşan gihiştin civate kurd. Lê ku aqilê wan ne hatibê serê wan, wê di hêrîşên piştre de wê derbeyên mazin ku têkçûnê ji wan re bêne wê bixwûn. Ji xwe, bo ku têkçûnê bi kurdan bidina çêkirin, ev hêrîşên roja me li kurdan dibin. Ji ber ku bakûrê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê

pirsgirêka kurd ne hatîya çareserkirin ev hêrîş li kurdan dibin. Û heta ku li bakûrê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê pirsgirêka kurd newê çareserkirin, wê ev hêrîşên ku li kurdan dibin jî wê dawî li wan newê. Î ro, di bin navê DAÎŞ´ê de bûn. Wê siba, di bin navekî din de bibin. Heta ku tirkiya û Îran pirsgirêka di nava xwe de çareser nekin, wê hertimî li her derî hêrîşî kurdan bikin û wê hêrîşan bidina kirin. ..

**-Armanca sereka a rejimên herêmê, ew a ku bi hêrîş û hebûna DAÎŞ´ê derbeyê li kurdan bixin û ji çareserkirina pirsgirêka kurd xwe xilas bikin a.** Armancên rejimên herêmê ên bi pirsgirêka kurd ve girêdayî, rejimên herêmê birîya avakirina rêxistina DAÎŞ´ê. DAÎŞ, rêxistina ku rejimên herêmê bi wê dixwestin ku ji pirsgirêka kurd xilas bibin a. Ya ku bi rejimên herêmê DAÎŞ daye avakirin jî, pirsgirêka kurd a. Armanca sereka a rejimên herêmê ya di temenê avakirina DAÎŞ´ê de jî, ew a ku bi DAÎŞ´ê ji çareserkirina pirsgirêka kurd xilas bibin a. Nûha jî, di vê temenê de wê didina hêrîşkirin bi ser civate kurd û beşên wê ên weke civate kurdên şebekî, civate kurdên êzîdî û hwd de. Bo vê yekê armanca sereka a rejimên herêmê, ew a ku bi hêrîş û hebûna DAÎŞ´ê derbeyê li kurdan bixin û ji çareserkirina pirsgirêka kurd xwe xilas bikin a.

DAÎŞ´, weke rêxistineka ku bi wê derbeyê li kurdan bixin û kurdan bişikênin hatîya avakirin. Ji destpêka pêvajoyê "çareserîyê" ku li bakûrê kurdistanê birêz Ocalan dayî destpêkirin de, rejima tirk ti gavên bo çareserîyê ên cidî neavêtin. Rejima tirk, ji ber hêvîya wê hebû ku DAÎŞ, ´cebetil-nasr´ û hwd ku derbeyekê li kurdan bixe, gav neavêt. Ji hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê, hêvîya tirkiya ya herî mazin ew a ku derbeyekê li kurdan bixe. Di vê pêvajoyê de, hêvîya rejima tirk a herî mazin ev a.

Di vê temenê de rejima tirk, bihemû îstihbarate xwe re alikarîyaka mazin ya locîstikî û hwd, da çeteyên DAÎŞ´ê ku şer bi kurdan re bikin. Di çapameniyê de tê gotin ku "tirkiya destûrê dide çeteyan ku ji sînorê wê derbas bibin rojava.". Ji vê gotinê ya ku dihê fahmkirin ew a ku weke rejima tirk, nikarê kontrolê çê bike û dervî kontrola wê ew derbas bûn dibin. Hemû şîrove jî, li ser vê "întibayê" re bi zanebûnî bê û ankû ne bizanebûnî bê, dihên kirin. Ev întîba bixwe jî, dibe weke maskeyekê ji meşandina wî şerî ku bi alikarîya tirkiya û bi destê DAÎŞ´ê.

DAÎŞ´, bi destê rejimên herêmê hat ava kirin û nûha wê didina şerkirin. Bi teybetî jî, di çerçoveya statûqûya ku afirandina û politikayên xwe de wê bi kurdan re û bi xalkên din ên herêmê re didina şer kirin. DAÎŞ´, weke rêxistineka ku bi teybetî bi wê dixwezin ku vîna kurdan ya ku di hundurê vî 30 salî de ku afirîya û êdî çareserîya pirsgirêka kurd dixwezê bişikênin. Yanî, bigiştî, weke rêxistineka ku bi wê dixwezin ku bi wê derbeyekê li kurdan bixin a. Ol, weke ´bîrdozî´ bikarhanîn û avakirina wê û di vê temenê de li ser olê re hin şîrove bi navê wê re pêşxistin jî, vê rastîyê ji berçav dûrnakê. Vajî wê, di vê temenê de li ser olê re hanîna wê ya li ser ziman, tenê dibe alikarî ku li ser armancên ku bo wan DAÎŞ hatîya avakirin, werina nxûmandin.

DAÎŞ´, di aslê xwe de, ku mirov lê binerê, mirov bi wê û hebûna wê re rengekî din ê îstîsmarkirina olê dibînê. Rejimên herêmê, weke ku çawa ku hata roja me, di bin navê "biratîya olî" de, mirov dixapandin. Lê di vê serdemê de, êdî ew jî ditin ku wê nikaribin vê bikin. Bo vê yekê, êdî bi awayekî vekirî ol kirina şer de bi hebûn û navê gelan de. Minaq, rejimên herêmê, dijminatiyê li kurdan dikin, di cih de, bi destê rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, wê "fetwa" serê kurdan bikin û bi wê re kurdan weke "kafîr" denezênin û bidest şerkirina bi wan re bikin. Ev rengekî bikarhanînê ê roja me ya.

Ji xwe, "fetwa" serê kurdan dan û di cih de bi devê van rêxistinên bi navê olê berhevkirina, denezendin ku "kuştina kurdan ´helal´ a." Pişte jî, gotin ku "kurd, kafîr in, wan bikujin." Bi vê rengî, rejimên herêmê, dijminatî ku kurdan dikirin, êdî ew dijminatî li ser olê re jî bi wate kirin û hanîn ser ziman. Di vê çerçoveyê de dijminatî li ser navê kurdan re li ser olê re dane afirandin.

Di demên berê de, ev rêbaz, bo bêdengkirina kurdan dihat bikarhanîn. Ku yekî li dijî dewletê şerî hilda ba, di gotin "li dijî olê rabûya." Bi vê rengê, êdî mirovan jî, çi bêmafî(´nehaqî´) dihatina serê wan, bi wê bêdeng diman. Deng dernedixstin. Bi vê rengê, ol li dijî mirovan dihat bikarhanîn. Î ro jî, di vê temenê de bi rengê DAÎŞ´ê dihê bikarhanîn. Di vê temenê de, di aslê xwe de rêxistina DAÎŞ´ê, weke rêxistineka ku bi destê wê pirsgirêka kurd ji holê rabikin. Bi vî rengî, misyonek li hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan kirina. Pêşketina civate kurd a ku afirîya jî di nava wan de, ew dihê armanc girtin.

Beş bi beş, beşên civate kurd ji xwe re kifş dikin û dikina armanca hêrîşan. Pêşî, rojava û KObanê bû. Piştre kurdên şebekî û î ro jî kurdên êzîdî di armanca wan hêrîşan de na. Di vê temenê de, misyona tûnakirina pêşketina kurdan dane DAÎŞ´ê. DAÎŞ´, weke rêxistineka ku bi vî rengî hatîya bi misyon kirin a. Misyona DAÎŞ´ê, bi hêrîşên wê re ku derbeyekê li kurdan bixe û bi wê re êdî weke ku rejima tirk dixwezê ku ji çareserkirina pirsgirêka kurd xilas bibe. Bi wê re jî, şoreşa rojava a kurd were şikandin. Bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li rojava, dixwezin ku çavtirsandinê çêbikin û bi wê re kurdên rojava bidina goçberkirin û bi wê re ”herêmê bêmirov bikin.”. Ev sîyeseta bêmirovkirinê, rejima tirk, ji salên 1990´î û pê de, li bakûrê kurdistanê kir piretîkê de. Ji bakûrê kurdistanê, li metropolên tirkan û welatên ewropa ser deh-milyonan re kurd ji herêmên wan dan goçberkirin û kirina pênaber. Yanî, kurd êdî bêdeng bibin û doza maf û azadîyê nekin. Di vê temenê de, diçina bi ser kurdan de. Bo vê ermancê DAÎŞ´ê bi kurdan re didina şer kiriin.

Yanî, bi gotinaka din, em dikarin, DAÎŞ´ê weke rêxistina rejimên herêmê ên weke tirkiya bihasibênin ku bi wê pêşîya pêşketina statûya kurdan bigrin. Di vê temenê de, DAÎŞ´ê didina şerkirin. Rejimên herêmê, dixwezin ku bihêrîşên xwe yên di bin navê DAÎŞ´ê de, hebûna civake kurd ji hevdû bifelişênin. Û bi wê re jî, derbeyekê li kurdan bixin. Bi wê re jî, êdî weke ku çawa ku piştî şerê cihanê ê yekemin kurd bêstatû hiştin bi wê bêstatûtîyê heta roja me ew hanîn û gelek komkujî jî hanîn serê wan, dixwezin ku bi heman rengî ji vir û pê de jî, bidina domandin.Rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, li herêmê bo vê ermancê hatina avakirin û didina şerkirin. Dûhû navê wê rêxistinê "cebetil-nasr" bû. Î ro jî, navê wê "DAÎŞ´" a. Siba, heya ku di bin navê rêxistineka din de jî, bi rêxistin bikin û bidina şer kirin, ku bi kurdan re bê û ankû bi xalkekî din ê weke kurdan ku doza maf û azadîya xwe dike bê. ..

Ji ber çi rejima tirk, di temenê radestkirina mafên kurdan de gavan neavêje? Ji ber ku rejima tirk, di wê hêvîyê de ya ku DAÎŞ wê derbeyek mazin li kurdan bixe û êdî ew jî êdî wê pêwîst nebînê ku gavan biavêje. DAÎŞ, ji aliyekî ve, weke rêxistineka ku di temenê vê armancê de li herêmê bi pozisyon kirina û didina şerkirin bi kurdan re. Dema ku em çerçoveya pirssgirêka kurd de, vê armanca dewletên herêmê ên ku bi pirsgirêka kurd ve eleqeder in ku em fahm nekin, emê vî şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re jî fahm nekin. Ev şerê ku DAÎŞ bi kurdan re dike, ne şerê rêxistineka weke ya DAÎŞ´ê a çete ya. Ji wê

zêdetirî, şerê rejimên herêmê ên weke rejima tirk û hwd a. DAÎŞ´, weke "maske"yekê ya ji vî şerî re.

Di vê temenê de, wê bi kurdan re, heta demekê DAÎŞ´ê bidina şer kirin. Bi wê, wê bixwezin ku derbeyekê li kurdan bixin. Heta ku, ji rejimên herêmê ên weke tirkiya bê, wê bixwezin ku li ser olê re, ji nava herêmên kurdan êdî ji vê çeteya DAÎŞ´ê re mirovan bibînin û bikina navê wê de û bidina şer kirin. Rêbazekî bi vî rengî, li Somalî, li ser komên tundrew ên olî re bikarhanî bûn. Bi wê re, ev 30 sal bêhtira ku li Somalî şerê navxweyî pêşxistin.

Ev rêxistinên ku di bin navê olê de dihên birêxistinkirin, bi wan rejimên herêmê şerê xwe bi xalkên herêmê re dikin. Bi wan, berxwedan û rêxistinîtîya navxweyî ya civatî tûna dikin û dikina xizmeta politikayên xwe de. Nûha jî, ev rêbaza ku li Somalî û hin herêmên din ên afrîqa û rojhilat hatîya bikarhanîn ji aliyê rejimên mêtinger ve, nûha jî dixwezin ku li dijî kurdan bikarbênin. Yanî, li ser olê re û bi olê derbeyekê li kurdan bixin. Di vê temenê de û bi politikayaka bi vî rengî DAÎŞ hatîya birêxistin kirin û avakirin. Hêvîya rejimên herêmê ên weke rejima tirk û hwd, ji wê rêxistina DAÎŞ´ê ew a ku derbeyekê li kurdan bixe û ew jî bi wê derbeyê re ji pirsgirêka kurd û ji çareserkirina wê xilas bibe.

Ev armancên rejimên herêmê ên bi pirsgirêka kurd ve girêdayî, rejimên herêmê birina avakirina rêxistina DAÎŞ´ê û hwd. Bi vê yekê re, mirov dikarê bibêje ku DAÎŞ´ rêxistineka ku bi wê armanca wê tenê kurd in. Çend ku di temenê giştîya rojhilat de û li ser olê re hin şîrove bi navê wê re dihêkirin û weke rêxistinek gelemper bahse wê dikin jî, di vê demê û astê de, tenê di çerçoveya hêrîşkirina li kurdan de hatîya birêxistinkirin. Sînorê DAÎŞ´ê, vê demê û vê kêlîkê, tenê kurd in.

Rejimên herêmê, DAÎŞ, di vê çerçoveyê de birêxistinkirina. Di vê çerçoveyê de jî, heta roja me ew dane şerkirin. Tenê, stretejiya wê, ew a ku derbeyê li civate kurd û bigiştî li vîna kurd bixe. Bo vê yekê, li rojavayê kurdistanê bi kurdan re didina şer kirin. Li başûrê kurdistanê bi kurdan re didina şerkirin. Siba, heya ku li bakûrê kurdistanê jî û li rojhilatê kurdistanê jî bo şîkandina kurdan û tirsandina kurdan, bi kurdan re bidina şerkirin. Ji xwe, bo vê armancê hatîya avakirin. Di vê temenê de ku em bibêjiin DAÎŞ, weke rêxistineka ku bi wê dihê xwestin ku pirsgirêka kurd were ji holê rakirin, wê pirr rast û di cih de bê.

-- Çeteyên DAÎŞ´ê, hemû cihêrengîyên olî û etnikî ên li herêmê dane berxwe û diçê bi ser wan de û bi wan re şer dike. Asûrîyên li dora Musilê, kurdên êzîdî ên li şengalê, kurdên rojavayê kurdistanê û hwd, çend ji wan armancên çeteyên DAÎŞ´ê na.

DAÎŞ, xwe weke rêxistinek olî bi nav dike. Her wusa, bi wê re jî, ên ku li ser wê dinivîsênin, wê dihênina ser ziman. Lê di aslê xwe de ti têkilîya vê rêxistinê bi olê islamê re tûna ya. Olê, tenê bo armanca xwe bikardihênê. Ol, ji ber ku ji wê re lazime bo bikarhanînê, êdî dibêje ´ez oldar im´. Bo ku bi navê olê mirovan bixapênin û bikina nava xwe de û bidina şerkirin, ol ji wan re lazim a. Lê zihniyeta wê, zihniyeta firewûn, nemrûd û hîtler a. Hîtler jî, digot ku "tenê nîjade alman heya û ên din divê bin wê re bin." Bo vê yekê jî, bi artişên nazîyan diçû bi ser hemû komên din ên cuda de.

Î ro, li rojhilat jî, rêxistinên weke DAÎŞ´ê wê zihniyetê temsil dikin. Bo rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, tenê divê ku ew serdest bin. Komên din ên etnikî bin û ankû olî bin, divê ku di bin kontrola wan û ankû destê wan de bê. Divê ku weke wan bijîn. Berî rêxistinên weke DAÎŞ´ê û hwd, li rojhilatê rêxistinên weke partîyên ´baasê´ li Îraqê û

sûrî û hwd, ev zihniyet temsil dikirin. Bo vê yekê jî, van partîyan, komkujiyên weke ´komkujiya helepçê´ û hwd kirin. Rejima tirk, di wê temenê de çû bi ser kurdan de. Bo ku civate kurd ji hevdû bifelişêne, çû bi ser de û ser 4 hezaran gund û warên kurdan vêran kir û bi deh hezaran kurd qatil kir. Ji ber ku kurdan qabûl ne dikir ku bibina tirk û ankû weke tirk bijîn, ev dihat hanîn li serê wan. Li Îraqê jî û li Sûrî jî, ji ber ku kurdan dixwest in ku weke kurd bijîn, komkujiyên weke komkujiya helepçe, komkujiya dersimê, komkujiya roboskî, komkujiya şengalê û hwd, hatin serê wan. Li Îranê jî, ji ber ku doza maf û azadiya xwe dikirin, ew komkujiyên di dema komare kurd a mihabadê û piştre hatina serê wan.

Ji vê zihniyetê ti tiştek neguharî. Lê vê zihniyeta nîjadperest ku î ro derketîya asta faşîzmê, olê û hêstên olî bikardihêne weke "maske". DAÎŞ´ jî, bi heman rengî weke rêxistineka wê zihniyeta kujar û hov a ku olê ji xwe re weke maske bikardihêne. .. Î ro, ev rêxistina çete û ku bi zihniyetek faşîşt ku olê ji wê re weke "maske" bikardihêne, hêrîşî kurdan dike. Bi zihniyeta Saddam ku çawa ku li helepçe komkuji dihanî serê kurdan, bi heman rengî diçê biserê kurdan de. Saddam jî, dema ku oparasyonên bo ´jenosîda kurdan´ li dar dixist, navê ´sûreya kuranê a ´anfallê´ lê dikir û ew oparasyonê jenosîdê li dijî kurdan dikir. Î ro, DAÎŞ jî, bi heman rengî û mantiqê, fetwa destavêtina can û mal û canê kurdan hemûyan dide û diçê biser wan de.

Hê ew fetwayên vê rêxistina kujar û hov, di destêpêka xwe de bo serê kurdan û mal û canê wan derxistî, di wê temenê de bidest hêrîşî wan jî dike. Wê çawa kurd, bi civatî werina tûnakirin, di wê temenê de diçê bi ser wan de. Rêxistineka ku rêz û hûrmeta wê li hebûna civatan û nirx û baweriyên wan ên cuda nebe, çawa dikarê wê îdîayê mirovatiyê û bahse wê bike? Ev rêxistin, bi wê re zihniyeta Baasê û Saddam heya. Di wê temenê de şer dike. Şerê xwe serdestkirinê dide. Yanî bi gotinaka din, şerê desthilatdariyê dide.

-- Faşîzm, ji xwe û pê ve ti kesekî û ti tiştî nabînê. Mirovê faşîşt jî, ji xwe û keseyetîya xwe pê ve ti kesekî û ti tiştî nabînê. Bi vê re jî, hemû mirov û rengên din ên ji wê cuda na, yan wê tabîî wê bin û yan jî, wê werina tûna kirin û ji holê rakirin. Ev cudahî, dikarê bibe cudahîyeka olî, dikarê bibe cudahîyeka etnîkî û hwd. Her wusa, dema ku mirov li nazîyên alman jî dinerê, mirov heman tiştî dibîne. Dema ku Hîtler hat ser desthilatdarîyê, hemû rêveberîyên li ewropa ji wî û nazîyan re bûna armanc. Wî dixwest ku hemûyan bike bin kontrola xwe de û xwe û nêzîkatîya xwe li ser wan serdest bike.

Ev nêzîkatîya Hîtler û nazîyan, bû sedema şerê cihanê ê duyemin. Ji xwe, piştî ku Artişên nazîyan bi fermane Hîtler ketina polonya û pê de, êdî şerê cihanê ê duyemin destpêkir. Bi vê re jî, êdî li giştî ewropa jî, ew şerê nazîyan li giştîya ewropa jî domîya. Li ewropa, hin rêveber bêî ku şer bikin xwe radestî nazîyan kirin. Hinekan jî, li berxwedan. Lê di ancamê de, li ber nazîyan nekerîn ku li berxwe bidin. Çend ku ew rejim têkçûn jî, piştre li dijî nazîyan şerê bi taktîqa gerîlla li dijî nazîyan dan destpêkirin, weke ku çawa ku î ro li rojava li dijî DAÎŞ´ê kurd didin. Î ro, rejimên ewropî ên ku di wê demê de hebûna, ên ku xwe bêî ku şer bikin ku radest kirina û ên ku li berxwedana û piştre têkçûna û piştre radestbûna jî, dîrokeka bi vî rengî ya bi rengê taktîqa gerîllatiyê dinivîsênin di wê demê de ku li dijî nazîyan dane.

Nazîyan, ewropa û herêmên din ên dervî ewropa jî kirina qade şer. Li kafkasya jî, bi yekîtîya sovyet şerên mazin kirin. Artişên nazîyan heta pêşîya moskov´ê hatin. Lê di dawîyê de têkçûn. Rejima faşîşt, hat ji holê rakirin. Hizrên hîtler ên faşîşt hatin qadaxa

kirin. Ji nava gel hatina derxistin. Lê ew zihniyeta ku hîtler ji xwe re kir temen û li ser wê re gav bi gav pêşket û pêde çû û heta ku bû desthilatdar, ew ji holê ranebû. Piştî şerê cihanê ê duyemin jî, ewropa ji nû ve hat avakirin. Di nava wê ewropeya ku ji nû ve hatî avakirin de jî nazîyan xwe bi navê "neo-nazî"´yan da domandin û jîyandin.

Ev zihniyeta nazîyan û hîtler, î ro li rojhilat û bi şerên rejimên herêmê ên ku bi kurdan re dikin dihê berçavê min. Pêşî bi komkujiyên rejima baasê a Saddam me dît. Piştre bi rejima tirkiya re me dît. Î ro jî, li Sûrîya ku bi destê DAÎŞ´ê û hwd, em dibînin. Kurdan, hertimî bo parastina hebûna xwe tekoşîyana. Lê hertimî, rejimên ku hebûna wan armanc girtina û çûna biser wan de na.

Î ro jî, weke wê rêxistina nazîyan a dendik ku pêşî avabûbû, rêxistina DAÎŞ´ê li rojhilat xwe bi rêxistinkir û rojhilat bi kurdan re bidest şer kir, li ser navê wan rejimên herêmê. Car bi car, fethullehçîyan ji hikimeta AKP´ê re digot ku "tu baş kurdan nakujê û nikarê wan têkbibê, ezê wê baştir bikim." Ev hizrên fethulehçîyan ên nazîst, î ro bi rengekî ku mirov li rewşa DAÎŞ´ê dinerê, dihêna berçavên mirov. DAÎŞ´, bûya weke rêxistina dendik a nazîyan a rojhilat. Bi wê rengê û mantiqekî, bi vî rengî gelên herêmê ên weke kurd û hwd, daye berxwe û diçê bi ser wan de û bi wan re şer dike. Jenosîdê li ser serê wan dimeşêne. Bi armanca tûnakirina wan, diçê biser wan de.

Em nikarin vê zihniyeta DAÎŞ´ê ji zihniyeta nazîyan û serokê wan Hîtler cuda werênina ser ziman. Çend ku xwe weke oldar didina nîşandin jî, tenê olê weke "maske" bikardihênin. Ol, ji hemû bawermend û oldaran dixwezê ku li ber mirov û hebûna gelan rêzdar bin. Rastîya olê, vê yekê ji mirov dixwezê. Hemû pêxemberên ku hatina jî, ev yek pêşnîyarkirina.

Lê mirovên weke hîtler, hertimî xwe û keseyetîya xwe dane li pêş û derxistina li pêş. Xwestina ku herkesek tabîî wan û vîna wan bê. Herkesek, li gorî gotina wan tevbigerihê. Di demên berê de jî, li rojhilat, mirovên bi vî rengî ku heta ku ´xwe dikirina cihê ´xwûdê de´ ên weke "Nemrûd" û "firawun" hebûn. Wan mirovan, hizrên xwe diafirandin û xwe li ser hemû mirovan re didîtin û dixwestin ku hemû kes tabîî wan bê û di bin gotina wan de bê. Dixwestin ku, ew çi bêjin herkesek weke wê bike. Ên ku derkevina dervî wê, wê yan wan bikujin û yan jî wan bigrin û biavêjina zindanê. Hebûna pêxemberan jî, ew bûya ku li dijî wê kirina Nemrûdan û Firewunan derkevin û mirovatiyê biparêzên. Ev jî, bi navê pêxemberan re bûya yek.

Li vir, ya ku î ro li rojhilat li dijî gelê kurd û xalkên din ên li kurdistanê ku DAÎŞ dike, em nikarin ji kirina nazîyan cuda werênina ser ziman. Nazîyan jî, dixwestin ku hemû kesî û koman dibin vîna nazîyan de bikina yek. DAÎŞ jî, dixwezê ku bi heman rengî vîna hemû gel û xalkên li herêmê bişikêne û xwe serdest bike, weke ku çawa ku nazîyan xwe di dema xwe de serdest dikir. Ji vê aliyê ve em nikarin DAÎŞ´ê û nazîyan ji aliyê zihniyetê ve ji hevdû cuda werênina ser ziman. Xwe weke oldar nîşandina DAÎŞ´ê jî, tenê bi armanca li ser wê zihniyeta xwe nûxûmandin a. Yanî, olê weke maske bikardihênin. Weke ku çawa ku Hz. Mihemed digot, "wê rojekê, hinek mirov derkevin, wê xwe weke misilman bidina nîşandin, lê ew minafiq in." DAÎŞ´î, weke ku hz. Mihemed tefsîr dike û bahse ´minafiqan´ dike, ew minafiqên ku hz. Mihemed bahsê dike na. DAÎŞ´î, di wê temenê de di pozisyonekê de na.

Faşîzm û zihniyeta wê, hebûna gelan û cudahiyên civatî û bawerî herê nakê. Em vê rewşê bi DAÎŞ´ê re dibînin. Di vê temenê de, hemû hebûna xalkên herêmê ên cuda, ji wê re armanc a. Cudahiyên bawerî, ji wê re armanc in. Heta ku ez dikarim bibêjim ku ji

vê rêxistina faşîşt a bi navê DAÎŞ´ê re ola îslamê jî armanca. Dema ku em li rewşa nazîyan dinerin, em gelek aliyên ku dişibihina hevdû di nava wê û DAÎŞ´îyan de dibînin. Her wusa, dema ku em ji aliyê mantiqe jî dinerin, em heman tiştî dibînin.

Ku em di çerçoveya zihniyeta îslamê de jî li DAÎŞ´ê binerin, zihniyeta Îslamê a hz Mihemed, hebûna DAÎŞ´ê şermazar dike. Yanî rêxistina DAÎŞ´ê, li gorî zihniyeta rast a îslamê a hz. Mihemed jî, divê ku were şermazar kirin.

Rêxistina DAÎŞ´ê, rêxistinek faşîşt a. Em dema ku ji şerê cihanê ê duyemin û bi vir de dinerin, em dibînin ku faşîzm bi gelek rengan xwe derdixe li holê. DAÎŞ´ jî, rengek ji wan rengê wê ya. DAÎŞ´ê, rengê faşîzmê ku li gorî rojhilat hatîya bi rêxistinkirin a. Her wusa, ev bi rêxistinakirina wê ya li gorî rojhilat jî, di temenê ku wê çawa hizrên dîrokî ên olî û hwd, ku wê çawa bikarbênin, di wê temenê de hatîya bi rêxistinkirin. Bi vê rengê, divê ku mirov rastîya wê fahm bike. Piştî şerê cihanê, ew komên nazîyan ên bi navê "neo-nazîyan" ku derketina li holê li welatên ewropî, ji aliyê saloxgerîyên ewropî ve dihatin piştgirî kirin. DAÎŞ jî, ji aliyê saloxgerîyên herêmê ve dihê piştgirî kirin.

DAÎŞ´, li dijî hizir û bawerîya pêxemberên ku hatina şer dike. Lê DAÎŞ, pişta xwe dide zihniyeta Firewun, Nemrûd û Hîtler. DAÎŞ´, rêxistinek û zihniyetek bi vî rengî ya. Weke ku Nebî Musa li dijî firewun tekoşîya, weke ku çawa ku Ibrehim li dijî Nemrûd serî hilda û tekoşîya, weke ku çawa ku Nebî Îsa li dijî roma li berxwe da û weke ku çawa ku Hz. Mihemed li dijî Abû cahîl tekoşîya, divê ku bi heman rengî li dijî DAÎŞ´ê jî şer û tekoşîn were kirin û dayîn.

- DAÎŞ, weke ku çawa ku rejimên herêmê ji şerê cihanê ê yekemin ve kurd bêstatû hiştin û di wê temenê de bi wan re şer dikin û wan dikujin, di vê temenê de DAÎŞ hêrîşî kurdan dike. Yanî, bi gotinaka din, ew jî, di temenê xwestekên rejimên herêmê ên weke Îranê û tirkiya de, ku bi armanca şikandin û bêstatû hiştina kurdan de bi kurdan re şer dike. Yanî DAÎŞ, rêxistinek şer ya ku olê weke maske bikardihêne ya. Di vê temenê de, hatîya bi rêxistin kirin. Li Musilê bicihkirina wê jî, armanca wê, ew bû ku temenekî ji wê re çê bikin û li ser wê temenê re bidina şerkirin. Yanî, li Musilê bicihkirina wê bixwe jî, di çerçoveya planak dana şerkirinê a DAÎŞ´ê de hatîya kirin.

Di vê çerçoveyê de, ji xwe piştî ku li Musilê û hine herêmên li dora wê bicihkirin, piştre berê wê dane biser kurdên rojavayê kurdistanê de. Di wê temenê de, hizirkiribûn ku berî hatina salwegera sêyemin a şoreşa rojavayê kurdistanê ku derbeyekê li wê bixin. Ev hasab û kîtab kiribûn.

Bo vê yekê, DAÎŞ bi çekkirin. Hemû rengên çekan kirina destê wê de. Heta ku çekên kîmyewî jî kirina destê wê de ku bikarbêne. JI xwe, li rojavayê kurdistanê çend gunden rojavayê kurdistanê bikarhanî jî. Bo vê yekê, Hêzên parastina gel, ji ber wê yekê bi taktîkî ji çend gundên rojavayê kurdistanê hêzên xwe vekişand. Lê piştre dîsa ket wan gundan de û çeteyên DAÎŞ´ê ji wan paqij kir.

Rojavayê kurdistanê, di dema sêyemin salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê pêşwazî dike de jî, hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê lê hatina zêdetirkirin. Hinekî jî, di vê dema rasthatina salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê de, zêdekirina hêrîşan, hinekî jî armanca wan ew a ku ji aliyê moral û deronîyê ve jî ku karibin kurdan bêmoral û bêderonî bihêlin. Xwestin ku berî hatina salwegerê derbeyekê li kurdan bixin. Bo vê yekê, ji her aliyê ve bidest hêrîşê kirin.

Lê tevî ku bi çekên giran ku ji tirkiya, artişa îraqê û hwd girtina jî, ku hêrîşî rojavayê kurdistanê kirin, derbeyê mazin xwarin. Bi armanca şikandina şoreşa rojavayê

kurdistanê, hêrîşên xwe di vê demê de zêdetir kirin. Yanî, wusa hizir kiribûn ku di destpêka vê salwegerê de ji KObanê ve ku derbeyekê li kurdan bixin, wê bi tememî êdî weke ku derbeyek li kurdan xistibin wê bin. Di vê çerçoveyê de dihizirîn.

- Piştî ku hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li dijî rojavayê kurdistanê û bi teybetî li dijî kantona KObanê destpêkirin, êdî gelê kurd jî ji 7 haftsalî heta hasftêsalî rabûna serpîyan û ketina çeperan de û li berxwe didin. Jin, zarok, mêr û hwd, hemû bi hevdû re şer dikin. Bi gotinaka din, li kurdistanê, bo berxwedanê seferberîya giştî hat denezendin û gelê kurd jî bersivek mazin da wê seferberîyê.

Berxwedanê kurdan a li Kobanê, weke berxwedane li ber-moskovê a li dijî artişên nazîyan a. Dema ku artişên Nazîyan hatina her ber-moskov´ê, moskovayîyan jî, bi jin, zarok û pîr û kalan ve dest dane hevdû rabûna berxwedanê. Kî çi ji destê wan dihat, dikirin. Î ro, em heman rewşê li rojavayê kurdistanê li dijî hêrîşên DAÎŞ´ê dibînin. Di wê demê de rewşenbîrên rûsî jî xwe digihandina çeperên ku di wan de berxwedan hebû û ji wan çeperan dinivîsandin. Ev nivîsandina wan jî, bû weke aliyekî din ê berxwedanê li ber hêrîşên artişa nazîyan.

Berxwedane li ber-moskovê´ a li ber artişên nazîyan, hingî civakek bi hemû andamên xwe re li berxwe dît. Î ro jî, bi heman rengî li rojavayê kurdistanê, civakek bi heman andamên xwe li berxwe didin. Jin jî, di nava wê berxwedanê rojavayê kurdistanê a li Kobanê de hena. Zarok jî hena. Mêr û ciwan jî hena. pîr û kal jî hena. Yanî, civak bi hemû andamên xwe û bi hevdû re di berxwedanê de ya. Civakek bi yekdengî li berxwe dide. Di wan çeperên YPG´ê de, dema ku yek çû ku lê binerê, wê jineka pîr jî û yeka ciwan jî bi hevdû re bibînê. Wê dayikekê û keça wê bi hevdû re bibînê ku di heman kozikê de li berxwe didin û çek di destê wan de ya û şer dikin li dijî çeteyên DAÎŞ´ê. Berxwedanê civakê a li dijî hêrîşên faşîzane ên DAÎŞ´ê ev a.

Piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê li rojavayê kurdistanê li ber berxwedane gelê kurd derbe xwarin, êdî bidest hêrîşên li herêmên başûrê kurdistanê ên weke Şengalê û hwd kirin. Piştî ku li Kobanê çeteyên DAÎŞ´ê derbeyên mazin xwarin, êdî bidest hêrîşkirina li kurdên êzîdî ên li dora şengalê û hwd kirin. Bidest avêtina topan li gundên şengelê kirin. Nûha jî, agahiyên ji herêmê tên, ew in ku tê gotin ku çeteyên DAÎŞ´ê li hin deverên herêmên şengalê li dora gundên wê çeperan dikolin bo ku hêrîşê bikin. Ev dide nîşandin, ku bigiştî hêzên li pişt DAÎŞ´ê ku wê bi kurdan re didin şerkirin, bigiştî hebûna civate kurd bi hemû beşên wê re kirina armanc. Dema ku hêrîşî beşeka wê û ankû aliyekî wê kirin û ku ancam bidest nexistin, êdî ji aliyekî din ve û li beşeka din a civatê bidest hêrîşê bikin. Berî van hêrîşên li şengalê jî, kurdên şebekî ên li dora Musilê bûna armanca hêrîşên DAÎŞ´ê. Hebûna kurdên şebekî nûha jî di bin telûkeya jenosîde de ya weke ya kurdên êzîdî.

**-Hêvîya tirkiyê a bi destê DAÎŞ´ê ku ji çareserkirina pirsgirêka kurd xilas bibe, heya.** Tirkiya hêvîyeka mazin bi DAÎŞ´ê ve girêdaya. Ew hêvî jî ew a ku bi sayaserê DAÎŞ´ê ji pirsgirêka kurd û çareserkirina wê xilas bibe. Di demeka dirêj de amedekarî hatina kirin. Heta ku Tirkiya ji aliyê ve, hê di dema hilbijartinên şaradarîyan ên di 30´ê adara 2014´an de jî, di vê temenê de li herêmên weke serêkahniyê û hwd, bi hêleyan û hwd, ev herêm di destê xwe de girtin. Navenda Rehayê, bi vê rengî, bi hîleyan di dest de girtin. Ev jî, bo ku vê qadê bikina qadaka ku ji wê şerê li djî rojava dihê birêvebirin ku wereê birêxistinkirin bû. Em hinekî ji vî aliyê ve li ser van **hilbijartinan jî bisekin in**.

**.. Li herêmên kurdistanê ên weke Heskif, Serêkahniyê, Wêranşer, Hazo, Xelat ûû hwd, bi hîleyan, xwestin ku di dest de bigrin. Navenda agirî jî, bi heman rengî xwestin ku didest bigrin û nehêlin ku bikeve destê kurdan de. Ev, hewldanên di dest de girtina van herêman, bo amedekarî û politikaya şer ya di rojên piştre de bû. Bo vê yekê, mudahale li hilbijartinan dikirin, bo ku ancamaka li gorî ku temenê politikaya xwe ya şer biafirênin bidest bixin.**Weke herêmên kurdistanê ´Serêkahniyê, Wêranşer û Xelat´ çend ji wan herêmên kurdistanê ên giring in. Ev hersê herêm bi teybetî, ji du aliyan ve divê ku em bi teybetî li ser wan bisekin in. Piştî hilbijartinên 30´ê adara 2014´an kurdan şaradariyên wan girtibûn, lê dewlet jî bo ku wan nedê bi kurdan re di nava şer de ya. Hinekî jî, ev israra dewletê ji ber çi ya? Dema ku em bi teybetî li hebûna wan herêman bi nerin, pêşî ji aliyê demê û politikayên demê ên dewletê ve girêdayî ali û giringîya wan heya. Bi awayekî din jî, ev hersê herêm herêmên ku divê ku mirov bi teybetî yek bi yek hilde li dest in. Bi teybetî li herêma Rehayê navçeyên weke Wêranşer û serêkahnîyê, dikevina sînorê rojavayê kurdistanê de. Di destpêka şerê Sûrî de, piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê ku kurdan rêveberîya xwe ya kurdistanî ava kir, dewleta tirk jî çeteyên ku dan hêrîşkirin li ser van herêman bi rêxistin kirin. Ev çete di serî de ji van herêman dihên bi rêxistin kirin. Ji aliyê din ve jî jî, ´diwarê şermê´ di nava bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê de çêkiriya. Hinekî jî, ew israra wê ya li ser Rehayê, divê ku mirov ji aliyekî ve bi vir ve girêdayî jî hilde li dest. Lê ji aliyê din ve jî, divê ku mirov bi politikayên wê ên şer ên li dijî kurdan ve girêdayî jî hilde li dest.

Bi teybetî, herêmên weke Hezo û Qaxizman û heskîf jî, bi vî rengî hinek giringiya wan heya. Bi teybetî, bi politikayên dewletê ve girêdayî hinek giringiya wan heya. Ji ber vê yekê jî jî, dewlet, bi hîleyan dixwezê ku van herêman di destê xwe de bigrê. Bo vê yekê, wê çawa bigrê, di serî de, herêmên ku ancamên wan di hilbijartinê de bi serkevtina BDP´ê re kifş jî bûna, bi **îtîrazan** û piştre di dema ji nû ve hijmartina dengan de bi guharandinan, dixwezê ku bidest bixê. Li Serêkahniyê, Wêranşerê û hwd ev kirî. Li Qaxizmanê û Heskîfê jî divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest. Li vir, dihê ditin ku politikaya şer ya li dijî kurdan ku weke konseptekê li dijî civate kurd hatîya bi rêxistinkirin, mirov bi van cihan ve girêdayî kifş dike. Minaq, bi Rehayê û herêmên wê ên weke wêranşerê û serêkahniyê weke herêmên şer ku ji wan herêman şerê xwe yê li dijî kurdên rojavayê kurdistanê bi rêxistin dike na. Ji aliyê din ve jî, biqasî ku ev herêmên ku dewlet, dixwezê ku di destê xwe de bigrê, biqasî ku bi politikayên wê ve girêdayî aliyên wan hena, her wusa bi ardnigarîya wan herêman girêdayî ve jî ku mirov dikarê werêne ser ziman, hin aliyên stretejikî în demî û dîrokî hena. Em divê ku di serî de, van aliyan jî kifş bikin û werênina ser ziman. Dema ku em van aliyan kifşnekin û newênina ser ziman, emê vê israra dewletê ya di dest de girtina van herêman jî baş fahm nekin. Ji vê israra dewlêtê ya van herêman dihê ditin û fahm kirin ku politikayên wê ên şerê ên ku bo demên pêş hatina bi rêxistin kirin hena. Yanî, gotinên ku rayadarên dewletê bikar dihênin ên "çareserîyê" jî derew in. Ji vê yekê ev jî dihê ditin û fahm kirin. Bo ku em pêşî dîmenekî baş li berçav çê bikin û fahm bikin, em yek bi yek van herêman hildina li dest û fahm bikin.

Serêkahniyê, dikeve sînorê rojavayê kurdistanê de. Di dema Mîtannîyan de jî, ´şerêkahniyê´ navend û ´paytaxt´ bû ji wan re. Mîtannîyan, serêkahniiyê ji xwe re kiribû navend û paytaxt û navê şerêkahniyê di dema mîtannîyan de jî ”weşokanî” bû. Di aslê

xwe de serêkahniyê hatiya qatkirin, Qatek li aliyê bakûrê kurdistanê maya, yani di nava sînorê tirkiya de hatiya hiştin û navê wê hatîya guharandin û kirina "ceylanpinar." Aliyê din ê serêkahniyê jî, di nava sînorê sûrî de hatîya hiştin û navê wê hatîya guharandin û kirina "resulayn." Serêkahnyê, ji destpêka pêvajoya sûrî ve jî, weke herêmeka ku dewleta tirk li wir şerê xwe yê bi rojavayê Kurdistanê ku li wir bi rêxistin dike ya. Li vê herêmê, hemû navendên çeteyên ku hêrîşî rojava dikin hatina ava kirin. Ji herêmên Rehayê û heta ku digihijê Xatayê, di vê navberê û xatê de qadaka şer hatîya bi rêxistin kirin. Dewlet, bo wî şerî xwe yê bi kurdên rojavayê kurdistanê re bide domandin, dixwezê ku vê herêmê di dest de bigirê û bihêle. Yanî, bi vê re, bi gotinaka din, dixwezê ku politikaya xwe ya şer biparêzê û ankû ji têkçûnê xilas bike. Di vê temenê de, em hinekî bi herêmên Rehayê û dîroka wê û rewşa wê ya herêmî ve jî bibêjin. Ev herêm, ji aliyê olî ve jî giring û cihê wê pirr mazin heya. Hikimetên AKP´ê, heta nûha li ser olê re politika kirin hem li dijî kurdan û hem jî li dijî gelên din ên li herêmê. Bo vê yekê, êdî ev herêm, ji vê aliyê ve jî giring dibe. Dema ku em li rewşê binerin, emê bibînin ku ev çeteyên ku bi rêxistinkirin û şandina bi ser rojavayê kurdistanê de, di temenê wan de û bi di temenê bi rêxistinkirina wan de, li ser camaatê re bê û ankû AKP´ê re bê, ol hatîya bikarhanîn û îstîsmarkirin. Ji vê aliyê ve jî, dewleta tirk giring dibîne ku Rehayê û herêmên wê di destê xwe de bigrê. Yanî, weke herêmeka ku ji her aliyê ve ku temenê şerê wê yê bi kurdan re li herêmê di afirênê ya. Dema ku olê, weke amûrekî û bîrdozîyekê bikarbêne, hingî, ev herêmên ku wateya wan ya olî bi giringî û pirr mazin heya jî, giringiya wan derdikeve li holê. Di vê temenê de, dema ku em li polîtikayên dewletê binerin jî, em dibînin ku di vê temenê de politika hatina bi rêxistin kirin. Politikayên dewletê ên şerê di vê temenê de, dema ku olê weke bîrdozîyekê di temenê xwe de bikardihênin, hingî, bo wan herêmên weke Xatay û Reha giring dibin. Bi teybetî jî Reha pirr giring dibê. Herêma Rehayê, ji aliyê dîroka olî ve, heta dema Birehim xelîl dîrokek wê heya. Bi wê re jî, hertimî, ji aliyê olî ve di hemû olên yek-xwûdayî ên ”semewî” ve ew giringîya wê derketiya li holê. Ji vê aliyê ve, dewlet, weke bîrdozîyekê vê hêrêmê hem li dijî kurdan bi vî rengî dixwezê ku bikarbêne di temenê politkayên xwe yên şer û ên dijber de û hem jî li dijî herêmê di temenê politikayên xwe yên bi armanca serwerîyê de bikarbêne. Bo vê yekê nahêlê ku ji dest herê. Ji aliyê din ve jî, demek berê ketibû rojevê ku dewleta tirk di nava rojava û bakûrê kurdistanê de ´diwarê şermê´ lê dike. Ev jî, rast bû. Bi vî rengî, dema ku wê di destê xwe de bihêle, bi wê dixwezê ku hebûna wî diwarê şermê jî biparêzê di nava kurdan de. Hinekî jî, bi vir ve girêdayî politikaya wê li ser Serêkahniyê û Wêranşerê heya.

Weke ku me ji bo herêma serêkahniyê hanî ser ziman, heman rewşê bi giringi bo wêranşerê jî werêne ser ziman. Wêranşer jî dikeve sînorê rojavayê kurdistanê de. Ew jî, weke Serêkahniyê, di nivî de bûya qat û qatek li vî aliyê ku em jê re dibînin "serxat"ê maya û aliyê din jî, li wî aliyê din ku em dibêjin "binxatê" maya. Yanî di nava Sûrî û tirkiya de hatîya beşkirin. Bi heman rengî, diwarê şerê di nava wê de jî, hatîya xîzkirin. Ji aliyyekî din ve jî, ev navendên kurdistanê hinekî malbatên arab jî li wan dijîn. Dewleta tirk, hinekî jî, dixwezê ku dijberîyê di nava kurdan û wan de jî çêbike û li ser wê re êdî li wê herêmê xwe serdest bike. Bi wê yekê re, politikaya xwe ya şer bidomêne. Politikaya şer ya dewletê, bi vê rengê divê ku em bibêjin ku israra dewletê ya di vê herêmê de jî, ji aliyê ardnigarî ve giring a. Yanî, di serî wê yê bi rojavayê kurdistanê re herêmek stretejîka bi Reha û serêkahniyê re. Ji ber vê yekê, dewlet

dixwezê ku vê herêmê di destê xwe de bigrê. Vê helwesta rêveberîya tirk a di hilbijartinên 30´ê adara 2014´an de, divê ku mirov baş fahm bike. Wê piştre li ser wê re temenê şerê li dijî şoreşa rojava û bi teybetî temenê hêrîşên DAÎŞ´ê ên li ser Kobanê wê ji vir werina koordîna kirin. DAÎŞ´ê, bo vê yekê bi awayekê din jî, dewlet dixwezê ku li ser aşîrên arab û hwd re, ên li herêmê re bi rêxistin bike. Çend, DAÎŞ, weke rêxistinek ”kontra” û ´kontr-gerîlla´ tê bi rêxistinkirin jî, bi vî rengî bi çêkirina têkiliya wê bi çend aşîrên arab re, vê kontr-gerîlla´tîya wê di bin wan têkiliyan de bidina veşartin. Yanî, ew têkilîyên bi aşîrên arab de ku didênin, ji vê aliyê ve weke maske jî dihên bikarhanîn. Li wê herêmê, ji xwe heta nûha ev pirr zêde bikarhanîn. Î ro jî, di şerê xwe yê bi çeteyna li rojavayê kurdistanê dimeşêne, bikarbêne. Yanî, ev herêm, bi vî rengî, giringiyeke wê heya bo meşandina poliitikayên şer ên rejima tirk ên li dijî statûya kurdên rojava. Bi teybetî, em divê ku vê herêmê, bi hevdû re hildina li dest. Ev herêm weke herêmek giring ya stretejik a herêmê ya. Li herêmê, ji ber ku dewlet dixwezê ku têkilîya kurdên rojava û bakûrê kurdistanê ji hevdû qût bike, naxwezê ku vê herêmê radestî kurdan bike. Bo vê yekê, serî li hîleyan dide di hilbijartinan de jî. Ji ber vê yekê û vê armancê, serî li şîdetê jî dide. Armanc, ew a ku politikayên xwe yên şer biparêzê û bidomêne. Hinekî jî, bi vê israra wê re, mirov divê ku vê yekê fahm bike. Ji aliyekî din ve jî, weke ku çawa ku dixwezê ku pergale metinger li ser serê kurdan bigrê û bidomêne, bi wê re jî dixwezê ku politikayên xwe yên şer bidomêne. Li Rehayê û serêkahniyê, wêranşerê û herêmên wê ên din, bi vî rengî, dewlet, dixwezê ku weke herêmek di dest de ku ji wir şerê xwe yê bi kurdên rojavayê kurdistanê re bide koordina kirin bikardihêne.

Herêma heskifê jî, herêmek pirr kevn û dîrokî ya. Dikeve rex Rehayê de. Yanî, weke lûleya Rehayê û ankû herêma ber-firatê ya jî. Ev herêm, dema ku were kontrol kirin, wê hingî, ji nêvî ve herêmek mazin ya kurdistanê jî were kontrol kirin. Dewlet, ji vê aliyê ve lê dihizirê. Hinekî jî, ew bendava ku dixwezê ku wir çêbike a bi navê ”heskîfê” û nîvê herêmê di bin avê de bihêle, hinekî jî bi vê plitikaya wê ve girêdayî ya. Bo vê yekê, bo ku wan politikayên xwe ên tûnakirin, şer û bi metingerî kontrol kirinê bidomêne, dixwezê ku Heskîf di destê wê de bê. Armanca israra wê ya di heskifê de hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Ji vê aliyê ve, dema ku em lê dihizirin, em dibînin ku weke xatekê ji Rehayê û heta ku digihijê heskifê, herêmek bi hevdû ve girêdayî heya. Dewlet, hinekî jî, bi wan politikayên xwe ên şer û serdestîya bi metingerî re li wê dihizirê.

Ji aliyekî din ve jî, bo ku bi van politkayên xwe ên şer bi domêne, dixwezê ku wê bendavê bibe sêrî. Yanî çê bike. Bi wê re herêmek mazin di bin navê de bihêle. Bi wê re jî, li dora wê kontrola xwe çêbike. Bi wê re, êdî li herêmê, serdestîya xwe mayinda bike. Ji aliyê din ve jî, ev heya ku dewlet dixwezê ku bike ku dema ku ev bendav çêkir û ev herêma ku ji gelek şaristanan re malîtî kiriya ku di dema ku di bin avê de hişt, deng ji ti kesekî dernekeve. Hinekî jî, dewlet li vê yekê dihizirê. Yanî, bi vê mantiqê jî, di wê di dest de girtina heskifê de israr dike. Bi vê yekê re, dema ku em lê dihizirin, em dibînin ku politikayaka şer ya giştî dewletê hizirkiriya. Yanî, di demên pêş de, dewletê ne çareserî lê şer kiriya politikaya li pêşîya. Di temenê çêkirina temenê wî şerî de, vê yekê dike. Dewlet, di vê temenê de, dema ku heskif di bin avê de hat hiştin jî, bo ku ti deng dernekevin, bo wê jî vê yekê dike. Yanî, dema ku ev dîrok hat tûnakirin, divê ku li ber wê tu deng dernekevin. Dema ku ev herêm di destê rêxistina kurdan BDP´ê de bê, bêgûman wê deng zêde derketiba. Lê dema ku di destê wê de bê, wê bi hasanî û bi

bêdengî vê karî bike û wê dîrokê bi dibin avê de hiştinê re tûna biike. Hinekî jî li vê yekê dihizirê. Ev hizirkirina dewletê, bi vî rengî, di temenê konseptekê de ku bi dulingîya dihê ditin. Reha, serêkahniyê û wêranşer û ji wir heta heskif, herêmna ku divê ku em di dewam hevdû de li ber firatê hildina li dest in. Ev herêm bi dêroka xwe pirr kevn a. Ev dîroka herêmê, di serî de dihê tûnakirin. Yanî, di vê temenê de divê ku mirov li wê bihizirê. Ji aliyekî din ve jî, vê herêmê weke herêmeka ku politikayên wê ên li ser şer re ku di di wê Reha-xatayê de ku dihên meşandin, ji pişt ve dihilde ewlakariyê. Dewlet li vê yekê dihizirê. Ji aliyê din ve jî, ji aliyê dîrojî û civatî ve jî, bo ku ti nirxên civatê ên dîrokî nebin li berçav, bi teybetî, pêwîstî pê dibîne ku wê tûna bike. Dema ku civatek, nirxên wê ên dîrokî û li ser ardê hatina tûnakirin, halandin û ji hevdû felişandina wê jî hesan dibe. Ya ku dewlet, bi vê re li wê dihizirê jî ev a. Yanî di temenê konsepteka şer û tûnakirina civatê de li heskifî dihizirin.

Di vê temenê de, divê ku em bibêjin ku herêmên ku bi vî rengî bi teybetî dewlet dixwezê ku wan di dest de bigrê, bi vî rengî dihê bi ser wan de. Hinekî jî, ev herêm, hinek herêmên ku politikaya wê ya asimlasyon û tûnekirinê têk dibin in. Ji vê aliyê ve giringiya van herêman heya. Hewldanên di dest de girtina van herêman, hinekî jî, bi armanca domandina wan politikayên wê ên şer û asimlasyonê ve girêdayî ya. Em divê ku bi teybetî ji van aliyan ve van hewldanên AKP´ê hildina li dest. Ji aliyê din ve jî, ku weke aliyekî giring ku em divê ku bin xat bikin jî, ew a ku wê çawa pêşîya pêşketina kurdan û hewldan wan ya xwe bixwe rêvebirina wan bigrin di wê temenê de jî, li van herêman dihizirin. Hinekî jî, di temenê wê de ev heya. Dema ku ev armanc, politika û nêzîkatiyên dewletê ên li dijê kurdan fahm nekin, emê van hewldanên wê ên bi hîleyan ên li ser ancamên hilbijartinan ku bi wê dixwezê wan biguharênê, mirov wê bi tememî baş fahm neke. Politikayên dewletê ên şer ku weke ji Reha û xatayê bi rê ve dibe ili dijî rojavayê kurdistanê, bi hermanca di bin avê de hiştin û tûnakirina nirxên dîrokê herêmê ên weke heskifê ku di xwezê heskifê di dest bihêle û bi armanca politikayên asimlekirinê ku li Xelatê û qaxizmanê dihizirê, hinekî jî bi vir ve girêdayî ya. Bi hewldan di dest de girtina xelatê ku çawa dixwezê ew dîroka zanînê a civate kurd newê ditin û kifşkirin û her wusa bi ya qaxizmanê re ew politikayên asimlesyonê ku dixwezê bide domandin, bi hevdû ve girêdayî na. Politikayên ku bi wan dixwezê ku civate kurd ji dîrokê bibê na. Politikayên di temenê israra di dest de girtina herêmên Rehayên ên weke Wêranşerê û serêkahniyê, di temenê wan de çi qirêjî hebe, bi heman rengî di temenê politikayên di temenê hewldanê di dest girtina heskifê, xelatê û qaxizmanê de jî heya. Van hewldanên dewletê ên li dijî van herêman, bi vî rengî divê ku em bi van politikayên wê re werênê ser ziman. Her wusa, her wusa dekûdolabên li ser Agirî ku dihên leyistin jî, em divê ku weke ên ku li ser Rehayê dihên leyistin hildina li dest. Weke hevdû ´na. Di temenê herdûyan de jî, politikaya şer, asimlasyonê û inkare hebûna kurd heya. Her wusa, wê çawa temenê statûya kurdan ya ku afirî ji holê rabiikin, di wê temenê de van hewldanan didina nîşandin. Van hewldan û politikayên li ser herêmên Rehayê û herêmên Serhadê ên weke qaxizman û xelatê û herêmên din ên weke heskifê, em divê ku di temenê poliitkayên dewletê ên ku em bi politikayên wê ên di temenê oparasyonên di bin navê KCK´ê de hilde li dest û fahm bike. Ev hewldan û hîleyên li ser şaradaran ên di hilbijartinan weke ku di hilbijartina dawî a 30´ê adara 2014´an de ku bû û hwd, em divê ku weke rengekê din ê wan oparasyonên di bin navê KCK´ê de û her wusa çêkirina temenê şer ê li dijî şoreşa rojava û hwd, şîrove bike û fahm bike.

Hilbijartinên adara 2014´an dîrokî bûn bo kurdistanê û kurdistanîyan. Herêmên weke Agirî û Dersimê ku navendna giring û dîrokî bûn ku bo kurdistanê û kurdistanîyan, care pêşî kurdan serdestîya xwe li wan bivîna xwe mazin kir û bidest xistin. Piştî Komkujiya Dersimê a sale 1937´an û pê de, kurdan care pêşî serkevtinek dîrokî bidest xistibû. Li Dersimê rejima tirk, komkujiyên mazin kiribûn. Kurdên elewî ên ku ji komkujiyan filîtî bûn jî, ji aliyê rayadarên dewleta tirk ve weke ”bermehîyên ku li şûn mana” dihatina bi navkirin. Bo vê yekê, ev serkevtina kurdan a li dersimê, weke bersiveka girin, mazin û dîrokî a ji vê dîroka bixwûn ku rejima tirk li herêmê nivîsandibû re jî bû. Piştî komkujiya dersimê û pê de, care pêşî bû ku kurdan li dersimê bivîna xwe serkevtinek dîrokî û biwate bidest xistibûbûn. BI heman rengî, ku weke dersimê giring û bi wate bû bo kurdistanê û kurdistanîyan Agirî jî, kurdan piştî serhildana agirî û komkujiya Zilanê û hwd, ew care pêşî bû ku bi vîna xwe serkevtinek dîrokî li herêmê bidest dixistin. Lê rayadarên dewletê jî, di farqe wê serkevtina vîna kurdan li herêmê bûn. Bo ku kurd li herêma Agirî û bi teybetî li navenda wê sernekevin, serî li her rê û rêbazê da. Hilbijartinên agirî, di hilbijartina 30´ê adara 2014´an de 15 caran hatina hijmartin. Di care 16´min de jî, hilbijartin hatina nûkirin. Lê dîsa kurdan vîna xwe biserxistîya. Di dema serhildane agirî de Agirî, weke navend bû. Komare agirî, hatibû demezrandin û denezendin. Di wê de jî, agirî weke navend bû. Dewletê, hêzek mazin şandibû bi ser agirî de û bi komkujiyên mazin ên ku hanîbû serê xalkên sivîl ên kurdistanîyên li herêma agirî, dewleta tirk, serhildana agirî tafisandibû. Li wê tafisandinê de bi deh hezaran kurdistanî hatibûbûna qatil kirin. Di dema tafisandina serhildana agirî de komkujiyên weke ´komkujiya zilanê´ li herêmê hatibû kirin û di vê komkujiyê de bi dehan gund û navçeyên kurdisstanî ên herêmê hatibûbûna ji naqşeyê birin.Dem heta ku tê sale 1926´an wê li herêmê, bi van komkujiyên bi vî rengî ku hatina kirin, wê bêdengîyeka ku weke axa mirinê bi ser de hatibê weşandin wê bibe. Bo vê yekê bû ku rayadarên dewleta tirk li ser çîyayê agirî tirbek sembolîk çêkiribûn û li ser nivîsandibûn ku ”kurdistana muhayyel, li vir veşartîya.” Piştî wê demê re kurdan berxwedana kêm nekirin. Piştre ku tevgera azadîya kurdistanê PKK´ê dest bi tekoşîna azadîyê kir û pê de, herêm dîsa derket li pêş. Rayadarên dewleta tirk, herêm kiribûbûna weke navendeka ku ji wê li herêmê oparasyonên xwe yên leşkerî û sîyesî ku li dijî kurdan dimeşandin. Bo vê yekê, rayadarên dewletê ne dixwestin ku agirî û navenda wê ji dest berdin. Lê kurdan care pêşî di hilbijartinên 30´ê adara 2014´an de dîrokek nû li herêmê nivîsandin û herêm bidest xistin. Ev serkevtina kurdan a li agirî, ji aliyê kurdistanîyan û gelek dîrokzanan ve weke serkevtina serhildana agirî û bersiva kurdan ji komkujiyên weke komkujiya zilanê û hwd re, ew serkevtina kurdistanî a li navenda agirî û li dora wê nivîsandin.

..**Bila nîqaşên** kê DAÎŞ´ê avakir û ankû ava nekir li dereha bin, em pêşî ji vê aliyê ve li mijarê binerin. Di serî de, ji xwe DAÎŞ´ bixwe jî, weke rêxistineka ku berê wê li kurdan û li pêşketina kurdan a hatîya avakirin. Hêvîya tirkiya jî, ew a ku bi destê DAÎŞ´ê ji pirsgirêka kurd xilas bibe. Hinekî jî, di temenê gavneavêtina wê de ev heya. Di temenê dirêjkirina pêvajoyê di temenê mijulkirinê de jî, hinekî ev heya.

Wusa tê ditin û xuyakirin ku tirkiya û Îranê, bi tememî hêvî û hizirkirina ku bidestê DAÎŞ´ê derbeyeka mazin li kurdan bixin. Di vê temenê de, di bendewarî û hêvîyekê de na. Li ser hêrîşên DAÎŞ´ê re, di vê temenê de dikina rojevê de. DAÎŞ´ê, rêxistineka bêqaîde û kûral a. Di vê temenê de, wusa dihê ditin ku li ser olê re rêxistineka bi vî

rengî ku bi temenî di temenê dijminatîya kurdan de hatîya avakirin.

Hatina li ser ava kurdan, denezendina "dewetek îslamî", hinekî jî, bi vî rengî, di temenê wê de armancek heya. Di vê temenê de, di vê ´pêvajoyê´ de, hêvî û bendewarîya tirkiya jî, ew a ku bi destê DAÎŞ´ê ji pirsgirêka kurdan xilas bibe. Ew derbeya ku ev 30 salin ku wê nekarîya ku li kurdan bixe, xwestîya ku bidestê wê li kurdan bixe. Bo vê yekê, em nikarin, DAÎŞ´ê weke rêxistinek îslamî şîrove bikin. Divê ku em weke rêxistinek terorê ku bi destê rejimên herêmê û ên ne li herêmê ên ku li ser pirsgirêka kurd re sîyesetê dikin hatîya avakirin a.

Li vir, divê ku em dîmen bi hemû aliyên wê ve şîrove bikin. Li bakûrê kurdistanê çêkirina wanqas qarakol û bendavên bi armanca leşkerî jî, hinekî divê ku em di vê çerçoveyê de hildina li dest. Pêvajoya ku weke pêvajoya çareserkirina pirsgirêka kurd em bi nav dikin, em weke aliyê kurd, çendî ku bo çareserkirina wê têdikoşîn, her wusa bi vî rengî li ser DAÎŞ´ê û hwd re bê, rejimên herêmê jî, di temenê ne çareserkirin û têkbirina kurdan de bi kurdan re şer dikin. Hinekî jî, divê ku mirov di vê temenê de binerê.

Pirsgirêka kurd, êdî pirsgirêkek herêmî heya. Ji nava sînoran buhurî ya. Rêbaza rejimên herêmê a li dijî wê giştîya pirsgirêka kurd a li herêmî şerkirin jî bi rengê DAÎŞ´ê û hwd dibe. Di vê temenê de, aliyekî derxistina li holê a DAÎŞ´ê û ankû di demên pêş de ´cebe til-nasr´ û hwd heya. Bi DAÎŞ´ê, li gorî statûqûya ku heya, parastina statûqûya herêmê, di vê temenê de di temenê şerê ku bi destê DAÎŞ´ê dihê dayîn de heya.

DAÎŞ´ê weke rêxistineka ku tenê berê wê li civate kurd û pêşketina civate kurd û her wusa beşên civate kurd ên weke êzîdî, şebekî, feylî û hwd a. Li îraqê, Saddam dema ku bidest kirina jenosîde kurd li helepçe kir ji kurdên feyli dest pê kir. Çeteyên DAÎŞ´ê wê demekê bidina hêrîşkirin li ser van beşên civate kurd ên weke êzîdî û şebekîya û hwd. Piştre, heya ku bidina hêrîşkkirin li ser kurdên feylî jî. Bo vê yekê, weke ku çawa ku kurdên êzîdî dereng jî bê, hêzên parastinê avakirin, divê ku kurdên feylî jî, wê rêxistina xwe ji nûha de çêbikin.

Ji van aliyan ve jî, divê ku mirov li mijarê binerê. Wusa dihê ditin ku ên ku stretejiya hêrîşên DAÎŞ´ê li civate kurd û li kurdan didina kifşkirin, li beşên civate kurd dihizirin û beş bi beş wê hêrîşê li wan dikin. Yanî, ev weke rêbazekî qatkirin û ji hevdû felişandina civate kurd a ku kirina temen û arman di wan hêrîşên DAÎŞ´ê de.Dûhû li kobanê li kurdan hêrîş kirin. Piştre li başûrê kurdistanê, çûna bi ser kurdên şebek de. Bi sadan kurdên şebek ravandin û qatil kirin. BI deh hezaran kurdên şebek ji herêmên wan ên ku lê dijîn ên lli dora musilê û hwd dan goçkirin. Piştre, êdî berê xwe dane bi ser kurdên êzîdî de. Nûha jî, hêrîşî kurdên êzîdî dikin. Siba jî, wê beşên civate kurd ên weke kurdên feylî, yaresanî û hwd, ji xwe re bikina armanc û herina bi ser wan de. Ev weke plan û programaka ku di temenê van hêrîşan de ya.

Di vê temenê de, divê ku mirov li DAÎŞ´ê bihizirê. Bi vê yekê, divê ku em di temenê hêvîya tirkiya a bi destê DAÎŞ´ê xilasbûna ji pirsgirêka kurd li DAÎŞ´ê bihizirê. Di vê çerçoveyê de jî, dema ku em lê dihizirin, em divê ku bibêjin, têkiliya rejima tirk û DAÎŞ´ê ji navikê ve bi hevdû ve heya.

Ji aliyekî din ve jî, divê ku mirov li DAÎŞ´ê û derxistina wê ya li holê bihizirê. Ew jî, ew a ku ev bi deh salan fethullehçîyan li welatên ereb û afrîqa gelek dibistan vekirina. Gelek mal û dergeh vekirina. Li mizgevtan xwe bi rêxistin kirina. Di van

dibistan, dergeh û mizgevtan de, propagandayên ku kirina, di wan de jî, hertimî, dijminatiyek li dijî kurdan dane çêkirin. Dii wan dibistan, dergeh û mizgevtan de, ji mirovên ku ji wan re diaxiftin, digotin ku "kurd, dij-ol in", "xwûdê nas nakin." Bi vî rengî, propaganda kirin. Hinekî jî, di dema hêrîşkirina li kurdan de, bi teybetî, beşên civate kurd ên weke şebekî, êzîdî û hwd, bijartin û hêrîşkirina li ser wan, divê ku mirov bi vê propagandayê ve girêdayê hilde li dest. Yanî, di vê temenê de, hêrîşkirina li kurdên êzîdî di çerçoveya konsepteka şer û dayîna şerkirinê a van koman bi kurdan re girêdayî ya.

Di vê çerçoveyê de, beşên civate kurd ên ku wê hêrîş li wan were kirin, bi teybetî bijartina û hêrîşî wan dikin. Di vê çerçoveyê de, di temenê hêrîşkirina li civate kurdên êzîdî, hinekî jî, bi konsepteka şer a bi kurdan re girêdayî ya. Weke ku çawa ku di wan dibistan, dergeh û mizgeftan de bi wan mirovan dane şerkirin ku "kurd, dijî olê na.", di wê temenê de didina hêrîşkirin a bi kurdan re. Di vê çerçoveyê de, beşên civate kurd, ên bi çand, kevneşopî û bawerîya xwe cuda na, bi teybetî, dihên bijartin û hêrîşî wan dikin. Di vê çerçoveyê de, hemû beşên civate kurd ên ku bawerîya wan cuda na, di bin telûkeya komkujiyên mazin ên weke ku hatina serê kurdên êzîdî de na.

Di vê temenê de, hizirkirina ku derbeyekê li civate kurd û pêşketina wê bixin. Di vê çorçoveyê de, denezendina "dewleta îslamî" jî, bi vê politikayê ve girêdayî ya. Bo ku temenê konsepta şer çê bikin,, ev kirina. Bi vî rengî, bi wan mirovên ku didina şerkirin, didina bawerkirin ku "bo armancekê şer dikin". .. Di vê temenê de, temenê hêrîşên li kurdan çê dikin. Yanî, ev hêrîş, bi teybetî li civate kurd û pêşketina wê, beşên wê ên civatî û hwd, dihên kirin.

Ji xwe, di destpêka şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re, denezênin ku diwaşandin, di wan de di gotin ku "kuştina kurdan halal a.", "destavêtina can, mal û jinên wan halal a." û "mêran bikujin û "Jinan ji xwe re bikina carîya." û hwd. Di vê temenê de, li gorî wê perwerdekirin û kirina propagandayên ku kirina, temen afirandina. Ev hemû di bin navê ola îslamê de kirina. Lê ti eleqeya van dordoran bi îslamê re tûna ya. Tenê, komeka ku li gorî politikayên rejimên herêmê ên weke tirkiya ku hatîya avakirin a, ku bi kurdan re şer bike. Hin mirovên ku di wan dibistan, dergeh û mizgeftan de hatina xapandin û şandina nava DAÎŞ´ê û didina şerkirin ku hatina dil girtin ji aliyê YPG´ê ve, ku diaxifin, dibêjin ku "ji me re digotin ku kurd, ne misilman in", û hwd. Weke van gotina, gelek gotin, bi wan dane bawerkirin. Nûha jî, dema ku ew hanîna û bi kurdan re didina şerkirin, weke ku bi hinekî mirovên ne misilman re şer dikin, wan didina şerkirin.

Dema ku mirov van rastîya bi başî fahm neke, mirov wê bi tememî û bi başî fahm neke ku çawa DAÎŞ´ê çêkirin û derxistina li holê û î ro bi kurdan re didina şerkirin. Her wusa, di vê temenê de ku ev rastî baş werina fahmkirin, wê bê ditin û fahmkirin ku rejîmên herêmê çawa ol bikarhanîna û bi wê hebûna xalkan û bawerîyên din ji dîrokê birina. Ol, di aslê xwe de, van kirinan hemûyan şermazar dike. Ola îslamê bixwe jî, rêxistinên weke DAÎŞ´ê şermazar dike.

**- Piştî civîna NATO´yê ket rojevê de ku tirkiya ji ber hebûna 49 karkerên wê ên balyozxaneya Musilê ku di destê DAÎŞ´ê de na, naxwezê ku di nava koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê de cih bigrê.** Di serî de, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku ev weke lîstikekê dihê li berçav. Lê lîstikeka pirr bi telûke ya. Tirkiya, ji her aliyê ve têkiliya wê bi DAÎŞ´ê re heya. Hemû pêdivîyên DAÎŞ´ê ên locistikî ji tirkiya diçin. Mirovên ku diçina nava DAÎŞ´ê jî li ser tirkiya re diçin. DAÎŞ´, nifta ku ji herêmê derdixe difiroşê

tirkiya. Ji her aliyê ve aliyê ji hevdû re dikin. Tirkiya, hêvî bi DAÎŞ´ê girêdaya ku bi wan hêrîşên wê ên li ser kurdan derbeyek li kurdan were xistin. Bo vê yekê, ji her aliyê ve alikarîyê didiyê de. Di berdêla ku DAÎŞ´ hêrîşî herêmên kurdan ên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku rêveberîyên kurd li wan ava na bike, alikarîyek namêne ku tirkiya nadiyê de. Ev alîkarîya tirkiya ya ji DAÎŞ´ê re jî, bi hin peymanên ku DAÎŞ´ê û hikimeta AKP´ê bi hevdû re çêkirina dibe. Î ro jî, bo ku wê peymane di nava DAÎŞ´ê û hikimeta AKP´ê de ya, ji berçavên rayagiştî dûr bikin, mijarên weke rehîn girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk çêkirina û di çapameniyê de dikina rojevê de.

Tirkiya, bo ku alikarîya xwe ya ji DAÎŞ´ê re di berdêla ku ew hêrîşî rojavayê kurdistanê bike ku bide domandin, ev politikaya "rehîne"yan afirand. Dema ku DAÎŞ´ê hêrîşî rojava û başûrê kurdistanê kirîya, hin kurdên başûrî ku xwe bi gotina "îtîfaqa" bi tirkiya re xapandina, serî li tirkiya dane bo alikarîyê. Tirkiya, bersiva ku daye van kurdan jî, ew a ku "49 rehîneyên me di destê DAÎŞ´ê de na, bo vê yekê em nikarin alikariyê bikin." Bi vê yekê û gotinê, ti alikarî ne daye wan. Ji xwe, ew kurdên ku hêvî dikirin ku wê tirkiya alikariyê bide wan û serî li wê xistina, ji nezanî û ne fahmîya xwe ya ji politikayê ew kirina. Heta roja me jî, hemû têkiliyên ku bi tirkiya re danîna, li ser wê derewê danîna. Di dema ku nîqaşên "serxwebûna kurdistanê" dikirin de jî, digotin ku "wê tirkiya ne li dijî denezendina serxwebûnê bê û wê heta ku alikar bê." Piştre, ku weke şileyekê ji van mirovên ku ev gotin re bê, T. Ardogan bixwe derketîya tv´ya arabî ya "el-Cizira" gotîya ´em li dijî serxwebûna kurdistanê na.´ ..

Ev politikaya tirkiya ya di temenê ´dijberîya´ statûya kurdan de, di vê temenê de di her firsandê de hatîya ser ziman. Tirkiya, peymane ku bi DAÎŞ´ê re çêkiriya li ser esasê ku wê ew hêrîşî şoreşa rojavayê kurdistanê bikin û wê kurdan bişikênin a. Bi vê yekê û rengê, ji her aliyê ve alikariyê didiyê de. Bo ku ser wê alikariyê li berçavên dunyê bi nûxûmêne jî, ev rewşa li musilê a weke "rehîn" girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk derxistina li holê. Ev rewşa girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk li musilê weke "rehîne" jî, weke ku bi levkirin û "peymane"´eka ku di nava hikimeta AKP´ê û DAÎŞ´ê de bûya ya. Ev rewş afirandina bo ku ji xwe re bikina hêncet. Biqasî ku ket çapameniyê de, di civîna NATO´yê de jî, tirkiya ev hanîya ser ziman. Lê di rastîyê de, ev bi peyman û levkirin hatîya kirin. Lê li vir, divê ku em balê bikişênina li ser vê jî ku ew mudaheleya ku Emerika dixwest ku li Sûrî bike û Rûsya li dijî wê derdiket, DAÎŞ´ temenê wê jî diafirêne. Ji aliyê Tirkiya û van 49 "rehîne"´yan ve jî, mirov ku binerê divê ku mirov bibêje ku tirkiya, ne xwediyê rejimeka ku giringiyê dide jîyane mirov. Bo politikayên xwe û domandina wan, dikarê bi hezaran mirovan bikujê û bike zindanan de. Minaqe vê jî, bi deh hezaran kurdên ku ji ber ku kurd in ku rejima tirk ew avêtina zindanan de li holê ya. Her roj jî, nûçeyên mirina girtîyên azadîya kurd ji hundurê zindanan tê. Rejime tirk, bi vî rengî, bo ku politikayên xwe bide meşandin, ew 49 karkerên balyozxaneya tirk a Musilê ku weke ku li ser levkirina û çêkirina ´peyman´a di nava hikimeta AKP´ê û DAÎŞ´ê de ew li musilê weke "rehîna" tên ragirtin, heya ku siba tirkiya bêje DAÎŞ´ê hemûyan jî bikujin, bo ku bide berçavên dunyê û bibêje, "meyizênin, va ya, me ji we re got ku wê wan bikujin" û êdî li ser wê re politikaya xwe bikin. Weke "rehîne" girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk li Musilê jî, divê ku mirov weke lingekê propaganda ê wê "stretejîya kûr" ku bi navê Dawutoglu re dihat bi lêvkirin bêne ser ziman. ..

Rewşên bi vî rengî, berê jî rayadarên rejima tirk dane kirin. Minaqe dane kuştinê a

33 leşkeran di sale 1993´an û bi wê xirakirina agirbesta ku PKK´ê denezendibû li holê ya. Minaqe 14´ê temmûza 2011´an ku kurdan li bakûrê kurdistanê ´xweserîya demokratik´ denezend de û di heman rojê de dane kuştin a 12 leşkerên tirk li holê ya. Bi vî rengî, dikarê siba wan 49 karkerên xwe jî bide kuştin û li ser wan re bidest kirina politikayê bike. Girtina wan 49 karkeran, weke hêncet didina nîşandin. Di van waran de rayadarên tirk, gotinan dibêjin û dixwezin ku mirovan bi wan gotinan bidina bawer kirin. Bo ku bibêjin, meyizênin va ya, me got´ heya ku wan bidina kuştin. Politikayên dewletê ku bi gotinên weke ên Dawutoglu û hwd re di gotin bi rengê "stretejîya kûr", divê ku mirov vê rewşa girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk, weke lingekî wê gotina bi navê "stretejîya kûr" ê bi wê çêkirina hêncetan hilde li dest û fahm bike.

Tirkiya, di çerçoveya pirsgirêka kurd de, gelek hasab û kîtap bi DAÎŞ´ê ve girêdayî kirîya. Dema ku em van hasab û kîtabên wê fahm nekin, emê vê dane girtinê ya 49 karkerên balyozxaneya tirk ji aliyê rayadarên tirk ve jî bi başî fahm nekê. Rayadarên tirk, wusa hasab kirina ku wê bi hêrîşên DAÎŞ´ê wê şoreşa rojavayê kurdistanê bişikihê û têkherê. Bi wê re jî, wê başûrê kurdistanê jî, wê derbeyek mazin bixwe bi hêrîşên bi destê DAÎŞ´ê. Ev rewşa, gav bi gav pêşxistina DAÎŞ´, ji musilê vekişandina artişa Îraqê û li wir bicih kirina DAÎŞ´ê, li wir weke "rehîna" girtina 49 karkerên balyozxaneya tirk û hwd, gav bi gav piştî wê civîna rayadarên tirk û rayadarên Îranî ya di dema gera T. Ardogan a li qasra sadabadê de bû. Di wê dema ku konferanse Cenev´ê dihat li darxistin de, Pêşî T. Ardogan, çû Brukselê. Piştî ku ji Brukselê vegerîya, êdî çû wê gera xwe ya li Îranê. Di vê gerê de, ev civîna li qasra Sadabadê hatkirin di nava rayadarên tirk û rayadarên îranî de. Wek tê zanîn berê jî, li heman qasrê di sale 1937´an de civînek bi heman rengî bûbû û temenê şerê bi kurdan re ê heta roja me ku rejimên ku kurdistan di nava wan de hatibû qatkirin ku didin, hatibû li darxistin. Di wê civînê de gelek biryar di çerçoveya pirsgirêka kurd de hatina girtin ji aliyê van ve. Î ro jî, divê civîna dawî ya di sale 2014´an de jî, bi heman rengî, heman biryarên giring hatibûbûna giring di derbarê şerkirina bi kurdan re. Piştre jî, gav bi gav ew biryarên xwe kirina piretîkê de. DAÎŞ´, piştî vê re, weke rêxistineka ku tundrew û kujar ku armanca wê tenê di nava sînorên kurdistanê de hêrîşan pêk bêne pêşket. ..

Li ser mirovên weke "Tariq Haşimî" û hwd re sûnnîyên li Îraqê jî kirina temenê DAÎŞ´ê. Bi heman rengî, li Sûrî jî kirina. Rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, heya wan ji politikayaka bi vî rengî ya li dijî kurdan heya. Çend ku kurd, di nava hikimeta Îraqê cih digirin jî, weke hin navendên vêşartî ên wê hikimetê hatina avakirin û agahiya kurdan bixwe ji wan navendan û nîqaş û biryarên wan ên bingihîn ên ku di wan de dihên girtin tûna ya. Ev navend bixwe jî, destê Îran û tirkiya jî di wan de heya. Hikimet, dema ku politikaya li dijî kurdan kifş dike di van navendan de kifş dike. Ku ne wusa ba, me yê bi başî fahm nekiriba ku ew hikimetên li baxdadê ku tên avakirin û ku çend ku kurd jî di wan de weke "hevkar" cih digirin jî, li dijî wan dikeve nava dijberîyê de. Kurd, çendî ku bibêjin ku bandûra wan di nava hikimetên ku li baxdadê tên avakirin de heya jî, em nikarin wl ´bandûrê´ ji astekê zêdetirî werênina ser ziman. Weke ku hin sazîyên vêşartî i Îraqê jî, hena ku bi biryarên ku digirin, hikimetê, parlamentê jî û serokkomariyêtiyê jî, ew ji temen ve bi rê ve dibin. Di dema Malîkî de, ew dijberîya malîkî û polîtîkayên wî yên li dijî kurdan bixwe jî, di van navendên hikimetî ên vêşartî de dihat kifşkirin. Di aslê xwe de, di wan navendan de bidestê hikimeta Malîkî temenê pêşxistina DAÎŞ´ê û hêrîşên wê ên di roja me de kifşkirin.

Kurd, çendî ku bibêjin ew li baxdadê di nava sîyeseta wê de na jî û çendî ku serokkomarî di destê wan de jî bê û bi wê re gelek wezeretên din jî di destê wan de jî bin, ev vê rastiyê naguherêne. Vajî wê, ev rewş hemû didina nîşandin ku bi hin politikayna navendî ên bi vî rengî ku ji van navendên vêşartî kurd jî çawa tên bi rêvebirin dide nîşandin. Piştî çûyina rejima Saddam, ji holê nerabûna zihniyeta wî di sîyeseta Îraqê de, divê ku mirov bi vir ve girêdayî hilde li dest.

Î ro, çend ku li îraqê di nava sînorên wê de başûrê kurdistanê xwedî rêveber û desthilatdar jî bê û li Sûrî hemû xûriha bê û rejim ne serrdest jî bê, em nikarin bibêjin ku ew "koalîsyona" ku di nava Îran, Îraq, Sûrî û Tirkiya de ku di temenê dijberîya kurdan de bûya, ji holê rabûya. Li Sûrî, rejima baasê a Beşar el-esad, çend ku şikeştî û xûrîhî jî bê, dem bi dem li herêmên kurdan ên li Helebê, hesekê û hwd, bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan ku divê demê de dike di ahangekê de bombabarankirina kurdan, vê yekê û rastîyê dide nîşandin. Politikayên "pirsgirêkan", yên ku di dema hikimeta Malîkî û hikimeta herêma kurdistanê de ku li ser firotina nifta kurdan û hwd ku dihatin pêşxistin jî, di çerçoveyekê bi vî rengî dihatina derxistin. Ev politika hemû jî, armanca wan bisînorkirina kurdan bû. Î ro jî, ew zihniyeta di temenê wan politikayan de bi rengê politikayên bi hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd re xwe dide dîyarkirin li berçav. DAÎŞ´, weke rêxistineka ku armanca wê tenê herêmên kurdistanê, pêşketina di nava civate kurd de û her wusa statûya kurd a. Yanî, DAÎŞ, weke rêxistineka ku tenê li kurdistanê li dijî kurdistanîyan û cihêrengiyên wan şer bike ya. ..

Weke ku çawa ku li ser serê gelên weke li Somalî "El-Şebeb" û li Nîjerya "boko-haram", li afganistanê ´talîban´, li filistînê ´hamas´ û hwd kirina bela, li kurdistanê jî dixwezin ku DAÎŞ´ê pêşbixin bi salan di rengekî "şerê navxweyî" de bi kurdan û gelê herêmê re bidina şerkirin. Weke van, li gelek deverên din jî, rêxistinên bi heman rengî ku didina şerkirin hatina avakirin ûû nûha şerên wan jî didomê bi gelên wan herêmên ku ew lê na. Ev rêxistin û rengê pêşxistina wan, weke rengê rêxistinên şer in û bi wan pêşketina gelan û temenê çareserkirina pirsgirêkan ji nava wan ji holê dirakin. Bi vê zihniyetê DAÎŞ, di rengê van rêxistinên tundrew ku li deverên cihanê ên cuda hatina birêxistinkirin, li dijî kurdan û civate kurd hatîya birêxistin kirin. Piştî ku birêz ocalan li Bakûrê kurdistanê pêvajoya çareserîyê da destpêkirin û li rojavayê kurdistanê jî kurdan rêveberîya xwe ya xweser a kurdistanî avakir û pê de, Pêşî Cebetil-nasr" û piştre ´DAÎŞ´ û hwd, li dijî van pêşketinên di nava kurdan de, ev rêxistinên şer ku van temenên çareserîya pirsgirêka kurd ji holê ra bike derxistina li holê. Rejimên ku naxwezin ku kurd li kurdistanê û li herêmên xwe bigihijina statûyekê DAÎŞ pêşxistin û î ro bi alikarîya wan DAÎŞ hêrîşên xwe yên li kurdan didomênê. Bi teybetî, herdû herêmên kurdistanê ên weke başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd ava na, di armanca hêrîşên DAÎŞ´ê de na.

**-Herêmên** weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku xwediyê rêveberîyên kurdî na, di bin hêrîşên DAÎŞ´ê de na. Em nikarin vê weke rasthatinekê şîrove bikin. Ji xwe, çi pêşketinên ku di çerçoveya pirsgirêka kurd de dibin, em nikarin wan bi rasthatinê werênina ser ziman. Hemû jî, bi plan dihên kirin. Î ro, bi teybetî, herêmên ku li wan rêveberîyên kurd ava na, rastî hêrîşên DAÎŞ´ê hatina wan jî, em nikarin bi rasthatinekê şîrove bikin. Em tenê dikarin bi rêza hêrîşên ku bi plan û program li kurdan û van dihên kirin, şîrove bikin û werênina ser ziman. Bi teybetî, kirina herêmên başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê bin hêrîşan de, em divê ku bi pêşketina kurd û bi

teybetî jî bi pêşketina statûya kurdan ve girêdayî werênina ser ziman. Hêrîşên DAÎŞ´ê, di vê temenê de bi plan û program in. Bi teybetî jî, li pişt wan hêrîşan, rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin û rêveberîyên ne herêmî ku politikayê li ser pirsgirêka kurd re dikin hena. Ku em pêşxistina DAÎŞ´ê li ser pirsgirêka kurd û pêşketina kurdan re weke mudahaleya rejimên herêmê û ên ne herêmê şîrove bikin, wê ne şaş û ne xelat bê. Piştî ku rêveberîya kurd a rojavayê kurdistanê avabû û pê de, ev mudahale hatina pêşxistin.

Politikayên dewletên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin û rejimên ku li herêmê sîyesetê dikin ên weke emerika û hwd jî, di pirsgirêka kurd de xitimî ya.Wê çawa ji vir û pê de, bêî ku di rewşa kurdan de guharandinekê bikin û bi pêş de herin, li rê û rêbazên wê digerihin. Bo vê yekê jî, hebûna civate kurd, pêşketina kurd û heta ku çareserkirina pirsgirêka kurd bixwe jî, dixwezin ku li ser olê re bi şîroveyan "dij-olî" bidina nîşandin û bikina pozisyonaka ´dij-olî´ de. Ev, weke politikayakê ya ku dihê meşandin. Politikayên rejimên herêmê ku olê jî, bi awayekî îstîsmar dikin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike. Li kurdistanê û li dijî civate kurd, dixwezin ku bi politikayên xwe ku li ser olê re dimeşênin, bi wan ancamakê bidest bixin. DAÎŞ´, politikayak rejimên herêmê a bi vî rengî ya. Ku em hebûna pirsgirêka kurd ji berçav dûr bikin, emê nikaribin derxistina li holê a DAÎŞ´ê jî bi başî fahm bikin. Bi çend şîroveyên li ser olê re, wê ti carî ew bi başî newê fahm kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku em hebûna DÎAŞ´ê û derketina wê fahm bikin. DAÎŞ, rengekî din ê bi karhanîna olê ê li dijî xalkên herêmê ya û biteybetî li dijî gelê kurd a.

Nûha, herêmên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd hena, hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdan û xalkên din ên ku bi kurdan re dijîn dibin. Bi wê re jî, beşên civate kurd ên weke kurdên êzîdî jî, kirina bin hêrîşê de û hêrîşî wan dikin. Herêmên Şengalê, kirina bin hêrîşan de. DAÎŞ´, di vê temenê de weke rêxistineka faşîzan û terorîst ku bi wê dihê xwestin ku derbeyê li kurdan bixin a. Li pişt DAÎŞ´ê, hemû rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin û ên ku politikayê li ser pirsgirêka kurd re dikin, hena. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku heta ku pirsgirêka kurd newê çareserkirin jî, wê ev hêrîş li kurdan û kurdistanîyan bidom in. Î ro, di bin navê DAÎŞ´ê de dikin, wê siba jî di bin navekî din de bikin. ..

Bi teybetî, herêmên kurdistanê ên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd hena, li wan hêrîş dikin. Bi hêrîşên li van herêman re dixwezin ku pêşî derbeyekê li temenê statûya kurd bixin. Bo ku pêşîya pêşketina kurdan bigrin, ev hêrîş, di vê temenê de bi plan dihên kirin. Bo vê yekê, pêşî, herêmên ku li wan rêveberîyên kurd ava na, li wan hêrîş dikin û DAÎŞ´ê li van herêman didina hêrîşkirin. Bo vê yekê, çend ku em van hêrîşên DAÎŞ´ê bi navê wê werênina ser ziman jî, em divê ku bi navê rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin ên weke tirkiya, Îran, Îraq û Sûrî werênina ser ziman. Îraq û Sûrî, ji hal ketibin jî, rejimên herî aktiv in ên tirkiya û Îranê na. Bi hêrîşên DAÎŞ´ê, dixwezin ku xûrixandinekê pêşî li herêmên ku li wan rêveberîyên kurd ava na, çê bikin. Bi wê re jî, pêşîya pêşketina kurdan û bi teybetî statûya civate kurd bigrin. Hêrîşên DAÎŞ´ê, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest û fahm bike. DAÎŞ, weke rêxistinaka ku di vê temenê de hatîya bi rêxistinkirin a. Wê bi destê DAÎŞ´ê, çawa derbeyekê li kurdan bixin, di wê temenê de ew bi rêxistinkirin û li ser kurdan didin hêrîşkirin. Yanî, hemû pêşketina kurdan a civatî ku heta roja me heya û bûya, dikina armanca van hêrîşên DAÎŞ´ê. Yanî hemû destkevtiyên kurdistanî ên civate

kurd, dikina armanca hêrîşan. Bo vê yekê ya, ku herêmên kurdan ên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd ava na, di armanca hêrîşên DAÎŞ´ê de na.

**- Divê çerçoveyê de, hilweşandina keleha salahadînê ayûbî a li Tikrîtê û tirbeya Yunis Pêxember ji aliyê DAÎŞ´ê ve bûya.** Heta ku mirov ´paqijkirina navê ´kurd´ ji nava olê fahm neke, mirov we wê s**ansûra navê ´kurd´ û Salahadînê Eyûbî a ji nava "ansîklopedîya îslamê a tirk" ku rejima tirk dayî nivîsandin mirov we wê baş fahm neke, mirov ku ev baş fahm nekir; mirov wê bi başî hilweşandina keleha salahadînê ayûbî a li Tikrîtê ji aliyê DAÎŞ´ê ve jî baş fahm neke.** Mirov nikarê, li ser gotinaka "mezhebî" re wê hilweşandinê bi tememî fahm bike. Mezhebîtî, tenê bûya maske ji wê hilweşandinê re. Qadaxakirina navê kurd û Salahadînê Eyûbî nava nivîsandina "ansîklopedîya îslamê a tirk" û hilweşandina keleha salahadînê ayûbî a li Tikrîtê ji aliyê DAÎŞ´ê ve, divê ku mirov bi gotina "paqijkirina navê kurd ji nava olê" re hilde li dest û fahm bike. Her wusa, bi bombayan hilweşandina tirba Yunis pêxember jî, bi heman rengî bi wê re divê ku mirov hilde li dest. Masîyê bi navê Yunis, pêşî Yunis pêxember li dunyê digerêne û piştre wî li kevîya ava diclê li ser axa **Nisêbînê** ji zikê xwe derdixe û li wir dihêle û piştre ji berçav winda dibe. Yunis Pêxember, ji wir bû. Piştre li ser gotina "rab´ê xwe rê digrê û diçê Nînova û li wir dimêne. Dema ku nûçeya wê hat guhê min ku çeteyên DAÎŞ´ê keleha Salahadinê Eyûbî li Tikrîtê bi bombayan hilweşandina, ew sansûr´ kirina navê kurd û Salahadinê Eyûbî a ji aliyê rayadarên tirk ku ne hiştibûn ku di "ansîklopedîya îslamê a tirk" cih bigrê ew hatibû bîra min. ..

Di nava wê hilweşandina keleha salahadinê Eyûbî a li tikrîtê ya ji aliyê çeteyên DAÎŞ´ê ve de û sansûrkirina navê kurd û salahadinê Eyûbî a ji nava wê ansîklopedîya ku rayadarên tirk bi navê "îslamê" de têkiliyek heya. Ev qadaxakirina navê Salahadinê Eyûbî û hilweşandina keleha Salahadinê Eyûbî a li tikrîtê, bi zihniyeteka dijber hatîya kirin. Lê ev ne di temenê dijberîya li dijî- îslamê de hatîya kirin. Ev bi dijberîyaka ku li dijî-kurd ku bi navê ´îslamê´ hatî maskekirin û nûxûmandin, hatîya kirin.. Yanî, ev şerê ku di bin navê îslamê de ku li dijî kurdan bi destê DAÎŞ´ê li dijî kurdan dihê dayîn meşandin, bi vê minaqe hilweşandina kelehê salahadinê Eyûbî a li tikrîtê re bi awayekî vekirî dihê dayîn li berçav. Bi teybetî, çi bi navê kurdan di nava olê de hebe, ew dihê armanc girtin û xûrîxandin. Di destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê ên li rojavayê kurdistanê de, çend tirbeyên şêx û ewliyayên kurd jî hatibûbûna hilweşandin bi bombayan. Tirbeya ´şêx Maşûqê Xiznewî´ jî di nava wan tirbeyan de bû.

Berî vê hilweşandina keleha salahadinê Eyûbî a li tikrîtê, tirbeyên Yunis û Sît pêxember jî bi heman rengî bi bombayan hatibûbûna hilweşandin. Çend ku li dijî van hilweşandinên ku manawîyeta wan di nava gelan de pirr-zêde heya hin bertek hatibûbûna dayîn nîşandin jî, lê wusa zêde ti bertekên mazin ne hatina dayîn nîşandin. Têkiliya van hilweşandina tirbeyan û kelehan, bi paqijkirina navê kurdan a ji nava olê ve girêdayî heya. Dema ku mirov li vê minaqê xûrîxandina keleha sahaladinê eyûbî a li tikrîtê dinerê, mirov dibînê ku şerekî çawa li dijî kurdan di bin navê olê de û di bin maskeya îslamê de dihê meşandin. Di serî de, ji vê yekê, divê ku mirov vê bi awayekî vekirî û bi hesanî kifş bike. Şerê li dijî kurdan ê di bin maskeya olê de ku tê meşandin, nirxên olî ên gelê kurd ku dîroka îslamê a giştî jî dem bi dem dane kifşkirin tên ji holê rakirin. Ev jî, weke mînaqaka din ya teybeta ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya.

Di dema nivîsandina ansîklopedîyê bi navê ´îslamê´ de ji aliyê rejima tirk ve û bicih nekirina navên kurd û keseyetên olî ên kurd û hwd, hinekî jî divê ku mirov bi van bûyaran re baş bixwêne. Ku mirov dahûrîyeka baş bi van şerên ku li kurdistanê ku di bin navê ´olê´ de ku bi kurdan re dikin ku mirov bike, mirov wê bi van rewşan re baş fahm bike. Dema ku mirov li sedema sansûrkirina navê ´kurd´ ji nava wê anîsklopedîya ku bi navê "îslamê" bigerihê, ew sedem wê bi xwe re me bigihêne vî şerê ku DAÎŞ î ro di bin navê olê û maskeya olê de ku bi kurdan re dike.

Li vir, ji aliyekî din ve jî, mirov divê ku li wê hilweşandina keleha Salahadinê Eyûbî binerê. Ew jî, ew a ku bi armanca "paqij"kirina navê kurd ji nava olê ya. Bi vê armancê dihê kirin. Yanî, ev bo meşandina hin politikayên ku wê di demên pêş de li ser olê re ku li dijî kurdan û hwd bimeşênin dikin. Temenê wê, bi van taqandina re diafirênin. Ji vê aliyê ve, dema ku mirov dinerê, mirov vê yekê fahm dike ku hewl didin ku xwe di nava olê de bikina desthilatdar û bi wê êdî herina bi ser gelên herêmê de û şerên xwe bi wan re bidina domandin. Ji xwe, di serî de "fetwa" serê civake gelê kurd dane. Di demên ku buhurî de, di gotin ku "kuştina kurdan ´helal´ a." Bi wê re, digotin ku "mêrên kurdan bikujin û jin û keçên wan ji xwe re weke carîya bibin" Yanî, bi navê olê ´fetwa´ gelekî û civatekê dihê dayîn û ew cihane îslamê li ber wê bêdeng dimêne. Ev bêdengbûn bi serê xwe, têrê dike ku ew mirovên ku dibêjin ´ez misilman im´ ji wê misilmantiyê derkevin û misilmantiya wan ku hebe ´betal´ bibe. Di ti olan de, fetwa´ya serê civakan bigiştî ne hatîya dayîn. Ji xwe, cihê wê û temenê wê jî di ti olê de tûna ya.

Li vir, em nikarin wê hilweşandina keleha salahadinê Eyûbî a tikrîtê, tenê bi mezhebitiyê re werênina ser ziman. Ji wê zêdetirî, divê ku em bi gotina "paqijkirina navê kurdî ji nava olê´ re hildina li dest û fahm bikin. Ev jî, bi armanca desthilatdariyê dihê kirin. Ji xwe, pêşxistina şerekî di bin navê olê de li dijî civate kurd giştî, divê ku mirov bi wî şerê desthilatdarîyê a rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin re fahm bikê. Li vir, di serî de, di bin navê olê de nîjadperestîya etnîkî çawa dihê kirin û serdestkirin û şerê wê dihê dayîn, mirov di serî de rastî minaqe wê bi şerên çeteyên DAÎŞ´ê û hwd re tê. Li vir, car bi car, di hin çapameniyna de, şerê çeteyên DAÎŞ´ê bi gotina "mezhebîtîyê" re jî hatîya şîrove kirin. Lê divê ku em li şûna vê gotina "mezhebîtîyê", gotina "etînîkî ya rejimên herêmê ên serdest bicih bike û wê fahm bike. Ji ber ku di bin navê wê ´mezhebîtîyê´ de ´nîjadperestîya etnîkî dihê kirin û şerê wê tê dayîn. Bi wê re jî, bo serdestkirina nîjadperestîya etnîkî, ew şer dihê kirin. Î ro, dema ku li ser navê nîjadekê ol were ser ziman û navê nîjadên din "fetwa"´ya wan were derxistin û ew werina paqijkirin ji nava olê, hingî divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest û vî şerê di bin navê "olê de û ku bi gotina "cihadê" dihê dayîn jî weke şerê nîjadperestîya etnikî hilde li dest û şîrove bike û werêne ser ziman.

Mînaqe hilweşandina keleha salahadinê Eyûbî ku ji ber ku bi navê wî ya û her wusa tirbeyên çend pêxeberên ku ji wê çandê hatina bi bombayan hatina taqandin û hilweşandin, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest. Li vir, em tiştekî pirr safî û biawayekî vekirî dibînin. Ew jî, ew a ku şerê nîjadperestiyê û etnîkîtîyê di bin maskeya ola îslamê de li dijî gelên herêmê ên weke gelê kurd û hwd, dihê meşandin. Ev rastî, di serî de divê ku ji aliyê herkesekî ve were ditin û fahm kirin.

Keseyetîya salahadinê Eyûbî, keseyetek ku em bi gotina ´demokratîkîtîya´ roja me re werênina ser ziman, em dikarin di asta herî bilind a demokratik de werênina ser ziman. Di bin serkêşî û fermandarîya salahadinê Eyûbî de, hemû cihane îslamê bêî ku li

cihêrengîyên xwe yên mezhebî ku pêşketina binerê bû yek. Hemû cihê rengîyên ku hena ên etnîkî û bawerîyên ji hevdû cuda, di temenê ku rêz û hûrmetekê bidina hevdû de bi hevdû re dijîn. Dema ku seferên xaçîyan li rojhilat bûn, wî ew sefer dan sekinandin. Piştre jî, li herêmê aramî afirand. Pêşengtî û serkêşî kir. Keseyetîya salahadinê eyûbî, keseyetîyeka ku di roja me de jî, mihtacî fahmkirinê ya. Bi teybetî jî, oldarên ku bahse ol û bawerîyê dikin, divê ku wê fahm bikin. Dema ku em keseyetîya salahadinê Eyûbî, hildina li dest, em nikarin kêmî ya pêxemberekî werênina ser ziman. Salahadinê Eyûbî, şûrê xwe li mazlûnan ne kişandîya. Wî, rastî û rêya rast ku di wê de werê meşîn pêşnîyar kirîya. Nirxekî weke salahadinê Eyûbî, li rojhilata navîn ku were fahmkirin û li gorî wê fahmkirinê tevgerîn û nêzîkatî were kirin, wê demokrasîya rojhilat pêş bikeve û wê rojhilat bê gûlîstanaka ku pirr-rengî ku hemû bawerîyên ji hevdû cuda û komên ji hevdû cuda ên etnkî û xalkên ji hevdû re cuda wê bi hevdû re di temenê rêz û hûrmetekê de ku bidina hevdû wê bi hevdû re bijîn. Wateya rastîya Salahadinê Eyûbî ev a.

**-Bi** heman rengî me li jor gor ku Yunis pêxember jî ji vê çandê ya. Rast a. Yunis pêxember ji vê çandê ya. Gotina "pêxember" jî ji zimanê kurdî ji "peyam" û "ber" pêk tê. Di temenê wê de ev hena. Yunis Pêxember, li gorî ku rêweyata wî, ew a ku ji wî re pêxemberî hatîya. Piştre ew hatîya Nînova. Li wir, 33´ê pêşengtî kirîya. Yunis pêxember navê wî jî ji ji wê tê ku ji ber ku ew di zikê masîyekê de demeka dirêj ma ya. Masî, ew di zikê xwe de li dunyê gerandîya. Birîya her deverî. Birîya çemê Nîlê, Ji wir hanîya bahre hûrmûzê. Ji wir jî hanîya warê bavûkalên wî Nisêbînê. Masîyê bi navê Yunis, Yunis Pêxember li kevîya ava diclê li ser axa **Nisêbînê** ji zikê xwe derdixe û li wir dihêle û piştre ji berçav winda dibe. Ji vê rewşa ku di jîyane Yunis Pêxember de di buhurê, mirov fahm dike ku çemê Diclê bi bilindayîya xwe heta ku digihişt ber nisêbînê jî. ..

Tê gotin ku xwûdê bo ku ew herê Nînova û li wir rê şanî mirovan bide wî bi erk dike. Ew pêşî dide wir û 33 salî dimêne. Lê pirr zor tên pêşîya wî. Ew bo ku navê ´xwûdê´ û "serdestîya wî´ ji wan re werênê ser ziman, tê wir. Yunis pêxember, di dema xwe de mirovan agahdar dike û ji xirabîyan xilas dike. Yunis pêxember, bandûraka mazin li îslamê jî kirîya û navê sûraya ´kuranê´ a yunis" ji navê Yunis pêxember tê. Pirtûk jî ji Yunis re hatîya xwerê. Li gorî ku tê zanîn, pirtûka Yunis pêxember, di dema împaratorîya Medîya a kurd de hatîya nivîsandin. Yunis pêxember, ji xwûdê re weke ku di zimanê kurdî de dihê gotin ku di nava olê de jî bicih bûya gotina "rab" bikar dihêne. Di temenê "nirxandinê" de, ew di pirtûka xwe de gotina ´rab´ dihêne ser ziman. Her wusa, di temenê şîrêtan de jî mirov dikarê fahm bike. Yunis pêxember bixwe jî, bi peyamên xwe ên ku gihandina mirovatîyê, aramî, aşîtî û qancîya nava mirovan pêşnîyar kirîya. Di vê temenê de û bi vê rengê qarakterê wî û yê Salahadinê Eyûbî ditijbihê hevdû..

Ev nirxên vê herêmê, bi sadsalan gelên herêmê bi wan bawerîya xwe hanîya û bi wan jîya na. Di temenê pêşketina herêmê de, hebûna van nirxên dîrokî ya. Di vê temenê de, di aslê xwe de, ev rengê hêrîşên ku li herêmê tên kirin, mirov nikarê tenê bi rêxistinek çete weke DAÎŞ´ê re bi sînor şîrove bike û werêne ser ziman. Ji wê zêdetirî, hêrîş li nirxên herêmê û pêşketina herêmê dihên kirin. Her wusa, hêrîş li temenê bawerîya herêmê dihên kirin. Hilweşandina keleha Salahadinê Eyûbî a li tikrîtê, hilweşandina tirbeya yunis pêxember, paqijkirina navê ´kurd´î ji nava olê û hwd, çend ji

wan mijarên ku divê ku mirov dêne rex hevdû bi hevdû re dahûr û şîrove bike na. Her wusa, mirov ku bi dîroka herêmê re van bûyarên ku rû didin ku hewl dide ku fahm bike, mirov dibînê û fahm dike ku li pişt van kiryarên ku bi destê çeteyên DAÎŞ´ê dihên kirin, zihniyet û hêzna mazin hena. Bi tememî, wê kîjan nûqtayan kifş bikin û hêrîşî wan bikin, pêşî kifş dikin û weke ´koçikê Pavlov´ êdî DAÎŞ´îyan didina hêrîşkirin li ser wan nûqtêyan. Hêrîşên li ser kurdan, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest û fahm bike. Li ser navê Yunis Pêxember re ji Nisêbînê û heta Nînova(`bi navê î ro ´musil´) **pirreka** biratîya gelan a binirx û dîrokî û bawerî heya. Di serî de divê ku mirov vê yekê kifş bike.

**-Bi vê re, divê ku mirov bibêje ku ji nû ve dane hêrîşkirina çeteyên DAÎŞ´ê li ser Kobanê û nîqaşên ´avakirina herêma tampon, di çerçoveya planaka ku bi wê kurdan bişikênin de ya. Her wusa, pêşketina kurdan û pergale wan ku ji holê ra bikin a.** Li vir di serî de bi gotina ´avakirina herma tampon´ ve divê ku mirov bibêje ku heta destûr ji emerika, Rûsya û neteweyên yekbûyî dernekeve wê zor bê çêkirina wê. Bo vê yekê jî, di serî de divê ku bîryaraka nû ya mudahaleya li Sûrî were girtin. Di destpêka mudahaleya li Sûrî de, Rûsya, Cînê û hwd, ne hiştin ku bîryarak bi vî rengî ji desteya bilind a ewlakariyê ya neteweyên yekbûyî derkeve. Rûsya jî û Çînê jî, şerh danî ser bîryara mudahaleyek li Sûrî. Dema ku mirov van aliyan li berçav bigrê, mirov dikarê bibêje ku wê zor bê ku tirkiya di temenê çêkirina herêmek tampon de piştgirîyê ji emerika jî û Rûsya jî bigrê. Her wusa, gelek fektorên din ên weke ewropa û welatên arab jî hena. Rewşeka bi vî rengî, wê bandûrê li van dordoran jî bike. Lê tirkiya, bi hêrîşên DAÎŞ´ê re dixwezê di filîyetê de rewşeka bi vî rengî li ser herêmên Kobanê û hwd bi ”hênceta parastina sînoran” û hwd bide çêkirin. Ji xwe, bo vê armancê DAÎŞ´ê dide hêrîşkirin li ser kurdan. Yanî, di vê temenê de dixwezê ku di filîyetê û piretîkê de rewşeka weke ya ´herêma tampon´ li ber sînor bide çêkirin. Bêgûman, rewşeka bi vî rengî, wê di serî de kurd herê nekin. Ji xwe, di serî de, wê kurd li ber wê berxwedanê bikin. Bo vê yekê jî, wê li ber hewldanaka bi vî rengî ya ku d aslê xwe de bo dagirkirina rojavaya wê berxwedanaka netewî pêşbixin. Hingî, wê sînor jî di nava bakûr û rojava ne de nemêne**.**

Heta roja me, ji xwe di filîyetê de tirkiya rewşek bi vî rengî afirandibû. Hertimî digot ku ”qadaka ji firînê re qadaxa divê ku were çêkirin.” Bi vê yekê, çend belafirên rejima Sûrî ku hatibûbûna ber van sînoran ji aliyê artişa tirk û balafirên wê ên leşkerî ve hatibûn xistin. Rewşeka bi vî rengî, êdî dixwest ku di wê temenê de biryar werina girtin. Ji xwe, piştî pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ên j 15´ê êlûnê û pê de, tirkiya hêvî dikir ku wê bi sed hezaran kurd jî goçî bakûrê kurdistanê bikin û tirkiya jî wê li ser wê sîyesetê bike. Bo vê yekê, tirkiya ku sînorê ku xwe ji hemû alikarîyê mirov ên ku diçûna herêmê re digirt, ji buhurîna çeteyên DAÎŞ´ê re di vekir û ji goçberkirinên ji rojava re divekir. Ji xwe, piştî van hêrîşên vê demê, rayadarên tirk bi yekdengî bidest hêrîşên li tevgera azadîya kurd PKK´ê jî kirin. Heta demê, rayadarên tirk ên ku gotina ”pêvajoyê” ji devê ne diberdan, piştre bi carekê bidest hêrîşê kirin. Herî dawî, di civîna ”davos´ê T. Ardogan ku li piştgirîya li dijî kurdan digerihê. Bo vê yekê, ji rayadarên Ewropî alikariyê dixwezê ku bi wê li dij tevgera kurd şerê xwe bidomênin. Gotinên weke "çima win li dijî terore DAÎŞ´ê koalîsyonê çê dikin lê li dijî PKK´ê çênakin bi lêv dike. Di pêvajoyaka ku rayadarên tirk qaşo bi birêz Ocalan re hevdîtinê dikin ku qaşo bi armanca ”çareserkirin pirsgirêka kurd”, van gotinan bi lêv dike. Ev, gotin, di aslê xwe de,

nêzîkatîya rayadarên rejima tirk a li pêvajoyê jî radixe li berçav. Rayadarên tirk, hêvîyek mazin bi hêrîşên DAÎŞ´ê ve girêdabûbûn. Bawer dikirin ku wê DAÎŞ´, bi hêrîşên xwe derbeyek mazin li civate kurd giştî bide. Li serê wê derbeyê re jî, êdî wê ´pêvajoya ku lli bakûrê kurdistanê ku birêz Ocalan dayî destpêkirin êdî li gorî xwestek û politikayên xwe biancam bikin. Lê ya ku hasab dikirin weke derneket. Kurdan, piştî ku berxwedan li Kobanê pêşxist û ne hiştin ku DAÎŞ biserkeve, êdî weke ku hasabên rayadarên tirk jî têkçûn. Êdî piştî van têkçûnên ku kurdan bi berxwedana xwe bi DAÎŞ´ê dane jînkirin û pê de, rayadarên tirk jî bidest hêrîşkirina li tevgera kurd PKK´ê kirin. Gelê kurd, bo ku pêvajoya çareserîyê bi başî û aşîtî ancam bibe li berxwe dide. Lê rayadarên rejima tirk, ji ber ku bawer dikirin ku wê DAÎŞ biserkeve û wê derbeyê li kurdan bixe gotinên weke yên ”pêvajoyê” û ankû ”pêvajo didomê” bilêv dikirin û dihanîn ser ziman. Lê piştî ku dîtin ku DAÎŞ biserneket, êdî li şûna bibêjin û gotinên weke ”pêvajoyê” û ankû ”pêvajo didomê” bilêv bikin, bidest hêrîşkirinê li tevgera azadîya kurd kirin.

Ji ber ku ji rêya çareserkirina pirsgirêka kurd û pê de, êdî rê li pêşîya wê nemana. Bo vê yekê jî, êdî rayadarên dewletê jî bo ku nexwediyê nîyeteka çareserkirinê na, êdî bidest hêrîşkirina li tevgera azadîya kurd dikin. Êdî li şûna gotinên weke ”pêvajoyê” û ankû ”pêvajo didomê” bidest hêrîşê dikin û zimanekî bi hêrîşkarî bikar dihênin. Dema ku em ji vê şibekeyê ve li berxwedana Kobanê a gelê kurd dinerin, em dibînin ku berxwedana Kobanê berxwedana Kurdistanê û civate kurd giştîya. Ev berxwedan, wê bandûra wê li hemû herêmê wê hebe. Divê temenê de, dema ku em li pêvajoyê jî dinerin, êdî piştî serkevtina berxwedana Kobanê, ji tirkiya re jî ji çareserkirina pirsgirêka kurd û pê de ti rêyên din namênin. Em vê yekê jî, dibînin. Di vê temenê de, ku pêvajoya çareserîyê û berxwedana kobanê baş were xwandin bi sîyesî, wê dîrokê bi xwe re bide nîvîsandin. Piştî ku ji aliyê rayadarên tirk ve hat dîtin û fahmkirin ku DAÎŞ wê nikaribê li ber kurdan serkevtineka mazin bidest bixe, êdî bidest hêrîşê kirin li ser çapameniyê re. Pêşî, li ber sînorê Pîrsûsê ku Eysel Tuxluk di dema ku polîs û leşker hêrîşî wan dikin kevir diavêje wan kirina hêncet û hêrîşî wê kirin. Piştre jî, gav bi gav ev hêrîş asta wan zêdetir kirin û wergerendina hêrîşên li tevgera azadîya kurd. Çend ku kevir avêtina Eysel Tuxluk kirina weke hêncet jî, di aslê xwe de li pişt wê hêrîşkirina li wê ya li ser çapameniyê re ew hêrsa li berxwedana kurd a li kobanê ku li ber DAÎŞ´ê, xwerdî lê derketina kurdan li bakûr û serkevtina wê bû.

Ku mirov ji kîjan aliyê ve li mijarê binerê, mirov wê bibînê ku pirsgirêka kurd hatîya wê astê ku êdî bêçareserî nikarê bê sekinandin. Kurd jî, bi pêşketina xw re gihiştina wê aste êdî nikari bê statû bijîn. Ev herdû fektor, fektorên kurdistanî na. Lê ev herdû fektor, çendî ku bi hevdû ve girêdayî na, wilqasî jî bi rojhilat û pêşketin û pêşaroja wê ve girêdayî ya. Kurd, weke statûyekê li rojhilat derketina li holê. Şoreşa rojava, ancamaka vê jî ya. Ya ku di serî de, divê ku were dîtin ev a. Li vir, di vê temenê de kurd, çendî ku yekbin, wê pêşveçûnên dîrokê bi xwe re bidina çêkirin. Wê statûya xwe li herêmê bidestê xwe bidest bixin û misoger bikin. Ji ber ku di dema ku kurdan hewlda kongira netewî a kurd´ li dar bixin tirkiya û îran dijberîya xwe li wê hanîn ser ziman û piştre bi zora wan hat taloqkirin li demek ne dîyar? Hinekî jî, divê ku mirov bi van rewşan, pêşketina statûya kurd a li herêmê û bûna wan weke hêzekê ve girêdayî ya. Rejimên herêmê ku heta roja me, di bin kontrol û destê Îran û tirkiya de jîyane na, êdî dema ku weke statûyekê derdikevina li holê, herî zêde ji van herdû rejim û dewletan re zor tê ku

wê herê bikin. Bo vê yekê, li rê û rêbazên şikandina kurdan bi heldanên weke pêşxistina DAÎŞ´ê û hwd re digerihin. Bêgûman, wê DAÎŞ di demên pêş de pirr zêe li ser were sekinin. Lê li vir, tenê ji du aliyan ve mirov dikarê wê werêne ser ziman. Aliyê pêşî ew a ku DAÎŞ bo şikandina kurdan hatîya pêşxistin a. Her wusa, aliyê din ê duyem jî ew a ku rejimên herêmê ew kontrola xwe ya li ser olê re çêkirina bi wê çawa rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê derdixina li holê û li dijî gelên herêmê didina şerkirin bo ku wan bikina bin kontrola xwe de. Aliyê pêşî ku bi kontrolkirin û kirina bin desthilatdarîya xwe de ya. Aliyê duyemîn jî, bi îstismarkirin û bikarhanîna olê ku bo vê armancê dihê dîtin li herêmê bi rejimên herêmê re. Serkevtina kurdan li rojavayê kurdistanê, wê bê zorek jî li ser rejima tirk ku pirsgirêka kurd a bakûrê kurdistanê çareser bike û li ser îranê jî ku pirsgirêka kurd a rojhilatê kurdistanê çareser bike. Îran jî û tirkiya jî, vê yekê ji aliyê ve pirr bi awayekî vekirî dibînin. Bo vê yekê, li çareserîyên li dijî çareserkirina pirsgirêka kurd digerihin.

DAÎŞ, çareserîyeka rejimên herêmê ku bo pêşîlêgirtina wê pêşketina bo çareserkirina pirsgirêka kurd bû. Her wusa, divê ku mirov ji vê aliyê ve jî, li DAÎŞ û derxistina wê ya li holê binerin. Piştî hêrîşên DAÎŞ´ê re hanîna li rojevê ”oparasyonaka bejehî li dijî Sûrî” û berî wê hanîna rojevê ”çêkirina herêmek tampon” û hwd jî, gotin û hewldanên di dewama wan hêrîşên DAÎŞ´ê de ku mirov fahm bike na. Tirkiya, li navendên ewropî û ya emerika û hwd, dîplomasîya vê jî kirîya. Ji wan xwestîya ku qadaka ´herêma tampon´ were pêşxistin. Lê bi vê re, em vê yekê divê ku werênina ser ziman, di dema ku pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ji 15´ê êlûnê û pê de, li Kobanê û bigiştî li rojavayê kurdistanê destpêkirin û pê de, di çapameniya cihanê de jî gotinên weke ”hevkarê koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê ê xweza kurd in” hatin ser ziman. Tirkiya jî, li ser hatina ser ziman a van gotinan, herêkir ku bikeve nava wê koalîsyonê de. Yanî, bo ku alikarîyek mihtemel ku ji wê koalîsyon li kurdan bibe pêşîya wê bigrê. Bo vê yekê, manevra kir. Piştî wê re, bo ku wê deronîya ku di çapameniya cihanê de bi berxwedana kurdan re afirîbû, berevajî bike, bidest bikarhanîna gotinên dijberî kurdan kir û hewldanên weke ”terorê” dayîna nîşandin a kurdan da destpêkir. Li **civîna** Davos´ê gotinên weke ”dunya dema ku rêxistinek terorîst a weke ya DAÎŞ´ê derdikeve li holê dirabê ser pîyan lê rêxistina PKK´ê a ´terorê´ derdikeve narebê ser pîyan” ji devê T.Ardogan dihatin ser ziman. Lê di wê kêlîka ku T. Ardogan ev gotin dikirin jî, artişa tirk li gundên bakûrê kurdistanê ên li Aliyê Tirkiya ku diketina dehma navenda Kobanê ên weke ”gundê atmanê” û hwd, bi dehan tankên xwe yên leşkerî bicih dikir li ser sînor. Ev jî, di demeka ku di wê de nûçe ji rojavayê kurdistanê û Kobanê dihatin ku YPG´ê derbeyên giran li çeteyên DAÎŞ´ê dide dibû. Ev di destpêkê de, ji aliyê kurdstanîyan ve weke piştgirîyeka ji DAÎŞ´ê re dihat dîtin. Bi vî rengî, hewldanên krimînalize kirinê dan destpêkirinê. Bi wê re jî, bidest hêrîşkirina li kurdan kir. Bi wê re jî, rayadarên hikimeta tirk ên weke Yalçîn Akdogan bangê li PKK´ê dike ku herê Sûrî û li dijî DAÎŞ´ê şer bike. Ji xwe, hemû armanca wan ev bû. Lê dema ku dîtin ku plana wan neçû sêrî, êdî ew bixwe derdikevina berçapameniyê û vê dihênina ser ziman. Bi vî rengî, di aslê xwe de hewldanên herikandina PKK´ê bi şerê bi DAÎŞ´ê re rêbazaka din ya rejima tirk ku bi wê dixwezê ku derbeyê li serkevtina kurdan a bakûrê kurdistanê jî bixe. Bi wê re, dixwezin ku kurd vê qadê ji hêzên gerîlla vala bikin, da qana ew lê xwe serdest bikin. Dema ku rayadarên hikmetê ên weke Yalcin Akdogan dîtin ku plana wan ya bi DAÎŞ´ê re li gorî xwesteka wan neçû sêrî, êdî herî kêm bi wê dixwezin ku anîyaka şer li ser wê re bi

kurdan re bidina vekirin û ku bikin hêzên Bakûrî ên gerîlla jî herina wir şer bikin. Di vê temenê de, em dibînin ku bi DAÎŞ´ê planaka mazin ya şerê bi kurdan re hatîya çêkirin. Di destpêka şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re, ji leşkergeha tirk dapalandina(´sızdırma´) gotina "wê sed hezar kurd werina kuştin" jî, bi vê plana dane şerkirinê DAÎŞ a bi kurdan re bû. Bi berxwedana kurdan a Kobanê û bakûrê kurdistanê re ev dihê şikandin. Li ser vê şikandinê re, bidest hêrîşkirinê li kurdan kirin.

Dema ku ´pêvajoya çareserîyê´ birêz Ocalan dabû bû destpêkirin, tevgera azadîya kurd weke aliyekî bû. Bi vî rengî pêvajo hatibû destpêkirin. Lê rayadarên tirk, hertimî, di nava hanîna li berçav de bûn ku ew pêvajoyê tenê bi serê xwe bi rê ve dibin. Di temenê çêkirina vê ´întîbayê´ de ew politika hebû ku wê bi hêrîşên ku li rojava, başûr û bakûr li tevgera kurd bûba, wê ji wê alîtîyê ew hatiba derxistin. Bo vê yekê bû ku DAÎŞ bi rêxistin dikirin. Di dewama herdû salên pêvajoyê ên pêşî de, Beşîr Atalay kiribûbûna berdevkê hikimetê ku pêvajoyê birêve dibe. Bi raya vî mirovî, hertimî hewl didan ku «gotinên nerm» bi wî bênina ser ziman û pêvajoyê bi rengê mijulkirinê bi rêve bibin. Lê di destpêka pêvajoyên hêrîşên DAÎŞ´ê de hikimet hat nûkirin û beşîr Atalay jî di «kabînaya nû» a hikimetê cih negirt. BI gotinaka din jî, êdî bawer dikirin ku bi DAÎŞ´ê wê êdî pêwîstî bi vî mirovî û hanîna ser ziman a ´gotinên mern´ ên bo mijulkirin nebê. Êdî Ev kar di nava kabîneya hikimeta nû de kirina destê mirovên nîjadperest ên weke Bilent Arinc û hwd de. Rayadarên tirk, ev pêngava nû a bi hikimeta nû û hêrîşên DAÎŞ´ê re weke pêngava nû a serkevtina xwe wê denezendiba. Li gorî wan, wê DAÎŞ´ê di demek kin de derbe li başûr û rojava li kurdan bixista. Wê kurd bihatan şikandin. Bi wê re, wê bi deh hezaran kurd bi destê vê rêxistina ku wan derxistibû li holê bihatiba kuştin. Piştî vê e jî, wê hêzên rojava û emerika jî, weke xilaskerekî wê êdî bidest oparasyonekê bikiran û ev rêxistina ku evqas komkujî kirina wê biheta ji holê rakirin. Wê hemû gunehên xwe yên ku kirina, wê bikiran stûyê DAÎŞ´ê û wê xwe «paqij» derxistan. Kurd jî, wê bi derbeya ku xwaribûn, wê êdî maban. Wê piştî wê derbeyê re, derfet êdî ne hatiba dayîn ji kurdan re ku bihetan serxwe. Ev jî, wê pêvejoyek nû a bi salan a biêş wê bi xwe re bihanîya. Êdî bi wê şikeştinê re jî, wê tevgera kurd jî ji aliyekî wê pêvajoya ku birêz Ocalan dayî destpêkirin bihata xistin. Ji xwe, hasabê mazin li ser wê bû ku weke aliyekî pêvajoyê xistina tevgera kurd bû. Bo vê yekê ya ku Yalçin Akdogan derdikeve berçapameniyê û ji tevgera azadîya kurd re dibêje «herina rojava û bi DAÎŞ´ê re şer bikin.» Û ji aliyê din ve jî, ji ber vê hasabê wê bû ku rayadarên tirk ne dixwestin ku muzakareyan bi tevgera kurd re bidina destpêkirin û wê weke aliyê kurd herê bikin. Hemû hasab û kîtab li gorî vê hatibû kirin Lê berxwedana kurdan ev hasab û kîtab şikand.

Dema ku em van hasab û kîtabên ku li herêmê bi politika hatina kirin nebînê, mirov wê bi başî hêrîşên DAÎŞ´ê li herêmên kurdan jî bi başî fahm nekê. Dema ku mirov van aliyan û van hasaban nebînê û fahm nekê, mirov wê tenê hêrîşên DAÎŞ´ê biarmanca avakirina «dewletek îslamî» şîrove bike ku ev şîrove pirr tang û nikarê rastîya hêrîşên li rojava û civate kurd werêne ser ziman.

Em divê ku hebûna DAÎŞ´ê, derxistina wê ya li holê û her wusa dane hêrîşkirina wê ya li ser kurdan, bi vî rengî bi politikayên rejimên ên di temenê bêstatû hiştina kurdan de mirov fahm bike. Bi wê re jî, dema ku em di çerçoveya vê pêvajoya ku birêz Ocalan dayî destpêkirin de mirov hilde li dest, divê ku mirov bi wê fahm bike ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê re armanc ew bû ku tevgera kurd ji aliyê pêvajoyê xistinê bû. Bi vê re jî, êdî

pêvajoyê li gorî xwe û xwestekên xwe hem bi kurdan bidina herêkirin û hem jî di temenê bêstatû hiştina kurdan de li gorî politikayên xwe bi ancam bikin. Di vê temenê de, Dema ku li rojava derbeyek li kurdan hat xistin, wê hingî, ev derbe tenê û tenê xizmetî vê vê yekê bikira. Bêgûman, bi derbeyeka li rojava hatî xistin, wê civate kurd newê tûnakirin. Lê wê bandûra wê li vê pêvajoyê pirr zêde hebû. Bo dewleta tirk û ya Îranê jî, aliyê herî giring jî ev bû. Di aslê xwe de, ev wê bûba dûbarakirina Lozane duyem li ser serê kurdan. Bo vê yekê jî, hêrîş bi teybetî li tevgera kurd û ji weke aliyê pêvajoyê ku wê ji pêvajoyê bixin bû. Dema ku tevgera kurd ji pêvajoyê xistin weke alî, wê hingî gihiştiban aancamê li gorî xwe. Pêvajoya i hêrîşên DAÎŞ´ê re li kurdan dabûbûn destpêkirin bo vê yekê bû. Di vê temenê de weke ku rayadarên tirk dapalandina li çapameniyê jî ´wê sed hezar kurd jî bihata kuştin. Lê di ancamê de serkevtin ya wan bû. Wusa hasab kiribûn. Di çerçoveya gotina «pêvajoyê» de, di her dema ku rayadarên tirk ku derdiketina ber çapameniyê de di vê temenê de bahse pêvajoyê dikirin. Bo vê yekê û armancê, digotin ku «pêvajo didomê.»

Di vê temenê de dema ku em rengê gotina «pêvajoyê» ku ji devê rayadarên tirk derdiket, divê ku mirov di berdewama wê de DAÎŞ´ê werênê ser ziman. Ji ber ku di vê temenê de pêvajo, li gorî xwe bi politika kirina. Di vê temenê de planaka giştî di çerçoveya vê pêvajoyê de çêkirina ku bi wê hem pêvajo li gorî xwe bi ancam bikin û hem jî kurdan bişikênin. Bo vê yekê, dema ku DAÎŞ´ê bi rêxistin kirin, DAÎŞ ne weke rêxistineka dîrekt ku bi tevgera kurd re şer bike ava kirin. Weke rêxistineka ku bi teybetî hêrîş civate kurd bike û di wê temenê de jî herê bi ser kurdan de avakirin. Di vê temenê de temenekî vê rêxistinê ê bîrdozîkî li ser olê re çêkirina. Birêxistinkirina û dane hêrîşkirin li ser kurdan. Bi teybetî, armanca vê rêxistina terorê a bi navê DAÎŞ´ê hebûn û navaroka civate kurd bû. Wê çawa wê hebûna civate kurd ji hevdû belav bike, di wê temenê de didina hêrîşkirin li ser civate kurd. Hêrîşên ku bi destê didina kirin, bo ku li ser çapameniyê re bi wan «sansansyonê» bidina çêkirin radigihênin. Serê mirovan li ber kamara jê dikin û di çapameniya civaknasî de belav dikin. Bi vî rengî, ku pêşî tirsê bikina dilê civatê de ku karibin ji herêmên wan bidina goçberkirin. Herkesekê, li şûna li berxwe bidin, bikina derdê xilaskiirna jîyane xwe de. Bi vî rengî, bi awayekî ku wê çawa bandûra wan hêrîşên DAÎŞ´ê li ser çapameniyê re zêdetir bikin di wê temenê de radigihandin. Hêrîşên DAÎŞ´ê aliyê wan ê ragihandinê, aliyekî mazin ê ku mirov divê ku bi gotina ”sansasyonê” re werênê ser ziman in. Ji ber ku li hebûna civatekê ew hêrîş dihên kirin, êdî aliyê hêrîşan ê bi sansasyonî giring dibê bo çavtirsanê û dane goçberkirinê û hwd. Ji ber van hêrîşên bi vî rengî bû ku dema ku hêrîşî şengalê kirin, li şûna ku berxwedan li wir bibe, bi sed hezaran ji herêm û warên xwe ketin rêyan û goçkirin. BI heman rengî şengal vala kirin. Çend pêşmergên ku li wir hebûn jî li berxwe nedan. Bi heman rengî, dema ku hêrîşî Kobanê kirin, heman ancam li wir jî hêvî dikirin. **Bo vê yekê, di roja(15´ê êlûna 2014´an) hêrîşkirina çeteyên DAÎŞ´ li kobanê de çapameniya tirk jî di nivîîsand ku bi sed hezaran kurdên rojavayê li ber sînor bûna kom.** Lê ev derew bû. ..

..

**”Stalîngrada kurdan kobanê”**

Kurdan, berxwedanak mazin a dîrokî li Kobanê pêşxistin. Bo vê yekê bû ku bi berxwedana kurdan a li kobanê re kobanê weke ´stalîngrada kurdan´ hat binavkirin. Vê gotina bi navê **”stalîngrada kurdan kobanê”** divê ku mirov li ser wê bisekinê**.** Ev

berxwedana kurdan a li kobanê ku weke ”stalîngrada kurdan” tê bi navkirin, di sale 2014´an de li berçavên cihanê hemûyî bû. Di dema şerê cihanê ê duyemin de dema ku artişên nazîyan hatina ber moskovê, hingî berxwedanaka mazin li stalîngradê li ber wan artişên nazîyan pêş ketibû. Ya ku temenê têkçûna artişên nazîyan li ber moskova afirand jî ew berxwedana li stalîngradê bû. Li stalîngradê, jin, zarok û kal jî di nav de, herkes li ber artişên nazîyan rabû bû serpîyan li berxwe dida. Kî çi ji destê wî dihat di wê demê de dikir. Yên ku nikariban ku şer bikin bi çekê, diçûn av di birin ji yên şer dikirin. Nan û xwarin çê dikirin ji yên ku li berxwe didan re.

Bi vê yekê, navê ´stalîngradê´ bi wê berxwedana girseyî a civatî bû malê dîrokê. Wê berxwedanê, têkçûneka dîrokî bi nazîyan da jînkirin. Piştî wê têkçûna ku artişên nazîyan li stalîngradê, êdî li deverên din ên ewropa jî bidest têkçûnê kir. Artişên nazîyan, piştî ku li ewropa jî bidest xwarina têkçûnê kirin, êdî nazî hatina sekinandin. Ev serkevtina li stalîngradê, wê rêveberîya wê demê ya yekîtîya sovyet jî bike weke hêzeka cihanî. Bandûra yekîtîya sovyet, ji vê serkevtinê û û pê ve zêde bû. Her wusa piştîşerê cihanê ê duyem wê êdî hebûna yekîtîya sovyet jî, weke desthilatdarîyeka ´sosyalîst´ wê derkeve li ser dika dîrokê. Ev rewşa serkevtina li stalîngradê, wê piştre bi peymanên weke ku li konferanse yaltayê´ tên mohrkirin re wê rewşa yekîtîya sovyet jî xorttir bike. Konferanse yalta, ku di wê de, rewşa polonya, beşkirina almanya jî ku piştî nazîyan re di nav de, wê gelek mijar li wir werina nîşandin û biryar di derbarê wan de werina girtin. Piştî şerê cihanê ê duyemin ku ji nû ve avakirina pergale cihanê jî temenê wê ji gelek aliyan ve li wir dihê avêtin.. Piştî konferanse yaltayê k u ji sale 1945´an û pê de, heta ku dem tê salên 1990´î û pê de, wê rewşa ”şerê sar” biafirê û bidomê. Konferanse yalta, wê temenê levkirinekê di nava yekîtîy sovyet û rojava de, ku nazîyan têk bibin û piştî wê re bi hevdû re tevbigerihin jî wê biafirêne. Konferanse yalta, sê-heyvan berî destpêka şerê cihanê bûbû û ew levkirina ku di wê de hatibû kirin, wê piştre ku şerê cihanê ê duyemin destpêkir, wê bê temenê hevkarîya sovyet û rojava bi hevdû re li dijî nazîyan.  Ev jî, şerê dîplomatikî ya ku bi wê du-qutup diafirin û li berhevdû dikevina pozisyonê de. Qutubek, ya emperyalîsmê ku bi emerika û hinek welatên ewropî dihat ser ziman. Qutubek jî, bi yekîtîya sovyet re ku weke ´qutuba sosyalîst´ jî dihat bi navkirin bi hinek welatên li balqanan û ewropaya rojava re wê xwe biafirêne. Lê navenda wê jî yekîtîya sovyet bû.

Di aslê xwe de, nazîyan jî di serî de yekîtîya sovyet ji xwe re kiribûbûna armanc. Di destpêka vê pêvajoyê de nazîyan û serokê wan Hîtler, hizir dikir ku hemû rojavayî û emerika li dijî sovyetê na, wê li dijî wê nerabin û heta ku wê alikariyê jî bidina wan. Ji xwe, di wê demê li Îtalîa û îspanya jî rejimên faşîşt bi firanko û musolonî re hebûn. Ew jî, di nava hewkarîyekê de bi nazîyan re. Vê rewşê, rewşa nazîyan li giştîya ewropa pirr zêde xort kiribû. Bo vê yekê jî, li ewropa ku artişên nazîyan diketina kîjan welatî de di cih de dikirina bin destê xwe de û dagir dikirin. Bi vê bawerîyê ku bawer dikirin ku wê bi heman rengî ji yekîtîya sovyetê destpê bikin û ku heta ku werina yewnanîstanê, wê di cih de herêmê dagir bikin û rejimên nazîst ên faşîşt ava bikin. Piştî vê re, Artişên Nazîyan berê xwe dane bi ser yekîtîya sovyet de. Di wê dema ku tên bi ser yekîtîya sovyet de, wê li ber yekîtîya sovyet li stalîngradê rastî wê berxwerdana mazin werin. Artişên nazîyan, wê li wê berxwedana li stalîngradê bialiqin û ji wir û pê de, pêde neçin. Heta ku dema ku li stalîngradê berwedanêê destpêkiribû, wê ji bilî sovyetîyan wê ji gel û xalkên din jî, di bin navê ”tekoşîna enternasyonal” wê mirov biharikan stalîngradê li

wir li ber artişên nazîyan li berxwe bidin. Ev rewşa ku li stalîngradê bi berxwedana li wir a li ber artişên nazîyan pêşket, wê êdî mazin bibe. Teybetmendîya şervanîn ku li wir şer dikirin li dijî nazîyan, bi bawerî şer dikirin. Çend ku bi bîrdozîya nîjadperestiyê ku Hîtler temenê wê avêt nazîstî jî hatibûbûna perwerdekirin û di wê temenê de bi wan re bawerîyekê hatibû afirand in jî, lê wê li dijî wê bawerîya şervanên stalîngradî ên ku bi wê bawer dikirin ku bo´mirovatiyê diparêzên ser dikin´, wê sernekevin. Hêst û ramana şervanên stalîngradîyan, ya  nazîstan xortir bû.

Yekîtîya sovîyet, di demma şerê cihanê ê duyemin de, piştî artişên nazîyan bidest hêrîşa li wê kirin û pê de, hema bêja li gelek deveran windahîyên dîrokî jî dabûn. Li gelek anîyên li ber moskovê, nazîyan hata ku serkevtin jî bidest xistibûn. Bi wê re mirovên ku li rewşa sovyetê dinerîn, digotin ku ´êdî wê sovyet ji holê were rakirin ji aliyê nazîyan ve´. Ji ber ku artişa yekîtîya sovyet artişa sor, hatibû ber têkçûnê. Anîya ku li berxwe dida, tenê ew anîya stalîngradê ku bi jin, zarok û kalan ve herkesekî di çeperan de şer dikir û li berxwe dida mabû bû. Ev anî, wê ti carî ji  şer bi şûn ve gav neavêje. Çend ku li hemû deverên din ên Rûsyaya wê demê a dema sovyetê, hatibûbûna xûrixandin jî, bêhêvîtî ne ket dilê wan berxwedêrên li anîyên stalîngradê. Artişên nazîyan ku li hemû çeperên din wê xûrixandinê li herêmê bidina çêkirin, wê nikaribin tenê li wê aliyê wê xûrixandinê bikin û serbikevin. Piştre jî, wê anîya stalîngrad, biserkeve. Wê bi wê serkevtina anîya stalîngradê re, êdî herêmên din jî, tevî hemû têkçûnên ku xwarina wê rabina ser pîyan û dîsa herêm bi herêm pêde herin û artişên nazîyan bişikênin. Ya ku weke destpêka wê serkevtinê jî, stalîngrad bûya. Bi vê rengê stalîngradê, dîrok nivîsand. Dema ku bahse berxwedana dîrokê dihê kirin êdî piştî wê re stalîngrad dihê bîra mirov. Stalîngrad, her wusa destpêka têkçûn û berjêr çûyîna nazîyan jî ya. Ji xwe, piştî wê serkevtinê re, êdî gav bi gav û dem bi dem wê li herêmên din ên cihanê û hwd, wê artişên nazîyan werina şikandin. Bi vê serkevtinê re, yekîtîya sovyet jî, navê xwe li dirokê bi tîpên zêrîn da nîvîsandin.

Î ro di roja me de, ku kî jî van deman lêdikolin û şerên vê demê ên weke şerê cihanê dihênin ser ziman, cihekî giring ji vê berwedana li stalîngradê re divaqtênin. Ji ber ku piştî ku bi serkevtina stalîngradê re yekîtîya sovyet jî biserket, bi wê re êdî piştî re di şerê cihanê ê duyemin de li dijî nazîyan mirovatî jî biserket. Her wusa, bi vî rengî jî, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Piştî şerê cihanê ê duyemin û pê de pêvajoyek nû li giştîya cihanê weke pêvajoya ´tekoşîna xilasbûna neteweyan ji bindestiyê´ jî destpê dike. Bandûra vê berxwedana li stalîngradê li ser vê pêvajoyê wê bi gelek aawayên wê re wê hebe. Rengekî rekoşîna azadîya neteweyan wê derkeve li holê. Her herêm, wê li gorî şert û mercên xwe wê pêvajoya tekoşînê birêxistin bikin. Li çînê bi rengê şerê maoîsmê ku pişta xwe dide gundîyan û hwd pêş dikeve. Bi maoîsmê re lenînism jî, weke çerçoveya teorîkî û ya tekoşînê pêşketin. Li herêmên din cur bi cur bi vî rengî pêş dikeve.

Şerên tekoşîna azadîyan, wê bi vî rengî li gelek deverên cihanê destpê bikin. Bi wê re jî, wê li gelek deveran desthilatdarîyên nû werina avakirin. Minaq, bi vê re divê ku mirov li vir bahsê bike ku berxwedana wîetnamîyan wê bi wê rengê dîrokê bi xwe re binivîsêne. Di van deman de, destpêka tekoşîna azadîya kurdistanê PKK´ê jî bûya. Çend ku tekoşîna azadîya kurdistanê, di destpêkê de dibin bandûra van pêşveçûnên cîhanê de mabê jî, wê piştre temenê xwe bi xwe re bi ´şerê gerîlla´ re pêş bixe û êdî dîroka xwe bidestê xwe û bi hebûna civate re bide nivîsandin. Berxwedana li Kurdistanê, bi vî rengî

êdî wê dîroka pêşbeçûnên li rojhilat jî bi xwe re bide kifşkirin. Tekşîna çekdarî, ku sale 1984´an û pê de li kurdistanê destpêkir, wê gav bi gav pêş bikeve û mazin bibe. Li kurdistanê, şerê bi metingerîyê re dihê dayîn. Heta ku sal tê salên 2014´an, wê ev tekoşîna azadîya kurdan li kurdistanê û li giştîya rojhilat hebûna xwe bide domandin. Ji wê dema şerê cihanê a ku di wê de berxwedanên weke ku li stalîngradê bûn, î ro kurdistanî li Kobanê bi heman rengî berxwedanê pêşxistina. Li Kobanê, bi heman rengî, jin, zarok, pîr û kal, di anîya şer de na li dijî hêzên DAÎŞ´a ku bi piştgîrîya Îran, tirkiya û hinek welatên din ên rojhilat hêrîş dike. Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê şoreşa rojava kirin û pê de pêl bi pêl, ev hêrîş li kurdistanîyên rojava û xalk û bawerîyên din ên li herêmê destpêkirin. Weke ku çawa ku di dema şerê cihanê ê duyemin de ku nazîyan hêrîşî stalîngrad dikir, bi heman rengî î ro DAÎŞ´î bi heman rengî hêrîşî Kobanê dikin. Weke ku çawa ku di wê demê de jin, zarok, pîr û kalan bi hevdû re anîyek berxwedanê li dijî nazîyan vekiribûn û di wê de li berxwe didan, di vê demê de bi heman rengî Kobanîyan, bi jin, zarok, pîr û kalên xwe re anîya şer vekirina û di wan anîyan li ber xwe didin.

Li herêmê, rejimên herêmê heta roja me hertimî bi artişên xwe yên ku bi teknîka sadsalê xamilandina diçina bi ser kurdan de. Lê kurd, di destê wan de, tenê kilêş hena. Bi wan kilêşan li berxwe didin. Çeteyên DAÎŞ´ê, çend ku bi hêzek mazin û teknîkeka di destê wan de a pirr pêşketî dihên bi ser kobanê de, dîsa windahîyên mazin ên dîrokî dane, weke ku çawa ku nazîyan li ber berxwedêrên stalîngradê dida. Wê dema ku di wê de li stalîngradê berxwedan bû û heta roja me, nîvsadsalek buhurt. Gelek guharîn bûn û pêşketin derketin li holê. Lê tiştek weke xwe ma. Ew jî ew bû ku ew zihniyeta ku hê bi metingerî xalkan di bindest de digirê ya. Li kurdistanê, di vê demê de tekoşîn bi civakî li dijî wê zihniyeta metingerî dihê dayîn. Tekoşîna mirovatiyê dihê dayîn. Ev tekoşîna mirovatiyê, dûhû li stalîngradê dîrok nivsand, î ro jî li Kobanê dîrokê dinivîsêne. Di wê demê de weke ku çawa ku bi jin, zarok, pîr û kalan re bi gîyane civatî berxwedan li ber faşîştên nazîyan hatibû dayîn di vê demê de jî bi heman rengî li dijî faşîştn DAÎŞ´î û rejimên ku piştgirîyê didina wê ên weke tirkiya û îranê ew berxwedan dibêt li Kobanê. Li kobanê, bivî rengî, di vê demê de dîrok dihê nivîsandin. Ev dîrok, newîyên hûrî û mîtannîyan dinivîsênin. Ev dîroka newîyên hûrî û mîtannîyan a. Newîyên Medîya in. Newîyên şadadî, merwanî û eyûbîyan in.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî biteybetî binxat bike ku weke ku çawa ku weke ancama serkevtina berxwedana stalîngradê, nazî têkçûn û piştî şerê cihanê ê duyem bi dawî bû û li cihanê pergalek nû hat avakiriin, bi heman rengî, wê bi serkevtina Kobanê re, wê statûqûya ku li herêmê a rojhilat ku heta roja ku weke ku bi DAÎŞ´ê dibe ku olê hertimî li dijîî pêşketina civatan bikardihêne û bi wê xwe serdest kirîya û hebûna xwe domandiya, wê bi statûya ku pêşxistî re û bi zihniyeta wê statûqûyê re bêavêtin li muzexaneya dîrokê. Li rojhilat, bi têgihiştina şoreşa rojava re, zihniyetek nû afirî û serdest bû. Di vê zihniyetê de, wekhevîya di nava zayendan, bawerîyan û kêmnetewên civatî û hwd de heya. Ev jî, tê wê wateyê ku wê bi serkevtina berxwedana Kobanê re wê bahara gelan were û pêşbikeve û bijî. Ya ku li Kobanê berxwedana wê dihê dayîn ev a. Hêzên ku diçina bi er kobanê de û dixwezin ku wê berxwedanê bişikênin, dixwezin ku vê zihniyeta ku wê bê temenê bahara gelan ji holê ra bikin. Yanî, li vir, di keseyetîya berxwedana Kobanê de ne kes zihniyet bihevdû re têdikoşîn. Dema ku em berxwedana li kobanê bênina ser ziman, divê ku em bi vê rengê wê werênina ser ziman. Her wusa ji

vê rengê wê û zihniyeta wê ya civatî gav biavêjin û wê şîrove bikin. Bi vê re jî, emê hê bi rastîtir fahm bikin ku ji berçi wilqasî bi şitt hêrîşî wê dikin. **Li vir, divê ku em vê bibêjin ku wê weke ku çawa ku bi berxwedana stalîngradê re serdemek nû destpêkir, wê di vê demê de bi berxwedana kobanê û serkevtina wê re serdemek nû hem li herêmê û hem bi dîrokê re destpê bike. Li vir, bo ku mirov vê berxwedanê baş fahm bike, mirov wê zihniyet û sîyeseta wê ya li pişt wan hêrîşên ku bidestê DAÎŞ´ê dibe jî fahm bike. Bi teybetî, rejimên weke rejima tirk ku li piştî van hêrîşên DAÎŞ´ê disekin û alikariyê didinê de, bo çi armancê wê piştgirîyê û alikariyê didin, divê ku mirov zihniyeta wê ya sîyesî re fahm bike. Li vir, ji vir û pê de, em hinekî li ser wê jî bisekin in. ..**

**Berxwedana li Kobanê, dema ku dikeve roja 17´an de êdî gihişt asta herî bilind. Ji ber ku hêrîşên li ser kobanê jî, gihiştin asta herî bilind.** Li rojavayêê kurdistanê, piştî ku şoreşa rojava bû û pê de, hêrîşên li lê, gav bi gav zêdebûn. Hêrîş, di serî de bi piştgirîya tirkiya zêde bûn. Di destpêka şoreşa rojava de, yanî di roja 19´ê temûza 2012´an de, ku care pêşî kurdan dest danî ser rêveberîya bajarê Kobanê, êdî herkesekê fahm dikir ku li wir şoreşek dibû. Ev pêşketina dîrokî, di serî de kurd, dilê hemû mirovên ku di dilê wan de mirovatî hebû xweş kir. Lê rêveberîya tirk, di wê rojê de civîn li ser civînê dikir. Di dawîyê de T. Ardogan bixwe ku weke serokwezirê dem bû, derket berçapameniyê got ku "emê ji ´bûn û bidawîbûnekê´ re nebêjin ´eywellah´". Ji vê gotina T. Ardogan, fahm dikir ku wê hêrîşî rojavayê kurdistanê bikin. Piştre, dem bi dem bi pêşveçûnên ku bûn, ev hêst û hizra di serîyan de piştrast kir. Tirkiya, çete kom bi kom bi rêxistin dikir û dida hêrîşkirin li ser serê kurdên rojava. Pêşî, cebetil-nasr´ bi rêxistinkir û ji herêmên weke serêkahniyê ê rojavayê kurdistanê ve da hêrîşkirin li ser kurdên rojava. Lê kurdan, hemû hêrîşên wan şikandin. Piştre, dema ku fahm kirin ku wê bi bi cebetil-nasr´ ti ancamê bidest nexin, piştre bi dest bi rêxistina DAÎŞ´ê kirin. DAÎŞ li ser mezhebê ola îslamê ´sûnnîyê´ re bi rêxistin kirin. Ji gelek deverên cihanê, mirovên ku di bin navê olê de xapandibûn, yek bi yek di birina tirkiya û çek didane destê wan û didane hêrîşkirin li ser rojava.

Ev pêvajo, gav bi gav bi asta hêrîşan re hat zêdetir kirin. Piştre, kom bi kom çete bi rêxistinkirin û dane hêrîşkirin li ser Kobanê. Kobanê, bû weke armanca sereka di hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê de. Ji ber ku Kobanê, destpêka şoreşa rojava li wir bû bû. Bo vê yekê, wateyeka wê ya sembolîkî hebû. Bo vê yekê, giranîya hêrîşan dane ser Kobanê. Dixwestin ku wê sembolê şoreşa û destpêka wê ji holê ra bikin. Ev, weke aliyekî teybet ê di temenê hêrîşên li rojava de bû. Piştî ku Civîna rayadarên Îranî û rayadarên tirk a li qasra sadabadê û pê de, gav bi gav pêla hêrîşan li kurdan hat zêdetir kirin. Piştî vê civînê re DAÎŞ, li Musilê bicihkirin. Pêşî, ji artişa Îraqê xwestin ku hemû çekên xwe li cih bihêle û xwe vekişêne. Ev jî, aliyekî plana bi rêxistinkirina DAÎŞ´ê bû. Piştre wusa kirin. DAÎŞ, li Musilê bicihkirin. Ew jî, weke planaka ku bi wê DAÎŞ, weke rêxistineka dij-şoreş ku li ser olê re hatibû birêxistin kirin bû. Bi teybetî, tirkiya dixwest ku pêvajoya li bakûrê kurdistanê a bi navê ´çareserîya demokratik´ di temenekî bêstatû hiştina kurdan de biancam bikin, ew plana bi navê DAÎŞ´ê pêşxistibûn. Di vê temenê de, DAÎŞ, tenê hêrîşî kurdan û rojavayê kurdistanê dikir. Pêl bi pêl, hêrîşên DAÎŞ´ê li herêmên rojavayê Kurdistanê û bi teybetî li Kantona KObanê a rojavayê kurdistanê

dibû. Dixwestin ku Kobanê bixin. Armanca xistina Kobanê, bo têkbirina şoreşa rojava bû. Lê bo xistina kobanê, pêla hêrîşên mazin di 15´ê êlûna 2014´an de destpêkiribû. Kobanê, ji her çar aliyên xwe ve hatibû dorpêçkirin. Ji aliyê rojava, başûr û rojhilat ve hatibû dorpêçkiirn. Sînorê Kobanê ê li aliyê tirkiyê ve jî, di wê de di bin kontrola tirkiya de kom bi kom çeteyên DAÎŞ´ê dibuhurîn û hêrîş Kobanê dikirin. Aliyê Kobanê ê ku diket sînorê tirkiya de ê bakûr, ji aliyê bakûrê kurdistanê ve, kurdistanîyên bakûr herikîbûbûna li wê. Di ber sînor de sekinîbûn. Armanca wê jî, ew bû ku pêşîya buhurîna çeteyan ji sînor derbas bikin.

Ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, asta hêrîşan li Kobanê zêde bû. Ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, roj bi roj, berxwedanaka mazin ya kurdan li Kobanê pêş diket. Kobanê, ji demê û pê de, bi alikarîya tirkiya çeteyên DAÎŞ´ê bi tank û topên ku ji tirkiya, artişa Îraqê û artişa Sûrî girtibûn, Kobanê dorpêç kiribûn. Ew dorpêçkirin, gav bi gav mazintir dibû. Lê li ber wê, berxwedana kurdan jî zêdetir û maztir dibû. Kurdên Kobanê, bi jin, zarok û pîr û kalan, ketibûbûna çeperên şer de û li berxwe didan. di çeperan de xwarina çê dikirin û dirazahan. Bi vî rengî, berxwedanaka mazin li Kobanê pêşketibû. Her wusa, ji başûrrê kurdistanê, bakûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê, ciwanên kurd diherikîn li Kobanê bo berxwedanê. Li ber wê jî, rejima tirk, çek, tank û topên bi bandûrtir didana tirkiya ku li dijî kurdan li Kobanê bikarbênin. Roj bi roj, ew hêrîşên bi wan çekên giran ên li Kobanê zêdetir dibûn. Li ber wê jî, berxwedana hêzên kurd ên YPG´ê û YPJ´ê jî zêdetir û maztir dibû. Di 2´yê kewçêra 2014´an de ew berxwedana li Kobanê gihişt astaka xwe ya bilind. Di vê rojê de, çeteyên DAÎŞ´ê bi alikarîya DAÎŞ´ê ji her çar aliyên Kobanê ve bi alikarîya tirkiya bidest hêrîşkirina li kobanê kirin.

Di vê navberê de, tirkiya û çapameniyê wê jî, nîqaş dikir ku di filîyetê de ´herêmek tampon´ li ber sînorê rojavayê kurdistanê ku ava bikin. Bi wê re jî, rayadarên tirk û hikimeta tirk ´destûrnameya şer" ku destûrê dide hêrîşên rejima tirk ên bi leşkerî li rojava amede kiribûn ku bibina meclîsê û di wê de bi buhurênin. Destûrnameya şer, hatibû amedekirin. Di xwestin ku di 3´yê kewçêrê a 2014´an de ji meclîsê bi buhurênin. Bo vê yekê jî, amedekarî dikirin. Amedekirina vê destûrnameya şer û hewldanên buhurandina ji meclîsê, nîşanaka şerekê mazin ê bi kurdan re bû. Gelê kurd, ew roja 2´yê kewçêra 2014´an ku di wê de asta hêrîşan gihiştibû asta herî bilind û rojava 3´yê kewçerê a 2014´an ku rayadarên tirk û hikimeta tirk ku Dawutoglu serokwezirtîya wê dikir ku xwe amede dikir ku destûrnamaya şer ji meclîsê derbas bike, weke du rojên destpêkê ên dema komkujiya dersimê şîrove dikirin. Bi heman rengî, di destpêka komkujiya dersimê de jî, hikimet biryarname ûû ankû destûrnama şer ji meclîsê derxistibû û bi wê komkujiyên bi deh hezaran hanîbû serê kurdên elewî ên dersimî. Î ro, bo kurdan, weke ku dîrok dûbare dikir. Kurdan, di vê demê de bi carekê dema komkujiya dersimê di mejiyê wan de zîndî bû bû. Lê kurdan, di her qada jîyanê de bi bawerî biryara bexwedanê dabûbûn li dijî hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi piştgirîya tirkiya. Ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de zêdebûna hêrîşên li kobanê, hinekî jî têkilîya wan bi wê destûrnamaya şer ya hikimeta AKP´ê ku di xwestin ku di 3´yê kewçêra 2014´an de ji meclîsê bi buhurênê ve girêdayî bû. Bi wê re jî, dixwestin ku di filîyetê de, herêmek tampon çê bikin û vê jî bi hêrîşên DAÎŞ´ê re bikin. Di piretîkê de bi sedan leşkerên tirk, cilên DAÎŞ´îyan li xwe kiribûn û li dijî rojava şer dikirin. Hêrîş Kobanê dikirin.

Armanca di temenê hêrîşên li Kobanê ên ku zêdebûn di 2´yê û 3´yê kewçêra 2014´an de ku zêdebûn, bi vê armanca rejima tirk a avakirina herêmek tampon di filîyetê de ve girêdayî bû. Li gor hasabên rayadarên tirk, dema ku Kobanê ket,wê temenek bo afirandina herême tampon li ber sînor wê biafirîya. Bo vê yekê, hêrîş zêdetir dikirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku di cejna ramazana 2014´an, bi DAÎŞ´îyan dabûbûn bawer kirin ku wê Kobanê bixin. Bo vê yekê hefteya pêşî ya berî cejna ramazanê, pêleka hêrîşan a bi şitt li ser kobanê ji aliyê DAÎŞ´ê ve bi alikarîya tirkiyê di wê demê destpêkiribû. Heta ku DAÎŞ´îyan digotin ku "emê mêja cejna ramazanê li Kobanê bikin." BI vê rengê, bawer dikirin, ku wê KObanê bixin. Lê çi kirin û nekirin, nekarîn ku Kobanê bixin. Piştî cejnê, êdî weke ku hêvîya wan şikeşt. Piştî cejna ramazanê jî, hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ne sekinî û domîya. Lê di her dema ku hêrîş dikirin de jî, bi dehn windahî didan û bi şûn ve diçûn. Lê dewletên weke tirkiya, ji wan dixwest ku Kobanê bê xistin. Piştî ku dem nêzîkî cejna kobanê dibû jî, êdî dîsa asta hêrîşan zêde dikirin. Heta ku hin dordorên rayadarên tirk, dîsa bi gotinî bi zanebûnî di dapalênin li çapameniyê û dibêjin ku "wê kobanê heta çarşemê bikeve." Roja çarşemê jî, rojek duroj berî cejna korbanê a 2014´an bû. Yanî,, di vê demê de di rojên berî cejna korbanê de zêdekirina hêrîşên li ser kobanê, bi armanca, tişta ku di cejna berî wê de di cejna ramazanê de dixwestin ku bikin û nekirin, dixwestin ku di vê cejna korbanê de bikin. Ew tişt jî, xistina kobanê bû. Bo vê yekê jî, pêlên hêrîşê li ser Kobanê zêde kiribûn. BI teybetî, di rojên 2 û 3´yên kewçêra 2014´an de ew asta hêrîşan pirr zêde bû. Heta ku weke ku tê gotin jî di nava xalkê Kobanê de û ku rojnemavan jî dema ku ji KObanê bi telefonê tên girêdan li telewîsyonê dibêjin, "hêrîş gihiştibûbûna asta xwe ya herî bilind li ser kobanê.". Bi wê re, xalk û rojnemevanan, car bi car di ragihandina xwe ya tv´yê de dihanîn ser ziman ku Kobanê ji hemû aliyên ve hatîya dorpêçkirin û ji hemû aliyan ve hêrîş lê dibin." Serokê kantona Kobanê Enwer Mislim û Serokê meclisa Kobanê Ayşa Efendî bi telefonê di derengîya şeva 2´yê kewçêra 2014´an de, bi telefonê di telewîsyona "ronahî TV" de hanîn ser ziman û ragihand ku ji her aliyê ve hêrîş li wan hena û dixwezin ku bikevina nava bajêr de û komkujiyê werênina serê gel." Bi wê re Enwer Mislim, tevlî bernemeya tv´yê ya zindî bû bi telefonê a "ronahî tv´" û hanî ser ziman ku "çete, ji ber ku gelê Kobanê li ber wan berxwedanak mazin û dîrokî dan nîşandin, dixwezin ku bikevina kobanê û bi komkujiyên ku bikin tola wê berxwedanê ji gelê kobanê hildin."

Ev dem û roj, bo gelê kurd û bi teybetî bo xalkê Kobanê, dem û rojên pirr zor û dîrokî bûn. Di wan rojan de xew ne diket çavê ti kurdî de. Herkesek, bi berxwedana kurdan a Kobanê re dirazaha û dirabû. Bi vê rengî, deronîyek wusa afirîbû ku xewê ti kesekî ne digirt. Dilê her kurdî bi Kobanê re diavêt. LI Kobanê jî, cih bi cih, bi dîmenên vîdîyayan ku hatina kişandin, di tv´yan de dihatina weşandin. Di wan dîmenan de, azman di derengîya şevê de bi rohnîya fişekan rohnî dibû. Dengê çekan azman diqatand. Dema ku mirovan di tv´yan de ew dîmen temaşa dikir, weke ku filmekî aksîyonê tamaşa bike lê dihat. Her kêlîk, bi berxwedanê re di buhurî. Şer û roj, berxwedan hebû. keç û kurên kurd, di çeperan de berxwedanak dîrokî didan nîşandin. Ew berxwedan, di mejiyê her kurdî de bû. Kurdên ku li kurdistanê dijîn li ser lingan bûn. Lê kurdên ku li welatên ewropî jî bûn, li ser lingan bûn. Kobanê û navê ´kobanê´ bûbû bû hizreka tekena û

yekana a mejîyan de. Bi wê re herkesek bi mejiyê xwe re li Kobanê dihizirî. Dilê herkesekî li Kobanê diavêt. Kobanê, bi vê rengî hemû kurd ku li kûderê bin, di hizrekê de kiribû yek û ew li dora kobanê û navê kobanê rakiribû serpîyan. ´Kobanê, stalîngrada kurdan´ bû.

Her wusa, ji aliyê sîyesî ve jî, dema ku em li Kobanê û hêrîşên li ser wê û berxwedana gelê kurd a li wê ku lê dihizirin, em dibînin ku kobanê bû girêkek mazin a kurdistanî. Ev bûna weke girêkê a kobanê, hem bo hemû kurdan wusa bû hem jî bo hêzên ku li dijî kurdan şer dikin wusa bû. Li kobanê, êdî rewş hat wê astê ku serkevtina li Kobanê wê çareserkirina pirsgirêka kurd jî bi xwe re bihanîya. Her wusa, gelek dordoran jî, ev hizir êdî dihanî ser ziman. Lê berevajî vê jî, hinekan jî digotin ku dema ku kobanê ket wê derbeyek li wan hewldanên çareserkirina pirsgirêka kurd jî bikeve. Di vê temenê de, kobanê û berxwedana wê, bûbû weke girêkek ji herdû aliyan ve. Aliyên ku ne dixwestin ku pirsgirêka kurd were çareserkirin, bi hemû hêza xwe hêrîşî Kobanê dikirin. Lê hêzên ku dixwezin pirsgirêka kurd, were çareserkirin jî, alikarî û piştgirî didane berxwedana kobanê a bi rûmet. Berxwedana kobanê, êdî bo hemû kurdan, rûmet bû. Kurdan jî, ji xwe di nava xwe de navê ku li berxwedana kobanê kiribûn, ew bû ku "berxwedana rûmetê." Piştî ku roj bi ser berxwedana kobanê ve buhurt in, êdî kurdan li şûna gotina "berxwedana kobanê" hemû dordoran gotina "berxwedana rûmetê" dihanîn ser ziman. Gotina, berxwedana rûmetê, navê berxwedana kobanê bû. ew berxwedan, êdî bi vî rengî dihat bi nav kirin. Êdî berxwedan, hatibû wê astê di mejiyê kurdan û herkesekî de, ku kurdan li wir derbeyek jî xwariban û çeteyên DAÎŞ´ê ketiban kobanê de jî, ew dîrok hatibû nivîsandin. Ew dîroka berxwedana kobanê, bi awayekî û hêsteka pirr zêde mazin di mejîyan de bicih bûbû. Dîrok, li kobanê bi berxwedanê hatibû nivîsandin. Weke ku di nava kurdan de û di nava gelek milletên din ên navnetewî de jî dihat bi navkirin, ´kobanê, stalîngrada kurdan a´ bû. Gotina, ´kobanê, stalîngrada kurdan a´, dihat ser ziman. BI vê re jî, berxwedana kobanê, rûpelekî nû û demek û serdemek nû ya dîrokî di mejiyê her kurdî de da vekirin. Weke ku di temenê zayinî de tê gotin "berî zayîna îsa" û "piştî zayina Îsa" bi vî rengî ji hevdû cudabûna dihê kirin, bi heman rengî, bo kurdan jî, êdî ´berî berxwedana kobanê´ hebû û ´piştî berxwedana kobanê´ hebû.

**Bi berxwedana Kobanê re, divê ku mirov rengê helwesta ´koalîsyona navnetewî a li dijî DAÎŞ´ê hatî avakirin werêne ser ziman.** Lê berî wê divê ku ez bibêjim ku hikimeta herêma başûrê kurdistanê di destpêka pêla hêrîşên li ser kobanê a ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, ragihandibû ku "derfet tûna ya ku em peşmergeyan bişênina kobanê bo alikariyê." Ev helwesta kurdên başûr, di serî de Mesud berzanî ragihand, bo sedema pirr rexneyên ji civate kurd jî li wê. Bi gelek cûreyan dikarîn alikariyê bikin. Lê tevî wê jî, YPG´, YPJ´ê û HPG´ê li başûrê kurdistanê bi peşmergeyan re di nava berxwedanê de bûn li dijî DAÎŞ´ê. Bi hevdû re oparasyon lî li dardixistin li dijî DAÎŞ´ê bo ku herêmên kurdan ji çeteyên DAÎŞ´ê paqij bikin û rizgar bikin. Ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, rêveberîya a başûrê kurdistanê û hikimeta wê, azmûnaka baş di vê demê de li ber kurdan neda. Berpirsîyarîyên civatî ku ji wê dihatina hêvîkirin ji aliyê rayagişt a civate kurd ve, ne hanî li cih. Di temenê qatkirina kurdistanê de tevdigerîya. Bi gotinaka din, li gorî politikayên rejimên herêmê ên weke tirkiya ku kurdistan di nava wan de hatî qatkirin tevdigerîya.

Piştî ku berxwedana li Kobanê destpêkir û pê de, kurd hemû rabûna ser pîyan.. Li hemû deverên cihanê xwepêşandin, çalakiyên girêvên birçîbûnê û rûniştinê û hwd, bi hevdû re hatina kirin. Armanc bi van çalakaiyan re ew bû ku berpirsîyarîtîya hêzên navnetewî bi wan bê bîrhanîn û ew jî alikarîyê bidina kurdan di wê berxwedana kurdan a li ijî DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkiya hêrîşî kurdan dikir. Her wusa, ji dema ku DAÎŞ´ê bi dest, hêrîşê li herêmên kurdan kirin û pê de, hin dewletên ewropî ên weke firansa û almanya û hwd gotin ku "emê alîkarîya çekdarî bidina kurdan. Lê ev alîkarî jî, dîsa li astangîya tirkiya alîqî. Tirkiya ne dixwest ku alikarîya çekdarî ji kurdan re herê. Bo vê yekê, tirkiya weke dewlet, di asta bilind de li navendên van welatan dîplomasî kir û dijberîya xwe ji wê alîkarîya dihat gotin ku wê bê dayîn re hanî ser ziman. Heta ku wezîrê karê dervê ê tirkiya Mewlût Çavûşoglu derket berçapamniyê û vekirî got ku "em helwesta xwe hanîya ser ziman û ji wan xwestîya ku alikarîya çekî nedina kurdan." Lê tevî vê jî, çend ku ti alikarîya çekî ji rojavayê kurdistanê û bi teybetî ji hêzên ku li ber hêrîşên DAÎŞ´ê li ber xwe didin ên weke YPG`ê û YPJ´ê  û hwd re neçû. Piştre, hat ser ziman ku ji hikimeta başûrê kurdistanê, hin alikarîya çekî çûya. Lê ew alîkarîya çekî ya ku ji başûr re çû jî, rastî dij-helwesta rejima tirk û rayadarên wê hatibû. Cemil Çîçek, di gera xwe ya di 27´ê êlûna 2014´an a li Awostorya vekirî hanî ser ziman, "ku wan weke dewlet nerazîya xwe li dijî şandina çekan li hikimeta kurd a başûr re hanî ya ser ziman."

Ev helwest û kirin û dîplomasîya tirkiya, bo wê yekê bû ku ew ancamanê bi hêrîşên DAÎŞ´ê li dijî kurdan bidest bixin. Li herêmên weke navçeya Musilê ên weke ´Rabîa" ku hêzên YPG´ê û pêşmergê bi hevdû re oparasyon li wir li dijî DAÎŞ´ê li dar dixistin, gelek çekên çeteyên DAÎŞ´îyan bidest xistin. Çekên ku bi dest xistibûn û di 2´yê kewçêra 2014´an de ji çapameniyê re jî dîmenên wan hatina ragihandin di çapamniyê de, di wan de dihat dîtin ku hemû çekên ku ji tirkiya çûbû bûn. Tirkiya, heta ku gelek tank û topên giran jî dabûbûn çeteyên DAÎŞ´ê. Di nava çekên ku hêzên YPGê´ê bi dest xistibûn de li rabîa ji destê çeteyan, tank û topên tirkiya ên ku malê NATO´ jî bûn hatibûn desteser kirin. Çend ku di çapameniyê re rayadarên tirk bi gotinî gotina "alîkarîyê ku didina DAÎŞ´ê" piştre herê ne dikirin jî, lê hemû birhan û nîşanakên ku derdiketina li holê didan nîşandin ku tirkiya alikarîyê didina DAÎŞ´ê. DAÎŞ´ê, bi wan alikariya ku distand ji tirkiya û hin welatên din, hêrîşî kurdan û Kobanê dikir. DAÎŞ´a ku li herêmên din derbeyê giran dixwar, piştre hemû hêzên xwe mobîlîze kiribû û herikandibû bi ser Kobanê de. Dixwestin ku kobanê bixin. **Xistina Kobanê**, bi teybetî bo tirkiya giring bû. Ji ber ku tirkiya, hê li dijî statûya kurd bû. Piştî ku pêla hêrîşên DAÎŞ´ê ji 15´ê êlûn 2014´an û pê de, rayadarên tirk jî bi rayadarên re hevdîtinê dikin û ji rayadarên dixwezin ku "bi rêveberîyên wan re hersê kanton werina feskirin û ji holê rakirin." Piştî ku hêrîşan li kobanê destpêkir, ku koalîsyona ku li dijî DAÎŞ´ê hatî avakirin ku ji tirkiya dixwest ku alikariyê bide  kurdan.. Rayadarên tirk jî, di wê demê de bi rayadarên kurd ên weke Salih mislim re hevdîtin dikin û ji wan dibjin, "ku win bi rêveberyîn wan re hersê kantonan fes bikin û tevlî muxalefet Sûrî bibin, emê alikariyê bidina we." Yanî, di berdêla feskirina kantonan bi rêveberîyên wan ên xweser de, digotin ku emê alikariyê bidina we. Gotina rayadarên tirk ev bû. Ji vê jî dihat fahm kirin ku hêrîşên DAÎŞ´ê û alikariya wê ya ji DAÎŞ´ê re bi armanca şikandina vîna kurdan a li rojava bû. Serokkomarê demê ê tirk T. Ardogan, li bendî ketina kobanê bû. Bo vê yekê, derdiket berçapameniyê û digot ku "kobanê ket, dikeve." Bi wê re jî, di temenê ku

hizirkirina de dihanî ser ziman ku ”piştî kobanê ket, wê dor were Hesekê û Afrînê” jî. Yanî, weke ku plan kirina ku di dawîya çeryreka pêşî a sedsala 21´ê de bi vî rengî plan çêkirina ku weke ku çawa ku bi paymana ´qasrîî-şêrîn´ kurdistan hat kirin du-qat û di konferanse Lozanê de hat kirin li çar-qat, dixwestin ku bi vî rengî di sala 2014´an de, ku ji Musilê û li ser şengalê re heta ku digihiştî herêmên rojavayê kurdistanê ên Kobanê, Hesekê û Afrînê û hwd, li ser axa kurdan,´dewletek sûnnî´ ava bikin û kurdistanê di vê serdemê de ji nû ve bikina qat û beşbikin û parvebikin. Bo vê yekê DAÎŞ´, weke planaka stretejîkî a sedsale 21´ê ku bi wê dihat xwestin ku derbe li kurdan were xistin bû. Li herêmê li rojhilat, rejimên ku piştî şerê cihanê ê duyemin ku hatina avakirin û kurdistan di nava wan hatîya qatkirin li çaran, li piştî DAÎŞ´ê disekinin. Bi pêlên hêrîşan ên li ser Kobanê re dixwestin ku pêşî Kobanê bixin û piştre jî Hesekê û Afrînê jî bixin.Bi vê re, êdî weke ku kurdan jî bi nav dikir û dihanî ser ziman, ku dixwestin ku şoreşa rojava têkbibin, bişikênin û ji holê **ra bikin**. Ji ber ku tirkiya, li dijî statûya kurdan bû û ne dixwest ku li rojavaya kurdistanê rêveberîyek kurdî were ava kirin. Di destpêka şoreşa û vir de, yanî ji 19´ê temûza 2012´an ve, ew hêrîşên li ser rojavayê kurdistanê ên bi destê çeteyên ku tirkiya alikariyê dide wan, ji ser rojava û Kobanê kêm nebûna. Lê di demên ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, asta va hêrîşan bi tank û topan gihişt astaka herî bilind li ser serê kurdan.

Berxwedana li Kobanê a kurdistanîyan, li berçavê cihanê hemûyan dibû. Ew çeteyên DAÎŞ´ê ku li herêmên din ên cihanê di bin navê olê de şer dikirin û ku ti kesekî xwe li ber wan ne digirt, li ber kurdan têk diçûn. Ya ku bale dunyê hemûyî dihanî li ser wê jî ev bû. Ji aliyê din ve jî çeteyên DAÎŞ´ê bi çekên giran û teknîkeka pirr zêde ku bi dest xistibûn, hêrîş dikirin. Lê di destê kurdan de, çekên wusa giran nebûn. Tevî wê jî, ew berxwedana dîrokî hat dayîn nîşandin. Ev jî, weke aliyekî din ê vê berxwedanê ê teybet, ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Di wê navberê de, hêzên navnetewî, yanî ew koalîsyona navnetewî a ku li dijî DAÎŞ´ê hatibû avakirin, piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşî şengalê û deverên din ên başûrê kurdistanê kiribûn hin deverên DAÎŞ´îyan bombardiman kiribûn ji azmana ve. Her wusa, li dora Musilê jî, ew bombardoman hatibû kirin. Ji xwe piştî van bombardomanan, çeteyên DAÎŞ´ê herîkîbûbûna li rojavayê kurdistanê û li wir hêrîşên xwe li ser herêmên rojava ên weke serêkahniyê û kobanê zêdetir kiribûn. Di van herêman de, piştî 15´ê êlûna 2014´an û pê de, pêleka pirr zêde mazin a hêrîşan van çeteyan bi hevdû re dane destpêkirin li ser Kobanê. Piştî ku ev pêla hêrîşan bi vî rengî destpêkir û pê de, li her deverê cihanê kurd jî rabûna ser pîyan û ketina nava li darxistina çalakiyan de. Piştî van çalakiyan re koalîsyona navnetewî a ku li dijî DAÎŞ´ê hatî avakirin, hin herêmên Sûrî ku dihat gotin ku çeperên DAÎŞ´ê li wan hena hatina bombabaran kirin ji anzmana ve ji aliyê vê koalisyonê ve. Lê tevî wê jî, wê bombardimanê ti bandûr li wan hêrîşên DAÎŞ´ê ên li ser Kobanê ne dikir. Heta ku ji herêmê nûçe û radigihandinên ku dihatina kirin, di wan de dihat gotin ku herêmên ku dûrî Kobanê na û çeteyên DAÎŞ´ê ew vala kirina hatina bombardiman kirin. Bi vê yekê re, êdî weke demekê ket rojevê de ku balafirên azmanî ên koalîsyonê bi bombardimanên ku kirina ti bandûr li hêrîşa çeteyan ne kirîya.

Kurdan jî di wê navberê de li her derê çalakiyên piştgirîyê bo kobanê dikirin. Kurd, li her derê li ser lingan bûn. Kurdan, dixwestin ku bo kurd xwe biparêzên alikarîya çekî jî

ji YPG`ê û YPJ´ê re were kirin, dakû parastin û berxwedana ku dike li dijî çeteyên DAÎŞ´ê xorttir bibe. Kurdistaniyên Kobanî, li kobanê ji her çar aliyên xwe ve hatibûbûna dorpêçkirin. Her ku diçû jî bi alikarîya tirkiya ew dorpêçkirin dihat jidandin jî. Bêgûman, ku alîkarîya çekî û hwd, ji kurdistanîyên rojava re çûba ba, wê rewş cudatir ba. Ya ku ew berxwedan zortir dikir, ew ne dayîna alikariyê jî bû. Bi derfet û îmkanên pirr zor ew berxwedan dihat pêşxistin. Ew berxwedan, temenê wê li ser fedekarîya mirov bû. Çendî ku mirov dikarî fedekarîyê bike, temenê wê berxwedanê jî mazintir dibû. Yanî, bi vîna mirov ew berxwedan dibû. Bo vê yekê, piştî ku ew berxwedana li Kobanê bi vê rengê mazin bû û doma, êdî gelek gotin û nîqaş li ser ”vîna mirov a ku li ber teknîkê ku dikarê biserkeve”, hatin kirin. Bi rastî jî, bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku berxwedanaka ku bi tememî li ser vîna mirov bû hat dayîn. Ya ku herî zêde, wateya wê berxwedanê mazintir dikir jî ev rastî bû. Bi vê yekê ve girêdayî, dîsa divê ku mirov bibêje ku ti kesekî bawer ne dikir ku li ber wê teknîka pêşketî ew berxwedana mazin dihê dayîn. Heta ku gelek çapameniyên arabî ku weke ku alikarî didane çeteyên DAÎŞ´ê jî radighandin ku ”kobanê ketîya”. Lê ev nûçe ne rast bûn. Tenê ev nûçe, bi armanca şerê deronî hem li ser raya xwe ya giştî û hem jî li ser rayagiştî a cihanê ku bikin dihanîn ser ziman. Berxwedana Kobanê, herkesek dikir şeklekî de. Bo rejimên herêmê giringîya xistina Kobanê ew bû ku wê derbeyek li kurdan hatiba xistin bû û wê pêvajoya li bakûrê kurdistanê ku birêz Ocalan dayî destpêkirin jî wê têkçûba ba. Dorpêçkirina kobanê, weke dorpêçkirina hemû destkevtiyên kurdan bû. Bo kurdan jî, kobanê bûbû bû keleha berxwedanê. Kurdan jî, di vê temenê de di temenê mayîn û nemanê de lê dinerin û di kobanê de û di berxwedana kobanê de li berxwe didan. Berxwedana kobanê, weke ku kurdan di nava xwe de bi nav dikir ”berxwedana rûmetê”, êdî dîrok bû. Ew dîroka ku dihat nivîsandin bû. Ji vê nûqtê û pê de, ku kobanê ketiba jî, wê êdî ew dîrok û ew dîroka berxwedanê ne hatiba ji holê rakirin, wilqasî êdî di mejiyan de cih **girtibû**.

**Li ser nûçeyên ku di dema berxwedana Kobanê de ku dihatin çêkirin de û di wan de dihat gotin ku ´DAÎŞ´, ketîya navenda kobanê de.´, divê ku mirov bi armanca xistina kobanê ve girîdayî şîrove bikin.** Di dema ku li Kobanê berxwedan dibû de, nûçeyên ku hin çapameniyên ragihandinên arab, tirk û hwd belav dikirin, di wê demê de bûn ku di wan de digotin ku ´DAÎŞ´, ketîya kobanê de´. Heta ku bo sîîyesetmederên kurd ên ên weke Salih Muslim jî, digotin ku "xwe spartina rojava bo xwe parastinê.´ Ev nûçe, ji sê aliyan ve divê ku mirov li ser wan bisekinê. Aliyê pêşî ew bû ku dixwestin ku deronîya ketina kobanê bidina çêkirin û bi wê bandûrê di serî de li ser vîna kurdên ku li wir berxwedidan çê bikin. Ev armanca sereka û ya pêşî bû. Lê aliyê van nûçeyan ên bi ragihandina çapameniya arab ve jî, hebû. Ew jî, ew bû ku bo ku Andaman ji DAÎŞ´ê re bibînin û bişênina herêmên şer ku bi kurdan re şer bikin. Bo vê yekê, ew nûçe dihatina ragihandin. Aliyê sêyemin jî, her wusa ew bû ku di temenê politikayên rejimên herêmê de bû. Minaq, tirkiya dixwest ku herême tampon li ser axa rojavayê kurdistanê çê bike. Bo vê yekê, biqasî ku li ser çapameniyê re bo vê yekê manîpûlasyon dikir, wilqasî jî di têkiliyên xwe yên bi navendên rojava û di hemû dîplomasîya xwe ya ku dikir de, di vê temenê de bo ku alikariyekê bistêne bikardihanî.

Tirkiya kiribû serê xwe de, ku derbeyekê li kurdan bixe. Ji ber ku di temenê kiryarên leşkerî de di nava hewldanên çêkirina temen de bû. Bo vê yekê, ´destûrnamaya şerê´ ku

bo dagirkirina rojavayê kurdistanê di 3´yê kewçêrê a 2014´an de hanîbû meclîsê. Di vê temenê de, tirkiya pirr dixwest ku bi DAÎŞ´ê ancamakê bidest bixe. Bo ku wê derbeyek li kurdan bihata xistin û wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd a ku di vê demê de afirîya bihata ji holê rakirin. Ya ku tirkiya û rayadarên tirk, ketibûbûna derdê wê de jî, ev bû. Çend ku diçûn û birêz Ocalan re hevdîtin dikiin û digotin "em dixwezin ku pirsgirêkê çareser bikin" û bi wê re civîna hikimetê li dar dixistin û qaşo hin makanizmayên ´pêvajoyê´ birêz Ocalan hanîbûbûna ser ziman çê dikirin jî, dîsa ev hemû çerçoveya lîstika rayadarên dewletê bû. Zimanê rayadarên tirk di hevdîtina xwe ya bi birêz ocalan re bikardihanî û zimanê rayadarên tirk li derve bikardihanî û bi wê sîyeset dikir jî ji hevdû cuda bû. Ne yek bû. Her wusa, biheman rengî, li ser çapameniyê re heman cudahî di nava gotin û kiryarên rayadarên tirk de jî hebû. Di gotinê de digotin ku "em alikariyê Nadina DAÎŞ´ê,", lê di piretikê de ew alikarî dikirin û heta ku di nava cilên DAÎŞ´ê de leşkerên tirk ên teybet ji sînor di buhurîn û li Kobanê bi kurdan re şer dikirin. Di vê temenê de, sîyeseta vê demê a rejima tirk, li ser esasê şikandina bû. Û bo vê jî, serî li her rê û rêbaz û derewê dixistin.

Di vê temenê de bi hêrîşên ku bi DAÎŞ´ê re dikirin, çapamenî jî weke lingekî şikandina kurdan dihat bikarhanîn. Ji her demê zêdetirî nûçeyên bi derew çê dikirin û manîpûlasyon dikirin. Ji vê yekê, bi awayekî vekirî dihat fahm kirin ku kurd, li ser çapameniyê re bi "oparasyonên têgihê" ê bi rengê ´şrê deronî´ lê û li mejiyê kurd hêrîş dihat kirin. Bi wê re jî, di temenê "şikandina hêvîyan" de nûçe amede dikirin û belav dikirin. Di van waran de çapamenî, weke lingekî şerê bi kurdan re hatibû birêxistin kirin. Ji aliyê din ve jî, di çeperên şer de, hêrîş dibûn. Çeteyên ku berhevkirina, bi tevlîbûna leşkerên tirk ên teybet re bi hevdû re hêrîşî rojava û bi teybetî Kobanê dikirin. Ew mirovên ku ji welatên arab û ewropa tevlî DAÎŞ´ê hatibûbûna kirin, ji vê aliyê ve weke maskeyekê jî dihatin bikarhanîn. Ew maske jî, ew bû ku di bin wê maskeyê de leşkerên tirk ên teybet, cilên DAÎŞ´ê li wan dikirin û ji sînor derbas dikirin. Kurdên bakûrê kurdistanê, li ser sînor nobet digirtin ku çeteyên DAÎŞ´ê derbas nebin. Lê di aslê xwe de, ew çeteyên ku derbas dibûn, leşkerên tirk ên teybet bûn. Bi vî rengî, ew destûra ku rejima tirk bi fermî negirtî ku bikeve rojavayê kurdistanê de, bi rêyên bi vî rengî ên ne fermî bo xwe pêşxistibû û bi wan rêyan bi kurdan re şer dikir. DAÎŞ´ê çend ku weke çeteyeka ku bi kurdan re şer dikir, bi vî rengî weke maskeyekê jî bû, ji bi buhurîna leşkerên tirk ên teybet ji sînor û şerkirina wan bi kurdên rojava re.BI vê rengî, ew leşkerên tirk ku li bakûrê kurdistanê bi cilên leşkerên tirk bi kurdan re şer dikirin, li rojava jî bi cilên DAÎŞ´ê sînor derbas dikirin û bi kurdan re şer dikirin. DAÎŞ´, bo vê yekê jî, weke maskeyekê bû. Her wusa, weke maskeyekê dihat bikarhanîn. Dema ku demografîya mirovên ku weke çeteyên DAÎŞ´ê di bin navê DAÎŞ´ê de ku bikurdan re şer dikirin ku bi heta derxistin, wê biheta dîîtin ku pirranîya wan, ji tirkiya, tirkimenên sûrî, û herêmên din ên kafkasya û Îranê bûn. Ji welatên arab, çend arab û hwd hanîna ew jî, tenê dibû weke maskeyekê bo vê yekê jî.

Yanî, weke ku çawa di dema ku salên 1990´î de ku rejma tirk, bi navê "hizbileh" ku rêxistna hizbil-kontra" avakir û bi kurdan re da şerkirin û piştre digot ku "ev hizbileh a û hizbileh, bi destê Îranê hatîya birêxistin kirin" û bi wê re dixwestin ku wê "întibayê" çêbikin ku têkiliya wê hizbil-kontra´ya ku tirkiya avakirî ku bi hizbileha li Libnanê re, bi heman rengî rewşek bi DAÎŞ´ê re jî dihê li berçav. Piştre, hizbilehe li Libnanê, pêwîstî pê dîtibû ku ragihêne ku "ti têkilîya wan bi wê rêxistina bi navê hizbileha li

tirkiya re tûna ya" . Ev rewş, rengekî poliitka kirina şerê bi kurdan ê rejima tirk jî dihêne ser ziman. Di nava şer de, bi vî rengî, gelek caran nav hatina bikarhanîn. Piştre jî, li ser çapameniyê re bi ´întîbayên ku çê dikirin´ dixwestin ku wan navan bi deverna ve girêbidin. Her wusa, ev rengekî şerê deronî ê li ser çapamenyê re jî bû. Bi wê re, rengekî bikarhanîna olê li dijî kurdan dijî bû. Ev jî, rengekî bikarhanîna çapameniyê bû ku li dijî kurdan.

Di vê demê de, DAÎŞ´, çend ku destê gelek saloxgeriyên herêmê û dervî herêmê di wê de hebe jî, di vê temenê de weke rêxistinaka ´kontrayî´ hatîya bi rêxistin kirin a. Rêbazên ku ev Rêxistin di şerkirina bi kurdan re de û her wusa di ragihandina xwe ya li ser çapameniyê de sazîyê şer ên rejima tirk nîşan didin. Taktîkên şer ên ku DAÎŞ bi kardihênê jî, taktîkên ku rejima tirk piştî salên 1990´î û pê de ku bi kurdan re şer dikir û bikardihanî na. Ji van aliyan ve divê ku mirov biteybetî li ser vê rêxistina teybetî a şer bisekinê. Bo vê yekê, divê ku mirov bi teybetî, binxat bike û bibêje ku DAÎŞ´, taktîkên ´kontr-gerîlla´ bikardihêne. Ev taktîkên ku em bi DAÎŞ´ê û şerê wê yê bi kurdan re kifş dikin, me berê bi şerê sazîyên teybet ên şer ên rejima tirk re dîtibûn û kifşkiribûn. Lê bi hinekî guharandina van taktîkan re, em bikarhanîna wan bi destê DAÎŞ´ê û hwd dibînin. Ji van aliyan ve, dema ku em li vî şerê ku bi navê DAÎŞ´ê ku bi kurdan re dihê dayîn ku lê dinerin, em dibînin ku gelek nîşanakên bi vî rengî ên ku rejima tirk didina nîşandin hena. Ev aliyên şer, divê ku mirov bi teybetî li ser wan bisekinê. Ev alî hemû, dema ku werina ditin û kifşkirin, wê hingî bi kifşkirina armanca dayina şerkirina DAÎŞ´ê re mirov wê bigihijê gelek rastîyan. Helwesta çapameniya tirk jî, di vê temenê de pirr balkêş a. Bi teybetî, wê DAÎŞ´ çê bike, weke ku pêşî e dihêne ser ziman û piştre DAÎŞ wê dike. Weke ku li ser çapameniyê re fermmandarî ji çeteyên DAÎŞ´ê re dihê kirin, mirov rastî rewşeka teybet tê. Di nava gotinên ku çapameniya tirk û nivîskarên wê ên ku li ser DAÎŞ´ê dinivîsênin, weke ku rê şanî şerkirina DAÎŞ´ê bidin, dinivîsênin. Yanî, ew manîfestoya şerê DAÎŞ û bi kurdan re didina dîyar kirin. Ev rewş, hinekî navêndên ku şerê bi destê DAÎŞ´ê ku bi kurdan re dikirin û dimeşênin jî, didina dîyar kirin. Li vir, çapamenî, weke rengekî teybet di vî şerî de divê ku mirov li ser wê bisekinê. Di demên berê de ji salên 1990´î û pê de jî, şerê rejima tirk ê bi kurdan re em rastî rewşên bi vî rengî hatibûn. Lê di vê demê de, em vê rewşê zêdetirî dibînin û kifş dikin. Li vir, mirov kifş dike ku ji ragihandinê zêdetirî çapameniyê, rol û weynek bi rengê rêvebirina şer û koordîna kirina şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re mirov kifş dike.

Her wusa, bi wê re jî, çend ku ev bi hefteyan a ku kobanî berxwedanak dîrokî didina nîşandin, ragihandinên di derbarê wê de di temenê piçûk xistin û ankû ji nedîtî ve hatinê de na. Bi wê re, di gelek waran de berevajî kirina rastîyan jî bi nûçeyan dihê kirin. Bi vê rengê, mirov rastî rewşek teybet têt. Li kurdistanê, di vê temenê de, mirov dibînê ku çapamenî di erê vê demê û bi kurdan re û ankû ku li dijî civate kurd bigiştî dihê meşandin de rolek mazin dileyizê. Di vê demê de, rejimên herêmê kirina serê xwe de ku derbeyekê li kurdan û biteybetî li tevgera azadîya kurd bixin. Şerê vê bi rêbazên kontrayî dihê kirin bi kurdan re. Herkesek jî dizanê ku wê desthilatek weke bi rengê ku DAÎŞ lê dihizirê wê newê avakirin. Ji xwe, DAÎŞ´ jî, li vir bo avakirina rêveberîyekê şer nakê. Her cihê ku dikeviyê de tarûmar dike. Komkujiyên mazin dike. Bi wê re jî, herêmê weke ku ji mirovan paqij bike tevidgerihê. Armanc, bi teybetî, herêmên kurdan bixûrîxanîn a. Hemû hêrîşên ku li herêmên kurdan dibin jî, di vê temenê de heta vê kêlîkê hatina kirin. Bi vî rengî, b xûrîxandinê, dixwezin ku temenê rêxistinî û statûya

kurdan ku afirîya ji holê rabikin. Yanî, ew şerekî bi kurdan re dikin. Her wusa, di berdewama hêrîşên DAÎŞ´ê de divê ku mirov li wan ´destûrnamaya şer´ û ankû ´tezkereya şer´ a ku hat hanîn li meclîsa tirk bihizirin û wê fahm bikin. Li ser vê temenê ku bi destê DAÎŞ´ê hatî xûrîxandin êdî bi vî rengî kontrolkirina bi leşkerî çê bikin. Destûrnameyên şer´ û ankû ´tezkereyên şer´ di temenê vê armancê de hatina derxistin. Ev destûrnama, armanca wan kurd û destkevtiyên kurdan in. Di serî de, divê ku mirov bi ´tezkereyên şer´ re vê yekê bi teybetî kifş bike û werêne ser ziman. Bi vir ve girêdayî divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan re hatîya hizirîn ku bi tememî rêxistinîya civate kurd were ji holê rakirin. Hêrîş, li hebûna civate kurd û hewldanên xwe bixwe rêvebirina wê na. Nîşanaka wê jî, ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê re, di çerçoveya konsept û stretejîyeka giştî de dihên bi ser kurdan re, ew in ku di dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li Kobanê dihê zêdetirkirin de, ´tezkereya şer´ ji dihê hanîn li meclî ku bi buhurênin û û bi wê re di vê dema ku hebûna civate kurd bigiştî hatî xistin bin hêrîşan de dedgeha rêvebirinê aa sêyemin, biryara betalkirina pergale hevserokatîyê a civae kurd di nava xwe de pêş xistî dide. Ev pêşketin, hemû jî bi hevdû e girêdayî na.Ji xwe, hêrîşên li kobanê û bigiştî li rojava, biarmanca şikandina kurdan û ji holêrakirina wê rêveberîya wan ya xweser ku wan bidestê xwe avakiribûn a. Rengê rêveberîyêên kantonên rojavayê kurdistanê hersêyan jî, di temen û rengê ´**hevserokatîyê**´ de na. Di rojên ku piştî pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ên ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de, li bakûrê kurdistanê sazîyên dadgehê ên tirk biryara ”betalkirina hevserokatîyê” didin. Di wan rojên ku biryara betalkirina hevserokatîyê li bakûrê didin jî, rayadarên tirk bi rayadarên kurd ên weke Salih mislim re hevdîtinê çê dikin û ji wan re dibêjin, ”ku win kantonan bi rêveberîyên wan re fes bikin, emê alikariyê bidina we.”

.. **Li vir, divê ku mirov valakirina gundên sersînor ên weke atmanikê hilde li dest û bi wê re helwesta rayadarên tirk a li dijî kurdan jî bi wê re fahm bike**. Piştî ku berxwedana Kobanê destpêkir, Ji bajarên bakûrê kurdistanê ên weke wanê, amedê, cizîrê, Nisêbînê, Agirî, Mûsê, Bedlîsê û hwd, bi hezaran kurd herîkîna bersînorê di nava Pîrsûsê û Kobanê de. Lê ku mirov bibêje ku kurdistanî, li kurdistanê hemû rabûna serpîyan. Hemû bajarên kurdan rabûbûna ser pîyan. Kurdistanîyên dervî welêt jî, li her deverê li ser pîyan bûn û di nava çalakiyan de bûn. Herêmên weke Pîrsûsê herêmên ku diketina sînorê Kobanê de. Rejima tirk, alikarîya wê ji çeteyên DAÎŞ´ê re hebû. Rejima tirk, dixwest ku Kobanê bikeve. Bo vê yekê, her alikarî dide DAÎŞ´ê. Di çerçoveya vê alikarîyê de rejima tirk, li bersînor, nexwest ku kurd li ser sînor kom bibin. Boo vê yekê, gundên weke ´atmanikê´ ku li ser sînorbûn û diketina dahma navenda kobanê de, kurd lê kom bûbûbûn bo ku alikarîyê û piştgirîyê bidina kobanê. Rayadarên tirk jî, bo ku pêşîya li gûndên sînor ên weke ´atmanikê´ kombûn nebê jî, hêzên polis û leşker bi hevdû re didan hêrîşkirin li ser kurdên ku li ser sînor dicivîyan. Gundên weke ´atmanikê´ gundên stretejikî bûn. Ji destpêka berxwedana kobanê ve, yanî ji 15´ê êlûna 2014´an ve li wir kurd dicivîyan. Ne dihiştin ku çeteyên DAÎŞ´î ji wir bi buhurin û hêrîşî kobanê bikin. Vê rewşê di serî de rayadarên tirk aciz kir. Bo vê yekê, rayadarên tirk, ketina nava hewldanên valakirina vê herêmê de. ..

Çendî ku hêzên dewletê hêrîşî kurdên ku li ser sînor civîyan kirin jî, ancam bidest nexistin. Piştre, weke rêbazaka din, hemû rêyên ku diçûna Pîrsûsê û gundên wê hatina

girtin û ne dihiştin ku kurdistanî xwe bigihênina ser sînor. Piştî ku hat dîtin ku ev rêbaz jî kêrî tiştekî nayê, piştre rayadarên tirk li rêyên din gerîyan. Piştre, ji 3´yê kewçerê û pê de, dem bi dem bidest ragihandinê kirin ku ev herêmên bersînor, hatina kirin weke "herêmên leşkerî." Di vê çerçoveyê de, êdî bidest hêrîşî kurdistanîyên ku li ser sînor dicivîyan. Dixwestin ku kurdan ji vê herêmê bidina dûrkirin Dixwestin ku hemû sivîlan ji wir derxin. Ev rewş, wê Piştre bi hêrîşên hêzên dewletê re bidomê. Lê piştre, dema ku rayadarên dewletê, ditin ku wê nikaribin bi vî rengî jî sivîlên kurdistanî ji ser sînorê gundên weke atmanikê ên Pîrsûsê dûr bikin, êdî serî li rêbazna din dan. Piştre, ji 5´ û 6´ê kewçêrê û pê ve, weke ku DAÎŞ´ diavêje, top hatina avêtin li gundên weke atmanikê. Ev jî, bo ku hêncetên valakirinê çê bikin bû. Piştre jî, ev yek, hat ditin. Piştî ku çend top avêtina gundên weke atmanikê û gundên dîn ên sînor û hwd, piştre bi hênceta "ewlakarîyê" gundê atmanikê jî di nav de, wê çend gundên din ên li ser sînor wê werina vala kirin. Di 6´ê kewçêrê a 2014´an de, bi hênceta ´ewlekarîyê´ hemû gundîyên gundê atmanikê û gundên din hatina derxistin ji gundan. Malbatên ku isrerkirin ku naxwestin ku derkevin ji gundên xwe, rastî hêrîş û mudahaleya hêzên dewletê hatin.

Ev rewş, heta nîvroja 6´ê kewçêrê domîya. Lê ji nîvroja 6´ê kewçêrê û pê ve, piştî ku ev gundên weke atmanikê ji sivîlan hatina valakirin, danê êvarî û pê de, rayadarên tirk gelek DAÎŞ´ê bi tank û topên wan re hanîna gundê atmanikê û ji wir ew dane hêrîşkirin li navende Kobanê. Bi vê re jî, ji demên berêvarî û pê de êdî hêrîşên li navenda Kobanê hatina zêdetirkirin. Heta wê demê û kêlîkê, çeteyên DAÎŞ´ê ji rojava, başûr rojhilatê kobanê ve bi hêzêek mazin û hêrîşên mazin bênavber hêrîşî kobanê dikirin. Dixwestin ku bikevina nava kobanê de. Lê piştî ku rayadarên tirk gundên weke atmanikê jî ji sivîlan vala kir û çeteyên DAÎŞ´ê hanîn wir ku ji wir ve jî ku ji wir hêrîşî Kobanê bikin û pê de, êdî ji çar aliyan ve çeteyên DAÎŞ´ê bidest hêrîşî kobanê kirin. Piştî ku bi alikariya leşkerên tirk, gundê sînor ê weke atmanikê jî hatina valakirin, êdî weke ku anîyeka din li kobanê hatibû vekirin. Weke ku anîyeka din ya şer li KObanê zêde bûbû. Ev rewş, wê êdî bike ku hêrîş li kobanê werina zêdetir kirin. Piştî vê re, çeteyan ji hemû aliyan ve giranî dane hêrîşkirinê ku bikevina nava kobanê de. Piştî vê rewşê re êdî nûçeyên ku ji navenda Kobanê dihatin ku çeteyên DAÎŞ´ê giranî dane şer bo ku bikevina Kobanê de. Her wusa, di wê navberê de li Kobanê û navenda jî, bi deh hezaran sivîl hebûn.

Bi wê re jî, jîyane bi hezaran sivîlan diket bin telûkeyê de. Ji xwe, bi wê re êdî nûçeyên bi rengê "nûçeyên lezgîn" dihatin ku "jîyane sivîlên li Kobanê di telûkeyê de ya. Li ser van nûçeyên bi awayê "nûçeyên lezgîn", êdî bi hezaran kurdistanî ji navendên weke Pîrsûsê û Serûçê ketina nava meşê de ku herina bersînor. Piştî ku ew sîvil ji wan gundên sînor hatibûbûna derxistin û gundî jî ji gundên wan hatibûbûna derxistin û pê de, êdî nîyeta Dewletê jî hatibû ditin. Piştî ku Ji gundên Atmanikê hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê piştî valakirina wê ji sivîlan destpêkir û pê de, êdî ew nîyeta wê hatibû fahm kirin. Rayadarên dewletê dixwestin ku gundê atmanikê ku weke devereka strejikî bû û ku diket dahma navenda Kobanê de, dixwestin ku ji sivîlan vala bikin û ji wir ve jî çeteyan li Kobanê bidina şerkirin bo xistina wê. Ev armanca rayadarên dewletê û hêrîşkirinên wan ên li kurdistanîyên ku dicivîyan li ser wan sînoran ev bû. Di roja 6´ê kewçêrê a 2014´an de berî nîvro gundê atmanikê jî di nav de, ew herêmên sînor ji sînor bi hênceta ´ewlakarî´ û ku "êdî herêmek leşkerî ya" û pê de, hatibûbûna vala kirin. Lê

rayadarên dewletê jî, ne hiştibûn ku zêde dem bi ser ve herê. Yanî, di kêlîk û seatên piştî nîvro de nûçeyên ku "çeteyên DAÎŞ´ê ji gundê atmanikê li navenda kobanê bidest hêrîşê kirina dihatin. Ev rewş, êdî rewşek nû bû.

Rayadarên tirk, dixwestin ku Kobanê bi destê DAÎŞ´ê were xistin. Bo vê yekê jî, alîkarîyaka pirr-alî didane wan. Heta ku bi sedan leşkerên teybet ên tirk jî, di nava cilên DAÎŞ´ê de diketina çeperên DAÎŞ´ê de û bi DAÎŞ´îyan re hêrîşî kobanê dikirin. Bo ku Kobanê bixin hêrîş dikirin. Bo vê yekê, DAÎŞ, bûbû weke maskeyekê ku leşkerên tirk ji sînor dibuhurîn ku bi kurdên rojava re şer bikin. Piştî ku ji dijberîya Rûsya û Çînê, ku biryar ji Neteweyên Yekbûyî derneketibû ku ew êdî mudalale li Sûrî were kirin û pê de, êdî DAÎŞ´ê û hwd hatibû pêşxistin û di bin ban û navê wê de di buhurîna Sûrî û hêrîşî kurdan dikirin. DAÎŞ´, weke planaka rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin bû ku bi wê dixwestin ku derbeyê li kurdan bixin û bi wê temenê bidestxistina statûyek mihteme a kurd werê ji holê rakirin. Di vê roja 6´ê kewçêrê û pê de, êdî nûçeyên ku dihatin di wan de dihat gotin ku "şer di nava bajêr de dibû." Yanî, anîya çaremin a ku ji aliyê atmanikê ve ku hatibû vekirin, êdî bi wê re çeteyên DAÎŞ´ê weke ku di rewşa şer de serdestîyek bidest bixin ketibûbûna rewşekê de. Ev jî, bi alikarîya tirkiya bû. Lê li vir, nûçeyek din jî, ket ajansên nûçeyan de di 6´ê kewçêrê a 2014´an de. Ew jî, ew bû ku leşkerên tirk ên li ber sînor "çekên xwe di cih de hiştina û ravîna" Ev rewş, di dema ketina DAÎŞ´ê a li Musilê de me dîtibû. Yanî, ev rewşa ku leşker biravin û çekên xwe di cih de bihêlin ku DAÎŞ´ dest dênê ser ziman, bûya weke rewşeka ku bi wê DAÎŞ tê xortkirin û mazin kirin. .. **Kurdan jî, di her qadê de çalakî li dar dixistin ku êdî çek bên dayîn li wan ku xwe û herêmên xwe karibin ji hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê biparêzên. Bo vê yekê, kurd, li her derê rabûbûn li ser pîyan û di nava çalakiyê de bûn. Hêzên navnetewî, li ber wê yekê û vê xwesteka kurdan bêdeng bûn. Koalîsyona ku dihat gotin ku li dijî DAÎŞ´ê jî hatibû avakirin bêdeng bû. Alîkarî, ne dihat dayîn li kurdan. Yanî, bi awayekî vekirî, bi nedena alikariyê li kurdan, weke ku dixwestin ku komkujiyek mazin werê serê kurdan. Kurdan jî, ev wusa şîrove dikir. Di pîretîkê de jî, dema ku hêzek bi çekên giran were bi ser te de û di destê te de çekên giran ên weke wan çekên giran bo bersivdayînê nebin, ev tê wê wateyê ku dihê xwestin ku komkujiyek mazin were kirin. Rewşa kurdan jî, ev bû. Kurdan, li welatên ewropa, îstasyonên tv´yan, balefirgeh û parlaman dagir dikirin bo ku welatên ewropî alikariyê bidina kurdan bo xwe parastin. Di hemû çalakiyan de tenê, xwestekek kurdan hebû, ew jî ew bû ku weke alîkarî çek bên dayîn li kurdan ku karibin xwe biparêzên. Bêgûman, ku di destê kurdan de çekên xwe parastinê haban, wê kurdan ne hiştiban ku çeteyên DAÎŞ´ê nêzîkî herêmên Kobanê jî bibin. Lê ew çekên baş ên parastinê di destê şervanên kurd de nebûn. Ya ku ji hêrîşên DAÎŞ´ê re dibû temen ku bikevina herêmên Kobanê de ev bû.**

-- Li vir, divê ku mirov bibêje ku hêrîşên DAÎŞ´ê ji 15´ê êlûna 2014´an heta 6´ê kewçêrê a 2014´na bi awayekî pirr bişitt domîya. Di 6´ê kewçêrê a 2014´an de êdî rengê rengên Hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê, vegerîyabû şerê ku li nava bajêr dihat kirin. Lê kurd, bi hêrs jî bûn. Ji ber ku koalîsyona navnetewî ku dihat gotin li Dijî DAÎŞ´ê hatîya avakirin, tenê hêrîşên ku DAÎŞ´ê li kurdan dikir temaşa dikir. Alikarî ne didane kurdan. Tevî ku çeteyên DAÎŞ´ê bi teknîkek pêşketî a ku bi destxistibûn û çekên giran hêrîş dikirin jî, didestê şervanên kurd de tenê kilêş hebûn. Heta ku Salîh Mislim, di 5´ê kewçêrê a 2014´an de radigihand li çapameniyê ku "em dixwezin ku bi pereyên xwe jî

bikin çekan nadine me." Ev bi vî rengî, li dijî kurdan, helwestek hebû. Çend ku kurdan, ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de heta 6´ê kewçêrê a 2014´an, roj bi roj dihanîn ser ziman ku "şervanên kurd, pêwîstîya wan bi alîkarîya tekan heya bo ku karibin xwe biparêzên. Bo ku ew alîkarî ji kurdan re were kirin, li hemû welatên ewropa, kurd hemû li ser lingan in û çalakiyan li dar dixin. Tevî wê jî, bêdengî li ber kurdan domîya ya. Alîkarî ne hatîya dayîn li kurdan. Çend ku koalîsyona ku digot ku "li dijî DAÎŞ´ê hatibû avakirin"a jî, lê hêzekî weke hêzên kurd ên YPG´ê ku li dijî DAÎŞ´ê şer dikir, alîkarî bo parastina gelê kurd ne hat dayîn li wê. Yanî, ev di nava kurdan de bûbû temenê hêrsekê li dijî wê koalisyonê jî. Kurdan, li bakûrê kurdistanê "pêvajoyek" dabûbûn destpêkirin, lê bersiva ku dihat dayîn li wê ´pêvajoyê, weke ku kurdan jî êdî di nava xwe de dihanîn ser ziman, bi ´komploya duyemin a 15´ê sibatê hatibû bersivandin." Kurdan, bi vî rengî pêvajo şîrove dikir û bi nav dikir. Êdî pêvajo, bi vî rengî ketibû awa û rengekî din de.

Bi rastî jî kurd, weke rastî komploya duyemin a 15´ê sibatê hatibûbûn bû. Komploya yekemin a 15´ê sibatê jî, di sale 1999´an de bi dilgirtina rêberê gelê kurd birêz Ocalan re bûbû. Kurdan, her sal, di salwegera wê wê komployê de ew şermazar dikir. Î ro, weke ku bi heman rengî rastî komploya duyemin were lê hatibû. Di mejiyê xwe de wusa hîs dikir. Her wusa, kurdan, ev ´komploya duyemin a 15´ê sibatê ku bi hêrîşên li Kobanê re li kurdan dibûn, weke bersiveka rejimên herêmê û bi teybetî rejima tirk a ji pêvajoyê re jî bû. Pêvajo, di newroza 2013´an de bi xwandina nameya birêz ocalan re destpêkiribû. Lê ji wê demê û heta vê demê jî, tevî ku tevgera kurd bo ku pêvajo bi awayekî aşîtîyana pêşbikeve gelek gav avêştin. Lê dewletê ti gav neavêt. Hertimî, wê çawa mijul bike li rê û rêbazên wê gerîya. Yanî, wê kurdan û bi teybetî jî ´pêvajoyê´ çawa bênina wê dema ku êdî bikin ku li Kobanê derbeyekê li wan bixin, bo wê yekê hewldanên mijulkirinê didan nîşandin.

Di çerçoveyê de ku mirov ji kîjan aliyê ve em binerin, em dikarin weke komploya duyemin a 15´ê sibatê werênina ser ziman. Ji xwe ji ber ku kurdan jî,, bi vî rengî dît û hîs kir, êdî li her derê kurdistanî rabûna serpîyan û çalakiyan li dar dixin. Kurdistanî, vê rewşa ku weke 15´ê sibate duyemin bi nav dikin a bi kobanê re şermazar dikin. Wan hêrîşên li kobanê şermazar dikin. Ev rewşa bi hêrîşên li Kobanê, mirov dikarê weke bersiveka ji ´pêvajoya çareserîyê a li bakûrê kurdistanê re´ jî mirov werêne ser ziman. Ev 22 roj bûn ku berxwedana kobanê didomîya. Êdî cihê gotin gotinê ne dima. Cihê gotinê diqadîya û cihê kirinê bû. Di nava kurdan de, gotinek hebû, ew jî ew bû ku di gotin ku "li cihê ku cihê gotinê nema, cihê kirinê dest pê dike." Pêvajoya berxwedana Kobanê, di roja xwe ya 22´an de, di rewşeka bi vî rengî de didomî ya. Bi vê re jî, kî mirov û rojnemevanên ku ji kobanê radigihandin, di gotin ku "dema gotinê qadîya ya." Yanî, êdî pêwîst bû ku gavên pîretîkî bi hatan avêtin bo parastina kobanê û gelê kobanê. Kurda jî, weke ku çawa ku komploya pêşî a yekemin ya 15´ê sibatê qabûl nekirin û her timî şermazar kirin, ew rewşa ku weke ´komploya duyemin a 15´ê sibatê jî bi nav dikirin qabûl nedikirin û li dijî wê dadiketin qadan û çalaki li dardixistin û şermazar dikirin. Ji ber ku rejima tirk û rayadarên wê jî, bi DAÎŞ´ê re bûn û bi wê re tevdigerîyan, dema ku kurdan helwesta xwe bi çalakiyan li bajarên bakûrê kurdistanê dihanî ser ziman, wan jî hêrîşî kurdan û kurdistanîyan dikir.

Rayadarên tirk jî li şûna ku di ´pêvajoyê´ de gavan biavêjin û temenê aşîtîyekê biafirênin, pêvajo gav bi gav bo armancaka bi vî rengî ya di temenê hêrîşên li kurdan de bikarhanî bûn. Di vê temenê de diçûna bi ser kurdan de. Hemû pêvajo, bo vê

armancê bikarhanîbûn. Di vê pêvajoyê de, li şûna ku pirsgirêka kurd bihata çareserkirin û bo vê yekê gav biavêtan, li şûna wê plana xwe ya şer ya di temenê têkbirina kurdan de amede dikirin. Bo ku vê pêvajoyê, vegerênina ´pêvajoya 15´ê sibateka duyemin li ser serê kurdan´, di wê temenê kar û xabate xwe kirina. Bi hêrîşên Kobanê re ku hat hanîn li serê kurdan, mirov dikarê bi vî rengî şîrove bike û werêne ser ziman. Yanî, weke ku çawa ku kurdan jî bi nav dikir, 15´ê sibata duyemîn xwestibûn ku werênina serê kurdan. Ev komploya duyemin a 15´ê sibate jî, ew bû ku bi hêrîşên li kobanê re şoreşa rojava têkbibin a. Şoreşa rojava, ji kobanê destpêkiribû, bo vê yekê jî, xwestibûn ku ji wir destpê bikin û derbeyekê li kurdan bixin. Ev rewş bû, ku weke komploya duyemin a 15´ê sibatê û ku kurdan ew jî bi daketina qadan û çalakiyên xwer re şermazar **dikir. ..**

**..Bi berxwedana Kobanê re li bakûrê kurdistanê gelê kurd rabû serpîyan û serhildan kir, navê wê serhildanê jî ´serhildana kobanê´ bû.** Piştî ku berxwedana Kobanê bû û pê de, nîyete herkesekî jî hin bi hin derdiket li holê. Di serî de, hatibû ditin ku Tirkiya bi DAÎŞ´ê re hevkarîyek û levkirinek çêkiribû di temenê ku DAÎŞ´ kobanê bixe de. Di rojên ku berxwedana kobanê dibû de, raydarên Tirk ên weke T. Ardogan, derdiketina çapameniyê û di temenê bendewarîya xwe de hizrên xwe dihanîn ser ziman û digot ku «kobanê ket, dikeve» Bi vê gotinê, weke ku oparasyonekê têgihê li mejîyan bikin diaxiftin. Ev gotina "Kobanê ket, dikeve", gotina T. Ardogan bû. Lê wê bi wê re jî, T. Ardogan, di nava gotinên xwe de dihanî ser ziman ku Kobanê ket, wê bikeve û piştre jî wê rêz were Hesekê û Afrînê" jî. Bi vê re, di aslê xwe de plana ku çêkirina dihanî ser ziman. Di çerçoveya wê plana şikandina kobanê, Hesekê û Afrînê de diaxift. Ew plan jî, di wê temenê de bû ku ´wê DAÎŞ´ê hêrîşî **kobanê** bikira û piştre jî, wê berê xwe bida bi ser **Hesekê û Afrînê** de.´ Bi vê rengê, hasab û kîtab hatibûbûna kirin. Bi teybetî jî, ev hasabê rayaderên tirk bû ku kiribûn. Bo ku rojava û statûya wê were ji holê rakirin, ev yek weke pêwîstîyekê didîtin. Bo ku rojava û bi giştî jî şoreşa rojava têkbibin û ji holê ra bikin, ev yek weke pêwîstîtîyekê didîtin. Bo vê yekê tirkiya, alikarîyek mazin jî **dida** DAÎŞ´ê.

Bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku di serî de kantona Cizîrê a rojava, hanîbû rojevê ku ”korîdorek” li ser bakûrê kurdistanê re di bin çavdêrîya neteweyên yekbûyî de were vekirin, dakû ji wir hem alikarî hem ji xalkê kobanê re herê û hem jî hêzên parastinê ku karibin ji vir ve hatin û bi buhurina kobanê dabû alikariyê bidina YPG´ê û YPJ´ê. Lê tirkiya, ev jî, di destpêkê de, kiribû sedema bazariyê bi kurdan re. Ji kurdan re digot ku ”dema ku win kantonan bi rêveberîya wan re fes bikin, emê alikariyê bidina we.” Di vê temenê de ev hewldana xwestina vekirina ´korîdorekê´ jî, rayadarên tirk dixwestin ku weke bazariyekê bikarbênin. Yanî, ji aliyekî ve alikarî dida çeteyên DAÎŞ´ê ku hêrîşî rojava bikin. Di ber wan hêrîşan re jî, bi vî rengî bazarîyên li ser temenê ´bêstatûtîya kurdan´ re bi kurdan re dikir. Her wusa ketibû rojevê de ku rêveberî kurd a başûr jî, destûr ji xwestîya ku ew alikarîya leşkerî bişênina Kobanê. Lê ji wê jî, ti deng derneketibûn. Rayadarê neteweyên yekbûyî Staffan de Mîstûra jî dicvînek li avahîya neteweyên yekbûyî li darxistibû û ku di civînê de hanîbû ser ziman ku korîdorek were vekirin, dakû dilxwezên ku dixwezin herin û tevlî parastina kobanê bibin. Li ser vê rewşê jî, Heyetek ku rayadarên Emerikî avakiribûn çûbû bûn anqara ku li ser vê yekê biaxiftan. Bi heman rengî, serokê berpirsîyarîyên têkiliyên derve ê yekîtîya ewropa Catherîne Ashton, dihanî ser ziman ku ”divê ku em alikariyê bidina kobanê. Kobanê berxwedana şanî cihanê da”. Piştî van gotinan re, êdî kurd jî li bendê

bûn ku alikariyê bidin. Lê tirkiya, ne xwest ku wê bike. Tirkiya dixwest ku di temenê şikandina kurdan de ku pêvajo were pêşxistin. Yanî, ya ku dixwest ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê li ser kobanê, Hesekê û Afrînê re bidest bixe, dixwest ku bi alikarîya koalîsyonê êdî bike. Bo vê yekê, tirkiya, mijare kobanê û bi teybetî jî statûya rojava ku afirî bû, bi heyetên re bike mijare bazariyê.

Sînorê tirkiya ku leşkerên tirk "diparast", di wê re hertimî bêastengî çeteyên DAÎŞ´ê di u´buhurttin. Lê ji rojava û kobanê, mirovekî sivîl ê bîrindar destûr jê re ne dihat dayîn ku bi buhurê û werê hanîn bo dermankirinê. Li ber sînor û deriyê sînor, ji ber destûr ji wan re ne hatîya dayîn bo derbaskirinê bi dehan kurdên bîrîndar ji ber windakirina xwûnê jîyane xwe ji dest dane, tevî ku bîrînên wan giran jî bûn. Komên tendurîstiyê ku vîna xwe avabûna û dixwestin ku alikarî bidin, li pêşîya wan jî astengî ji aliyê rayadarên tirk ve dihat derxistin. Hêncetên weke "ji anqarê me bersiv ne hildaye", "em li bendî bersivê na.", "heta ku bersiv newê em nikarin destûrê bidin" û hwd, didan nîşandin.

Di rojên piştre ên berxwedanê de li bajarên bakûrê kurdistanê û ên tirkiya ên weke stambûlê jî, hinek çalakiyên weke xwepêşandinan jî, bo **´vekirina korîdorê´** li darxistibûn. Her wusa, ji Kobanê jî, hêzên parastina gel YPG´ê ragihand ku divê ku korîdor were vekirin. Bi wê re jî, di vê temenê de, tevgerînek di nava kurdan de jî bi çalaki û xwepêşandinî jî hebû. Lê rayadarên dewletê ku bi devkî têkiliya bi DAÎŞ´ê re red dikirin û di piretikê de di nava wê têkiliyê de bûn jî, ne dixwestin ku korîdor vebe. Ji ber ku dixwestin ku kobanê bikeve. Yanî, hêvîyeka xwe bi ketina kobanê ve girêda bûn. Gelê kurd, li her deverê di nava serhildanê de bûn bo kobanê û berwedana wê. Bi wan berxwedanan, dîrok dinivîsandin. ..

**Wusa** dihat ditin ku bi DAÎŞ´ê re rejimên herêmê ên weke rejima tirk, hasabna pirr mazin kiribûn. Bi teybetî, bo ku kurd werina şikandin û bêstatû hiştin, hasab û kîtab bi DAÎŞ´ê kiribûn. Ev jî, çendî ku berxwedana kobanê mazin dibû û bi wê re li giştîya kurdistanê belav dibû û civate kurd dirabû serhildanê, derdiket li holê. Serhildana kurdan a li kurdistanê, berxwedana li kobanê bihêz dikir. Civate kurd jî, bi berxwedana kobanê re, weke ku ketibû serdem û pêvejoyaka nû de. `pêvajoya ku birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê bo çareserkirina pirsgirêka kurd dabûbû destpêkirin, dixwestin ku bi vî rengî di temenê bêstatû hiştina kurdan de biancam bikin. Bo vê yekê bû ku dibistanên kurd ên ku kurdan bixwe divekirin mohr dikirin û digrtin. Bi wê re jî, kurdan bo pêşxistina jîyane xwe çi gav diavêtin, rastî astengiyên rejima tirk dihatin. Ev jî, ji ber vê yekê bû ku hasabê şikandina kurdan bi vî rengî kiribûn. Li kurdistanê, ev pêvajo, bi vî rengî pêşketibû. Li kurdistanê kurd, bi civatî rabûbûna ser pîyan. Kobanê û berxwedana kobanê, kurd li dora xwe gihandibû li hevdû. Bi vê yekê, êdî rabûbû serpîyan. Rabûbû serhildanê. Li hemû beşên kurdistanê, kurd li ser lingan bûn û di nava serhildanê de bûn. Vê yekê jî, bi kurdan re gelek hêstên netewî ên mazin diafirand bi wan re. Di aslê xwe de, kobanê û berxwedana kobanê, weke ku kurdan ji nû ve biafirêne, rewşek afirand. Êdî li kurdistanê, di nava civate kurd de, dema ku bahse kobanê û berxwedama kobanê dihat kirin, dihat gotin, ´berî berxwedana kobanê´ û ´piştî berxwedana kobanê´. Yanî, berxwedana kobanê, êdî weke zayînekê û ankû ´miladekê´ bû. ..

Berxwedana kobanê, giring bû. Bo kurdan, çendî ku ji aliyê gîyanî û keseyetîyê ve ew weke ku ji nû ve diafirandin, bi heman rengî ewçendî jî ji aliyê sîyesî ve hasabên ku li ser bêstatû hiştina kurdan ku hatibûbûna kirin berxwedana kobanê xira dikir. Kurdan, berî ku hêrîş li kobanê zêde bibin jî, dihanîna ser ziman ku "DAÎŞ´ê dixwezê ku pêşî

kobanê bixe û piştre Hesekê û Afrînê jî bixe û bidest bixe." Piştre, ev di temenê nîyet û bendewarîyan de, rayadarên tirk ên weke T. Ardogan jî, di nava gotinên xwe de dihanî ser ziman. Li bendî ketina kobanê bûn. Di wê dema ku ew li bendî ketina kobanê, dihanîn ser ziman û bi wê re digotin ku ´wê Hesekê û Afirîn jî bikeve.´ Her wusa, gotina "ketinê", dema ku dihanîn ser ziman, tenê bi kobanê re bi sînor ne dihanîn ser ziman. Hesekê û afrînê jî, dikirina nav de û dihanîn ser ziman. Ev jî, dihat ditin û fahm kirin ku hatîbû plankirin ku bo şikandina kurdan li rojava armanc girtin ku bi kobanê re Hesekê û Afrînê bixin û ji destê kurdan derxin. Ev plan hemû, ji navendekê hatibûbûna plan kirin. Dema ku mirov li vê hasabê ku li ser ketina kobanê hatîya kirin ku lê dihizirê û bi wê re li hasabê xistina Hesekê û Afrînê jî ku hatibû kirin ku mirov lê dihizirê, di cih de ew gotina ku di temenê planaka şer ya ku dihat gotin ku li leşkergeha tirk a leşkerî hatîya çêkirin û bi wê ve girêdayî dihat gotin ku "wê sed hezar kurd werina kuştin" dihê berbîra me. Li vir, wusa dihê ditin û fahmkirin ku dema ku ev plana şer ya bi vî rengî a li leşkergeha tirk ku hatîya çêkirin, ev hûrgil(´detay´) hemû hatina hasab kirin. Bi wê re, hasabkirina ku wê ji Şengalê û heta ku digihişt kobanê, Hesekê û Afrînê di xatekê de wê van herêmên kurdistanê bixin û li ser wê "dewletek Sûnnî" ava bikin. Ev jî, weke plana ji nû ve qatkirina kurdistanê ya di dawîya çeyreka pêşî a sedsala 21´ê de ya.

. **Piştî** ku hêrîşên bişitt ji 15´ê ûlûna 2014´an û pê de li kantona kobanê destpêkirin û pê de, bi hezaran ciwanên kurd ên ji bakûrê kurdistanê sînor derbas kiribûn û çûbûbûn kobanê û tevlî berxwedana kobanê bûbûn. Bi wê re jî, çend ku dem têve diçû, asta hêrîşên DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya li kobanê zêdetir dibûn. Kurdên bakûr ên ku li ser sînor dicivîyan jî rastî hêrîşên leşker û polisên dewletê dihatin. Lê van hêrîşan, bi kurdan bi şûn ve gav neda avêtin. Çend ku dem têve diçû, kurdistanîyên bakûr hê zêdetirî dirabûna serpîyan. Ew asta rabûna serpîyan a kurdistanyên bakûr, di 7´ê kewçêrê a 2014´an de gihişt asta serhildanê. Li bakûrê kurdistanê, cih û deverek nema ku li wê kurd ne rabûna serpîyan û xwepêşandin li der nexistin. Li hemû deverên kurdistana bakûr, ev bû. Cizîrîyan, ku navê wan bi gotina ´serhildanê´ re bûbû yek, vê carê jî di serhildana bakûr a bo kobanê û berxwedanê wê de cudahîya danîn li holê û bi girseyî bi sed hezaran ketin rê de û bi ber sînor ve bi dest meşê kirin û têlên sînor rakirin û buhurîna kantona Cizîrê. Ev care pêşî bûbû. Lê li herêmên din ên kurdistanê jî, gelê kurd rabûbû ser pîyan. Hêzên dewletê ên polisîya jî, bi leşkeran re di her xwepêşandina kurdan de hêrîşî kurdistanîyan dikirin. Di destpêka xwepêşandinan de Li navçeya Varto ya Mûşê polîsan bi guleyan ciwanê kurd ê bi navê **Hakan Buksur qatilkirin. Li Amedê jî, kurdistanîyê bi navê Mehmûd Enez qatil kirin.** Li deverên din ên kurdistanê ên weke navçeya Sêrtê li Kortalanê û hwd jî, hêzên dewletê hêrîşî kurdan dikin û di hêrîşa pêşî ya hêzên dewletê de du ciwanên kurd bi navê **Mehdî erdogan û Yusif çelik** bi hêrîşên hêzên dewletê hatina qatil kirin. Bi vê re, her wusa li qosera Merdinê jî bi navê Kerem karaaslan kurdistanîyek hatibû qatill kirin. Bi wan re, piştre hin bi hin ku rewşa qatilkirina kurdan zelal dibû, dihat dîtin ku bi dehan kurd cih bi cih hatibûbûna qatil kirin. Bi vê re jî, weke ku çawa ku li Vartoya Muşê piştî qatilkirina ciwanên kurd bû, kurdan êdî saziyên dewletê dane ber êgir. Pirranîyan saziyên dewletê ên li van deverên kurdistanê jî, ji aliyê kurdistanîyan ve hatina şawitandin. Lê bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku li her dever û bajarên kurdistanê, gelek birîndar hebûn û kêlîk bi kêlîk hijmara mirinan ji nava wan birîndaran zêdetir dibû. Vê dida nîşandin ku serhildana li kurdistanê, li bakûrê kurdistanê. Ev qatilkirinên pêşî ên bi serhildana bakûr

ya bo kobanê re ku li bakûrê kurdistanê bi destê hêzên rejima tirk bûbûn bû. Piştî vê re jî, li gelek deverên din jî, di hêrîşên rayadarên dewleta tirk de bi sedan kurd bi giranî hatina birîndar kirin.

Ev rabûna kurdan a li ser pîyan, tenê li bajarên bakûrê kurdistanê nebû. Li her devera ku kurd lê hebûn rabûn serhildanê. Li hemû welatên ewropî ku li wan kurd hebûn, xwepêşandinên kurdan bi heman rengî bûn. Her wusa, divê navberê de divê ku mirov bibêje ku di van rojên dîrokî ên ku kurd bi hemû beşên xwe yên civatî bi hevdû re li ser lingan bûn, serokê neteweyên Yekbûyî Ban kî-moon banga çalakîya lezgîn bo kobanê kir. Lê bi vê rengî, tevî ku rêveberîyek kurd bû û hêvîya kurdan ji wê hebû ku bikeve nava tevgerê û helwestê de hikimeta kurd a başûrê kurdistanê, bêdeng bû. Ti deng ji wê dernediket. Bi wê re jî, kurdên başûrî, bi girseyî bo ku bikeve nava tevgerê de li pêşîya parlamane kurd a başûrê kurdistanê ketibûbûna nava çalakiyê de. Dixwestin ku hikimeta kurd a başûr, li birayên xwe yên kurd ên rojavayî xwedî derkeve.Lê wê tenê, ew hikimeta kurd, tenê bi bêdengî mirina birayên xwe yên kurd temaşa dikir.

Di vê navberê de, piştî ku berxwedana kobanê mazin bû û hêrîşên li kurdan zêdetir bûn, asta rabûna serpîyan ya kurdistanîyên bakûr derket asta herî bilind. Bi wê re jî, bi hezaran kurd diherikîna bersînor. Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî ku YPG´ê bersivek mazin didê çeteyên DAÎŞ´ê û ku ji azmanan ve jî hêzên koalîsyonê bi balefiran hin çeperên çeteyên DAÎŞ´ê li dora kobanê bombardiman dikin, bi kamyonên leşkerî di wê demê de ji sînor derbasî sînorê tirkiya dibin û xwe didina winda kirin. Ev jî, piştre bûbû temenê nîqaşên mazin. Bi teybetî, piştî bombardimana hêzên koalîsyonê ya di êvara 6´ê kewçêrê 2014´an de, çeteyên DAÎŞ´ê wê derbasbûnê dikin. Rejima tirk, bo ku derbeyekê li rojavayê kurdistanê bixin alikarîyek mazin ji her aliyê ve dide çeteyên DAÎŞ´ê. Kurdistanîyên bakûrê kurdistanê jî, ev yek bi awayekî didîtin. Vê jî, dikir ku kurdistanî pirr bihêrs bibin. Bi gotinaka din, hevkarîya rayadarên rejima tirk û DAÎŞ´ê bi awayekî vekirî li berçav bû. Çend ku rayadarên tirk ên weke Ehmed Dawutoglu og T. Ardogan, bo ser vê alikarîya xwe binûxûmênin, digotin ku "alîkarîya me ji DAÎŞ´ê re tûna ya" jî, ev derew bûn û kurdistanîyan dizanîn ku derew in. Gotinên serokwezirê tirk ê vê demê Ahmed Dawutoglu ên bi rengê "em jî naxwezin ku kobanê bikeve", tenê bi armanca manipûlasyonê bû û pêşîya bertekên kurdan girtinê bûn. ji ber ku wusa bûn, êdî kurdan ti qiymet ne didane wan. Ev jî, bi wê rengê tê şîrovekirin ku ji herêmên ku tên bombardiman kirin xwe divekişênin û bi alikarîya tirkiya di buhurîna herêmên din û hwd. Her wusa, bi wê re jî, mirov divê ku bibêje ku hêrîşên li ser kobanê di roja xwe ya 23´min de bû. Yanî, bi gotinaka din, berxwedana kobanê di roja 7´ê kewçêrê a 2014´an de diket roja xwe ya 23´min de û bi serhildana bakûrê kurdistanê a bo kobanê didomîya. Serhildana bakûrê kurdistanê jî, navê wê ´serhildana kobanê´ bû.

Bi vê re, divê ku mirov vê jî bibêje ku di roja 7´ê kewçêrê a 2014´an de hem hêrîşên li kobanê zêdetir bûbûn û hem jî li ber wê berxwedana kurdan jî derketibû astaka hê bilindtir. Ku em vê roja 7´ê kewçêrê a 2014´an, weke roja ´serhildane kobanê a li bakûrê kurdistanê´ binav bike, wê pirr rast û dicih de bê. Ji ber ku wusa bû. Berxwedana kobanê û hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi alikarîya tirkiya, kurdistanî hanî wê asta raperînê. Êdî kurdan digot ku "ev der, cihê ku lê gotin qadîya ya." Êdî, kurdistanî li her deverê dirabûna serpîyan. Berxwedana kobanê, bi vê rengî, êdî di rengekî ´berxwedana kurdistanê a giştî de pêşve diçû. Her wusa li başûrê kurdistanê û rojhlatê kurdistanê jî, hin xwepêşandin bûbû bûn. Lê rayadarên kurd ên başûrî, rêya kontrolkirina kurdên

başûrî bijartibûn. Dixwestin ku ew bêdeng bin û bi wê re ne dixwestin ku deng ji kurdistanîyên başûrî derkeve. Lê kurdistanîyên başûrî jî, li wê ne dihisandin û dirabûn serxwe û xwepêşandin li dar dixistin. Di êvara 6´ê kewçêrê a 2014´an de, bi girseyî kurdistanîyên başûr li pêşîya parlamene kurd a başûr civîyabûn û xwepêşandin li dar dixistin. Her wusa ew bêdengîya hikimeta kurd jî şermazar dikirin. Li hemû bajarên bakûrê kurdistanê jî gelê kurd kurdistanî li ser lingan di nava serhildanê de bûn. Hêzên dewletê ên tirk jî, di nava hêrîşên li gel de bûn, ku wan xwepêşandin û rabûna serpîyan ya kurdan bidina sekinandin. Bi vê yekê re, li kurdistanê rewşek awerta derketibû li Holê. Kurdistanî, bi dirişma, "yan emê bi bêdengî li ketina kobanê tamaşa bikin û yan jî emê bi kobanê re di nava berxwedanê de bin û bi hevdû re serkevin", rabûbûn ser pîyan. Kurdistanîyan, rêya duyem, bijartibûn û bi kobanê re ketibûbûna nava berxwedanê de. Ti kesek, êdî li malên xwe ne disekinin. Herkesek li qadan bû. Ev dema ku di wê de bi pêleka bi şitt hêrîşan li kobanê destpêkiribû, êdî ew pêla hêrîşan a li kobanê ya bi destê DAÎŞ´ê û alikariya tirkiya, vegerîyabû hêrîşên li kurdan li hemû bajarên kurdistanê ên bakûrê kurdistanê jî. Yanî, kurdistanî, ji her aliyê ve di bin hêrîşan de bûn. Bi vê rengê, êdî rewşek hê awertetir bo kurdistanîyan afirî bû. Ji vê aliyê ve sînor jî, rayaderên tirk û polis, bi rengekî ku kurdên bakûrî bikina bêdengiyê de di nava hêrîşê de bûn. Bo vê yekê, di 7´ê kewçêrê a 2014´an de ku hinek kurdên sivîl ji kobanê hatina veguhaztin li bakûrê Kurdistanê û ku di nava wan de hinek rojnemevan hebûn, ew rojnemavan hatibûbûna binçavkirin bo ku ew zanyarîyan di wê demê de ên di derbarê berxwedana kobanê negihijina çapameniyê ku ka çi dibe li kobanê. Bi wê re jî, rayaderên tirk, bo ku pêşîya xwepêşandinên kurdan bigrin, **"qadaxaya derketina li sûkê" jî** derxistibûn. Bi wê ´qadaxaya li sûkê´ re, «rewşa awerta» ya «ohal» hatibû denezendin. Lê kurdistanîyan, li wê jî ne hisandin û guhdar ne dikirin. Hemû kurdistanî, daketibûbûna qadan û di nava rewşeka serhildanî de bûn. Ciwanên kurd jî, li her bajarên kurd, di nava çalakiyan de bûn. Bi polîs û hêzên dewletê re şer dikirin di nava sûkan de. Bi vê rengê, weke ku berxwedana kobanê, bûbû bû berxwedana hemû kurdistanê û kurdistanîyan.

.. **Bo** ´berxwdana kobanê´, ku em gotinekê bibînin û werênina ser ziman, wê ew bê ku berxwedana kobanê hemû kurdistan bi her çar beşên wê re di gîyanekê de kir yek û rakir serhildanê. Bi wê re jî, em dikarin bibêjin ku ew gîyane şoreşa rojava, bi berxwedana kobanê re bû malê hemû kurdistanê. Bi vê rengê, em di karin di dewama wê de bibêjin ku berxwedana kobanê, şoreşa rojava barî hemû kurdistanê û nava kurdistanîyan kir. Ev, di serî de weke ancamaka dîrokî ya berxwedana kobanê bû. Berxwedana kobanê, em nikarin tenê weke berxwedanekê werênina ser ziman. Pêvejoyek nû bi vî rengî hem li herêmê bigiştî û hem jî li kurdistanê bi kurdistanîyan re da destpê kirin.

Jiv ê aliyê de dema ku em lê binerin, berxwedana kobanê dîrok nivîsand. Li kurdistanê, gelê kurdistanê li her çar beşên wê hem di dilê wan de û hem jî di jîyane wan de rakir serhildanê. Bo vê yekê, li bakûrê kurdistanê, ew rabûna serpîyan ya kurdistanîyan ku ji 6´ê û 7´ê kewçêrê a 2014´an û pê de ku vegerîya serhildanaka mazin ya gel, hinekî jî divê ku mirov mirov bi rengê vegerîna wê berxwedana kobanê ku vegerîya serhildanê bixwêne. Li Kobanê berxwedana hebû. Lê li bakûrê kurdistanê û beşên din jî serhildan hebû. Navê wê serhildana bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê jî, ew bû ku ´berxwedana kobanê´ bû. Navê serhildana bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê, ´serhildana kobanê´ bû. B vê re jî, em dikarin bêjin ku navê serhildana kurdistanê giştî, ´serhildana kobanê´ bû. Kobanê, bi vê rengê, êdî weke ku

çawa ku destpêk bû ji şoreşa rojava re, bûbû bû destpêkek ji serhildana bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê jî. Her wusa, ew hêrîşên ku li şoreşa rojava û bi teybetî jî li kobanê bûn, kobanê ji ji destpêkîtîya şoreşa rojava derxist û kir destpêkek dîrokî ji serhildan û şoreşa kurdistanê giştî re. Her wusa, berxwedana kobanê bi vî rengî weynek û rolek dîrokî leyist. Çendî ku hêrîş li kobanê bûn bo şikandina şoreşa rojava, bi heman rengî bi wan hêrîşan û bandûra wan ya li ser kurdan û berxwedana kurdan ya ku li kobanê bê û li herêmên din ên kurdistanê bê, şoreşa rojava kir şoreşa kurdistanê giştî. Bi vê rengê, rewşek bi berxwedana kobanê re derket li holê. Em divê ku vê yekê bi teybetî bibêjin ku di serî de li dora berxwedana kobanê li hev gihiştins hevdû, bû temenê gîyanek kurdistanî a berxwedêr. Ev gîyan, bi bandûra wê berxwedana kobanê re li hemû kurdistanîyan serdest û serwer bû. Her der kobanê, her der berxwedan bû.

Bi vir ve girêdayî, êdî em divê ku bahse ´gîyane kobanê´ bikin. Ne tenê kurd kurdistanî, xalk û gelên din ên li herêmê jî, çendî ew berxwedana li kobanê didîtin, êdî weke ku werina xwe li wan dihat. Ev jî, weke aliyekî din ê teybet bû ku divêt ku mirov li ser bisekinîya. Bi wê gîyane kobanê re hat dîtin û fahm kirin ku mirov bi vîn û berxwedana xwe re dikarê li ber teknîka herî zêde mazin jî bi serkeve. Ji xwe, dema ku bi alikarîya tirkiya çeteyê n DAÎŞ´ê bidest hêrîşkirina li kobanê kirin, teknîkeka pirr zêde pêşketî bi çekên pêşketî re di destê wan de hebûn. Bi wan çekan re hêrîşî kobanê dikirin. Lê şervanên YPG´ê, di destê wan de tenê kilêşên wan hebûn. Lê tevî wê jî, serkevtinên mazin ên dîrokî bidest dixistin. Bi vê yekê re dihat dîtin û kifşkiirn ku ti tişt ji vîna mirov ne maztira û ne li ser re ya. Çendî ku mirov di kifş û têgihiştina vîna xwe de bê, wê ewçendî karibê xwe biserbixe. Ev jî, weke ancamaka dîrokî ya berxwedanaka kobanê bû. Gîyane kobanê, di vê temenê de divê ku mirov fahm bike. Gîyane kobanê, rengê vîna mirov a bizane û hişar a. Kurdistanîyan, ev yek bi awayekî vekirî bi tekoşîna xwe re kifşkirin. Bo ku derbe li kurdan were xistin, ne dihiştin ku ti çek û teknîk bikeve destê kurdan de. Lê kurdan, hertimî li ser keseyetîyê û vîna xwe ya mirovî re birêxistin û bizanebûn dikir û li ser xwe dida. Ya ku wan di dem û pêvajoyên herî zor de jî biser dixist, ev bû. Keseyet, zanîn û vîn, bi hevdû re hevnasîyekê çê dikin di nava keseyetîya tekoşar ya tevgera azadîya kurd de. Ya ku temenê serkevtina wê jî bû, ev bû. Kurdan, bi vê re serkevtin bidest dixist. Gîyane kobanê, dema ku em bi berxwedanak kobanê re fahm bikin, em divê ku bi wê rengê wê fahm bikin. Ev keseyet, biser dikeve. Li kurdistanê, vê keseyeîyê, li dijî teknîka herî pêşketî, bi vîneka mazin serkevtin bidest dixist. Gîyane kobanê, gîyane şoreşa kobanê bû. Ev gîyan, di destpêka şoreşa rojava de li rojavayê kurdistanê bicih bû. Piştre, her kurd hêrîş li rojavayê kurdistanê bûn û çendî li ser wan hêrîşan berxwedan bû û serkevtin bi xwe re hanî, êdî rengê wê gîyanê û keseyetîya wê gîyanê dihat dîtin. Bi berxwedana kobanê re, ew gîyana kobanê bû malê hemû kurdistanîyan. Li bakûrê kurdistanê, bi wê gîyanê gelê kurdistanê rabû serhildanê.

Şoreşa rojava, wucana kurdan derxist li holê. Wucana kurdan, di temenê statûya wan ya herêmî de raxist li berçav. Bi gotinaka din, şoreşa rojava, vîna kurdan kir bistatû. Piştî bûna şoreşa rojava re, ew hêrîşên ku li wê bûn, li vê vîna kurdan bi wê bû xwedî statû dibû. Kurdan jî, ev yek, bi awayekî vekirî didît. Êdî kurdan jî, li her qadê li vîna xwe xwedî derdiketin. Şerê piştî bûyîna şoreşê ku bi şoreşê re dibû, şerê şikandina vîna gel ya bi wê şoreşê re ku derketibû li holê bû. Ew gel jî, gelê kurdistanî kurd bû, asûrî bûn û xalk din û bawerîyên ji hevdû cuda ku hebûn bûn. Ev vîna kurd ku tekoşîna azadîyê dide, di çapameniya cihanê de jî cih digirt. Bi teybetî, piştî berxwedana kobanê,

pirr zêde cih girt. Cihanê, bi wê re bi vîn û dîroka kurdan û her wusa bi navê kurdan re hevnasîn kir. Şoreşa rojava, divê ku mirov bi wucan kurdan û kurdistanê a stretejikî re jî hilde li dest û fahm bike. Ev jî, bi serê xwe, wê bê aliyekî vê şoreşê ku mirov wê fahm bike. Tirkiya, Îranê, Îraq û Sûrî, heta roja me, lis er wûcana kurdan stretejikî, dîrokî û ardnîgarî û hwd, xwe didan jîyandin. Lê dema ku kurd bi vîna xwe re derketina li holê û doza statûya dikirin, di serî de ne dixwestin ku vê yekê dest berdin. Bo vê yekê, li şûna ku wê pirsgirêka kurd çareser bikin, bi kurdan re diketina nava şerê şikandina wan de. Hêrîşên li ser kobanê, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest û fahm bike. Gelê kurd jî, bi vîna xwe û bo statûya xwe li ber wan hêrîşan berxwedanê pêş dixin. Berxwedana kobanê, bi gîyane wê re berxwedana kurdan a vê ya. Kurdan, hêrîşên ku bi pêlên şitt ji 15´ê êlûnna 2014´an û pê de ku li wan bûn, li ber wê berxwedana kobanê pêşxistin. Pişre ev berxwedana kobanê, bi gîyane kobanê re bû temenê serhildana bakûrê kurdistanê ku navê wê ´berxwedana kobanê´ ya. ..

**..Tirkiya, li ser wûcan(konum)a stretejikî a kurdan ku li herêmê xwe dide jîyandin.** Dema ku mirov rola Tirkiya di derxistina DAÎŞ´ê a li holê de hewl bide ku fahm bike, divêt ku mirov hinekî jî li rewşa kurdan û rewşa stretejîka herêmên kurdistanê a bi sîyesî û dewlemendiyên wê jî binerê. Nivîskarê rojnemaya "**The Gardian" Sîmon Tisdall** di nivîsa xwe ya bi navê "wê tirkiya di tekoşîna bi DAÎŞ´ê re rola hilde ser milê xwe" de ku di hefteya dawî a meha êlûna 2014´an de nivîsand de, dihêne ser ziman ku "Tirkiya, naxwezê ku kurd weke hêzek herêmî derkevina li holê." Ev gotina Sîmon Tisdall, rewşa tirkiya ya xwe jîyandina li ser rewş û wûcana kurdan a stretejikî jî dihêne ser ziman. Lê di 8´ê kewçêrê a 2014´an de **Financial Times**, di sernivîsa ku weşanda de T. Ardogan weke ”hokkabazekê” dihêne ser ziman û bi wê re jî tirkiyayê weke ”aliyê zayif” ê koalîsyonê bi nav dike. Rojnema balê dikişêne ser xwesteka T. Ardogan ya ku dixwezê ku Kobanê bike jî. Di sernivîsê de dibêje ku ”tirkiya hêzeka ku xwediyê wûcanaka giring a, gelek tank li ser sînor rêzkirina lê ti mudahale wê li DAÎŞ´ê nebûya.” Bi wê re jî, rojnema dinivîsne ku T. Ardogan ”ji giranî ve dihilde.” Yan, bêdil dike. Weke ku naxwezê tevdigerihê. Bi wê re jî, rojnema balê dikişêne ser wê ku T. Ardogan gotîya ”bo me, PKK û DAÎŞ wekhev in.” Ev helwesta tirkiya, bi tememî di temenê dijberîya kurdan de ya. Tirkiya dixwezê ku derbe li kurdan were xistin. Ji ber ku heta vê demê jî, li dijî statûya kurdan sîyesetê dikin. Hêvî jî, dikin ku kurd, wê rewşa bêstatûyî herê bikin û xwe li mirinê razênin. Sernivîsa ´Financial Times´ dinivîsêne ku helwesta T. Ardogan fahmkirina wê zor a.” Lê bo kurdan, fahmkirina helwesta T. Ardogan ne zor a. Ji ber ku kurd, di bin kiryarên wî yên qirêt de na. Û Rastî hêrîşên hêrzên wî yên dwletê tên. T. Ardogan, li dijî kurdan, statû û navê kurdan a. Di temenê hemû helwesta wî de ev heya. Bi vê re, divê ku mirov vê jî bibêje ku di heman rojê de di 8´ê kewçêrê a 2014´an de di rojneaya firanizî ya bi navê ”le Monde” de di sernivîsa edîtorîya rojnemê de dahûrek li ser helwesta tirkiya û gotinên T. Ardogan ên weke ”bo me, PKK û DAÎŞ wek hev in” şîrove dike û di nivîsêne ku ”ev gotina T. Ardogan ne rast in.” Di dewama nivîsa editorîya rojnemê de di dewamê de tê nivîsandin ku ”anqara ku ev demek dirêja ku derfetê dide andamên DAÎŞ´ê ku ser wê re bi buhur in.” Bi wê re jî di dewama vê gotinê de tê nivîsandin ku ”anqara li şûna kurdan tercîha xwe ji DAÎŞ´ê ve kir.” ..

Kurdan jî, ev gotin dem bi dem dihanî ser ziman. Di pêvajoya ku kurdan û tevgera kurd dayî destpêkirin de, li şûna ku aşîtîyek were çêkirin bi kurdan re û kurd û tirk, wê

aşîtîyê bikina temenê hevpeymanîyeka dîrokî a di temenê muttefîkîyekê de, anqara çû bi DAÎŞ´ê re lev kir û bi hevdû re bidest hêrîşkirina li ser kurdan kirin. Di vê demê de, çapameniya welatên ewropî jî, rûyê rast ê sîyeseta tirkiya a li dijî weke ku baştir dît. Dît ku tirkiya çendî sîyeset lewitî dike. Dirûtîya sîyeseta tirk, ji aliyê ewropîyan ve jî hatibû dîtin. Biqasî ku didîtin û ku berjewendîyên wan derfet didayê de jî ew sîyeseta dirû dihanîn ser ziman. Rûyê rast ê sîyeseta tirkiya ew bû ku di gotinê de digot ”ez li dijî DAÎŞ´ê me û ti têkiliya mini wê re nîn a.” Lê ji bin ve jî, bi hemû awayan biwê re di têkiliyê de bû û alikarî, didayê de. Bi hêzek mazin pêşî çûna bi ser herêmên başûrê kurdistanê ên weke şengalê, xanaqîn, kerkûk û maxmûrê û hwd de. Piştre berê xwe dana bi ser rojavayê kurdistanê de û çûna bi ser Kobanê de. Bi vê re, xwestin ku li gorî ku tirkiya dixwezê derbeykê pêşî li pêşketina civatî a civate kurd bixin û piştre weke sale 1923´an ku di ´konferanse Lozanê´ de hatkirin û kurdistan hat kirin weke çarqat di nava çar welatên ku li herêmê ji nû ve hatina avakirin, dixwestin ku di sale 2014´an de tiştekî bi heman rengî werênina serê kurdan. Di xwestin ku bi DAÎŞ´ê ji xateka ku ji Musilê ku li ser şengalê ûû heta ku digihişt Kobanê û ku herêmên rojavayê kurdistanê ên weke hesekê û Afrîn jî di nav de ´dewletek sûnnî´ ava bikin û û piştre ku karibin, herêmên din ên rojavayê kurdistanê jî bikina nav de û êdî bi vî rengî hem temenê statûya civatî a civate kurd ji holê ra bikin û li gorî demê ji nû ve carek din kurdistanê qat bikin. Bi berxwedana kurdan a li Kobanê li hemberî hêrîşên DAÎŞ´ê û serhildana bakûrê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê, ev plan hat têkbirin ji aliyê kurdan ve. Bêgûman, ev hasabên ku bi wan dihê xwestin ku kurdistan ji nû ve di dawîya vê çeyreka pêşî a sedsale 21´ê de ku were qatkirin, hê jî hena. Ji xwe, şerê wê bi kurdan re dihê kirin. Hêrîşên Li kobanê û bigiştî li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê bûn, di temenê wan de ev heya. Çend ku rayadarên tirk, di axiftinên xwe de dibêjin ku ”pêvajo didomê” jî, hewldanên wan têkbirina pêvajoyê bi vî rengî ib hêrîşên DAÎŞ´ê û hêrîşên li kurdên bakûrê kurdistanê û hwd re didomê. Gotina ”pêvajo didomê” jî, di temenê ku karibin destê xwe rehet bikin şerê xwe yê ku bi destê DAÎŞ´ê ku bi kurdan re dikin bikardihênin. Yanî, bo ku gelek aliyên şer li pêşîya wan nebin. Pêşî, bi şer rojavayê kurdistanê têk biibin. Heta ku wê têkbirinê çê bikin jî ku tevgerên bakûrê kurdistanê ên weke PKK´ê di rewşa ”agirbestê” de bin. Piştî ku derbe li rojava xistin, êdî piştre berê xwe bidina bi ser wê de jî. Ev hasab heya di temenê gotina ”pêvajo didomê” de. Ji ber vê yekê û vê hasabê ya ku rayadarên tirk ên weke Ahmed Dawutoglu ku serokwezirê demê ya, dema ku derdikevina berçapameniyê û ku ji wan tê pirsîn ku ”Ocalan gotîya kobanê bikeve wê pêvajo dawî lê were”, bersivê didin ku ”ti eleqeya wir û pêvajoyê bi hevdû ve tûna ya.” Yanî, bi gotinaka din, ji hevdû cuda nîşandina rojava û pêvajoya li bakûr, di temenê qatkirina sîyeseta kurd de jî divê ku mirov fahm bike. Yanî, ew sînorê ku di nava civate kurd de hatî xizkirin, di sîyesetê de ku were herêkirin. Lê ji wê zêdetirî jî, bi van gotinan mirov divê ku fahm bike ku çawa ku ”bi taktîkên mijulkirinê” û bi gotinên weke ”pêvajo didomê” re çawa hewl didin ku pêvajoyê li gorî xwe birêve bibin. ..

**Ya hebûn** tirkiya bixwe jî li rojhilat dike weke welatekî giring û ´stretejikî´ jî, hebûna kurdistanê bixwe ya. Di serî de, divê ku mirov vê yekê kifş bike. Ku em ji aliyê têkilîyên sîyesî û hwd ve û di çerçoveya sîyeseta roja me de jî binerin, ev wusa ya. Her wusa, dema ku em ji aliyê dîrok û rûbirdûya dîrokî ve jî binerê ev wusa ya. Herêmên rojavayê kurdistanê ku di nava sînorê Sûrî de hatina hiştin, ji dema Sûmerîyan bigra û

heta demên hûrî û mîtannîyan serdemên dîrokî jîyane na. Hêzên ku li herêmên Anatolia û hwd derketina, çendî ku bihêzbûna ên weke hîttîtê û hwd, berê xwe dane herêmên rojavayê kurdistanê. Bi heman rengî, herêmên bakûrê kurdistanê jî, herêmên başûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê jî wusa giring in û herêmên stretejîk in hem bo rewşên sîyesî ên desthilatdarî ên serdema me ya î ro û hem jî bi pêşketinên xwe yên bi dîroka xwe re wusa ya. Ji ber ku deriyê ku li rojhilat, nîvgirava araban û herêmên din ên asya divebê Kurdistan a. Kurdistan, bixwe jî, herêmek rojhilat a stretejikî ya. Di hemû pêşveçûnên dîrokî de ku em ji dema gûtîyan, hûrî û mîtannîyan bigrin û heta ku werina serdemên Şadadî, merwanî û eyûbîyan jî, em dibînin ku herêma kurdistanê kifşkar a. Piştî ku Desthilatdarîya kurdan a Medîya hat xûrixandin û piştî wê re Axamanîşan û Sasanîyan bûn jî, heta ku Kurdan piştîgirî nedan Axamanîşan û Sasanîyan, nekarîn ku di temenekî stretejikî de li herêmê bi sîyesî serdest bibin û bibina desthilatdar. Em heman tiştî û rewşê, piştî desthilatdarîya kurdan a Ayûbîyan di pêşketina desthilatdarîya Osmanîyan de jî dibînin. Heta ku osmanîyan, piştgirî ji kurdan negirt, nekarî ku li herêmê weke hêzekê pêş bikevin û bibina serdest û desthilatdar. Her wusa, di serdema sadsala me de, di dema avabûna komare tirk de jî dîsa ew piştgirîya kurdan bûya ji wê re. Wan desthilatdarîyan, çendî ku kurdan piştgirî dane wan, xwe jîyandina û domandina. Lê piştî ku bûna desthilatdar jî, êdî bi wê haz û hesta bûna desthilatdar, weke ku "serxwoş" bibin li wan hatîya û xwe winda kirina û êdî bi wê xwe windakirinê re xwe afirînêrê cihanê dîtina û ew kurdên ku piştgirî dane wan û ew rakirina serpîyan, bûna armanca hêrîşên wan û çûna bi ser wan de jî. ..

Î ro jî, di vê temenê de ku em bipirsin ku ka çima pirsgirêka kurd ku li herêmê bi destê rêveberîyên herêmê hatîya afirandin nayê çareserkirin, hinekî jî ev hesta xwe kirina desthilatdar û tenê xwe weke desthialtdar ditin heya. Yanî, li vir, bi gotinaka din em bibêjin, ev şerê ku bi kurdan re dihê dayîn jî şerê desthilatdarîyê ya. Î ro jî, di roja me de, dema kurd bahse ´statûya xwe ya civatî´ dikin jî rastî hêrîşan tên. Zimanê kurdan, bo ku civatîtîya wan were ji hevdû felişendin û kurd werina bişavtin tê qadaxa kirin. Ji welatên ewropî û ankû Emerika û hwd jî, bo ku têkiliyek sîyesî bi kurdan re newê danîn û kurd bi statûya wan re newina herêkirin û weke hêzekê pêşnekevin, rejimên herêmê diçina bi ser kurdan de. Minaqe vê jî, ew a ku rêveberîya tirk ku ji her aliyê re di hevkarîyaka bi DAÎŞ´ê re de ya, dema ku gotina "muttefîkîtiyê" bo têkiliyeka mihtemel a koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê ku bi kurdan re dênin hat ser ziman, hingî tirkiya di cih de manevra kir û herê kir ku bikeve nava koalîsyonê de. Lê ev ketin jî, ne weke ketinaka jidil bû. Ev herêkirin û ketina tirkîya li nava koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê, bi armanca di van waran de pêşîya têkilîyên mihtemel ku bi kurdan re dênin bigrin bû. **Bi** wê re jî, vê gotinê jî dihêne ser ziman ku "tirkiya, dixwezê ku pêşîya bi hêzbûna kurdên îraqî û Sûrîyayî bigrê û nehêle ku wê wûcanîya mûttefîkîya kurdan bi rojava re ´îstîsmar neke´ di nava tevgerê de ya." Ev helwesta tirkiya a bi armanca bêhêzkirina kurdan û wûcana wan, hertimî bûya. Di temenê hemû têkiliyên tirkiya ên bi rojava(ewropa û emerika) re jî, ev rastî heya. Dema ku tirkiya têkiliyê bi welatên rojava re û bi teybetî jî ku bi emerîka re didêne, xale pêşî ku rayadarên tirk li ser danûstandinan dikin mijar û rewşa wûcana kurdan a.

Di vê dema ku ket rojevê de ku li dijî DAÎŞ´ê li rojava ´koalîsyonek´ hat avakirin de, di wê de jî helwesta tirkiya li ser nêzîkatîya li dijî kurdan bû. Wê çawa pêşîya kurdan bigrê û wê çawa nehêle ku weke ku ket rojavê de ku "kurd jî, wê weke

hevkarekî xweza ê vê koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê bin" ku pêşîya wê bigrê, di nava tevgerê de ya. Di vê temenê de herêkirina tirkiya ya ketina nava ´koalîsyonê´ de jî, di vê temenê de bi armanca pêşîya kurdan girtin a. Ev politikaya tirkiya, ne tenê li dijî kurdên bakûrê kurdistanê û kurdên rojavayê kurdistanê ya. Her wusa, bi têkiliyên ku bi kurdên başûrê kurdistanê re danîya hewl dide ku wan jî di vê çerçoveyê de di bin "kontrola" xwe de bigrê û nehêle ku bi hêz bibin. Di vê temenê de çûyina tirkiya a bi ser kurdan de, heta roja me bûya. Gotinên T. Ardogan ên ku wî di civîna ´Davos(civîna davosê a di êlûna 2014´an de)´ê de hanîn ser ziman û di wan de tevgera azadîya kurd ya ku di demên wî de û wî û hikimeta wî ku bi wê re têkilî danî û hevdîtin bi wê re çêkir jî, bi gotinên "terorê" hanîna ser ziman, divê ku mirov bi vê helwesta tirkiya a di temenê dijberîya kurdan de fahm bike. Her wusa, dema ku em vê helwesta tirkiya ji aliyê van hevdîtinên ku wê bi tevgera azadîya kurd re kirina jî hilde li dest, wê tenê bi ne jidilbûna wê re were ser ziman.

Tirkiya naxwezê ku kurd li herêmên xwe jî weke hêzekê bibin. Bo vê yekê, çeteyên weke çeteyên DAÎŞ´ê û hwd, birêxistin dikin û dişênin bi ser kurdan de. Her wusa, piştî ku DAÎŞ´ derxistin li holê û bi teybetî şandina bi ser başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê de, divê ku mirov bi vê helwesta rejima tirk û rejimên din ên herêmê a bi vî rengî re fahm bike. Ev herdû herêmên ku kirina armanca hêrîşên DAÎŞ´ê jî, herêmên kurdistanê ên ku li wan temenê statûyek kurdan heya na. Her wusa, li başûrê kurdistanê jî û li rojavayê kurdistanê jî, bi hemû kêmesîyên xwe re rêveberîyên kurd avakirî hena. Ev rêveberîyên kurd, bi van hêrîşên bi destê DAÎŞ´ê, dihê xwestin ku werina bêbandûr kirin. Yanî, hêrîşên DAÎŞ´ê, bi armanca şikandina kurdan û pêşîya bi hêzbûna wan girtin a. Di çerçoveyeka bi vî rengî de DAÎŞ´ê û ankû çeteyên din ên weke wê diafirênin, di dina hêrîşkirin li ser kurdan û ankû ew bixwe û bi destê xwe wê hêrîşa şikandin û bêbandûrkirina kurdan li kurdan dikin.

Kurd, bi rewşa xwe û wûcana xwe re di wûcanaka stretejikî de na. Wûcana kurdistanê, stretejikî ya. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de bibêje. Tirkiya, şerê wê yê bi kurdan re, di aslê xwe de li ser vê rewşê û wûcana wan ya stretejîkî ya. Tirkiya, dixwezê ku li şûna ku kurd ji wê wûcanaka xwe ya stretejikî sûd bigrin, ew dixwezê ku sûd bigrê û bi wê re jî ku karibê kurdan bêbandûr bike. Bo vê yekê, hêrîşên bêbandûrkirinê li **rewş û wûcana kurdan a li herêmê** ku pêş dikeve wan hêrîşan dike. Bo vê yekê, DAÎŞ afirandin, derxistin li holê û bi kurdan re dane şer kirin. Di aslê xwe de, di bin nav DAÎŞ´ê de û di hundûrê cilên DAÎŞ´ê de, leşkerên tirk û îranî hena ku li herêmê ku bi kurdan re şer dikin in. Em dema ku van hêrîşên ku li kurdan dikin, tenê wan hêrîşan bi rêxistineka ji rêzê a weke DAÎŞ´ê ku li ser mezhebîtîyê re xwe bi rêxistin kirîya re werênina ser ziman, wê rastî newê fahm bikin. "Telûkeya DAÎŞ´ê", ne telûkeya ku ji xwe re afirîya ya. Telûkeyeka ku hatîya afirandin a. Ya ku di serî de divê ku mirov bibîne û fahm bike jî ev rastî bixwe ya. Rejima tirk û rejimên din ên herêmê ên weke Îranê û hwd, dixwezin ku bi DAÎŞ´ê re ancamekê bidest bixin bi herîşên wê yên li kurdan re. Li ser wê re êdî rewşa sîyesî ji nû ve bi wê dîzayn bikin. Yanî, ev hêrîşên ku li kurdan dibin, hêrîşên stretejikî na ku li kurdan û wûcana wan ya civatî dihên kirin in.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku li ser vê rewşê û wûcana kurdan re, tirkiya tevlîbûna xwe ya li nava ´koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê´ herê kirîya. Yanî, bi wê herêkirina xwe re xwestîya pêşîya kurdan bigrê ku weke "muttefîkekî" rojava derkevina

li holê. Ji xwe, piştî gotinên weke "kurd, hevkarê rojava ên xweza na di nava koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê" û pê de, êdî tirkiya di cih de herê kir ku tevlî nava koalîsyonê bibe. **Ev tevlîbûnna tirkiya a li nava koalîsyonê ya bi vî rengî, dawîyê li têkiliyên wê ên bi DAÎŞ´ê re nayênê. Ji ber ku tirkiya, esas wûcana xwe li ser wê rewşa DAÎŞ´ê a bi hêrîşkirina li kurdan re diparêzê. Wê têkiliyên xwe ên di nava koalîsyonê de jî, di temenê ku alîkarî newê dayîn li kurdan û kurd weke ´muttefîkekî´ newina ser ziman û bahse wan newê kirin de wê bikarbêne. Ji xwe ya ku heta roja me bûya jî ev a. Tirkiya wê ´tevlîbûna xwe ya li nava koalîsyonê´, wê bo serkevtina DAÎŞ´ê li dijî kurdan bikarbêne. Wê vê têkilîya xwe ya bi koalîsyonê re jî, bike lingekî ku bi wê hêrîşên DAÎŞ´ê li dijî kurdan biserkevin û "ew derbeya ku wê dixwest ku li kurdan were xistin" êdî ku li kurdan were xistin. Bo vê yekê, tevlîbûna tirkiya li nava koalîsyonê, wê rewş û wûcana koalîsyonê jî lawaz û zayif bike. Ji ber ku tirkiya û hwd, heta ku bi destê DAÎŞ´ê derbeyekê li kurdan nexin, wê nehêlin ku DAÎŞ´ê were ji holê rakirin. Bi vê re tirkiya, çend ku di nava wê koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê de bê jî, wê hewl bide ku ew koalîsyon li dijî DAÎŞ serkevtinekê bidest nexê. Yanî, bi vî rengî, tevlîbûna tirkiya li nava koalîsyonê, ji fêdeyê zêdetîrî wê zirerê bênê bo koalîsyonê. Raste, li herêmê bi vî rengî bi rewşa xwe re dikeve wûcanak giring de. Lê tirkiya wê vê jî, di temenê li dijî kurdan de bikarbêne. Ji kaolîsyonê zêdetirî wê DAÎŞ´, ji wê wûcana tirkiya sûd bigrê bo ku derbeyek li kurdan were xistin. Ya tirkiya ji xwe re û li gorî politika û zihniyeta xwe ku di temenê dijberîya xwe ya li dijî kurdan de "rast" dibînê jî ev a.**

Bi vê re, divê ku mirov vê yekê bibêje ku şerê ku bi di bin maskeya DAÎŞ´ê de bê û ankû bi dest û rengên din bin ku bi kurdan re dihên kirin di vê demê de, aliyekî wan ê bi têkiliyên stretejikî ên li herêmê re jî heya. Li herêmê kurd, weke hêzekê derdikevina li holê. Êdî ev hêza ku li rojhilat derdikeve li holê, wê di qadaka çawa de desthilatdar bê û bi rengekê çawa, rol û weyna xwe ya stretejikî bileyizê, hinekî jî şerê vê bi kurdan re dihê kirin. Yanî, şerê wê wûcana stretejikî a kurdan bi kurdan re dihê kirin. Tirkiya heta roja me, li ser rewş û wûcana stretejikî a kurdan, xwe jîyand. Jê sûd wergirt. Hê jî, bi wê xwe dijîyênê û sûd jê werdigirê. Vêca, tirkiya naxwezê ku ji vê bi şûn ve gavê biavêje. Yanî, heta roja me, çawa ku ji kurdan xwarîya û li ser rewş û wûcana wan xwe jîyandîya, dixwezê ku ji vir û pê de jî bi heman rengî xwe bide jîyandin. ..

Di aslê xwe de, şerê ku bi kurdan re dike jî, şerê vê ya. Ji wê rewş û wûcana kurdan, heta roja me, kurdan bixwe sûd negirtîya. Ev rewş û wûcana xwe, bo xwe bikar ne hanîna. Ew gotina ku Sîmon Tisdall a di heman nivîsa wî ya ku me navê li jor hanî ser ziman de ku dibêje ku **"tirkiya di nava tevgerê de ya ku kurd, wê rewşa xwe ya giring a bi muttefekî ku ´îstîsmar´ nekin." Li vir, Sîmon Tisdall gotina "..bo ku wê wûcana xwe ya giring îstîsmar nekin" bikardihêne bi hewldanên tirkiya re. Di hundurê vê hevokê de bikarhanîna gotina "îstîsmar kirinê", divê ku mirov li ser bisekinê. Di aslê xwe de, asil zihniyet û nîyet di vir de vêşartî ya. Yanî, weke kirdeyeka vêşartî ya vê gotinê heya. Ev kirdeya vêşartî bi gotina "..bo ku wê wûcana xwe ya giring îstîsmar nekin" û bi bêjeya "îstîsmar kirinê" a di wê de ku dibuhurê dihê ser ziman. Ew jî, ew a ku ´divê ku pêşîya kurdan were girtin, ku wê wûcana xwe ya stretejikî bikar neyênin û bi wê doza maf û azadîya xwe nekin û bi wê re statûya xwe nexwezin´ a. Yanî, li vir, bi gotinaka din em bibêjin ku di gotinê de dihê gotin ku ´divê ku pêşîya kurdan werê girtin, ku kurd li ser navê xwe bi wê**

**wûcan(konum)a xwe re dîplomasîyê li ser navê xwe nekin û statûyê bidest nexin. Di çerçoveya gotinên Sîmon Tisdall de, weke ku mirov fahm dike ku tirkiya dîplomasîya vê jî dike li navendn ewropa û Emerika. Her wusa, tiştekî din jî ku mirov ji gotinên Sîmon Tisdall fahm dike, ew a ku tirkiya bo ku pêşîya kurdan bigrê tevlî nava koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê ku hatî avakirin bûya.**

Tirkiya, di vê demê de li rojhilat bi DAÎŞ´ê şerê vê zihniyeta ku Sîmon Tisdall dihêne ser ziman bi kurdan re dike. Li navendên welatên ewropî û emerika jî, weke ku Sîmon Tisdall dihêne ser ziman, dîplomasîyê dike û dixwezê ku hebûna statûya kurdan newê herêkirin bi statûyî. Di vê çerçoveyê de rewşa sîyesî a başûrê kurdistanê jî, di vê çerçoveyê de hatîya bêbandûr kirin. Tirkiya, bo vê yekê, ewqas peyman bi hikimeta başûrê kurdistanê re çêkirina, ku bi wan wê bi xwe ve girêbide. Çend kurdên başûr ên weke Nêçîrwan Berzanî ku derdikevina berçapameniyê, dibêjin ku "tirkiya hevkarê me yê stretejikî ya." Çend ku ev gotin di Awa û çerçoveya ku dihên gotin de ne rast bin jî, ji aliyekî din ve di temenê bêbandûrkirina kurdan de divê ku mirov li ser wan rawastihê. Rejima tirk, di ti astê de naxwezê ku kurd xwediyê bandûraka stretejikî bin li herêmê. Ku ev kurdên rojava bin û ankû kurdên başûr jî bin. Tirkiya, ku sîyeseta şer li dijî hebûna civate kurd bi DAÎŞ´ê dimêşêne, bi ti awayê nabê "hevkarekî stretejikî" bi kurdan re. Ji xwe, em nikarin têkiliyên rejima tirk ên bi hikimeta kurd a başûr re jî bi têkiliyên ´hevkarî´ û ankû´ ´muttefîkî´ hwd, werênina ser ziman. ..

Têkiliyên tirkiya ên bi kurdan re û bi teybetî bi hikimeta başûrê kurdistanê re, li ser du temen û tiştan ava ya. Yek, ew a ku bi wan têkilîyan pêşîya yekîtîyeka mihtemel ku di nava kurdan de çêbikin bigrê ya. Ya din jî, ew a ku di temenê bikarhanîna kurdan li gorî politikayên xwe de ya. Ev herdû alî jî, me di rojên buhurî de bi minaqên wê re dîtin. Di dema ku kurdan amedekarî dikirin bo li darxistina ´kongira netewî a kurd´, di serî de rayadarên tirk ên weke T. Ardogan dijberîya xwe li dijî wan amedekarîyên li darxistina ´kongira netewî a kurd´ hanîya ser ziman. Di rojên ku amedekarî bo li darxistina kongira netewî a kurd dihatina kirin de, T. Ardogan bixwe kurd "tehdîd" kirina. Piştî wê ´tehdîda´ wî re, Nêçîrwan berzanî çûya Anqara û piştî wê serdewan Nêçîrwan berzanî a li anqara bi du rojan re li darxistina kongira netewî a kurd´ hatîya taloqkirin li demek ne dîyar. Her wusa, di çerçoveya zihniyet û politikaya bikarhanînê de jî, weke ku çawa ku li dijî ´şoreşa rojava´ û hwd, hikimeta başûrê kurdistanê kirina pozisyonaka dijber de û hwd. Bi wê re, divê ku mirov bibêje ku bi ambargoya li rojava ku hatî pêşxistin, ev rêveberîya kurd a başûr jî tevlî wê bûya. Bi vê re, em vê jî bibêjin ku rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê ku kurdan avakiribû, ne têkiliyên hikimeta başûr bi wê re çêbûna û ne jî ew rêveberîya rojava a kurdan, ji aliyê vê rêveberîya kurd a başûr û hikimeta wê ve jî ne hat naskirin. Ji destpêka avakirina rêveberîya rojavayê kurdistanê ji sale 2012´an û heta dema pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ku di 15´ê êlûna 2014´an jî hikimeta kurd a başûr, rêveberîya kurd a rojavayê kurdistanê nas nekiribû. Di ti demên dîroka kurdan de bêrûmetîyaka bi vî rengî ne hatibû hanîn serê civate kurd. Ev rewş, rengekî teybet ê bi politikayên bikarhanînê dihênê ser ziman. Ev politikaya rejima tirk a bi bikarhanîna hikimeta kurd a başûrê kurdistanê li dijî kurdan bixwe jî, biqasî wan hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi piştgirîya wê ku li rojavayê kurdistanê û biteybetî li kobanê dibin, zirer û zîyan daye civate kurd.

Tirkiya bo ku rojava têkbibe jî dixwezê ku ´herêmek tampon´ li rojavayê kurdistanê´ ava bike. Kurd jî, dizanin ku avakirina herêmek tampon li sînorê rojava tê wateya şer bi

wan re. Ji ber vê yekê, li dijî wê jî di nava hewldanê de na. Bo vê yekê, xwestin ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê bi sed hezaran mirovan bidina goçberkirin û dîplomasîyê li ser wê goçberkirinê re bikin û weke hêncet û sedemeka çêkirina ´herêmek tampon´ wê goçberkirina ku wan bi destê xwe daye çêkirin bikarbênin. Her wusa, li ber sînorê rojava, bi teybetî, vê politikayê bikardihênin. Her wusa, tirkiya ji Emerika dixwezê ku ´oparasyonek leşkerî a bejehî´ jî li Sûrî bibe û ew di wê oparasyonê de ´aktîv´ cih bigrê û ew bikeve herêmên kurdan de. Tirkiya vê dixwezê, bo ku pêşîya statûyek mihtemel ku kurd bidest bixin bigrê. Yanî, ev xwestina wê jî, bi kurdan ve girêdayî ya. Bi dijberîya wê ya li dijî kurdan ve girêdayî ya. Ji xwe "pêvajoya çareserîyê" a li bakûrê kurdistanê jî, bi agirbesta ku PKK´ê kirîya, bo vê armancê bikardihêne. Yanî, vê jî, di temenê ku dixwezê ku bi wê derbeyekê li kurdan bixe de dixwezê ku bikarbêne. Bo vê yekê ya, ku ev du-salin ku li bakûrê kurdistanê pêvajoyek ku birêz Ocalan daye destpêkirin heya jî, ti gav neavêtina. Rêveberîya tirk, di wê de pirr bi heyîderî tevdigerihê ku gavên ku bibina temenê statûya kurd neavêje. Her wusa, bi heman rengî, gotin û gavên ku werina wateya pêşxistina statûya kurd, li derve jî ji aliyê hêzên derve jî ku bên kirin, li dijî wan helwestê dide nîşandin. Her wusa, tirkiya di vê warê de, her tur tawîzê dide bo ku gavên di temenê pêşxistina statûyek kurd de newina avêtin. Minaqe vê jî, her wusa, ew a ku bo pêşîya têkiliyek mihtemel ya wê koalîsyona ku li dijî DAÎŞ´ê ku hatî avakirin ku bi kurdan re bibe bigrê, herêkirin û ketina wê ya li nava wê koalîsyonê de mirov dikarê werêne ser ziman.

**-Piştî demekê**, çeteyên DAÎŞ´ê bi piştgirîya tirkiya ji sê aliyan ve bidest hêrîşa li ser Kobanê kirin. Kobanê ji sê aliyan ve di bin hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku tirkiya piştgirîyê dide wan de ma. Ji ber çi bi vî rengî bi şitt hêrîşî Kobanê dikin? Ji ber ku dixwezin ku kobanê bidest bixin û rojavayê kurdistanê jî di fiilîyetê de bikina du-qat. Bi wê re jî, şoreşa rojavayê kurdistanê bişikênin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku bi teybetî, tirkiya li pişt van hêrîşan heya. Dixwezê ku Kobanê bê xistin û piştre li ser wê re derbeyekê li kurdan bixin. Ku derbeyek li Kobanê were xistin, wê ew derbe li hemû kurdan bê. Wê ew derbe, weke dûbarekirina Şengalê li ser serê kurdan. Bo vê yekê, di vê demê de dîsa hêrîşî Kobanê dikin. Şoreşa rojavayê kurdistanê jî, ji Kobanê destpêkir. Bo vê yekê, ji vê aliyê ve hêrîşên li Kobanê, aliyekî wan ê din ê sembolîkî jî heya. Bi vê re jî, ku derbe li Kobanê were xistin, wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê jî, ji hin aliyna ve were ji holê rakirin. Bo vê yekê, giranî didina ser hêrîşên li ser Kobanê.

Kurd, divê ku ji her aliyê ve li dora kobanê bibina yek. Divê ku ciwanên kurd, ji bakûrê kurdistanê, biherikina Kobanê. Ji hemû beşên din ên kurdistanê divê ku ciwanên kurd biherikina Kobanê û li rûmeta xwe xwedî derkevin.Li Bakûrê kurdistanê jî, divê ku di vê demê de bi girseyî biherikina bi ber sînor ve. Divê ku ciwanên kurd, derfetê nedina derbaskirina çeteyên DAÎŞ´ê ji van aliyên sînor ve.

Her wusa, divê demê de ji nû ve ji sê aliyan ve dayîna hêrîşkirinê çeteyên DAÎŞ´ê li ser Kobanê û nîqaşên ku rejima tirk ji nû ve dane destpêkirin ên çêkirina "herêmek tampon" bi hevdû ve girêdayî na. Di destpêka Mudaheleya li Sûrî de jî, rejima tirk, planaka wê ya bi vî rengî hebû û hanîbû rojevê. Piştre, li ser bertekan, ew nîqaşên wê dabûbûn sekinandin. Lê piştre, "pêvajoya çareserîyê" hat dayîn destpêkirin li bakûrê kurdistanê. Rejima tirk, li şûna ku di wê pêvajoyê de gavan biavêje, bidest çêkirina qarakolan kir, herêmên kurdan ji nû ve bi leşkerî kir. Ev pêvajoya çareserîyê, rejima tirk

bo van tiştan bikarhanî. Yanî, bo ku di van waran de, ancamê bidest bixe, gotina "pêvajoyê" bikardihêne. Her wusa, di demeka bi vî rengî hanîna rojevê ´avakirina herêmek tampon´ divê ku mirov bi vê ve girêdayî hilde li dest. Wusa ji van pêşveçûnan dihê fahmkirin, ku rejima tirk gotina ´pêvajoyê" bi awayekî taktîkî di van temenan de îstîsmar dike û bikardihêne.

Di vê demê de hanîna rojevê ´avakirina herêma tampon´ û ji nû ve zêdebûna hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li ser Kobanê bi hevdû ve girêdayî na. Divê ku mirov van bi hevdû ve girêdayî hilde li dest. Her wusa, di temenê ´îşkal´kirina rojeva de, ji destpêkê ve hizrên rejima tirk ên weke avakirina herêma tampon hebûn. Nûha jî, di vê temenê de nêzîkî vê dibin. Di vê temenê de divê ku mirov vê jî bibêje ku bi hêrîşên li ser Kobanê re ancamê bidest bixin, wê li ser wan ancaman re temenê avakirina ´herêma tampon´ bidest bixin. Ji xwe, bo ku wê bikin û wê herêma tampon ava bikin, di vê demê de zêdeyî dane hêrîşên li ser Kobanê.

Herêmek kurdan ên weke kobanê li rojavayê kurdistanê, heta ku ji destê newina derxistin, wê zor bê ku herêmek tampon çê bikin. Bo ku temenê herêmek bi vî rengî çê bikin, ev hêrîşên bi destê DAÎŞ´ê tên zêdetirkirin li kurdan. Divê ku mirov vê yekê di serî de bibînê. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku hasabên mazin li ser xistina Kobanê hatina kirin. Kurd, divê ku vê yekê bibînin û li Kobanê xwedî derkevin. Divê ku parastina Kobanê xort bikin. Ji her aliyê ve kurdistanê ji hemû aliyan biherikina Kobanê û di parastina wê de cih bigrin. Ku KObanê bikeve, wê ev bê temenê hêrîşên nû li başûrê kurdistanê jî. Rayadarên başûrê kurdistanê jî, divê ku vê yekê bibînin.

Î ro, baxtê hemû kurdan û herêmên kurdistanê bûya yek. Li herêmekê kurd serkevin, bandûra wê li hemû beşên din xwe dide nîşandin. Her wusa hêrîşên li beşek kurdistanê jî, bandûra xwe li beşên din ên kurdistanê didina nîşandin. Ji van hêrîşên dawî ên li ser Kobanê mirov fahm dike ku hêrîşên li ser başûrê kurdistanê jî, weke planaka ku bi wê dixwezin ku hêzên kurd bo parastin û şerkirinê li qadaka berfireh bidina belavkirin û bi wê re jî, êdî bi hêrîşên şitt ên weke ku nûha li Kobanê dikin, ancamê bidest bixin. Aliyekî van hêrîşên li ser başûrê kurdistanê ê bi vî rengî heya. Yanî, hêzên ku van stretejîya şer ya bi kurdan re kifş dikin, bi taktîkên leşkerî dihizirin û van hêrîşan li herêmên kurdistanê belav dikin.

Em dikarin van hêrîşên ku ji nû ve li ser kantona Kobanê hatin zêdekirin, bi armanc û nîqaşên bi minasebeta ´avakirina herêmek tampon´ a rejima tirk ve girêdayî hildina li dest û fahm bikin. Bi hevdû ve girêdayî ya. Em nikarin ji hevdû cuda werênina ser ziman. Her wusa, ku bi van hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ên dawî ancamê bidest bixin, êdî wê di fiilîyatê de hewl bidin ku herêmek tampon biafirênin. Lê bo avakirina herêmek tampon jî, di serî de divê ku Kobanê were şikandin. Li vir, di serî de, divê ku mirov di vê temenê de van hêrîşên dawîyê ên DAÎŞ´ê ku ji sê aliyan ve dibina biser kobanê de fahm bikin.

Rejima tirk jî, li şûna ku pêvajoya çareserîyê di temenê çêkirina aşîtîyeka herêmî de pêş bixe, weke ku çawa ku agirbestên ku berê PKK´ê di denezendin weke firsand didîtin û bi wê re giranî didane ser li kurdistanê bicihkirina leşkerî, nûha jî, bi heman mantiqê pêvajoya çareserîyê jî, bi vî rengî li gorî xwe bikardihênin. Yanî, li şûna ku di vê pêvajoyê de gavan biavêje, bi vî rengî pêvajoya çareserîyê jî bo armancên xwe yên şer bikardihêne. Zihniyeta ku agirbestên berê ên PKK´ê ji xwe re weke firsand didît, î ro bi heman rengî ´pêvajoya çareserîyê jî weke firsand dibînê ku bi wê derbeyekê li kurdan

bixe. Bo ku zihniyet ev a, êdî gavan navêjin û bi gotinên mijulkirin û xapandinê pêvajoyê bi rêve dibin. Çend ku aliyê kurd, van hasabên rejima tirk dibînê jî, dixwezê ku bi tekoşînê ancamakê bo biratîya gelan ji vê pêvajoyê derxê.

**Şengal, dîrok û bawerîya kurdên êzîdî û di sadsale 21´ê de jenosîda ku hatî serê wan. ..**

Şengal, herêmeka kurdistanê a pirr kevna. Her wusa, navendeka olî û pîroz a ola êzdatîyê jî ya. Ev, herêm ji dem û sadsalên berî zayinê ji demên gûtî, hûrî û mîtannîyan û heta ku digihijê demên piştî zayîna îsa wan demên ku di wan de kurdên êzîdî ên deşnî ku lê serdest û desthilatdar in, wê weke navendeka mazin ya bi têgihiştin û pêşketî bû. Li wê, perwerdexaneyên mazin hebûn. Dema ku em em li çîrokên kurdan jî dinerin, em navê şengalê di bihîzîn. Di çîrokeka keçelok de, navên weke navên ´Mîr badê şengalî´, ´Mîr birehimê şikilê xorasanî´ û hwd di buhurê. Bi heman rengî, weke keremetekê bahse ´"axiftina Mîr birehimê şikilî ku bi xezalê re diaxivê" dihê kirin. Di vegotinê de dihê gotin ku pêşîyên Mîr birehim, "ji male nebîyan bûna." Lê dem bi ser ve çûya û wî xwe ji bîrkirîya. Piştre xezal bi wî re diaxivê û rastîya wî bi wî û mejûya bavûkalkên wî biwî dide fahm kirin." Lê Mîr badê şengalî çendî û çawa bûya û pêşengîyeka çawa kirîya, zêde di derbarê wê de zanîn di dest de tûna na. Tenê, navê wî hatîya guhan di nava wan çîrokan de.

Lê çend ku mîr badê şengalî ku di derbarî wî û dema wî de zêde zanîn di destê me de tûna na jî, di wê çîroka keçelok de, dema ku bahse wî û dema wî dihê kirin, bi awayekî ku mirov ji wê acêbmayî bahse wî dihê kirin. Dihê gotin ku "dema ku Mîr badê şengalî tê serdane mîrê bota, li ser çil(40) haspî tişî dîyarî dike û bar dike û bi xwe re tînê ji mîrê bota re." Mîrovekî ku li ser çil haspî tişî dîyarî bike û weke dîyarî bêne, ji mîrekî weke xwe mîr re, ku em ji vê gavê biavêjin û rewşa wî şîrove bikin, divê ku em bibêjin ku divê ku xwediyê rewşeka pirr xweş bê.

De ne, dema ku em bahse çîrokan bikin, divê ku em bi awayekî mazin bahsê bikin. Çîrok, navarok, nirx û hilma xwe ya navxweyî ji nava wê civate xwe ya ku ji wê afirîya

dihilêne û diafirêne. Ku rewşeka wusa nebûba, wê di wê çîroka keçelok de, wusa mazin bahse rewşa mîr badê şengalî ne hatiba kirin. Ev çîrok, bi teybetî li herême me ya botanê dihên vegotin. Dema ku bahse wê herêma şengalê dihê kirin, di heman çîroka keçelok de û di hinek çîrokên keçelok de, dihat gotin ku "heeyyy, ew çîyayê şengalê ..." bi vê gotinê bahse wê dihat kirin û êdî ji wê bidest hanîna ser ziman dihat kirin. Ev rewş, hinekî rewşên civatî ên wê demê bi xwe re bi me dide têgihiştin kirin.

Dema ku em li van vegotinên civatî ên ku î ro em weke çîrokan li wan dihisênin, em rengekî û awayekî pêşketina civatî lê dinerin û dibînin. Şengal, ji wê rewşa ku bi wê û navê wê re ku tenê di wan çîrokan de dihê ser ziman jî, mirov fahm dike ku xwediyê rewşeka pirr xweşîk û pêşketî ya. Şengal, heta ku dem dihê dema kurdên deşnîyan jî, em dibînin ku xwediyê pêşketinaka mazin ku ji xwe dide bahskirin a.

Rewş û heyîna rastîya jîyane li şengalê, dema ku bahse wê li herêma botanê dihê kirin, weke wê rewş û jîyane pêşketî a di demên berê de ku li herêma botanê ku li ber diclê hebû, dihat vegotin. Bi heman rengî, ew çîrokên ku min navê wan hanî ser ziman jî, di wan de jî bi heman rengî pêşketî jê bahs dihat kirin û dihat ser ziman. Ji wê rewşê û rengê vegotinê mirov fahm dike ku rewşeka perwerdekirinê ya pêşketî li wir hebûya. Ev yek, bi awayekî pirr zêde mazin dihê ser ziman. Ji vê yekê jî, ti carî gûmana me tûna ya.

Li herêmê, em dema ku li dîroka herêmê û awayê pêşketina herêmê dinerin, em dibînin ku wê piştî deşnîyan re, wê hin bi hin berjêrbûnek wê bibe. Ev jî, divê ku em bi teybetî bi sedemên wê re li ser bihizirin û fahm bikin. Li wir, bi rastî jî, em dema ku li mejûya wê dinerîn, bi rengî ku bûya navarok û mijar ji çîrokên civatê re xwediyê pêşketinekê û jîyaneka pêşketî a bi xaml û şamal bûya. Em di serî de, vê aliyê şengalê werênina ser ziman. Divê ku ev aliyê were ditin. Ev rengê jîyane wê ya ku li wir heyî, ku em wê kifşnekin û baş fahm nekin, emê nikaribin wê rengê ronasanse wê jî werênina ser ziman.

Em divê ku vê yekê jî bibêjin ku wê piştî deşnîyan re, bi hatina Şêx Adî re wê weke ku ji nû ve bûyîneka nû wê li Şengalê weke demên berê wê rû bide. Şêx Adî, ew rastîya wê herêmê a dîrokî jî zanî ya. Baş fahm kiriya. Rengê jîyane wê û pêşketina wê pirr baş fahm kiriya.

Li herêmê, bi teybetî, ew rewşe perwerdekirinê û herêm weke perwerdexaneyekê karkirîya, em dibînin ku li şengalê pêşketî hebûya. Bi wê re, êdî temenê jîyaneka bizanebûn li herêmê pêşketîya. Di aslê xwe de li şengalê, ku heta roja me jî, ev rewşa wê ya pêşketî ku bi navê laleşê re heta roja me bi awayekî pêşketî heta roja me hatîya, di temenê wê de ev rewşên pêşketî ên demên berê hena. Pêşveçûnên bi têgihiştinî ku di demên berê de ku bûna, bi xwe re qalibên jîyanê afirandina. Mirovan jî, jîyane xwe di nava wan qaliban de domandîya. Ev, ku bi navê kevneşopîyê bê û hwd, bûya. Lê divê ku em bibêjin ku çerçoveyeka jîyanî ku li herêmê bigiştî xwedî bandûr û heyîn bûya li wir pêşketîya.

Herêma Şengalê, hinekî jî, ku hemû zaneyên olî û hwd, ku kiriya qastî wir bikin û ewder ji wan re kiriya navend, ew herêm û nirxên wê ên mejûyî ku li wir bi jîyanî xwe hebûna bûna. Minaq, laleşa nûranî li wir a. Her wusa, divê ku mirov vê yekê bibêje ku laleşa nûranî berî zayîna îsa jî, em dibînin ku bi bandûra wê re hebûya. Tenê ku em mînaqekê bidin, ew ava pîroz ku di hundurê laleşê de di herikê, di hemû bawerîyên ku piştî wê re afirîna û pêşketina, di wan de bicih bûya. Ew ava pîroz a li laleşê, di demên

berî zayinê de di nava bawerîya Mîtra û Zerdeşt bi navê "ava kansavê" hatîya bi navkirin. Piştre, ku Îslemiyet jî hatîya, heman navê ku êzdayîyan bikarhanîya, hildane û bikarhanîna û gotina "ava kewserê" bikarhanîna. Lê ev gotin, hemû jî, gotinên xate êzdayîyê na. BI heman rengî, di ola mesihiyê de jî bi rengî "waftizkirinê" û hwd, bicih bûya. Bi heman rengî em dikarin bo cihûtîyê jî bibêjin.

Lê ev çanda êzdayîyê, bandûra wê pirr zêde hebûya. Ava pîroz, weke ku di êzdatîyê de dihê bawerkirin û gotin ku "ava yekane, ku ji bihûştê diharikê li dûnyê ya." Di tefsîrkirina wê ya di mîtratîyê de jî, dihê gotin ku "mîtra rojekê çû nêçîrê. di wê dema ku çû nêçîrê, dît ku wa xezalek derket ber wî. Wî tîrek xist kavane xwe ku bi avêje wê. Lê mîtra, bi xezalê re çav bi çav tê û piştre mîtra dilê wî nahêle ku ew tîrê biavêje xezalê û êdî ew tîra xwe diavêje kevirekî. Dema ku tîrê wî li kevir dikeve, wê kevir ji nêvî ve biqalişê û wê ji wê qalişîna kevir av bidest herikînê bike." Ev av jî, weke "avaka pîroz ku ji bihûşta yazdanê mazin ku diharikê" dihê bi navkirin. Mîtran(oldarên ola Mîtra navê wan "metran" in.), ev rewşa mîtra ya bi avêtina wî ya tîr û li kevir xistinê û qalişîna kevir, bi rengekî hatîya tefsîrkirin ku mîtra li ber kevir sekinîya û av ji w qalişîna kevir diharikê û û çend mirovên bi wî re ku weke oldarên wî jî dihên binavkirin destê xwe bikûlm dane beravê û tişî av dikin û dikin ku bi wê rengê bikûlmê avê vexwûn. Bi vê rengî, ew rengê avê dihê tefsîrkirin. Mîtra bixwe jî, bawermendekî Melekê Tawis a. ..

Di vê temenê de, em dibînin ku rewşa êzdayîyê, em dibînin ku di vê dema hûrî û mîtannîyan de, pirr zêde pêşketî û serdest a. Nirxên laleşî jî, di wê demê de pirr zêde û pêşketî hena. Î ro, di destê me bineter hena ku em dikarin bibêjin ku gotina "laleşê" di dema hûrî û mîtannîyan bi serdestî û pêşketî heya. Ev rewş hemû, didina nîşandin ku êzdayî demeka ronasanse li herêmê pirr zêde mazin daye jînkirin. Mirovekî ku hinekî dîrok lêkolînkiribê û xwandibê, wê nikaribê ronasanse şengalê li herêmê înkar bike. Lê wê dîrok û xwandina dîrokê jî, bi me bide têgihiştin û fahm kirin ku ew ronasanse wê hatîya ji holê rakirin. Li ber wê û li dijî wê şerek hatîya meşandin.

Î ro, dema ku em vê kifş dikin, ku rewş ev a, êdî ji vê xalê û pê de, ya ku dikeve ser milê me de ku em wê ronasanse li gorî gîyane wê û bi gîyane wê re kifş bikin û werênina ser ziman û cardin bidina jînkirin. Li herêmê û bi teybetî civate kurd û kurdistanê, pêwîstîya wê bi wê kifşkirina ronasanse Şengalê û ji nû ve jîyankirina wê pê heya. Ev jî, wê bê aliyek ku temenê pêşketina civatî li ser kok û hîmê wê bide rûnandin û bide domandin. ..

Li kurdistanê, bi teybetî xate êzdayî, bi teybetî ku dîroka wê bi awayekî rast ku li gorî wê were nivîsandin, wê bi wê re were ditin ku ew xate êzdayî temenê ronasanse hemdem a li herêmê jî ya. Weke Mîtra piştî wî re Zerdeşt jî, li ser wê xate êzdayîyê hatîya û çûya. temenê wî û pêşketina wî li ser wê xatê ya. Gotina ´yazdan´, li vir, divê ku em weke gotinaka bi pergale ya bi têgihiştin ku li herêmê temenê pêşketinaka bi ronasansî bûya.

Li vir, di vê çerçoveyê de ku li şengalê, dibistan û zanko û hwd, werina vekirin, wê di destpêkê de, du tiştan pêşî bikin. Yekê, wê wê dîrokê û xatê ji nû ve bifahm bikin û êdî bênina ser ziman. Ya duyem jî, wê rengê jîyane wê ya berê li ser wê xatê wê kifş bike. Bi wê re jî, wê bi wê re êdî temenê pêşketina dema xwe û ya dema nû bide çêkirin û afirandin. Dema ku em bahse ronasanse şengalê dikin, em temenê vê gotinê li ser pêşketina jîyana civatî û bitêgihiştinkiirn û bi zanebûn pêşxistina rewşenbîrîya wê

didênin. Ev weke aliyekî vê gotinê ê herî giring û binirx a. Temenê vê gotina ronasanse şengalê, ji dema gûtî, hûrî û mîtannîyan ve hetîya û pêşketîya. Em vê yekê, divê ku di serî de fahm bikin.

Dema ku di sadsale 15´min a piştî zayîna îsa de ku ronasanse ewropa pêşket, wê ji bajarên Îtalya ên weke Filoranse ku wê hin bi hin bi perwerdekirinê wê pêşbikevin. Bi wê re jî wê hin bi hin dîroka roma û bi wê re jî, dîroka herêmên din wê binivîsênin û bixwênin. Ev jî, wê hin bi hin, temenê wan ê pêşketinê biafirêne. Piştî ku mirovan, ew pêşketinên demên berê pirr başû zêde hanîn ser ziman, êdîî ji wê bi mejiyê xwe têr bûn. Bi wê re jî, êdî hizrên nû bidest afirandinê kirin. Ev jî, êdî wê bê temenê pêşketina demên aqil ên piştî wê demê re ku li ewropa pêş dikevin. Ev, êdî wê bi xwe re demên nû ên pêşketinê li dûv hevdû bêne. ..

Li kurdistanê, bi teybetî, demeka bi wê rengî li herêma botanê li ber diclê li cizira bota hat û jîyankir. Bi teybetî, ji sadsalên berê û heta dema sadsale 15´min, wê bi vê rengî, pêşketinaka mazin bê û bibe. Medreseya Sor, ku heta roja me bi nav û deng bahse wê dihê kirin, weke berhema klasîk a wê demê ya ku di wê de perwerdekirina demê a bi aqil dibû bû. Weke wê, gelek medreseyên din jî hebûn. Lê teybetmendya vê medreseyê wilqasî bi navê wê re derket li pêş, ew bû ku ji ber ku di dema xwe de bi aqil û felsefe perwerdekirineka pêşketî dide kirin. Êdî, herkesekî jî, ew rewş bi wê re farq kir û piştre zaroyên xwe û ankû ku mazin û bizane û an jî kû alim bin, wê bixwe çûban wir û bi salan maban û jê zanebûn fêr bûban. Ev rewş, rewşên pêşketina bi aqil in. Her wusa, di pêşketina jîyane civate û pêşveçûna wê de jî, ev rewş mejûyî na.

Em, dema ku li şengalê bixwe dihizirin û li mejûya wê dinerin, em dibînin ku heta dema Şêx Adî jî û piştî wî re heta dema Şêx Faxrê Adîyanî bixwe jî, em dibînin ku rewşeka dibistanî a pirr zêde pêşketî hê jî li wê herêmê heya. Ev bi serê xwe rewşeka teybet bi me re bi têgihiştin dike. Dema ku em li rewşa wan zaneyên wê demê dinerin ku ew di kîjan rewşan de hatina û jîya na, ku em li ser wê dihizirin, em bi jîyane wan re rastî rewşeka bi vî rengî tên. Li vir, berî hertiştî divê ku em bi zanebûnê û dîrok û felsefeyê re wê rewşê bênina ser ziman. Li herêmê, bi teybetî, pêwîstî bi pêşketinaka mazin ya bi aqadamikî a bi felsefê heya. Bi aqil û ankû felsefê xwe fahm kirin û naskirin, wê berî hertiştî temenê wê pêşketina ku ew di pêşaroja xwe de bijî jî bê. Ev yek, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Zaneyên herêmê, divê ku êdî li herêma xwe weke ku li rastîya xwe vegerihin, divê ku vegerihin. Divê ku herêmê, bi teybetî, zanebûna xwe bênina ser ziman. Li herêmê û bi teybetî li herêma şengalê, zanîngeh û rojnemeyê rojane û pirtûkxaneye civatî a herêmê, weke karên pêşî ku divê ku werina kirin bin ku divê ku bikin.

Li herêmê, heta nûha, bo pêşxistin û pêşketin ti ramedan ne hatina kirin. Ya ku di vê demê de bi zanebûnê re ku divê ku werê kirin divê ku ev bê. Zanebûn, wê temenê pêşketina pêşarojê bê.

**- Bi teybetî**, ji herêma Şengalê û heta herêmên kerkek, Musil, tûsxûrmatû û her wusa şahrîzor û hwd, di qadaka mazin de, bi teybetî di dema Medîya de pêşketinaka mazin pêşketibû. Herêmên rojhilatê kurdistanê ên weke kirmaşan, aqbatan, Ûrmîya û hwd, di wê demê de jî weke herêmna navend bûn. Her wusa, ji van herêman û heta ku digihişt herêmên weke şengalê, Musil û şahrîzor û hwd, weke di nava şariştanîyaka pêşketî de gerîn bû. Berî zayîna Îsa, ku navenda wê hewlêr bû, keyanîya kurdistanî a keyanîya hezewanê(keyanîya hezewanê, bi navê "Adîbanê" jî dihê bi navkirin) li wê herêmê

serdest bûya. Di wê demê de, serdestîya êzdayîyan mazin hebûya. Di wê demê de, bawerîyên din ên ku pêşketina karîna ku xwe li wê herêmê bijîn. Zerdeştî, piştî dema Medîya û pêde, wê pêşketina xwe dem bi dem êdî bijî li herêmê. Her wusa, divê ku em bibêjin ku wê temenê vê demê li ser temenê xate yazdanîyê bê.

Demên piştî zayinê jî, wê li herêmê pêşveçûnên mazin bibin. Li rojhilatê kurdistanê ku êdî hin bi hin hersanî(yarsanî) pêş dikevin hena. Ew jî, bi rengê bawerîya xwe re çend ku di temen û rengekî cuda de pêşketina xwe dijîn jî, lê wê di esasê xwe de temenê wan li ser xate yazdanîyê û melekê Tawis bê. Wek wan, Manîkî, hûremî, mezdekî û hwd pêş dikevin. Li vir, divê ku em vê yekê bibêjin ku em bi awayekî vekirî dibînin ku di wê demê de ku weke nirxek û navendek û olî şengal ku di temenê wê de ya, pêşketina vê xatê heta herêma xorasanê wê pirr zêde pêşketin, pêşveçûn û serdestbûn heya. Em vê yekê dibînin. Heta ku em di dema Şêx Adî bixwe de jî dibînin ku piştî ku Şêx Adî, derket li holê û weke pêxemberekî ji wî re wahî hat, êdî ew wê li vê qadê bigerihê. Wê herê herêma xorasanê jî. Di vê çerçoveyê de û di çerçoveya gera Şêx Adî de gelek vegotin li ser ger û geşta şêx Adî a li herêmê dihên vegotin. BI teybetî, di nava gotin û qawlên êzdayîyê de jî di derbarê ger û geşta Şêx Adî a li herêma xorasanê û hwd b, vegotin hena. Heta ku ne tenê bi olî û pîrozî, her wusa di nava vegotin û çîrokên gelê kurd de jî, bahse wê gera nirxê mazin şêx Adî dihê kirin.

Li herêmê, pêşveçûnên ku hena, divê ku em di çerçoveya rastiyên wan de fahm bikin. Bi rastî jî, herêma Şengalê, bandûraka wê ya teybet heya. Herêma Şangalê, di demên berî zayinê de, biqasî ku em fahm bikin, ku herêmek avî jî ya. Î ro ku ew çem û geştên ku hinekî weke ku kêmbûna û ankû ji holê rabûna jî, lê di wan demên berê de hebûya. Bi wê yekê, rengê jîyane wê pirr bi reng û pêşketî ya. Ev yekê, bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa, em dibînin ku pirr bizanebûna jî. Têgihiştinaka mazin ya pirr kevn li herêmê afirîya û pêşketîya. Bo vê yekê, zane û oldarên demê ên ku derdikevin ên li herêmê, bi awayekî xwe gihandina şengalê û laleşê. Em nikarin bêjin ku Manî bixwe jî, xwe ne gihandîya wir. Li herêmê wê şengal, bi teybetî nirxên wê yên ku di wê de na ên weke laleşê bixwe jî, kirina ku zaneyên herêmê werina wir û wir bibînin. Di wan deman de, oldaran, zanebûn pêşdixist.

Li vir, dixwezin ku vê yekê jî bibêjin ku dema ku mirov ´destana gilgamêş´ dixwêne, em dibîbînin ku gilgamêş, dikeve rê de û diçê ku herê û xwe bigihihêne nepenîya jîyana nemir. Li wir, di dawîya destana gilgamêş de, dihê gotin ku ew dihê û xwe digihne ûtnapîiştim ku li deverekê ku ´yazdan ji wî re bi teybetî çêkirîya û ku ew li wê ya û dijî ya´. Li wir, dihê gotin ku "avek diharikê û ew av teybet a û nepenîya jîyane nemirîyê bi wê re dihê ser ziman. Li vir, gotinaka din ya pirr bale me dikişêne ku ew a ku "marek, li wir çavdêrvaniyê dike." Bi teybetî, marê reş, di nava têgihiştina xate êzdayîyê de binirx dihê ser ziman. Hinekî jî, pîrozî jî bi wê dihê baxş kirin. Di vê temenê de, ew pîrozîya ku li mar hatîya kirin di vê xatê de, mirov dikarê bi tefsîr û naqşaya ´şahmaran´ fahm bikin. Şahmaran, di nava çanda kurdan de, weke nirxeka pîroz a bingihîn a jî. Bi teybetî, dinava jîyane civatî û pêşketina wê ya di nava kurdan de hebûna nirxa şahmaran giring û wateya wê mazin a. Em nikarin wê hevgirtin(sentez)a ku bi tefsîrkirina laşê şahmaran re ku hatîya kirin û çêkirin, ji wê nirxê dûr werênina ser ziman. Di wê hevgirtin(sentez)a laşê şahmaran de, mar, jin, rengên weke keskûsorûzer û hwd hena. Ev nirx û rewş, hemû rewşên ku di nava xate pêşketina yazdanîyê û ankû êzdayîyê de ên ku pîroz in. Weke ku bê xwestin ku hemû

pîrozîyên ku hena û li berçav in bi hev ve bikin û ji wan nirx û pîrozîyaka mazin ya mayînda li jîyanê were çêkirin. Em temenê wê gotina "mayîndatiyê" jî di temenê jîyane şahmaran de ku bi wê û bi navê wê re dihê ser ziman re dibînin. Minaq, tê gotin ku "Şahmaran, deh hezar salî jîya ya."

Di nava çanda êzdayîyê de, bi teybetî, di demên wê ên serdest de, di demên gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd de, em dibînin ku jin hebûna wê weke nirxeka pîroz a. Ev pîrozîya ku bi navê jinê re dihê ser ziman, di nava hizrên zerdeşt de jî hatîya ser ziman. Em bi teybetî, em dibînin ku ew pîrozya jinê, di nava çand û bawerîya Manî û bawermendên wî bixwe de jî bi awayekî vekirî bicih bûya û derketîya li holê. Ev mijare pîrozîya jinê, wê piştre, bê mijareka ku di wê temenê de pirr ser werê sekin a. Ji ber ku jin, bi wê nirxbûna xwe di nava civate xwe de serdest a, wê gotina wê hertimî mazin ba. Wê çê bigota û di derbarê jîyane xwe de çê bigota, wê weke wê û gotina wê bihata kirin. Ev rewşa serdestîya jinê wê heta dema ku di wê de îslemiyet derdikeve jî wê hebe. Wê piştî wê re jî, hinekî xwe bide domandin. Minaq, dema ku xalîfê abasî ku weke ku bi derbeyeka di hundurê qasrê de hatibê ser taxt Muttasîm, hêzên xwe dide hêrîşkirin li ser herêma xorasanê de. Çend ku hêzên wî hêrîşî wê herêmê dikin bi sernakevin. Di dawîyê de li rêyên têkbirina xorasanîyan digerihin. Di dawiyê de rêya dibînin, li ser wê rewşa serdestîya jinê re ya. Piştre xalîfe bi rêya çend melayên xwe di nava xalkê de di gotin ku "dema ku win çûna devê deriyekê ku kûmek bi devê deriyê malê ve dalaqandî bê, wê hingî bizanibin ku yek bi jina malê re di nava nivînan de ya." Ev rewş, wê d nava hemû beşên civate kurd de û bawerîyên wê de, bê sedema ´înfîalê´.

Di aslê xwe de, ev rewş û hinek rewşên din, wê zêdetirî bandûra wan li rewşa jîyane jinê û serdestîya wê ya di nava civate de bê. JIn, wê ji van gotinan xwe bi şûn ve bide kişandin. Ev jî, li gorî şert û mercên demê dihê û dibê. Piştre jî, wê hin bi hin, rewşa jîyane jinê a bi pîrozîya wê re ku di xate yazdaniyê de hebûya wê bi şûn bikeve. Ew bi şûnketin, wê weke derbeyeka mazin ya dîrokî li jîyane civate kurd jî bê. Ji ber ku di nava jîyane civate kurd de, ji hemû reng û pêşketinên din ên civatî cudatir, rengekî pêşketina civatî a civate kurd hebû ku di wê de jin serdest bû. Piştre, ev hin bi hin bin dikeve. Lê wê li şûna wê çawa pêşketin were pêşxistin û jînkirin jî, ew jî bi tememî nayê zanîn. Bi wê re êdî weke ku bûhran û tengezerîyaka civatî jî wê ev rewş di nava civate kurd de derkeve li holê.

Rewşa pêşketina jîyane civatî a li herêmê ku em lê dinerin, em dibînin ku hemû bi hevdû re di ahangekê de pêş dikeve.Ji pêşketina Mîtra û Zerdeşt bigra û heta ku digihijê ya Manî û hwd, di vê temenê de ya. Ev hemû pêşketinên vê xatê ên teybet û serdemî na.

Bi teybetî, em dibînin ku berî hatina îslemiyetê, li herêmê çand û bawerîyên weke ên Zerdeştîtî û Manîtîyê û hwd, lê serdest in. Bi wê re jî, pêşveçûnên herêmkî ên li herêmê jî hena. Pêşketina yarsanîtîyê û hwd, yek ji wan pêşketin û nirxên herêmî ya. Lê ev pêşveçûn û pêşketin hemû jî, divê ku em di çerçoveya xate êzdayîyê de hildina li dest li ser temenê gotina ´yazdan´. .. Ya ku temenê van pêşveçûnan afirand jî, gotina ´yazdan´ a. Piştî ku îslemiyet pêşket, êdî ew qada ku ev bawerîya yazdanî lê serdest a, ji xwe re kir armanc û çûyê de. Li herêmê seferên ku hena, wê ser dusad salî re li herêmê bi şerên ku bi xalkên herêmê re dihê kirin re wê bidomê. Di ancama wan şeran de, wê herêm binkeve. Ji destpêka hatina îslemyetê de, piştî ku Hz. Mihemed çû berdilovaniya xwe, êdî mirovên ku piştî re hatina li ser serê rêveberîya îslemiyetê,

têgihiştina ´fetihkirinê´ pêşxistin û di çerçoveyê de pêşî xalk û bawerîyên li herêmê hatina fetihkirin. Piştre jî, çûyina li derve bûya. Ev şerên ji destpêka îslemiyetê ku li van herêman xwe didina domandin, wê ser dusad salî re li herêmê bidom in. Nakokîyên ku berê desthilatdarîya Sasanîyan di wê xate yazdaniyê de li ser Zerdeştîtîyê re ku derxistina, wê bina temenê qatkirina herêmê bixwe jî. Di aslê xwe de, kuştina Manî, wê di ancama wan nakokîyên ku rêveberîya sasanîyan derxistin de wê bibin.

Li herêmê, sasanîyan di dema xwe de, xwestin ku li gorî demê li ser Zerdeştîyê û nirxên di temenê wê de ku hena, li ser wan re ji xwe re ´nasnema´yekê bide çê kirin.. Û da çêkirin jî. Lê piştre, hemû tişt û rengên bawerîyê bi navê zerdeştîtîyê bi navê xwe re hanî ser ziman. Yanî, Zerdeştîtî kir olek serdestî ya desthilatdaran. Manî, ev rastî dît. Manîtî, çend ku wê hinekî bandûra wê serdestîtîyê li wê jî bibê jî, lê wê bibêje ku zerdeştî ji koka xwe dûrketîya. ya rastî çîya bi koka wê re wê dihêne ser ziman. Ev rastî, wê bikin ku Manî, weke rengekî olî ku hinekî serdest û hinekî jî ji nava xalkê û hwd, wê derkeve li holê. Manî, wê bixwezê ku wê têkiliya di nava serdest û desthilatdar û mirovên ji rêzê ên nava xalkê çî ya, wê bixwezê ku ahangekê di nava wan de çê bike. Bi vê yekê, di rengekî xalkkirinê de, bi awayekî xwûnûkirinî(reformî) wê Manîtî hin bi hin pêş bikeve. Dema ku desthilatdarîya sasanîyan wê rengê pêşketina Manî û bawerîya wî dibînin û dibînin ku xalk ji binî ve serdest dibînin û êdî wê hêza wan ya serdestîyê ya weke ku ew dixwezin wê kêm bibe, êdî Manî û bawerîya wî "weke telûkeyekê" dibînin û diçina bi ser wî û bawermendên Manî de. Ev çûyina bi ser Manî û bawermendên Manî de, wê biawayekî vekirî bandûra wê li êzdayîyan hemûyan bibe. Ji ber ku desthilatdarîya sasanîyan, hemû êzdayîyan jî, bi wê minasebetê dide berxwe û diçê bi ser wan de.

Ev rengê hizre Manî, wê piştî wî re Mazdek bi civaknasîyeka xalkî û civatî werêne ser ziman. Mazdek, wê balê bikişêne ser "xizanî" û "faqirîyê" û hwd. Bi wê re, wê balê bikişêne, li ser rewşa mirovên dewlemend û xizan ku afirîya. Wê Mazdek, rexneyên xwe li wê rewşê bigrê. Wê wekhevîyê di nava jîyanê de biparêzê. Bi vê rengê wê Mazdek, wê civaknasîyeka civatî a demî ku em dikarin bi aqilmendîyeka pêşketî bênina ser ziman, wê bêne ser ziman. Heta ku Mazdek, wê di dema xwe de, tevgerekê jî bide destpêkirin li dijî şahê Sasanî ê demê Kawê. Wê bikevina qasra kawê de û wî ji taxt bikin û wî bikina zindanê de û wê Mazdek li ser taxt rûnihê. Lê ji ber ne bi rêxistinbûna wan, wê piştre kawê rêyekê bibîne û ji zindanê bi ravê û wê hêzekê biafirêne û hêrîş qasrê bike û cardin desthilatdarîya xwe bidest bixe. Ev rewş û çûn û hatinên di nava desthilatdarîyê de, hinekî jî, nîşanaka du tiştan in. Yek, ew a ku nîşanaka ku aqilekî pêşketî êdî pêşketîya û heya û bi aqilê xwe dibînin a. Ya duyemin jî, rêveberîya ku heya nikarin li gorî wê pêşketina ku heya bersivê bidina xwestekên xalkê ên demê. Ev jî, dibê sedema raperîn û nexeşîyan û hwd. Desthilatdaran, rengên pêşketinên ku hena kirina bin kontrolê de û derfeta pêşketinê nadina wan. Lê ew hizrên nû û rengê bawerîya nû jî dixwezê ku pêş bikeve. Manî nimînêrê wê ya. Tevgera Manî, têr nekirîya ku rêxistiniyeka xort û maziina ku karibê bersivê bide demê pêş bixin. Vê rewşê jî, xwe weke valahiyekê daye li der. Piştî ku Îslemiyet hat, êdî îslemiyetê ew valahî dît û êdî xwest ku li gorî wê valahiyê tişî bike. Ya ku li herêmê bû temenê serdestbûna wê jî ev bûya.

PIştî ku îslemiyet hat jî, wê xate yazdaniyê xwe domand. Lê pirr jî binket. Hêrîşên mazin lê bûn. Zaneyên wê xatê yan xwe ne hanîn ser ziman û yan jî, dema ku xwe hanîn

ser ziman, ne bi navê wê xatê û yazdanê mazin hanîn ser ziman.. Ev rewş jî, ji aliyekî din ve, kir ku pêşketina li herêmê weke çîreyeka ku fitîla wê were kişandin li hundur û rohnîya wê kêm bibe lê hat.

Aliyekî din ê ku em dikarin li vir, weke temenê gotina ronasanse Şengalê werênina ser ziman, ew a ku zaneyên wê herêmê êdî bi awayekî vekirî bi navê yazdanê mazin xwe û hizrên xwe û her wusa rewşenbîrîya xwe werênina ser ziman. Bi wê re jî, êdî li wê herêmê, perwerdexaneyên xwe ava bikin, dibistan û zankoya xwe ya li herêmê ava bikin û pirr giraniyê bidina li ser wê ku pêşbixin. Ya ku wê weke aliyekê giring ê pêşketina civatî jî bê wê ev bê. Dema ku rengê jîyane herêma ku li gorî nirx, çand û dîroka wê û hwd a, ku newê parastin wê mirov nikaribê bibêje ku wê pêşketina şengalê jî ji tûnabûnê were xilaskirin. Di temenê hemû pêşketinan de, rengê jîyanî ê li gorî rastîya civatê bi giringî heya. Ev bergirên ku werina kirin bi xwandin û nivîsandin û hwd, wê pêşî parastina wê rengê jîyanê ê li herêmê ji xwe re bike armanc. Bi wê re jî, wê êdî hin bi hin li gorî wê hanîna li ser ziman a bi rewşenbîrî û hwd, bibe. Bi wê yekê re, di serî de, di vê demê de pirr giring a ku weke bergira pêşî ya sereka ku li herêmê pirtûkxaneyeka giştî a civatî, zankoyek û rojnemeyek rojane ku werê derxistin a. Bi wê re jî, dibistanên xwandinê bi zimanê gelê herêmê bo zaro û ciwanan werina avakirin. ...

Pêşketin û ronasanse Şengalê, ku em ji kîjan aliyê ve lê binerin, bo pêşketina û ronasanse kurdistanê û bigiştî a rojhilat jî wê wateyeka wê ya bipêşengî a giring wê hebe. Temenê vê pêşketinê bi mejûyya wê re heya. Li vir, divê ku em bi teybetî, vê rastîyê bibînin. Ronasanse şengalê ronasanse kurdistanê giştî jî ya. Ronasanse Kurdistanê jî, ronasanse rojhilat û xalak û mejûya wê ya. Bêgûman, pêşketina şengalê û nirxên wê, wê bo civate kurd hin wateyên wê ên din ên teybet jî wê hebin. Wê xate pêşketina civate di serî de dêne li ser temenê wê û bide domandin bi ber pêşarojê de. Di serî de, divê ku em kifş bikin ku pêşwîstî û pêdîvîya civate kurd giştî bi wê pêşketina şengalê heya. Di serî û her wusa dawiyê jî de, divê ku em vê yekê kifş bikin û bênina ser ziman.

**- Ev demeka** ku di roja kurdên me yên êzîdî de jî mijare yekîtîyê heya û dihê nîqaşkirin. Lê mixabin, heta vê kêlîkê di vê warê de jî ti gavên li berçav hê ne hatina li berçav. Ev mijare pêşketina kurdên êzîdî pirr mijareka pirr kûr a. Êzê di rojên pêş de, bi teybetî li ser vê mijarê çend nivîsên dirêj binivîsênim. Lê li vir, di serî de ezê li vir, li ser rewşa kurdên êzîdî ên herêma şengalê bisekin im. Herêma Şengalê, weke herêmeka giring û binirx a kurdên êzîdî ya. Her wusa, divê ku em bibêjin laleşa nûranî jî li wir a. Ev herêm, weke herêmek mazin a jî.

Heta roja me, ne zaneyên kurdên me ên êzîdî û ne jî ên ne êzîdî ev mijar û pirsgirêkên kurdên êzîdî ne hildane rojeve xwe. Nûha, li herêma şengalê, ji pirsgirêka perwerde bigrê û heta ku digiijê pirsgirêkên din ên jîyanî ên ciwanî û hwd jî, hena. Berî nûha, çend nûçe jî ji herêmê hatina ku çend jinên ciwan bidestê xwe dawî li jîyane xwe hanî na. Her wusa, divê ku em bibêjin ku gelek hêrîşên ku li herêmên kurdên êzîdî bûna hena ji aliyê komên tundrew ku her roj li deverekê taqînekê dikin.

Ev demeka ku li bakûrê kurdistanê jî bê û li başûrê kurdistanê bê û her wusa li rojavayê kurdistanê jî bê, şahî û pîrozbahiyên ragihadina xweserîya rojavayê kurdistanê hena û dihên kirin. Heta vê kêlîkê jî, ew pîrozbahî dihên kirin. Nûha, ku em di çerçoveya gotina xweserîyê lê binerin, divê ku em bibêjin ku bi teybetî, herêma şengalê ku herêma tûsxûrmatû jî di nav de, divîyabû ku xweserîya wê bi heta denezendin. Ev

herêm, weke herêmeka kurdistanî, heta roja me, li ser pirsgirêkên wê serî hatiba wastandin.

LI herêma şengalê, bo pirsgirêkên xwe yên rêvebirinê û ewlakarî û aramiyê jî bê, divê ku rêveberîya herêma şengalê were ava kirin. Ev herêm, divê ku xwe bi rêxistin bike. Ji aliyê ragihandinê ve bê û ankû ji aliyê perwerdeyê ve bê, gavên giring ne hatina avêtin. Nûha, dema ku me bahse şengalê kiriba, divîyabû ku herî kêm, bi dehan dibistanên bingihîn û saziyên Jinan û ên şariştanî ên beşên din ên jîyanê divîyabû ku heban. Sazîyaka Jinan ku jin karibin xwe di nav de bi rêxistin bikin û bênina ser ziman, sazîyên ciwanan ku ciwanên herêmê karibin xwe di wan de birêxistin bikin û bênina ser ziman, sazîyên perwerde ku karibê bi perwerdeya zarokên kurd(kurd bê û zarokên ku ne kurd jî bin) ên wê herêmê herêmê eleqeder bibe û hwd, divê ku werina ava kirin.

Sazîyên ragihandinê, kovar û rojnemeyên herêmê ên heftane û rojane divê ku hebin. Heta nûha min navê rojnemeyekê li herêma şengalê bi gelê şengalî min ne bihîstîya. An jî ku hebe jî, navê wê ne hatîya guhê min. Herî kêm, divê ku rojnemeyek rojane a herêma şengalê divê ku hebê. Herî kêm divê ku zanîngek şengalê ku ciwanên wê herêmê lê dixwênin divê ku hebe. Kibris, herdû aliyên xwe re dibêt ku nagihijina heştsad hezarî jî. Lê tenê li aliyekê herî kêm çar û ankû pênc zanîngeh û wilqas jî rojnema û zêdetir jî hena. Herêma sêngalê, bi gelhê xwe yê ku li herêma şengalê dijî, ku bi awayekî rast hijmartina şênîyên wê were kirin, dibê ku ji herdû aliyan jî zêdetir bê. Lê mixabin, ti pêşketin li wir ne hatîya çêkirin. Tevî ku desthilatdarîya kurd a başûr û sazîyên wê bi xamsarî nêzbûna, her wusa kurdên me yên êzîdî ên wê herêmê jî ev pirsgirêkên xwe ne hildane rojeve xwe û çareserî ji wan re hewl nedane ku bibînin.

Kurdên êzîdî, ku li gorî maddeya 140 herêmên başûrê kurdistanê ên weke kerkek, tûsxûrmatû û herêmên din ên ku dervî rêveberîya kurdistanê mana ku were çareser kirin jî, weke ku çawa ku li Îtalya xweserîya watîkanê heya, wê xweserîyeka şengalê ya bi wî rengî wê hebe. Divê ku em di vê temenê de lê binerin. Li vir, di serî de, berpirsîyarî, dikeve ser milê kurdên êzîdî de ku ew êdî li wê pirsgirêka xwe xwedî derkevin. Bi wê re jî, bi piştgirîyê bê û ankû bi alikariyê bê, hemû kurdên din jî li cem xwe bibînin. Lê weke destûreka bingihîn ku divê ku li ser newê nîqaşkirin jî, divê ku xweserîya herêma şengalê weke kantonakê were ragihandin û denezendin. Bi wê re jî, êdî mirovên li wê herêmê jî werina xwe û li pirsgirêkên xwe bihizirin û li rêyên çareserîyê bigerihin.

Gerek şengal, rêveberîya wê wrre avakirin û xweserîya wê were ragihandin û her wusa ew herêma şengalê bi wê xweserîya xwe re navik û navaroka yekîtîya kurdên êzîdî biafirêne. Zaneyên kurdên êzîdî û ên ne êzîdî, divê ku vê mijarê êdî hildina rojeve xwe. Nûha, weke karê pêşî, dikeve ser milê rewşenbîr û zaneyên kurdên êzîdî de, ew a ku xwe bigihihênina herêma şengalê, li wir pêşî pirtûkxaneyeka ku hemû çand û pirtûkên dîrokî û hwd, ên vê çandê ku di wê de bên berhevkirin, divê ku were ava kirin. Ev weke karekê ku nebê nabê ya. Divê ku ew jî bi wî rengî lê binerin. Divê ku di cih de rojnemeyekê herêmê deest biweşane wê bikin. Nûha dibêt ku dikarê haftane bê, lê bila piştre ne bi demeka dirêj re ku bikina rojane. Divê ku li her herêmê dibistanên zarok û ciwanan ên xwandinê ava bikin û pirtûk û amûrên xwandinê ji wan re çê bikin. Bi wê re jî, di vê demê de herî kêm divê ku zanîngehek herêma şengalê ku bi navê şengalê bê û ankû navekî vê xatê ê pîroz ku dikarê lê were kirin, divê ku were ava kirin. Ev kar, êdî karên divêt ku werina kirin in. Kirina van karan jî, ne weke zêdebûnekê ya. Ji wê zêdetir, weke zarorîyekê û pêwîstînîyekê ya.

Herêma Şengalê, heta roja me, gelek kar û barên ku bi rewşnbîrî ku bihetan kirin, yek jî nehatîya kirin. Dema ku zaneyek bê û ankû rewşenbîrek bê, van karên civatê ên zarorî û pêwîstînî ku nekê, çawa dikarê bêje ku ´ez wê çandê diparêzêm û li berê wê heyîdar im´? Bêgûman, gelek karên ku bihetan kirin hebûn. Lê ne hatina kirin. Minaq, piştî komkujiya şengalê ku di 14 tabaxe 2007´an de ku hatî serê kurdên êzîdî hê bi tememî birînên wê ne hatina pêçan. Dema ku rewş ev bê û heta roja me jî, agahiyên ku jinên ciwanên dawî li jîyane xwe dihênin û ankû hê jî hêrîş ji derve li wê herêmê dibin lê ku hê parastinaka wê ya baş li ber wan hêrîşan ku bide sekinandin ku ne hatibê kirin, ji xamsariyê pêve em nikarin bitiştekî din re bênina ser ziman.

Kurdên êzîdî, bi nirx û dîroka wan re, dîroka wan diçê demên berî zayinê nêzî sê hezar salan. Bi rastî, divê ku mirov bibêje ku tevî ku xwediyê vê dîroka dirêja, lê ev dîroka dirêj hê jî aqadamî û zanîngeha wê ne hatîya avakirin ku binivîsêne û bivejênê di nava jîyane civatê de. Dema ku em bahse parastin û bi nirxkirinê bikin, divê ku em ji van aliyan ve lê binerê. Ji van aliyan ve, çendî kar hatîya kirin, mirov dikarê ewçendî bahse parastinê bike û gotina parastinê bikarbêne. Dîrokek, bi nivîsandina wê re û bihanîna wê ya li ser ziman re dikarê bijî û bide jîyandin. Dema ku ev nebê û ankû li gorî ku were kirin ku ne hatibê kirin, em nikarin bahse wê parastina wê jî bikin.

Li vir, bi teybetî û giringî, dûbare li vir werênina ser ziman ku xweserîya şengalê wê navaroka yekîtî û yekbûna kurdên êzîdî jî biafirêne. Wê, mejiyê wan jîndî û zîndî bike. Wê rastîya wan hin bi hin werênê ser ziman. Wê wê mejûya wan kevnera raxê li berçav. Min, pirr dixwest ku dema ku min ev nivîs nivîsand, ku min gotiba, min hin agahiyên vê nivîsê ji vê rojnema herêma şengalê a rojane û ankû li pirtûkaxaneya zanîngeha şengalê girtîya. Lê mixabin, kurdên me yên êzîdî weke ev derfet neda min, her wusa nedane ti zane û rewşenbîrên din ên kurd û cihanî jî. Bi çi rengî ew derfet nedane? Bi rengî nebûna pirtûkxaneyekê, nebûna rojnemeyekê, ne bûna zaningehekê wê herêmê û hwd. Bêgûman, î ro li wir laleşa nûranî, nirxeka pîroz ku mirov dikarê ji wê hilde heya. Lê li vir, ji wê zêdetirî, dema ku em bahse karên aqadamikî bikin, pêşî zanîngeh, pirtûkxaneyên di asta netewî de û hwd dihên berbîra me. Laleşa nûranî, rêxistinîya wê ya li ser olî re aliyekî giring û binirx û pîroz dihêne li holê. Lê bo civatek hemdem û birêxistinkirina wê, êwîstî, bi zanîngeh jî, pirtûkxaneyên di asta netewî de, rojnemeyên rojane û hwd jî, heya. Ev tenê, çend ji wan kar û xabatên ku werina kirin in. Gerek, li gorî nirxîtîya wê, ev herêm bibe herêmek ku ne tenê zaro, ciwan û kurdên êzîdî, her wusa, ên beşa din ên civate kurd jî ku karîban ku li wê mazin bikiran bi zanebûnê re. Ev jî, Di aslê xwe de, karekî bi vî rengî, wê şengalê, bi nirxên wê ên weke laleşê ku di wê de û dîroka wê ya pirr kevn re bike navendaka ronsansê dinava pêşketina civatî de. Ev ronansas, divê ku were bijî bi zanebûnê. Her rewşenbîr, ku rast rewşenbîrên vê civatê bê, divê ku ji aliyekî xwe ve, xwe bi vir ve girê bide. Dem, êdî dema karên aqadamikî û zanyarîtîyê û pêşxistin û têgihiştinkirina wê ya. Ya ku pêşaroja civatekê wê misoger bike jî, wê ev bê. Dema ku navê laleşê hat ser ziman, divê ku karên rewşenbîrî ku di wê de hatina kirin, bi wan were ser ziman. Ya ku li gorî rastîya wê dîroka wê ya dirêja jî ev a. Weke ku di sadsale 15´min de, Ji filoransa, bo ronsansa rojava rohniyek pêxist û piştre serdemên dîrokî hanî. **Ronasanse şengalê** jî divê ku were jîyîn li herêmê. Ronasanse şengalê, wê ji herêmê re hem şengalê bixwe biike navendek têgihiştinî û binirxî û hem, wê pêşketina civatê di temenekî rast de bi ber pêşarojê de bide pêşxistin û hem jî wê dîrokî ji nû ve li ser rastî û temenê wê ê rast bide nivîsandin û rûnandin.

Di dema Sûmerîyan de, di dema xanadana Ur´ê de demeka weke ya ronasanse sûmerîyan jîya li ber firatê li ber çîyayê kurda li herêmên weke afrînê, kobanê û serêkahniyê. Di dema gûtîyan de û piştre Cizîra botanê ew rol û weyn leyist. Navê cîzîra bota, ji ber wê ya ku heta roja me jî, bi zanebûn û têgihiştin û nirxên wê ên di wê de û her wusa perwerdekirina wê re li dîrokê maya. Î ro jî, şengal, dikarê wê rol û weynê di çerçoveya xwe de di nava civate xwe de di temenê demeka ronasanse şengalê de bileyizê. **Ronasanse Şengalê**, bi vê rengî, pêwîstî bi wê heya ku were û bijî. Bêgûman, wê bijî jî. Lê ev jî, bi avakirina dibistanan bi zaro û ciwanan, bi avakirina zanîngehan û derxistina rojnema, kovar û pirtûkên mazin re dibê. Ku weke mohra wê ronasansê şengalê bê, pirtûkxaneyeka wê ya mazin were ava kirin û bêtişîkirin bi pirtûkan. Ya ku wê li gorî rastîya wê dîrokê jî bê ev bê.

Di roja me de, gotinak pirr zêde bidûbare dihê bikarhanîn. Ew jî, gotina "dema ragihandin û zanînê" ya. Ku dem, dema ragihandin û zanînê bê, wê çaxê, di vê çerçoveyê de çi temen hatîya avêtin û pêşxistin? Divê ku mirov vê pirsê bi pirsê. Ti kesek û ti nivîskar jî, divê ku nekeve wê xelatiyê de ku bibêje ku wê bi çend nivîs û ankû çend pirtûkan wê karibê dîrokek dirêj û tişî fêr û zanîn werêne ser ziman.

Ku em bahse pêşketin û pêşxistinê bikin, em divê ku ji vê aliyê ve bahs bikin. Î ro, civate kurdên êzîdî civateka ne piçûk a. Lê mixabin, bo wê civatê ti kar ne hatîya kirin. Dema ku em li rewş û nêzîkatîya hin nivîskaran dinerê, mirov di wan de kifş dike ku weke di wê rewş de ku dixwezin ji mirov re bibêjin ku bila yek were ji me re bibêje vê û yan jî wê bike, na. Lê wekî din jî, bi serê xwe di nava xwe de xwe bi rêxistin kirin û li ser pirsgirêkên civate xwe mijulbûn û hizirîn kêm a. Li vir, divê ku ez bibêjim ku dema ku ez çav li dîroka êzîdîtiyê dinerim, ez dibînim ku temenê wê li ser zanebûnê ya. Î ro, ev temen dîroka dirêj, ku ne xwediyê, rojnemeyekê, zanîngek, pirtûkxaneyek xe ya teybet û her wusa xweserîyek xwe ya ku xwe di wê de werêne ser ziman bê, ew tenê bi kêmasîyê re nayê ser ziman, divê ku mirov bi xamsarî û herêkirina ji dîrokê çûnê şîrove bike.

Bi dahan dengbêjên herêma şengalê hena, Lê maleka wan ya çandê li wir heya? Ev mijar û ankû pirsgirêk, mijar û pirsgirêkên ku divê ku mirov bi cidîyetekê li ser bisekinê û werênê ser ziman in.

Dîroka herêma şengalê û nirxên wê ên pîroz ên ku li wê na, kiriya ku hemû mirovatiyê ji wan sûd bigrê. Ev herêm, di her rewşê de, pêwîstîya wê bi xweserîya wê civatî, çandî, rewşenbîrî, olî û hwd heya. Î ro, weke ku çawa li Îtalya, watîkan xwediyê xweserîyê ya, ev herêm jî, wê di nava jîyane kurdistanî jî û ya herêmî de jî, wusa xwediyê heman rewş û qadr û statûyê bê. Ev weke aliyekî zarorî û pêwîstî ya. Dema ku ev newê kirin, hingî bi hemû nirxên xwe re ew civate êzîdî ji dîrokê çûyina wê dibê. Divê ku ev were kirin. Li vir, divê ku hemû zaneyên civatî jî, oldar jî û rewşenbîrên êzîdî jî vê yekê bizanibin ku bi çend kovar, û malper û ankû nivîs û pirtûkên ku dinivîsênin re wê nikaribin pêşîya wê ji dîrokê çûyinê bigrin. Wê tenê, bi van nivîsandinên xwe bidina gotin ku civatek û bawerîyek bi vî rengî di dîrokê de dijî. Lê wê nikaribin, parastina jîyane wê bikin. Dema ku parastina jîyanê hat kirin, wê ev aliyên din ên rewşenbîrî û hwd, hemû di nav de werina parastin.

Bi kirina van kirinên zaneyînî û rewşenbîrî û rêxistinkirinî hwd, wê temenê wê wê xweserîya herêma şengalê jî werê pêşxistin û çêkirin. Ev jî, karekî ku bi rêxistinî divê ku li ser were hizirî na. Lê tenê bi rewşenbîrî jî têrê nakê. Ji wê zêdetirî, bi sazîyî û

sazûmanî, divê ku hemû sazîyên kurd ên êzîdî, xwe ji vê yekê berpirsîyar bibînin. Divê ku hemû sazîyên êzîdî bi komelî bê û ankû malî û hwd bê, divê ku êdî werina cem hevdû û pirsgirêkên di nava xwe de ên piçûk dênina aliyekî û êdî wê jîyane xwe hildane ewlakariyê. Ya ku di vê demê de dîrok ji wan dixwezê jî ev a. Dema ku vê nekin, wê dîrok wusa bihasibêne ku berpirsîyarên xwe yên li ber bawerîya xwe jî ku ne hanîna li cih.

Xweserîya şengalê, divê ku êdî mejiyê her mirovî li ser wê bihizirê. Bi teybetî, mazinên civatê ên civate êzîdî divê ku werina cem hevdû û temenê wê xweserîyê çê bikin. Bo pêşxistina wê, çi pêwîstî pê hebe bikin. Ya ku dîrok jî, ji wan dixezê ev a. Dema ku di vê demê de, xweserîya şengalê nexwezê, wê çaxê, wê çawa karibê, pîrozîyên xwe jî bi dîroka wan ya civatî re biparêzê? Li vir jî, karekî mazin dikeve ser milê komel, mal û saziyên civatî ên rewşenbîrî û hwd de. Di vê demê de hemû rêxistinî li ser zanînê re dihê kirin. Ya ku di serî de li vir ku divê ku were kifşkirin ev a. Li herêmê, hem bo pêşxistin û zîndîkirina jîyane herêmê û hem jî bo pêşxistina komel, mal û sazîyên rewşenbîrî û hwd, divê ku xwe birêxistin bikin û bi wê rengê êdî ku pêşengîyê ji civat û pêşketin û pêşveçûna wê re bikin. Li her herêmên şengalê, gelek kevneşopîyên rengî ên dîrokî û kevn hena. Hemû jî, werina kifşkirin û bi rêxistinkirin. Cejn û festîwalên wan werina kirin. Rengê wê yê civatî ku were berçav û ditin.

Li vir, weke xalên pêşî ku divê werina bi rêxistinkirin ev in:

*Bo rewşenbîrîya herêmê pêş bikeve komela reweşenbîrîya herêmê were avakirin. Di asta pêşî de rojnemeyek rojane a herêmê bi kurdî were derxistin. Piştre bi kovar û rengên din ên nivîsandinê û hwd, lê were zêdekirin. Telewîzyonên bi çanda êzîdî ên weke ´Çira TV´navenda wan li herêma şengalê werina vekirin û xwe bikina 24 seatan. Bi radio û ankû îstasyonên tv´yan ên herêmkî dikarin li herêmê li wan werina zêdekirin.

*Divê ku zanîngehek li herêmê ku bi navê herêmê bê û ankû navekî din ji herêmê bi wê were ava kirin. Li herêmê, dibistanên bingihînên zarok û ciwanan divê ku werina avakirin li her herêmê şengalê.

*Pirtûkxaneyek ku çand û mejûya êzîdîyê di wê de hatî civandin û ku li giştîya a herêma şengalê ku hemû şengalî karibin xwe bigihihhêninê û ji wê sûd bigirin, divê ku were avakirin.

*Divê ku komel, mal û saziyên Jinan, rewşenbîr, û hwd werina avakirin. Malên çandî û dengbêjên herêmê werê ava kirin.

*Divê ku rêveberîya herêma şengalê ku karibê hemû pirsgirêkên civatî, çandî, rêveberî û hwd ku di xwe de bigihêne hevdû û bi rê ve bibe û çareserîyê ji wan re bêne, divê ku ji xalk û zaneyên herêmê were ava kirin.

Herêma şengalê giring a divê ku xweserîya wê were denezendin. Lê kurdên êzîdî tenê li şengalê û başûrê kurdistanê najîn. Li bakûrê kurdistanê jî, herêmên weke cizîr, bacin, hazax, li dora midyadê, amed û rehayê û her wusa gelek deverên din dijîn. Bi heman rengî li rojava û rojhilatê kurdistanê jî dijîn. Kurdên ku li herêmên qafqasya dijîn û hwd jî, hena. BI deh hezaran kurdên ku ji neçarî ku li welatên ewropa ên weke almanya û hwd dijîn jî hena. BI wê rengê, wê hemû kurdên van herêmên din ên hem li deverên din ên kurdistanê û hem ên li dervî kurdistanê dijîn û hwd jî, wê li dora wê xwe bicivênin. Wê temenê wan ê jîyane û parastina hebûna xwe ya çandî, rewşenbîrî, zimanî bawerî û hwd jî, wê bi vî rengî ji wan re hatibê afirandin jî. Çend ku dibin sazîyekê de

bê, komelekê bê û ankû malekê bê, bi wê ku hemû êzîdî jî werina cem hevdû, wê dîsa nikaribê, aliyên wê ên çandî, zimanî, bawerî û piretîka jîyanî û hwd bide parastin. Yanî, ev sazîyên weke komel, mal û hwd, ku ev temenê wan hebe, wê çetîrî ew jî ji wan ancam were girtin. Lê ku ew temenê wan nebê, wê ew ancama ku dihê xwestin jî wê ji wan newê girtin. Wê parastin pêşnekeve.

Jinên êzîdî, bi reng û çand û cil û bergên xwe divê ku malên xwe yên çandî ava bikin. Her wusa, komelên çandê, rewşenbîrîyê divê ku werina ava kirin. Lê hemû jî, dema ku werina ava kirin, wê wê çanda wê rêveberîya xweser a şengalê û pêşveçûnên wê ji xwe re esas bigrê û bike temen. Êdî wê temenê wê û rengê wê hebe. Kurdekî êzîdî dema ku dihê welatekî ewropî, li ber pirseka di derbarê rengê wî yê çandî û bawerî de ku lê tê kirin, di bersivdayîna wê de dikeve zorê de. Ev ketina zorê ne ku nizanê ku çandî û bawerîya wî çî ya. Dizanê ku çî ya. LÊ dema ku ew dihêne ser ziman, di serê rayadarê welatê ewropî de, li gorî wê pêşketina rêveberîya herêmê a ku heyî hizirkirin li wê bersiva wî dibe êdî dikeve zorê de ku ji hevdû cuda bike ku rastîya êzîdîtîyê çi ya. Rewşek, û ankû rêveberîyek xweser ku mirovê êzîdî bi rengê çandî û bawerî xwe bi wê bêne ser ziman û weke mînaq bide nîşandin li berçavên wî û yên li ber wî jî tûna ya. MInaq, dema ku bêje ´ez ji herêma şengalê me´, Wê bê gotin "hiii, tû ji iraqê yî". Êdî wê rengê wî yê çandî û bawerî di nava wê têgihiştin û rengê fahmkirina bi navê îraqê re wê ji berçav winda bibe.Ji xwe ya ku dibê jî ev a.

Rêveberîyaka xweser a şengalê ku li gorî rastî û mejûya xwe bi rol û weyna xwe re rabê û karê xwe bike, wê ji aliyê çandî, dîrok û civatî û hwd ve, wê pêşengiyê ji hemû civate kurdistanê re jî karibê bike. Wê ew bixwe, bi hebûna xwe re, wê bê aliyekî mejûyî ê pirr kevnera ê civate kurd jî. Wê rengekî giştî ê civate kurdî jî bi xwe re werêne ser ziman. BI teybetî, ev rengê ku bi wê re were ser ziman, wê dîrokek bi deh hezar salan bê, çandek bi hem temenî kevn bê û bawerîyek di wê temenê de kevn bê ku ji hemû pêşveçûnên piştî wê ên ku hatina û pêşketina ên weke cihûtîyê, filehiyê(mesihiyê) û îslamê re jî ku temen afirandîya wê ew were ser ziman. Ev, rastîya dîrokê ya. Ev dîrok bixwe ya. Berî van, Mîtra û Zerdeşt li dûv hevdû li ser vê xatê hatina û çûna. Rastteqînî û mejû ev a. Ya ku were parastin jî, ev dîrok û mejû ya. Lê xweserîya şengalê wê karibê bersivaka dîrokê bide van aliyan hemû yan bi paratina wan re. Xweserîya şengalê, ne weke zêdetîyekê ya. Xweserîya şengalê, weke pêwîstîyaka zarorî ya parastina nirx, dîrok û çandê bi civatê re ya. Li vir, ya ku dikeve ser milde jî ew a ku ev were kirin û pêşxistin a. Şengal, bi wê dîrok, çand, bawerî û civatîtîya xwe ya kevn re pêwîstîya wê bi xweserîyê wê heya.

-

**Weke navendek şariştanî û dîrokî; ´rêza çîyayên şengalê´**

Dema ku em li ser pergalîya perwerdehiyê bisekinin, divê ku mirov ji gelek aliyan ve li ser bisekinê. Li kurdistanê, sê û ankû çar navendên pirr giring û dîrokî ên perwerdekirinê hena. Yek ji wan Cizîra bota ya. Ya duyemin jî, Reha ya. Ya sêyemin jî, Şengal û ankû laleş a. Ya çaremin jî ku navenda wê kirmaşan a rojhilatê kurdistanê ya. Bi teybetî, ev navêndên dîrokî, hem dîrokaka wan ya pirr demdirêj heya ku divê ku mirov werêne ser ziman û hem jî, weyna ku bi hebûna xwe re bi dîrokê re leyistina jî divê ku mirov li serbisekinê. BI teybetî, di vir de, emê bi teybetî, laleşê û ankû şengalê bikina navend û li ser wê navendîtîya wê perwerdekirinê bikisekin.

Î ro di destê me de dokument hena ku em dikarin bibêjin ku Laleş bi serê xwe weke

saziyeka serdest û civat û pêşketî, hê di dema hûrî û mîtannîyan hebûya. Di wan deman de jî, weke navendek ku civatê xwe lê dicivand. Bi wê re, divê ku mirov bibêje ku ji Rehayê û heta digihijê botanê û ankû Cizîra bota ku rojavayê kurdistanê jî di nav de, ku weke ku di kurmancî ji wê herêmê re tê gotin "torê", weke herêmeka ku ev bawerî lê bi pêşketina xwe ya dîrokî hebû. Ji wir, û heta ku digihişt çîyayê laleşê, ev serdestî hebû. Li vir, divê ku mirov bibêje ku çîyayê laleşê, bi wan rêza çîyayên xwe re, ji başûrê kurdistanê û heta gihijê rojavayê kurdistanê, bênavber xwediyê heyînaka dirêj a. Divê çerçoveyê de, ew xate rêza çîyayên laleşê di kifşkirina wê pêşketinê de kifşkar a. Lê biqasî ku kifşkar a, weke navendekê jî ya. Çîyayên şengalê û laleşê, ji vê aliyê ve, dema ku mirov lê binerê, biqasî rêza çîyayên Zagrosan li mesopotamya û torosan li Anatolia weyn û rol leyistîya.

Ji vê aliyê hebûna xwe çîyayê laleşê, weyneka mazin leyistîya. Heta ku biqasî ku mirov ji nava wan nivîsên ji dema hûrî û mîtannîyan dixwêne ku weke ku ´pîrozîyek´ jî bi çîyayê laleşê bigiştîya wê hatîya baxşkirin. Li ser çîyayê laleşê ve, bi hesanî, ku wan rêza çîyayên şengalê ku mirov dişopêne, mirov dikarê xwe bigihijêne rojavayê kurdistanê herêmên weke Kobanê, Afrînê, Serêkahnîyê û hwd. Ev herêmên rojavayê kurdistanê jî, weke herêmên giring ên dîrokî na. Ji van herêman heta ku digihişt ber helebê, bi vî rengî ev çanda êzîdîtîyê di van deman de serdest bûya. Em navê "şengalê" jî, weke navendekî ardnîgarî jî pirr kevn dibînin. Her wusa, bi heman rengê, hin herêmên ku mirov ji çîyayê laleşê ve diçû wan ên rojavayê kurdistanê navê "şengalê" li wan hatîya kirin. Li dora helebê ku navê "şengalê" ku dibêt ku hê ji wê demê mabê, li herêmna ma ya.

Ev rastîyeka ardnîgarî bi pêşketina demgrafîya civatî ve dihêne ser ziman. Bi teybetî, di dema Hûrî û mîtannîyan de, ev herêm pêşketîna. Bi wê re jî, Hûrî û mîtannîyan, ew herêm bi awayekê pêşketî bi rêxistin kirina. Di dema mîtannîyan de, hêrîşên ku li herêmê dibin jî, hêrîşên bi armanca bidestxistina wê dewlemendiya herêmê na. Bo vê yekê, wê şer ji herêmê kêm nebin. Lê divê ku mirov vê yekê binxat bike û bibêje ku nirxên ku di çerçoveya wan ew rêxistinîtî hatîya kirin jî, nirxên pîroz ên melekê tawis in. Î ro jî, ku tefsîrên ji dema hûrî û mîtannîyan tên xwandin, ji nava wan bi zêdeyî, mirov rastî tefsîrên melekê tawis bi gelek cûre û rengên wan tê.

Li vir, em dibînin ku li ser çîyayê şengalê û laleşê re, hûrî û mîtannî, heta ber zagrosan serdest in Bi wê çandê serdest in. Di vê çerçoveyê de, civat hatîya perwerdekirin û pêşxistin. Nav û dengê, laleşê û şengelê, em di vê temenê de divê ku bibêjin ku li pêş û pirr zêde heya. Di vê çerçoveyê de, dema ku em çerçoveya pêşketina hûrî û mîtannîyan werênina ser ziman, em nikarin wan rêza çîyayên herêma şengalê ku heta rojavayê kurdistanê dirêj dibin ji berçav dûr bikin. Herikîna hinek aliyên çemên diclê ji herêmên weke Nînowa(musilê)ê jî, wê ji aliyekî din ve temenê wê girêdanê biafirêne. Lê bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku ev herêm, weke herêmek navendî, di vê temenê de karûerk dîtîya û kirîya.

Çîyayê şengalê, ku dikevê bakûrê diclê û firatê de û bi ber herêma Cizîrê ve dirêj dibe, weke çîyayekî kurdistanî ku li dora 1463´an de bilinda jî, li aliyekî xwe herêmên başûrê kurdistanê ên weke şengalê dihêle û aliyekî xwe herêmên weke Xazoyê dihêne ku li ser wir heta herêma botanê temenê hatinê diafirêne, li aliyên xwe ên weke Sunniye û Xana Sor û hwd jî, rojavayê kurdistanê dide kêleka xwe û jê re dibe pişt ew Herêmên rojavayê kurdistanê ên weke "cezaa"yê û û hwd jî, dibina herêmên li rex

çîyayê şengalê jî. Her wusa, bi heman rengî, rêza çîyayên şengalê, heta ku digihihê Zagrosan jî, xwediyê herîneka çîyayî ya.

Çîyayên şengalê, di nava jîyane kurdistanê, temenê jîyane koçerîyê pirr zêde afirandîya. Bi vê rengê, divê ku mirov bi teybetî bibêje ku çîyayê şengalê hertimî bi ´zozan´ên xwe yên navdar re bûyar bi nav û deng. Di nava jîyane kurdistanî de, di demên berê de sawalgerî li pêş bû. Koçerî jî, weke şêwayeka jîyane koçertîyê ya. Em dikarin rengê jîyane koçerîyê li kurdistanê bi jîyane koçerîyê re werênina ser ziman. Her wusa, jîyane koçerîyê jî, bi xwedîkirina sawal û sawalgeriyê re em dikarin werênina ser ziman. Di rewşek bi vî rengî de çîyayên şengalê bi hebûna xwe re dibûna zozanên kurdistanê jî. Bi vî rengî, jîyaneka gurr û geş, li gorî demsalan li berçîyayên şengalê her demî û timî hebûya.

Di vê temenê de, ku em bibêjin di nava pêşketina şariştanîyên mesopotamikî û kurdistanî de, biqasî zagrosan, çîyayên şengalê jî bûya xwedîyê weyneka dîrokî. Her wusa, bi vê rengî, em dikarin bibêjin ku hê di demên pirr zû de bûya herêmek ku zû lê niştecihîtî pêşketîya. Bo vê yekê, em dikarin bibêjin ku çîyayên şengalê, herêmek ji wan herêmên ku li wê pirr zû temenê jîyanê û jîyanbûnê afirîya. Ev yek, ji aliyê lêkolînên ardnîgarî û ankû ´jeolojikî´ û hwd ve jî hatîya ditin.

Ev çîyayê kurdistanî çîyayê şengalê, di vê temenê de, em dikarin weke çîyayekî navendî jî bi nav bikin û werênina ser ziman. Çîya, di demên xwe ên berê de, pirr zêde çem di navê de diharikîkin. Di roja me de jî, çend ku hin ji wan çeman zûwa jî bûbin, lê dîsa hin ji wan diharikin. Her wusa, hin çemên avê ku ji zagrosan li wê diharikin jî hena. Bi vê re, em divê ku bibêjin ku bi şînatîya xwe ve jî xwediyê dewlemendiyekê bû. Bo vê yekê bû ku mirovan weke herêmên ku li wan zozan bikiran dihilbijartin. Ji xwe, herêmên ku bi şînatîya xwe re dewlemend û avî, weke herêmên ku li wan zozantî bihatkirin dihatina hilbijartin. Li kurdistanê, bo vê yekê, sê û ankû çar herêmên pirr giring ên ku li wan zozantî dihatkirin hebûn. Yek ji wan herêma botanê bû. Herêma duyemin jî, herêma çolemergê û ankû hin herêmên şerhadê bûn. Herêm jî, li dora gola Ûrmîyê û heta ku digihişt kirmaşanê bû. Herêma din jî, "zozanên çîyayên şengalê" bûn.

Di vê temenê de, jîyane şariştanî, li vê herêmê temenê wê û tegihiştina wê pirr zêde pêşketîya û bandûr li hewirdora xwe jî kirîya. Di vê temenê de divê ku mirov bibêje ku herêma çîyayên şengalê, bi navê "zozanên şengalê" jî dem bi dem hatîya bi navkirin. Ev, tiştekî giring dide nîşandin. Navendbûna wê ya jîyanî û derfetên wê ên jîyanî ku dide jîyane mirovan dide nîşandin. **Ev** xate rêza çîyayên şengalê, bi vî rengî bûna wan cihên zozanî û her wusa li dora wê kombûna wê jî, hinekî jî bandûra wê wê ya bi bawerî jî hebû. Ji ber ku weke çîyayên şengalê dihên ditin û ji wir xwe gihandina navenda şengalê û laleşê jî dibû. Di demên berê de, bilindbûna ava xaborê, dikir ku hin çem hat ku bigihijina ber çîyayê şengalê jî.

Di dema Hûrî û mîtannîyan de, serdestbûna ku hûrî û mîtannîyan li herêmên xwe çêkirina, bi wê kirina ku li hewirdora xwe serdest bibin. Ji aliyekî rojavayê kurdistanê ve bi serdestbûna wan ya li ser çîyayên şengalê re bandûr û serdestîya wan li herêmê xort bû. Bandûra bi serdestîya çîyayên şengalê biqasî ya serdestbûna di wê navenda çemên diclê û xaborê û hwd de giring bû. Di vê temenê de, di nava serdestîya xwe de pergalek ekolojikî dane avakirin û bi wê dijîn.

Her wusa, piştî hûrî û mîtannîyan jî, wê giringîya çîyayên şengalê weke ya zagrosan wê hebe. Li kurdistanê, çîyayên şengalê jî, temenê parastinek mazin bo jîyane kurdistanê afirandîya. Em dikarin heyîn û hebûna çîyayên şengalê bi serdestîya li wê, weke parastvanîyeka giring jî werênina ser ziman. Her wusa, ji aliyê nirx û parastina wan ve jî, em dikarin heman gotinê bibêjin. Bi teybetî, dema ku em navê çîyayên şengalê bibîr dikin navê laleşê û êzdatiyê di cih de dikeve bîra me de. Ji ber ku hertimî bi hevdû re û di nava hevdû de buhurîna. Çîyayê şengalê û heta çîyayê laleşê, ev herêm, weke herêmên pîroz û bi bereket jî hatina ditin. Bi vê rengê, em dikarin rêza çîyayên şengalê weke navendeka êzdatiyê jî werênina ser ziman.

- Ol, li rojhilat weke mijareka ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Desthilatdarên herêmê, heta roja me, hertimî û ol bikarhanîna. Ol, li rojhilat, bûya amûrekî ku deshilatdarên herêmê bi wê dengên xalkên herêmê ditafisênin, komkujiyan li dijî wan dikin û bi wê ser wê dinûxûmênin û her wusa, bi wê jî xwe û kirinên xwe yên weke komkujiyan û hwd, ku "meşrû" bidina nîşandin. Bo vê yekê ol, bûya weke amûrekî hem sernûxûmandinê bo rêveberîyên herêmê û hem jî bûya rengekî hêrîşkirinê ku bi wê diçina bi ser gelên herêmê de.

Tirkiya, bi wê olê sûryanîyên ku herêmê hebûn dan sûrgûnkirin. Saddam dema ku komkujiyên weke komkujiya helebçê dikir, piştre diçû bi xwûna xwe koran dida nivîsandin û êdî bi wê re xwe "paqij dikir" û "meşrû dida nîşandin." Komkujiyên ku li dijî kurdan dikir, ji wan re digot "enfall". Humeynî, "fetwa" serê kurdan dida. Bi wê rengê diçû bi ser kurdan de. Rejimên herêmê, bi vî rengî, pîsîtîyekê û komkujiyek nema ku nekirin.

Ol di destê wan de bûya amûrekî xwe paqij derxistinê. Rejimên herêmê ên weke tirkiya, Îran, Îraq û Sûrî û hwd, wê her pîsîtiyê bikin, her komkujiyê bikin, û piştre xwe "oldar" bidina nîşandin û êdî wê xwe "paqij" bidina nîşandin. Bi vî rengî, li herêmê qira xalkan hanîna. Li Anatolia, xalkên weke "lîdyayî", "frigyayî", "karîyayî", "fenîkeyî" û hwd hatina ji dîrokê birin. Ev tenê navê çend ji wan xalkan in. Berî nûha dihat gotin ku tenê "li Anatolia, 72 millet dijîn." Kî î ro navê wan xalkan dizanê? Li herêmên din ên rojhilat jî, rewş ji vê ne cûdatira. Rejimek asimlasyonê avakirina û di nava wê rejimê de jî, hemû nirxên mirovatiyê û bi navê mirovatiyê jî bi navê wan tûnakirina. Jenosîdên mazin bi rêya wê asîmlasyonê û qadaxaya zimanan û rengê çand û kevneşopîya wan xalkan hatîya kirin. Qadaxaya zimanan, hinekî jî, bi armanca jenosîdê ya.

Li kurdistanê, ev rengê jenosîdê, ji şerê cihanê ê yekemin û bi vir de, zêdetirî hatîya kirin. Î ro jî, dihê kirin. Rejimên herêmê, di aslê xwe de, "şerên mezhebî" û hwd jî, weke "maskeyek" ji wan komkuji û jenosîdên ku dikin re bikardihênin. Di destpêka şerê navxweyî ê sûrî de, gotinên weke "şerê mezhebî û hwd, ku dihatin bilêvkirin jî, hinekî jî, nîşanak û birhana vê yekê na. Piştî ku ev gotin hatina bikarhanîn û piştre êdî hin bi hin çawa pergalek jenosîdê hat pêşxistin û komkujiyên mazin li kurdistanê li ser xalkên din pêşxistin, mirov bi demê re hin bi hin dibînê. Pêvajoya jenosîdê ku dîsa di bin ´maskeya´ olê de li dijî kurdên êzîdî li şengalê hatîya pêşxistin jî, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest. Pêvajoya jenosîdê a li dijî kurdên êzîdî hatîya pêşxistin, pêvajoya jenosîde a li kurdistanê a li dijî civate kurd ku hatîya pêşxistin û dihê domandin, ast û rada wê dide nîşandin.

Rêxistina faşîşt a DAÎŞ´ê ku di bin maskeya olê de hatîya birêxistinkirin, rêxistineka ku rejimên herêmê bo derbeyekê ku li kurdan bixin hatîya avakirin a. Ev rêxistin, bi teybetî, di rex kurdan de hatîya avakirin û tenê hêrîşên xwe li kurdan û kurdistanîyan û cihêrengiyên kurdistanî dike. Yanî, armanca wê, bi giştî ew a ku pêşketina kurdan tûna bike û pêşîya wê bigrê. Rejimên herêmê ên ku Kurdistan û civate kurd di nava wan û sînorên wan de hatî qatkirin, hertimî li ser olê re bi kurdan re şerkirina. Î ro jî, vê yekê dikin. Bi vî rengî, komujiyên ku bi destê rêxistinên ku bi maskeya olê avakirina ku kirin, weke şerên ku di ancama ´şerên mezhebî´ û ankû "cûdahîyên olî" û û hwd didina nîşandin. Yanî, bi vî rengî ol weke "kamûflajekê" ku bi wê hem komkujiyan dikin û hem bi wê ser wan komkujiyan di bin navê wê de diveşêrên û hwd, bikardihênin.

Î ro, hêrîşên ku ji şangalê bê, ji Kobanê û hwd bê, ku li kurdistanîyan dihên kirin, bi wan dixwezin ku bi tememî kurdan û pêşketina wan ji holê ra bikin. Rêxistinên faşîşt ên weke DAÎŞ(ÎŞÎD)´ê, weke rêxistinên ku bi wan kurdan dorpêç bikin pêşketina kurdan ji holê ra bikin in. Bi teybetî, ev rêxistin, weke rêxistineka ku tenê Kurdistan û civate kurd ji xwe re kirîya armanc a. Li ser olê re jî, birêxistinkirina wê, di temenê şerekî jenosîdî de ya. Bi wê ku her jenosîdê bikin, lê ku xwe paqij derxin. Armac jî, ev a.

Bigiştî, hemû cihêrengiyên civat ên kurdistanî ji vê rêxistina faşîşt re bi destê tirkiya û Îranê û hwd, hatya xistin weke armanc. Dohû ji kobanê ve hêrîşî kurdan dikirin. Î ro bi wê, ji şengalê ve ji warê rûmetê ve hêrîşî kurdên êzîdî û bigştî jî kurdistanîyan dikin. Şengal rûmeta di nava rûpelên dîroka kurdistanê de. Şengal, temen û bingeh a di nava pêşketina kurdistanê û civate kurd de. Şengal, rûmetê mirovatîyê ê herî paqij a. Şengal, navendek ku dayika mirovatiyê ya.

--Şengal dişawitê. Rewşên ji şengalê ku dihên li berçavan ti cihî ji gotinan re nahêlin. Hemû tiştî radixin li berçavan. Li şengalê, dîrok, mirovatî ahlaqê mirov û rastîya mirov hemû hatîya xistin bin hêrîşan de. Iblîsên DAÎŞ´îyan pêşî hêrîşî Kobanê kirin. Di hêrîşên xwe de ancam bidest nexistin. Piştre jî, li başûrê kurdistanê, bidest hêrîşkirina li ser xalkê şengalê ên sivîl kirin. Mirov ku ti tiştek ji mirovatiyê fahm nekiribê, wê çawa bê? Dema ku em li hêrîşên li şengalê binerê mirov wê bibîne. Mirovekî ku piçek jî rûmet û şeref pêre hebe, ji kîjan milletî û baweriyê bêm, divê ku li ber wan hêrîşên li ser kurdên êzîdî û şengalê ku iblîsên DAÎŞ´î dikin, bêdeng nemênin.

Di vê rojê de, ku misilman jî bê, û ku ji kîjan baweriyê bê, ku li ber wan hêrîşên li ser kurdên êzîdî bêdeng bê û bêhelwest bê, divê ku êdî piştre bahse mirovatiyê nekê. Çîyayê şengalê, ku deng bide mirovan wê biqêrînî deng bide. Wê bahse wê êşa di nava xwe de bike? Êşa di dilê şengalê de, êşa ku di singa kurdistanê de ya. Şengal bi hemû dîroka xwe re rûmeta hemû dîrokê ya. Dengê hemû dîrokê ya. Î ro, ya ku li wir di bin hêrîşê de ya, ev a. Ya ku li wir lê hêrîş hatî kirî, li rûmeta mirovatiyê kirîya. Ya ku li şengalê bêbaxtî kirî, li mirovatîyê bêbaxtî kirîya. Di ti pirtûkên pîroz de, na nivîsêne û na bêje ku herin zarokan bikujin, mirovên sivîl qatil bikin û dest biavêjina namûsa jinên bêparastin. Cihê vê di ti mirovatiyê de tûna ya. Ên ku li ber wê zilm û pîsîtîyê bêdenge jî, ku ji kîjan baweriyê bê, hevkarê wê zilmê û bêbaxtiyê û pîsîtiyê ya.

Î ro, bi sed hezaran kurdên êzîdî ji cih û warên xwe hatina kirin. Bi hezaran hatina qatil kirin. Zarok di pêsîra dayika xwe de bê rih disekinê. Li ber vê rewşê, ew kîjan wijdane ku bêdeng dimêne. Bi hezaran kurdên êzîdî li her çar beşên kurdistanê belav

bûna. Bi hezaran kurdên êzîdî ji şengalê hatina bakûrê kurdistanê jî. Î ro, li ber vê rewşê, ji ti kurdî re ne şeref û rûmeta ku li ber wê rewşê bêdeng bimênin. Ên ku î ro li ber hêrîşên li ser kurdên êzîdî bêdeng in, ku siba hêrîş werina ser namûsa wan jî wê bêdeng bimênin.

-Li şengalê xwedî derketin li rûmet û kurdistanê xwedî derketin a. Li Şengalê xwedî derketin, li dîrok û rastîya dîrokê û rastteqînîya mirovatiyê xwedî derketin a. Li şengalê xwedî derketin, li rastîya civatî xwedî derketin a. Ku mirov ji kîjan aliyê ve jî lê binerê ev rastîyek wusa ya. Em nikarin hêrîşên bi armanca jenosîdê ên li şangalê, ji wê hêrîşên ku rejima tirk a li ser nirxên kurd, cuda werêne ser ziman. Divê ku em bi hevdû ve girêdayî werênina ser ziman.

Divê ku em vê jî bibêjin ku divê ku em hêrîşên faşîzane ên DAÎŞ´îyan bi navê rejimên herêmê ku heta roja me pirgirêka kurd hanîna, werênina ser ziman. Ev hêrîş, hemû hêrîşên ku li pêşketina civate kurd dihên kirin in. Bi van hêrîşan, dixwezin ku dînamîkên pêşketina civate kurd yan ji holê ra bikin û yan jî bikina bin kontrola xwe de.. Bi vê armancê, rêxistinan li ser olê re birêxistin dikin û didina hêrîşkirin li ser kurdan. Çawa ku di dema yekîtîya sovyet de, bi olê û bi navê "kembera kesk" dihat xwestin ku dorpêçkirinekê li wê bidina çêkirin, bi heman mantiqî li dijî kurdan jî, olê bikardihênin. ..

- Ku em bahse hêîşên li civate kurd bikin, divê ku em dîrokek pirr dirêj werênina ser ziman. Di her demê de, hêrîşên ku li civate kurd bûna, armanca wan şikandina civate kurd bûna. Bi teybetî, piştî şerê çardiranê û pê de, hêrîşên li civate kurd bûna, pirr zêde bûna. Hemû hêrîşên ku li civate kurd bûna, bi armanca ji holê rakirina civate bûna. Piştî şerê çardiranê û pê de, li rojahilatê kurdistanê, rêveberîya sefewîyan bo ku civate kurd ji hevdû belav bike, aşîrên kurd ji rojhilatê kurdistanê dane goçkirin. Heman tişt, pişt li beşên ên kurdistanê ji aliyê rêveberîya osmaniyan û hwd ve jî, hatîya kirin. ..

Piştre, piştî şerê cihanê ê yekemin û pê de, Kurdistan di nava çar rêveberîyên metinger de hat parvekirin. Van rêveberîyan ku ew jî tirkiya, îran, îraq û Sûrî bûn, bo ku hebûn û temenê civate kurd ji holê ra bikin, serî li politikayên cûr bi cûr dane. Kurd, ji herêmên wan dane goçkirin. Dîyasporaya kurdan pêşxistin. Bi wê re jî, bi sînor nemana, zimanê kurdan qadaxakirina û kurdistanîyên serê xwe hildaya rastî girtin, kuştin û êşkenceyên rejimên herêmê hatina.

Î ro ku em dirabin û li şûn ve dinerin, em rastî dîrokek bi vî rengî ku bi destê rejimên herêmê li ser serê kurdan nivîsandina tên. Î ro jî, ew rewş didom in. Li herêmê, rejimên weke rejima tirk, rêbazek nemaya ku serî lê nedane. Î ro, hê jî, li bakûrê kurdistanê heman rewş heya û didomê.

Li herêmê, bi teybetî, beşên civate kurd, yek bi yek hatina armanc girtin û hêrîş li wan hatina pêşxistin. Di roja me de jî, kurdên êzîdî di bin wan hêrîşan de na. Di demên berê de jî, ew hêrîş li kurdên êzîdî bûna. Lê hêrîşên di vê demê de ku li wan dibin, zêdetir bûna. teybetmendiya cûda ya di navbera roja me û demên berê de ew bûya ku di demên berê de kurdên êzîdî jî, weke beşên civate kurd ên din, hêzek wan ya parastinê hebûya. Lê ji şerê çardiranê û bi vir de, hin bi hin bi hewldanên bêçek kirina kurdan, kurd bêparastin hatina hiştin. Ji ber vê yekê ya, ku di vê demê de bandûr û dijwariya hêrîşên li kurdan zêdetir xwe dide nîşandin.

Bi teybetî, herêmên kurdên êzîdî ên weke şengalê û hwd, di demên berê de jî, rastî hêrîşên mazin hatina. Lê hertimî, ew hêrîş, rastî bersivên mîr caferên dasnîyan û dewrêşan hatina. Di sadsalê 7´min de, dema ku xalîfe mutasîn el-bileh hêrîş hanîna ser şengalê de, hingî mêr û mêrxasên êzîdî û mîr ên weke mîr Caferê Dasnî bi artişa kurdên êzîdî li ber wê sekinî ya û xalkê xwe parastîya. Di dema dewrêşê Ewdî de, dema ku hêrîş bûna, dîsa bi heman rengî li ber wan sekinîn bûna. Î ro, ku di nava destan û çîrokên kurdî de bahse van mêranîyan tê kirin, hinekî jî, bi sayaserê wan mêraniyên ku dane nîşandin in.

Civate kurd, weke civateka ku bêparastin hatîya hiştin a. Ji ber vê yekê jî, ev hêrîş bi vî rengî zirerê didinê de. Î ro, ku bi sed hezaran kurdên êzîdî cih û warên bihêlin û goç bikin, hinekî jî, divê ku mirov bi vê yekê ve girêdayî hilde li dest.

Beşên civate kurd ên weke civate êzîdî û hwd ku karibin hebûna xwe heta roja me bidina domandin, hinekî jî, ev bi sayaserê hêz û têgihiştina xwe parastinê ya ku di demên berê de ku bi wan re hebû bû. Di roja me de, ev hêz û têgihiştin kêm bûya. Heta ku tevgera azadîya kurd, ev pêşnexist, ew bêparastin hebû. Lê beşên civate kurd ên weke civate êzîdî, heta roja me, makanizmayên xwe parastinê pêşnexistina. Xwe, wusa zêde di van waran de bi rêxistin nekirina. Çeteyên DAÎŞ´ê ku hêrîşî rojava kirin û bi serneketin, êdî ew xate şengalê û bi teybetî ew beşa civate kurd, weke beşek civatî û herêmî ya bêparastin ditin û êdî hêza hêrîşkirinê li wê di xwe de ditin. Hinekî jî, divê ku mirov ji van aliyan ve jî, li hêrîşên li şengalê binerê. Ji xwe, di destpêka hêrîşan, xwe vekişandina peşmergeyên PDK´ê jî, wêretîyek da wan çeteyan ku êdî bigiştî bidest hêrîşê li wan herêman bikin.

Hêrîşên li şengalê, em dikarin ji du aliyan ve şîrove bikin. Aliyê pêşî, ew a ku di serî de şengal û ew beşa civate kurd, weke xeleka zayif hatîya ditin a. Aliyê din ê duyemin jî, ew a ku bi teybetî, teybetmendi û rengên pêşketina civate kurd ên dîrokî hatina xistin li bin hêrîşê de. Bi teybetî, em divê ku bibêjin ku hêrîşên li şengalê civate kurd a êzîdî, em nikarin tenê li wê bihasibênin. Divê ku em van hêrîşan weke hêrîşna giştî ên li civate kurd bigiştî bihasibênin. Î ro, ev hêrîş li kurdên êzîdî û şebekî bûn. Siba, heya ku li li kurdên xalxalî, yarsanî û hwd jî bibe û zêdetir bibe. Her wusa, li beşên din ên civate kurd bibe.

Ev hêrîşên ku bi destê çeteyên DAÎŞ´ê li beşên civate kurd û kurdistanê dibin, li pişt wan, rejima tirk, Îran, û hwd heya. Rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin û hêzên ku dixwezin ku pirsgirêka kurd bidomê û li ser wê re sîyesetê bikin, piştgirîyê didina çeteyên DAÎŞ´ê. Hêzên ku naxwezin ku pirsgirêka kurd, were çareserkirin, piştgiriyê didina çeteyên DÎAŞ´ê. Bo vê yekê, divê ku em van hêrîşan, weke hêrîşên stretejikî bihasibênin bi nav bikin.

Kurdên êzîdî, heta roja me, di temenê pêşxistina têgihiştin û hêzek cewherî ya parastinê de wusa zêde ti gavên mazin ên li berçav neavêtin. Li herêmek, weke rojhiilat, xwe bêparastin hiştin, bi tememî xwe ji tûnabûnê re razandin a.

Piştî ku hêrîş li şengalê destpêkirin, êdî bi sed hezaran şengalî ketina rêyan de û goçkirina. Ji xwe, armancek van hêrîşan jî, ew a ku wê hebûna civate kurd a li şengalê bidina ji hevdû belavkirin a. Bo vê yekê, divê ku kurdên êzîdî jî, li vê yekê bihizirin û warê xwe ne terikênin. Ku civate kurdên êzîdî şengalê, biterikênin, wê hingî, li ser serê

wan, ev hêrîş bina 73´min ferman û serkevtina wê. Divê ku destûrê nedina serkevtina vê 73´min fermane ku hatî hanîn li ser serê wan. Divê ku şengalê ne berdin. Ku civate kurd a êzîdî şengalê bi terikêne, hingî, wê tûna bibe. Divê ku ev jî were ditin. Bo vê yekê, divê ku derfet ji vê yekê re newê hiştin. Weke ku çawa ku Mîr Caferê Dasnî li şengelê û hewirdora wê, hêzek mazin ya parastinê pêşxist û hebûna civate xwe parast, divê ku civate kurd a êzîdî jî di vê demê de wê yekê bikin. Her ciwanekî kurd ê êzîdî, divê ku bi gîyane dewrêşê Ewdî radê ser pîyan li hebûn, civat û nirxên xwe xwedî derkeve.

Hêzên parastina şengalê divê ku werina pêşxistin. Li herêmê, divê ku di bin parastina wê de, derfetê jîyanê werina afirandin. Malên kurdên êzîdî ên ku goçkirina, divê ku werina parastin ku ew vegerihina li ser malên xwe. Bi pîrozîya laleşa nûranî, divê ku ew gîyan were parastin. Laleşe nûranî, di her demê de, bûya temenê hemû xîretan. Î ro jî, ew pîrozîya wê, temenê hemû xîretan û rûmetan a.

Î ro, li dijî van hêrîşên li şengalê li civate kurdên êzîdî ku dibe, berpirsîyar dikeve her milê her mirovê bi wijdan de ku li dijî wan bisekinê. Mirovêkî ku ne êzîdî jî bê, ku li ber wan hêrîşan bêdeng bê, nikarê bahse wijdan û mirovatiyê bike. Hêrîşên li şengalê û bi teybetî li civate kurdên êzîdî, li rûmeta hemû mirovatiyê na.

Lii vir em vê jî divê ku bibêjin. kurdên êzîdî ku goçî beşên din ên kurdistanê ên weke başûrê kurdistanê û bakûrê kurdistanê û hwd, divê ku hemû beşên civate kurd ên li van herêmên kurdistanê, li wan xwedî derkevin. Divê ku weke ku çawa ku li rûmeta xwe xwedî derdikevin li wan jî xwedî derkevin. Kurdên êzîdî jî, çengî ku goçî başûrê kurdistanê, bakûrê kurdistanê, rojavayê kurdistanê û hwd kiribin jî, divê ku ji kurdistanê dernekevin û li şengalê û warê xwe xwedî derkevin. Divê ku ne berdin. Armancaka wan hêrîşên li şengalê jî, ew a ku wê vala bikin a. Divê ku derfetê nedina wan çeteyan û hêzên li pişt wan ku dixwezin ku kurd ji warê xwe goç bikin, divê ku nehêlin ku ew xwesteka wan were li çih. Bêgûman, li kûdera kurdistanê jî bixwezin wê bijîn. Kurdistanê warê wan a. Bixwezin wê li bakûr jî, li başûr jî, li rojava jî û li rojhilatê kurdistanê jî bijîn. Ev mafê her kurdî jî ya. Lê teybetmendiya hebûna şengalê, ew a ku hebûna civate kurd a dîrokî û kevneşopîya wê diparêzê ya. Bo vê yekê, divê ku bi teybetî li wê xwedî derkevin. Divê ku ji şengalê dûrnekevin.

Navê şengalê, di nava dîroka kurdistanê de û bi teybetî di nava kevneşopîya kurdistanî û temenê wê de bi rûmet û pîroz a. Li her kurdî dikeve ku li wê rûmetê û pîroziyê xwedî derkevin. Bi têgihiştina mîr Caferê Dasnî û Dewrêşê Ewdî divê ku kurdên êzîdî li rastîya xwe xwedî derkevin. Her wusa, bi heman rengî, li her mirovê civate kurd ên ku ne êzîdî jî na dikeve ku li cem civate kurdên êzîdî bisekin in û wê biparêzên. Ev, bo wan jî, rûmet û şeref a.

- Şengal, herêmeka kurdistanê ya bi teybetmendiyên xwe ên dîrokî, çandî, kevneşopî, bawer û hwd re cuda û giring a. Di van rojan de, herî zêde ew di rojevê de ya. Li ser şengalê dihê nîqaşkirin. Lê ev nîqaş ne li ser wê dîroka wê ya dîrêj û bi nirx a. Ew nîqaş hemû jî, li ser komkujiyên ku li şengalê dihên serê civate kurd a êzîdî ya. Ku gerîllayên tevgera azadîya kurd PKK´ê û YPG´ê xwe di dema wê de ne gihandiban wir, î ro, me yê bahse komkujiyên mazin ên ku di wan de bi deh hezaran mirov hatina qatilkirin bikiran. Î ro ku em bahse komkujiyên bi vî rengî ên mazin nekin, ev jî, bi sayaserê tevgera azadîya kurd a.

Her wusa, divê ku mirov bibêje ku bi sed hezaran kurdên êzîdî ên şengalî ji cih û warên xwe hatina kirin. Bi hezaran ji wan di rêyan de jîyane xwe ji dest dane. Mirov dikarê, wê rewşa şengalê ku di bin navê "goçberîyê" de dihê ser ziman, bi navê "têcîrîya şengalê" jî bi nav bike. Ev rewşa kurdên êzîdî, rewşa jenosîd û ´têcîra´ ermeniyan dihêne berbîra me. Şengal, bi vê re û bi têcîra kurdên êzîdî re di rojevê de ya. Ji şengalê xwûn diherikê. Rewşa şengalê, dema ku ez lê dihizirim, gotina rêberê gelê kurd Birêz ocalan a ku navê pirtûkeka wê jî ya, ya bi navê "gelê kurd, ê di nav lapê jenosîde de" dihêne bîra min. Rewşa şengalê û kurdên êzîdî û her wusa kurdên şebekî, û bi wê re jî hêrîşên li ser başûr û rojavayê kurdistanê û bi wê re hêrîşên li bakûrê kurdistanê, rewşa kurdan a di nava dorpêçkirinaka bi armanca jenosîdê de dihêne ser ziman.

Tevî wê jî, dema ku kurdan xwestiya ku xwe biparêzên, weke "terorîst" hatina bi navkirin. Rêxistinên wan, dema ku gelê kurd parastina, hatina xistin li hundurê "lîsteyên terorê" de. Ev, bi kinasî ji bêwijdanîyekê û pê de, ne ti tiştekî din a. Gelek, çawa dibe, dema ku hêrîş werina li ser wê û dema ku li ber wan hêrîşan xwe diparêzê dibe "terorîst"?. Mirov, tenê dikarê, vê bi armanca jenosîd kirina wî gelî re şîrove bike û werêne ser ziman. Ji xwe, ew hêz û dewletên ku kurdan weke "terorîst" bi nav dikin jî, ji aliyê van ve kurd "bêstatû" hatina hiştin. Î ro jî, hemû komkujiyên mazin ên ku têna serê kurdan di ancama wê de tên serê kurdan.

Li rojavayê kurdistanê, piştî ku kurdan xweserîya rojavayê kurdistanê denezend û rêveberîya kurd ya xweser avakir û pê de, êdî hêrîş lê zêdetir bûn. Pêşî, dijberîîya "muxalefeta Sûrî" lê hebû. Piştre, komên çete ên weke "cebetil-nasr" û ankû "DAÎŞ" li ser olê re û di bin navê olê de avakirin û dane hêrîşkirin li ser serê kurdan. Ev hêrîşên van ên li ser serê kurdan, hê jî li kurdan didom in. Hêrî zêde, di vê demê de hêrîş birina bi ser civate kurd a êzîdî de.

Pêşî hêrîş birina bi ser rojavayê kurdistanê de ku bi wê derbeyekê li kurdan bixin. Lê di wê de biserneketin. Piştre jî, li dora Musilê bidest hêrîşkirina li kurdên şebekî û piştre li şengalê kurdên êzîdî kirin. Ev hêrîşên li kurdên êzîdî hê jî di dom in. Bi sed hezaran kurdên êzîdî ji cih û warên wan hatina kirin. Têcîrîya êzîdîyan hat pêşxistin, weke ku çawa ku di salên 1916´an de têcîrîya ermeniyan hat pêşxistin.

Ev hêrşên ku li kurdên şebekî bin, li rojavayê kurdistanê bê û her wusa li şengalê û devereka din a kurdistanê bê, bi armanca şikandina kurdan û derbe li kurdan xistin a. Beşên civate kurd, beş bi beş dikina armanc û hêrîşê li wan dikin. Bi teybetî, ji kîjan aliyê û nûqteyê ve civate kurd û ankû beşeka civate kurd bêparastin a, wê kifş dikin û hêrîşê dibina li ser wê. Bi wê re, bi sadan mirovên sivîl qatil dikin. Bi wê qatilkirinê re xwe dikina rojevê de. Li ser komkujiyên bi vî rengî ku bi wê xwe kirina rojevê de, şerekî deronî jî li dijî civate kurd didina meşandin. Di vê temenê de, ku mirov bibêje hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê bi vî rengî aliyekî wan ê bi şerê deronî ve jî heya ku mirov kifş bike û werêne ser ziman.

Ev hêrîşên li şengalê li kurdên êzîdî û li rojavayê kurdistanê li kurdan, em divê ku bi hevdû ve girêdayî şîrove bikin. Her wusa, bi hêrîşên DAÎŞ´ê re, hêzên ku piştgirî didina DAÎŞ´ê, bigiştî pêşketina kurdan a hem li rojavayê kurdistanê û li başûrê kurdistanê jî kirina armanc. Bi wê re, xwestina ku derbeyekê li kurdan bixin. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, hêrîş li pêşketina kurdan in. Hêrîş li asta pêşketina kurdan a. Rejimên

herêmê ên weke tirkiya ku di vê demê de li ber pirsgirêka kurd û kirinên xwe ên li ber kurdan ku ´teşîr´ bûna, êdî bi van hêrîşan dixwezin temenê ´ne çareserkirina pirsgirêka kurd´ bi van hêrîşan biafirênin. Hinekî jî, armancaka bi vî rengî a rejimên herêmê ên weke tirkiya jî di temenê hêrîşên DAÎŞ´ê û hwd de heya.

Bi teybetî, ji aliyê kurdan ve ku mirov li hêrîşên DAÎŞ´ê binerê, divê ku mirov bibêje ku ev hêrîş, hêrîşên ku li dijî civate kurd û statûya wê ya ku li herêmê ku pêş dikeve na. Bi van hêrîşan, bigiştî hatîya armanc kirin ku derbeyek li kurdan were xistin û pêşketina wan were ji holê rakirin. Bo vê yekê, bi giştî herêmên sivîl û şariştanî ê jîyanî ên jîyane civate kurd tên armanc girtin. Ev hêrîş, ne hêrîşên leşkerî na. Ev hêrîş, hêrîş terorîstî ên li jîyan û pêşketina civate kurd in.

Jîyan, bi civatî pêş dikeve. Di nava pêşketina her pêşketina civatî de jî, beşên civatî hena û pêş dikevin. Bi teybetî, ku em ji vê aliyê ve li civate kurd binerin jî, emê bibînin ku gelek beşên wê ên bi kevneşopî û bawerî ên cuda û hwd hena. Ev beş û pêşketina wan ya civatî dihê armanc girtin. Yanî, bi teybetî, jîyane kurdî û civate kurd dihê armanc girtin. Hêrîşên DAÎŞ´ê bi rengê ku dihên xistin nava çapameniyê de û dihên weşandin jî, bi vê rengê na û vê yekê piştrast dikin. Hemû hêrîşên ku armanca wan ji hevdû felişendina pêşketina jîyane civatî ya. Bo vê yekê, ew hêrîş wê bi çi rengî di nava jîyane civatê de bandûre bikin û tirsê pêş bixin, di wê temenê de dihên weşandin û dihên ragihandin.

Li şengalê jî, bi vî rengî bû. Pêşî, çend kurdên êzîdî ên çeteyan ew ku sax girtin, li berçavên çapameniyê qatil kirin. Heta ku hinek ji wan bi saxî serê wan jêkirin û dîmenên wan bi vîdeoen kişandin û di çapameniyên civaknasî de weşandin. Bi vê yekê û rengê, kîjan mirovî jî, dema ku li wan temaşa kir, êdî wê bandûr li wan bikira û wê bitirsiha û wê goç bikira. Ji xwe, çeteyên DAÎŞ´ê, li gelek deveran bi awayekî vekirî, ji niştecihên wê herêmê xwestina ku ji herêmê goç bikin. Bi vê yekê, temenê jîyane civatî ji hevdû felişênin. Yanî, em dikarin bi awayekî pirr vekirî û zelal bibêjin ku ev hêrîş, bi teybetî, hêrîşên li pêşketina civate kurd in.

Hêzên ku DAÎŞ´ê didina şerkirin, ew bixwe jî, ne hêvî dikin ku serkevtinaka leşkerî bidest bixin. Ew bixwe jî, di zanînin, wê li kurdistanê, serkevtinên leşkerî bidest nexin. Lê bi hêrîşan û rengê hêrîşan, pêşketina civate û temenê pêşketina civate kurd armanc girtina. Ev yek, li şengalê û di hêrîşên li şengalê de bi awayekî vekirî derket li holê. Ji ber ku ev hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşên bi armanca tisandina mirovên civatê kurd in û wan ji herêmên wan bidina goçkirin in, êdî ji ber vê yekê wê çaw di vê temenê de bigihijina armancê, di wê temenê de çapameniyê bikardihênin. Di vê temenê de, hêz û dewletên herêmê ên ku DAÎŞ´ê didina şerkirin li dijî kurdan, ew bixwe jî, di vê temenê de di nava bendewarî û hêvîyê de na.

Hêrîşên li hebûna jîyane civatî bin, bigiştî di wan de çend mirov hatina kuştin bo çeteyan ne giring in. Ya giring ew a ku çendî karîya li ser çapameniyê re deng çebike û ´sensansyon´ bi xwe re çêkiriya, ew bo wê giring a. Bo vê yekê, li ber çapameniyê jêkirina serê mirovekî û kişandina dîmenên wê û li ser medîyaya civaknasî re belavkirin, hêrîş birina li ser parazgehan civatî û sivîl û li wir qatilkirina bi dehan sivîlan û hwd, ya herî giringa bo hêrîşên çeteyan. Bo vê yekê, komên bi vî rengî ên çete ên weke DAÎŞ´ê, bi teybetî li nava bajaran û li deverên ku girseyên sivîl û civatî lê dijîn, li wan

dihên bicihkirin. Bi vê re jî, armanc, ew a ku wê çawa tirsandinê bidina çêkirin û bidina pênaberkirin(goçberkirin).

Di vê temenê de DAÎŞ hatîya avakirin. DAÎŞ, bi teybetî, armanca wê tenê ew pêşketina mesopotamiyayî û kurdistanî a li kurdistanê ya. Di vê temenê de, wê çawa derbe li pêşketina kurdistanî were xistin, di wê temenê de dîzaynkirin li DAÎŞ´ê hatîya kirin. Bi teybetî, wê çawa derbeyê li civate kurd bixin, ew hatîya armanc girtin. Li vir, di temenê stretejiuyek leşkerî de DAÎŞ hatîya avakirin. Di hin stretejiyên leşkerî ên klasîk de, weha dihê gotin, ku dema ku ji aliyê leşkerî ve derbe li hêzekê hat xistin ew êdî dihê têkbirin. Li vir, li dijî, kurdan ev stretejî bi deh salan ji aliyê rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin hatîya meşandin, lê ti serkevtin bi wê bidest nexistina. Nûha jî, di vê temenê û mantiqê de serî li rêbazeka din hatîya xistin. Hebûna civate kurd û beşên civate kurd, temenê pêşketina wê û serkevtina wê hatîya ditin. Bi wê re jî, li şûna ku di anîyê de herina bi ser kurdan de, ew temenê ku civate kurd li ser pêşketîya civate kurd dihê armanc girtin. Weke ku çawa ku di salên 1990´î de rejima tirk, bakûrê kurdistanê vala kir, bi milyonan kurd ji kurdistanê li rojavayê tirkiya û ewropa dane goçberkirin, bi heman mantiqê, nûha nêzîkatî li ser DAÎŞ´ê re jî li civate kurd hatîya kirin. Mantiqê vê ê leşkerî jî, ew a ku tê gotin ku "bahrê biçikêna û masî bigrê" ya.

Rejima tirk, bi dehan salan, rêya têkbirina tevgera azadîya kurd, di projeyên aborî û tirsandin û valakirina kurdistanê de dît. Bi wê re, bawer dikirin ku wê temenê pêşketina tevgera azadîya kurdistanê were ji holê rakirin. Bi vê armancê, ser 4 hezaran re gundên kurdan hatina şawitandin û valakirin. Nûha jî, weke ku ev weke politikayê li dijî kurdan û civate kurd bigiştî dihê meşandin. Bo vê yekê, DAÎŞ´ê jî, ne weke rêxistineka ku bi leşkerî bi kurdan re şer bike, her wusa weke rêxistineka ku hêrîşan bibe ser sivîlan û jîyane sivîl a civatî de û ku bi wê re jî êdî çavtirsandinê bide çêkirin û mirovan ji cih û warên wan bide goçberkirin. Bo vê yekê jî, hêzên ku DAÎŞ´ê didina şerkirin, li herêmên başûrê kurdistanê, rojavayê kurdistanê, bakûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê dinerin ku li kîjan nûqteyê û herêmê civate kurd bêparastina, wê kifş dikin û ji vir ve hêrîşên goçberkirinê li hebûna beşên civate kurd ên weke kurdên êzîdî, şebekî û hwd dikin.

Bi vî rengî û bi politikayên bi vî rengî ên goçberkirinê bi sed hezaran kurdên êzîdî ji herêmên wan ên şengalê dane goçberkirin. Bi sed hezaran kurdên êzîdî di rêyan de na. Bi hezaran ji wan di rêyan de jîyane xwe ji dest dane. Bi vê rengê, şengal weke trejedîyeka nû ya civate kurd pêşxistin. Bi wê re, ku derbeyekê li pêşketina kurdan, li deronîya kurdan û her wusa li civate kurd bixin. Di vê temenê de, hêrîş li civate kurd dihên kirin.. Mantiqê di temenê hêrîşên li şengalê de, divê ku mirov bihêrîşên giştî ên li kurdistanê dibin re fahm dike. Şengal, weke xelaka zayif û bêparastin ditin û ji wir ve bidest hêrîşkirinê a li kurdan kirin. Ji ber ku li şengalê hêzeka xwe-parastinê ne hatibû afirandin, êdî temenê vê trejediyê hat çêkirin.

- Lê vir, dikeve ser milê kurdên êzîdî de jî û kurdên ne êzîdî de jî, ew a ku derfetê nedina vê têcîra sedsale 21´ê ku bigihijê armanca xwe. Di destpêka sadsale 20´an de, têcîra ermeniyan bi komkuji û ji warên wan kirinê re hat biserxistin. Dema ku kurdên êzîdî ji şengalê dûrketin, wê hingî ev têcîra kurdên êzîdî herê sêrî. Bo vê yekê, biqasî ku li hemû beşên civate kurd û giştîya civate kurd dikeve ku li hemû kurdên êzîdî ku ji

warên xwe goçkirina xwedî derkevin, bi heman rengî, dîsa li kurdan dikeve ku şengal were parastin û hemû mal û herêmên êzîdîyan weke ku ew li wir bin, were parastin. Bi vê re jî, êdî ku ew ji warê xwe neqatihin. Bi vê re jî, êdî wê têcîra kurdên êzîdî neçê sêrî. Di sedsale 21´ê de têcîra kurdên êzîdî û bigiştî jî ya civate kurd dihê kirin.
-

**Li ser jenosîda kurdên êzîdî û ankû ´têcîrîya êzîdîyan´ ji herêma Şengalê**

Jenosîda kurdên êzîdî di dawîya çeyreka sadsale 21´ê ya pêşî de pêk hat. Bi deh hezaran êzîdî hatina qatil kirin û ji cih û warên wan hatina kirin. Trejedîya kurdên êzîdî, dema ku ez lê hizirîm, têcîra ermeniyan a di sale 1916´an de hat bîra min. Rewşa ku î ro kurdên êzîdî dijîn ji ya wê rojê ya ku ermeniyan jîyan kir ne cudatira. Heta ku, ez dikarin bibêjim ku xirabtira jî. Jenosîda kurdên êzîdî, di dawiya çeyreka sadsale 21´ê a pêşî de pêk hat. Li ber çavên hemû mirovatiyê ew jenosîd hatkirin. Li ber wê jenosîde, cihanê tenê ew tamaşa kir. Jenosîda kurdên êzîdî, di demeka wusa hat kirin.

Jenosîda kurdên êzîdî, gav bi gav çawa, bi ber wê çûyin bû, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Di vê demê de, vê jenosîda sadsale 21´ê, em divê ku werênina ser ziman. Sadsale 21´ê, weke ´sadsale, maf û azadî û demokrasiyê´ hatiya bi nav kirin. Di sadsaleka ku bi vî rengî hatî bi navkirin de, ev komkuji hatkirin û hat hanîn serê kurdên êzîdî û di keseyetîya kurdên êzîdî li serê hemû civate kurd.

Î ro, çend ku jenosîda kurdên êzîdî em bi navê kurdên êzîdî re werênina ser ziman jî, em nikarin tenê bi wê re werênina ser ziman. Ji wê zêdetirî, divê ku weke jenosîda ku hatî serê civate kurd bihasibênin û di vê temenê de werênina ser ziman. Ji xwe, jenosîdeka ku hatîya serê civate kurd. Ev jenosîd, temenê wê hatîya çêkirin, plan û porgrama wê hatîya kirin û piştre hatîya kirin. Yanî, em nikarin, bêplan û bêprogram werênina ser ziman. Ji xwe, hin bi hin agahi dikevina nava çapameniyê de jî, di dema ku çeteyên DAÎŞ´ê ketina musilê û hwd de, di temenê peyman û levkirinekê de plansazîya hêrîşên li ser şengalê hatîya çêkirin û hatîya xistin di piretîkê de.

Jenosîdek, dema ku bi plan û program hebûna civatekê û ankû komek ji wê civate were armanc girtin, mirov dikarê bahse wê bike. Di vê temenê de, dema ku em li ser jenosîda kurdên êzîdî dihizirin, em dibînin ku şert û mercên bi karhanîna gotina "jenosîdê" bi zêdetirî jî heya. Jenosîd, dema ku komeka civatî, ji ber cudahîya xwe ya etnîkî û ankû bawerîyê ku rastî hêrîşê were û ankû were tûna kirin, mirov dikarê bahse wê bike. Di vê temenê de, jenosîda kurdên êzîdî em dikarin bahse wê bikin. Kurdên êzîdî, ji ber du sedeman rastî jenosîdê hatina. Sedema Pêşî a yekemin ew a ku ji ber ku ew êzîdî na û bawerîya cuda ya. Sedema duyemin jî, ew a ku ji ber ku ew kurd in û bi kurdî diaxifin. Ev herdû sedem, di temenê jenosîda kurdên êzîdî de ya.

Di vê temenê de jenosîda kurdên êzîdî, divê ku mirov bi teybetî bahse wê bike. Dîroka jenosîda kurdên êzîdî jî heya. Heta roja me, kurdên êzîdî, ji ber cudahîya bawerîya wan û ankû ji ber ku ew êzîdî na, rastî hêrîşan hatina û komkujiyên mazin jîn kirin. Bo vê yekê, di nava kurdên êzîdî de, weke ku gotinaka ku bi bûya malê xalkê jî, tê gotin ku "72 ferman hatîya serê kurdên êzîdî." Ev gotin, rastîyaka kurdên êzîdî a dîrokî dihêne ser ziman. Bi vê gotinê mirov fahm dike ku heta vê roja me, bi heman rengî, weke ku çawa ku kurdên êzîdî rastî jenosîdê hatin, di demên buhurî de jî 72 caran rastî hatina. Ev, weke rastîyeka dîrokî derdikeve ber me.

Kurdên êzîdî, ji ber bawerîya xwe, rastî van fermanan hatina. Di roja me de jî, ji ber ku êzîdî û kurd in, rastî jenosîdê hatina. Ji ber hebûna xwe ya etnîkî û rengê bawerîya xwe kurdên êzîdî rastî komkujiyan hatina. Î ro jî, ji ber rengê bawerîya xwe û kurdîtîya xwe rastî jenosîdê hatina. Di vê temenê de, divê ku mirov bi teybetî, bahse vê jenosîda kurdên êzîdî a di sadsale 21´ê de bikin. Ev jenosîd, teybetmendiyeka wê heya. Di serdemeka ku bi navê ´maf û azadîyê´ dihê kirin de, ev komkuji bûya. Ev serdema ku tê gotin ku ´serdema maf û azadîyê´, di wê de hê jî kurd bêstatû na. Her wusa, dema ku em komkujiyên ku hatina serê kurdan û bi teybetî ku hatina serê beşên civate kurd ên weke kurdên şebekî û kurdên êzîdî, divê ku em di temenê wê de wê ´bêstatûtîyê´ jî bi nav bikin û werênina ser ziman.
Gelê kurd, piştî şerê cihanê ê yekemin û pê de, bêstatû hat hiştin. Piştre, welatê kurdan Kurdistan, di nava çar dewletên ku hatina avakirin de hat parvekirin û qatkirin. Piştre, navê ´kurd´ û ´ Kurdistan´ê hat qadaxa kirin. Yekî ku digot ez kurd im, dibêt ku tenê ji ber wê bi navkirinê biheta qatil kirin. Ji xwe, bi hezaran kurd, bo wê sedemê hatina qatil kirin jî. Hê jî, kurd, ji ber ku kurd in dihên qatil kirin. Ev jî, weke rastiyekê ku em divê ku di temenê jenosîda kurdên êzîdî de werênina ser ziman.

Jenosîda kurdên êzîdî, di temenê wê de, "dijberî" û "dijminatîya" ku li ser gotinên olî re rayadarên dewletên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin jî, rol û weyneka mazin leyistîya. Ev jî, weke aliyekî din ê giring divê ku em li berçav bigrin û werênina ser ziman. Jenosîda kurdên êzîdî, di vê sadsala ku weke ´sadsale, maf û azadî û demokrsiyê de kirina wê, weke şermeka mirovatîyê jî divê ku mirov wê werênê ser ziman.

Li vir, bi teybetî, divê ku em gotinên oldaran ên di temenê dijber de ku li dijî kurdên êzîdî hatîna bikarhanîn jî ji bîrnekin û li vir bahse wan bikin. Oldarên ku nêzî rayadarên van dewletên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, hertimî di temenê dijberîyekî û dijminatiyekê de bahse rengên din ên bawerî kirina. Di vê temenê de, ku bahse wan kirina jî, bi dijminatî bahse wan kirina. Pêvajoyên vê jenosîda kurdên êzîdî, divê ku em werênina ser ziman. Ev pêvajo, giring in. Pêvajo, çawa bi bawe jenosîda kurdên êzîdî de çû, divê ku em bi teybetî li ser wê jî rawastihin û wê werênina ser ziman.

Pêvajoya pêşî ya destpêkirina jenosîdê, ku mirov hewl bide ku wê werêne ser ziman, divê ku em em herina heta destpêka mudaheleya li Sûrî. Di vê destpêkê de, pêşî Ji emerika û welatên ewropî gotinên dijberî rejima baasê a Sûrî hatina ser ziman. Ji wan gotinan dihat fahm kirin ku wê hin bi hin temenê mudahaleyekê li wê were afirandin. Wusa jî bû. Ji xwe piştre, ev hat ser ziman. Berî hewldanên mudahaleya li Sûrî, mudahaleyek li Libya bûbû û rejima Qadafî hatibû rûxandin û qadafî bixwe jî hatibû kuştin. Piştî wê mudahaleyê re, Libya, ji aloziyekê di buhurî li ya din. Êdî ti kesekî jî, bawer ne dikir ku êdî wê aramî li wir çê bibe.

Piştî wê re, êdî hêzên rojava, di pêşengîya emerika de xwestin ku Mudahaleyê li Sûrî jî bikin. Di vê demê de, hêzên ku herî zêde li ber wê disekin in Çîn, Îran û Rûsya bû. Wekî din, dewletên li herêmê ên weke tirkiya û hwd, aligirên mudahaleyê bûn. Di wê demê de, rêxistinên weke "îxwanî-l muslîmîn" û hwd, derketina li holê. Bandûra rêxistinên bi vî rengî zêdetir bû. Bo mudahaleyeka mihtemel a li Sûrî, emerika jî û welatên ewropî jî, hizir dikirin ku ji vê rêxistina ku heyî sûd bigrin. Bo vê yekê, ji hinek

aliyan ve, alikarî jî danê de ku li dewletên li herêmê ên weke Misrê were ser îktîdarê jî. Di bin pêşengîya Mûrsî de, care pêşî bi hilbijartinan serokwezirek hat bijartin li Misrê. Li welatên din ên arab jî, ew bandûr bû. Piştre jî, hin bi hin temenê mudahaleya li Sûrî hat çê kirin.

Hêzên ku dihizirin ku mudahale li Sûrî bikin û rejima baasê bixûrîxênin, di bin navê "muxalefeta Sûrî" de, bidest avakirina komek ku bibe "artarnatîf" ji rejima ku heyî a beşar el- Esad re. Li tirkiya, bidest avakirina komên bi vî rengî kirin. BI wê re jî, komên çekdar ên ku wê li dijî rejimê şer bikin jî, bidest avakirina wan kirin. Hêzên rojava û bi teybetî emerika, dixwest ku rejima baasê herê û li şûna wê rejimek aligirê wê were ava kirin. BI wê re jî, hem li herêmê hêza xwe ya sîyesî maztir bike û hem jî li ber Îran û Rûsya, xorttir bibe. Bo vê yekê, hin bi hin temenê mudahaleyê hat afirandin. Piştre jî, Di vê temenê de, politika hatina afirandin.

Li Sûrî, nêzî 5 milyonan kurd hena. Lê di ti pêvajoyên wê pêvajoyê de cih ne hat dayîn li Kurdan. Rejimên herêmê ên ku bi destê wan kurd bêstatû hatina hiştin, bi destê wan, dixwestin ku dîsa kurdan dervî pêvajoyê bihêlin. Bo vê yekê, ne xwestin ku di ti dokument û biryaran de navê kurdan hebe. Di wê pêvajoyê de konferanse pêşî a Cenev´ê jî bû. Lê dîsa navê kurdan ne hat ser ziman. Ti tiştek bi navê kurdan ne hat kirin. Kurdan dixwestin ku li herêmên xwe bi Azad bijîn. Bo vê yekê, dixwestin ku navê wan were ser ziman û bahse maf û azadîya wan were kirin. Muxalefeta Sûrî a ku hatîbû avakirin jî, ji hin sovenîşten arab hatibû avakirin. Ew jî, weke ku çawa ku rejimên herêmê dijberî li kurdan dikirin, wan jî bidest bidest dijberîya li kurdan kirin.

Ev pêvajo, di hemû gavên pêvajoyê de bû. Di hemû civînên di derbarê sûrî de û ên Muxalefeta Sûrî jî di nav de, di wan de bi isrerî dixwestin ku bahse kurdan nekin. Bo vê yekê, wê çawa kurdan bêdeng bikin, li rê û rêbazên wê jî digerîyan. Kurd, civatek mazin bû. Ev civate mazin, wê çawa, bêî ku bahse wan û navê wan û mafê newê kirin, wê pêvajo werê meşandin, li rê û rêbazên wê digerîyan. Piştre jî, rejmên herêmê ên weke Tirki û ewropî û emerika, bidest dane şerkirina muxalefeta Sûrî li dijî rejimê kirin. Di wê pêvajoyê de, kurdan xwe birêxistin kirin û li herêmê xwe bidest xwe xortkirinê kirin. Di destpêka vê pêvajoyê de, kurdan bêî ku xwûna ti kesekî birijihê, ji Kobanê destpêkirin û dest danîna ser rêveberîya bajarên xwe di 19 temza 2012´an de.

Ev pêvajo, bo kurdan bû pêvajo û pêngavek nû ya demê. Kurdan piştre, hêzek xwe ya parastinê bi navê "yekîneyên parastina gel" bo parastina herêmên xwe ava kirin. Rejimên herêmê ên weke tirkiya, bi teybetî, li dijî vê pirr aciz dibûn. Bo vê yekê, rejima tirk, bidest bi rêxistinkirina komên çekdar kir ku li dijî kurdan bidest şer kirin. Pêşî, îstihbareta tirk, xwest ku bi destê hin kurdên ku di bin navê ENKS´ê de dabûbûna li hevdû, wê derbeyê li kurdan bixin. Lê piştre ku ditin ku wê nikaribin bidestê van kurdan derbeyekê li kurdan bixin, piştre bidest rêxistinkirina li ser olê re kirin. Pêşî, di vê pêvajoyê de me navê "cebetil-nasr" bihîst. Ev rêxistin, ava kirin û li herêmên kurdan ên weke şerêkahniyê dane hêrîşkirin li ser kurdan.

Bi destê van rêxistinan bidest kuştina kurdan li rojavayê kurdistanê kirin. Piştre, hin bi hin ev asta hêrîşan a li dijî kurdan hat bilindtir kirin. Di wê navberê de, muxalefeta Sûrî jî, bi kurdan re dane şer kirin. Ew jî, ajotina ser kurdan de. Muxalefeta Sûrî, di dicîvînên xwe ên ku li Antebê û hwd ku dikirin de, biryara şikandina kurdan bi

leşkerî digirtin. Di vê temenê de, êdî piştre bidest çûyina bi ser kurdan de kirin. Piştî wê re, kurdan jî, ku fahm kirin ku telûke li ser serê wan heya, êdî bidest birêxistinkirina xwe kirin. Yekîneyê parastinê di bin navê "yekîneyên parastina gel" avakirin û bidest parastina xwe kirin.

Di vê navberê de, dewletên ku biryarên mudahaleya li Sûrî dane, wê çawa kurdan ´dervî pêvajoyê bihêlin´, li rê û rêbazên wê gerîyan. Di vê temenê de kurd, dervî hemû pêvajoyên sîyasî û civînên ku dikirin dihistin. Minaq, konferanse duyemin a cenevê ku hat li darxistin, di wê de jî kurd dervî pêvajoyê hatibûbûna hiştin. Weke ku çawa ku di konferanse Lozanê de kirin, kurdek kirina nave xwe de, ku dakû bibêjin ku meyîzênin va kurd jî li vir hena." Bi vê armancê tenê kurdek bi xwe re birin. Lê ew jî, ne ji bo naskirina navê kurdan bû. Ne ji bo bahse mafên kurdan bikin bû. Bo ku bahse kurdan nekin, ew kurd bixwe re biribûn.

Piştre jî, ev pêvajo, domîya. Kurdan gelekî li berxwe da ku hebûna wan were naskirin û ew bi awayekî fermî werina dewetkirin li nava wê konferanse cenevê a duyemin. Kurdan, çi kir û nekir, di vê de bi ser neketin. Piştre jî, konferans, bêî ku serkevtinekê bidest bixe bi dawî bû. Lê mijare kurdan bidawî nebû. ..

Di kurdan de, di vê demê û navberê de li herêmên xwe hin bi hin bidest rêxistina xwe ya demokratikî kirin. Di bin navê "xweserîya kurdistanê" de bidest xwe birêxistinkirinê kirin. Rêveberîya xweser a kurd hin bi hin temenê wê hat avêtin û pêşxistin û piştre hat avakirin. Rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatibû qatkirin, bi awayekî vekirî dijberîya xwe ya li dijî wê rêveberîya ku care pêşî kurdan bidestê xwe avakiriya, dane nîşandin. Care pêşî, di 19 temûza 2012´an de, dema ku kurdan dest danîna li ser rêveberîya bajarên xwe, serokwezirê demê ê tirk ê demê T. Ardogan, derket berçapameniyê û dijberîya xwe li dijî wê rêveberîya kurd hanî ser ziman û piştre got ku "emê dest girêdayî ne rûnihin û ne sekin in." Ev gotina, T. Ardogan, nîşanaka hêrîşên li kurdan bû. Ji xwe, herkesekê ku gotinên T. Ardogan şîrove dikirin jî, bi vê rengî, gotinên wî şîrove dikirin. Piştre wezîrê karê derve ê demê Dawutoglu ew zirtên bi gotinan ên li kurdan domand in.

Piştre, ew zirt(`tehdît´) di gotinê de neman. Hin bi hin, komên çekdar birêxistinkirin ku dane hêrîşkirin li ser kurdan. Pêşî, hêrîş bidestê muxalefeta Sûrî li kurdan kirin. Piştre, hin bi hin ev komên weke ´Cebetil-nasr´ avakirin û li herêmên weke ´serêkahniyê´ hwd bidest dayîna hêrîşkirinê a li kurdan kirin. Di wan hêrîşan de gelek kurd qatil kirin. Lê dîsa ti ancam bidest nexistin. Piştre hin bi hin bidest birêxistinkirin û mazinkirina rêxistina DAÎŞ´ kirin.

Ev rêxistin, weke rêxistineka ku di giştîya rojhilat de ku bi kurdan re bidina şerkirin, birêxistin kirin. Bi vê rengê, li Îraqê jî û li Sûrî jî, li ser esasê mezhebî û li ser Sûnnîtîyê re bidest rêxistinkirina wê kirin. Sûnnîyên Îraqê, ku ji rêveberîya malikî nexwest bûn, ew hatina xapandin û kirina nava DAÎŞ´ê de. Li Sûrî, bi heman rengî, li ser aşîrên arab û sûnnî re heman politika meşandin.

**Armanca bi pêşxistina bi DAÎŞ´ê ew a ku pêşketina civate kurd ji holê ra bikin û bi wê derbeyê li kurdan bixin.**DAÎŞ, weke rêxistineka ku bi wê hêrîşê bibina bi ser kurdan de. DAÎŞ, weke rêxistineka ku bi wê dixwezin ku pêşketina kurdan ji holê ra bikin. Di vê temenê de DAÎŞ hat avakirin. DAÎŞ´, piştî ku hat avakirin jî, temenê

hêrîşên wê li kurdan afirandin. Berê dane bi ser kurdan de. Ji xwe, ev rêxistin, armanca wê tenê kurd in. Çend ku bahse olê dikin û li ser olê û îslamê re bahse wê dikin jî, em nikarin di vê temenê de bahse wê bikin. Ev şîroveyên li ser olê re tenê ji wê re dibina "maske". JI destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê ve, hertimî, "fetwa"´ya serê kurdan dan. Di temenê dijminatiya kurdan de, ´fetwa´ derxistin. Di gotin ku "kuştina kurdan ´helal´ a". "Destavêtina mal, can û jinên kurdan ´helal´ a.", Di dewama wê de digotin ku "mêrên kurdan bikujin û jinên kurd ji xwe re weke bikin ´carîya´". Di vê temenê de gotin dan gotin û bi van gotinan temenê hêrîşên li kurdan afirandin.

DAÎŞ, weke rêxistineka ku bi wê, wê çawa pêşîya pêşketina kurdan bigrin û wê çawa pêşketina kurdan bitefisênin, di wê temenê de dane hêrîşkirin li ser kurdan. Ew statûya ku piştî şerê cihanê ê duyemin ku li rojhilat hatibû pêşxistin û kurd di wê de ´bêstatû´ hatibûbûna hiştin, di wê temenê de DAÎŞ dane hêrîşkirin li ser kurdan. Dema ku kurdan, doza maf û azadîyê dikirin, ev çeteyên ku avakiribûn dane hêrîşkirin li ser wan.

DAÎŞ bixwe jî, rêxistineka ku di vê temenê de bi destê rejimên herêmê hatîya pêşxistin a. DAÎŞ´, projeyeka rejimên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin a. Wê çawa civate kurd di wê rewşa ku xistinê de bihêlin û wê çawa pêşîya xwestina maf û aazadîya kurdan bigrin û wê çawa pêşîya pêşketina statûya kurdan li herêmê bigrin, di wê temenê de DAÎŞ´ê didina şerkirin. Piştî ku şoreşa kurd li rojavayê kurdistanê bû û pê de, êdî di asta rojhilat giştî de bidest hêrîşkirinê li kurdan kirin. DAÎŞ, rêxistineka bi vî rengî ku di asta rojhilat de ku didina hêrîşkirin li kurdan.

Piştî ku rojavayê kurdistanê pêşket, êdî rêxistinên weke ´cebetil-nasr´, ´DAÎŞ´ pêşxistin k u bidina hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê. DAÎŞ´, li ser navê tirkiya, Îran û rejim û dewletên din ên ku politikayê li ser pirsgirêka kurd dikin, bi kurdan re şer dike. Rejimên herêmê ên weke tirkiya bi DAÎŞ´ê, didina hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê. Ji xwe, DAÎŞ´ bo vê armancê hat avakirin. Denezendina "dewleta îslamî" bi navê wê jî, bo ku wê bi kurdan re bidina şerkirin. Bi teybetî, herêmên kurdan ên rojavayê kurdistanê, dikina nava sînorê wê ´dewleta bi navê DAÎŞ´ê di denezênin. Ev jî, bo dayîna şerkirinê a bi kurdan re dihê kirin.

Rejimên herêmê, heta roja me, hertimî li ser olê re dijberî li dijî kurdan pêşxistina. Bi wê re jî, dijminatîya li kurdan pêşxistina. Î ro jî, li ser olê re wê li dijî kurdan dikin. Pêşketina ku kurdan di nava xwe de li bakûrê kurdistanê bê, li başûrê kurdistanê bê û li rojavayê kurdistanê û hwd bê ku çêkirina, di temenekî dixwezin ku di temenê dijberîya olî de şîrove bikin. Li ser DAÎŞ´ê re, ev hewldan bi destê rejimên herêmê hatîya kirin. Kîjan ol, dikarê ´fetwa´ serê gelekî bide`? Mirovekî ku ji ber ku aîdî koka xwe ya, çawa dibê ku lis er navê olekê mirov ´fetwa´ serê wê tê dayîn? Oldarên ku li ber wê bêdeng in jî, nikarin bahse oldarîya xwe û mirovatiyê bikin.

Di dema ku li bakûrê kurdistanê jî kurdan pêvajoyeka ´çareserîya pirsgirêka kurd dane destpêkirin. Di wê demê de, wê çawa pêşketina kurdan ji holê ra bikin, di vê temenê de DAÎŞ derxistina li holê û bi kurdan re didina şerkirin. Piştî ku DAÎŞ li musilê bicihkirn jî, herkesekî digot ku wê êdî "DAÎŞ, herê bi ser baxdadê de." Lê wusa nebû. Li şûna ku herê baxdadê û rêveberîya xwe bicih bike. Berê xwe da rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê û bidest hêrîşkirina li kurdan kirin. Ev jî, dide nîşandin ku DAÎŞ,

weke rêxistineka ku li dijî kurdan, ku bi wê dixwezin ku pêşketina kurdan ji holê ra bikin û bi wê derbeyekê li kurdan bixin, hatîya avakirin.

Piştî ku DAÎŞ li Musilê, bicih bû, piştre, pêşî, çû bi ser kurdên şebekî de û ew ji herêmê dane goçkirin. Kurdên şebek, ji herêmên musilê bi ber başûrê kurdistanê de dane goçkirin. Piştre, çûna bi ser rojavayê kurdistanê de. Piştî wê re, dema ku ditin ku ancam ji wan hêrîşên xwe bidest nexistin, êdî bidest hêrîşên li şengalê kirin. Ew têkçûnên ku li rojavayê kurdistanê jîyankirin, bo ku bandûra wê ji ser xwe biavêjin, çûna bi ser şengalê û herêmên din ên başûrê kurdistanê de. Li herêmên şengalê, çeteyên DAÎŞ´ê, bi sedan jinên kurd ên êzîdî jî ravandin.

**Di 19´ê tabaxê de têcîrkirina kurdên êzîdî ji şengalê destpêkir**. DAÎŞ, weke rêxistineka ku armancaka wê ya sereka pêşketina a. Lê bi wê re jî, weke rêxistineka ku li ser mezhebê sûnnî re ku hatîya bi rêxistinkirina ku bi wê dihê xwestin ku li dijî Îranê jî bikarbênin. Ev alî jî, heya. Dema ku em DAÎŞ´ê, şîrove bikin, li ser aliyê wê mezhebî re, ji van aliyan ve şîrove li ser wê dihên pêşxistin. Lê çend ku di vê temenê de DAÎŞ hat pêşxistin jî, DAÎŞ´ê tenê berê xwe kurdan. Nûha tenê kurd di armanca hêrîşên wê ya. Di vê temenê de, li rojhilat, bi destê rêxistinên weke DAÎŞ´ê, nakokîyên mezhebî ku di nava Şîîtîyê û sûnnîyê û hwd jî, bikardihênin û li ser wan re şer pêş dixin.

Piştî ku DAÎŞ´ê pêşî hêrîşên giran birina biser rojavayê kurdistanê û Kobanê de û ku ji wir ji hêrîşên xwe ti ancam bidest nexist, êdî bi awayekî vekirî hat ser ziman ku DAÎŞ têk çû. Lê hêzên ku DAÎŞ li dijî kurdan avakirin, hêvîyaka mazin bi wê ve girêdabûn. Hevîya herî mazin ew bû ku DAÎŞ bi hêrîşên ku li kurdên rojavayê kurdistanê bike, derbeyek mazin li kurdan bixe. Bo vê yekê, berî ku roja salwegera şoreşa rojavayê kurdistanê ya 19 temûzê were, hêvî dikirin ku derbeyekê bi destê DAÎŞ´ê li kurdan bixin. Bi wê yekê jî bawer jî dikirin. Heta ku, DAÎŞ´îyan digotin ku "emê mêja cejna korbanê li kobanê bikin." Bi vî rengî, bawer dikirin ku wê derbeyekê li kurdan bixin. Bo vê yekê, êdî bidest çûyina bi ser kurdan de kirin. Komkujiyên mazin kirin. BI hezaran û seh hezaran kurdên rojavayê kurdistanê ji cih û warên wan kirin. Gelek kurd bûna pênaber û bi dunyê ketin.

Hêrîşên DAÎŞ´ê, di serî de, dema ku li rojavayê kurdistanê bûn, weke ku çawa ku rejima tirk dikir, dixwestin ku kurdan bidina goçkirin. BIdestê DAÎŞ´ê bi vî rengî, êdî bidest hêrîşên dayîna goçberkirin li kurdan kirin. Hêrîşên çavtirsandinê kirin. Bi vê rengê, wê çawa kurdan bidina goçberkirin, di wê temenê de bidest hêrîşan kirin. Tevî ku gelek goçberî dane kirin jî, li dijî kurdan li rojavayê kurdistanê, DAÎŞ´îyan ti ancam bidest nexist. Bo vê yekê, rejima ku stretejiya hêrîşê a DAÎŞ´ê dida kifşkirin rejima tirk, sînorên xwe ji wê heta dawiyê vekiribûn.

Ev hêrîşên DAÎŞ´ê, ew ancama ku rejima tirk û ên din dixwestin bidest nexist. Piştre, stretejiyek din kirina dewrê de. Ew jî, ew bû ku di temenê hinek levkirinan jî bê de, artişa îraqê ji herêmên weke Musilê û hwd dane vekişandin û li şûna wê DAÎŞ bicih kirin. Bi wê re jî, ku êdî pêvajoyaka nû ya şer li kurdan bidina destpêkirin. Piştî ku DAÎŞ li Musilê bicih kirin, êdî pêvajoyaka nû a şer li kurdan dane destpêkirin. Armanca, li herêmên musilê bicihkirina DAÎŞ´ê û hwd, dîsa kurd bûn. Bi wê, dixwestin ku derbeyekê li kurdan bixin. Bo vê yekê, piştî ku DAÎŞ´ li Musilê bicih kirin, piştre bi

wê germîyê, çekên ku kiribûbûna destê DAÎŞ´ê de, bi wan DAÎŞ dane hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê li Kobanê. Şoreşa rojavayê kurdistanê, ji Kobanê destpêkiribû. Roja ku di wê de destpêkiribû jî, 19´ê temûzê bû.

Bo vê yekê, ji cihê ku kurdan şoreşkiribû, ji wê bidest hêrîşê li kurdan kirin. Pêşî, bi awayekî pirr bi şitt bidest hêrîşkirina li Kobanê kirin. Kurdan, weke ku çawa ku destpêkek dîrokî bi şoreşa rojavayê kurdistanê re ji kobanê dabûn destpêkirin, bi heman rengî dixwestin ku ji Kobanê care pêşî derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê,ji Kobanê bidest hêrîşkirina li rojavayê kurdistanê kirin. Yanî, bi gotinaka din, dixwestin ku ji wê nûqteya ku şoreşkiribû, dixwestin ku derbeyê li kurdan bixin. Bo vê yekê, ji Kobanê ve, hêrîşek mazin li Kobanê li kurdan dane destpêkirin. Di destpêkê de, ji xwe bawer dikirin ku wê derbeyê li kurdan bixin. Lê piştî ku hêrîşan destpêkir û ditin ku nikarin derbeyê li kurdan bixin, êdî bidest hêrîşên li sivîlan kirin.

Hêrîşên bi destê çeteyên DAÎŞ´ê, ên li sivîlan jî, qatek ji rengê hêrîşên li rojavayê kurdistanê bû. BI wan hêrîşan dixwestin ku çavtirsandinê di nava xalkê de bidina çêkirin û êdî goçberkirinê bidina çêkirin. Yanî, rojava vala bikin. Bi vê rengê, hêrîş dane destpêkirin. Rejima tirk ku ji hemû alikariyên mirovî re deriyên sînoran girtibû, ji goçberkirinan re derî vekiribû. Bi vê rengî, weke politikayakê ppêşxistibûn. Piştî ku ´yekîneyên parastina gel´, Bergir(´tedbîrên´)ên xwe girtin û xalk parast û pêşîya goçberkirinê girt, êdî weke ku politikaya ku wan vala derket. Di vê temenê de, êdî li rêyên din ên goçberkirinê gerîyan. Di vê temenê de, çûna bi ser kurdan de. Ev politikaya goçberkirinê ku li rojavayê kurdistanê kiribûbûna meriyetê de, di rojava de bi wê ancam bidest nexistin. Piştre, êdî bi heman politikayê çûna bi ser herêmên başûrê kurdistanê ên weke şengalê de.

**Politikaya goçberkirinê li Şengalê li ser serê êzîdîyan kirina piretîkê de.** Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li rojavayê kurdistanê ji aliyên hêzên kurd ve hat şikandin, êdî li herêmên din ên kurdistanê ew kirina pretîkê de. Heta ku herî zêde bi wê ancam girtin jî, herêma kurdên êzîdî şengalê bû. Piştî ku DAÎŞ´ê di hêrîşên wê yên li ser rojava de ew hat şikandin, piştre li başûrê kurdistanê ew kirina rojevê de bi hêrîşên wê re. Bi teybetî, herêmên ku DAÎŞ li wan dane hêrîşkirin, herêmên weke Şengalê, Maxmûr jî, herêmên ku rejima tirk pirr ji wan aciz bû.

Di 19 tabaxê de çeteyên DAÎŞ´ê bidest hêrîşkirina li ser kurdên êzîdî a li Şengalê de kir. Bi hêrîşên ku li şengalê û herêmên şengalê dane destpêkirin, wê çawa goçberkirinekê bidina kirin, di wê temenê de çûna bi ser kurdên êzîdî û şengalê de. Lê berî ku werina bi ser
şengalê de, li herêmên li dora musilê hêrîşî kurdên şebekî kiribûn û ew ji herêmên wan dabûbûna goçberkirin. Kurdên şebekî, bi sed hezaran ji herêmên wan hatina goçberkirin. Bi wê re jî, êdî çûna bi ser kurdên êzîdî de. Bi wê re jî, beşên civate kurd ên ku bi bawerîya xwe cuda na, rastî hêrîşê hatina. Lê herî zêde çûna bi ser kurdên êzîdî de. Ew ancama ku bi dayîna goçberkirinê ku li rojavayê kurdistanê bidest nexistin, li herêma Şengalê weke ku xwestin ku bidest bixin.

Kurdên êzîdî, ti hêzên ku wan biparêzên nebûn. Di destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê de, çend pêşmergeyên ku li wir hebûn, ew jî vekişîya bûn. Şengalê, bi vê rengê bi baxtê xwe re bi tenê hatibû hiştin. Piştî ku hêrîş li kurdên êzîdî destpêkir, kurdên êzîdî jî bi komî xwe

spartina çîyayê şengalê. Di hundurê çend rojên pêşî de, bi seh hezaran kurdên êzîdî li çîyayê şengalê lev gihiştibûbûna li hevdû.

Piştî ku li çîyayê şengalê kombûn bû, êdî hêzên parastinê ên rojavayê kurdistanê, rewş fahm kirin û xwe gihandina herêmên şengalê û çîyayê şengalê û xalkê sivîl biparêzên. Piştre, hêzên rojava, "korîdorek" ewla çêkirin ku di wê de mirovan bi ewla bigihênina rojavayê kurdistanê. Bi heman rengî, piştre, goçberkirina kurdên êzîdî li bakûrê Kurdistanê, li rojavayê kurdistanê, li başûrê kurdistanê û li rojhilatê kurdistanê destpêkir. Lê herî zêde, goçberîya kurdên êzîdî li rojavayê kurdistanê û li bakûrê kurdistanê bû. Li bakûrê kurdistanê, herêmên weke silopîya, şirnax, çolemerg û hwd, weke herêmên ku herî zêde li wan goçberî bû. Li rojavayê kurdistanê jî, goçberîya ku bû, pirr zêde bû. Ser nîv-milyonê re kurdên êzîdî xwe spartina rojavayê kurdistanê.

**Bi sed hezaran kurdên êzîdî xwe spartin çîyayê şengalê.** Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li başûrê kurdistanê û bi teybetî li herêma kurdên êzîdî a şengalê destpêkir, bi sed hezaran kurdên êzîdî xwe spartina çîyayê şengalê. Li wir jî, di destpêkê de, çeteyên DAÎŞ´ê xwestin ku herina biser çîyayên şengalê de û hêrîşî wan sivîlên ku xwe spartina çîyayê Şengalê. Piştî ku bi sed hezaran kurdên êzîdî xwe spartina çîyayê şengalê, êdî di nava rayagiştî a kurd de heyîderîyek mazin li wir çêbû. Piştre, ne bi gelekî re, hêzên partinê ên rojavayê kurdistanê YPG´ê û piştre HPG xwe gihandina wê herêmê ku wan sivîlan biparêzên.

Piştî ku hêzên parastinê xwe gihandina wir, êdî li wir, dorpêçkirinaka bo parastinê pêşxistin. Ne hiştin ku çeteyên DAÎŞ´ê xwe bigihênina wir ku hêrîşî van sivîlan bikin. Piştre, hêzên parastinê, ´korîdorek´ ku wan sivîlan bi ewla bigihijêne rojavayê kurdistanê da çê kirin. Bi wê rengê, piştî ku korîdor çêkirin, piştre ew jin û zarok û sivîln li çîyayê şengalê gihandina rojavayê kurdistanê.

Rewşa kurdên êzîdî ku xwe spartina çîyayê şengalê, di nava çapameni û rayagiştî a navnetewî de jî cih girt. Li ser wê axiftin pir bû. Netewyên yekbûyî, xwest ku alikarîya mirovî li wan bike. Piştre, kurdên êzîdî ku hatina gihandin li rojavayê kurdistanê, li wir di "wergeha newrozê" de hatina komkirin û piştre hinekî alikarîya mirovî a neteweyên yekbûyî jî li wan bû. Lê bigiştî kurdên bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê bo parastin û alikarîyê seferber bûn.

Çeteyên DAÎŞ´ê, bo ku kurdên êzîdî ji şengalê derbike û navendên pîroz ên kurdên êzîdî ên li şengalê tûna bike, gelek hêrîş li wir dane kirin. Li ber wan hêrîşan, hêzên kurd ku xwe gihandina wir, "hêza parastinê a hevbeş" bo parastina şengalê çêkirin. Piştre, ne bi gelekî re hêza parastinê a kurdên êzîdî bi navê "yekîneyên parastina şengalê" hatina avakirin. Ev hêz, wê karûbarê ew ba, ku şengalê û xalkê wê biparêzê. Hêrîşên ku werina ser şengalê ku li ber wan bisekinê û li berxwe bide.

Li çîyayê şengalê jî, gelek mirovan jîyane xwe ji dest dan. Ji ber ku pirr germ bû. Pêre jî, nan û av tûna bû. Bi vê re jî, rewşa ku herî zêde kir şepirzetîyek mazin çêbibe ev bû. Gelek zarokên li ber sina dayika xwe jî, nexweş ketin û jîyane xwe ji dest dan. Di wê rewşê de trejedîya herî mazin hat li berçav. Rewşa kurdên êzîdî ku xwe spartina çîyayê şengalê, di çapameniya cihanê de jî cih girt. Ew rewşa mirovan û trejedîya wan ya ku hat li berçav, bi di çapameniya cihanê de cih girtinê re li ser hat axiftin. Dîmenên jin û zarok û dayik û pîr û kalên kurd ku ketina rêyan de, ket nava rûpelên çapameniya

cihanê de.

Bi sed hezaran kurdên êzîdî xwe spartina bakûrê kurdistanê jî. Li herêma Silopîya, Şirnax û heta ku digihijê çolemergê û hwd, gelek kurdên êzîdî xwe li vê herêmê girtin. Di dema ku kurdên êzîdî bidest goçkirinê kirin û hetina bersînorê bakûrê kurdistanê, hêzên artişa tirk li ber sînor hebûn. Pêşî ne dixwestin ku destûrê bidina kurdên êzîdî ku ji sînor derbas bibin. Piştre ev bû, temenê bertekên mazin di nava civate kurd de. Rêxistinên kurd, bertekên mazin li dijî wê rewşa leşkerên tirk dane nîşandin. Lê kurdên êzîdî ku ji sînor derbas bûn, li bakûrê kurdistanê, saziyên rejima tirk ti alikarî nedane wan. Alikarî tenê ji kurdên bakûrê kurdistanê bû.

**Hebûna Şengalê û giringîya wê ya di nava çand û kevneşopî û dîroka kurdistanê de dîrokî ya.** Şengal, herêmeka ku weke navenda bo kurdên êzîdî. Kurdên êzîdî bixwe jî, weke navend in di nava çand, kevneşopî û dîroka kurdistanê de bi çand, kevneşopî û dîroka xwe re. Bo vê yekê, divê ku mirov bi teybetî li ser şengalê bisekinê. Şengal, û bi teybetî çîyayê şengalê, weke navendeka di bawerîya qadîm a êzdatîyê de. Ev çand û bawerî, bi rengê xwe re kurdîstanî ya. Rengê wê rengê kurdistanî ya. Î ro, bo vê yekê, divê ku em bi awayekî giring li wê binerin û li ser bisekin in.

Hêrîşên li şengalê, dema ku en ji aliyê bawerîyê lê binerin, em dibînin ku ji ber wê rengê bawerîya xwe ve hertimî rastî hêrîşan hatîya. Ev rengê çand û bawerîya şengalê a êzdatiyê kurdistanî ya. Ev jî weke aliyekî din ê wê yê giringa ku di temenê hêrîşên li wê de ya. Ji holê rakirina êzdatîyê, hinekî bi armanca ji holê rakirina wê nirxê bi navê kurdistanî ya. Ola êzdatiyê, zimanê wê kurdî ya. Ev jî, weke aliyekî din ê teybeta ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya.

Şengal, bo ku êzîdî ya, temenê hêrîşê li wê hatîya afirandin. Di sadsale 21´ê de, jenosîda êzîdîya li berçavê mirovatiyê hatîya kirin. Şengalî, ji ber rengê bawerîya xwe û ji ber koka xwe ya ku ji wê na, rastî hêrîşê hatina. Hatina jenosîd kirin. Ev hêrîşa li êzîdîyan di roja me de, hê jî didomê. Bi teybetî, ev rengê bawerîyê û çandê, hatîya ji holê rakirin.

Bi hêrîşên li şengalê û bi teybetî li êzîdîyê re, di aslê xwe de hêrîş li kurdistanîyan giştî dihê kirin. Li çandaka, dîrokeka û bawerîyaka kurdistanî ew hêrîş dihê kirin. Em vê hêrîşê bi vî rengî dikarin weke hêrîşeka dîrokî ku li civate kurd bigiştî fahm bikin û werênina ser ziman. Ji ber ku bi jenosîdkirina êzîdîyan, civate kurd û ankû beşeka dîrokî a herî kevn hatîya jenosîd kirin. Hewl hatîya dayîn ku were tûna kirin. Hê jî, hewl tê dayîn ku were tûna kirin. Kurdên êzîdî, heta roja me, gelek caran rastî komkujiyên mazin hatina. Heta roja me, ku bahse komkujiyên êzîdîyan dihat kirin, dihat gotin ku "72 ferman hatina serê êzîdîyan". Ev rast a. Î ro jî, em dikarin, weke fermane 73´min bi nav bikin û werênina ser ziman.

Jenosîda şengalê, dibe weke derbeyek li mejiyê kurdan ê dîrokê. Di vê temenê de, divê ku em vê jenosîd bi giringî şîrove bikin û fahm bikin. Li kurdistanê, heta roja me, bi sedan komkujiyên mazin ên ku rejimên herêmê kirina hena. Bi van komkujiyan gelek beşên civate kurd hatina tûna kirin. Li başûrê kurdistanê, hêrîşên li kurdên êzîdî li şengalê û hêrîşên li kurdên şebekî li dora musilê ku bûna, divê ku em weke hêrîşên dîrokî ên li civate kurd şîrove bikin û werênina ser ziman.

Hêrîşên li Şengalê, em nikarin tenê bi rêxistineka çeteyî weke DAÎŞ´ê ve bi sînor şîrove bikin û werênina ser ziman. Dema ku em em hêzên li pişt vê rêxistina kojar û hov nebînin, em nikaribin bi başî wê bênina ser ziman. Hêz(rejim)ên ku Kurdistan di nava

wan de hatîya qatkirin, çend ku nakokîyên wan ên mezhebî û desthilatdarî û hwd hebin jî, di mijare şerê bi kurdan re û di mijare şerkirina bi kurdan re bi hevdû re di ahangekê de tevdigerihin. Di vê rewşê de, rewşa Îran û Tirkiya, ji vê yekê re minaq a. Îran, çend ku xwe weke şîî bi nav dike û her wusa, rêxistina DAÎŞ´ê, sûnnîya jî, di nava wê rêxistina şûnnî a DAÎŞ´ê de gelek mirov ji Îranê jî tevlî wê hatina kirin. Yanî, DAÎŞ´, weke rêxistineka ku ji her çar dewletên ku Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin de jî, mirov hatîna tevlî kirin.

Her wusa, di vê temenê de, şerê di vê demê de têkbirina kurdan bi kurdan re dikin. Îran jî, em nikarin, ji pişt hêrîşên ku bi destê DAÎŞ´ê hwd bê, ku li kurdan dibin dûr şîrove bikin. Her wusa, rejima tirk, ji her aliyê ve jî, pirsgirîyê dide DAÎŞ´ê, DAÎŞ, di vê temenê de, weke rêxistinaka "kooalisyonî" ku li dijî kurdan hatîya avakirin a. Bi vê rengê, armanca vê rêxistinê ew a ku di vê temenê li ser navê dewletên herêmê ên weke îran û tirkiya kurdan bişikêne û çareserkirina pirsgirêka kurd ji holê ra bike. **Di çanda êzîdîtiyê de jin pîroz a. Divê ku mirov di vê şibekeyê de li jinê binerê û rewşa xirab ku hat hanîn serê jinên kurdên êzîdî şîrove bike.** Ola êzîdîtiyê, weke ola herî kevn a yek-yazdanî ya. Dîroka wê, pirr kevn û dirêj a. Bi teybetî, dîrokeka wilqasî dîrêj, dema ku em hewl bidin bi wê dîroka wê werênina ser ziman, wê di temenê pêşketina civatî de, wê gelek tişta rohnî bike. Li vir, divê ku ez di serî de bibêjin ku di temenê watekirinê jîyanê û pêşketinên wê ên ku bûna de dema ku em en dinerin, em dibînin ku xwediyê têgihiştineka bi demê re ya pirr pêşketî a bi demê re ya. Bi ´qawl´ û ´beytên´ wê hanîna li ser ziman, di temenê salixkirina jîyanê û bi wate kirina jîyanê de mirov divê ku fahm bike. Ji aliyê felsefekî û têgihiştinî ve, bi vê rengê em divê ku bi teybetî li ser bisekin in.

Dema ku mirov li rastîya dîroka êzîdîtiyê û pêşketina wê ya bicivatî dinerê, mirov dibînê ku gelek nirxên wê ji jîyanê hatîna dûrkirin. Di jîyanê de nayêna ser ziman. Her wusa, minaqe vê yekê ya herî zêde li berçav, ew a ku pergaleka perwerdekirinê ya pêşketî heya, lê heta nûha li ser wê serî ne hatîya wastandin. Dii vê demê de, herî zêde divê ku serî bi awayekî aqadamikî were wastandin. Nerîna êzîdîtiyê, nerîna mesopotamya ya pirr-rengî ya. Di wê nerînê de, jîyan bi hemû reng û pêşketinên wê re hatîya ser ziman. Bi teybetî, dema ku em di vê çerçoveyê de li hebûna jinê binerê, em dibînin ku di nava wê nerînê, têgihiştin û kevneşopîyê de jin ´pîroz´ a. Divê ku em vê di serî de kifş bikin.

Ev pîrozîya jinê a di nava çanda êzîdîtiyê de, piştre wê di nava çanda mitratiyê jî bicih bibe û piştre di nava zerdeştîtîyê de jî bicih bibe. Her wusa, di çanda Manîtiyê de jî ew heya. Lê koka vê pîrozîyê, em divê ku bi çanda êzîdîtiyê werênina ser ziman.

Civatek dema ku çanda xwe û dîroka xwe jibîrkir, wê hingî, hin bi hin têk herê û ji holê rabê. Bo vê yekê ya, ku kurdên me yê êzîdî bin û kurdên ne êzîdî jî bin, piştî ku ji warê xwe dûrketin, êdî ji wê çanda xwe jî dûrketina. Minaq, nîşanaka herî zêde ya vê dûrketina ji vê çanda binirx û kevneşopîyên wê, ew a ku dem bi dem tûndûtûjîya li ser jinê ku ketîya rojevê de. Di nava çandaka ku jin pîroz a û ku bi navê wê tûndûtûjî bi navê jinê werê ser ziman, wê çaxê em dikarin bi tememî vê bi ji wan nirxên wê çandê ê civatî dûrketinê werênina ser ziman. Ev alî hemû, aliyên ku em divê ku di temenê çanda dema şariştanîyê de ku werênina ser ziman in. Ev kevneşopîya ku koka wê li ser vê nirxa dîrokî û civatî ava ya, piştî ku misilmanetî derket jî ji nava kurdan ji holê ranebû. Her çend ku gelek zor û astangî derketina li pêşîya wê jî, lê dîsa wê kevneşopîya jinê a pîroz, weke ku çawa ku berî derketina îslamiyetê hebû, bi heman rengî hebûna

xwe domand bi navê "kevneşopîya hemawîyê".

Kevneşoîya hemawîyê, çi ya? Kevneşopîya hemawîyê, çanda pîroz a jina kurd a. Bi wê çandê, jina kurd, di nava civate xwe de serdest bûya û heta ku dem bi dem wê civate xwe bi rê ve birîya. Dema ku du mêr bin û ankû du aşîr jî bin ku ketina berhevdû de ku bi hevdû re şer bikin û ku jinek çûna û li nava wan sekinî û ew hemawîya li serê xwe di nava wan de avêt ardê, wê hingî wî şerê ku bikin êdî wê nekin. Jin, di nava civatan de bi mêr re rûniştîya û hizrên xwe hanîya ser ziman. Ti farq di navberê de nebûya. Dem bi dem, di demên berê de ku mîrên ku kurd diçûna seferan û ne divegerîyan, heta ku vegerîyaban wê jina wan li şûna wan mîrîtî biikira. Minaqe vê yekê jî, minaqe dayika kurd a Ûrmîyeyî dayika Annezê ya ku di sadsale 9´min de jîya ya. Vê dayikê di bin mîrîtîya xwe de du dewletên kurdan ên weke ´dewleta kurdên kekoyîdîyan´ û ´dewleta kurdên eyerîdîyan di bin gotina xwe de kirîya yek û bi wê temenê dewleta kurd a ´dewleta şadadîyan´ avêtîya. Mihemedê kurê şadadî ku dema ku hat ser mîrîtîyê û desthilatdarîya şadadîyan pêşxist, di temenê wê pêşketina wî de û li pişta wî, ew dayika kurd û ev kevneşopîya wê hebû.

Pêşketina civatî a jina kurd, çend ku dem bi dem weke kevneşopîyeka li şûnmayî dihê hanîn li ser ziman jî, dema ku em li dîrokî û li rengê pêşketina wê dinerê, em nikarin vê yekê piştrast bikin. Her wusa, dem bi dem bi wê rengê dihê ser ziman û tê gotin ku "li cihê ku mêr bi gotin bû û axift, wê jin bêdeng bê", "jin, ji male xwe dernekeve", "jin, ji gotina mêrê xwe dernekeve" û hwd, gotinên ku piştre di dema derketina islamiyetê de ku hatina ser ziman in. Bi vî rengî çandek êdî pêşket û bi bandûra wê bawerîyê jî li civate serdest bû. ..

Civate kurd, piştî ku hin bi hin çandek bi vî rengî pêşket û di nava wê de jî hin bi hin serdest bû, êdî pirr pirsgirêkên mazin ên civatî jîyan kirin. Piştre, di nava civate kurd de, di civatan de nîqaşên bi wê rengê hatina destpêkirin ku wê çawa wê çanda ku di wê de jin pîroz a û vê rengê pêşketinê bi hevdû re fahm bikin. Bi rengekî, ew pîrozîya jinê a ku hebû û piştre bi kevneşopîya hemawîyê jî dihat ser ziman, li ser wê nîqaş bûn. Ev pîrozîya jinê a ku koka wê li ser hîmê êzîdîtiyê ya û pirr kevn a, bi bawerîyê jî dihê ser ziman. Her wusa, dema ku êdî ew gotinên weke "li cihê ku mêr bi gotin bû û axift, wê jin bêdeng bê", "jin, ji male xwe dernekeve", "jin, ji gotina mêrê xwe dernekeve" û hwd, ku dihatina ser ziman, êdî weke ku nakokî derdiket. Filosofê kurd ê misilman Ahmedê Xanê jî ev nakokî dîtîya. Her wusa, ew pîrozîya jinê jî dîtîya. Bo vê yekê, dema ku berhema xwe ya bi navê ´Mem û Zînê´ nivîsand, li gorî wê nivîsand. Bi vê yekê û rengê, wî hizir kirîya ku hem wê pîrozîyê biparêzê û hem jî wê rewşa jinê ya bi wê werêne ser ziman.

Kevneşopîya jina kurd, di vê temenê de, dema ku em lê binerin, emê dîrokek pirr demdirêj û kevn bibînin. Ew gotin û rewşên ku bi navê civate kurd dihên ser ziman, ku "mafê gotinê ê jinê nîn a" jî, piştre derketîya li holê. Lê piştre jî, di nava civate kurd de, bicih jî bûya.

.. Dema ku em bahse perwerde bikin, divê ku em hinekî bi şûn herin û werênina ser ziman. Di nava kurdan de, kevneşopî weke nirxna li pêş ên ku li ser wan re xwe bizanebûn kirin bûn. Dema ku em bahse kevneşopîyan bikin, divê ku em kevneşopîya êzîdîtiyê biserekeyî li berçav bigrin û werênina ser ziman. Êzîdîti, xwediyê dîrokeka pirr demdirêj a. Dîroka wê, pêşketina wî ya bipergalî a civatî û hwd, hê bi tememî ne hatîya fahm kirin. Em pêşî ji vir destpê bikin. Rengê pêşketina civatê, hinekî jî rengê xwe

perwerdekirinê û pêşketina jîr û aqilê civatî ê ku li ser wê re perwerdebûn dibê, bi wê dihê fahm kirin. Bo vê yekê, divê ku em bi teybetî li ser vê rewşa êzîdîtiyê bisekin in.

Î ro ku em li demên hûrî û Mîtannîyan dinerin, em çanda êzîdîtiyê serdest dibînin. Laleşî, pêşketîya û weke sazîyeka civatî ya di wê de xwe perwerdekirinê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Rengê pêşketinê ê civatî ê di nava êzîdîtiyê de pêşketîya, bandûra wê, wê li pêşketinên olî ên piştre ên weke Mîtratiyê, Zerdeştîtîyê û her wusa piştre Manîtîyê û heta ku digihijê yersanîtîyê û hwd, dibê. Ev pêşketinên ku bûna, bi hemû pêşketinên olî ên di vê xatê de, di temenê wan de çand û kevneşopîya êzîdîtiyê heya. Bandûra êzîdîtiyê, li cihûtiyê jî bûya. Her wusa, bi çand û pêşketinên weke mîtratiyê û hwd re, li xiristiyanîyetê jî bûya. Em dibînin ku ser çand pêşketinên weke Zerdeştîtîyê û Manîtiyê re li Misilmanetiyê jî pirr bûya.

Di nava civate kurd de, kevneşopî pirr giring in. Bi kevneşopîyê, hemû rewş û hal û tevgerên jîyanî, jin û mêran hatina dîyarkirin. Bi wê yekê re, rewş û asta mirov di nava civate wî de hatîya dayîn kifşkirin. Keçikek dema ku bê dema zawacê, wê ´cehîzê´ xwe çê bike. Wê bi gotinaka din temenê male xwe hê di male bavê xwe de bi vî rengî çê bike. Jin, bi vîna xwe ya û ew bi vîna xwe diafirêne. Dema ku dema zwace wê hat jî, heta ku ew bixwe nebêje herê, ew bi ti kesekî re nayê zawicandin. Ev jî, weke xaleka giringa ku divê ku mirov binxat bike. Bi vir ve girêdayî, divê ku em bibêjin ku dema ku qelen dihat standin jî, ew qelen di temenê hin alikariyên di avakirina male wan ciwanên de dihat standin. Lê piştre ku ev jî bû weke kevneşopîyekê û bû sedema dayîn û ankû nedayîna keçikê, êdî bû temenê pirsgirêkê jî di nava civatê de. Dîroka jina kurd a bi dîroka êzdatîyê pirr kevn diçêt. Di nava wê de jî, jina kurd bi vîna xwe hebûya di nava civate xwe de û di nava pêşketina wê de. Bi heman rengî, weyneka mazin jî di pêşketina civatê de leyistîya. Her wusa dîroka jina kurd, bi wê dîroka êzdatiyê re pirr kevn a û bi serdestî xwe jîya ya. Bi hevdû re bergkirina jin û mêran a di laleşê de, tenê aliyekî wê dihêne ser ziman. Dîsa, dema ku zaroyek bû, wê ji destê jineka pîr ku bi zerikê avê ji ´kehnîya sipî´ dihildê( ev av, ´ave kewserê´ ya.) û pêde dike ku dike êzîdî, dibê êzîdî. Lê ji aliyê felsefîkî jî, giring a ku divê ku mirov li ser bisekinê ya. Bi aliyê felsefeyê re û her wusa minaqên dîrokî ên di jîyanê de ku pêşketina divê ku em bi wê vê aliyê felsefeya êzdatiyê werênina ser ziman. Ev, biqasî wê geza nan ku ji destê dayika pîr ku hîç ne zewicîya û ku di laleşê de dihê xwarin pîroz a. Biqasî, wê ave ku dayikek bi zerikê ji ´kehniya sipî´ dihilde û bi wê zarokan de dike û bi wê dike êzîdî pîroz a.

-Bi hezaran jînên kurd ên êzîdî girtin û birin û weke kola di bazaran de firoştin. Piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşî şengalê kirin, trejedîyeka mazin bû. Bi sed hezaran şengalî goçber bûn. Bi hezaran kurdên êzîdî jî hatina qatil kirin. Lê di vê trejedîya kurdên êzîdî de, herî zêde dîsa Jinan û zarokan zirera mazin dît. hertimî, zihniyeta mêtinger ku li gorî ya mêr a, di şeran de jin weke ´genîmetê´ de dîtîya û dest danîya li ser wê. Mixabin, di wê sadsale 21´ê de ku jenosîda kurdên êzîdî bû de, dîsa heman tişt bû. Di jenosîda kurdên êzîdî de, bi hezaran mêr hatina qatil kirin û bi hezaran jin, weke ´genîmeta şer´ hatina berhevkirin û ravandin. Her wusa, destavêtina Jinan, weke kevneşopîyeka vê zihniyeta kujar a.

Di hemû komkujiyên mazin ên ku hatina kurdên êzîdî de jî, destavêtina Jinan bûya. Her wusa, ne tenê di komkujiya kurdên êzîdî de, komkujiyên ku bigiştî hatina serê civate kurd hemûyan de, destavêtina li jinê bûya. Lê di hêrîşên weke ên li beşên civate kurd ên weke êzîdî û hwd de, ev destavêtin zêdetirî bûya. Ji ber ku civate kurdên êzîdî ji

aliyê bawerîya xwe ve cuda ya jî, ev cudahîya rengê bawerîya wê bûya sedema destavêtina jinên kurdên êzîdî. Di demên buhurî ên berê de, weke bûyarên ku bûna malê dîrokê jî, bi sedan û hezaran keçikên malbatên êzîdî hatina ravandin. Heta ku di sala 2013´an de jî, ciwanekî misilman, keçikeka ji malbetaka êzîdî ya temen piçûk ravandîya û xwestîya ku bêî dilê wê zawacê bi wê re çê bike û piştre wê ravandinê "meşrû" bide nîşandin. BI sedan rewşên bi vî rengî ên ku hatina hanîn serê ciwanên jin ên ji malbatên kurdên êzîdî hena.

Tevî ku ev rewş hena û di dîrokê de gelek minaqên bi vî rengî hena jî, dîsa saziyên civate êzîdî ji van rewşan ti ders û fêr dernexistina ku di nava civate êzîdî de, komelên Jinan ava bikin û di van waran de têgihiştinê çê bikin û makanizmeyên xwe bi xwe parastinê bo ciwanên jin ên êzîdî ne hatina afirandin û pêşxistin. Î ro, di nava civate kurd de, weke rêxistina jinê a giştî "komên jinên kurdistanê" ´KJK´ hatîya avakirin. Her wusa, "yekîneyên parastina jinê" ´YPJ´ bi leşkerî hatiya avakirin. Ev xwe bi xwe rêxistinakirina jinê çendî rast û giring a, evçendî di nava her beşên civate kurd de bi rêxistin kirina vê rêxistina Jinan û pêşxistina makanizmayên xwe parastinê jî giring a. Bi teybetî, ev têgihiştina xwe parastinê a jinê, divîyabû ku di nava jinên kurd ên ku bawerîya wan êzîdî, şebekî, yeresanî û hwd de, herî zêdetir biheta pêşxistin. Ku di demên buhurî de, ev birêxistinkirin di nava jinên êzîdî de hatiba pêşxistin, wê î ro ew jinên ciwan ên êzîdî ku ji aliyên çeteyên DAÎŞ´ê ve hatina ravandin, wê î ro di nava wê rêxistina xwe parastinê a jinên êzîdî ên li şengalê de ba û wê xwe parastiban.

Ev bûyar û mijar, divêt ku ji wê pirr zêde ders û fêr were derxistin. Herî wê zêde, pêwîstîya jinê, divê ku xwe birêxistin bike.Ev yek, weke pêwîstîyekê ya. Herî zêde, beşên civate kurd, ên weke êzîdî, şebekî, yeresanî û hwd ku rengê bawerîya cuda ya, divê ku ew rêxistinkirina jinê û makanizmeyên xwe parastinê divê ku di nava wan de werê pêşxistin. Her wusa, jinên ciwan ên êzîdî jî divê ku ji van dîrokên bi êş ders û fêrê derxin û divê ku yekîneyên parastina jinê a şengalê ava bikin, pêşbixin û di navê de cihên xwe bigrin. Bi vê rengê, hem xwe û hem jî civate xwe bitêgihiştin biparêzên. Herî zêde, jin, divê ku xwe birêxistin bike.

Ji vê jenosîda şengalê ku hatîya serê kurdên êzîdî, ders û fêra herî mazin ya dîrokî jî divê ku ev bê ku were derxistin. Bêgûman heta roja me, bi gelek jinên civate kurdên êzîdî, di nava tekoşîna azadîya kurdistanê de cihê xwe girtina û hinek ji wan pekrewan jî bûna. Tenê ku bo bîrhanîna wan jî bê û bo ku mirov layiqî wê bîrhanîna wan jinên leheng ên kurdistanî jî bê, divê ku ev rêxistinîtîya jinê zêdetirî were pêşxistin. Herî zêde, di vê demê de, weke ku li rojavayê kurdistanê, "yekîneyên parastina jinê ên rojava" hena, divê ku bi heman rengî yekîneyên parastina jinê ên şengalê jî were pêşxistin. Jinên êzîdî, divê ku di vê warê xwe de xwe birêxistin bikin. Heta ku jinên ku li male xwe na jî, bo ku di male xwe de xwe biparêzên û bo ku dema ku telûkeyek were serê wan, divê ku di nava wan yekîneyên parastina jinê ên şengalê de xwe bi têgihiştin û perwerde bikin. Ev yek, weke zarorîyekê divê ku were ditin.

Berî nûha, gelek caran xwe xwe parastina şengalê hatîya kirin. Lê mixabin ew, ne hatîya pêşxistin. Ku di demên buhurî de, ew xwe-parastina cewherî ku bi ciwanên êzîdî hatiba avakirin û pêşxistin, wê î ro rewşa şengalê jî ne ev ba. Bo vê yekê, ji van aliyan ve jî, gelek ders û fêrên dîrokî divê ku were derxistin ji vê trejedîya şengalê. Çeteyên DAÎŞ´ê, pêşî ew hêrîşên xwe li rojavayê kurdistanê dan kirin. Li wir, jin û mêran bi hevdû re li ber wê li berxwe da. Li wir, bi serneketin. Lê civate kurdên êzîdî ji aliyên

xwe-parastinê ve bêparastin bû. Êdî ji wan aliyên bêparastin ên beşên civate kurd ve bidest hêrîşê li civate kurd kirin. Minaq, ev rengê xwe birêxistinkirina jinê, herî zêde, divê demê de divê ku li rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê divê ku were pêşxistin. Beşên kurdistanê ên ku herî zêde mihtacî wê na, ev in.

Piştî ku hêrîş li şengalê destpêkirin, ´yekîneyên parastina şengalê´ bi navê `YPŞ´ hatina avakirin. Her wusa, divê ku ev avakirin, dualî bê. Aliyê wê ê jin jî divê ku hebe, Bi wê re jî ne tenê ciwanên mêr ên êzîdî tevlî wê bibin. Divê ku ciwanên jin ên êzîdî jî tevlî wê bibin. Ji xwe, herî zêde, divê ku ew tevlî bibin. Ku demekê berî vê demê, jinên ciwan ên êzîdî, ew birêxistinkirin di nava wan de hatiba pêşxistin di temenê xwe-parastina cewherî de, wê î ro bahse "firotina bi hezaran keçan bi destê DAÎŞ´ê di bazaran de ne hatiba kirin. Civateka weke civate kurd a êzîdî, ku dema ku bahse wê dîroka wê dihê kirin û dihê gotin ku "72 ferman hatina serê wê", ku ji aliyê xwe parastina cewherî ve bêrêxistin bê, mirov tenê dikarê bi qafletekê wê werêne ser ziman. Herî zêde, divîyabû ku î ro, jina kurd a êzîdî ji van aliyan ve xwe birêxistin bikira. temenê vê jî, ji aliyê têgihiştinî ve di nava civate êzîdîtiyê de heya. Di nava rengê bawerîya êzîdîtiyê de "jin, pîroz a." Di vê temenê de, di temenê parastina pîrozîya xwe de, divê ku êdî li mijarê binerê û xwe-parastina were pêşxistin.

**Hêrîşên li kurdên Êzîdî hêrîşên ku li mirovatîyê û li nirxên mirovatîyê na.** Berî nûha bi çend rojan ket nûçeyên ajansan de ku li Şengalê DAÎŞ´ê hêrîş kirîya li ser kurdên sivîl ên êzîdî û çar ji wan qatil kirina. Berî nûha jî, li kurdên êzîdî hêrîş bûna. Lê di vê demê de kirina van hêrîşan, hinekî jî, wusa tê xuyakirin ku weke ku bi plan û organize dihên kirin in. Hêzên ku li pişta DAÎŞ´ê na û wê didina hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê, li pişt van hêrîşên ku li kurdên êzîdî na jî.

Wusa dihê ditin ku ev hêrîş hemû li gorî planekê û programekê dihên kirin. Dûhû li rojava ev çeteyên DAÎŞ´ê didane hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê. Î ro jî, didina hêrîşkirin li kurdên êzîdî li herêma şengalê. Siba jî, heya ku li başûrê kurdistanê û ankû rojhilatê kurdistanê û hwd, li devereka din hêrîşên bi vî rengî li ser serê kurdan bidina domandin. Ev hêrîş, di çerçoveyeka planakê de dihên kirin ku bi wê planê dixwezin ku şerê bi kurdan re li ser olê re bidina domandin. Heta roja me, ev hêzên ku bi kurdan re şer dikin bo ji dîrokê birina wan, her rê û rêbaz bikarhanîna. Î ro jî, rê û rêbaze wan bûya şerê bi kurdan re ê li ser olê re.

Aliyekî din, ê van hêrîşan ew a ku bi van hêrîşan dixwezin ku xatekê di nava kurdan û olê de bidîna çêkirin. Li ser wê xatê re jî, êdî hêrîşên xwe li kurdan bidina domandin. Ev, weke planake qirêj a. Bi vê rengê, dihizirin ku wê bi kurdan bi şûn ve gavê bidina avêtin. Di dema ku kurdan li rojavayê kurdistanê xweserîya denezend, dîsa van dordoran çeteyên DAÎŞ´ê kirina dewrê de û bi wan qatle kurdan "halal" kirin û bidest qatilkirina wan kirin. Ev dordorên ku ti eleqeya wan bi olê îslamê re jî tûna ya lê ku bi navê wê olê tevdigerihin, çend çeteyên ku li ser hasabê dewletên herêmê û politikayên wan ên qirêj şer dikin in.

Î ro, şerê li dijî kurdan ku dihê dayîn, bi wê dihê xwestin ku kurdan ji dîrokê bibin. Hêrîşên ku li ser olê re bin û ankû bi rengna din bin ku li kurdan dibin, em nikarin ji wê qadaxaya li ser zimanê kurdî jî dûr şîrove bikin. Her wusa, paqijkirina navê kurdan ji nava olê jî, hinekî bi vir ve girêdayî ya. Bi teybetî, di dema ku van çeteyên DAÎŞ´ê bidest hêrîşên li rojavayê kurdistanê kirin, armanca wan ya pêşî cihên pîroz ên weke

qabra şêxê kurd şêx mihemedê Xiznewî hwd bû. Ji vê rengê rengê hêrîşê mirov dibînê ku ev hêrîş di çerçoveyê de û bi çi armancê li kurdan dihên kirin. Ev hêrîş hemû biplan û program dihên kirin. Mirov nikarê weke çend hêrîşên menferid şîrove bike.

Wusa dihê ditin ku bi van hêrîşên ku li kurdan dibin li ser olê re, dixwezin ku kurdan dorpêç bikin. Bi hêrîşan kurdan dorpêç bikin. Di vê çerçoveyê de hêrîşî kurdên êzîdî ên şengalê dikin. **Komkujiya şengalê ku di 14 tabaxe 2007**´an de bû jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest. Ji wê demê û heta vê demê, weke ku konseptek hat çêkirin û dem bi dem bi wê konseptê hêrîş li kurdên êzîdî dan destpêkirin. Komkujiya şêngalê a di 14 tabaxa 2007´an de, weke ku destpêka pêvajoyeka bi vî rengî bû. Di vê çerçoveyê de, weke ku têkiliya rejima tirk û ya Îraqê a baxadê jî bi hevdû re di vê çerçoveyê de heya. Ji xwe di dema ku komkujiya şendalê a di 14 tabaxa 2007´an de bû, ev hat rojevê jî.

Li vir, kêmesîya kurdan jî, ew bûya ku ji vê demê û heta vê demê ku li herêmên bi vî rengî ku dîyare ku dewletên herêmê dixwezin ku hêrîş li wan werina kirin, parastina cewherî zêde ne hatîya pêşxistin. Weke ku çawa ku li qantonên rojava bû, divîyabû ku li şengalê jî parastina cewherî hatiba pêşxistin. Di vê çerçoveyê de, divê ku rêxistiniyeka baş were pêşxistin. Ev rewşa ne pêşxistina hêza parastina cewherî, hem kêmesîyeka û hem jî valahîyeka ku ji wê valahiyê hêrîş li kurdan dibin. Dewletên herêmê dema ku plana hêrîşekê li kurdan çê dikin, pêşî dihizirin ku ka kîjan nûqtaya lawaz û zeyîf heya, wê kifş dikin û ji vir hêrîşê pêş dixin.

Ev hêrîşên nemerdene ku li civate kurd û li beşên civate kurd dibin, divê ku mirov weke hêrîşên li nirx û dîroka mirovatiyê jî şîrove bike û werêne ser ziman. Yên ku van hêrîşan dikin û didin kirin jî, nesibê xwe ji mirovatiyê û nirxên mirovatiyê negirtina.

.

**Bikarhanîna olê û bi wê dorpêçkirina şoreşa rojava a kurd**.

**Ol, weke ku di temenê "kembera kesk" de ku li ber sovyetê hat bikarhanîn; nûha jî, bi heman rengî li dijî kurdan û pêşketina wan dihê bikarhanîn.** Şerê ku li herêmê û bi teybetî li dijî rojavayê kudistanê dihê dayin, weke şerek ku rejimên herêmê ên weke tirkiya ên metinger ku pirr giringiyê didinê de ya. Tirkiya, bi teybetî, bi awayekî stretejîkî nêzî wî şerî dibe û di wê temenê de piştgirîyê dide wan komên çekdar ên ku li dijî kurdan şer dikin. Ew komên çekdar, ku hêzên weke tirkiya li pişta wan nebin û alikariyê ji wan nestênin, wê nikaribin, wilqasî zêde bi hovane hêrîşî rojavayê kurdistanê bikin û her wusa bi awayekî hovane mirovan bikujin. Dewleta tirk, hizir dike ku dema ku li wir yanî li rojavayê kurdistanê derbeyek li kurdan were xistin, wê ew derbe li giştîya kurdan hatibê xistin. Weke ku pêvajoya duyemin ya ´anfalê´ li dijî kurdan hatîya dayin dest pê kirin. Weke ku ji kurdan re bêjin, ´mafê we yê jîyanê tûn ya´ diçin bi ser kurdan de. Dihizirin ku di vî şerî de karibin derbeyekê li kurdan bixin, wê ew derbeya li kurdan giştî bê.

Bi vir ve girêdayî, divê ku mirov bibêje ku baxtê pêvajoya ku kurdan li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin jî, hinekî bi serkevtina rojavayê ve girêdayî ya. Ji xwe bakûr

û rojavayê kurdistanê bi hebûna xwe re jî û bi baxtê xwe re jî yek a. Divê ku mirov wan bi hedû re şîrove bike û bêne ser ziman. Her pêşketin û pêşveçûna li beşekê bandûra wê li ya din jî heya.

Bi teybetî, piştî ku ji aliyê rûsya ve hat herê kirin ku wê kurd jî tevlî civîna li Cenewre bibin û piştre û pê de, ev hêrîşên li kurdan dem bi dem êdî zêde bûn. Î ro jî, asta ku gihiştinê de, asta wan hêrîşan ya herî bilind a. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêjje ku ev şerê ku li dijî kurdan li rojayê kurdistanê dihê dayîn û pêşxistin, di temenê "şerekî stretejîkî" de ya. Serketina di wî de jî, ku bi kîjan aliyê ve bê, wê bandûra wê li statûya herêmê bigiştî jî bike. Herkesek jî vê yekê dizanin. Lê kurd, ji ber ku ev 30 salin tekoşîna xwe ya maf û azadiye didin û her wusa bo ku dayin ahange(denge) herêmê dixwênin, wê rastiyê baştir dibînin. Kurd, rewşa xwe jî dibînin ku çendî di rewşeka stretejikî de dimênin. Kurd, hem herêmên wan ji aliyê jeo-stretejikî ve giirngiya wê hin bi hin mazin bûya û wê di demên pêş de mazintirr û giringtir bibe û her wusa ji aliyê pêşxistina herêmê û statûya wê ve jî, ew giringiya wê heya. Tirkiya, heta roja me, ku bê pirsin ku çawa dikarin ku wusa zêde li ber pêşaroja herêmê bibina xwedî gotin, hinekî jî divê ku mirov bi metingerîya wan ya li bakûrê Kurdistan ve girêdayî werêne ser ziman. ..

Dema ku em ji aliyê stretejikî ve li herêmê dinerin, em van rastîya baştir dibînin. Bo vê yekê, em divê ku bibêjim ku li rojavayê kurdistanê, ne tenê çarenûsa gelên herêmê bo maf û azadîya xwe tedikoşê. Her wusa divê ku mirov bibêje ku hêzên mazin ku berjewendîyên wan ên sîyesî û aborî ku li herêmê hena jî, bo wan berjewendiyên xwe di nava şer de na.

Li vir, dema ku em li kurdistanê bigiştî binerin, em vê yek û vê rewşê baştir dibînin. Nûha jî, rewşa kurdan, di nava wê rewşê de ya. Şerên ku li kurdistanê bi kurdan re tên dayin û her wusa şerên ku li ser axa kurdistanê tên dayin, şerên dewlemendiyên serard û binardî ên kurdistanî na jî. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Li herêmê, hem hêzên herêmê hem jî hêzên dervî herêmê, hem bi leşkerî û hem jî bisîyesî ew şerê û tekoşîna wan bi kurdan re heya.

Li herêmê, di destê hêzên herêmê de, tenê ol weke amûrekî ku bikardihênin maya. Dema ku ew ji destê wan herê, êdî wê ti tiştek di destê wan de nemêne. JI ber ku li herêmê, heta roja me, hem ji aliyê mezhebî ve ku li dijî hevdû bi şerkirinê bê û hem jî ku li dijî gelan bikarhanîna wê bê, ol hatîya bikarhanîn û pirr zêde jî hatîya bikarhanîn. Wusa hasab bikin, ku dikarin, bi nav olê "fetwa" serê xalkekî herêmê dibin û bi wê fetwayê êdî temmenê şerkirina bi wî xalkî re bidina afirandin û bi wê re şer bikin. Di vê temenê de, gelek xalk, di demên berê de ji dîrokê jî hatina birin. Tê gotin ku "li ser axa anatolîa 72 xalk dijîn." Lê î ro, yek jî ji wan, em ne navê wan û ne jî hebûna wan dibînin. Hemû hatina ji holê rakirin. Di wê ji holê rakirinê de ol pirr zêde hatîya bikarhanîn. ..

Î ro, li dijî kurdan li rojavayê kurdistanê jî ol dihê bikarhanîn. Bi navê olê ´fetwa´ serê kurdan didin û dibêjin ku "kuştina kurdan helal a." Piştre jî, bi destê komên çekdar diçina bi ser kurdan de û kurdan dikujin. Di aslê xwe de,, dema ku em li vê dayina "fetwaya serê kurdan" binerin, emê asta bikarhanîna olê ku weke amûrekî jî ku ji aliyê van rejimên herêmê ve bibînin. Dema ku ev li vê awayê bikarhanîna olê binerin, emê di demên berê de jî, ku çawa ol li dijî xalkên herêmê hatîya bikarhanîn ji aliyê desthilatdariyê herêmê ve, mirov wê di derbarê wê de jî bibe xwediyê hizrekê û

têgihiştinekê. ..

Ya rastî, li vir, divê ku mirov bibêje ku ol li dijî kurdan ne tenê li rojavayê kurdistanê dihê bikarhanîn. Li başûr û rojhilat û bakûrê kurdistanê jî hatîya bikarhanîn. Piştî ku li Îranê şoreşa komare islemê´ bû û piştre, ji aliyê Humeynî ve dayîna "fetwa"ya serê kurdan hê di hişê me de ya. Di dema rejima baasê de li Îraqê jî, Saddam Huseyîn, oparasyona jenosîda kurdan da dest pê kirin û navê sûreyeka ji kuran´ê lê kir û navê wê oparasyona qirkirina kurdan kir "anfal". Li tirkiya jî, li kurdistanê û bi teybetî li bakûrê kurdistanê bi destê komên cemaetê ên bi navê "Fethullahçîyan" û hwd, xwe bi rêxistin kirina. Ti farqe fethullahçîyan ji wan çeteyên cebetil-nasr´ û rejima baasê ya îraqê ya berê ya Saddam tûna ya. D vê dema ku şerê bi kurdan re li rojavayê kurdistanê dibe de, ev cemaeta fethullahçîyan ku destê wê bixwûn a, ciwanên kurd dixapêne û wan dişêne nava şerê li Sûrî. Bi wî rengî, dixwezin ku rengekî kurdî bidina wan komên li rojavayê kurdistanê ku hêrîşî bajarên kurdan dikin. Ev rewş, li bakûrê kurdistanê jî hat kirin. Li bakûrê kurdistanê, di şerê dewletê ê bi kurdan re de, bo ku wî rengî kurdî bidina wî şerê xwe yê bi kurdan re, ´korucû´ û ankû weke ku kurd ji wan re dibêjin "cahş" afirandin û bi kurdan re dan şer kirin. Divê ku mirov, bidestê fethullahçîyan xapandina ciwanên kurd û şandina nava şerê Sûrî, ji vê rewşa ku li bakûrê kurdistanê ya weke ya ´korucu´ û ankû "cahş"an dûr şîrove neke. Di temenê herdûyan de jî, bikarhanîna olê û heman zihniyet heya. Lê di temenê de ´pergale cahşan´ ya li bakûrê Kurdistanê, di hîmê wê de hêsta aşîrtiyê jî hatîya bikarhanîn di rex ya olê de.

Şerê li Sûrî, çend ku em weke şerê komên çete ên bi xalkên herême ên weke kurdan re şîrove bikin jî, di aslê xwe de rastî pirr ji wê cudatira. Di rastiyê de, tirkiya bi zihniyeta xwe re li pişt wî şerî ya. Her wusa, welatên din ên herêmê jî bi zihniyeta xwe li pişt wî şerî na. Bi teybetî, welatên ku Kurdistan di nava wan de di konfaranse LOzanê de hat qatkirin, herî zêde weke welatên ku şerê bi kurdan re bi rê ve dibin in. Amerika jî, ew rewşa metingerî ku Firanse û Ingilistan li herêmê afirand ji destê wan girt û wê da domandin. Î ro jî, wê rewşê didina domandin. Yanî, bi teybetî, ew pergale metingerîyê ku li ser temenê hin berjewendîyna ku temenê wê firansa û Ingilistan avêt û Amerika dide domandin û hwd, di temenê wê piştgirîya wan ya ji şerê tirkiya ê bi kurdan re û hwd re de ya. Di vê demê de,, çend ku kurd bi tekoşîna xwe ya ku didin, tekoşîna mayîn û nemanê didin, her wusa bi heman rengî rejimên herêmê jî şerê zihniyeta xwe ya mayîn û nemanê didin. Ew jî, bo xwe û zihniyeta xwe, şerê mayîn û nemanê didin. ..

Li herêmê, di vê demê de, şerên ku tên kirin ku bi kurdan re bê û her wusa bi xalkên din re bê, divê ku mirov tenê ji aliyekî ve nêzî wan şeran nebê. Divê ku mirov ji pirr aliyan ve nêzî wan şeran bibe. Di serî de, divê ku mirov di temenê zihniyet de nêzî bibe. Bi wê re jî, divê ku mirov bi aliyên din re jî nêzîk bibe.

Li herêmê, bi teybetî, şerkevtina kurdan a li rojavayê kurdistanê, divê ku mirov tenê weke serkevtina kurdan û destdanîna ser rêveberîya wan ya li ser herêmê xwe ku desthilatdarîya xwe ya xweser ava dikin şîrove nekê. Ji wê zêdetir, divê ku mirov di temenê zihniyetê de şîrove bike. Di aslê xwe de, li herêmê şoreşeka zihniyetê ya. Ya ku nûha di aslê xwe de welatên herêmê li dijî wê şer dikin jî ev a. Zihniyeta wan û qalibên zihniyeta wan, bi serkevtina kurdan re û bi pêşketina wan ya têgihiştinî re û her wusa bi zihniyeta nû ya ku ew dihênin li holê re, ji holê dirabê û ankû diguharê. Hê pirsgirêka kurdistanê li sê beşên wê didomê. Tenê li beşeka kurdistanê, li beşa rojavayê kurdistanê şoreşa xwe kirin. Lê ew şoreşa wan bi bandûr, zihniyet û têgihiştina wê re di çerçoveya

herêmê de, divê ku em ji wê şoreşa firansa ku di sale 1789 bûyî mazintir şîrove bikin. Bi teybetî, bi pêşketina kurdistanê û çareserkirina pirsgirêka kurd ya li bakûrê kurdistanê re, wê ew têgihiştin û zihniyeta nû, ne tenê li herêmê li rojhilat, her wusa wê li giştîya cihanê bandûra xwe bide nîşandin.

Di aslê xwe de, ez vê demê û ku di wê de pêşketina kurdan bitijbihênim, ezê bi tijbihênima dema hûrî û mîtannîyan. Di dema hûrî û mmîtannîyan de, pêşketinên ku bûn, hemû pêşveçûnên piştre ên şarîstanî û têgihiştin û felsefikî da kifşkirin. Heta roja me jî, pêşketinên ku li rojhilat bûn û ku bandûra wan li pêşketina rojava û ankû li ewropa û hwd jî ku bûn, weke ancamna wan demên hûrî û mîtannîyan in. divê ku em ên têgihiştinî, zihniyetî, olî û hwd jî di nav de hasab bikin û weke ancamna wan demên hûrî û mîtannîyan bênima ser ziman. Destpêka ku di wê demê de kurdan di dema hûrî û mîtannîyan de ku dabûn çêkirin, î ro em dîsa bi kurdan re bi destpêkeka bi wî rengî re rû bi rû na. Weke kurdan, li vir jî, ku dema ku em di navenda wan pêşketinan de bin û ku em wan baş fahm nekin û şîrove nekin û lê xwedî dernekevin, weke ku çawa ku pêşî şoreş lli misrê bû û piştre bi derbeyê ji dest hat derxistin û dîzîn, wê heman tişt were serê ya kurdan **jî**. ..

- **Ev hêrîşên** ku lli rojavayê kurdistanê dibin, ku em li ser dihizirin, em pirr sedeman di temenê wan de dibînin. Berî hertiştî, li rojhilat, pergal û statûqûya ku piştî şerê cihanê ê duyemin ku hatî ava kirin, bi tememî xalkên herêmê bêvînkirin û dengê wan tafisand. LI herêmê, rejimên ku hatina avakirin, ne rejimên pêşketineka rast li herêmê bidina çê kirin in, rejimên ku wê çawa pêşketina xalkên herêmê dibin kontrolê de bigrin a. Di vê temenê de, rejimên ku hatina ava kirin, dema ku cih hatîya li dijî wî gelê ku bi salan bi rê ve birina, zor û şîdet jî bikarhanîna. Minaq, rejima baasê ya Sûrî, ser 50 salî re li desthilatdarîya xwe domandîya. Li ser serê xalkên li ser serê wan desthilatdarî kiriya serî rêbaza zor û şîdetê daye. Li tirkiya jî, li Îraqê jî, li Îranê jî û her wusa li welatên din ên herêmê jî ev yek bûya.

Ji bo desthildatdaran, hertimî ya giring, serdestî û mayîna wan ya serdest ya herî giring bûya. Î ro, dema ku em li temenê pirsgirêkên herêmê dinerin, em dibînin ku ev zihniyet jî weke zihniyetekê di temenê pirsgirêkên ku afirîna de na. Di aslê xwe de, rejimên herêmê bigiştî, bûna rejimên pêşî li pêşketina xalkê bigirin in. Di vê çerçoveyê de, bûna xwediyê zihniyetekê. ..

Hemû pêşketinên li herêmê bi xwûnê hatina tafisandin. Li herêmê, ne tenê li kurdistanê, her wusa li welatên din ên arab û farisan jî, pêşketinên ku di wan de çîriskên pêşketina xalkan bo pêşketina wan hebûna, hatina ji holê rakirin. Hertimî, rejimên herêmê xwe "bê-artartnatif" hiştin. Derfet, ji pêşketinaka dervî pêşketina wan re ne hiştina. Di vê temenê de hertimî bi zihniyetî, tevgerîya na. Di vê yekê de, rejimên li herêmê, bûna rejimên dijberî ên li xalkên herêmê û pêşketina wê jî.

Di vê temenê de rejim û desthilatdariyên ku hatina ava kirin, î ro di roja me de ketina rewşeka nû de. Gelên herêmê ji wan nexweş in. Gelên herêmê, desthilatdarîyna ku rêz û hûrmetê ji wan re bigrin dixwezin. Bo vê yekê, ketina nava tekoşînê de. Piştî wê pêvajoya ku tê gotin ku "bihara arab", êdî hêvîyek bi xalk û gelên herêmê re çêbû ku wê rêveberîyna nû werina ava kirina û ew rêveberî û hin pêşketinna di jîyane wan de bidina çê kirin. Di vê rewşê de, rejim û desthilatdarîya Husnu Mubarek bi piştgirîya gel hat xistin. Lê desthilatdarîya ku li cihê wê ava bû desthilatdarîya Mûrsî, ti zihniyeta nû neda nîşandin û ti farqîtî jî ya dema Husnu Mubarek neda nîşandin. Mursî jî, hêvîyên ku ji wî

hebûn, yek jî ne hanî li cih. Piştre, ew girseya ku bo ku desthilatdarîya Husnu Mubarek were xistin daket qadan, bo ku dawî li desthilatdarîya Mûrsî jî bê hanîn daket qadan.

Piştre, ew desthilatdarîya Mûrsî bixwe jî, bi derbeyê hat xûrîxandin. Lê ew rêveberîya sêyemîn ku ji cihê ya Mûrsî hat ava kirin, wê çi zihniyeta cuda danî li holê? Ne ti tiştek. Ew jî, bi armanca, wê rewşa li rojhilat ku bi avakirina desthilatdarîyên ku piştî şerê cîhanê ku hatibûbûna avakirin û bi wan herêm bi wan dihat bi rêvebirin, dihê xwestin ku ew rewş û pergal werina parastin û domandin. Di vê rewşê de, pêşketina kurdan, ji wê pêşketinê û xwestinê re weke rewş û pêşketineka ku cuda ya. Kurdan bi pêşketina xwe re û bi têkoşîna xwe re û her wusa bi şoreşa xwe ya rojavayê kurdistanê re têgihiştin û zihniyeteka nû danîna li holê.

Piştî ku kurdan li rojavayê kurdistanê şoreşa xwe kirin, êdî çûyîna bi ser wê de bû. Komên çekdar ji qada navnetewî bi pereyan hatin berhevkirin û şandin rojavayê kurdistanê ku li dijî kurdan şer bikin. Di aslê xwe de, di vê demê de, ew hêrîşên ku bi destê van komên çekdar ku bi piştgirîya tirkiya û welatên din ên rojhilat û rojava û hwd, bi wê dixwezin ku wê pêşketina kurdan were tafisandin. Nayê xwestin ku ew têgihiştin û zihniyet û nêzîkatîya kurdan ya nû ji aliyê gelên din ên herêmê ve were ditin. Bo vê yekê, hêrîşên li wê hatina zêdetir kirin. Di aslê xwe de, rojavayê kurdistanê, bi pêşketin û şoreşa xwe re, têgihiştina nû jî didêne ber cihane arab ku di wê çerçoveyê de rabina serpîyan û bi wê tekoşîna maf û azadîya xwe bidin. Di serî de, di warê maf û azadiyê de, û di pêşketina demokrasî û mafê mirovan û hwd de, temenekî nû bi zihniyet û têgihiştinê radixe li berçav.

Ev hêrîşên ku li kurdan zêdebûna, em nikarin bi hesanî şîrove bikin. Bi teybetî, hêrîşên piştî avabûna yekîtîya sovyet ku di destpêkê de ku li wê bûn, dihênina bîra me. Di wê demê de jî, bi hêrîşên ku pêşî li desthilatdarîya nû ya sovyetê bûn, bi wan xwestin ku di cih de wê desthilatdarîyê ji holê ra bikin. Lê ew hêrîş bi serneketin. Nûha jî, dema ku em li van hêrîşên ku li rojavayê kurdistanê ku dibin ku mirov li wan dinerê, ew hêrîşên destpêka avabûna yekîtîya sovyet de ku lê bûn dihêne berbîra me.

Hêrîşên ku li kurdan dibin, temenekî wan ê navnetewî heya. Di destpêka tekoşîna kurdan ya bo azadya wan de, ji ber ku tirkiya andamê NATO bû, di gelek oparasyonên li dijî kurdan de wê bixwe rol û weyn leyist. Heta ku girtina serokê gelê kurd birêz Ocalan û radestkirina wî ya li tirkiyê jî ji aliyê vê sazîyê û andamên wê û gelek sazîyên din ên ewropî û navnetewî û hwd ve bûya. Î ro jî, dema ku em li şerê li dijî rojavayê kurdistanê dinerin, em dibînin ku bi teybetî, weke ku çawa ku di destpêka yekîtîya sovyetê de ol di temenê "kembera kesk" de hat bikarhanîn û bi wê hat xwestin ku yekîtîya sovyet were dorpêçkirin,, nûha jî, li dijî kurdan jî heman tişt li ser olê re dihê kirin. Bi teybetî, komên ku tên berhevkirin û tên şandin li rojavayê kurdistanê ku kurdan bikujin û komkujiyan bikin, di berhevkirina wan de ol dihê bikarhanîn. Bi wê re jî, li ser refaransên olî re, bi zanebûn, dijberîyek li dijî kurdan dihê afirandin. Gotinên weke "kuştina kurdan helal a.", "destavêtina mal, can û jinên kurdan helal a." û hwd jî, gotinên ku bi wan re li ser olê re temenê wî şerê bi kurdan re ku dihê afirandin in. Yanî, bi rengekî din, bi tememî ne weke ya "kembera kesk" ku li dijî sovyetê hat bikarhanîn jî bê, lê di awayekî din ku nêzî wê bê, dijberîya li kurdan li ser gotin û rafaransên olî re dihê afirandin. Û her wusa, bi wê re bi rewşeka weke ya ku bi "kembera kesk" yekîtîya sovyet hat dorpêçkirin, kurd jî bi heman rengî û zihniyetê û bi hêrîşên ku bi

destê komên çekdar dihê xwestin ku were dorpêçkirin.

Di vê çerçoveyê de, dema ku em li wê şerê bi kurdan re ku em lê dihizirin, em dibînin ku weke rewşeka bi vî rengî li ser olê re dihê afirandin. Ew dorpêçkirina bi olê re ku li ser Afganististan, Îran û welatên arab û hwd re, ku li sovyetê hat çêkirin û piştre bi wê re pêşketina wê hat bisînorkirin û her wusa piştre ku di salên 1990´î û hwd de, ku hat xirûxandin, nûha dihê xwestin ku li dora kurdan were pêşxistin. Ku em ji kîjan aliyê ve binerin, em divê ku bibêjin ku serdestî û desthilatdarîya olî ya ola Îslamê jî, ku çendî ku li ser çapameniyê re weke "xatereyekê" jî ji aliyê welatên rojava û emerika ve dihê ser ziman jî, lê emerika ji navikê ve ola Îslamê ji serî ve ku bi desthilatdarîya Sûûdî arabiya û hwd bê, kirîya bin kontrola xwe de. Navendên ku ji wan ol dihê bi rê ve birin, di desthilatdarîya wan de, giraniya Emerika pêşket. Oldarên sereka ên ku gotinên wan weke gotinên ku pêşketina ola îslemiyetê didin kifşkirin, di bin kontrola vê hêzê de na. Ev jî, bikarhanîna olê weke "mertalekê" di rewşên weke ku î ro li rojavayê kurdistanê ku li dijî kurdan dihê bikarhanîn de dike xwedî weyn û rol.

Di nava oldarên îslemiyetê de jî, ên ku bandûra wan pirr mazin hena, nikarin vê yekê inkar bikin. Bi wê kontrolkirina olê re, êdî temenê bisînorkirina gotinên "maf" û "azadiyê" di navaroka wê de pêşketina wan hat astengkirin. Î ro, divê ku em vê yekê bipirsin, çend oldarên îslemiyetê ên li ser serê îslemiyetê dikarin derkevina berçapameniyê û bahse "mafê mirovan", "azadîyê". "azadîyan gelan" û "demokrasiyê" û hwd bikin. Di aslê xwe de, ji salên 1990´î û pê de, ew dorpêçkirina li sovyet, piştî ku sovyet xûrixî û piştre, li dora îslemiyetê hat kirin. Piştî salên 1990´î û pêde, bi tememî ol ket bin kontrolê de. Wusa bihizirin, bi wê dorpêçkirinê, olek weke ola îslemê dikarê were wê astê ku hinek xwûdênenas dikarin li ser navê wê "fetwa" serê gelekî weke gelê kurd bidin. Ev gotin, î ro, em tenê ji aliyê kurdan ve şîrove dikin û her wusa ji aliyê hêrîşên ku li kurdan dibin ve şîrove dikin. Lê ji aliyê temenê wê yê ku di olê de hatî afirandin û her wusa ji aliyê ve jî divê ku mirov li ser bisekinê û wê fahm bike. Di aslê xwe de, ev gotin, didina nîşandin ku ola îslemê bixwe jî di rewşeka ´qayran´ û ankû "tengerîyaka´ çawa de ya.

Ola ku bo pêşketina herêmê pêşket û xwediyê wê têgihiştinê û hizrê bû, piştre çawa hat wê astê û ket bin kontrolê de ku di temenê "mertelekê" de li dijî pêşketina herêmê dihê bikarhanîn`? Ya rastî, bersiva wê pirsê, wê me ji sadaale 20´an jî bi wirdetir bibe û bibe û heta ku bigihijêne dema Osmanîyan. Piştre di sadsale 20´an de, osmanî hat ji holê rakirin. Lê ew qalibê wê yê serdestîyê bi ola îslemê re ji aliyê hêzên ku di wê demê de li dijî sovyetê xwe bi rêxistin kirin ve hat kirin bin kontrolê û piştre di temenê afirandina "kembera kesk" û hwd de, hat bikarhanîn. Ew kembera kesk, bû kembereka wusa ku ne tenê yekîtîya sovyet hat xûrîxandin, Her wusa, bi wê re pêşketina xalkên herêmê jî ku dervî vîna wan bi wê hat kirin bin kontrolê de. Î ro jî, dema ku pêşketinaka bi şoreşî weke ya şoreşa rojavayê kurdistanê biafirê, her wusa êdî dîsa ew "mertal" hat derxistin li holê û hat kirin li dewrê de li dijî wê pêşketina bi şoreşî.

Ev pêşketina kurdan û bi teybetî jî pêşketina şoreşa rojavayê kurdistanê, pêşketina olê ya li herêmê jî bi dîroka wê re ji me dixwezê ku em şîrove bikin û wê fahm bikin. Dema ku em wê fahm nekin, emê bi rastî jî, êdî nikaribin pêşketinekê li herêmê bidina çêkirin. Em bibêjin ku bi destê wan komên çekdar pêşketina kurdan û bi teybetî ya rojavayê kurdistanê hat tafisandin, wê piştre li dijî pêşketinên din jî ên ku derkevin û bibin jî wê heman rewş derkeve li holê. Wê li dijî, pêşketinên din jî ên li rojhilat, heman

rewş were bikarhanîn. Minaq, î ro, îran, weke welatekî olî yê îslam dihê ditin. Lê Îranê, nûha ketîya rewşa yekîtîya sovyet ya salên wê yên dawiyê de. Di warê demokrasî û pêşketinê de, di gavavêtinên wê tûna na. Du tişt, serdestîya olî ya îslemê kirina bin kontrola hêza Emerika û rojava de. Yek, çênekirina pêşketinê di temenê mafê mirovan û demorkasiyê de ya. Ya din jî, desthilatdarîyên li herêmê ku hatina avakirin in. Bi teybetî, zihniyeta di temenê wan desthilatdarîyan de, bi kirasê olê hatîya xamilandin bi desthilatdaran re xwe dide domandin.

Dema ku em li rojavayê kurdistanê û pêşketina wê ya dîrokî dinerin, em dibînin ku çend ku li beşaka kurdistanê ya piçûk jî ew şoreş bû, lê wê hemû rastî jî, yek bi yek derxistina li holê. Bi gotinaka din ´rûyê herkesekê yê rast derxist li holê û da li berçavan.´.

Çend ku bahse "bihara arab" dihê kirin jî, heta ku ew "kontrolkirina ji serî ve ya îslemê" di destê yên ku ev gotinên bi navê "bihara arab" ku avêtina li holê û dan nîqaşkirin de bin, divê ku mirov bahse biharaka arab neke. Di vê temenê de, hinekî jî li vir, têgihiştin û hişmendî, pirr giringa ku divê ku mirov li ser bisekinê. Hişmendî û têgihiştin, dikarê hemû planên reş derxe rohniyê û bide xira bikirin. ..

Gelên herêmê bi rastî jî, temenê pêşketinaka dîrokî ku bi xwe re bidina çêkirin bi wan re heya. Lê li vir, tişta ku tenê kêm a, bi zihniyet û têgihiştinaka rast kirina pêşkeşvanî û serokatîya wê ya. Ya ku nûha, kêm a ev a. Li herêmê, divê ku mirov bibêje ku hemû rastî, ku rastîya olê jî di nav de bi destê desthilatdaran hatina berevajî kirin. Ya rastî ew a ku divê ku ew rastîyên herêmê ên dîrokî werina fahm kirin û piştre werina rakirin li ser lingên wan û piştre dane fahm kirina wan bibe.

Di temenê hêrîşkirinên li rojavayê kurdistanê de, ew berevajî kirin jî hena. Bi teybetî, hêstên olî ên xalkê ên paqij îstismarkirina wan jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de fahm bike û bêne ser ziman. Her ol, dema ku tê, pêşî xwediyê wê hizrê û têgihiştinê ya ku pêşketineka rast û baş di jîyane mirov de bide çêkirin û mirov di "rêya rast" de bide meşandin. Lê li vir, dema ku mijar were ser salixkirina wê gotina navaroka olê yên weke "rêya rast" û hwd jî, em dibînin ku rêveberan li gorî xwe û di temenê nîjadperestîya xwe de ew şîrove kirina û hanîna ser ziman. Di vê temenê de jî, êdî wê olê bikardihênin. Heta ku li berçavên mirovan gotinên olê bixwe jî berevajî şîrove dikin. Minaq, di ola îslemiyetê de tê gotin ku "kuştina mirovan haram a." Lê tevî wê jî, dikarin weke ku bi "navê olê" bê mirovan bikujin. Her wusa, di olê de çend ku bahse ".. afirandina milletan .." tê kirin jî, weke ku li rojavayê kurdistanê hwd dibê, dikarin "fetwa" serê kurdan bidin. Yanî, tişta li gorî olê xelat û şaşa, bi navê olê didina kirin bi mirovan. ..

Em vê pirsê jî bikin. Ji ber çi tevî ku bi navê olê li dijî kurdan( û ankû li dijî milletan) şer bi destê komên çete hat dayin destpêkirin û ti desthilatdar û ankû oldarên wê olê li dijî wê derneket? An jî, çawa destûr dihê dayîn ku bi navê olekê fetwa´ya serê gelekî were dayîn? Yên ku li ber wê bêdeng in, çawa dikarin, bahse oldarîya xwe û ankû misilmanatîya xwe bikin? Ol, hertimî xîtabî wijdanê mirov dike. Her wusa, wusa tê tewsîrkirin ku "têkiliya nava mirov û xwûdayê wî de ya." Dema ku ol wijdan bê û têkiliya ava mirov û xwûdayê wî bê, ew mirovên ku fetwa serê gelekî dan û her wusa ew mirovên ku li ber wê dayîna fetwayê ku bêdeng in, çawa dikarin bahse wijdan û mirovatiyê bikin?

Li herêmê, bi teybetî li rojhilat, pêşketina herêmê bi olê hatîya zantkirin û hatîya

kirin bin kontrolê de. Li her devera ku pêşketinek bû, wê ew "kirina bin kontrolê a olê" di temenê "mertelekê" de were derxistin li ber û pêşîya wê. Di roja me de, bi teybetî li rojavayê kurdistanê ew mertel´ hatîya derxistin û nûha dihê bikarhanîn. Weke ku çawa di dema destpêka avabûna sovyetê de ol li herêmê hat kirin bin kontrolê de û piştre weke ´mertelekê´ li herêmê li hemberê wê hat bikarhanîîn. î ro jî, bi heman rengî li dijî kurdan û pêşketina dihê bikarhanîn..

Li rojavayê Kurdistanê, şoreşa ku bû, bi zihniyeteka nû û Azad, da nîşandin ku ew kirina bin kontrolê ya olê jî, dikarê were xilas kirin. Di aslê xwe de, ji bin kontrolê derxistina wê, ji bin kontrolê derxistina pêşketina herêmê û xate wê ya pêşketinê bê. Şoreşa rojavayê kurdistanê, ev yek daye nîşandin. Di vê temenê de, di aslê xwe de, hêrîşên ku li şoreşa rojavayê kurdistanê dihê kirin, li perspektif û refaransên wê yên di temenê parastina ´mafê mirovan´, "azadîya gelan" û "pêşketina demokrasiyê" û hwd, dibin in. Gotina, "azadiya gelan", "parastina mafê mirovan", "demokrasî" û hwd, ji xwe, bi tememî ji nava têgihiştin û zihniyeta desthilatdarîyên herêmê û pêşketina wan hatîya derxistin. Ji ber vê yekê ya, weke ku çawa ku di temenê "kembera kesk" de sovyet, bi olê hat dorpêçkirin; nûha jî, heman tiştî dixwezin ku li dijî têgihiştina şoreşa rojavayê kurdistanê bikin. Ya ku nûha şerê wê bi kurdan re didin jî ev a li rojavayê kurdistanê.

- Ku em ji kîjan aliyê ve lê binerin, emê bibînin ku kurd hem ji nav û hem ji ji dervî wan ve hatina dorpêçkirin. Ji nava wan ve, ji bo ku wan qat bikin, komên weke "El-partî" û ankû "partîya Azad" ku ti eleqeya wê bi azadiyê re tûna ya û hwd, kurd hatina dorpêç kirin. LI ser van herdû partîyan re, hewldanên qatkirina kurdan ji nava van ve heya. Di van rojên dawiyê de, gotinên ku dikevina ajansên nûçeyan de, ew in ku tê gotin ku "ev partî dixwezin ku hêzeka leşkerî ava bikin." Tê gotin ku rêvebera başûrê kurdistanê jî, tê gotin ku bo ku destûr ji wê avakirina hêzeka wan ya leşkerî re were dayîn, deriyê sêmalka hatîya girtin û dorpêç kirin.

Di serî de, divê ku mirov vê yekê bibêje ku hewldanên bi vî rengî, ti carî xizmetî ji kurdan re nakin. Tenê, xizmetî perçekirina kurdan û hêza parastina dikin. Hêzeka ku qatbûyî jî, wê nikaribê, ti parastinê bike. Ji ber vê yekê, di serî de, hewldanên bi wî rengî ên ku divê ku werina şermazar kirin, divê ku dev û dest ji wan were berdan. ..

Li kurdistanê, çendî ku kurdan, hem ji aliyê leşkerî ve û hem jî ji aliyê sîyesî ve hêza xwe kirina yek û bi hevdû re di temenekî de tevgerîyan, wê hêzeka mazin derxina li holê. Wê bandûra wan zêdetir bibe. Li herêmê, bi teybetî li rojavayê kurdistanê, herêma kurdistanê ya herî piçûk a. Lê tevî ku piçûk a jî, bi vî rengî, hewldan, tenê xizmetî têkbirina kurdan li wê tên kirin. Qatkirina hêza parastina kurdan, wê tenê xizmetî têkçûna kurdan bike. Bo vê yekê, divê ku ti carî ji vê yekê re derfet newê hiştin. Yên ku di nava wê hewldanê de jî, armanca wan ne parastina kurdan a. Armanca wan, di serî de xwe weke ´dîktator´na piçûk li ser serê kurdan bi wê hêzê bijîn. Ji wê zêdetir jî, divê demê de hewldanên bi vî rengî di xizmeta qatkirina kurdan ji aliyê sîyesî û hwd de ya. Ev jî, êdî temenê bêstatûtîya kurdan diafirêne. Ev hewldanên bi vî rengî ên qatkirinê, divê ku mirov ji tirkiya cuda lê ne hizirê.

Di dem û rewşên weha de, bahse çêkirina hêzeka duyemin, tenê wê xizmetî hêzên ku î ro li dijî kurdan wî şerî bi destê çeteyên kujar ên weke ´cebetil-nasr´ û hwd, ku bi rê ve dibin bike. JI ber vê yekê, ti xwestekên bi vî rengî jî bi mirovatî û parastina kurdan re divê ku newina ser ziman jî.

Di rewş û demên weha de, ku heka rast, hêzên cuda ku hebin jî, xwe dikina yek. BI

hevdû re, hêza xwe ku kirina yek, wê êdî çêtir bi serbikevin. Li kurdistanê, di vê demê de, bahse li darxistina kongira netewî jî dihê kirin. Ya ku di rastiyê de bihata nîqaş kirin, divîyabû ku ne ew ba. Ya ku bi heta nîqaşkirin ku ew ba ku wê çawa di kongira netewî de hemû hêzên leşkerî û sîyesî ên kurd ku wê bikiran yek û di bin banê sazgerîyeka sîyesî û parastinê de lev bicivîyandan. Lê vajî wê, nîqaş kirin, di aslê xwe de, êdî mirov dike tirsê de ku wê kongira netewî jî, ne di temenê berjewenediyên kurdistaniyan de, her wusa bi kirina di xizmeta lîstikkên bi vî rengî de ên weke ku tirkiya li pişt wan a de ku wê zirerê bidina kurdan.

Kongirên netewî, ên bi vî rengî ku lev dicivin, di serî de, sazgerîya xwe ya sîyesî û ya leşkerî ya parastinê didina çê kirin. Dibin sazgerîya sîyesî de hemû hêzên civatî ên sîyesî dihên civandin û dikina yek. Bi heman rengî ku hebin, hemû hêzên leşkerî jî, dibin banê sazîya parastinê de dihên civandin û dihên kirin yek. Ji ber ku kirina yek, hertimî temenê serkevtinê ya.

Her partiyên ku ava bibin ku bibêjin divê ku hêzeka min ya leşkerî hebe jî, wê tenê qatbûnê bi xwe re bêne. Wê di serî de, zirerê bide pêşketina civatî. Bi wê re jî, wê ti carî hêzeka giştî ya parastinê newê afirandin. Wê hertimî zirerê bide pêşketina civatê û rewşa parastinê. Ku li Rojavayê kurdistanê hemû sazî û partiyên ku di bin banê ´tev-dem´ê de gotiban, divê ku hêzeke me ya leşkerî hebê, ku wan jî hewldanên bi wî rengî pêşxistiban, wê î ro hêzeka parastinê ya giştî ya kurdan tûna ba. Wê kom bi kom ban. BI wê re jî, êdî wê ti carî nikarîban ku ti parastinê jî bikiran.

Di cihanê de, di roja me de, hêzên parastinê, hertimî di temenê hebûna netewê de dihên kirin yek. Ya li ser serê wê hêza giştî ya netewî de jî biryarê dide, ya parlamane civatî ya. Û yan jî weke ku kurd di van rojan de dixwezin ku li darbixin, kongira netewî ku karûbarê parlamane netewî jî dikarê hiilde ser milê xwe dike. .. Di wê temenê de êdî parastina civatê dihê kirin. BI heman rengî, dema ku pergale civatê hat ava kirin jî, wê partîyên civatî, ne bi hêzên leşkerî ku civatê bi wê qat bikin li koman, wê bi proje û ankû hizrên xwe ên pêşketî ku pêş dixin wê derkevina pêşîya civatê.

Di nava pergaleka civatî de, partî karên wan ew a ku projeyên civatî ên ku werina pêşxistin di temenê ku bikevina xizmete netewê de bi rê ve dibin.. Rexneyên wan ku li hevdû hebin jî, rexneyên wan di temenê kêmesî û ne hanîna li cih ya berpirsîyarên xwe de ya. Di vê temenê de, partî, dikarin xwe bi karûbar bikin. Di vê temenê de partî, li gorî demê û hizir û awayên pêşketinê dihên ava kirin û ankû ku ên avakirî hebin dihên nûkirin. Bi wê yekê re, çendî ku bersiv da pêşketina civatî ya netewî, ew partî wê karibê bahse pêşketinekê bi navê xwe re bike.

Li kurdistanê, ji xwe, heta roja me, ji ber ku hertimê qatbûn hebû, ewqas komkuji hatina serê kurdan. Dema ku em dîroka kurdan bênina ser ziman, ku em bi wê dîroka kurdan re çend komkujiyên ku hatina serê kurdan ku werênina ser ziman, emê bi gelek sedemên ku em werênina ser ziman re emê qatbûna kurdan û hêza wan ya civatî jî werênina ser ziman. JI xwe, î ro qatkirina civate kurd û kurdistanê ku li çar qatan jî, hinekî bi armanca wê ji holê rakirina hêza wan ya netewî û parastinê ya. Bi teybetî, politikayên li ser temenê qatkirinê hertimî li ser serê kurdan meşandina. Tenê bi qatkirina kurdistanê li çar qatan re bi sînor nemana. Di her **qatê** de jî, bo ku hêzeka parastinê ya civatî ya giştî neafirê û dernekeve li holê bi hezaran lîstik leyistina. Di roja me de jî, bi teybetî li rojavayê kurdistanê ev dihê kirin. Ma ji ber çi di cih de li ber "lijneya bilind a kurd" di cih de lijneyaka din ya bi navê ya "nistimanî" û hwd ava

kirin.? Armanc, ew a ku ji aliyê sîyesî ve ew qatkirin bibe û were domandin. Nûha jî, ji aliyê sîyesî ve ew qatkirina ku çê kirina, dikin ku wê bi hêzeka leşkerî bi temem bikin û piştre di temenê di nava Sûrî de bêstatû hiştina kurdan de, dixwezin ku wê êdî ji holê ra bikin.

Di vê temenê de çûyinaka mazin ya bi ser kurdan de heya. Di vê demê de, demeka ku kurd, di nava xwe de ku hêzên wan ên cuda hebin jî, dema ku wan bikina yek a. Ma ne ji ber vê yekê ya, dixwezin ku herina kongira netewî? Ku ev hizir di serê wan de nebe di dema ku diçina kongira netewî, ma gelo nexwe ji ber çi diçin?

Dev ji herêmeka weke ya rojavayê kurdistanê ya piçûk berda, herêmên mazin ên cihanê jî, ti carî destûrê nadin ku hêzên wan qat bin. Dewleta Çînê, li ser milyar û nîvê re mirov lê dijîn. Wê çaxê, dema ku mijar beşkirina hêzekê ba, hêncetê qatkirina hêzekê pirr ji wê re hebûn. Lê çendî ku herêm piçûk bin û mazin, farq nakê, ku hêz yek bê û di yekîtîyê de bê, wê hingî wê çaxê karibê baştir biparêzê. Her komên ku di nava civatê de derkevin û bibêjin "ezê hêzeka leşkerî ji xwe re ava bikim", ew ne ji bo parastinê ya.. Ew tenê bo ku bibina hin komên weke ên "mafya" ku hêzeka xwe ava bikin û bi wê zorê li ser serê herêmê bimeşênin û bi wê ne hêlin ku civat bi awayekî di aramiyê de pêş bikeve.

Li başûrê kurdistanê, dema ku PDK´ê û YNK´ê jî, hêzên wan ên cuda hebûn, lê wan jî ditin ku dema ku hêza wan nebê yek, wê nekaribin ku parastinaka giştî ya kurdistanî bikin. Tevî wê jî, gotinên ku ji başûrê kurdistanê tên ku di wan de tê gotin ku "dervî hêza YPG´ê ya parastina rojavayê kurdistanê, dixwezê ku hêzeka din bide ava kirin jî, mirov di bawerkirina wan de dikeve zorê de. Ev gotin jî û kirin, bi vî rengî jî, ti carî û ti kesek nikarê di temenê berjewendiyên civatî ên kurdistanî de werêne ser ziman. Hin kom, bixwezin ku navê kurd û ´berjewendiyên netewî´ û hwd jî bidina fahm kirin jî, mirov nikarê ti carî bi wê rengê werêne ser ziman. Ji xwe, di eleqeya xwestekên bi vî rengî bi berjewendiyên netewî re tûna ya.

Partî, di nava jîyane civatê de, wê hertimî hizrên wan ên ji hevdû cuda hebin. Ew hizrên cuda, ti carî nayêna wê wateyê ku divê ku cuda bin. Di nava jîyane civatî de, herdû alî jî hizrên xwe bi awayekî demokratikî dihênina ser ziman. Didina nîqaşkirin. Li ser wê re jî, ya rast kîjan bê, wê civat wê hilbijêrê. Wate partîyan di pêşketina civatan de ew a.

Li kurdistanê, hertimî di jîyane civatî de qatbûn hatîya çê kirin. MInaq, li bakûrê kurdistanê, dewletê bi serokê hin aşîrên kurd re lev kir û ew li dijî tevgera azadîya kurd da şer kirin. Î ro, ew "korucu" û ankû weke ku kurd wan bi nav dikin "cahş", ew bixwe na. Yanî, hêza tevgera kurd, dema ku afirî, dewletê di cih de hêzek din bi vî rengî bi navê "cahşîyê" pêşxist û li dijî tekoşîna azadiya kurd da şer kirin. BI destê wan bi hezaran ciwanên kurd jî hatina qatil kirin. Ji bilî wê jî, hin kurdên oldar jî, di bin navê oldariyê de hatina xapandin û bi partîya ku îstihbarete tirk ava kirî ya ku kurd jê re dibêjin "hizbil-kontra" û bi navê "hizbillah" û hwd hatina xapandin û li dijî kurdan dane şer kirin. Li rojavayê kurdistanê jî, rola wan ´cahşan´ û ankû wan ´hizbil-kontra´ dane partîyên weke "partîya Azad" û ankû "el-partîyê" û hwd. Ev jî, cahşên rojavayê kurdistanê na, ku girêdayî îstihbarate tirk kar dikin in. ..

Di vê dema ku kurd li rojavayê kurdistanê di bin komkujiyên mazin de na, ev komên ku ji xwe re dibêjin kurd jî di roleka xêrnexwez ya bêxîret û bêşeref û bêrûmet de na. Heka rast derd û kula wan parastina kurdan a, aha î ro YPG´ê weke hêzeka

netewî avakirina wê heya, di nav de cihê xwe bigrin û wê parastinê bikin. Çendî ku kurdan, ji serî ve hêza xwe ya sîyesî kirina yek û yekbûn çêkirin û ji binî ve jî çendî ku hêza xwe ya parastinê kirin yek, wê ew çendî bandûra wan mazin bê û wê statûya xwe ya ku ew dixwezin wê bidest bixin. Armanca qatkirinê, bo ku kurd di temenê mafên xwe yên hevbeş(kollektif) de nebina xwediyê ti statûyê. Li her dera cihane û di her demê de, hertimî di dem û rewşên weha ên dîrokî de, ku di nava xalkekî û ankû netewekî de hêzên cuda hebin jî, tên cem hevdû û hêza xwe dikina yek bo ku biserkevin. Çendî ku hêzên xwe kirin yek jî, serkevtin dibe ya wan. Bo vê yekê, hertimî tê gotin ku yekbûn, temenê serkevtinê ya.

Li vir, di serî de, ya ku em ji ciwanên kurd re bibêjin ew a ku divê ku newina lîstikên wan partîyên ku bi vî rengî û xwe ji parastina civate xwe dûr negrin. Divê ku bizanibin, ku ew partî, ne girêdayî hêzên derve na û dixwezin ku qatkirinê di nava civate kurd de bidna çêkirin bo ku kurd negihijina statûya xwe.Partîyeka ku bixwezê ji xwe re hêzê ava bike, divê ku bê zanîn ku nîyetên xirab bi wê re hena. Hêz, ne ji bo partîyekê tê ava kirin. Hêz ji bo parastina civatê tê ava kirin. Hêza ku bi vî rengî hat ava kirin jî, li ser hemû partîyan re ya. Aramiya civatî ku ew hêz diafirêne, hemû hêzên civate ku hizrên wan ên cuda jjî hebin dihênin ser ziman. Di wê temenê de, divê ku mirov lê binerê.

Di aslê xwe de, divê ku mirov van hewldanên qatkirina hêza parastina civatî di temenê dorpêçkirina civate ya ji hundurîyê van ve hilde li dest û şîrove bike. Ew dorpêçkirin, bi dorpêçkirina derve ve girêdayî ya. Î ro, bi girtina derîyan re ku nahêlin ku alikarîya mirovî jî bibuhurê, divê ku mirov di temenê wê dorpêçkirinê de şîrove bike. Girtina derîyê sînor ê ´sêmalka´ jî, ji aliyê rêveberîya herêma başûrê kurdistanê ve, wê bi navê wê weke bêrûmetîya wê ya dîrokî wê li dîrokê cihê xwe bigirê û were nivîsandin. Dema ku ji min were pirsîn ku bê gotin ku tirkiya û rejima tirk derîyên bo alikariyê girtina, ezê wê fahm bikim. Ji ber ku wê ji dîrokê ve hertimî dijminatîya gelê kurd kiriya û ti carî jî dev ji wê dijminatiyê ne berda ya. Î ro jî, ya ku dikin ew a. Lê ku rêveberîyeka kurd, tevlî wê dijminatiya li gelê kurd bibe, ew tenê weke dijminatiyê di dîrokê de nemêne, wê weke bêrûmetîyeka dîrokî jî bimêne. Mirov nikarê vê rewşa girtina derî ya ji aliyê rêveberîya kurd ve li kurdan, bi ti felsefeya ahlaqî û rûmetê em nikarin wê bênina ser ziman.

Mirovê ku di derbarê dîroka kurd û kurdistanê de jî xwediyê agahî û têgihiştinê bê, wê di cih de wê rewşa girtîya derî li kurdan ji aliyê rêveberîyeka kurd ve, wê di cih de bi bêrûmetî werênina ser ziman. Ji aliyê çand û kevneşopîya kurdan ve jî ti meşrûtîya wê tûna ya. Rewşeka, ku divê ku mirov dervî ahlaq û rûmetê şîrove bike ya. Ez girtîna deriyên weke deriyên sêmalka bo alikariyê, biqasî wê "fetwaya" komên çekdar ku dibêjin "kuştina kurdan helal a." û ankû "destavêtina jin, can û malê kurdan helal a" û hwd, bi bêahlaqî şîrove dikim.

Ev rewş, hemû di temenê dorpêçkirina kurdan de hatina pêşxistin. Li pişt wan jî, rejima baxdadê, rejima Îranê û rejima tirk heya. Bi teybetî, ev rejim naxwezin ku kurd bibina xwediyê ti statûyê li herêmên xwe. Heta roja me, di temenê nîjadperestiya xwe de hêrîşî kurdan kirin û bi dehan komkuji jî bi kurdan dan jîn kirin. Lê di wan kirina komkujiyên xwe de jî bi ser neketin.

Ev dorpêçkirina li kurdan, bo ku kurd nebina xwediyê ti statûyê hatina pêşxistin. Bo vê yekê, komkuji tên kirin. Hêrîşên li herêmên rojavayê kurdistanê ên weke ´girê-sipî, kobanê, afrînê û hwd, di temenê qatkirina herêmê kurdan de na. Kurd, di vê demê

de divê ku di nava tekoşînaka pirr jidahî de bin. Bi teybetî, karekî pirr mazin dikeve ser milê kurdên bakûrê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê de. Bi teybetî, li bakûrê kurdistanê, divê ku li her herêmê weke ku kurdan hewl dan biherikin li serêkahniyê û hwd, zêdetir û gurrtir bibin. Divê ku kurd, rabina ser pîyan. Tenê, bi çend xwepêşandinan nabê. divê ku kom bi kom, bidina rex hevdû û xwepêşandina derbaskirina sînoran pêş bixin. Divê ku li amedê xwepêşandinên bi milyonan di vê demê de bibin. Divê ku kurdan ne rûnihê.

Başûrê kurdistanê, gelê kurd, ku komkujiyên ´anfalê´ û komkujiyên weke ´komkujiya helebçe´ jîn kirina, divê ku di vê demê de ji herdemê zêdetir bo rojavayê kurdistanê li ser lingan bin. Divê ku wê bêrûmetîya hikimeta herêma kurdistanê ya bi girtina derîyê sêmalka de jî bi wê bidina şikandin. Ev komên çete ên ku hêrîş rojavayê kurdistanê dikin ku ji tûxmê deccal in, her roj hêrîşekê li herêmekê dikin. Ev jî, bi vî rengî, ji aliyê rejima tirk ve bi plan û bi destê van komên çeteyên weke ´cebetil-nasr´ û hwd, dihên bi rê ve birin. Iblisên ´cebetil-nasr´, li her devera rojavayê kurdistanê komkujiyan dikin. Rêveberîya başûrê kurdistanê, bi girtina derîyê sêmalka li kurdan, daye nîşandin ku ne li aliyê kurdan lê li aliyê ´iblîsên cebetil-nasr´ cih girtîya. Ew iblîsên cebetil-nasr´, ku fetwa serê kurdan didin û dest diavêjina namûsa gelekî, ti eleqeya wan bi ol û bawerîyê re tûna ya. Lê olê wek maske bikardihênin. her wusa bi piştgirîya tirkiya jî kurdan dikujin. Hemû çekên wan ji tirkiya diçin.

Başûrê kurdistanê, em hêvîdikin ku wê di cih de wê bêrûmetiyê derbas bike. Wekî din, wê dîrok ti carî bi navê mirovatiyê wê afû nekê. Divê ku di cih de, ji wê rewşa ku nûha têde xwe derbas bike û ne tenê deriyê sêmalka, her wusa hemû deriyên din jî divê u veke bo ku alikarîya mirovî ji kurdên rojavayê kurdistanê re herê. Divê derîyê sêmalka derîyên din veke. Her wusa, divê ku komkujiyên ku çeteyan hanîn serê kurdên rojavayê kurdistanê şermazar bike. Desthilatdarîyaka ku bibêje ku "ez desthilatdarîya kurd im" û komkujiyên ku hatina serê kurdan şermazar nake, gelo çiqasî wê karibê bahse rûmeta kurdan û navê kurdan bi navê xwe re bike? Dîmenên ku ji ´Til-eran´ û ´ Til-hasil´ û hwd hatin, weke anfale duyemin ya ku hatî serê kurdan. Li ber wê, bêdengbûna her kurdî, tenê bêrûmetî ya bo wan. Rûsya, ne welatekî kurda, lê komkujiya hatî serê kurdan şermazar kir. Lê desthilatdarîya ku ji xwe re dibêje "ez kurd im", hê ew komkujiyên ku hatina serê kurdan û ku hê têne serê kurdan şermazar nekirîya. Bila ji vê yekê fihet bikin.

Em hêvî dikin ku wê desthilatdarîya başûrê kurdistanê ji wê rewşa xwe ya ku em ti carî nikarin bi rûmet bênina ser ziman derbas bike û derîyê sêmalka jî di nav de hemû deriyên li rojavayê kurdistanê ku girtina veke û wan komkujiyên ku hatina hatina kirin ku Rûsya jî şermazar kirina, şermaza bike. Desthilatdarîyek, divê ku nekeve wê rewşa bêrûmetîyê de ku komkujiyên li ser serê gelê xwe jî şermazar nekê.

-Hêzên desthilatdar ên statûqû û hêzên dervî herêmê ên berjewendîparêz, di şerê li Sûrî de bûna yek. Statûya li herêmê ku piştî şerê cihanê ê yekemin hat afirandin, bû bingihê şerê cihanê ê duyemin. Piştre jî, heta roja me jî, di ancama wê statûqûya ku hat avakirin de, şer pevçûn kêm nebûn. Hê jî, ew şer û pevçûn dibin. Hemû şer û pevçûnên ku dibin jî, şer û pevçûnên wê statûqûyê na.

Di mudahaleya li Sûrî de, herî zêde mijare ku divê ku em bahsê bikin, ´statûya kurdan a li herêmê´ ya. Ji xwe, hinekî jî, bixwûnbûna şerê li Sûrî sedema wê jî ev a. Li herêmê, desthilatdarîyên ku hena ên weke Tirkiya û Îran û hwd, naxwezîn ku kurd

bibina xwediyê ti statûyê. Li Sûrî jî, komên çekdar ku hatibûbûna avakirin dibin navê "muxalefeta Sûrî" de, berê wan dane bi ser kurdan de. Bo ku kurd lli rojavayê kurdistanê nebina xwediyê ti statûyê, ew şer bi wan re hat pêşxistin.

Kurdan, bêî ku xwûna ti kesekî bi rijênin li herêmê xwe ên rojavayê kurdistanê, dest danîn ser rêveberîyên herêmên xwe ên bajaran. Piştî wê re, ku kurdan sazîyên xwe yên xwe bixwe rêvebirinê avakirin û ragihandin ku wê rêveberîya xwe ya herêmî ya xweser ava bikin û pêde, ew şerê bi wan re hat zêdetir kirin. Berê komên çekdar ên ku di bin navê "muxalefet"ê de hatibûbûna avakirin, dane bi ser kurdan de. Komên weke ´cebetil-nasr" ´lîva el-tewhîd", "bîlad el-şam" û hwd berê wan dane bi ser kurdan de. Î ro, çapameniya kurd jî, van koman weke komên "el-kaîde" nîqaş dike. Lê di aslê xwe de, ev kom hemû ku ol hatîya bikarhanîn û hatina birêxistin kirin in. Ev kom, hemû lingna camaatê ên ne fermî ku dibin ardê de bi rêxistinkirî na ve girêdayî na. Minaq, koma lîva el-Tewhîd, digihijê " koma tewhîd" ku li tirkiya bidestê camaatê hatîya birêxistin kirin. BI vî rengî, gelek komên ku em navê wan ji Sûrî dibihîzîn ku şer dikin, li ser camaetê re hatina bi rêxistin kirin. BI çend aşîrên arab re, levkiirina wan dewleta tirk jî, hinekî jî, dixwezê ku rengê van koman qatil û kujar bi navê ´îslamê´ û ´arab´an bide nîşandin. Di vê temenê de, telewîsyonên arabî ên weke ´el-cîzîra´, ´ el-arabîya´ û hwd bikarhanîn. Bi heman rengî ´cebetil-nasr´ jî wusa ya.

Lê li vir, ya herî ku mirov dikarê bi navê bêahlaqiyê werêne ser ziman, ew a ku nakokîyên olî û mezhebî dihên bikarhanîn û li ser wê re ev şer dihê pêşxistin. Di vê temenê de şerê mezhebî jî dihê pêşxistin.

Lê divê ku mirov vê yekê bibêje ku "ew dibistanên fethullahçîyan û ankû "camaetê" ku herêmên kurdan û li herêmên din ên cihanê hatina avakirin, weke saziyên hildane mirovan a li leşkerîyê kar dikin. Her wusa, li welatên ewropa û hwd, mizgeft û hin saziyên wan ên weke hena li ser wan re mirovan dixapênin û dişênina nava şer û didina kuştin. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku hemû şerê bi kurdan re û bi sazîyên wan re ên di vê demê de li ser fethullahçîyan û camaatê re dihê meşandin.

LI bakûrê kurdistanê, pêvajoya ku kurdan bo çareserkirina pirsgirêka kurd, di vê temenê de weke firsandekê dît. Ji dêla ku di vê demê de gav werina avêtin di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd de, amedekarîya şer hat kirin.

Li herêmê, çend ku dewleta tirk, gotinên ku birêz Ocalan bi navê "çareseriyê" hanîn ser ziman, li hin ji wan xwedî derket û bi navê ´çareseriyê´ hanî ser ziman jî, lê di aslê xwe de ti plan û programên wan ên bo çareserkirina pirsgirêka kurd tûna na. JI ber ku hê hebûna kurdan herê nekirina û ne pejirendina. Hê, naxwezin ku kurd bibina xwediyê statûyê li herêmê. Bi vê yekê, bi tememî û bi tundî li dijî kurdan û li dijî statûya kurdan şer dikin. Tirkiya, hemû giranî û dîplomasîya xwe daye ser wê ku pêşî li pêşketina statûya kurdan bigrê. Bi vê yekê û awayê nûha, di nava hewldanê de ya. Li herêmê, statûya ku piştî şerê cihanê ê yekemin hat afirandin, êdî ji holê dirabe. Lê rewşa nû û statûya nû ya herêmê ku diafirê jî, bo ku di wê de kurd bi statûya xwe têde cih negirin, tirkiya di nava hewldanên mazin de ya. Di vê temenê de şerê xwe bi kurdan re dike.

Î ro ku em bipirsin, ji ber çi tirkiya kom bi komên çekdar dişêne bi ser kurdên rojavayê kurdistanê de? Bersiva wê, bi dijberîya wê ya li dijî statûya kurdan re dihê li holê. Yanî, bi ti awayê tirkiya naxwezê ku kurd li herêmê xwedî nav û statû bin. Di vê temenê de, dijberîyekê di vê demê de jî li dijî kurdan dike. Di dema ku Salih Mislim bi rayadarên tirk re hevdîtinê dike, gotina pêşî ya rayadarên tirk ew a ku "kurd, xweserîya

xwe li herêma rojavayê kurdistanê ne denezênin" a. Yanî, di hevdîtinên xwe ên bi kurdan re de jî, di temenê dijberîya statûya kurdan de gotina xwe dihêne ser ziman. Di vê temenê de, dema ku mirov lê dihizirê, kurdên ku dervî sînorê wê na jî, ku li dijî xweserîya wan jî bê, wê çaxê bi çi awayê û kî dikarê bêje ku jidil a di pêvajoya li bakûrê kurdistanê de jî. Di vê pêvajoya li bakûrê kurdistanê de ku kurdan daye destpêkirin de jî, dîsa dixwezê ku wê pêvajoyê weke firsandekê bikarbêne û bi wê derbeyekê li kurdan bixe.

Piştre ku, sevkkirina bi sadan hêzên leşkerî ên nû li bakûrê kurdistanê û çêkirina qarakolan û bendavên bi armanca leşkerî, hinekî jî bi armanca kirina bin kontrolê de ya bakûrê kurdistanê ya. Ji ber ku di serê dewletê de heya ku mudahale li rojavayê kurdistanê bike. Weke ku bi wê sevkkirina leşkerî û amedekarîyên leşkerî, hinekî jî ji vê yekê re amedekarî dihên kirin. Şandina van komên çekdar li ser rojavayê kurdistanê jî, hinekî bi armanca ji hêz xistinê ya. Li gorî ku mirov dibîne, wusa hizirkirina ku bi van komên çekdar re wê pêşî rojavayê kurdistanê ji hêz bikin û piştre jî, mudahaleyê lê bikin. Piştî rojavayê kurdistanê ji hêz xistin û wastandin û pê de, dema ku mudahale lê kirin, wê hesantir bê. Ya ku lê hatîya hizirîn ev a.

Di vê çerçoveyê de di çeroveya stretejiyeka leşkerî de ew şer bi kurdan re dihê meşandin. Şerê bi armanca ji xistinê, bi teybetî li kîjan herêmên rojavayê kurdistanê tê zêdetir kirin? Herêmên Girê-sor(´til-ebyad´) dihê zêdetir kirin. Dixwezin ku li vê herêmê serbikevin. Ji ber ku dema ku li vê herêmê bi serketin, wê herêmên kurdan bikina duqat. Li aliyekî girê-sor, Afrîn û koban dimêne. Li aliyê din jî, Qamişlo, Hesekê, Amûdê, Serêkahniyê û hwd, dimênin. Divê çerçoveyê de şerekî biplan dihê meşandin bi kurdan re.

Di vê dema ku bahse mudaheleyê dihê kirin de jî, tirkiya bi isrer dixwezê ku di nava wî şerî de hebe. Ji ber ku ew dixwezê bi teybetî herê bi ser herêmên kurdan de. Dema ku mudahale li Sûrî bû û ku tirkiya di wê mudaheleyê de hebe, herêmên ku tirkiya pêşî wê tirkiya hêrîşî wan bike, wê herêmên rojavayê kurdistanê bin. Ya ku nûha di wê temenê de amedekarî dihên kirin ev a.

Rojavayê kurdistanê, şoreşa ku lê bû, bi ziniyeteka nû re pêşket. Di aslê xwe de, ya herî zêde wê şoreşê dike armanca hêrîşan jî ev a. LI herêmê, vîna gelan hatîya kirin bin kontrolê de. Nayê xwestin ku gel, bi vîna xwe rabin. Î ro, di vê temenê de jî, dema ku em li rewşa rojavayê û herîşên li lê ku em lê dinerin, em di vê temenê de wê dibînin. Gelê kurd, di vê demê de weke gelekî herî zêde ku bi vîna xwe derdikeve li pêş a. Ji ber vê yekê ya, herî zêde hêrîş li vîna kurdan dihên kirin.

Li bakûrê kurdistanê, divê ku kurd rêxistinîya xwe hê zêdetir pêş bixin. Heta ku divê ku di nava xwe de kom bi kom komên ewlakarîyê divê ku ava bikin. Divê ku hêzeka xort ya ewlakarîyê ku bi sad hezaran mirov andamê wê na, divê ku di vê demê de bi rêxistin bikin. Ku ev kirin, wê di demên pêş de ku mudahale li Sûrî bû û ku hêrîş li rojavayê kurdistanê jî bûn, wê hingî ew hêrîş werina vala derxistin. Afirandina hêzên ewlakarîyê, wê wan hewldanên leşkerî ên tirkiya ku li bakûrê kurdistanê pêş dixe jî vala derxe. Wê, di vê demê de, kurdan biser bixe. Di vê demê de, ku kurd ewlakarîya xwe negrin, wî rastî hêrîşên mazin werina û wê ´komkujiyên ên weke komkujiya helepçe ên nû werina serê wan. Bo ku ev newin û nebin, pêwîstî pê heya ku hêzeka giştî ya ewlakarîyê were ava kirin.

Li vir, divê ku em bi teybetî bin xat bikin û bibêjin ku mûdahale li Sûrî bibe û tirkiya di nava wê mudaheleyê de hebe, wê tirkiya yekser hêrîşî herêmên kurdan ên rojavayê kurdistanê bike. Ji ber ku tirkiya naxwezê ku kurd xwedîyê ti statûyê bikin. Tirkiya, statûya kurdan a rojavayê kurdistanê ji xwe re kirîya armanc. Ji xwe, heta nûha şandina komên çekdar bi ser herêmên kurdan de, hinekî jî bi vê girêdayî ya. Mûdahaleya li Sûrî ku bi amedekarîna komên çekdar ku li dijî rejimê şer bikin û wê bixûrixênin, vegerîya şerê bi kurdan re. Nûha, ast û rewşa ku em hatinê û gihiştinê, ew a ku komên çekdar hemûyan berê xwe daye bi ser kurdan de. Rejim jîî, herêmên kurdan bombabaran dike.

Di nava wê rewşeê de, ku em bi gotinekê jî bê ku em bahse wê nekin nabê. Rojavayê kurdistanê, embargo hatîya danîn li ser. Bi zora tirkiya desthilatdarîya kurd ya başûrê kurdistanê jî tevlî wê ambargoyê bûya û derîyên çûnûhatinê ên weke derîyê ´sêmalka´ û hwd jî hatina girtin. Yanî ji hemû aliyan ve dorpêçkirinek li ser kurdan heya. Armanca van herîş û ambargo´yan, yek a. Armanc, tafisandina şoreşa rojavayê kurdistanê ya.

Dema ku mijar rojavayê kurdistanê û pêşketina şoreşa rojavayê kurdistanê bê, divê ku em ambargoyên li ser rojavayê kurdistanê, hêrîşên komên çekdar, amedekarîyên leşkerî ku li bakûrê kurdistanê dihên kirin bi hevdû re hilde li dest. Ji ber ku ev rewş û gelek rewşên din bi armanca têkbirina rojavayê kurdistanê dihên pêşxistin. Her wusa,, bi deh hezaran kurdên ku ji rojavayê kurdistanê bi zorê hatina dayîn goçkirin ji herêmên wan, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest. ..

Tirkiya, pirr dixwezê ku Mudahale li Sûrî dibe. Lê tirkiya, en ji kul û derdê gelên li Sûrî ketîya. Gotinên ku dibêjin ku "çekên kîmyewî bikarhanîya jî, tenê weke gotinên ku dihên bikarhanîn in. Ev bûyare ´bikarhanîna çekên kîmyewî´ a li Sûrî, di tijbihê bûyare balefira tirkiya ku ji aliyê Sûrî ve hat xistin a. Yanî, bûyaraka ku hatîya çêkirin a.

Divê ku mirov vê yekê bibêje ku ew mirovên ku dibêjin "ji ber ku rejimê çekên kîmyewî çekên kîmyewî bikarhanîya emê lê bixin" jî, di heta nûha de, di şerê li Sûrî de ku bi destê komên di bin navê "muxalifîyê" ku bi rêxistin kirina, bi destê wan jî bi deh hezaran mirov hatina qatil kirin. Lê li ber wan ti deng dernaxin. Î ro, çekên ji çekên kîmyewî bi bandûrtir ku herêmê dikina kavil dihên bikarhanîn. Lê li ber wî şerî ti deng nayê derxistin.

Ev hêzên ku bahse Mudaheleyê dikin, gelo ku derdê wan demokrasîya herêmê ba, çima bi rêyên demokratîkî, nahêlin ku pêvajo pêş bikeve. Ji ber çi, ji dêla ku piştgirîyê bidina hêzên demokratik piştgirîyê didina komên çekdar ku mirovan dikujin.?

Bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku gelek hasabên hêzên ku li Sûrîya şer dikin hena. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bibêje, tirkiya, weke welatê ku herî zêde dixwezê ku Mudahale li Sûrî bibe ya. Derdê Sûrîya, ew a ku di mudahaleyeka ku bibe de, ew jî di wê de hebe û bi teybetî herê bi ser herêmên kurdan de. Ku Mudahaleyek bibe û tirkiya di wê de cih bigrê, wê pêşî tirkiya herîşê bibe bi ser herêmên kurdan de. Derdê, tirkiya ew a ku mudahaleyek bibe û ew di wê de hebe û bi wê re herê bi ser herêmên kurdan de.

Tirkiya, ji xwe, heta nûha, gotinên ku rayadarên wê gotina, hemû jî li dijî statûya kurdan in. Tirkiya, naxwezê ku hem li bakûrê kurdistanê û hem jî li rojavayê kurdistanê, kurd bibina xwediyê ti statûtyê. Tirkiya, dihizirê ku karibê li Rojavayê kurdistanê derbeyek li kurdan were xistin, wê êdî karibê, li bakûrê kurdistanê jî, wê

derbeyê li kurdan bixe. Bi wê re jî, ez vê jî bibêjim ku tirkiya, wusa tê xuyakirin û fahm kirin ku di destpêka vê pêvajoya bi navê ´çareserîyê´ de jî, hasabên xwe bi mudahaleyeka li Sûrî re kirina. Bi wê mudahaleyê re hasab kiriya ku wê derbe ji rojavayê kurdistanê ve li kurdan were xistin û ew jî wê bi hêza xwe û tedbîrên ku wê bigrê wê ji bakûrê kurdistanê ve derbeyê li kurdan bixe.

Ji ber vê yekê, wusa tê fahm kirin ku di destpêkê de, rayadarên dewletê, hasab kirina ku wê mudahale li Sûrî bibe. Bi wê re jî, bi derewan bê û ankû bi dayîna sozên ku newênina li cih bê, bidina bawerkirin û pêvajoyê bidina destpêkirin. Lê piştre jî, ku ew pêvajo, destpêkir, êdî piştre bi pêşketinên weke mudahaleya li Sûrî ku bû jî, kurdan di bin pêvajoyê de bihêlin û wan têk bibin. Hin, hasabên ku bi vî rengî, ên bi bêahlaq û bêwijdan jî, dewleta tirk kirina. Ji ber vê yekê ya, ku bi teybetî, li ser disekinê û dixwezê ku mudahale li Sûrî bibe.

Dema ku em di vê temenê de jî li bûyarên weke bikarhanîna çekên kîmyewî dinerin, em tê digihin ku tirkiya weke ´bûyaraka dane xistina balefira tirk´ û hwd, dibê ku ev bûyara bikarhanîna çekên kimyewî jî provakasyonaka bi vî rengî bê. Di vê temenê de, dema ku em dihizirin, em dibêjin ku weke ku tirkiya bi teybetî, li ser pêvajoya navxweyî ya kurdan de jî dixwezê ku xirabûnekê bide çêkirin. Du caran, taloqkirina kongira netewî, divê ku mirov di vê temenê de lê binerê. Destê tirkiya, bi têkiliya wê ya bi rêveberîya kurd ya başûrê kurdistanê re di wê taloqkirinê re heya.

Li vir, di çerçoveya taloqkirina kongira netewî de jî, em hinekî divê ku li pêvajoyê binerin û pêvajoyê hinekî bixwêni. ..

Li darxistina kongira netewî a kurdistanê, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku hêvîya hemû kurdan a. Hemû kurd li bendê na ku kongira were li darxistin. Piştî amedekarîyên li darxistina kongira netewî destpêkirin, hat dîyarkirin ku wê di meha tabaxê de were li darxistin. Lê piştre, bi sedema ku amedekarîyên komîteya amedekar nagihijin hat paşvexistin(taloqkirin) li 15 û 16´ê Êlona 2013´an. Lê piştre, hat dîyarkirin ku dîroka li darxistina kongira netewî hatîya paşvexistin li 25´ê mijdara 2013´an. Ev care duyemin a ku dîroka kongira netewî li darxistin tê paşvexistin.

Gelê kurd, dixwezê ku kongira netewî were li darxistin. Her wusa, paşvexistina dîroka kongira netewî jî, derbeyê li pêvajoya çareserîyê ku li bakûrê kurdistanê jî hatîya dayin destpêkirin dixe. Bi teybetî, paşvexistina dîroka kongira netewî, dikeve bin xizmeta poliitkayên mijulkirinê ên dewleta tirk de. Di serî de, divê ku mirov bibêje ku ev rewşa paşvexistina kongira netewî, nakeve xizmeta çareserkirina pirsgirêka kurd de. Dikeve bin xizmeta politikayên ne çareserkirina politikayên dewletên herêmê ên weke tirkiya ku naxwezê pirsgirêka kurd çareser bike û di wê temenê de gavê biavêje.

Çend ku paşvexistina vê carê de weke sedem hilbijartinên li başûrê kurdistanê hatîna dayîn nîşandin jî, em nikarin bi tememî bi wê re bidina nîşandin. Di vê demê de, hemû rewşên bi vî rengî, divê ku mirov bi pêvajoyê ve girêdayî şîrove bike. Ev nêzîkatîyên bi vî rengî ên weke paşvexistina kongira netewî yan ji nezaniyekê û nexwandina pêvajoyê tê û yan jî bi zanebûnî di temenê di xizmeta hin hêzên ku dixwezin ku derbeyê li kurdan bixin de dihê kirin.

PÊvajoyên bi vî rengî ên xeses, di wan de, herî zêde gavên bi vî rengî dihên avêtin û ti carî derfet nayê dayîn ku werina paşvexistin. Ji ber ku di paşvexistinên wan e herî zêde zirer li civatê dihê kirin. Ev paşvexistin jî, wê ne di xizmeta kurdan de bê. Wê tenê, di xizmeta politikayên mijulkirinê ên weke yên dewleta tirk ku bi armanc gav neavêtinê

dihên kirin, wê xizmetî wan bike. Wê xismetî kurdan neke.

Ez hêvî dikim ku hem rêveberîya başûrê kurdistanê û hem jî hemû rêxistin û partîyên kurd ên ku wê tevlî kongira netewî bibin, wê van xaterîyan dibînin. Bi wan xaterîyan, tişta ku were serê kurdan, wê berpirsîyarîya wê jî, li ser milê wan bê.

Di pêvajoyên bi vî rengî de, divê ku politika û nêzîkatîyên kifşkar werina dîyarkirin û werina li cih hanîn. Di dem û pêvajoyên bi vî rengî de, biqasî gotinên mirov jî, her wusa kirin jî giring in û divê ku pêwîstînîya wan were hanîn. Birêz Ocalan jî, ji ber ku xaterîya pêvajoyê dîtîya, ev pêşnîyarkirîya. Ji ber ku dîtîya ku wê, di demên pêş de pêvajoyên xaternak derkevina ber kurdan, êêdî ku da qana kurd bi vîneka giştî ya kurdî û kurdistanî wan xaterîyan pêşwazî bikin û di bin wan de nemênin, girîngîîya kongira netewî hanîya ser ziman.

Divê ku ev xaterîyên vê pêvajoyê û tangesîyên werina ditin û bêî ku dem were winda kirin, divê ku kongira netewî a kurdistanê were li darxistin. Ev nêzîkatîyên paşvexistinê, di vê demê de xismetî kurdan nakin. Tenê, xizmetî politikayên mijulkirinê ên dewletên herêmê ên weke yên tirkiya û hwd ku naxwezin pirsgirêka kurd were çareserkirin û naxwezin ku kurd bibina xwediyê ti statûyê dike. Bi vê yekê, em hêvî dikin ku ev rastî tên ditin. Lê divê ku ev yek were ditin ku ev paşvexistin, wê bê alikarîyek ji dewleta tirk re ku amedekarîyên xwe yên leşkerî bidomêne ku bi wan re derbeyekê li kurdan bixe.

Lê divê ku were zanîn ku ên ku rol û weyna wan di paşvexistina kongira netewî de hena, wê ji komkujiyên ku di rojên pêş de werina serê kurdan jî wê berpirsîyar bin. ...

Di vê çerçoveyê de, dema ku em li pêvajoyê dihizirin, em dibînin ku planên ku di temenê pêvajoya nû ku Birêz Ocalan da destpêkiriin ên dewletê, ne çareserkirina parastinê ya. Dewletê, di hasabê têkbirina kurdan û derbe li wan xistina wan de ya. Di vê temenê de plan û program kiriya. Dema ku ez li vê pêvajoyê dinerin, Pêvajoya, ku bi destê dewleta ´Sirî-lanka´ ku hat hanîn serê rêxistin û xalkê Tamilî dihê berbîra min. Yanî, çend ku wê dema ku ew komkuji hatina serê tamilîyan, hat nîqaşkirin ku ´dewleta tirk, dixwezê ku heman tirkî werêne serê kurdan´ jî, lê wusa xuya dike ku çend ku wan demên ev nîqaş dibûn jî, hin hewldanên bi vî rengî bûna jî, lê wusa tê xuyakirin ku hin planên bi vî rengî ku weke tişta ku hanîna serê tamilîyan ku mudahaleyeka mihtemel ku li Sûrî bibe jî bide li pişta xwe û bi wê herê bi ser kurdan de.

Divê çerçoveyê de, divê ku mirov bibêje ku zora tirkiya jî di taloqkiirna kongira netewî a kurd de heya. Tirkiya, bi wê taloqkirinê, dixwezê ku politikayên xwe yên mijulkirinê ên li li dijî kurdên bakûrê kurdistanê bide domandin. Her wusa, bi wê re jî, demê ji xwe re qizinc bike. Ev hasabê wê heya. Di vê temenê de jî, li nava kurdan dileyizê. Kongira netewî a kurd, wê ji du aliyan ve wê giringîya wê pirr mazin hebe. Yek, wê pêşî li wê qatbûna di nava kurdan de ku heya bigrê. Ji xwe, heta roja me, li ser wê qatbûn û perçebûnê re, hertimî alozî di nava kurdan de derxistina. Bi wê qatbûn û perçebûnê re, kurd bixwe li dijî hevdû nava şer kirin. Piştî şalên 1990´î li başûrê kurdistanê ew li dijî hevdû dane şerkirin bû. Î ro jî, li Rojavayê kurdistanê, hin komên ku ji xwe re dibêjin "em kurd in" lê di aslê xwe de ti alaqaya wan û kiriya wan bi kurdatiyê re tûna ya ên weke "partîa Azad" û ankû "el-partî" û hwd, li dijî kurdan didina şer kirin. BI destê van herdû rêxistinên kujar, mirovên kurd dixapênin û li Sûrî û li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan didina şer kirin.

Kongira netewî, di serî de, wê pêşîya van qatbûn û bikarhanînan bigrê. JI ber vê yekê, di serî de tirkiya li dijî wê ya. Tirkiya, bo ku ew pêvajoya kongira netewî a kurd bi sernekeve di nava karûbar de ya. Ez hêvî dikim ku hemû dordorên kurd, di serî de van aliyan bibînin û di serî de, di nava xwe de bi bîryarî êdî van pêvajoyên bo yekbûna kurd ên weke yên kongira netewî a kurd´ bibina sêrî û biserbixin. Ji bo pêşaroja wan, ya herî giring tenê û tenê ev a.

**-Dewleta tirk, di destpêka pêvajoya ´çareserîyê´ de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyek mihtemel ku li Sûrîya bibe kiribû. Rejima tirk, di destpêka mudahaleya li Sûrî, li gorî plan û hasab dikir derneket. Piştre, bidest birêxistinkirin û bicihkirina çeteyên weke ên "cebetil-nasr´ û ankû "DAÎŞ´ê kirin. Weke rêxistin ´kontrayî´ û ´paramilîter´ hatina bi rêxistin.** Dewleta tirk, di destpêka pêvajoya ´çareserîyê´ de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyek mihtemel ku li Sûrîya bibe kiribû**.**Di destpêka vê pêvajoya çareserîya demokratik de, wusa dihê ditin ku dewletê ji destpêkê, hin hasabên xwe yên têkbirina kurdan kirina. Di vê temenê de, hasabê ku tirkiya kiriya, wus dihê ditin ku ew a ku wê hêzên gerîîla vekişîhin û piştre ew jî, wê herêmên bakûrê kurdistanê bi leşkerî bike bin kontrolê de û piştre jî, ku mudahale li Sûrî bû, êdî li wir ku ji nû ve rêveberîya Sûrî ya nû hat ava kirin û ku kurd dervî wê hatina hiştin û bêstatû hatina hiştin, êdî wê ancam bidest bixista. Yanî, dewletê, hemû hasabên xwe li ser mudahaleya li Sûrî kirina. Ji destpêka pêvajoyê ve li bakûrê kurdistanê, çêkirina wanqas qarakol û bendavên bi armanca leşkerî û sevkkirina wêqas leşkerî li herêmên kurdan, hinekî jî têkiliya wê bi hasabê dewletê ê bi vî rengî ve heya.

Tirkiya bo ku li Sûrî û biteybetî jî li rojavayê kurdistanê serbikeve, bi piştgirîya rêveberîya kurd ya başûrê kurdistanê çend komên kurd ên ji rojava ku hêrîşî kurdan dikin jî, hinekî bi vê hasabê ve girêdayî ya. Dewletê, piştre weke ku ´îtîfaqak´ li ser camaatê re bi wan koman re çêkir li dijî kurdan û bi wê, heta roja me şer kir.

Ev kurdên ku ji rojavayê kurdistanê ku li dijî statûya kurdan û rojavayê kurdistanê bi bêahlaqî şer dikin li ser navê dewleta tirk, bi destê wan jî bi sadan kurd hatina qatil kirin. Weke ku çawa li bakûrê kurdistanê, bi destê cerdawanan bi hezaran kurd hatina qatil kirin, î ro bi destê wan kurdên bêrûmet jî, bi sadan kurdên rojava hatina qatil kirin.

Dewleta tirk, van kurdan weke qatil û kahbikan bikardihêne. Wan biçek dike û dişêne bi ser kurdan de. Bi destê wan, hêrîşê dibe bi ser kurdan de. Di vê temenê de dewleta tirk, di destpêka pêvajoya ´çareserîyê´ de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyek mihtemel ku li Sûrîya bibe kiribû. ..

Bi destê van koman, hê jî, ew hêrîşa li kurdan didomê. Ev hêrîşên ku heta roja me jî didom in, bi wê politikaya dewletê ya bi mudahaleya li Sûrî re ku derbeyekê li kurdan bixe ve girêdayî bû. Yanî, çend ku ji aliyê hêzên rojava û emerika ve mudahaleyek nebû jî, lê bi destê komên çete û çekdar, ev valahî dagirtin. Di aslê xwe de, li ser wan komên çekdar ku di bin navê olê de hatina xapandin re, ew şer û mudahale hat pêkhanîn. Divê ku mirov vê yekê herê bike. Nûha jî, bi van koman, dixwezin ku bi tememî temenê statûya kurdan li rojavayê kurdistanê ji holê ra bikin. Ji ber çi dewleta tirk, bi dest û rêya van komên çete herîşa li kurdan di vê demê de daye zêdetir kirin? Ji ber ku armanca wê ew a ku li wir derbeyekê li temenê statûya kurdan bixe û piştre li ser wê derbeyê re li bakûrê kurdistanê jî wê derbeyê li kurdan bixe.

Ji ber vê yekê bû ku çend ku pêvajoya li tirkiya ku kurdan û birêz Ocalan dabû bû

destpêkirin, ev 9 mehên piştre ku buhurtina, lê tenê gavek jî ne avêtina. Dewletê, xwestîya ku vê pêvajoyê vegerênê pêvajoyaka ku di wê de kurdan bişikêne û derbeyê li kurdan bixe. Bi teybetî, ku weke mafekî herî xwezaya mafê perwerdeya bi zimanê dayikê, ew jî qadaxa ya. Î ro, li bakûrê kurdistanê, hemû kurd, li ser lingan in bo ku qadaxaya li ser zimanê wan rabê û êdî bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya xwe bibînin.

Divê temeneya ku tirkiya hemû hasabê xwe li ser mudahaleyeka mihtemel ku li Sûrî bibe kiribû jî, mudahaleyên wê li têkiliyên kurdan ên navxweyî biwe jî dibin. Minaq, ku mirov tenê li gotinên Serokwezirê tirk T. Ardogan bixwe jî binerê, mirov wê bibîne ku hertimî mudahale li têkiliya kurdan ya navxweyî kirina. Dîsa bi heman rengî, ku mirov li gotinên T. Ardogan dinerê, mirov dibîne ku bi gotinan û hwd, mudahale li pêvajoya amedekarîyên bo li darxistina kongira netew a kurd jî hat kirin. Gotinên rayadarên tirk ên bi rengê "tehdîtkarî" û hwd jî, ku hanîna ser ziman, heta roja me jî di rojnemayan de li ser wan axiftin dibin.

Di destpêka pêvajoyê de, bo vê yekê, rojeva kurd ya ku bi ´pêvajoya çarserîya demokratik re ku hebû ya dewleta tirk ya ku hebû ne weke hevdû bû. Rojeva kurdan ya di serê wan de, ew bû ku di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd de gav werina avêtin. Bo vê yekê, di vê temenê de, birêz Ocalan bahse li darxistina çar konfaransan kiribû. Ji ber ku birêz Ocalan, hemû hasabê xwe li ser çareserkirina pirsgirêka kurd çêkiribû. Di vê temenê de, wê çawa jîyane were asayîkirin û aramkirin, li ser wê serî wastandibû. Di vê temenê de jî, banga birêz Ocalan li hêzên kurd bû ku vekişihin. Armanca wê vekişînê ew bû ku rewşeka bi aram bo çareserkirina pirsgirêka kurd were afirandibin bû.

Lê rojeva dewletê û ya di serê wê de cuda bû. Ji ber vê yekê, wê jî li gorî rojava xwe kir. Ji dêla ku wê di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd de gavan biavêje û rewşê aramtir bike, bêhtirî wê giranî da ser çêkirina qarakolên nû, bendavên bi armanca leşkerî, derxistina qadroyên nû bo cerdewaniyê û hwd. Bi vê re jî, gelek kiryarên dewletê ên ku em dikarin bi van çêkirina qarakolan, bendavan û derxistina qadroyên nû ên cerdewanan re bênina ser ziman hena. Minaq, hêrîşên li nirxên kurdan û piçûkxistin û hwd, ne tenê weke rêbazekê bû, her wusa weke politikayaka dewletê ya di vê pêvajoyê de bû. Zimanê rayadarên dewletê û bi teybetî ê T. Ardogan, hin kurdna şîrove dikir ku "ji ber ku ev 30 salin şer heya û zimanê wê bikardihêne" şîrove kirin. Lê di rastiyê de bo dewletekê ku dema ku politikayên xwe çêkir û dane kifşkirin ku çendî nû bê û kevn bê farq nakê, dikarê di cih de bo wê ziman biafirêne. Zimanê rayadarên dewleta tirk, zimanê rojeva wan ya di serê wan de bû. Di wê temenê de gotina xwe digotin.

Dewletê, bi rastî jî, wusa weke ku bawer kiribû ku wê li rojavayê kurdistanê derbeyekê li kurdan bixe û piştre êdî wê li ber kurdan di pêvajoyê de bi serkeve û wê êdî ya xwe yanî ´çareserîya´ di serê xwe de bi kurdan bide herê kirin. Çareserîya dewletê jî, di temenê halandina civate kurd di nava ya tirkiya de bû. Di vê temenê de, wê perwerdeya bi zimanê dayikê neba. Wê nehatiba hiştin ku kurd li herêmên xwe temenê xweserîriya xwe çêbikin û hwd. Ji xwe, hemû girtinên di bin navê "DOZÊN KCK`"ê de, girtinên bi armanca têkbirina sîyeseta kurd bû. Ji xwe, piştî ku kurdan di sale 2011´an di 14 temûzê de ku ´xweserya xwe ya demokratik´ denezendin, êdî ew asta zêdebûna girtinan zêdetir bû. Li ser çapameniyê re, wê çawa, wê denezendina kurdan ya xweserîya demokratik reş bikin, ketina nava wê hewldanê de. ..

Weke ku çawa ku piştî 14´ê temûze 2011´an de, ku kurdan xweserîya demokratik li bakûrê kurdistanê denezendin û pêde ku dewletê bi dest oprasyonan li wê qada sîyeset kurd zêdetir kir bo ku temenê wê xweserîyê ji holê ra bike, bi heman rengî û zihniyetê şerê bi kurdên rojavayê kurdistanê re li ser çeteyên ku di temenê bi rêxistinakirina de camaate fethullahçîyan heya re zêdetir kirin. Armanca, wî şerî jî, ew a ku temenê xweserîya kurdan ji holê ra bikin. Bo kurd, li rojavayê kurdistanê nebina xwedîyê ti statûyê, ev hêrîş dihênin kirin. Di roja me de jî, ev hêrîş hê jî zêdetir dibin. Armanca bi van hêrîşan re, bi teybetî, pêşî lêbigrin ku kurd li rojavayê kurdistanê bibina xwediyê statûyê.

Ji ber vê yekê, hêrîş û ambargo bi hevdû re li ser serê kurdên rojavayê kurdistanê hatina pêşxistin. Armbargo, bi armanca stretejiya leşkerî ya têkbirina kurdan hat pêşxistin.

Ji ber ku dewleta tirk, di destpêka pêvajoya çareserîya demokratik de bi vî rengî bi hasabekî xwe yê ku li ser şerekî navxweyî ê li sûrî û mudaheleya mihtemel ya li Sûrî re çêkiribû, êdî di wê temenê de hemû gavên xwe avêtin. Divê temenê de, dem bi dem komên çekdar bi rêxistin kirin û şandina bi ser kurdan de. Ev kom, hemû navenda wan li Tirkiyê na. Her koma ku bi navekî li Sûrî hatîya bi rêxistin kirin, lingê wê yê li Tirkiya ku li ser wê re hatîya bi rêxistin heya. Minaq, koma `lîva el- tewhîd´ li tirkiya li ser wê koma camaatê ya bi navê "koma tewhîd" û ankû dibîjin "tewhîd dergisî" û hwd re hatîya bi rêxistin kirin. Koma Bi navê salahadin, çend kurdên rojavayî ku girêdayî MÎT´a tirk kar dikin, li ser wan re dîsa bi destê camaatê hatina bi rêxistin kirin. Her wusa, komên Çeçen jî ku berê li dijî Rûsya dihatina bikarhanîn, ew jî, ji wan kom ava kirina û hanîna Sûrî ku li Dijî kurda bidina şer kirin. Her wusa, komên tirkmen ên li herêmê jî, di vê temenê de hatina bi rêxistin û biçekkirin û dişênina bi ser kurdan de. Ev hemû karên dewletê ên li ser camaatê û hwd re ku li dijî kurdan di pêvajoya şerê Sûrî ê li dijî kurdan ku hatina kirin in.

Di aslê xwe de, berî ku pêvajoya çareserîya demokratik were dayîn destpêkirin, di vê temenê de tirkiya bidest rxistinkirinê kiribû. Ev rêxistinên ku di temenê wan de ol û camaat hat bikarhanîn, weke tedbîrên dewletê û hikimeta Tirk ên di vê pêvajoya çareserîya demokratik de bûn. Amedekarîyên dewletê û rojeva wê ya di serê wê de jî, di vê temenê de hebû. Ev rojev û amedekarîyên hikimeta tirk, bi temenî vajî amedekarî û rojeva kurdan ya di serî wan de ya bo çareserkirina pirsgirêka kurd bûn. Dewleta ku di destpêka pêvajoyê de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyeka mihtemel ya li Sûrî kiribû, wê çawa gavan bo çareserkirina pirsgirêka kurd biavêje.?

Xwepêşandinên li ´parqê Gezî´ bixwe jî, hinekî, dewletê û hikimeta AKP´ê, weke ´mudahaleyekê li wê hasabê xwe yê li ser mudahaleya li ser sûrê li Sûrî re" dît. Bo vê yekê jî, pirr bi şîtt çû bi ser de. Ji ber ku dewleta tirk, di destpêka pêvajoya ´çareserîyê´ de, hemû hasabê xwe li ser mudahaleyek mihtemel ku li Sûrîya bibe kiribû**.**Di aslê xwe de, wan xwepêşandinan, derbeyek li vê politikaya dewletê ya şer ya bi vî rengî xist. Ji ber vê yekê, pirr bi hêrs bûn. Ew xwepêşandin, weke rewşeka ku ne li bendê bûn.

Heta nûha, di vê pêvajoyê de du tişt li pêşîya dewletê na ku gavan di temenê çareserkirina pirsgirêka kurd de biavêje. Yek; zihniyeta wê ya. Ya din jî, ev hasabê wê yê li ser şerê li Sûrî re ku kirîya ya. JI ber ku ew di temenê wê hasabê xwe yê li ser şerê li Sûrî re pêvajoyek bi serê li ser çeteyan re daye destpêkirin li dijî kurdan. Ev jî, weke aliyekî din ê ku di vê pêvajoyê de li pêşîya wê asteng a. Di temenê de, hasabê dewletê li

ser şerê navxweyî û mudahaleye mihtemel ya li Sûrî re ku kiribû, şikeşt. Lê hê jî, li ser çeteyan re û bi dayîna hêrîşkirinê ya çeteyan re di wê de isrer dike.

..

**Denezena ´xweserîya rojavayê kurdistanê´, avakirina rêveberî û sê-kantonan wê weke ”kantona Cizîrê”, ”kantona Afrînê” û ”kantona Kobanê”.**

Ev demek bû ku kar û xabatên wê dihatina kirin ku xwerîya demokratik a rojavayê kurdistanê were denezendin. Piştî van amedekarîyan êdî di 21´ê rêbendanê de di dema nîvro de hat denezendin. Vê denezendina xweserîya demokratik a rojavayê kurdistanê, giring a û dîrokî ya. Em di serî de, li hemû kurdistanîyan pîroz dikin. Weke tê zanîn ku rojavayê kurdistanê li sê "qanton"an hatibû beşkirin bi navê ´qantona Cizîrê", ´qantona afrînê´, û ´qantona kobanê´ jî wê piştî wê re wê ev qantonên din ên kurdistanê jî wê xweserîya xwe denezênin. Lê em dikarin vê denezendina qantona cizîrê, weke destpêkeka dîrokî li ser navê herdû qantonên din jî herê bikin. Li aliyê din jî, denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê, di roja salwegera avakirina komare kurd a Mihabadê de hatkirin. Bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku bi nirxkirina wê salweger û avakirina komare kurd a Mihabadê jî ya.

Gelê kurdistanê, bi teybetî li rojavayê kurdistanê, berxwedanaka mazin da nîşandin. Ev demeka dirêja ku ser sê salan re ya ku hêrîşên rejimê û komên çete ku rejima tirk piştgirîyê dide wan, hêrîş dibirina ser rojavayê kurdistanê. Hêza parastinê ya rojavayê kurdistanê ´hêzên parastina gel´, bi berxwedanaka ku mînaqa wê di dîrokê de tûneyî da nîşandin û kurdistanê bi hemû rengên wê re parast. Bi demê re, hemû hêrîşên ku li rojavayê kurdistanê bûn jî, bi armanca bêstatûkirina kurdan bû. Di van rojên ku tê payîn ku wê ´konfaranse Cenev´ê were li darxistin de, bi awayekî vekirî bo ku wê bêstatûtiyê li ser serê kurdan bidina domandin, kurd nevaqandin û ne hatina dewet kirin li wê civînê. Tevî ku hê rojek maya ku konfaranse Cenevê a duyemin were li darxistin jî, hê jî kurd bi navê wan re ne hatina naskirin û ne hatina dewet kirin li cîvîna konfaranse Cenevê a duyemin.

Kurdan, bi denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê re dane nîşandin ku wê destûrê nedina ´lozanek din ya duyemin´ ku were gelê kurd. Bi ne vaqandin û ne dewetkirina kurdan li konfaranse Cenevê a duyemin re hat xwestin ku lozanek duyemin were serê kurdan. Lê kurd, ne kurdên wê demê na. Herêm jî, ne di rewşa wê demê de ya. Li herêmê, kurd, wê li kurdistanê bigihijina statû û rêveberîya xwe. ..

Nîşanaka vê yekê jî, denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê ya. Kurd, êdî bi vê denezendinê re peyamek mazin û dîrokî jî didina hêzên ku konfarase Cenevê a duyemin ku nexwezin ku kurdan dewetî wê bikin. Ev denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê, bêgûman, divê ku em weke destpêkeka nû bo civate kurd û kurdistanê jî bihasibênin. Ev destpêk, dîrokî ya. Zarokên hûrîyan û mîtannîyan, cardin derketina dika dîrokê. Weke ku çawa ku mitannîyan, weşokanî kiribûn paytaxt, î ro ew paytaxt cardin dibe paytaxt ji pêşketineka dîrokî ya kurdistanê û kurdan di sadsale 21´ê de. Ev dîrok, hê didomê. Wê hê jî bidomê. ..

Li kurdistanê, pêşketinên ku dibin, wê dîrokê ji nû ve li herêmê bidina nivîsandin. Di demên berê de jî, bi pêşketinên vê herêma kurdistanê dîroka herêmê hat nivîsandin. Wê di vê demê de jî, wusa bê. Kurdan, rengê xwe dane der. Pêşketina xwe bi têgihiştin û pergelake nû a têgihiştî û civatî ji nû ve rayîxistina li berçavên hemû cihanê. Gelê kurd, êdî bi civatîtîya xwe derketîya ser rûyê dîrokê. Êdî, dîroka xwe bixwe û bidestê xwe dinivîsêne. Em nikarin, tenê vê denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê, tenê weke dene xweserîyekê şîrove bikin. Divê ku ji wê zêdetir, weke destpekeka dîrokî ya li herêmê jî werênina ser ziman. Ev destpêk, bi kurdan û xalkên din ên li kurdistanê dijîn re detpê dike. Lê wê bi têgihiştin û pêşketina wan re, êdî herêmê jî bigiştî bi bandûr bike û pêşketinên wê ji her aliyê ve bide kifşkirin.

Ev xweserîya ku tê şîrove kirin, hinek mirov dema ku wê şîrove dikin, weke ´xweserîya kêmnetewî´ ên ku li rojava û hwd hena şîrove dikin. Ev gotina, ku kurd bi navê xweserîya demokratik, wê dihênina ser ziman, em ti carî nikarin weke şîrove bikin. Temenê vê gotinê li ser azadî û gihiştina mafên xwe a gelên xwe ya. Temenê wê li ser wê esasê ya ku li pêşîya pêşketina van gelan ti astang nebin. Temenê wê li ser wê esasê ya ku hemû gel û xalkên herêmê xwediyê vîna xwe bin. Di cewherê wê de, hebûna ti kesekî ne li ser ya din re ya. Lê ku karibin li rex hevdû û bi hevdû re ku di temenekî ku rêz û hûrmetê bidina hevdû de bijîn a. Ev esasê vê gotina ´xweserîya demokratik a kurdistanê´ diafirêne. Li kurdistanê bixwe jî, dema ku em li nava civate kurd binerin, em dibînin ku pirr rengî bi wê re pirr zêde heya. Ev pirrr-rengîtî hem ji aliyê olî û bawerî ve û hem jî ji aliyê xalkî û kêmnetewî û hwd ve heya. Di vê temenê de, ku ev cudahîyên kurdistanî jî ku karibin wê hebûna xwe ya dîrokî li rex hevdû û di nav hevdû de bijîn giringa ku ew karibin bi rengê xwe êdî xwe bênina ser ziman. Hinekî jî, esasê vê gotina xweserîyê di vê temenê de jî dihê ser ziman.

Li aliyekî din, komên din ên civatî ên weke asûrî û hwd jî hena. Ew jî, ku karibin, pêşketina xwe li gorî rastî û dîroka xwe êdî bijîn. Ev, bo vê yekê jî, giringa ku divê ku em di temenê vê gotina xweserîyê de werênina ser ziman. Her reng û nirx ku karibin xwe bênina ser ziman, di wê temenê e vace vê gotinê heya û divê ku mirov fahm bike. Rastîya civatî a li kurdistanê, divê temenê de divê ku mirov bi teybetî wê fahm bike. Li kurdistanê, hemû pêşketinên civatî û olî û bawerî û hwd, xwediyê dîrokeka pirr kevn in. Dîroka, pirranîyan bawerîyên li kurdistanê, herî hindik diçê berî zayîna Îsa. Di vê temenê de, dema ku em li dîroka wan binerin, emê bibînin ku xwediyê dîrokeka pirr kevn in.

Gotina xweserîyê, divê temenê de em divê ku hildina li dest. Lê ku em gotina xweserîya demokratik, di temenê radestkirina hin mafên kêmnetewna ku li rex netewên mazin ku serdest in dihê bi rêxistinkirin ku fahm bikin, emê ti carî nikaribin vê gotinê jî fahm bikin. Di serî de, salixkirina vê gotina xweserîya demokratik, temenê wê li ser heyîn û hebûna xalk û gelên li herêmê ku karibin bigihijina rêveberîya xwe ya cewherî û karibin xwe bixwe bi rêve bibin û li ser vîn û jîyane xwe xwediyê gotinê bin. Di vê temenê de, divê ku em vê gotinê hildina li dest. Di vê temenê de, ev gotina xweserîya demokratikî a kurdistanê, hinekî jî wê rewşa konfadaresyonî ya dema Medîya dihêne ber bîra mirov bi rengê xwe yê ku pêş dikeve. Di dema Medîya de jî, ku hebûna ti xalakn ne dihat redkirin û înkarkirin, di wê temenê de rêveberîyên herêmkî û ya navendî hatibû avakirin. Ne rêveberîya navendî dikarî hebûna xwe li ser ên herêmkî mazin bide nîşandin û ne jî rêveberîyek herêmkî dikarî xwe ser ên din re bide nîşandin. Di temenê

jîyanek xwexa de êdî bi hevdû re û di rex hevdû de dijîn. Ji xwe vace bê gotina "xweserîya demokratik", hinekî jî ew a ku xak karibin di rex hevdû de û di nava hevdû de bi hevdû re bijîn.

Ji nûha de, li gelek bajarên rojavayê kurdistanê şahî û xwepêşandinên pîrozbahîya denezendina rêveberîya rojavayê kurdistanê dihên kirin. Piştî ku denezenda rêveberîya rojavayê kurdistanê hat kirin, êdî şahîyên pîrozkirinê li her derê destpêkirin. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku li herêmê hêzên ku li dijî statûuya kurdan in, heya ku bikevina nava bixwûnkirina wan şahîyan de. Divê ku bo vê yekê jî, herkesek heyîder bê. Hê dibîra me de ya ku dema ku di sale 2011´an de kurdan li bakûrê kurdistanê di 14 temûzê de xweserîya demokratik denezend, rejima tirk di cih de, çend leşkerên xwe da kuştin û bi wê xwest ku pêşîya şahîyên denezendina xweserîyê bigrê. Ev zihniyet, hê jî, li rojavayê kurdistanê bi kurdan re şer dike.

Lê kurdan, tevî wan hemû hêrîşan jî, karîna ku herêmê xwe biaram bikin û jîyane xwe ava bikin û xweserîya bi temenê wê re biafirênin û denezênin. Ev biserê xwe, serkevtinaka mazin û pîroz a. Î ro, di roja 21´ê rêbendenê de rêveberîya xweser ya rojavayê kurdistanê hat denezendin. Di roja salwegera avakirina komare kurd a Mihabadê de ew denezen bû. Denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê li hemû kurdistanê û kurdistanîyan û mirovatiyê pîroz bê! Denezendina xweserî û rêveberîya rojavayê kurdistanê, divê ku em weke destpêkek û ronesansa civate kurd û kurdistanê şîrove bikin. Denezendina xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê, destpêkeka ronesans(jinûvebûn)a civate kurd û kurdistanê ya. Yên ku li dijî-bidestxistina statûya kurdan in jî, divê demê de dijberîyê li dijî denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê didin nîşandin. Rojavayê kurdistanê, di 21´ê rêbendanê de xweserîya rojavayê kurdistanê a demokratik ragihand û denezend. Vê denezendina xweserî û rêveberîya rojavayê kurdistanê, li her çav beşên kurdistanê di nava kurdan û dostên kurdan de dilxweşîyek çêkir. Lê hêz û mirovên ku li dijî statûya kurdan in û ankû mirovên ku bi hêzên ku li dijî-statûya kurdan in, bi hevdû re dijberîya xwe dan nîşandin. Çend ku ev dengên li dijî denezendina xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê marjînal jî bin, dîsa hewceyî pê dibîne ku em li ser wan bisekin in. ..

Bi teybetî, tirkiya, hertimî, li dijî statûya sekinî ya. Di pêvajoya amedakerîyên konfaranse Cenevê û di dema li darxistina konfaranse Cenevê de, tirkiya ew dîplomasîya xwe ya dijber kir û da nîşandin. Ku kurd, weke heyetek serbixwe ne hatibin dewetkirin, li wê konfaranse Cenevê, hinekî jî divê ku em rola dîplomasîya tirkiya di wê de bibînin. Di dema ku tê gotin ku "emê sûrîyek nû ava bikin" de, ku dijberîya li dijî statû û denezendina xweserî û rêveberîya kurd, nîşandina bertekan, hinekî wê gotina "avakirina sûrîyek nû" ku wê di çi vacê û nêzîkatî û zihniyetê de bê jî, dide nîşandin. Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku rejima baasê, tevî ku bi deh salan sûrîya bi rê ve birîya, lê di vê pêvajoyê de biqasî wê ´muxalefeta Sûrî" dijberî li kurdan nedaye nîşandin û ne hanîya ser ziman. "Muxalefeta Sûrî", ku tê gotin ku divê ku rêveberîya sûrî a nû bi destê wê were avakirin, di zihniyeta xwe de, ji zihniyeta rejima baasê zirabtir û pistira. Di vê demê de, bidest muxalefetê ji yê bi destê hêzên rejimê zêdetirî kurd hatina qatil kirin. Divê ku em vê jî bibêjin.

Muxalefeta Sûrî, ku dijberîyê li dijî rêveberîyên din ên weke komên tundrew ên îslamî li Sûrî avakirina nadê nîşandin. Lê li dijî rêveberîya kurd, di cih de wê dijberîyê dide nîşandin. Li vir vac(mantiq) ew a ku, kî rêveberîyê avakê û bi çi rengê avakê ne

giringa û divê ku were herê kirin. Lê ku kurd, rêveberîyê avabikin, divê ku di cih de bertek û dijberî li dijî wê were dayîn nîşandin. Hêrîşên bi destê Muxalefetê bê û ankû rejima tirk bê ku di bin navê "dijberîya li PYD´ê" de didina nîşandin, di aslê xwe de dijberîya li dijî-statûya kurd a. Divê ku em wê dijberîyê û wan hêrîşan hemûyan, weke dijberî û hêrîşên li statûya kurd divê ku mirov şîrove bike û werêne ser ziman. Li tirkiya jî, dijberîya li PKK´ê û di bin navê "dijberîya li PKK´ê" de hatî afirandin, dijberîya li dijî statûya kurd a. Dema ku rayadarên rejima tirk û hwd, dibêjin ku "em li dijê PYD´ê têdikoşîn" û ankû dibêjine "em li dijî PKK´ê têdikoşîn", divê ku em vê gotinê di temenê dijberî û û tekoşîna li dijî statûya kurd fahm bikin. Di vê dema ku konfaranse Cenev´ê dihê li darxistin de, li Birûkselê serokwezirê tirk T. Ardogan dibêje ku "em li dijî PYD´ê têdikoşîn", û ankû dibêje "em li dijî PKK´ê têdikoşîn". Divê ku em vê gotina "em li dijî têdikoşîn ..", em di temenê tekoşîna li dijî statûya kurd fahm bikin. Ew tekoşîna "bêstatû" hiştina kurdan bi kurdan re didin.

Di vê temenê de, dîsa piştî ku kurdên rojavayê kurdistanê xweserîya rojavayê kurdistanê a demokratik denezend in, pêşî van dordoran deng derxist û dijberîya xwe li dijî wê denezena rêveberî û xweserîya rojavayê kurdistanê hanîn ser ziman. Bi wê re, bi devê "muxalefeta Sûrî" jî, ew dijberî dan gotin. Ji xwe, berê jî, ew dijberîya muxalefetê li dijî kurdan û statûya kurdan hatibûbû ser ziman. Çend kurdên ku hinekî jî nesibê xwe ji rûmetê ne girtina ku di nava wê muxalefetê de na, ew jî di wê temenê wan gotinê muxalefetê û hêzên dijberî kurd de gotinê dibêjin û dijberîya xwe li denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê dihênina ser ziman.

Kurd, di vê demê de, gavek dîrokî li rojavayê kurdistanê avêtin. Rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê denezendin. Nêzîkatîya rast ew a ku ev denezendin were silevkirin a. Heta roja me, li ser temen û dijberîya kurdan, statûqû li herêmê hat afirandin û pêşxistin û bi rêveber kirin. Î ro jî, dixwezin ku ew were û bibe. Yanî, kurd, oza mafên xwe nekin. Bêdeng bin. Ya ku ji kurdan dihê xwestin ev a. JI ber vê yekê, kurd ne hatina dewetkirin li konfaranse cenevê. Ji ber vê yekê, ew dijberî li dijî kurdan dihê dayîn nîşandin. Kurd, di vê demê de divê ku di pêvajoyaka mejûyî de di buhurin. Divê ku hemû kurd, li dora rêveberîya xweserîya rojavayê kurdistanê bibin yek û li hevdû bicivin. Sedema hebûn û nebûna hemû kurdan jî ew a. Dema ku kurd, ku hizra wî ya cuda çi bila bê, ku vê nekê, divê ku ne rabê û bahse rûmet şerefê nekê bi navê xwe re. Kurd, di vê demê de, divê ku yek bin. Divê ku li dora rêveberîya xwe bibin yek. Ev rêveberîya rojavayê kurdistanê ku di roja avakirina komara kurd a mihabadê de hatî denezendin ku naxwezin baxtê wê bibe weke wê, divê ku li dora wê levbigihijina li hevdû û wê biparêzên. Ku kurd li rojava têkçûnekê bixwûn, wê ew têkçûn bê ya hemû kurdan. Bila ti kurd, xwe ne xapanênin û nebêjin ku "ev partî ya" û an jî "ya wê wê partîyê ya". Di vê demê de, ku derbe li kurdan bikeve, wê ji partîyan zêdetir wê li civate kurd giştî bikeve. Divê ku ev were ditin. Ya ku di serî de were fahm kirin jî ev a. Ji ber vê yekê, herkesek divê ku hem li gotinên xwe û hem jî li kirinên xwe heyîder bê.

Kurd, heta ku hatina vê demê û rewşê, bi hezaran pekwaran dane. Bi hezaran ciwanên wan jîyane xwe feda kirin. Ew rêveberîya rojavayê kurdistanê li ser xwûna wan pekrawanan hatîya avakirin. Ew rêveberî, her rewşa wê, xwûna pekrawanekî di wê de heya. Ev 30 sal in, xwûna kurdan dihê rijandin. Ên ku dirijênin jî kifş in û li holê na. Ên ku Kurdistan û civate kurd di nava xwe de weke ´tayrê ser kelaşan´ ku beşkirina, berpirsîyarên wê rijandina xwûnê na. Rêveberîya rojavayê kurdistanê, ji hemû

kurdistanîyan re di dilê wan de bû peyxam. Peyxamaka wusa da afirandin ku bi wê, her mirove kurdistanî weke ku ji nû ve ji dayika xwe bibe lê hat. Denezendina xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê xwûna hemû kurdan di rayên wan de germkir û kir ku zûtir herê û were. Ew, bi mejiyê wan rakir ser pîyan. Rêveberîya kurdistanî, dîrokî ya. Divê ku kurd, bi dirişma ku herkesek weke gotinak pîroz ku ji xwe re bibe û bibêje ku "ev xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê di roja roja salwegera komara kurd a mihabadê de hat kirin, ev mihabada me ya nû ya. Lê emê ti carî nehêlin ku baxtê wê bibe weke yê komara kurd a mihabadê ku hatî xûrixandin." Bi vê hişê û dirişmê, divê ku herkesek lê xwedî derkeve. Berî nûha, kurdan dirişmek bo rojavayê kurdistanê diavêtin û digotin ku "rojava, kurdistanê rûmet a!". Rast a, rûmet a û divê ku herkesek li rûmetê xwedî derkeve. Bo vê yekê, herkesek di vê demê de weke li male xwe û li rûmeta xwedî derkeve divê li rêveberîya rojavayê kurdistanê jî xwedî derkeve. Denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê, divê ku di dilê her kurdî de agirê newrozê ji nû ve pêbixe. Divê ku wê şahîya newrozê di dilê xwe de bijîn.

Rojavayê kurdistanê, dibin ambargoyeka mazin de ya. Ji destpêka şerê navxweyî Sûrî de, tevî ku şer jî bû li hemû beşên din ên Sûrî alîkarîya mirovî hatîya kirin. Lê tenê li rojavayê kurdistanê li beşên ku lê kurd dijîn ew alîkîarî ne hatîya kirin ji aliyê sazi û komelên navnetewî ve. Tenê, alîkarîya ku bûya, ji nava kurdan ve bi sînor maya. Neteweyên yekbûyî, ku naqşaya alîkarîya xwe ya li Sûrî di weşêne di malpara xwe de ku hanî ser ziman, " li hemû beşên Sûrî alîkarî kiriya, lê tenê li herêmên kurdan ew alîkarîya wê hîç nebûya." Ev nêzîkatî bi ser xwe jî, dide nîşandin ku çendî cihêkarî hatîya kirin. Her wusa, piştî wê re ev nêzîkatî di konfaranse cenevê de jî hat dayîn nîşandin. Konfaranse Cenevê, di wê de temsîlîyeta kurdan tûna ya. Çend kurd, weke ku çawa ku di konfaranse Lozanê de kirin, tevlî heyetên xwe kirin ku karibin bêjin "meyîzênin va kurd, di nava heyetê ku diçê konfaranse Cenevê de na." Lê ev nêzîkatî, tenê bo xapandinê ya.

Di vê demê de karekî mazin dikeve ser milê nivîskar û rewşenbîrên kurdî de. Divê ku em li vir hinekî li ser berpirsîyarîya wan ya ku dikeve ser milê wan de jî bisekinê û çend gotinan li ser wê jî bibêjin. Ku em ji kîjan aliyê ve lê binerin, em dibînin ku kurd û kurdistanê di pêvajoyek dîrokî de di buhur in. Li rojavayê kurdistanê, kurdan xweserîya rojavayê kurdistanê a demokratik denezend in. Bi wê re, kurd li wê beşa kurdistanê jî derketina dike dîrokê. Ev herêma kurdistanê, bi serê xwe de xwediyê dîrokeka giştî û giring û mazin a. Ji dema hûrî û mîtannîyan ve ev herêma rojavayê kurdistanê, weyneka dîrokî leyistîya.

Î ro, kurd, li bakûrê kurdistanê jî, di nava pêvajoyekê de na. Bi wê re jî, li wir dixwezin ku pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane çareser bikin. Lê nîşanak û dengên baş ji wir i rayadarên dewleta tirk nayên bihîstin. T. Ardogan, dema ku bahse pêvajoyê dike, weke ku li Birûkselê got; dibêje "em li dijî PKK´ê têdikoşîn." Her wusa, bi ser gotina xwe ve dike û dibêje ku rojavayê kurdistanê jî "em li dijî PYDê têdikoşîn." Ev gotin, ne gotinna ji rêzê na. Ji van gotinan divê ku mirov hêvîya hin hêrîşên nû di demên pêş de ku wê li herêmên kurdan bibin ji aliyê rejima ve bibin bike. Di dema ku min ev nivîs di nivîsand jî, nûçeyên ku ji rojhilatê kurdistanê jî di hatin û diketina nava ajansên nûçeyan de, ew bûn ku "îran, zimanê kurdî qadaxa dike." Ev nûçe hemû bi hevdû re, dema ku em hildina li dest, em dibînin ku weke rengê konseptekê li dijî kurdan û statûya wan dihê li berçavên mirov. Ev dem, tekoşîna ku tê dayîn, giringa ku mirov wê di warê rewşenbîrî û

têgihiştin û zimanê civatê de pêş bixe. Ev weke aliyekî ku nebê nabê ya. Ya ku wê temenê vê tekoşîna maf û azadîyê ya kurdan wê xorttir bike jî wê ev bê. Bi vê re, ez divê ku bi teybetî bin xat bikim û bibêjim ku kar û berpirsîyarîyaka mazin dikeve ser mmilê rewşenbîrîya kurd de. Di vê demê de, divê ku rol û weyna xwe bileyizê. Di warê nivîsandinê de, bi pênûsa xwe re divê ku weke tekoşarekî derkeve li berçav. Li vir, ya ku hinekî kêm a jî ev a. Ev jî, dibe cihê rexneyna li qada nivîskarîya kurdî û rewşenbîrîya wê.

Di serî de, di vê demê de, herî zêde di vê ku van waran de gavên giring werina avêtin. Li bakûrê kurdistanê jî li başûr, rojhilat û rojavayê kurdistanê jî, divê ku gavên giring di van waran de werina avêtin. Bi teybetî, di her beşên rewşenbîrîyê de, divê ku rêxistiniyek giring û mazin werê kirin û pêşxistin ku karibê bersivê bide pêwîstînî û pêdivîyên demê û pêvajoyê. Mirovekî ku ne xwediyê hizreka mazin jî bê di serê xwe de, ku hinekî di derbarê dîrok û civate xwe de xwediyê zanîneka piçûk jî bê, wê karibê dîrokê binivîsêne. JI aliyê dîrokê ve pêşketinên mazin û dîrokî hena. Ku tenê wan bi zimanê civatê werêne ser ziman û dêne berçavên mirovên ji vê civatê, wê temenekî mazin bide afirandin. Ev jî, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û werênê ser ziman. Di vê temenê de, herî hindik, hemû nivîskarên kurd, dikarin ji xwe weke berpirsîyarîyekê bibînin ku herî hindik di vê pêvajoyê û demê de berhemekê(pirtûkekê) naqş bikin û biweşênin. Ev weke karekî herî hindik, ku dikarin bikin in. Temen û derfeta wê heya. Lê tenê hinekî xîret pêwîsta...

Dema ku em bahse civate xwe bikin, divê ku em bahse aliyê wê zanistî jî bikin. Minaq, dema ku em bibêjin ku em civatek in, divê ku herî hindik, ya ku dikeve ser milde ew a ku pirtûkxaneya netewî a kurdî were mazin mazin kirin. Mirovek, çawa ku pêdivîya bo jîyandinê bi xwarin û vexwarinê heya, her wusa civat bi zanebûnê heya. Civat, çendî ku zanebûna wê pêşketî bê û bi wê bixwanda bê, wê Azad bibe. Çendî ku Azad jî bê, wê ewçendî karibê pêşketina xwe mazin bide çê kirin. Di temenê pêşketin û pêşveçûnê re hinekî bi zanebûnê re azadî heya. Dema ku ev nebin, emê nikaribin bahse pêşketina civatê jî bikin. Bo vê yekê, divê ku em divê ku bi zanebûnê re ku heya azadiyê di temenê pêşketin û pêşveçûna civatê de werêne ser ziman. Civatek, hinekî jî sînorê pêşketina wê bi zanebûn û azadîya wê ya ku bi wê zanebûna wê ve girêdayî ya. Bo vê yekê, divê ku em bi teybetî ku li ser pêşketina civatê bisekin in, divê ku em li ser van herdû gotinan bi teybetî bisekin in. Ev herdû gotin jî, weke du gotinên bingihîn gotinên zanebûn û ya azadîyê ya. Di vê warê de, çendî ku zanebûn hat pêşxistin û zêdekirin jî, wê sînorê wê azadîyê were berfirehtir kirin. Çendî ku ew sînor hat berfirehtir kirin jî, wê êdî temenê pêşketina civatê jî were mazin afirandin.

Li vir, em dibînin ku temenê pêşketina civatîtiyê li ser gotina azadîyê ya. Lê temenê gotina azadiyê ku em bi hebûna civatê re werênina ser ziman jî, li ser temenê gotina zanebûnê ava ya. Li vir, bi rêzê, ku em werênina ser ziman, emê bibînin ku çendî ku zanebûn di temenê gotina azadîyê de bê wê ewçendî jî azadî di temenê pêşketina civatî de jî bê. Bi vê yekê û rengî, bi hevdû ve girêdayî û bi hevdû ve hoyandî na. Bo vê yekê, divê ku em bibêjin ku di her pêvajoyên pêşketina civatê de giringîya zanebûnê weke nan û avê giring û pêwîsta. Civaknasîya civatî, ew têkiliyên wê ên ku em divê ku wan fahm bikin û wan werênina ser ziman, wê bi zanebûnê bê. Çendî ku hatina wan ya ser ziman bû, wê fahmkirina di derbarê wan têkiliyan û bi wê re di derbarê civatê de jî bibe. Çendî ku ev fahmkirina di derbarê de bû jî, wê pêşveçûnek were çêkirin di nava jîyane civatî

de ya. Bi teybetî, jîyane şaristanî zanebûn aliyekî wê ên bingihînî û temen di afirêne. Civat, çendî ku Azad bû û bi wê zanebûnê xwe hanî ser ziman jî, wê pêşketina wê bibe. Li vir, yê ku wê temenê vê pêşketinê bi civatê re biafirêne, wê zaneyên civatê bin. Bo vê yekê, berpirsîyarîyaka mazin û dîrokî dikeve ser milê zaneyên wê civatê ku bi zimanê wê dihizirin.

Di demên şaristanî de, dema ku em bahse civatê bikin, divê ku em hinekî jî bahse azadîya wê bikin; civat, çendî ku dikarê xwe bêne ser ziman. Ev jî, wê azadîya wê ve girêdayî ya. Gotina azadiyê, li vir ji du aliyan ve em divê ku di wê temenê wê pêşketina jîyane civatê de fahm bikin. Yek û ankû aliyek, di ji aliyê mejî û fahmkirina wê ve. Aliyê din û ankû aliyê duyemin jî, divê aliyê giştî ê civatê û nava civatê ya. Lê ev herdû alî jî bi hevdû ve hoyandî na. Divê ku em vê yekê jî bibêjin. Bi vê yekê, divê ku em bi teybetî li ser wê bisekinin û wê bênina ser ziman. Di vê temenê de, divê ku zaneyên civate kurd û ku bi kurdî dinivîsênin, divê ku karibin şoreşa azadiyê di hanîna ser ziman a civatê de bikin. Wê hingî, karibin bibêjin ku berpirsîyarên xwe li ber civate xwe hanîna li cih.

Piştî ku di 21´ê rêbendenê de rêveberîya xweser a kontona Cizîrê hat denezendin, î ro jî, yanî di 27´ê rêbendenê de rêveberîya xweser a kantona kobanê jî hat denezendin. Piştî ku denezendin bû, şahîyên ku di nava kurdan li bakûr û rojavayê kurdistanê û li beşên din ên kurdistanê ku hebûn, êdî gurrtir bûn. Denezendina rêveberîya xweser a rojavayê kurdistanê, bi denezendina rêveberîya xweser a kantona kobanê jî êdî hê maztir gihişt astaka din ya bilind. Di hundurê çend rojên pêşîya me de jî, wê rêveberîya kontona Afrînê jî werê denezendin. Ji nûha de, agahiyên ku ji afrînê tên ku kar û xabatên ku denezendinê herêma afrînê jî gihiştina berdawiyê. Ev jî, êdî di van rojên pêşîya me ku ne di demek dirêj de, wê ew jî were denezendin. ..

Li kurdistanê, pêvajoyak nû destpêkir. Bi denezendina xweserîya rojavayê kurdistanê re êdî pêvajoyak nû destpêkirîya. BI teybetî, ne tenê bo kurdan, bi kurdan re li herêmê bigiştî jî em dikarin bibêjin ku pêvajoyek nû destpêkirîya. Ev rengê xweserîya ku kurdan li rojavayê kurdistanê kurdan denezend, li herêmê bandûra wê hebe. Bi teybetî, wê bandûra wê li politikayên welatên ku hemû hêz di navendekê de di destê xwe de dane hevdû û herêmên ku politikayên wan ên xwe serwerkirinê ku hena, li dijî vê modale xweserîyê a li herêmê ku kurdan denezendina bertekên xwe didina nîşandin. Lê li herêmê, bi vî rengî, êdî pêvejoyek nû destpêkirîya. Li herêmê, ji nû ve naqşaya herêmê ya ardnîgrî, sîyasî, civatî û hwd diguharê. Ji nû ve, dihê rakirin. Di vê rastkirinê de, kurd jî cihê xwe digrin. LÊ welatên ku heta roja me, li ser tûna hasibandina kurdan û bêstatûya kurdan statûqû avakirina û meşandina jî, bertekên xwe didina nîşandin. Di aslê xwe de, li herêmê, ya ku nûha bi hevdû re di nava tekoşînê de ya, yek ev zihniyeta û ya din jî, gelên herêmê ku doza maf û azadîya xwe dikin in.

Li herêmê, ev zihniyeta navendîparêz, heta roja me, herêm di nava dorpêçkirinekê de girt. Di aslê xwe de li pêşîya pêşketin û demokratikbûna herêmê jî, ev zihniyet heya.JI ber ku ev zihniyet, hebûna gelan nasnekê. Ew gelên ku hebûna wan nasnekê jî, wan bêstatû dihêle û piştre jî bi politikayên bişavtinê û hwd jî, dike ku wan ji holê ra bike û bi navê wan re wan ji dîrokê bibe. Li gorî zihniyeta navendîparêz, çendî ku yekkirin kir û çêkir, wê karibê aramiyê jî ji holê ra bike. Hebûna gelan û xalkan a ji hevdû cûda na, li gorî zihniyeta navendîparêz, dibina "nakokîyên ku di temenê nearamiyê de na." Bo vê

yekê jî, bo ku wan nakokî û nearamîyê ji holê ra bike jî, divê ku ew rengê wan bêkirin nava hevdû de û were bi hevdû re halandin. Yanî were yekkirin. Bi dehan zimanan ji holê ra bike û zimanekî serdest bike. Bi çandan çandan ji holê ra bike û tenê çandake serdest bike. Bi dehan hebûna gel û xalkan ji holê ra bike û tenê ya xalkekî û ankû gelekî serdest bike. Bi wê re jî, ew xalk û ankû gelê ku hatî serdest kirin û gihiştî serwerîyê ku hemû xalk û gelên din xwe aîdî wê bibînin û weke wê bibînin. Bi wê rengê û yekê, êdî ku dema ku ew "yekbûn" bû, êdî wê aramî bibe û wê nakokî nebin û wê hemû tiştî di rêya xwe de di aramiyekê de bi rê ve herê. Vaca navendîparêzîyê ev a.

BI vê yekê re, êdî di vê temenê de hebûna gelan dihê înkarkirin û bi wê înkarkirinê re bêstatû dihên hiştin û piştre dihên tûnakirin û ji dîrokê birin. Bi vê yekê, heta roja me, bi dehan gel û xalk bi navê wan re hatina ji dîrokê birin. Carna, weke gotinakê tê gotin ku "li tirkiya 72 millet dijîn." Ev gotin, çend ku ji alîyê dîrokê û hebûna gel û xalkan a ku bi dîrokê e hebûn ku rast jî bû, î ro ew ´72´ê milletê´ ku bahse wan dihê kirin û ne navê wan, ne çand û zimanê wan, ne rastîya wan û hebûna wan li jîyanê maya. Hemû hatina ji holê rakirin û tûnakirin û ji dîrokê birin. Ev jî, bi wê zihniyetê, hatkirin. Î ro, di sadsale 20 ´an ´ piştre 21´ê de, bi dehan ´milletên mazin´ hatina afirandin. Lê ew milletên mazin, dema ku bi awayekî rast li dîroka wan ya ku li şûn wan maya bi axên ku li ser dijîn re, emê bibînin ku berê weke bi dehan gelan dijîn. Lê hemû hebûna gelên din hatina ji holê rakirin û tûnakirin û ji dîrokê birin.. Di aslê xwe de, ku mirov bibêje, ev milletên mazin ên roja me, bê îstîsna´ hemû jî, her yekê bi dehan millet hatina tûnakirin û ew ji wan hatina afirandin jî, wê rast bê û di cih de bê. Ev rastî, bêîstîsna, dîroka hemû van gelên mazin û ankû dewletên wan ên ku hatina avakirin, ji me dixwezê ku mirov bike ber lêpirsînê de.

-Divê ku em bibêjin ku rêveberîya xweserîya rojavayê kurdistanê ku kurdan denezendîya, tenê bi gotina xweserîyê û têgihiştina wê ya roja me ku hatî fermîkirin re fahmkirin, wê ne bes bê. Ji wê zêdetir, têgihiştina rêveberî û xalkî û civatî a ku di temenê vê rengê ku li rojavayê kurdistanê dihê denezendin jî, divê ku mirov bibêje ku pirr maztir û kûrtira. Dema ku em li wê dihizirin, ew ´bajar-welatên´ dema Sûmerîyan û ankû ew têhiştina konfadarelî a dema Medîya û hwd de dihê li berçavên me. Li kurdistanê, ev fêr û cerbên demên berê ên dema Sûmerîyan jî, demên qasîtî û lolîyan jî, dema gûtîyan jî, dema hûrî û mîtannîyan jî û dema Medîyan jî û hwd, li ser vê axê bûna û jîya na. Piştî van deman jî, demên weke demên kekoyîdî, Eyîrîdî, Şadadî, Merwanî, Eyûbîyan û hwd jî hatina û jînbûna. Fêr û cerbên van rêveberîyên kurd ên li herêmê, didina nîşandin ku çawa mirov dikarî bi hevdû re bijîn. Divê ku em bibêjin ku navekî din ê kurdistanê mesopotamîya ya. Divê ku em vê yekê jî bênina ser ziman. Her wusa, dema ku bahse mesopotamya dihê kirin jî, gelek rengên civatî, olî, xalkî û hwd dihêna berbîra me.

Li kurdistanê, di vê demê de, dema ku dihê gotin ku xweserî dihê denezendin, rêveberî û xweserî û vîna gelên li ser vê axê dijîn dihê denezendin. Bi vê yekê re, divê ku mirov bahse wê bike. Li kurdistanê, em di pêvajoyak mazin û dîrokî de di buhur in. Ev pêvajo, pirr giring û kifşkar a.. Hemû pêşketinên ku di vê pêvajoyê de rûdidin, wê bi pêşaroja kurdan re wê pêşaroja xalkên herêmê hemûyan jî bide dîyar kirin. Rengê jîyane wan û heta rengê xwe bixwe rêvebirina wan jî bide dîyar kirin. Ev jî, aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahm bike ya. Li herêmê, pêşketina demokrasiya wê, hinekî bi rêz û hûrmet girtina ji hevdû re ya gel û xalkên herêmê re

dimeşê. Heta roja me, dewletên herêmê ku serdest in, bo ku desthilatdarîyên xwe bidomên in, bi dehan şer di nava xalkan de derxistina û bi wan şeran re jî bi dehan nakokî di nava wan de bi xwûnrijandinê û hwd bê, afirandina. Li ser wê re jî, sîyesetê dikin. Şandina çekan bi destê rejima tirk ji komên çete û tûndrew ku li Sûrî li dijî rojavayê kurdistanê bê ankû xalkên din ku şer dikin re, divê ku mirov di vê temenê de hilde li dest û fahm bike.

Pêvajoya ku em têve dibuhurin, bi vî rengî, giring û kifşkar a. Weke ku çawa ku wê bo gelên herêmê kifşkar bê, her wusa wê bo rêveberîyên herêmê jî wê kifşkar bê. Divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje. Rêveberîyên herêmê jî, wê êdî derfet ji wan re nemêne ku bi vî rengê êdî sîyesetê bikin. Hinekî jî, di vê temenê de, ev pêşketinên ku weke ku li rojavayê Kurdistanê bi denezendina xweerîya rêveberîya kurdistanê re ku dibin, pirsgirêkek zihiyetê jî bo rêveberîyên herêmê ji vê aliyê ve jî derdixin. Ji ber vê yekê, tûndûtûjiyê û zorê pêşdixin. Bo vê yekê, di înkare de û di bêstatû hiştinê de isrer dikin. Li herêmê, ku em ji kîjan aliyê ve lê binerin, divê ku em bibêjin ku êdî pêvajoyak nû destpê kirîya. Êdî, ti kesek jî, nikarê ku ji wê bi ravê. Gelên herêmê, derdikevina dika dîrokê. Ev jî, wê hebûna dewletên navend ku temenê wan û avakirin û pêşketina wan li ser bişavtinê ya, wê bike zorê de. Ya ku nûha ketina derdê wê de, ev a. Ev dikarê bike ku wan dîn û har bike ku şerna mazin bi gelên herêmê re bidina destpêkirin jî. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî heyîder bê.

Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku kurd, wê di vê pêvajoyê de bi pêşketin û pêşketinên ku bi xwe re û di nava xwe de bidina çêkirin re wê li herêmê hemû rûdaw û pêşveçûnên sîyesî jî bidina kifşkirin. Li vir, bo vê yekê, pirr giring a ku kurd yekdeng bin û bi hevdû re bin. Di vê demê de, divê ku hemû nakokî sîyesî û hwd, ku di nava xwe de ji xwe re derxistina dênina aliyekî û bi hevdû re tev bigerihin. Ev dem, hemû pêşketinên wê li ser partîyan re jî û li ser têgihiştina wan re jî bi rê ve diçin. Li kurdistanê, ev sala 2014´an, bi denezendina xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê re û bi pêşketinên di çerçoveya pêvajoya ku birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê bi rejima tirk re daye destpêkirina re wê bide kifşkirin. Dide kifşkirin jî. Heta nûha, hemû pêşveçûnê ku di bin, di vê çerçoveyê de bi rê ve diçin.

Li herêmê, di qadên sîyesî de jî, şerek bi kurdan re li ser dîplomasîyan û civînên weke ên konfaranse Cenevê û hwd jî, bi kurdan re dihên dayîn. Bo ku statûya kurdan û kurdistanê, di cîvînên bi vî rengî ên weke konfaranse Cenevê de newê ser ziman, hemû dîplomasî li dijî kurdan dihê kirin. Pirsgirêka kurd, di vê demê de, bi kurdan re di astaka ku di temenê di qada navnetewî de bi rê ve diçê. Pirsgirêka kurd, êdî li herêmê, ji nava sînorên dewletên herêmê derketîya û bûya pirsgirêkek navnetewî. Divê ku em vê yekê jî bi teybetî binxatkin û werênina ser ziman.

Li herêmê, bi teybetî pêşketina statûya xweserîya rêveberîya rojavayê kurdistanê, wê bandûra wê li hemû beşên din ên kurdistanê çareserkirina pirsgirêka wan jî bike. Ji ber ku tirkiya jî, vê yekê dibîne, êdî piştgirîyê dide çeteyan ku hêrîşî rojavayê kurdistanê bikin. LÊ di bin wan hêrîşan de jî, kurdan û xalkên din ên herêmê karîna ku xwe û rewşa xwe biparêzên û xweserîya denezênin. Ev jî, serkevtînaka wan ya mazin û dîrokî ya. Kurd, di vê demê de, çendî ku yekbin û û hêza xwe ya sîyesî bikina yek, wê bêhtirî serkevtinên mazin bidest bixin. Divê ku mirov vê yekê jî bibêje. Ji xwe, ji ber ku ev dihat ditin, êdî hewldan ku li ser sîyesetê re du meclîs çêkirin û rewşa sîyesî kirin qat. Î

ro, ji xwe li ser wê qatkirina sîyesî re hêrîşî kurdan û hêrêmên wan dihê kirin û her wusa li ser wê qatkirinê re dixwezin ku nahêlin ku kurd bi serê xwe weke heyetek serbixwe herê civîna Cenevê. Ku kurdan, bi hevdû re tevgerîya ba û her wusa dema ku dewet ji kurdan ne hat şandin ku weke heyetek serbixwe herina civîna cenevê, ku hemû kurd û partîyên wan helwestek bi hevdû re daban nîşandin û gotiban ku "em weke heyeteka serbixwe li ser navê civate kurd newina dewet kirin, emê newina civîne cenevê", dibêt ku î ro wê kurd ne di vê rewşê de ban û heya ku î ro ku weke heyetek ser bixwe ji wan re dewetîya hatiba şandin jî. Lê dema ku beşek ji kurdan, bêî ku dewetîya ji wan re were şandin ku weke ´sêwîyan berdiwaran´ xwe kirina nava wê "muxalefeta Sûrî" ku hebûna civate kurd jî nasnekê, êdî bi wê re derbeyek mazin li kurdan û li rewşa kurdan hat xistin. Divê ku em vê yekê di serî de kifş bikin.

Ji ber ku koma ENKS´ê herê kir û bi vî rengî çû, êdî di aslê xwe de, wê çûyina wê pêşî li şandina dewetîyê serbixwe ji kurdan re jî girt. Divê ku em vê yekê jî, weke astengiyekê li pêşîya şandina dewetîyê serbixwe ji kurdan re şîrove bikin. Yanî, vê rewşa sîyesî ku li ser ENKS´ê re afirandin, bi wê re derbeyek mazin di vê warê de yanî di warê sîyesî de li kurdan xistin. Ji xwe ji ber ku ENKS´ê re rewş da nîşandin û bû amûrê listika wan ya li dijî statûya kurd, êdî bêhtirî isrera li dijî statûya kurdan mazintir bû. Divê ku em weke sedemekê bi serê xwe neçûyin û ne hatina dewetkirna kurdan serbixwe weke heyetek serbixwe li civîna cenevê jî, divê ku em vê rewşa ENKS´ê bi rewşa hinek hêzên din ên li herêmê ku li dijî statûya kurdan şer dikin re şîrove bikin. ENKS`ê, destê kurdan ji aliyê sîyesî ve di vê demê de zayifkir û şikand.

Ev rewşa zayifkirina destê kurdan ji aliyê sîyesî ve bi ENKS´ê, divê ku em weke temenê hêrîşên ku wê piştî konfaranse Cenevê ku wê li herêmên kurdan bibin jî şîrove bikin. Wê di demên pêş de, herina bi ser kurdan de. Ji ber ku hebûna kurdan herê nakin û pişrsgirêka kurd nahildina rojevê ku çareerîyekê ji wê re were ditin. Êdî di temenê wê ne hildina rojevê a pirsgirêka kurd û çareserkirina we de çi biryar werina girtin, wê di temenê bêstatûtîya kurdan de bin. Êdî bo ku wan biryaran jî, bi kurdan bidina herêkirin, wê zorê û tûndûtûjiyê li dijî kurdan bikarbênin bo ku bi kurdan bbidina herê kirin. Ev jî, wê weke ku çawa piştî konfaranse Lozanê, bo ku lozanê û biryarên wê bi kurdan bidina herêkirin şerekê bi dehan salan bi kurdan re şer kirin, wê biheman rengî bo cenevê û biryarên wê jî, temenê şerekî bi vî rengî ê bi kurdan re wê biafirê. Ji xwe, ya ku dihê ditin jî ev a.

Hê konfaranse Cenevê didomê. Hê bi dawî nebûya. Di vê dema ku didomê de jî, rayadarên rûsî dibêjin ku "divê ku tevlîkirinên bênkirin li nava konfaranse Cenevê" û ankû dibêjin "divê ku bên hanîn li konfaranse cenevê". Lê heta nûha jî, ti herêkirina bo kurdan di wê de nebûya. Heta ku navê kurdan bixwe jî ne hatîya ser ziman. Hin kurd, ku piçekî ji sîyesetê fahm nekin, dibêjin ku "dema ku pirsgirêka Sûrî hat çareser kirin, wê êdî piştre pirsgirêka kurd were hildina li rojevê û bê çareser kirin." Ên ku van gotinan dibêjin, ya ji ahmaqî û nezanîya xwe dibêjin û yan jî bo xapandinekê dibêjin. JI ber ku ti carî, di sîyesetê de, gotinên bi vî rengî hanîna ser ziman, ne temenê wan heya û ne jî rast in. Ti di sîyesetê de, niikarê bêje ku ezê vê bênin ser ziman û vê nayênim ser ziman. Ji xwe, dema ku em li vê gotinê dinerin jî, em dibînin ku bo xapandinekê ev gotin tê gotin. Mirov ji kûderê fahm dike ku gotineka xapandinê ya. Dema ku bahse ´pirsgirêka Sûrî´ were kiirn, bahse çi tê kirin?´ Di nava wan pirsgirêkan de pirsgirêka kurd jî, heya. Dema ku bê gotin, "em pirsgirêka Sûrî çareser dikin" û hîç

bahse pirsgirêka kurd jî newê kirin, ji xwe demek kî, ew weke pirsgirêkekê nayê hêrêkirin jî. Êdî li vir, ev dordorên ku van gotinan dibêjin, ew gotinên wan, wusa dihê ditin ku tenê weke gotinên wan ên ku bo wê bêxîretîya xwe bi wê werênina ser ziman a. Ji xwe, muxalefeta Sûrî, li vê gotina bi rengê "emê pêşî pirsgirêka Sûrî çareser bikin û piştre ya kurd hildina rojeve xwe" xwedî jî dernekevin.

Dema ku Sûrî ji nû ve were avakirin û pirsgirêkên were çareser kirin, dema ku kurd dervî wê hatin hiştin, hingî, piştî wê "çareserîkirina pirsgirêka sûrî ku ew lê dihizirin, ku ew rengê çareserîyê ê di serê wan de çawa bê, ku ew bû û piştre êdî wê bêjin, "va me pirsgirêka sûrî çareser kir, di çerçoveya vê çareserîyê de cihê wê heya û yan jî nîn a, win bixwe bibînin û êdî dengê xwe dernexin û tişta ku hatî kirin weke biryar win jî li gorî wê bijîn." Ya ku wê bê gotin ev a. Lê hin kurdên me, biqasî ku ew ji nezaniya xwe diaxifin û fahm nekin û ji wan wê ya ku herkesek weke wan fahm nekê, dibêjin ku "piştî ku pirsgirêka sûrî çareser bû, wê êdî ev pirsgirêka kurd jî were çareser kirin. Em bibêjin, ew çareserîya ku ev kurdên me jî, bahse wê dikin, ku dema ku kurdan xweserîya denezend û ´muxalefeta Sûrî´ li dijî w dijî wê bertek dide nîşandin, em divê ku çerçoveya "çareserîya pirsgirêka kurd a di serê wan de" di vê çerçoveya bertekên wan de fahm biikin.

Yekî ku nûha li dijî xweserî û statûya te bê, û xweserî û statûya herê nekiribê, wê çawa piştre herê bike? Ên ku bi vê bawer dikin, ya ahmaq in û yan jî ji nezanîya xwe diaxifin. Lê divê ku em vê dûbare bibêjin ku ev kurdên bi vî rengî û bi van gotinan tevlî ´muxalefeta Sûrî´ xistina, di dîrokê de derbeyek dîrokî li rewşa sîyesî ya kurdan xistina. Bi wê re, bûna amûrna bêtatû hiştina civate kurd. Bi hêzên ku di temenê bêstatû hiştina de tevdigerin re dimşîn û gotinê li dijî statûya kurdan dibêjin. Dema ku em zikê zayik ê kurdan ê di vê demê de şîrove bikin divê ku em van dordoran bi wê zayifîyê werênina ser ziman. Wan, kurdan zayif kir. Bi destê wan, bi yekdengî tevgerîna kurdan hat şikandin. Kurd, li rojavayê kurdistanê xweserîya demokratik denezend in. Ev xweserîya kurdan, divê ku hemû hêzên kurd, ên hundur û derve bi yekdengî lê xwedî derkevin û wê biparêzên û pêşbixin. Pêşxistina wê, wê bê pêşxistina civate kurd jî. Divê ku em vê yekê jî bibêjin. Kurd, derbeyekê li rojava bixwûn, wê derbe li hemû kurdan û li herêmê bê. Divê ku em vê yekê jî bibêjin. Bo vê yekê, divê ku em vê yekê bi teybetî bibêjin. Her wusa divê ku em vê yekê jî bibêjin ku dema ku kurdan derbe xwe, ne tenê herêm ji wê bi bandûr bibe, wê giştîya cihanê, bandûreka wê lê bibe. Divê ku ev were ditin.

Rojava, dîrok û rûmeta gelê kurd a. Rojava dîrok û rûmeta hemû kurdan a. Divê ku ev wusa were ditin. Çawa ku tê gotin ku ji rûmetê tavîz nayê dayîn, divê ku bi wê rengê li rojava were nerîn û ji wê tavîz newê dayîn. Dema ku ev gavên dîrokî ên ku di vê rojê de hatina avêtin, ew hatina kirin bi ewlakariyê de, wê êdî gavên hê maztir li ser wê re di temenê pêşketina civate kurd de wê werin û bibin. Lê dema ku ew temen newê parastin, wê ew gavên mazin ên piştî wê re jî wê newin û nebin. Divê ku ev were ditin. Rojava, xweserîya xwe denezend, di 21´ê rêbendendê xweserîya kantona cizîrê hat denezendin. Î ro jî, yanî di 27´ê rêbendenê de rêveberîya kontona kobanê a xweser hat denezendin. Di hundurê çend rojan de wê ya kontona Afirînê jî were denezendin. Herêma kobanê û serêkahniyê pirr giring in. Minaq, ku em tenê li ser navê "kobanê" re herin, em divê ku bibêjin ku navê kobanê bixwe jî ji dema hûrî û mîtannîyan a. Di teksta ku ji dema Hûrîyan hatî ditin û "navê hûrîyan" di wê de na a bi navê "hurrian and hurrians names in the mari tekst" de navê kobanê bi navê "dohukê" re û her wusa bi

navê "kurd" re heya. Yanî, ev navê kobanê pirr giring a. Bi teybetî, herêma Kobanê û afirînê bi hevdû re li ber "çîyayê kurd" bi şarîstanî bûya xwediyê pêşketinaka mazin a dîrokî. Ji ber ´çîyayê kurda´ û heta ku digihişt ber parava ´ava-firatê´, di wê navberê de jîyan bi şarîstanî pêşketibû. Navê serêkahniyê ku di dema hûrî û mîtannîyan de jî hebûya, ev devera ku ev nav lê, weke paytaxt û herêmek navend bû. Mîtannîyan, bi navê "weşokanî" ku di kurdî de "weşokanî" tê wateya ´xweşbûn´, kenbûn´, ´cihê xweş ê avî ku di wê de av diherikê´ û hwd a, ji xwe re kiribûn paytaxt û navend. Ev herêma serêkanîyê û ankû bi navê wê yê kevn ´weşokanî´, î ro hatîîya qatkirin, û qatek li rojavayê Kurdistanê û qatek li bakûrê kurdistanê maya. Qate ku li bakûrê kurdistanê ku di nava sînorê tirkiya de maya, navê wê hatîya gûharandin û hatîya kirin "ceylanpînar". Aliyê ku li rojavayê kurdistanê di nava Sûrî de maya jî navê wê dîsa hatîya guharandin û ji wê re hatîya gotin "resûlayn". Lê herdû alî, navê wan di kurdî de, î ro, serêkahniyê ya.

Ev herêmên kurdistanê, herêmna, jîyane şaristanî, pirr zû li wan pêşketîya. Ji ber çemê firatê û heta ku digihişt ber çîyayê kurda, wê herêmek teybet ku li wir jîyane şaristanî pirr zû û zêde pêşketîya ya. Em divê ku bibêjin ku ev herêm, weke herêmek teybet a. Li herêmê, kîjan hêzê û împaratoriyê ku xwestîya ku bibe serdest, pêşî xwestîya ku vê herêmê bike bin destê xwe de. Ji ber ku ev herêm, hem bi nirxên xwe re bî û her wusa hem bi pêşketina xwe ya rewşa jîyanî û hwd, pêşketinên di de kifşkirin. Dihat gotin ku "Adam, dema ku ji buhiştê hat hanîn li dunyê, ew li vê herêma li ber firatê hatîya û bcih bûya." Her wusa, gelek wateyên pîroz lê wê herêmê dihatin kirin. Hêza ku li wê herêmê serdest dibû, xwe weke hêzeka serdest a li herêmê jî didît. Li herêmê du herêm, ev hêst dikira serê mirovan. Yek; ji ber çîyayê kurda û heta ber firatê bû. Ya din jî, ji ber Diclê û heta çîyayên Zagrosan û hwd bû. ..

Ji ber vê yekê, ev herêmên rojavayê kurdistanê êdî hertimî bûna xwediyê heyîderiyekê. Hinekî jî, di roja me de jî, çend ku nêzîkatîya li van herêman dihê kirin ku hinekî di temenê sîyesî de lê nêzîkatî de lê bibe jî, ji wê zêdetir, ev aliyên olî û hwd jî, ku dikevina nav de, nêzîkatîyek birdozî jî ji aliyê serdestên herêmê û cihanê ve jî dihê kirin. Ev alî, divê ku mirov wê fahm bike. Ji xwe, ev aliyê birdozî, aliyê herî zêde ku li dijî kurdan jî dihê bikarhanîn a. Bi wê li dijî statûya kurdan sekin in dibe. Ji ber ku ew di temenê dijberîya statûya kurdan de dihê şîrovekiirn, êdî wê temenê de dihên bi ser kurdan de.

Ji ber ku ev pirsgirêkên civatî, di nava wan nêzîkatîyên olî de hat fatisandin, êdî hertimî di wê temenê de nêzîkatî hat kirin. Ên ku nêzîkatî lê kirin, li gorî xwe şîrove kirin. Minaq, dema ku hêzek li dijî hebûna civatekê bê, ew di temenê dijberîya wê de li ser olê û hwd re, şîrove kirîya û bi wê kirîya ku wê civate ji holê ra bike. Di destpêka mudaheleya li Sûrî de, dema ku çeta dan hêrîşkirin li ser serê kurdan, bi wan dan gotin ku "kuştina kurdan helal a". Piştre, hat gotin ku "destavêtina, mal, can û jinên kurd helal a." Bi vî rengî, "fetwa"yên kuştina kurdan û civate kurd li ser holê re hatina derxistin. Bi teybetî, heta roja me jî, ev gotinên tûndrew ên olî ku hinek kurd jî kirina nava wan de bi nezanîya wan re, di vê temenê de bi kurdan re didina şerkirin. Di vê temenê de şerê li dijî kurdan "di temenê "şerekî pîroz" de hat xwestin ku were şîrovekirin ku karibin wê kurdan bi wê ji holê ra bikin. Piştî ku jîyane şaristanîyê pêşket, şer hat "pîroz" kirin. Minaq, çend ku di jîyane vê herêmê de çanda Îstar" heya pîroz hatîya ditin, her wusa, bi wê re şer jî hatîya şîrove kirin. Mînaq, "şara" navê xwûdayê şer ku dihê ditin û weke

"kûrê lipît Îstar" jî hatîya tefsîrkirin di nivîsarên wan de. Gotina "şer" a di kurdî de, ji vê gotina navê "kûrê lipît îştar" ´şara´ tê. Ev di demên piştre de jî, wê bi rengên cûda were domandin. Pîrozkirina şeran di olan de ku pêş dikeve, ev minaq, bo fahm kirina wê pirr watedar a.

Heta roja me jî, di vê temenê de şerên mazin hatina kirin. Li kurdistanê, bi teybetî li dijî civate kurd, dema ku şerên dewletên herêmê destpêkir, pêşî xwestin ku bi olî dijberîyekê li dijî wê biafirênin. Pêşî, navê kurd ji olê paqij bikin. Pêşketina kurdan û navê kurdan û her wusa civate kurd, di temenê dijberîya olî de şîrove kirin û hertimî xwestin ku dijberîyekê li dijî wê biafirênin û afirandin. Çend ku di nava misilmanan de jî û di pirtûka wan ya pîroz ´kuran´ê de jî ji devê xwûdê dinivîsêne ku xwûdê gotîya ku "min, we weke milletan çêkir û ziman kir devê de, dakû win min nas bikin" jî, lê dîsa ew gotina "milletan" û ankû ya xalkan, bi destê van oldarên vê olê bixwe jî lê dijberî hat pêşxistin bo wê ji holê bibin û ji dîrokê bibin. Ku î ro, komên tûndrew ên weke "cebetil-nasr", çeteyên ÎŞÎD´ê kû hêrîşî kurdan dikin û hwd, divê ku em di vê çerçoveyê de şîrove bikin. Ev dordor, çend ji wan dordor û komên ku bi navê olê hatina li hevdû komkirin in. Î ro jî, li dijî kurdan û civate kurd şer dikin. ..

Li vir, dema ku em şerê dewletên herêmê ê bi kurdan re hewl bidin ku fahm bikin ku em rafaransên ku olî û hwd, ku bo berjewndiyên xwe bikardihên ku em fahm nekin, emê nikarin bi tememî fahm bikin. Ev bo demên pêş pirr zêdetir, pêwîstî pê dide ditin ku were fahmkirin. Ji ber ku li herêmê, hê jî, dihizirin ku şerê xwe bi kurdan re bidina domandin. Nîşanaka vê yekê jî, di konfaranse Cenevê a duyemin de, ne dewetkiirna kurdan û ne hanîna rojevê a pirsgirêka kurd û her wusa ne qabûl kirina statûya civate kurd a. Ev nîşanakên şerên demên pêşî ên ku wê dewletên herêmê wê bi kurdan re bikin a. Ya ku wê temenê wê şerê wan ê bi kurdan re û bi civate kurd re biafirêne jî, wê weke "rafarans" wê ev bin. Ku, statûya kurd li wir newê herêkirin û pirsgirêka kurd li wir newê û nekeve rojevê, divê ku mirov li bendê vê bê.

Dema ku di konfaranse Cenevê a duyemin de, dîsa bêstatûtî ji kurdan re were rast ditin, êdî divê ku em li bendê şerê wê bêstatû kirinê bin. Li rojavayê kurdistanê, tevî hemû astengî û hêrîşan jî, kurdan rêveberî û xweserîya xwe ya civatî bi navê civate xwe denezend. Ya ku heta roja me, ne "muxalefeta Sûrî" û ne jî rejima Sûrî heta nûha herê nekirî jî ev bixwe ya. Lê li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku li dijî pêşketina kurdan a li rojavayê kurdistanê, ji rejima esad zêdetir, komên muxalefeta Sûrî, dijberîya xwe dane nîşandin. Hê rejimê dijberîya xwe nedaye nîşandin li wê pêşketina statûya kurdan. Lê "muxalefeta Sûrî" dijberîya xwe daye nîşandin. Vêca ev muxalefeta Sûrî ku tê gotin ku wê bibe rêveberîya pêşaroja Sûrî, ku li dijî statûya kurdan berteke dide nîşandin, kî dikarê ji wê hêvîya mirovatiyê jî bike. Ya ku ew bike, wê piştî ku bû desthilatdar, êdî şerê bêstatûkirina kurdan ku bi kurdan re bike. Ji xwe, ji ber vê yekê ya, ku vê muxalefet Sûrî, heta roja me ´hebûna civate kurdû nasnekiriya. Heta nûa ne gotîya ku ez hebûna civate kurd nas dikim. Vajî wê, kurd isrer jî dikin bo ku hebûna civate kurd nas bike, lê wê nasnekirîya. Di ne naskirinê de isrer dike. Di hemû civînên xwe yên ku kiirn û li şûn xwe hiştin de, win tenê di gotinaka wê de û tenê di denezeneka wê de navê kurd û civate kurd nabînin. Di vê demê de, ya ku herî zêde li dijî civate kurd şer dike jî û dijberîyê dike jî ev muxalefeta Sûrî ya.

Dema ku rewş ev bê û ku kurd herina nava wê muxalefetê, ji bo wan kurdan ji bêrêzî û bêrûmetîyê û pê de, ne ti tiştekî din a. Çend ku hin kurd, dibêjin ku "me belge bo

pirsgirêka kurd bi muxalefetê re mohrkirîya" jî, divê ku em bipirsin ku ka çi belge mohrkirina û çûma wê Nadina nîşandin ji raya giştî re? Ji çi di tirsihin? Wusa xûya dike ku temenê vê gotinê jî vala ya. Ên ku î ro li dijî statû û xweserîya rojavayê kurdistanê bin, wê siba jî li dijî wê bin. Ên ku li dijî wê gotinê dibêjin, wê çawa karibin bibêjin ku em statûya kurdan dixwezin?. Ku bikin û bibêjin, ew gotin, tenê bo xapandina rayagiştî û pê de, ne ti tiştekî din a. Sîyeseta kurdan, di vê demê de, ti kêmesî nedan nîşandin. Kêmesîyên sîyeseta kurd, ên ku em werêna ser ziman, helwesta rayadarên hikimeta başûrê kurdistanê ku bi girtîna derîyê sîmalka û hwd, xwe dide nîşandina. Kêmesîya din jî, hebûna ENKS`ê ya. BI vê hebûnê jî, sîyeseta kurd, hat qatkirin li rojavayê Kurdistanê. Î ro jî, li ser wê qatkirinê re, sîyeset li dijî kurdan û statûya kurdan dihê dayîn meşandin. Lê tevî van kêmesîyan û ankû ku em ne weke kêmesîyê weke xelatiyên dîrokî şîrove bike jî, kurdan serkevtinên mazin bi pêşketina xwe denezendina xweserîya xwe re bidest xistina. Di 21´ê rêbendenê de rêveberîya xweser a kantona Cizîrê hat denezendin. Î ro jî, yanî di 27´ê rêbendanê de rêverêya xweser a kantona kobanê hat denezendin. Di rojên pêş de jî, wê rêveberîya xweser a kontona Afrînê were denezendin. Ev jî, pêşketinên dîrokî ên di nava civate kurd de na li ser navê civate kurd. Her kurd, divê ku li vê xweserîya rojavayê kurdistanê xwedî derkeve û wê pêş bixe. ..

Bi armanca ji holêrakirina şoreşa rojava, hêzên herêmê DAÎŞ´ avakirin û dane hêrîşkirin li ser rojavayê kurdistanê û bi teybetî kantona Kobanê. Ev hêrîşên li kantona Kobanê, hêrîşna stretejikî bûn. Armanca wan, pêşî kantona Kobanê bişikênin û rewşa xweserî a bi rêveberîya kurd re ji holê ra bikin. Bi wê re jî, têkiliya kantona Cizîrê û ya kantona Afrînê ji hevdû bibirrin û piştre wan bişikênin û ji holê ra bikin. Bi vê armancê pêşî hêrîşî kantona Kobanê hat kirin. Ev sedemek bû di temenê zêdebûna hêrîşên li kantona Kobanê. Sedema din ya duyemin jî, ew bû ku şoreşa rojava ji wir destpêkiribû di 19´ê temûze 2012´an de. Bi vê yekê, kobanê destpêk bû. Bo ku rêveberîya kurd ji holê ra bikin û bandûra wê ji holê ra bikin, ji vê nûqtayê bidest hêrîşkirina li kantona Kobanê kirin. Lê tenê ev armanc nebûn di temenê hêrîşên li ser kantona Kobanê de. Ji wê zêdetirî, wusa hatibû hasabkirin ku dema ku li Kobanê derbeyek li kurdan hat xistin, wê bandûra wê derbeyê li deronîya kurdên din ên beşên din ên kurdistanê jî bikira. Yanî, wê bandûra wê şikeştin û derbeyê li her çar beşên kurdistanê û tekoşîna wan bûba. Ev jî, weke armancaka sereka bû di temenê hêrîşên li Kobanê de. Bo vê yekê, pêl bi pêl, hêrîşên DAÎŞ´ê di birina ser Kobanê û bigiştî rojavayê kurdistanê.

DAÎŞ´, weke rêxistineka tundrew ku li ser olê re hatî birêxistin a terorîst ku armanca wê hebûn û pêşketina kurdan bû. Bo vê yekê, di serî de DAÎŞ´ê hêrîşên xwe tenê li kurdan û beşên kurdistanê kirin. Hêzên rojava ên weke emerika û hwd jî, di civînên xwe de DAÎŞ weke ”tehdîdekê” dihanîn ser ziman û digotin ku emê mudahale lê bikin. Lê pêşî dixwestin ku DAÎŞ kurdan bişikêne û piştre mudahale lê bikin. Bo vê yekê, heta ku DAÎŞ´ê hêrîşên xwe birina bi ser kurdan de û bi teybetî hêrîşên xwe dibirina biser rojavayê kurdistanê de hîç xwe ne labitandin. Ti mudahaleyên wan ne dibûn. Di wê navberê de tirkiya jî, hasab kiribû ku wê bi hêrîşên tirkiya derbe li rojavayê kurdistanê were xistin, êdî li ser wê re hertimî di civînên xwe ên bi rayadarên ewropî û emerikî de çêkirina ”herêmek tampon” dikira rojevê de û ji wan dixwest ku destûrê bidinê de. Ji ber ku wê dixwest ku derbeyekê li rêveberîya xweser a kurd ku li rojavayê kurdistanê hatî

ava bikirin bixê. Lê Şoreşa rojava, temenê wê xort bû. Şoreşa rojava, ancama kedaka 35 salan bû. **Çendî** ku hêrîş lê hatina kirin jî, bi wê fêr û zanînê bersiv dide ên ku hêrîş dikirin. Çend ku çeteyên DAÎŞ´î, bi çekên giran û teknîkên pêşketî ên ku bidest xistina hêrîş dihanîn ser kantona kobanê û bigiştî rojava jî, lê tenê bi çekên di dest de ên ferdî û hwd, kurdên rojavayî serkevtinên mazin li ber wê bidest dixistin. Ji ber ku bi bawerî bûn. Bi zanîn bûn. Bi wê vê yekê, dan nîşandin li berçavê cihanê hemûyî ku vîna mirovê birêxistinkirî û bizane li ser koka xwe hêz û çeka herî mazin a cihanê ya.

Lê bo şoreşa rojava ku mirov werêne ser ziman, divê ku mirov bibêje ku weke şoreşa maf û azadiyê jî mirov dikarê binav bike. Li rojavayê kurdistanê, çendî cihrengîyên bawerî û kemnetewî û hwd hebûn, gihan maf û azadîya xwe hanîna ser ziman û pêşxistina xwe çêkirin. Hemûyan jî, mafên xwe bixwe birêvebirinê bidest xistin. Çare pêşî, xalkên weke xalkên asûrî, bi şoreşa rojava re mafê xwe bixwe rêvebirinê û avakirina hêzên xwe parastinê ên bi navê xalkên asûrî bi navê ”**sutoro**” hêzên parastîna xwe avakirin. Dema ku rêveberî hatina avakirin jî, bi heman rengî bi awayekî hevbeş hatina avakirin. Minaq, li rojava bi kurdan re asûrî û arab dijîn. Dema ku rêveberî hat avakirin ku serok kurda, wê du alikarên wî heban ku yek asûrî û yê din jî arab ba. Bi vî rengî pergalek xwe-rêveberînê hatibû avakirin. Bi wê re jî, herî zêde jinan xwe bi rêxistinkirin û rengê xwe dane jîyanê. Bo vê yekê, dema ku şoreşa rojava dihat bi navkirin, gotina ”şoreşa rojava, şoreşa jinê ya” jî dihat gotin û bi navkirin. Li rojava, hêzên parastina YPJ´, hêzek parastinê ku jinên kurd li rojava ava kiribûn bû. Bo vê yekê, pêşketina şoreşa rojava, em dikarin weke pêşketina şoreşa jinê jî **binav bikin**. ..

- Bi şoreşa rojavayê Kurdistanê re, em dikarin bêjin ku jin, kirdeya têgihiştî a azadî û jîyane civatê ya. Temenê vê gotina jin kirdeya têgihiştî a azadî û jîyane civatê ya, ev pêşketina jina kurd wê ya ku bi tekoşîna azadîya kurd re gihiştîyê de ya. Ku em civatekê hildina li dest û wê şîrove bikin, divê ku em bibêjin, nêvî wê mêr û nêvî wê jin a. Ev ji aliyê pirr zêde li berçav ku pirr bi hesanî herkesek dikarê bibînê ya. Em ku ji vê gotinê gav biavêjin û şîrove bikin jî, divê ku em bibêjin ku ya rastî ew a ku li gorî wê hebûna wê jî mafê wê û azadî û wekhevîya wê di nava civatê de hebe. Î ro, ya ku tûna ya ev bixwe ya. Rengê civatekê bi nerîna wê ya li jinê re dihê ditin û li berçav. Her wusa mirov dikarê li gorî wê zihniyeta civatî a şariştanî ku heya û serwer û serdestê jî fahm bike. Zihniyet, li vir, weke gotinaka ku divê ku mirov bi cewherê wê re wê hilde li dest. Li rojhilat, dema ku em li dîroka wê binerin, em dibînin ku di demên kevn de, jin û kifşkarîya wê pirr dihê li berçav. Navê wê li pêş a. Bi teybetî, di nava wê çanda li ber firatê û diclê de jin bi ´pîrozîyekê´ re hatîya pêşwazî kirin. Ev yek, di cewherê têgihiştinên olên yek-yazdanî ên mesopotamikî ên weke êzdatiyê de em dikarin bibînin.Li vir, min xwest ku ji vê aliyê ve hildime li dest. Li ser xate ´yazdantîyê´, pêşketina ku bi têgihiştinî û hişmendî bûya, di çerçoveya wê de ku mirov dihizirê, mirov divê ku bibêje ku jin di temenê wekhevîyekê de bi pîrozîyekê re hatîya ser ziman. Ku di xate yazdanê mazin û melekê tawis de hatina û çûna, berî Mîtra û piştre jî Zerdeşt, di nava nêzîkatîya wan de jî ev nêzîkatîya li jinê ya civatî ku di temenê wekheviyekê de bi pîrozî mirov dibînê. Her wusa, ev rewş, dinava çanda kurdan de, bi gotina "çanda hamawîyê" û ankû "kevneşopîya hamawîyê" dihê ser ziman. Bi teybetî, pirtûka Ahmedê Xanê ya bi navê ´Mem û Zînê´, di wê de ev rewş bi minaqî hatîya

hanîn ser ziman. Di pirtûkê de, ku em bi kortesî û sereka bi nivîsênin bi vî rengî dihê ser ziman

"Mem, li ber Mîrê bota rûniştîya ku bi hevdû re sedrenc(kişik) dileyizin. Di wê demê de Beko Zînê dihêne berçavên Mem. Mem ku wê dibînê heya wî diçê li ser Zînê. Piştre ku Mîr wê farq dike êdî li berhevdû dirabin ku dest biavêjina hevdû. Di wê demê de, jinek tê û hamawîya xwe ji ser serê xwe diavêjê nava Mîr û Mem û êdî ew li herhevdûbûna wan jî dawî lê tê."

Ev kevneşopî, weke kevneşopîyeka civate kurd ya pîroz a. Hertimî, dema ku du êl bin, û ankû mirov bin, li hevdû rabin ku dest li berhevdû rakin û ankû levxin, hingî ku jina kurd çû û di nava wan de sekinî û ankû ew hemawîya li ser serê xwe ku ji ser serê xwe avêta nava wan, êdî ew li herhevdûbûn û ankû ku bûbe pevçûn jî dawî lê tê hanîn. Ev, ji rûmetê tê hasibandin. Wekî din, ên ku li vê ne hisênin û piştî ku hamawî hat nava wan û piştre şerê xwe di nava xwe de domandin, ew ji wan re dibe weke bêrûmetîyekê.

Bi vê kevneşopîyê, jina kurd, hertimî bûya parastvanê aşîtîyê di nava civate xwe de. Wê hertimî, bi vê kevneşopî aşîtî, aramî û parastina civatê kirîya. Bi vê kevneşopîyê, jina kurd ne hiştîya ku di nava civatê de şer zêde biqawimin. Şerên ku qawimî na jî, bi wê kevneşopîyê û bi destê jina kurda dawî li wan hatîya hanîn. ..

Kengî, di nava civate kurd de, bêaramî û aşîtîya navxweyî têkçû? Kengî ku vê kevneşopîyê serwerî û bandûra xwe winda kir, bû. Li vir, em kifş dikin ku ev kevneşopî, bi hebûn jinê re xwediyê serwerî û serdestîyeka civatî ya. Bi vê serwerî û serdestîyê re jina kurd, bi wê kevneşopîyê re rengekî giştî û teybet ê civate ku dihêne ser li berçav. .. Ev reng, bi hebûna civatî re dihê li berçav. Ev kevneşopîya pîroz ya civate kurd ku bi gelek kevneşopîyên xwe ên ku weke destûrên civatê na re ku hebûya, kengî ku civate kurd serwerîya xwe hin bi hin winda kir, êdî wê hin bi hin bandûrbûna vê kevneşopîyê kêm bike. Lê li vir, em dibê ku vê jî bibêjin ku piştî ku civate kurd serwerîya xwe ya civatî a giştî ku hin bi hin windakir jî, wê heya demekê ev kevneşopîya civatî wê bijî û wê heya demekê jî aramî û aşîtîya navxweyî ya civatê jî biparêzê. Bi vê yekê re, wê civate kurd, hebûna xwe jî, bide domandin. Diaslê xwe de, bi vê kevneşopîyê re, wê aliyekî civatî ê civate kurd ku bi bandûr hebûna xwe ku dide domandin, wê piştre jî xwe bide domandin.

Li rojhilat, piştî ku di tefsîrkiirna olê de bê û ankû nirxên bi vî rengî bin ku bi desthilatdarîyê re hatina şîrovekiirn û tenê bi hêzê hatina ser ziman, wê êdî tenê li gorî wê hêzîya mêr wê werina şîrovekirin û ser ziman. Jin, bi tememî ji jîyanê dihê dûrkirin. Heta ku ev dûrkirina ji jîyanê, wê di tefsirkiirinên olî û hwd de jî, were bicihkirin. Ya ku, wê mirov herî zêde acêbmayî bihêle jî, wê ev bê. Ol, hertimî, heta dema derketina îslemê jî, pîrozî bi jinê baxşkirîya. Minaq vê yekê jî, hizrên ola Mîtra û Zerdeşt û hwd in. Piştre hinekî, mesihiyê jî li ser navê Meryem re jê sûdgirt. Lê piştre, ev ji holê hat rakirin.

Civate kurd, ya ku bi jîyane civate kurd re ku di nava wê de serdest û serwer bû, wê di dema îslemê de herî zêde ji ber van aliyên xwe wê zorê bikişênê di jîyane xwe de. Di destpêka îslemê de ku ew dema wê ya pêşî weke dema "asrî-seadetê" dihê bi navkirin, di wê de jin bi wate heya. Serdestbûna Fatîma û hwd û heta ku bi navê wê desthilatdarbûn jî, nîşanaka vê ya. Lê piştre, ev jî bi bandûra wê re hatîna ji holê rakirin ji nava îslemê. Êdî piştre, di aslê xwe de, wê civat bikeve nava tengezerî(kriz) û buhranaka giştî de jî. Gelek destûr, zagon û nirxên ku dihêna ser ziman û bi pîrozî di

nava olê de jî bahse wan dihê kirin, wê vajî van rastîyan û têgihiştina di navaroka wan de werina şîrovekirin. Zihniyeta ku bi desthilatdarîyê re pêşketibû û di dema metingerîyê de ku diket herêmekê de û ku ew herêm talan dikir û hemû mal û jinên wê ji xwe re weke "ganîmetê" didît, wê bi awayekî ku mirov di bawerkiirna wê de bikevê zorê de û acêmbayî dimêne, wê di olê de were bicihkirin. Di rojên me yên dawiyê de ku hin komên çekdar ku bi destê tirkiya û ankû Îranê hatina birêxistinkirin û li dijî kurdan di hundurê Sûrî de didina şerkirin, bi serê xwe "fetwa"yan derdixin û dibêjin "mêrên kurdan bikujin û jinên wan ji xwe re weke carîya hildin." Ev gotin û ankû zihniyet, çend ku ji mirov di bawerkirina wê de dikeve zorê de jî, wê were û li ser navê olê bihê gotin.

Ev gotin, di aslê xwe de, zihniyeta ku ol li gorî wê hatî şîrovekirin û tefsîrkirin, bi awayekî vekirî dihêne li berçav. Di vê temenê de, zihniyeta olî, di temenê zihiyeta rejimek serdest û metinger de dihê şîrovekirin û tefsîrkirin. Ya ku weke hêrîşekê li navaroka wê olê bixwe jî ya, ev bixwe ya. Î ro, di vê temenê de, nêzîkatî li jinê jî dihê kirin. Jin, li gorî vê zihniyeta ku "fetwa" kirina jinê weke "cariya" û ankû jinê weke "genîmetê" dibênê, di wê de tenê mafekî wê heya û ew jî ew a ku tenê li gorî xwestekên mêr bijî ya. Jin, nikarê derkeve dervî xwesteka mêr. Derketina jinê ya dervî xwesteka mêr, dikarê bibe sedema mirina wê bixwe jî. Ji wê zêdetirî jî, ku jin, ji ber wê derketina dervî xwesteka mêr ku newê kuştin jî, wê weke zîndîyeka "bêrûmet" û "bêahlaq" were ditin û şîrovekirin. Li vir, ahlaq jî, û rûmet jî, jinê û jîyane wê, ku çendî li gorî ku di bin destê mêrê xwe de ya rast dibînê. Ev rewş, mixabin, heta roja me jî, li rojhilat hatîya parastin.

Çend ku cihê vê nêzîkatîyê di olê de tûna ya jî, bi awayekî pirr zêde, hin şîroveyên pirr mazin di vê warê de bi olî hatina kirin û di wê çerçoveyê de rewşa jinê hatîya kifşkirin. Jin, bi vî rengî, di jîyanê de, ji hemû maf û azadîya xwe hatîya dûrkirin. Ev, weke aliyekî pirr giring ku divê ku mirov li ser bisekinê ya.

Bi teybetî, di van rojên dawiyê de, ji ber çi hêrîş li rojavayê kurdistanê û pêşketina wê dibin? Hinekî jî, dema ku mirov lê dihizirê, mirov aliyekî jî bi vir ve girêdayî dibînê. Ji ber ku di pêşketina şoreşa rojavayê kurdistanê de jin, bi awayekî pirr zêde li pêş a. Bi hêz a jî. Di jîyanê xwe de, bi rêxistinkirîya û di derbarê jîyane xwe de biryarê dide û dide kifşkirin. Ev, di aslê xwe de, ne rewşeka ku ew zihniyeta ku di nava olê de jî hatî bicihkirin ku wê herê û bipejirênê ya. Ji ber vê yekê jî, hêrîş li rojavayê kurdistanê bin. Hemû komên çete ku di bin navê olê de hatibûbûna bi rêxistinkirin û ji welatên din biribûbûna Sûrî û didan şerkirin, ji wan re digotin ku "winê li wir, bina xwediyê çend Jinan", "wê ti jin, ji were nebêje na" û hwd. Bi van gotinan û çend gotinên olî ku ew hatibûbûna xapandin û hatina hanîn li Sûrî û dane şerkirin, piştre di vê temenê de bidest karên xwe yên qirêj kirin. Gelekan ji wan, bidest ravandina Jinan kir. Jinên ku wan ne dihisandin jî, serê wan jê dikirin.

Ev rewş, di dema hêrîşên çeteyan ku li ser rojavayê kurdistanê de pirr zêde û baş hat ditin. Çeteyên weke DAÎŞ´ê ku hatibûbûna avakirin, ku bi gotinên bi vî rengî hatibûbûna xapandin, êdî "fetwa" derdixistin û digotin "mêran bikujin û Jinan ji xwe re bikina carîya." Î ro, bi vê rengê û zihniyetê jî, mixabin li ser navê olê bixwe jî "fetwa" tên derxistin. Ev ´fetwa´, bi vî rengî li ser navê olê hatina derxistin.

Dema ku em li vê rengê zihniyetê dinerin, em giringîya şoreşa rojavayê Kurdistanê û ankû şoreşa kurdistanê, bigiringî û bi zihniyetî û têgihiştînîya wê dibînin. Li vir, têgihiştin û rengê jîyane ku bi pergal bi şoreşa rojavayê kurdistanê pêşket, li dijî vê

rewşa bêahlaq a. Li dijî wê zihniyeta ku jinê ji xwe re weke "carîya" û ankû "genîmetê" û hwd dibînê ya. Ji ber vê yekê ya ku pirr zêde hêrîş lê dibînin. Aliyekî pirr giring ê di temenê hêrîşên li rojavayê kurdistanê de jî, ev a. Bi vê rengê, weke ku hertimî jinên kurd dihênina ser ziman, "şoreş, bi zihniyetê hatîya kirin." Piştre dibîjin, ´şoreşa rojava, şoreşa jinê ya´. Ev gotinên jinên kurd, gotinên rast û bi perspektifa pêşarojê na. Di wê temenê de, wê jin, çawa bijî û wê çawa xwedî li mafê xwe û azadîya xwe derkeve, di wê temenê de ev zihniyet bi navê jinê re hatîya bi rêxistinkirin. Her wusa, gotina "jineolojî" jî, ku di wê temenê de şîrovekirin û hanîna ser ziman, di vaca wê de zanyarîya vê jîyane jinê û civatê bi hevdû re di xwe de dihêne ser ziman.

Pêşketina jina kurd a bi tekoşîna azadîya kurd re, di temenê wê kevneşopî û pêşketina wê de ya. Bi wê re jî, xwe bi têgihiştinî û jîyanî bi rêxistin kirîya. Li vir, di aslê xwe de, ´pirsgirêka jinê´ ku em bahse wê dikin, derdikeve li holê ku pirsgirêka mêr û zihnîyeta wî ya. Her wusa, pirsgirêka wî ya ku xwe ji aliyê keseyetîyê ve pêşnexistîya jî ya. Di vê temenê de, di serî de hinekî jî divê ku mirov ji aliyê mêr ve lê binerê. Mêr, ji vê aliyê ve, wê çawa xwe li gorî wê têgihiştinê pêş bixe, hinekî jî pirsgirêk êdî pirsgirêka wê ya. Mêrê ku di temenê wê zihniyeta kevn de hatîya perwerdekirin û ku jinê ji xwe re weke ´carîya´ dibînê û weke ´genîmet´ dîtîya û xwe xwedîyê wê dîtîya û hwd, di wê çerçoveyê de nerîna wî ya ku heya, di temenê wê ´pirgirêka mêr´ de ya.

Di demên berê de, dema ku bahse têkiliya jin û mêrê dihatkirin, dihat gotin ku "li gorî wê rûmetê wê jîyîn" çawa ya, ku mêr li gorî wê bijî, hingî wê karibê ji xwe re bibêje mêr. Yanî, divîyabû ku mêr, jin ji xwe re weke ´rûmetê´ bidîta. Lê piştre, ev kevneşopî ji dest çû. Hin bi hin winda bû. Ev kevneşopîya jina kurd, wê heta sadsalên piştî zayina ên 8´min jî bijî. Ku ne zêde ji vê demê dûr, di sadsale 9´min de, li rojhilatê kurdistanê ´dayika Annezê´ hebûya ku li ser serê kurdên Annezîdî bûya. Vê jin û dayika kurd, wê nêzî 60 salî wê şahîtîyê û ankû hikimdariyê li herêmê bike. Wê dewleta kurd a bi navê kekoyîdî ku navande wê kirmaşan a û dewleta kurd ya bi navê "eyirîdîya" ku navende wê Ûrmîya ya, wê di bin hikimdarîya xwe de bike yek. Kurdên annezîd, eyîrîdî bûn. Piştre, ew yekbûna ku wê jina kurd çêkir, wê bê temen ji pêşketina Mihemedê kurê şadadî re, ku ew wê dewleta kurd ya bi navê Şadadîyan ava bike.

Jina kurd, ew dîroka wê ya wê ya bi civate wê re heya, hê jî li gorî xwe û mazinatîya xwe ne hatîya nivîsandin. Dema ku em çav lê dixin, em dibînin ku xwediyê çi pêşketinaka mazin a li herêmê ya. Temenê wê pêşketina jina kurd, hinekî jî, divê ku em di nava rûpelên dîrokê de herin û fahm bikin.

Di roja me de, tevî hemû hêrîş û astangiyên li pêşîya wê, jina kurd xwe pêşxistîya û di nava civate xwe de xwe bi rêxistin kirîya û pêşengîya wê dike. Ew qalibên ku di çerçovey jinê de hatibûbûna kifşkirin, wê ew şikandin. Astangiyên ku hatibûbûna derxistin li pêşîya azadîya wê û civatê, ol jî bo domandina wan hatîya bikarhanîn. Ew qalibên ku jin xistinê de, hemû kirina rengê "hizreka olî" de jî. Hê jî, ew didom in. Bi teybetî, piştî ku şoreşa rojava bû, di temenê wê û têgihiştina wê ya ku bi wê jin pêşket, hat gotin ku ´şoreşa rojava, şoreşa jinê ya´. ..

Î ro, ew pêşketina ku li rojava bi jinê re û bi pêşketina civatê re dibê, dibê mînaq li herêmê. Şoreşa rojava, ji vê aliyê ve pirr zêde xwediyê têgihiştinaka mazin a. Ji ber vê aliyê wê ya, ku li herêmê ji pergale ku heyî re dibe weke arternatifekê êdî wilqasî zêde hêrîş lê dibin. Şoreşa rojava, têkiliya xalkan wê bi hevdû re çawa bê û li ser kîjan esasê bê, wê têkiliya zayendan weke jin û mêr bi hevdû re çawa bê, têkiliya mirov wê bi

xwezaye mirov re çawa bê û hwd, bersiva van pirsan bi têgihiştineka xort di hundurê xwe de di hawêne. Ji ber vê yekê ya, ên ku li dijî wê disekinin, ku bi zanebûn bê û ne bi zanebûn bê li dijî van aliyên wê disekin in. Her wusa, nîqaşên ku dihên xwestin ku bidina destpêkirn û di mejiyê mirovan de ji wan re bibêjin "ev ne şoreş a", ankû "gotina şoreşê, mirov nikarê bo wê bikarbênê" jî û hwd, bo şikandina wê û bandûra wê ya. Ev gotinên ku bi vî rengî dihên gotin ên weke "li rojava şoreş nebûya", "ev ne şoreş a", "gotina şoreşê, mirov nikarê bo wê bikarbêne" û hwd, hinek ji wan rengên hêrîşkirinê na ku li wê dihên kirin in.

Li rojavayê kurdistanê, rengekî şoreşê bû ku em dikarin bibêjin ku ew şoreşa jinê ya. Ji xwe, gotina ku dihê bikarhanîn jî ev a. Di vê temenê de, ew têgihiştina ku ji nava dîrokê herîkî ya û di xate yazdaniyê de bi wê re ji jinê re gotina "pîrozîyê" hatîya bikarhanîn, weke ku şoreşa wê bibe ya. Di vê temenê de, ku em bibêjin ku ev şoreşa vê têgihiştina jinê ya wê xatê ya, wê rast bê. Bi wê re jî, şoreşa ku bi wê re jin, kirdeya têgihiştî a azadî û jîyane civatî ya. Dunya, dibêt ku bi roja 8 adarê re roja jina kedkar bi mafî pîroz dike. Lê jina kurd bi wê re, bi şoreşa jinê a ku kir re pîroz dike.

..

**Berxwedane Kobanê û hêrîşên DAÎŞ´ê bi piştgirîya tirkiya a li lê û hasabên di temenê hêrîşan de. ..**

Hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku bi piştgirîya tirkiya ji 15 êlûnê û pê de, weke pêleka nû û bişitt ku li Kobanê û bigiştî li rojavayê kurdistanê destpêkir, bakûrê kurdistanê jî rakir ser pîyan. Ji aliyê bakûrê kurdistanê ve ´Pîrsûs´ diket sînorê Kobanê de. Li wir, kurdên bakûrê kurdistanê li hevdû gihiştina hevdû bo piştgirîya li berxwedane li Kobanê. Lê di wê navberê de jî, bi hezaran ciwanên kurd ên ku li wir levgihiştibûbûna hevdû derbasî Kobanê dibûn û tevlî berxwedane YPG´ê dibûn. Bi vî rengî, di aslê xwe de, berxwedane Kobanê û ya bakûrê kurdistanê gihişta hevdû. Li bakûrê kurdistanê jî, berxwedana kurdan didoma.

Pêla duyemin ya hêrîşên DAÎŞ´ê di 19 tabaxê de destpêkiribû. Ew pêla hêrîşên DAÎŞ´ê a li ser rojavayê kurdistanê û bi teybetî li ser Kobanê hatibû şikandin. Piştî wê şikandinê re êdî Bi alikarîya tirkiya û vegûhaztina hêzên DAÎŞ`î bi trenên leşkerî ên tirk li herêmên başûrê kurdistanê bû. Êdî ji wir ve pêleka nû ya hêrîşan li kurdan hat destpêkirin. Di vê demê de, bi teybetî, herêmên weke Maxmûr, Şengal, Xanaqîn, tûzxûwmatû û hwd, kirina bin hêrîşên DAÎŞ´ê de. Heta ku gelek hêrêmên din ên başûrê kurdistanê jî kirina bin hêrîşên DAÎŞ´ê de. Hêzên weke tirkiya ku li pişt DAÎŞ´ê bûn, bo ku hêrîşên DAÎŞ´ê li herêmên kurdan bidom in, dixwestin ku herêmên weke Musil û kerkûkê jî bikina bin kontrola çeteyên DAÎŞ´ê de. Bi vê yekê û bi alikarîya rayadarên Îranî jî, artişa Îraqê xwe ji herêmên weke Musilê, kerkûkê û hwd vekişand. Piştre çeteyên DAÎŞ´ê di hundurê çend seatan de ketina Musilê û hin herêmên li dora wê de. Ev herê ji aliyê van çeteyan ve hatina kontrol kirin. Li van herêman, hin aşîrên sûnnî ku hebûn jî, bi alikarîya mirovên weke Tariq Haşîmî û hwd, kirin ku piştgirîyê bidina DAÎŞ´îyan ku hêrîşî herêmên kurdan bikin û herêmekê di bin kontrola wan de çê bikin. BI vê yekê, bi van aşîrên sûnnî jî, dana bawerkirin ku "wê desthilatdarîyek ku ew di wê

de xwedî hêz û rêveberî bin", ava biikin. Bi vê bawerîyê û ´taahûdan´ ew aşîrên sûnnî jî kirina temen ji pêşketina DAÎŞ´îyan re.

Lê rewş, ne tenê bi vê ve bi sînor bû. Ji wê zêdetirî jî, DAÎŞ li herêmê kirina weke rêxistineka tundrew ku li hinek herêmên Sûrî û Îraqê ku bi hêz a. Di vê temenê de êdî piştre ji aliyê hêzên ewropî ên weke Emerika û hwd jî, DAÎŞ û pêşketina wê weke "tehdîdekê" dihat binavkirin. di civîna NATO ya piştî 8´ê êlûnê û hwd de, DAÎŞ´ weke "tehdîdekê" çend ku hat bi navkirin jî, li ber hêrîşên wê ên ku li kurdên rojavayê kurdistanê û bi teybetî li Kobanê dibûn bêdeng bûn. Weke ku li bendê bûn ku pêşî DAÎŞ li wir derbeyekê li kurdan bixe û piştre bikevina tevgerîyê de di seknekê de man. Ev rewş û sekn, ji aliyê kurdan ve hatina fahm kirin. Her wusa, welatên weke tirkiya û hwd, çekên giran didan DAÎŞ´îyan, lê kurd di destê wan de çekên wusa giran nebûn. Heta ku welatên ewropî û hwd, digotin û radigihandin ku "wê çekan nedigina kurdan." Tevî ku bahse kurdên başûrê kurdistanê dikirin û digotin ku "emê alikarîya leşkerî û çekî ji wan re bikin jî, ev tenê, bû weke helwesteka ku ser wê nedane alikarîya li kurdan li ber wan hêrîşên DAÎŞ´ê bû weke maskeya sernûxûmandinê jî. Van gotinên ku di wan de digotin û radigihandin ku "wê alikariyê bikina kurdan(kurdên başûrê kurdistanê)" jî, ev ne rast bû. Di aslê xwe de, hêrîşên DAÎŞ´ê herî zêde li ser Kobanê û rojavayê kurdistanê bû. Herî zêde ew pêwîstî alikariyê bûn. Lê bo wan deng dernedixistin û alikarî ne didan.

Her wusa, kurdên başûrê kurdistanê ên weke PDK´ê û hwd, ku têkiliya wan bi van hêzên dervê hebû jî, li ser helwesta van hêzan ew jî bêdeng ma ku alikariyê bide birayên xwe rojavayî. Ev jî, di nava rayagiştî de bû sedema ku rojava bi destê van hêzên derve têgiha "kurdên baş" û "kurdên ne baş" afirandina. Kurdên baş, ên ku li gorî wan gav diavêtin bûn. Bi wê re jî, "kurdên ne baş" jî, kurdên bakûrê Kurdistanê û kurdên rojavayê kurdistanê ku doza statûya xwe dikirin û bo wê têdikoşîyan bûn. Ev navbendî, li pêşîya çêkirina yekîtîya di nava kurdan de jî bûbû weke astengekê.

Hêrîşên li kurdan, piştî şoreşa rojavayê kurdistanê, avakirina rêveberîya wê ya kurd zêdetir bûn. Hemû hêrîşên ku li kurdên rojavayê kurdistanê bûn jî, bi armanca têkbirin û şikandina wê vîna kurdan û ji holê rakirina wê rêveberîya kurd a ku hatibû avakirin bû. Di destpêka mudahaleya li Sûrî de jî, bo ku navê kurdan newê li holê û bi navê kurdan ti statû dernekevina li holê, pirr bi heyîderî tevgerîya bûn. Di destpêka mudahaleya li Sûrî de, di hemû civînên komên di bin navê "muxalefeta Sûrî" de, ku li Qatar, Misrê, tirkiya û hwd kiribûn jî, di wan de ne dihiştin ku bi navê kurdan tiştek were ser ziman. Piştî ku kurdan fahmkir ku wê êdî bo wan ti tiştek ji van civînan dernekevê, êdî bi destê xwe û hêza xwe rêveberîya xwe avakirin. Bi wê re jî, ew rêvberîya ku kurdan bo xwe û herêmên xwe avakiribûn, bo ku werina xûrixandin êdî hêzên herêmê rêxistinên weke DAÎŞ´ê bi rêxistinkirin û dane hêrîşkirin li ser wê. DAÎŞ´, weke rêxistineka ku di temenê "dij-şoreş" de hatî birêxistin a. Ev rêxistina dij-şoreş, bi teybetî, kurd û pêşketina kurdan, kirina armmanca wê de. Bigiştî, hemû herêmên kurdan û pêşketina kurdan, kirina armanca wê de ku hêrîşî wê bike.

Rêveberîyên herêmê, li dijî statûya kurdan in. Ev 30 salin ku bi kurdan re şer dikin. Bo ku kurdan û statûya wan û temenê wê ji holê ra bikin, ev hêrîş bi şitt li kurdan dihên kirin ji aliyê rejimên herêmê ve. Hêrîşên li Rojavayê kurdistanê ên ku piştî bûyîna şoreşa wê re ku bûn, di vê temenê de li wê dibin. Di temenê hêrîşên li kurdên rojavayê kurdistanê û bi giştî li şoreşa rojavayê kurdistanê dibe, du sedemên mazin û giring di temenê wê de hena. Sedema pêşî ew a ku rejimên herêmê ên weke tirkiya û Îranê ku li dijî statûya kurdan in, bo ku kurd statûyekê bidest nexin û di bin kontrola wan de bijîn van hêrîşan dikin. Sedema din ew a ku ew modela rêveberîyê a ku li rojavayê kurdistanê ku kurdan avakiribû û pêşxistibû û ku di wê de hemû cihêrengîyên bawerî û kêmnetewî ku di wê de dikarîn xwe bênina ser ziman, dihat armanc girtin.. Rejimên herêmê, temenê wan li ser ´bişavtinê´ ava ya. Bo vê yekê, di temenê bêstatûkirina xalkên herêmê de xwe bi rêxistinkirina. Ji ber vê yekê, rengekî bi vî rengî ê modela rêveberîyê ku pêş bikeve dibe weke "artarnetîfekê" jî ji wê rengê rêveberîya wan re. Bo vê yekê, bidest hêrîşan li şoreşa rojava kirin. Şoreşa rojava, bi teybetî, divê ku mirov bibêje ku di vê temenêd e têgih, têgihiştin û rengekî nû ê pêşketinê bû li herêmê. Hêrîşên ku li kurdan dibûn, bo vê yekê bûn.

Bi teybetî, hêrîşên ku li rojavayê kurdistanê dikirin, bi wan dixwestin ku bi sed heezaran xalkê herêmê bidina goçberkirin. Bo vê yekê, dema ku goçberkirin bû herêm vala bû, êdî wê li gorî wan pêşketina civatî jî di wê temenê de nebûba. Bo vê yekê, hêrîşên tirsandin û bi wê re dane goçberkirinê dane kirin. Ev hêrîşên gocberkirinê divê ku mirov bi teybetî li ser wan jî rawastihê. Ji ber ku goçberkirin, di temenê politikayaka şikandina kurdan de hat birêvebirin. Bi teybetî, li ser herêmên rojavayê kurdistanê ev politika meşandin. Rêveberîyên herêmê ku hêrîşên li kurdan didana kirin, derîyên xwe ji hemû alikariyên mirovî ên ji kurdan re digirtin. Lê ji goçberbûnê re heta dawîyê vekirî dihiştin. Ji sala 2012´an ve ku di wê de şoreşa rojava bû û pê de, hêrîş li kurdan kêm nebûna.

Kurdan, di salên 2012´an de, şoreşa bêxwûn kirin. Care pêş ji Kobanê destpêkirin û dest danîna ser rêveberîyên bajarên xwe ji destê hêzên rejima baasê. Heta ku ez dikarim bibêjim ku hemû bajarên kurdan, rêveberîyên hemûyan ku hebûn kurdan bêî ku xwûn were rijandin dest danîna li ser wan. Bo vê yekê, di destpêka şoreşa rojava de, gotina "şoreşa bêxwûn ku pêkhatî" jî bo şoreşa rojava hat bikarhanîn. Di nava Sînorê Sûrî de, li hemû herêmên din ên Sûrî de, roj bi roj bi sedan mirov di ancama hêrîşan dihatina qatilkirin û bi deh hezaran jî ji cih û warên wan dihatina goçberkirin. Lê li rojava, di nava wê rewşê de şoreşek bêxwûn kir. Heta ku bi deh-hezaran mirovên ku ji herêmên din ên sûrî goç kirina, ew aramîya li rojavayê kurdistanê wan dîtîya û goç wê herêmê kirina. Bo vê yekê, di destpêka şoreşa rojava de bi deh hezaran goçberî li rojavayê kurdistanê bûya.

Di nava rewşek bi vî rengî de şoreşa rojava pêkhat. Ku em wê sala pêşî a şoreşa rojavayê kurdistanê weke "sala asrî-seadetê" bi nav bike jî wê pirr rast bê. Ji ber ku wusa bû. Di dem û serdemeka ku li herêmên herêmên ên rojhilat û Sûrî şer hebû de, rojavayê kurdistanê bi vî rengî demek buhurand. Ya ku rejimên herêmê nexweş jî di serî de hebû. Bo ku wê şoreşê êdî bixwûn bikin êdî bidest hêrîşan li wê kirin. Kom bi kom,

komên çete avakirin û dane hêrîşkirin li ser herêmên kurdan. Lê di wê demê de kurdan jî ev yek farq kir, Bo vê yekê wan jî, êdî hêzên yekîneyên parastina gel di bin navê `YPG´ê de avakirin. Hemû hêrîşên ku bi destê çeteyan li rojavakirin, vê hêza kurd ya bi navê YPG´ê dan rawastandin. Vê hêza kurd, parastina herêmê û kurdan û xalkên din ên herêmê kir. Di vê temenê de, weke artişa rojava a şoreşa rojava jî YPG´ê êdî pêşket.

Şoreşa rojava, piştî wê re di sala xwe ya duyemin de hemû hêrîşên ku bi vî rengî hatina bi ser wê de dan rawastandin û bêbandûrkirin. Lê hêrîş ne sekin in. Hêzên herêmê, komên nû ên mazin ên weke DAÎŞ´ê û hwd ku di temenê ´dij-şoreşê´ de birêxistin dikirin li herêmê avakirin. Bi wê re jî, xwestin ku van komên bi vî rengî bidina hêrîşkirin li ser kurdan de û ancamê bidest bixin. Şoreşa rojava, ji her aliyê ve êdî kirina bin hêrîşan de. Bi teybetî jî, dema ku bidest hêrîşan li rojavayê kurdistanê kirin KObanê weke navenda hêrîşkirinê bijartin. Sedema wê jî, ew bû ku li Kobanê destpêka şoreşa rojava bû bû. Li wir, şoreşa rojava di 19 temûza 2012´an de destpêkiribû. Bo vê yekê jî, wusa hizir kiribûn ku dema ku ji Kobanê hêrîş rojavayê kurdistanê bikin û ji wir ve derbeyekê li kurdan bixin, wê ev derbe bûba derbeyek ku hem li şoreşa rojava ketiba, û her wusa wê bûba derbeyek jî ku li hemû civate kurd û deronîya wê ketiba. Weke ku çawa ku bi şoreşa rojava re KObanê bûbû navenda xweşbînî dilşahîyê bo kurdan, di xwestin ku bikina navend dilşikeştinê jî bi wan hêrîşan re. Bi vê armancê, êdî giranî didane hêrîşên li Kobanê. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku di temenê hêrîşên ku li kobanê dibûn de gelek armanc bi hevdû re û di nava hevdû de hebûn.

Lê ev jî hebû ku li kobanê kurdan serkevtinek bidest xist, ew jî wê bûba serkevtina hemû gelên herêmê. Wê êdî ev modela rojavayê kurdistanê a rêveberîyê wê li rojhilat bi awayekî vekirî bihata ditin û fahmkirin. Ev jî, wê temenê şîyarbûnaka mazin bi fahmkirinê re di nava xalkên herêmê de bide çêkirin. Ev jî, weke aliyê din ê bi serkevtina şoreşa rojavayê kurdistanê re ku mirov wê bêne ser ziman bû. Ji xwe, bo ku ew şîyarbûn di nava wan gelan de çênebê, ew hêrîş bi şitt li kurdan herêmên wan dibûn. Piştî 15´ê êlûnê êdî bi vê armancê pêvajoyek nû ya pirr bişitt ya hêrîşkirinê li KObanê û bigiştî li rojayê kurdstanê dane destpêkirin. Her wusa, di rojên ku ev hêrîşên bi şitt li Kobanê û rojavayê kurdistanê dane destpêkirin, 49 karkerên balyozxaneya tirk jî hat gotin ku DAÎŞ´ê «redest» kirina. Piştre, li ser van «berdanan» re hat nîqaşkirin ku «levkirinek» di nava hikimeta AKP´ê û DAÎŞ´ê de bo berdenan bûya. Di rojên ku bişitt DAÎŞ´ê hêrîşî kurdan kirin de ew berdan bûn. Berî vê hêrîşa bişitt, hêrîş herêmên başûrê kurdistanê ên weke şengalê hatibû kirin û bi deh hezaran kurdên êzîdî ji herêmên wan hatibûbûna derkirin. Bi deh hezaran kurdên êzîdî kiribûbûna goçber ji herêmên wan. Bi vê yekê re, wusa dihizirîn ku derbeyek li deronîya kurdan xistibûn. Ji xwe piştî vê rewşê re hîç dem winda nekirin û bidest hêrîşkirina li Kobanê kirin. Êdî pêlên hêrîşan li Kobanê dane destpêkirin. Di vê temenê de, bi hêrîşên li Şengalê û goçberkirina kurdên êzîdî re pêş xwestibûn ku derbeyekê li deronîya civate kurd giştî bidin. Ew derbe li deronîya civate kurd dabûbûn jî. Piştre li ser wê derbeye ku li deronîya civate kurd bigiştî dan, êdî bidest pêlên hêrîşên li Kobanê kirin. Bi wê rê jî, hêrîşên mazin birina bi ser herêmên başûrê kurdistanê ên weke kerkûk, tûzxûrmatû, xanaqîn, maxmûr û hwd jî. Yanî, di vê temenê de hêrîşeka ku pêşî ji deronîyê destpêkirin û piştre bi wê hêrîşê giranî dane ser hêrîşên leşkerî ên li kurdan. Bi vê rengî, hêrîş bi plan hatibû kirin.

Di nava rewşek bi vî rengî de, bo ku bi hêrîşên leşkerî ancamê bidest bixin, pêşî xwestibûn ku deronîya kurdan bi wan hêrîşên weke li şengalê û goçberkirinê bidina şikandin. Wusa hizirkiribûn ku piştî şikandina deronîyê wê şikandina leşkerî jî bi xwe re bêne. Heta roj me jî, teorîsyenên ku stretejiyên leşkerî çê dikin, di vê temenê de stretejî dane kifşkirin. Li gorî vê mantiqê jî, di temenê ku pêşî deronîyê bişikênin û piştre hêrîşên leşkerî li ser wê şikandina deronîyê re bidina destpêkirin, pêvajoyek hêrîşkirinê ji Şengalê dan destpêkirin û bi wê re xwestin ku li Kobanê bi hêrîşên leşkerî ancamê bidest bixin. Ji van aliyan ve divê ku mirov fahm bike ku ev yek bi stretejiyên leşkerî û bi plan hatina kirin. Ji xwe, piştî ku pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ên 15´ê êlûnê ku dabûbûn destpêkirin, rejima tirk derîyê xwe bi tememî vekiribû û i bendê goçberîyek mazin ku bi sed hezaran kurd ji rojava werina bakûrê kurdistanê bûn. Heta ku rojenemayên tirk jî, di vê temenê de nûçe çê dikirin. Di gotin ku "bi sed hezaran goçber li ser sînorê sûrî cîvîyana". Lê ev derew bûn. Ev tenê, di temenê plankirina xwe ya şer dihanîn ser ziman. Bi vê re jî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî ku pêlên hêrîşê li ser Kobanê û rojavayê kurdistanê destpêkirin, kurdên bakûrê kurdistanê jî herîkîbûn ber sînorê Kobanê li Pîrsûsê´. Hêzên rejima tirk, di cih de biryar dan ku pêşîya wê herîkîna kurdên bakûrê Kurdistanê a ber sînorê kobanê li Pîrsûsê bidina sekinandin. Bo vê yekê jî, bidest hêrîşê li gelê kurd ku li Pîrsûsê li ber sînor cîvyabû kirin. Piştre, li ser çapameniyê re jî, bo ku wê civîn û herîkîna kurdan a li ser sînorê Kobanê li Pîrsûsê "krimînalîze" bikin jî, digotin ku "xwepêşandêr, çekan li dijî leşkeran bikardihênin." Bi wê re jî, sîyesetmederên tirk ên weke Bilant arinc derdiketina berçapameniyê û di gotin "şov dikin." Bi van gotinan, dixwestin ku pêşîya wan bertekên kurdan bigrin û ser wê piştgirîyê ji berçavên rayagiştî binûxûmênin.

Pêlên hêrîşê ên ku di 15´ê êlûnê de li kobanê destpêkriibûn, teybetmendîya wê ew bû ku rejima tirk jî bi destpêkirina hêrîşan re di nava xwe de û bi rayadarên emerikî û ewropî re nîqaş dikir û ji wan dixwest ku ew "herêmek tampon" li nava sînorê rojavayê kurdistanê de bide çêkirin. Bo vê yekê, dixwestin ku wan hêrîşên DAÎŞ´ê bide zêdetir kirin û piştre di berdewam hêrîşan de weke ancamaka hêrîşan ´herêmek tampon´ li herêmê bide avakirin. Di vê temenê de, êdî ku bi hêzên xwe rejima tirk ket rojava de û li gorî xwe herêma tampon avakir, êdî wê statûya kurd a li rojava û rêveberîya ji holê ra kiriba. Bi wê re jî, wê şoreşa rojava tafisandiban. Çend ku di çapameniyê de dihat nîqaşkirin ku di nava DAÎŞ´ û hikimeta AKP´ê de "hevkarîyek" heya jî, piştre bi pêşveçûnên ku dibûn, dihat ditin û piştrastkirin ku ji wê zêdetirî hebû. Leşkerên tirk ên ku bi teybet hatibûbûna perwerrdekirin, di bin navê DAÎŞ´ê de derbasî rojavayê kurdistanê dibûn û bi kurdan re şer dikirin. Yanî, di vê temenê de DAÎŞ, bi navê xwe re dibû weke rêxistinek "parawan" ku di bin navê wê de rejima tirk hêzên xwe ji sînor derbas dikir û hêrîşî kurdên rojavayê kurdistanê dikir bû.

Di vê temenê de divêê ku mirov vê yekê jî bibêje ku kurdan û tevgera azadîya kurd li bakûrê kurdistanê pêvajoyek "çareserîya demokratik" dabûbûn destpêkirin. Li gorî vê pêvajoyê, wê gav bi gav pirsgirêka kurd bi rêyên aşîtîyane bihata çareserkirin. Kurdan, ji aliyê xwe ve gelek gav avêtin. Lê rejima tirk, ti gav neavêtin. Ev pêvajoya ku kurdan li bakûrê kurdistanê dabûbû destpêkirin, bo rejima tirk bûbû pêvejoyek ku rejima tirk di

temenê hêrîşên rojavayê kurdistanê de bikardihanî. Di vê temenê de divê ku mirov çavekî li rengê pêşketina wê **pêvajoya ku birêz Ocalan dayî destpêkirin jî bixe**..

**- Pêvajoya çareserîya demokratîk**, di dema ku destpêkir de, hêvîyeka mazin kir dilê gelê kurd de. Ew hêvî jî, ji ber ku birêz Ocalan di nav de bû û wî dabû bû destpêkirin bû. Pêvajoyê destpêkir. Lê ji wê dema destpêkê ya newroza 2013´an û heta roja me çi bû? Ev pirs, dema ku em hewl bidin ku bersivê bidina vê pirsê, emê tiştekî nebînin. Pêvajo, ji destpêkê heta roja me, "yek-alî" hatîya meşandin ji aliyê aliyê kurd ve. Di destpêkê de, rayadarên dewlet, weke "lê xwedî derkevin" rewşek dane nîşandin. Lê ew rewşa weke ya ´lê xwedî derketinê´ ku dane nîşandin jî, bi armanca ji wê bo xwe sûdbigrin bû. Lê ji wê rewşê û pê de, rewş ne guharî. Dewletê, temenê ´pêvajoyê´ ê destûrî û hwd, çênekir. Hemû hevdîtinên ku birêz Ocalan kirin jî di rewşeka "dervî destûrê" de kir. Rayadarên dewletê û hikimeta AKP´ê nêzîkî destpêkirina muzakareyan nebûn. Hertimî, bi mijulkirinê pêvajo bi rêve birin. Her ku kurdan, dixwest ku temenê bi destûrî bê çêkirin jî, kurdan ti bersiv negirtin. Ji radestkirina mafên kurdan ve û her wusa bi wê re bo statûya kurdan ti gav ne hatina avêtin. Hê dewlet, oparasyonên xwe ên sîyesî li qada sîyeseta kurd dike û sîyesetmederên kurd digirê û diavêje zindanan. Dewletê, nûha rewş kirîya rewşekê de ku ne dibêje ku min bi dawî kir û ne jî gavan diavêje. Yan rewşa pêvajoyê, di vê rewşê de, weke ku hatîya û xitimî ya. Birêz Ocalan, di hevdîtina berî vê hevdîtinê de, gotibû ku "dewletê pêvajo ne red kirîya û ne jî bi dawî kirîya". Bi vî rengî, nûha jî, li ser vê rewşê dewleta tirk li gorî xwe sîyesetê dike. Yanî vê rewşê bikardihêne. Dixwezê ku bo hilbijartinan jê sûdbigrê. Gera Birêz Berzanî bixwe jî, di temenê qatkirina sîyeseta kurd de, dixwezê ku bikarbêne û bi vî rengî jî sûdbigrê. Weke ku çawa ku salên 90´î de ´hizbil.kontra´ birêxistin kirin û bi kurdan re dane şer kirin. Nûha jî, li ser sîyesetê re, ku kî dijberîyê ku li tevgera azadîya kurd dike, dixwezê li hevdû bide hevdû û bi wan di syesetê de hin rêxistinna bi vî rengî ava bike. Di nava rewşeka demokratikî de avakirina partîyan ne xelat a. Lê ku li ser temenê dijberîya hin rêxistin û partîyên din ên kurd ku ji nava kurdan ava bikin, ew ji rewşeka demokratîkî zêdetir dibe rewşeka ku bi wê dihê xwestin ku kurd û sîyeseta kurd bi wê were qatkirin û bi wê re êdî li gorî xwe bi rêve bibin a.

Di vê pêvajoyê de, gelê kurd bi girseyî ku xwepêşandinên demokratikî dikin jî, rastî hêrîşên hêzên dewleta tirk tên. Heta nûha, bi sadan xwepêşandinên gelê kurd bûna û rastî mudaheleya hêzên dewletê hatina. Dewletê, bi wan mudahaleyan xwestîya ku dengê gelê kurd bide birrîn. Yanî, naxwezê ku dengê gelê kurd derkeve. Ev rewş xwe di zimanê rayadarên dewletê de jî dide dîyar kirin. Minaq, dema ku rayadarên dewletê derdikevina berçapameniyê û ankû ku dinivîsênin, dibêjin ku "win bahse azadîya ocalan bikin wê pêvajo bixitimê", "win, nûha di mafê perwerdeya bi zimanê dayikê de isrer bikin wê di pêvajoyê de xitimandinê bixwe re bêne", "win, xwepêşandinan li darxin, wê pêvajo têkherê." "Win, gotinên dervî dewletê bêjin, wê pêvajo bişikihê.", "win, bahse xweserîyê bikin, wê pêvajo ber bi dawîbûnê ve herê û xira bibe.", û hwd, bi vî rengî bi sadan gotinên rayadarên dewletê hena ku bi wan dixwezin ku pêşîya kurdan bigrin. Bi gotinaka din jî, dixwezin ku dengê kurdan bi birrin. Ev kirin û gotin hemû jî, di bin navê "xesasîyeta" pêvajoyê de dihên kirin û gotin. Ev ´xesasîyeta´ pêvajoyê, wusa dihê bikarhanîn ku kurd, bi wê werina bêdengkirin. Li ber kirin û kiryarên dewletê gotinê nebêjin. Doza maf û statû û xweserîya xwe nekin. Bi vî rengî pêvajoya kurdan bi vê

gotinê dihê girtin. Kurd jî, ji ber wê xesasîyeta wan ya pêvajoyê, hinekî weke li ber van gotinan bêdeng dimênin. Bi teybetî jî, sîyesetmederên kurd, vê bêdengîyê **dikin.**

Lê her çend ku bahse pêvajoyê dihê kirin jî, ji aliyê destûrî ve ti temenê "pêvajoyê" tûna ya. Nûha, em base pêvajoyê dikin û gotina pêvajoyê bikardihênin, lê ji aliyê destûrî, sîyesî û hwd ve, temenê wê nîn a û ne hatîya afirandin. Hevdîtinên ku tên kirin jî, ji ber ku temenê wan ê destûrî tûna ya, dikevina rewşeka ne asayî û ne destûrî de jî. Divê ku mmirov ji bîr nekê ku berî vê pêvajoyê li Oslo´ya ku paytaxta Norwêcê hevdîtin di nava rayadarên dewletê û ên tekoşîna azadîya kurd de bûn. Lê piştre, dewletê lingê xwe masayê xist û piştre pêla girtina sîyesetmederên kurd da destpêkirin. Parazerên Birêz Ocalan jî, di vê çerçoveyê de hatina girtin. Piştî ku dewleta tirk dawî li wan hevdîtinên li Oslo hanî û piştre, komkujiya kurdan a li Parîsê ku di wê de sê jinên ku sîyesetmederên kurd bûn hatina qatil kirin bû. Bi wê re gelek sîyesetmederên kurd, bi hin hêncetna din hatina girtin û avêtina zindanê de. Ev hemû jî, dema ku em di çeçroveya wê pêvajoyê de lê binerin, weke ku ancamna wê pêvajoyê bin bûn. Yanî, çawa ancamna wê pêvajo bûn? weke ku çawa ku bê xwestin ku bi tememî temenê hevdîtinan were ji holê rakirin û ên ku hevdîtin kirina jî, werina ji holê rakirin û ankû tûna kirin.

Em di wê demê de, rastî pêvajoyaka bi vî rengî hatin. Piştî wê pêvajoyê re, li bakûrê kurdistanê û li ewropa, kurdan bi sadan xwepêşandin bo hevdîtinan bi birêz ocalan re bi dom in li darxistin. Li Zindanan girêve birçîbûnê bû û heta 58 rojan çû. Di ancama wê de jî, bi sadan ciwanên kurd saqat jî man. Jibilî wê jî, piştî kju dewletê dawî li pêvajoyê hanî li Oslo, giranî da oparasyonên sîyesî û leşkerî li ser kurdan. Ji wê demê û pê de, bi hezaran kurd ji ber ku sîyeset kirina û gotin hanîna ser ziman, hatina girtin û nûha jî, ew jî di zindanan de na. Bi wê re jîî, divê ku em bibêjin ku dozên qirkiirna sîyesî bûn. Hê jî, didom in. Di wan dozan de bi deh hezaran sîyesetmederên kurd ên hilbijartî jî ku di nav de, hatina girtin û tên darizandin. Ev oparasyonên sîyesî ku li qada sîyesî a kurd dibin jî, hê jî didom in.

Çend ku dewlet, bahse ´pêvajoyê´ dike û vê gotina ´pêvajoyê´ bikardihêne jî, heta Nûha ti temenê wê çênekirîya ji aliyê destûrî û hwd ve. Yanî, bigotinaka din jî, pêvajo, di rengekî korsanî de dihê birêvebirin. Ji ber çi dewlet, temenê pêvajoyê bi destûrî çênekê.? Ji ber ku bo çareserkirina pirsgirêka kurd, ti plan û programên wê tûna na. Lê pêvajoyê jî, ne red dike û ne jî dibêje ku min dawî lê hanîya. BI vî rengî jî, dixwezê ku jê sûdbigrê û bi wê re ku karibê, derbeyekê li kurdan jî bixe. Di vê pêvajoyê de, di bin navê gotina ´xesasîyetê´ de jî, hewl tê dayîn ku dengê kurdan û sîyeseta wan jî bibirrin. Ev jî, weke aliyekî din, ê vê pêvajoya ku ne asayî û temenê wê ê destûrî tûneyî, dihê li berçav û ditin.

Birêz Ocalan, mirovê ku ev pêvajo daye destpêkirin a. Lê dewletê, heta nûha jî, ew di bin tecrîde de girtîya. Mafê wî yê têkildanînê hemû ji wî hatîya girtin.Birêz Ocalan, ev çend hevdîtinên ku bi wî re tên kirin, di wan hevdîtinan de, hertimî balê dikişêne ser çêkirina temenê pêvajoyê bi destûrî. Ji xwe, dema ku ew temen, newê çêkirin jî, mirov nikarê bahse ´pêvajoyê´ jî bike. Car bi car jî, hin rayadarên dewletê, derdikevin berçapameniyê û dibêjin ku "pêvajo didomê". Lê divê ku em jî bipirsin ku kîjan pêvajo didomê? Ev pêvajo çii ya? Pêvajoya ku bi hevdîtinên bi birêz Ocalan re heya, dewlet pêvajoyê rewşek wusa de digrê ku weke ku çawa li bû û dawî li hevdîtinan hanî ku dawîyê li vê pêvajoyê jî bêne. Lê di aslê xwe de, çend ku rayadarên dewletê bêjin

ku ´pêvajo didomê´ jî, dewletê weke ku ji aliyê xwe ve dawî lê hanîya jî. Lê belê, dixwezê ku di rewşeka wusa de bihêle ku "ne red bike û ne jî bihêle ku pêvajo bipêde herê û temenê wê yê destûrî çêbike. Yanî, di rewşeka wusa de, piştî ku aliyê kurd got ku pêvajo bi dawî bûya, êdî ew bidest propaganda bikin û bibêjin ku ´meyîzênin, me pêvajo didomand, lê wan dawî lê hanî´. Yanî, ev ´ne red kirin û ne gotina pêvajo bi dawî bû´ bikarbêne ji aliyê dewletê ve, hinekî jî, weke ku taktîkeka bi vî rengî jî di hundurê xwe de dihawêne.

Ji aliyekî ve, dewlet gavan navêje bo pêvajoyê, ji aliyê din ve jî dibêje pêvajo didomê. Bi wê re jî, hertimî di rewşeka kju aqil bidina kurdan de, ji kurdan re dibêjin, vê nebêjin, vê nekin, weha neçin, wusa xelate û hwd, dixwezin ku pêşîya kurdan jî bi tekoşîna wan re bigrin. Minaq, dema ku rayadarên dewletê derdikevina berçapameniyê û ankû ku dinivîsênin, dibêjin ku "win bahse azadîya ocalan bikin wê pêvajo bixitimê", "win, nûha di mafê perwerdeya bi zimanê dayikê de isrer bikin wê di pêvajoyê de xitimandinê bixwe re bêne", "win, xwepêşandinan li darxin, wê pêvajo têkherê." "Win, gotinên dervî dewletê bêjin, wê pêvajo bişikihê.", "win, bahse xweserîyê bikin, wê pêvajo ber bi dawîbûnê ve herê û xira bibe.", û hwd, bi vî rengî bi sadan gotinên rayadarên dewletê hena ku bi wan dixwezin ku pêşîya kurdan bigrin. Ev rengê sîyesetê, hin bi hin bi xwe re rengekî din ê înkarê û tafisandinê bi xwe re dihêne. Gotinên ku kurdan bikarhanîna ên di temenê ´xesasîyetê´ de, dihê xwestin ku bi wan derbeyek li kurdan were xistin. Bi wan gotinan pêşî li tekoşîna kurdan ya maf û azadiyê bigrin. Yanî, bi gotinên kurdan, derbeyê li kurdan bixin.

Herî zêde divê demê de, divê ku xwepêşandin û tekoşîna demokratikî were dayîn û pêşxistin. Bisazîbûn, divê ku were pêşxistin. Di van waran de pirr lawazî heya. Ev jî, dibe temenê di pêvajoyê de bi serneketinê. Divê ku her mirovê kurd, bizanibê ku dewlet, dixwezê ku hertimî ku bi çi rengî gotinê bikarbêne, divê ku pêşîya tekoşîna wan ya maf û azadiyê bigrê. Ji ber ku hê di înkare kurdan de isrer dike. Hê di statûya kurdan de, înkarê pêş dixe. Hê di perwerdeya bi zimanê dayikê de, rêya înkarê derdixe li pêş. Bo ku wan înkaran bide kirin jî, gotinên weke hêncet ji xwe re dibêje. Vaj wê, herî zêde, kurd jî, divê ku tekoşînê maztir bikin.**Bi** gotina ´xesasîyetê´ re, dewlet li gorî zihniyeta xwe tişta ku ji kurdan dixwezê ew a ku kurd bêdeng bibin û doza maf û azadîya xwe nekin û mafên xwe neyênina ser ziman. Di bin navê gotina ´xesasîyetê´ de, ji kurdan dibêjin, ´doza azadîya birêz ocalan nekin´, ´doza statûyê nekin´, ´ ji xwe bahse xweserîyê nekin´, ´doza perwerdeya bi zimanê dayikê nekin´, ´doza statûyê nekin´ û hwd. Bi vî rengî, bi teybetî, tiştên kurd dixwezin di nava gotinên xwe de bikardihênin ji kurdan re dibêjin doza wan nekin. Bi wê re jî,, hemû hêza xwe dikina dewrê de ku pêşîya xwepêşandinên kurdan ên ku dikin bigrin. ..

**-Ev pêvajo**, dema ku hatibû destpêkirin, bi wê hêvî dihatkirin ku pirsgirêka kurd were çareserkirin û dawî li şerê bi kurdan re were hanîn. Lê dewleta tirk dawî li şerê bi kurdan re ne hanî. Bi wê re jî, piştî ku şoreşa rojavayê kurdistanê bû, bi wê re pirsgirêka kurd û pêvajoya wê ya çareserkirinê jî ket rewş û pêvajoyaka nû de. Êdî kurdan bi serkevtina xwe ya li rojavayê kurdistanê û temenê statûya xwe ya ku li wir pêşxistin, hêvî dikirin ku bandûrê li çareserkirina pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê jî were kirin. Bi vê rengî, gelek şîrove jî hatina kirin û di wan de hatîya gotin ku wê pêşketina kurdan a rojavayê kurdistanê wê bandûrê li çareserkirina pirsgirê kurd bike. Dihat gotin

ku wê serkevtina rojava, wê pêvajoya çareserkirinê a li bakûrê kurdistanê zûtir bike. Ev şîrove ne xelat bûn. Rast bûn. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku li şûna ku bi bandûra rojavayê kurdistanê rejima tirk giraniyê bide çareserkirina pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê, pêvajo bi rengekî din xwand û kira temenê şer û pevçûnên ku bi rojavayê krudistanê re pêş bixe. Di vê temenê de bandûra pêvajoyê, xwest ku ji holê ra bike.

Pêvajoya çareserîyê ku li bakûrê kurdistanê û rewşa serkevtina kurdan a li rojavayê kurdistanê, baxtê hevdû bi hevdû re dan kifşkirin. Bandûra bandûra rojavayê kurdistanê û pêşketina rojavayê kurdistanê êdî bi awayekî vekirî di nava pêvajoya çarwserîyê a bakûrê kurdistanê de hat ditin. Bi vî rengî, êdî weke ku hat li berçav, pêvajoyek bo çareserkirina pirsgirêka kurd ku nebê nabê êdî afirî. Rejima tirk, êdî bia wayekî ew bandûra pêşketina rojavayê kurdistanê di pêvajoya çareserîyê de dît û hîskir. Çend ku gotina ´pêvajoyê´ dihanî ser ziman û digot ´pêvajo didomê´ jî û gav ne diavêtin, êdî bi bandûra wê pêşketina rojavayê kurdistanê nekarî wusa bide domandin. Ji ber ku ti serê wê de ti çareserî tunabûn. Di vê temenê de pêşketina rojavayê kurdistanê û pêvajoya çareserîya demokratik a li bakûrê kurdistanê ket nava hevdû de. Rejima tirk, di vê temenê de bo ku wê bandûrê bişikêne, çeteyên weke DAÎŞ´ê pêşxistin û dane hêrîşkirin li ser kurdên rojavayê kurdistanê. JI ber ku di serê wê de çareserkirina pirsgirêka kurd tûnabû. Hêrîşên DAÎŞ´ê ên bi alikarîya tirkiya li ser Kobanê û piştî ku kurdan bi derfetên xwe dibistanên kurdî i bakûrê kurdistanê vekirin û hêrîşên li ser van dibistanan divê ku mirov bi hevdû re di temenê zihniyetekê de hilde li dest. Nêzîkatîya li dibistanên kurdî, di temenê pêşxistina DAÎŞ´ê û hêrîşên wê ên li Kobanê de na.

Bi van pêlên hêrîşên DAÎŞ´ê ên ku di 15´ê êlûnê de li Kobanê destpêkirin re xwestin ku derbeyekê li kurdan bixin bi leşkerî. Bi wê re jî, goçberîyekê ji Kobanê û herêmên wê bidina destpêkirin li derve. Her wusa, bi vî rengî êdî temenê pêşxistina "herêmek tampon" biafirênin. Têkiliya van hêrîşên DAÎŞ´ê ên li Kobanê ên di vê demê de bi vê hizra avakirina herêma tampon a rejima tirk ve girêdayî heya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî li ser **wê bisekinê**.

**-Piştî demekê, çeteyên DAÎŞ**´ê bi piştgirîya tirkiya ji sê aliyan ve bidest hêrîşa li ser Kobanê kirin. Kobanê ji sê aliyan ve di bin hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ku tirkiya piştgirîyê dide wan de ya. Ji ber çi bi vî rengî bi şitt hêrîşî KObanê dikin? Ji ber ku dixwezin ku kobanê bidest bixin û rojavayê kurdistanê jî di fiilîyetê de bikina du-qat. Bi wê re jî, şoreşa rojavayê kurdistanê bişikênin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku bi teybetî, tirkiya li pişt van hêrîşan heya. Dixwezê ku Kobanê bê xistin û piştre li ser wê re derbeyekê li kurdan bixin. Ku derbeyek li Kobanê were xistin, wê ew derbe li hemû kurdan bê. Wê ew derbe, weke dûbarekirina Şengalê li ser serê kurdan. Bo vê yekê, di vê demê de dîsa hêrîşî Kobanê dikin. Şoreşa rojavayê kurdistanê jî, ji Kobanê destpêkir. Bo vê yekê, ji vê aliyê ve hêrîşên li Kobanê, aliyekî wan ê din ê sembolîkî jî heya. Bi vê re jî, ku derbe li Kobanê were xistin, wê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê jî, ji hin aliyna ve were ji holê rakirin. Bo vê yekê, giranî didina ser hêrîşên li ser Kobanê.

Kurd, divê ku ji her aliyê ve li dora kobanê bibina yek. Ciwanên kurd, ji bakûrê kurdistanê, biherikina Kobanê. Ji hemû beşên din ên kurdistanê divê ku ciwanên kurd biherikina Kobanê û li rûmeta xwe xwedî derkevin.Li Bakûrê kurdistanê jî, divê ku di vê demê de bi girseyî biherikina bi ber sînor ve. Ciwanên kurd, derfetê nedina

derbaskirina çeteyên DAÎŞ´ê ji van aliyên sînor ve.

Her wusa, divê demê de ji nû ve ji sê aliyan ve dayîna hêrîşkirinê çeteyên DAÎŞ´ê li ser Kobanê û nîqaşên ku rejima tirk ji nû ve dane destpêkirin ên çêkirina "herêmek tampon" bi hevdû ve girêdayî na. Di destpêka Mudaheleya li Sûrî de jî, rejima tirk, planaka wê ya bi vî rengî hebû û hanîbû rojevê. Piştre, li ser bertekan, ew nîqaşên wê dabûbûn sekinandin. Lê piştre, "pêvajoya çareserîyê" hat dayîn destpêkirin li bakûrê kurdistanê. Rejima tirk, li şûna ku di wê pêvajoyê de gavan biavêje, bidest çêkirina qarakolan kir, herêmên kurdan ji nû ve bi leşkerî kir. Ev pêvajoya çareserîyê, rejima tirk bo van tiştan bikarhanî. Yanî, bo ku di van waran de, ancamê bidest bixe, gotina "pêvajoyê" bikardihêne. Her wusa, di demeka bi vî rengî hanîna rojevê ´avakirina herêmek tampon´ divê ku mirov bi vê ve girêdayî hilde li dest. Wusa ji van pêşveçûnan dihê fahmkirin, ku rejima tirk gotina ´pêvajoyê" bi awayekî taktîkî di van temenan de îstîsmar dike û bikardihêne.

Di vê demê de hanîna rojevê ´avakirina herêma tampon´ û ji nû ve zêdebûna hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li ser Kobanê bi hevdû ve girêdayî na. Divê ku mirov van bi hevdû ve girêdayî hilde li dest. Her wusa, di temenê ´dagir´kirina rojeva de, ji destpêkê ve hizrên rejima tirk ên weke avakirina herêma tampon hebûn. Nûha jî, di vê temenê de nêzîkî vê dibin. Di vê temenê de divê ku mirov vê jî bibêje ku bi hêrîşên li ser Kobanê re ancamê bidest bixin, wê li ser wan ancaman re temenê avakirina ´herêma tampon´ bidest bixin. Ji xwe, bo ku wê bikin û wê herêma tampon ava bikin, di vê demê de zêdeyî dane hêrîşên li ser Kobanê. Herêmek kurdan ên weke kobanê li rojavayê kurdistanê, heta ku ji destê newina derxistin, wê zor bê ku herêmek tampon çê bikin. Bo ku temenê herêmek bi vî rengî çê bikin, ev hêrîşên bi destê DAÎŞ´ê tên zêdetirkirin li kurdan. Divê ku mirov vê yekê di serî de bibînê. Bo vê yekê, divê ku mirov bibêje ku hasabên mazin li ser xistina Kobanê hatina kirin. Kurd, divê ku vê yekê bibînin û li Kobanê xwedî derkevin. Divê ku parastina Kobanê xort bikin. Ji her aliyê ve kurdistanê ji hemû aliyan biherikina Kobanê û di parastina wê de cih bigrin. Ku Kobanê bikeve, wê ev bê temenê hêrîşên nû li başûrê kurdistanê jî. Rayadarên başûrê kurdistanê jî, divê ku vê yekê bibînin.

Î ro, baxtê hemû kurdan û herêmên kurdistanê bûya yek. Li herêmekê kurd serkevin, bandûra wê li hemû beşên din xwe dide nîşandin. Her wusa hêrîşên li beşek kurdistanê jî, bandûra xwe li beşên din ên kurdistanê didina nîşandin. Ji van hêrîşên dawî ên li ser Kobanê mirov fahm dike ku hêrîşên li ser başûrê kurdistanê jî, weke planaka ku bi wê dixwezin ku hêzên kurd bo parastin û şerkirinê li qadaka berfireh bidina belavkirin û bi wê re jî, êdî bi hêrîşên şitt ên weke ku nûha li Kobanê dikin, ancamê bidest bixin. Aliyekî van hêrîşên li ser başûrê kurdistanê ê bi vî rengî heya. Yanî, hêzên ku van stretejîya şer ya bi kurdan re kifş dikin, bi taktîkên leşkerî dihizirin û van hêrîşan li herêmên kurdistanê belav dikin.

Em dikarin van hêrîşên ku ji nû ve li ser kantona Kobanê hatin zêdekirin, bi armanc û nîqaşên bi minasebeta ´avakirina herêmek tampon´ a rejima tirk ve girêdayî hildina li dest û fahm bikin. Bi hevdû ve girêdayî ya. Em nikarin ji hevdû cuda werênina ser ziman. Her wusa, ku bi van hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê ên dawî ancamê bidest bixin, êdî wê di fiilîyatê de hewl bidin ku herêmek tampon biafirênin. Lê bo avakirina herêmek tampon jî, di serî de divê ku Kobanê were şikandin. Li vir, di serî de, divê ku mirov di vê temenê de van hêrîşên dawîyê ên DAÎŞ´ê ku ji sê aliyan ve dibina biser kobanê de

fahm bikin. Rejima tirk jî, li şûna ku pêvajoya çareserîyê di temenê çêkirina aşîtîyeka herêmî de pêş bixe, weke ku çawa ku agirbestên ku berê PKK´ê di denezendin weke firsand didîtin û bi wê re giranî didane ser li kurdistanê bicihkirina leşkerî, nûha jî, bi heman mantiqê pêvajoya çareserîyê jî, bi vî rengî li gorî xwe bikardihênin. Yanî, li şûna ku di vê pêvajoyê de gavan biavêje, bi vî rengî pêvajoya çareserîyê jî bo armancên xwe yên şer bikardihêne. Zihniyeta ku agirbestên berê ên PKK´ê ji xwe re weke firsand didît, î ro bi heman rengî ´pêvajoya çareserîyê jî weke firsand dibînê ku bi wê derbeyekê li kurdan bixe. Bo ku zihniyet ev a, êdî gavan navêjin û bi gotinên mijulkirin û xapandinê pêvajoyê bi rêve dibin. Çend ku aliyê kurd, van hasabên rejima tirk dibînê jî, dixwezê ku bi tekoşînê ancamakê bo biratîya gelan ji vê pêvajoyê derxê. .. **Weke ku Birêz Ocalan** jî, di hevdîtina xwe ya 22´ê êlûnê a bi parezerê xwe Mazlûm dinc re kir de ku got, "Hikimet, nêzîkî destpêkirina muzakerayan nabîn.".

Ev ne nêzîbûna hikimeta AKP´ê li Muzakereyan, helwesta hikimetên tirk ên berê jî ya. Di vê temenê de gotinên weke "gotinên baş" car bi car bilêv dikin û weke ku "hêvîyekê" dixwezin ku çê bikin û çêdikin û piştre êdî li gorî plana xwe ya şer û hwd didina domandin. Yanî, jidil tevnegerihin. Di temenê xapandin û mijulkirinê re nêzî dikin. Pêvajoya bo çareserîyê ku Birêz Ocalan dabûbû destpêkirin, temenekî mazin bo çareserkirina pirsgirêka kurd afirand. Her wusa, bo yekî ku li çareserkirinê bihizirê û xwediyê nîyet û projeya çareserîya aşîtîyane bê, pêşketina rojavayê kurdistanê jî derfetek mazin afirand. Her wusa, pêşketina rojavayê kurdistanê, bi vê rengê temenê çareserkirina pirsgirêka kurd bi awayekî vekirî pirr baş afirand. Ev temenê ku bo çareserkirina pirsgirêka kurd ku bi pêvajoya çareserîyê ku birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin û rewşa pêşketina rojavayê kurdistanê ku afirî, î ro bi hêrîşên DAÎŞ´ê re li wê temenê hêrîş dihê kirin. Di serî de divê ku mirov vê yekê bibînê û kifş bike.

Tirkiya, di destpêka pêvajoya mudahaleya li Sûrî de dijberî li kurdan dikir. Di destpêka pêvajoya mudahaleya li Sûrî de kurdan bo ku yekbûnekê di nava xwe de çêbikin û helwesta xwe bikina yek, li hewlêrê bi hevdû re civîyan. Di wê civînê de levkirin û desteyek bilind bi navê ”desteya bilid a kurd” avakirin. Wê hemû sazî û partiyên kurd di nava wê de cihbigirtan û wê bi wê yekê bi hevdû re yek-helwesta bidina nîşandin. Di 11´ê temûza di 2012´an de weke ancama wê li hevdû civîna partî û sazîyên kurd ”paymana Hewlêrê” hat mohrkirin. Lê tirkiya jî, ji wê levkirina kurdan pirr aciz bû û acizîya xwe hanî ser ziman. Heta ku bi gotinên hêrîşkarî ji Mesud berzanî re digotin ”heta duhû serokê aşîrekî bû î ro bûya serokekî ku baxtê herêmê dide kifşkirin.” Ev rengên hêrîşan, wê piştre bidomê li kurdan. Piştî vê levkirina kurdan re, Ahmed Dawutoglu bixwe çû hewlêrê bo ku nîfaqê bike nava kurdan û wê levkirina xira bike. Bo vê yekê, partiyên ku xwe weke partîên ENKS´ê bi nav dikirin û bi wan re hevdîtin kir û ji wan xwest ku li dijî PYD´ê helwestê bidina nîşandin. Her wusa, bi wê re bi sînor nema û bo ku PYD´ê nebê serdest, divê ku ew nexwedî bandûr bê di nava hevdîtinan de. Çend partîyên kurd ku xwe li vê rewşê razandin, çend ku di îmzakirina paymana hewlêrê de jî cihgirtibûn, wê di temenê dijberî de li gorî tirkiya tevbigerihin û wê xalên peymanê binpê bikin. Ev pêvajoya pêşî ya têkbirina wê peymana hewlêrê bû. Bi vê yekê û rengê pêşîya ketina wê ya merîyetê de dihat girtin. Bi vê rengê ku weke pêwîstîya paymane hewlêrê bû û hatibû avakirin ”desteya bilind a kurd, hatibû bêerkkirin. Piştî vê yekê re ti bandûra vê sazîya kurd ne hat hiştin. Partîyên kurd ên ku xwe dibin sêwane

MGRK´ê re civandibûn jî, heta dawiyê li wê peymanê xwedî derketin. Armanca wê xwedî derketina wan jî ew bû ku yekîtîyekê di nava hêzên rojava de çêbikin û wê biparêzên.

Yekîtîya kurdan, di wê demê de bi civîna di pêşengîya Mesud Berzanî de destpêkir û bi çêkirina ´peymana hewlêrê bi ancam bû. Lê di roja ku ”peymana hewlêrê” hatibû mohrkirin, wezîrê karê derve ê tirkiya Ahmed Dawutoglu çûbûbû Hewlêrê û birayadarên başûr re hevdîtin çêkiribû û piştre bi hin partîyên ku di nava imzakirina wê peymane hewlêrêr de cihgirtibûn ên weke ”el-partî´ û ´partîya azadî´ û hwd re jî hevdîtin çêkiribû. Piştî van hevdîtinan rayadarên va partîyên kurd ên bi dawutoglu re di wê demê de li Hewlêrê û pê de, êdî ev partî bi awayekî bidest dijberîya kurdan û partîyên din ên rojavayê kurdistanê kirin. Di vê temenê de, êdî piştre, ew ”dijberîya” ku dawutoglu xwestibû ku di nava wan partîyên kurd de çê bike êdî çêkiribû. Piştî wê re, rayadarên başûrê jî, xwe di temenekî dijber de bi pozisyon kirin. Çend gotinên weke ”em birayarên xwe ên rojavayî dihizirin” jî digotin jî, lê di piretikê de di pozisyonaka dijber de xwe girtin. BI heman rengî, partîyên weke ´el-partî´ û ´azadî´ û hwd, bi çend partî û komikên din ên piçûk re di bin navê ENKS´ê de hiştin. Van jî, di temenekî dijberî pêşketinên rojavayê kurdistanê de xwe girtin. Heta ku piştî wê re dema ku rojavayê kurdistanê xweserîya denezend û avakir jî, van partîyên ”kurd” jî, xwe di temenekî dijberî wê de bi pozisyon kirin û gotin ”em vê rêveberîyê nasnekin” weke ku çawa ku rejimên herêmê ên ku kurdistan dinava wan de hatîya qatkirin digotin.

Ev pêvajoya hewldanên bo yekîtîya navxweyî, wê heta dema ´amedekarîya bo lidarxistina kongira netewî a kurd û hwd, wê bidom in. Piştre, çend ku peymana hewlêrê weke ku ´mir´ û êdî ne hat hanîn li cih jî, piştre hewldanên zindîkirina wê domîyan. Li ser van hewldanên zindîkirina wê bi xabatên bo amedekarîya li darxistina kongiran netewî a kurd re divê ku mirov li ser bisekinê. Li hewlêrê, kurdên rojava bi herdû meclîs û hemû partîyên xwe re li hevdû kirin ku bi hevdû re herina civîna cenewrê a duyem. Ev pirr rast a û di cih de bû. Rojavayê kurdistanê, beşa kurdistanê ya herî piçûk û ku giringîya wê hem bo başûrê kurdistanê û bakûrê kurdistanê jî heya. Ji gelek aliyan ve kurdan, heta nûha pirr zêde hanîn ser ziman. Lê ji aliyê pêşketina rojava ve ku wê em li başûr û bakûrê kurdistanê binerin, emê bi giringîyeka mazin wê bibînin. Li vir, berî hertiştî, wê ji aliyê pêşketina, civatî, hevbeşbûna kurdistanê, di temenekî yekîtî de li rojhilat giştî kirina sîyesetê a kurdan û hwd ve, pirr giring a. Ji ber vê yekê, giring a. Tirkiya, ji aliyekî ve pirr giringî didayê de. Ew jî, ew bû ku şerê xwe yê li kurdistanê li bakûrê kurdistanê ê bi kurdan re li ser wê re barî cihane arab jî bike. Ji vê aliyê ve pirr zêde li ser disekinê. Ji xwe, di dema şerê navxweyî de, tirkiya hemû rêxistiniya xwe li ser wê re kirîya. Bi wê yekê, şovenistên arab, bi rêxistin kirina û ku li ser olê re bê û ankû li ser aliyên din re li dijî kurdan sor kirîya û daye şer kirin.

Bi vê rengî, derketîya ber kurdan. Lê rojava bo kurdan, pirr giring a. Bi teybetî, ev herêm hemû ji serêkahniyê bigrê heta ku digihijê Rimêlan, Til-koçer, girê-sipî, afrîn, Kobanê, û hwd, bi herêmên xwe ên din re bi civate kurd, ji aliyê çandî, civatî û dîrokî û pêşketina ve jî giring a. Bo vê yekê, divê ku mirov pirr zêde li ser wê bisekinê. Li kurdistanê, di demên berê de, dema ku dihat gotin "herêma botanê", di nava vê herêma bakûrê kurdistanê de rojavayê kurdistanê jî bigiştîya xwe hatîya hasibandin. Di demên Eyûbîyan de jî, di demên berî eyûbîyan de jî û di demên piştî Eyûbîyan de jî ev wûsa bûya. Î ro, dema ku em li rewşa aşîrî ya bakûrê kurdistanê binerin, emê bibînin ku

pirranîya piştî ku sînor di nava rojava û bakûr de hat xizkirin, ew aşîrên kurd jî bûna qat. Hinek li vî aliyê sînor mana û hinek li aliyê din ê sînor mana.

Rojavayê kurdistanê, ji ber ku wê giringîya wê, tirkiya giringî da wê qatkirina sîyesî û li dijî meclîsa rojavayê kurdistanê ya gel, bi piştgirîya rêveberîya başûrê kurdistanê ENKS´ê hat ava kirin. Armanc, ji wê ew bû ku wê qatbûnê di nava kurdan de bi sîyesî çê bikin. Ji xwe, ku ji aliyê sîyesî ve hatina qatkiirn, êdî wê ji aliyê din ve jî karibin bi hesanî bi rê ve bibin. PIştre jî, xwest in ku li ser wê qatkirina sîyesî re êdî temenê bêstatû hiştina kurdan biafirênin. Li ser wê qatbûnê re, beşek ji wê tevlî muxalefeta Sûrî ku ji çend şovenistên arab pêk dihat hebûna kurdan jî, înkar dikir kirin. Ew muxalefeta ku kurd, tevlî kirina, bi ti awayê hebûna civate kurd û navê wê nasnekê. Li dijî hebûna civate kurd a bi wê zihniyeta di temenê de ku bi pê hatîya ava kirin. Ji xwe, bo ku wê înkarê li ser serê kurdan bidina domandin û kurdan bêstatû bihêlin, êdî dixwestin ku kurd tevlî muxalefetê bibin û herina civîna cenewrê a duyem. Ji xwe, bi wê re jî, ji kurdan dixwestin kurd di civîna cenewrê de, doza mafê xwe nekin û pirsgirêka kurd newênina ser ziman. Bi wê mantiqê, tevdigerîyan û ji kurdan dixwestin.

Ev rewş, dihat wê wateyê ku Lozane, ku di sale 1923´an de hatibû mohrkirin û kurd di wê de hatibûbûna bêstatû kirin û piştre şerê wê bêstatûkiirnê bikurdan re hat dayîn, dihat xwestin ku di civîna cenewrê de ew were dûbare kirin. Ji xwe, hemû hêzên ku dixwestin ku kurd divê ku di bin sêwane ´muxalefetê´ de herina civîna cenewrê û li wir pirsgirêka kurd newênina rojevê, ên ku xwestin ku kurd di wê rewşa xwe ya "bêstatû" de werina hiştin bûn. Ne dixwestin ku kurd, bigihijina statûya xwe. Bo vê yekê jî, gelek şer jî bi kurdan re kirin. Hemû ´çeteyên cebetil nasr´ û ´çeteya dewleta îslam´ê ji ber vê yekê bi piştgirîya tirkiya û hin hêzên din, heta roja, hêrîşên xwe li rojavayê kurdistanê didomên in. Hê jî, ev çete, hêrîşî kurdan dikin. Sivîlan qatil dikin. Û Mirovan diravênin, êşkence dikin û dikujin. Bi destê van çeteyan, gelek mirov hatina ravandin bo xwestina "fîdyê" jî. Mirov ravandina û piştre ji malbatên wan pereyek mazin xwestina. Ku derfeta malbatê nebûya ku bidin jî, ew mirov qatil kiirna.

Kurd, wê di bin sêwane muxalefeta bi vî rengî ku heta roja me jî komkujiyê têne serê kurdan, wê çawa çûban civîna cenewrê? Ev ji wan dihat xwestin. Biryare kurdan a bi hevdû re, çûyina civîna cenewrê a duyem rast a û di cih de bû. Divê ku dervî wê li ti rêyên din jî, newê hiizrîn. Desteya bilind a kurd, zindî kirin. Bi wê yekê re, hemû partîyên kurd ên rojava, herina nava civate xwe û li gorî wê û rastîya wê û xwestên wê gav bigavêjin û tevgerîyê bikin. Civate kurd, statûya xwe dixwezê. Ew jî, di wê temenê de, weke prensîbekê, divê ku bi hevdû re bin û li gorî hebûna civate kurd û nirxên wê tevbigerhin û mafên civate kurd biprêzên. Divîyabû ku wê qatbûnê jî ji nava xwe derbas bikin. Divîyabû ku herdû meclîsan jî bikina yek û din meclîsekê de êdî tevbigerihin. Hizir û ramanên wan, dibêt ku ji hevdû cuda hebin. Lê ev divîyabû naba sedema wê qatbûnê ku zirereka mazin dide civate kurd. ..

Civate kurd, gelek êş û elem kişandin. Gelek komkuji hatina serê wan. Di vê dema ku min ev dihilda li dest de, rastî salwegera komkujiya roboskî dihat. Kurd, bo ku vê dîrokê û temenê komkujiyên ku dihên serê wan, bo ku ji holê ra bikin, giringa ku statûya xwe bidest bixin. Ku statûya bidest nexin, wê temenê li ser wê ev komkuji tên û dibin û tên serê kurdan jî wê ji holê ranebê. Bo ku temenê wê ji holê rabê jî, bêşert û merc, divê ku kurd statûya xwe bidest bixin. Kurd, di vê demê de, divê ku hemû qatbûn, cudahîyên ku zirerê didina wan û civate wan li şûn xwe bihêlin. Divîyabû ku meclisên

xwe bikina yek û bi hevdû re di temenê destûrekê de divê ku tevbigerihin. Ew jî, ew bê ku parastina civatî û nirxên wê û pêşketina wê bê. Li rojavayê kurdistanê, divîyabû ku navendek sîyesî heba. Ji wê navende, hemû biryar werina girtin û gav werina avêtin. Di vê temenê de, gavên ku li hewlêrê hatina avêtin, giring in û dîrokî na. Divîyabû ku herkesekî, wê xort bikira. Di wê temenê de, êdî gavên xwe biavêje. Divîyabû ku wê levkirinê bike destpêk ku hemû qatbûnên sîyesî ku di nava civate kurd de hatina afirandin, ku werina ji holê rakirin. Bi hizir û ramanên cuda sîyeset dihê kirin. Lê ti carî destûr nayê dayîn ku civat bi wê were qat kirin. Hizir û ramanên cuda, di aslê xwe de, ku bi aqilekî baş werina ditin û bikarhanîn, wê ciherengiyekê di temenê pêşketina civatî de jî bi xwe re bidina çê kirin. Ev, temenê pêşketineka demokratîkî ya civatî jî ya.. Lê weke destûreka bingihîn divê ku ne di temenê qatkirina rewşa sîyesî û bi wê re civatî de bin.

Ji her aliyê ve, ku leşkerî bê, sîyesî bê, û her wusa di hemû rewşên din de, divîyabû ku hêzên wan û rewşên wan yek ban. Wê hingî, kariban, bi hêza civatî jî tev bigerihin. Wê hingî, karibin hêza xwe ya civatî biparêzên û bikarbênin. Bo yekê, levkiirna li hewlêrê, divîyabû ku temenê wê were xorttir kirin û pêşxistin. Divîyabû ku ev tenê weke gav û pêpeloka pêşî werê ditin û gav bi gav û pêpelok bi pêpelok lê were zêdekirin û pêşxistin. Bi vê yekê, yekbûna civatî ya kurdistanî were pêşxistin. Sînorên ku desthiilatdarîyên ku Kurdistan û civate kurd bi destê wan û di nava wan de hatî qatkirin, ew sînor divîyabû ku kurd ji wan bi buhurîyan hem di jîyanê de û hem jî di kirin û sîyesetê de. Ya ku gelê kurd jî, ji wan dixwest ev bû. Ya rast jî, ev bû bo civate kurd. Lê ya ku van hêz û partîyên kurd nekir jî ev bû. Bi demê re peymana hewlêrê bêerk kirin. Ne kirina fermîyetê de. Ne hanîn li cih. Di wê temenê de qatbûn kirina nava kurdan de. Vê yekê jî, kurdan zayifkir. Hêza wan şikand. Ev jî, bû temenê hêrîşên mazin ku li civate kurd bibin. Hêzên derve û ên herêmî jî li wê rewşa qatbûyî nerîn û gotin ku yekbûn di nava wan de tûna ya, nexwe ku em herina bi ser wan de, emê bi hesanî wan bişikênin. Êdî bi vê yekê re, hêrîşên mmazin hanîn bi ser kurdan de. Weke ancama têkbirina peymana hewlêrê, piştre qatbûn hat xistin nava sîyeseta kurd. Heta ku bi wê serneketinê, rejimên herêmê çûna biser hêzên kurd de û ne hiştin ku kongira netewî a kurd jî were li darxistin. Weke ancama vê jî, piştre, ji başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdistanê giştî bûn. Ew qatbûn, bû temenê wan hêrîşkirinan jî dinava kurdan de. Ya ku di serî de, ji aliyê hin partî û hêzên kurd de ne hatî dîtin û fahmkirin ku êdî nikarin bi partîyan hebûna civate kurd biparêzên. Divîyabû ku yekîtîyê çê bikin û hêzek hevbeş ya prastina civate kurd çêbikiran.

- Piştî ku mudahale li Sûrî bû û hin bi hin hat ditin ku kurdan xwe li herêmên xwe bi rêxistinkirin û rêveberîya xwe ya herêmî ya rojavayê kurdistanê ava kirin û pê de, êdî ev rêxistinên tundrew dan hêrîş kirin li ser kurdan. Ev rêxistinên tundrew ku dihên bi rêxistinkirin, hemû têkiliya wan bi Tirkiya û Îranê ve heya. Ev yek, gelek caran hatîya piştrastkirin jî. Bi teybetî, dijberîya li dijî kurdan, di temenê helwesta Îran û tirkiya de ya. Piştî ku rêveberîya xweserîya demokratik li rojavayê kurdistanê hat denezendin û piştre, ku weke sê kantonan herêm hat bi rêxistin kirin, êdî bidest û hêrîş û çûyina bi ser kurdan de bû. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştî wê re pêşxistina DAÎŞ´ê zêdetirî ket rojevê de. Li vir, bi teybetî, piştî wê re li Îraqê jî DAÎŞ bicih kirin. Li Sûrî jî û li Îraqê jî, herêmên ku DAÎŞ li wan hatîya bicihkirin jî, herêmên balkeş in. Bi teybetî, yan herêmên kurdan in û yan jî herêmên di sînorên herêmên kurdan de na. Ev jî, bi

teybetî, weke aliyekî ku bi teybetî divê ku mirov li ser bisekinê ya.

Şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re, em nikarin tenê bi navê DAÎŞ´ê re werênina ser ziman. Divê ku em bi Îranê û Tirkiya re werênina ser ziman. Ev yek, li berçav a. Ji pêvajoya ku li Îraqê li herêmên weke Musilê ku DAÎŞ dihê bicihkirin, mirov fahm dike ku hevkarîyek Îranê, Tirkiya û rejima baxdadê bi hevdû re heya. DAÎŞ, weke rêxistineka van rejiman ku li dijî kurdan didina şerkirin a. Lê Rejima Baxdadê, bi teybetî, dordora xwe gunahbar dike. Li dijî kurdan, helwesta xwe hanî ser ziman. Heta ku dema ku helwesta xwe li dijî kurdan hanî ser ziman, got ku "tirkiya jî, ji aliyê stretejikî ve bi me re di heman hizrê de ya." Tirkiya jî, li dijî kurdan, piştgirîyê dide rêxistinên weke DAÎŞ´ê ku hêrîşî kurdan dikin. Û bi wê re jî tirkiya, herêmên bakûrê kurdistanê, weke ku ji nû ve dagir bike, kirina herêmên leşkerî. Sevketîyeka mazin ya leşkerî, li bakûrê kurdistanê dike. Herêmên weke herêmên çolemergê, şîrnax, dersim, agirî, amed, Reha û hwd jî, bi sadan qareqol û ankû kaleqol li wan çêkirina.

Bi wê re jî, diçina bi ser kurdan de. Çend ku hin dordor, dibêjin ku "ev ser salekê ku li bakûrê kurdistanê şer nebûya" jî, em nikarin vê gotinê piştrast bikin. Raste, tevgera kurd, şer sekinandîya li bakûrê kurdistanê bi artişa tirk re. Ev jî, bo ku pêvajoyek çareserîyê pêşbikeve kir. Lê dewleta tirk, di vê navberê de, şer bi kurdan re ne sekinand bi kurdan re. Bi alikarîya çeteyên DAÎŞ´ê hwd, hêrîş rojavayê kurdistanê kir, Yanî, şerê xwe yê bi kurdan re barî vêderê kir. Tirkiya şerê ku li bakûrê kurdistanê bi kurdan re kêm kir û li rojavayê kurdistanê li ser rêxistinên tundrew ên weke DAÎŞ´ê û hwd re, şerê xwe bi kurdan re daye domandin. Yanî, ew şerê xwe yê bi kurdan re nedaye sekinandin. Wan hêrîşên ku li herêma rojavayê Kurdistan a Kobanê dibin, em divê ku weke hêrîşên tirkiya jî bi hasibênin. Bi teybetî, rejimên herêmê ên weke Tirkiya û Îranê ku çendî nakokîyên wan bi hevdû re hebin jî ku mijar dibe kurd dibin yek û diçin bi ser kurdan de. Dema ku em şerê Kobanê dahûr bikin, emê bibînin ku Îran û tirkiya bi hevdû re di nava hevkarîyekê de, wê piştgirîyê didina çeteyên DÎAŞ´ê û wê didina hêrîşkirin li ser kobanê.

Li Îraqê, ev ser deh salan re ya ku bomba tên taqandin. Rêxistinên ku tundrew ku wan bombayan li Îraqê ditaqênin, heta roja me bi deh hezaran sivil qatilkirina. Lê dîsa nekarîna ku serkevtinekê bidest bixin. Lê çî hikmeta ku di vê dema ku êdî hêrîşên bi bombayî jî kêm dibin, rêxistina DAÎŞ´ê bi nêzî du hezaran çeteyan re dikarê Musilê û dordora bike bin kontrola xwe de? Gelo, em dikarin, ketina DAÎŞ´ê li Musilê, tenê bi wê û şerê wê re bênina ser ziman? Na, em nikarin. Li Sûrî, bi deh hezaran militanên xwe nekarîya ku wê bike. Ev jî dide nîşandin ku DAÎŞ´ê, nekû musil bidest xistîya, DAÎŞ li musilê hatîya bicihkirin ku bidina şerkirin bi kurdan re. Weke ku çawa, li Somalî belaya "el-sabab" derxistin li holê, li Nîjarjayê belaya "boko-haram" derxistin li holê, li Filistînê belaya "hamas"´ê derxist li holê, li Afganistanê ´talîban´ê derxist li holê û ev herêm û gelek herêmên ên weke van ên cihanê ên bi belayên bi vî rengî bi dehan salan di nava rewşeka weke ya "şerê navxweyî" de hat hiştin, dihê xwestin bi heman rengî û mantiqê li Kurdistanê DAÎŞ´ were derxistin û bi kurdan re bidina şerkirin û bi wê derbeyekê bi heman rengî li kurdan bixin. DAÎŞ, hamas´a kurdistanê ya ku hatî avakirin a.

Nîşanayeka din jî bo vê, ew a ku dema ku artişa Îraqê divekişihê hemû çekên xwe di cih de dihêle û DAÎŞ wan bidest dixe. Ev jî, bi plan hatîya kirin. Îro, bi wan çekan bi kurdan re şer dikin. Bi wan çekan hêrîşî Kobanê dikin. Hêrîşên li Kobanê, hêrîşên

stretejikî na. Li pişt wan, rejimên ku bi teybetî li dijî statûya kurdan ên herêmê ên ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin hena. Bo ku kurd li herêmê, nebina xwediyê ti maf û azadiyê, bi kurdan re didina şer kirin. Rêxistina DAÎŞ´ê jî, tenê rêxistineka ku bi kurdan re şer bike hatîya bi rêxistin kirin û formula kirina. Di serî de, divê ku mirov vê yekê kifş bike. Di aslê xwe de, divê ku mirov bi teybetî bibînê û piştre baş fahm bike, weke ku çawa ku li musilê DAÎŞ hatîya bicihkirin, bi heman rengî li Musilê bi destê DAÎŞ´ê denezendina "dewleta îslamî" û bi wê re qatilekî weke "el-baxdadî" denezendina weke "xalîfe" jî, hinekî weke lingekî din ê vê plana şerê bi kurdan re dihê li berçav. Bi wê re, xwestina ku bi plan û li ser olê re li dijî kurdan bidina şerkirin. Bi van kirin û kiryaran, temenê şerê bi kurdan re afirandin. Nûha jî, li ser wê re şer dikin.

Ev şerê ku li Kobanê dihê kirin bi kurdan re, şerê jenosîda kurdan a. Di serî de, divê ku mirov vê yekê jî binxatkê û bibêje. Ev şerên ku bi kurdan re dihên kirin, em dikarin weke şerên jenosîda kurdan jî bi hasibênin û werênina ser ziman. Lê ev şerê jenosîda kurdan ku bi destê DAÎŞ´ê û hwd dihê meşandin li dijî kurdan, armanca wê jenosîda fizikî jî ya. Her wusa, kuştin û goçberkirin, weke du rêbazên şer ên ku bi destê DAÎŞ´ê dihê bikarhanîn a. Her wusa, bi wê re jî, ew jenosîda fizikî ku tirkiya û Îranê, heta roja me domandina, ku wê jî bidina domandin. Ev jî, wê çawa bibe? Ew jî, bi vê rengê dibe ku li rojavayê kurdistanê kurd şikandin, êdî piştre wê rewşa kurdan ya bêstatû hiştina wan, bidina domandin. Rayadarên Îranî û tirk, rojên ku konferanse Cenevê a duyemin dihat li darxistin de li Îranê li Qasre sadabadê li hevdû civîyan û hin stretejîyên şer li dijî kurdan bi hevdû re dane meşandin. Î ro jî, ev şerên ku bi kurdan re dihên kirin, di temenê wan stretejî û peymanên di nava Îran û tirkiya de li wir hatina çêkirin de dihên kirin. Li Musilê bicihkirina DAÎŞ´ê jî, divê ku mirov di temenê wê levkirina li qasra sadabadê hilde li dest û fahm bike. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku rêxistina tundrew a DAÎŞ´ê, divê ku mirov weke rêxistineka ji rêzê ne hasibêne. Ev rêxistina DAÎŞ´ê, bi hebûna wê re, rengê şerê Îran û tirkiya ê bi kurdan re ê vê demê dihêne ser ziman. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî lê binerê. Ev rêxistin, bi vê rengê, ji aliyê Îranê ve jî û ji aliyê tirkiya ve jî, dihê bi rêxistin kirin, bicihkirin û şerkirin. Li vir, telûkeya mazin ew a ku ev mirovên ku di nava vê rêxistinê de dihên dayîn şerkirin, tundrew in û bi wê tundrewîya wan re çavên wan dunyayê nabînê. Kor in. Tenê, li ser olê re ku bi navê olê çi ji wan re hatîya gotin bi wê bawer dikin û şer **dikin**. ..
..

**Pergale xwe-rêvebirinê a rojava a demokratîk, hêrîşên rejimên herêmê ên di bin ”maske”´ya DAÎŞ´ê de ku li lê û plana şerê bi kurdan re a ku li leşkergeha tirk hatî çêkirin û di wê de dihê ser ziman ku wê ”sed hezar kurd werina kuştin.”**

- Li kurdistanê, ji 19´ê temûzê ve pêşketinên dîrokî rûdan. Kurdan, di serî de li rojavayê kurdistanê xweserîya xwe ya demokratîk denezendin. Herêma rojavayê kurdistanê, di bin sê-kantonan de ku bi navê ´kantona Cizîrê´, ´kantona Kobanê´ û ´kantona Afrînê´ hatibû bi rêveberkirin. Ev rengê rêveberîyê, kurdan di serî de li rojavayê kurdistanê pêşxist. Li vir, di serî de, li ser têgihiştina di temenê gotina ´xweserîyê´ de ku heya werênima ser ziman. Heta roja me, ku gotina ´xweserîyê´ ku bahse wê hatîya kirin û hatîya ser ziman, di temenê di nava sînorê desthilatdarîyekê de ku biqasî kifşkirina sînorê ardnîgarî, sîyesî, aborî û hwd, ku di bin kontrola wê desthilatdarîyê de dijî, bahse wê dihat kirin. Ev têgihiştin û zanîna bi gotina xweserîyê

re ku hebû, em nikarin zanîn û têgihiştina vê gotina xweserîyê´ ku kurdan di hundurê gotina ´xweserîya demokratîk´ de bênin ser ziman. Bo vê yekê, di serî de divê ku mirov li ser zanîn û têgihiştina vê gotina ´xweserîyê´ bibe xwediyê zanînekê. Li vir, bi vê gotina xweserîyê, serdestîya desthilatdarîyekê û ankû birdozîyekê li ser xwe re nayê qabûlkirin û ev gotina ´xweserîyê nayê ser ziman.

Di serî de gotina xweserîyê, di temenê cihêrengîyên civatî ku dikarin bi hevdû re bijîn û rêz û hûrmetê bidina hevdû de dihê ser ziman. Di vê temenê de, ew sînorê ku desthiatdarî ji xwe re dide kifşkirin jî çerçoveya vê gotina xweserîyê nadê nîşandin. Mirov nikarê bi wê re werêne ser ziman. Li vir, sînor û ast, hebûn û cihêrengîya civatî a kêmnetewî û bawerîya ku dikarin di nava hevdû de bijîn. Yanî li vir, ser beşek ardnîgariyê çend beşên civatî û ankû bawerî dikarin bijîn. Ew bi hevdû re û di rex hevdû de dijîn. Ev nasîna hebûna hevdû û herêkirina wê, sînorê gotina ´xweserî´yê a ku em li jêr dihênina ser ziman, dihêne ser ziman. Li rojavayê kurdistanê, di serî de divê ku mirov bibêje ku gelek kêmên civatî ên ji hevdû cuda û ên bi bawerî ku ji hevdû dijîn hena. Ev kom, çawa dikarin bi hevdû re, bêî ku hebûna hevdû ji hevdû re weke ´telûke´ bibînin û bijîn, di serî de li vir divê ku mirov li ser vê serî bi wastêne. Çendî ku me bersiv da vê pirsê û ankû rewşê, ewçendî, emê sînorê gotina xweserîyê jî bibînin û navaroka wê jî fahm bikin.

Di sadsala me de, dema ku bahse serdemê dihê kirin, dihê gotin ku ´ev sadsal, sadsala zanîn û ragihandinê ya´. Ev gotin, çendî rasta, ew çendî jî mihtacî fahmkirinê ya di çerçoveya hebûna civatî û pêşketina wê û cihêrengîyên wê de. Li kurdistanê, em dikarin gotina cihêrengiyê bi berdewama dîrokê re ji aliyekî ve werênina ser ziman û ji aliyê wê yê din ve jî, dema ku em li hebûna civatê a demê binerin ji aliyê cihêrengîyên wê ên bawerî û kêmnetewî ve mirov dikarê werêne ser ziman. Yan, ji aliyê dîrokî ve bi dirêjahîya bilindahî û bi aliyê civatî ê demî ve jî bi dirêjahîya berfirehî em dikarin werênina ser ziman. Di vê temenê de, em divê ku hinekî jî, rewşê bi gotinê re fahm bikin. Li kurdistanê, bi dîrokê re gelek kêmnetewî hena. Her wusa, bi heman rengî em dikarin bahse cihêrengîya civatî jî bikin. Dema ku desthilatdarîyek ´dewletî´ jî were avakirin wê di nava wê de ew xweserîtî hebe. Her wusa bi çi awayê bê, wê ew hebe.

Li rojavayê kurdistanê, dema ku ´şoreşa rojava´ bû û pêşket, di serî de di warê têgihiştina civatî de zanînek derxist li holê. Her wusa, cihêrengîyên civatî ên bi kêmnetewî û bawerî jî weke dewlemendiya civatî a vê axê hat hanîn ser ziman. Bi vî rengî, bahse mafê wan ê jîyanî jî hat kirin. Mirov, di nava jîyanê de çendî ku serbest bê, ewçendî wê karibê pêşketinê û pêşveçûnê di nava civatê de bide çêkirin. Sînorê mirov li vir, bi zanîn û têgihiştin û her wusa bîr û bawerîya wî re ya. Mirov, çendî ku serbest bê, wê ewçendî karibê pêşketinê di wan de jî bide çêkirin. Li vir, berî hertiştî, zanîn li vir, di temenê hebûna pêşketinê a bi mirov re de ya. Dema ku em mirov werênina ser ziman, mirov jî bi zanîna xwe re di nava jîyane civatî de kifşkarîya wî heya. Vê yekê jî, mirov dikarê bi teybetî werêne ser ziman. Zanîstên weke civaknasîyê, deronînasîyê, felsefe û hwd, bi hemû beşên din ên zanistê de dike ku wan astengiyên li pêşîya mirov kifş bike. Her wusa, bi vê yekê û armancê dikarê pêşketinê bide çê kirin. Ji van aliyan ve, dema ku em jîyanê binerin, em dikarin bibêjin ku emê pêşveçûnekê bidina çê kirin.

Jîyane civatî, bi teybetmendiyên wê re heya. Teybetmendî jî, weke ku kurd bi zimanê xwe re bi nav dikin di rengê ´kevneşopîyan´ û hwd de dihê li berçav. Her wusa, sînorê tevger û hal û pêşketina civatî, hinekî li zanîna van ´kevneşopî´yan disekinê.

Yanî, bi gotinaka din, kevneşopî, destûrên jîyane civatî na. Piştî k jîyane civatî û ankû bi gotinaka din ´şariştanî´ pêşket, êdî rengê hal û tevgerên mirov jî xwe dane li der û li berçavên mirov jî bi zanîn û têgihiştina me re di reng û gotina ´kevneşopîyê´ de xwe dane der. Ev, bi awa standinê re êdî jîyane civatî derxist li holê. Jîyane civatî, di vê temenê de dema ku mirov hilde li dest, mirov divê ku bi dîroka wê re ya bi van rengê pêşketina wê re werêne ser ziman. Her wusa, civatîtî heya.

Mafê jîyanê mafê pîroz a. Di olan de jî ev maf hatîya parastin. Her mirovê ku jîyane mirovekî dihilde, weke ku di olan de jî dihê ser ziman, xwe dike cihê ´xwûdê´ de. Li desthilatdarîyên herêmê, ji ber ku xwe kirina wê cihê xwûdê de, mafê standina jîyane mirov ku ji mirov bistênin di xwe de dîtina. Bi vê re jî tevgerîya na. Her wusa, mirov wê çawa bijî, ew jî hewldane ku bidina kifşkirin. Î ro, pirsgirêkên maf û azadîyê ku civate kurd dijî, hinekî jî di temenê wê de ev nêzîkatî jî heya. Şoreşa rojava, hinekî jî li dijî vê zihniyetê bûya. Di vê temenê de şoreşa rojava weke şoreşa maf û azadîyê bûya. Divê ku miirov di vê temenê de lê binerê û wê fahm bike. Mafê jîyanê, bi rengê ku mirov çawa wê jîyanê dijî re bi wate ya. Her wusa, Ev herdû aliyên jîyanî ê maf, weke dû lingên mirovekî na. Dema ku lingekî mirov were jêkirin, wê ew mirov bi yeklingî bê û saqat bê. Wê bilingekî bê. Bo vê yekê, dema ku em bahse gotina ´mafê jîyanê´ bikin jî, divê ku bi qasî jîyandina mirov wilqasî jî giringî û wateyê bidina rengê jîyane mirov ê ku bi wê dijî jî. Ji ber ku ev hevdû temem dikin. Weke dulingên ku yek bê ya din nabê ya. Wusa bi hevdû ve girêdayî na. Rengê jîyanê, bi fahmkirina wê re temenê pêşketinên mirov ê jîyanî û pêşketinên şariştanî jî diafirêne. Rengê jîyanê, her wusa giring û bi wate ya. Mirov, wê çawa û bi çi rengî bijî û pîvanên wê jîyanê çi bin, hertimî li ser vê serî hatîya wastandin. Hertimî, desthilatdarîyên ku di nava jîyane şariştanî de hatina û çûna jî, mudahaleyên wan li vê xale jîyane mirov bûna.

Her wusa, dema ku em pêşketina jîyanî û ankû bi jîyane civatî re ku mirov bahsê bike pêşketina şariştanî, li vê herêmê xwediyê dîrokek xwe ya teybet a pirr dirêj a. Ev dîroka şariştanîyê bi hezaran salan tê ser ziman. Ji demên sûmerîyan û bi vir de, dema ku em dihildina li dest, em jîyane şariştanî, teybetmendîyên wê bi aqil ên ku pêşketina hewl didin ku fahm bikin û bênina ser ziman. Ev weke demên pêşketî ên demên şariştanîyê jî mirov dikarê werêne ser ziman. Li vir, vê jî mirov divê ku werêne ser ziman ku ev herêma rojavayê kurdistanê ku li wir şoreşa rojava bû, weke herêmek teybet ya ku li wê dîrokeka pêşketinê a şariştanîyê heya. Em dema ku bahse pêşketina aqil û jîyane civatî bikin, ev herêm xwediyê cihekî teybet a. Her wusa, demên hûrî û mîtannîyan, li vê herêmê weke demna hemdem ên demên şariştanî ku temenê pêşketinên piştre jî afirandina na. Rojavayê kurdistanê, weke herêmeka teybet mirov dikarê bêne ser ziman. Her wusa, ji demên sûmerîyan ên aqadîyan û hwd û pê de, li vê herêmê dem bi dem serdemên ku em dikarin weke serdemên jinûvebûn(ronasans)ê werênina ser ziman lê bûna. Demên xanadanên Ur´îyan weke demna şariştanî ên ronasansî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, demên gûtîyan, em dikarin weke demna dirêj ên bi vî rengî werênina ser ziman. Piştre jî, dem û serdemên hûrî û mîtannîyan, em dikarin bi vî rengî pêşketî werênina ser ziman. Ji xwe, ev pêşketinên vê herêmê na, ku ev herêm hertimî kirîya berçav û bala mirov hanîya li ser ku mirov bi wê azwerîya xwe hertimî xwestîya ku lê serdest bibe û bibe desthilatdar.

Di serdeme de şoreşa rojava jî, dema ku dibe, weke navend ev der a. Lê weke serdemên berê, çend ku pêşketinên bi vî rengî ên bi şoreşî bûna, li ber wan helwestekê

dij-şoreşî ên bi armanca tafîsandinê jî lê bûna. Bi vî rengî, ev herêm, herêmek dîrokî ya. Herêmeka ku xalkê wê dayik û bavîtî ji ´pêxember´an re kirîya ya.

Li rojhilat, pêşveçûnên ji berî zayîna îsa ên ji ji du-hezaran û pê de, ku mirov wan hilde li dest, divê ku mirov wan bi teybetî şîrove bike û werêne ser ziman. Ev herêm, weke herêmna dîrokî ku destpêkên dîrokî li wan bûna na. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî bibêjin ku dîroka van herêman, heta roja me, ya ku em dizanin ji wê zêdetir û dîrêjtira jî. Birhan û nîşanaka vê jî, ew a ku bi lêkolênên erkolojîkî kifşkirinên ku dibin, dem bi dem nivîsandinên dîrokî ên bi herêmê re û ankû di derbarê herêmê de, ji nû ve bi mirov didina nivîsandin.Ev nîşanaka çî ya? Ev nîşanaka dîrokeka demdirêj ku hê em jî wê bi tememî nizanin a. Hê me, bi temmemî ew kifş nekirya û li bendî kifşkirinê ya. Kifşkirinên bi aqil û pêşketinên bi zaninê ên dema, temenê wan li ser ên van deman in. Yanî, aqilên ku di demên berê û li vê herêmê hatina pêşxistin, em di farqê de bin û ne di farqê de jî bin, di roja me de bi mirov şoreşên têgihiştinê dide kirin. Û ankû daye kirin jî.

Li herêmek bi vî rengî pêşketina şoreşî, bêgûman wê ancam û bandûra wê jî ne ji rêzê bê. Bo vê yekê, divê ku mirov bi tememî bi dîroka wê re wê hilde li dest û fahm bike. Dema ku em pêşketinên şoreşî ên li rojavayê kurdistanê hildina li dest ên roja me, ku em ji temenê wê civatî û dîrokî dûr werênina ser ziman û şîrove bikin, bêgûman, emê nikaribin bi tememî wan fahm bikin û werênina ser ziman. Bo vê yekê, giringa ku mirov divê ku bi dîrokê re wê fahm bike. Bi teybetî, civatîtîya vê herêmê, dîroka wê, dema ku em bi rengên pêşketina wê re û zanîna wê re dihildina li dest, em bi teybetî ji aliyekî ve pirr baş pêşketinên vê herêmê ên şoreşî fahm dikin. Civatîtî, rengê wê hertimî bûya mijare nîqaşan bi heyînîya şariştanî re. Gotina şariştanîyê, dema ku em li vir hildina li dest, em divê ku bi ansîklopendîyan bergan dagirin û werênina ser ziman. Di aslê xwe de, divê ku mirov werêne ser ziman jî. Ev hanîna li ser ziman, wê bê fahmaka vê pêşketina şoreşî a rojavayê kurdistanê û pêşketina wê jî. Dîrok, çendî ku hat fahm kirin, di roja mirov de di rastkirina roja mirov de temenê mirov diafirêne. Bo vê yekê, her timî û demî têgihiştin û fahma di derbarê dîrokê de wê heman giringî û wateya xwe ya bi qiymet biparêzê.

Şoreşa rojava, kurdî zindî kir û derxist dika dîrokî. Asûrî zindî kir û derxist dika dîrokê. Weke van xalkan ku destpêka wan diçê destpêka dîrokê û bi politikayên desthilatdariyên herêmê ku hatina ber ji dîrokê windabûnê ji nû ve divêjênê. Bi wê re jî, rengê jîyanê di hundurê xwe de derdixe li holê. Em di vê temenê de pêşketina şoreşa rojava, weke pêşketina mesopotamya jî şîrove bikin wê di cih de bê. Ku em weke vejînbûna gîyane mesopotamya şîrove bikin û werênina ser ziman, wê rast û di cih de bê.Gîyane mesopotamya çi û çawa bû? Ew jî, ew bû ku wateya bi cihêrengîya civatî û bawerî ya herêmê re dibînê. Di vê temenê de bi pirr-rengîya herêmî xwe dihê ser ziman. Em dikarin weke şoreşa mesopotamya jî şoreşa rojava şîrove bikin.

Em dema ku şoreşa rojava şîrove bikin, divê ku em di serî de dîrokê baş bixwênin. Aliyekî vê pêşketina şoreşa rojava bi fahmkirina dîrokê. Aliyê din ê duyem jî, bi pêşketinên şariştanî ên civatî re mirov dikarê werêne ser ziman. Di serî de, aliyê wê civatî derdikeve li holê. Di vê temenê de li herêmê rengekî din ê bi pergalî û her wusa desthilatdarîya ku li gorî vê pergalê bê jîyîn derdikeve li holê li pêş. Bi vê re jî, divê ku mirov tekoşîna civatî a vî 30 salî ku bi tevgera azadîya kurd re hatîya dayîn jî, mirov ji bîr neke û werêne ser ziman. Her wusa, tekoşîn, her timê, temenê fahmkirinê bi xwe re

dihêne. Di vê temenê de, ev fahmkirin jî, li herêmê bi pêşketina civatî, cihêrengiyên wê û her wusa bi dîroka wê re li ser temenê xwe dirûnihê. Dîrok û civat, li vir bi hevdû re şîroveyekê ji mirov dixwezin. Dema ku mirov dîrokê bi herîkîna wê re li berçav digrê û hebûna civatî bi pêşketinên wê ên şariştanî hewl dide ku fahm bike, mirov wê hingî di temenê pêşketina vê şoreşa rojava de xwe bigihêne têgihiştineka rast. Şoreşa rojava, bi rengê wê ê civatî re divê ku mirov di serî de hilde li dest. Bi vê re, rengê jîyanê û pêşketina bi wê re hilde li dest. Çendî ku bi jîyanî û bi cihêrengîyên wan re pêşketin bû, wê şoreşa rojava jî gav bi gav pêş bikeve. Ji ber ku gîyane şoreşa rojaava, temenê wê li ser vê temenê ya. Şoreşa rojava, ji ber vê gîyane xwe ya ku piştî ku bû rastî hêrîşa rejimên herêmê ku bi statûqû lê desthilatdar in hat. Piştî pêşketina şoreşa rojava û pê de, dem bi dem şer bi gelê kurd re hat meşandin. Ev şerê ku bi kurdan re, bi pêşketina şoreşa rojava û pêşketina statûya civate kurd û xalkên din ên herêmê ve girêdayî ya. Di vê temenê de di aslê xwe de, em dikarin vî şerê ku bi şoreşa rojava û dînamîkên wê ên civatî re dihê kirin, mirov dikarê weke şerê sadsalê jî şîrove bike û werêne ser ziman. Mirov dikarê vî şerî, weke şerê statûya gelan û statûqûya desthilatdarîyên li herêmê û sîyeseta wan jî şîrove bike. Me bahse şer kir, Ev gotina ”şer” bixwe jî, ji zimanê kurdî, ku mirov tenê ku wê jî binerê mirov dîrokekê dibînê. Gotina ´şer´ di kurdî de navê cengkirinê ya. Di kurdî de gotina ´şer´ ji gotina ´şahr´ û ankû ´şahra´ hatîya û afirîya. Gotina ´şahr´, ku bi nêzîkatîyaka şehwetgirt ji her aliyê ve şîyarbûna mejî û laşê mirov jî dihêne ser ziman. Şahr, ji her zindîyên ku di asta tevger û gavavêtinên xwe de gihişt asta herî bilind de jî dihê gotin.

Di nava civate kurd de, demekê(di demên berê de) jinên ku derdiketina dervî wî sînorê ku di nava civatê de hatî kirin, ji wan re dihat gotin. Ev gotin, lê ne di wateyek ne baş de dihat dihat bikarhanin. Bi zîndîbûnê de ji her aliyê ve şîyarbûnê bi xwe re dihêne ser ziman. Minaq, ´haspê kihêl´ ku di ciwanîya xwe de pirr bi tevgera û di zantkirina wê de ku mirov dikevina zorê de, ji wê rewş û dema hasp re gotina şahr dihat bikarhanîn. Şahrbûn, hinekî di kurdî de wateya ´dîn û harbûnê´ de ya. Yekî ku har bûyî, ti tişt nikarê wî bisekini nê. Minaq, gotina "gûrê har" pirr di nava kurdan de dihat bikarhanîn. Gotina ´dîn´ jî bi serê gotina ´har´ ve kirinê re rewşa ku zindî har dibe û vac û ahange xwe winda dike dihêne ser ziman.

Her zindîyê har, şahrbûn pêre heya. Lê ew asta harbûnê ku bi gotina ´şahr´ re dihê ser ziman, ji rengekî têgihiştinî ku bi şehwetê re jî dihê ser ziman, dûr nayênina ser ziman. Carna, dema ku haspê barrî dihat girtin û dihatina ahlkirin, mirov diketina zorê de. Hasp, ku rabû şahr, mirov jî li ber bin, yan bi gezan û yan jî bi pehînan diçiyê de û wan dide ardê. Haspê şahr, zora ku ew were zantkirin. Hasp, wusa dihat ahlkirin ku di dema ku bi sûwarê li ser pişta xwe re ku diket şeran de dirabû şahrê. Hingî, dihat gotin ku "haspê ku rabûyî şahr" û ankû "haspê şahr" jî dihat gotin., Bi vê re jî, minaq, gotinên weke "haspê şahr", "jina şahr" û hwd, gotinên ku di nava civate kurd de di demên berî de pirr zêde hatina bikarhanîn in.

Ew rewşa şahrbûnê, dema ku zîndî ku mirov bê û ankû zindîyekî din ku ahange(denge) xwe winda kir bi harbûna xwe re, hingî ji wê re dihê bikarhanîn. Dema ku gotina şahr, ji mirov re dihat bikarhanîn, hingî, bi şehwetbûna mirov re ku mirov bi hêst û hîs û şîyarîya xwe re derket asta xwe ya herî bilind, hingî ji mirov dihê bikarhanîn. Ev rewşa bi mirov re ya. Lê di rewşa bi zîndiyên çolê re bi harbûna wan re dihê ser ziman. Di hêrîşên li hevdû ên mirovan re gotina şer dihê bikarhanîn. Bi vê re di

kurdî de ku em dikarin bi rengê bê gotinê bênina ser ziman, gotinê ´şat´, ´şaht´, ´şak´, ´şakt´, ´şaktî´, û hwd, bi vî rengî, em dikarin hê gelek gotinên din li vir li dûv hevdû rêz bikin. Ev gotin hemû jî, gotinên hinekî di wan re ya tevgerbûna zêde û yan jî ji ahang ketinê û hwd bi wan re heya. Gotina ´şar´ di demên berî zayinê li dora sê-hezaran de jî weke navê yazdanê çengê û ankû yazdanê şer jî hatîya ser ziman. Heta ku di hin tefsîrên ku ji dema Sûmerîyan mana de, yazdanê şer ku navê wî ´şara´ ya, weke kûrê ´lipît Îştar´ jî hatîya tefsîr kirin. Em divê ku bibêjin ku wê gotina şahr, ji asta harbûnê were bi temenkirin û afirandin. Gotina ´şara´ jî, wê ji gotina ´şahr´ were derhanîn û afirandin û êdî bikarhanîn. Gotina ´şer´ jî, wê ji gotina ´şara´ were derhanîn, piştre afirandin û êdî **piştre bikarhanîn**.

- Kurd, xwediyekê welatekî na ku dîroka wê dîroka cihanê û şaristaniyên ku hatina û avabûna dide kifşkirin. Dema ku rewş ev bê, hingî, pirsgirêkên wan bi zêdeyî derdikevin û dihên li ber wan. Heta vê demê de, di vê serdemê de şerên ku bi kurdan re hatina kirin, hinekî jî şerên wê aîdîyeta wê mejûya wan ya demdirêj jî ku bi wan re dihê kirin. Bi teybetî, navê kurdan hatîya qadaxakirin û nayê xwestin ku ti nirx bi wî navî werina ser ziman. Qadaxaya zimanê wan jî, bêstatû hiştina wan û di wê bêstatûtiyê de isrerkirin û hwd, hemû jî bi vê aliyê ve girêdayî na. Ev jî, rewşeka wusa dihêne li berçavên me, ku em dikaribin wê rewşê bi vê rengê werênina ser ziman ku kurd dikevina wê rewşê ku di nava dewlemendiyê de faqirîyê bijîn. Berî hertiştî, temenê pêşketina civate kurd, ew a ku kurd xwe ji vê rewşê derxin û bikina rewş û tevgereka wan li ser lingan digrê ya. ..

Rojavayê kurdistanê, ev beşa kurdistanê ku li gorî giştîya kurdistanê jî, ku ne zêde mazin a jî, xwediyê dîrokeka pirr kevn û demdirêj a. Em hinekî li ser vê dîrokê rawastihin. Bi teybetî, dema ku em hildina li destê, divê ku bi dema Sûrmerîyan re wê hildina li dest. Lê em berî ku werina dema Sûmerîyan, divê ku em hinekî jî, demên berî dema Sûmerîyan ku weke ´demên neolotîkî´ jî dihên bi navkirin, em ji wan deman jî hinekî bahsê bikin. Ji ber ku, jîyane neolitîkî temenê wê li ser van axan bi demdirêjî heya.

Li vir, di serî de, divê ku em binxat bikin û werênina ser ziman, ku jîyan li vê herêmê bi teybetî di wê sêkika çêyayê kurda, çemê firatê û heta ber çemê diclê û hwd de, pirr zû pêşketîya. Rêza çîyayên qandîl û zagrosan jî divê ku mirov ji bîrnekê. Niştecihîtî û pêşketina wê, pirr zû destpêkirîya û pêşketîya. Tenê, di van demên dawiyê de, bi lêkolînên bi ´erkolojikî´ ku hatina kirin û kifşên ku bi wê hatina kirin, tenê ku mirov li wê jî binerê, mirov vê yekê bi awayekî vekirî dibînê. Bi teybetî, ku li bakûrê kurdistanê ê roja me dikeve li herêma Rehayê li gundê ´xirabreşkê´, kolanên ku bi erkolojikî hatina kirin û di wan kolanan de parastgeh û cihên jîyanî ku hatina ditin, hatina qadykirin ku berê zayinê li dora 12 hezar salî re na. Ev tenê, weke Bineter(dokument)eka ku em dikarin li vir wê esas bigrin a.

Hinekî jî, domografiya vê herêmê a civatî û pêvajoyên wê pêşketinê, mirov di derbarê wê de kûr û dûr dibin. Li vir, divê ku em bibêjin ku î ro di destê me de bineter hena ku hê di dema Hûrîyan de, aqilê ´felsefekî(hiziratî)´ pêşketîya. Minaqa vê yekê jî, em dikarin pêşketina bi melekê Tawis û xwûdayê wî yê bi navê "yazdan"ê mazina re bênina ser ziman. Pêşketina Melekê Tawis, î ro em dikarin bibêjin ku di dema hûrîyan de pêşketîya. Dibêt ku bi lêkolînên ku piştre werina kirin re ku bêpiştrastkirin ku hê kevntir jî diçê. Ji xwe, ji nûha de, nîşanakên wê jîyîna çanda Melekê Tawis ji dema

gûtîyan jî tên kirin. Oldarê Misilman Hacî Qadîrê koyî ku di sadsale 18´min jîya, di nivîsêne û dibêje ku "Melekê Tawis, pêxemberê pêşî ku peyema pîroz ji xwûdê bi kurmancî ji wî re hatîya" ya. Her wusa, mela Hisêne Bateyî jî di mewlûda xwe ya bi kurdî de bi têgihiştinaka ku bi wê dixwezê ku ji me re bibêje ku ´çendî´ û ´çîqasî´ kevn û bi mejûya, navê ´laleş´ê bi rengê ku "leleha têr ew ji ava kewserê" dinivîsêne. Bi vê gotinê, mirov têdigihê ku bahse "laleş"ê dike. Bi vê rengê re, em jî hinekî li ser vê rewşê rawastîyan û me hinek bineterên dîrokî jî ditin. **H. J. Kantor, dii lêkolîna xwe ya bi navê "Plant Ornament in the Ancient Near East" de**, gelek tefsirên ji dema hûrî û mîtannîyan di pirtûka xwe bicih kirina. Di nava tefsîrên wî de, gelek ji wan tefsîran jî, ên di derbarê Melekê tawis de na. Hinek jî, ji wê demê ku minaqa tefsîrên melekê Tawis hatiya esas girtin û hatina naqşkirin, em rastî gelek naqşên din ji ji van deman ên cûr bi cûr tên. ..

Lê dema ku em li tefsîran dinerin, em dibînin ku çawa ku hemû naqş bi têgihiştînî hatina çêkirin. Ev herêma rojavayê kurdistanê, herêmek ji wan herêmên ku çanda Melekê tawis li wê pirr zêde bicih a. Sedema vê jî, ew a ku ji dema gûtîyan û heta dema demên hûrî û mîtannîyan ku ev çand li wê serdest bûya. Bi teybetî, ev çand, di nava gûtî, hûrî û mîtannîyan de bicih in. Dema ku bi dema gûtîyan re bidina destpêkirin û werina serdemên hûrî û mîtannîyan, em divê ku bibêjin ku dibînin ku ew serdestî di nava rengê jîyane wan de dijîn. Gûtî, wê ber çîyayê Cûdî ji xwe re bikina navend û ji vê herêmê li hewirdora xwe serdest û serwer bibin. Heta roja me jî, bermehîyên dema Gûtîyan li vê herêmê hena. Gelek ji wan di vê dema şerê dewleta tirk de hatina tûnakirin. Finîk, 35 km'yayî li aliyê başûrê rojavayê Şirnexê ya. Di dewama wêderê ya bi ber çiyayê Gabar de, di cihê wê dikeve navbirîna çiyayê Gabar û ava Dîcle, di devê niwalekê de, beriya zayînê 4 hezar salan ji aliyê Gûtiyan ve hatiye avakirin. Li "**finîkê**", hê jî, hêkelên mirovan, kirman û qasrên ji wê demê mana, hena. Herêma finikê, Mîrên bota jî, hertimî ji xwe re dikirina cihê seyrangehê jî.

Li herêmê, ev rengê pêşketina bi awayekî vekirî dihê ditin. Piştî Gûtîyan re, serdema Hûrîyan ku wê, wê temenê wê li ser nirx û pêşketina gûtîyan bê. Lê hûrî di dema xwe de, divê ku mirov bibêje ku xwediyê aqilîyeka mazin in. Hûrî, xwediyê pergelak biaqil in. Pergale olî ya ku ew wê dijîn jî, ´yek-yazdanî´ ya. Cihên wan ên weke cihên bergkirinê û ankû parastgeh, pirr pêşketî weke saziyna civatî na û serdest in.

Î ro, di destê me de, bineter hena û em dikarin piştrast bikin ku navê parastgehên Hûrîyan "laleş" a. Nivîskarê Emerikî H. Crag Melchert, li lêkolîna xwe ya bi navê "Cunneiform Luvian Lexicon", de gotina ´laleşê´ ku ji dema hûrîyan ku hatîya xwandin ji nivîsên bizmarî ên li ser keviran bi **rengên *´la-la-aš-ha-ri´…. ´Lālašha´) û hwd***, dihêne er ziman. Her wusa, divê ku em bibêjin ku bi gelek rengên din jî, ev gotina Laleşê´ ji wê demê hatîya qaydkirin.

Ev rewş, tenê didina nîşandin ku rengê pêşketinê ê li ser van axan ji dema gûtîyan û heta hûrî û mîtannîyan, bi çi rengî hatîya bûya û xwe domandîya. Lê divê ku em vê jî bibêjin ku serdemên Hûrî û mîtannîyan, du serdemên mazin û giring in. Di aslê xwe de, em divê ku dîroka hemdem a bi aqil û felsefê ji van deman bidina destpêkirin. Filosofê wê demê ku em dikarin, biqasî û weke Aristoyê girêkî ku mazin hanîya ser ziman, werênina ser ziman Mîtra ya. Mîtra Ji mîtannîyan a. Û mîtannî jî kurd in. Her wusa hûrîyan jî, berfiratê ev herêma rojavayê kurdistanê ji xwe re kirina navend. Divê ku em weke gotinekê jî bibêjin ku em piştre werin û li ser bisekin in, wê mîtannî herêma

´serêkahnîya roja me ji xwe re bikina navend û paytaxt. Di dema wan de, navê wê ´Weşokanî´ bû.

Î ro ku em li demên hûrî û mîtannîyan dinerin, em rengê olî bi sê-gotinan re bi giringî dibînin. Yek ji wan gotinan a pêşî gotina "yazdan" a. Gotina duyemin a Melekê Tawis a. Gotina Sêyemin jî, di demên piştre ê Mîtannîyan de ku dihê û derdikeve navê Mîtra ya. Di çerçoveya van navan de pergale olî a dema Mîtannîyan jî mirov divê ku bibêje ku heya û pêşketîya. Xwedîyê hemdemîya xwe ya. Li vir, divê ku em bibêjin ku dema gûtîyan jî û piştre demên Hûrî û mîtannîyan hemû jî, di temenekî olî a hiyararşîkî de bi rengê ´yek-yazdanî´ pêş dikevin. Di vir de, em dibînin ku ola êzdatiyê ku weke ola yek-yazdanî a pêşî ku mirov wê kifş dike. Ola êzdatiyê, berî ola cihûtîyê jî hebûya. Cihûtî, dema ku peşket, ji wê sûdgirtîya û ji nirxên ku vê xatê de pêşketina sûd girtîya û pêşketîya.

Î ro ku em li reng û kevneşopîyên êzdatiyê ku mirov binerê, di aslê xwe de, em gelek kodên pêşketina demên gûtî, hûrî û mîtannîyan ji di wê de bibînin û kifş bikin. Bi rengê xwe yê pêşî ê ola êzdatiyê, rengê pergela giştî a gûtîyan, hûrî û mîtannîyan bi xwe re bi reng dike.

Li vir, em divê ku vê yekê bi teybetî dema mîtannîyan, êdî weke ku tê ditin bi rengekî teybet pêş dikeve. Dema mîtannîyan, wê weke ku hemû demên berî xwe ji nû ve bi hevgir(sentez)ê û bêne ser ziman. Di aslê xwe de, pêşketina Mîtra, hinekî jî, nîşanaka vê yekê ya. Mîtra, di temenekî û rengekî xwenûkirinê de dema Mîtannîyan bi xwe re dihêne ser ziman. Weke ku çawa ku piştî wî re Zerdeşt bi xwe re demek daye destpêkirin û hanîya ser ziman; di dema xwe de Mîtra jî, bi heman rengî demek daye destpêkirin û hanîya ser ziman. Mîtra, di gelek tefsirên ji dema Mîtannîyan de weke "sûwarê Mîtannî" jî hatîya tesirkirin.

Dîroka Mîtra û pêşketinên şaristanî û olî û hwd, ku bi wî re destpêkirin, wê piştre pêşketinên olî hemûyan jî ji binî ve bidina kifşkirin. Bandûra Mîtratiyê, piştî wî re wê herî zêde li pêşketina ola Mesihiyê bibe. Dema Sersalê ku Mîtrayî û berî wî Êzdayî pîroz dikin, wê piştre di navaroka mesihiyê de jî were bicihkirin. Lê di aslê xwe de, ev kevneşopî, kevneşopîya Êzdayî û mîtrayîya na.

Mîtra, wê bi pêşketina xwe re û bi hizrên xwe re wê dema dawiyê ên mîtannîyan bide kifşkirin. Bi wê re jî, wê demeka nû bide destpêkirin. Piştî wî re, demeka ku em yaqîn dikin ku ne bin sêsad salî re ya wê pêş bikeve û wê hebe. Piştre jî, êdî heta ku dem tê dema Zerdeşt, êdî wê ew wê serdestîya li şûna Mîtra, bi xwe û navê xwe re bide domandin û pêşketina xwe derxe li holê. Î ro ku em li zimanê avêsta bixwe jî dinerin, em dibînin ku bi rengê gotinê xwe re ne dûrî kurmancîya botanê û dora wê ya, em rastî pirranîyan gotinên wê ên ku wî bikarhanîna tên di avesta wî de. Ev, tiştekî dide nîşandin ku ji vê herêma rojavayê kurdistanê yanî ji herêma Mîtra, wê rengê pêşketinê bi Zerdeşt re bi ber başûr û rojhilatê kurdistanê ve biherikê. Bi vê rengê, wê bandûra wî pirr zêde wê derkeve holê û hebe.

**-Ji sêkika Afrîn, Serêkahniyê û Rihayê, heta digihijê Nisêbînê, qamişlo û Cizîra bota, destpêkeka dîrokî û jîyanî a pirr kevn heya.** Di sêkika Afrîn, Serêkahniyê û ji Rihayê heta digihijê Nisêbînê de destpêka dîrokî û jîyanî ya pirr kevn heya; Ev herêma kurdistanê, ku em î ro bi navê ´rojavayê kurdistanê´ bi nav dikin, di dîrokê de, weke herêmeka pirr kevn û kevnera mirov divê ku bahse wê bike. Di serî de, ku em di çerçoveya serdemên aqil û pêşketina wê de, bahse wê bikin, divê ku em bibêjin ku

rojavayê kurdistanê, herêmeka weke navend bûya. Berî zayinê, ku em ji sadsala 20´min û pê de, hildina li dest, em dikarin, wê bênina ser ziman. Lê ev herê, bi serê de, ji aliyê dîrokî ve gelek teybetmendiyên wan ên ku ne hatina kifşkirin jî hena. Ev sînorê ku di çerçoveya avakirina sûrî de ku hatiya xizkirin, ti dîroka wê ne bi çandî, ne bi felsefekî û ne jî bi dîrokî heya. Em nikarin, bi dîrokî bahse wê bikin. Ev sînor, sînorên sadsale 20´an in. Lê berî wê demê jî, ev herêm bi herêmên bakûrê kurdistanê re yekbûn. Ji Afirînê heta nivîsêbînê û ji serêkahniyê heta Rihayê û hwd, yek-qat in. Çandên weke ên lipît Îştar û hwd jî, çandên vê herêmê jinê û xwûdawendîya wê na.

**- Çanda lipît Îştar**, çanda xwûdawendî a jinê ya. Li ser wê axê xwediyê pêşketinaka dîrokî ya. Ji xwe, dema ku şoreşa rojava pêşket, pêşî rengê vê şoreşê ê bi jinê û hebûna wê re derket li pêş. Hêzên parastina jinê bi navê YPJ´ê û hwd jî hat avakirin. Li rojavayê kurdistanê bigiştî, di hemû kar û barên jîyanî de herî zêde jin heya û li pêş a. Ev jî, weke aliyekî din ê vê pêşketinê ku hin bi hin rengê xwe da û pêşket, mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê temenê de jîyane civatî, mirov divê ku bibêje ku bi pêşketina wê û cihêrengîya wê re derket li pêş. Jîyane civatî, giringa ku mirov li vir bi pêşketinên wê ên şariştanî û dîroka wê ya li herêmê re ku werêne ser ziman.

Dema ku piştî şoreşa rojava, hêrîş li rojavayê kurdistanê bûn, pêşî hêrîş li wê jîyanê wê bûn. Bi hêrîşan hat xwestin ku pêşî wê jîyane wê ya ku afirî bi rengê xwe, ji hevdû were felişandin. Bo vê yekê, di destpêka şoreşa rojava de, bi hêrîşan pêşî hewl didan ku mirovan ji herêmên wan bidina goçberkirin. Bi vê re jî, herêmê bê mirov bikin. Bi wê re jî, êdî wê temenê pêşketina jîyane şariştanî a herêmê ji holê ra bikin. Rojavayê kurdistanê, em divê ku weke beşek ji bakûrê kurdistanê werênina ser ziman. Hevdû temem dikin. Dema ku em li demên wê ên buhurî jî binerin, emê vê rastîya wê pirr bi başî bibînin û fahm bikin. Bi dîroka herêmê re ku mirov dinerê, ji dema hûrî û mîtannîyan û heta demên piştre ên Eyûbîyan û Merwanîyan û hwd, mirov bi teybetî dîrokeka bi vî rengî ya civatî bi cihêrengîya wê dibînê. Ev herêm, divê ku mirov bi teybetî binxat bike û bibêje ku di demên berê de bi herêma botanê re dihat bi nav kirin. Bi hevdû re dihat bahskirin. Her wusa, navê botanê li wê jî dihat kirin. Î ro, di destê me de bineter hena ku em dikarin bibêjin ku gotina ´botanê´ bixwe jî ta dema gûtîyan û hwd diçê. Her wusa, herêma kobanê ku destpêka şoreşa rojava ji wê bûya jî, bi heman rengî bi navê xwe re kevn a. Navê ”kobanê”, em di dema gûtîyan, hûrî û mîtannîyan de rastî wê tên. Bi vê rengî, Kobanê bixwe jî, weke niştecihekî dîrokî ê kevn mirov dikarê bahse wê bike. Bi heman rengî, mirov dikarê bo navê ´afrînê´ jî bibêje. Em bi vî rengî ku tenê li ser ziman û gotin û navan re jî herin, em vê kevnerîya wê bi awayekî vekirî kifş dikin. Î ro, em bahse pêşketina şoreşî li herêmek bi vî rengî ya ku bi dîrok û pêşketinên xwe yên civatî û şariştanî xwediyê dîrokek kevnera ya dikin. Dîroka hemdem a şariştanî li vir hatîya nivîsandin bi destpêka xwe re. Bi wê re jî, biheman rengî, î ro şoreş li ser wê temenê li wê herêmê dihê kirin.

Şoreşa rojava, şoreşa rojhilat giştî jî ya. Di vê temenê de jî mirov dikarê li şoreşa rojava binerê. Dîrok, di vê temenê de, bi wê re li rojhilat ji nû ve dihê nivîsandin. Bi vê şoreşê re di serî de statûqûtî dihê ji holê rakirin. Mesopotamyatîtîya herêmê dihê vejandin û jîyandin. Bi vê rengî, di aslê xwe de, ew dîroka herêmê ku bi sedsalan weke ku bi ser serê xwe dalaqandî bê, bi pêşketina şoreşî a rojava re weke ku di vergerendin li ser lingên wê.

Şoreşa rojava, dema ku em wê şîrove bikin, em nikarin tenê bi avakirina gelê kurd a rêveberîya xwe re şîrove bikin. Ji wê zêdetirî, divê ku em bi pêşketina têgihiştinê, jîyane civatî û cihêrengîyên civatî ku xwe dijîn û dikarin werênina ser ziman re wê fahm bikin. Di vê temenê de, şoreşa rojava, weke rengekî pêşketinî ê civatî li herêmê ya. Ev rengê pêşketinê jî, temenê wê ê drokî heya. Bo ku temenê wê yê dîrokî û civatî û ankû şariştanî fahm bike, divê ku mirov wate û gîyane bi têgihiştinî û hişarî ku hatî fahmkirin a bi gotina mesoptamya re bi pêşketiina wê ya bi xate dîrokê re hilde û fahm bike. Ev, wê bi serê xwe têgihiştinê di derbarê vê pêşketina hemdemî a vê demê de di serê me de bide çêkirin. Têgihiştin, bawerîyên olî û hişarîyên civatî û civaknasî, weke aliyna giring in ku divê ku mirov wê hilde li dest. Li vir, dema ku em şoreşa rojava hildina li dest, divê ku em bi teybetî, ji şerê cihanê êê yekemin û heta roja me, ew bêstatû hiştina kurdan jî em fahm bikin. Piştî ku kurd, hatina bêstatûkiirn, êdî komkujiyên dîrokî hatina hanîn li serê kurdan. Armanca rejim û desthilatdarîyên herêmê bi van komkujiyan re ew bû ku wê bêstatûtîyê ku li ser kurdan farz dikin bi kurdan bidina herê kirin.Kurdan, li dijî wê bêstatûtiyê hertimî raperîn kirîya, tekoşîn daye û berxwedan kirîya.

Komkujiyên ku î ro jî dihên serê kurdan, divê ku em di çerçoveya wê zihniyeta rejimên herêmê a ´bêstatû´ hiştina kurdan de fahm bikin. Piştî ku şoreşa rojava bû, êdî hêrîşên rejimên ên ku dîrekt bin û ankû rêya çeteyên weke ên DAÎŞ´ê û hwd bin, li kurdan û herêmê bûn. Bi van herîşan, armanc ew bû ku pêşketina rojavayê kurdistanê bişikênin. Bêstatûtîyê dîsa li ser kurdan û xalkên din herêmê farz bikin. Î ro, di vê temen de şerên rejimên herêmê ên bi kurdan re bin û ankû bi xalkên din re bin, şerê bêstatû hiştina wan a. Di vê temenê de divê ku mirov fahm bike. Bi wê bêstatû hiştinê re, ziman û çanda van xalkên weke kurdan jî qadaxa dikin û pêvajoyên bişavtinê di temenê bernemeyên rejiman de li ser serê wan xalkan dihên meşandin. I bin navê perwerdekirinê û hwd de bê, wê bişavtinê pêş dixin. Di bin navê fêrkirina bi xwandinê û nivîsandinê wê dikin. Bi rengî, li wan politikayên jenosîda sipî ku bi bişavtinê pêş dixin, kiresekî jî bi gotinên di rengê ´parastina mafê mirovan´ û ankû ´demokrasîyê´ hwd de jî, lê dikin. Lê ev gotin, tenê weke gotinên sernûxûmandinê û maske na. Li herêmê, rejimên herêmê çawa xwe bikina desthildatdar, di wê temenê de politikayên xwe pêş dixin. Politika, li ser temen û esasê xwe kirina desthilatdar in. Yanî, şerê ku bi hevdû re jî û bi xalkên herêmê re dikin, şerên desthilatdarîyê ê wan a.

Li herêmê, jîyane herêmê hatîya ji holê rakirin. Gotinên weke ”parastina mafê jîyanê” û ankû parastina mafê mirovan” û hwd, weke gotinên ku hê beyenî na li herêmê û li pêşketina herêmê. Mafê mirovan´, weke nirxekî nayê dîtin.. Her wusa, nirxên olî ên ku hatina û pêşketina jî, di demên berê de di navaroka wan de di temenê van gotinan de hebû. Lê rejimên herêmê, ol jî, li herêmê navaroka wê ji van gotinên weke ´parastina mafê mirovan´ ankû ´parastina mafê jîyanê´ û hwd hatîya ´paqij´ kirin. Çawa li gorî berjewendîyên wan rast a, ol jî li gorî wê bi rêxistin kirina û gihandina navarokekî. Wusahasab bikin, olek ku bahse nirxên mirovatiyê û ´ilm û îrfanê´ dike, ´hebûna tûndûtûjiyê´ hem li zayendan û hem jî li beşên din ên kemnetewî, bawerî ên cuda û hwd, red nakê. Vajî wê, ew tûndûtûjîya ku hem li zayendan û ankû li komên din ên kêmnetewî û bawerî ên cuda hatî kirin, wê çawa rawa(meşrû) were dîtin, di vê temenê de ”fetwa” dihên derxistin. Yanî, dema ku rejimek herêmê tûndûtûjiyê li komên netewî ên cuda û bawerîyên cuda ên di bin kontrola wê de na ku ku dike, bo ku xwe biparêzê, ji devê oldaran ´fetwa´yan derdixe û wê rast dide nîşandin. Ev rengê bikarhanîna olê weke

maskeyekê ku bi wê nûxûmandina wê tûndûtûjîya ku hem di nava civatê de ku li zeyandan(minaq; tûndûtûjîya li jinê ku tê kirin) dihê kirin û ankû li beşên din ên kêmnetewî û civatî û hwd dihê kirin, aliyekî giring ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Ol, çawa dihê bikarhanîn, mirov divê ku bi wê re vê yekê baş fahm bike. Minaq, dema ku DAÎŞ´ê bidest hêrîşên xwe yên li kurdan û li civate kurd kir, pêşî bi navê olê ”fetwa” derdixst û di got ku ”kurd, kafîr in, kuştina wan ´halal´ a”. Bi wê re digotin ku ”mêrên kurdan bikujin û jinên wan ji xwe re weke carîya bênin.” Di vê temenê de jî, wê çawa vê yekê rast bidina nîşandin, ”hadîsan”, ji serê xwe çê dikin û şîroveyan bi navê olê pêş dixin. Her wua, wê çawa wan komkujiyên ku bênina serê kurdan bi raya giştî bidina herêkirin û rawa bidina nîşandin, di wê temenê de, gotinên olî îstîsmar dikin û bikardihênin.

Bêgûman, cihê van kirin, kiryar û piretkên bi vî rengî di ti olê de tûna ya. Lê rejimên herêmê, di vê temenê de û bi vî rengî bi navê olê olê, gotin, ´fetwa´ û şîroveyan pêş dixin, bo ku komkujiyên ku li dijî xalkên herêmê ên weke kurd, asûrî û hwd, ku rejimên herêmê ew ´bêstatû´ hiştina ku bikin rawa bidina nîşandin, bi vî rengî olê bikardihênin. Her wusa, di vê temenê de, ol weke ´birdozîya´ domandina desthilatdarîyê û meşrû dayîn nîşandin a kirinên xwe yên weke komkujiyan û hwd, bikardihênin. Her wusa, komkujiyên ku li dijî kurdan dikirin, bi vî rengî di nava raya giştî a herêmê de ”rawa” didan nîşandin.

Bi vê yekê re divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku rejimên herêmê ne rejimna demokratik ku em bibêjin rêz û hûrmeta wan li ´mafê mirovan´ û ankû ´mafê mirovan ê jîyanê´ heya. Ji xwe, em bahse mafên civatî ên civakên herêmê nakin. Bi ti awayê, di temenê rejimekê û desthilatdarîyekê de ku kî serdest û desthilatdar bê, mafên civatî ên xalkên din ji holê dirakê û wan civatan bi rêya bişavtinê dixwezê ku yan di nava xwe de bihalêne û ji holê rabike û yan jî bi komkujiyan bêdeng bike û wê bi tememî bi vî rengî ji holê ra bike. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku ev herdû rêbaz jî li dijî kurdan li herêmê ji aliyên rejimên herêmê ên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin û parvekirin ve hatîya bikarhanîn. Kurd, dîroka wan, mirov dikarê weke dîroka komkujiyên ku hatina serê wan jî şîrove bike û bêne ser ziman.

Şoreşa rojava, bi vî rengî em dikarin di temenê pêşketina van xalkên ku dibin desthilatdarîya rejimên herêmê de ku rastî tûndûtûjiyê tên şîrove bike. Yanî, em dikarin weke dengê wan werênina ser ziman. Ji xwe, ji ber vê yekê ya ku vilqasî rejimên herêmên komên çete ên weke çeteyên DAÎŞ´ê bi rêxistin dikin û dişênina bi ser rojavayê kurdistanê de. Bi vî rengî, dixwezin ku wê şoreşa rojava bitafisênin. Bo vê yekê jî, her rê û rêbazê ê tûndûtûjiyê bikardihênin. Li ber kamarayan serê mirovan jê dikin bo ku tirsandinê bidina çêkirin û mirovan ji herêmên wan bidina goçber kirin. Her wusa, bo ku wê şoreşa rojava bitafisênin jî, hêrîşên ku bi wan çavtirsandinê çêbikin û mirovan bi wê ji herêmên wan bidina goçberkirin dikin. Bi vî rengî, li dijî gelê kurd li rojavayê kurdistanê şer dikin. Di destpêka bûyîna şoreşa rojavayê kurdistanê de, li bakûrê kurdistanê birêz Ocalan pêvajoyek da destpêkirin. Li gorî vê pêvajoyê wê pirsgirêka kurd, bi muzakareyan bihata çareserkirin. Wê dawî li şerê bi kurdan re bihata hanîn. Lê ev nebû.. Rejima tirk, ev pêvajo, di temenekî ku xwe û pozisyona xwe ya şer a li dijî kurdan xort bike de bikarhanî. Çend ku li bakûrê kurdistanê, tevgera kurd şerê bi dewletê sekinand jî, dewleta tirk ew şerê bi kurdan re ji bakûr herikand rojavayê kurdistanê. Li dijî şoreşa rojava gav bi gav şer pêşxist. Komên çete ên weke DAÎŞ´ê bi

rêxistin kir û alikarî dayê de û da hêrîşkirin li ser serê kurdên rojava. Yanî, bi vê rengê, bi demê re rayadarên tirk, gotina ”pêvajoyê” bikardihanîn. Digotin ku ”pêvajo didomê”. Lê çendî digotin ku ´pêvajo didom´, bi armanca ku kurdan li ber van kiryarên şer ên dewletê ku li dijî şoreşa rojava û ankû herêmên din ên kurdistanê pêş dixe ku kurd bêdeng bibin. Çend ku kurdan, deng derdixist, digotin ku ”meyizênin, pêvajo didomê, ev berteka we, wê zirerê bide pêvajoyê, bo vê yekê bêdeng bimênin.” Di vê temenê de gotin dihanîn ser ziman. Yanî, pêvajo, bi vî rengî bo domandina şerê li dijî kurdan li rojava û hwd dihat bikarhanîn. Şerê rejima tirk, di vê temenê de bo şikandina kurdan bû. Herî dawî, di 15´ê êlûna 2014´an de, rejima tirk û DAÎŞ´ê bi alikarîya ku didan hevdû, bidest hêrîşkirina li rojavayê kurdistanê kirin. Bi wê re bi rojan û hefteyan wan hêrîşan ji Kantona Kobanê ve li rojavayê kurdistanê domîya. Dema ku hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê li Kobanê destpêkir, gelê kurd ê bakûrê kurdistanê jî herikîn ber sînorê rojavayê kurdistanê li herêmên weke Pîrsûsê´. Li vir, li ser xate sînor çalakiya piştgirîyê ya bi birayên xwe yên li aliyê din ê sînor ên rojava re kirin. Lê rejima tirk, polîs û leşkerên wê, her roj hêrîşî wan xwepêşandêrên li ber sînor dikir. Xwepêşandêr, li ser sînor nobetê bigrin bo ku çeteyên DAÎŞ´ê ji sînor nikaribin derbasî rojava bibin û komkujiyan nekin. Ji ber ku hemû çeteyên ku diçûn û bi rojava û bi teybetî li kobanê bi kurdan re şer dikirin ji tirkiya û sînorê wê dibuhurîn. Bo ku pêşîya wê bigrin, ew çalakî kurdan li ser sînor li dar dixistin. Bi van hêrîşan, dihat armanc kirin ku şoreşa rojava, pêşketina wê û rengê pergale wê ya civatî were tûnakirin û **ji holê rakiri**n.

Bi vir ve girêdayî ivê ku mirov hinekî jî li ser pêşveçûnên di nava kurdan de û rewşa sîyeseta kurd jî şîrove bike. Sîyeseta kurd, bi xelatîyên xwe ên dîrokî, di vê demê de bû alikarî ji aliyê xwe ve ji hêrîşên ku wê werina bi ser civate kurd li başûr û rojavayê kurdistanê. Bi vir vegirêdayî, ez dixwezim ku vê jî bibêjim ku di dema ku kongira netewî a kurd amedekarîyên wê dihatina girtin, T. Ardogan bixwe derketibû berçapameniyê û gotibû ku "wê ji wê rewşê ew zirerê bibînin. Sozên ku dane me divê ku ji birnekin." Ev gotin, wî bo rêveberîya başûrê kurdistanê dihanîn ser ziman. Piştî van gotinên T. Ardogan bi sê-rojan re Nêçîrwan Berzanî ji başûrê kurdistanê diçê tirkiya. Rojekê li tirkiya dimêne. Piştre di roja duyemin de ku Nêçîrwan berzanî vegereha başûrê kurdistanê, êdî di cih de taloqkirina li darxistina kongira netewî a kurd ket rojevê de. Pêşî ku weke heyvekê li darxistina kongira netewî a kurd hat taloqkirin. Piştre di care duyemin û piştre de "li demek ne dîyar hat taloqkirin." Piştî vê re jî, weke ku ji navendekê werina amede kirin, bi hin politikayên ku wê temenê ku wê li ser kongira netewî biheta li darxistin hat armanc kirin. Hin bi hin li ser gotinan re hin nakokî di nava hêzên hêz, navend û partîyên kurd de hat afirandin. Piştre jî, bi pêşketina rojavayê kurdistanê re ew dijberî di nava kurdan de hat pêşxistin.

Piştre jî, weke ku di gera Mesud berzanî a li Amedê de weke ku êdî ew dijberî temenê wê bi hin xalna jî hat afirandin. Ew "çar xalên" ku bahse wan hatkirin û ketina çapameniyê de ku hatina gotin ku weke "peymanekê" di nava rêveberîya kurd a başûr û tirkiya de hatina çêkirin, êdî bi wê weke ku bi tememî dijberîyek afirandin. Gotinaka ku weke xalek ji wan "çar xalan" ku hat ser ziman û hat gotin ku "wê PDK, derfetê nedê PYD´ê ku rêveberîyek ´defacto´ a li bakûrê Sûrîyê ava bike" jî, bi navê rêveberîya kurd a başûr hatibû ser ziman. Piştre jî, ji hikimeta başûr ku di destê PDK´ê de bû, ti derewandin ji wê gotinê re ne hat. Piştre, hin bi hin PDK´ê weke partîya başûrê kurdistanê, kirina di rewşeka pozisyonî ya bi vî rengî de.

Nûha ku Tirkiya rabê hêrîşî rojava bike û dijminatiyê bide nîşandin, mirov wê fahm bike. Ji ber ku rejima tirk, heta roja me, hertimî dijminatiya kurdan kiriya. Heman tiştî mirov dikarê bo Îranê jî bibêje. Lê çi li PDK´ê bûya.? Ew çima wê dijminatiyê li rojava dike? Çi zirare wê jê heya? PDK´ê, ber ku bi hikimeta AKP´ê ku dijminatiya kurdan dike re, tevdigerihê û weke wê dike, êdî dikeve rewşeka ku dijminatiya kurdan bike. Peymanên ku PDK´ê, bi rejima tirk re û bi teybetî bi AKP´ê re çêkirina, bi wan xwe ji navikê ve girêdane. Di dema ku amedekariyên li darxistina kongira netewî a kurd dihatina kirin de, T. Ardogan bo ku tehdîd bike, "wê ji wê rewşê ew zirerê bibînin. Sozên ku dane me divê ku ji birnekin.". Ew sozên ku T. Ardogan digot ku "dane me" çi soz in û bi navê kê PDK´ê ew soz dane T. Ardogan û ankû rejima tirk?? ..

Gelo, mirov dikarê wê gotina ku T. Ardogan got ku"soz dane me", di çerçoveya nîşandina vê dijminatiya li rojava de bi gotina ku di dema gera Mesud Berzani a li amedê de ku hatibû ser ziman ya bi rengê "wê PDK, derfetê nedê PYD´ê ku rêveberîyek ´defacto´ a li bakûrê Sûrîyê ava bike", bi wê fahm bikin? Di ragihandina rayadarên PDK´ê a 18´ê gûlanê de gotinek hebû. Di gotin ku "PKK´ê herêmên Mediya dagir kirina." Ji vê gotinê, mirov fahm dike ku ev serdegirtina hêzên PDK´ê a rojekê piştre a di 19´ê gûlanê de, bi vir ve girêdayî ya. Li vir, di aslê xwe de, wusa tê ditin ku dewleta tirk wusa dihzirê ku wê bi çêkirina qarakolan û bendavên bi armanca stretejiya leşkerî li bakûrê kurdistanê kontrola xwe çêkiriya. Êdî bi wê ve girêdayî dihizirê ku zorê bidina wan ku çêkberdanê bi wan bidina kirin. Wusa dihê ditin ku wê di vê xalê de, hin bi hin hewl bidin ku zorê bidina tevgera azadîya kurd. Ev gotinên ku hatin gotin û ev serdegirtinên ku li saziyên kurd dihên kirin, bi wan çêkirina qarakolan û bendavan ûû qaşo wê çêkirina kontrolê a leşkerî a dewletê ve girêdayî dihên kirin. Divê çerçoveyê de, ku mirov dihizirê, mirov dibîne ku weke ku konsepteka giştî heya û PDK´ê jî di nava wê konseptê de ya. Vê rewşê mirov dikarê weke konsepteka rejima tirk a li pişt wan serdegirtinên PDK´ê ên li başûrê kurdistanê werêne ser ziman.

Tirkiya, şerê xwe yê ku bi kurdan re dide, bi vî rengî xwestibû ku rêveberîya başûr bike hevkarê wê. Berî hingî jî, mixabin, ev partîya kurd PDK´ê hatibû vê listika rejima tirk û heta ku li dijî civate kurd bixwe ketibû nava şerekî de. Minaq, li dijî PKK´ê, oparasyonên rejima tirk ên dervî sînor ku hatibûbûna li darxstin de, hin pêşmergeyên wê jî kiribûbûna bikarhanîn. Î ro jî, bi rengekî din de, disa vê dikin. PDK´ê, piştî wê gera Mesud Berzanî a li Tirkiya û pê de, bi tememî hat xistin pozisyoneka dijber li dijî rojavayê kurdistanê de. Pêvajoya ku piştî taloqkirina li darxistina kongira netewî a kurd ku hatibû dayin destpêkirin, bi vî rengî bi tememî êdî vajî wê rewşa ku afirîbû pêşket.

**- Li vir, div ku mirov li ser wê plana şerê bi kurdan re ku di leşkergeha artişa tirk de hatî çêkirin û bi wê dihatê gotin ku wê ´sed hezar kurd werina kuştin´" jî bisekinê.** Di çerçoveya vê gotinê de rêbazên şerkirina DAÎŞ´ê jî, hizrekê didina me. Em, divê ku pêşî van rêbazên bi şerkirina DAÎŞ´ê re ku hatina bikarhanîn fahm bikin. Ev rêbazên şer ku DAÎŞ´ê bikarhanîn û plana dane wê şerkirinê li dijî kurdan û her wusa bi wê re hewldane derbeyekê ku li civate kurd bixin, bi şerê rejimên herêmê ê bi kurdan re û bi gotina ku di temenê plana şer a ku hat gotin ku di leşkergeha tirk de hatîya amede kirin û biwê dihat gotin ku wê ”sed hezar kurd werina kuştin, hevdû temem dikin.

**.. Divêt ku mirov li vir pêşî, wan rêbazên ku DAÎŞ bikardihêne fahm bike. DAÎŞ´ê, rêbazên jenosîdê ên rejima Saddam, rejima tirk û artişa Sirb ku li dijî**

**Bosnîyan li dijî kurdan bikarhanî. DAÎŞ´ê rêbazên jenosîdê ên ku rejima Saddam ku li başûrê kurdistanê bikarhanî, ên ku rejiam tirk li bakûrê kurdistanê bikarhanî û ên ku artişa Sirb li dijî ´Bosniya û Herzegovîna´ bikarhanî, li dijî kurdan bikarhanî.** Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku bi şer û hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê re tiştek bi awayekî vekirî hat ditin. Ew jî, ew bû ku rêbazên jenosîdkirina kurdan li başûrê kurdistanê di dema rejima Saddam a baasê de ku dihat bikarhanîn bi rêbazên şerê teybet ên kontrayî ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bikardihanîn, me bi hevdû re ditin. Weke ku ew rêbazên rejima Saddam ên jenosîdê û rêbazên rejima tirk ên şer ku li bakûrê kurdistanê bikardihanî li berçav hatibûbûna girtin û awayekî şerkirinê bi armanca têkbirina kurdan li rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê hatibû pêşxistin. Piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê ketina şengalê û bi sedan keç û jinên kurd ravandin û birin, rêbazekê rejima Saddam ku di dema jenosîda kurd de jî bikarhanî bû. Bi heman rengî, bi hêrîşkirinê re çavtirsandin û hewldanên valakirina herêman ji mirovan û bi wê re pêşxistin şer jî, rêbazên şer ku rejima tirk ji salên 1990´î û pê de ku li bakûrê kurdistanê bikarhanîbûn û bi wan ser 4 hezar gundên kurd re dabûn vala kirin. Ev rêbaza rejima tirk, bi teybetî, bi rêbaza jenosîdê ya Saddam ya kuştin û ravandina Jinan û piştre firotina wan li welatên din ên arab re hat meşandin li şengalê. Her wusa, bi heman rengî çûna bi ser kobanê de jî. Di destpêka hêrîşên li ser Kobanê de çapameniya tirk radigihand ku "bi sed hezaran kurdên Sûrîyî hatina bersînor´" DAÎŞ, weke rêxistinaka ku taktîkên wê yên şer û rêbazên şerkirina wê, yên rejima Saddam ên jenosîdê û rejima tirk ên tafisandin û tûna kirinê bûn.

Em di vê temenê de dikarin DAÎŞ´ê weke rêxistinaka ku di vê temenê de bi mejiyekî hevbeş ku hatî avakirin werênina ser ziman. BI teybetî, mejiyê Saddam ê baasî ku jenosîda kurdan li başûr kir û mejiyê rejima tirk ê ku ev 30 sale ku bi kurdan re şer dike, bi hevdû re weke ku levkirina û biwê levkirinê re stretejikî û taktîkên şer ên DAÎŞ´ê kifşkirina û ew dane hêrîşkirin li ser kurdan. Em di serî de, divê ku van aliyan bi teybetî kifş bikin û binxat bikin.

**Rêbazên jenosîdê ên mejiyê Saddam ku li başûrê kurdistanê li dijî kurdan hatibû bikarhanîn û bi wê re komkujiyên mazin ên weke "komkujiyên anfallê" û komkujiya Helepçe" û hwd kirina, di rengê şerê DAÎŞ´ê de dihatin bikarhanîn. Her wusa, rêbazên şer ên rejima tirk jî, li wan hatibûbûna zêde kirin. Bi vê rengê, di nava rêbazan de jî, levkirinek dabûn çêkirin. Li ser van rêbazên şer ên jenosîdê, maskeya DAÎŞ´ê hatibû lê kirin. Ev rêbaz, di bin nav û maskeya DAÎŞ´ê de li dijî kurdan, li başûrê kurdistanê, rojavayê kurdistanê û hwd dihatina bikarhanîn. DAÎŞ, bi vî rengî, weke rêxistineka ku divê ku mirov wê ji gelek aliyan ve weke rêxistineka jenosîdê werênê ser ziman. Lê di vê demê de, care pêşî, rêbazekî din ê jenosîdê bi DAÎŞ´ê re li dijî kurdan hatibû bikarhanîn, ew jî ev rêbaza jenosîdê, ku care pêşî me li balqanan di şerê Sirbistanê ê li dijî Bosna-hersek(**Bosniya û Herzegovîna´) **´îyan dîtibû bû. Ew jî, ew bû ku Artişa Sirb, hemû mêrên Bosna-hersek(**Bosniya û Herzegovîna´)**´î qatil dikirin û dest diavêtina jinên wan. Hata ku jinên Bosna-hersek´î weke "koleyên seksê" bikardihanîn. Ev rêbaza jenosîdê, ku me gelek caran di çapameniyê de bi kirinên artişa Sirbê ku li dijî Bosna-hersek´îyan bikarhanî û dixwand, me bi şerê DAÎŞ´ê re dît ku li dijî kurdan jî hat bikarhanîn li başûrê kurdistanê û rojavayê Kurdistan. ..**

Lê bi destê DAÎŞ´îyan ev rêbaza jenosîdê ku me dît bi artişa Sirbê re li dijî Bosna-

hersek(Bosniya û Herzegovîna´)´îyan, di wê temenê de "fetwa" jî hatibû derxistin. Yanî, ev rêbaza jenosîdê, bo ku li dijî kurdan were bikarhanîn, di bin rengê maskeya olî û ´îslamê´ de hatibû kirin weke "fetwa"yekê. Gotina ku weke ´fetwa´yeka DAÎŞ´îyan hatibû ser ziman, ew bû ku bi wê dihat gotin ku "mêrên kurdan bikujin û jinên kurdan ji we re´halal a´ û ji xwe re bibin û bikina weke ´carîya´." Her wusa, di dewama vê gotinê de dihat gotin ku "kuştina kurdan ´halal´ a". "Destavêtina, çan, mal û jinên kurdan ´halal´ a." Bi vê rengê û bi van gotinên, weke ku bi gotina "fetwa"´yê, ew rêbaza jenosîdê a ku li dijî Bosna-hersek(Bosniya û Herzegovîna´)´îyan ku hatibû bikarhanîn, li dijî kurdan jî weke rêbazekê jenosîdê bi şerê jenosîdê ê DAÎŞ´ê ê li dijî kurdan re hatibû bikarhanîn. Em, ku gotinên ku ji devê DAÎŞ´îyan hatina dayîn gotin ku li berçav bigrin û wan dahûr(´analîz´) bikin, emê vê yekê bi awayekî vekirî pirr-baş fahm bikin. Emê di nava gotinên ku ji devê DAÎŞ´îyan dihatina gotin, bibînin ku çawa ev rêbazên jenosîdê hatina kirina weke "fetwa." û li dijî kurdan dihên bikarhanîn. Rêbazên jenosîdê, bi gotinên "fetwa"´yê, hatina gotin li ser navê îslamê. Bi wan jî, êdî DAÎŞ´a ku avakirina, dane hêrîşkirin li ser serê kurdan. Rêbaza jenosîdê a ku artişa Sirbî bikarhanî bû li dijî komek misilman ên li Bosna-hersek´îyî, bi DAÎŞ´ê li dijî kurdan hatibû bikarhanîn. Î ro jî, ev gotinên ku ji devê DAÎŞ´ê di bin reng û navê gotina "fetwa"´yê de hatina gotin, ku em li wan dinerin, em dibînin ku li dijî kurdan ev rêbazên jenosîdê hatina bikarhanîn. DAÎŞ´î, bi vî rengî, weke rêxistineka jenosîdê hatîya avakirin. Vê rêxistina bi navê DAÎŞ´ê, wê jenosîd bikira. Bi wê re jî, wê êdî ji wê jenosîdê, ne rejimên herêmê ên ku Kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin bihatan gunahbarkirin û ne jî wê ji derve li ti gunahbaran bihata lêgerîn. Piştre jî, wê weke ku qancîyekê li kurdan bikin, wê oparasyon li DAÎŞ´ê bikiran û ew ji holê rakiriban. Bi wê re, êdî wê navê xwe jî "paqij" kiriban.

Ev rêbazên jenosîdê ku DAÎŞ bikardihênê, em dema ku li wan dihzirin û wan dahûr(´analîz) dikin, em dibînin ku weke ku çawa ku li dijî DAÎŞ´ê "koalîsyonek" hatîya avakirin, bi heman rengî di temenê avakirina DAÎŞ´ê bixwe de jî aqilekî bi ´koalîsyonî" heya. Taktîkên jenosîdê ên ku li deverên din ên cihanê ku hatina bikarhanîn û bi hin awayna biserketina, hatina li hevdû komkirin û ji wan stretejî û taktîkên şerkirinê ên DAÎŞ´ê hatina kifşkirin û bikarhanîn. Em dema ku li kurdistanê û li hêrîşên DAÎŞ´ê ên li wê dinerin jî, em vê yekê bi awayekî vekirî kifş dikin û dibînin. Em çendî ku dihizirin, em gelek rêbazên jenosîdê ên ku hatina l hevdû komkirin û li dijî kurdan bikarhanîna, em kifş dikin. Lê bi teybetî, em dema ku li gotinên ku ji devê DAÎŞ´îyan hatina dayîn gotin ku mirov li wan dinerê, mirov di serî de bi awayekî vekirî, rêbazên jenosîdê ku rejima Saddam li dijî kurdan li başûrê kurdistanê bikarhanîn, rêbazên şer ên ku rejima tirk li dijî kurdan li bakûrê kurdistanê bikarhanîn û rêbazên tûnakirinê ên ku weke rêbazên jenosîdê dihên binavkirinên ên artişa sirbê ku li dijî Bosna-hersek(**Bosniya û Herzegovîna´)**´îyan bikarhanîna, em pirr zêde kifş dikin. Weke ku gelek rêbazên din jî di nav de, lê bi teybetî ji van hersê rêbazan hin rêbaz hatina naqandin û sentezkirin û li gorî demê û herêmê hatina birêxistinkirin û di bin navê olê de jî hatina xistin weke "fetwa"´yan û li dijî kurdan hatina bikarhanîn bi DAÎŞ´ê.

Di aslê xwe de, di rengê Olî de birêxistinkirina DAÎŞ´ê hem bo wê û hem jî bo van rêbazan û bikarhanîna wan hem dibe temen û hem jî dibe weke maskeyekê. Yanî, ol bi vî rengî dihê bikarhanîn. BI wê re jî, ol dibe weke maskeyekê bo hêzên li pişt DAÎŞ´ê ku wê bi kurdan re didina şer kirin. Bi heman rengî, ji gelek deverên cihanê xapandina

mirovan hanîna navan DAÎŞ´ê û li dijî kurdan dayîna şerkirinê, dîsa dibe weke maskeyekê ji van hêzên li pişt DAÎŞ´ê ku wê didina şer kirin. Bi vî rengî DAÎŞ, weke rêxistineka ji gelek aliyan ve li wê hatîya hizirin û ew hatîya avakirin. Wusa hasab bikin ku wê ji kîjan aliyê ve û kîjan mezhebê olî bikarbênin jî, li wê jî hatîya hizirkirin. Bi wê re jî, rêbazên jenosîdê ku berê hem li dijî kurdan hatina bikarhanîn û hem li dijîn xalkên din ên cihanê ên weke Bosna-hersek(**Bosniya û Herzegovîna´)**´îyan û hwd ku hatina bikarhanîn, hatina kifşkirin û bi navê olê û îslamê jî kirina weke "fetwa" û hatina hanîn bikarhanîn li dijî kurdan. Î ro jî, dema ku em li rengê şerkirina DAÎŞ´ê û şerê wê dinerê, em vê yekê bi awayekî pirr vekirî kifş dikin. Bi vî rengî, dema ku em rewşê bi navê DAÎŞ´ê ku kifş dikin ku gelek rêbazên jenosîdê ku bi rengê şerê DAÎŞ´ê re ku bi hevdû re hatina hûnandin ku hatina bikarhanîn ku dibînin, em fahm dikin ku weke ku çawa ku li dijî DAÎŞ´ê koalîsyonek hatîya avakirin, bi heman rengî bi mejiyê ku di temenê avakirina DAÎŞ´ê de ya jî ´koalisyonek´ heya. Ev ji kûderê dihê ditin û fahm kirin? Ev ji rengê şerkirina DAÎŞ´ê û ji rengê taktîkên şer û bikaranîna wan rêbazên jenosîdê ên ku bikardihêne, em fahm dikin. Rastîya DAÎŞ´ê, bi vê rengê xwe dide li dest. Ew rewşa olî a îslamî ku bi gotina "fetwa"´yê re dihê ser ziman, di temenê bikarhanîna van rêbazên jenosîdê de hatîya **bikarhanîn**.

**. Li kurdistanê, navê gîyane hevbeş a kurdistanî bû ´kobanê´ û ankû ´berxwedana kobanê´.** Kobanê, bajarekî kurdistanê ku dikeve rojavayê kurdistanê de ya. Lê î ro, ev bajarê kurdistanê, navê gîyane kurdistanî ya. Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya li Kobanê destpêkirin û pê de, li giştîya kurdistanê kurdistanî rabûna ser pîyan û bertek dan nîşandin. Ev bertekên bo kobanê hatina dayîn nîşandin, êşî li giştîya bakûrê destpêkirin û pêl bi pêl mazin bûn. Gelê kurd ê bakûrê kurdistanê rabû ser pîyan. Serhildan kir. Deverek name ku ne rabû ser pîyan. Piştre, hin bi hin deng ji herêmên din ên kurdistanê derketin. Herêmên başûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê jî rabûna serpîyan. Li rojhilatê kurdistanê, li herêmên weke ´Ciwanro, Ûrmîya, Mihabad, saqiz, Merîwan, Sînê, Kirmaşan û hwd, ku bi dehan cihên din ên rojhilat kurdistanê jî di nav de li wan xwepêşandin ji aliyê kurdistanîyan ve hatina li darxistin. Kurdên li paytaxta îranê li Tahranê û Tebrîzê jî rabûna serpîyan. Wan jî, xwepêşandin li darxistîya. Di çalakiya jin û mêr bi hevdû re tevlî bibûn de, dovîzên bi nivîsên “Kobanê ne bi tenê ye”, “Berxwedan jiyan a”, “Bimire DAIŞ”, “Bimire Dewleta Îslamî” hatibûn hildan. Di hemû xweşandinên li rojhilatê kurdistanê de ev dirişm li ser dovîzan hatina nivîsandin û hildan û hatina avêtin. Pasdarên îranî, hêrîşî xwepêşandinên kurdistanîyan kirina û bi sedan kurdistanî girtina û binçav kirina. Lê vê helwesta rayadarên îranî a bi armanca bêdeng kirina civate kurd, ne gihiştîya armanca xwe. Kurdan, xwepêşandinên xwe li darxistin û hêrîşên DAÎŞ´ê ku bi alikarîya tirkiya li kobanê dibin şermazar kirin.

Li rojhilatê kurdistanê, li darxistina xwepêşandinan giring a. Rojhilatê kurdistanê, ji her aliyê ve civate kurd ji aliyê rejima îranê ve hatîya dorpêç kirin. Heta ku bi wê dorpêçkirinê, nahêle ku ti agahî jî ji herêmê derkevina derve. Hemû tevgerên civatî ên kurdistanî, di temenekî dijberî olî de dihên şîrovekirin û diçina bi ser wan de. Piştî hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kobanê ku bûn û pê de, weke hemû herêmên din ên kurdistanê li rojhilatê kurdistanê û hemû bajar, navçe û herêmên wê ên ku mirov lê dijîn ew xwepêşandin û da nîşandina bertekên kurdan hatina dayîn nîşandin. Bi vê yekê re, di aslê xwe de, ew gîyane kurdistanî ku berxwedana kobanê bû navê wê, li hemû deverên kurdistanê û her wusa li hemû deverên cihanê ên kurd li wan dijîn kurd rakirina

serpîyan. Li rojhilatê kurdistanê jî kurd rabûna ser pîyan.

Bi wê re, divê ku mirov bibêje ku li başûrê kurdistanê jî, tevî ku hikimeta kurd, bêhelwest disekinî jî, hemû kurdistanî li hemû bajar, navçe û herêmên başûrê kurdistanê li ser lingan bûn û hêrîşên DAÎŞ´ê ên bipiştgirîya tirkiya şermazar kirina. Ev rewş, her wusa, bo kurdên li welatên ewropa dijîn wusa bû. Bi vî rengî, gîyanek hevbeş ya kurdistanî, bi berxwedana kobanê re bi awayekî vekirî derket li holê û hat ditin. Hêrîşên li Kobanê, çend ku bi armanca şikandina kurdan dihatina kirin jî, lê bi bandûra wan hêrîşan kurd şîyar dibûn û di gîyanekê de digihiştina hevdû û bi hevdû re li her cihê ku lê bûn çalakî li dar dixistin. Hêrîşên li ser Kobanê û berxwedana di hundurê kobanê de ku kurdistanîyan dida nîşandin, kurd û beşên civate kurd ên hemû beşên kurdistanê gihandina hevdû. Li dora armanc û gîyanekê ew kirina yek. Bi vî rengî, rewşek jî bi berxwedana kobanê re derket li holê. Ew sînorên ku di nava kurdan de hatibûbûna danîn, hat ditin ku dema ku hêrîşek li beşeka kurdistanê û civate kurd bû, li dijî wê bo bertek dayîn nîşandinê ne asteng û nabina asteng. Mirovan, ew sînor, bi vî rengî ji holê rakirin. Weke ancamaka berxwedana kobanê mirov dikarê werêne ser ziman ku ew sînorên kdu mejîyan de hatibûbûna kişandin ji wan hat buhurandin. Kurdan, ew di mejiyê xwe de buhurand in. Berxwedana Kobanê, ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, gîyanek civatî ya hevbeş afirand û kurd hemû li dora wê gîyanê gihand hevdû.Piştî ku hêrîş li Kobanê zêde bûn û pê de, li kobanê berxwedana hebû û li giştîya kurdistanê jî serhildan hebûn. Li her çar beşên kurdistanê li bakûrê kurdistan, rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê serhildan hebûn. Di navenda wan serhildanên kurdistanîyan de jî, berxwedana kobanê hebû. Bo vê yekê, mirov divê ku navê lêbike û bibêje ku li kurdistanê serhildan hebû û navê wê serhildanê jî ´berxwedana kobanê´ bû.

Li bakûrê kurdistanê, ji ssale 2013´an de ´pêvejoyek´ ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin hebû. Lê rayadarên dewletê, çend ku hertimî gotina "pêvajoyê didomê" û hwd jî, ti gav neavêtin. Her wusa, temenê vê pêvajoya hêrîşan jî li ser wê hatibû avakirin. Wusa hasabkiribûn ku wê bi van hêrîşan, ji kobanê ve derbeyek li kurdan bihata xistin. Piştre jî, wê ev derbe li pêvajoyê jî biketa. Di vê temenê de aqilek meşandibûn. Bi wê aqilê ku meşandibûn, wusa hizirkiribûn ku ev derbeya ku ji kobanê ve li kurdan were xistin, wê temenê statûtûya civate kurd a kurd dixwezin jî were ji holê rakirin. Ji xwe hemû hêrîş bi armanca tûnakirina temenê statûya civatê a civate kurd a. Yanî, bo ku pêvejoyek din weke ya piştî konferanse Lozanê li ser temenê bêstatû hiştina kurdan were pêşxistin û domandin, dixwestin ku derbeyek li kurdan were xistin. Di dema ku hêrîşên li Kobanê destpê dikirin de, kurdan bidestê xwe sê-dibistan ku yek li baxlare Amedê, ya duyemin li Geverê û ya sêyemin jî li Cizîra botanê bû û ku vekiribûn, rayadarên tirk, çûn û mohr li devê derîyê wan xistin û ne hiştin ku zaroyên kurd di wan de perwerdeya xwe bi zimanê kurdî bibînin. Kurdan, bi wê re jî, hefteyekê dibistanên tirkî boykot kiribûn. Her wusa, ew roja ku mohr li devê derîyê dibistanên kurd hatibû xistin jî roja 15´ê êlûna 2014´an bû. Kurdan, belkî deh caran ew mohr qatandin û avêtin. Lê her care kurdan ew mohr diqatandin û diavêtin jî, rayadarên tirk, diçûn carek din mohr li devê derîyê wan dibistanên kurdî dixistin. Ji xwe piştî vê re êdî pêla hêrîşên xadar li ser kobanê li civate kurd destpêkiribû. Çi rasthatin bû ku destpêka pêla hêrîşên DAÎŞ´ê ên li ser kobanê rastî roja ku di wê de Sîûqast li Birêz Ocalan hatibû kirin bû. **Bi tememî pêvajoyek ku bi rêbazên jenosîdê li dijî kurdan dihat şerkirin hatibû pêşxistin.** Kurdan, di her 8´ê kewçêrê de vê sîûqastê şermazar dikin. Di

zihniyeta wê sîûqastê de pêlek hêrîşan ya ku biwê dixwestin ku kurdan bişikênin, dabûbûn destpêkirin kurdan. Bi vê re kurdan jî, ev hêrîşên li kobanê, weke dewama wê komploya 8´ê kewçêrê jî dihanîn ser ziman. Kurdan, berî wê, bi milyonan daketibûbûna qadan û mohrkirina dibistanên kurdî şermazar kiribûn. Piştre jî, kurd, ji qadan ne vaqatîyan. Piştre, bo kobanê û bo berxwerdana kobanê, pêla xwepêşandinên kurdistanîyan li her deverê destpêkirin. Serhildana gelê kurd û kurdistanîyan hemûyan êdî destpêkiribû.

Di serhildana kurdan a bakûrê kurdistanê de, bi dehan kurdistanî hatina qatilkirin ji aliyê polîs û leşkerên dewletê ve. Di herdû rojên pêşî ên serhildana kurdan de zêdetirî 26 ciwanên kurd li bakûrê kurdistanê hatibûbûna qatil kirin. Polîs û leşkerên tirk, bi alîkarîya komên faşîşt û hizbil-kontrayên ´huda-par´î hêrîşî kurdistanîyan û civate kurd dikirin. Di rojnameyên tirk de, dixwestin ku bertekên kurdan, di nava gotinên weke "hatina berhevdû ya PKK û hizbileh" de bitefisênin û bêbandûr bikin. Lê ew ´hizbileh´ên ku kurd, wan weke ´hizbil-kontrayên dewletê´ bi nav dike jî, hin komên ku dewletê ol bikarhanîbû û ew li ser olê re ku li dijî pêşketina civate kurd birêxistin kiribûn bûn. Di vê temenê de jî, ew bikardihanî. Bi destê van komên hizbil-kontra, bi sedan pêşengên civate kurd, alim û rewşenbîrên kurd hatina qatil kirin. Yanî, ew jî, komek ´paramilîter´ bûn. Di vê dema ku serhilana kurdan destpêkiribû de, dewletê dîsa ew jî derxistibûbûna pîyasê û didane hêrîşkirin li ser kurdan. Ev qatilên dewletê ku di bin navê "huda-par´ê de hatina bi rêxistin, bidestê hêrîşkirina li kurdan dikirin. Di aslê xwe de, di bin navê navekî weke navê ´hûda-par´ê de birêxistin kirina van qatilan, rengekî din ê bikarhanîna wan li dijî civate kurd bû. Pêşketina civate kurd, bi kîjan awayî û aliyê de pêş dikeve, van qatilan jî, li gorî wê rengê pêşketina kurd li kurdistanê û di nava kurdan de birêxistin dikin. Ev jî, êdî di nava civate kurd de, komkujiyan pêktênin, fitneyê derdixin û hêrîşî nirxên civate kurd dikin. Divê demê de jî, ev yek, bi awayekî vekirî hat ditin. Di vê dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li ser kobanê zêde bûbû de û ku kurdistanîyên li kobanê berxwedan dikirin û li hemû herêmên din ên kurdistanê ´serhildan´ hebû, ev komên qatil, ên bi navê huda-par´ û ankû hizbil-kontra, weke lingekî DAÎŞ´ê ê di nava kurdan de derxistina li holê û li ser navê vê rêxistina DAÎŞ´ê a kujar didane hêrîşkirin li ser hebûna civate kurd û ciwanên kurd bi destê rê xistina qatil a dewletê didane kuştin.

.. **Piştî ku çeteyên DAÎŞ**´ê hêrîşî herêmên Şengalê kir û pê de, bi deh hezaran kurdan goçî herêmên din ên kurdistanê kirin. Lê çeteyên DAÎŞ´ê, bi hezaran keç û jinên kurd ên ku sax girtibûn, berhevkiribûn û biribûn û firotibûn. BI sedan ji wan, biribûbûna welatên din ên araban. Di dema Saddam de jî, dem a ku artişa saddam hêrîşî herêmên kurdistanê dikir, mirovên mazin ên weke dê û bav dikuştin û zaroyên wan ên keç ên zaro berhev dikirin û dikirina arabayan de ûû dibirina welatên din ên arab. Bi vî rengî, bi hezaran keçên kurd, heta roja me jî, winda na. Ev rêbaz, piştre di dema hêrîşên DAÎŞ´ê de carek din jî hat pêşxistin. Bi hezaran keçên kurd ên civate kurd a êzîdî, ketina destê DAÎŞ´ê de. Ên ku derfet dîtina û ji destê çeteyên DAÎŞ´ê ravîyana, piştre xwe gihandina qadên çîyayê şengalê ku dibin kontrola hêzên kurd ên YPG´ê, HPG´ê, ûYPJ´ê de. Piştre, ew serborîyên xwe wan keçên dihanîn ser ziman. Di wan hanînên ser ziman de, digotin ku ”em dibirina bazaran û di firotina mirovan û wan jî em ji xwe re dibirin.” Ev rewş, di nava kurdan de bû temenê êşên pirr mazin. Piştre jî, biheman rengî, li herêmên din kurdistanê ên weke rojavayê kurdistanê û başûrê kurdistanê û hwd,

xwestina ku heman rewşê pêş bixin. Weke ku DAÎŞ´î yan di nava xwe de jî hanîbû ser ziman, mêrên kurd dikuştin û keç û jinên wan ên ku xwe digihandina wan dibirin û bi vî rengî li wan dikirin. Yanî, weke ku çawa ku artişa Sirb, di dema ku diçû biser Bosna-hersek de û ku mêr berhev dikirin û li ber hêt rêz dikirin û piştre ew gûlabaran dikirin, bi heman rengî rewşek li kurdistanê jî bi DAÎŞ´ê re hatibû pêşxistin. Ev rêbaz, me li kurdistanê berî derxistina li holê a DAÎŞ´ê û dana hêrîşkirinê li ser kurdan, li başûrê kurdistanê di dema rejima saddam de û li bakûrê kurdistanê jî di dema salên 1916´an di dema komkujiya koçgirî de û salên 1937´an di dema komkujiya dersimê de jî hatibû hanîn li serê kurdan. Di dema komkujiya dersimê de artişa tirk, kurdên weke dê û bav ên mazin digirtin û li ber hêt didan rêzkirin û gûlabaran dikir. Lê keçzarokên piçûk, berhev dikirin û dikirina arabayên leşkerî de û jji herêmê dibirin. Lê ev rengê rêbaza jenosîdê ku artişa sirb li ser serê Bosna-hersek´îyan bikarhanî, di temenê bi tememî koka civatekê a etnikî ku zûwa bike bû. Bo vê yekê, ev rêbaz, bo ku ev koma etnikî nikaribê xwe zêde bike, bo wê hatibû bikarhanîn. Bi awayekî din jî, dema ku mêr dikuştin û jin berhev dikirin û weke ”koleyên Seksê” bikardihanîn jî, biarmanca bi tememî ji hevdû felişendina wê civatê bû. Bosna-hersekî, biqasî ku tê gotin, misilman jî bûn. Ev rêbaza ku li dijî wan dihat bikarhanîn. Î ro, heman rêbazê jenosîdkirinê, bi destê DAÎŞ´ê li dijî kurdan dihê bikarhanîn. Di vê temenê de, divê ku mirov vê jî bi vir ve girêdayî werêne ser ziman ku DAÎŞ´, ne rêxistinaka ku armanca wê avakirina rêveberîyekê ya. Çend ku bi vî rengî dem bi dem hin gotin hatina gotin û di wan de gotinan de hat ser ziman ku ”DAÎŞ, dixwezê dewletek îslam ava bike” jî, ev gotin tenê gotinên Bîrdozîkî(îdeolojîkî) bûn û bi armanca propaganda hatibûbûna bikarhanîn. DAÎŞ, rêxistineka ku wê hatibû xwestin ku bi rêbazên jenosîdê ku derbeyê li civate kurd û pêşketina wê were xistin û bi wê re jî temenê statûya civatî a kurdan were ji holê rakirin bû. Bo vê yekê jî, tenê armanca DAÎŞ, kurd û kurdistan bû. Wekîî din jî, ti armancên wê nebûn. Ji kurdan û pê de, hêrîşî ti kesekî ne dikir. DAÎŞ´ê, hêrîşên xwe tenê li kurdistanê û li kurdan û komên din ên civatî ku li kurdistanê dijîn dikir. Li kurdistanê, kom ji hevdû cuda hebûn. Li kurdistanê hem komên ku bi rengê bawerî cuda na ên weke êzîdî û asûrîyan û hwd hena, û hem jî komên ku bi koka xwe ên weke sûryanî û hwd hena. Bi teybetî ev cudahîyên kurdistanî hatina armanc girtin. Ji DAÎŞ´ê re kirina weke armancakê van komên ku bi koka xwe ya kêmenetewî û ku bi bawerîya xwe cuda na, weke politikayeka li dijî civatîya kurdistanî bû.

Li vir, divê ku mirov vê aliyê hêrîşên DAÎŞ´ê jî bi vê gotina ´jenosîdê´ re li ser bisekinê. DAÎŞ, tenê li kurdistanê hatîya dayîn hêrîş kirin. Çend ku tê gotin ku «wê DAÎŞ, hêrîşên xwe piştre li deverên din jî bike» jî, em divê ku bibêjin ku mirov di vê demê de nikarê van gotinan piştrast bike. DAÎŞ´, weke rêxistinaka ku di rengê hêrîşên xwe de rêbazên jenosîdê bikardihênê û hêrîş dike. Ev rêxistin, ji aliyê Tirkiya ve hat xwedîkirin û mazin kirin. Alikarîya Îranê jî, Ji wê re heya. Çend ku Îran, b mezhebî ji wê cudaya jî, bo ku DAÎŞ li ber serbikeve alikarî dayê de. Lê bi teybetî, di destpêkê de di mazinkirina DAÎŞ´ê de tirkiya rol û weyn leyistiya. Tirkiya, stretejiyên wê kifşkirina. Em î ro vê yekê dizanîn. Lê weke ku me li jor jî hanî ser ziman, ew aqilê ku di temenê birêxistina rêbazên ku DAÎŞ bikardihêne de pirr-rangîyek heya. Bo vê yekê, divê ku mirov ji aliyê wî mejiyê ku DAÎŞ afirandîya de, hinekî hê ji tirkiya maztir bihizirin. Di destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê de, rayadarên tirk ên leşkerî gotinak dapalandibûn(´sızdırmak´) li çapameniyê. Ew gotin jî, ew bû ku digotin ku wê «sed

hezar kurd werina kuştin.» Ev gotin, di çerçoveya planak şer ya şerkirina bi kurdan re de digotin. Herkesekî di wê demê de ev gotin nîqaş dikir û digot ku ka wê çawa hêrîş li kurdan bibin û wê sed hezar kurd werina kuştin. Piştre, ne bi gelekî re ku DAÎŞ hat derxistin li holê û bidest hêrîşên xwe yên komkujiyê kir, êdî hizir û plana şer ya ku di temenê wê de ev gotin dihat gotin jî zelal dibû. Wusa hizir kiribûn ku wê DAÎŞ, herê biser kurdan de. Wê dînamîkên kurdan ên berxwedêr werina tûna kirin. Bi wê re, wê girseyên mazin ên civatî bi hêrîşan werina radest(´teslim`) girtin. Piştre, ku hêrîşên DAÎŞ li Şengalê, xanaqîn, maxmûr û herêmên din ên başûrê kurdistanê bû, hinekî din rengê vê gotinê kifş bû. Lê bi hêrîşên vê rêxistina kujar ên li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li Kobanê re, weke ku êdî bi tememî rengê vê plana şerkirina b kurdan re ku di temenê wê de dihat gotin ku wê ”sed hezar kurd werina kuştin” jî, safî û zelal dibû. DAÎŞ´î, ti zanîn û fêra wan ya şer tûna ya. DAÎŞ, ne rêxistineka wusa ya ku zanîn û fêra wê ya şer heya. Yên ku di nava wê de şer dikin, leşkerên tirk in. Her wusa, DAÎŞ, ne rêxistineka ku karibê, stretejikî û takîtên şer jî kifş bike û bike piretîkê de ya. Ji ew zanîna wê jî zêde tûna ya. Her wusa, bi zanîn, fêr û teknîka wê re tirkiya ne tenê li pişt DAÎŞ´ê disekinê, her wusa di nava DAÎŞ´ê de ya û şer dike û şerê DAÎŞ´ê bi kurdan re dimeşêne. Her wusa, bi tirkiya, ew dordorên weke ên dem rejima saddam û hwd jî, bi hinek dordorên din re hena ku wê temenê zanîn û fêra şer di nava DAÎŞ´ê de diafirênin. Bi wan re, rejimên weke rejima tirk û hwd jî, teknîka şer û hwd didinê de. Di dema vê de, em divê ku wê plana serkirina bi kurdan re û wê gotina wê ”sed hezar kurd werina kuştin” hildina li dest û hewl bidin ku fahm bikin.

.. **Li v**ir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku di roja 19´ê gûlana 2014´an de ku hêzên PDK´ê biser saziyên kurdan ên li başûrê kurdistanê de digirê, hêzên Îranê jî, li dijî PJAK´ê bidest oparasyona leşkerî dike. Tirkiya jî, li herêmên bakûrê kurdistanê ên Şîrnaxê û dersimê oparasyon li dar dixist. Li vir, ya ku dihê fahmkirin ew a ku konsepta şer ya ku vê naqlê rejima tirk çêkiriya, wusa hasabkirina ku di şerekî ku biqawimê de Îran jî ji aliyê xwe ve bidest şer bike û hêzên ku kurd bikina nava xwe de û êdî herina biser wan de û derbeyê li wan bixin. Wusa dihê ditin û fahmkirin ku ew civîna li qasra sadabadê ku rayadarên tirk û Îranî bi hevdû re li darxistin, li ser hin konseptna bi vî rengî jî li hevdû kirina û di wê çerçoveyê de amedekarîya dikin. Li bakûrê kurdistanê tevgerîya leşkerî a rejima tirk û li aliyê rojhilatê kurdistanê di van rojên dawiyê de zêdebûna tevgerîya leşkerî a Îranê, hinekî jî vê yekê radixe li berçav. Bi teybetî PDK´ê bi sîyeseta ku dimeşêne, xwe dike lingekî planaka bi vî rengî ya têkbirina kurdan. Bêgûman, Îran jî û tirkiya jî, çendî ku bi kurdan re şer bikin jî, wê derbeyê nikaribin li kurdan bixin. Bo vê yekê, ji nava kurdan, hêzeka ku bi wê derbeyê li civate kurd bixe, dixwezin ku derxin û weke ku PDK´ê kirina pozisyonaka bi vî rengî de. Ya ku li PDK´ê dikeve ku xwe nekê pozisyonaka bi vî rengî de. Ev ji bo wê, ti carî nabê rûmet.

Wusa tê ditin ku şerekî mihtemel ku bi kurdan re destpê bike, wê tenê Tirkiya ne di wê de bê. Heya ku Îran jî, di nava şerekî bi vî rengî de bê. Weke ku tê zanîn, ev demeka dirêj a ku tirkiya danûstandinên wê bi rayadarên Îranê re hena ku wê bikişêne şerekî bi kurdan re. Bi teybetî, piştî wê civînna li qasra sadabadê, hin bi hin bi hinek politikayên rejima tirk û Îranê re gotinên bi vî rengî bidest bi lêvkirina wan hat kirin. Her wusa, ji xwe ev demeka ku ketîya rojevê de ku artişa tirk li ser planaka şer ku tê gotin ku di wê de ser sedhezarî re kurd werina kuştin kar dike. Yanî, wusa xuya dike, ku di vê temenê de planaka giştî dihê kirin. Rejima tirk, di vê çerçoveyê de, weke ku ji nû ve dagir bike,

li bakûrê kurdistanê bi sadan qarakol û bendav bi armanca stretejiya leşkerî çêdike. Hê jî, ev çêkirin didom in.

Di konsept û ankû planaka bi vî rengî ya şer de, wusa dihê ditin ku hatîya hizirkirin ku dewletên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, bi hevdû re şerekî mazin bi kurdan re bidina destpêkirin. Berî nûha, bi demekê li ser "modela Sirî-lanka" hatibû nîqaşkirin. Ev rengê planak şer a di leşkergeha artişa tirk de ku tê gotin ku wê bi wê ´sed hezar kurd werina kuştin´ û tevgerîya leşkerî ya li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk dike, û tevgerîya leşkerî ku di rojên dawiyê de rejima Îranê destêkiriya û hwd, di vê çerçoveyê de planakê radixe li berçav. Ev plana artişa tirk ya ku bi wê dihê gotin ku wê sed hezar kurd werina kuştin, bi pêşveçûnên weke çêkirina qarakolan a li bakûrê kurdistanê û tevgerîya leşkerî a artişa tirk û her wusa bi tevgerîyên dawiyê ên artişa îranê re mirov hilde li dest. Her wusa, ev tevgerîyên ku bi PDK´ê dihên dayîn kirin ên weke bisersaziyên kurdan de girtinê li başûrê kurdistanê û hwd, mirov nikarê dûr şîrove bike.

Di dema ku ev gotin tê gotin ku ´sed hezar kurd werina kuştin´, gelek mirovn serî diwastandin ku ka wê çawa ´sed-hezar kurd werina kuştin´. Dem di buhurî. Herkesekê ku aqil dimeşend jî, aqil ne dikir ku tirkiya li ser DAÎŞ´ê re planaka stretejikî çêkirîya ku li başûr û rojavayê kurdistanê hêrîşî kurdan bike. DAÎŞ, pêşî li rojava dan hêrîşkirn li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li Kobanê. Lê di her hêrîşên wê de hat şikandin. Piştre jî, DAÎŞ dane hêrîşkirin li ser şengalê. Li wir, bi hezaran mirov hatin qatil kirin. Bi sed-hezaran kurdên êdî ji warên wan hatin goçberkirin. Piştî ku li başûrê kurdistanê û bi teybetî li şengalê ev komkuji hat kirin dî piştre li ser wê deronîyê re DAÎŞ dane hêrîşkirin li ser Kobanê. Hêzên weke tirkiya û Îranê ku ji aliyê ve piştgirîyê didina DAÎŞ´ê bo ku kurdan bişikêne, wusa hasab kiribûn ku wê DAÎŞ kurdan bişikêne. Wê bi wê şikandina kurdan re bi deh-hezran kurdan bikujê û bi serkeve. Di aslê xwe de, ev gotina bi rengê ´sed hezar kurd werina kuştin´ a ku bi navê ´leşkergeha tirk´ dihat ser ziman, hat hanîn li cih. Li şengalê bi deh-hezaran kurd qatil kirin. Piştre, Şengalê bi wan komkuji û goçberkirinan vala kirin. Piştre jî, berê xwe dane bi ser Kobanê de. Li wir jî, yanî li Kobanê jî, wusa plan û hasab kiribûn. Wusa hasabkiribûn ku tişta ku li şengalê kirin wê bi hêrîşên DAÎŞ´ê li Kobanê jî bikin. Di vê temenê de, planaka giştî ku bi wê bi tememî derbeyê li kurdan bixin hatibû amede kirin. Piştî komkujiyên dewleta Srî-lanka ên li ser ´tamilîyan´, dihat nîqaşkirin ku bi heman rengî tiştekî werênina bi serê kurdan de. Lê dema ku ev gotin digotin jî, îhmal ne dikirin û digotin ku ´planaka bi vî rengî li herêmê temenê wê tûna ya´ Yanî, piştre hat dîtin ku planaka di wê zihniyetê de bi DAÎŞ´ê li gorî herêmê hatî bi rêxistin di serê van rejimên herêmê ên rojhilat de hebû. Piştre ne bi demek dirêj re, gotinên weke ´sed hezar kurd werina kuştin´, hat hanîn li ser ziman. Ev gotin, dema ku hat hanîn ser ziman, mirovên ku ev gotin şîrove dikirin, ji kirinên tirkiya ên ku hat roja me kirina ji wan gav diavêtin û şîrove pêş dixistin û digotin ku Wê rejima tirk, oparasyonên berfireh li kurdan bike û komkujiyêên mazin bikê´. Lê dewleteka ku hizir dikir ku kurdan di nava xwe de bi pêvajoyên bişavtinê bihalêne, wê bi vî rengî di vê sadsalê de neçê bi ser kurdan û bi navê xwe bi vî rengî komkujiyên mazin nekê. Bo vê yekê, weke îcatek û kifşeka pirr baş DAÎŞ´ kifşkirina û derxistina li pîyasê ku bi kurdan re şer bike û bi destê wê derbe li kurdan were xistin. Bi vî rengî, wê êdî hem ji kurdan û tekoşîna wan ya azadîyê xilas bibin û hem jî wê planên xwe bibina sêrî li ser serê kurdan.

Rejimên herêmê, di vê temenê de planak kiribûn. Li berçavên hemû cihanê, rêxistinek weke DAÎŞ´ê derxistin li holê. Kirin û kiryarên ku wê van rejimên ku li ser serê kurdan serdest in ku bi destê xwe kiriban bi destê DAÎŞ´ê dikirin. Bi wê re jî, wê DAÎŞ´ê bi navê «rêxistinek tundrew» derdiketiba li holê û hemû tişt bi navê van rejiman bikira. Wê piştre, ev rêxistin bo ku ev komkuji kirina jî, wê li wê «oparasyon bikiran». Bi wê re, wê hem xwe û navê xwe ´paqij´ derxistiban û hem jî wê bi destê DAÎŞ´ê ji kurdan û tekoşîna wan xilas bûban. Di vê temenê de planak hatibû amede kirin. Ev plan, weke plana têkbirina kurdan a sadsalê bû. Bo vê yekê, bo ku DAÎŞ´ê were pêşxistin, bi salan rejimên herêmê ên weke Îran û Tirkiya di nava xabatê de bûn. Xabat kirina. Di ancama wê de DAÎŞ derxistina. Bi vê re jî, di aslê xwe de berî destpêkirina hêrîşên DAÎŞ´ê li herêmên kurdan û kirina komkujiyên wê, hanîna ser ziman gotinên weke ´sed hezar kurd werina kuştin´, dibûna gotinên ku rayagiştî ji komkujiyên mazin ên ku wê werênina serê kurdan de amede bikin bûn. Ev gotin, bi vê armancê dihatina gotin. Bi gotinên bi vî rengî, nîqaşek jî dan kirin. Bi wan nîqaşan ev gotin dimejiyê mirovan de bicih kirin. Herkesekî, dema ku ev gotin dihatin ser ziman, digotin ku ´wê ji kûderê ve hêrîş li kurdan destpêbikin û komkujiyên mazin ku di wan de ´sed hezar kurd werina kuştin´, wê bibin´. Ji xwe, li bakûrê kurdistanê rejime tirk, pêvajoya çarserîyê ku birêz Ocalan dabûbû destpêkirin hebû. Ev jî, di serê mirovan de bû. Êdî, ji ber vê pêvajoyê, ti kesekî hêvî nedikir ku wê tirkiya hêrîşên bi vî rengî li kurdan bike. Ji xwe, rayadarên dewletê ên tirk jî hertimî derdikevina berçapameniyê û dibêjin ku ”pêvajo didomê”, ”emê gavan biavêjin”, ”em naqşaya rê amede dikin” û hwd. Bi gotinên bi vî rengî jî rayagiştî didinan nîqaşkirin. Lê ji bin ve jî, DAÎŞ´ê bi rêxistin dikin û alikariyê didinê de. Çekan didinê de. Ji her aliyê ve alikariyê didinê de. Di vê temenê de ku gotina ´pêvajoyê´ jî di nav de, di çerçoveyeka mazin û giştî de planaka stretejikî a şikandina kurdan hatibû amede kirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku piştre hin bi hin hat dîtin û fahmkirin ku ew ´kuştina sed-hezar kurdî´ wê bidestê DAÎŞ´a ku weke projeyeka rejimên herêmê a rejimên tirkiya û Îranê ku bi wê kurdan bişikênin, wê bidestê vê rêxistinê ew komkuji bihata kirin. Wê sed-hezar kurd, bi destê DAÎŞ´ê bihata kuştin. Di vê temenê de, di aslê xwe de DAÎŞ, weke ”koalîsyonaka” ku li pişt wê di serî de Îran û tirkiya heya ya. Ev rêxistina ku wee ”koalîsyona” tirkiya û Îranê ya, koalîsyonaka bi vî rengî ku li ser esasê ku bi wê derbeyek li kurdan werê xistin a. Wusa dihê dîtin û fahm kirin ku van rejiman, pirr bawerî bi vê rêxistinê hanîya ku wê derbeyekê li kurdan bixe. Hemû hasabên xwe jî,, li ser wê derbeye ku wê DAÎŞ li kurdan bixe çêkirina.

Dema ku em ji vê aliyê lê binerin, î ro bi hêrîşên DAÎŞ´ê re em rastîya vê gotina bi rengê ´sed hezar kurd werina kuştin´, baştir fahm dikin. Ev gotin, di vê temenê de hatîya gotin. Yanî, ev gotin, weke gotinaka ku di temenê amedekarîyên ku bi DAÎŞ´ê hatina kirin de hatîya gotin. DAÎŞ´, bi vî rengî, weke rêxistineka ku wê ´sed hezar kurdî bikujê´ hatîya birêxistin kirin. Di vê çerçoveyê de, di serî de, herdû herêmên kurdistanê ên başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê ku li wan rêveberîyên kurd ava na, kirina armanca hêrîşên DAÎŞ´ê. Heta ku van rejimên ku hasab li ser hêrîşên DAÎŞ´ê kirina, xwe negirtina û wusa hasab kirina ku wê DAÎŞ, tenê derbeyê li rojavayê kurdistanê nexê, wê derbeyê li başûrê kurdistanê û destkevtiyên kurdan ên li vê beşa kurdistanê jî bixe. Di vê temenê de jî hizirîna. Bo vê yekê, li başûrê kurdistanê, DAÎŞ, dane hêrîşkirin li ser herêmên kurdan. Ji vê yekê dihê fahm kirin ku ji pêşxistina DaîŞ´ê û

heta ku ji Musilê vekişîna artişa Îraqê û li wir lli şûna bicihkirina DAÎŞ´ê û hemû çekên artişa Îraqê di bin navê ”desteserkirinê” de kirina destê DAÎŞ´ê de jî bi plan û program hatîya kirin. Her wusa, li ser olê re çêkirina temenê DAÎŞ´ê bi bîrdozî û hwd jî, di vê temenê de hatîya hizirkirin. DAÎŞ´, li herêmê di rengê ”dewleta Îslam” de bi navkirina wê de jî, di çerçoveya vê planê de weke gotinaka birdozîkî (îdeolojikî) divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, weke ”xelîfe” denezendina qatilekî bi navê ”el-baxdadî” jî, lingekî vê planê ya ku divê ku mirov bi teybetî balê bikişêne li ser ´wê û fahm bike.

Êdî, hatîya fahm kirin ku ew rêxistina DAÎŞ´ê ya ku wê bi destê wê, ´sed hezar kurd werina kuştin´. Ev yek, bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li şengalê û herêmên din ên başûrê kurdistanê û Kobanê û bi wê re herêmên din ên rojavayê kurdistanê re hat dîtin û fahm kirin. Ev yek, dide nîşandin ku ”modela Srî-lanka” ku çawa li rojhilat û bi teybetî li kurdistanê hatîya formula kirin. Her wusa, mirov vê yekê jî fahm dike. Divê temenê de, çawa planaka ku wê bi wê derbeyê li hemû kurdan bixe hatîya amede kirin. Bi DAÎŞ´ê, tenê beşeka kurdistanê ne hatîya armanc girtin. Bi hêrîşên DAÎŞ´ê re hemû hebûna civate kurd û pêşketin û destkevtiyên wê ên ku heta vê demê bûna hatiya armanc girtin û li wan hêrîş hatîya girtin. Ev yek jî, êdî hat fahm kirin.. Di vê temenê de êdî mirov fahm dike ku DAÎŞ, weke projeyeka mazin ku bi wê hebûna civate kurd hatîya armanc girtin a. Ev jî, hat dîtin. Ev jî, hat dîtin ku dema ku dihat gotin ku wê ´sed hezar kurd werina kuştin´, hîmê vê gotinê li ser hêrîşên DAÎŞ´ê hatibû danîn û avakirin. Yanî, ên ku ev gotin didan gotin, pişta xwe didan hêrîşên DAÎŞ´ê ên ku wê bikira û ev gotin digotin. Di vê temenê de, berî hêrîşên DAÎŞ´ê hanîna ser ziman ya vê gotinê bi rêya çapameniyê, weke amedekarîyekê û her wusa amedekirina rayagiştî ji komkujiyên ku wê werênina kirin re bû. Di vê temenê de, divê ku mirov vê yekê fahm bike. Dapalandin(sizdirma)a gotina ´sed hezar kurd werina kuştin´ li çapameniyê, bi vê armancê bûya. Yên ku ev plan kirina, bi vê rengê, dihê dîtin ku ji her aliyê ve amedekarîya xwe kirina. Hizirkirina ku wê DAÎŞ´ bi hêrîşên xwe û bi komkujiyên ku bi wan hêrîşan bike wê biserbikeve. Bo vê yekê, êdî li piştî wê hizirî na. Yanî, êdî wê piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê destpêkir, wê bi şikandina kurdan re ew valahîya ku biafirê wê çawa were dagirtin û her wusa wê çawa wan komkujiyên ku bi destê DAÎŞ´ê bikin wê werênina ser ziman û bi rayagiştî bidina herêkirin, li wê êdî hizirîna. Ji vê yekê dihê dîtin û fahm kirin ku planaka giştî hatîya amede kirin ku bi wê derbeyê li kurdan bixin. DAÎŞ, ev rêxistina ku ew komkujiyên ku artişa Sri-lanka ku li ser serê tamilîyan kir ku wê li ser serê kurdan kiriba bû. Divê temenê de divê ku mirov DAÎŞ´ê hilde li dest û fahm bike. Yanî, DAÎŞ´ koalîsyonaka Îran û tirkiya ku di vê temenê de û bo vê armancê ku hatîya çêkirina. Her wusa, wusa hasabkirina ku piştî ku rejimên herêmê bi rêya DAÎŞ´ê ku biserketin, êdî wê hemû komkujiyên ku wê hanîna serê kurdan, wê di bin navê ”şerê mezhebî” û ankû ”hêrîşên rêxistina tundrew a terorê a DAÎŞ´ê” û hwd bihata ser ziman. Wê êdî navê tirkiya û Îranê ne hatiba ser ziman.

Sîyeseta kurd, wusa dihê dîtîn ku ev plankirina rejimên herêmê a bi DAÎŞ´ê hêrîşkirina li ser serê kurdan baş ne dîtina. Rejimên herêmê, di serî de li dijî yekîtîya kurdan bûn. Ji xwe, planaka bi vî rengî, dema ku yekîtîyeka civatî neba, wê biserketiba. Wê di ancama wê de jî bi deh-hezaran kurd bihata qatil kirin. Ji xwe, ji şengalê û heta Kobanê bi deh hezaran kurdên sivîl hatina qatilkirin. Sîyeseta kurd, ku ew xelatiyên dîrokî ne kiriba, wê evqas zirara bi vê plana rejimên herêmê ên weke Îran û tirkiya a bi navê DAÎŞ´ê û hwd, ne dîtiba. Li darnexistina kongira netewî a kurd û nebûna

yekîtîyekê di nava sîyeseta kurd de, temenê van zirerên ku bi destê DAÎŞ´ê hat gihandin li civate kurd in.

-Bi vir ve girêdayî, li vir divê ku mirov bahse tevlîbûna tirkiyê ya li nava wê ´koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê a navnetewî´ jî bike û li ser bisekinê. Tevlîbûna tirkiya li nava wê Koalisyonê jî, biarmanca pêşîya kurdan girtin a. Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li Kobanê zêdebûn û piştre, hêzên kurd YPG´ê berxwedenek mazin da nîşandin. Ew berxwedana dîrokî û mazin hê jî didomê. Di vê navberê de ew berxwedana YPG´ê, di nava çapameniya cihanê de jî bahse hat kirin. Heta kû, ji gelek çapameniyên cihanî, hin nûçe jî bi wî rengî hatina çêkirin ku "hevkarê koalîsyonê ê xweza kurd in." Di serî de, van nûçeyan jî tirkiya Aciz kir. Ji xwe, di dema cvîna NATO de, ji tirkiya hatibû xwestin ku li dijî DAÎŞ´ê helwestê bide nîşandin û tevlî koalîsyonê bibe. TIrkiya bi hênceta ku 49 karkerên balyozxanena wê di destê DAÎŞ´ê de "rehîn" in bersiv nedabûbû vê xwestekê. Biqasî ku ji nûçeyên ku ket çapameniyê de mirov bi vî rengî dibînê.

Lê li pişt perdeyê jî, ev jî heya ku piştî ku şer li Kobanê zêdebû bû, li ewropa û hemû cihanê kurd daketin qadan ketina nava xwepêşandinan de bo piştgirîya dîrokî a Kobanê. Her wusa, kurdan xwestibû ku alîkarî ji welatên ewropî ji wan re hebe. Her wusa, YPG û kurd,, bi çekên piçûk li dijî wê teknîka ku kirina destê DAÎŞ´ê de şer dike. Bi vê re kurdan doza alikarîya çekî jî kirîya ji welatên ewropî. Wek tê zanîn, dema ku ketibû rojevê de ku wê alikarîya çekî bê dayîn li başûrê kurdistanê, wezîrê karê derve ê tirkiya Mewlut çavûşoglu derketibû berçapameniyê û gotibû ku "me têkilî bi hemû dordoran re danîya ku çekan ne didina PKK´ê. Her wusa, bi vê rengê, ji welatên ewropî xwestin ku alikarîya çekî ji YPG´ê re jî neçê. Tirkiya dijberîya xwe li dijî wê dabû bû nîşandin.

Bi vê re jî, piştî ku xwepêşandinên kurdan li welatên ewropa û cihanê zêde bûn, piştre hin bi hin ji aliyê sîyesî, weke ku tirkiya "manevra" bike, rewşek hat û ket rojevê de. Hat gotin ku "tirkiya, herê kirîya ku tevlî koalîsyonê bibe." Di serî de, divê ku mirov li ser vê manevra´ya tirkiya bisekinê. Ev manavra bixwe jî, di temenekî pêşîya alikarîya ku bê dayîn li kurdan bigrê û her wusa pêşîya wan nîqaşên bi rengê "hevkarê koalîsyonê ê xweza kurd in" jî bigrê. Ji vê yekê, mirov fahm dike ku herêkirina tirkiya a ´tevlîbûna wê ya li nava koaalîsyonê´ jî, ne ji bo tevlîbûna li nava koalîsyonê ya. Bo ku ji van aliyan ve pêşîya kurdan bigrê ya. Bo ku alikarîyeka ku ji kurdan re bibe pêşîya wê bigrê û her wusa ku di gotinê de jî bê ku bahse hevkarîya bi kurdan re were kirin pêşîya wê bigrê. Yanî, ev manevra´ya tirkiya, hinekî di vê temenê de û bo van armancan divê ku mirov hilde li dest.

Li vir, wusa tê ditin ku ´herêkirina tevlîbûna tirkiya li nava koalîsyonê´ jî, di vê temenê de di temenê dijberîya kurdan de hin armancên wê hena. Bi wê re jî, divê ku mirov vê jî bêne ser ziman ku bi destê DAÎŞ´ê tirkiya û Îranê şerekî giştî li dijî kurdan dane destpêkirin. Bo ku vê jî bidina domandin, ew herêkirina li nava koalîsyonê bûyîn bûya. Bi wê re jî, bo ku pêşîya dayîna alikarîyê ji kurdan re bigrin jî ew tevlîbûn bûya. Wek tê zanîn ku tirkiya di nava koalîsyonaka bi vî rengî de li Afganîstanê jî mabû bû di bin navê NATO de. Di wê demê de jî, weke ku tirkiya Î ro dike, di du-rolan de dileyizê. Î ro, çawa du-rolan dileyizê? Pêşî alikarîya wê ya bi DAÎŞ´ê re didomê. Hevkarîya wê ya bi DAÎŞ´ê re didimê. Lê ji aliyê din ve, li ser çapameniyê re êdî bi çend gotinên ji devê rayadaran xwe weke "dijber" dide nîşandin. Heta kû, xwe dide hêrêkirin ku bikeve nava wê koaalîsyonê de. Bi wê re jî, weke ku di rojekî din de bê, tevdiigerihê. .

Tirkiya, di herdû rolan de jî, di temenê dijberîya li kurdan de tevdigerihê. Her wusa,

herêkirina wê ya li nava koalîsyonê, aliyekî wê yê bi vî rengî heya. Weke ku rayadarên emerikî û NATO, dihanîn ser ziman, mecbûrîyetek tirkiya heya ku tevlî wê koalîsyonê bibe, ji ber ku andamê NATO ya. Ev alîyekî din a. Lê di rengê ku di vê demê de tirkiya tevlî koalîsyonê dibê de herwusa dijberîyek jî heya. Di nava wê koalîsyonê de tirkiya, dîplomasîyê dike ku alîkarî ji kurdan û bi teybetî ji rojava neçê. Nûha, di nava welatên ku di nava wê koalîsyonê de hena, tirkiya dîplomasîya vê dike. Heta ku ez divê ku vê jî bibêjim ku tirkiya li dijî wê çekdayîna li kurdên jî dîplomasîyê dike. Cemil Çiçek, di gera xwe ya li Awûstorya a di 27´ê êlûna 2014´an de ku kirîya de, ev yek bi awayekî vekirî hanîya ser ziman. Tirkiya, dijberîya xwe li wan çekên ku hatina dayîn li hikimeta başûrê kurdistanê a kurd jî bi dîplomatîkî hanîya ser ziman. Her wusa, li welatên din jî, ev yek hatîya hanîn ser ziman.

Di vê demê de bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan, rejima tirk û rejimên din ku Kurdistan dinava wan de hatî qatkirin û her wusa rêveberîyên herêmî û ên ne herêmî, wusa hizir kirina ku wê bidestê DAÎŞ´ê derbeyek mazin li kurdan û destkevtiyên kurdan were xistin. Ev hasab, bi awayekî vekirî dihê ditin ku hatîya kirin. Bi vê re jî, di temenekî bi vî rengî hêrîşî rojava û bi teybetî Kobanê dikin. Tevî ku teknîkeka mazin kirina destê DAÎŞ´ê de û DAÎŞ bi wê hêrîşî Kobanê û rojava dike jî, di destê kurdan de ti teknîk tûna ya. Bêgûman ku alîkarîyak çekdarî û hwd, ji kurdan re heba, wê kurdan hê xorttir herêmên xwe biparasta. Heta ku wê ev şerê ku bihêrîşên DAÎŞ´ê ên bikurdan re jî wilqasî zêde dirêj ne doma ba. Heta ku dibêt ku me yê î ro bahse trejedîya Şengalê û hêrîşên li Kobanê jî nekiriba. Tevî wê jî, çend ku kurd bo alikarîyê dîplomasîyê dikin, tirkiya jî li dijî wê dîplomasîya kurdan dîplomasîya dijberî dike û bi wê ji welatên ewropî dixwezê ku çek newina dayîn li kurdan. Ev jî, bo ku derbeyek li kurdan were xistin dihê kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku tevlîbûna tirkiya li nava Koalîsyona navnetewî a li dijî DAÎŞ´ê, dawî lî têkilîyên wê ên bi DAÎŞ´ê û alikarîya wê ya ji wê re jî ne hanîya. Di piretikê de ew alîkarî domîya ya. Di gotinê de di nava rûpelên rojnemeyan de, bi awayekî gotinan dibêjin û didina nivîsandin. Lê di piretikê de jî, bi rengekî din tevdigerihin. Di piretikê de wê alikarîya xwe didina domandin ji DAÎŞ´ê re. Yanî, kirin û gotin, ne weke hevdû ya. Di kirinê(piretikê) de bi rengekî tevdigerihin bi piştgirîya xwe ya ji DAÎŞ´ê re. Bi gotinê jî, weke ku li dijî wê bin û têkilîya wan bi wê re nebê tevdigerihin û derewan dikin. Ev yek, ji aliyê kurdan ve bi awayekî vekirî dihê ditin û fahm kirin.. Bo vê yekê ya ku tevî hemû gotinan kurd, li ber sînorê Kobanê û pîrsûsê nobeta xwe ya bo piştgirîya berxwedana Kobanê a kurdan **didomêne**.

- Sîyeseta kurd, di vê demê de xelatîyên dîrokî kir. Bi teybetî, di planaka bi vî rengî ya ku bi wê werina biser kurdan de, berî hertiştî pêwîstî bi yekîtîya kurdan hebû. Ya ku hê bi tememî ne hatîya kirin ev a. Ji xwe, rejima tirk û Îranê, ji ber ku pirsgirêka wan ya kurd heya, ti carî naxwezin ku yekîtîyek di nava kurdan de çê bibe. Her hewldanên yekîtîyê, rastî dijberîya wan herdû dewletan tên. Ev yek, me pirr baş di dema nîqaşên amedekarîyên bo li darxistina kongira netewî a kurd de dît. Bi rêya sîyesetê, ew yekîtîya civatî ya kurd ku heya jî, dihê xwestin ku werê xirakirin. Ji ber vê yekê ya ku li ser sîyesetê re di nava partîyên kurdan de ew dijberî dihê pêşxistin. Partîyên kurd, li dijî hevdû tên sorkirin. Tam li gorî van politikayên rejimên herêmê ku di bin navê rexneyan û hwd de bê, wê dijberîyê dikin. Ya ku sîyeseta kurd û sîyesetmederên kurd pirr baş fahm nekirina jî ev bixwe ya. Sîyeseta kurd, bi vê rewşa ku î ro tê de ya, temenê şerê

rejima tirk û rejima Îranê ê bi kurdan re jî ji aliyê xwe ve diafirêne. Yekîtîya ku di vê demê de divîyabû ku çêbikira, çênekir. Kongira netewî a kurd, li darnexist. Piştî taloqkirina li darxistina kongira netewî a kurd, ew temenê ku wê li ser wê kongira netewî biheta li darxistin, bû armanca hêrîşên rayadarên tirk û Îranî. Bi wê re jî, di wan hêrîşan de hinekî partîya kurd ên weke PDK´ê û hwd, hat bikarhanîn. Di aslê xwe de, hemû nîqaşên bi vî rengî, dibe alikar ku rejimên herêmê ên weke rejima tirk û rejima Îranê û hwd, ku li dijî yekîtîya kurdan in, ji berçav werin dûrkirin. Ev nîqaş û rewşa PDK´ê û hwd, ji îranê re jî û ji tirkiya jî dibê weke maskeyeka sernûxûmandinê.

Hewl didin ku hertiştî, weke ku kurdan bixwe ew rewş afirandibê bidina nîşandin. PDK´ê jî, xwe kiriya amûrê listikeke bi vî rengî. Ew jî, li ser wê wê amûrê re xwe didina dîyarkirin. Lê li vir, divê ku mirov li piştî hemû helwestên PDK´ê, li Îranê û bi teybetî li Tirkiya jî bigerihê. Dijberîya ku wê tirkiya li dijî rojavayê kurdistanê bida nîşandin, kira malê PDK`ê jî. Weke ku çawa ku temenê DAÎŞ´ê ê bi bîrdozîkî li ser olê re çêkirin, temenê dijberîya PDK´ê jî li ser gotinên weke ”divê ez bibina desthilatdar li wir” û ankû di bin kontrola min de bê” û hwd, li ser gotinên êveberîytîyê û hwd re afirandin. Her wusa, bi vê re, em dûbare jî werênina ser ziman, ku ew serdegirtinên ku di 19´ê gûlana 2014´an de weke ku hêzên PDK´ê biser saziyên kurd de girtin, li pişt wan serdegirtinan rejima tirk jî heya. Lê bi teybetî divê ku mirov bibêje ku, ev serdegirtin û rengê sîyesetê bi rojavayê kurdistanê ve girêdayî ya. Ev aliyê wê jî heya. Ji aliyeyekî ve, weke amedekarîyekê jî bûn ji hêrîşên DAÎŞ´ê ên li ser rojava re. Tirkiya, vê yekê dide kirin. Tirkiya van kirinan di çerçoveyeka politikayaka ku tengavkirina tevgera kurd de dide kirin. Pêvajoya ku çareserîyê ku birêz Ocalan li bakûrê kurdistanê dayî destpêkirin, rejima tirk bi vî rengî bi konseptekê re dibersivêne. Rejima tirk, pêşî xwest ku dîwar di nava bakûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê de çê bike. Piştre ku ev rastî gelek bertekan hat, êdî li başûrê kurdistanê jî, ev rewş bidestê kurdan pêşxist. PDK´ê jî ”hendek” di nava rojava û başûr çêkirin. Bi wê re jî, xwest ku rewşê bi awayekî din jî bide nîşandin. Ev rewş, hemû di çerçoveyekê de dihên kirin. Ji girtina deriyê sêmalka bigra û heta ku digihijê xendekên ku hêzên PDK´ê wan kola û hwd, hemû bi politikayên hêrîşê ên li rojavayê kurdistanê ve dihên pêşxistin. Sîyeseta kurd, ku rêveberîya başûrê kurdistanê dimeşêne, li şûna ku di xizmeta civate kurd û pêşketina wê de bê, di xizmeta rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin û înkare kurd dikin de ya. Bi vî rengî jî, bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê, dibe amûrê planên bi vî rengî ên bi rengê ên Îran tirkiya ên bo têkbirina kurdan jî.

Politikayên rejîma Îranê a roja me û ên demên buhurî jî, jî yên ku rejima tirk a î ro û ya demên berê a dema osmanîya ne cudatira. Li vir, bo fahmkirina vê, em divê ku bisereka jî bê, çavekî li rewşa Îranê bidin. Planaka bi vî rengî ku li ser DAÎŞ´ê re li dijî kurdan were pêşxistin û Îran hevkarê wê bê, divê ku mirov hinekî bi dijberîya wê ya li dijî kurdan re werêne ser ziman. Îranê, li dijî kurdan politikaya dervekirinê kirîya meriyetê de. Heta nûha Îranê, bi sadan kurd ji ber ku kurd in û doza maf û azadîya xwe kirina bi dervekirîya. Di dema ku bi derve dikê jî, olê û bawerîyê bi awayekî pirr mazin îstîsmar dike û bikardihêne. Di dema ku bi derve dikê jî, di derbarê wan mirovên ku bi derve dike, di çapamaniyê de dide ragihandin ku "dijminatîya li navê xwûdê kirina." Bi vê rengê, dixwezê ku pêşîya bertekên ku li dijî wan dervekirinan ku li wê bibin jî dixwezê ku bigrê. Bi vê gotina "dijminatîya li navê xwûdê kirîya" jî, vê politikayê di awayekê tafisandinê de bi rê ve dibe. Ji ber ku ol weke mijareka pirr xesas a. Heta roja

me jî, zêde mirovên ku dinivîsênin wêre nakin ku li dijî dervekirinaka ku bi gotina "dijminatî li dijî navê xwûdê kirîya" şîrove bikin. Rayadarên Îranî û hwd, vê yekê dibînin, êdî di her bi dervekirinê de, pêwîstî pê dibînin ku li gorî berjewendiyên xwe gotinaka bi navê "dijminatî li dijî navê xwûdê kirîya", bikina dosya wî mirovê ku bi derve dikin. .. Ev, weke politikayaka ku ji pirr aliyan ve li ser wê hatîya hizirkirin a.

Piştî hevdîtina rayadarên tirk û Îranî ku li qasra sadabadê di wê dema ku hê konferense Cenev´ê a duyemin dihat kirin de ku bû, êdî piştre ev politikayên rayadarên îranî jî ên li dijî kurdan zêdetir bûn û ketina jîyanê de. Tenê ji demên piştî wê civîna rayadarên Îranî û tirk a li qasra sadabadê û bi vir de, bi dehan kurd hatina bi dervekirin. Ev politikaya rayadarên Îranê di roja me de, politikayên demên berê ên demên Mohemed xudabendî, Şah Abas û hwd dihênin ber bîra me. Di wan deman de jî, rêveberîyên van deman politikaya dervekirina bi rêbazna din pêk dihanîn. Komkujiyên ku Mohemed Xudabendî li Şîvan û bokanê hanîna serê kurdan, hê jî, dema ku di nava kurdan de bahse wan dihê kirin bi "îbretekê" bahse wan dihê kirin. Di demê de bi fermane şah Mohemed Xudabendî pêşî Şîvan û bokan di şûr de tên derbas kirin. Hemû mirov(zilem)ên balix di şûr de hatina derbas kirin. Piştre jî, ev rewş li gelek deverên din ên rojhilatê kurdistanê hatîya domandin.

Bi teybetî, di dema Şah Abas de, politikaya teybet li dijî rojhilatê kurdistanê li dijî kurdan hatibû meşandin. Di wê demê de Şah Abas, pêşî hemû pêşeng, alim û oldar û mazinên civate kurd ên ku ew dikarê xwe bigihêne wan, wan digirê û di şûr de derbas dike. Piştre êlên kurd ên weke Zaferanlû, Şadlû, Topkan, Kawanlû, Qereçorlû û Lek û hwd, ku pirr mazin bûn û her yekê xwedîyê bi dehan aşîrên mazin bûn, hatina ji hevdû belav kirin û li herêmên din ên îranê roja me hatibûbûna belavkirin. Bi vê yekê re, di wê demê de di qada rêveberî û xwe rêvebirinê de li rojhilatê kurdistanê valahîyeka mazin afirî. Rêveberîya sefewîyan ya demê, ji vê rewşê şûd girt û êdî serdestîya xwe karîya ku li herêmê bide çêkirin. Lê dîsa, ew serdestî, wusa zêde pêşneket. Kurdan, piştre, dîsa xwe li hevdû dane hevdû û ketina nava raperînan û hwd de li rojhilatê kurdistanê. Ev rewşa kurdan a ketina nava raperînan û hwd de, wê di sadsalên 17´min û 18´min û hwd de, zêdetir bibe. Raperînên kurdan ên di van herdû sadsalan de wê derkevina astaka herî mazin. ..

Lê ji dema Şah Abas û vir de, sefewîyan derbeyek mazin li kurdan xistibû. Temenê serkevtina wan ya herêmê ji hinek aliyan ve ji holê rakiribû. Kurdên ku heta wê demê bi êlên mazin xwediyê serdestîyeka mazin bûn, piştre ew rewşa wan ya êlî ku weke dewlet dijî hatibû ji holê rakirin. Li şûna wê, çend ku hinekî mazin jî ban, hine aşîr mabûn û aşîr jî, êdî bi hebûna xwe re ne di wê astê û kûdretê de bûn ku hêzêke mazin di nava xwe de çê bikin û bi wê serkevtinek dîrokî bidest bixin. Piştre jî, wê ev yekê bi ancamên wê re were ditin. Çend ku dem bi dem hinek aşîrên kurd wê werina li cem hevdû û hêza xwe jî bikina yek ku bi hevdû re serdestîya xwe ya herêmî çê bikin jî, wê bisernekevin. Bi vê yekê re, êdî her raperîn, tenê ´aşîrî´ mana. Hinekî jî, gotina raperînên kurdan aşîrî mana, divê ku em li ser vê temenê hildina li dest û fahm bikin.

Ev politika, bi gelek politikayên din re hat meşandin. Politikaya dervekirinê jî, yek ji wan politikayan bû. Her wusa, politikaya olê jî, weke politikayek ji wan politikayan bû. Di sadsale 19´an û 20´an de, hinekî weke ku rewşek din afirî. Kurdan, hinekî jî bê, ew rewşa xwe ya qatkirina êlên wan û bi wê re qatkirina civate wan, fahm kirin, lê ne bi tememî. Di wê temenê de, piştre pêşketina partîyan di nava kurdan de bû û ew partî, bi

ziniyeta aşîrî jî bûn. Ji wê derbas nebûn. Ji ber vê yekê, êdî hertimî, ew partî bixwe jî, car bi car bûna temenê qatkirina civate kurd bixwe jî. Partîyên kurd, wusa zêde rastîya civate kurd bi civaknasî û dîroka wê re fahmnekirina û bi wê tevnegerîya na. Ev jî, di temenê pêşneketina wan de bûya. ..

Piştî salên 1950 û hwd, wê hin bi hin partîyên weke PDK û PKK derkevin. PDK jî, ji wê aşîrîyê derbas nebûya. Lê di wê demê de avabûna komare Mihebedê û xûrîxîna wê, dervî vîna wê partiyê jî bê, wê bandûraka gelemper lê bike. Lê PDK´ê, ew bandûr jî, bi aşîrî û zihniyeta aşîrî xwand. Bi vê yekê, êdî ew temenê ku ji wê afirîbû ew jî bikar ne hanî. Lê wê bandûra komare kurd a Mihebed, hertimî zor da rewşên pêşketina kurdan ku derkevina ser astaka bilind ya ser hebûna aşîran re. Çend ku wê têgihiştina komare Mihebedê nêzîkatîyaka civatî ji hemû partîyan dixwest jî, ya ku bi tememî nebûya ev bûya. Li rojhilatê kurdistanê bixwe jî, wê tevgerên weke ên Simkoyê şîkakî, **Qasimlo**, şerefkendî û hwd wê bibin. Ew jî, bi awayekî ji aliyê rejima Îranê ve hatina tafisandin. Piştî salên 1980´î û pê de, bi derketina tevgera azadîya kurd PKK´ê re wê demek nû li giştîya kurdistanê destpê bike. Rêxistinên kurd, li her beşên kurdistanê ên ku bo azadîya civate kurd têdikoşîn wê hin bi hin derkevin. Li rojhilatê jî, ji ber wê bandûra olê ya ku rejima Îranê pirr zêde baş bikarhanîya, zêde pêşketin nebûya. Her yê ku serê xwe rakirîya bi gotina "li dijî xwûdê rabûya" û ankû "dijminatî li navê xwûdê kirîya" û hwd, hatina girtin û bidervekiirn. Bandûra vê rewşê, li rojhilatê kurdistanê giştî bûya. Heta ku çend mirovên kurd ku dikarin pênûsa bikarbênin û binivîsênin jî, di bin wê bandûrê û tirsê de mana û ew karê ku bikiran jî nekirina. Î roj jî, li ser wê temenê, rejima îranê li dijî kurdan tevdigerihê.

Her kurdên ku serê xwe dirakin û ku gotinekê dibêjin, di cih de tên bi derve kirin. Bi teybetî, rejima Îranê, di vê demê de politikaya bidervekirinê, weke ya dema Şah Abas bikardihêne. Di wê demê de, zihniyeteka Şah Abas hebû. Ew jî, ew bû ku wî hizir dikir ku dema ku mirovên ku bizane û ku dikarin pêşengîyê bikin ku werina kifşkirin û ji nava civatê werina dûrkirin, wê êdî tenê girse bimênin û êdî wê hesan bê ku ew werina Sêhet(kontrolkirin) kirin. Bi vê zihniyetê tevgerîya li dijî kurdan. Bo vê yekê, hertimî, zaneyên civatê û pêşengên wê hatina armanc girtin. Hertimî zaneyên civate kurd ku dikarin gotinekê bibêjin bi navê civatê, hatina armanc girtin. Di van demên bi gotinên rayadarên îranî ên bi rengê "pirsgirêka kurd derdikeve li holê" re, êdî hin bi hin ew politikayên bi dervekirinê û hwd, di temenê tafisandina civate kurd de hatina pêşxistin. Bi teybetî, keseyetîyên civatî ên ku xwe didina li der armanc tên girtin. Ev rengekî tafisandina civatî ya. Politikaya bidervekirinê ku rejima îranê di vê demê de ku di temenê wê de olê jî îstîsmar dike û bikardihêne, kirîya dewrê de. Ev politikaya rayadarên Îranî a li dijî civate kurd, bi teybetî, pêşeng, rewşenbîr, zane û sîyesetmender, oldar û alimên kurd û hwd, ji xwe re armanc digrê. Ev keseyetîyên civatî di armanca vê politikaya rejima Îranê de na. Bi gotinaka din, rejima Îranê bi vê politikaya bidervekirinê, hizir dike û hasab dike ku pêşîya derketina keseyetîn kurd ku dikarin gotinê li ser navê civate xwe bibêjin bigrê. .. Hinekî jî, divê ku mirov di vê temenê de werêne ser ziman.

Rejimên herêmê, bi vî rengî hertimî di temenê têkbirina kurdan de politika pêşxistina. Heta ku aborîya kurdistanê jî, hatîya xistin xismeta bişavtina civate kurd de ku bi wê têkbibin. Weke ku çawa ku kurdistan û civate kurd li çar qatan hatîya qatkirin, bi heman rengî dewlemendiyên serard û binard jî hatina parvekirin.Aborîya kurdistanê,

çwa hatîya xistin xismeta bişavtin û têkbirina civate kurd de, divê ku mirov hinekî li ser wê jî **bisekinê.** Gelê kurd, li ser axa xwe ev bi hezaran salane ku dijî. Ji aliyê çandî, dîrokî û hwd ve jî, xwediyê mejûyeka pirr demdirêj a. Ji aliyê ardnîgarî û dewlemendîyên wan ve jî, em dikarin bibêjin ku Kurdistan herêma herî dewlemend a. Dewlemendîyên serard û binard ên kurdistanîyan, pirr zêde hena. **Li** kurdistanê, dema ku bahse ´kurdistanê´ dihê kirin, dihê gotin ku "Kurdistan ´, di nava çar dewletên weke Tirkiya, Îran, Sûrî û Îraqê de hatîya qatkirin." Di çerçoveya vê qatê de jî, ev dewletên ku Kurdistan di nava van de hatîya qatkirin jî, dewlemendîyên kurdistanê jî di temenê wê qatkirinê de di nava xwe de parvekirina. Lê li herêmê ne kurd û ne jî ti xalkên din ên kurdistanî ji wan dewlemendîyan sûd nagrin.

Minaq, tirkiya dema ku dewlemendîyên herêmên kurdistanê derdixe ên weke niftê, kehrebê û hwd, diveguhêzê rojavayê tirkiya. Tevî ku kehrebeya pirranîya tirkiya ji herêmên kurdistanê dihên bidestxistin jî, lê herêmên kurdistanê car bi car bêkehrebe na. Tevî ku nifta wan hemû ji herêmên kurdistanê derdikeve, kurd bi tememî ji wê bêparkirin. Bi vî rengî jî, wê çawa vê pergale metinger li ser serê kurdan bidina domandin, rejimên weke Tirkiya û hwd, dikevina nava hazar dekûdolaban de. Herêmên kurdistanê, herêmên cihanê ên herî dewlemend in hem ji aliyê dewlemendîyên serardî û hem jî ji aliyê dewlemendîyên binardî ve. Lê gelê kurd û xalkên din ên kurdistanê weke gel û xalkên cihanê ên herî xizan jî dijîn. Heta ku carna wusa dibe ku bo jîyane jî nan jî nabînin ku bi wê jîyane xwe bidina domandin. Her wusa, tevî ku herêmên herî zêde dewlemend in jî, ti **ramedan** li wan ne hatîya kirin. Weke herêmên pirr xizan dijîn. Tevî ku ev herêm, herêmên herî dewlemend in jî, lê ev gelê kurd û xalkên din ên ku bi wan re dijîn, di rewşa herî zixan de na.

Wusa bihizirin ku gelek di warê xwe de li ser axa xwe li welatê xwe dibe pênaber. Li kurdistanê, bi dehan wergehên ku tenê kurd di wan de dijîn ji aliyê Rejima tirk, Îran, Îraq û Sûrî ve hatîna vekirin. Yanî, ev gel, di welatê xwe de hatî dil(esîr)kirin. Zimanê civat kurd hatîya qadaxakirin. Tevî ku zimanekî herî kevn ê cihanê ya jî, weke zimanekî "ne pêşketî" dihênin ser ziman û wusa didina nîşandin. Çand û felsefeya li ser vê axê pêşketî, dîroka wê ne bin dehhezar salî re ya. Ev çanda vî gelî bi navê rejimên ku Kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin li çar-qatan, bi navê wan dihênina ser ziman. Bi vî rengî pergale bişavtinê li ser vê çandê hatîya avakirin û dihê meşandin.

Berî nûha bi çendekê Ku şaş newê bîra Gulten Kişanak bû ku hanîbû ser ziman ku "divê ku ji dehate ji herêmê ´pay´ were dayîn li herêmê." Piştî vê gotinê re nîqaşek dan dest pêkirin. Weke mirovê ku li ser sûd de were girtin, gelek nivîskarên tirk ên nîjadperest û bi zihniyeta metinger jî, bidest hêrîşê li wê gotinê kirin. Xwestina ´pay´ ji dahetên ji herêmê bo herêmê, weke "sûcekê" xwestin ku bidina fahmkirin bi mirovan. Hemû dahetên wan ji herêmên kurdan tên. Bi kurdan re xalkên din ên kurdistanî di xizaniyê de dijîn. Her sal qaşo dahete ku dişênin li herêmê bo daberekirin jî, dişênina ji leşker û karên leşkerî û hwd ên li dijî gelê kurd û xalkên din ên li herêmê. Her wusa, bi dahetên ji herêmê ku tên, şerên xwe bi xalkên herêmê re jî didina domandin. Ku em bahse bêahlaqiyê bikin, ji vê çêtir ti mîqaq tûnane ku em bidin.

Gelekî û ankû civateke weke ya kurd bihizirin ku bi dewlemendîyên xwe yên serardî û binardî, weke gelê cihanê ê herî dewlemend a. Lê mixabin ew bixwe bi hemû ferdên xwe di nava xizaniyeka dijîn. Ferdên wê ên ku hinekî mal û samyan ji xwe re çêkirina, çiqasî ku li gorî dewletê bijîn û zaroyên xwe bixwe jî asimlekiribin û her wusa çiqasî

weke tirk dijîn, ewçendî dikarin wan mal û samyanên xwe biparêzên. Bi vî rengî, pergale aborîyê ya ku li kurdistanê hatî avakirin di temenê têkbirina civatîya kurd de hatîya bi rêxistinkirin û dihê birêvebirin. Pergale aborîyê, kirina pergalek ku bi wê her ferdê civate kurd ku ji civate xwe û ji nirx, çand û zimanê civate xwe diravê ya. Her ferd(andam)ê civate kurd, çendî ku ji rastîya dûrketibê, wê ewçendî karibê di nava wê pergale rejima tirk û bi teybetî jî ya aborî de bijî.

Yanî, pergale aborîyê, di temenê "bênîjad" û ankû "bêasil"kirina andamên civate kurd de li dijî wan dihê bikarhanîn. Ev pergal, di roja me de, zêdetirî dihê bikarhanîn. Minaq, çend ku ji aliyê çandîniyê û cotkariyê û hwd ve derfetên pirr mazin ên kirina wan li kurdistanê di nava civatê de han û ku civat tenê bi wan jî bixwezê bijî wê têra wan bike, nahêlin ku ew were pêşxistin. Sawalgerî ji xwe bi tememî hatîya tûnakirin. Pergale koçerîyê, ji aliyekî ve pergale sawalgeriyê ya kurdistanî bû, ew bi tememî hat tûnakirin.

Pergale aborîyê, hemû lingên wê ên li kurdistanê ên civatî hatina tûnakirin. Ji aliyê çandiniyê, cotkariyê û sawalgeriyê û hwd ve derfet jî nayê dayîn ji kurdan re ku ew xwe bixwe pêş bixin û temenê jîyane xwe biafirênin. Bi vê yekê re, derfetê jîyanê wan, ji destê wan hatîya girtin. Hemû hatina xizankirin. Tenê ku em li dîmenên di demên hilbijartinan de ku dibin ku li wan binerin, emê hê baştir fahm bikin. Rayadarên partîyên dewletê û hwd, diçina devê deriyên kurdan bi berdêla çûwalek miqarna û komûr, ji wan dixwezin ku ew dengê xwe bidina wan. Yanî, wusa hasab bikin, mirov hatina kirina rewşekê ku mûhtacî çûwalek miqarna û komir bibin.

Bi wê re jî, weke aliyekî din ê bi wê ku hewl didin ku civate kurd tûna bikin û têk bibin jî, li ser camaatê re dihê kirin. Pêşî bi vî rengî bi politikayên xwe faqîr û xizan dikin. Hemû tiştên wan û mal û samyanên wan ji destê wan digrin. Piştre jî, bi destê camaatê malên weke ên bi navê "sevgî evî" û hew divekin û bi wan qaşo xwe bi "wijdan" û "oldar" didina nîşandin û bi wê re car bi car çend mirovan her yekê çend kişikên piçûk ên ku hinek xwarin di wan de na dikina destê wan mirovan de û dişênina devê wan deriyê malên kurdan qaşo bi navê "alikarîyê". Ev, weke rewşeka xweza, hatîya pêşxistin.

Hema bêja li hemû herêmên kurdistanê ev hatîya ppêşxistin. Hê jî, ev rewş didom in. Dewlet û rayaderên wê ên ku di bin navê camaatan de xwe weke "alikarvan" û ankû "oldar" didina nîşandin û "bo alikariyê diçina devê derîyan", nahêlin ku ew xalkên herêmê bidestê xwe çandiniya xwe bike, sawalên xwe xwedî bike û her wusa cotkariyê bike bo male xwe. Ardên kurdistanîyan ên ku çandinî dikirin, pirranîya wan hatîna mayin kirin. Nûha ku ez bibêjim ku ji sadî 80´yê herêmên kurdistanê ên çandiniyê hatina mayinkirin û hê jî mayinkirî na, wê pirr rast û di cih de bê.

Ku tenê hinekî jî, derfet ji gelê kurd ê herêmê re bihata hiştin, î ro tenê bi van karên weke çandiniyê, cotkariyê, sawalgeriyê û hwd, wê weke herêma herî dewlemend bûya. Ji bilî wê jî, dewlemendiyên bin ardî ên weke niftê û hwd, ji xwe em bahse wan jî nakin. Li kurdistanê, hemû nifta ku dihê derxistin, bi kamyonan dihê birin li bajarên rojavayê tirkiya. Li wan deran dihê bikarhanîn. Minaq, dewlet nahêle ku tenê cihekî ku vî karê niftê bike li herêmên kurdan vebe.

Ev herêmên wilqasî dewlemend û xwedî derfet in ji jîyanê re, mirovên li wan dijîn di nava faqîrî û xizaniyeka mazin de jî dijîn. Gelê kurd, bi dewlemendiyên xwe re gelê cihanê ê herî dewlemend a. Lê î ro, weke ku li berçav dihê ditin, weke gelê herî faqîr û

xizan dijî. Ev li tirkiya jî wusa ya, li Îraqê jî wusa ya, li Îranê jî wusa ya û li Sûrî jî wusa ya. Piştî salên 1990´î û pê de, li başûrê kurdistanê, ku bi hemû kêmesîyên xwe ve jî desthilatdarîyek kurd li wir ava bûya. Lê wir jî, wê çawa pêşîya van aliyan bigrin û wê çawa pêşîya pêşketina kurdan li wir bigrin, rejima Malîkî bi rejimên weke ên Tirkiya û Îranê û hwd re, di levkirinekê de politikayên weke di temenê "tengezerîyên firotina niftê" û hwd, derdixe. Her wusa, ev tengezerî jî, tengezerîyên ku divê ku di van temenan de fahm bikin in.

Rejima Tirk, bakûrê kurdistanê di nava Sînorê wê de ya. Hemû dahetên ji serardî û binardî ên bakûrê kurdistanê, rejima tirk van barî rojavayê tirkiya dike. Li wir bikardihêne. Bi wê yekê re, tenê piçûkê jî nahêle ku li herêmên kurdan werina bikarhanîn. Minaq, piştî ku Gultan Kişanak bahse "xwestina payê bo herêmê" kir, hemûyan rayadarên dewletê û gelek nivîskarên tirk jî dinav de bidest hêrîşkirinê kirin. Ji ber ku rejimek bi vî rengî li ser mijtina xwûna gelekî avakirina û bi wê dahetîyên ku tên li hevdû belav dikin, êdî naxwezin ku ew pergal xira bibe. Ya ku di temenê wan gotinên wan ên bi hêrîş ên li Gultan kişanak de ev rastî bû.

Î ro, minaq, bi sadan bendav li herêmên kurdistanê ji aliyê rejima tirk ve hatina çêkirin. Hemû kehrebeya ku ji wan digrin, dibina rojava. Mirovê herêmê car bi car di reşîyê de jî dijî. Heta ku ew bidestê xwe ku rabê tiştekî bike, wê ew pergale dadê ku avakiriya li herêmên kurdan û di temenê parastina vê pergale metinger de bikardihênê jî, wê bike dewrê de. Aborîya herêmê, bi tememî bi vî rengî hatîya tûnakirin. Ev yek, di çeçroveya politikeyekê de dihê kirin. Bi wê re jî, em vê jî bibêjin, ew bendavên ku dihên çêkirin, bi wan gelek herêmên çandî û dîrokî ên ku bo dîrok, çand û pêşketina herêmê giring in li ser wan van herêman, wan bendavan çê dikin. Bi wan bendavan, ji aliyekî ve bêdîrok dikin û ji aliyekî ve vejene ku ji wan dihildin jî, herêmê dimijin.

Ev rewş hê jî, didom in. Bi vê rengê, dewletê, herêm bi tememî xizankirîya. Li ser wê re, êdî dixwezê ku politikayên xwe di temenê qirkirina çandî, aborî, ramanî û her wusa fizikî û hwd bibe sêrî. Li ser wê rewşa ku afirandîya, wan politikayên xwe yên di temenê qirkirin û dîrokê birian civate kurd de dike meriyetê de. Politikayên dewletê, di temenê tûnakirina hebûna civate kurd de na.

Ev politikayên ku di temenê tûnakirina civate kurd de hatina birêxistinkirin, pergale aborîyê wê çawa di temenê wan de cihbigrê, di wê temenê de hatîya birêxistinkirin. Li ser wê re, êdî politikayên xwe dike meriyetê de. Li vir, di aslê xwe de, divê ku em **aborî-ramyarî(politik)ya kurdistanê** pirr baş û qanc fahm bikin. Divê ku ev alî hemû li ser wan were sekinandin. Ji vê aliyê ve divê ku mirov bitememî û xort li ser bisekinê.Ya ku temenê politikayên qirkirina civatî li ser wê dihê birêxistin kirin jî ev a.

Ev mijara aborîyê, emê bi navê aborî-ramyarî(politik)ya kurdistanê, hê li ser bisekin in. Ji van aliyan ve dema ku em wê ne hildina li dest, emê ji gelek aliyan ve di fahmkirina xwe de wan politikayên qirkirina civatî jî baş nebînin. Lê li vir, bi sereke divê ku em bibêjin ku aborî-ramyarîya kurdistanê, weke mijareka civatî divê ku em bi teybetî li ser bisekin in. Dema ku em li ser sekin in û me hinekî fahm kir jî, emê bibînin ku **aborî-politikaya kurdistanê** çawa hatîya ji holê rakirin. Bi wê re, çawa temenê qirkirina civatî li kurdistanê gav bi gav hatîya pêşxistin.Lingekê giring ê civatê aliyê wê yê aborî ya. Lingê duyemin jî rewist û ankû ahlaq a. Ev herdû ling jî, di piretik yanî kirinî û teorîkîyê yanî zanîna wê de digihijina li hevdû. Civatek, çendî ku pêwîstî pê dibînê ku xwe bi aliyê xwe yê ahlaqî werêne ser ziman, her wusa bi heman rengî

pêwîstîya wê bi aborîya wê ya. Sîyeseta civatî jî, her wusa ku em dikarin bi abor-ramyarîya kurdistanê werênina ser ziman, bi wê êdî civat xwe bi rê ve dibe. Aborî lingekê wê ê herêmkî ku dihê birêxistinkirin bi civatî ya. Lingê wê yê duyemin jî bi lingê aborîyê ê gelemper a û giştî ya. Li kurdistanê, ev lingê civatî bi tememî hatîya xurixandin. Li ser wê temenê re, pergalek metingeriyê, weke ya Ingilizan ku li Hindistanê avakiribûn, li kurdistanê rejima tirk li ser serê kurdan avakirîya û bi wê civatê tûna dike. Di temenê wê politika tûnakirina civatê de tûna hasibandina hebûna civatê û nasnema wê heya.

Hertimî, dama ku kurdan bahse mafên xwe yên hevbeş(kollektîf) kirina, rastî redkirin û hêrîşan hatina. Car bi car, rejima tirk û her wusa rejima Îranê jî û rejimên din jî, gotina ”kurd jî, xwediyê heman mafê hemwelatiyî na.” Li vir, bi vê gotinê ve girêdayî, divê ku mirov vê yekê bibêje ku çendî ku kurdan, rastî û nirxên xwe li şûn xwe hiştina û xwe weke ´arab´, ´faris´, ´tirk´ û ankû ´misilman´ dana nîşandin, bûna xwediyê mafekî. Lê bi navê xwe û bi kurdîtîya xwe ti carî nebûna xwediyê ti mafî. Hertimî rastî înkarê hatina. Navê kurd û kurdistanê hatîya qadaxa kirin. Zimanê kurdî, hatîya qadaxa kirin. Her wusa, li ser nirxên civatî ên weke çandî û hwd, pêvajoyên ´bişavtinê´ meşandina. Ev aborîya kurdistanê jî, dem bi dem kirina xizmeta vê de. Di destpêka hefteya duyemin a êlûna 2014´an de, kurdan weke salên buhurî dîsa dibistanên bi zimanê tirkî ”boykot” kirin. Ji ber ku zimanê kurdî qadaxa bû û ne dihiştin ku kurd bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bibînin. Lê car bi car rayadarên rejima tirk derdiketina ber çapameniyê û digotin ku ”kurdî, serbest a”. Kurdan, dizanîn ku ev gotin derew in. Lê bo ceribandinê jî bê, bi destê xwe sê dibistan ku yek li geverê bê, yek li Cizîrê û yek jî ku li baxlare Amedê bû çêkirin û vekirin. Lê di cih de rayadarên tirk çûn û mohr li devê deriyê van dibistanên kurd xistin. Her wusa, ku em ji aliyekî din ê aborî ve li vê mijarê jî binerin, em divê ku bibêjin ku kurd ”bêşa(´vergi´)a xwe didin. Lê bi wê bêşa wan kurd û zaroyên dihên bişavtin. Bo fahmkirina rastîya kurd û hêrîşên li ser wê, em mijara perwerde giring ku mirov li vir divê ku bi teybetî li ser bisekinê. Ev rewş hemû, di temenê ´bêstatûtîya kurdan´ de dihat kirin.

..

**Hêrîşên DAÎŞ´ê û yekîtîya kurdan û bi hevdû re tevgerîna hêzên parastînê ên kurdistanî YPG`, HPG`, YPJ, YBŞ û PÊŞMERGE´yan û pirsgirêkên bi têkiliyên bi rejimên herêmê ên weke rejima tirk re ên li pêşîya pêşxistina hêzek kurdistanî ya hevbeş.**

Di nava me kurdan de gotineka xalkê heya. Ew jî, ew a ku tê gotin ku ”ji her ne başîyekê derxistina başîyê, carna mecbûrî ya.” Çendî ku hêrîşên DAÎŞ´ê ên li civate kurd pirr bi hov û xadar bûn û bi hezara kurd qatilkirin jî, lê li ber wan hêrîşan, bi hemû kêmesîyên xwe re yekîtîyek di temen parastîna kurdistanî de di nava hemû hêzên parastinê ên kurdistanî de afirî. Piştî 15´ê êlûna 2014´an, dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li herêmên başûrê kurdistanê destpêkirin, di cih de hêzên YPG û HPG´ê xwe gihandina herêmê û bi hêzên parastinê ên başûrê kurdistanê re ketina nava hevgirtinê de û bi hevdû re bidest parastina kurdistanê kirin.Bi hevdû re bersiv dane hêrîşên DAÎŞ´ê, bi hevdû re oparasyonên leşkerî li darxistin. Herî dawî, di 29. Êlûna 2014´an de hat ragihandin ku di nava YPG´ê û hêzên peşmergeyêên başûrê kurdistanê hevpeymanîyek hatîya çêkirin. Li gorî wê hevpeymanîyê wê zanyarîyên di derbarê şer û DAÎŞ´ê de bi hevdû re parve bikin. Wê agahiyan di cih de bidina hevdû. Û her wusa wê di her mijare

ku dikarin de wê alikarîyê bidina hevdû. Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li Kobanê destpêkiribûn, hatibû ser ziman ku weke alikarî hêzên peşmerge jî herina alîkarîya YPG´ê bi hevdû re parastina Kobanê bikin. Piştî ku ji ber astangîyên ardnîgerî ku Birêz Berzanî ragihandibû ku ew nikarin alikarîya leşkerî bişênin, ev di nava civate kurd de bûbû sedema hin rexne girtinan jî.

Bêgûman, şert û mercên başûrê kurdistanê zêdetirî hena. Ji aliyê çekî û hwd ve jî, derfetên wê zêdetir hena. Di gelek waran de dikarê alikariyê bide berxwedana Kobanê. Ev mijar weke aliyekî din ê teknîkî ya. Lê ez dixwezim ku li vir, ji aliyê zihniyetî û nêzîkatîyê ve vê mijarê bênima ser ziman. Di serî de, divê ku mirov ji aliyê şert û mercên demî re vê mijarê şîrove bike. Î ro, di şert û mercên roja me de, hem pêşketina civate kurd a ku di nava wê de afirîya û hem jî hebûna civate bixwe jî, tenê dikarê bi hêzek kurdistanî a giştî dikarê were parastin. Ev yek, weke mijareka teybet ku divê ku mirov li ser nîqaş nekê jî ya. Êdî, divê ku hêzek parastinê ku li ser hemû partîyan re bê, divê ku were avakirin û ew êdî hebûna civate kurd biparêzê û her hêrîşên ku werina bi ser civate kurd de bersivê bide wan. Bi wê re jî, di nava xwe de hertimî xwe bi hêz û zanîn bike. Profesyonelîtîyê di nava xwe pêş bixe. Di asta roja me de, ev êdî weke tiştekî ku nebê nabê ya. Di serî de, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Heta roja me, ji ber nakokîyên di nava partîyan de ku afirîna, ev ne hatîya kirin. Ev nakokîyên ku afirîne, bûna weke astengîyên mazin li pêşîya hevbeşbûnaka bi vî rengî di warê parastina civatî de. Di vê mijarê de, dema ku mirov li mijarê dinerê, mirov vê yekê bi awayekî vekirî kifş dike û dibînê. Di aslê xwe de, civate kurd, heta roja me, pirranîya windahiyên wê, hinekî sedema wê qatbûna di nava wê de ya. Di demên berê de, bi aşîrî ew qatbûn hebû. Têkilî, bi hevdû re ne didanîn. Bi wê re jî, li ber hêrîşên mazin ku di hatina ser wan de piçûk diman û êdî dişikeştin û ew şikeştin jî dibû sedema windahîyên mazin ên dîrokî jî.

Di vê temenê de divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman, ku carna şert û metcên demî zorê didina mirov ku mirov wê rewşê di nava xwe de çê bike. Î ro jî, şert û mercên demî ên bi hêrîşên DAÎŞ´ê re temenekî bi vî rengî di nava kurdan de afirand. Kurd jî, divê ku wê temenê pêş bixin.BI hevdû re, tevbigerihin. Her wusa rastîya civate kurd bi hevdû baş fahm bikin û li gorî bi kevina nava hewldanê de. Li vir, ev jî, biawayekî vekirî hat dîtin ku bi hêzek hevbeş dikarê bersiv were dayîn li dijî hêrşên kurd êdî werina bi ser civate kurd de. Dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li hebûna civate kurd destpêkirin, ku ew ´tifaq´ di nava hevdû de ne hatiba çêkirin, dibêt ku komkujiyên hê maztir ji ya şengalê û Kobanê me yê î ro li ser biaxifta. Lê em vê jî, bi teybetî binxat bikin û bibêjin ku di demên berî ku ew hêrîş li şengalê û Kobanê bibin ku yekîtîyek mazin ya civatî hatiba çêkirin û hemû partîyên kurd hatiban cem hevdû û hêza kiriban yek û bi hevdû re tevgerîyaban, wê ew trejedîya şengalê jî ne hatîba jînkiirn û wê ev hêrîşên ku hatina bi ser kantona Kobanê de jî, wê wilqasî zirer nedaba kurdan. Di serî de divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werêne seer ziman.

Dema ku hê di dema ku bahse li darxistina kongira netewî a kurd dihat kirin de ku hê hingî ew kongira netewî hatiba li darxistin û bi ancam kirin, wê î ro di wê çerçoveyê de hêzek hevbeş amede heba ku bi hevdû re parastina kurdistanê bikiran. Wê di wê demê de pêşîya gelek zîyenên ku piştre hatina serê civate kurd wê bigirta. Dibêt ku rewşa şengalê, ne weke ya ku em î ro bahse wê dikin ba. Ev rewş hemû rewşên ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê na.Lê ez di wê bawerîyê de me ku partîyên kurd jî,

hinekî jî bê, ew kêmesîyên xwe dîtin. Her wusa ew jî dîtin û kifşkirin ku êdî divê ku hêzek hevbeş ya parastina civate kurd hebe. Ev jî, weke pêwîstînîyeka demê ya. Li herêmeka weke rojhilat, bêparastin, ti kesek nikarê bijî. Di vê demê de nikarê bijî. Hêzek parastinê hertimî pê pêwîstî bûya.

Dema ku em li dîroka herêmê jî dinerin, em vê yekê biawayekî vekirî dibînin. Dema ku em li dîroka herêmê binerin, emê rastî komkujiyên mazin ku hatina hanîn li serê civatan emê bibînin. Ne tenê di sadale me de, her wusa, di hemû sadsalên berê de ev yek bûya. Lê di roja me de, di serî de me kurdan, ev yek bi gelek êş û fêr û dersên bahagiran kifşkir. Di nava şer de me kurdan ev yek kifşkir. Kurdan, heta ku hêrîşek weke ya DAÎŞ´ê bi piştgirîya rejimên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin hat serê kurdan û piştre êdî ev hevpeyman di nava xwe de çêkirin. Berî wê jî, şert û mercên wê hebûn ku ew ew hevpeyman di nava xwe çê bikiran. Lê berjewendîyên partîyî li pêşîya wê bûn astang.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî binxat bike û bibêje ku divê ku di serî de pêwîstînîyê werênina hanîn li cih û ew hevbeşîya di nava hêzên parastina kurdistanê de were mayindatir kirin. Êdî di vê temenê de ku hebna xwe bide domandin. Ya ku civate kurd û hemû kurd jî dixwezin ev a. Ji ber ku gelê kurd gelek hêrîş hatina serê wê, êdî hertimî pêwîstînîya hevkarîya bihevdû re hanîîya ser ziman. Lê mixabin, berjewendîyên partîyî li pêşîya wê bûna astang û ew hêza hevbeş ne hatîya afirandin. Di vê demê de, kurdan ev îî pirr bi êş û di berdêleka mazin de dît û kifşkir ku êdî parastin dikarê bi hêzek hevbeş ya kurdistanî dikarê were kirin. Li vir, ev yek hat dîtin. Dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdistanêê û li civate kurd zêde bûn, ku partîyekê gotiba min ti eleqe jê tûna ya û xwe daba bi şûn ve, wê hêza din ya ku ket şer de bi wê re wê nekarîba ku serkevtineke mazin bidest bixista. Lê dema ku li başûr û hwd, ew hêrîş destpêkirin û bi hevdû re di cih de hêzên kurd ketina çeperekî de bi hevdû re berxwedan pêşxistin û bersiv dane hêrîşan, hingî dîtin ku serkevtin ya wan a. Êdî serdestî kirina destê xwe de Li başûrê kurdistanê, dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê lê bûn, ku gerîîla neçûbûban alikarîya pêşmergeyan, dibêt ku pêşmergeyan derbeyek mazin jî bixwara. Ew derbe jî, wê tenê weke derbeyek ku pêşmergeyan xwarî wê ne maba. Wê ew bûba derbeyek li hemû kurdistanîyan ketî ba. Bi heman rengî, weke ku çawa ku î ro dema ku DAÎŞ hêrîşî Kobanê dike ku weke ku hêrîşî hemû kurdistanîyan bike, kurd wê hîs dikin û li ber wê berxwedan dikin û xwepêşandinn şermazarkirina wan hêrîşên wê ên hov dikin û hwd. Li vir, divê ku miirov vê rewşê baş bixwêne. Ev rewşê, ku bi çi rengî bi ancam bibe, wê bi heman rengî di dîroka kurdan de cih bigrê û wê bandûra wê pirr zêde bi awayê ku bûya malê dîroka kurdan wê bibe.

Li Kurdistanê, kî çi bêje bila bibêje, di vê demê de kurdistan û civate kurd di demek dîrokî de di buhurê. Pêşketinên vê demê ku bi çi awayê bin wê pêşaroja civate kurd jî bi bandûr bikin. Heta ku wê di kifşkirina wê de jî rol û weyn bileyizin. Di serî de divê ku mirov vê yekê û rastiyê bibîne û li gorî wê gav biavêje û gotina xwe bibêje. Di vê demê de, çendî ku mirov weke kurd, berpirsîyarên xwe yên dîrokî hanî li cih, hingî mirov wê karibê bahse serkevtinê bike. Ev dem, demeka wusa ya û dîrokî ya. Di vê demê de, hêrîşên stretejikî li hebûna civate kurd dibin. Serkevtinên di vê demê de biqasî ku wê dîrokê li leyha kurdan bide guharandin. Her wusa derbeyên ku li kurdan bikevin jî, wê vajî wê dîrokê li dijî kurdan bide nivîsandin. Lê di vê demê de ku çendî hêrîş li civate kurd bibin û çendî komkuji werina serê kurdan jî, wê kurd êdî tekçûneka mazin a dîrokî

nejîn û nexwûn. Ev yek, êdî hatîya dîtin. Hebûna kurd, derketîya dika dîrokê. Şerên ku bi kurdan re dihên kirin şerên herêkirin û redkirina wê hebûna civate kurd a ku derketî dika dîrokê na.

Di vê temenê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev pêşketina civate kurd ku afirîya, parastina wê jî giring a.Her wusa dema ku em bahse parastina wê bikin, em divê ku vê tenê bi aliyê parastinê ên leşker ve ne hizirin. Ji wê zêdetirîn, aliyên wê ên din ên bi zaninî û ragihandinî jî û hwd jî hena. Her wusa, aliyên wê li ser teknîkê hwd jî hena. Ji van aliyan ve jî, bi rêxistinkirina wê parastina cewherî, wê temenê pêşaroja civatî a civate kurd bê. Di serî de, di vê demê de herî zêde kurd, wê yekîtîyê di nava xwe de çê bikin. Divê ku bi hevdû re êdî tevbigerihin. Êdî dîrok vê yekê ji wan dixwezê. Yan, wê vê xwesteka dîrokê werênin li cih û yan jî wê hebûna civate kurd ji tûnakirinê re biterikênin. Êdî rewş, bi têgihiştina parastinê re hatîya û li vê nûqteyê aliqî ya. Ji wê û wirdetir naçê. Bi gotinaka din jî, êdî parastina civatî a hevbeş bûya weke zarorîyekê. Di serî de divê ku mirov vê yekê kifş bike û werêne ser ziman. Li kurdistanê, heta roja me, hemû komkujiyên ku hatina serê kurdan, ji nebûna hêzeka parastinê ya xort bûya. Em dema ku li dîroka kurdan dinerin, em rastî dîrokeka ku tişî komkujî tên. Dema ku em vê dîrokê dinivîsênin û dihênin ser ziman, ev rengê nivîsandina dîrokê a nivîsandina wê tenê bi serê xwe li mejiyê her kurdî dibe weke kirina komkujiyekê. Di serî de, divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman.

Di aslê xwe de, ev rewşa kurdan a ku î ro di wê de na, divê ku mirov weke ancamaka şoreşa rojava jî werêne ser ziman. Yanî, piştî ku şoreş bû, êdî jîyan jî bo ti kesekî nema bû weke berê. Her tişt di serî de ji temen ve bi dest guharandinê kir. Di serî de, di zihniyet û têgihiştina kurdan de wê şoreşa rojava guharandin çêkir. Ên ku aligirên wê şoreşê bûn û ên ku li dijî wê bûn jî, di serî û mejiyê hemûyan de jî ew guharîn pirr zêde pêkhat. Di aslê xwe de, ku em di serî de di nava civate de bahse şoreşa civatî bikin û bûna wê bikin, divê ku em ji vir gavê biiavêjin û werênina ser ziman. Hertimî, kurdên ku ji warên wan dihatina kirin û ew di birin û dikirina wergehan de, êdî ew bixwe sînorê wan wergehan ên hem dimejiyê xwe de û hem jî di jîyane xwe de dirakê. Bi wê re jî, wan sînorên di nava xwe de dirakê. Li vir, bi vîr ve girêdayî ez dixwezim ku vê yekê jî bibêjim. Piştî hêrîşên şitt ên DAÎŞ´ê ku di 15´ê êlûna 2014´an de li kobanê destpêkirin, kurdên bakûrê kurdistanê li herêmên bakûr ên weke Pîrsûsê civîyan û ew sînorên ku di nava wan de hatina danîn jî yek bi yek ji holê rakirin. Ji sînor derbas kirin û buhurîna Kobanê. Bi hezaran ciwanên kurd ên bakûrî sînor derbas kirin û çûn Kobanê û ketin wan çeperan de bidest şerê berxwedaa Kobanê kirin. Dema ku mirov li demgrafîya kurdistanîyên ku li Kobanê li berxwedan binerê, mirov wê bibînê ku ji hemû beşên kurdistanê kurd û kurdistanî hatina wir û şer kirina. Ev bi xwe re tiştekî din jî dide nîşandin. Ew jî, ew a ku kurdistanîya di mejiyê xwe de hemû sînor ji holê rakirina. Derbas kirina. Bo vê yekê divê ku mirov bibêje ku ew rewşa Kobanê û berxwedana wê û her wusa ku ji her herêmên kurdistanê herikînîna kurdistanîyan li wir, nîşanak û birhana hebûna yekbûna civatî a kurdistanî ku êdî afirîya ya.

Ji vir ve, dema ku em li rewşê binerin em dibînin ku kurdan yekbûn di mejiyê xwe de çêkirîya. Li ser wê temenê ku bi wê yekbûn çêkiriya, hemû rêxistinên kurdistanî jîî dewetî yekîtîya civatî dike. Li vir, ez dixwezim binxat bikim û bibêjim ku civate kurd bi pêşketina xwe ya di nava xwe de û bi asta xwe ya zanîna di mejiyê xwe de, li pêşîya partîyên kurdistanî hemûyan a. Partîyên kurdistanî ên kurd, hem bi helwesta xwe û hem

jî bi gotinên xwe li şûnmayî na. Asta wan, bin ya civatîya kurd re. Çend ku hinek ji wan car bi car rexneyan li hebûna civatî bigrin jî li gorî wî aqilê xwe, lê hebna civatî bi aqilê xwe re pirr zêde li ser wan û aqilê wan re ya. Î ro, ya ku tekoşînê dide civat bixwe ya. Partî li şûn wê na. Heta ku hinek partîyên ku dibêjin «em partîyên kurd in», ti kesek wan li qadan jî nabînê. Ji navê wan ti eseme nayê xwandin. Di vê rewşê de tiştek bi awayekî vekirî dihê li berçav ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê sekinê û wê werêne ser ziman. Ew jî, her wusa ew a ku êdî pêwîstînîya yekîtîya civatî ku were kirin a. Di aslê xwe de, li vir, civate kurd zorê dide partîyên kurd ku bibina yek. Li deverên din ên cihanê, partî û rêxistin ji karên bi vî rengî pêşavanîyê dikin. Lê li kurdistanê, bi teybetî di vê demê de rewşek vajî vê derketîya li holê. Ew jî, her weha ew a ku civate kurd bi asta xwe ya herî bilind re wê pêvanîyê dike û zorê ide rêxistinên kurd ku bibina yek.

Li kurdistanê, di vê demê de gelek rastî biawayekî vekirî derketina li berçav. Ew jî, her weha ew in ku êdî nirxên civatî divê ku werina girtin li ser rêxistinan re. Ev jî, hat dîtin ku rêxistineka ku nirxên civatî dimejiyêê xwe de kifş nekiribê û li ser hebûna xwe ya rêxistinî re negirtibê, wê nikaribê di nava civate kurd de jî bijî. Ev yek, weke rastîyekê pirr vekirî êdî hatîya li berçav û dihê dîtin. Gelek partî û rêxistinên kurd ku î ro weke partî û rêxistinên ku tenê bi navê xwe re hena û weke partî û rêxistinên ´tabela´ na, hinekî jî sedema wê divê ku mirov di vir de lê bigerihê. Nirxên civatî, êdî hatina dîtin ji aliyê mejiyê civatî ê kurdistanî ve. Dema ku kurd jî, êdî li rêxistineka xwe dinerin, pêşî bi wê dipîvîn û li gorî wê nêzîkatîyê lê dikin. Ev jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov binxat bike ya.

Di vê dema ku hebûna civate kurd di bin hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê de ya, em dibînin ku kurd bi civatîtîya xwe re hê zêdetirî dirabina ser pîyan. Bersivek civatî didina van hêrîşên hov ên ku li civate kurd dibin. Li her çar beşên kurdistanê, kurdistanî rabûna ser pîyan. Ev biserê xwe nîşanaka yekîtîya navxweyî ya civatî a kurd a. Êdî li gorî vê, rêxistinên kurd jî, divê ku hem rastîya xwe û politikayên xwe di berçav de derbas bikin. Her wusa, ji avakirina hêzên parastinê bigra û heta ku digihijê gelek mijarên din ên civatî û hwd, divê ku di temenê yekîtîya civatî de bihizirin û gavên xwe biavêjin. Ev yek, êdî weke pêwîstînîyeka civatî ya jî. Her wusa, rêveberîyên civatî ên kurd divê ku li gorî rastîya civate kurd politikayên xwe kifş bikin. Her wusa, divê ku bi hevdû re hêzên parastinê biafirênin. Cudahîyên xwe, nekina temenê qatkirina civatî de. Ev jî, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya.

Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li rojavayê kurdistanê û bi teybetî li kobanê bûn û her wusa ku li başûrê kurdistanê û bi teybetî li herêmên weke şengalê û hwd bûn, êdî bi wê re rewşa ku derket li holê bi hêzên parastiniyê re, ew bû ku di rengê kurdistanî de bê.Ya ku herî zêde pêdîvîya wê hat hîskirin ew bû ku hêzek kurdistanî ya hevbeş were avakirin bû. Li şengalê, trejedîya ku hat jînkirin bi kurdên êzîdî re, dide nîşandin ku êdî divê ku hemû rêxistinên kurdan xwe û politikayên xwe di berçav de derbas bikin. Ev yek, bi awayekî vekirî hat dîtin li berçav. Bi wê re jî, pêwîstînî û pêdîvîya yekîtîya civatî, bi awayekî vekirî hat dîtin. Pêwîstînî û pêdîvîya hêza parastina hevbeş biawayekî vekirî hat dîtin. Kurdan, di vê demê de, ji wê zêdetirî pêdîvîya wê cudakarîya ku hatî xistin li nava kurdan ku ew were rakirin dîtin. Ku bahse kurdan dihê kirin, têgiha «kurdên baş» û «kurdên ne baş» hatîya afirandin, divê demê de jî hat dîtin. Ew dubendîya ku hatî xistin li nava kurdan, hat dîtin ku çawa dikarê bibe temenê wê ku civate kurd têkçûnên mazin ên dîrokî bixwûn. Ev ji hevdû cuda kirina kurdan bi vî rengî weke «kurdên baş»

û «kurdên ne baş», weke bîrîneka kurdan a. Her wusa, weke ancama wê qatkirina hebûna civate kurd a jî. Li welatên ewropî jî, ev qatkirina kurdan heya. Di vê temenê de nêzîkatî li kurdan hatîya kirin. Bi vê yekê re, civate kurd hatîya beşkirin. Bi wê beşkirinê re êdî bi demê re qatkirin di nava wê de pirr zêde çêbûya. Heta ku kurdan bixwe ev têgiha ´kurdên baş û ´kurdên ne baş´ weke ku di mejiyê xwe de bicihkiirna. Bi wê re biawayekî bi zanînî bê û ankû bi ne zanînî bê, ew qatkirin di nava civate kurd de li ser van gotinan û gotinên weke van re afirandina. Di aslê xwe de, derbeya herî mazin li hebûna civate kurd ev bixwe ya. Her wusa, ev rengên qatkirina civatê, bandûra wê hem li deronîya mirov dibe û hem jî li hemû rengên din ên pêşketina civatî jî dibêt. Heta ku di rewşeên parastina civatî de jî, bandûra gotinên bi vî rengî bineyînî heya. Civate kurd, mihtacê ya ku xwe weke yek bibînê ya. Ew laşê wê yê ku weke ku dihê li berçav ku hatî qatkirin, divê ku xwe ji wê deronîyê xilas bike. Ev jî, bi gavê avêtinên bi vî rengî ku bi hevdû re tevgerîn a. Yekkirina civatî ya. Ev yekkirin ku di warê hêzên parastinê de bê, di warê kirina sîyesetê de bê, di warê nivîsandina dîrokê de bê, di warê bikarhanîna rengê ziman û ziman bi xwe de bê û hwd, divê ku were kirin. Yekkirina civatî, êdî ji kurdan re pêwîsta.

Di vê temenê de li ser esasê hebûna civatîtîyê rojavayê kurdistanê jî û başûrê kurdistanê jî divê ku bi hevdû re êdî tevbigerihin. Di warê parastin û piştgirîya ji hevdû re divê u bi hevdû re bin. Dema ku mirov gotina ´divê ku başûrê kurdistanê piştgirîyê bide rojavayê kurdistanê´ dihêne ser ziman, û ankû dema ku mirov vajî wê jî dihêne ser ziman, weke ku mirov bahse du xalkên ku bi kok ji hevdû cuda na bike dibe. Ev têgih, di serî de divê ku were buhurandin. Ên herdû aliyan jî ji nirxekê û çand û kokekê na. Ev yek divê ku bi awayekî vekirî were dîtin. Êdî li gorî wê gav werina avêtin. Gavên weke bi hevdû re weke hêzek hevbeş tevgerîna hêzên YPG`ê, HPG´ û pêşmergeyan, giring in ku divê ku di temenê hebûna civate kurd û hebûna parastina wê de werina mayindatir kirin. Ya ku civate kurd bigiştî jî dixwezê ku ev a. Ya ku wê kurdan ji komkujiyên mazin biparêzê jî wê ev bê.

Dema ku em bahse hebûna civatekê bikin, divê ku em binirxên wê ên civatî, dîrokê, kevneşopî, felsefîkî û hwd re bahse bikin. Jiv ê aliyê deme ku am bahse aliyê nirxên civatî bikin, her wusa, di nava têgihiştina civatî de, civat makanizmayên xwe-parastinê diafirêne. Her wusa, ev makanizmayên xwe-parastinê ên civatî, di warê têgihiştin, felsefe û gelek nirxên din ên bi vî rengî ên hizirkirinî û têgihiştinî de n. Her wusa ´kevneşopî´, ku weke gotinaka ku di nava civate kurd de pirr giring a, dema ku bahse wê were kirin, wê di cih de aliyekî wê ku em dikarin bi têgihiştin û felsefeya xwe-parastinê a civatî re ku dihê ser ziman, mirov dibînê. Wê li gorî nirxên civatî çawa were jîyîn, li gorî wê kifşkirin bi zanîna kevneşoîyan re dihê zelal û safîkirin. Her wusa, kevneşopî, di vê temenê de bi rengê têgihiştinî ku di çerçoveya heyîna jîyane civatî de bi rengê destûrên jîyanê xwe dihêne ser ziman.

Li kurdistanê, kevneşopî, weke nirx û destûrna civatî, bi hezaran salan di pêşketina jîyane civatî kifşkar bûna. Ev kevneşopîyên civatî ên civate kurd, wê di rengekî de di nava bawerîyan de jî dihên ser ziman. Her wusa, kevneşopî, di temenê pêşketina bawerîyên civatî de na jî. Em vê yekê, weke aliyekî giring dibînin. Di dema ku hêrîşek li van nirxên kurdan ên bi navê kevneşopîyê dibûn, hingî berteka kurdan xwe biwan re dide li der. Di her demê de, bi vî rengî bi awayekî giringî dane kevneşopîyên xwe. Di roja me de jî, hin rexneyên ku li kurdan dihên kirin, di wê temenê de na, ku bi wan dihê

gotin ku «kurd, dernekevina dervî wan kevneşopîyên xwe. Divê ku derkevina dervî wan. Êdî divê ku hemdem bibin.» Yanî, li vir, weke ku em di nava gotinê de jî dibînin ku gotina ”hemdem” dihê danîn li hemberî gotina kevneşopîyê û bi wî rengî dihê ser ziman. Li vir, em divê ku vê yekê bibêjin ku her rewş û kevneşopî, bi nirxîtî û têgihiştina xwe ya ji temen ve, xwediyê hemdemîyeka xwe ya bi xwe re ya. Kevneşopî, destûrên jîyanî na. Her wusa, dîtbarîya gotinên weke «hemdem», li vir, nikarê wê kevneşopîyê kêm û an jî zêde werêne ser ziman. Kevneşoppî, bi nirxîtîya xwe re û her wusa bi destûrîya xwe re jîyane civatî bi xwe re dihêne ser ziman. Bo vê yekê, dema ku mirov bahse civatîtîya civatê bike, divê ku mirov ji van ´kevneşopîyan´ gavê biavêje û wê werêne ser ziman. Her wusa, di vê temenê de mirov divê ku rastîya wê bibaşî fahm bike.

Li kurdistanê, ji ber ku ji aliyê desthilatdarî û parastîya cewherî ya leşkerî û hwd ve kêmesî hebû û valahî li kurdistanê hebû û kurdan xwe «bêparastin» hîs dikir, êdî hê zêdetirî xwe li kevneşopîyên xwe pêça. Bi wê re jî, kevneşoîyên wê jîyanî ku rengê jîyane wî ya civatî dihanî ser ziman, bi wê rengê bo ard û axa ku pêl dikir û li ser re dimeşî. Di vê temenê de êdî dema ku hewldanak li dijî wan kevneşopîyan dibû, bo mirovê kurd ew hewldan ne tenê hewldanaka têgihiştinî ya bi gotinê û têgihiştinî ya li wê kevneşoîyê. Mirovê kurd, ew hewldan, bi başî û xirabî, ku bi çi awayê ba, weke hewldanaka li «ewlakarîya xwe» jî didît bû. Di roja me de jî, çend ku hêzên parastinê ên kurdistanê hena jî, van hêzan bi giranî hê bawerîyaka mazin ya «parastinê» ne dane civate kurd bigiştî. Çendî ku rêxistinên kurdan bi hêzên xwe yên parastinê hena jî, ew hêzîya wan di temenê giştî de bawerîyê nadê civate kurd. Du sedem, di temenê wê ne bawerkirinê de hena. Yek, ew a ku di temenê giştîya kurdistanî de ku hevbeşbûnek tûnaya ya. Sedema duyemin jî, ew a ku çendî ku hêzên wan hebin jî, ew rêxistinên kurd ên weke PDK´ê ku têkilîya wan bi dewletên weke tirkiya re ku heya ya. Ev herdû sedem, du sedemên giring in ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê. Bihêzbûn, çendî ku di temenê wê pêşketina civatî de xwe bi wate kir û her wusa, çendî ku bi civatê re û li gorî wê hêst û rastîya wê tevgerîya û her wusa, pirsgirêk û telûkeyên li ser wê dîtin û li gorî wan bû xwedî helwest, êdî dikarê wê bawerîyê bide. Di vê temenê de, sedema duyemin a ku dibê temenê bêbawerbûnê ya bi têkilîyên bi rejimên herêmê ên ku kurdistan û civate kurd di nava wan de hatî qatkirin re ku diafirê di serê mirovê kurd de, biqasî wê sedeme yekemin a nebûna yekbûnê di nava rêxistinên kurd de giring a. Li vir, hêsta parastinê, dema ku bawerîyê dike temenê xwe de û ew xwe dihêne ser ziman, bi awayekî xwe bi rengê xwe yê civatê şîrove dike di mejî de. Di vê temenê de, dema ku em bi gotinên hemdem jî werênina ser ziman, divê ku di temmenê têgiha parastinê de, kirin û gotin li hevdû bike. Ya ku di wê de kêmesî dihê jiyîn, bi hebûna rêxistinên kurd re ev bixwe ya. Biqasî hêza parastinê, ew hêsta parastinê ku divê ku mirov wê bi xwe re hîs bike û xwe di ewlakariyê de hîs bike jî giring û biwate ya. Ji xwe, bihêzbûn, divê ku temenê vê hêstê biafirêne. Dema ku temenê vê hêstê afirand, wê hingî karibê bersivê bide hêst û ramanên mirov ên di serê mirov de. Di vêê temenê de, dema ku em bahse hêza parastinê bikin, divê ku em hêsta parastinê weke aliyekî giring ku li berçav were girtin divê ku werênina ser ziman. Di vê temenê de, rêxistinîtîya li ser têgihiştin û teorîyê re ya parastinê, divê ku li gorî rastîya civatî bê. Wê esas bigrê. Di serî de, wan hêstên civatî esas bigrê. Weke ku çawa ku dema ku mirovek ji saqamê qûfûlî û cemîdî û ku dema ku hat hundur û li ber sobayekê rûnişt û xwe germ kir, ku di wê demê de çi

hêst bi wî re afirî, rewşa parastinê û têgihiştina wê ya ku esas were girtin de ev nêzîkatî weke teorî û ”dîktrînek”´a wê were esas girtin. Di vê temenê de, divê ku mirov hêsta a parastinê, weke temenekî pêşketina civatî jî hilde li dest.
Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê bialîkarîya tirkiya li hebûna civate kurd destpêkirin, êdî di nava rêxistinên kurdan de jî ew pêwîstînî derket li holê ku divê ku bi hevdû re û hevbeş parastinê bikin. Hêzên pêşmerge û gerîlla, bi hevdû re ketina çeper de û bi dest parastinê kirin. Ev çendî ku rast û giring bû ku bikiran, ewçendî jî giringa ku ji vir û pê de ku di temenê hêzek parastinê a kurdistanî de yekbûnek di nava wan hêzên parastinê ên kurdistanî de biafirê. Rewş û asta ku civate kurd hatî û gihiştiyê de, vê yekê weke pêwîstînîyekê û pêdîvîyekê jî didêne li holê. Î ro, hebûna civate kurd û destkevtiyên wê, li ser rêxistinan û çend komên hêzî ên ku wê li dora xwe dane komkirin re wê nikaribê were parastin. Fêr û dersa pêşî a ku ji va hêrîşên DAÎŞ´ê ku were derxistin ew a. Bi wê re jî, divê ku bi hevdû re yekbûnê çê bikin. Di temenekî de, hêzên parastinî, karibin, weke nirxek ku li ser hemû rêxistinên civatî re werina dîtin bin. Li vir, di serî de, qatbûna kurdistanê û politikayên rejimên herêmê ên ku kurdistan di nava wan de hatî qatkirin ku ji hevdû cudabûna wan, nêzîkatîyên ji hevdû cuda dixwezêt. Her wusa, minaq, weke ku li bakûrê kurdistanê ku hê pirsgirêka kurd ne hatîya çareserkirin, weke aliyên ku dibina temenê astengî ku li pêşîya wê afirandina hêzek parastinê a civatî jî bin, di serî de li vir, divê ku rêxistinên kurd li gorî nirxên civatî ên kurdistanî tevbigerihin.

Ev qatbûna kurdistanê û rejimên herêmê ku ji şerê cihanê ê duyemin ve ku hatina avakirin û kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin, biteybetî li dijî pêşketina yekîtîya navxweyî ya civate kurd in.. Bo vê yekê, ji her aliyê ve hêrîşî wê û nirxên wê dikin. Wê çawa civatê bêparastin bihêlin, di wê temenê de diçina bi ser civate kurd de. Her wusa, ji ber vê yekê bû ku di serî de rejima tirk û îranê, hêzên ku lli dijî hebûna civate kurd in, nexwestin ku kongira netewî a kurd´ were li darxistin. Di dema amedekarîyên kongira netewî a kurd´ de, zirt(´tehdîd`) li kurdan kirin bo ku wê kongirê li darnexin. Bo vê yekê, ev hêz ti carî mirov dikarê bi vê zihniyeta wan, wan weke dostna civate kurd şîrove bike. Car bi car, rayadarên başûrê kurdistanê ên weke Nêçîrwan berzanî derdikeve berçapameniyê û bo tirkiya dibêje ku ”em, muttefîkê hevdû ê stretejikî” na. Ev gotin, bo têkiliyên kurd û tirk, di vê demê de ti carî ne rast a. Rejimeka ku li dijî hebûna civate kurd şer dike, bi ti awayê nabê ”..muttefîkekî stretejik” dost bo hebûna civate kurd. Her wusa, bo têkiliyên kurd û tirk ên vê demê, ev gotin, nikarin werina bikarhanîn. Van gotinên ku rayadarên PDK´ê bi lêv dikin, em nikarin tenê bo başûrê kurdistanê jî rast werênina ser ziman. Ji ber ku ne rast in.

Têkilîyên bi ”..muttefîkîtîya stretejikî”, di serî de li ser esasê wekhevîyeka bi hevdû re miirov dikarê werêne ser ziman. Î ro, em nikarin vê bo kurd û tirk werênina ser ziman. Ku î ro, li bakûr kurdistanê, di temenê xweserîtîyê de jî pirsgirêka kurd were çareserkirin jî, piştî wê re jî mirov nikarê bi tememî vê gotinê werêne ser ziman. Ji ber ku di wê demê de jî, wê têkilîyên di nava kurd û tirkan de, ”têkilîya yên jêr û jor” bê. Yanî, têkiliya ên bindest û yên serdest bê. Têkilîyeka bi vî rengî jî, ti carî mirov nikarê bi wê rengê bi nav bike û werêne ser ziman. Li vir, dema ku mirov li têkiliyekê binerê, divê ku mirov fahm bike ku çendî herêkirina nirxên hevdû ên civatîtî û statûtîya hevdû herêkirina. Ya ku temenê têkilîyek rast diafirêne jî ev bixwe ya. Di rengê têkilîyê de ku yek xwe li ser yê din re nebînê. Li piştî hevdû gora hevdû nekolin. Çend ku rayadarên PDK´ê bahse tirkiya bi rengê ”..muttefîkekî stretejik” dikin jî, em dibînin ku ew çeteyên

DAÎŞ´ê ên bi piştgirîya tirkiya hêrîş dikin, pêşî hêrîşî wê rêveberîyê û civatê dikin. Di qada navnetewî de, di temenê bi sînorkirinê de li dijî wê dîplomasî dihê kirin. Di têkiliyek stretejikî de serdestî û serbixwebûnîtîya hevdû herêkirin heya. Herî zêde tirkiya li dijî azadî û serxwebûna kurdan a. Dema ku rewş ev bê, çawa dibê ku mirov dikarê bi wê û navê û têkiliyên bi wê re gotina ”..muttefîkekî stretejik” bikarbêne? Di dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li başûrê kurdistanê destpêkirin, rayadarên başûrî ên ku digotin ku ”tirkiya ”Tirkiya, muttefîkekî me yê stretejikî ya”, serî li tirkiya dabûbûn bo ku çek û alikariyê bide wan. Lê bi çêkirina çend hêncetan re ya ku pêşî ew alîkarî nedabû wan ew bû. Her wusa, ya ku bi rêveberîya kurd a başûr re têkili û peymanên niftê bi armanca bi xwe ve girê bide çêkiriya dîsa tirkiya ya. Êdî çawa dibe ku mirov dikarê bahse têkiliyek bi vî rengî bike? Yên ku van gotinan bikardihênin, yan ji têgihiştin û wateya van gotinan bêxaber in û yan jî bi zanebûnî bo xapandinê van gotinan dikin. Rejima tirk, hertimî bûya rejimak ku li dijî pêşketina civate kurd û bûna xwedî rêveber bûya. Bo vê yekê ya ku piştgirîyek dîrokî dide DAÎŞ´ê ku hêrîşî rojavayê kurdistanê bike. Rayadarên başûrî jî, ez di wê bawerîyê de me ku di farqê de na ku têkiliya wan ne têkiliyek rast û di temenekî rast de ya. Çend ku van gotinên bi rengê ”..muttefîkekî stretejik” û hwd bikarbênin, ne di wê bawerîyê de na. Bi van gotinan weke ku li ser tiştna binûxûmênin tevdigerihin. Piştî hêrîşên DAÎŞ´ê ku bialikarîya tirkiya hêrîşî hem başûrê kurdistanê û hem jî rojavayê kurdistanê û ku dunya alem bahse wê têkiliya DAÎŞ´ û hikimeta tirk a AKP´ê dike de ku rayadarekî kurd weke Nêçîrwan berzanî derkeve berçapameniyê û bibêje ku ”têkiliya DAÎŞ û tirkiya bi hevdû re tûna ya, ma mirov wê bi çi şîrove bike? Rayadarên hikimeta tirk a AKP´ê jî, nikarê bi vî rengî gotinekê ji xwe bi êmin werêne ser ziman. Dema ku rewş bi vî rengî bê, kurdek bi çi aqilî û ahlaqê dirabê piştgirîya tirkiya di wan hêrîşên DAÎŞ´ê de veşêrê û ´înkar bike.”? Ev tenê, mirov dikarê bi du tiştan werêne ser ziman, Yek, bi wê têkilîya serdest-bindest werêne ser ziman. Ya din jî, bi gotina ku ”ji kral zêdetir bûna kral” mirov dikarê werêne ser ziman. Mirov, nikarê vê nêzîkatîyê, bi felsefeya ahlaqê re jî werêne ser ziman. Dema ku hemû dunya têkilîya AKP´ê û DAÎŞ´ê didêne li berçav û nîşan dide bi belgeyan, raydarekî kurd, rabê û weke berdevkê hikimeta AKP´ê û wê têkiliyê înkar bike, weke ku çawa ku ev têkilî, dev jê berda ku ”têkilîyek muttefîkekî a stretejik” bê, ev têkilî dibê pêşî têkilîyek ku ji aliyê ahlaqî ve jî biqûsûr û têkilîya ´efendî û kole.´Di aslê xwe de, ev rengê tîpolojîya sîyesetmederên kurd ku Nêçîrwan berzanî di vê rengê dihênê li holê û didêne li berçav, mirov dikarê bi tîpolojîyeka keseyeta ku hatî bindestkirî û hatî metingerkirin werênê ser ziman. Di temenê têgihiştina tîpolojîyaka têkilîyê ya bi rengê ”têkilîya di nava efendî û kole” de mirov dikarê werêne ser ziman. Efendî, çi ji kola bixwezê û jê re bibêje ku ew bêne ser ziman,, ew jî wê zimanê xwe li gorî wê rast bike û bi wê zimanê efendîyê xwe werênê ser ziman. Navê vê têkiliyê jî nabê ”têkilîya muttefîkekî a stretejikî.” Navê wê, dibê ´têkilîya efendî û kole´. Ev rewş, çi dde nîşandin? Ev rewş, wê dide nîşandin ku li ser nifşek rêveber ve ku dihê xwestin ku were afirandin, civate kurd were kirin bin kontrolê de û bi wê re jî êdî wê têkilîya ´efendî û kole´ li ser wan re bidina domandin.

Li vir, dema ku ev rengê sekna rayadarên kurd a li ser lingan ku werênina ser ziman, divê ku em weke ku civate kurd jî hêvî dike ku li gorî rastîya civatî û biahlaq bê. Her wusa, ku di temenekî rast de bi rastîya civatî re di ahengê de sîyesetê bikin. Sîyeset, di temenê kirina wê de nirxên civatî hena. Dema ku li ser navê civatekê sîyeset were kirin, pêşî ahlaqê wê civatê esas tê girtin û piştre jî li gorî rastîyên wê civatî ên dîrokî, felsefîkî

û kevneşopî û hwd sîyeset dihê kirin. Sîyeseta rast û serbixwe a ku rengê civatê bi xwe re dihêne ser ziman jî ev a. Sîyeset, di vê temenê de nirxeka parastîya cewherî jî ya. Bi wê, parastina civatî dihê kirin. Di vê temenê de felsefeya sîyesetê, divê ku mirov werêne ser ziman.

**..Li vir, em** bi hêrîşên li ser rojava ve girêdayî divê ku ji ve aliyê ve lê mijarê binerin. Çend ku roj bi ser berxwedana li Kobanê ve diçin û dibuhurin. Em dibînin ku hinek detayên din ên di temenê planên rejimên herêmên ên weke tirkiya û hwd jî derdikevina li holê. Ew detay jî, ew in ku wusa hasa kirina ku wê Kobanê zû bikeve. Bo vê yekê jî, ew kurdên ku dibin navê ENKS´ê de hatibûbûna berhevkirin li herêmên weke Rehayê bicihkirina ku piştî ku derbeyek li berxwedana kurdan hat xistin, êdî ew werina derxistin li pêş. Ji xwe, hê di destpêka berxwedana Kobanê de ku ji devê van dordorên kurd dihat dayîn gotin ku ”emê artişaka kurd ava bikin” jî, divê ku mirov bi hêvî û bendewarîyê ve girêdayî werênê ser zman. Lê ev plan jî, bi berxwedana kurdan a li Kobanê hat vala derxistin. Bi vê rengî, dihat hizirkirin ku şoreşa rojava were şikandin. Ji xwe, ev dordorên ”kurd” jî, ji destpêka pêşketina şoreşa rojava ve, li gorî helwest û nêzîkatî û politikayên rejimên herêmê ên weke rejima tirk tevgerîya na û heta ku ew rêveberîya kurdî a li rojava ku hatî avakirin jî nasnekirina. Di her firsandê de gotina ku ”em wê rêveberîyê nasnekin.” Her wusa, ev rengên nakokîyên ku di nava kurdan de hatina hanîn çêkirin bidestê rejimên herêmê ên weke rejima tirk, bi armanca şikandin û bêbandûrkiirna kurdan bû. Tevî ku hêzeka parastinê ku li rojava berxwedanê û parastinê dike heya jî, ev dordorên ku dibêjin ´emê artişaka kurd ava bikin´ jî, çend ku dizanîn ku wê nikarin artişakê ava bikin jî, bi vî rengî dixwezin ku çend ciwanên kurd bênin cem hevdû û biçek bikin û ku karibin heta ku bi hêzên berxwedanê ên weke YPG´ê, YPJ´ê û hwd re jî bidina şer kirin. Ji xwe, di destpêka mudahaêeya li Sûrî de, hin hewldanên bi vî rengî jî bûbûn. Heta ku di wan destpêkên mudahale li Sûrî de, dema ku ew hêzên di bin ”artişa azad” de ku hatina avakirin, ketina dijberî kurdan de û li hin deverna hêrîş birina bi ser kurdan de, ew kurd jî di nava wan hêrîşan de hebûna. Lê di vê dema ku di wê de kurd li dora berxwedana kobanê bûna yekdeng de, dîsa deng derxistina van dordoran, tenê bi armanca şikandina kurdan a.

Li vir, divê ku vê yekê bibêjin ku ji van hewdan û ji nû ve derketina lli holê û hanîna li ser ziman ku ”wê artişaka kurd ava bikin” jî, bi hêvîya wan ya şikeştina kurdan di kobanê de û her wusa bendewarîya wan ya di vî aliyî de ya. Ji xwe, wusa dihê dîtin û fahm kirin ku van dordorên kurd jî, weke rayadarên tirk hizirîna û hêvî kirina ku wê di dema hêrîşan de pirr zû Kobanê were xistin. Êdî wan jî, li gorî xwe ketina nava hizirkiirna li piştî ketina Kobanê de. Yanî, êdî hizirkirina ku piştî kobanê ket, êdî ew hêzeka xwe ava bikin û herina herêmê weke ”xilasker” û êdî li herêmê di temenê poliitkayên rejimên herêmê de gava xwe biavêjin. Ev dordor,  derdekî wan yê weke bidest xistina ´statûya kurdan´ kurdan tûna ya. Ji xwe, ji ber ku li rojava û bi teybetî li Kobanê Statûyek kurdan bi temenê xwe re afirîya û rêveberîyek kurd li ser wê temenê û statûyê hatîya avakirin ew hêrîş li wê dihên kirin. Di ser de, divê ku mirov vê yekê kifş bike. Ev rewşa van ´kurdan´, tiştekî vekirî radixe li berçavan ku divê ku em ji aliyê yekîtîya kurdan ve hildina li dest a. Ew jî, ev a ku di vê dema ku bahse hevbekirina hêzên parastina kurdistanê dihê kirin de, ev dordor bi vî rengî derdikevina li holê û dengekî cuda derdixin. Li başûrê kurdistanê, li herêmên weke şengalê, rabîa, Cezaa û maxmûrê û hwd, hêzên YPG`ê, YPJ´ê, HPG´ê û PÊŞMERGE´yan bi hevdû re hêza xwe

kirina yek û dikin ku herêmên kurdistanê ji hêrîşên çeteyên DAÎŞ´ê rizgar bikin. Yanî, di demeka ku hatî dîtin ku tenê û tenê parastin dikarê bi vî rengî bi hevbeşkirina hêzên kurdistanê tenêê dikarê kurdistan û civate kurd were parastin, bi vî rengî derketina van dordoran, tenê bi armanckirina qatkirina kurdistanê ya. Yanî, weke komên ´mafya´ ku hin hêzna xwe yên leşkerî li herêmna çê bikin û bi wê re êdî li ser wê li herêmê xwe bidina jîyandin. Yanî, armanca wan, ne parastina kurdistanê û civate kurd a. Di serî de, divê ku mirov bi helwesta van dordoran re vê rastîyê fahm bike.

Bi teybetî, ev dordorên ku van gotinan dibêjin jî, dixwezin ku ji neçarîya mirovên ku bûna pênaber ên kurdên rojava sûd bigrin û van xwestek û emelên xwe werênina li cih. Dixwezin ku dervî xwesteka wan jî bê, van kurdên pênaber bikina bin kontrola xwe de û çekê bidina destê wan û di berjewendîyên wan xwestek û emelên xwe yên bi vî rengî de bidina bikarhanîn. Li vir, di serî de ya ku mirov kifş dike ev a. Bi wê re jî, em divê ku vê yekê bibêjin ku ji helwesta van kurdên ku bahse ´avakiirna artişaka kurd´ dikin, mirov fahm dike ku hem wan û hem jî rejimên herêmê ên weke tirkiya, wusa hêvî nekiirna û ne li bendêbûna ku wê li kobanê berxwedanaka bi vî rengî a dîrokî li Kobanê derkeve li holê. Bi wê re jî, hêvî nekirina ku wê di demek pirr kin de kobanê bikeve û êdî wê ya ku di serê xwe de plan kirina ku bikina piretikê de. Plana ku di serê xwe de plan kirina jî li ser têkbbirina YPG´ê, YPJ´ê û hwd avakirina. Yanî, hêvî van kurdan jî, weke ya rejima tirk ew bû ku YPG´ê û YPJ´ê têkherê û ew êdî li gorî xwe serdestîyekê çêbikin. Wusa dihê dîtin û fahmkirin ku ji destpêka şoreşa rojava ku van dordorên ´kurd" ên bi navê ENKS´ê û hwd, ku di her firsandê de digotin ku "em rêveberîya xweser a rojava nasnekin, ber ku yekalî hatîya denezendin", hinekî jî, hasabna bi vî rengî kiirna û di vê temenê de ketina nava bendewarîyan de. Di vê temenê de, berxwedana Kobanê, hemû rastîyên bi vî rengî derxistina ser rûyê avê.

Di vê demê de hat dîtin ku, bêî ku hêzek hevbeş ya kurdistanî hebe, wê kurd nikaribin hem destkevtiyên xwe ên li başûrê kurdistanê û hem jî ên li rojavayê kurdistanê û beşên din ên kurdistanê biparêzên. Bi vî rengî, di vê dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê hat dayîn hêrîşkirin li ser kurdan de, ev yek weke rastîyeka giring ku dihê dîtin ku pêwîstî bi hêzek hevbeş ya kurdistanî heya. Li başûrê kurdistanê, dema ku hêzên hevbeş bi YPG`ê, HPG´ê, YPJ´ê û PÊŞMERGE´yan ne hatiba avakirin û bi wê hêze hevbeş bersiv ne hatiba dayîn li DAÎŞ´ê, wê zirerek mazin bigihişta başûrê kurdistanê jî. Wê, weke ku çawa bi hêrîşên DÎAŞ´ê herêmên din hatin xûrîxandin, wê başûrê kurdistanê jî biheta xûrîxandin. Bi vî rengî, hat dîtin ku çendî pêwîsta ku hêzek kurdistanî a hevbeş were avakirin a. Ev rastî, di vê demê de biawayekî vekirî hat dîtin ku rêxistinek rabê û hêzek xwe ya leşkerî ava bike, wê nikaribê bi wê parastinaka civatî bike. Ev dem û dewr, êdî di vê demê de hatîya buhurîn. Li kurdistanê, bi teybetî, piştî hêrîşên DAÎŞ´ê re ev rastî hat dîtin. Bo vê yekê, tevî ku hêzek kurdistanî ya parastinê hebe, û li rex wê bahse avakirina hêzek din were kirin, tenê û tenê bi armanca qatkirin û perçekirinê ya. Di aslê xwe de, ev hewldan, bi armmanca pêşîya hêzek kurdistanî ya parastinê a giştî ku were avakirin û pêşxistin were girtin, ev hewldan û kiryar dihên pêşxistin. Yanî, di piretikê de, ev dordorên kurd jî, xizmeta şikandina kurdan û domandina wê qatbûna nava kurdan dikin. Ev dordor, li hebûna civate kurd ne hizirin û ti politika û hizrên wan ku bi wê li civate kurd dihizirin tûna ya. Tenê, li derxistina navê xwe digerihin. Her wusa, bo wan kurdistanê û civate kurd derbe xwarîya, wilqasî ne giring a. Ew li wê nahizirin. Ku li ser wê derbeye ku civate kurd bixwê ku ew karibin

xwe bijîn. Yanî, wusa hasab bikin, ku yekî ku bibêje ku ´ez kurd im û hêvîyê ji şikandina kurdan bike û li ser wê re hasabê xwe jîyandin û çêkirina hêzeka ku karibê xwe pê bijî bike, hingî mirov çawa dikarê bibêje ku ev dordor li kurdan û li civate kurd dihizirin? Hizirkirin ne bi gotinê ya. Divê ku mirov li piretikê bibêje û rastîya vê gotinê fahm bike. Di vê demê de bûya weke gotinaka ´moda´ ku herkesek bi lêv dike û dibêje ku ”ez bo berjewendîyên kurd ´û civate kurd´ vê dikim. Lê ev gotina bi rengê ”ez jî kurd im û ankû ´ ez bo civate kurd vê dikim´, di vê temenê de dihê îstismar kirin. Weke ku çawa ku rejimên herêmê di bin maskeya olê de mirovan dixapênin û di bin û didina şerkirin li dijî kurdan, ev dordor jî, bi vî rengî navê ´kurd´ û ´kurdistanê´ bikardihênin û bi wê mirovan dixapênin û li gorî berjenwendîyên xwe bikardihênin û didina şer kirin. Ev rastî, me li rojavayê kurdistanê di vê demê de dît. Çend ku hin dordorên kurd dibêjin ku em kurd in´ jî, heta ku ew rêveberîya xweser a kurd jî, ku kurdan bi destê xwe avakirîya hêrîşî wê kirina, reşkirina û gotina ku ´em wê nasnekin´. Dema ku yek di vê rewşê de bê, çendî ku bi koka xwe kurd jî bê û zimanê kurdî jî bikar bêne, çiqasî dikarê bahse kurdwewarî û nirxên civatî ên civate kurd bike? Bêgûman, mirovekî di van rewşan de, çendî ku bahs bike jî, ya di temenê hin politikayên xapandinê ên hin dordorna de bahs dike û ya jî yan ji nezanîya xwe bahs dike. Di serî de divê ku mirov vê rastîyê kifş bike û werêne ser ziman. Nirxên civatî ên civate kurd kifş in. Tiştên kurd, bo wê tekoşînê didin kifş in. Kurd, doza maf û azadîya xwe dikin. Kurd, doza statûya xwe ya ku ji wan hatî girtin dikin. Ku ev li bakûrê kurdistanê bê, li rojavayê kurdistanê bê, li rojhilatê kurdistanê bê û ku li başûrê kurdistanê bê. Li vir, di vê demê de bi hêrîşên DAÎŞ´ê ên li ser rojava û başûr re ev jî, bi awayekî vekirî hat dîtin ku heta ku pirsgirêka kurd ya beşên din ên kurdistanê newê çareserkirin, başûrê kurdistanê ku î ro li wê hikimet û parlamene kurd jî lê heya, nikarê bibêje ku ´min pirsgirêka kurd çareser kirîya.´ Ew rewş hemû, dibina rewşna demkî. Kengî, pirsgirêka kurd, li beşên din ên kurdistanê hat çareserkirin, hingî mirov dikarê bahse mayîndatîya wan bike. Bo wê mayindatiyê jî, parastinaka giştî ya kurdistanî pêwîsta. Hat dîtin ku başûrê kurdistanê jî, ne diewlakarîyê de ya. Rayadarên başûrê kurdistanê ên kurd ên weke Nêçîrwan Berzanî li berçapameniyê dibêjin ku ”tirkiya, hevkarê me yê stretejikî ya.” Divê ku mirov li vir li dûv vê gotinê bibêje ku tirkiya piştgirî û alikarîyê dide DAÎŞ´ê û hêrîşî başûrê kurdistanê jî dike. Hêrîşî rojavayê kurdistanê dike. Hêrîşî kurdên bakûrê kurdistanê dike û zimanê kurdî qadaxakirîya û hewl dide ku civatîtîya kurdî ya bakûr ji holê rabike û tûna bike. Tenê dibistanek nîn a ku kurd di wê de zayorên xwe perwerde bikin.Her wusa, di temenê bêstatû hiştina kurdan de bi kurdan re şer dike û hêrîşî temenê pêşxistina statûya kurdan a li rojavayê kurdistanê jî dike. Rejimek bi vî rengî, bi ti awayê tahamûlî kurd û navê kurd nakê, bi çi awayê dibe ”hevkarê stretejikî ê başûrê kurdistanê.´? Her wusa divê ku mirov vê jî bibêje ku rayadarên rejima tirk, bo başûrê kurdistanê bixwe jî, navê ”başûrê kurdistanê” û ankû nav û hevokeka ku di wê de navê ”kurd” û ”kurdistan” di buhurê, bikarnayênin. Ji başûrê kurdistanê re, gotina ”bakûrê Îraqê” weke navê wê herêmê bikardihênin. Dema ku tu kurd bê, û rejimek bo te navê ”kurd” jî nexwezê ku bikarbêne û navê herême te ”kurdistan” bê û navê wê jî nexwezê bikarbêne û li ser bikarhanîna gotina "kurd” û ”kurdistan” bê, çawa dibe ´hevkar”´ê tê? Li vir, weke **hûrgile**(´detay`)kê mirov divê ku werêne ser ziman ku çapameniya tirk, li şûna gotina ´başûrê kurdistanê´ weke navê herêma başûrê kurdistanê, navê ”bakûrê îraqê” û ankû weke ku bi tirkî bikar dihêne û dibêje ”kuzey îrak”. Her hûrgil, bi xwe re

rastîyekê dihêne ser ziman. Her wusa, mirov dikarê hûrgilan ji rastîyên zihniyetî ku hena ên li jîyanê serdest in cuda û dûr werênina ser ziman. Divê ku mirov bibîr bike ku herêma başûrê kurdistanê a li dora Rabîa ku bi berxwedana hevbeş ya peşmerge û hêzên gerîlla ên HPG´ê, YPG´ê, û YPJ´ê ku bû, di wê de gelek tank û topên ku di destê çeteyan de bûn ûû ku hêzên kurd ên hevbeş ji çeteyan standibûn, tank, top û çekên ku malê NATO ên ku ji tirkiya hatibûbûna dayîn li DAÎŞ´ê bûn. Yanî, DAÎŞ, bi çek, tank û topên tirkiya ên malê NATO, hêrîş başûrê kurdistanê dike. ..

Weke van rewşan mirov dikarê gelek rewşên din jî werêne ser ziman. Li vir, kî dibê ´muttefîkê stretejîkî´ bo kurdan di vê rewşê de, divê ku mirov rast bibînê. Kî bibe bila bibe, lê tirkiya, Îran, Sûrî û Îraq, bi rêveberîyên xwe yên navendî nabina ´muttefîkên kurdan ên stretejikî´. Ênku van gotina dihênina ser ziman, yan ji nezanîya xwe ya politikî dihênin ser ziman û yan jî bi zanebûnî bo xapandinê li ser navê van hêzan di nava kurdan de çêbikin dikin. Her wusa, dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li başûrê kurdistanê destpêkirin, rayadarên başûr serî li tirkiya dabûbûn bo standina alikarîyê. Lê rayadarên tirk, hin hêncet çêkiribûn ew destvala zîvirandibûn. `muttefîkekî stretejikî´, di rewşek bi vî rengî de te destvala divegerêne.? Tirkiya, dixwest ku bi wan hêrîşan derbe li başûrê kurdistanê jî were xistin. **Bo** vê **yekê**, wan hêrîşên DAÎŞ´ê ji herêmên başûrê kurdistanê ên weke Şengal, xanaqîn, tusxûrmatû, Maxmûrê û hwd dest pê kir. Her wusa, divê ku mirov vê jî bêne ser ziman ku di temenê bendewariyekê de T. Ardogan, weke serokkomarê demê hizrên xwe dihanîn ser ziman û digot ”kobanê ket, dikeve” jî, divê ku mirov di vê temenê de bêne ser ziman. Bi wê re, dibê ku mirov vê jî bêne ser ziman ku dema ku T. Ardogan bo kobanê digot ”kobanê ket, dikeve”, bi wê re jî dihanî ser ziman ku ´piştî ku kobanê ket û pê de, wê DAÎŞ´ê Hesekê û Afînê jî bixe´. Yanî, di vê temenê de hasab kirina bi hêrîşên DAÎŞ´ê re. Hasab kirina û plan çêkirina ku ev hersê dever, divê ku werina xistin, dakû rêveberîya kurd a rojavayê kurdistanê ku kurdan weke sê-kantonan avakiribû were ji holê rakirin. Ji xwe, di rojên ku pêlên hêrîşan li ser kobanê destpêkirin, rayadarên tirk, hevdîtinê bi Salih Mislim re çê dikin û ji wî re bi awayekî vekirî dihênina ser ziman, ”ku rêveberîya hersê kantona a xweserîyê li rojava werê feskirin û ji holê rakirin, wê hingî bihêlin ku alikarî ji wan re herê.´ `Xwe-feskirina rêveberîyên kurd ên kantonan li rojava, weke ”şert” dihênina pêşîya kurdan. Bi gotinaka din, rêveberîya tirk, li dijî statûya kurdan a. Rêveberîya ku bo ku alikarî ji kurdên rojava re herê, ´şartê´ feskirina rêveberîya xweser a kurdan dênê li pêşîya kurdan, wê bi çi aqilî pirsgirêka kurd a li bakûrê kurdistanê çareser bike? Ankû, weke ku kurdan dipirsî, rêveberîya ku ´feskirina rêveberîyên kantonan weke şart dêne pêşîya kurdan, bi çi mantiqê û ahlaqê gotina ´pêvajoyê´ dihilde ser ziman?´ Kurdan ev pirs, pirr dikirin. Lê kurdan, ev jî dizanî ku hêrîşên li kobanê jî, ji ber wê rêveberîya xweser a kurdan a li rojavayê kurdistanê destpêkiribûn bûn. Di vê temenê de, rejimên herêmê ên weke rejima tirk, ku li dijî statûya kurdan in, hevkarîyek wan bi yên ku hêrîş dikirin re hebû. Hemû hêrîşên ku di bin nav û maskeya DAÎŞ´ê de ku li kobanê û rojavayê kurdistanê dihên kirin, di temenê wan de ev rastî heya. DAÎŞ´, bi navê xwe re û her wusa bi hebûna xwe re ji hêrîşên van rejimn herêmê ên weke rejima tirk ên li kurdan re dibe maskeyek pirr baş. Di destpêka hêrîşan de, şartê feskirina rêveberîyên kantonan di dênina ber kurdan. Ji kurdan re dibêjin ku ”win rêveberîyên kantonan fes bikin, wê alîkarî li we bêrawastandin.” Yên ku vê gotinê ji kurdan û bi teybetî ji Salih mislim re j dibêjin rayadarên tirk in. Dema ku ev vê zihniyeta ku di temenê vê nêzîkatîyê de ya ku

fahm nekin, emê bi başî hêrîşên DAÎŞ´ê jî fahm nekin. DAÎŞ´, di vê temenê de bo vê armancê, yanî bo armanca şikandina kurdan hatîya çêkirin a. Bo vê armancê hatîya pêşxistin a. Yanî DAÎŞ´ê. Rêxistinek ´çêker´ a. Herkesekê ku pêşketina herêmê, têgihiştina sadsalê û asta wê û her wusa pêşketina ku bi kurdan re re li herêmê bûya ku fahm bike, wê pirr baş fahm bike ku li herêmê temenê rêxistinên bi vî rengî ên weke DAÎŞ´ê û hwd tûna ya. Pêşaroj, zihniyet û rêxistinên bi vî rengî re tûna ya. Piştî ku tevgera azadîya kurd PKK´ê derket û pêşket, êdî civate kurd jî xwe ji nû ve bi zihniyet nû ya sadsalê û pêşketî nûkir û pêşxist. Bi wê derket dika dîrokê. Rengê pêşketina civate kurd, bi nirx û kevneşopîyên wê re hat holê û dîtin. Civate kurd, xwe ji nû ve şîrove kir û fahm kir. Ji nû ve, bidest nivîsandina dîroka xwe ya civatî û hwd kir. Lê beremberî wê jî, rejimên herêmê ên weke rejima tirk ku civat kurd û kurdistan di nava wan de hatîya qatkirin û beşkirin jî, li rê û rêbazên ku bi wê vê pêşketinê û temenê wê ji holê ra bikin gerîyan. Bo vê yekê, rêya ku dîtin, ew bû ku êdî di temenekî sîyesî de olê bi gotinên navaroka wê di temenê dijberîya hebûna civate kurd de ku şîrove bikin û li ser wê re dijberîyê li pêşketina civate kurd çêbikin, weke rêyekê kifşkirin. Di temenê wê zihniyetê de, ji devê DAÎŞ´ê hanîna ser ziman û dana gotin ku ”kuştina kurdan halal a.” Ol, kiribûbûna reng û laşê statûqûya ku bi xwe re afirandibûn. Bi wê re, rengên pêşketinên civatî û bawerî ên cudaû hwd, ji holê dirakirin. Dîsa ev zihniyeta ku pêşî hêrîşan dibe ser hebûna civate kurd û bi wê re li bajarên kurdistanê ên weke kobanê hêrîşan dide destpêkirin û piştre şartê xwe-feskirina rêveberîya kurd a kantonan ku li rojava hatî avakirin, didêne pêşîya kurdan.

Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman, ku ev hêrîşên DAÎŞ´ê di çerçoveya planak weke ya jê bahs dihatkirin û dihat gotin ”modela Srîlanka” de hatîna dayîn destpêkirin. Bi wê re, divê ku em wê gotina ku bi navê Ahmed dawutoglu re dihat ser ziman û dihat gotin ku ”stretejîya kûr” û her wusa wê gotina ku bi navê leşkergeha tirk re dihat ser ziman û dihat gotin ku ”wê sed hezar kurd werina kuştin”, bi hevdû re di temenê van hêrîşên hov û xadar ên DAÎŞ´ê de şîrove bike û werêne ser ziman. Her wusa, di temenê van gotina de, armanca ji holê rakirina temenê statûya kurdan heya. Bi vê re, divê ku mirov bi ´gotina ´stretejîya kûr´ û ya ´wê sed hezar kurd werina kuştin´ re û bi hêrîşên DAÎŞ´ê re, li wê gotina bi rengê ”ku win rêveberîyên kantonan ên li rojava fes bikin, emê alikarîyê bidina we”, ku weke şart rayadarên tirk didanîn pêşî kurdan bihizirê. Di destpêka hêrîşên DAÎŞ´ê de rayadarên tirk, bi rayadarên kurd ên rojava ên weke Salih Mislim re hevdîtinê çê dikin û weke ´şartê´ dane alikarîyê, ”feskirina rêveberîyên kantonan ên li rojava ku kurdan bidestê xwe avakirina” didênina pêşîya kurdan. Di temenê hemû hêrîşên li ser rojava de jî, ev rêveberîya kurd a li rojava heya. Ji xwe, bo ku ev rêveberîyên kantonan werina xûrixandin, ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de pêlên hêrîşê bi şitt di bin maskeya DAÎŞ´ê de li rojava û bi teybetî li Kobanê dane destpêkirin. Destpêka vê pêla hêrîşên bi maskeya DAÎŞ´ê ku ji 15´ê êlûna 2014´an û pê de ku li kobanê destpêkir, divê ku mirov weke destpêka xistina piretîkê ya konsepteka şer ya bi kurdan re jî werêne ser ziman. B vê re, divê ku mirov werêne ser ziman ku di hêrîşan de kobanê destpêk bû. Piştî wê jî, wê Hesekê û Afrînê, biheta armanc girtin. Piştî ku kobanê hat xistin û piştre hesekê û afrîn jî hatina xistin, êdî wê temenê rêveberîya xweser a ku kurdan hatiba ji holê rakirin û wê êdî li wir statûyek kurd nebûba. Hemû hasab û kîtab li gorî vê hatibûbûna kirin. Lê piştî ku li kobanê rastî

berxwedanê hatin û zor bû ku pêde herin, êdî weke ku plana têkherê bû. Lê bo ku nehêlin ew plan têkherê jî, tirkiya jî bi dayîna çekên giran li DAÎŞ´ û hwd bû. Heta ku leşkerên teybet ên artişa tirk jî di nava cilên DAÎŞ´îyan de di buhurîna li rojava û bi kurdan re şer dikirin dakû kobanê bêxistin û piştre Hesekê û Afrînê jî werina xistin. Tirkiya, bo vê yekê, gelek hêzên weke ´jîtem´ û ankû ên ´paramiliter´ ku berê bi kurdan re didan şerkirin, vê carê di nava cilên DAÎŞ´ê de berê dane bi ser rojava de. Ku tenê bi çend DAÎŞ´îyan ba, wê ti carî nikariban wilqas zirerê bidina xalkê Kobanê. Ji xwe, piştre di rojên ku şer dîrêj bûn de, hat dîtin ku ti fêr û zanîna wan ya şer jî tûna ya. Yên ku bi fêr û zanîna şer li wir şer dikirin, ew leşkerên teybet ên ji artişa tirk bûn. Bi wê re jî, ew çekên bi teknîka pêşketî ku dikirina destê wan de ku bi wê hêrîşî kobanê û herêmên rojavayê kurdistanê bikin. Ya ku di aslê xwe de şer dida domandin, ev bû. Bi vê yekê re, hêzên koalîsyonê ên Emerika û hwd jî, dema ku biryara bombardimana mewzîyên DAÎŞ´ê li rojava û Sûrî dan heya tirkiya jî jê dibû. Tirkiya, berî ew bombardiman çê bibe, agahî dida hêzên xwe yên ku dibin maskeya DAÎŞ´ê de şer dikir û ew di cih de ji herêmê didane vekişandin. Piştî ku bombardiman diskinê û pê de, cardin ew di şandina nava şer. Bi vê rengê, hemû bombardimanên balefirên hêzên koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê weke ku dihatina vala derxistin. Piştre, di çapameniya cihanê de jî, dihat ser ziman ku ”bombardiman, ti fêdeya wan nîn a.” Ya ku ew bombardiman bêfêde dikir jî, ev kiryara rayadarên tirk bû. Wan ne dihist ku bi wan bombardimanan ancamak baş were bidest xistin. Ji ber ku di serê rayadarên tirk de, pêlanaka wan ya di wî şerî de hebû. Ew plan jî, ew bû ku bi hêrîşên DAÎŞ´ê wê rojava û kantonên ku hatibûbûna avakirin bihatana şikandin. Çend ku ji serîî ve ji devê mirovên camaatê ên weke Fethuleh Gulen, didan gotin û bi gotinên ji devê wî DAÎŞ dihat dayîn şermazar kirin jî, di aslê xwe de di temenê pêşxistina DAÎŞ´ê de ew camaat û sazî û dibistanên wê ên li welatên arab û arîqa jî hebûn. Ew ”şermazarkirina” ji devê gûlan di rojên destpêkê ên DAÎŞ´ê de ku li DAÎŞ´ê kir jî, tenê bo xapandinekê bû. Ew ´şermazarkirina´ ji devê gulen jî, weke lingekî wê planê bû. Ji ber ku dewlet û alî dileyist. Li aliyekî weke ku çawa ku ”di nava koalîsyonê de bê´ tevdigerîya gotin dihanî ser ziman û heta ku rayadarên tirk, DAÎŞ´ jî weke ´terorîst” bi nav dikirin û dihanîn ser ziman û digotin ku ”ti têkiliya me bi wê re tûna ya.” Lê li aliyê din jî ji bin ve, di temenê hevkarîyekê de alikarî û çek didanê de ku hêrîşî kurdan bike û bi wê dixwest ku derbeyekê li kurdan bixe.Weke vê helwesta dirû û dûalî a rayadarên tirk, divê ku mirov li wê helwesta gulan a bi gotina ´şermazarkirina´ DAÎŞ´ê bihizirê. Ew jî, ne jidil bû. Derew bû. Di gotinê de, ew gotin dikirin. Lê di piretikê de, bi hemû hêza xwe jî di nava DAÎŞ´ê de bûn. Sazî, mizgeft, malên camaatê û dibistanên ên li welatên ewropa, li welatên arab û li welatên afrîqa û hwd, ku bidestê camaatê hatina avakirin, di wan de ev rêxistin û xapandina mirovan dihat kirin û ew dişandina nava DAÎŞ´ê. Li ser camaatê re tûrek birêxistinî avakiribûn. Xwe weke ku ti têkiliya wan tûna ya camaatê jî, bo parastina vê tûra xwe ya rêxistikirî bû. Yanî, şermazar kirina gulen, derew bû û bi vê armancê bû. Ew şermazar kirin, tenê ´politika´ bû. Ew jî, dirû û dûalî dileyist, weke rayadarên tirk ku ji aliyekî ve di nava koalîsyona li dijî DAÎŞ´ê de bûn û ji aliyê din ve jîî di nava wê de bûn û alikarî didanê de bûn. Ji aliyekî din ve jî, Camaat mecbûr ku wê gotina weke şermazar kirinê bikira. Ji ber ku ev rêxistin, bi giranî, bi hizra kurderî weke ”bedîûûzzaman” hatibûbû bi rêxistin û di nava wê de gelek kurdên ku ew ji temen ve bi rê ve dibirin hebûn. Heta ku tarîqata kurd a naqşîbendî ku li başûrê kurdistanê bû, ew jî, îstismar dikir. Hinek çengên

vê tarîqata kurd a bi navê naqşîbendî, hê jî ji aliyê camaate gulen ve dihê îstîsmar kirin. Bo vê yekê, didestpêka hêrîşên DAÎŞ´ê de ew şermazara gulen a li DAÎŞ´ê ku di rojnemaya Emerîkî ya bi navê **"The wall street journal"** de derketibû jî, divê ku mirov di vê temenê de bi gelek hasab û plana rejima tirk a bi şerê DAÎŞ´ê ê bi kurdan re girêdayî werêne ser ziman.

Berî ku ´pêvajoya´ çareserîyê ku birêz ocalan dabûbû destpêkirin, pirr zêde gotinên weke "modela Sîr-lanka" hatibûbûna nîqaşkirin. Dordorên ku pirr zêde ev nîqaş birêve dibirin û dikirin jî, rojneeyên Fethullehçîyan ên weke "zaman", "yenî-şafak" û hwd bûn. Heta ku di wan deman de gotinên weke "bi rengê wê bi wê re divê ku mirov şer bike". Ev jî, di çerçoveya wê de hatibû gotin ku "rêxistineka weke PKK´ê divê ku mirov derxe ber wê bi wê re şer bike" de dihatina gotin. Di vê temenê de, rayadarên tirk û hin "nivîskarên tirk" ên nîjadperest jî di nava van nîqaşan de, ku qastî tevgera azadîya kurd PKK´ê dikirin û digotin "bi derxistina rêxistineka weke wê ku bi wê re şer bike û wê têk bibe," wê dunyayê de bê yekenê ku ew jîî tirkiya kirîya." Ev hizrên bi vî rengî, ên ku dihanîna ser ziman, nivîskarên tirk ên nîjadperest û ku nêzîkê camaatê bûn. Piştî vê demê û van nîqaşan, "pêvajo"ya çareserîyê destpêkir. Pêvajo, li ser dayîna gelek sozên ku rayadarên tirk dabûbûna tevgera azadîya kurd û Birêz Ocalan re destpêkiribû. Rayadarên kurd ên tevgera azadîya kurd û birêz Ocalan jî, dema ku diaxift, li van gotinan dinerin û li gorî wan gotinên de dihanîn ser ziman. Kurdan jî, êdî digotin "vê naqlê, dewlet cidî ya" û "wê gava biavêjê". Ev bawerî afirî bû. Lê ku dem têve diçû, êdî hin bi hin, di derbarê helwesta dewleta tirk û rayaderên wê de gûman hem di serê kurdan de diafirîn û hem jî di nava rayadarên kurd ên tevgera azadîya kurd de diafirin. Li cihanê jî, bi gotinên weke "pêvajoya çareserîyê" nîqaş di rojnemeyên Emerikî, ewropî û hwd de dibûn. Ji wan nîqaşan, dihat fahm kirin ku li derve jî bawerîya bi gotina "pêvajoya çareserîyê" di serê mirovan de afirî bû. Lê dikevîya mêjîyê kurdan de, ew jî weke nîşeyekê hebû ku di dema ku artişa Srî-lanka oparasyonên tûnakirinê li dijî Tamiliyan dabû destpêkirin de li paytaxta Norwêcê Oslo´yê hevdîtinên çareserîyê di nava wan de jî ku destpêkiribûn hebûn. Hin bi hin di nava nîqaşên di derbarê pêvajoyê de, ev nîqaş jî dihatina ser ziman. Êdî bahse van pêvajo û rewşan kirin jî, dida nîşandin ku di serê mirovan de pirr gûman afirîbûn. Lê afirîna gûmanan jî, ne vala bû. Dewletê ti gav neavêtibûn. Pêşketinên kurdan di nava xwe de çê dikirin ên weke vekirina dibistanên bi zimanê kurdî jî mohr dikir. Ev jî, êdî dida nîşandin ku di serê rayadarên dewletê li şûna çareserkirina pirsgirêka kurd, ji holê rakirina tevgera kurd hebû. Piştre, ji wê gotina "pêvajoyê" ku rayadarên tirk bikardihanên, derket û derket DAÎŞ´ derket ku êdî bi awayekî pirr bişitt bidestên hêrîşên xadar û hov ku hem li başûrê kurdistanê û rojavayê kurdistanê li Kurdan kir. Teybetmendiya vê rêxistinê, ew bû ku tenê kurd û pêşketina wan ji xwe re kiribû armanc û hêrîşî kurdan dikir. Ji kurdan û pê de, hêrîşî ti kesekî ne dikir. Ji xwe DAÎŞ, rêxistinaka ku tenê hêrîşî kurdan bike hatibû derxistin li holê.

Li vir, divê ku mirov vê jî bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku çendî bi gotina «ti têkilîya me bi DAÎŞ´ê re tûna ya» û her wusa weke ku fethuleh gulen bixwe di heypeyvînên xwe yên di rojnemeyên weke «the wall street journal» ku DAÎŞ´ê «şermazar dikin» jî, weke lingekî vê plana rejima tirk bi pêşxistina bi DAÎŞ´ê ve

girêdayî ya. Di aslê xwe de, temenê DAÎŞ´ê li ser hebûna malên camaatê, sazî, rêxistinên ên di mizgeftan de, dibistanên ku li welatên ewropî, welatên araban û welatên efrîqa û hwd ku avakirina bû. Ev camaat, bi tûra xwe ya ku rêxistinkirî li hewirdora cihanê di temenê wê de bû. Di vê çerçoveyê de, rayadarên rejima tirk û heta ên camaatê jî, dihizirîn ku planaka bêqûsûr çêkirina ku bi wê hem derbeyê li pêşketina kurdan û tevgera azadîya kurd bixin. Bi wê re jî statûya kurd a li rojava û rêveberîya ku kurdan li rojava avakirî ku xilas bûban. Bi wê re jî, wilqasî ji bi plana xwe bibawer bûn, êdî leze xwe negirtibûn û ne tenê rojava û tevgera kurd kiribûbûna armanc ji wê re. Bi wê re jî, hizirîbûn ku derbeyekê li pêşketina rojava bixin ku bahse «serxwebûna kurdistanê» jî nekin. Yanî, DAÎŞ´ planaka bi vî rengî ku wê di giştîya kurdistanê de bi hêrîşên ku li civate kurd bikira wê derbe li kurdan bixista. Bi wê re jî, ji cihan jî, vê rêxistinê weke rêxistineka «tundrew» ku çavên wê kor dizanê. Wê êdî ev rewş û zanîn jî, bûya maskeyek ku xwe dibin wê de bi nûxûmandan û bivêşartan. Piştre, wê rayadarên tirk jî di nav de, wê êdî çûbûban bi wê rêxistin kujar de û wê ew ji holê rakiriban. Wê êdî ew jî, weke zaroka ku li dêrê hatî vaftizkirin wê paqij bûban û wê kurd jî bi derbeya ku xwarin re wê maban. Ji van aliyan ve ku mirov dinerê, weke ku rejimên herêmê ên kurdistan di nava wan de hatîbû qatkirin, dihizirîn ku wan planaka bêqûsûr çêkirina ku bi wê derbeyê li kurdan bixin. Ev plan jî, navê DAÎŞ bû. Rayaderên tirk, gotinên weke «pêvajo» û ankû «pêvajo didomê», «stretejîya kûr», «wê sed hezar kurd werina kuştin» û hwd, di vê çerçoveyê de bilêv dikirin û dihanîn ser ziman. Piştî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdan destpêkirin, rayadarên tirk jî bi rayadarên kurd ên weke Salih Mislim re hevdîtinê dikin û dibêjin ku «rêveberîyên kantonan fes bikin» û «ku win, rêveberîyên kantonan fes bikin, emê alîkarîyê bidina we» û hwd. Yanî, gotinên ku piştî wan gotinên rayadarên tirk ên weke «pêvajo» û ankû «pêvajo didomê», «stretejîya kûr», «wê sed hezar kurd werina kuştin» û hwd ku tên jî ev in. Li van gotinan «rêveberîyên kantonan fes bikin» tê. Ya ku zihniyeta ku di temenê hêrîşên DAÎŞ´ê ên li kurdan de na ev a.

Li vir, divê ku mirov li ser rêbazên ku DAÎŞ bikardihênê jî, divê ku mirov bisekinê. Rêbazên ku DAÎŞ bikardihênê, rêbazên jenosîdê na. Ev rêbazên jenosîde, me di demma rejima Saddam de ku li dijî kurdên başûrî hat bikarhanîn de dît. Bi wê re jî, me heman rêbazên ku DAÎŞ bikardihênê me bi rejima tirk û şerê wê yê bi kurdan re li bakûrê kurdistanê ku bikardihanî dît. Lê bi wê re jî, hin rêbazên jenosîdê ku Artişa Sirbîstanê ku li dijî Bosniya û Herzegovîna´ bikardihî, em di nava rêbazên ku DAÎŞ bi wan şer dike de dibînin. Minaq, Artişa Sirbîstanê, mêr dikuştin û jin jî weke «koleyên Seksê» bikardihanî. Ev rêbaz, bi DAÎŞ´ê re dihê dîtin. DAÎŞ´ê jî, di temenê vê rêbaza jenosîde de, bi navê «fetwa»´yê dibêje ku «mêran bikujin û jinan ji xwe re bibin û bikina ´carîya´». «jinên wan ji we re ´halal´ in». Bi wê re, weke «fetwa»´yekê dibêje ku «kuştina kurdan halal a.» Ev gotin, di temenê kuştina hemû andamên civate kurd de dihê gotin. Yanî, bi gotinaka din, navê civatekê dihê bikarhanîn û "fetwa"´ya serê wê tê dayîn. Bi vê rengê, ew dihê xistin bin hêrîşan de. Ev rengê hêrîşan ên ku li ser civate kurd tên pêşxistin jî, li gorî wan gotinên ku weke «mêran bikujin û jinan ji xwe re bibin û bikina ´carîya´» û «jinên wan ji we re ´halal´ in» a.Bi vê rengê, em dikarin bibêjin rengê hêrîşan, di temenê jenosîdkirina civatê de na.Yanî, bi gotinaka din, wê çawa civatê ji hevdû bixin û ji hevdû bifelişênin, di wê temenê de hêrîşî hebûna civate kurd dikin. Ji vê rengê hêrîşkirinê û rêbazên jenosîdê ên ku bikardihêne, mirov bi awayekî

vekirî dibînê ku di temenê jenosîdkirina civatê de hêrîş li civate kurd dihên kirin. Rêbazên jenosîdê ên ku DAÎŞ bikardihêne, rêbazên jenosîdê ên ku rejima Saddam li başûrê kurdistanê bikardihanî, ên rejima tirk li bakûrê kurdistanê bikardihanî û artişa Sirbîstanê ku li dijî Bosnîyan bikardihî na.

Ya herî giring, ew a ku li vir mirov divê ku kifş bike jî ew a ku ev rêbazên jenosîdê wê çawa li herêmê bikarbênin li wê hizirîna. Her wusa, ev rêbazên jenosîdê ku me dît ku Artişa Sirbîstanê li dijî bosnîyan bikardihanî, hatina xistin reng û maskeya ”fetwa”´yan de û hatina bikarhanîn. Hemû rêbazên jenosîdê ku me didît ku li dijî Bosnîyan dihatina bikarhanîn, rewşên olî hatina kifşkirin û bi wan ev rêbazên jenosîdê hatina kirina weke ”fetwa”´yan û hatina bikarhanîn. Minaq, gotinaka ku weke ”fetwa”´yekê hatîya gotin û ku rêbazekî jenosîdê ê ku Artişa Sirbîstanê ku li dijî bosnîyan bikardihanî jî bû, ew a ku ”mêrên kurd bikujin û jinên kurd ji were halal in, wan weke ´carîya´ ji xwe re **bibin.” a**.

Ji **xwe** di destpêka avakirina rêveberîya başûrê kurdistanê de, hêza herî zêde ku li dijî başûrê kurdistanê bû, tirkiya bû. Piştre bi zora Emerika û hwd, ew dijberîya tirkiya a li başûrê kurdistanê dan sekinandin. Lê ji aliyê politika û zihniyetê ve, ew dijberîya tirkiya ya li başûrê kurdistanê jî hertimî domîya. Heta ku ew têkiliyên ku tirkiya bi rêveberîya başûr re danîn û çêkirin jî, wê çawa di temenê ku bi wan derbeyê li kurdan bixin û qatbûnê di nava kurdan de bi wê bidin çêkirin, bo vê armancê bikarhanî. Divê ku mirov ji bîrnekê ku tirkiya dîsa ew têkilî bikarhanî û hikimeta başûr kirîya rewşeka dijberî a li rojavayê kurdistanê de û bi peymanên ku bi wê re çêkiriya, rêveberîya başûr kirîya hewkarê wê ambergoya li ser rojava û dîsa bi wê têkiliyê pêşîya alikarîya ji başûrê kurdistanê li rojavayê kurdistanê daye girtin. Her wusa, dîsa bi heman rengî divê ku mirov vê jî bibêje ku li ser wê têkiliyê re li darxistina ´kongira netewî a kurd´ hatîya taloqkirin li demek ne dîyar. Ev rewş û gelek rewşên din, didina nîşandin ku têkiliya tirkiya a bi rêveberîya başûrê kurdistanê re li ser temen û esasê pêşîya pêşketina kurdan girtinê ya. Yanî, bi destê kurdan, pêşîya kurdan digrê. Li ser wê têkiliyê re nahêle ku kongira netewî a kurd were li darxistin. Dîsa li ser wê têkiliyê re dijberîyê ji rêveberîya başûrê kurdistanê li rêveberîya ku nû avabûyî ya rojavayê kurdistanê dide çêkirin. Ev rewş, bi serê xwe rewşeka teybet ku divê ku miirov wê hilde li dest a. Ev rewş, rewşeka teybet ku mirov wê weke astengîya li pêşîya pêşketina kurdan û çêkirina yekbûûna navxweyî ya kurdan werêne ser ziman. Her wusa, li ser vê rewşê re, êdî vê qatbûna kurdan didina domandin û her wusa li ser wê re dijberîyê li ser rêxistinîîyê re di nva kurdan de diafirênin. Bi wê re, divê ku mirov bo hebûna civate kurd bixwe jî, vê rewşê weke rewşeka aşayîşa û ya li pêşîya parastina civate kurd ya ewlakarîyê werêne ser ziman. Her wusa, hat dîtin ku ev rewşa ku bi van têkiliyên tirkiya ên bi rêveberîya kurd a başûr re hatî parastin û bi wê ne hatî hiştin ku kongiran netewî a kurd jî were li darxistin û bi wê re dijberî li rojavayê kurdistanê hatî pêşxistin, li ser wê re DAÎŞ´ hatîya pêşxistin û hatîya dayîn hêrîşkirin li ser başûrê kurdistanê jî. Yanî, ev rengê têkiliyê, di aslê xwe de bo başûrê kurdistanê jî bi vî rengî temenê telûkeyên mazin ên demên pêşî jî ya. Î ro, ev hêrîş, di bin navê DAÎŞ´ê re li hebûna civate kurd û rêveberîya kurd a başûr û li rojavayê kurdistanê bû. Siba, wê di bin navekî din û bi rengekî din bibe. Lê wê di temenê heman zihniyetê de bibe.

Bo vê yekê û bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku ev rengê têkiliya tirkiya a bi başûrê kurdistanê, dev jê berda ku bo başûr ´têkiliyek stretejikî´ bê, têkiliyek ku bi vî rengî wê hertimî temenê hêrîşên demkî ên li rêveberîya başûr û herêmên başûrê kurdistanê jî bê. Wê li ser vê temenê têkiliyê û ev rewşa bi wê dihê parastin, wê li ser wê re weke ku di roja me de bi DAÎŞ´ê hêrîş hatina kirin, wê di demên pêş de jî bi heman rengî hêrîş bibin. Li vir, dihê dîhê dîtin ku ev rengê têkiliyê e rêveberîya başûr bi tirkiya re, hertimî wê di rewşeka ku lê hêrîş werina kirin de dide hiştin û gitin. Bi vê têkiliyê re tirkiya, du tiştan bi teybetî dixwezê ku biparêzê. Yek ji wan tiştan a pêşî ew a ku bi wê têkiliyê re pêşîya yekîtîyeka mihtemel a navxweyî ya kurdan bigrê ya. Her wusa tişta din a duyemin jî ew a ku rewşa rêveberîya başûrê kurdistanê di vê temenê de bigrê û hertimî ji hêrîşan re vekirî bêhiştin. Ev têkiliya tirkiya a bi rêveberîya başûr re, hertimî xismetî van herdû tiştan dike. Ev yek jî, di vê demê a ku pêleka mazin a hêrîşên bi rengê hêrîşên DAÎŞ´ê li kurdan dan destpêkirin de bi awayekî vekirî hat dîtin û fahm kirin. Di aslê xwe de, di vê temenê de em dikarin têkiliya tirkiya ya bi rêveberîya başûr re di temenê pirsgirêkeka giştî ya ewlakarîyê ya bo civate kurd jî werêne ser ziman. Ji ber ku bi vê têkiliyê bi vî rengî hebûna civate kurd, hertimî di nava rewşeka ku hertimî derfetên hêrîşkirinê li hebûna civate kurd dihên afirandin de ew dihê hiştin. Bo vê yekê, ev têkiliya rêveberîya başûr, ku weke hin rengên çapamenî û keseyetên kurd weke «têkiliyek baş» û ku «bo ewlakarîya başûrê kurdistanê jî baş» dihêne ser ziman, em nikarin wusa werênina ser ziman.

Minaq, li ser temenê van têkilîyan re dijberî di nava rêxistinên kurd de hatîya afirandin. Rêxistin kurd, li dijî hevdû hatina xistin pozisyonekê de. Ev rewş, tenê bi serê xwe rewşeka telûkeya bo ewlakarîya civate kurd. Her wusa, rêxistinên kurd bi rengekî hatina xistin dijberî hevdû ku karibin bi hevdû re şer bikin. Ev, telûkeya pêşî ya jiv ê têkiliya rêveberîya kurd a bi tirkiya re bo hebûna civate kurd a. Her wusa, weke ancamaka vê têkiliyê dîsa divê ku mirov vê yekê bibêje ku tevî ku dema ku hêrîşên DAÎŞ´ê li başûrê kurdistanê bûn, hêzên kurdistanî ên HPG`ê, YPG´ê YPJ´ê bazîn alikariya wê. Lê tevî ku hêrîşên DAÎŞ´ê li ser Kobanê bi hefteyan domîya, ji başûrê kurdistanê alîkarî ji wan re nebû. Heta ku birêz Berzanî bixwe ragihand ku ew «derfeta wan tûna ya ku alikariyê bişênin bo parastina kobanê.» Em divê ku van aliyan hemûyan bi wê têkiliya tirkiya re şîrove bike. Divê ku mirov van aliyan hemûyan weke ancama wê têkiliya rêveberîya kurd a başûrê ya bi tirkiya re werêne ser ziman. Ev ancamên ku rêveberîya tirk dixwezê ku bidest bixe ji aliyê ve û bidest dixê jî. Bi wê têkiliya xwe ya bi rêveberîya kurd re, pêşîya yekbûna wan digrê û nahêle ku kongira netewî a kurd were li darxistin û her wusa, heta ku pêşîya alikarîya kurdan a li hevdû jî bi wê têkiliyê digrê. Yanê, bi gotinaka din, rêveberîya tirk, bi wê têkiliya xwe ya bi rêveberîya a başûr re, yekbûna kurd û pêşketina civate kurd û her wusa hatina wan ya li cem hevdû jî digrê. Rêveberîya tirk, bi wê têkiliya xwe ya bu rêveberîya kurd a başûr re pêşîya hatina li cem hevdû a kurdan digrê. Dîsa rêveberîya tirk, bi wê têkiliya xwe ya bi rêveberîya kurd a başûr re statûya kurd digrê. Her wusa, divê ku mirov dîsa bi teybetî bibêje ku rêveberîya tirk, bi wê têkiliya xwe ya bi rêveberîya kurd a başûr re wê qatbûn û perçebûna di nava kurdan de jî dide parastin. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku temenê têkiliya rêveberîya a bi rêveberîya kurd a başûr re lis er esasê parastina wê qatbûn û perçebûna navxweyî ya kurdan a. Dema ku em bahse mijarên parastinê, avakirina hêzek hevbeş ya kurdistanî bo parastina civate kurd û hwd bike jî, dîsa li ser wê têkiliya rêveberîya tirk a

bi rêveberîya başûrê kurdistanê re wê astengî derkeve li pêşîya kurdan. Dîsa, wê ew rewş newê pêşxistin. Çend ku kurd bigiştî vê yekê dixwezin jî, bi vê têkiliyê nayê hêlin ku ew bê kirin.

Di vê temenê de, divê ku em bi vê serdema ku di vê de bahse têkilîyeka pirr xort ya tirkiya bi DAÎŞ´ê re dihê kirin û DAÎŞ hêrîşên xadar û bo têkbirina kurdan li kurdan dike bi alikarîya tirkiya, divê ku mirov van têkiliyên rêveberîya kurd ên bi rejima tirk re jî bikina ber lêpirsînê de. Têkilî, ku li ser temenekî baş bê, hingî bi wê têkiliyê rêz û hûrmet li hevdû pêş dikeve. Rengê ´têkiliyek rast´, li ser esas û temenê parastina berjewendîyên hevdû ê civatî na. Dema ku rejima tirk, li bakûrê kurdistanê zimanê kurdî qadaxa kiribê, û li rojavayê kurdistanê ji ber ku kurdan bidestê xwe rêveberîyek xweser avakirîya hêrîşan bi vî rengî bi destê DAÎŞ´ê û hwd li wê pêş bixe, em hingî nikarin bahse têkiliyek rast û baş jî bikin. Ev têkilî, nabê têkiliyek ku di wê de ´wekehevdûbûnîtî´ heya. Ev têkilî, dibê têkiliyek di rengê ´têkilîya efendî û kole´ de ya.

Ku em ji kîjan aliyê ve binerin, î ro ew têkiliyên bi rejima tirk û îranê ên rêveberîya kurd a başûr, li pêşîya yekîtîya navxweyî ya kurd jî asteng in û li pêşîya pêşketina kurdan a civatî jî asteng in. Bi van têkiliyan, ti kesek nikarê îdîa bike ku wê karibê parastinekê hem bo rêveberîya kurd û hem jî bo civate kurd pêş bixe. Ku kurd bê, ku bahseka bi vî rengî bike, yan wê ji nezanîya xwe wê bahse bike û yan jî ku bi zanebûnî bê, di temenê xapandinekê de wê bahse dike. Ku bizanebûnî bê, wê çaxê rewş diguharê û dêî divê ku mirov şîroveyek din pêş bixe û wê rêveberîyê ku rêveberîya kurd jî bê, divê ku mirov di temenê têkbirina kurdan de ku hatî avakirin şîrove bike. DI dema ku rêveberîya başûr ava bû, biqasî kurdên başûr, kurdên rojava jî û bakûr jî dilxweş bûn. Kêfa wan hat. Lê rêveberîya kurd, piştre bi tememî ket pozisyoneka li dijî pêşketina kurdên beşên din ên kurdistanê de. Yanî, li ser esasê wê qatkirina kurdistanê bidest kirina sîyesetê kir. Sîyeseta ku hat kirin jî, ne di temenê berjewendîya kurdan de bû. Weke ku sîyeseta li dijî rojava hat dîtin, di temenê li dijî bidest xistina statûya kurdên rojavayî de bû. Di temenê vê dijberîyê de ew têkiliyên rêveberîya kurd ên bi rejima tirk re hena.

Li kurdistanê, di nava civate kurd giştî de ku ev beşa civate kurd a başûrê kurdistanê bê, a rojavayê kurdistanê bê, a bakûrê kurdistanê û rojhilatê kurdistanê bê, ew hesta netewî û yekîtîyî pêşketîya û heya. Lê bi rêxistinkirina vê hêstê û sazîyên pêşketina civate kurd ên vê hêstê ne hatina afirandin. Rêxistinên kurd, di vê demê de ew rol û weyna xwe ya dîrokî ne leyistina. Çend ku civate kurd ji hemû beş û aliyên xwe ve zorê dide rêxistinên kurd jî, ev rêxistinên kurd, li ber wê zora civate kurd bixwe jî li berxwe didin ku wê yekîtîya ku civate kurd dixwezê çênekin. MInaqe vê jî, li darnexistina kongira netewî a kurd´ a. Gelê kurd, yekîtîyê dixwezê. Bo vê yekê, hêvî û bendewarîyê dike. Her wusa têkiliya tirkiya a bi rêveberîya başûrê kurdistanê re, bo ku ev yekîtîya ku civate kurd dixwezê ku newe li dar xistin, dihê bikarhanîn ji aliyê rejima tirk ve. Yanî, tirkiya hemû têkiliyên xwe yên bi rêxistinên kurdan re, li ser wê temenê ya ku bi wê pêşîya pêşketina yekîtîyek navxweyî ku bibe bigrê. Bo vê yekê ya ku di wê dema ku kurdan li Kobanê li berxwe dida, çend kurd hanîbûbûna li Rehayê û bi devê wan dida gotin ku «em dixwezin ku artişak kurd ava bikin.» Bo şikandina kurdan, ku çend kurdan bixapênin û çend koman bi navê van kurdên ENKS´ê ava bikin jî, wê ew komên ku bi çekdarî avakirina wê di rengê ´cahş´ û ´cerdewanên´ ku rejima tirk li bakûrê kurdistanê bo dane şerkirinê li dijî tevgera azadîya kurd PKK´ê avakirina, wê weke van bin û di

pozisyona wan de bin. Ew jî, wê bina hêzên ´para-militer´ û cahşên rojava ku li dijî statûya kurdên rojava têdikoşîn. Li vir, divê ku mirov bi vir ve girêdayî li ser vê hûrgilê jî bisekinê ku temenê şerê DAÎŞ´ê ê ji aliyê tirkiya ve li ser temenê «şerê kontrayî» ê li dijî kurdan ku ava ya. Li bakûrê kurdistanê, bi pergale cerdewanîyê, ser 70 hezar kurdî re biçekkirin û kirina cerdewan û ankû weke ku kurd wan bi nav dikin «cahş». Bidestê van kurdên hatina bi çekkirin û bûna ´para-milîter´, bi hezaran mirovên sivîl ên ji civate kurd hatina qatil kirin. Nûha jî, bi heman rengî û politikayê li ser hin komikên ´kurd´ re vê poliitkayê li rojavayê kurdistanê li dijî kurdan ku bi destê hin ´kurdna´ pêş bixin.

Civatek, çendî ku hêzên çekdarî bi komî di nava wê de hatibibina avakirin, ewçendî temenê têkçûnê bo wê di nava wê de dihê afirandin. Bi wan komikên bi çek ên çete re, her cure pîsîtî d nava civate de dihê pêşxistin. Civat jî, nikarê êdî bi rengê xwe û bi kevneşopîyên xwe bijî. Civat, êdî hin bi hin têk diçê. Êdî ya ku li civatê serdest dibe, ew komên çekdar in ku hin bi hin weke qijnikên ku xwûna laşê mirov dixwûnn û mirov bêxwûn dikin, civat jî wusa lê tê û êdî bidest têkçûna wê dibe. Ku mirov van komên çekdar ên ku di nava civatê de dihên afirandin ên weke li bakûrê kurdistanê ´Cerdewan´ û ku li rojavayê kurdistanê jî ihê xwestin ku were pêşxistin, mirov dikarê weke «qijnikên xwûn mij» bi nav bike û bi wê rengê wan werêne ser ziman. Pêşî bi rêya van komikên ku hatina bi çekkirin temenê hêzek hevbeş ya kurdistanî ku hebûna civate kurd bi nirxên wê re biparêzê dihê ji holê rakirin. Ji xwe, bo vê yekê ev dihê kiirn. Çendî ku bi vî rengî weke komên bi çek zêde hebin û hatibibina avakirin, wê ewçendî temenê hêzek kurdistanî a hevbeş ku karibê giştîya civate kurd biparêzê, wê were ji holê rakiirn. Ji xwe, bo ku pêşîya xwe parastina civatî were ji holê rakirin, ev komên çekdar, herêm bi herêm dihên afirandin û dihên derxistin li holê. Bi wan re jî, hem hebûna civatê di nava wan komikan de dhê beşkiirn û perçekirin û hem jî yekîtîya navxweyî ya civatê ku hebê jî dihê tûnakirin. Yanî, ev hewldanên çêkirina komikên çekdar li rojavayê kurdistanê, hem bo têkbirina hebûna civate kurd û hem jî bo ji hevdû felişendina hebûna civatê ya. Mirov, dikarê vê avakirina komikên çekdar, weke politikayaka ku bi wê civat re ji civatîtîya wê xistin û tûnakirin jî bihasibêne. Ev politika, berê di salên buhurî de li herêmên Afrîqa hatibû pêşxistin. Bi wê jî, hemû pêşketinên netewî ên li afrîqa hatina ji hevdû felişendin. Ev komikên biçek, çendî ku êdî hevdû ji hevdû dikujin, bi wê rengê ji civatê jî dikujin. Lê hebûna wan, derbeyeka mazin a dîrokî ya li pêşketina civatî jî ya. Bi heman rengî, di aslê xwe de DAÎŞ li kurdistanê ku li dijî civate kurd were şerkirin pêşxistin. Vêca nûha dixwezin ku hin komikên «kurd» jî li DAÎŞ´ê zêde bikin. Nakokîyên ku di nava rêxistinên kurdan de hatina pêşxistin, sorkiirn û dijwarkirin, li ser wan re ev komên piçûk ên bi çek dihê xwestin ku werina çêkirin. Di nava civatekê de, bi vî rengî temenê hevdû kuştinê, li ser van nakokîyên ku li ser rêxistinan re hatina çêkirin re dihê pêşxistin. Êdî di nava civate de li şûna têkiliyên rast ên civatî, têkilyên bixwûn ên hevdû kuştin diafirin. Li kurdistanê, rejima tirk, têkiliyên xwe yên ku bi hin rêxistinên rojavayî û başûrî ên kurd re danîya li ser van esas û temenê na. Ji xwe, ku têkilîyên wê ne li ser politikayaka bi vî rengî bê, wê nikaribê wan rêxistinên kurd bike dijberî hevdû de ku karîbin êdî hêrîşî hevdû jî bikin. Di aslê xwe de, ev rewş bi serê xwe rewşeka ewlakarîyê û aramîyê ya navxweyî bo civate civate kurd û hebûna wê diafirêne. Ji vê aliyê ve dema ku mirov li rewşê binerê, mirov dikarê bi van rewşan hinek telûkeyên din jî bo parastina hebûna civatî a kurd kifş bike.

Dema ku em bahse afirandina hêzek hevbeş ya kurdistanî dikin, em tenê bahse hanîna li cem hevdû ya çend hêzên kurdistanî ên weke YPG´ê, HPG´ê, YPJ´ê û PÊŞMERGE´yan nakin. Ji wê zêdetirî, em bahse zihniyetekê jî dikin. Li vir, di serî de divê ku zihniyeta vê were kifşkiirn û ser ziman. Weke arternatîfe wê zihniyeta afirandina hêzên piçûk li ser rêxistinan û bi navê wan re, ev zihniyeta afirandina hêza parastinê a hevbeş divê ku were ser ziman. Bi wê re jî, divê ku mirov fahm bike ku ev hêz ku li ser hemû rêxistinan re û her cûre telûkeyên ku werina ser civatê wan kifş bike û li dijî wan bisekinê. Di vê temenê de xwe bi gelek awayan bi rêxistin bike. Artişbûn jî, di vê temenê de pêş dikeve. Di vê demê de li rojavayê kurdistanê, bahse pêşxistina artişbûnê hat kirin. Heta deverekê jî bi YGP´ê û YPJ´ê gavên wê jî hatina avêtin. Lê ku bo hêzêk hevbeş ya kurdistanî bi rengê artişbûnî dernekeve li holê, ev komik dihên pêşxistin û dihên derxistin li pîyasê. Yanî, ev di temenê politikayaka qatkirinê de dihê kirin. Bo ku hêrîşên ku li dijî civate kurd bikin, hêzek hevbeş ya kurdistanî li hemberî wan nebê, vê yekê pêşdixin.

Hêza hevbeş ya kurdistanî, divê demê de pirr zêde pêwîstî û pêdîvîya wê hat dîtin. Hat dîtin ku êdî civate kurd, tenê dikarê bi hêzek hevbeş ya kurdistanî dikarê were parastin û ewlakarîya wê were çêkirin. Ev yek, weke rastîyekê li başûrê kurdistanê jî û li rojavayê kurdistanê jî hat dîtin. Piştî hêrîşên DAÎŞ´ê ên li başûrê kurdistanê, navenda çalakiyên hevbeş hat avakirin. Her wusa, bi wê re jî, navenda ´fermandarîya hevbeş´ ji aliyê YPG`ê, HPG´ê û PÊŞMERGE´yan ve hat avakirin. Bi wê re, êdî li dijî DAÎŞ ketina yek pozisyonê de.Bi hevdû re parastin û DAÎŞ ji herêmên kurdan derxistin. Nehiştin ku DAÎŞ were herêmên kurdan. Ev rast bû û di cih de bû. Her wusa, bi vî rengî kirina yek ya hêzan, temenê nakokyîn dijberî ên rêxistinan jî ji holê dirakê. Temenê şerê navxweyî jî ji holê dirakê. Heta ku di nava civatekê de, hêzên ji hevdû cuda û komikên ku hatina birêxistin kirin û çek hati kirin li destê wan de, temenê hevdû kuştin û weke ku kurdan berê bi nav dikir ”birakujiyê” heya. Her weha minaqe vê ya herî dawî rewşa li rojava ya. Hin komikên ´kurd´, li Rehayê sekinî na ku YPG´ê li rojava û bi teybetî di berxwedana li Kobanê de derbe xwar ku êdî bikevina dewrê de. Bo vê yekê ya, ku ji destpêka berxwedana Kobanê ve kirina rojevê ku ”artişaka kurd” ava bikin. Dema ku YPG´ê li wir derbe xwar û şikeşt û bi sedan kurd hatina qatil kirin, hingî ne temenê wê avakirina artişa te dimênê û ne jî ku ti ava bike jî wê karibê li ser wê şikeştinê re bibe artişakê û weke artişekê.Ya ku nayê dîtin û ankû tê dîtin jî, bi zanebûnî dihê kirin ev a.

15.10.2014/Abdusamet Yigit